CILD 1-2

ESLÎXAN YILDIRIM

DI SEDSALA 20'AN DE

# KURDISTAN Û SÎNOR

AZAD

# DI SEDSALA 20'AN DE
# KURDISTAN Û SÎNOR

CILD I-II

Eslîxan Yildirim

**DI SEDSALA 20'AN DE KURDISTAN Û SÎNOR**
**CILD: 1-2**
Eslîxan Yildirim

**WEŞANXANEYA AZAD**
**Dîrok:** 01/03

**Edîtor**
Eslîxan Yildirim

**Sererastkirin**
Serwet Denîz

**Berg**
Şener Özmen

**Rûpelsazî**
Mîran Janbar

**Çapa Yekemîn**
Weşanên Azad, 2013

**Çapxane**
İMAJ MATBAACILIK SAN. TİC. LTD. ŞTİ.
Litros Yolu, 2. Matbaacılar Sitesi, C Blok 2 BC 6
Topkapı-İstanbul
Tel: 00 90 212 501 91 40
Sertifika No: 26954

**ISBN:** 978-0-9575612-2-9
**Company No:** 8291088

**Navnîşan**
WEŞANXANEYA AZAD
41 Handa Walk
LONDON
N1 2RF
www.wesanxaneyaazad.com
info@wesanenazad.com

DI SEDSALA 20'AN DE

# KURDISTAN Û SÎNOR

CILD I-II

Eslîxan Yildirim

**Eslîxan YILDIRIM:** Di sala 1960'î de li Nisêbînê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî û ya navîn li Nisebînê xwendiye. Dûre li Erziromê, Lîseya Mamostehiyê ya Keçikan a Nenehatûnê û dîsa di heman dibistanê de Enstîtuya Perwerdehiyê qedandiye. Bîst salan li Nisêbînê mamostetî kiriye. Ji sala 1999'an ve li ser dîrok û çandê lêkolînê dike. Di sala 2012'an de li Londonê "Weşanxaneya Azad" ava kiriye. Sê zarokên wê hene. Bi Kurmancî, Tirkî û hinekî jî Erebî û Ingilîzî dizane.

**Berhemên wê:**

*-Tarihin Tanığı Nusaybin (Nisêbîna Şahida Dîrokê),* Şaredariya Nisêbînê, 2001
*-Kaniyek ji Mezopotamyayê Nisêbîn,* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2005
*-Herdemciwanê (Çîrokên Gelêrî),* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 2009
Çapa 2. Weşanên Azad, London, 2013
*-5 Çîrokên Zarokan (Pîrê û Dîk, Gayê Cot, Herdemciwanê, Pîrê û Rovî, Rovî û Şêr),* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 2009
*-Di Sedsala 20'an de Kurdistan û Sînor –Cild I (Dîroka Sînorê Di Kurdistana Bêsînor De)*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 2009

*Ji bo bîranîna bavê min Reşîtê Misto*

کتێب هەواڵنامەی

هوالنامه‌ی کتیب

# NAVEROK

PÊŞGOTİN, 17
PÊŞEK, 23
DESTPÊK, 33

**CILD I**

**DÎROKA SÎNORÊN DI NAVA KURDISTANA BÊ SÎNOR DE**

**Heta Sedsala 20'an ........................................................................39**
*Mijarên di hundirê vê servivîsê de:*
Împaratoriya ewil a dinyayê
Têkilî û pevçûnên di navbera Rojhilat û Rojava de
Ketina nav hev a çanda Rojava û Rojhilat
Êrîşên Ereban û hatina Îslamiyetê
Hatina Mogolan û wêrankirina herêm û çandê
Destpêka bihevrebûna Kurd û Tirkan
Bihevrebûna bi dilê xwe ya Kurdan û Dewleta Osmanî
Rewşa Mîrekiyên Kurdan
Encama cihgirtina di sînor de
Peymana Qesra Şîrîn
Rewşa di sînor de
Êşa Ehmedê Xanî ya ji ber Peymana Qesra Şîrîn
Qelskirin û ji holê rakirina Mîrekiyên Kurdan
Rewşa piştî hilweşîna Mîrekiyên Kurdan
Peymanên li ser sînor
Hin bandorên din ên sînoran
Rewşa Kurdan a dema dawiya Osmaniyan

**Serê Sedsala 20'an û Şerê Dinyayê yê Yekemîn ........................................81**
*Mijarên di hundirê vê servivîsê de:*
Cihgirtina Kurdan di gelek qadên Dewleta Osmanî de
Di pêla azadiyê de hewldanên cuda
Hevdîtinên peymanê ji bo sînoran didomin
Encama pêşxistina neteweperweriya Tirkîtiyê
Feşkilandina Dewleta Osmanî
Rehberdana Ewrûpiyan a di nav Dewleta Osmanî de

Şerê giran dest pê dike
Çavberdana axa Dewleta Osmanî ya Ewrûpiyan û ji bo paykirina van erdan sînorên li ser maseyan hatine xêzkirin

**Kurdistan Parçe Parçe ....................................................................103**
*Mijarên di hundirê vê sernivîsê de:*
Di şer de Kurd li hemû cepheyan bûn û xwe ji Tirkan veneqetandin
Tevliheviya piştî şer
Pêşketina neteweperweriya Kurdan
Di navnetewî de hin gavavêtinên ji bo Kurdan
Baweriya Kurdan bi Ewrûpiyan nehatiye
Hevdîtinên Ewrûpiyan bi hin derdorên Kurdan re dom dike
Ji aliyekî ve pevrebûna Kurd û Tirkan dimeşe
Rewşa Başûr û Şêx Mehmûd Berzencî
Ji bo Kurdan ber bi xwe ve bînin tevgerên derdorên cuda
Biryarê Sewrê û encam
Mîsaqî Milî (Peymana Milî)
Kesek naxwaze Kurdistanê ji dest xwe berde
Tevgera Mustafa Kemal derdikeve pêş
Peymana Sewrê
Alîkariya Yekitiya Sovyetan bi Mustafa Kemal re
Peymana Sewrê tu cih nagire
Hêdî hêdî hêvî ji Mûsilê tê birîn
Peymanên hikûmeta Enqerê bi dewletan re
êkoşîna Kurdan di asta herî bilin de ye
Peymana sînorê Tirkiyê û Sûriyê û fermîbûna veqetandina Başûrê Biçûk
Serhildanên Kurdan bi berfirehî dom dikin
Serkeftinên Smaîl Axayê Şikakî (Simko)
Qanûna meclisa Enqerê ya ku hin heqên Kurdan qebûl dikir
Hikûmeta Enqerê berê xwe dide Başûr
Bombebarandina Ingilîzan bi ser Başûr de
Li ser payêkirina Kurdistanê berbihevçûna dewletan
Vegera Şêx Mehmûdê Berzencî ji sirgunê
Têkçûna Kurdan li Lozanê
Tirsa Ingilîzan a ku Mûsilê winda bikin û hewldanên wan ên herêmî
Şîroveyên ne rast ên der barê têkçûna Kurdan de
Pêvajoya li Başûr li hesabê Dewleta Tirkiyeyê nayê
Têkoşîna ji bo Mûsilê dom dike
Taqeta tu aliyî, ji bo bidestxistina tevahiya Kurdistanê şer bike tune û li ser paykirinê li hev dikin

Li Lozanê tunebûna temsîlvanê Kurdan ê fermî
Tevliheviyên li ser windakirina Mûsilê
Rakirina Xîlafetê, behsa yekneteweyî û serhildana Şêx Seîd
Nîqaş û lîstikên li ser Mûsilê

## CILD II

## SÎNORAN BI XWE RE ÇI ANÎN?

SÎNORÊN SEDSALA 20’AN ........................................................................203
**Sînoran Dê û Weled Ji Hev Qut Kirin ..............................................209**
*Mijarên di hundirê vê sernivîsê de*
Wateya sînor ji bo Kurdan çi ye?
Rewşa Kurdan di dema pêşî a perçekirina welatê wan de
Danîna mayinan û jihevqutkirina xwedî û milet
Dîmenên ber sînoran
Hin serpêhatî û bûyer

**Li Kurdistanê Her Tim Şer Heye ....................................................227**
*Mijarên di hundirê vê sernivîsê de*
Bi gelemperî nerînek li sedsalê
Rewşa Heta 1950’yî
Bihevrebûna Kurd û Tirkan heta Peymana Lozanê
Li Tirkiyê bi înkarkirina Kurdan re destpêkirina serhildana Şêx Seîd
Tevger û hewldanên 1926’an
Berdewamiya serhildanên li Îranê û qeweta Smaîl Axayê Şikakî
Serhildanên Şêx Mehmûd Berzencî dom dikin
Serhildana Agirî û pêşketina Îhsan Nûrî Paşa
Xapandina xelkê û komkujiya Eleqemşê
Şerê giran ê 1930’î û komkujiya Zîlanê
Alîkariya Îranê ya bi Tirkiyeyê re û lihevkirina pevguhertina erdên di sînor de
Di heman demê de rewşa li Sûriyeyê
Têkiliya pêvajoya li Îraqê ya bi Serhildana Agiriyê re
Domkirina sirgûnan
Rewşa sînorên Kurdistanê
Kurdistana Sor a li Sovyetê
Bingeha serhildana Dêrsimê
Serhildana Dêrsimê

Komkujiyên Dêrsimê
Di dema komkujiyên Dêrsimê de hilweşandina Amûdê
Bi Şerê Cîhanê yê Duyemîn re derketina Frensiyan ji Sûriyeyê û guhertina rewşa Kurdan a li Başûrê Biçûk
Li Îraqê destpêkirina tekoşîna di bin rêberiya Mistefa Barzanî de
Tevî hêzên xwe derbasbûna Mistefa Barzanî ya Îranê
Damezirandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê
Rewşa Dewleta Kurdistanê û xebatên Kurdewarî
Hêza li dijî Komara Kurdistanê û hilweşandina wê
Çûna Îraqê ya hêza Barzanî
Rêwîtiya Barzanî û hêza pê re ya ber bi Sovyetê ve
Qewînkirina Sînoran û Bi Dû Wê De
Damezirandina Nato û Pakta Warşovayê û bandora wan a li Kurdistanê
Vegera Mistefa Barzanî ji Sovyetan û bidestxistinên Kurdan ên li Başûr
Qewînkirina sînoran û jihevdûrxistina rêxistinên Kurdan
Dîsa lidijderketina gelek hêzan a li hemberî heqên ku Kurdan li Îraqê bi dest xistibûn
Piştî bidestxistina hin mafan a li Îraqê rewşa Kurdên li dewletên din
Li Tirkiyeyê biryara tunekirina Kurdan a hişkere û “Doza 49’an”
Li Tirkiyeyê derbeya leşkerî ya 1960’î
Paşde gavavêtina Dewleta Îraqê û serhildana Mistefa Barzanî
Derbeyên li Îraqê û lihevkirinên bi Kurdan re yên demkî...
Damezirandina PDK-T (Partiya Demokrat a Kurdistan- Tirkiye)
Xurtbûna çepgiriyê ya li Tirkiyeyê
Mitîng û tevgerên Kurdan
Bidestxistina otonomiyê li Başûr û dîsa derbeya leşkerî ya li Tirkiyeyê
Dîsa destpêkirina têkoşîna çekdarî ya li Îranê
Peymana Cezayîrê û têkçûna Kurdên Başûr ên di bin serokatiya Barzanî de
Di dema Mistefa Barzanî de Kurdistana Başûr
Derketina tevgera Celal Talabanî û bi salan domkirina birakujiyê
Li Tirkiyeyê derketina gelek rêxistinên Kurdan
Li Îranê destpêka dema Humeynî û bi dû de
Li hemberî Humeynî têkoşîna Kurdan
Di 1980’yî de derbeya leşkerî ya li Tirkiyeyê
Zilm û zordariya di dema derbeyê de
Şerê Îran û Îraqê û di nîvê agir de mayîna Kurdan
Operasyonên dersînor yên Tirkiyeyê
Destpêkirina têkoşîna çekdarî ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK)
Bidestxistinên Kurdên Başûr
Li Viyanayê 13’ê Tîrmeha 1989’an, bi xapandin kuştina sekreterê giştî yê

PDK-Î Abdurahman Qasimlo
Êrîş û bikaranîna çekên kîmyewî yên dema Enfalê
Qetlîama Helepçe
Koçberiya ber bi sînoran ve
Belavbûna Sovyetan û serxwebûna gelek xelkan
Pêşketina têkoşîna Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK)
Bilindbûna agirê Newrozê
Berdewamiya êrîşên mezin û koçberiya Başûrê Kurdistanê
Avakirina Herêma Federe ya Kurdistanê
Li hemberî bihêzbûna PKK'ê zêdebûna kuştinên kiryar nediyar ên li Tirkiyeyê
Di dawiya sedsalê de bi komployeke navnetewî girtin û anîna Tirkiyê ya serokê PKK'ê Abdullah Ocalan (1999)
Bi tevayî rewşa Kurdistanê ya serê sedsala 21'emîn

**Asîmilasyon, Sirgûn û Koçberî ........................................................ 337**
*Mijarên di hundirê vê sernivîsê de*
Encama asîmilasyon, sirgûn û koçberiyê
Kurd û otoasîmilasyon
Asîmilasyon sûcekî mirovahiyê ye
Windahiyên sirgûn û koçberiyê
Girêdana Miletê Kurd bi axa wî ve
Pevrebûna gelan a di dîrokê de û danûstendina çandan
Sirgûn û koçberiyên ku bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn re hatin
Bi avakirinên netewedewletan planên asîmilekirina Kurdan ên bi rêk û pêk
Ji aliyê dewleta Tirkiyeyê ve terikandina biratiya Kurd û Tirkan, înkarkirina ziman, çand, kesayetî û hebûna Kurdan
Xelitiyên di Saziya Dîroka Tirkan û Zimanê Tirkî de hatin meşandin
Berhevkirin û şewitandina pirtûkên Kurdî, derxistina peyvên 'Kurd' û 'Kurdistan' ji hemû pirtûkên dersan
Guhertina navên gund û cihan
Rewşên trajîkomîk ên ji ber înkarkirina Kurdan derdiketin holê
Bandora şerê demdirêj a li ser tundiyê
Li Îranê zordariya dema Şah Riza
Asîmilekirina Kurdan a li Îranê
Lezgîniya tunekirina Kurdayetiyê û qirkirina Dêrsimê
Mifetişê giştî yên herêmên Kurdan û hewldanên wan
Cezakirina kesên ku bi Tirkî nediaxivîn
Xwestina ji Kurdan a xweînkarkirinê

Biçûkxistina Kurdan a di nav civatê de
Bayê çepgiriyê û rewşa 1960'an
Domkirina planên asîmilasyonê û rewşa 1970'yî
Bîranîneke min a dema ez li dibistanê bi Kurdî axivîm
Berevajîkirina dîroka Kurdan
Bi perwerdeya dewletê ya bi planên asîmilekirinê derketina nêrînên xelet ên li dîrok û şexsiyeta Kurdan
Meşandina heman rewşê ya li Îranê
Bi Kurdan re asîmilebûna hemû hemwelatiyan
Li hemberî çewtiyan rewşa zarokên Kurdan
Li Îraqê carna bidestxistina mafên çandî û qebûlkirina Kurdayetiyê
Bêencammayina hewldanên hin rayedarên Tirk ên ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdan
Bi israr meşandina polîtîkaya înkarkirina Kurdan
Jihevqutkirina Kurdan bi alfabeyên cihê
Xebatên Kurdewar ên li Ermenistanê
Di bin nîrê xweînkarkirinê de îstatîstîkên xelet ên di derbarê Kurdan de
Mecbûrmayina veşartina nasnameya xwe ya Kurdan
Rewşa Kurdên ku koçberî welatên Ewrûpayê bûne
Di warê çandî de jihevdûrketina Kurdan
Paşdemayîna dewletên ku Kurdistan di nav xwe de parve kirine
Di tunekirina Kurdan de rêbazeke din: Sirgûn
Sirgûnên piştî Serhildana Şêx Seîd
Qanûnên ku ji bo sirgûnê hatine derxistin
Xayintiyên ku bi Kurdan re hatine kirin
Sirgûnên ku li Îranê çêbûne
Guhertinên navên hemû cihên cografîk, taxên di nava bajaran de yên li Kurdistana Îranê
Li Îranê qedexekirina cilûbergên kevneşopî yên Kurdan
Sirgûniyên malbatekê
Di seqema zivistanê û germa havînê de berdewama sirgûnkirinan
Li cihê sirgûnê ji hev veqetandina ferdên malbatan
Bi sirgûn û koçberkirinan Kurd koçeke girîng a mejî jî didin
Sirgûnkirina Bedirxaniyan
Helwestên cihê yên miqabilî mihacirên ji derve tên û Kurdên sirgûn dibûn
Sirgûnkirinên berî destpêka Serhildana Dêrsimê, di dema serhildanê de û piştî serhildanê
Barzanî û sirgûn
Xefikvedan û girtina ber Kurdan a bi mayindanînê

Li sînorê Sûriyeyê danîna Kemera Erebî û encamên wê
Sirgûnên li Kurdistana Başûr
Zêdebûna sirgûnan a piştî derbeyên leşkerî û guhertinên desthilatdariyan
Koçberiyên mezin ên ji ber zilma Sedam
Di 1991'ê de Enver Ozkahraman li sînor çi dîtin
Li Tirkiyeyê ji bilî sirgûniyên mecbûrî, ji ber mercên xerab koçberiya ber bi rojava ve
Kurd li ku û ku hene
Nêrîneke tevayî li asîmilasyon, sirgûn û koçberiyê

**Hevalbendiya Dewletan a li Hemberî Kurdan û Êrîşên Dersînor ............429**
*Mijarên di hundirê vê sernivîsê de*
Lihevkirina dewletan a li ser parkirina Kurdistanê
Li hemberî berxwedana Kurdan pevrebûna dewletên ku Kurd lê dijîn
Ji bo berjewendiyan, firehbûna eniya dewletên dijberî Kurdan
Rola dewlemendiya axa Kurdistanê ya li ser hevkariya dijminên wê
Tirsa ji serî netewandina Kurdan û pêkanîna cepheyên dijberî wan
Sînorguhertin tê de, lihevkirina dewletan li ser her cureyî ya li hemberî Kurdan
Newekheviya tiştên tên xuyakirin û rastiyê
Qelsketina Kurdan li hemberî pevrebûna gelek dewletan a li dijî wan
Şîroveyên İsmail Beşikçi yê li ser vê mijarê
Di dema Komara Kurdistanê ya Mehabadê de hêzên ku li dijî Kurdan derketin
Di Meşa Berzaniyan a ber bi Sovyetê ve xweparastina ji sê dewletan
Pakta Bexdayê
Di sala 1975'an de têkçûna Kurdan a bi lihevkirina dewletan a li ser menfaetê
Toleransa dewletan a ji bo operasyonên dersînor ên bi ser Kurdan de
Bi operasyoneke dersînor, qetlîama li Qamîşloyê
Di navbera Enqere û Bexdayê de 'Peymana Ewlehiya Sînor û Hevkariyê'
Di bikaranîna çekên kîmyewî de alîkarên Sedam
Bêhijmar operasyonên dersînor ên Tirkiyeyê
Di 1992'yan de bi îlankirina 'Dewleta Federe ya Kurdistanê' windahiyên mezin ên PKK'ê
Guhertina sînoran li dinyayê û hesasiyeta dewletan a li hemberî sînorên di Kurdistan de
Di sala 1999'an de girtina rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a bi hevkariyeke navneteweyî
Zêdebûna bi hevkarî operasyonên dersînor ên Îran û Tirkiyeyê yên serê sedsala 21'emîn

**Mayin û Qaçax ........................................................................................ 463**
*Mijarên di hundirê vê sernivîsê de*
Di heyamê berê de bazirganiya li Kurdistanê
Di navbera karwanên Rojava û Rojhilat de Kurdistan û mêvanperweriya wê
Piştî perçekirina Kurdistanê jihevdûrxistina bajaran û qelsketina bazirganiyê
Bazirganiya ku navê wê bû qaçaxî
Bîranînên bi qaçaxî derbaskirina sînoran a demên ewil
Mayînkirina sînoran
Hin bîranînên dema ku nuh mayin hatin danîn
Hewcedariya qaçaxvaniyê
Malên ku bi qaçaxî dihatin û diçûn
Bi demê re zêdekirina tedbîrên li ser sînoran
Rengguhertina qaçaxê û vekirina sûkên qaçaxçiyan a li herêmê sînoran
Têkiliyên qaçaxvaniyan û dinyaya ku bi van têkiliyan ava bû
Li Tirkiyeyê di salên 1980'yî de bi destûrdayîna derbaskirina hemû cure mal a di gumrikan re xelasbûna qaçaxvaniyê
Cudahiya sînoran a li gorî xwezayê
Hakimiyeta PKK'ê ya li ser sînoran
Zehmetiya vekolînên li ser sînor
Qaçaxa mazotê
Piştî derbeya leşkerî ya 1980'yî çûna gelek xortan a derveyî welêt
Valakirina gundan a piştî bihêzbûna şerê çekdarî û mayinkirina derdora gundan
Hin dokumanên kuştinên bi mayinan ên Komeleya Mafên Mirovan
Pirbûna mexdûrên zarok
Hin serpêhatî
Pirsgirêkên kesên ku ji ber mayînan seqet mane
Mayin, li dinyayê tevî pirsgirêkeke mezin e
Hewldanên rakirina mayinan li dinyayê tevî û Sondxwarina Ottowayê
Dokumanên hin bûyeran
Hin fîlmên li ser mijarê
Di derbarê danheva serpêhatî û bîranînan de
Hin serpêhatî, bîranîn û hevpeyvînên derbarê sînor de

**Her Derên Kurdistanê Bûn Herêmên Sînoran û Ji Hev Hatin Qutkirin........571**
*Mijarên di hundirê vê sernivîsê de*
Cudabûna herêmên sînoran
Her derên Kurdistan bûne herêmên sînoran
Lêkolînên li ser herêmên sînoran û encam

Cudahiya neziktêdayînên sînor ên desthilatdariyên cuda
Bandora sînoran a di şeran de cihgirtina Kurdan a di nav hêzên dijberî hev de
Sînor her tim qadên şer in
Windahiyên qadên şer
Di heyama Osmanî û Sefewiyan de hin taybetmendiyên mîrekiyên di sînoran de
Guhertina hevalbendiya mîrekiyên di sînoran de
Zordariya her du dewletan a li ser eşîrên qels
Têkiliyên Kurdên di sînorên Rûsan de
Destguhertina herêmên sînoran
Bandora çanda her du aliya ya li ser xelkê herêmên sînor
Bixwereanîna pirsgirêkên nû yên sînorên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn   Kurdistan parçe kirine
Cehş û qoricî; birakujî
Rêveberiyên rewşên awarte yên herêmên sînoran
Pirbûna polis, esker û biryargehên eskeran ên li sînor û herêmên sînoran
Li himberî Kurdan saziyên derqanûnî (çete)
Di bin navê sebeba sînorderbaskirinê de kuştina kesên bêguneh ku tu ele qeya wan bi derbasbûna sînor tune ye
Kuştin û şewitandina hespan a di sînor de
Bîranîneke Enver Ozkahraman û rewşa Çelê
Kemera Erebî ya di sînorê Sûriyeyê de
Pirbûna bûyerên bi felaket ên navçe û bajarên li ber sînoran
Nivîsên pesindayîna Tirkbûnê li herêmên Kurdan (axilbe ber sînoran)
Ji romana Laleş Qaso rewşa ber sînoran
Ligel dewlemendiya welatê wan paşdehiştina herêmên Kurdan
Bi hin serpêhatî û bîranînan jiyana ber sînoran
Qaçax gelek derban bi destê wezîfedarên dewletê hatiye kirin
Dîmenên hevdîtinên ber sînoran
Çûn û hatina bi peseportan
Tevgera ji bo mazotê
Bandora têkiliyan li ser deriyê sînor
Texrîbkirina cografyaya Kurdistanê
Dîroka di nav mayinan de
Şewitandina daristanan
Li Tirkiyeyê valakirina gundan û mayinkirina wan
Sînor gelek cih û war hêsîr girtine (wek Nisêbîn)
Hin serpêhatiyên kesên ku bi mayinan seqet bûne
Zehmetiya bisînorkirina tevgera mirovan

Li aliyekî cîhanê rakirina sînor û dîwaran û li aliyê din projeyên avakirinên dîwaran li nav sînorên di Kurdistanê de

**Bandorên Li Ser Psîkolojiyê ..........................................................633**
*Mijarên di hundirê vê sernivîsê de*
Sînorên lîstikên zarokan
Lîstikên zarokên sînoran
Ji hev qutkirina xwediyan û hesret
Sînorkirina tevgera mirovan
Di mejiyan de rûniştina rewşên awarte
Bi serpêhatiyan ronîkirina rewşê
Zarokatiyeke ku bi dîtina birîndar û kuştiyan derbas bibe
Bandora sînor a li helbestvan û nivîskarên ji herêmên sînor
Bi hevpeyvîn û bîranînên di beşên din de fêmkirina bandorên cûr be cûr ên li ser psîkolojiyê
Kurd li ber bayê netewdewletê nepekiyan û sînor nexistin navbera xwe û yên din, lê bedelên giran dan

ÇEND GOTINÊN DAWÎ/653

ÇAVKANÎ / 671

هەوالنامەی کتێب

# PÊŞGOTIN

## Pirtûka giranbuha, neynika rastane ya jiyana gelê Kurd

Gelê Kurd tevî rewşa bindestiyê û binpêkirina mafên xwe yên mirovane îro li ber du astengên pir mezin sekiniye. Bi girîngiya xwe çarenivîsa azadiya welêt û jiyandariya gel di bin xetereyeke mezin de ne.

Yek ji wan **astengan jiyandariya zimanê Kurdî ye**: Rewşa mayin û nemayina wî ye, îro ser zaravayê kurmancî (li Îran, Îraq, Sûriye û bi taybetî li Tirkiyeyê), zarav ku di zimanê Kurdî de yê herî mezin e, bi dîroka hezaran salan e û pêşketî ye. Kurmancî komponênteke bingehîn e ji bo duaroja nêzik li meşa hevgirtina gelê Kurd û Kurdistanê; ew gencîneyeke çandî ye, ku mafê wî heye zindî bimîne, bê naskirin ne ku tenê ji aliyê hemû Kurdan, lê wisa jî divê bê parastin û bibe milkê şaristaniya navnetewî.

Ya duduyan ew **astenga sînordanînê ye**, bi têgihîştina naveroka vê peyvê ye herî fireh: Him bi wateya parçekirina Kurdistanê di navbera çar dewletên Rojhilatê de; him bi wateya parçekirin û dabeşkirina çand û hunera Kurdan: Siyaseta xurtkirina bandora çand û hunera gelên dagirker: Tirk, Ereb û Farisan, bi armanca ku di nava xwe de miho bikin (bihelînin) bingeha çand û hunera Kurdîtiyê; sînordanîna navbera hêzên Kurdan a siyasî û civakî; destkariya dagirkeran, bi siyaseta aboriyê, wêrankariyê û zilm û zorê, ji bo xurtkirina nava Kurdan îdêntîtêta ji hev xerîbbûnê û kovîbûnê; piştovanîkirina nava Kurdan mêldariya wan a ser jiyan û aboriya mêtropolên

ji Kurdîtiyê û Kurdistanê dûr û biyanî; her wisa jî jiyandarkirin û xurtkirina hisa eşîretiyê, tayifebaziyê, dutîretiya navbera olan û parastina nava Kurdan, xetereyên ku civaka Kurdî têkdidin û ber bi tunebûnê ve dibin. Ev her du pirsên pir ziyankar, ku li ber hêzên Kurdan ên siyasî, rewşenbîran û civakê serî rakirine, divê ji her aliyî ve bên lêkolînkirin, di nava gel de bên gengeşekirin, da ku bikaribin li ser vê rewşa xeter çêtir serwext bibin û stratejiyeke milî ji bo lihembersekinînê û berxwedanê bipejirînin. Divê Kurd îro ji fitilên van her du ejdîharan, ku welat û gel dorpêç kirine rizgar bibin.

Armanca min li vira ew nîn e, wekî di vê nivîsarê de ez li ser bervedana van her du astengan bi hûrbînî bisekinim, an jî dergehê gengeşekirinê li ser van mijaran vekim. Na. Daxwaza min ne destnivîs-lêkolîna li ser van astengan ku li ber destê min e û li ser riya weşandinê ye jê re oxira xêrê bixwazim.

Xwedana destnivîsê Eslîxan Yildirim e, xanimeke Kurd e, ku ji bilindahiya rewşenbîriya xwe, baş têgihîştina rewşa gelê xwe ev berhem bi hêza zanîn û kela dilê welatparêziyê nivîsiye. Berhem bi naverok dagirtî û stûr e. Bi xwe li ser vê mijarê eva cilda duduyan e ku amade dike. Benda pêşî bi navê “Di Sedsala 20’an de Kurdistan û Sînor-I (Dîroka Sînorên di Hundirê Kurdistana Bêsînor de)” di sala 2009’an de hatiye weşandin.

Benda (cilda) duduyan karekî pirbelge û bêguman, berhema xebata Yildirim xanimê ya salên dirêj e, ku wê xerc kiriye û realîteya vê pirsê yek bi yek di ber çavê xwe re derbas kiriye. Ji ber agahdariya xwedanê tu çavkanî, weşanên biçûk û mezin nefilitîne û hatine bikaranîn.

Di dîroka Kurdzaniyê de pirsa sînorkirina Kurdistanê wiha bi giştî, ji her aliyî ve û bi şarezetî, çiqas ez zanim, hê nehatiye lêkolandin û wek pirtûk û lêkolîn li ser maseya xwendevanan nehatiye danîn.

Li ser dabeşkirina Kurdistanê piraniya Kurdzan, siyasetmedar, rewşenbîrên Kurd û lêkolînarên ne Kurd sekinîne, cêribandine bûyera parçekirina Kurdistanê di navbera du dewletan de: Împêratoriya Osmaniyê û Îranê û paşê jî piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn çarparçekirina welêt, li ser Tirkye, Îran, Îraq û Sûriyeyê, binirxînin, lê bi giranî li ser nesekinîne û di ser re derbas bûne.

Parçekirina Kurdistanê ji sala 1514’an û vir ve, heta Şerê Cîhanê yê Duyemîn, rast çarsed salan ji aliyê Kurdan ve nehatiye pejirandin, ew de jûre bûye, lê ne de fakto, ji ber ku binaliyên vê herêmê, gelê Kurd ev parçekirin û sînordanîna navbera her du aliyên çiyayê Zagrosê, li ser xwe nas nekirine. Ev jî bûye sedem, ku di navbera her du dewletên Rohilata Nêzik de her tim û bi awayekî sîstematîk şerên biçûk û mezin çêbûne.

Rûsya û Îngiltere tevî Îranê û Tirkiyeyê çend caran komîsyonên taybet ji bo sînor eşkere kirine, ava kirine, bi dirêjahiya mehan û salan kar kirine, da ku karibin xeteke şirûştî bibînin û wê raberî her du aliyan bikin, lê ev yek ji wan re li hev nehatiye. Xema Rûsyaya Qeyseriyê û Brîtaniyaya Mezin ne agirbest û aştiya navbera Îranê û Tirkiyeyê bûye, her duyan jî xwestiye di vî karî de berjewandiyên xwe yên siyasî, aborî û dagirkeriyê bidin pêş, da ku karibin bandora xwe li wan herêman xurt bikin. Tevbûyên van komîsyonan dîplomat, zanyar û berpirsiyarên leşkeriyê paşwextiyê bîranîn û lêkolînên xwe li ser cografiya, etnîk landşaftê û rewşa civakî û aboriya herêmê pirtûk û lêkolînên xwe weşandine.

Li ser dîroka sînordanîna navbera Îran û Tirkiyeyê hêja Eslîxan Yildirim di pirtûka xwe ya cilda pêşî de bi hûrbînî sekiniye. Cilda duduyan ku ji bo çapê amade ye, bi giştî diyarî dîroka sedsala XX'an a nûdemê kiriye.

Dîroka Kurdan a sedsala XX'an ji bo Kurdan ber bi çav dikeve bi xwînrêjiyên mezin li ser erda Kurdistanê. Sal bi sal li herêmên welatê Kurdan li pey hev agirê serhildanê vêketiye, şoreşên biçûk û mezin li Tirkiyeyê, Îraqê, Îranê pêk hatine, ew wek zincîreke dirêj bi sedan xelekan ve hevgirtî û hevhûnayî bûne. Dema serhildanan bi hezaran Kurd şehîd ketine, gund û bajar wêran bûne, lê agirê hêviyê netemiriye. Welatparêzên Kurd dema serhildanan ji her çar parçeyên Kurdistanê gihîştine hawara hev û bi hev re singê xwe kirine mertalê parastina welatê xwe û şehîd ketine. Zindî şikestine ber hêzên leşkeriyên xurt, lê bi ruh neşikestine, ruhê wan, hêvî û armancên wan xurtir bûne ji bo duarojê.

Faktora hevgirtina gel, dijmin hîn devxwîn kiriye, dewletên dagirker jî bi siyaseta bindestkirina Kurdan gihîştine hev, planên têkdayîna serîrakirina Kurdan danîne ber xwe, bûne hevbeş û hevkarên hov.

Di van planên hevkariyê de dagirkeran giraniya xwe danîne ser karê praktîk: Bi taybetî ser xurtkirina sînorê nav xwe yên dabeşkirinê bi hêzên leşkerî û têknîka nûjen. Li ser xeta parçekirina gel bi milyonan mayin di erdê de çandine, têlên elektrîk derbas kirine, serê her 50-70 metreyî qereqolên leşkerî ava kirine, gundên li ser sînor wêran kirine, xelkê wan koçber kirine, dero dero kirine, ji welat xerîb kirine. Ew erda jiyandar û bi ber tijî bûye erdeke mirî, erda bi xwîna Kurdan avdayî, bi laşên şehîdan dagirtî.

Xwedana vê lêkolînê li ser van pirsan yek bi yek radiweste, bi dehan mînakan ve mak dike û li ber xwendevanan radixe. Babatên bingehîn li ser astengiya sînoran, ku xwedana pirtûkê xebata xwe dabeş kiriye, ev in:

**a.** Sînorên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn di navbera her çar parçeyên welêt de hatine avakirin bêexleqî bûne, bingeha wan a dîrokî, cografî, etnîk ji bo parçekirinê qet bi qet tune bûye; bandora vê parçekirinê negatîf bûye: destê endamên malbetê, xizm û mirovên nêzik ji hev kirine, bingeha aboriyê, milkên wan: Erd û zevî, tarş û zozanên çêrê û hwd. parçe kirine. Xwedanê pirtûkê pêkanîn û lêpoktiya li ser dîroka parçekirina Kurdistanê, li ser sînorên navbera Tirkiyeyê û Sûryeyê -xeta trênê- disekine, ku bi destê welatên Ewropî hatine danîn û ji aliyê wan ve jî hatine naskirin. Ji bo gel û dewletên dinyayê xeta trênê xeta hevgirêdana gund û bajarên gel û welêt bûye, lê bo Kurdan ew bûye xeta ji hev qetandina destê dê û dotan, kûr û bavan, destê bira û pismaman... Dergehê trênê yê destê çepê bûye riya daketina Tirkiyeyê, dergehê destê rastê bûye dergehê daketina Sûriyeyê. Pêkanîn û paradokseke wiha gelo mirov dikare li ser rûyê zemînê lê rast bê?

Bandora trajîk li ser jiyana hezaran malên Kurdan ên li ser vê "xetê" xwedana lêkolînê bi mînakan, ji her aliyî ve daye xuyakirin.

**b.** Sînorên ku Kurdan qebûl nekirine û mecbûr bûne peywendiya xwe ya civakî, mirovî û aborî bi her du aliyên sînor re berdewam bikin, rastî astengan hatine û ji aliyê desthilatdaran ve navê qaçax, karê qaçaxçiyê qazanc kirine û bi tundî hatine gunehbarkirin. Sînorê bi hezaran mayin çandî astenga mezin bûne li ser riya vê jiyanê, ku her tim bi kuştin û bi teqînên mayinan pêk hatiye. Pirsa çandina mayinan, ku diviyabû baldariya saziyên navnetewî bikişanda ser xwe, hîna jî rastî bêxemiya dewletên Ewropayê tê. Rêjîma Baas a li Îraqê, li Sûriyeyê, desthilatdarên Îranê û Tirkiyeyê erd û xaliya Kurdistanê bi milyonan mayin çandine, yên ku jiyana bi hezaran mirovên am û tam, zarokan, şivanan, jin û bûkan xwarine, ew seqet kirine. Ev pirsa giring di pirtûka Eslîxan Yildirimê de mijara lêkolînê ya taybet e, ku bi mînakên pirhijmare dihingêve û bi xemgîniya mezin dagirtî rastî xwendevanan tê. Lêkolîner bi xwe nêzikî van sînoran jiyaye, gelek caran bi xwe şahidê van rastiyan bûye, li gelek deweran jî bi xwe geriyaye û qurbaniya van teqînan, mirovên seqet û birîndar axiviye û gotinên wan civandine, wekî dengê êş û kovaniya wan a neheqiyê û zilmê bigihîne xwendevanan.

**c.** Siyaseta bindestkirina Kurdan, xên ji parçekirina bi sînoran, bi siyaseta mihokirinê (asîmilyasyon), sirgûnê, koçberkirinê, zîndankirinê zordariyên cur be cur ên hovane hatine meşandin.

Mêtodên asîmilasyonê terz bi terz bûne. Mînak, li Tirkiyeyê heyîna gelê Kurd înkar kirine, bikaranîna navê Kurd û Kurdistanê bi dehan salan qedexe bûne, bi sedan kes ji bo van navan çûne ber dadgehê û gunehbariya zîn-

dankirinê qazanc kirine. Xudanê pirtûkê dengê van kesên ku hatine gunehbarkirin û bi dehan salan li zindanan mane; axaftinên karmendên şovenîst û helwesta wan a li dijî mirovahiyê, ku bi konstîtrûsya dewletê “Ana....” piştrast bûne daye xuyakirin. Ev hemû dîroka duh û pêr nebûne, evana îro jî di jiyana praktîk de tên bikaranîn.

**d.** Xwedana lêkolînê ciyekî serbixwe û taybet veqetandiye ser mijara bandora bûyarên ser sînor û siyaseta dewletên zilm û zextiyên li ser psîkolojiya gelê Kurd. Eslîxan xatûnê bi dilekî dayikane nazik û birîndar ev mijar bi mînakên ku dilê mirovan dikizirînin, li ser zarokên Kurdan radiwaste yên ku li ser sînor dijîn û ji telebext re ji destê mayinên li dora gund û nava zeviyan çandî birîndar û seqet bûne. Bandora vê jiyana bi tirs û xeter li ser psîkolojiya zarokan, ku ji salên zarotiyê hetanî xortaniyê dom kiriye, şopa xwe reş hiştiye li ser wan, heta kalbûnê û wek dibêjin heta ber devê gorê bûye rêberê jiyan û dinênasîna wan niştevanên hêrêmên ser sînor. Xwendevan nikare bê his û bê kel bixwîne vê nivîsarê...

Babetên pirtûkê li ser zor û zilma ku salên dirêj gelê Kurd dorpêçkirine, di pirtûka “Kurdistan û Sînor” de bûne îzbatiyên giran û girîng ji bo naskirin û zanîna rastiya pirsa Kurdan bi giştî û rojanebûna helkirina rewşa Kurdan a bindestiyê.

Berî ku ez nivîsa xwe bigihînim dawiyê, dixwazim li ser çend taybetiyên pirtûka berdest ên erênî bisekinim.

1- Berî pêş divê bê gotin, ku piraniya zanyar û rewşenbîrên Kurdan ên bakurî bi taybetî, heta niha ji xwe re kirine adet, berhemên xwe yên lêkolînê yên li ser dîrokê, sosyolojiyê û hwd. bi zimanê Tirkî binivîsin û biweşînin. Sedema vê rewşê xuya ye. Xwedana destnivîsa berdest bi Kurdî fikiriye û berhema xwe jî bi zimanê Kurdî, zimanê dayika xwe nivîsiye, ji ber vê jî zimanê nivîsarê ji bo xwendevanên Kurdîaxêv wê gelekî nêzikî dil be û baş bê têgihîştin. Xwedanê karibûye ramanên zanyarî bi Kurdiya (Kurmanciya) pêşketî û îroyîn bigihîne xwendevanên xwe. Rêzên nivîsarên sade û kamilîn. Sadebûna nivîsê ne ji kîsê qelskirina ziman hatiye pêkanîn. Berovajoya vê. Baş zanîna zimanê gel û edebiyetê diyar kiriye hêz û potansiyela zaravayê kurmancî ya mezin ji bo duarojê.

2- Xwedana pirtûkê bi berhema xwe hêz û şureta xwe bi du awayan daye xuyakirin: a) Wek dîrokzan, ku kare lêkolîna pirsên civakî û siyasî ji xwe re bike hedef û bi hostayî wan bervede û hişkere bike. b) Wek Romannivîs. Di berhemê de gelek caran em rastî hevpeyvînên wê tên tevî Kurdên gundî. Axaftinên wan bi hunera zimanê edebî li ber xwendevanan tên raxistin.

Dîdemên ji zilma li ser Kurdan bi zimanekî wisa dewlemend bi kar aniye, ku tenê nivîsarvana bi tecrûbe kare vê yekê bike.

3- Eslîxan xanim lêkolîna xwe bi bînfireyî, hûrbînî meşandiye, xwe nehêwişandiye ku hemû çavkanî û pirtûk-lêkolînên berî nivîsa wê çapbûyî, çiqas karibûye peyde bike, bona kamilbûna berhema xwe bi kar bîne.

4- Hêjayî destnîşankirinê ye, ku gelek parçeyên destnivîsê bi xwe çavkaniyên nû û giranbuha ne, ku bi hewldana xwedana berhemê hatine zindîkirin. Di vî karî de alîkarê wê bûye, çarenûs, ku malbata wê bineciyê bajarê Nisêbînê bûye û zarotiya wê li ber xeta sînor derbas bûye û hemû bûyerên trajîk li ber çavên wê û zarokên hevalên wê derbas bûne. Dêmek, ev pirtûk bi xwe dikare bibe çavkanî ji bo lêkolînvanên van mijaran.

5- Destanîneke vê pirtûkê yek jî ew e, ku hemû nivîsên xwe bi dokûmêntasyona foto-nîgaran mak kiriye. Mezin e, bandora van nîgaran li ser hisa xwendinvanan: Zarokên bêguneh seqet, bêdest, bêling ji ber çevên xwendevanan nikarin bê şopa giran derbas bibin.

Daxwaza min ew e ku ev pirtûka hêja li zimanên Tirkî û Ingilîzî jî bê wergerandin, da ku wêya ne ku tenê xwendevanên Kurd, lê wisa jî yên biyanî bixwînin û li ser rewşa Kurdan a heyî bibin xwedî agahî.

Prof. Dr. Celîlê Celîl

# PÊŞEK

Ev nêzikî dused salan e ku Kurd û Kurdistan di nav êgir de ne. Di serê sedsala 19'emîn de li dinyayê guhertinên mezin pêk dihatin, lê Împaratoriya Osmanî di warê hilberîna teknîkî de li paş mabû û bûbû heyranê Rojavayiyan. Rojavayiyan jî ev xweşik bi kar anîn û roj bi roj şax û perê xwe bi Împaratoriyê de berdan. Împaratoriya Osmanî ji bo xwe bi pêş de bibe serî li hin nuhkirinan dide. Di vê demê de gelek mîrekiyên Kurdan di nav sînorên Împaratoriya Osmanî de ne. Dema ku Împaratoriya Osmanî dest bi guhertinên mezin kirin, herî zêde Kurdan û Kurdistanê windahî dan. Bi qelsketina Kurdistanê, Dewleta Osmanî hê bêhtir kêm ket û di serê sedsala 20'emîn de ruxiya. Dema Dewleta Osmanî hat dagirkirin, Kurdistan jî hat parçekirin û parvekirin. Di nexşeya dinyayê ya nuh de sînorê Kurdistanê tune bûn û gelek sînor di hundirê wê de derbas dibûn. Bi parçekirina Kurdistanê gelek dewletan, li ser tunekirina kesayetiya Kurdan jî li hev kirin û ev nêzikî sed salan e ku Kurd di bin vê êrîşê de ne.

Mijara me sînorê di hundirê Kurdistanê de ye. Em ê hewl bidin ku em ji gelek aliyan ve li van sînoran binêrin. Xebat ji du cildan pêk tê. Di cilda I'emîn de, em ê bi kurtayî li dîroka sînorên di hundirê Kurdistanê de binêrin. Di cilda II'yemîn de jî em ê li ser "Sînoran Bi Xwe Re Çi Anîn?" bisekinin. Cilda I'emîn di sala 2009'a de ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hatibû weşandin. Ji bilî rastkirina hin xelitiyên biçûk min dest neda cilda I'emîn û di vir de em herdu cildan bi hev re diweşînin.

Pêşek, ji berfirehkirina pêşgotina cilda I'emîn (2009'a de Enstîtuya Kurdî ya Amedê çap kiribû.) û spasiyê pêk hatiye.

Dema min xebata bi navê 'Kaniyek ji Mezopotamyayê Nisêbin' amade dikir, hîmê vê mijarê hat avêtin. Kesên ku min dixwest der heqê Nisêbînê de bîranînên xwe bi min re parve bikin, gava dipeyivîn gotin diçû û dihat, dihat ser sînor. Sînor parçeyek ji jiyana wan bû, belkî jî parçeyê herî mezin. Kesên ku li ser sînor tiştek nehatibû serê wan an jî yê xwediyekî wan, tune bû. Di dema wê xebatê de, min hinek serpêhatî dabûn hev û min xwest ku ez di demeke kin de bikaribim ji gelek kesan serpêhatiyên wan ên li ser sînor guhdarî bikim. Ji aliyê din ve ez jî li wir, li bajarekî li ser sînor jiyabûm û qewam û bûyerên ku dibûn behs, bi kurahî min hîs dikir. Jixwe hin mînakên ji van bûyeran min bi xwe dîtibûn, hin jê jî min ji mezinên xwe bihîstibûn.

Erê, derbasbûna jiyana min a di bajarekî li sînor de bandor li vê xebatê kir. Bi piranî ez li Nisêbînê jiyame, ligel ku gelekî nêzik bûn, bi salan min xwediyên xwe yên li Qamîşlo nedîtine, min şerên di navbera qaçaxvanî û eskeran de dîtiye, min ji mezinê xwe koçberiya bav û kalên xwe yên li ser van sînoran guhdar kiriye û hwd. Malbata min bixwe gelek caran hatibû sirgûnkirin, gelek caran koçber bûbûn û ev sînor derbas kiribûn, tirba kalikê min li Helebê bû û me nikaribû em herin ser tirba kalikê xwe... Van salên dawî çend caran ez binxet bûbûm û ligel ku erdnîgarî û xelk yek bûn jî, min ferqa du aliyên sînor didît. Bi rabûn û rûniştin, bi aborî, heta bi Erebeyên ku dihatin bikaranîn. Her çiqas her du alî jî welatparêz bûn, ber û têkiliyên wan li navêndên cihê bûn. Wek mînak, Nisêbîn ber bi Enqereyê ve dihat kişandin, Qamişlo jî ber bi Şamê ve... Gelek caran bi şev em di riya ber sînor re derbas bûbûn û şewqa her du aliyên sînor tevli hev dibû; me tê dernedixist bê kîjan şewq a kîjan aliyî ye... Min li zikakan gelek kesên ku ji ber mayinan seqet mabûn dîtibûn... Min bandora psîkolojîk a bûyerên li ser sînor, zarokên ku xwe dikirin wek qaçaxvaniyan û dilîstin dîtibû...

Dema min serpêhatî guhdar dikirin salên berê dihatin ber çavê min. Heta salên 1980'yî, bi taybetî di mehên havînê de şeva ku dengê sîlehan nehata tune bû. Şer û pevçûnên ku li ser sînor di navbera esker û qaçaxçiyan de diqewimîn, bûbûn wek parçeyekî jiyana şêniyên navçeyê. Di navrojê de çûn û hatina li sînor, li ser banê xaniyan dihat temaşekirin. Baş tê bîra min, gava qaçaxçî di sînor de derbas dibûn, ku erebeya dewriyeya eskeran xuya dikir, kesên li ser xaniyan deng li qaçaxçiyan dikirin û ew ji vê yekê agahdar dikirin. Ji aliyê din ve her teqandinek li ser sînor, nîşana êşekê nû bû. Piştî teqîna çek û sîlehan her kesî "Îcar çi bû, kî birîndar bû, kî mir" an jî digotin "Gelo kî xelas bû, kî hat girtin" û li benda xeberekê diman. Bi kinayî sînor, her roj bi endîşe, mirin û girtin dihonand.

Belê, wê demê min gotibû xwezî min karibûya di vê babetê de xebatek bikira. Ewil bi niyeta ku ez tenê serpêhatiyên li ser sînoran bidim hev min dest bi xebatê kiribû. Dûre min dît ku di encama van sînoran de gelek serûbinbûn pêk hatine û divê xebateke berfireh bê kirin. Beriya wê jî hewce dike ku em ji dîroka van sînoran dest pê bikin. Ji ber wilo ve xebat bi dîrokê dest pê dike; dîroka bê kîngê û çawa ev sînorên di hundirê Kurdistan de hatine danîn, lê esas mijar 'sînora bi xwe re çi aniye?' ye û di cilda 2'emîn de bi heft beşan em li ser vê mijarê sekinîne.

Di destpêkê de pêşiyê min ev pirs ji xwe kir: Sînor ji bo me Kurdan çi ye? Ez bawer dikim wê bersiva vê pirsê li cem hemû Kurdan nêzî hev be. "Şer e, mayîn û têl e, veqetandin e, hesret e, qetl e, tengahî ye, rûxandina Komara Kurdistanê ya Mahabadê ye, zilma li Helepçeyê ye, qetla Qamîşloyê ye, koçberî ye, mihacirî ye..." Piştî min dest pê kir, ji girîngiya mijarê, xebat her bi her fireh bû. Dûre ez çiqasî di xebatê de kûr bûm, min bêhtir dît ku, halê îro Kurd tê de ne, bi piranî ji destê van sînoran e û divê bi berfirehî mirov li ser bisekine.

Ku mirov li dîrokê dinêre mirov dibîne ku Kurdistan bi xwe tu carî sînor ji xwe re çênekiriye û hemû tiştên xwe bi gelek xelkan re parve kiriye. (Mêvanperweriya Kurdan a bi nav û deng ku îro jî tê dîtin, dibe ku bingeha xwe ji vê pratîkê girtibe.) Lê her tim gelek kesan çav berdayê, gelek derban hatiye dagirkirin, hatiye parvekirin. Ev heye nêzikî sed salan jî di hundirê Kurdistanê de gelek sînor hatine danîn û van sînoran gelek pirsgirêk bi xwe re anîne.

Dema mirov li dîroka sînorên di Kurdistanê de dinêre, mirov dibîne ku birîn gelekî kûr e. Hîn berî zayînê bi sêsed salî, gava Îskender ji bo Med û Persan ji welatê rojava bi dûr bixe, berê xwe da rojhilat û pê de, nêzikî hezar û pênsed salî Kurdistan bûye qada şer û sînorê di navbera Rojhilat û Rojava de. Tu carî jî şer jê xalî nebûye. Di sedsala 7'an de, bi pêla îslamiyetê re, îcar bi hêzên başûr re jî rû bi rû dimîne. Ji sedsala 11'an û pê de, bi hatina Oguz û Moxolan re jî li erdê Kurdistanê şerê dijwartir çêbûne.

Di serê sedsala 16'an de bi dilxwazî hin mîrekiyên Kurdan û Dewleta Osmanî li ser hevkariyê peymanekê pêk tînin. Bi vê pevrebûnê Kurdistan dibe du parçe. Parçeyê mezin bi ser Dewleta Osmanî ve, aliyê din jî bi ser Sefawiyan ve dimîne. Bi Peymana Qesra Şîrîn, rewş di belgeyên navdewletan de fermî dibe. Nêzikî 400 salî ev rewş dom dike. Dûre, di serê sedsala 20'emîn de bi hin peymanên ku piştî Şerê Parvekirinê yê Yekemîn tên morkirin, gelek dewlet li ser perçekirin û behrkirina Kurdistanê li hev dikin.

Împaratoriyên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn hilweşiyan û dewletên ku di pey wan de derketin holê, tiştên Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi xwe re anîn, hin dewletên ku bi belavbûna Yekîtiya Sovyetan derketin meydanê, rûdanan ji ber lihevnekirinên li ser sînoran, li Ewrûpayê jî hilanîna qismî ya sînoran, kir ku sedsala 20'an bibe sedsala gelemşeya sînoran. Îro li dinyayê hejmara dewletan nêzikî 300'î ye û sînorên gelekan jê tije pirsgirêk in. Di vî warî de pirsgirêkên herî mezin di Kurdistanê de ne. Ew tiştên ku li Kurdistanê ji ber rewşa sînoran diqewimin, ez dibêjim qey manend û nimûneyên wan li cihekî din nîn in. Ji ber vê yekê, ji ber vê rewşa taybet a "sînorên di nava Kurdistana bêsinor de" divê ku ji gelek aliyan ve li ser lêgerîn bên kirin û ew bên vekolandin.

Ji aliyê din ve lêkolînên tevayî yên li ser sînoran ku van salên dawiyê hatine kirin jî nîşan didin ku sînorên dewletan bi techîzatên xwe, bi jiyanên tê de, bi têkiliyên civakî û bi bandora van têkiliyan a li ser psîkolojiyan qadên cuda ne û li gorî rewşa ku ew dewlet tê de ye wekî şeklê wê yê îdarî, siyaseta wê, têkiliyên wê yên bi cîranên wê re, dike ku nêziktêdana wê ya li sînoran jî cihê be. Yanê sînorên hemû dewletan xwedî statuyeke xweserî xwe û wateyekê ne. Gava mirov li ser van hemûyan bifikire ew ê bê dîtin ku di Kurdistanê de bi dehan qadên sînoran ên cihê hene û rewşa ku Kurdistan tê de ye gelekî wahîm e.

Di destpêka sedsala 20'an de rêbazên lîstika netewedewletê tên diyarkirin, li gorî vê yekê jî rotayek tê xêzkirin. Kurd dikin nakin di vê lîstikê de rolê wernagirin. Bi dû de ji ber ku nebûbûn xwedî dewlet û sînorên wan ên ew biparastina tune bûn, ji êrîşan re vekirî man; a herî girîng jî, ji ber sînorên ku di nav wan re derbas dibûn, her aliyekî welêt bûbû herêma sînor û her hêleke wî jî ketibû nav sîstemeke cihê û tevî pergaleke cuda bûbû. Di encamê de, her aliyê cografyaya Kurdan bi mayînan hatiye çandin, bi çekên kîmyewî hatine qetilkirin, ji cih û warên xwe hatine koçberkirin; bi kurtasî ji serê sedsalê ve bi çendîn caran duçarî mûameleyên derî mirovahiyê bûne. Bi ser ev qas neheqiyan de, ji ber ku dîroka Kurdan ji aliyê serdestan ve hatiye serûbinpêkirin bi piranî rastî jî nayên zanîn.

Zanebûna dîrokê; ji bo miletekî, ji bo mirovan çi qasî girîng e gelek kes zanin. Gotineke klasik heye, tê gotin ku miletê bi dîroka xwe nizanibe nikare pêşeroja xwe ava bike. Em tiştekî din jî bi ser vekin, miletê ku dîroka wan ji aliyê dilnexwazên wan ve hatibe nivîsandin û ew fêrî wê dîrokê hatibin kirin delîl li halê wan. Erê, dîroka Kurd û Kurdistanê ji aliyê hinên din ve serûbinî hevdu hatiye kirin û gelê Kurd bi piranî bêyî ku sebeba wê zanibe ne rast li

xwe û raboriya xwe dinêre. Kurd ketine halekî ku dîroka xwe ya herî nêzik jî nizanin, di derbarê mirovê xwe yê herî nêzik de tiştekî nizanin. Mejî û dilê wan hatiye zeptkirin. Ev di serî de jixwedûrketinê û bixwenebawerbûnê tîne. Loma divê Kurd, axilbe xortên Kurdan berî hemû tiştî fêrî dîroka xwe bibin.

Helbet divê em kêmaniyên ku hene, xelitiyên ku hatine kirin, li gora demê paşdemayînên ku hene înkar nekin. Lê ev kêmanî nikare bibe sebeba ku gelê Kurd ev qas zilm û zordariyê bibîne. Tu tişt nikare bibe sebeba qetlîamên mîna Helepçeyê. Heke ji aliyê hinan ve navê wan wilo bên gotin jî tu carî kesên xwedî kirinên bi vî awayî wê ne medenî û ne serketî bin. Ev li dijî xweza û mirovahiyê ye...

Nifşê nuh ê Tirkan, Ereban û yê Farisan jî ji gelek rastiyan û zanînê hatine dûrxistin. Çunkî ew jî bi heman şeklî tên perwerdekirin. Bingehên xelet dibin sedema encamên xelet. An na çilo xelk wê li hemberî van kirinên hovane wisa bisekinîna.

Ji aliyê din ve divê mirov dîrokê rast bixwîne. Divê li gorî demê mirov her tiştî raxe ber çavan û bi vî awayî li bûyeran binêre. Ku mirov bi nirx û derfetên îro li dîrokê binêre wê gelek xeletî bên kirin. Ji bo mînak, ku em dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn û dema Kurdistan hat parçekirin binirxînin hewce dike em derfetên wê demê, rewşa Dewleta Osmanî û nêzikbûna ax û gelê Kurdistanê bi îdareya wê re, hebûna gelek milet û çandan di hundirê Dewleta Osmanî de, tunebûna saziyên li ser navê netewîtiyê, derfetên teknîkî yên di destê Ewrûpiyan de û hwd. hemûyan bigirin ber çavan. Divê mirov zanibe ku di hundirê rojan de guhertinên mezin pêk hatine û derfeta ku hemû kes ji van agahdar bibin tune bû... Divê mirov zanibe ku ji derve de li ser xwestina hinan civat û çand di demên kin de nikarin zêde bên guhertin...

Bi vê nerînê min di cilda 2'emîn ya vê xebatê de, giranî da serpêhatî û bîranînan û ji hin rastkirinê biçûk pê ve min gelekî dest neda wan. Dibe ku gelek salan dûra ji bo xebatên zanistî yên cihê li ser van şîrove û nirxandinên cihê bêne kirin. Ez li gelek herêmên sînoran geriyam, wek Serêkaniyê, Sirûc (Pirsûs), Wêranşar, Bazidê û min serpêhatî û bîranîn qeyd kirin. Bi hevkariya hin hevalan jî, danhev ji hinek cihên ku em negihanê hat kirin. Ji ber ku di cilda 2'emîn de em li ser sedsala 20'emîn sekinîn û ev dîroka demeke nêzik bû derfeta me ya ku em gelek serpêhatî û bîranînên şahid û mexdûrên mijarê bidin hev hebû. Di cilda 2'yemîn de ya di bin sernivîsa "Sînora Bi Xwe Re Çi Anî" de ev serpêhatî û bîranîn cih distînin.

Ez li Nisêbînê yanî li sînorê Tirkiye û Sûriyeyê dijîm. Ji ber wilo ve di serpêhatiyan de giranî ket ser vî sînorî. Min dixwest bi qasî li ser sînorê Sûriye û Tirkiyeyê di sînorê Îran û Tirkiyeyê de û di sînorê Tirkiye û Îraqê de, Sûriye û Îraqê de, Îraq û Îranê de jî serpêhatiyan bidim hev. Lê derfetên min tune bûn. Ji ber wilo li ser hin aliyên sînoran hindik mînak hatin dayîn. Ez hêvî dikim di vî warî de gelek xebat bêne kirin û em dengê hemû qadan bigihînin hev.

Ji aliyê din ve ez li Tirkiyeyê dijîm û bi Tirkî dizanim. Ji ber wilo ve bêhtir min çavkaniyên bi Tirkî xwendin û giranî ket ser Tirkiyeyê û Împaratoriya Osmanî. Helbet piştî vana xebat dibe nerîneke ji Tirkî û ji sînorê Sûriyeyê.

Mijara me pir fireh e û ji ber cudahiya sînorên di Kurdistanê de jî, divê gelekî bi zanistî dem bi dem, mijarên di hundirê mijaran de ji aliyê pisporan ve bên vekolandin û şîrovekirin. Li gorî antropologan ji ber ku hikumdariyên cihê herî zêde li sînoran nêzikî hev in ev qad ji vekolînan re qadên bêmînak in. Ji ber rewşa cihê ya sînorê di hundirê Kurdistan de û bandora wî ya li gelek dewlet û xelkan, bi vekolîn û lêkolînê ku li vir bên kirin wê gelek zanîn bên bidestxistin. Di vê perspektîfê de jî mirov binêre, ev qad ji bo antropologan pir girîng e. Tenê em li ser tiştên ku 30 salên dawî li sînorên di hundirê Kurdistanê de qewimîne bisekinin cild têrê nakin. Loma ez zanim hîn gelek ji vê xebatê re divê û ev wek destpêkekê ye.

Bêgûman ji ber rewşa ku em û zimanê me tê de ne wê kêmanî û xeletî hebin. Min xwest ez ji gelek berheman ramanan di vê berhemê de li hev kom bikim. Bi taybetî min xwest tiştên ku qewimîne û hatine jiyîn bidim xuyakirin û bi piranî şîroveyan ji xwendevanan re bihêlim. Di hin cihan de komkujî, êş, sirgûn ew qas pir bûn ku ketin şiklê lîsteyan û gotinan têrê nekir, ziman lal bû. Di hinek cihan de, ji ber mijara ku tê vegotin di zimanê me de gelekî nehatiye bikaranîn zehmetî hene. Wek belge min xwest ev di nav vegotinan de cî bigirin û bi vî awayî bêhtir gotin bi zanistî, bi tespît li cihê xwe rûnên. Loma dibe ku di hin vegotinan de herikbarî kêm be û bêhna fireh jê re bivê. Ez hêvî dikim hebekî be jî min stûna bingehîn a vê mijarê îfade kiribe û bal bikeve ser vê mijarê. Ez bawer dikim ku em karibin di vê mijarê de kûr bibin, rewşa ku heye û heq û hiqûqa navnetewî li ber hev bixin, di demeke kin de pirsgirêkên ku hene xelas nebin jî em ê karibin hebekî kêm bikin.

Di vê xebatê de keda gelek kesan heye, ez dixwazim spasiyên xwe pêşkeşî wan bikim. Alîkarî bi gelek awayan bi min re bû. Hinan jê bîranînên xwe bi me re parve kirin, hinan jê riya kesên ku hewce dikir em bi wan re hevdîtinê bikin pêş me kirin, hinan jê danheva serpêhatiyan kirin, hinan jê sûret û

dokuman dan me... Di warê teknîkê de jî hinan jê, danhevên ku di kasetan de hatibûn tomarkirin derbasî nivîsê kirin, hinan jê sûret li kompîturê bar kirin, hinan jê jî werger kirin... Jixwe ku ez çavkaniyê min ji wan sûd wergirtine jî bînim ber çavan, ez karim bêjim di vê xebatê de civateke pir xurt heye.

Di warê lêkolînê de xebatkarê Kitêbxaneya Kurdî Ya Stockholmê, Kitêbxaneya Mezopotamyayê ya li Stockholmê, Enstîtuya Kurdî ya Parisê, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Enstîtuya Mezopotamyê ya li Stockholmê, Navenda Arşivxane û Lêkolînê Sara Distribution a li Stockholmê, Komeleya Mafên Mirovan Şaxa Stenbolê, Komeleya Mafên Mirovan Şaxa Amedê bi nêzikahiyeke ji dil bûn alîkar, ez gelekî spasî hemûyan dikim.

Ji ber hin sedeman hin vegotinên vê xebatê pêşiyê bi Tirkî hatin amadekirin û dûre bi alîkariya Zana Farqînî, Davut Ozalp, Azad Zal, Aydın Rengîn hatin wergerandin. Ji bo alîkariya wan yek bi yek ez gelekî spasî wan dikim. Li Londonê Prof. Ahmet Tarî arşîvxaneya xwe bi min re par ve kir, gelekî spas. Li Swêdê serokê Enstîtuya Mezopotamyayê Jan Beth-Şawoce pir bû alîkar, gelekî spas. Wekî din dema em çûn Rasilaynê, Sirûcê û Wêranşarê, şaredar û xebatkarên şaredariyan bi me re gelekî bûn alîkar, ez gelekî spasî wan jî dikim. Jixwe gelek kesan serpêhatiyên xwe bi me re par ve kirin û me nexwest em navê wan bidin, ez yek bi yek spasî hemûyan dikim; bi alîkariya wan ev berhem amade bû.

Ji aliyê din ve ked û alîkariya Deham Ebdulfettah, Hulya Aslan, Prz. Sedat Yurttaş, Operator Dr. İbrahim Yıldırım, Huseyin Tokay (Hiseynê Tinatî), Mele Brahîm Alper, Erxen Tanhan, Serwet Denîz, Rohat Alakom, Arjen Arî, Gunay Aslan, Hasan Kaya, Serkan Birûsk, Gabar Çiyan, Mustafa Cizîrî, Mîrhem Yigit, Hans Dubber, Ehmed Gegez, Mahabad û Rana Anter, Memed Seferoglu, Ferhan Emre, Salihê Heydo, Hasan Kaya, Kemal Pekoz, Osman Ozçelik, Doç. Dr. Neşe Ozgen, Zehra Akman, Goran Candan, Selmet Guler, Ahmet Dinç, Necla Yersev, Alaattin Sinayiç, Hûtî Aslan, Davut Yarıcı, Osman Yıldız di vê xebatê de heye û bêgûman bi van alîkariyan xebat gihîşt vê astê. Ez deyndarê wan im. Çi kesên ku keda wan di vê xebatê de heye yek bi yek ez spasî hemûyan dikim.

2011
*Eslîxan YILDIRIM*

*"Serdest, ji ber ku ji şikayetên me aciz in, me wek kesên sûcdar îlan dikin."*[*]

---

* Gundiyekî Kurd ê ku di sedsala 19'an de jiyaye
(Prof. Dr. Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğunda Kürtler, r. 155)

# DESTPÊK

Dema bi gelemperî em li raboriya sînorên dewletan dinêrin em dibînin ku her çûye sînor hişkeretir bûne, her ku çûye hîn zêde tespîta çiya û keviran, heta bi nuqteya herî biçûk ya di sînoran de hatiye kirin û di sedsala dawî de îcar parastin û vesaziya sînoran roj bi roj pir zêde bûne.

Ji aliyê din ve em dibînin ku sînorên dewlet û împaratoriyan, heya bi cihên ku hêz û qeweta wan digihîştê diçû. Di wan dem û dewranan de, li gorî êrîşên ku dihatin kirin, sînor di hundirê demên kin de dihatin guhertin.

Nifûs û hêz çiqas zêde bûye, bi cografyayê ve jî zêdetir girêdan çêbûye. Îcar ji ber parastina erdnigariya ku bi hezaran salan gelê wan lê jiyabû, an jî ji ber armanca bidestxistina erdnigariyên nû, şerên ku bedêlên wan pir giran bûn diqewimîn. Ew têkoşînên ku ji bo erdnigariyeke diyarkirî dihatin kirin, bi demê re cîhûwariyek, qedrek ji erdnîgariyê re jî çêdikir û bi zêdebûna nirxên tarîxî yên erdnîgariyê re, sînor û tixûbên miletan û binyata wan jî hêdî hêdî bêhtirîn diyar dibûn.

Kurdistan û Mezopotamya xaka pîroz e, warê pêşketina sivîlîzasyon û landika şaristaniyê ye. Li ser vê xakê gelek dewlet û împaratorî ava bûn û hilweşiyan. Di vê navberê de gelek sînor û tixûb hatin qebûlkirin û dûra jî bêyî ku şopê li dû xwe bihêlin tune bûn. Lê sînorê ku di sedsala 16'emîn de Kurdistan kir du parçe ya ku di navbera Dewleta Osmani û ya Sefewiyan de bû heya roja îro, yanî ev nêzîkî 500 salî ye hebûna xwe didomîne. Di sedsala 20'an de jî bê rizamendiya gelê Kurd di hundirê welatê wan de gelek sînor

hatin danîn û ev nêzîkî sed salî ye ji bo ku ev sînor her roj qewîntir bibin gelek dewlet alîkariya hev dikin.

Di sedsala 20'an de, bi Şerê Dinyayê yê Yekemîn re wek Împaratoriya Osmanî, împaratoriyên Awisturiya-Macaristan û Rûsan jî hilweşiyan. Di vê demê de têkoşîna ji bo avakirina netewdewletan gihîşt asta herî bilind û pê re hin wateyên din li sînoran hatin barkirin. Mafê her neteweyê hebû ku li ser axa xwe bibe xwedî dewletekê. Li gor hina ew kesên ku di nav sînorên dewletekê de cih digirtin jî, diviyabû ku bi tevahî mensûbên wê neteweyê bin. Sînor ew qad bûn ku ew ji neteweyên din cihê dikirin. Ji bo her miletekî ji sînorên dewleta wan û bi wir de cihê xerîb û xerîban bû, dijmin bûn. Di vê pêvajoyê de her netewe, ji bo nîşandan û afirandina formûla xwe ya hemcuretiyê ya qewmî, nîjadî, zimanî û çandî ku ew honaka bingehîn a netewedewletê ne, ket nav têkoşîneke mezin. Hinan jê, di daneyên îstatîstîkan de reqamên mubalexe yên der barê neteweya xwe de derxistin, hinan jî bi çavbirçîtî sînorên welatê xwe pir zêde fireh dan nîşandan.

Di dawiyê de bi sînorên ku li ser maseyan hatin xêzkirin û bi peymanan, gelek dewletên nû hatin avakirin. Esas pirsgirêkên gelekî giran hê nû dest pê dikirin. Li gorî armanca aşopiya netewedewletê, sînor ew cih bûn ku du neteweyên cuda ji hev vediqetand an jî digihandin hev, lê belê wek ku li Kurdistanê jî wisan e, li hin cihan rewş cihêtir bû; mirovên li her du aliyên sînor ji heman neteweyê bûn û gelek ji wan jî mirov û lêzimên hev bûn.

Dûra dengekî herî biçûk ê cihê yê di nav sînorên dewletekê de, ji ber ku tevahiya dewletê dê bixista nav talûkeyê, di nav neteweya serdest de tirs çêdikir. Lewma jî neteweyên serdest ji bo ku di nav sînorên xwe de serweriya xwe bidomînin, hewce pê didîtin ku her kesî mehkûmî çandekê (çanda miletê serdest) tenê bikin. Vê yekê jî bi xwe re asîmilasyon û zixt dianîn. Ji lew re, ji ber vê rewşê di sedsala dawî de gelek tevlihevî qewimîn. Li hêlekê li hundir tedbîrên asîmilekirinê dihatin danîn, li hêla din jî li ser sînoran tedbîr dihatin zêdekirin. Îro ew quleyên ewlekariyê, têlên direhî û avaniyên li ser herêmên sînor ên dawiya erd û axa dewletan, bûne nîşaneyên desthilatdariyê.

Sînorên siyasî ev demeke dirêj e bala erdnigarnasan dikişîne. Di dema me de, her çiqas ne bes be jî, lêgerînên der barê sînor û dîroka sînoran de xwedî cihekî girîng e. Piştî salên 80'yî nêziktêdayînên cuda derketin, ev jî bi xwe re pirbûna lêgerînên eleqedar û cihêreng anîn.

Van lêgerînan, lêgerînên dîrokî yên klasîk buhartine. Lêkolîn li ser vesaziyên sînorên navneteweyî, li ser bandorgirtina ji sînoran a gelên ku li her du aliyên sînoran dijîn, li ser têkiliyên her du aliyên sînor a ji her aliyî ve, li

ser çanda wan û çanda sînoran hatine kirin û tên kirin; vê jî nêziktêdayîn û şîroveyên pir cuda derxistine holê.

Êdî wateyên cuda û avaniyên cuda yên herêmên sînoran hene. Ji bo mînak, li gorî van lêkolînan, tiştên ku li ser sînoran diqewimîn, nîşanderên pirsgirêkên ku dewlet li hundir û bi cîranên xwe re dijî. Yanî dema mirov qewamên li ser sînorên di hundirê Kurdistan de binêre mirov dikare bigihêje gelek têgihiştinan. Ligel van, di xebatên tên kirin de, netewdewlet jî tê pirsyarîkirin. Hin mijarên van lêkolînan ev in: Bandora sînoran a li ser siyasetên neteweyî, bandora siyasetên neteweyî ya li ser sînoran, tengasiyên netewdewletan û hwd.

Demên dawî gavavêtina dewletên Ewrûpayê ya ji bo hilanîna sînoran, xerakirina Dîwarê Berlînê, bidawîbûna şerê sar a bi hilweşîna Yekîtiya Sovyetan re û rûdanên piştî Şerê Kendavê, kir ku careke din wateya sînoran bê şîrovekirin.

Li gorî asta zanistî ya îro hewcedarî bi gelek lêkolînên cuda cuda li ser sînorên di nav Kurdistanê de heye. Dema mirov berê xwe dide van sînoran tiştekî pir cuda derdikeve pêşiya mirov. Erê sînorên hemû dewletan ne wek hev in, nêrîn û saziyên li sînoran ji hev cuda ne, lê mînakên sînorên ku îro di nav Kurdistanê de ne li tu cihan tune ne. Bi van sînoran Kurdistan bûye parçe parçe û hemû bûye herêmên sînoran. Kurdistan bi xwe bêsînor e û ne azad e. Ji bilî vê ne bindestê dewletekê tenê ye jî. Ev aliyê wê, gelekî girîng e. Her dewlet xwedî polîtîkayekê ye û ji bo ku vê di nav sînorên xwe de belav bike, di nav çalakiyê de ye. Ya herî girîng jî ew e ku, dewletên ku serwerê parçeyê Kurdistanê ne, li dijî Kurdan di nav hevkariyê de ne û ji ber ku berjewendiyên gelek dewletên mezin jî di herêmê de hene, bi piranî tevgerên Kurdan ya ji bo mafên herî xwezayî jî vedigerin kaosên mezin.

Kurdistan, ku warekî stratejîk ê herî girîng ê cîhanê ye, bi hezar salan e ku herêmeke sînoran e. Demên dirêj cihgirtina wê ya di nav çend dewletên xurt û hêzdar de, bû sedema gelek tesîrgirtinên cuda û cihêreng. Lê bi sînorên ku di serê sedsala 20'an de di nav re hatin derbaskirin û bi avakirina netewedewletan ya li ser axa wê, kete bin zext û zordariyên bi pîlan û bibername, windahiyên mezin dan û di navbera parçê wê de cudahiyên mezin pêk hatin. Bi van sînorên navneteweyî yê ku niha hene, gelek eşîret ji hev hatin parçekirin, dê ji weledê xwe hate qutkirin, mirov ji axa xwe hatin koçberkirin û bidûrxistin; mirov ketin rewşeke ku her tim di şer de dijîn. Bi asîmilasyonê re rû bi rû man, welat bi mayînan hat çandin... Esas ev 200 sal e Kurd û Kurdistan di halekî gelekî nexweş de ye. Rewşa ku heye xwedî bingehek kur e. Pêşî em ê hebekî xwe bi dîrokê de berdin.

# CILD I


## DÎROKA SÎNORÊN DI NAVA KURDISTANA BÊ SÎNOR DE

## HETA SEDSALA 20'AN

Wek ku tê zanîn sînorê ku cara peşî di peymana nivîskî de ya sedsala 17'emîn de cih girtiye û Kurdistan parçe kiriye, sînorê di navbera Dewleta Osmanî û Dewleta Safawiyan de bû. Ji bilî guhertinin biçûçek hema hema heman sînor bi sed salan hebûna xwe dom kir û îro di navbera Tirkiye û Îran û di navbera Iraq û Îran de ye. Di esasê xwe de bingeha vî sînorî hîn gelekî berê hatiye danîn. Dema em bi dîrokê de dadikevin em dibînin ku ev bingeh diçe heta sedsalên beriya zayînê.

Bi çend hevokan be jî ku em hinekî li ser dîroka kevn bisekinin wê rewşin jê baştir bên xuyakirin. Ku em ji nav dest pê bikin, hîn di belgeyên beriya zayînê (B.Z) nîveka ewil a hezarsala yekê de navê Kurd derbasî nav qeydên dîrokê bûye. Di vê serdemê de Kurd, bi avakirina Împaratoriya Medan re, dema herî geş a dîroka xwe jiyane. Prof. George Rawlinson di berhema xwe ya bi navê "Eski Doğu'nun Büyük Kralliklarindan Medya Kralliği" (Ji Qraliyetên Mezin ên Rojhilata Kevn Qraliyeta Medyayê) de, ji bo sînorên Împaratoriya Medan wiha dibêje: "Ber bi rojava ve bi mesafeya bîst derece yan jî 2000 km'yî ji rojhilatê Çemê Halysê, ji Ragesê dest pê dikir û ber bi Çola Karmanyayê ve dirêj dibû. Bi şeklê rêjeyeke rast a ji bakur ber bi başûr ve, di navbera Behra Reş û Kafkasan de û li aliyekî Hezar, li aliyê din Ferat û kendava Fars bi sînor û teng dibû. Cihê herî fireh ê ber bi rojhilat ve neh û cihê herî teng ê ber bi rojava ve jî hema bi qasî çar dereceyan bû. Rûpîvana vê derê ji 1.295.000 km çarçikî ne kêmtir bû."[1]

[1] Prof. George Rawlinson, Eski Doğu'nun Büyük Krallıklarından Medya Krallığı, r. 202





*Nexşeya Împaratoriya Med (B. Z. 600)*[2]

Lê piştî demeke kurt ev împaratoriya mezin û bedew, wek guherîna xanedaniya rêveber, dê biketa destê îdareyeke nû. Kyros ku neviyê qralê medan e, Împaratoriya Medan dixe dest xwe û împaratoriyê dike xwedî hêzeke wisan mezin ku li dinyayê mirov rastî mînaka wê nayê. Ji ber ku pers li ser mîrata medan rûdinên, ev yek dibe sedema ku împaratoriya mezin bi navê Împaratoriya Med-Persan bê binavkirin. Ji birêveberan heta bi qedemeya leşkeran, piranî ji medan pêk dihat. Ew şerên ku digihan ber sînorên Yewnanan, bi navê êrîşên Med-Persan tên gotin û bibîranîn.

Li gorî berhema komandarê Yewnan Ksenophon a navdar a bi navê 'Anabasîs (Vegera Bi Deh Hezaran)', ku behsa Kurdên di sedsala 5'an ê B. Z. de jî tê de derbas dibe, gava prensê persan Kyrosê II yemin qala Împaratoriyê dike, vana dibêje:[3] "Dostên min, împaratoriya bavê min ber bi başûr ve digihîje heta wan herêman ku mirov ji ber germê nikarin li wan deran bimînin, ber bi bakur ve jî dirêjî wan herêmên(welatên) sar dibe ku mirov ji serma nikarin li wan deran bijîn."*

[2] www.freewebs.com
[3] Ksenophon, Anabasis(Onbinlerin Dönüşü), r. 36
* Esas ev hevok sebeba êrîşên li vê axê gelekî xweşik û bi kurtayî dide xuyakirin.




*Împaratoriya Persan*[4]

Seferên Împaratoriya Med-Persan ku digihîştin peravên rojavayê Anatoliyayê, bi derketina li hemberi van seferan hatina Îskenderê Mezin a ber bi rojhilat ve kirine ku rojava û rojhilat bêhtir têkevin nav têkiliyan. Îskenderê ku dest nedida îdareyên herêmê û hurmet dida urf û adetên wan, di qesrên persan de wek wan kincan li xwe dike û wek wan teşrîfatan qebûl dike. Gelek zanyarên Yewnan beriya Îskender jî li dibistanên rojhilat bingeheke hêja ya zanînê ji xwe re stendine. Bi dû de rojavayî ligel ku heyranî û hejmetkariyên xwe li hemberî çanda rojhilat diyar kirine jî, êdî dest bi têkoşîna nîşandana hebûna çanda xwe kirine. Bi vê rewşê re têkiliya her du çandan zêde bûye û ketine nav hev. Lê belê ev rasthatin û ketinanavhev a çandan, wê ne wisan bi hêsanî çêbibûya, wê gelek şer û pevçûn jî bi xwe re bianiya.

Dema Îskender miriye, împaratorî di navbera fermandar û waliyên wî de hatiye parvekirin. Dûre ne bi gelekî, li wargeha Med û Persan dewleta Partiyan ava bûye û Makedonî hêdî hêdî ber bi rojava ve dehfandine. Di dawiya sedsala 2 yemîn a B. Z. de Nisêbîn bûbû paytexta eyaleteke Partan. Di van salan de Romayî li rojava bi qewet dibin û cihê Mekadoniyan bi dest dixin. Piştî vê îcar Kurdistan di navbera Romayî û Partan de dibe herêmeke tampon. Şerê di navbera her du hêzan de diqewimîn hertim li Kurdistanê pêk dihatin. Lê her du aliyan jî, li herêmê desthilatdariyeke tekûz bi dest

[4] edsitement.neh.gov

nedixistin. Di vê navberê de, hêzên niştecihên herêmê hinekî bi ser xwe ve hatine û bûne wek nîvserbixwe. Di vê demê de îcar ji bakur jî Ermeniyan xwe berdane ser herêmê, lê desthilatdariya wan zêde dom nekiriye. Dîsa Romayî û Partî dikevin hemberî hev. Li derdora salên B. Z. bi 50'yî Ruha bûbû wekî sînorê rojava yê Partan. Lê piştî bi çend salan Romayî Part têk birin û dîsan ber bi rojhilat de meşiyan. Bajar û jîngehên ku tim ji destekî diketin destekî din diketin bin zilma rêveberên nû; rêveberên nû kerba têkçûnên xwe yên berê di serê wan re derdixistin û pirî caran ew cih û war, bi erdê ve rast dikirin. Diyarbekir û Nisêbîn ku gelek caran di sînoran de diman, ev yek tim dihate serê wan.

Kurdistan gelek caran xwedî mîrekiyên nîvserbixwe bû û di navbera serweriya rojhilat û rojava de gelek caran dest diguherand. Ev mîrekiyên biçûk ji bo ku li ser lingên xwe bimînin gelek têkoşînên mezin kirine. Di van şerên ku ne yên wan bûn de gelek caran hevalbenditiya xwe guhertine. Di vê dema şerê dîrokî yê rojhilat û rojava de, ku berê di navbera Roma û Part û paşê jî di nav Bîzans û Sasanî de bûye, Kurdistan tim bûye warê serhedan û lewma jî bûye meydana şer û warê lihevhatin û têkiliyên van hêzan. Wek nimûne di serdema Bîzansiyan de nuqteyek ji sînorê rojhilat bi piranî Nisêbîn e, ku wê demê wek metropol e û carinan jî mîna herêma serbest e ku her du alî jî dikaribûn lê ticaretê bikin. Dema Nisêbîn ji destê Bîzansiyan çûye, li hemberî wê Daraya ku îro jî bi bermahiyên xwe cihekî muhteşem e ji nû ve ava dikin û wê derê dikin wek bajarê sînor û garnîzonê. Di van demên ku her du alî jî li herêmê ne helbet têkilî û çand jî dikete nava hev de.




*Di 450'yî de sînorê di navbera hêzên Rojava û Rojhilat de*[5]

[5] Colin McEvedy, The Penguin Atlas of Medieval History

Di vê dema ku Kurdistan di navbera du hêzan de tim ji destekî derbasî destekî din dibû, hem ev her du dinyayên ji hev cihê digihandin hev, hem jî Xiristiyaniya ku hê nû belav dibû xwedî dikir. Ligel Zerdûştiyê ku wê heta serdema Îslamiyetê bi awayekî xurt dewam kir, Xiristiyanî jî wê mesafeyên girîng bi dest bixe. Piştî ku dînekî nû yan jî hukmekî nû bê qebûlkirin û pê de, bêguman jiyana berê bi carekê nayê guhertin, hêdî hêdî hevbandorî pêk tê, nû û kevn têkilî nav hev dibin. Lewma herêm ji vî aliyî ve, ji hêla ziman, dîn û çandê ve gelekî zengîn e.

Di dema dawî a şerê rojhilat û rojava de, çendî serdestî ketibe destê Sasaniyan jî, vê lihevnekirin û pevketinê heta sedsala 7'an dema pêşveçûna îslamiyetê dewam kir û jê û pê ve jî paşketina her du hêzan a li dijî îslamiyetê dest pê kir. Herêma ku hîn jî pirsgirêkên xiristiyaniyê lê didomiyan, di sedsala 7'an de bi hatina îslamiyetê ya ji hêla başûr ve, rewşa xwe ya ku qada şerê xwînherikandinê bû, berdewam kir. Bi tevlîbûna Başûr, heta dawiya seferên xaçparêzan, têkoşînên herî dijwar ên rojhilat, rojava û îslamiyetê yên li dijî hev, dîsan li Kurdistanê qewimîne. Lê belê di dema seferên rojava de û di dema îstilayên Ereban de çendî ew hêz ketibin gelek cihên Kurdistanê jî, hakimiyeteke tam bi dest naxin, binyatên xweser ên cihkî xwe diparêzin û carinan jî xwe bi pêş dixin. Di çanda wan de jî mirov bandora çandê her du aliyan dibîne.

Qraltiya Komageneyê nimûneyek ji vanan e. Qraltiya Komageneyê li ser hîmên serdema Med-Persan dameziriye, navenda wê Semsûr bûye û dirêjî heta bajarên Meletî, Enteb, Ruha û Elezîzê bûye; beriya zayînê di salên 300'î de xurt bûye û hema nêzî 500 salan hukim kiriye. Xirbeyên Nemrûd (ku nuwazeya heştemîn a dinyayê ye) û Zeugma aîdî vê dewrê ne. Ev berhem îfadeya ketina navhev a pêşî a rojhilat û rojava ne.

Dagirkirina Kurdistanê ya ji aliyê qebîleyên Ereban ve beriya îslamiyetê di sedsala 4'an û 5'an de dest pê kiriye. Koçerên Ereb havînên xwe di navbera Torê û Çiyayê Şengalê de derbas dikirin, zivistanê jî dadiketin başûrê Çiyayê Şengalê. Di dema fethên îslamê de êrîşa pêşî a Ereban di sala 638'an de pêk hat û di nav du sedsalên paşê de Ereban piraniya Kurdistanê kirin bin destê xwe. Li gorî hin lêkolîneran Kurd bi zorê û li gorî hinekên din jî, Kurd bi hemd û xwesteka xwe dibûn misilman.

Di sedsala 10, 11, û 12'an de piraniya nifûsa Kurdan îslamiyet qebûl kiribû û wan baweriyên xwe yên nuh û yên berê xistibûn nav hev; li hin herêman jî mîrekiyên feodal ên Kurdan mîna Şedadî, Hasanweyhî, Merwanî, Loristana Mezin, Loristana Biçûk û Buweyhî hatibûn avakirin û pêşveçûnên

girîng çêbûbûn. Serdema Merwaniyan ji bo herêmê bûbû dewreke zêrîn; avakirin û temîrkirina bajaran, çêkirina mizgeft û çarşiyan, qedirdana zanist û hunerê, kiribûn ku çanda Kurdî nefeseke rihet bistîne. Van mîrekiyên Kurdan ku dê bi qasî hezar salî hebûna xwe berdewam bikirina, bingehên saxlem danîbûn. Û bi gihandina şexsiyetên girîng jî asta ku gihîştibûnê nîşan didan.

Heta van dewran, sînorên serweriyê bi nîşandana hêz û qewetê dihatin diyarkirin, bi piranî warên jiyanê yên mezin bi sûr û bedenan, cihên asê û bilind ên li ber çem û avan, ku kesî zû bi zû nikaribû xwe bigihanda wan jî, bi lêkirina kelehan dihatin parastin.

Oxûzên ku di sedsala 11'an de ji Asyaya Navîn dest bi hatinê kirin û Moxolên ku di sedsala 13 û 14'an de hatin û nemaze Tîmûrleng herêmê talan dikin, di cih û warên jiyanê de kevir li ser kevir nahêlin her derê xera dikin û bi vî awayî warê wek buhiştê dikin cehenem û dihêlin.

Kurd bi mêvanên xwe yên nû re carinan hevalbendiyê dikin û bi hev re di miqabilî dijmin de şer dikin û hin caran jî şerê hev û din dikin. Ji bo mînak, di Şerê Melazgirê yê 1071'ê de, siwariyên Dewleta Merwanî ya Kurd û gelek eşîrên Kurd ên ji herêmên Kurdan, di himberî Bîzansiyan alîkariya Sultan Alpaslan kirine.

Kurdên ku alî Bîzansê dikirin û şer dikirin jî hebûn. Yek ji şairên navdar ê swêdî Gunnar Ekelöf, di kitêba xwe ya bi navê "Emgion Prensi İçin Divan" (Dîwana ji bo Prensê Emgîonê) de behsa serpêhatiya prensekî Kurd dike ku ew di dema Şerê Melazgirê yê 1071'ê de tevî Împarator Diogenesê 4'an dîl ketiye destê Tirkan û di dema pevguhartina dîlketiyan de ligel Împarator teslîmî Bîzansiyan dikin. Piştî ku prens dibin Stenbolê, bi Împarator re mîlê dikişînin çavên wî jî û wî terkî qedera wî dikin. Ew prensê Kurd ê ku di dîwanê de wek Prensê Emgîonê tê gotin, yek ji mîrê sersînor (serhedan) ê Împaratoriya Bîzansê ye. Mîrê sersînoran, li gorî hin pîvanan di rewşeke serbixwe de bûn. Ji lew re tê gotin ku "gava împarator eyaletên sersînoran ziyaret dikirin -wek prensîb- ne xwedî wî mafî bûn ku tevî artêşa xwe karibin bikevin wan eyaletan."[6]

Ev cihgirtina di nav her du aliyên şer de, ji rewşa jiyana di sînoran de ye. Cihgirtina Kurdan a di nav du artêşan de, ku ew bi hev re şer dikin, ji ber ku ew tim di ber sînoran de ne dê her bidome; çendî piranî derbasî aliyê artêşekê bibe jî. Ev rewşa hanê ne tenê di nav Kurdan de hatiye dîtin, di nav gelên ku li ser sînoran dijîn hemûyan de ev hatiye dîtin.

[6] Gunnar Ekelöf, Emgion Prensi İçin Divan, r. 185

Biêş û jan be jî, di vê dewra hanê de ku hîm û bingehên pevrebûna Kurd û Tirkan a ev nêzî hezar salîye dom dike dihat danîn. Di dema hukumdarê Selçûqiyan Sultan Sencar (mirin 1157) li herêma ku ji rojhilatê Çiyayê Zagrosê ve Hemedan, Dînawer, Kirmanşah û Senendecê û li rojava jî Şarezûra li ser Ava Zêyê û herêma Şengalê digirt nav xwe, Eyaleta Kurdistanê hatibû sazkirin. Ev yekîneya îdarî ya pêşî ya ku bi navê Kurdistanê hatiye avakirin e.

Di destpêka sedsala 12'an de, nemaze li Sûriye û Cezîreyê însiyatîfa xaçparêzan ku ji danheva gelek hêzên rojava pêk dihat gihîştiye asta xwe ya herî bilind. Di vê demê de Selehedînê Eyûbî li devera Misir, Sûriye û Filîstînê Dewleta Eyûbî damezirandiye. Selehedîn li dijî xaçparêzan bi awayekî xurt şer kiriye, beşeke mezin a Kurdistanê jî xistiye bin serweriya xwe. Bi vî awayî Ereb, Tirk û Kurd anîne cem hev û di bin alaya îslamê de împaratoriyeke xurt ava kiriye.

Di dewrên serweriya Aqoyunlî, Qaraqoyunlî û di dema serdestiya Tîmur a kurt de jî mîrekiyên Kurdan pirî caran bi dayîna diyariyan serbixwebûna xwe parastine û li ser navên xwe ku ev yek nîşaneya serweriya wan e, pereyên zêr û zîv jî çap kirine. Wekî hemû demên dîrokê, di vê demê de jî dagirkirin demkî bûne û Kurdistan ji dagirkeran re nebûye cih û warê jiyanê. Lê gelek derban hatiye talankirin û xerakirin. Wek nimûne, Moxolên ku di sedsala 13 û 14'an de Kurdistan talan û wêran kirine, kutubxaneya herî zengîn a dinyayê ku ji aliyê Selehedînê Eyûbî ve hatiye avakirin jî şewitandine.

Piştî hinekî me li dîroka kevn nihêrî îcar em ê derbasî dema duparçekirina Kurdistanê bibin, ku ew sînorê wê demê ket peymanan heta îro jî heye. Gava li sedsala 16'an, dema Kurdistan bûye du parçe bê nihêrîn wê bê dîtin ku, wê demê mîrgehên Kurdistanê ji aliyê siyasî û madî ve têra xwe hebûn; xwediyên amraz û alavên îdarekirina xwebixwetiyê ya di şeklê dewletê de bûn. Di vê demê de mîrekî tim û tim bi êrîşên Sefawiyên ku li Îranê bûne desthilatdar re rû bi rû dimînin. Şah Smeîl di sala 1507'an de û piştî wê hema hema tevahiya Kurdistanê xistiye bin destê xwe, piraniya gel daye ber devê şûrê xwe û cih û deverên ku li dijî wan li ber xwe dane jî bajar û gundên wan hatine xerakirin û bi erdê ve kirine yek. Her mîrektiyeke Kurd ji bo li hemberî van êrîşan xwe biparêze gelekî li ber xwe daye.

Vesazîbûnên rêveberiya herêmî mîrîtiyên Kurd ên ku wê heta sedsala 19'an hebûna xwe biparêzin, geleki bi hêz bûn. Li hemberî Sefewiyan demeke dirêj li berxwe dane. A. M. Menteşaşvili, di berhema xwe ya bi navê 'Dünden Bugüne Kürtler' (Ji Duh Heta Îro Kurd) de wiha nivîsiye: "Piştî ku

li Îranê serweriya qizilbaşan pêk tê, serekê xanedaniya nû Şah Smeîl Sefewî (1502-1524) çend caran bi darê zorê xwest ku serî li Kurdistana Mukrîn bide tewandin, lê her car hewldanên wî pûç derketin. Di sala 1507'an de, di bin pêşengiya Sarûmê kurê Seyfedîn de Kurdên Mukrînê artêşa Şah têk birin. Şah Smeîl, xwest ku bi piştgiriya qebîleya Şamlu ya Qizilbaş Kurdên Mukrîn têk bibe lê ev hewldanên wî jî bi kêrî tiştekî nehatin. Di rastiya xwe de dema windahiyên ku hatin dayîn li pêş çavan bên girtin, ev serkeftin ji bo rêberê Mukrî jî serkeftineke wekî têkçûnê bû û serekê Mukrî neçar ma ku di demeke kurt de serweriya Dewleta Sefewî qebûl bike"[7]

Li gorî Şerefnameyê, hukimdariyên ku di sedsala 16'an de li Kurdistanê hebûn ev bûn: Hukimdariya Bedlîsê, Hukimdariya Erdelan, Hukimdariya Şenbo (Hekarî), Hukimdariya Behdînan (Amadiye), Hukimdariya Botan (Cizîr), Hukimdariya Hesenkêfê, Hukimdariya Çemîşgezekê, Hukimdariya Eglê (Gêlê), Hukimdariya Palo (Mirdasî), Mîrektiya Çêrmûkê, Hukimdariya Sasonê, Hukimdariya Hîzanê, Mîrektiya Muksê, Hukimdariya Îsbayerdê, Mîrektiya Şêrwanê, Hukimdariya Kilîsê, Mîrektiya Zirkan, Hukimdariya Siwêdî, Mîrektiya Qulp û Batmanê, Mîrektiya Meyafarqînê, Hukimdariya Soran, Hukimdariya Baban, Hukimdariya Mukrî, Hukimdariya Biradost, Mîrektiya Somay, Mirektiya Mehmûdiyan, Mîrektiya Dinbilî, Hukimdariyên Kelxor-Pilingan, Mahdeşt û Derteng, Mîrektiya Baneyê, Mîrektiya Gelbaxî, Mîrektiya Siyah Mansûr, Mîrektiya Çengê, Mîrektiya Zengîne, Mîrektiya Pazûkî.

Bihevrebûna Kurd û Osmaniyan û diyarbûna sînorê ku Kurdistan dikir du parçe, bi êrîş û zextên Şah Smeîl ên li hin mîrekên Kurdistanê dest pê dike ku vê yekê jî kir Kurd berê xwe ber bi Osmaniyan vekin. Di Şerê Çildêranê de, ku di 23'yê Tebaxa 1514'an de, di navbera Yawiz Sultan Selîm û Şah Smeîl de qewimîbû, bi qasî 16 mîrên Kurdan(Li gor hin çavkaniyan ev hejmar 23 ye) tevî hêzên xwe yên leşkerî di nav sefên Osmaniyan de cih girtin û di vî şerî de artêşa Şah Smeîl têk çû.

Piştî Şerê Çildêranê têkiliya Osmanî û mîrekên Kurdan zêde bû û mîrekan bi dilxwazî xwestin tevlî Dewleta Osmanî bibin. Ji bo Kurdistan tev li Dewleta Osmanî bibe di serê têkiliyan de Îdrîsê Bîtlîsî heye. Îdrisê Bîtlîsî girîngiya tevlêbûna Kurdistanê ya li Dewleta Osmanî wiha îfade dikir: "...Tevlêbûna Osmaniyan ya Bilad-i Ekrad, bi qasî ku biserketina fetehkirina Stenbol temam bike muhîm e. Ji ber ku dema ev herêm bi ser vebe ji aliyekî ve riyên Îraq yanî Bexdê û Besrayê û ji aliyê din ve riyên Azerbeycanê û ji aliyekî din ve jî riyên

[7] A. M. Menteşaşvili, Dünden Bugüne Kürtler, r. 138
[8] Doğu ve Güneydoğu Hadiselerinin Gerçek Reçetesi-2, Ahmet Akgündüz, www.osmanli.org.tr

Helebê û Şamê wê vebin. Alîkariya Xwedê pir nêzîk e..."[8]

Ev bihevretiya bidilxwazî ya Kurd û Osmaniyan bi peymanekê bû fermî. Bi vî awayî Dewleta Osmanî 16(li gor çavkaniyan ev hijmar tê guhertin) mîrekiyên xweser ên Kurdan ku li ser parçeyekî mezin ê Kurdistanê serweriya wan hebû, qebûl dikir.

Vê statuya xweser (otonom) a mîrekiyên Kurdan, çendî ku hin nexweşî qewimîbin jî, 300 sal ango heta nîveka sedsala 19'an dom kir. Bi vî awayî piraniya Kurdan ketibûn bin serweriya Osmaniyan û hin ji wan jî di aliyê Sefawiyan de diman. Ev mîrekiyên Kurdan ku pirî caran xwedî avaniyeke azad bûn û tenê girêdana wan, salê carekê dayîna bacê û di wexta şer de jî alîkirina leşkerî bû; ya rast wan ji pergal û sazûmanên Osmanî û Sefawiyan wilo pir tesîr nedigirt. Di wê serdemê de ne miliyet lê belê dîn li pêş e. Ligel vê rewşê, bi qehremaniyên wan, bi urf û adetên wan ji hêla van dewletan ve wesfê Kurdan pir hatiye dan.



*Tabloya ku şerê Çildêranê dide xuyakirin. Nivîskara îtalî Mirella Galetî ev tablo li Seraya malbateke Sicîlyayî dîtiye û vekolaye. Galettî destnîşan dike ku li bin tabloyê nîvîsek dirêj bi zimanê îtalî heye. Ev nivîs agahdariyan der barê şerê di navbera Sultan Selîm û Şah Smeîl de, pozisyona wan û hejmara wan a di şer de dide. Li gor Galettî, nivîs ji aliyê kesekî ku bûye şahidê bûyerê û xwedî agahiyên misoger e hatiye nivîsandin û ev belgeyeke gelekî taybet e ji bo Osmanî û Kurdan. Galetti, der barê 'kengî û çawa ev tablo hatiye çêkirin' de hîn ne xwedî agahiyê ye. Lê îhtîmal dide ku ev tablo di dawiya sedsala 16'emîn an jî di destpêka sedsala 17'emîn de hatiye çêkirin.*

Osmaniyan piştî ku bi Kurdan re îtifaqa bidilxwazî çêkir bi şûn de, serkeftinên mezin bi dest xistin. Mîrgehên Kurdan tim bûn kaniya hêza leşkerî ên artêşa Osmanî. Di gelek şerên ji bo fetehkirina deran û vemirandina serhildanan de leşkerên Kurdan jî beşdarî artêşa Osmanî dibûn. Yawiz Sultan Selîm erdê Dewleta Osmanî ji du qat û nîvan zêdetir fireh kir. Di heyama Kanûnî Sultan Silêman de ev hilkişiya heft qatan. Di vê navberê de hin mîrekiyên Kurdan ên ku destgirtiyê safewiyan bûn bi xwestina xwe tevlî Dewleta Osmaniyan dibûn. Mînakek jê ya mîrekê Kurdan Zulfîkar Xan e. Zulfîkar Xan, Piştî mirina Şah Smeîl di sala 1524'an de serî di miqabilî Dewleta Safewiyan de rakir, Bexda xist bin destê xwe û di peyre bi dilê xwe tevlî Devleta Osmanî bû. Bi dû vê de Kanûnî Sultan Silêman Îraq bi ser Dewleta Osmaniyan ve kir. Yawiz Sultan Selîm dema hat ser text erda Osmanî 2.375.000 km² bû, di dawiya saltanata wî de ev hilkişiyabû 6.557.000 km². Kanûnî Sultan Silêman ê paşê bû padîşah ev hilkişand 14.983.000 km². Ango Dewleta Osmanî piştî ku bi Kurdan re pevrebûn danî tenê di dema du padîşahan de erda xwe kir nêzîkî 7 qatên berê û bû împaratoriya dinyayê.

Rohat Alakom di kitêba xwe ya bi navê Arîstokratên Kurdan de dibêje: "Li gor çavkaniyan: 'Dema Kanûnî Siltan Silêman ji sefera xwe ya rohilatê vegeriya Stenbolê, diya wî jê pirsiye:

- Ha kurê min, va tu vegeriyayî, lê gelo gurcî û qizilbaş wê êrîşan nebin ser bajarên te û ziyanê negihînin te?

Siltan lê vegerandiye:

- Hay dayê, min dîwarekî xurt di navbera Împaratoriya Osmanî û Dewleta Gurcî û Îraniyan de ava kir, dijmin nikare tu ziyanê bike.

Diya wî dîsa jê dipirse:

- Çawa te karibiye dîwarekî ew qas dirêj ava bikî?

Siltan lê vegerandiye:

- Dayê min ew dîwar ji goşt û xwînê ava kir. Min hukmê wan herêman da destê êlên Kurdan, min ew ji Gurcistanê heta Bexdê, Besrê û Şarezûrê, di rêzekê de mîna asêgehekê danîn. Dijmin nikare ji wan derbas bibe û têkeve dewleta Îslamê"[9] Rastî û nerastiya vê gotinê li dera hanê, ev çîrok rastiyekê dide xuyakirin.

Helbestek, hêza Kurdistanê ya wan dema gelekî vekirî dide xuyakirin. Ev helbest ji xebata Xelîl Xelîlî hatiye stendin.

[9] Rohat Alakom, Arîstokratên Kurdan, r. 18

Bijartina serbaz û serhêz û ûmarayê mezin, der zincîra hêzê leşkerê yekîtî.

Dawî wê demê sultanê welat
Teqsîm girêda bi cehd û xebat

Terfî dikirin emîr û sûbaş
Serhêz û sermifrez û serbaş

Serqolê esakirê Kurdistan
Teyîn kirin wê demî Yahya Xan

Eslê wî ji bajarê Mûsil bû
Sahib huner û qahres û zor bû

Serhêzê esakirê cîhan e
Terfî dikirin Eshed Begê can e

Esl û nesaba wî pir eyan bû
Ew jî ewladê Mîrxanê xanan bû

Paşê ku nîşan didane Usman
Bû amîrê rimbazê Kurdistan

Derwêş ku dibû erkanê herb e
Dispartin wî, emrê ceng û derb e

Merteb merteb tayîn kirin sûbaş
Sermefrez û mexfer û serbaş

Tekmîl kirin hêzê Kurdistan e
Wan şah û egîd û şeker xan e

Te digot hemî ew bav û bira bûn
Te digot hemî ew nûra çavan bûn

Yek lehze qeder ji hev nedibûne xafil
Daîm ew di emrê hev bi acil

Rojan û şevan daîm bi xebatî
Der hamî bûna Kurd û welatî

Her dem ew li hev bi xebîr û kar bûn
Ha reng e li ser îş û eyar bûn

Ew hîşyarê li dewleta Kurdî bûn
Ew nazirê hêzên çekdarî bûn

Ew tabiê zincîra emrê xan
Yekser yekî ra serok û nîşan

Firqe bi firqe leşker ku belav bûn
Her firqekî cem'a wê lê diyar bûn

Firqekek ji leşkerê hêzê Kurdistan
Daîm ew hebû li Cizîra Buhtan

Firqa diduwê li bajarê Amed
Lew ew merkeza welatê Serhed

Firqek li Neynewa heta Rewandûz
Wan cehd û xebat dikir şeb û roz

Firqa sisiyê di şehrê Mehabat
Ew nobetdarê der cih û welat

Teyîdek mezin hebû di Wanê
Ta Laçîn û semta Erîwanê

Firqek ji pêşmergê yekîtî
Daîm ew hebû li qişla Ûmadî

Dawî mefrezek ji leşkerê rimbaz
Der mesken bû li Kengê bi cîhaz

Ew cumle bi tedbîr û telîm
Meşhûr bûn bi zanîn û tenzîm

Hindî hebûn bajar û şehristan
Ji şehrê Hewlêrê, Riha ta Haran

Xerpêt û Mêrdîn ta Melatyanê
Der emr û zincîra Buhtanê

Yek firqe ji çekdarê Kurdistan
Her tim ew hebû di şehrê Haran

Şaxê mefrezê wan diçûne avê
Ta pişt çiyayê şehrê Etavê

Daîm wan dikir cerîd û cewlan
Ew nobetdarê welat û cîhan

Yek gavek ji welatê xwe Kurdistan
Wan ku nedida bi mal û rih û can

Hindî ew wisa aşiqê hev bûn
Tebîetmelek bûn bi evîn û xweş bûn[10]

Tifaqa bi Kurdan re hêzeke mezin da Osmaniyan, lê îdareyên xweser ên Kurdan ku mîna yekîneyên biçûk mabûn, her ku çûn ji hêz ketin û roj bi roj girêdana wan a bi rêveberiya Osmanî re zêdetir bû. Li hêla din, mîrekiyan ji ber pevçûnên bi hev û din re û nakokiyên navxweyî gava pirsgirêkên wan çêdibûn, serî li rêveberiya Osmanî didan. Rêveberiya Osmanî jî, ji kîjan rêveberî ne xweş bûya û hebûna wî ji xwe re wek xeter bidîta, di şûna wî de rêveberekî din tayîn dikir; ev jî dikir ku rêveberên Kurd mecbûr bimînin ku dilê padîşahê Osmanî xweş bikin, xwe pê şelaf bikin.

Hin caran jî mîrekî û mîrgehên ku xurt dibûn, ji aliyê Osmaniyan ve yan dihatin parçekirin an jî dihatin berterafkirin. Digel vê yekê, rêveberiya Osmanî reqabet û nexweşiyên di navbera eşîran de zêde dikir û bi vê, rê li ber xurtbûn û yekîtiya wan digirt; her wiha carinan bav û kur li ber hev radikir,

[10] Nivîskarê pirtûkê Xelîl Xelîlî ye. Hesen Çeter ev pirtûka ku hîn nehatiye çapkirin ji tîpên Erebî wergerandiye tîpên Latînî.

bira û bira berdidan hev û bi vî awayî parçebûna hin mîrgehan rihetir dibû. Li gorî fermana ku Sultan Selîm ê Yekemîn di sala 1515'an de weşandiye, herêma ku Kurd lê dijîn ji 18 mîrekiyan pêk dihat, lê paşê ev hejmar gihîştiye 55'an. Ev parçebûn bûye sedema çêbûna gelek navendên hêzan ên niştecihên herêmê, têkilîdanîna cihêreng û bingeha veqetîna ji hev û din.

Gelek derban jî çavreşî davêtin kesên xwedî îtibar ên ku derdora xwe fireh dikirin û ji bo wî tune bikin mahne lê dikirin. Ji bo mînak, Şêx Mehmûd dibe qurbana hêza xwe ya ku gihîştiyê. Şêx Mehmûd ê Neqşebendî, ji Urmiyeyê koçî herêma Diyarbekirê kiriye û di demeke kin de li bajarê Diyarbekirê û derdora wê bûye xwedî qedrekî mezin û xelkê jê re pir hurmet kiriye. Paşê tesîra Şêx Mehmûd li nav hemû Kurdistanê û heta nava Îranê jî belav bûye, hejmara alîgirên wî yên milîtan gihîştiye 40 hezarî û hejmara mirîdên wî jî bûye 400 hezar. Hema bibêje ji sala 1575'an heta 1639'an sekin nakeve şerê di navbera împaratoriyên Osmanî û Sefawiyan de. Mûrad ê 4'em bi xwe fermandetiyê ji sefera sala 1635'an a ser Erîwanê û ya salên 1638-39'an a ser Bexdayê dike. Di dema van seferan de, ji ber xwedîkirina artêşên mezin û bacên bizêdebûn dihatin xwestin, Kurdistan dikeve nav tengasiyeke mezin. (Li hêla din heger mirov tê bifikire ku ji Kurdistanê beşdarîbûna artêşê jî heye, wê gavê tê texmînkirin bê van sefera çi tehde bi xwe re dianîn.) Di dema şer de, Şêx Mehmûd bi hêza xwe ya xurt û berfireh a li Kurdistanê, di têkoşîna Mûrad ê 4'em de, ya bi Sefawiyan re alîkariyên mezin kiriye. Lê piştî ku di şerê Sefawiyan de serkeftin tê bidestxistin û peyman jî tê girêdan, Şêx tê daliqandin. Her çiqas ji bo îdama wî çend sedem bên gotin jî, tiştekî hişkere ye ku vê potansiyela wî kiriye ku Osmanî zikreşiyê bavêjinê.

Martin van Bruinessen, di berhema xwe ya bi navê "Kürdistan Üzerine Yazilar" (Nivîsên li Ser Kurdistanê) de, der barê mijarê de van agahiyan dide: "Bi awayekî hovane kuştina Şêx, ku li deverên dûr mîna Macaristanê jî ketibû ser zar û zimanan û gotina ku, sultan ji ber vê ve ji aliyê 'yê jorê' ve hatiye cezakirin, nîşaneya binavûdengbûna Şêx Mehmûd e. Li Peçewî Temaşwarê 'li van deran' di dema sefera Rewanê de (dema pêşî ku Mûrad ê 4'em ji tesîra Şêx xof jê re çêdibe), bi Sultan re îşaretên nexweşiya gutê xuya dibe. Tê gotin ku 'roja Şêx tê kuştin Sultan felç dibe.'"[11]

Xirecirên bi Sefawiyan re jî dewam dikin. A. Qasimlo di berhema xwe ya bi navê 'Kurdistana Îran' de ji pevçûneke Kurd û Sefawiyan wiha behs dike. "Di sala 1608'an de ew berxwedana ku Xanê Çengzêrîn ê Bradostî yê cesûr di Kela Dimdimê de dide, dibe efsane. Ev berxwedan ji aliyê artêşa Şah Ebasê

[11] Martin van Bruinessen, Kürdistan Üzerine Yazilar, r. 54-55

Sefawî ve tê şikandin. Di pey vê de artêşa şiiyan (kumsoran) li rojavayê Gola Urmiyeyê xwîna gelê Kurd diherikîne."

Ji aliyê din ve di encama hin fîtneyan de, hin rêveberên Kurd ligel ku xwestine tekiliyên xwe bi seraya Osmanî re bi xweşî bidin domandin jî -tevî ku li dijî wan peymanên ku hatine çêkirin in- ji hêla îdareya Osmaniyan ve cihê wan hatiye guhertin.

Di vê navê de tê dîtin ku mîrekiyên li ber sînoran, geh hevalbendên Osmaniyan in geh ê Sefawiyan in. Ez dibêjim qey, ji bo ku em karibin rewşa mîrekiyên Kurdan ên di wê demê de, têkiliyên di navbera îdareyên Osmanî û Sefawiyan de û têkiliyên wan ên bi yekîneyên îdarî yên mîrekiyên Kurdan re, pozîsyona sînorê ku hîn tam rûneniştiye baş bizanibin û wan hîs bikin, em der heqê Mîrekiya Bedlîsê de ku ew tenê yek ji mîrekiyên Kurdan bû, ji Şerefnameyê hin vegotina bibînin wê baş be.

Şerefxan ku hukimdariya wî ji aliyê Sefawiyan ve jê hatibû stendin, yek ji wan mîran e ku bi Osmaniyan re îtifaqê dike û tevlî Şerê Çildêranê dibe. Piştî derxistina temsîlkarên Sefawiyan ji Diyarbekirê, mîrên Kurdan ji bo ku pozîsyona xwe ya berê bi dest bixin û temsîlkarên Sefawiyan ji warên xwe derxin, têdikoşin. Şerefxan jî tê ser kewna xwe ya berê, yanê hukimdariya Bedlîsê dike destê xwe. Di dema hukimdariya xwe de, ku di çaxa Sultan Suleyman de jî dewam dikir, ji ber ku ew li ber sînorê Osmanî û Sefawiyan e, mecbûr dimîne ku dilê her du aliyan jî xweş bike û ji xwe razî bike.

Demekê navbera Osmanî û mîrê Bedlîsê nexweş dibe. Dilmayina di navbera rêveberiya Osmanî û Mîr Şeref de, bi pirsgirêka di navbera Ulame Tekelu û Mîr Şeref de dest pê dike û ev ji aliyê kesên li derdorê Sultan ve bi awayekî ne baş tê bikaranîn. Qalûqurteke ku wê Mîr Şeref serî hilde û derbasî aliyê Şu'iyan bibe, belav dikin. Ulame Tekelu pêşî ji cem Osmaniya çûye xwe avêtiye Şah Tahmasp û bûye mîrê mîra yê Azerbaycanê, îca vê demê dîsa li Osmaniya vegeriyaye. Wezîrê Osmanî yê ji Mîr Şeref diqehere jî piştevaniyê li gelaciya Ulame dike. Sedema ku Wezîr ji Mîr acize di Şerefnameyê de wiha tê diyarkirin: "Mîr Şeref di wexta pevçûna bi Eşîra Pazûkî re, hespek bi dest xistibû; Wezîr jî ev hesp bihîstibû û ecibandibû; ew ji Mîr Şeref xwestibû; lê Mîr Şeref xwe giran kiribû û bi mahneyekê hesp jê re neşandibû."[12]

Di encamê de ji cepheya Osmanî, qerara ku divê Hikûmeta Bedlîsê bidin Ulame û ji bo ku Bedlîsê jî dagir bikin divê yekîneyeke mezin ji leşkerên "yênîçerî" û "ecemî oxlanan" bê hazirkirin û berê wan bidin Bedlîsê derdikeve. Her wiha ferman tê derxistin ku ji bo şer bi wilayeta Mîr Şeref re

[12] Şerefxan, Şerefname-Kürt Tarihi, r. 489

bê kirin û bikin ku serî ji hikûmeta Osmaniyan re deynin ji Diyarbekir, Mereş, Heleb û ji yekîneyên din ên Kurdistanê tedarikkirina 30 hezar leşkerî tê xwestin da ku herin bigirin ser Bedlîsê. Dema Mîr Şeref bi van yekan dihise, leşker û fermandaran di kelehan de bi cih dike, ew jî diçe Têwrêzê cem Şah Tahmasp û jê alîkariyê dixwaze.

Ev şerê ku di sala 1532'yan de diqewime, sê mehan didome, lê Bedlîs nayê stendin. Li ser xebera ku Şah Tahmasp tevî Mîr Şeref bi artêşeke mezin tê Bedlîsê, dorpêça Osmanî ya li ser Bedlîsê tê hilanîn û Mîr Şeref careke din tê ser karê xwe. Berdewamiya mijarê di Şerefnameyê de wiha ye:

"Mîr Şeref piştî vê li Xelatê ji bo Şah û erkanên wî yên dewletê, şahiyeke wilo hejmetkar çêkir û ziyafeteke wisan mezin da ku heta wê çaxê manendên wan nehatibûn dîtin û nehatibûn bihîstin.

"Di pey şahiyan, leystik, kêf û zewq, diyarî, yadîgarî, xelat û belavkirina kincên teşrîfatan de, ku sê rojan wiha dewam kir, Mîr Şeref hin diyarî û xelatên ku demên berê kesî manendên wan nedîtibûn pêşkêşî huzûra şah kirin. Hinek ji wan ev in: Çend teyrên nêçîrê yên mîna şahîn û teyrê baz, tevî zînên bi zêr neqişandî hespên Erebî yên bi esil, du kurkên weşeqan ên rengîn û hêja, qumaşên heft rengî ên bi qeseb, qumaşên freng ên bipûrt ên ku kêm peyde dibin... Şah jî Mîr Şeref bi şûrekî ku qevda wî bi gewher û mircanan hatibû xemilandin û xeftanek sirmên wê bi zêrên safî hatibû neqişandin, teltîf kir; her wiha di şûna Mîr Şeref de nasnavê Şeref Xan dayê. Ji bilî van rutbeya bi qedir ya gewre ya serektevahiya leşkeran û wezîfeya mîrêmîratiya Kurdistanê dayê û di vî warî de fermanek berz derxist..

"Piştî Şah vegeriya memleketê xwe bi qedereki, li ser xebera ku Ubeyd Xan ê Ozbek Xorasan dagir kiriye, fermannameyekê ji Şerefxan re dinivîsîne û muhafiziya Eyaleta Ezerbeycanê û îdareya karên wê derê ya di hemû rewşan de, dayê; ji bilî van hin fermandarên şiî û kesên mîna Helhel Sultan Arabkîrlû, Uweys Sultan Pazûkî, Kaçar Ecel Sultan, Emîre Beg, Mahmudî, Mûsa Sultan ê waliyê Têwrêzê wezîfedar kirin ku pê re bibin alîkar û piştgiriyê bidinê."[13]

Bi vî awayî di vê demê de, aminiya Sefawî û mîrektiya Bedlîsê li hev heye û alîkariyê didin hev. Di vê pêvajoyê de ji aliyekî ve neyariya Ulame zêde dibe, li aliyê din jî Şeref Xan heyfa xwe ji wan mîrên Kurdan ên ku di dema êrîşên Osmaniyan de ligel hêzên Osmanî cih girtibûn distîne. Ji ber vê rewşê dîsa Osmanî û hêzên Kurdan, artêşeke ku ji 10 000'î pêk hatiye kom kirine

[13] Şerefxan, Şerefname-Kürt Tarihi, r. 495

û biryara ku êrîş bikin ser Bedlîsê dane. Rêberên eşîran, ku li dijî fikara xwestina alîkariya ji Sefawiyan a Şeref Xan derdikevin, bi tena serê xwe, bi hêzeke bi qasî nîvê hêza Osmanî li hember artêşa Osmanî derdikevin û têk diçin. Şeref Xan jî di vî şerî de tê kuştin (1534).



*Tabloyeke ku Meclîsa Mîrê Botan dide xuyakirin*[14]

Kesên xuyanî yên Mîrekiya Bedlîsê, di cihê Şeref Xan de lawê wî Şemsedîn Xan tînin ser text. Dewleta Osmanî di sala 1535'an de hukimdariya Şemsedîn Xan a Bedlîsê pesend dike û êdî mîrekî ji aliyê Osmanî ye. Şemsedîn Xan ku tevî leşkerê Osmanî bi ser Tewrêzê de diçe, paşê di dema meşa dûdirêj a Sultan Sileyman de ku heta Bexdayê dom dike, ligel Sultan e. Piştî Bexda tê stendin, Şemsedîn Xan vedigere Bedlîsê.

Sultan jî zivistanê li Bexdayê derbas dike, gava vedigere li rasta Xelatê kon û çadirên xwe vedide. Dîsan ji ber fîtneyên Ulame tevlihevî çêdibin û Wilayeta Bedlîsê ji Şemsedîn Xan tê stendin; lê belê li şûna wê wilayetên Meletî û Mereşê didinê. Şemsedîn Xan haziriya ku Bedlîsê vala bike û teslîmî zilamên Padîşah bike û here Meletiyê werbigre dike; lê li ser gotina hin dostên wî, ku dibêjin ev windakirina warê bav û kalan e û divê vê yekê qebûl neke, dev ji çûna Meletiyê berdide. Şemsedîn Xan di wê navê de gava pê dihise ku wê hêzên Şah Tehmasp bigirin ser aliyên Xelat û Mûşê û wan deran talan û wêran bikin, ji bo ku welatê xwe ji zerar û ziyana ku dikare çêbibe biparêze, berê xwe dide ser Tewrêzê. Ligel xizmetkar, maiyet û zilamên xwe ve, diçe îtaeta xwe pêşkêşî Şah Tehmasp dike.

[14] Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname-Tarîxa Kurdistanê ya Kevn

Ulame jî ji tirsa li Bedlîsê namîne û Bedlîs demekê bêrêveber dimîne. Di vê dewra hanê de ku Bedlîs bêxwedî dimîne, Osmanî nehiyeyên Amûrk, Xwêt, Poxnad û Krencê ji Eyaleta Bedlîsê vediqetînin û wê dikin Sencaq, her wiha lawê Emîr Bîlbas Îbrahîm Beg jî dikin serokê wê. Eşîret jî li ber vê yekê radibe...

Li aliyê din Şah Tehmasp qedrekî giran daye Şemsedîn Xan û di demên cuda cuda de rêvebirina hin herêman dayê. Di Şerefnameyê de berdewamiya behsa vê yekê wiha ye:

"... Şemsedîn Xan havîn, zivistan bi piranî li cem Şah dima. 150 kesên xuyanî yên Rojkan xistibûn nav muhafiz û efserên yawer ên muteber ên Şah."[15]

Paşê di navbera Begêbegan ê Diyarbekirê û Îbrahîm Paşa de nexweşî çêdibe, dora Îbrahîm Paşa dipêçin, talî ew jî diçe cem Şah Tahmasp. Piştî ku tiştê hêvî dike li wir bi dest naxe, du sal bi şûn de diçe Saraya Osmanî û efûya xwe dixwaze. Sultan jî, senceqek ji senceqên Rûmeliyê didê.



*Bajarê Bedlîsê–Sala 1681*[16]

Şerefxanê lawê Şemsedîn Xan li seraya Şah Tahmasp perwerdehiyê dibîne, ji aliyê Şah Tahmasp ve di hin wezîfeyên astbilind de tê wezîfedarkirin. Herî dawiyê gava ku hukimdarê Nehçîwanê ye, bi têkiliyên mîrên Wan û Hekariyê ji aliyê Mûradê 3'yem ve Mîrektiya Eyaleta Bedlîsê didinê û li ser vê xeberê, di sala 1579'an de vedigere warê bav û kalên xwe. Şerefxan nivîskarê Şerefnameyê ya bi nav û deng e.

[15] Şerefxan, Şerefname-Kürt Tarihi, r. 509

[16] Gravürlerle Kürtler(Bi Gravuran Kurd), Mehmet Bayrak, www.kurdinfo

Piştî salên bi dû de Mîrekiya Bedlîsê, li cografyaya Kurdan ji aliyê çand û zanistê ve gelekî li pêş e. Gelek medrese di bin sîwana mîrîtiyê de bi pêş dikevin. Lê Osmaniyan di 1655'an de êrîşek mezin bir ser Mîrîtiya Bedlîsê û zerarê mezin lê bû.

Tiştê ku li Bedlîsê qewimîne, tenê ji wê dewrê nimûneyek e. Di gelek deran de, di dem û dewrên din de jî rewşên mîna van qewimîne. Yanî gava li têkiliyan bê meyzandin wê bê dîtin ku, di vê demê de sînorên şidyayî û qutbirînê tune ne û gava pirsgirêk giran dibin, tevlihevî çêdibin mîrekên Kurd di hevalbendîtiyê de di navbera Osmanî û Sefawiyan de diçin û tên. Gava mirov li rêveberiyên cîranan binêre jî dê mirov bibîne ku ev çûn û hatin, ne tenê di nav Kurdan de heye. Ev rewşeke ku bi piranî bi jiyana derdora sînor ve girêdayî ye.

Di navbera Osmanî û Sefawiyan de têkoşîna ji hev stendina herêmên sînoran berdewam dike. Sînor zêde ne zelal û xuya ne. Wek ku li jor me îfade kir hin herêm geh li aliyê Osmanî û geh li aliyê Sefawiyan in. Piştî ku Murad ê 4'em di sala 1638'an de Bexdayê distîne ku ew di 1623'an de ketibû destê Sefawiyan, di navbera Osmanî û Sefawiyan de Peymana Qesra Şîrîn tê îmzekirin. Bi vê yekê re, duparçebûna Kurdistanê derbasî qeydan dibe û bi vî awayî nuqteyên sînor bêhtir diyar dibin. Peymana Qesra Şîrîn, a ku sînorê herî kevn ê Kurdan bi awayekî diyar ji hev diqetîne fermî dike, di Gulana 1639'an de hatiye qebûlkirin. Çendî di vî sînorî de carna hin guherînên biçûk bûbin jî, îro sînorê di navbera Îran û Tirkiyeyê de û sînorê di navbera Iraq û Îran de ye hîn ew sînor e.

Dirêjahiya sînorê di navbera Osmanî û Sefawiyan de 2185 km ye û her tim pirsgirêkên wî derketine. Wek ku me li jor da xuyakirin, piştî stendina Bexdê li Zohabê ku ew dikeve qûntarên çiyayên nêzî Qesra Şîrîn, dest bi gotebêjên aştiyê hatiye kirin. Lewma jî di hin çavkaniyan de ev peyman wek Peymana Zohabê cih digire.

Li ser navê Şah, wekîlê wî Sarûxan û serekelçiyê wî Şemsedîn Muhammed Qulî Xan tevî gotebêjan bûn. Piştî gotebêjên ku di 14'ê Gulana 1639'an de dest pê kirin û sê rojan dewam kirin, peyman di 17'ê Gulanê de hat îmzekirin. Şemsedîn Muhammed Qulî Xan, ji bo pesendkirin û erêkirina padîşah, peyman biriye Stenbolê. Ji lew re peyman di dawiya meha Sermaweza 1639'an de bi awayekî eseh hat tesdîqkirin.

Kopyaya bi Osmanî ya Peymana Qesra Şîrîn, li Kitêbxaneya Împaratoriyê ya Wiyanayê tê mihafizekirin. Peyman bi devê Wezirê Mezin Mustafa yê rayedarê Osmanî hatiye nivîsin û ji aliyê wî ve hatiye îmzekirin. Beşa ku piştî

qismên bi pesindana padîşah û şah dest pê dikin, wiha ye:

"... Ji ber vê, gava Sarûxan gihîşt baregeha împaratoriyê ya ku li Zohabê hatibû danîn, bi mêvanperweriyeke mezin hat pêşwazikirin û çardehê meha muheremê ya piştî hîcretkirina Pêxember (hemû dua ligel wî bin) sala 1049'an li baregeha împaratoriyê dîwanek civiya, ku tê de wezîrên navdar, mîrê mîran, fermandar, axayên yenîçeriyan, axayên şeş tofan (bêlûkan) û efser amade bûn; temsîlkarê hikûmetê Sarûxan ê ku bi hemû pêdiviyên rayedariyê hatibû arastin û Muhemed Qulî Beg hatin teqdîmkirin, bi mebesta ku tiştên hatine nîqaşkirin li ser zemîneke biqewet bên rûniştandin, ligel kesên li dîwanê hemû meseleyên ku gihabûn wê merheleyê hatin nîqaşkirin. Nîqaşên ku di navbera her du aliyan de hatibûn kirin derbasî qeydan kirin û metneke wiha derket holê:

Der barê sînorê ber bi Bexda û Ezerbeycanê de Jassan û Badray ji me re û cihên ji bajarokê Mendelî heta Dartengê (cihê ku wek Sar-î Mîl hatiye binavkirin wek sînorê Dartengê hatiye diyarkirin) û deştên ku di navbera van cihan de jî dimînin ji me re, çiyayên li derdorê jî wê ji aliyê din re bimîne; ji ber ku Sar-î Mîl wek sînorê Dartangê hatiye xuyakirin wê Darna ji me re bimîne; ji qebîleyên êşîra Caf'an Ziyaudî û Harûn wê bi me ve girêdayî bin; Bêra û Zardûlî jî wê ji aliyê din re bin; wê Kela Zanjîr bê xerakirin û bi tevî gundên ku li rojavayê wê dikevin ji me re, gundên ku dikevin hêla wê ya rojhilat jî ji aliyê din re bimînin; li derdora Şarezûrê, ew çiyayê ku dikeve wî aliyê Kela Zalmê, berê wê yê ku li vê kelê dinêre ji hêla padîşahê me ve hatiye dagirkirin; tevî Kela Hewremanê gundên ku parçeyên wê yan jî li ser wê ne, wê ji aliyê din re bimînin; Buhêrka Çugxanê wek sînorê Şarezûrê hatiye diyarkirin, wek encam Qizilca û deverên li ser wê dê ji aliyê din re bin..."[17]

(...)

"Wek encam, min xwe sipart hemû hez û îradeya xwe ya mutlaq û min ev peymana ku hişkere ye û şewqê dide dora xwe nivîsî û ez wê ji Şahê Mezin û ji Padîşahê me yê Gewre re dişînim. Heger Şah fermana Kitêba Pîroz ku dibêje 'Piştî we peymanek çêkir rîayetî wê bikin û li gorî wê tevbigerin' ji xwe re wek prensîb qebûl bike, bi vê Peymanê ve girêdayî bimîne, wê Hezretî Împarator Padîşahê me yê hejmetkar jî li gorî fermana Kitêba Pîroz a ku dibêje 'Gava we peyman çêkir, mukelefiyetên wê bînin cih, ev ji bo we mecbûriyet e', tevbigere. Ev aştiya pîroz bi destûra Xwedê heta roja qiyametê wê dewam bike, wê bê parastin û her kî piştî bihîstina vê yekê rabe ji bo guhartinê lê bixebite, ya rast, paşê gunehê vê yekê wê di stûyê wan de be."[18]

[17] C. J. Edmonds, Kürtler, Türkler ve Araplar, r. 175
[18] C. J. Edmonds, bnb(berhema nav buhurî), r. 177

Lê belê, ev tiştên ku li ser kaxiz hatine nivîsandin dê li ser kaxiz bimînin, heta wê bi dehan car peyman bên nûkirin, lê dîsan jî Kurd wê vî sînorî nekin paçê xwe de. Di van dewrên hanê de, ku feodalî xurt û hêzdar bû, mensûbên gelek eşîrên li ser sînor, li her du aliyan hebûn. Ev sînorên ku ji derve ve dihatin ferzkirin, ne li gorî civata ku li vir dijiya bûn, paşê jî wê bê dîtin, tim bi alozî û bi pirsgirêk dimînin.

Ji ber ku sînorek gelek dirêj ji seriyekî heta seriyê din di Kurdistanê re derbas dibe pirsgirêkên ku di sînoran de hene bandora wan li Kurdistanê tevdî heye. Em hinekî ji aliyê Osmaniyan ve li rewşa Kurdistanê ya wê demê binêrin. Li gor Ewliya Çelebî yê ku di sedsala 17'an de li Kurdistanê geriyaye:

"Ji aliyê bakur ve Kurdistan ji Erziromê dest pê dike; ji Wan, Hekarî, Cizîr, Erdelan heta Bexda û Besrayê heftê (70) qonax in. Ev erd, erdê Kurdistanê ye, welatê Kurdan e. Di gund û bajaran de şeş hezar (6000) eşîrên Kurd rûdinin. Lê Kurdistan bi qasî dirêjahiya xwe ne pehn e. Ji rojhilat ve; ji tixûbên Ecemistanê heta erdê Şam û Helebê bîst, bîst û pênc (20-25) qonax in. Erdê wê yê teng, panzdeh (15) qonax in. Ji vî welatî, ji welatê Kurdistanê pênc sed hezar (500.000) esker derdikevin, hemû Kurdên cwamêr û mêrxas in û li ser mezhebê şafiî ne. Di Kurdistanê de heft sed û şêst kelên mezin hene. Kel hemû ava û xweyîkirî ne. Her keleke wê, bajarekî mezin e."

Ewliya Çelebî bajarên Kurdistanê yên mezin bi awayê jêrîn dihejmêre:

"Meletya, Egil, Diyarbekir, Cizîr, Mêrdîn, Xatûnî, Şingar, Meya Farqîn, Hezro, Çalindir, Bidlîs, Wan, Xelat, Adilcewaz, Bargirî, Xweşab, Elbak, Sîpan, Frecek, Pinanîş, Qotor, Elbak, Ûmrî, Dumdumî, Şînow, Dimilî, Pîlewer, Dînor, Cemcenab, Sîne, Agirî, Demawend, Derteng, Derne, Bîrecûk, Ferat, Rum-kele, Foha, Qorik, Reqa, Çermik, Hesen-Mensûr, Bihisnî, Meraş, Egin, Erebgir, Xarpêt, Çepeqçûr, Genc, Ataq, Mûş, Hezargol"[19]

Sînor, cihê ku du hêz lê ji hev vediqetin û digihîjin hev û din in. Ew cih e ku ji mudaxeleya hêzên derve re dibe muxetab. Lewma jî gava ku mirov bibêje sînor, divê di cih de wek cihê şer bê bîra mirov; cihê şer jî tê wateya qelsketinê, xizanbûnê, bêhizûrbûn û bixofbûnê. Piraniya şerên ku di navbera Osmanî û Sefawiyan de diqewimîn jî, tim li ser vî sînorî dibûn. Çendî Kurd sînorên ku di peymanan de derbas dibin, di jiyana xwe de bi tiştekî nehesibandibin û têkiliyên xwe yên rojane berdewam kiribin jî, di demên şer de neçar mane ku bibin hevalbendên aliyekî şer. Hertim di artêşa her du aliyan de jî Kurdan cih girtine, bi gotineke din di van şeran de, ku ne aîdî wan bûne,

[19] Kovara Hawar, Cilt 1, r. 324

Kurd bi hev û din hatine qirkirin. Herî baş jî Ehmedê Xanî ev yeka hanê aniye ziman.

Neteweperwerî, ku hîn li Ewrûpayê xuya nake, di edebiyata Kurdî, di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de di asteke bilînd de ye. Ehmedê Xanî bi şahesera xwe, destaneke neteweyî afirandiye. Her wiha li dinyayê ev çend deh salên dawî li ser 'sînorên dewletan û rewşê ku bi xwe re tînin' xebat hatine kirin; lê belê Ehmedê Xanî bi nêzîktêdana xwe ya 300 sal berê, di vê derbarê de tespîtên gelekî girîng kirine. Ji ber ku li eyaleteke li ser sînor dima, ew jî di nav pirsgirêkên ku miletê wî ji ber sînoran dikişand de bû û ji ber parvekirina welatê xwe jî gelekî aciz bû. Ehmedê Xanî gelekî yekîtî û bihevrebûna Kurdan dixwest û ji bo wî Peymana Qesra Şîrîn kuleke mezin bû. Nerazîbûna xwe bi awayekî pir hişkere wiha aniye ziman:

Tasek ji vê ava zelal
Nadim bi hewza Kewserê
Lihevhatina Qesra Şîrîn
Jê nabînim tu meferê
Piştî roja me bû tarî
Mirin xweş e ji amberê[20]

Bi van rêzikên li jêrê jî Ehmedê Xanî, bê sînor çi ji gelê wî re aniye û Kurdistan jî ji ber ku di navbera du hêzan de maye, çawan bûye war û qada şerên xwîndar û dijwar bi awayekî zelal û hişkere îfade kiriye:

Ez mame di hîkmeta Xwedê da
Kurmancî di dewleta dinê da

Aya bi çi wechî mane mehrûm
Bîlcumle ji bo çi bûne mehkûm

Wan girtî bi şîrî şehrê şuhret
Tesxîrî kirin bîladê hîmmet

Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
Her mêrekî wan bi rezmê Ristem

[20] H. Mem, Mamosteyê Sêyemîn Xanî, r. 115

Bif'kir ji Ereb heta ve gurcan
Kurmancî ye bûye şibhê bircan

Ev rûm û ecem bi wan hesar in
Kurmancî hemî li çar kenar in

Her du terefan qebîlê kurmanc
Bi tîrê qeza kirîne amanc

Goya ku li serhedan kilîd in
Her taîfe seddek in, sedîd in

Ev qulzumê rom û behrê tacîk
Hindî ku bikin xurûc û tehrîk

Kurmancî dibin bi xwîn mulettex
Wan jêk vedikin mîsalê berzex[21]

Piştî Peymana Qesra Şîrîn jî, şerên di navbera Osmanî û Sefawiyan de dom kiriye, demna jê ev şer gelekî şidiyaye, sînor hatine binpêkirin û di demên kurt de sînorên hin deran hatine guhertin. Lê dîsan bi peymanên ku di salên 1727 (Hemedan), 1736 (Stenbol), 1746 (Mughan) û 1823'an (Erzirom) de hatine çêkirin jî, hema bibêje sînorên di Peymana Qesra Şîrîn de hatine teyîdkirin.

Di wê dewra ku Kurdistan di neqeba du împaratoriyan de hat dabeşkirin bi gelek awayan tesîrên cur bi cur ên sînor li ser xelkê çêbûne. Malbatên rêveber ê gelek mîrekiyan, bi awayê 'alîgirê Osmanî' û 'alîgirên Îranê' hatine parevekirin. Di berberiya serekên eşîran de, gava hinan ji wan xwestine bikevin şûna rêveberên ku hene serî li alîkariya dewletên hember dane. Ev tenê du mînakên tevgerên ku bi bandora sînoran derdikevin holê ne.

Li hêla din, ji ber ku Kurd di sînorên dewletên Osmanî û Sefawiyan de bûn, di rewşa aloz û biarîşe de îmkana wan hebû ku serî li dewleteke din bidin; ji lew re demna jê hikûmetên Osmanî û Sefawî ji bo ku Kurdan ji dest xwe bernedin, ketine nav hemberiya ku Kurdan dilxweş bikin. Em dikarin ji vegotinên Celîlê Celîl, ji bo vê yekê çend mînakan bidin. "(Nîveka sedsala 19'an) Desthilatdarên Îranê yên li herêmên havîngehên cafan, bi hêzdarbûn

---

[21] H. Mem, bnb, r. 115-116

û xurtbûna Kurdên Osmanî yên li ser erdê xwe eleqedar bûne û ji ber vê yekê jî destûr dane wan ku bêyî mukelefetiyê erd û axê xwe bi kar bînin. Desthilatdariya Îranê bi nestendina heqê çêra zozan ku wek adetî her tim ji wan dihat stendin, hewldana ji bo dilxweşkirina cafên di nav sînorên Osmaniyan de, bêhtir daye xuyakirin. Ji van cure îmtiyazan eşîrên Gawer û Bîlbas (ku xwedî 4000 konî ye) jî îstifade kirine. Eşîrên ku armanca desthilatên Îranê fehm kirine jî, ji van avantajan sûd wergirtine. Hurşît Efendî wiha gotiye: 'Ligel ku hewcedariya van eşîran bi zozan û warên li erda persan hebûye jî, dîsan germiyanên wan ji bo wan hîn bêhtir girîng bûne; çimkî ji bo xwedîkirina heywanên xwe cihê koçkirinê yên ji bo havîngehan li aliyê me (li aliyê Osmaniyan) jî didîtin. Ji bo germiyanan, peydekirina ji bo cihê koçkirinê jî li aliyê persan ne mimkun e."[22]

Celîlê Celîl dibêje ku, ev avantaj nedane hemû eşîrên Kurdan: "Polîtîkaya Osmanî û Îranê ya musemehakariyê, tenê ji bo eşîrên ku xwedî giraniyeke polîtîk û hêzeke eskerî ya hêja bûne, dihat pêkanîn ..."

".... Eşîrên Kurd ên mîna Şivezûrî, Pîrhesenî, Rewanduhî (Rawedûk), Surçî, Herekî yên biçûk di rewşeke zor de bûn. Ev hoz di bin serweriya Osmaniyan de dijiyan, lê belê wan ji bo zozan û mêrgan havînê koçî Îranê dikir. Di vê rewşê de bac didan du dewletan."[23]

Heta destpêka sedsala 20'an ev yek wisan didome. Eşîrên ku di nav sînorên Osmanî de dijiyan, lê belê havînan ji bo çêreyê diçûn war û zozanên li Îranê, bac didan dewleta Osmanî jî û didan desthilatdariya Îranê jî. Gava ku Kurdan nedixwest bacê bidin hikûmetên Osmanî yan jî Îranê û di demên ku nedixwestin eskeriyê bikin de serî hildidan; lê heger serhiladana wan ne serketî bûya îcar lê dixistin di sînorên ku ji bo wan tune bûn de, derbasî aliyê din dibûn û xwe li eşîrên Kurd ên li wê derê digirtin. Piştî wextekî dema ku tiştek li ser wan nemaye dîsa vedigeriyan warê xwe.

Li hêla din, di her demê de şerê desthilatdariyê yê di nav mîrekiyan de û arîşe û kêşeyên di navbera mîrekiyan de jî berdewam kirine; her wiha ew û waliyên ku ji aliyê Dewleta Osmanî ve hatibûn tayînkirin, tim bi hev ketine û li hev nekirine. Digel her tiştî mîrekiyên Kurdan xwe li ser lingan girtine û gava keysa wan lê hatiye di demeke kin de xwe dane hev û dest bi xurtbûn û hêzdarbûnê kirine. Gelek derban mîrekî û mîrnişînên Kurdan, bi qewet û xurtbûna xwe xof xistine zikê hikûmeta Osmanî jî ya Îranê jî. Her du dewletan jî, ji bo ji holê hilanîna van mîrekiyan her tim dek û dolab gerandine.

C. A. Bedirxan di gotara xwe ya bi navê 'Kürt Sorunu Üzerine (Li Ser

[22] Prof. Dr. Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğunda Kürtler, r. 44
[23] Prof. Dr. Celîlê Celîl, bnb, r. 44

Meseleya Kurdan)' de, der barê vê mijarê de, ji cepheya Îranê nimûneyek daye:

"Mîrgeha dawî a li Kurdistana Îranê Mîrgeha Erdelanê*, ku gelek caran gef li textê şahên Tehranê xwariye, incax bi dek û dolabên ji aliyê împaratorên Îranê ve karibûye were hilweşandin. Şahên Îranê ji bo meqseda xwe bînin cî, bi mîrên Kurd ên Erdelanê re îtifaqên zewacê kirine. Prensesên serayên Tehranê ku dayikên mîrên Erdelanê ne, li saraya Senendecê (paytexta Mîrgeha Erdelanê) telîmatên bavên xwe yên împarator bi sedeqet û bi awayekî serkeftî bi cih anîne..."

Serûbinîhevkirina Kurdistanê û mîrekiyên Kurdan bi hêzbûna rojavayiyan ya li hemberî Osmaniyan dest pê dike. Bingeha sînorên ku îro Kurdistan parçe parçe kiriye û halê ku îro Kurdistan têde ye di wê demê de dest pê dike. Ewrûpiyan çav berdane axa Osmaniyan û hêdî hedî rehê xwe pêde berdane.

Di sedsala 18'an de dest bi pêjna hatinên ji rojava dibe. Bi demê re hilberînên li Ewrûpayê nema di eyarê xwe de hiltên û Ewrûpayî ji bo malê xwe bifiroşin têkiliyên xwe roj bi roj fireh dikin. Di nîveka sedsala 19'an de, Împaratoriya Osmanî, di serî de ji bo Îngiltere û ji bo hin welatên Ewrûpayê, yek ji mezintirîn cihê bazarê ye. Di nîvê pêşî ê sedsala 19'an de, nemaze di salên 30 û 40'î de malên endustriyê yên Ingilîz ketine rojhilatê Dewleta Osmanî bi bendera wê ya li Behra Reş û bi navbeynkariya benderên deryayê yên Rojhilata Navîn jî gihîştine heta Helebê û gelek herêman.

Trabzon, cihê cenga tûj a berjewendiyên Îngiltere û Rûsyayê ye. Ji bo Îngiltereyê girîngiyeke mezin a vî bajarî heye, çimkî bi navbeynkariya vê benderê têkiliya xwe ya bazirganî bi Hindistanê re datîne.

Di bazara Rojhilata Nêzik de, ji aliyê hemberiyê ve Îngiltere ji Rûsyayê serdestir e. Di demeke kin de Anatoliyayê bi malên pîşesaziyê (endustriyê) yên Îngiltereyê tije dibe. Gelek bajarên Anatoliyayê û Kurdistanê ku li ser riyên karwanan in, dibin navendên zindî yên riyên bazarvaniyê.

Di vê navbera ku Ewrûpî têkiliyên xwe berfireh dikin wê têkiliyên xelkê herêmê li nav hev bikevin, Osmanî wê bêhtir têkevin bin tesîra Ewrûpiyan û wê têkevin riyên xeter. Gelek warên hilberîna pîşeyî yên herêmî ku nikarin bi berhemên pîşesaziyê yên Ewrûpayê re reqabetê bikin, bi awayekî berbiçav ber bi windabûnê ve diçin. Dewleta Osmanî ku nikare zengîniyên sererd û binerd bi kar bîne û her wiha Kurdistan, neçar dibin ku madeyên xwe yên xam bi destê biyaniyan ve berdin. Li aliyê din rêveberiya Dewleta Osmanî jî hêdî

* Mîrgeha Erdelanê heta sala 1865'an xweseriya xwe parastibû.

hêdî dikeve bin destên Ewrûpiyan. Împaratoriya Osmanî ku hêvî dike bi Fermana Tenzîmatê ya di sala 1839'an de xwe bighîne serdemê, bi gavên Tenzîmatê dikeve nav aloziyên nuh. Ew hewlên reforman dê berdewam bikin, lê belê ew qalibên îtxal wê tu encamên ku ji wan dihatin hêvîkirin bi xwe re neynin. Ji aliyekî ve jî wê Dewleta Osmanî êrîşan bibe ser Kurdistanê, wê bi vî awayî stûnê xwe yê bingehîn bibire û dawiya xwe bîne.

Îngiltere bi alîkariya Ermeniyan, ku ew li ser guzergeha rojhilat in gihîştiye bazirganiya Îran û rojhilatê wê. Di heman demê de bi Rûsyayê re jî di nav hemberiyê de ye û li dijî îhtimala ku Ermenî û Nastûrî li rojhelat nêzî Rûsan bibin, hewcedarî bi teşebûsan dibîne da ku wan ber bi xwe ve bîne û bi dest bixe. Rûsya jî û welatên Ewrûpayê jî di wê serdemê de bi xiristiyanan re têkiliyan xurt dikin, soz û qerarin mezin didin wan û bi van hewldanan têkiliyên xelkên herêmê xera dikin.

Misyonerên ku di sedsala 19'an de ji Ewrûpa û Amerîkayê tên, çalakî û xebatên xwe yên ji bo piştgiriya hindikahiyên xiristiyan bikin her roj zêdetir dikin û wan bêhtir sor dikin. Ev misyoner, ji bo ku hindikahiyên xiristiyan ên li herêmê hin mafan bi dest bixin bi navbeynkariya konsolosxane û sefaretên xwe yên li Stenbolê zorê didin rêveberiya Osmanî. Ev teşebûsên wezîfedarên Ewrûpî yên ku di bin navê mafên hindikahiyan de ji bo berjewendiyên xwe tevdigerin, dibin sedem ku di nav misliman û xiristiyanan de hin nexweşî û nerazîbûn çêbibin. Her roja ku diçe dijminahî û neyartî di navbera misliman û nemislimanan de, ev ên ku bi sed salan bi hev re jiyabûn, mezintir dibe.

Ew têkiliyên germ ku Ewrûpiyan bi Xiristiyanan re datanîn û ferqî dixistin nav wan û Kurdan, riyên ku didan ber xiristiyanan û soz û qewlên ku ji wan re didan, zora Ewrûpiyan a li ser Osmaniyan a ji bo ji holê rakirina mîrekî û mîrgehên Kurdan, kir ku der barê rastiyên Kurdan de zemîn û baweriyên şaş pêk bên. Ji aliyekî ve jî ji ber vê yekê, di demên dûre de çendî di asta bilind de hin rewş guherîbin jî, di nav gelê Kurd de nêrazîbûna li hemberî Ewrûpayê dom kiriye. Yanî her çi hatibe gotin jî, Kurdan ji Ewrûpiyan yeqîn nekirine. Wek ku wê di rûpelê pêş de li ser bê sekinandin, dûre di encamê de qismê xiristiyanan jî wê li ser piştê bên hiştin, Kurd jî û xiristiyan jî bi eynî şeklî wê mexdûr bibin û armancên Ewrûpiyan jî wê hîn baştir diyar û hişkere bibin.

Osmaniyan, herekatên bi armanca jiholêrakirina mîrekî û mîrgehên Kurdan, bi zora erkedarên Ewrûpî yên li Stenbolê pêk dianîn û wek nimûneya efserê alman Moltke tê dîtin ku efserên biyanî jî tevî van seferan dibûn. Ingilîz û Frensî, ji ber bidestxistinên qezencên aborî û siyasî yên ji

Osmaniyan, ji hêzên ku wê karibin li herêmê ji wan re pirsgirêkan derxin, aciz dibûn.

Di destpêka sedsala 19'an de li Kurdistanê gelek mîrekiyên xurt ên mezin hebûn: Li başûr di sînorên senceqên Silêmaniye û Zohabê de Mîrgeha Baban, ji vir ber bi bakur ve jî Mîrgeha Soran warekî mezin dida ber xwe; ji Soran hîn bêhtir li rojava Mîrektiya Behdînan an jî Îmareta Amediyê û li bakurê Soran hîn bêhtir bi wê de welatê çiyayîn û şaxawî yê Mîrgeha Hekarî yan jî Şembo cih digirt; li rojavayê Hekarî û Behdînanê hîn bêhtir bi wê de jî Mîrgeha Botan hebû, navenda wê Cizîr bû, ji berê ve jî bi navê Botan dihat zanîn.[24]

Dema dest bi feşkilandina mîrekiyên Kurdan tê kirin, şerê dijwar diqewimin. Her çiqas berê jî rastî êrîşan hatibûn, mîrekiyan xwe di demeke kin de bi ser hev de dianîn û hebûna xwe berdewam dikirin. Di meseleya, tevî gelek zordarî û şeran di wextekî kin de xwedayîna hev a mîrekiyan de bi xêr û bêrbûyîna cografyayê faktoreke pir mezin e. Em di gotin û vegotinên seyahan de pir lê rast tên ku di nav erdê van mîrgehan de gelek xan hebûn û ji van deran jî karwanan gelek melzeme, xurek û her wiha keriyên pez û garanên dewaran birine Stenbol, Tehran û Bexdayê.

Di sedsala 19'an de di Kurdistanê de herb nesekiniye û welat qels ketiye. Osmanî carê mîrekiyekê didin ber xwe, her çiqas mîrekî berxwedaneke mezin li dar bixin jî ji ber ku hêzên wan ne di eyarekê de ne di encamê de mîrekiyan ji hev belav dikin û dema esker tên û vedigerin bi rê de jî gelek waran tarûmar dikin.

Di serê sedsalê de wekî gelek mîrên din Mîr Mihemed, ê ku mîrê Mîrgeha Soran bû, her ku çûye hem xwe hem jî rêveberiya xwe xurt kiriye û di riya serxwebûnê de jî gavên girîng avêtine. Di vê demê de Mîrgeha Soran bûye yek ji navendên tevgera Kurdistanê. Mîrê Soran Mîr Mihemed, piştî ku Osmanî ji herêma xwe derxistine serxwebûna xwe îlan kiriye, artêşeke mezin a nîzamî ava kiriye, warê rêveberiya xwe mezintir kiriye, di xutbeyan de navê xwe daye xwendin û li ser navê xwe jî pere çap kiriye.

Ji mîrgehan a ku cara pêşî êrîşên mezin dirin ser, Mîrgeha Soran e. Reşît Paşa, ku di bihara sala 1834'an de bi artêşa xwe ya 40 hezar kesî ji Sêwaz û Meletiyê bi du milan bi rê ketibû, hedefa wî Mîr Mihemed bû; lê li ser riya xwe Kurdistan şewitand, wêran kir û mirovên wê jî dan ber şûran.

Reşît Paşayê ku digel hemû zordariya xwe negihîştibû encama ku dixwest, du salan li hêviya teqwiyeyê sekinî. Di sala 1836'an de, bi teqwiyeya ku ji Iraq

[24] Prof. Dr. Celîlê Celîl, bnb, r. 51

û Sûriyeyê stend, careke din dest bi êrîşê kir û tevî Babanan berdewamî da kuştina gelê sivîl. Cizîr bi erdê ve kir yek. Di sala 1836'an de gava artêşa Osmanî, dor li navenda wilayeta Botan Cizîrê girtibû, Mîrê Miksê Xan Mehmûd xwestibû bi artêşeke nêzî 20 hezar kesî bê alîkariyê, lê belê ji ber ku pirên li ser Çemê Botan hatibûn xerakirin û hilweşandin, sefer nîvco mabû.

Berxwedaneke pir mezin hatibû lidarxistin lê di dawiyê de ji ber propagandaya bi gotina "Mirov şûr li artêşa xelîfe nakişîne" gel ji hev ketibû û ev yek jî bûbû sedema têkçûna Mîr Mihemed. Piştî têkçûna wî Mîr dibin Stenbolê, çendakî din destûr didinê da vegere welatê xwe, lê di rê de didin kuştin.

Êrîşên artêşa Osmanî didomin, dixwazin kele û cihên girîng ên berxwedanê bi dest bixin. Di sala 1837'an de Reşît Paşa ji nexweşiya kolerayê dimire û Hafiz Paşa dikeve şûna wî. Ew jî dest bi êrîşkirina ser Mîrekiya Botan a ku li ber xwe dide ku serxwebûna xwe muhafaza bike dike. Êzîdiyên li Şengalê bi awayekî bêmerhemet dide ber şûran. Di dema dorpêçkirina Mîrekiya Botan a sala 1838'an de, ya ji aliyê artêşa Osmanî ve, yekîneyeke mezin a ku ji Kurd, Ermenî û Nastûriyan pêk tê, diçe alîkariyê lê belê di wextê de nagihîjê.

Gelek derban êrîş hatibe ser Botan jî, li ser daxwaza Osmaniyan Mîrê Botan Bedirxan Beg bi qasî 30 hezar (li gorî hin çavkaniyan ev hejmar tê guhertin) leşkerî ve di sala 1839'an de diçe alîkariya Osmaniyên ku li Nizîbê bi artêşa Îbrahîm Paşayê Misirê re şer dikin. Di vê cengê de artêşa Osmanî bi awayekî gelekî xerab têk diçe û bi hezaran leşkerên Kurd jî dibin qurban...

Piştî vê têkçûnê ewletiya bi Dewleta Osmanî têra xwe derbê dixwe. Her wiha sawa dewletê namîne. Der heqê vê mijarê de Moltke wiha dibêje: "Piştî şerê Nizîbê hikmê padîşah li ser miletê Kurd yekcar nemabû. Jixwe miletê Kurd heta îro bi tevahî nehatiye mexlûbkirin û Tirkan hukum li wan nekiriye.

Êdî tu hikmê hikûmetê li ser xelkê çiyê nemabû. Hikûmetê ew di cihên xwe de rihet dihiştin.

Lê niha ku topên Ingilîzî û Awistûryayî ji hikûmetê re di bilindcihên Asyayê re rê vekirine, dewlet mîna berê ji Kurdan dîsan mîrî, qemçûr, pere û esker dixwaze. Li hember van xwestinan jî serhildan û şer xwe nîşan didin. Heke hêj xwe nîşan nedabin jî bêşik di van rojan de dê dest pê bikin."[25]

Serhildanên Kurdan ên li dijî Osmaniyan her tim hebûn. Lê di sedsala 19'an de serhildanên mezin û xurt ên ku warên fireh dane ber xwe pêk hatin.

[25] Kovara Hawar Cild 1, r. 467

Gelek sedemên vê yekê hene. Di serî de di vê demê de di çarçoveya Tenzîmatê de tê xwestin ku hemû mîrgeh ji navê bên rakirin û bi merkezê ve bên girêdan, di vê çarçoveyê de zor û tehdeyîk mezin li herêmê tên kirin; mîrekî jî di miqabilî vê de serî hildidin. Ji aliyê din ve wek ku li jor me îfade kir Dewleta Osmanî roj bi roj qels diket, di şeran de têk diçû û erd winda dikir; bi vî awayî baweriya bi dewletê qels diket. Ji ber van sedeman wek serhildana Mîrekiya Botan, her çû serhildanên Kurdan mezintir bûn. Di bin tesîra Ewrûpiyan de nûjeniyên ku ji jor de dihatin ferzkirin, di civatê de dibûn sedemên nerazîbûn û aloziyan. Mîr û îmaretên Kurdan ku li dijî nûjeniyên Tenzîmatê, nemaze li dijî merkezîbûnê derketine, ji bo serxwebûna xwe şer kirine, lê belê artêşa Osmanî ya di bin rêveberiya Reşît û Hafiz Paşa de ku fermandarên Ewrûpî jî tê de cih girtine, bi dehan car bi leşkerên ku hejmara wan digihîşt deh hezaran êrîş birine ser Kurdistanê, her der wêran kirine û gel jî qetil kirine.

Êrîşên Împaratoriya Osmanî yên bi mebesta şikandina berxwedana Kurdan, her carê rastî serhildaneke hîn mezintir hatiye û ev serhildan jî qet ranewestiyane. Rêxistinên feodal bi raboriya xwe ya dûr û dirêj û bihevgirêdanên xwe yên kulturî organîzasyonên xurt û hêzdar in. Serhildanên wan jî xurt in. Ku em mînakekê bidin, Bedirxaniyên mensûbê Mîrgeha Botan gelek caran serî hildane û serhildanên wan bûne destan û li ser zar û zimanan geryane.

Bedirxanê mîrê mîran ê dawî ê Mîrgeha Botan ku navenda wê Cizîra Botan bû, di 1835'an de wek “Hakimê Kurdistanê” di pozîsyona xurt û çalak de bû. Tam dozdeh salan li ser navê xwe xutbe da xwendin. Bedirxan Beg ku wek kesekî otorîter, mêrxas, pêşbîn, biryardar û fermandarekî eskerî yê baş dihat wesifandin, qada serweriya xwe heta bajarên Mûsil, Şengal, Wêranşar, Siwêrek, Diyarbekir, Sêrt, Wan, Şîno, Urmiye, Seblax (Mahabad) û Rewandûzê berfireh kir.

Bedirxan Beg li hemberî êrîşên dihatin kirin, li dijî Osmaniyan bi mezinê Kurdan re “tifaqek pîroz” pêk anî. Di nav kesên ku tevî vê tifaqê bûbûn de giregirên mîna Mistefa Beg, Derwêş Beg, ji serokên Wanê Mehmûd Beg (Xan Mehmûd), ji serokên Hekariyê Nûrulah Beg, ji serokên Hîzanê Fetah Beg, Xalid Beg, ji serokên Mûşê Şerîf Beg û ji serokên devera Qers û Acarê Kor Huseyîn Beg hebûn. Her wiha kesên wekî Şêx Mihemedê Mûsilî û Şêx Yûsifê Zaxoyî ku wê demê alimê dînî yên Kurdistanê bûn jî hebûn û wan jî bang li eşîran dikirin da ku tevî vê tifaqa pîroz bibin. Ev tifaq ne tenê ji Kurdên di bin serweriya Osmanî de pêk dihat. Wek nimûna mîrê herêma

Erdalanê yê ku di nav sînorên Dewleta Îranê de bû jî, beşdarî vê tifaqê bûbû.

Endamên tifaqa pîroz, di nav sînorên mîrekiya xwe de keleh dan avakirin û yên heyî temîr kirin, leşker dan hev û ew perwerde kirin. Yekîneyên leşkerî bi çekên agirbar arastin û bi teçhîzat kirin. Bedirxan Beg, bi alîkariya hosteyên ku bi taybetî hatibûn gazîkirin, hilberîn û çêkirina barûd, tiving, demançe û heta topan jî pêk anî.

Hewldanên Bedirxan Beg ên ji bo xurtkirina rewşa sosyo ekonomîk û siyaseta navxweyî yên mîrgeha xwe, encamên girîng dane. Serûberiyeke baş dabû tehsîlata bacan, rewşeke xweş û rehet ji bo gundiyên Kurd ên ku koçî nav erdê mîrekiyê kirine hatibû temînkirin, her wiha bazirganî û hunerên destkariyê dihatin teşwîqkirin, di nav Gola Wanê de dest bi çûnûhatina gemiyan jî hatibû kirin. Mîr li dijî anarşî, eşqiyatî û talankariyê, tedbîrên xurt û biryardar stendibûn. Di nav erdên Kurdistanê de yên di bin hikmê xwe de, ewletiyeke rasteqîne ya can û mal û hizûrê ava kiribû. Di sala 1842'yan de bi çapkirina pereyê ku li serê "Emîrê Botan Bedirxan" nivîsandî bû, serxwebûna xwe wek hikumdarekî serwer teyîd kir. Cizîrê wek paytext îlan kir, li wê derê jî ala Kurdî bilind kir. Pêşewayên Kurd ên din û hevalbendên wî jî hişkere pevrebûn û piştevaniya xwe ya bi Mîrê Botan re dan xuyakirin.

Reformên ku di nav Dewleta Osmanî de bi Tenzîmatê dest pê kiribûn, ji bo hindikahiyên (eqaliyetên) xirîstiyan bi xwe re gelek maf anîbûn. Ji aliyê din ve mîsyoner bi navbeynkariya sefaretên xwe yên li Stenbolê dikaribûn zirarê li serekeşîrên ku ji wan ne razî bûn, bikin. Hindikahiyên xiristiyan bi vê rewşê xurt dibûn, îcar diketin rewşa ku nema rîayetî otorîteya herêmê yên ku berê pê ve bûn, bikin. Ew rewşa ku heta wê rojê bi Kurdan re di nav hev de, di pozîsyoneke wekhev de berdewam dikir, dest bi xerabûnê kir.

Gava ku Nestûriyan baca xwe ya salane nedan Begê Hekariyê, pirsgirêk zêde bûn. Piştî ku Suryaniyan alayên Ingilîzan li ser banê xaniyên xwe danîn, şer û pevçûn mezintir bûn. Di Hezîrana 1843'yan de êrîşên li dijî Nestûriyan gurtir bûn. Ji ber kuştina Nestûriyan, hêzên Ewrûpî reaksiyonên mezin nîşan dan. Ingilîz û Frensiyan zor dan ser Hikûmeta Osmanî da ku li hemberî Bedirxan Beg helwestê wergire. Bi vî awayî êrîşên li dijî Mîrekiya Botan a ku jixwe berê ji bo ku li dijî pêkanînên Tenzîmatê radibû û dixwest serbixwe tev bigere nav wan ne xweş bûbû, hatin destpêkirin.

Bedirxan Beg di meha pûşberê de, di encama şerê li hemberî hêza Osmanî ya mezin de ku ji 30 hezar leşkerê nîzamî, 15 hezar milîs û ji 40 topan pêk dihat, têk çû. Di keleha Ewrexê de sê roj di dorpêçkirinê de mabû, neçar mabû di 29'ê Temûza 1847'an de teslîm bibe. Ji wê demê pê de jiyana wî li

sirgûnê li Stenbol, Girît û Şamê derbas bû.

Tesfiyekirina mîrgehên Kurdan berdewam kir. Bi seferên bêmerhemet hemû mîrekiyên li Kurdistanê yek bi yek ji navê hatin hilanîn. Digel berxwedanên mezin, ji têkçûnê xelas nabin. Çimkî di navbera hêzan de yên ku bi hev re şer dikin, cudahiyên mezin hene. Çendî ku artêşên mezin û nîzamî yên Mîr Mihemed û Bedirxan Beg hene jî, di şerên ku bi artêşa Osmanî re tên kirin mirov nikare liberhevxistina hêzan bike, ew qasî ferqî di navbera wan de heye.

Di têkçûna mîrekiyên Kurdan de gelek sedem hene. Tunebûna stratejiyên nû yên şer, taktîkên wan, kêmbûna amûr û pêdiviyên şer û nemaze dûrbûna wan a ji polîtîkayên nû, bû sebeba biserneketine wan. Sedemeke din a biserneketina mîrekiyên Kurdan jî helbet cihgirtina Kurdan a di artêşa Osmanî de ye. Dema artêşa Osmanî digirt ser aliyekî Kurdistanê hin ji aliyên din di nav artêşê de cih digirtin. Rêxistin bi wî rengî bû...

Mîrekiya Botan, di 1847'an de, ya Bedlîsê di 1849'an de, ya Hekariyê di 1849'an de û Mîrnîşîna Baban jî di 1851'an de ji holê hatin rakirin.* Di dawiya salên 40'î de mîrên Kurdan ên Bedlîs, Botan, Rewandûz û malbatên hemû mîrên din, bi darê zorê ji Kurdistanê hatine sirgûnkirin û li herêmên herî dûr ên Împaratoriya Osmanî hatine bicihkirin.[26]

Li Îranê jî heman rewş heye. Di salên 1818, 1820, 1822 û di 1825'an de di miqabilî dewleta Îranê de serhildanên Kurdan ên bi girseyî pêk hatine. Wek me berê îfade kiribû tevgera van serhildanan carina gelekî berfireh bûye. Ji bilî vê, serhildanên mîrekiyê li aliyekî sînor bandor li aliyê din jî kirine. Serhildana Mîr Mihemed ku ji 1816'a heta 1839'a dom kiribû tesîra xwe heta bi Azerbeycana Îranê belav kiribû. Serhildana Mîr Bedirxan jî heta bi Mahabad û Urmiyê belav bibû. Lê di encamê de, wek me berê îfade kir ji ber hin kêmaniyan biserketin pêk nehatiye.

Bi kurtasî di nîveka sedsala 19'an de li Kurdistanê têkçûneke mezin pêk hatiye; di warê siyasî û civakî de pir tevlihevî derketiye, guherînên mezin çêbûne. Her roj Kurd bi navenda her du dewletan ve bêhtir hatine girêdan. Ev hewldanên dewletên Osmanî û Îranê yên ji bo hîn bêhtir Kurdistan bi navenda wan ve bê girêdan di sedsala 20'an de jî heta hilweşandina wan dewam kiriye.

Gava eskerên Osmanî mîrgeh ji holê hilanîn, herêm talan û wêran kirin; bi hejmareke zêde mirov hatin kuştin, hatin nefîkirin û gelek jî hatin girtin û

* Piştî wan şerê giran şewba kolerayê ya sala 1849'an jî bi ser herêmê de hatiye û bi van rewşa di van deman de Kurdistan derbek mezin xwariye.

[26] Prof. Dr. Celîlê Celîl, bnb, r. 154

hepiskirin.

Hilweşandina mîrgehan û çûna pêşewayên Kurd, bêhizûrî anî heremê. Ji wê demê û pê de ji bo kesê ku mayî ewletiya mal, can û namûsê di talûkeyê de bû. Memûrên ku di şûna mîran de dest bi wezîfeyê kiribûn, pirî caran nikarîbûn hizûr û ewlekariyê pêk bînin. Ji ber ku memûrên dewletê yên nû bi kêrî rêvebirina herêmê nedihatin û bertîl dixwarin, ev dikir ku her here ewlenebûna bi dewletê kêm bibe. Bi vî awayî heq û hiqûq derb xwar û lihevnekirin û pevçûnên di navbera eşîretan de jî pirtir bûn.

Jihevbelakirina têkoşîna Kurdan a serxwebûnê, wisan bi hêsanî pêk nehatibû. Li hemberî teşebûsên ku dixwestin Kurd qels bên xistin û bingeh ji sînorên îro re bên danîn, bi qasî sed salî têkoşîn hatiye kirin û Kurdistan bûye wek gola xwînê. M. S. Lazarev di berhema xwe ya bi navê "Emperyalizm ve Kürt Sorunu" (Emperyalîzm û Pirsgirêka Kurdan) de, tesfiyekirina mîrgehên Kurdan a di nîveka sedsala 19'an de wek fetha duyem a Kurdistanê şîrove dike. Lê ev fetha hanê, di heman demê de bû sedema ku hemû erdên Osmanî di sedsala 20'an de bikevin bin serweriya Ewrûpayê.

Piştî ku pareke mezin ji Kurdan di sedsala 16'an de tevlîbûna Osmaniyan ji xwe re bijart, rewşa wan a ku bûn hêzên serhedan ên di navbera du hêzên mezin de, wê bi sed salan bidomiya. Û ev wê halekî bi xeter ji wan re bianiya. Me li jorê jî nivîsîbû ku Ehmedê Xanî ev yek pir bidilêşî îfade kiriye. Di dema êrîşên ku ji derve de tên, ên cara pêşî bi wan re rû bi rû dimînin, ji êrîşan re dibin sîper Kurd in. Esas ji ber vê yekê, di dîroka dewlatên ku Kurd tê de bûn ew xwedî rolên gelekî girîng bûn jî. Çendî ji aliyê din yê sînor ne dûr bin jî, pirî caran dibûn nobedarê dewleta ku tê de dijiyan. Lê xuyaye rêveberiya Osmanî di van dewrên dawî de ev yek jibîr kiriye û bi êrîşên xwe yên tund ên li ser Kurdan, dawiya xwe jî aniye.

Rêveberiya Osmanî di serdemên dawî de bi navê hemdembûn û nûjenbûnê berê xwe da Rojava û xwest ku raboriya xwe ji nedîtî ve bê; bend û têkiliyên xwe yên ku ji dîrokê jî dihatin avêtin pişt guhên xwe. Împaratoriya Osmanî fêm nedikir ku bi qelsbûn û lewazxistina Kurdistanê şax û perê xwe dişkîne. Di encamê de ew Kurdên ku ji qetlîaman filitîbûn û bêhêz mabûn, wê nikarîbûna di Şerê Cîhanê yê Pêşî de hêzên Ewrûpî yên ku dor li Osmanî girtibûn, bidana sekinandin. Heta ew ê nikaribin axa xwe jî biparêzin. Di pey windakirina cih û warên Ereban de, hin erdên mîrgehên Kurdan ku ew di nîveka sedsala 19'an de ji aliyê hêzên Osmanî ve hatibûn tesfiyekirin, wê ji hakîmiyeta Îngiltere û Frensayê re bimana. Heta mirov kare bêje di nebiserketina têkoşîna Kurdan ya ku heta îro nesekiniye û tu encamê erênî

nehatine bidestxistin de bandora qelsketina vê demê gelek e.

Li gorî teşekulên resmî yên împaratoriyê, ku di dawiya sedsala 17'an de hatine çêkirin û heta destpêka sedsala 19'an dewam kirine, di nav yekeyên rêveberiya Împaratoriya Osmanî de herêmên ku Kurd bi awayekî zêde lê hene eyaletên Şarezûr, Hekarî, Mûsil û Diyarbekirê ne. Ber bi nîveka sedsala 19'an ve, ev eyalet hatine feşkilandin û dest bi çêkirina teşekulên nû hatiye kirin: Ji lîwayên Hekarî, Mêrdîn, Wan û Cizîrê Eyaleta Hekariyê; ji lîwayên Dêrsim, Mûş û Diyarbekirê Eyaleta Kurdistanê; ji lîwayên Mûsil û Rewandûzê Eyaleta Mûsilê; ji lîwayên Bexda, Silêmaniye û Besrayê jî Eyaleta Bexdayê hatine çêkirin.[27]

Valiyê Mûsilê Esad Muhlîs Paşa tînin serê Eyaleta Kurdistanê. Di sala 1856'an de sînorên Eyaleta Kurdistanê hatine guhertin û di 1864'an de jî Osmaniyan dawî li eyaletê anine û ew wek wilayetên Diyarbekir û Wanê veqetandine.

Di vê navberê de serhildana Mîrekiyan Botan dîsa dest pê kiriye. Ji bo Yêzdanşêr ê biraziyê Bedirxan Beg, tê gotin di têkçûna Bedirxan Beg de rola wî heye û li ser vê, rêveberiya Osmanî ew kirine meznê Cizîrê û hin soz danêyê. Lê piştî demeke kurt li Yêzdanşêr qulipîne. Piştî Yêzdanşêr dibîne ku fen lê hatiye kirin tifaqên nû pêk tîne, dest bi serhildanê dike û serhildan hema bibêjê li temamiya herêmên Kurdistanê belav dibe. Tevgera Yêzdanşêr, dibe yek ji serhildanên herî mezin ên Kurdan ku di sedsala 19'an de rû daye. Tevî Kurdên Êzîdî, Ermenî, Suryanî û Rûmên herêmê jî di nav serhildanê de, ligel Kurdan cih girtine.

Serhildan di Berfanbara (Kanûna Pêşî a) 1854'a de li Botan û Hekariyê dest pê dike û ev der dibe navenda serhildanê. Yêzdanşêr û artêşa wî piştî ku Cizîrê bi dest dixin, hêzên hakimê Mêrdînê jî ji hev difeşkilînin. Bi yekîneyeke ku ji du hezaran pêk tê, dikeve bajarê Bedlîsê û bi piştevaniya gel di cih de bajêr bi dest dixe. Di bin pêşewatiya Têlî Beg û lawên Bedirxan Beg de, gelên ji herêmên Wan û Miksê tevî Yêzdanşêr dibin. Di destpêka sala 1855'an de heta bi başûrê Gola Wanê hatibû bidestxistin.

Kesên di meha Çile (Kanûna Paşîn) de dema fetha Mûsila ku navenda îdarî û aborî ya Mezopotamyaya Bakur e serî hildabûn, 30 hezar bûn. Serhildêr li Mûsilê kargeheke fişekan bi dest dixin. Berdidin rêveberên herêmê û daîreya xezîneyê distînin. Êzîdiyên Mûsilê bêyî ku diduliyê nîşan bidin beşdarî Yêzdanşêr dibin û desteka eskerî jî didinê. Êzîdiyên li herêma Mîr Huseyn ê ku piştî têkbirina yekîneyên Osmanî Sêrtê bi dest dixin jî tevî

[27] Prof. Dr. Celîlê Celîl, bnb, r. 33

Yêzdanşêr dibin. Serhildan di demeke gelek kurt de ji Mûsilê heta Îranê hemû herêmê dide ber xwe. Di meha Sibatê (Reşemiyê) de hejmara artêşa serhildêran gihîştiye 100 hezarî.

Rêveberiya Osmanî bi navbeynkariya Ingilîzan dawxaza gotûbêjên aştiyê yên bi Yêzdanşêr re dike. Yêzdanşêr di bin ewlehiya şexsî ya konsolosê Ingilîz ê li Mûsilê diçe ji bo gotûbêjên aştiyê, lê kemîn li ber hatiye danîn, tê girtin û ji bo ku wî biavêjin zîndanê jî wî dişînin Stenbolê. Serhildana Kurdan a ku bêpêşewa û serî dimîne bi paş dikeve, di bihara 1855'an de jî dîsa Bedirxaniyên ku di şer de dikevin destên artêşa Osmanî, tên nefîkirin.

Ji aliyê din ve di van demên tesfiyekirina hêzên di Kurdistanê de, yanê di nîvê pêşî ê sedsala 19'an de, gelek caran di navbera Osmanî û Sefawiyan de, şer û pevçûn diqewimin, êrîşî sînorê hev û din dikin û ev yek dikin ku sînorên peyman li ser wan hatine çêkirin, bê wate bimînin. Brîtanya û Rûsya ji bo ku li ser sînoran peyman bên çêkirin dixwazin navbeynkariyê bikin. Di 1843'yan de komisyona sînoran ku ji delegeyên Îran, Osmanî, Brîtanya û Rûsyayê pêk tê, li Erziromê li hev civiyaye û ji bo dawî lihevnekirinê bîne, ketiye nav hin hewldanan.

Digel ku gelek pirsgirêk qewimîne jî, gotûbêj û muzakereyên komîsyonê dewam kirine. Muzakere heta ku di 31'ê Gulana 1847'an de bi Peymana Erziromê ya 2'yan bi encam bibe, li Erzirom û Ewrûpayê didome. Hin xalên peymanê yên der barê verastkirina sînoran de wihan in:

"Xal 2) Hikûmeta Îranê qebûl dike ku hemû cihên rast ên Eyaleta Zohabê -ango beşa rojava- ji Hikûmeta Osmanî re bihêle; Hikûmeta Osmanî jî teahud dike ku tevî Geliyê Karînê beşa rojhilat a eyaleta navborî -ango hemû cihên wê yên çiyayîn- ji Hikûmeta Îranê re bihêle. Hikûmeta Îranê di hemû îdiayên xwe yên li ser Eyaleta Silêmaniyê û bajêr dibihure û di serî de digire ser xwe ku dê mudaxele û destdirêjiya mafên serweriyê yên Hikûmeta Osmanî yên li ser eyaleta navborî neke....

Xal 3) Her du aliyên îmzeker, bi vê peymanê di hemû îdîayên xwe yên din ên li ser erd û xakê dibihurin û digirin ser xwe ku dê endamên komîs-yonê û pisporên din wek temsîlkarên xwe bidine wezîfedarkirin da ku sînorên di navbera her du dewletan de, li gorî xala berî vê bi awayekî guncan diyar bikin.

Xal 9) Hemû peymanên berê, bi taybetî hemû xalên Peymana Erziromê ku di 1238'an (1823'yan) hatiye îmzekirin, ku bi awayekî hişkere bi vê peymanê nehatine selerastkirin an jî ji holê nehatine rakirin, bi munasebeta vê peymanê, ligel hemû şertên li hundir, wek bi vê peymanê qerar hatine dayîn wê ji nû ve bên pesendkirin.

Aliyên peymanê yên bilind, gava ku metnên peymanê ji hev û din stendin wê bê qebûlkirin ku wan ew pejirandiye û îmze kiriye; peyman ji vê demê bi şûn de wê di nav du mehan an jî di demeke hîn kurtir de bê pesendkirin û teref jî dê wê bidine hev û din."[28]

Piştî ku metna peymanê hatiye hazirkirin jî, di navbera aliyan de pirsgirêk derketine û peyman incex di 21'ê Adara 1848'an de hatiye pesendkirin... Di Komîsyona Sînoran de ku ew ê sererastkirinên di xala 3'yan de behsa wan dihat kirin pêk bianîna, ji Brîtanyaya Mezin careke din Serheng (albay) Williams, ji Îranê Mîrza Cafer Xan, ji Tirkiyeyê Dervîş Paşa û ji Rûsyayê jî Serheng Chirikov hebûn. Temsîlvanên Komûsyona Sînoran, di sala 1849'an de li Bexdayê li hev civiyabûn lê incex di Rêbendana (Kanûna Paşîn) 1850'yî de dest bi xebatê kirine.[29]

Xebatên Komîsyonê yên li ser sînoran bi salan dewam kiriye, di vê demê de jî dagirkeriya beranberî hev dom kiriye. Derwîş Paşa yê ku di Komîsyona Sînoran de temsîlvanê Osmaniyan bû, bi hêzeke çekdar a di bin fermandariya xwe de kete Qoturê ku ew li gorî peymanan di sînorê Îranê de bû; rêveberên Îranî ji wezîfeyê stend, garnîzoneke ku ji yekîneyên nîzamî pêk dihat ava kir, bingehên qişleyan danî û ligel kîtabeyên didan nîşandan ku heta 10-12 km'yan nêzî bajarê Xoyê ji wê demê bi şûn de tevî nav sînorên Osmaniyan dibe, kevirên sînoran çikiland.[30] Ji aliyê din ve ji hêla Prens-Waliyê Kirmanşahê Muhemed Alî Mîrza ve jî nîvê rojava yê Zohabê ku li gorî peymanan ew li aliyê Osmaniyan bû hatibû stendin.

Di sala 1869'an de, dîsan gotûbêjên sînoran ên Osmanî û Îranê hebûn û dîsan li herêmên sînoran êrîş berdewam dikirin. Ji bo ku Qotura ketiye destê Îranê dîsa bê stendin, Osmaniyan êrîş birine ser wan. Ji aliyên din ve bi deh salan xebatên komîsyonê dom kiriye û incex di sala 1880'yî de digihîje encamê, lê belê dagirkirin û lihevnekirinên li ser tixûban, dîsan didomin.

Mehmet Hurşît (Paşa) yê ku di Komîsyona Sînoran de cih girtiye, geşt û lêkolînên xwe yên ji bo zelalkirina sînorên di navbera Îran û Dewleta Osmanî de yên ku ji Senceqa Bazidê ya li ser Eyaleta Erziromê heta Kendava Besrayê dewam dikirin, di berhema xwe ya bi navê "Seyahatname-i Hudûd" de bi kitekitan daye xuyakirin. Vê xebatê bi awayekî berfireh cih daye binyad, urf û adet û jiyana rojane ya nêzî 1100 eşîretên ku li ser sînoran dijiyan. Wek ku di vê xebatê de jî hatiye diyarkirin, bi van peyman û sînoran hin cihên ku bi ser Osmaniyan ve bûn derbasî Îraniyan û hin cihên bi ser Îraniyan ve bûn

[28] C. J. Edmonds, Kürtler, bnb, r. 181
[29] Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. C. J. Edmonds, bnb, r. 182
[30] C. J. Edmonds, bnb, r. 183

jî derbasî nav sînorên Osmaniyan bûne. Ya herî girîng jî eşîretên ku girêdayî hev bûne, ji hev hatine qetandin û heta hin jê jî di nav sê dewletan de hatine parçekirin.

Endamên Konfederasyona Eşîreta Cafan havînê li Kurdistana Îranê, zivistanê jî li Kurdistana aliyê Osmaniyan dimînin. Cafên Zohabê piştî hişkerebûna xeta sînorê di navbera Îran û Osmaniyan de tevî aliyê Îranê dibin. Qismekî mezin ê Eşîra Zîlan ku ew yek ji eşîrên xurt û hêzdar a Kurdan e, di nav erda di bin destê Osmaniyan de bû û beşên din jî di nav sînorên Rûsya û Îranê de bûn. Her wiha beşeke Eşîra Şikakan, di nav Îranê û ya din jî di nav erdên Osmaniyan de maye. Dîsan beşeke mezin a Celaliyan di nav sînorên Osmaniyan de, qismek di nav Îranê de û beşeke biçûk jî di nav tixûbên Rûsyayê de maye. Wek van gelek eşîret bi vî sînorî ji hev hatin qutkirin û bi demê re rewşa sînordarîtiyê hîn bêhtir xuya û hişkere bû.

Misyoner, geştyar (seyah) û erkedarên taybet ên Ewrûpayê pir bi cografyaya Kurdistanê û çanda wê re eleqedar bûn. Di xebatên vezîfedarên biyanî yên di Komisyona Sînoran de jî mirov kare vê bibîne. Yanî ji bilî erkedarên Osmanî û yên Îranê ku di Komîsyona Sînoran de cih girtine, di zebitnameyên endamên din ên komîsyonê de jî, gelek agahiyên der barê cografyaya Kurdistanê, warên eşîrên wê û çandên wan de cih girtine. Ji bilî vê, di çaxa van xebatan de xerîteyên cihê cihê yên bi kitekit ên der barê herêmê de hatine xêzkirin û çêkirin. Ev xebatên Komîsyona Sînoran dike mirov bifikire û ji xwe bipirse, bibêje, 'gelo ji bo bi vê riyê agahî û zanyariyên berfireh yên li ser herêmê bi dest bixin ev tevger hatine kirin?'....

Di sedsalên 18 û 19'an de, di şerên navbera Osmanî û Rûsyayê de û dîsan di şerên navbera Osmanî û Sefawiyan de, ku bi dehan car qewimîne, ji aliyê aborî ve jî ziyana herî mezin gihîştiye Kurdan. Ji ber ku şer li Kurdistanê çêbûne û ji ber ku Kurdan di her du aliyên cepheyê şer de cih girtine, windahî zêde û mezin in. Gelê Kurd ê ku tim duçarî êrîşan bûye û li ser qada derbasbûna yekîneyên leşkerî bûye, pirî caran nikare cotkariyê bike, lewma jî ji ber ku kana wî ya debarê ya tekane dimîne ew, xwe bi xwedîkirina heywan girtiye û ajaldarî kiriye. Ji lew re jî bûye mehkûmê jiyana nîvkoçeriyê. Hin kes jî, ji bo xwe ji bacên ku ji ber şer û pevçûna giran bûne bidin alî, bi tevahî vegeriyane jiyana koçeriyê. Ev hemû dikin ku ji aliyê madî û civakî ve danhevek neyê bidestxistin û civandineke ku bibe qewet ji bo pêşketinê çênebe.

Celîlê Celîl, di berhema xwe ya bi navê 'Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması' (Serhildana Kurdan a Şêx Ubeydulahê Nehrî) de, sedemên bêcih û warbûna xelkê wiha tîne zimên:

"... Bacên giran û bacdarkirin jî di nav sedemên girîng ên ku kirine kes vegerin jiyana koçeriyê, de ne. Ev bac û bacdarkirin, bi operasyonên yekîneyên leşkerî yên desthilatdaran dihatin berhevkirin. Der barê vê mijarê de Elize Reklu vana dinivîse: 'Li gorî mercên siyasî hejmara wan (a koçeran-C. C.) zêde yan jî kêm dibû. Heger duçarî talana waliyê herêmê bûbe yan jî heger yekîneyên leşkerî di heman herêmê re derbas bûbin, hin eşîretên dêmanî ku bi çandiniyê mijûl dibûn û tim bicihbûyî bûn, ji bo ku dest bi koçeriyê bikin dev ji gundên xwe berdidan û di şertên guncan de jî gava firsend bidîtina ew eşîret careke din vedigeriyan ser axa xwe ya ku bêriya wê dikirin.

Di van mercên ku eşîrên nîvkoçer tim xwedî jiyaneke bixof bûn, gelek warên çandiniyê dibûn zozan û diman. Wek nimûne, meskenê Abara ya Senceqa Wanê ku piraniya şêniyên wê ji Kurdên êzîdî dihat pê, berê wek herêmeke pêşketî û geş dihat zanîn..."[31]

Celîlê Celîl ji bo barên li gel hatine kirin ên dewra herba 1877-78'an a Osmanî û Rûsan wiha dinivîse:

"Desthilata Osmaniyan a ku ji aliyê xwedîkirina artêşa xwe ve diket tengasiyê, ji bo ku ji yekîneyên xwe yên leşkerî re pêdiviyan peyde bike, heremên nêzî cepheyê bi kar dianî. Kurdên Bazid û Botanê hatibûn mecbûrkirin ku hemû mukelefiyên xwe yên bacan di cih de bidin û ji artêşa Osmanî re jî xurek û pêdiviyan peyde bikin. General Ter -Gusakov ji Loris- Melikov re ev tiştê dinivîsîn: 'Her malbata li Senceqa Bazidê, wek xizmeta ji yekîneyên leşkerî yên li wê derê re, divê van tiştan derhal bide karbidestên ku ji aliyê fermandaran ve hatine tayînkirin: Kurd; du beran, ritilek rûn û cotek goreya hirî; heger şêniyên dêmanî tiştên tên xwestin wek mal nikaribe bide, mecbûr e ku di gerewa wan de pere bide."[32]

Piştî Tenzîmatê, bi hilanîna mîrgehan re, li herêmê eşîretên ku parçeyekî biçûk ên mîrgehan bûn hîn bêhtir xuya bûbûn û derketibûn pêş. Pê re di navbera eşîretan de dewrek nuh a berberiyê û pevçûnên giran di navbera wan de jî dest pê kiribû. Wek ku me berê jî destnîşan kiribû, erkedarên hikûmetê yên ku ketibûn şûna mîr û mîrekan, ji ber ku têra xwe ne xwedî pêşbînî, hêz û meşrûbûnê bûn, bi kêrî ku pevçûn û tevliheviyan têxin bin kontrolê û sererastkirinên nû pêk bînin nehatin. Ji ber vê sedemê jî, gel ber bi şêxan ve kişiyan. Çinku otorîteya şêxan di ser a eşîran re bû, wan civak nas dikir û hurmeta xelkê jî bi awayekî zêde ji wan re hebû. Sebeba din a vê kombûna li dora şêxan reaksiyona li hemberî mîsyonerên Ewrûpî yên ku îmtiyaz didan xiristiyanan bû. Serhildanên ku dûre çêdibin jî îcar bi piranî bi pêşengiya şêx

[31] Prof. Dr. Celîlê Celîl, Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması r. 23
[32] Prof. Dr. Celîlê Celîl, bnb., r. 41

û kesên mensûbên dîn çêdibin.

Martin van Bruinessen wê serdemê wiha dinirxîne:

"... Ji holê rakirina mîrgehên Kurdan, bi zordayîna Ewrûpayê ve hate girêdan û xiristiyanên li deverê jî wek şirîkê sûc ên dijminên biyanî hatin qebûlkirin. Alozî û anarşiya ku di wê serdemê de ligel van rûdanan diqewimîn, bêhtir kir ku fikara di nav mislimanan de ya ku digot xiristiyan ji bo nîzama kevneşopiya îslamî tune bikin plansaziyê dikin, xurt û belav bibe. Vana giştan, di encamê de kir ku di nav Kurdan de hişmendiya îslamê zêde bibe û Kurd jî li dora serokên dînî kom bibin."[33]

Bi xurtbûna polîtîkayên rehberdana li Rojhilata Nêzik ên dewletên Ewrûpî, Împaratoriya Osmanî difeşkile û pê re serhildanên Kurdan jî zêdetir dibin. Têkoşîna serxwebûnê ya Kurdan ku di destpêka sedsala 19'an de bi giraniya herêmina dest pê kiribû, her diçe dibe wek tevgera Kurdistanê tevî. Di riya pêkanîna yekîtiya neteweyî de, her roja diçe bêhtir gav tên avêtin. Neteweperweriya Kurdî, bi bihîstina nûçeyên li ser serxwebûna Slav û Yewnanan ên ku bi desteka hêzên derveyî hatibûn bidestxistin, hîn bêhtir belav bûye.

Dewleta Osmanî şerê salên 1877-78'an ê wê û Rûsan, ku wek herba 93'yan derbasî dîrokê bûye, bi têkçûnên mezin li dû xwe dihêle; li Balkanan dewletên nû tên avakirin. Li ser ku mafên cur bi cur bidin Ermeniyan li hev tên. Di encama Kongreya Berlînê de, împaratorî mecbûr dimîne ku wilayetên Batûm û Qersê ji Rûsan re bihêle. Piştî vê, neteweperweriya Ermeniyan hîn zêdetir belav bûye û hem Rûsya hem jî hêzên rojavayî ji bo parastina berjewendiyên Ermeniyan, zor dane ser hikûmeta Stenbolê.

Gelek pêşewayên Kurd ên ku di qedemeyên bilind ên Osmaniyan de erkedar bûn, beşdarî herba Rûsan a di salên 1877-78'an de bûbûn. Şêx Ubeydulahê Nehrî jî, ji nav eşîrên di bin serweriya xwe de ji bîst hezarî zêdetir milîs civandine, tevî şer bûye û fermandarî li van hêzan kiriye. Ji ber ku di herbê de pir bi kêr hatiye, Sultan Ebdulhemîd rutbe û nîşanan pê ve dike.

Li hêla din wek ku me li jor da xuyakirin, şerê Osmanî û Rûsan ê salên 1877-78'an, kiribû ku li Kurdistanê feqîrî û alozî çêbibin. Di pey vî şerî de, ku bûbû sedema koçberiyên girîng, êdî ewlehiya can û mal nemabû. Ligel vê yekê, piştî şerê giran, bac jî hatibûn zêdekirin. Ev kiribûn ku di nav gel de nerazîbûn zêde bibin.

[33] Martin van Bruinessen, bnb, r. 110

Hin pêşengên Kurd ên ku tevî şerê 93'yan bûbûn, li dijî Osmaniyan, serhildanên mezin ên berfireh didine destpêkirin. Ji lawên Mîr Bedirxan yên ku di sefên Osmaniyan de tevî şerê Rûsan bûbûn, Osman Paşa û Huseyn Kenan Paşa, di sala 1879'an de ketin Cizîrê û rêveberî kirin destê xwe. Osman Paşa desthilatdariya xwe heta Colemêrg, Nizîb, Nisêbîn, Zaxo, Amadiye, Midyad û Mêrdînê berfireh kir. Li van hemû herêman serxwebûn hate îlankirin. Piştî heşt mehan li hemberî artêşa Osmanî ya di bin fermandariya Osman Paşa de têk çû û ew sirgûnî Stenbolê bûn.

Di 1879'an de Şêx Ubeydulahê Nehrî û Seyîd Taha bi hev re tevgereke Kurdî dan destpêkirin û herêmên Kurdistana Îranê jî xistin bin destê xwe. Bi tevgera pêşewayê neteweperweriya Kurd û yê dînî Şêx Ubeydulah ya sala 1880'yî re, sînorê navbera Osmanî û Îranê ku bi sedsalan dom kiribû, wek tune hatiye hesibandin û Kurdistan wek yek parçe tevgeriyaye. Ruhê neteweyî bi pêş ketiye. Şêx Ubeydulah di nameya xwe de, ya ku ji alîkarê Konsolosê Îngiltereyê yê li Elbakê re nivîsiye, dibêje ku Kurd miletekî cihê ne û dixwazin serbixwe bin.

Şêx Ubeydulah di dawiya meha Temûza sala 1880'yî de, di dîroka Kurdistanê de cara pêşî kongreya giştî ya yekîtî û piştgiriyê li Şemzînanê civand. Di civîna pêşewayên Kurdan de 5 şêx, 21 xelîfe, 42 mîrza û 68 mîr amade bûn. Ji bo damezirandina Kurdistaneke serbixwe pêkanîna yekîtiyê ya di nav eşîrên Kurdan de û kirina amadehiyên ji bo serhildanê wek armanc û mebesta sereke ya civînê hatibû diyarkirin. Di civînê de li ser bêhizûriya ji ber xala 61'ê ya Peymana Berlînê çêdibû jî sekinîne, ku bi vê xalê mafê otonomiyê didan Ermeniyan. Axaftina Şêx Ubeydulah, a ku helwesta neyînî ya li hemberî Ermeniyan şaş didît û nêrînên wî yên ji bo avakirina Kurdistaneke serbixwe, ji aliyê piraniya beşdaran ve tê pejirandin.

Martin van Bruinessen ji bo Şêx Ubeydulahê Nexşebendî wiha dibêje: "Di salên 1870'yî de li Kurdistana navîn û bakur kesê herî bi tesîr û bi qewet Şêx Ubeydulah bû. Li gorî nivîskarên hemdemên wî, di nav Kurdan de cihê wî ji yê sultan girîngtir bû çendî ku ew xelîfe bû jî. Bi awayekî pir bi îhtiyat nêzikahî li îhtirasên siyasî yên neteweperwerên Ermenî dikir û ji rêveberiyên şaş ên Tirk û Îraniyan jî ne razî bû."[34]

Serhildan roj bi roj xurt dibe û hemû herêmên Kurdan digire nav xwe. Serhildêrên ku ji eşîrên Kurdan ên mîna Mangurî (xwedî 5 hezar tiving), Mameşî (5 hezar), Zarza (8 hezar), Mukrî (10 hezar), Debokrî (xwedî 10 hezar tiving), Garikî, Şikakî, Caf (50 hezar kes), Pîran, Ago, Zudî pêk dihat

[34] Martin van Bruinessen, bnb, r. 111

û bi beşdariyên din her ku diçû xurtir dibûn, bi tevlîbûna efser û leşkerên ku ji Îranê re xizmet dikirin û bêyî ku rastî liberrabûneke cidî bên, xwe digihînin paytexta Kurdistana Îranê Sablaxê (Mahabadê). Di vê navê de Hikûmeta Kurdistanê ya demkî hatiye damezirandin û ji bo herêmên rizgarkirî jî rêveber hatine şandin.

Hêzên Kurdan bi lezgînî bi pêş dikevin û heta nêzî Tewrêzê diçin. Gel bi heyecaneke mezin destekê dide wan. Sefîrên Ingilîzan zû bi serhildanê hisiyabûn û ev qewam û rûdan tim ji amirên xwe re wek rapor dişandin. Ingilîzan gava dîtin ku Şêx Ubeydulah xwedî îtibareke mezin e û di nav eşîrên Kurdan de yên li Îranê jî tevgera wî bi pêş dikeve, ji sefîrên xwe xwestine ku ji bo serhildana Kurdan bê şikênandin li îtifaqa Osmanî û Îranê bigerin û bibine navbeynkar. Bi vê yekê mirov vekirî dibîne ku sînor, ji bo sê hêzên mezin li dijî tevgera Kurdan bibin yek zemîn hazir kiribû.

Rêveberên Osmanî ji vê bipêşveçûna serkeftî ya Kurdan a bi Îranê de, him kêfa wan dihat him xof ji wan re çêdibû. Ji aliyekî ve ev wek têkçûna dewleta cîranê xwe didît, meseleya Ermeniyan jî dixist ser û li çepikan dixist, lê ji aliyekî ve jî ji tirsa re esker û cebilxana dişînin ser sînoran. Tedbîrên ku rêveberên Osmanî stendibûn û belavbûna hêzên Kurdan ya di miqabilî hêzên cuda cuda de, bûbû sedema qelsketina hêzên Kurdan. Piştî artêşa Îranê xwe dide hev û êrîşeke mezin dibe ser Kurdan Şêx Ubeydulah vedikişe cihê xwe yê li Şemzînanê. Hêzên Îranê gel qir dike. Celîlê Celîl di berhema xwe ya bi navê ‘Serhildana Kurdan ya Şex Ubeydullah ê Nehrî’ de radigihîne ku ji ber qetlîama artêşa Îranê ya li hemberî serhildêran, gelek Kurd ji neçarî derbasî aliyê Osmaniyan bûne; li gorî daneyên Serayê nêzî 60-70 hezarî ji nifûsa Urmiyeyê koçî aliyê Osmaniyan kiriye.

Şêx Ubeydulah ji bo hemleyeke din dîsan haziriyan dike. Îran, ji bo ku li dijî Şêx Ubeydulah bikeve tevgerê zorê dide ser Seraya Osmaniyan. Şêx Ubeydulah ji ber zora Serayê, mecbûr dimîne ku here cem Sultan. Li ber Xelîfeyê Îslamê Şêx neçar e û stûyê xwe ji kêra wî re dirêj dike.

Celîlê Celîl der heqê birina Şêx a Stenbolê de wiha dibêje: “Şêx bi refaqeta ‘qitaya muhafiz a Osmanî ya xatirşînas’ ket riya Stenbolê. Muhafizên ku ji tabûra siwarî û 2 bateryayên topavêj pêk dihatin, ji bo nehêlin Şêx bireve hatibûn wezîfedarkirin. Sultan ji bo ku ‘mêvan’ê xwe bi merasîma şerefê pêşwazî bike tu tişt texsîr nekiribû. Hemû giregirên bajêr ên resmî çûbûn pêşiya Şêx. Kuçe û kolan bi mirovan tije bûbûn. Gava ku Şêx ketibû Stenbolê, ji bo şerefa wî guleyên topan hatibûn avêtin. Lê pir neçû, hat fêmkirin ku ew li Seraya Sultan ne mêvan lê belê hêsîr e.”

Piştî demekê, Şêx Ubeydulah bi awayekî ji Stenbolê direve û vedigere Kurdistanê. Rêveberiya Îranê gava dibîne Şêx careke din xwe bi kar û bar kiriye, li ser sînoran dest bi tedbîrên girîng dike. Her wiha, di heman demê de artêşa Osmanî jî esker û cebilxaneyê dikişîne ser sînor. Dema dinêrin Şêx dev ji têkoşîna serxwebûna Kurdistanê bernade, artêşa Osmanî dora wî digire, pêşiyê wî sirgûnî Mûsilê dikin, paşê jî wî dişînin Mekeyê û di sala 1882'yan de li wir dire rehmetê.

Di vê navê re gelş û arîşeyên di navbera Osmaniyan û Ermeniyan de, her diçe zêdetir dibin. Osmanî di dema ji bo xwe bi ser hev de bînin ketin nav hewlên modernkirinê de, mecbûr mane ku Rûm û Ermeniyên bi têkilî û zimanên Ewrûpî dizanin bînin qedemeyên bilind ên dewletê. Ewrûpa jixwe ji ber têkiliyên xwe yên bazirganî bi van derdoran re di nav dan û stendineke zêde de bû. Paşê jî, bi mudaxeleyên polîtîk ên Ewrûpayê, ji aliyê siyasî ve jî rê li ber Rûm û Ermeniyan ku ew di warê aboriyê de xurt bûbûn vedibe. Bi vî hawî halê Dewleta Osmanî di himberî Ermeniyan de roj bi roj nexweş dibû.

Alayên Hemîdî yên ku ji Kurdan pêk dihatin û di sala 1891'ê de ava bûbûn, di encama siyaseta Abdulhemîdê 2'em de ya li dijî Ermenî û Rûsan, derket holê. Ev artêş, ku bi kulfeteke giran hatibû damezirandin, ji 36 alayan pêk dihat û her yek ji wan 1200 siwarî bûn. Paşê hejmara wan her çû zêdetir bû. Bi Alayên Hemîdî re, di navbera padîşah û eşîretên Kurdan de hevkariyeke muhîm dihat destpêkirin. Ev hêza mezin li herêmê, ji bo siyaseta Osmanî temînatek bû. Bi vê hêzê, sînorên rojhilat dihatin parastin, her wiha bi vê yekê hin eşîrên Kurd jî bi avaniya merkezî ve hîn bêhtir hatibûn girêdan. Wê demê bi armanca ku pêşewayên Kurdan bi navendê (merkezê) ve bên girêdan, Mektebên Eşîretan(Aşiret Mektepleri) jî hatibûn avakirin; ev dibistan li Stenbol û Bexdayê bûn û di wan de zarokên axa û paşayan dixwendin.

Alayên Hemîdiyan tesîrê li binyada herêmê jî dike û ji ber vê hêzê cara duyem herêm ser û binî hev dibe. Bruinessen der barê alayan de wiha nivîsîye: "Dema eşîrên ketine nav alayan bi çek dibin û xurt dibin, gelek eşîret çav berdidin wan û ji bo ew beşdarî alayan bibin mureceat dikin. Avantajên eşîrên di alayê de, wekî bidestxistina çekên baş, dîtina perwerdehiya leşkerî û bûna xwedî îmtiyazan, dibin sedema ku ew zordariyê li eşîrên din bikin û êv rewş jî pevçûnên nav eşîran zêdetir dikin. Di heman demê de ev alayî li dijî Ermeniyan jî dihatin bikaranîn. Gava di sala 1894'an

de gelê Ermenî yê Sasonê serî hilda, padîşah ji bo şikênandina serhildanê Alayên Hemîdî dişîne wê derê."[35] Belkî yek ji faktorên ku kirine emrê Împaratoriya Osmanî hînekî din zêde bibe, Alayên Hemîdî be.

Ji heman eşîrê carinan nêzî pêncsed kes an jî hezar kes tevî Alayên Hemîdî dibûn. Hin eşîrên mezin, ji yekê zêdetir alayî ava dikirin. Di gerewa xizmetên leşkerî de ji van eşîran hin bac nedihatin stendin. Di sala 1895'an de, 56 alayî hebûn, ku bi piranî bi Zekî Paşayê Fermandarê Artêşa 4'emîn a Erzinganê ve girêdayî bûn.[36] Alayên Hemîdî, piştre di dema derketina şerê desthilatdariyê de, yê di navbera padîşah û îtihadiyan de, wê bibin pişt ji padîşah re. Alayî li dijî neteweperweriya Ereban jî, ku li başûr geş dibû, hêzeke girîng e.

Piştî şoreşa Jon Tirkan, guherînên bingehin di Alayên Hemîdî de hatin çêkirin. Navê wan wek "Alayên Eşîretê" hatin guhartin û heta dereceyekê ew tevî nav binyada hiyerarşîk a artêşê kirin. Ev yekîneyên eşîretê, paşê jî beşdarî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Şerê Serxwebûnê (Îstiklalê) bûn.[37]

Alayên Eşîretê li herêmê bêhizûrî û pevçûn zêdetir kiribûn. Ew ên ku di nav alayê de cih digirtin, hem ji bo serweriyê li dijî hev têdikoşiyan hem jî zordarî li eşîrên bêçek dikirin û gundên wan talan dikirin. Ji bo ku ji derfetên dewletê îstifade bikin, hin kesên ku xwe bi vê avaniyê xweş dikirin jî, hebûn. Li hêla din, ji xwe alayî terefdarên dewletê bûn û bi vî awayî Kurdistan ji hundir ve hatibû parçekirin. Pirsgirêkeke din a ku van alayan bi xwe re anîne heye. Ji ber ku alayî ji eşîrên sunî hatibûn pêkanîn, vê yekê dikir ku elewî di bin pest û zordariyê de bimînin. Pirsgirêkên ku di vê serdemê de derketibûn, wê di sedsala 20'an de jî bidomiyana.

Di sedsala 19'an de li dinyayê gelek guhertin çêbûbûn. Li gel gelek tevliheviyan di warê mafên xelkan de pêşketin çêdibûn. Lê ev sedsal ji Kurdan re gelek êş, tunekirin û feqîrî anîbû. Li Dewletê Rojava hin pêşketin hebûn, biserketinên wan pir bûbûn û dixwestin vana zêdetir bikin. Ev hewldan di sedsala 20'an de dinya ber bi tevliheviyeke mezin ve dibir.

[35] Martin van Bruinessen, bnb, r. 134
[36] Martin van Bruinessen, bnb, r. 133
[37] Martin van Bruinessen, bnb, r. 133

# SERÊ SEDSALA 20’AN Û ŞERÊ CÎHANÊ YÊ YEKEMÎN

Di vê beşê de em ê hinekî li rewşa serê sedsala 20’an û li dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn binêrin. Ji ber ku Kurdistan bi dû de ne bi gelekî dibe parçe parçe. Rewşa vê demê û rewşa Kurdistanê çi bû bi kurtasî em lê binêrin.



*Damezirînerên Komîteya Yekîtî û Pêşketinê (İttihad ve Terakki Cemiyeti) yê Kurd li rastê Abdûlah Cevdet û li çepê Îshak Sukûtî*[38]

Kurd di her dewrê de, di nav gelek saziyên Dewleta Osmanî de, di wezîfeyên payebilind de cih stendine. Di demên dawî de, di nav hewldanên ku Dewleta Osmanî ji tengasiyê xelas bikin de jî Kurdan cih digirt. Bi taybetî hin rewşenbîrên Kurd ên ku li Stenbolê bûn, di destpêka sedsala 20’an de bi piranî ligel rewşenbîrên Osmanî tevgeriyane. Ji çar endamên damezirîner ên Komîteya Yekîtî û Pêşketinê, ku di sala 1898’an de hatibû avakirin û roleke wê ya girîng di şoreşa Jon Tirkan de jî hebû, du kes jê Kurd in. Abdurehman Bedirxan û Hîkmet Baban jî tevî kongreya komîteyê ya ku di sala 1902’yan de li Parîsê hatiye lidarxistin, bûne. Kurdên ku di vê komîteya li dijî Sultan Abdulhemîd de cih stendine, hin jê ji aliyê Abdulhemîd ve hatine girtin û hin jî hatine sirgûnkirin.

[38] İttihad ve Terakki Cemiyeti’nin kurucusu ve 1/1 no’lu üyesi İbrahim Temo’nun İTTİHAD VE TERAKİ Anıları

Gava di sala 1908'an de Îtihad û Teraqî bi derbeyekê bû hikûmet, gelek Kurd jî anîn ser wezîfeyên girîng. Îlana Meşrûtiyeta 2'yem gelek Kurdên li bajaran kêfxweş kirin û di hilbijartinên giştî yên sala 1908'an de, nêzî 30 Kurdî jî wek mebûs hatin hilbijartin. Heta Seîdê Kurdî (Bedîûzeman) di dema îlankirina meşrûtiyeta duyemîn de li Meydana Huriyetê ya Selanîkê, xîtabî girseyeke mezin kir û behsa feydeyên meşrûtiyetê kir. Li aliyê din, bi name û telgrafa xwe gihand serekeşîr û pêşengên olî yên li Kurdistanê yên ku şik û gumanên wan der heqê meşrûtiyetê de hebûn.[39]

Kurdên ku li dijî vê tevgerê muxalefeteke xurt dikirin jî hebûn. Wek me li jorê jî diyar kir, di van rojên tevlihev de gelek Kurdên ku alîgirên padîşah bûn, hebûne. Di dema şoreşa Jon Tirkan de, ya ku di sala 1908'an de li dijî Sultan Abdulhemîd ê 2'em de hatibû kirin, Îbrahîm Paşa yê Milî li Wêranşarê bi 1500 kesên ji eşîretê, bi navê sultan Şamê îşxal dike. Hikûmeta nû, Eşîreta Şemarê dike dewrê da ku Îbrahîm Paşa ji bajêr derxe. Îbrahîm Paşa vedigere Wêranşarê, lê dîsa êrîş tê ser, di van şera de birîndar dibe, dema vedikşe ku here Şingalê bi rê de nexweş dikeve û dire rehmetê.

Parolaya Jon Tirkan, ku ew aktorên sereke yên şoreşa sala 1908'an bûn, 'Osmanîtî' bû. Mebesta wan xelaskirina Osmanî ji pirsgirêkan û nûjenkirina wê bû. Di bernameya wan de ev hebûn: Divê makeqanûn (Qanûna Bingehîn) xwe bispêre serweriya gel; divê otonomiyeke berfireh ji bo eyaletan bê dayîn; li dibistanan hîndekariya sereke divê bi zimanê dayikê yê zarokan bê dayîn; xizmeta leşkerî, bêyî ku li cudahiya dînî bê nihartin divê ji bo her kesî mecbûrî be.[40] Di pey de, li Stenbolê azadiyên ku heta roja îro bi dest neketine, pêk hatin. Ji sala 1908'an heta destpêka Şerê Cîhanê yê Yekemîn, li nav xaka Osmanî bi sedan berhemên peryodîk ên cur bi cur bi zimanên Tirkî, Ermenkî, Kurdî, Erebî û hwd. derketin. Bi vî awayî di destpêka sedsala 20'an de, di van demên ku bayê azadî û xwebipêşxistinê xurt bibû, bi awayekî modern gelek rêxistinên Kurdan ava bûn û weşana bi Kurdî jî gav avêt meydana weşanê.

Yek ji nirxên ku di dawiya sedsala 19'an de derdikeve pêş û bilind dibe jî, sosyalîzm e. Konferansa Enternasyonala Sosyalîst, di sala 1896'an de li Londonê civiyabû û fikara 'mafê hemû neteweyan heye ku di der heqê pêşeroja xwe de qerara bistîne' pesend kiribû. Paşê, di serî de li Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê, wê li ser çandên herêmî lêkolînên hêja bihatina kirin.

[39] Naci Kutlay, 21. Yüzyıla Girerken Kürtler, r. 124
[40] Mete Tunçay, Erik Jan Zürcher-Osmanli İmparatorluğu'nda Sosyalizm ve Milliyetçilik, r. 63

Di vê navê de, problema sînor a di navbera Osmanî û Îranê de didome. Di 21'ê berfenbara 1911'an de temsîlkarên Osmanî û yên Îranê bi mebesta pêkanîna "Komîsyona Sînoran a Hevpar" Protokola Tehranê îmze dikin. Der barê mijarê de em serî li Edmonds bidin bê çi dibêje:

"Xebatên komîsyonê wê li gorî madeyên Peymana Erziromê, ku di sala 1847'an de hatiye danîn, bên meşandin û her xala ku li serê lihevhatin çênebe jî, dê wê bibine Dadgeha Hakemiyê ya Laheyê. Di 1912'an de ji meha Adarê heta ya Tebaxê, li Stenbolê hejdeh civîn hatin lidarxistin û hema bibêje negihîştin encamekê; piştî Rûsya notayeke ku nêrînên xwe yên li ser sînor dida xuyakirin şand, ku bi piranî li ser dirêjahiya sînor disekini, îcar sefîrên dewletên navbeynkar mudexaleyî rewşê kirin û ji aliyê Tirkan re gotin ku, divê bêyî dereng bimînin hukmên hişkere yên Peymana Erziromê bi cih bînîn ku ew dihat wateya restorasyona statukoya sala 1848'an. Di Temûza 1913'an de Hakî Paşa ji bo gotûbêjkirina hin meseleyên girîng wek nûnerê taybet ê Porte çûbû serdana London'ê. Di vê demê de Sir Edward Grey, li ser sînorê ku hîn bêhtir li aliyê başûr dikeve Hakî Paşa îqna dike. Di rastiyê de ev sînor li gorî berjewendiyê Îranê bû û ev yek ji tiştê ku hikûmeta Osmanî dixwest bide Îranê, zêdetir bû.

Ev gotûbêjên çaralî, di 4'ê Sermawezê de li Stenbolê bi beşdariya nûnerên çar hikûmetan ve bi encam bû û protokoleke ku tê de xeta sînor bi kitekit hatibûn vegotin hat îmzekirin. Der barê Qoturê de protokola sala 1880'yî, careke din hat pesendkirin. Di herêmekê de, di çola Hewremanê ya li rojhilatê Helepçeyê de, di protokola ku di sala 1848'an de hatibû çêkirin de, kêmkirineke taybet hat kirin û guherînên ku heta sala 1905'an di rewşa fiîlî de hatibûn kirin (ku hemû li gorî berjewendiyên Îranê bûn) wek xwe hatin pejirandin.

Dê Komîsyona Diyarkirina Sînoran ji her çar nûnerên hikûmetan bihata avakirin û ji bilî erka xwe ya der barê diyarkirina sînoran de jî wê li gorî statukoya sala 1848'an erka kifşkirina hin qismên ku di protokolê de tam nehatine zelalkirin, bigirta ser xwe. Endamên komîsyonê yên Rûs û Ingilîz jî, bi desthilatiyên şexsî hatin arastin da ku karibin der barê hemû lihevnekirin û kêşeyan de biryarê bidin; û gava sînorên herêmekê hatin xêzkirin û kişandin pê de, bi tu awayî ew herêm wê nema bihata guhartin.

... Xebatên Komîsyona Diyarkirina Sînoran di Rêbendana 1914'an de li Şatul Erebê dest pê kir û di meha Kewçêrê de, piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn qewimî bi çend hefta li Araratê (Agiriyê) bi dawî bûn. Di zebtnameyên komîsyonê de çarçoveya peymanê bi awayekî pir bi kitekit tê terîfkirin û her

wiha koordînatên cografî yên her nuqteyê jî tên dayîn û ev bi awayekî bi kitekit tên diyarkirin; di gelek cihan de, nemaze li ser ax û erdên ku dibin sedema lihevnekirin û gelşên sereke jî heqên bikaranîna avê û çêrandinê dihatin terîfkirin."[41]

Wek tê zanîn, piştî destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekemîn, li ser sînoran gelek tevlihevî û nexweşiyên mezin çêbûn. Komara Tirkiyeyê ku paşê hat avakirin, ragihand ku ji ber ji aliyê Meclîsa Mebûsan ve nehatiye pesendkirin û ji aliyê sultan ve jî nehatiye îmzekirin ew ê protokola 1913'an wek belgeyeke siyasî nepejirîne.

Piştî ku di navbera Osmanî, Îran û Rûsyayê de sînor diyar bûn jî, ji bo çêregehan îhlalên sînoran û arîşeyan berdewam kir. Sînorên di nav Kurdan de tu carî bi awayê ku di peymanan de ne nehatine pejirandin. Edmonds di berhema xwe ya navborî de bi awayekî berfireh cih dide mijarê û wiha dawî li vegotina xwe ya der heqê nezelaliya sînoran de tîne: "Nedihat texmînkirin ku berî bîst sal derbas bibin dê her du alî jî îtirazî verastkirinên qerarlêdayî bikin û Cemiyeta Miletan digel du peymanên cuda û bi dehan referansên komîsyonan di sala sedemîn a Peymana Erziromê ya Duyemîn de jî hîn ji sînorê di navbera Îraq û Îranê de, ku 1500 kîlometre ye, 1400 kîlometre nehatiye diyarkirin."[42] Berxwedana çanda xurt û vesaziya herêmê ya ku her du alî bi hev ve girêdidan, sedama bingehîn a bêencam mayîna van teşebûsan bû. Ji bo ku her du alî ji hev bên qutkirin hîn wê gelek xebat li ser van sînoran bên kirin.

Li aliyê din, gotûbêj, konferansên navneteweyî û xebatên komîsyonên taybet ên ku 70 salan berdewam kirin wek ku li ser sînoran tu encamek nedabe xuya bike jî, bi demê re ji gelek tiştên ne li rê re zemîn amade kirin. Vê rewşa parçebûna bi du alî, yanê dabeşbûna Kurdistanê wek ku tiştekî sirûştî be, paşê kir ku bêhtir bê parçekirin û hêzên nû jî tevî vê dabeşbûnê bibin. Çawa be Kurdistan di nav du dewletan de hatibû parvekirin, hinin din jî karîbûn tevlî parkirinê bibûna!

Têkçûna Kurdistanê û têkçûna Dewleta Osmanî di navhev de ne. Di dawiya sedsala 19'an de Dewleta Osmanî hem ji aliyê aborî ve hem jî ji aliyê siyasî ve ketibû qonaxeke xerab û têkçûnê. Serhildanên ku li devêrên sînoran dest pê kiribûn, her ku diçûn çember tengtir dikir û nêzbûna hilweşînê bi awayekî vekiri dida xuyakirin. Reformên ku bi îlana meşrûtiyetê re hatibûn kirin jî, encamek nedan. Berevajî vê sererastkirina di ser re kir ku heyraniya

[41] C. J. Edmonds, bnb, r. 183-88
[42] C. J. Edmonds, bnb, r. 189

di miqabilî rojava de û bawernekirina bi xwe zêdetir bikin û her roj bêhtir bûn hêsîrê rojava. Giranbûna bacên ku dewletê dikir bi vî awayî deynên xwe bide, zêdebûna firarên leşkeriyê yên ji ber venegerîna kesên ku çûbûn leşkeriyê û hema hema hemû di şeran de miribûn, zerar û ziyandana van firarên leşkerî yên ku li çiyayên derdorê, dikir ku her biçe di nav gel de nerazîbûn pirtir bibe.

Di Şerê Balkanan de ku Kurd jî tevlî bûbûn Artêşên Osmanî têk çûn û Sirbistan, Yewnanistan, Bulgaristan û Qeredax jî ji dest çûn. A rast neteweperwerî ji destpêka sedsala 19'an pê de, dest bi ziyandayîna împaratoriyê kir. Çinku wê neteweyên cuda di nav xwe de dihewand û vê pirengiyê di qedemeyên rêveberiyê de jî xwe îfade dikir. Heta wê demê pirsgirêk pir bin jî dewlet li ser lingan bû. Lê têkçûna li Balkanan kir ku gel destê xwe ji dewletê bişo û di nav gelên ne Tirk de jî hêviya azadiyê zêdetir bibe. Di heman demê de bidestxistina berjewendiyan ên ne musilman biratiya mislimantiyê jî di nav Kurd û Tirkan de derxist pêş, hema hema li her bajarên Kurdan lêgerîn çêbûn û komele hatin avakirin.

Windakirina erd û tevliheviyên derketin kir ku Jon Tirk hîn zêdetir berê xwe bidin neteweperestiyê. Tesîrgirtina ji miliyet û sosyalîzmê, ku ev ji rojava hatibûn îtxalkirin, ji sînorên Ewrûpayê ber bi rojhilat ve herikî. Van rêbazên nû, herî zû bandor li civatên ne misilman ên ku bi Ewrûpiyan re di nav têkiliyên nêzik de bûn kiribû. Esas di van rojên ku hestên neteweperweriyê derketibûn pêş de serdemeke nû dest pê dikir, serdemeke ku qirkirin û gelek êş wê bi xwe re bianiya. Di van rojan de rewşenbîrên Kurd, ji ber ku zanibûn ev yek rê li ber parçebûnê vedike li dijî Tirkîtiyê derketibûn. Lê rê li ber vebibû û veger nema hebû.

Ji sala 1912'an bi şûn de, ji ber ku dev ji Osmanîtiyê tê berdan û Tirkkirin tê tercîhkirin, têkçûna şeran, rêvebirina xerab, nelirêtî gel bêzar dike û ruhê Osmanîtiyê ber bi tunebûnê ve diçe. Neteweperweriya Kurdan jî di vê rewşê de her diçe xurtir dibe, dengên Kurdan Kurdistanê derbas dike û belav dibe.

Kurdên xwende û yên ku di gelek mewkiyên girîng de cih girtine, tevî Kurdistanê li bajarên mezin ên mîna Stenbol û Qehîreyê jî xwe bi rêxistin dikin. Di weşanên xwe de neteweperweriya Kurdî îfade dikin, rê didin ber gel û ji bo rizgariya Kurdistanê jî dikevin nav lebat û hewldanan.

Stenbol, yek ji navendên herî çalak a Kurdan e. Abdullah Cevdet ê ku xizmetê wî yên mezin ji neteweperweriya Kurdî re dibû li Stenbolê 'Mala Îçtihadê' vekiribû û ew der bûbû yek ji navendên gîring a ku rewşenbîrên Kurd lê vedihewiyan. Kovara Îçtihadê di sala 1904'an de dest bi weşana xwe

kiribû, hejmarên pêşî li Cenewre û Qehîreyê derketibûn û heya 358 hejmar wê hatibûya derxistin. Di sala 1908'an de li Stenbolê rojnameyên 'Şerq û Kurdistan', 'Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi' (Rojnameya Hevkarî û Pêşketina Kurdan) hatine weşandin. Di sala 1909'an de, li Stenbolê 'Amid-i Sevda' û li Amedê jî 'Peyman'; di sala 1913'an de li Stenbolê 'Rojî Kurd', 'Yekbûn' û 'Hetavî Kurd' derketin. Di 1918'an de li Stenbolê kovara 'Jîn' û di 1919'an de jî rojnameyên 'Kurdistan' û 'Jîn' dest bi weşanê kirin. Rojnameya Kurdan ya ewil 'Kurdistan' di sala 1898'a de ji aliyê Mîr Miqdat Midhat Bedirxan ve li Qahîre dest bi weşanê kiribû.[43]

Kurdan bi awayekî fermî herî zêde li Stenbolê rêxistin ava kirin. Di wê dewrê de rêxistinên ku li Stenbolê hatine avakirin ev in:

1) Komeleya pêşî a Kurdan Komeleya Vîna Zexm a Kurdistanê (Kürdistan Azm-i Kavi Cemiyeti) di 1900'î de ava bû.

2) Komeleya Piştgirî û Pêşketina Kurdan (Kürd Teavün ve Terakki Cemiyeti) di sala 1908'an de di serdema meşrûtiyeta 2'yan de tê avakirin û di sala 1909'an de tê girtin. Li Kurdistanê rêxistineke xurt û hêzdar e.

3) Komeleya Berbelavkirina Perwerdeya Kurdî (Kürd Neşr-i Maarif Cemiyeti)-1910; dibistana meşrûtiyetê vedikin û bi Kurdî perwerdehiyê dikin.

4) Komeleya Hezkerên Kurdistanê (Kürdistan Muhiban Cemiyeti)-1912

5) Komeleya Xwendekarên Kurd -Hêvî (Hêvî-Kürd Talaba Cemiyeti)-1912. Bi navên 'Rojî Kurd' û 'Hetavî Kurd' du organên weşanê derdixin. Li Erzirom, Diyarbekir û Swîsreyê (Lozan) jî şaxên wê hatine vekirin.

6) Komeleya Xebatên Qanûnî ya Kurdistanê (Kürdistan Teşr'i Mesai Cemiyeti)-1912

7) Komeleya Pêşketina Kurdistanê (Kürdistan Teali Cemiyeti)-1918

8) Komeleya Rêxistina Civakî ya Kurdî (Kürd Teşkilat-i İçtimaiye Cemiyeti). Kesên ku ji Komeleya Pêşketina Kurdistanê vediqetin, wê ava dikin.

9) Partiya Neteweyî ya Kurdî (Kürt Millet Firkasi), kesên ku ji Komeleya Rêxistina Civakî ya Kurdî vediqetin, wê dadimezirînin.

10) Komeleya Pêşketinê ya Jinên Kurd (Kürd Kadinlari Teali Cemiyeti)-1919

11) Komeleya Perwerdehî û Berbelavkirina Weşanan a Kurdan (Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti)- 1919

[43] Naci Kutlay, bnb, r. 75



*Cemiyeta Kurd Tealî ya li Diyarbekirê*[44]

Rêziknameya Komeleya Pêşketina Kurdistanê di 2'yê Adara 1919'an de dikeve destê karbidestên Ingilîz, paşê Qerargeha Giştî ya li Stenbolê wê dişîne Buroya Şer a Londonê. Belgeya Ingilîz ya bi mêjûya 17ê Hezîrana 1919'an ku di kitêba bi navê 'İ. B. Kürdistan (Di Belgeyên Ingilîzan de Kurdistan)' de cih digire dide xuyakirin ku komele ji bo wê kêlikê di bin mandeya Brîtanyayê de ji bo Kurdistaneke serbixwe dixebite, her wiha propagandaya wê ji aliyê Rojnameya Serbestî ve tê meşandin û hatiye nivîsandin ku, tê texmînkirin hejmara endamên wê li dora deh hezarî ye û ev jî bi qasî nîvê nifûsa Kurdan a li Stenbolê ye. Vedibêje ku navenda wê li Stenbolê ye û şaxên wê yên mihelî jî li Amed, Dêrsim, Sêrt, Xarpût û Meletiyê ne.

Haya Ewrûpiyan bi hemû awayan ji rewşê heye, sekin li wan tune ye. Ji xwe bi gelek awayan rehê xwe berdabûn nava Dewleta Osmanî. Di rehberdanê de di nav hêzên Ewrûpî de hemberî jî heye. Di serê 1900'î de Almanya, piştî Brîtanyayê xwedî stola duyem a mezin a dinyayê bû û li gorî xwe di warê bidestxistina mêtingehan de dereng mabû. Dilê wê dibijya Dewleta Osmanî. Deynên ku di dema Şerê Balkanan de dabû wê, li deynên ku berê dabûyê zêde bûbû û bi vî awayî Osmanî pir deyndarê wê bûbû. Ev dikir ku dilxweş bibe. Xeyal dikir ku bi alîkariyên leşkerî, alîkariya personelan û bi çêkirina rêhesinan rehê xwe berde nav Împaratoriya Osmanî.

[44] M. M. Bruinessen - Agha, Shaikh and State, on the social and political organization of Kurdistan

Fikara çêkirina rêhesinan a di erda Osmaniyan de ya ku wê xwe bigihanda Kendava Besrayê reqabeteke mezin di nav erkedarên Ewrûpî de li dar xistibû. Îmtiyaza pêşî Şirketa Rêhesinan a Rojhilat ku ji aliyê 1888 Deutsche Bank a Almanan ve hatibû damezirandin, bi dest xist. Peymana ku di sala 1903'yan de hatibû nûkirin, îcar rasterast bi Rêhesina Bexdayê re eleqedar bû û destûr dida şirketê ku li her du teniştê şerîta riya hesin di erdek bi qasi 20 km çarçik de, ew dê karibe lêgerîna maden, petrol û kolanên arkeolojîk bike.

Ingilîz û dewletên Ewrûpî ên din jî ketibûn nav gelek karên hundirîn ên Osmanî. Liv û lebatên gelan ên ji bo serxwebûnê ji xwe re bi kar dianîn, li hin deveran jî rê ji wan re vedikirin da ku lez bidin têkçûn û hilweşîna Dewleta Osmanî. Têkiliyên germ ên Almanan û Osmaniyan hikûmeta Ingilîz ditirsand û difikirîn ku riya diçe Hindistanê dikeve talûkeyê. Riya hesin a Tengava Stenbolê û Kendava Besrayê bi hev û din ve girê dida, bi navekî din Xeta Berlîn û Bexdayê bû. Vê yekê kir ku her du hêzên mezin ên sedsala 19'an Îngiltere û Rûsya bi hev re îtifaqê bikin. Maneya îtifaqê jî, ji bo dewletên Ewrûpî hatina dema parvekirina erd û zengîniyên Osmaniyan bû, ku wan ji zû de çav berdabûn wan.

A rast yekîneyên sîxuriyê yên Ingilîzan ku ji efserên siyasî, arkeolog û rojnamegeran pêk dihatin, pir ji berê ve li ser kar in. Çalakiyên misyoneneran ên li erdên Osmaniyan, ku di sedsala 18'an de dest pê kiribû, ku em wan wek merheleya haziriya bidestxistina herêmê dibînin, di serê salên 1900 î de bi awayekî pir hêsan û aktîf dihatin kirin. Gelek erkedarên siyasî û arkeolog ku ji destpêka sedsala 19'an de eleqeyeke mezin nîşanî Kurdistanê didan, qul bi qul li herêmê geriyabûn û cografya xistibûn qeydiyan.*

Serpêhatiya E. B. Soane ji bo çalakiyên li herêmê, nimûneyeke baş e ku ev kes yek ji erkedarên siyasî yên Ingilîzan e û paşê jî wek şêwirmendê Şêx Mehmûd Berzencî hatiye tayînkirin. Efserê siyasî Edmonds ê ku salên piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn li Kurdistanê bû dibêje, nîveka sedsala 19'an ji bo keşf û lêkolînên li Rojhilata Navîn serdema zêrîn bû. Li gorî vegotinên Edmonds serpêhatiya Soane bi kurtasî wiha ye:

"Wek Îraniyekî xwe girêdide û di 1909'an de derdikeve seyahetê. Bi kelekê li ser Çemê Dîcleyê ji Diyarbekirê tê Mûsilê, ji vir jî diçe Hewlêr (Erbîl), Kerkûk û Silêmaniyê. Di dema ku li Helepçeyê dimîne, geştek ji bo Biyareyê jî dike ku ew li aliyê Hewremanê dikeve. Di vegerê de li Silêmaniyê

* Kolan û vekolanên arkeolojîk ku li erdên Osmanî, Kurdistan û Başûrê Mezopotamyayê di destpêka salên 1800'î de dest pê kiribûn, di salên 1900'î de zêdetir bûbûn. Berhemên dîrokî yên ku di encama kolanan de dihatin derxistin, bi piranî dişandin welatê xwe. Bi saya van kolanan nêrîn û zaninên der heqê dîrok û mêjûyê de pir hatin guhartin û berhemên dîrokî yên ku hatine peydekirin gelek muzeyên dinyayê, dewlemend kirine.

disekine, paşê jî di ser Kerkûkê re derbasî Altinkopriyê dibe û ji vir jî bi kelek û qeyikan ji Çemê Zapê û Dîcleyê ber bi jêr ve dadikeve û digihîje Bexdayê. Soane gelek meteryalên dîrokî jî der barê deverên ku di wan re derbas bûye berhev kirine. Tecrûbeyên ku li herêmên Kurdistana Îranê bi dest xistine, ji bilî zimanên Ewrûpî yên ku dizanîn, serdestiya wî ya li ser Farisî û Kurdî û ji ber ku hemû geşt û guzarên xwe wek kesekî misliman kirine, agahî û zanyariyên ku wî bi xwe veguhastine bi qedir dike.

"Gava Soane digihîje Helepçeyê, li gorî adetên deverê, bê tirs û bê pirs dikeve mala Tahir Begê lawê Adîle xanima bî -pîreka Osman Paşa bû ku ew yek ji girêgirên Eşîra Cafan bû û wî qeymeqamtiya Helepçeyê kiribû- yê mezin û xwe wek katib û bazirganekî Îranî pê dida naskirin. Li ser fermana Adîle Xanimê, serê pêşî ew li mala Tahir Beg a qata jorîn tê bicihkirin. Paşê jî li qata jêr li odeyeke Adîle Xanimê bi cih dibe û bi demê re katibiya Farisî ya Adîle Xanimê dike. Serdar (bînbaşî) Soane di dema seyehata xwe ya li Kurdistanê de, navê xwe yê rast veşartiye û xwe wek Xulam Huseyn daye naskirin. Wezîfeyên ku dispartin wî, bi awayekî baş pêk dianîn û bi Tahir Beg re jî têkiliyên baş datanî."

Ji çavkaniyan yek jê dinivîsîne ku Tahir Beg ji hin lebt û tevgerên Xulam Huseyn ketiye şikê û rojekê Tahir Beg gazî Xulam Huseyn kiriye, jê re gotiye ku ji wî gumana dike û bi vî awayî nasnameya wî ya rastîn derketiye holê. Edmonds jî diyar dike ku 'Di nivîsên Soane de tu daxuyaniyeke ku ew deşîfre bûye nîn e û wî nivîsandiye ku Adîle Xanimê jê xwestiye ku ew bibe perwerdekarê Farisî ji her du lawên wê yên xort re û nexwestiye ji ba wan here.'

Soane paşê ji aliyê Şirketa Petrolê ya Anglo-Persiyan ve wek xebatkar tê girtin û di 1914'an de, dibe serkarê operasyonên sondajên li Çiyayê Surçê ku li nêzî Xaneqînê dikeve.

Soane ligel hin nûnerên Ingilîzan ên li Iraqê tê Besrayê, ku ew kes piştî şer qewimî bû ji aliyê Tirkan ve hatibûn girtin û paşê ew şandibûn Behra Spî û berdabûn. Di meha Tîrmehê ya heman salê de, ligel du tabûrên ji Sinifa Siwariyan a Hindistanê ya 23'an ve bi nasnavê alîkarê efserê siyasî wî dişînin Dizfulê. Ev sinifa siwarî li bakurê rojavayê Îranê ligel misyona şerê pîroz ê Tirk û Almanan, gelek komên mezin ên bextiyariyan ji holê radike, li wê herêmê hêz û kartêgeriya Ingilîzan rûdinîne û wê hêzê jî li şatoya ku arkeologên Frensî li Şûşê çêkirine, bi cih dike...

Soane di Adara 1917'an de piştî ketina Bexdayê, ji bo ku bi Kurdan re bikeve nav têkiliyan, diçe Xaneqînê. Piştre jî tayînî şûna Neol dibe ku ew li Silêmaniyê şêwirmendê Şêx Mehmûd Berzencî bû.[45] Soane ji gelek mîsyonerên ku ew ber bi rojhilat ve diherikîn tenê nimûneyek e.

[45] C. J. Edmonds, bnb, r. 206



*Adîle Xanim, malbata wê û jina Soane 1920*[46]

Ev reqamên li jêr hin rewşan têra xwe diyar dikin. Beriya Şerê Cîhanê yê Yekemîn ne bi gelekî hejmara nefermî ya dibistanên katolîk ên Frensiyan ên li Împaratoriya Osmanî 500, dibistanên amerîkiyan 675 û yên Ingilîzan jî 178 e. Li dibistanên Frensiyan 59. 414, li yên Amerîkiyan 34.317, li yên Ingilîzan jî 12.800 xwendekar hene.[47]

Beriya şerê mezin hikûmeta Stenbolê hema hema di bin destê Ewrûpiyan de bû. Di nav Ewrûpiyan de hevalbendî pêk hatibû, li ser projeyên dabeşkirina erdên Dewleta Osmanî tifaqî bi pêş xistibûn û îcar ji şer re amade bûn. Tu planeke Dewleta Osmanî ya li dijî vê yekê tune ye û dema şer dest pê dike ber bi şer ve hatiye kişkişandin. Pêşengên Cemiyeta Îtihat û Tereqiyê Talat, Enwer û Cemal Paşa, ku wan di sala 1908'an de bi derbeyê Sultan Abdulhemîd ji text xistibûn û îqtidar kiribûn destê xwe û wan sultanê ku anîbûn cihê wî jî bêtesir hiştibûn. Dema di 1914 an de Şerê Cîhanê ya Yekemîn dest pê dike bêyî xebera sultan, li ser 5 milyon zêrê Ingilîz bi Almanan re li hev tên û artêşa Osmaniyan dajon cepheyê şer. Ne artêşa wan û ne xezîneya wan ji vê re amade ye. Di dawiya şer de wê welatekî parvebûyî û xelkekî perîşan bimîne.

[46] Susan Meiselas-Kurdistan, In the Shadow of History
[47] Roderic H. Davison, Osmanli Türk Tarihi (1774-1923), r. 235

Gava dikevin Şerê Cîhanê yê Yekemîn, di serî de seferberî tê îlankirin. Li Împaratoriya Osmanî, di dema şer de nêzîkî 2 milyon û 850 hezar kesî distînin bin çek û sîlehan. Nêzîkî 500 hezar leşker tenê beşdarî Şerê Çeneqeleyê kir, di vî şerê ku heşt meh û nîvan dom kir, bi sed hezaran leşker mirin. Di dawiya şer tevî de, di artêşa Osmanî de, ku ji çar aliyan ve ketibû şer, hejmara kesên di bin çekan de mabûn li derdora 560 hezar kesî ye.

Bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn re hêzên Ewrûpayê biavantaj dest bi dabeşkirinê dikin, belkî jî ji tiştên ku hêvî dikirin bêhtir rihet ev çêbûbû. Dewleta Osmanî ya ku demeke dirêj a bi qasî sed salî ji bo bigihîje serdemê li ber xwe dabû, lê bi ser neketibû û di her warî de bêhêz ketibû. Li aliyê din ji ber ku baweriya wê ya bi xwe şikestibû, gelşên di îqtidarê de û pêla neteweperestiya ku wê demê xurt bûbû avantaj didan hêzên miqabil.

Kurdistana ku bi qasî sed salî şer lê qewimîbûn rojên zor û dijwartir bi ser de dihatin. Di şerê di navbera salên 1914'an û 1918'an de, Kurdan di artêşa Osmaniyan de cih girtin, welatê wan li ber lingan çû û gelek windayî dan.

Ji destpêka salên Şerê Cîhanê yê Yekemîn ve, Kurdistan dibe cihê şerên gur û şidyayî. Di cih de Rûsya dadikeve Bakurê Kurdistanê, ji ber ku ew bi sînorê wê ve bû. Di destpêka şer de bi Enver Paşa ve girêdayî 'Teşkîlat-i Mahsusa' ya xwedî terxana veşarî hatibû avakirin. Li rojhilat ji bo çeteyên vê rêxistinê Kurdên mêr û jêhatî hatibûn hilbijartin û êrîş biribûn ser Rûsan. Li dijî vê yekê jî Artêşa Rûs a nîzamî êrîşî wan kiriye, gelek gundên Kurdan bi temamî wêran kirine û şêniyên wan jî kuştine.

Ji aliyê din ve di destpêka şer de yekîneyên siwarî yên Kurdan ligel mufrezeya Osmanî dikevin bajarê Sablaxa Îranê. Kurdên li Kurdistana Îranê jî beşdarî wan dibin û li Miyanduavê hêzên Rûs têk dibin. Paşê bi ser Tewrêzê de diçin. Rûs mecbûr dimînin ku vê derê biterikînin. Bajar tê dagirkirin û waliyê giştî yê bajêr ê Îranî direve diçe Tehranê (Berfanbar 1914). Lê bi êrîşeke miqabil, leşkerên Osmanî û Kurd ji Tewrêzê tên derxistin.

Ji ber ku Kurd li ser sînor in, xwedî posîzyoneke pir cihê ne. Ew di navbera dewletên ne aîdî xwe de ne. Pirî caran şer, şerê du dewletên ku di sînorê hev de ne, lê vê derbê şer a rast şerê Almanan e. Yanî tevlihevî pirtir e. Jixwe sînor dike ku bi her du aliyan re têkilî bên danîn û ew têkilî bên bipêşxistin. Îcar ku li aliyê din ê sînor kesên ji te hebin, ji sînor û wêde ew qas ji te ne dûr e. Heta carinan têkiliyên ligel aliyê din wisan dikevin nav hev û din ku mirov qet xem naxwin bê li kîjan aliyî ne. Rewş carinan wan bi vî aliyî ve carinan jî bi wî aliyî ve dibe û tîne. Ya herî girîng jî gava êrîşek bê dewleta ku lê yî, hedefa pêşî ew in, yanî xelkê di sînor de ji dewletê re dibe sîper. Bi kurtasî

Kurd di vê serdemê de jî dibin dîwarê her du aliyan; dîwarekî ku her du aliyan diparêze û dibe aîdê her du aliyan.

Ji ber ku bi sed salan e di sînor de ne, Kurd xwedî hinek rewşên taybet in. Wekî ku beriya sedsala 20'an bûye û dê paşê jî bibe, Kurd di nav her du hêzên li ser sînorên xwe ne cih girtine û carinan jî hevalbendê xwe guhertine. Rewşa Serokê Eşîra Şikakan Smeîl Axa (Simko Axa) ku di dema Şerê Cîhanê ya Yekemîn û bi dû de ketiyê, ji vê yekê re nimûneyek e. Di pêş de em ê li ser tevgera Simko Axa bisekinin.

Wek ku wê di beşên din de jî mînakên wan bên dayîn, di gelek şerên Osmanî û Rûsan de eskerên Kurd di nav her du aliyan de cih girtine. Celilê Celîl, ji bo dema Şerê Qirimê (1853-1856) van tiştan dinivîse: "Du alayî ji Kurdên dilxwaz hatibûn pêkanîn. Alaya pêşî Cafer Axa û ya diduyan jî Ahmed Axa îdare dikir. Alaya Kurd a pêşî ku ji 500 kesên siwar pêk dihat, diket nav binyada yekîneya Aleksandropolê. Di alaya diduyan de jî, 100 êzîdiyên siwar hebûn. Alayên Kurd rasterast di bin çavdêriya serheng (albay) Loris-Melikov de bûn. Ew ji bo Rûsyayê ne tenê leşker bûn, her wiha xwedî girîngiyeke siyasî jî bûn. (...) Qebîleyên mezin ên Kurdan ku li ser sînorê Rûs û Tirkan bûn; Zîlan, Heyderanî, Sipkî û Cemaldînî bûn. Di destpêka şer de ji qebîleyên Cemaldinî, Milyanî û Bizikî nêzî 4-5 hezar siwar tevî artêşa Osmaniyan bûbûn."[48] C. Celîl di berdewamiya vegotina xwe de dibêje ku yekîneya siwarî ya Kurdan a di nav artêşa Osmaniyan de piştî têkçûna artêşê û reva wan, bi dû wan dikevin wan talan dikin û ligel mal û çekên ku ji talanê anîne, vedigerin qişleya xwe.

Wek di Şerê Qirimê de, di vê cenga Rûsya û Osmanî de, dîsan Kurdan di nav hêzên her du aliyan de jî cih girtine. Di serê Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, yekîneyên Kurd ên ku ji nav refên Rûsyayê derbasî nav refên Osmaniyan bûne û her wiha ji nav refên Osmaniyan çûne nav refên Rûsyayê jî hene. Gava di sala 1915'an de artêşên Rûs dikevin Bakurê Kurdistanê, hin ji Alayên Hemîdî dev ji terefê Osmanî berdane û alî Rûsan kirine, lê Ermenî ji vê yekê nerazî ne; bi xerabî nêzî Kurdan bûne û ev yek jî bûye sedema acizbûna Kurdan. Ev qas tevlihevî wek ku me li jor jî îfade kir ji ber cihgirtina di sînor de ye.

Di vê demê de birakujiya ku di nav Kurd û Ermeniyan de hatiye kirin êşeke mezin li dû xwe hiştiye. Der heqê mijarê de divê em hinekî bi paş de herin. Peymana Berlînê ya 1878'an qebûl dikir ku li wilayetên rojhilat ên ku Ermenî lê diman, reform bên kirin. Bi vê peymanê Dewleta Osmanî mecbûr

[48] Prof. Dr. Celîlê Celîl, bnb.

maye ku bi Ermeniyan re dest bi gotûbêjên li ser reforman bike. Rûsya dixwest waliyên Rûs û Ewrûpî bên ser wilayetên rojhilat, ji ber wilo ve pakêta reforman a ku Dewleta Osmanî pêşniyaz dike red kiriye.

Di Adar û Nîsana 1909'an de kuştin û bûyerên Ermeniyan ên li Edeneyê ku di wan de bi hezaran Ermenî hatibûn kuştin, kir ku ewlenebûna di navbera Tirk û Ermeniyan de zêdetir bike. Nexweşiyan dom kir û di meha Sermaweza sala 1912'an de katolikosê Ermeniyan ku li Eçmîadzînê bi cih bûye (rayedarê herî mezin ê dînî) serî li Rûsyayê da û ji wan xwest ku Ermeniyên di bin serweriya Osmanî de dijîn bikevin bin mihafizeya wan.

Ji ber zêdebûna nexweşî û gelşên li herêmê ya di bihara sala 1913'an de, sefîrê Tirkan ê Londonê di 24 ê Nîsana 1913'an de notayek pêşkêşî wezareta Ingilîzan kir û pêşniyaz kir ku, bila di bin fermandariya Ingilîzan de hêzeke jendirmeyan li şeş wilayetên rojhilat bê avakirin û ji bo ku ji waliyan re bibine alîkar jî 'mufetîşên' Ingilîz bên tayînkirin. Îngiltereyê berjewendiyên xwe yên li Mezopotamyayê girîngtir dît û ev wezîfe dewrî Rûsyayê kir.

Li ser pêşniyaza Rûsan, da ku mijarê gotûbêj bikin, di 3'yê Tîrmehê de li Stenbolê konferansek bi beşdariya sefîrên hêzên mezin hat lidarxistin. Li ser pêşniyaza hevpar a Alman û Rûsan biryar hat stendin ku du mufetîşên giştî yên Ewrûpî tayîni wilayetên rojhilat bên kirin û Ermenî jî li meclîsên wilayetan bi rêjeya %50 bên temsîlkirin. Di pey xwedayîna erdê û nîqaşên dûvdirêj, Bab-i Alî (Hikûmeta Osmanî) ev metna hanê di 8'ê Sibata 1914'an de qebûl kir.[49]

Dewleta Osmanî di bin van zextan de ji aliyekî ve hin heq didan Ermeniyan, ji aliyê din ve çek didan Kurdan û propagandaya li dijî nemislimanan gurtir dikir. Bi fitneya hêzên mezin, gelên bira yên mezlûm ku di rojên reş û xweş de bi hev re jiyabûn, wê hevdu bikuştina û di vê demê de birînên ku di demên dirêj de neyên girtin wê di dîrokan wan de çêbûbûna. Jihevqetîna Kurd û Ermeniyên ku bi hezar salan di nav hev de bûn ne mimkun bû. Lê ji bo polîtîkaya Rûsya û Ewrûpiyan ku wan çav berdabûn Rojhilata Anatoliyê û Mezopotamyayê neteweperweriya Ermeniyan navgîneke bijarte bû. Ji bo wilo ev gelekî bi pêş xistin. Çavê wan ne tenê di axa Dewleta Osmanî de hebû. Niyeta Rûsya û Brîtanyaya Mezin hebû ku bikevin nav Îranê û peymana ku di 1907'an de hatibû îmzekirin jî derfet dida van her du dewletan ku Îranê di navbera xwe de par ve bikin. Ligel ku Brîtanyaya Mezin herêmên petrolê yên li başûrê Îranê dagir kiribû, Rûsyayê jî Azerbeycan xistibû bin hukmê xwe û başûrê Hezarê jî tevî nav qada xwe ya kartêkirinê kiribû.

[49] Stefanos Yerasimos, Milliyetler ve Sınırlar, r. 132

Di dawiya Temûza 1914'an de, Partiya Taşnakê ku serkêşiya tevgera netewperweriya Ermeniyan dikir, li Erziromê kongreya xwe ya heştemîn li dar xist. Di dawiya kongreyê de heyeteke ji giregirên Jon Tirkan serdana temsîlkarên Ermeniyan kir û ji wan xwestin ku ew li dijî Rûsan beşdarî şer bibin. Di gerewa vê yekê de jî pêşniyaz kirin ku dê li Qefqasan cihên Ermenî lê dijîn û li hin herêmên wilayetên Erzirom, Wan û Bedlîsê otonomiyê bidine wan. Nûnerên Taşnakê ragihandin ku ew ê di şer de ne hevalbendê tu aliyî bin. Heman rojê pêşewayê dînî katolîkosê Eçmîadzînê serî li waliyê Qefqasê Vorontzov-Daşkov da, bi kelegermî bang kir ku ew Ermeniyan bike bin mihafizeyê, ew statuya otonomiya Ermeniyan a ku hatiye qebûlkirin biguhêre û waliyekî xiristiyan ê ku ji hêla Rûsyayê ve bê tayînkirin bişîne ser şeş wilayetên yekbûyî. Dîsan heman rojê Vorontzov-Daşkov û endamên Konseya Neteweyî ya Ermeniyan a li Tîflîsê, bi şaredarê bajêr Hatisyan re hevdîtinê pêk dianîn û jê re digotin ku heger şeş wilayetên rojhilat ên Osmaniyan bi alîkariya Ermeniyan bên bidestxistin dê bê îlankirin ku li vir otonomiya Ermeniyan tê naskirin.[50]

Li ser vê yekê, heta destpêka şerê Osmanî û Rûsan yê 1'ê Sermawezê, ji Ermeniyên di bin serweriya Osmaniyan de çar yekîneyên ji dil ên ku her yek jê ji hezar kesî pêk dihat, tên avakirin. Hefteyek berî destpêkirina pevçûn û êrişan, di 24'ê Kewçêra 1914'an de yekîneya Ermeniyên dilxwaz ji Îdirê ber bi Wanê ve bi rê dikeve, ev yekîne di 1'ê Sermawezê de ji hêla artêşa Osmanî ve tê rawestandin.

Yekîneyên Ermenî, ji ber ku cih nas dikirin wek yekîneyên pêşeng tên bikaranîn, lê gava bi taybetî ew di nuqteyên girîng de li hemberî Kurdan tên bikaranîn, Osmanî jî ji Kurdan sêzdeh hezar siwariyî dixe nav tevgerê. Rûsan, Ermeniyên di bin serweriya xwe de xistine nav artêşa xwe û Osmaniyan jî Kurd û Ermeniyên ku di bin serweriya wê de ne xistine nav artêşa xwe. Wek ku berê jî hat diyarkirin, Kurdên ku di nav artêşa Rûsan de cih digirin jî hene û paşê wê hinek Kurdên di nav artêşa Osmanî de ne jî derbasî nav artêşa Rûsan bibin. Kurd û Ermeniyên ku ji nav artêşa Osmanî firar kirine da ku gund û malbatên xwe biparêzin jî hene. Yanî, ji serî heta binî rewşeke kaos heye.

Ligel yekîneyên jidil ên Ermeniyan, alaya Rûs di 24'ê Sermawezê de digihîje Elbakê. Ermeniyên ku ji vê firsendê îstifade dikin, malên mislimanan talan dikin. Artêşa Osmanî bi êrîşeke miqabil, bajêr ji destê wan distîne û piraniya Ermeniyan jî dikujin.

---

[50] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 282

Dewleta Osmanî ya ku nikaribû artêşa xwe xwedî bike, li her aliyî rastî ziyan û windahiyên mezin tê. Li gor çavkaniyên berê artêşa Osmaniyan ya ku ji 120 000 leşkerî pêk tê, gava di meha Berfanbarê de ber bi Sarîqamîşê ve bi rê dikeve, yekîneyên Rûs û Ermeniyan vedikişin, lê herekat dibe sedemê mirina 90 hezar leşkerî.* Herekata Sarîqamîşê (Sermawez- Berfanbar 1914) bi xetayên wisan tijî ye ku aqil qebûl nake. Di vî şerê ku di zivistana xedar de dest pê kiriye, leşker ji ber birçîbûn, serma û nexweşiyan di demeke kin de dişikên. Sefera Misirê jî ku di heman rojan de dest pê bûye, ji ber kêmbûna xwarin û cebilxaneyê û riya ku wê pê de herin, tam macerayek e. Li seriyê din di 1915'an de li Çeneqaleyê zêdeyî 250 hezar leşker şehîd ketine.

Her roja ku diçe, hejmara firarên eskeriyê jî zêdetir dibe. Ew jî bi piranî êrîşî gundan dikin û wan talan dikin. Ji aliyê din ve di Sibata 1916'an de Rûsan erdên Îranê dagir kirin. Di pey de artêşa Rûs di 16'ê Sibatê de Mûş û Erzirom, di 18'ê Nîsanê de Trebzon û di 25'ê Tîrmehê de jî Erzingan dagir kirin. Yekîneyên Ermeniyan, ku di 29'ê Nîsanê de ji Erîwanê bi rê ketibûn, di 18'ê Gulanê de ketibûn Wanê. Kurdên ku ji ber êrîşên artêşa Rûsan neçar mabûn koç bikin, daketina wan a ber bi başûr ve qefle bi qeflê dom kir û ji ber mercên zor ên zivistanê û birçîbûnê, di riyan de piraniya wan mirin, kêm kes filitîn.

Di nav gel de li ser wê demê hin stran hene ku demê tîne ber çavê mirov. Minakek jê ev e:

Hey lê Gulê Gulê Gulê

Hey lê Gulê Gul dêranê
Ûris hatin ji Qaxizmanê
Hey lê Gulê Gul dêranê
Mosqof hat ji Qaxizmanê
Li te mihacira Behra Wanê

Ûris hatin çog şikandin
Wey lê Gulê Gul dêranê
Mosqof hatin çog şikandin
Li te mihacira Behra Wanê
Gule li ser gulê barandin
Hey lê Gulê Gul dêranê

** Heta demek berê di hin çavkaniyan de hejmara miriyên li Sarîqamîşê wisan dihatin dayîn. Lê belê di van demên dawî de, li ser vê mijarê pir hat sekinandin. Bernameyên televizyonan hatin amadekirin û di wan de hat diyarkirin ku ji leşkerên ku di nîvê zivistanê de bi kincên havînê, bi pêlavên qelişî û bi zikê birçî şandine Sarîqamîşê 130 hezar kesî jiyana xwe ji dest daye.*

Gule li ser gulê barandin
Li te mihacira Behra Wanê
Kum û koloz gindirandin
Hey lê Gulê Gul dêranê
Kum û koloz gindirandin
Li te mihacira Behra Wanê

Ûris hatin ser bêndera
Hey lê Gulê Gul dêranê
Mosqof hatin ser bêndera
Li te mihacira Behra Wanê
Tev qazanan û eskeran
Hey lê Gulê Gul dêranê

Tev qazanan û eskeran
Li te mihacira Behra Wanê
Hic (hebitandin) xistin nava Heyderan
Hey lê Gulê Gul dêranê
Hic xistin nava Heyderan
Li te mihacira Behra Wanê

Ûris hatin û rûniştin
Hey lê Gulê Gul dêranê
Mosqof hatin û rûniştin
Gule li ser gulê maliştin
Hey lê Gulê Gul dêranê
Gule li ser gulê maliştin

Li te mihacira Behra Wanê
Box û beranên me kuştin
Hey lê Gulê Gul dêranê
Box û beranên me kuştin
Li te mihacira Behra Wanê[51]

[51] Di sala 1974'an de li herêma Amûdê ji nav eşîra Gabaran Salihê Heydo, ev ji bavê xwe bihîstiye û nivîsandiye.

Ji bo sirgûnkirin û destdanîna li ser malên Ermeniyan Îtihad û Teraqî ya di Dewleta Osmanî de li ser hukim biryarnameyek derxist. Tê de hatibû hişkerekirin ku, heger gelê herêmê Ermeniyan biparêze wê ji aliyê karbidestên dewletê ve bên îdamkirin û malên wan jî wê bên şewitandin. Di encama vê biryarnameyê de hema bibêje li her derê dest danîn ser malên Ermeniyan, hin ji wan hatin kuştin û hin jî hatin mişextkirin. Di vê demê de bi sed hezaran Ermenî, ji ber sedemên muemeleya xerab, birçîbûn û nexweşîyên biveketin li ser riyan mirin.

Osmaniyên ku dîn derxistin pêş û Kurd ber bi xwe ve kişandin, hêdî hêdî peravên Gola Wanê dîsa bi dest xistin. Di 4'ê Tebaxê de Rûs û Ermenî mecbûr man ku ji Wanê vekişin. Di vê rewşê de xiristiyanên din jî bûbûn hedef û aqûbeta Ermeniyan hatibû serê wan.*

Mûş di 6'ê Gelawêjê de ji Rûsan tê stendin. Di wê dema ku warê şer geh diket destê Osmaniyan û geh jî diket destê Rûsan, %75 nifûsa esker û sivîl tune bû, yan jî koç kir. Di dawiya sala 1916'an de êdî xelkekî perîşan û şerpeze, bajar û gundên wêran û artêşeke xelasbûyî mabû.

Di destpêka 1917'an de gava li Galîçya, Dobrûca, rojhilata Anatoliyayê, Îran, Sîna, Iraq û Hîcazê şer tê kirin, hikûmeta Osmanî bi awayekî bêçare diperpite. Temenê eskeriyê derdixin 50 salî, dikeve pey 300 hezar firarên eskerî yên li çiyayan, xortên ku hîn temenê wan negihaye eskeriyê dixin bin sîleh û dişînin leşkeriyê.

Di berdewamiya şer de digel ku birçîbûn û sefaleta di artêşê de hişkere tê dîtin û ev dê bibe sedema têkçûn û nemanê jî, dîsan bi sed hezaran leşker ber bi mirinê ve tên ajotin. Efserên Alman ên ku di Artêşa 6'an de ya li Iraqê wezîfedar bûn di raporeke de diyar kirine ku di destpêka zivistana 1918'an de 117 hezar leşker ji ber birçîbûn û sermayê mirine. Di salên şer de hema hema li her derê, nexweşiyên biveketin jî gel perîşan kirine. Ev şer yek ji şerên herî wehşî yê dîrokê ye; nêzî 10 milyon kesên sivîl û leşker jiyana xwe ji dest dane, hejmara birîndaran jî gihîştiye 20 milyonî, gelek bajar û gund hatine şewitandin û wêrankirin.[52]

* *Di nav xelkê herêmê me de, ji reva Kurdan a vê heyamê re dibêjin 'dema mihaciriyê', ji tehcîra Ermeniyan re ya bi dû de re jî dibêjin dema 'fermana filehan'. Di bîraninên gelek kesan de êşa wan rojan hîn jî heye. Yekî li Nisêbînê, lawê mihacirekî, dema behsa bavê xwe dikir, digot: "Koma ku bavê min tê de bû, zêdeyî sed kesî bûn, lê tevî bavê min tenê heft kes filitîn. Ên din hemû bi rê de mirin." Jixwe dema mezinê me behsa fermana filehan dikin, gelekî biêş û keser dibin. Gelek jê xwedî li filehan derketine, hin ji wan veşartine, bi hinan ji wan re gepa nanê xwe parve kirine. Lê halê wan jî ne tu hal e, xela çêbûye û ji ber xapandinên dînî jî zêde bi kêrî wan nehatine.*

[52] Ji bo agahiyên berfireh mirov kare li berhema 'Milli Kurtuluş Tarihi(1838-1995)' ya Doğan Avcıoğlu binêre.

Artêşên Rûsan ên Qefqasê di dema destguhartinên desthilatiya li Rûsyayê de, ji herêmê vedikişin. Piştî Şoreşa Kewçêrê, bolşevîk ji bo aştiyê dikevin nav teşebûsan û di 14'ê Berfanbarê de li Brest-Litovskê bi Almanya û Avusturyayê re, di 17'ê heman mehê de li Cepheyê Qefqasyayê jî bi Osmaniyan re Peymana Erzinganê ya Agirbestê îmze dikin. Lê di gotûbêjên li ser maseyan de, di der barê hin mijaran de li hev nakin.

Di meseleya lihevnekirina Osmanî û Rûsan de, pirsgirêka Ermeniyan li pêş e. Di 31'ê Berfanbarê de, Komîserê Pirsgirêka Miliyetan a Sovyetan Stalîn, belavokekê belav dike û tê de bang dike ku divê çareserkirina meseleyên Ermeniyên di bin hakimiyeta Osmaniyan de li Rûsya ya li ser bingeha sovyetan pêk hatiye bê dîtin. Piştre di qerarnameya Ermeniyan de, ku di 11'ê Rêbendana 1918'an de hat weşandin, daxwaz dikir ku; divê artêşa Rûsan ji herêmên di nav sînorên Osmaniyan de yên ku Ermenî lê dijîn vekişe; ji bo parastina gelên sivîl divê hêza milîsan a Ermeniyan bê sazkirin; Ermeniyên ku koç kirine yan jî yên ku hatine mişextkirin azad in ku vegerin welatê xwe; divê 'Sovyeta Nûnerên Gel a Ermenî' ya timî bê damezirandin ku Stepan Şaumyan jî serkêşiya wê bike.[53] Li ser belavbûna vê, şawşaw û nerazîbûn di nav Kurdan de zêde dibe.

Bi Şoreşa Kewçêrê re aloziya ku li Rûsyayê çêbû tesîr li Qefqasyayê jî dikir û bilindbûna dengê serxwebûnê zêde dibû. Hêzên hevalbend ên Ewrûpî, ji bo ku valahiya ji ber vekişîna Rûsan çêbûye dagirin û xiristiyanan jî di cepheyekê de bicivînin, dest bi hin teşebûsan kirin. Li gorî peymana ku Îngiltere û Frensayê li serê li hev kirine, wê Ûkrayna, Besarabya û Qirim biketina bin desthilatiya Frensiyan û erdên Qazaxan, Qefqasya û Bakurê Kurdistanê jî ji desthilatiya Ingilîzan re dihatin hiştin. Londonê di cih de biryar stend ku misyoneke leşkerî bişîne Qefqasyayê. Bi desteka Ingilîz û Amerîkayê Ermenî û Asûrî hatin çekdarkirin, li dijî vê yekê jî bi desteka Alman û Osmaniyan îcar mislimanên wê herêmê hatin xurtkirin û hêzdarkirin.

S. Yerasimos di berhema xwe ya bi navê 'Mîlliyetler ve Sinirlar (Miliyet û Sînor)' de der barê vê mijarê de wiha nivîsandiye. "Di 24'ê Berfanbara 1917'an de, 'Tegmen' Gasfield çû Urmiyeyê û ji bo çar yekîneyên Nestûriyan ava bike xebitî; lê Nestûrî çekên xwe ji bo talankirina bajêr û êrîşkirina ser gundên mislimanan bi kar anîn. Di meha Sibatê de li Urmiyeyê gelê ku ji ber pest û zordariya xiristiyanan nema îdare kir, serî hilda û ev serhildan jî bi awayekî xwindar hat bidawîkirin. Mehek bi şûn de Mar Şemûn ji aliyê Simko

[53] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 296

Axa (Smeîl Xanê Şikakî) ve hat kuştin û Nestûriyan îcar ji bo ku heyfê hilînin êrîşî ser Kurdên derdorê kirin. Halbûkî li gorî biryara Hevalbendan a meha Berfanbarê hatibû stendin, difikirîn ku ji bo herêma di navbera Wan û Urmiyê de biparêze artêşekê damezirînin û rêvebirina wê jî ligel karbidestekî Ingilîz bi îtifaqa ku ji aliyê Mar Şemûn û Simko Axa ve bê çêkirin, bê parvekirin; her wiha Simko Axa dawetî misyona Amerîkayê ya li Wanê hatibû kirin û wî jî hevkarî qebûl kiribû."[54]

Hikûmeta Osmanî ev rewşa bi tehde û bialoz ji xwe re bi kar anî û têkiliya xwe ya bi hêzên herêmê re xurt kir. Di 11'ê Sibata 1918'an de Fermandarê Cepheya Qefqasyayê Vehîp Paşa diyar kir ku ew li hemberî kuştina misilmanan nikare bêdeng bimîne, ji lew re tevgeriya û di 13'ê Sibatê de Erzingan stend. Li aliyê din piştî şer û pevçûnên tund ên di navbera Kurd û Asûriyan de diqewimin, Ingilîz di bin parêzdariya xwe de Asûriyan dişînin Iraqê.

Bi peymana Tirk û Rûsan a 3'yê Adara 1918'an, ku li Brest-Litovskê hat îmzekirin, Qers, Ardehan û Batûm li Osmaniyan hatin vegerandin. Fermandarê Osmaniyan ji Meclîsa Damezirîner a Qefqasyaya Başûr a li Tîflîsê xwestibû ku yekîneyên xwe ji wan bajaran vekişînin, lê ew radigihînin ku ew peymanê nas nakin. Bi paş ve stendina Trebzonê û piştî wê jî ya Erziromê, di dawiya meha Adarê de Osmanî gihîştin sînorê xwe yê berî destpêkirina şer. Ji mislimanên ku li Bakûyê li hemberî Sovyetê serî hildabûn, bi qasî 9 hezarî di navbera 30'ê Adarê û 2'yê Nîsanê de hatin kuştin. Alayiyeke Osmanî ya ku ji Bedlîsê derketibû rê, di 6'ê Nîsanê de Wan dagir kir.[55] Paşê yekîneyên Osmanî êrîşî deşta Urmiyeyê kirin. Di wan rojên germ de Simko Axa û Seyîd Taha ku li herêma Şemzînan xwedî bandoreke berfireh bû li vê cepheya Kurdan pêşewatî dikirin. Artêşa Osmanî ku di 12'ê Nîsanê de ji Mûsilê bi rê ketibû, bi piştevaniya Kurdan, di 4'ê Gulanê de gihîşt Tewrêzê. Yekîneyên ku berê xwe dabûn aliyê bakur jî, çûna xwe ya ber bi Qers û Batûmê ve domandin.

Di 24'ê Nîsanê de Qefqasyaya Başûr serxwebûna xwe îlan kir. Piştî ku Qefqasyaya Başûr yekîneyên xwe vekişandin û bajarê Qersê terikand, sînorê Osmanî gihîşt rewşa xwe ya sînorên beriya sala 1878'an; lê Osmaniyan qîma xwe bi vê yekê neanî. Artêşên Osmaniyan di nîveka meha Gulanê de heta Tîflîs û Êrîvanê çûn.

Bipêşveçûna Osmaniyan ne bi dilê Almanan bû. Gurciyan jî bi ewlehiya desteka Almanan di 26'ê Gulanê de serxwebûna xwe îlan kirin. Di pey de, li

[54] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 292
[55] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 302

dû hev Azerî û Ermeniyan jî serxwebûnên xwe îlan kirin. Ingilîz li dijî kişîna artêşa Osmanî ya ber bi nava Îranê ve, ketin nav tevger û lebatê. Heyeteke serkaniyê ji aliyekî ve ji Hemedanê diçû Qezwînê, li aliyekî din hêzeke pêşeng a ku ji hêla Frensî û Ingilîzan ve dihat birêvebirin, ji Xaneqînê di 31'ê Gulanê de Zencana li ser riya Tewrêz û Tehranê dagir kiribû.

Di van rojan de ji aliyekî ve jî li ser maseyan peyman pêk dihatin. Komara Ermeniyan a ku di Gulana 1918'an de bi pesendkirina Osmaniyan li herêma Êrîvanê ya Rûsyayê hatibû damezirandin, bajarê Qersê jî digirt nav xwe ku ew di navbera salên 1877'an û 1918'an de ketibû bin serweriya Rûsan. Ermenî piştî vekişîna yekîneyên Ingilîzan ku ew di pey vekişîna artêşa Rûsan de hatibûn Qefqasyayê, bi êrîşên artêşa Osmaniyan re rû bi rû dimînin.

Hêzên Osmaniyan, ku di 20'ê Tîrmehê de Nehçîwan bi dest xistibûn, ber bi Urmiyeyê ve kişiyan û heta dawiya meha Tîrmehê bajar di bin dorpêçê de hiştin. Bi kurtî di Tebaxa 1918'an de Azerbeycana Îranê û herêmên bakurê Kurdistana Îranê (ji Gola Urmiyeyê ber bi başûr ve) kiribûn destê xwe. Di vê dema ku artêş bi pêş de dimeşe dîsa li ser maseyan agirbest û peyman pêk tên. Piştî Agirbesta Mondrosê ya di 30'ê Kewçêrê de, artêşa Osmanî mecbûr dimîne ku xwe ji Qefqas û Îranê vekişîne. Di vê navberê de Kurdên ku di nav artêşê de cih girtibûn, tevî çekên xwe beşdarî nav refên Simko Axa dibin. Simko Axa berê jî dest danîbû ser çekên ku ji aliyê Rûsan ve hatibûn hiştin. Hevalbendê wî yê herî mezin torinê Şêx Ubeydulah ê ku ji bo serxwebûna Kurdistanê di 1880'yî de serhildaneke berfireh dabû destpêkirin, Seyîd Taha bû.

Li şûna Osmaniyên ku ew neçar mabûn ji Qefqasyayê vekişîn, Ingilîz bi cih bûn. Di dawiya 1918'an de, li Qefqasya û Îranê êdî serdestiyeke di ser re ya Ingilîzan bi awayekî xuya hebû.

Ji xwe erdên Dewleta Osmanî yên ku Ereb lê ne di vê demê de bi tevayî ketiye destê Ewrûpiyan. Heta bi Mûsil jî hilkişiyane. Em ê di beşa din de hinekî li ser Başûrê Kurdistanê bisekinin. Ev mijarên ku li jor hatin behskirin mijarên berfireh in. Tenê bi kurtayî em li ser hin bûyeran sekinîn ji bo ku dema Kurdistan hate perçekirin çi rewş hebû em zanibin.

Herî zêde zengîniya erd û xakên Osmaniyan, dilên hêzên Ewrûpî dibijandin xwe û gelek xeyal û gotûbêj li ser çêdibûn. Di destpêka cengê de Komîteya Dubleixs a Frensiyan, nîmetên ku ji xakên Osmaniyan bê bidestxistin wiha vedigot: “Di cih de li Kilîkya, Sûriye, Filîstin, Kurdistan û Mûsil em ê bibin xwedî van tiştan:

Genim: Salê 115 milyon kental.

Petrol: Petrol a ku li tu cihên din me peyde nekiriye û sibê bêyî wê dê kes nikaribe bibe miletekî mezin. Çinku beyî petrolê ku ew xwedî girîngiyeke heyatî ye, ne artêş ne jî hêza deryayê mimkun e.

Pembû û hirî: Dem û dezgehên me, bi dijwarî û bi bihayên pir zêde wan ji Îngiltere û Amerikayê dikirin."[56]

Di destpêka şer de erdên Osmanî li ser maseyê ji aliyê Hevalbendan ve hatibû parvekirin. Di mehên Adar û Nîsana 1915'an de komîteyên Frensî û Ingilîz rolên xwe yên dahatûyê yên li ser erdên Rojhilata Navîn ji nû ve plan kirin û ligel vê li ser parvekirina wê dest bi gotûbêjan kirin. Frensa Sûriyeyeke mezin dixwest ku dê sînorên wê ji aliyê başûr ve bigihîje Misirê, ji bakur ve jî tevî erdên li başûrê Torosan ên Wilayeta Edeneyê jî pê re di wilayetên Elezîz, Diyarbekir û Wanê re di ser bilindcihên Torosan re derbas bibe û paşê jî ber û berê çiyayên li geliyê Dîcleyê bişopîne û dakeve başûr; ji başûrê Mûsilê jî ji Dîcleyê bibihure û piştre ji herêma Zorê jî dê xwe bigihîne Firatê.

Hevdîtinên ku di 23'yê Sermaweza 1915'an de li Londonê dest pê kir bi navberan domiyan û di 3'yê Rêbendanê de Georges-Picot û Mark Sykes li ser hin mijarên sereke li hev kirin. Li gorî vê peymanê, herêma Frensiyan dê li başûr heta cihê sînorê Lubnan û Îsraîlê ya îro ku xwe digihîne deryayê, tevahiya peravê bigirta nav xwe. Ji vir, bi awayê ku Galîleya Jorê ji Frensiyan re bihata hiştin, dê xwe bigihanda Gola Taberiyeyê. Sînorê başûrê herêma desthilatiya Frensiyan, di nav Firat û Gola Taberiyeyê re, di nav sînorê Sûriyeya îro re derbas dibû, paşê jî bi Dîcleyê re, li cihê ku ew bi ava Zêyê re tevî hev dibû, digihîşte hev û ber û berê vî çemî dewam dikir heta ku herêma petrolê ya Kerkûkê di navbera Frensa û Îngiltereyê de bike du cih didomiya heta xwe digihand sînorê Îranê. Îcar Filîstîn; Heyfa û bendera wê tevî Aqayê dê di bin destê Ingilîzan de be; Filîstîna ku 15 mîl li başûrê Heyfayê dest pê dike û heta Gola Taberiyeyê, Şerîa, Gola Lût û Gazeyê dirêj dibe, dê bêteref bê îlankirin û dê ew di bin îdareyeke navneteweyî de bê hiştin, ku ew îdare jî wê ji nûnerên Frensa, Îngiltere, Rûsya, Îtalya û mislimanan pêk bihata. Piştî ku di der barê kitekitan de jî li hev hatin, peyman di 4'ê Sibata 1916'an de ji aliyê kabîneya Ingilîzan ve û di 8'ê Sibatê de jî Hikûmeta Frensayê ew îmze kir. Hikûmeta Frensayê di peymanê de dabû qeydkirin ku, bi şertê ku Rûsya jî peymanê îmze bike, ew vê dipejirînin. (...) Metnê temamkirî yê peymanê gihabû Rûsan jî; Sykes û Picot ji bo peymanê gotûbêj bikin diçin Petrogradê... Di encama hevdîtînên destpêkê de, biryar hat dayîn ku herêma Frensiyan a ku li aliyê rojhilatê sînorên başûrê rojhilatê Tirkiyeyê ya îro

[56] Banu Avar, Sınırlar Arasında, r. 253




*Li gor peymana Sykes û Picot parvekirina herêmê*[58]

dikeve û di navbera Cizîrê û Gola Urmiyeyê de dimîne êdî wê ne ya Frensiyan be, ew der dê ji Rûsan re bê hiştin.[57]

Minorsky di pirtûka xwe ya bi navê 'Musul Sorunu' (Pirsgirêka Mûsilê) de sînorên herêma Kurdistanê ya dixwestin tevî Rûsyayê bikin wiha terîf dike: "Herêma ku di navbera Mûş, Sêrt, Çemê Dîcleyê, Cizîr, Amêdiye û xeta girên raserê Mergewerê de dimîne."[59] Ligel vê, herêma Frensiyan ber bi bakur ve, bi awayê ku Sêwazê jî bigire nav xwe, tê firehkirin. Sînorê rojava yê ku Rûs fikirîbûn dê piştî şer hişkere bibe jî, cihekî li rojavayê Trebzonê dabûn ber xwe. Besra, Bexda û Xaneqîn jî ji serweriya Ingilîzan re dihat hiştin. Sal 1916. Çendî li ser maseyê be jî, bi Peymana Sykes-Picot xerîteya Rojhilata Navîn hemûyî dihat guhartin.

Paşê bi Şoreşa Kewçêrê, Împaratoriya Rûsyayê têk diçe, artêşa ji cepheyê Qefqasyayê tê vekişandin û hatibû daxuyakirin ku dê rîayetî peymanên veşarî yên ku berê hatine çêkirin, nekin. Lê projeyên parvekirinê û bazarên der barê van yekan de, bi berdewamiya şer re û piştî şer jî dewam dikin. Dewleta Osmanî hin cihên ku di şer de ji dest xwe bernedabû, îcar bi peymanên li ser maseyan dê winda bikira.

Di dawiya Şerê Cîhanê Ya Yekemîn de Kurdistan ji ber şer perîşan e. Ji xwe berê di bin zordariya Osmaniyan de bû, bi vî şerê cîhanî re jî hîn bêhtir qels ket. Bi vê bêtaqetiyê heqê herî însanî ya Kurdan jî ketibû talûkeyê û serdemek dijwar bi ser de dihat.

[57] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 144
[58] 1916 Sykes-Picot Agreement, http://israelipalestinian.procon.org
[59] Vladimir F. Minorsky, Musul Sorunu, r. 28

## KURDISTAN PARÇE PARÇE

Şerê cîhanê qediyabû, lê şer û pevçûnên li Kurdistanê û yên li derdora wê didomiyan. Îcar her roj bi hêzên cuda cuda re rû bi rû dihat mayîn. Li Bakur ji ber ku Ermeniyan dixwest bi paş ve vegerin xelk ketibûn nav şikan, li Îranê alozî û tevliheviyan berdewam dikir, li Başûr jî Kurd û hêzên Ewrûpî derdiketin pêşberî hev.

Kurd digel şerê giran ê ku çar salan dom kiribû û tê de perîşan û tarûmar bûbûn, dîsan jî teslîm nebûbûn û serwerê erd û xaka xwe mabûn. Yanî projeyên parvekirinê ku hêzên hevalbend di dema şer de di nav xwe de çêkiribûn, li Kurdistanê pêk nehatibûn.

Piştî şer, Frensî û Ingilîzan bi soz û qerarên ku didane Kurdan, li Başûrê Kurdistanê ji xwe re cih çêkirin. Ji ber ku hêza wan a şerên mezin bikin nemabû, bi têkiliyên siyasî yên dilxweşkirinê û awiqandinê her yek ji wan li aliyekî Kurdistanê, roj bi roj şaxên xwe berdan. Sînorên îro di Kurdistanê de ne, yên ku birînên vekirin her roj bêhtir axivîn, di navbera salên 1919 û 1926'an de hatin xêzkirin, derbasî nav peymanan bûn û hatin kifşkirin.

Kurdan di vê demê de ji bo azadiyê gelekî li ber xwe û welatê xwe dan. Têkoşîna serxwebûnê ya ku Kurdan di vê serdemê de bi gelek awayan kir, parçedemek ji dîroka berxwedana Kurdan a pir gur û birûmet e. Lazarev der barê vê dema ku hema hema li her cihê Kurdistanê şer qewimiye û ew di nav tevger û lebatên mezin de bûye, wiha dibêje: "Li hemû herêmên Kurdistanê ji bo serxwebûnê têkoşîna çekdar zindî bûye, neteweperweriya Kurdî jî ji bo

armanca pêkanîna dewleta Kurd a serbixwe û yekbûyî, xwe wek tevgereke siyasî ya birêkûpêk îlan kiriye."[60]

Heger em li rojên piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn binêrin; windahiyên Dewleta Osmanî li sînorên rojava hatibûn heta nêzî paytexta Osmanî Stenbolê, ku ew şahdamara wan bû û dê piştre ew jî bihata dagirkirin. Li sînorê başûr jî hemû cih û warên Ereban ketibûn destên hêzên Ewrûpî û veqetîna erdên Ereban a ji Osmanî zelal bûbû. Berî destpêkirina şer û di demên destpêka şer de, rayedarên Ingilîz ku bi gelek hêzên herêmî yên li Erebistanê re di nav têkiliyan de bûn, der barê gelek mijaran de bi Ereban re li hev kiribûn û dest bi hukimkirina herêmê kiribûn. Di pey şer de êdî Ereban meseleya veqetînê nîqaş nedikir, ew li ser sînorê erd û îdareya dewleta ku wê ava bibe û wê kî di rêveberiyê de cih bigire têdikoşiyan. Heta derdorên Osmanî jî ev yek qebûl kiribûn û ew jî li gorî vê yekê ketibûn nav xweavakirineke nû.

Kurd û pozîsyona erdên Kurdan pir cuda bû. Kurd ji hin aliyan ve nêzî Osmaniyan bûn û di nav hev de bûn; ji aliyê cografyaya xwe ve û bi têkiliyên xwe yên avaniyên civakî ve. Di tevahiya dema şer de, çendî hin dengên dijber bilind bûbin jî, Kurdan di nav refên Osmaniyan de li dijî hêzên Ewrûpî û Rûsan şer kiribûn. Ew Kurdên ji ber tarûmarkirina mîrekiyên ku yekîneyên Osmanî di bin fermandariya efserên Ewrûpî de di sedsala 19'an de ew têk biribûn mabûn, dîsan bi Osmaniyan re di şerê wê de, yê ku çar salan dom kiribû, cih girtibûn. Kurdan di şerên Balkanan, Çeneqele, Erebistan û Qefqasyayê de, hema hema li her cepheyî windahiyên mezin dabûn û ji sê par nifûsa Kurdan du par jê qir bûbû.

Li aliyê din, ber bi dawiya şer ve, rewşa eskerî ya li Mezopotamya, Filîstin û Sûriyeyê bi temamî tê guhertin, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) tevî şer dibe û Rûsya jî li derveyî şer dimîne. Di nav van mercên nû de, hêzên bihevresozdayi careke din li ser parvekirinê dest bi gotûbêjan dikin. Di nav serxweşiya parvekirinê de senaryoyên cuda cuda, nêziktêdayînên cihê cihê derdikevin holê. Li ser Kurdistanê planên cuda yên Osmaniyan û yên bihevresozdayiyan hene. Rêveberên Brîtanyayê yên li Rojhilata Nêzik jî, der barê dahatûya Kurdan de xwedî helwestên cihê ne.

Piştî Agirbesta Mondrosê, ku di 30'ê Kewçêra 1918'an de di navbera Dewleta Osmanî û dewletên lihevkirî de hat îmzekirin, dewletên biserketî di cih de dest bi dagirkirinê kirin. Gava şerê cîhanê qediya, êdî Împaratoriya Osmanî ya mezin û gewre têkçûyî û her parçeyekî erda wê di bin lingên

[60] M. S. Lazarev, Emperyalizm ve Kürt Sorunu(1917-1923), r. 126

leşkerên welatekî Ewrûpayê de bû. Mûsil, digel ku li dijî peymana hatibû îmzekirin bû û tevî îtiraza fermandarê artêşa 6'emîn Alî Îhsan Paşa, di pey îmzekirina agirbestê de, di serê meha Sermaweza sala 1918'an de hat dagirkirin. Artêşên Osmanî bi lez û bez ji vir veqetiyan. Di 10'ê Sermawezê de wilayeta Mûsilê hemû ji hêla artêşên Ingilîzan ve hatibû dagirkirin.

Gava artêşa Osmanî bi awayekî perîşan bi paş ve vedikişiya, di destê Ingilîzan de 11 000 dîl hebûn. Çiya jî bi mehkûmên ku ji eskeriya pir dirêj reviyabûn tije bûn. Li hin gundan kesên xort û ên karibin bixebitin nemabûn. Gundî û esnaf jî li dû nanên xwe û zarokên xwe bûn. Gundî di bin bacên giran de bûn, gel xizan, westiyayi û perîşan bû....

Ji aliyê din ve xelkê Kurd û hêzên dagirker man di miqabilî hev de. Gel, heryekî li herêma xwe xwe birêxistin dikir, bi îmkanên xwe yên kêm li ber xwe dida û xwe diparast. Geh bi hêzên dagirker re nêzikî hev dibin, geh bi hev re şer dikin.

Tevî rêveberên payebilind ên Osmanî, piranî xelasiyê di bin hîmayeya dewleteke xurt de dibînin. Saray û Partiya Huriyet û Îtilafê, xelasiyê di xwe avêtina bextê Ingilîzan de dibîne. Heta li gorî Dogan Avcioglu "Heger Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) berê îlan bikira ku ew amade ye Tirkiyeyê wek manda ji xwe re qebûl bike, digel ku Mustefa Kemal li dij derketa jî wê li Kongreya Sêwazê pêşniyaza mandayê bihata pejirandin. Li aliyê din hikûmeta Stenbolê, Ingilîzên ku ji bo tunekirina Tirkiyeyê hatibûn datanîn ser serê xwe."[61]

Di berhema bi navê 'Osmanli Türk Tarihi' (Dîroka Osmanî ya Tirkan) de rewş wiha tê vegotin: "Komisyona Harbond a ku ji bo li mandayeke muhtemel a Amerîkayê bipirse geşteke ji nişkê ve li dar xistibû, gava di meha Rezberê de di Sêwazê re dibihure, Mustefa Kemal bi Harbond re hevdîtinekê pêk tîne.... Harbond vediguhêze ku Mustefa Kemal jê re gotiye, mebesta wî 'Împaratoriyê di bin tenê hêzeke ku ne xwedî berjewendiyê ye, wek tercîh di bin mandaya Amerîkayê de biparêze' û 'alîkariya welatekî biyan î bêteref' xwestiye. Paşê Mustefa Kemal li Sêwazê M. George Picot re hevdîtinek pêk aniye û li gorî hatiye veguhestin, teklîfa 'manda'ya aborî ya Frensî di miqabilî ku Frensa Kilîkyayê li wan vegerîne dayê."[62]

Di van rojên aloz de, ku serûbinbûnek çêdibe û faktorên nû dikevin dewreyê, di nav Kurdan de jî lêgerînên cuda cuda derdikevin. Di demên Şerê Cîhanê yê Yekemîn de wekî tevahiya Ewrûpa, Rûsya û Dewleta Osmanî, li Kurdistanê jî fikarên cihê cihê û tevgerên nû derketine holê. Hin jê alîgirên

[61] Doğan Avcıoğlu, Milli Kurtuluş Tarihi(1838-1995), r. 907-908
[62] Roderic H. Davison, bnb, r. 290

serxwebûnê ne, hinek jê alîgirên otonomiyê ne û hin ên din jî di navbera her duyan de diçin û tên. Hinek kes naxwazin ji Osmaniyan veqetin, hin jê mandaya di bin hîmayeya Ingilîz û Frensiyan de, hin kes jî hîmayeya Rûsyayê dixwazin...

Di heman demê de, di warê lênêrîna Ewrûpayîyan de jî di nav Kurdan de du cephe hene. Li gorî hinekan Ewrûpayî rizgarkar, nûbûnxwaz in; li gorî hinekan jî ew dagirker in û dijminekî nemisliman in. Li cepheya Osmanî jî di nav Kurdan de du nêziktêdanên cihê hene. Hin kes alîgirên îtihatiyan in ku hê nû desthilatdarî bi dest xistine, hin kes jî alîgirên hikûmeta nû bi heyranî û teqlîdkeriya Ewrûpayê tawanbar dikin û alîgirên Padîşah Abdulhemîd ê ku bûye xwediyê nasnavê 'bavê Kurdan' in.

Ev rewşa binakok û tevlihev, ne bi tenê li Kurdistanê, tevî hikûmetê li her cihê Dewleta Osmanî heye. Wek ku ji aliyê hin kesan ve hatiyê fikirandin, ev cudahiya nêrînê wê di nav Kurdan de nebe sedema bingehîn a veqetîna ji hev, heta pirî caran ligel berdewamiya hukimkirina li herêmên xwe, hêzên herêmî wê bi hev re tevbigerin. Lê Kurd di bin tesîra ku bi sed salan ev yek dom kiribû, di rojên ku bi tevayî têkoşîna rizgariya neteweyî dihat kirin de, wê bi piranî tercîha xwe ligel pevrejiyana bi Tirkan re bikirina, ew ê di bin tesîra propagandaya dînî de jî bimana û vê yekê wê ji wan re pirsgirêkên gelekî mezin bi xwe re bianiya.

Kurd ji aliyekî ve ji bo împaratoriya ku ew jî parçeyek ji wê bûn biparezin diçûn leşkeriyê, ji aliyê din ve jî ji bo ku xwe li ser lingan bigirin û ji împaratoriya ku difeşkilî mafên neteweya xwe biparêzin tevî nav refên şerkerên netewî dibûn. Carinan ev diketin nav hev û din, carinan jî di cepheyên dijber de cih digirtin. Di vê serdemê de tevger û navên ku zêde derketine pêş ev in: Şêx Mehmûdê Berzencî, Smaîl Axayê Şikakî (Simko Axa), Seyîd Taha, Cemiyeta Kurd Tealî, Komîteya Îstîklala Kurd, Mala Bedirxaniyan, Şêx Abdulqadir, kesên ku bi tevgera Mustefa Kemal re ne, Milî, Qoçgirî, Şêx Seîd... û Sevr, Lozan û Mûsil ku hîn jî di rojevê de cih digirin.

Di demên pêşî ên Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, Kurd duçarî êrîşên dijwar ên artêşa Rûsan mabûn, bi piranî li vê cepheyê windahî dabûn û gelek êş kişandibûn. Şopa wan rojên giran û êşa wan wê bi salan bidomiya. Dewra mihaciriya Kurdên ku ji şer bi zor û heft belayan filitîbûn û tehcîr û qetlîama Ermeniyan ku dê piştre biqewimiya, gelê herêmê xistibû nav gelş û aloziyan. Ev rewş dê piştre tesîreke mezin li têkilî û rûdanan bike.

Vê rewşê berî hemû tiştî kir ku Kurd nema ji Rûsan yeqîn bikin. Di dewra dawî a Hikûmeta Çar de, Abdurezaq û Kamil Beg ên ji mala bedirxaniyan, bi Hikûmeta Rûs re hevdîtinên li ser azadiya Kurdistanê dikin û têkilî erênî derbas dibin. Bedirxanî vêna bi nameyan ji serekeşîran re dişînin. Lê belê êş û janên di dema serê şer de kişandine hatine bîra wan, xwe ji nameyan aciz kirine û bersiva wan jî nenivîsandine. Digel ku bi Şoreşa Sovyetê re wan mafê diyarkirina çarenûsê ya neteweyî di siyaseta xwe ya navxweyî û ya derveyî de wek prensîb dabin pêş jî, tesîrek mezin ji bo guherîna nêrîna gelê Kurd a di derbarê Rûsan de nekiriye. Bi tevayî ji ber van û hin sedemên ku dûre jî wê têkeve ser de, dema ku li Kurdan gelekî teng bûye jî tu têkiliyên germ di nav Sovyet û Kurdan de çênebûye.

Hêzên leşkerî yên Ewrûpayê jî di salên 1917-18'an de hê nû nû digihîştin başûrê Kurdistanê û bi Kurdan re rû bi rû diketin têkiliyê. Têkçûna Împaratoriya Osmanî û piştî ku nuh şer qediya dewletên qezenc kiribûn bi dengekî bilind "prensîba mafê diyarkirina qedera xwe ya neteweyan" dianîn ziman, meyla Kurdan ber bi Ewrûpiyan ve bir û kir ku Kurd bi wan re rûnên. Heta wê rojê Kurdan tim zerar ji Ewrûpiyan dîtibûn. Wek ku me berê jî behs kir, gava Ewrûpî di sedsala 19'an de alîkarî bi derdorên xiristiyan re dikirin, tekiliyên civakê serûbinî hev kiribûn. Ewrûpî ku gelek sozên xeyalî dabûn derdorên xiristiyan û bûbûn sedemên pirsgirêk û çêbûna şeran, di heman demê de ji bo ji holê rakina Kurdan zorî dabûn Osmaniyan. Lê niha Ewrûpî alîgirê Kurdan dihatin xuyakirin û serxwebûna ku Kurdan di sedsala 19'an de di oxira wê de pir şer kiribûn hatibû ber lingên wan; roj roja avakirina netewedewletê bû.

Esas ber bi dawiya sedsala 19'an ve Kurdan di warê çapemenî, weşan û xwebirêxistinkirinê de gavên girîng avêtibûn û roj bi roj xwe bi pêş xistibûn. Cemiyeta Kürdistan Teali (Komeleya Pêşketina Kurdistanê) ku di sala 1918'an de hatibû avakirin û di vê pêvajoyê de dê rolên girîng bigirta ser xwe, li Stenbolê bi hezaran alîgirên wê û li welat jî li cihên mîna Amed, Bedlîs û Elezîzê şaxên wê hebûn. Di nav komeleyê de kesayetiyên bijarte û yen ji pîşeyên cuda cuda, gelek kesan cih girtibû. Hin kesên ku mensûbên wê yên Stenbolê bûn, ev in:

Serok: Seyîd Abdulqadir
Cîgirê Serok: Emîn Alî Bedirxan
Cîgirê Serok General Fuad Paşa

Endam:
Mîralay Xelîl Beg ê Dêrsimî (Serekê Polîsên Stenbolê)
Mihemed Alî Bedirxan (Mîralayê malnişîn)
Mihemed Emîn Beg (Qeymeqamê malnişîn)

Armanca komeleyê wek “Ji bo bipêşxistin û bilindkirina Kurdistanê ya ji aliyê madî û manewî ve û der heqê mijarên terbiye, fikir û ruhî ya îslamê ya miletê Kurd de xebata bikin” hatiye diyarkirin.[63]

Hin rêxistin û şexsiyetên Kurd ku pişta xwe bi gotinên rayedarên dewletên medenî yên der barê serxwebûna neteweyan de girêdabûn, bi riya nivîsandina pirtûk û meqaleyên di rojnameyên cuda cuda yên bi zimanên cihê, ji bo ku meseleya neteweya Kurd û daxwazên neteweya Kurd bidin naskirin dixebitin. Arîstokrat û rewşenbîrên Kurd li ser bingehên heqaniyetê pir bi xwe ewle dibûn, bêyî ku hêzeke artêşê ya nûjen û yekbûyî pêk bînin û berê xwe bidin bingehên madî, bi piranî teşebusên dîplomatîk kirin. Kurdan bi dilpaqijî bawariya xwe bi gotinên dîplomatîk anîn, lê dûre ketin nav tengasiyên dijwar.

Kurdan wek hêza leşkerî li ser navê xwe xwe birêxistin nekiribûn, hêzên ku hebûn bi piranî bi hêzên Dewleta Osmanî ve girêdayî bûn, hinin jî wek yekîneyên herêmî bûn û ne xwedî rêxistinên serdemê bûn. Lê hêzên derveyî xwedî rêxistinên berfireh, xwedî balefir û tenq û topan bûn û her roj hîn bêhtir rehê xwe berdidan nav erdên wan. Li aliyê din, di vê demê de têkoşîna Kurd û Tirkan a li ser bingeha pevretiyê wê bê kirin lê ev wê derbasî nav peymanên fermî nebe û ev yek jî wê ji bo her du neteweyan bibe sedemên ziyan û windahiyên mezin. Heger em bi awayekî kurt behsa hin demên piştî şerê cîhanê bikin, rewş wê hîn zelaltir û hişkere bê dîtin.

Wek ku me berê îfade kir dema agirbest hat îmzekirin, hêzên Ingilîz heta nava Başûrê Kurdistanê kişiyabûn û bi Kurdan re diketin nav danûstendinan. Alîkarê serokê hêzên sewqiyatê li Mezopotamyayê yên Brîtanyayê Serheng (albay) Arnold Wilson ji bo ku serkeftina siyaseta Brîtanyayê di nav arîstokratên Kurd de xurt bike di 1’ê Berfanbara 1918’an de çûye Silêmaniyeyê. Wilson bi 60 pêşewayên herêmên cîran ên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê re hevdîtin pêk anîye û bi Şêx Mehmûd Berzencî re jî dûr û dirêj axiviye.

Arnold Wilson danezanek belav kiriye ku tê de dibêje, ji bo ji bin nîrê Tirkan derkevin û bigihîjin serxwebûna xwe ew ê alîkariyê bidin gelên rojhilat. Li ser van hewldanan Şêx Mehmûd jî wek bersiv bi îmzeya 40 pêşewayî danezanekê dide Wilson, bi vî awayî alîkarî û hîmayeya Ingilîzan

[63] Hasan Uşak, Kürdistan’da Aşiretçilik ve Milliyetçilik, r. 234

qebûl dikin.

Hikûmeta Ingilîz xwedî siyaseteke ku rêveberên cihkî destek dike û di bin re kontrolê bi dest dixe. Li Silêmaniyê jî Şêx Mehmûd Berzencî wek Mîrê Başûrê Kurdistanê hatiye îlankirin û Serdar (bînbaşî) E. W. Noel anine ser erka şêwirmendiyê; li hêla din efserên siyasî yên alîkar jî tayînî navçeyên Çemçemal, Helepçe û Ranyayê kirine û memûrên Tirk û Ereb bi yên Kurd guhertine.

Ji pêngavên ewil ê ku li cepheya Kurdan hatine avêtin yek jê ya li Misirê hatiye avêtin e. Ji Mala Bedirxaniyan Mîr Sureya dema duçarî zordariya îtihadiyan bûbû, çûbû Misirê. Dûre, piştî Agirbesta Mondrosê, Komîteya Serxwebûna Kurdan (Kürt İstiklal Komitesi) damezirandibû. Rêzikname û bernameyeke rêxistinê ya ku pir bi zanîn hatibûn amadekirin hebû.

Komîteya Serxwebûna Kurdan serî li Îngiltere'yê da û di 16'ê Berfanbara 1918'an de jî memorandûmeke bi Frensî pêşkêş kir. Daxwaziya Kurdistaneke serbixwe kir ku Kurdistana Tirkiye û ya Iraqê digirte nav xwe û sînorên wê heta Qefqasyayê diçûn. Komîteyê di meha Çile ya sala 1919'an de, hevdîtinek din pêk anî û daxwazên xwe dubare kirin. Arif Paşa ji bo ku ligel Şerîf Paşa beşdarî Gotûbêjên Aştiyê yên Parîsê bibe hat wezîfedarkirin.

Nivîsara sondxwarinê ya di bernameya Komîteya Serxwebûna Kurdan di beşa siyasî di xala 14'an de cih girtiye, wiha ye: "Ez ji bo welatê xwe Kurdistanê ji bin zilm û dîlîtiyê xelas bikim û yekîtiya Kurdan û hukimdariyeke serbixwe ya Kurdistanê ava bikim bixebitim ez dikevim nav Komîteya Serxwebûna Kurdan; her wiha ez bi Xweda û bi namûsa xwe sond dixwim ku ez ê rîayetî hemû biryarên Komîteya Navendî bikim, ez ê îxanetê bi welat û miletê xwe re, bi Komîteya Serxwebûna Kurdan re nekim û ez ê xwe ji tu fedekariyên madî û manewî nedim alî."[64]

Wek ku me berê behs kir tekoşînên Simko Axa û Seyid Taha yên herêmî ku berê dest pê kiribûn hene. Li Başûr Şex Mehmûdê Berzencî serweriya herêma xwe dike. Tevgerên Kurdan hemû ji hev agahdar in û teşebûsên wan ên ji bo dîplomasiyê yên ligel hev jî hene. Bi gotinên ku hemû milet wê bigihin heqê xwe Kurd jî bi hêviyên mezin têdikoşin. Gava Kurdan xeyala Kurdistaneke serbixwe dikir, haya gelekan ji senaryoyên kesên ku ji zû de lêkolîn li ser axa wan a zengîn kirine û di nav xwe de parve kirine tune ye.

Parkirina Kurdistanê ya li ser maseyan di serê şer de dest pê kiribû. Ancex di demên dawiya Şerê Cîhanê yê Yekemîn de piçek be jî, di cepheya Ingilîzan de behsa mafên Kurdan tê kirin. Di notaya bi tarîxa 14 ê Berfanbara 1918'an

[64] Naci Kutlay, bnb, r. 79-80

de, ya Beşa Siyasî ya Buroya Hindistanê ya Ingilîz, ji bo Kurdistanê ev tişt hatine nivîsandin:

"1) ... Peymana Sykes-Picot a di sala 1916'an de, kiriye ku Kurdistan bibe sê parçe. Aliyê bakur ketiye bin nifûza Rûsyayê, herêma navendî ketiye bin a Frensayê û başûrê wê jî ketiye bin nifûza Brîtanyayê...

2) ... Ji bo Brîtanyaya Mezin girîngiya Kurdistanê (heger em ji memorandûma Wezareta Derveyî îqtibas bikin) ji ber vê yekê ye: Hêza ku bibe serwerê vî welatî, dê nuqteyên stratejîk ên ku digihên Mezopotamyayê û kaniya avê ya Dicleyê ku piraniya erdê vê derê bi saya wê tên avdan, kontrol bike. Bi ser de, Kurdistaneke dost û aram ku dê karibe ji mebestên leşkerî re bibe kaniyeke zengîn, ji bo aştiya li Mezopotamyaya Jorîn xwedî girîngiyeke heyatî ye. Erdên nizm ên di nav sînorên Mezopotamyayê de xwedî warên petrol û kaniyên din in. Silêmaniye û Helepçe ku li wan petrol, komir û tûtin tê hilberandin, wek herêmên ku xwedî potansiyela pêşketinên mezin in, tên nirxandin. Li Tûzxurmatû ya li ser riya Kifrî û Kerkûkê û li Siyaqurayê ku li aliyê rojhilata başûr a herêmê ye, petrol hatiye dîtin. Ev herêm hemû di bin nifûza Brîtanyayê de ne.

3) Pirsgirêka Kurdan bi pirsgirêka Ermenistanê ve gelekî girêdayî ye.(...) Heman nuqte, ango têkiliya beranber a pirsgirêka Ermenî û Kurdan ji aliyê Sitvan Wilson ve, di telgrafeke bi tarîxa 27 Çileya 1918'an de, bi awayê "Heger dewleteke Ermenî xwedî şansekî wekhev be (ku bê avakirin- nota wergêr) divê ji nifûsa Tirkan serbixwe konfederasyoneke Kurdan jî bê pêkanîn," hatiye îfadekirin. Ji bilî vê Wilson bi awayekî pêwîst lê zêde dike ku divê konfederasyoneke wiha bê pêkanîn û di bin kontrola wî de be.( ...)

4) Dahatûya Kurdistanê jî zêdetir bi van her du pirsan ve girêdayî ye: a) Gelo em ê karibin Hikûmeta Frensî îkna bikin ku dev ji îdiayên xwe yên li ser Mûsilê berde; b) Heger em karibin vê bikin, wek ku nûnerê li Bexdayê bi qewet pêşniyar dike, gelo ew ê Mûsil bi ser dewleta Mezopotamyayê ve be, yan jî wek ku Serheng Lawrence di axaftina xwe ya li pêşberî Komîteya Rojhilat pêşniyar kir, ew ê parçeyek ji qraliyeta merkezî ya Ereb û Kurdan be, ku dê ew ji Sûriyeyê û ji Mezopotamyayê serbixwe be û paytexta wê jî yan Mûsil bi xwe yan jî Rasuleyna hîn li rojava be.

Li herêmê, halê hazir rewşa siyasî tekûz e. Me beşa başûr a herêmê ji aliyê eskerî ve dagir kiriye û me erkedarên îdarî yên Ingilîz tayînî Kifrî, Kerkûk, Silêmanî, Altinkoprî û Erbîlê kirine. Li gorî ku raporên dawî didin nîşandan, rejîma nû ji aliyê Kurdan ve hatiye pejirandin û çareseriyeke bi awayê dewleteke serbixwe ya Kurdistanê yan jî federasyoneke di bin mandaya

Ingilîzan de, dê şêniyên welêt razî bike. Bi rastî jî nûnerê siyasî yê li Silêmaniyê (serdar/major Noel) di van demên nêz de rapor kiriye ku mirov dikare a niha bi rihetî bigihîje mexseda Kurdistaneke serbixwe, ku ew digihê heta peravên Gola Wanê..."[65]

Gava em li cepheya Frensiyan dinêrin, em dibînin ku ew ji plana hin nûnerên Ingilîzan a avakirina dewleta Kurdistanê aciz bûne. Di belgeyeke Ingilîzan de lênêrîna Frensayê wiha hatiye diyarkirin: "M. Picot (rayedarê Frensayê), di telgrafa xwe ya bi tarîxa 12 Çile 1919'an de îfade kiriye ku, Sor Mark Sykes di der barê teklîfa 'Bila Mîrekiyeke Kurd a serbixwe bê avakirin ku Mûsil jî di nav de be û ev dewleta serbixwe jî bila bikeve bin mandaya Brîtanyayê' ew agahdar kiriye; lê ji ber ku ev plan li dijî berjewendiyên Frensayê ye û bi sedema ku ew ê ziyanê bigihîne gelên wekî Keldanî û Nestûriyan ku ji zû ve ew ji aliyê Frensayê ve hatine hîmayekirin, ev teklîf red kiriye û li ber çavan negirtiye."[66]

Bi saya teşebûsên Kurdan ên di demên dawî de, di dîrokê de cara pêşî li Konferansa San-Remoyê ya dewletên Ewrûpî pirsgirêka Kurdan di formeke navneteweyî de bûye mijara nîqaşê û fikarên di lehên Kurdan de derketine holê. Ji aliyê din ve li herêmê bi Ingilîzan re diyalog tên berdewamkirin û hin gav tên avêtin. Lê dûre ne bi gelkî dengên ku ji hevdîtinên li Ewrûpayê tên ên der barê mafên ku wê bidine Ermeniyan, yeqîniya Kurdan bi Ewrûpayê ya ku nuh dest pê kiribû têk dibe.

Di 18'ê Çileya 1919'an de Konferansa Aştiyê li Parîsê dest pê kir. A rastî pêşewayên Ewrûpayê, şêwirmendên leşkerî, wergêr û alîkarên wan ji bo ku xenîmetên Şerê Cîhanê yê Yekemîn di nav xwe de parve bikin xwe dabûn hev. Kaniyên zengîniyên Mezopotamyayê, riya Hindistanê û petrol dabaşên sereke yên sohbetên wan bûn.

Ji gelek neteweyan heyetên nûneran jî hatibûn konferansê. Fikarên netewedewletê mijara bingehîn a rojevê bûn. Lewma jî, heyet bi zanyariyên îstatîstîkî yên li gorî vê fikarê hatibûn. Hejmartinên nifûsê hatibûn kirin an jî wek ku hatibin kirin hijmar danîne ber çavan, xerîte hatine xêzkirin û amadekirin, bi kurtasî her heyet ji bo parastina mafên netewa xwe daneyên ku ji xwe re pêwîst dîtibûn, civandibûn. Lê belê her heyet ji bo bide nîşandan ku ew ji bo netewedewleta ji xwe re aşopî kiribû xwedî bingeh e, gelek daneyên nerast û çewt jî amade kiribûn. Hin ji wan der barê hijmara nifûsê de, hin jî der barê xerîteya welatê xwe de rewşeke derveyî rastiyê didan xuyakirin.

[65] Ahmet Mesut, İngiliz Belgelerinde Kürdistan (1918-1958), r. 19-20
[66] Ahmet Mesut, bnb, r. 19-20

Di rûniştina 26'ê Sibata 1919'an a konferansê de, daxwazên herêmî yên Ermeniyan; ligel Senceqa Meraşê û Klîkyayê, wilayetên Erzirom, Bedlîs, Wan, Diyarbekir, Xarpût û Sêwazê û beşeke wilayeta Trebzonê ku digihîşt Behra Reş, digirtin nav xwe. Bi vî awayî wan parçeyekî mezin ê Kurdistanê xistibû nav Ermenistana Mezin.

Di demê Konferansa Parîsê de, Hikûmeta Îranê jî di gelek herêmên Kurdistanê de heq îdîa dike. Lê tu kesî ev daxwaz cidî nedîtiye û guh lê nekiriye. Di van rojan de Wezîrê Karê Derve yê Îranê Prens Fîrûz, sînorê ku dewleta wî bi sedsalan, bi gelek peymanan dikirin ku bidin qebûlkirin, wiha bêqedir dikir: "Ji bo Kurdan ev sînor bêwate ne, çimkî ew di dema koçeriyê de van sînoran bi serbestî binpê dikin."

Berî bi çend salan, aliyê Ereb jî li ser Kurdistanê hin maf daxwaz kirine. Tevgera neteweperwer a Ereb a bi navê el-Fatah ku navenda wê li Şamê bû, di mehên Adar û Gulana 1915'an de li hev dicivin. Lawê Şerîf Huseyn, Faysal jî di nav wan de ye. Gotûbêjên wan bi protokoleke ku sînorên erdên Ereban diyar dike, bi encam dibe. Li gorî vê, sînor li bakur bi Mêrsîn, Edene, Bîrecîk, Ruha, Mêrdîn, Cizîr, Amêdiye û sînorê Îranê; li rojhilat dîsan sînorê Îranê; li Başûr Kendava Besrayê, Okyanûsa Hindê û ji bilî Adenê ya ku di bin serweriya Ingilîzan de ye Deryaya Sor; li rojava jî heta Mêrsînê bi Deryaya Spî dihat xêzkirin. Di 14 ê Tîrmeha 1915'an de Huseyn nameya xwe ya pêşî ji Komîseriya Bilind a Ingilîz a li Qehîreyê re dişîne û tê de ji wan daxwaz dike ku, ew 'serxwebûna welatên Ereban' ku bi protokola Şamê sînorên wan hatine destnîşankirin û prensîba ku divê xelîfeyekî Ereb bê ser dînê îslamê, nas bikin.[67]

General Şerîf Paşa ji aliyê Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê ve hatibû wezîfedarkirin û di Konferansa Aştiyê ya Parîsê de Serokê Delegasyona Kurdan bû. Beşdarekî din jî Fexrî Beg ê diyarbekirî bû. Wek dê piştre jî were îfadekirin, rayedar û karbidestên Kurd ên ku xwestibûn ji Kurdistana Îranê û ji Kurdistana Başûr tevî konferansê bibin, wê bên astengkirin.

General Şerîf Paşa di memorandûma 22'yê Adara 1919'an de, rewşa Kurdan raxistiye ber çavan. Di memorandûmê de xwesteka damezirandina Kurdistaneke serbixwe heye. Hatiye teklîfkirin ku beşa Kurdistanê ya li Îranê jî tevî Kurdistana serbixwe bibe. Di memorandûmê de sînorên Kurdistan wiha ye; ji bakur ji tixûbên Qefqasyayê, ji rojava ji xeta Erzirom-Erebgîr-Dîwrîkê, ji başûr ji Çiyayên Şengalê derbas dibe heta Tel Afer-Hewlêr-Kerkûk-Silêmanî û Sîneyê, ji rojhilat ve ji xeta Rewandûzê heta bi Elbakê

[67] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 144

(Başqaleyê) û hîn li pêş jî, ji tixûbê Îranê heta Araratê ye. Daxwazên Ermeniyan ên ji bo wilayetên Diyarbekir, Wan, Erzirom û Bedlîsê jî, bi awayekî biryardar hatine redkirin. Di encamê de, di belgeyê de hatiye diyarkirin ku hemû zengîniyên sirûştî yên Kurdistanê, divê tenê aîdî Kurdan bin.[68]

Seyîd Abdulqadir jî, di vê demê de serî li Komîseriya Bilind a Frensiyan a li Stenbolê dide, xerîteyeke Kurdistanê pêşkêşî wan dike û van daxwazan dike: "Di xerîteya ku ji aliyê Şerîf Paşa ve di 22'yê Adarê de hate şandin de, di nav tixûbên bakur de hin cudahî tên dîtin. Parçeyekî girîng ku %70 yî Kurd in, ji derveyî sînorên ku Şerîf Paşa xêz kiriye, mane. Wisan tê gumankirin ku ew bi awayekî baş û têr nehatiye agahdarkirin..."

Bi vî awayî axa Kurdistan û Ermenistanê ketibûn nav hev û berberiya di nav Kurd û Ermeniyan de jî, sortir bûbû. Ew soz û bextên ku bi deh salan dabûn Ermeniyan û windahiyên Ermeniyan ên di dema şer de, kiribûn ku Ewrûpî bikevin bin hin berpirsyariyan. Bi desteka ku dihat dayîn, Ermeniyan ji nû ve berê xwe didan rojava û jêr. Bi alîkariya Ingilîzan, di 30'ê Nîsana 1919'an de rêvebirina Qersê dan Ermeniyan. Li Sewrê ji aliyekî ve daxwazên Ermeniyan, ji aliyekî ve jî rastiya Kurdan û reaksiyonên ku dihatin nîşandan hebûn. Xwestekên Ermeniyan ên li konferansê gelekî bêdilî xelkê Kurd in û vêna bi gelek hewldanan didin nîşandan.

Kurdistana Îranê jî li ser lingan e. Simko Axa, hîn di sala 1912'an de riya ku Wan bi Tewrêzê ve girêdida kontrol dikir. Di vê demê de li herêma di navbera Çiyayê Agiriyê û heta qûntarên rojava yên Geliyê Urmiyeyê de bibandor e û di nav têkoşîneke xurt de ye. Wekî me berê jî bi awayekî kurt îfade kiribû, gelê xirîstiyan ên ku di dema Şerê Cîhanê ye Yekemîn de reviyabûn aliyên Qefqasyayê, ku bi piranî Ermenî bûn, piştî şer di bin muhafezeya dewletên biserketî de dixwestin vegeriyana. Tabloya di dema gotûbêjên aştiyê de, ku dixwestin gelek herêmên Kurdistanê bixin nav sînorên Ermenistanê jî Kurd bêhtir tirsandibûn. Ev hemû ketibûn ser hev û protestoyên ku ji aliyê Simko Axa û Seyîd Taha ve hatibûn destpêkirin, ku Osmaniyan jî hinek alî wan kiribû, dadigeriyan serhildaneke mezin.

Hasan Yildiz di berhema xwe ya bi navê "Frensiz Belgeleriyle Sevr-Lozan-Musul Üçgeninde Kürdistan" (Bi Belgeyên Frensiyan Kurdistana di Sêgoşeya Sewr, Lozan û Mûsilê de) de wiha dibêje: "Kurd li Wan, Mûsil, Urmiye û Diyarbekirê bi guman li sedemên di pişt van vegeran de dinêrin û hêzên xwe dikin yek. Di raporeke Frensiyan de tê gotin ku di navbera van

[68] M. S. Lazarev, bnb, r. 125

bajaran de 25.000 şerkarên Kurd hene û bi qasî 5.000 jê jî wek yekîneyeke artêşê şer dikin, yên din jî bi şeklê yekîneyên biçûk di van şeran de cih digirin."[69]

Li Başûrê Kurdistanê jî, ku ew bi awayekî rasterast muxatabê mudaxeleya hêzên rojava ne, di demeke kurt de nerazîbûn û neqayîliya gel dest pê dike. Serhildanên pêşî yên li dijî hêzên Ingilîzan, li vir li dar dikevin. Yek jê di Nîsana 1919'an de, li derdora Zaxoyê ji aliyê Eşîra Goyan ve dest pê bûye, paşê jî li Berzanê ku tim bûye warê nerazîbûn û nexweşiyan, di bin serokatiya Ahmed Berzanî de serhildanek çêbûye. Çend efserên polîtîk ên Ingilîz tên kuştin. Ancex ber bi xelaseka havîna 1919'an ve, ev serhildan ji aliyê artêşa Brîtanyayê ve bi zor tê sekinandin.[70]

Kurd, ji ber ku her diçe ji serxwebûna wan re sînordarî pêk tê û tiştên ne xweş ji bo wan diqewimin, dengê xwe zêdetir dikin. Ev rewş Ingilîzan ditirsîne. Bertekiya gel, çalakbûna Cemiyeta Tealî ya Kurd a li Kurdistanê û pevretiya Kurd û Tirkan, dike ku rayedarên Ingilîz bikevin nav fikarên mezin û ev yek jî dibe sedem ku di navbera Bexda, London û Stenbolê de trafîka ragihandinê zêde bibe. Niha bi çend ji van belgeyan em rewşê hîn ji nêzik ve bibînin.

Di telgrafa bi mêjûya 21 ê Adara 1919'an de, ku ji Beşa Siyasî ya Bexdayê ji Komîseriya Bilind a Stenbolê re hatiye şandin ev tê gotin: "Abdurehman Axayê serokê Kurdên Şirnexa ku li bakurê rojhilatê Cizîrê dikeve, ji hin serokên Kurdên li herêma me re mesajeke tund a li dijî Ingilîzan şandiye. Mesaj dide nîşandan ku ber vê hereketê ji aliyê Stenbolê ve hatiye vekirin, lê nav nayê hişkerekirin. Ma rêxistinkarên tevgerê (ê li Stenbolê; nota wergêr) dikarin bên şopandin?"

Di telgrafa bi mêjûya 26'ê Adarê de jî wiha tê gotin: "Kesên ku navê wan di nav tevgera serxwebûna Kurdistanê ya li Stenbolê de derketiye pêş ev in: Seyid Abdulqadir, birayê Seyid Taha, Dr. Abdulah Cewdet û Suleyman Nazîf (waliyê berê yê Mûsilê; E. Y.)

Bedirxan li Stenbolê bi awayekî xurt tê temsîlkirin û bi kesên ku navên wan li jor in di nav têkiliyeke germ de ne. Tê raporkirin ku bi Mêrdîn û Diyarbekirê re jî bi awayekî serbest pêwendiyên wî yên bi riya telgrafê hene. Kurdên xuyanî yên Diyarbekirê, ji bo tevgerê bi pêş bixin, komîteyeke xurt ava kirine û komîteyeke mîna wê jî dê li Mêrdînê bê avakirin. Tevger ji Misirê ve jî tê destekkirin ku navê di pêşiyê de Sureya Beg ê lawê Bedirxan e."[71]

[69] Hasan Yıldız, Fransız Belgeleriyle Sevr-Lozan-Musul Üçgeninde Kürdistan, r. 30
[70] M. S. Lazarev, bnb, r. 64
[71] Ahmet Mesut, bnb, r. 25

Komîserê Bilind ê Stenbolê, di 7'ê Nîsanê de radigihand ku Hikûmeta Tirk ji bo nîzamê pêk bîne, lawê Seyid Abdulqadir ê Serokê Senatoya Tirk ji bo pêşiyê here Nisêbînê û paşê jî here Zaxoyê ew şandiye herêmê. Serkaniya Giştî ya Mezopotamyayê ya Ingilîzan jî, ji ber ku herêm li derveyî kontrola Ingilîzan maye, ji komîseriyê dixwaze ew zorê bide ser Hikûmeta Tirk da ku tedbîrên hedanê bistîne.

Di belgeya bi mêjûya 8'ê Nîsanê de ku bi 'Bexda, Acîl' dest pê dike, wiha dibêje, "Ev sê hefteyên dawî em li ser kirina fîtneyê û tevgerên li dijî Ingilîz û xiristiyanan li herêmên eşîrên Kurdan ên li herêma rojhilata wilayeta Mûsilê hin raporan werdigirin... navenda wê Cizîr e" û tê îfadekirin ku divê miheqeq ew bên cezakirin.

Belgeya veşarî ya bi mêjûya 9'ê Nîsana 1919'an, ku Serkaniya Giştî ya Mezopotamyayê ji Komîseriya Bilind a Stenbolê re nivîsiye:

"Nûnerên Komîteya Neteweyî ya Kurd ku pêşewayê wê Seyîd Abdulqadir û Dr. Abdulah Cewdet in, ligel nameyeke ku ji bo eşîret serweriya Ingilîzan red bikin û serxwebûna xwe di bin muhafezeya Tirkan de îlan bikin bang dike, li derdora 25'ê Adarê ji bo ku biçin Silêmaniyê di Mûsilê re derbas bûn. (...) Ez pêşniyaz dikim ku bi awayekî lezgîn Abdulqadir û Abdulah Cewdet ji Stenbolê bên dûrxistin.

Nûçeyeke ku ji Cizîrê hatiye, dide zanîn ku qeymeqam ji bajêr çûye û çend yekîne mane ku ew jî li ser çûnê ne. Miftiyê ku wek fîtne û navtêderê qetlîama xirîstiyanên li Cizîr û derdora wê nav daye, di nav eşîrên Kurdan de digere û bang li wan dike da ku ew, hikûmeta Kurdan a li ber avabûnê Cizîrê îşxal bikin. Min ji qezaya Hezexê ya xirîstiyanan, ku ew li aliyê rojavayê Cizîrê ye ku çendî xwedî nifûseke çekdar a pir e û li ber Kurd û Tirkan serî hildaye, nameyek girt. Didin zanîn ku ew êdî nikarin xwe li ber eşîran ragirin. Wisan dixuyê ku li pişt meseleya li herêma Zaxoyê Abdurehman Axayê Şirnexê, ya ku li aliyê bakurê rojhilatê Cizîrê dikeve heye, ku tesîreke wî ya girîng li ser eşîrên derdorê heye. Kesên xuyanî yên Cizîrê piştgiriyê didinê."[72]

Belgeya di 9 ê Nîsana 1919'an de, li Beşa Siyasî ya Bexdayê hatiye nivîsandin û ji Qehîre, Stenbol, Sîmla û Tehranê re hatiye şandin; radigihîne ku:

"– Di nav eşîretên li rojhilatê Diyarbekirê de fîtneyên li dijî Ingilîzan tên kirin.

– Tevger xwedî bikaranîna telgrafê ye û xwedî desteka wezîfedarên li Mêrdîn û Diyarbekirê ye.

[72] Ahmet Mesut, bnb, r. 29

– Bi riya belavokan çalakiyan pêk tînin.

– Ajanên wan têra xwe çalak in; li Heleb, Nisêbîn, Cizîr, Şirnex, Mûsil, Zêya Mezin û li cihên din xebatan dimeşînin.

– Tevgerê serkeftineke girîng nîşan daye; di encama tevgerê de li Heleb, Midyad, Hezex, Goyan, li beşa bakurê Zaxoyê û li cihên ku ber bi rojhilat ve aloziyan çêdike û ew dikeve şeklê tevgereke pankurd û dijxiristiyan.

– Tevger ji niha ve bûye sedemê mirina efserekî Ingilîz û texîrkirina demnediyar a vegera Asûriyên penaber.

– Heger bi navendên giştî bê daketin, hereket tevde wê karibe bifeşkile; lê heger bi vî awayî pêşdeçûn bidome dibe tevger di rojên peş de bigihê asta ku bêyî navenda giştî jî karibe bimeşe."

Di belgeyeke bi tarîxa 15'ê Nîsana 1919'an de ev hatine nivîsandin: "Tê dîtin ku hin konfederasyonên zeîf ên li dijî Ingilîzan hatine avakirin. Reîsê Hevêrkan Eliyê Betê, reîsê Şirnexê Abdirehman û reîsê Selahiyeyê Remezan gihîştine hev û wan konfederasyoneke li dijî Ingilîzan ava kiriye. Ligel vê, Cemiyeta Siwêrekê ku Eşîra Qerekeçiyan a dibêjin 12 000 siwariyên wan ên çekdar hene, Bûcax û eşîrên girên Haşînê digire nav xwe hatiye avakirin."[73]

Di van rojan de, ji bo ku bê fehmkirin bê xwesteka Kurdan a ji bo Kurdistaneke serbixwe dikare çiqas destekê bistîne, Major Neol tê erkedarkirin û dişînin herême. Her wiha lêkolînkirina li ser rewşa nêzîhevbûna Kurd û Tirkan û civandina zanyariyan der barê rewşa siyasî û mercên aborî yên herêmê jî di nav mebestên gera Noel de bûn. Noel di 15'ê Nîsanê de li Nisêbînê ye. Çavdêriyên xwe yên der barê herêmê de wiha îfade dike:

"Heta hefteyek du hefte berê meyla giştî ya li bajêr li ser pesendkirina dagirkirina Ingilîzan û rêveberiya wê bû. Lê piştî qalûqurta ku 'wê heyfa qetlîama xiristiyanan a li Mûsilê ji misilmanan bê hilanîn di nav xelkê de belav bû, meyl guheriye dijî wê.

"Giregirên Nisêbînê ji Şêx Abdulqadir, ku ew yek ji şexsiyetên xuyanî yên alîgirên tevgera Kurdistaneke serbixwe ya di bin hikumraniya Tirkan de ye, telgirafek girt. Tê de girîngiya pêşîgirtina li kuştina xiristiyanan ji bo zirar negihîje armanca neteweyî dida xuyakirin. Telgrafeke din jî ji lawê Bedirxan Beg Emîn Alî Bedirxan hat; diyar dikir ku Hikûmeta Tirk ew wek Waliyê Diyarbekirê tayîn kiriye û hêvî dike ku di demeke kin de bê ser wezîfeya xwe.


"... Rewşa heyî, dikare veguhere rewşeke ku hewce bike em li hemberî yekîneya eşîreta ya ku her gav dikare 3000 çek berhev bike, serî li tedbîrên eskerî bidin...."[74]

[73] Ahmet Mesut, bnb, r. 33

[74] Ahmet Mesut, bnb, r. 69-73

Ji aliyê din ve Ingilîz bi Eşîra Milan re ku ji Erzinganê heta Helebê serwerî di destê wan de bû, di nav dan û stendinê de ne. Ingilîzan bihîstine ku ji bo êrîşî ser yekîneyên Ingilîzan bikin Eşîra Milan û eşîrên cîran ên li Ruhayê amadehiyan dikin. Ji bo lêpirsînê li vê yekê bike Sitvan (yuzbaşî) C.I.Woolley tê peywirdarkirin. Sitvan Woolley ê Ingilîz, di 14'ê Gulana 1919'an de li Wêranşarê ye. Li mala Mehmûd Beg (lawê Îbrahîm Paşa ye û endamê Cemiyeta Tealî ya Kurd e) ji aliyê birayên Îbrahîm Paşa ve tê pêşwazîkirin.

Di hevdîtin û gotûbêjên ku Serokeşîrê Milan Mehmûd Beg û Sitvan di nav xwe de dikin, li ser çêbûna Kurdistaneke serbixwe ya di bin hîmayeya Îngiltereyê de disekinin. Sitvan hevdîtinê wiha vediguhêze: "Mehmûd Beg wek hemû kesên din ên ku min ew nas kirine, neteweparêzekî xurt e. Derheqê Ingilîzan de xwedî niyeteke baş e, muxalifê Tirkan e û di der barê parastina aştiyê de jî hesas e. 800 qebîleyên ku bi Mehmûd ve girêdayî ne hene. Ji bo prenstiya Kurdistanê ya ku wê bê avakirin, navê bedirxaniyan û yê Mehmûd Beg lawê Îbrahîm Paşayê Milî tê bilêvkirin."[75]


*Seyid Taha**

Mehmûd Beg di sohbetên xwe de gelek tiştan vedibêje. Dibêje, çir ku Tirkan ji sulaleya wî Tîmûr Paşa, Eyûb Paşa, kalkê wî Mihemed Axa, bavê wî Îbrahîm Paşa û birayê wî yê herî mezin Abdulhemîd Beg kuştine û du caran jî ew bi xwe avêtine zîndanê ji Tirkan diqehere. Her wiha dibêje ku, gava bavê wî Îbrahîm Paşa tê kuştin, Wêranşar tê talankirin, mala wî bi temamî tê wêrankirin, keriyên pezên wî tên dizîn û gava li xezîneya Îbrahîm Paşa digerin gor û tabûta wî bi xwe jî tê xerakirin.

Aliyekî din ê ku lê tevger û berxwedan heye cepheya Seyîd Taha ye, ku wî li hemberî Hikûmeta Îranê serî hildaye. Neviyê Şêx Ubeydulah Seyîd Taha, di van salan de di warê têkoşîna azadiya Kurdan de hem li Iraqê hem jî li Îranê kesayetiyekî çalak û xwedî cihekî girîng e.

Seyîd Taha yê ku li ser herêma ji Hewlêrê heta Wanê dirêj dibe serwer e; di destpêka Gulana 1919'an de li Bexdayê bi rayedarên Ingilîzan re hin hevdîtinan pêk tîne, da ku bi riyên dîplomatîk ji nerazîbûnên xelkê yên ji ber

[75] Ahmet Mesut, bnb, r. 9

* C. J. Edmonds, bnb, r. 138

gotinên li ser sînorên Ermenistanê û vegera gelên xiristiyan ku li Sewrê hatibûn ziman çareseriyekê bibînin. Seyîd Taha pêşniyaz dike ku, di bin hîmayeya Brîtanyayê de Kurdistaneke yekbûyî bê avakirin, ku di nav de hin beşên Iraq û Îranê jî hebin. Lê aliyê Ingilîz tevlêbûna Kurdistana Îranê ya vê dewleta Kurdî ya bihîmaye bi awayekî qethî red kiriye. Seyîd Taha di bersiva xwe de daye zanîn ku dê bêyî pesendkirina Îngiltereyê jî herêmên Kurdan ên Îranê bi ser yên din ve bîne û bike yek. Taha bi rêveberên Ingilîz ên li Başûrê Kurdistanê re bi şert û mercên li jêrê hevkarî qebûl kiriye:

1) Divê efûya giştî bê îlankirin,

2) Divê li welêt tenê rêveberek tune be, hewce ye welat bi milkên xweser (otonom) bê veqetandin,

3) Vegerandina xelkê xirîstiyan a li welatên wan, divê ne bi awayê ku serdestiyê li ser Kurdan bikin be,

4) Divê desteka malî jî eynî wekî ya ku ji bo Iraqê hatiye temînkirin, be.

Seyîd Taha diyar dike ku bi van şertan, ji bo ku di bin mandeya Ingilîzan de Kurdistan bê avakirin, bi her awayî ji alîkariyê re hazir e. Rêveberiya Ingilîz ev şert qebûl kirine. A. Wilson nameyek ji Seyîd Taha re şandiye ku tê de soz daye ew ê li ser efûyê bifikire, der barê lihevkirina Ermeniyan de bi awayekî erênî wê tevbigere û di Konferansa Aştiyê de jî wê berjewendiyên Kurdan biparêze.[76]

Simko Axa jî ku bi Seyîd Taha re di nav hevalbendiyê de bûye û armanca Kurdistaneke serbixwe daye ber xwe, pêşiyê li ser xeta Tirk û Îranê, paşê jî li rojhilat serdestiya xwe daye rûniştandin. Ber bi nîvê sala 1919'an ve Urmiye, Şahpûr û Selmas bi dest xistiye. Di Heziran û Temûza 1919'an de Tehranê rêveberiya hin riyan û herêman didêyê û hewl dide bi Simko Axa re lihevhatinê çêke. Simko Axa ji aliyê Tirkan ve jî alîkariyê distîne. Di vê dema ku li Erzirom û derdora wê li hemberî xiristiyanan birêxistinbûyîn xurt dibe Mustafa Kemal jî hatiye wir û dest bi tevgera xwe kiriye. Di payîza 1919'an de Simko Axa desthilatdariya xwe heta ber bi nava Îranê ve fireh kiriye.

Hewldan di hemû waran de pêk tên. Ên ku nerazîbûna xwe bi mektûba didin xuyakirin jî pir in. Mêrdînzade Mehmed Arif Paşa, di nav wan kesên ku li dijî daxwazên Ermeniyan ên der barê sînor de nerazîbûna xwe nîşan didin de ye. Li ser navê Komîteya Serxwebûna Kurdistanê ya li Qahireyê, ji bo ku pêşkêşî Konferansa Aştiyê ya Sewrê bibe nameyekê ji General Şerîf Paşa re dişînin (30 Nîsan 1919). Di wê nameyê de wiha digot:

[76] M. S. Lazarev, bnb, r. 71

“Ji birêz General Şerîf Paşa re,

Bi riya Salih Beg em ji hemû xebatên we yên fedekar ku we ji bo parastina welatê me yê pîroz kirine, agahdar in. Ez hêvî dikim xebatên we yên hêja ku ji aliyê me ve jî tên pejirandin, wê me jî bi pêş bixin.

Wek hûn dikarin ji nav nimûneyên dawî ên ku Salih Beg dane we, ji nîqaşên baldar ên program û belavokê derxin, ji bo pêkanîna armanca pîroz em bi şev û roj û bi hemû hêza xwe xebatê texsîr nakin. Ji bo ku em îdiayên pêkenok ên Ermeniyan ên neheq destnîşan bikin û tewşiya wan nîşan bidin, me bi hezaran mînakên broşûr û îlanên ku bi Frensî û Ingilîzî hatine ravekirin şandine gelek hikûmet û meclîsên wan. Ligel vê me telgrafên gilî û protestoyê şandin Serokatiya Konferansê, Serokatiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) û Wezîrên Karên Derve yên hêzên hevalbendîtiya hev dikin. Daxwaz û îdiayên me, yên ku di nav esasên biryar, xerîte û îstatîstîkên ji hêla hemû hikûmetan ve bi awayekî fermî hatine pesendkirin û pejirandin de ne, nayên guherandin.

Ji heft wilayetên ku Kurdistanê pêk tînin, ji Erzirom, Sêwaz, Diyarbekir, Wan, Bedlîs, Xarpût û Mûsilê hiştina bihustek ax ji Ermeniyan re, bi tu awayî ne mimkun e. 14 milyon misliman Kurd û Tirk li ber Xwedê sond dixwin ku heta nefesa xwe ya dawî, heta mirovê xwe yê dawî wê welatê xwe biparêzin.

Hikûmeta Kurdistanê ji niha ve ava bû. Kurdistan ne tevî Îranê ne tevî Emîrtiya Mekeyê dibe, ne jî kes kare bike bin serweriya wan. Gelê Kurd û hêza wî wek Îran û Emîrtiya Mekeyê bilind e.

Em serxwebûna xwe ne ji hêzên Ewrûpî ne jî ji Konferansa Aştiyê dixwazin. Me serxwebûna xwe bi saya hêza Xwedayê mezin û ya şûrên xwe pêk anî û îlan kir...”[77] Di nameyê de reaksiyona li dijî Ermeniyan dewam dike û bi zimanekî tûj tê îfadekirin ku neheqiya hatiye kirin wê neyê qebûlkirin.

Nerazîbûnên li dijî Ermeniyan dûre jî didomin. Esas wek ku me berê jî îfade kir, pirsgirêkên di navbera Kurd û Ermeniyan de berê dest pê kiribûn. Ligel fikarên Şerîf Paşa ku dibêje, dijminiya di navbera Kurd û Ermeniyan de bi avakirina Alayên Hemîdî dest pê kiriye û li ser êrîşên xwîndar ên nû jî tesîra polîtîkayên jon Tirkan tê xuyakirin, Hasan Yildiz ev dîpnot nivîsiye. “Kurd beriya avakirina Alayên Hemîdî, bi ser gelên Xirîstiyan de yên ku ji dema Mehmûdê 2’yem ve di rewşa serhildanê de bûne şandine cepheyan. Nemaze piştî veqetîna Yewnanan ji împaratoriyê, dewletê Kurd di van çalakiyan de bi kar anîne. Li gorî projeyekê, ku wek plana Reşîd Paşa tê zanîn, ji barîqateke ku li dijî Rûsan ji Misilmanan bê çêkirin tê hêvîkirin ku,

[77] M. S. Lazarev, bnb, r. 71

wê gelê xirîstiyan ji holê rake yan jî mişext bike û li şûna wan jî wê kesên misilman bên bicihkirin. Di van şeran de, Kurd bi zorê ajotine ser hedefeke ku ne ya wan e û hatine fedakirin."[78]

Em niha dîsa li rewşa piştî Şerê Cîhanê vegerin. Li dijî talûkeya Ermeniyan û ji bo ku bajarên rojhilat ji împaratoriyê neyên qetandin, di 4'ê Berfenbara 1918'an de li Stenbolê "Vilayat-i Şarkiye Müdafaa-i Hukuk Cemiyeti" (Komeleya Parastina Mafên Bajarên Rojhilat) hatiye damezirandin. Paşê jî li wilayetên Erzirom, Bedlîs, Diyarbekir, Sêwaz, Elezîz û Wanê şaxên wê hatine vekirin. Piraniya damezrînerên komeleyê rewşenbîrên Kurd in. Di civîna pêşî a vê komeleyê de hin qerar hatin stendin; ji vana ya pêşî wiha digot:

"Li wilayetên rojhilat mafên tarîxî û irqî yên Tirk û Kurdan di bin miliyeta Osmanî de civandî ye û pêkhatina berjewendiya her du irqan -bêyî ku yek tecawizî mafê yê din bike- qebûl bûye."

Di kitêba Kazim Karabekir a bi navê 'Kürt Meselesi' (Meseleya Kurd) de tê gotin ku "Hikûmeta Stenbolê bi fikara 'ji bedêla wilayetên rojhilat bibe Ermenistan bila bibe Kurdistan', alîgirê serxwebûna Kurdan bû."

Em derbasî mehên pêşî ên hevdîtinên Sewrê bibin. Di vê dewrê de, bizava Mustefa Kemal hê dest pê nekiriye. Wek ku ji belgeyan jî tê fêmkirin, Kurd jî nerazîbûna xwe li dijî daxwazên Ermeniyan ên li Konferansa Aştiyê derdikevin holê didin nişandan û xwe bi rêxistin dikin. Bihevrebûna Kurd û Tirkan derketiye pêş. Heta Hikûmeta Osmanî hin Kurd wek rêveber tayînî rêvebirina herêmê kirine.

Di van deman de Ingilîz polîtîkayên xwe yên li hemberî Kurdan hêdî hêdî diguherînin. Li Başûrê Kurdistanê biryara avakirina îdareyekê wek li ser erdên din ên di bin dagirkirina wan de, distînin. Serdar (bînbaşî) Soane, li şûna Noel, ku ew wek wezîfedarekî seyar tayînî bakurê Kurdistanê bûye, tê wezîfedarkirin. Lê Kurd vî awayî qebûl nakin. Şêx Mehmûd Berzencî li dijî vesînorkirinên li ser warên îdareyê têne pêkanîn derdikeve û di navbera Şêx û nûnerên Ingilîzan de di demeke kurt de tevlihevî û nexweşî derdikeve. Şêx Mehmûd Berzencî difikirî ku ew li ser riya avakirina Dewleta Kurdistanê ya axa Kurdan hemûyî bigire ber xwe bi rê ve biçe, lê erkedarên Ingilîz jê dixwestin ku ew qîma xwe bi rayeyên kêm ên di devereke teng de bîne. Bi ser de, bi avakirina navendeke li dijî biyaniyan a li Şirnexê jî dihat sûcdarkirin.

[78] Hasan Yıldız, bnb, r. 56



*Şêx Mehmûd, Silêmanî, 1919*[79]

Di vê demê de Silêmaniye ku berxwedaneke xurt û berfireh nîşan dide, yek ji navenda tekoşîna azadiya Kurdan a wê serdemê ye. Serhildana Şêx Mehmûd Berzencî, li Silêmaniyê di 23'yê Gulana 1919'an de dest pê dike. Hêzên Ingilîz di dema serhildanê de dişikên û Silêmaniye bi tevayî dikeve destê serhildêran. Şêx Mehmûd serxwebûna Kurdistanê û xwe jî wek hikumdarê wê îlan dike.

Efserê Ingilîz ê siyasî C. J. Edmonds ku wan salan li Kurdistanê xwedî erkên taybet bû, wan rojan wiha vedibêje:

"Şêx Mehmûd di berbanga 23'yê Gulanê de êrîşî Silêmaniyê kir û di nav çend saetan de kontrrola bajêr bi dest xist. Dest danî ser xezîneyê, hemû personelên Ingilîz ên li wê derê avêtin hepsê û alaya Ingilîz daxist, alaya xwe ya ku li ser zemîna kesk heyvikeke sor hebû kişand dîreka li ber Buroya Siyasî. Di 26'ê mehê de Helepçe ket destê wan. Fermandarê Ingilîz ku guhdariya emrê zêdekirina hêzan nekir, bêyî jêhatîbûna Kurdan a di şer de bifikire bi hinek siwarî, yekîneyên civandî yên Iraqê, wesayîtên zirxdar û bi kamyonetên ford ên ku tifingên bi markeya Lewîs bi wan ve hatibûn montekirin, biryara êrîşbirina ser Silêmaniyeyê da. Lê li neqeba Teslûcê, 40 kîlometre dûrî bajêr, ji çar aliyan ve êrîş bi ser de hat û neçar ma bi paş ve vekişe. Kurdan 40 kîlometre da dû hêzên ku bi paş ve vekişiyane û ziyaneke mezin gihandin

[79] Susan Meiselas, bnb.

wan; çar wesayîtên zirxdar û nozdeh kamyonet hatin îmhakirin... Di dema destpêka bûyeran de, gelek derdorên ku dudilî bûn, biryar dan ku beşdarî Şêx Mehmûd bibin; heta gelek eşîrên li wî aliyê sînor ên li Îranê, serî li ber hikûmeta xwe (hikûmeta Îranê) hildan û dan zanîn ku ew dixwazin tevî Dewleta Kurd a di bin hikumdariya Şêx Mehmûd de bibin."[80]



*Şêx Abdulqadir û xatûna xwe Hafsa Xan*[81]

Şêx Mehmûd di demeke pir kurt de, ji bo pêkanîna dewletê gavên sereke avêtin; di bin serokatiya birayê xwe Şêx Abdulqadir Berzencî de hikûmeteke taybet ava kir û ji bo Wezîrê Fînansê Abdulkerîm Alaka yê xiristiyan, ji bo Wezîrê Perwerdehiyê Hecî Mustefa Paşa û ji bo serfermandariyê jî Saleh Zekî tayîn kirin. Ala, pere, pûl û demxeyên pûlan ku li ser wan resmê Şêx Mehmûd hebû, çêkirin. Rojnameya bi navê Roja Kurdistan jî dest bi weşanê kir.

Şêx Mehmûd desthilatdariya xwe heta Kerkûkê berfireh kir. Qebîleyên li ser sînorên Îran û Iraqê û yên Kurdistana Îranê (wek Hemawend, Hewreman) derbasî aliyê wî bûn. Bi pêşewayên mezin ên Kurd, wek rêveberê Şirnexê Seyîd Taha yê neviyê Şêx Ubeydulah ê navdar û pêşewayê xwedî hêzeke xurt ê Kurdistana Îranê Îsmaîl Axa (Simko Axa) re têkilî danîn. Serhildana Silêmaniyê ya Şêx Mehmûd, ne tenê li herêmên Kurdên ku di bin bandora wî de bûn, li hemû Mezopotamyayê deng veda.[82]

Di belgeyekê de ku di 25'ê Gulana 1919'an de li Bexdayê hatiye nivîsandin, tê îfadekirin ku, bi keşfa ji hawayê ve xuya dibe Silêmaniye di destê Kurdên serhilder de ye, Şêx Mehmûd ji Kurdistana Îranê destekê distîne, Kurdistana Îranê jî tê de, ev rasterast encama tevgera di riya

[80] C. J. Edmonds, bnb, r. 54-55
[81] Susan Meiselas, bnb.
[82] M. S. Lazarev, bnb, r. 65

Kurdistaneke serbixwe de ye. Tê vegotin ku heger Şêx Mehmûd di carekê de neyê perçiqandin, ew ê eşîretên xurt ên vê herêmê jî ku niha bêalî ne tevbigerin, wê ev bizav li Îran, Mûsil û Mezopotamyayê jî deng vede, rewşa leşkerî ya li van herêman jî wê di xetereyê keve û dê bibe sedem ku tevgerên wek wê li bakurê rojavayê Îranê û li bakurê Kurdistanê jî teşwîq bike, her wiha dê ziyanê bigihîne berjewendiyên girîng ên dewletên hevalbend ên li van deran; lewma jî divê ku di cih de Silêmaniye bê dagirkirin.[83]

Li hemberî xurtbûna Şêx Mehmûd Ingilîzan dest bi amadekirina operasyoneke mezin kir. Kurdên ku bi hêviya ew ê ji îdareya Osmanî xelas bibin û bigihîjin azadiya xwe alîkarî bi hêzên dagirker ên Ewrûpayê re kirin, piştî demeke kurt bi bombebarandina balafirên Ewrûpayê re rû bi rû man û man şaş.

Edmonds di berhema xwe ya bi navê “Kürtler, Türkler ve Araplar” (Kurd, Tirk û Ereb) de, yekeyên hêzan ên ku li Kerkûkê li hev hatibûn komkirin ku bigirin ser Kurdan wiha bi rêz dike: Alaya Rojhilat a Surey a 1/5’an, Alaya Pîyadeyan a Bûrmayê ya 85’an, Pencab ên 1/87’an, Mahrattas a 1/116’an, Piyadeya Bengal a 49’an a Tofa 1’em, Tabûra Tifingên Otomatîk a Hindistanê ya 18’em a Tofa 239’an, Bataryaya Çiyayan a Hindistanê ya 25’emîn, Bataryayên ‘B’ û ‘D’yê yên 336’emîn Yekeyên ji Lîwaya RAF’ê (Hêzên Hewayî yên Qraliyetê), fîloyeke ku ji balafirên sinifa ‘A’yê ya RAF 63’yan, nîşangir, leximkar, neferên mayînker û yekeyên alîkar ên din. Soane jî dê wek efserê siyasî tevî konvoyê bibûya.[84]

Di şerê qewimî de Şêx Mehmûd birîndar bû û dîl ket. Heta 15 rojan serhildan têk çû. Di meha Hezîranê de jî artêşên Ingilîz û Hindistanê bi ser serhildêran de hatin şandin. Bi vî awayî heta 3’yê Tebaxê tevahiya Başûrê Kurdistanê dikeve bin kontrola Ingilîzan. Şêx Mehmûd jî derxistibûn mehkemeya eskerî û cezayê mirinê lê hatibû birîn; lê karbidestên Ingilîz ji ber tirsa reaksiyona gel çare di mişextkirina wî ya Hindistanê de dîtibûn.

Waliyê Ingilîz ê li Bexdayê Sir Arnold Wilson karekterê esasî yê tevgera Kurdî wiha vedigot: “Kurd ne dixwazin ew li hikûmeta Tirkan bên vegerandin û ne jî dixwazin di bin kontrola hikûmeta Iraqê de bi cih bibin. Li başûrê Kurdistanê ji her 5 kesan 4 jê partîzanên plana Şêx Mehmûd in, ku ew dixwaze Kurdistaneke serbixwe biafirîne.”[85] Dema mirov li encamê dinêre ev gotin nîşan didin ku sozên di serî de hatine dan û tiştên tên kirin eleqeya

[83] Ahmet Mesut, bnb, r. 39
[84] C. J. Edmonds, bnb, r. 56
[85] Hasan Yıldız, bnb, r. 175

wan bi hev re tune ye. Di vir de vekirî tê xuyakirin ku raya giştî li ber çavan nehatiye girtin, her roj rewş xerabtir bûye û her tişt li hev herbiliye.

Mişextkirina Şêx Mehmûd Berzencî, rewşa li Kurdistanê aram nekiriye, berevajî hîn bêhtir alozî derketine. Welat di rewşeke wisan de ye ku nikare bê îdarekirin. Goyî, Berzanî, li başûrtir jî Ahmed Takî û li Îranê jî Simko Axa li ser lingan in...[86] Di dema berdewamiya serhildanan de yekîneyên êrîşê yên hewayî yên Ingilîz herêmê her tim bombe dikin, heta ew qas zêde pê de diçin ku, di çapemeniya Ingilîz bi xwe de ji rewşê nerazîbûn derdikeve.

Heger em vegerin aliyê Osmanî, di 15 ê Gulana 1919'an de Yewnan herêma Egeyê dagir kirine. Teşebûsên Ermeniyan ên li rojhilat û rewşa li Başûrê Kurdistanê jî gelekî ne xweş e. Vana hemûyan hiştiye ku Osmanî hîn bêhtir di nav Kurdan de propagandaya panîslamî û ya li dijî biyaniyan bikin. Di heman demê de, di rêxistinbûnên li dijî Ermeniyan de çalakî zêdetir dibin. Di van deman de Mustefa Kemal wek mufetîşê artêşê yê Dewleta Osmanî berê xwe dide rojhilat. Di kongreyên Erzirom û Sêwazê de, behsa talûkeya Ermeniyan û biratiya dînî tê kirin; her wiha li ser yekîtiya gelên Tirk û Kurd disekinin û piştgiriyê didin parastina xelîfetî û sultaniyê.

Mustefa Kemal, ji bo ku serokên eşîrên Kurd û şêxên wan ber bi xwe ve bîne dikeve nav hewldanên mezin. Hê gava li Erziromê ye, ji bo wan qezenc bike, ji wan re name û telgrafên pesindar dişîne. Ataturk di "Nutuk"a xwe de wiha nivîsandiye: "Min nameyên taybet ji hin kesên giregir ê gava ez wek kumandarê artêşê li Diyarbekir û Bedlîsê bûm me hevdu nas kiribû re nivîsand û min têkilî û pêwendî bi hin serokên eşîran ên li derdora Wan û Bazidê re danî."

Sedema ku Kurd bi awayekî zêde tevî van her du kongreyan jî bûne, ev şert in. Ji 54 delegeyên ku tevî Kongreya Erziromê bûne, 22 jê Kurd in. Tevî 10 delegeyên ku ji Elezîz, Merdîn û Diyarbekirê hatine hilbijartin lê ji ber ku waliyên Osmanî nehiştine ew beşdarî kongreyê bibin dibe 32 delege yê ku Kurd temsîl kirine. Ev hejmar jî nîvê hejmara yekûn a delegeyên ku tevî kongreyê bûne pêk tîne. Vê bihevrebûna hanê nûnerê Kurdan Şerîf Paşa di dema gotûbêjên Sewrê de xistiye tengasiyê.[87]

Rûdanên di çaxa tevgerên kongreyê de hinekî M. Kemal rihet kirine û di nameya bi tarîxa 21'ê Hezîrana 1919'an de, ku ji hevalên xwe yên li Stenbolê re şandiye ev nivîsandine: "Tevgerên ji ber propagandaya Ingilîzan çêbûne, wek mînak bizava serxwebûna Kurdan ku niha dixebite, şikir ji Xwedê re

[86] Hasan Yıldız, bnb, r. 45
[87] Hasan Yıldız, bnb, r. 34

piştî meseleya parçebûna împaratoriyê derketiye holê, derbasî aliyê me bûne. Bi saya şandina nameyan ji hev re bi beşdarên vê tevgerê re, wan eleqe nîşanî mexseda giştî dane û bi me re li dora xelîfetî û seltanetê bûne yek. Di navbera me de diyalogeke tam pêk hatiye û ew jî ji bo kongreyê hatine vexwendin."[88]

Ji aliyê din ve tevgera Kurdên ku bi hikûmeta Osmanî re di têkiliyan de ne jî bi pêş dikeve. Çûna Neol a herêmê, ramanên wî yên der barê mafên Kurdan de jî, kiribûn ku hewaya ne xweş a demên pêşî a Sewrê belav bibe. Di 3'yê Tîrmehê de, Komîserê Sivîl ê Bexdayê, pêşniyarên berbiçav li Komîserê Bilind ê Stenbolê kirin, got ku ji bo rewşa li Kurdistana Navîn baş bibe divê hin garnîzonên Tirkan bên hilanîn û kesên hevalbendên koma Abdulqadir ji bo Wan, Bedlîs û hwd wek rêveber bên tayînkirin. Wezîrê mezin Damat Ferîd Paşa bi şertê ku Kurd dûrî tevgerên li dijî hikûmetê bimînin, qebûl kiribû ku esîlzadeyên Kurdan tayînî Kurdistanê bike. Navê kesên mîna Abdulqadir, Seyîd Taha û Mustefa Babanzade jî wek endam hatibûn bilêvkirin.[89]

Di vê demê de halê Dewleta Osmanî ne tu hal e. Serê her kesî tevlihev e. Li aliyekî ji bo serxwebûna neteweyên ku berê pê ve girêdayî bûn alîkarî tên kirin. Li aliyekî li serê dewleta Osmanî desthilatdariyek nuh heye, li aliyê din hevalbendiya padîşah û biratiya dîn heye.

Mustefa Kemal li ser hevalbendiya padîşah û li ser navê biratiya dîn pêwendiyan berfireh dike. Wek ku me berê got, ji bo ku Mustefa Kemal alîkariya Kurdan bistîne dikeve nav gelek hewldanan. Nêzîhevbûna Kurd û Ingilîzan a ku bi teşebûsên Noel çêbûbûn jî hebûn. Yanî di vê demê de hemû alî xwe nêzikî Kurdan dikin û dixwazin têkiliyeke erênî bi wan re deynin.

Hikûmeta Stenbolê di nav tirsê de ye û ji bo ku Kurdan ber bi xwe ve bikişîne di nav hewldanê de ye. Li gorî belgeyeke Ingilîz, li Stenbolê li ser daweta Şêxulîslamê berê û endamê kabîneya wê demê Haydarî Zade, wek nûnerên Komîteya Bilind a Kurdan Seyîd Abdulqadir, Emîn Alî Bedirxan, Mewlanazade Rifat, Pêşkar (yarbay) Emîn Beg û Serdar (bînbaşî) Awnî di 10'ê Tîrmeha 1919'an de ligel Wezîrê Şer ê Osmanî Abuk Paşa û Wezîrê Deryavaniyê Avni Paşa civînek pêk hatiye. Çend jêgirên ji wê hevdîtinê ev in:

"Haydarî Zade: Li gorî telgrafên di der barê şaxên Komîteya Bilind a Kurdan de ji walîtiyan hatine, tê fêmkirin ku we li Kurdistanê gelek rêxistinên alîgirên serxwebûnê û nenaskirina hikûmetê ava kirine. Ji bo em gazî we bikin û daxwazên we tam çi ne fêm bikin em ji aliyê hikûmetê ve hatine

[88] M. S. Lazarev, bnb, r. 114
[89] M. S. Lazarev, bnb, r. 108

wezîfedarkirin. Lewma gelo hûn dikarin daxwazên xwe bi nivîskî ragihînin kabîneyê?

...

Ez jî dizanim ku Kurd naxwazin ji Dewleta Osmanî veqetin; lê mimkun e ku hatibin xapandin. Îngiltere ku Silêmaniye dagir kiriye, lê dixebite Kurdistaneke mezin ava bike û dixwaze bajarên rojhilat jî tevî nav vê Kurdistanê bike. Em wiha dibînin.

Mewlanazade Rifat: Heger wiha be, naxwe Îngiltere hebûna Kurdistanê û her wisan Dewleta Osmanî ji Sedrezam Ferîd Paşa bêhtir muhafiza dike. Çinku ji bo berjewendiyên Osmanî Kurdistaneke mezin ji Ermenistaneke mezin çêtir e; bi vî awayî qet nebe welatekî ku bi tevahî misilman e wê bimîne.

Haydarî Zade: Min tam fêm nekir bê hûn dixwazin çi bibêjin.

Mewlanazade Rifat: Wek hûn dizanin, Sedrezam di axaftinên xwe yên Konferansa Parîsê de ku hatine weşandin, dide xuyakirin ku Hikûmet dana otonomiyeke fireh ji bo Ermeniyan qebûl kiriye; vê jî bi awayekî sirûştî pir zêde tesîr li miletê Kurd kir.

...

Avnî Paşa: Werin em rasterast biaxivin; îro qedera me ne diyar e. Hewce ye ku em ji bo armanceke hevpar bixebitin. Ji bo niha em li benda alîkariya we û îtiata we ne. Kengî em hatin wê nuqteya ku em ê nikaribin we bifikirin ez ê ji we re bibêjim; herin li çareya serê xwe binêrin.

Mewlanazade: Lê belê wê demê ji bo ku em li çareya serê xwe binêrin ne wê dereng be? Qedera her kesî niha li Konferansa Parîsê dike hişkere bibe. Her hikûmet û her netewe mecbûr e hurmetê ji qerarê li wir tên dayîn bigire. Ji ber vî awayî cemiyeta me ji bo selametiya miletê Kurd pê dadikeve ku aştî û sikûneta li Kurdistanê muhafiza bike.

...

Emîn Beg ê Bedirxanî: Heger hûn dixwazin imtiyazan bidin Kurdistanê, ma ne çêtir e ku hûn ji niha ve waliyekî Kurd û wezîfedarên Kurd bişînin Kurdistanê?

Avnî Paşa: Çima na? Kesên ku hûn munasîb dibînin ji me re bibêjin..."[90]

Bi vî awayî, civîn bi sozê ku wê Hikûmeta Osmanî Kurdistaneke xweser (otonom) qebûl bike û walî û erkedarên Kurd jî tayînî Kurdistanê bike, bi dawî dibe. Di vê navê de bi Seyîd Taha re jî têkilî tê danîn.

Di neqeba Ingilîz û Hikûmeta Osmanî de hemberiya ji bo Kurdistanê ber

[90] Ahmet Mesut, bnb, r. 75-77

bi xwe de bikişînin dom dike. Lê her du alî jî zêde bi pêş de nikarin herin, ji ber ku Kurdistaneke yekbûyî û serbixwe ku karibû hevalbenditiya wê bê guhertin û ji bo wan xetereyên girîng bi xwe re bîne. Heger Osmaniyan Kurdistaneke mezin zeftbikirina wê çaxê dê rewşa Ingilîzan a li Rojhilata Navîn biketa nav xetereyan, îcar heger Kurdistaneke mezin li aliyê Ingilîzan bima, wê gavê wê Tirkiyeyeke biçûkbûyî û bêhêz derketa holê.

Qeweta Kurdan jî ya li dijî van her du hêzan û her wiha hezên Îranê rabûna tune bû; loma hewce dikir ku xwe bi yekî ji van hêzan bigirin. Wek ku tê xuyakirin, bi piştgiriyeke herî biçûk jî Kurdan li aliyê Tirkan cih digirt. Karbidestên Ingilîz ev yek didîtin û gava cihek bi dest dixistin ji bo ku karibin wê di destê xwe de bigirin diketin nav têkoşîn û hewldanên mezin. Yanî ne li gorî xwestek û mafê gel, li gorî berjewendiyên dewleta xwe tevdigeriyan.

A rastî, nêziktêdayîna li Kurdên Îranê helwesta Îngiltereyê vekirî dide xuyakirin. Gava Kurdên li Îranê ji bo serxwebûnê li ser piyan bûn û pirî caran jî bi tevgerên li parçeyên din re di nav têkilî û pêwendiyan de bûn, li Sewrê tu meyla Îngiltereyê ku statuyek ji bo Kurdên Îranê bê dan tune ye. Dema piştgirî bida Kurdên li Îranê berjewendiyên wan ên li wê dewletê diketin xetereyê. Ev yek jî dide nîşan ku ew ne li gorî tiştên ku gelek caran di gotinan de dianîn zimên, wek “prensîba diyarkirina qedera xwe ya neteweyan” tev digeriyan. Ev gotin tenê maskeyek e ji bo ku xwestekê xwe bicih bînin.

Kurdên Îranê dixwazin di asta temsîlkariyê de beşdarî Konferansa Sewrê bibin. Klûba Kurdan a li Stenbolê vê yekê destek dike û ji bo vê jî dikeve nav hin teşebûsan. Lê temsîlkarên Kurdên Îranê yên ku dixwazin tevî Konferansa Sewrê ya Aştiyê bibin, tên astengkirin. Serlêdanên Fexrî Beg ê Ebdî ku ew wek nûnerê Kurdên Îranê hatiye hilbijartin, bêencam dimînin û heta xwesteka Şêx Taha ya ku tevî gotûbêjên li Parîsê bibe, ji hêla otorîteyên Ingilîz ve tê astengkirin. Ev helwesta Ingilîzan ji hêla Frensayê ve jî tê destekkirin. Şerîf Paşayê ku wek temsîlkarê Kurdan tê qebûlkirin, diyar dike ku pirsgirêkên Kurdên Îranê li derveyî konferansê hatine hiştin.[91]

Li Başûrê Kurdistanê jî li ser vê mijarê eynî rewş heye. Nameya ku rewşa astengkirina çûna Zekî Reşîd û Saîd Ahmed Efendî yê ji malbata Şêx Mehmûd ê ku dixwazin wek delegeyê Kurdistana Başûr tevî konferansê bibin tê de tê xuyakirin, rewşa wê rojê û dek û dolabên ku hatine gerandin, vekirî li ber çavan radixe:

---

[91] Hasan Yıldız, bnb, r. 55

*“ Otela Bêrûdê ya Amerîkan*
*6 Tîrmeh 1919*
*Ji Birêz Komîseriya Bilind a Frensayê ya Bêrûdê re,*

Delegeyên ji Kurdistana Başûr, ku îmzeyên wan li jêr in, vana îlan dikin:
Hikûmeta Kurd a ku li Silêmaniyê hatiye avakirin, ji Mêrdînê heta Sîneyê hemû bakur û herêma ji Urmiyeyê heta Elbakê digire nav xwe. Gel li Kerkûkê, ku ew berî îlankirina agirbestê ketibû, bi yekdengî Şêx Mehmûdê ku endamekî ji malbata Şêx Berzencî ye, wek hikumdarê xwe hilbijart. Li aliyê din Şêx Mehmûd daxwazên gel hemû qebûl kirin. Ji ber ku xetên telgrafê tune bûn, me ev yek nikaribû ragihanda hêzên hevpeymanan. Bi agirbestê re, bi lez me cîranê xwe Waliyê Giştî yê Leşkerî yê Iraqê agahdar kir. Bi dû vê ragihanê de Waliyê Giştî yê Leşkerî ji Bexdayê 3 efser erkedar kiribûn û hikumdarên me jî ew qebûl kiribûn û bi wan re hevdîtin pêk anîbûn. Piştî demeke kin Waliyê Iraqê Wîlson hatiye Silêmaniyeyê û bi awayekî fermî qebûlkirina serbixwebûna me îlan kiriye. Hilbijartina delegeyan û şandina wan a Parîsê ji bo ku berjewendiyên neteweyî biparêzin pejirandiye. Em li Şamê ji bo ku em General Allemby bibînin û ji bo bidestxistina pasaportên ku bi wan seyaheta delegeyên me bi awayekî fermî bê naskirin, tevî Seîd Ahmed Efendî yê ji malbata hikumdarê me yê dahatûyê, em du kes in. Em di 20’ê Adarê de ji Silêmaniyeyê derketin. Piştî şeş rojan em gihîştin Bexdayê. Ji ber ku li Bombayê, bi riya deryayê rêwîtî dirêj û zor bû, bi pesendkirina Hawel li ser navê Waliyê Iraqê me riya bejahiyê da ber xwe û piştî deh rojan em hatin Helebê. Bi pasaporta ku li Bexdayê dabûn me, tenê ji bo rêwîtiya heta Helebê destûr dida me. Ji bo em seyaheta xwe berdewam bikin, diviyabû em bi dû Serdar (bînbaşî) Brayer ketina. Vî zatî got, pêşiyê divê Bexda bê agahdarkirin. Ji bo em bersivekê bistînin hewce bû em çend rojan bisekinin, lê paşê nizanim çima wî bi xwe hişkere kir ku bersiva Bexdayê erênî ye, lê belê divê ew vê yekê ragihîne Fermandariya Şam û Misirê. Piştî demeke dirêj, îcar di bersiva der barê seyaheta me de dan xuyakirin ku delegeyên temsîlkarên neteweya Kurd ên ku ji aliyê Londonê ve hatine rayedarkirin ji zû de bi rê ketine, ji lew re hewcedarî bi şandina kesên din tune ye û ev yek ragihandine General Allembey. Nexwe, ji bo ku hûn vê yekê ji me re bibêjin, çima we ew qas dem em dan sekinandin?”[92]

Wek tê dîtin, di nameyê de xwestina serxwebûnê ya Kurdan û soz û qewlên ku dane Kurdan jî, bi awayekî zelal hatine diyarkirin. Digel vê yekê,

[92] Hasan Yıldız, bnb, r. 62

tê xuyakirin ku ji aliyê teknîkî ve jî Kurd li hember hêzên ku bi wan re rû bi rû mane, çi qas di nav bêîmkaniyan de ne. Dema mirov wê demê binirxîne divê mirov hemû warî, hemû mijaran bîne ber çavan. Ji bo mirov fêm bike bê tenê telgraf ji bo tevgera Mustefa Kemal çiqas girîng û tiştekî alîkar e, xwendina 'Nutuk'ê (Nutqa Ataturk) bes e.

Li aliyê din Mustefa Kemal desteka fermandarên leşkerî yên Osmanî û saziyên wan distend û her ku diçû xurt dibû. Kadro û binesaziya ku ji dewleta Osmanî mabûn, hêzeke xurt wê bidanayê. Desteka ji hêzên herêmê distend jî dikir ku bi gavên ewle bi riya xwe de bimeşe. Lê ji bo piştgiriya hêzên herêmî bistîne, wek me li jor jî behs kiriye ketiye nav hewldanên mezin. Mustefa Kemal beriya beşdariyê li Kongreya Erziromê bike serokê eşîrê yê li Motkan Hacî Mûsa Beg wek endamê Heyetî Temsîliye dabû hilbijartin û di 10'ê Tebaxa 1919'an de jê re bi kurtasî vana dinivîse:

"Qet têkilî û pêwendiyê di navbera me de ku di dema ez li Fermandariya Artêşa Duyemîn bûm, di nav rewşên gelekî xeter de çêbûbûn ji bîra min naçin. Ew fedekarî û xizmeta we ya bijarte ya ji berê de, ku di oxira dewlet, milet û welat de ye û ji şexsiyeta we ya mezin tê, ji aliyê hemû welatperweran ve tê nirxandin. Di vê navê de qîmeta alîkariya we ya der barê bi paş ve stendina Bedlîsê de, girîngiya hewldana we ya muhafezakirina herêma Motkan a li dijî dijminan, bi pesindan û spasiyan tê bibîranîn.

Dijminên me, ji bo ku serwerî û serxwebûna miletê me bi dest bixin û wî bikine rewşa koleyan, dixebitin. Hişkere tê xuyakirin ku, ew dayiknîştimana me ya ji bav û kalên me maye dixwazin bikin Ermenistan.

Hikûmeta Stenbolê, bi bêmicalî ji dijminên me re serî daniye. Miletê me ji ber ku têdigihîje bi destê van kesên bêdesthilatdar wê encameke xerab bê serê wan, rêxistinên parastina milî ava dike... Di nav vê hewldana welatparêz de, tiştekî sirûştî ye ku baweriya min bi welatiyên min ên mîna we ku wê destek û hevkariyên xwe ji me texsîr nekin tam e.

Bi yekîtiya dengan a kongreyê hûn ji bo emdamtiya Heyetî Temsîliye hatin hilbijartin... Ez hêvî û qebûl dikim hûn ê li gorî pêwîstiya nîzamnameya wê birayê min Celal Beg bîne, di zûkirina rêxistinkirinê, destûr nedayîna aliyek an jî kesekî ku pê dakeve û di pêşiyê keve, di riya pêkanîna armanca milî ya pîroz de hûn ê bibin alîkar; ji bilî vê ez ji şexsiyeta we ya mezin rica dikim, gava lebatek nelirê ya baskê eskerî yan jî sivîl ê hikûmetê bê dîtin, divê serwerî û îradeya milet bê nîşandan."

Mustefa Kemal, di 13'ê Tebaxa 1919'an de, ji Hezretî Kufrewîzade Şêx Abdulbaqî Efendî yê li Bedlîsê re jî, ku jê re dibêje 'Efendiyê min ê xweyîfazîlet', bi kurtasî van dinivîsîne:

"Rewşa dijwar a ku meqamê mezin ê xîlafet û seltanetê û welat û miletê me tê de ye, ji aliyê şexsiyeta we ya kamil ve jî eyan e. Bi fikara ku xebata bi milet re, di nav milet de riya herî rast e, ez ji eskeriyê veqetiyam.

Ez prensîbên qerarê ku di Kongreya Erziromê de hatine stendin, dişînim. Ji welatperweriya we ya ku ji aliyê her kesî ve tê zanîn, tê hêvîkirin ku çi hewce be ew ê li herêmê bê bicîanîn û rê li pêşiya her cure gotinên jirêbirinê yên dijminan bê girtin. Ez hezdarî û hurmetên xwe pêşkêş dikim. Hezretî Efendî."[93]



*Mustefa Kemal û Diyap Axa*[94]

Mustefa Kemal eynî rojê ji Abdurehman Axa yê Şirnexî, Omer Axa yê Derwêşî û ji Hezretî Resûl Axa yê Mûşasî re nameyan dinivîse. Ji wan dixwaze ku, ji bo tu carî welat di bin lingên Ermeniyan de neyê perçiqandin, ew li herêmên xwe rêxistinên milî pêk bînin. Li hêla din Mustefa Kemal ji mebûsê berê yê Bedlîsê 'Hezretî Sedulah Efendî' re ku ew wek Endamê Heyetî Temsîliyeyê dabû hilbijartin, ji Şêx Mehmûd re ku wî li dijî Ingilîzan li ber xwe dida, ji şêxên mezin ên Norşînê Ziyaedîn Efendî, ji Cemîlê Çeto re, ku ew ê paşê li Xerzan li dijî Têkoşîna Millî serî hilde, li Meletiyê ji Hecî Kaya û Şatzade Mustefa Axa re dinivîse û ji wan dixwaze ku ew beşdarî tevgera milî bibin; her wiha têra xwe pesnê Muftiyê Şîranê Hesen Fexrî jî dide.

Di van rojan de li sehneya Ermenistanê jî teşebûsên Amerîkayê tên dîtin. Ramana 'di bin mandeya Amerîkayê de avakirina dewleta Ermenî' derketiye pêş. Serok Wîlson, ji bo ku li cih lêkolînan bike, di Tebaxa 1919'an de komîsyonekê dişîne. Ji aliyê din ve, belgeyeke Ingilîz a bi tarîxa 6'ê Rezbera 1919'an, niyeta Frensizan ku ji bo ew Ermeniyan biparêzin wê 12. 000 leşker bişînin û wan li Îskenderûnê bi cih bikin, rapor dikir.[95]

[93] Doğan Avcıoğlu, bnb, r. 990
[94] Susan Meiselas, bnb.
[95] Ahmet Mesut, bnb, r. 90

Îngiltere di Tebaxa 1919'an de hîn jî ji bo Kurdistanê negihîştiye biryareke zelal û hişkere. Rayedarên Ingilîz ji berpirsyariya herêmên Kurdan tevdî bigrin ser xwe bitirs in, difikirin ku taqeta wan a berpirsyariya leşkerî û siyasî ya herêmê ragirin tune ye. Di vê demê de ne alîgirên ji nû ve avakirina serweriya Tirkan in jî.

Di meha Rezberê de ji bo dahatûya Kurdistanê, li ser du alternatîfan tê sekinandin. Di her duyan de jî fikara parçekirina Kurdistanê û Mûsilê bi ser Iraqê de berdin heye. Serheng C. French ku van alternatîfan li Qahîreyê rapor dike, tercîha der barê mijara Mûsilê de rexne dike:

"Ji bo zengînkirina Mezopotamyayeke Ereb, teklîfa daxilkirina hin herêmên dewlemend ên Kurdan a nav Iraqê, bi prensîba 'self-determînasyon'ê re, ku ew di nav Peymana Cemiyeta Miliyetan de cih digire, li hev nake... Bi min, divê di nav Iraqê de qet erdê Kurdan tune be; naxwe, ew ê li Mezopotamyayê cureyek Irredantîzma* Kurdistanê bipêşkeve ku wê hewce be tim hêzeke leşkerî lê hebe. Çendî tevlêkirina van herêmên Kurdan a nav Mezopotamyayê fêdeyê zêde bike jî, ev dê ji bo her roja ku were jî bibe sedema qelsbûnê."[96]Di wê demê de, heger kesên xwedî berpirsyar guh bidana vê tespîta rast, ew tiştên ku heta roja îro diqewimin wê nehatina jiyandin.

Der barê gelek mijaran de pir hindik rê diyar bûbû, lê li gorî dengeya navbeyna hêzan rewşa Kurdistanê ya di sînor de zelal nebûbû. Nezelaliya tevgerê, gotegotên der barê parçebûna Kurdistanê de, bêhizûriya xelkê zêde dikir. Wek Serokê Komîteya Navendî ya Yekîtiya Kurdan, Seyîd Abdulqadir di notayekê de ku di 2'yê Kewçêra 1919'an de, ji serokatiya Konferansa Sewrê re şandiye, dibêje ku "Heger tê xwestin li Kurdistanê sikûnet pêk were, divê dev ji parçekirina welat bê berdan û rê li ber xistina bin mandeya welatên cuda bê girtin." Yan na li gorî Seyîd Abdulqadir Kurdistan, wê "di nav vê parçebûnê de bibe qada aloziyên ku tu car xelas nebin."[97]

Wezîfedarên Ingilîz cara diduyan Noel di Rezbera 1919'an de şandibûn Rojavayê Kurdistanê.

Beriya wê bi mezinên Kurdan re hevdîtin tên kirin û ji bo Noel û şexsiyetên xuya yên Kurdistanê bi hev re li Kurdistanê bigerin biryar tê stendin. Mebesta prensên Kurd ew bû ku nerastiya îdiayên Ermeniyan bidin nîşandan, her wisan tespîtên rast ên rewşa herêmê bên kirin û heta encameke

---

* *Irredantîzm; polîtîkaya ku miletek îdiaya mafê serweriya ji nû ve ya erda ku demên berê lê jiyaye yan jî kontrol kiriye bike.*

[96] Ahmet Mesut, bnb, r. 101

[97] Hasan Yıldız, bnb, r. 97

erênî ji Sewrê derkeve bikin ku bêhna xelkê fireh be.

Komîserê Bilind ê Ingilîz radigihand ku li ser çûna Kurdistanê ya sê temsîlkarên Kurd ku eşîreta ji bo aramiyê qanix bikin, li hev kirine; lê wê ew û Serdar Noel cuda cuda herin û piştre ew ê li wir bigihîjin hev. Heyeta Kurd, di 24'ê Tîrmehê de ji Stenbolê da rê.[98]

Kesên ku çûne Kurdistanê bedirxanî ne. Bedirxanî û Noel li Kurdistanê li hev civiyane û ji bo Kurdistaneke otonom bi giregirên Kurdan re jî hevdîtin pêk anîne. Her wiha ji bo ku Kurd bi hev re tevbigerin jî ketine nav hewldanan. Noel ku ji Entabê heta Meletiyê li vê herêma fireh geriyaye, tespît kiriye ku ji % 80'yê gelê vê herêmê Kurd e.

Niha jî mijar ziviriye ser Kurdên alîgirên Hikûmeta Stenbolê û Kurdên ku alîgirên Padîşah in yê tevî nav tevgera Mustefa Kemal bûne. Lê belê hîn însiyatîf di destê Hikûmeta Stenbolê de ye. Li Meclîsê Kurd xwedî hejmareke zêde ne. Li gorî ku li jorê jî hat diyarkirin, lihevkirina hikûmetê û ya Kurdan jî ya berê heye. Ji bo şaşî û çewtiya îdiayên Ermeniyan bê destnîşankirin, li herêmê lêkolîn tên kirin. Lê di vê navê de Hikûmet wê bixwaze Kurdan li dijî tevgera Mustefa Kemal bi kar bîne.

Li Kurdistanê zêdehiya bilindbûna tevgera neteweyî ya Kurdan, çalakbûna arîstokratên Kurd ên li Stenbolê û bi awayekî rasterast teşebûsa wan a ji bo danîna têkiliyan bi pêşewayên cihkî re, têra xwe Mustefa Kemal xistiye nav fikaran. Hikûmeta Stenbolê jî, ji bo ku tevgera Mustefa Kemal berteraf bike, dikeve nav hin hewldanan. Hikûmeta Stenbolê ji waliyê Elezîzê Xalib Beg dixwaze ku bi hin siwariyên Kurd re biçe Sêwazê û serokên tevgerê bigirin. Talîmata ku hatiye dayîn dikeve destê alîgirên Mustefa Kemal. Li ser vê yekê Mustefa Kemal talîmata ku Xalib Beg û Noel li Meletiyê bên girtin dide. Xalib Beg û Noel xwe bi zor xelas dikin û derbasî Ruhayê dibin.

Alîgirên Mustefa Kemal vê talîmata ku ji devleta Stenbolê hatiye, di rojnameya Sêwazê de diweşînin. Di nav xelkê de belav dikin ku hikûmeta alîgirê Ingilîzan lê dixebite ku Kurdan li dijî padîşah û artêşê sor bike da ku serî hildin û bi armanca ku Kurdên serhildêr îsyanê li hemû Kurdistanê belav bikin û êrîşî ser Kongreya Sêwazê bikin jî, wezîrê karê navxweyî û wezîrê leşkeriyê yên Hikûmeta Stenbolê û Ingilîz li hev hatine. Heman rojname der heqê girtina Bedirxanzade Celadet û Kamûran Alî Beg de, ku bi Serdar Neol re li Kurdistan digerin, dinivîse ku wan 'cezayê divê li xayînên mîna Celadet û rêhevalên wî bê birîn, ku wan hemû Kurd bi zêrê Ingilîzan firotine, ji mehkemekirina gel re' hiştine.[99] Ev propaganda li her aliyê welêt tê kirin û ev

[98] Ahmet Mesut, bnb, r. 87
[99] Ahmet Mesut, bnb, r. 105

yek jî dibe sedema gelek alozî û tevliheviyan.

Lazarev ji bo wê demê wiha dinivîse: "Mustefa Kemal ku hê di Tîrmeha 1919'an de salox digihêyê ku ew ê Celadet, Kamûran û Ekrem Beg ji Stenbolê herin Kurdistanê, ji bo bên girtin emir daye komandarê Perleşkera 13'an a li Diyarbekirê. Rêveberên herêmê, bêyî pesendkirina Hikûmeta Osmanî, biryara tedbîrgirtina ji bo vê yekê nedane. Bedirxanî, bi alîkariya Waliyê Xarpêtê (Elezîz) Elî Xalib Beg xwe veşartine û ji vê yekê filitîne. Bêhna Kemal teng dibe, ji rêveberan re dinivîse û dixwaze ji bo tunekirina tevgera Kurdan a veqetînxwaz li ser zemîneke minasib tedbîran bistînin."[100]

Di 8'ê Kewçêrê de, Cemiyeta Teraqî ya Kurdistanê, civîneke derasayî li dar dixe. Civîn ji bo ku tevgera Mustefa Kemal gotûbêj bike û li dijî wê helwestan bigire li dar dikeve û biryara ku di vê civînê de derdikeve jî radigihînin çapemeniyê, lê belê ji aliyê sansûrê ve pêşiya wê tê girtin. Biryara ku hatiye stendin bi kurtasî wiha ye:

"Komeleya Pêşketina Kurdistanê ku hejmara endamên wê digihîje 15000'î, bi pêbawerî û sikûnetê, li hêviya biryarên der barê qedera wan a Konferansa Aştiyê de ne.

Bi tevgera Anatoliyayê re tu armanceke wan a muşterek nîn e. Îdiayên 'El Bayraq' an jî yên şefên hêzên Anatoliyayê ku der barê Kurdan de dikin, bi xemgînî red dike.

Em li ser navê hemû Kurdan radigihînin ku Bûyera Meletiyê, tevgereke li dijî rûmeta neteweyî ya Kurdan e. Serdarê Ingilîz Noel, ji bo ku li Kurdistanê lêkolînên cografîk, etnografîk û yên din ên zanistî bike, ji aliyê hikûmeta xwe ve hatiye şandin. Her du prensên Kurd ên ciwan ên ku bi wezîfedarê Ingilîz re ne, ji aliyê me ve, ji bo ku tenê lêkolînên zanistî yên Serdar sivik bikin ligel wî bin û her wiha bikin ku heta Konferansa Aştiyê qerarên xwe bide Kurd bêhnfireh bin hatine wezîfedarkirin û mesrefa seyaheta wan jî komîteya me daye ser xwe.

Her du prensên Kurd ne ji bo ku li Kurdistanê bêhizûriyê çêkin çûne, ew ji bo ku heta qerara dawî der barê Kurdistanê de derkeve xelk aram û bêhnfireh bin alîkariyê bikin çûne.

Di dawiya civînê de, biryara li jêrê bi yekîtiya dengan hatiye stendin.

'Tenê Ingilîz dostê me ne û Kurdan biryar daye ku ji bilî Ingilîzan naxwazin hinekî din wan bihimînin."[101]

Daneyên ku Noel li Kurdistanê bi dest xistine, dikin ku hîn bêhtir bi çavekî rastbîn li Kurdistanê bê nêrîn. Lê propagandaya alîgirên Mustefa

[100] M. S. Lazarev, bnb, r. 116
[101] Ahmet Mesut, bnb, r. 103

Kemal îdareya Îngiltereyê ditirsîne. Ji bo têkilî hîn bêhtir ne xweş nebin, Ingilîzan Noel ji wezîfeyê digirin û wî bi paş ve dikişînin. Rayedarên Ingilîz, ku gotine Noel bi awayekî xeternak propagandayeke li dijî Tirkan û alîgirê Kurdan meşandiye, ev yek wek meyleke taybet qebûl kirine û gotine, ev ne biryara me ye. Ingilîzan ji bo ku terefê Tirkan rihet bikin, dibêjin ku, 'mebesta Noel ne propaganda ye lêgerîn e. Li Meletiyê (di vê demê de Meletiye yek ji merkeza tevgera Kurdan e) rasthatina Noel û Xalib Beg, rasthatineke tesadûf e. Bi mebesta pêkanîna aştî û hizûrê, tenê ji bo ku bedirxanî refaqetî Noel bikin destûr hatiye dayîn.'

Di pey re îdareya Osmanî ya di bin kontrola Ingilîzan de, di Kewçêra 1919'an de hemû rêxistinên Kurdan ên li Stenbolê digire, çalakiyên wan qedexe dike, rêveberên wan digire û Ingilîz di eynê xwe dernaxin.[102]

Li gorî Noel, heger Konferansa Aştiyê ji meseleya dewleta Kurdî re çareseriyekê neyne, pêwîst e ji bo daxwazên "Partiya Kurd" gaveke dilxweşkirinê bê avêtin. Heger serweriya Tirkan li ser wilayetên rojhilat bê hiştin, wê demê divê ev dewlet bi îdareyeke fireh bê temsîlkirin. Rêveberiya dewleta nû divê bi wilayetên Kurd re ku % 95'ê wan Kurd e, li gorî prensîba etnîkî tevbigere. Jendirme jî tê de, hewce ye îdare ji Kurdan bê pêkanîn. Divê zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û li dibistanan jî divê bê hînkirin. Tayînkirina kesên ji bo qedemeya bilind a dewletê, wekî walî, mutesarif û qeymeqaman divê tenê bi îmtiyaza mandayê be.[103]

Ji ber ku Noel Kurdistaneke serbixwe pêşniyaz dikir, erkedarên Ingilîz ên li Bexdayê li dijî wî derdikevin. Di nav rêveberên Brîtanyayê yên li Rojhilata Nêzik de, der barê dahatûya Kurd û Kurdistanê de pêşniyazên cuda hene. Belgeyeke bi mêjûya Rezber 1919, ku li Biryargeha Hêzên Misirê hatiye nivîsandin dibêje, li gorî hemû erkedarên ku çûne herêmê, îro Kurd û Ermenî pir di nav hev de ne, avakirina du dewletên cuda û ji hev veqetyayî wê rê li bêedaletî, alozî û rijandina xwînê veke. Tê gotin ku 'heger bêyî hêmana Kurd li ber çavan bê girtin, Ermenistanek were damezirandin, digel ku ew ji Tirkan zêde ne xweş in jî, ew ê bike ku Kurd xwe biavêjin bextê Îtihad û Teraqiyê.' Her wisan tê hişkerekirin ku her çiqas 'Ermenistaneke bi tevahî' Ermeniyan qayil bike jî, ew ê bêdilî hinên din ên li Anatoliyayê be û ji bo parastina aştiyê jî muhtemel ne tenê hêza mandeter ew ê hemû hêzên bi Anatoliyê û bi Sûriyeyê re eleqedar bajo ser xerckirinên giran ên eskerî.[104]

[102] Hasan Yıldız, bnb, r. 98
[103] M. S. Lazarev, bnb, r. 108
[104] Ahmet Mesut, bnb, r. 99

Di belgeyê de, fikarên der barê veqetandina Kurdistanê ya bi sê herêman jî hene. Li hêla din didin xuyakirin ku, ji bo ew û mafên bi mudafaa wan mudexaleyî herêmê hatiye kirin li hev nake, teklîfa Serheng (albay) Wilson a ku ji bo zengînkirina Mezopotamyayeke Ereb dixwest hin herêmên zengîn ên Kurdan daxilî nav Iraqê bike, tên rexnekirin. Digel vê yekê, ku dê paşê jî bê dîtin, ew ê vê teklîfê pêk bînin. Di wan rojan de fikara ku 'divê diyarkirina sînorên di navbera Kurdistan û Ermenistanê de bimîne paşê', derdikeve pêş.

Di aliyê tevgera Mustefa Kemal de jî piştî kongreyên Erzirom û Sêwazê, biryar tê dayîn ku ji bo têkiliya nexweş a di navbera Heyeta Temsîliyeyê û Hikûmeta Stenbolê de têkeve riyeke erênî, li Amasyayê hevdîtin bê pêkanîn. Ji ber ku di vê serdemê de rewşa Kurdan di rojevê de ye, di hevdîtinê de mijara sereke dayîna mafên Kurdan e. Di hevdîtin û gotûbêjên di dema 20-23 Kewçêra 1919'an de, ku li ser navê Hikûmeta Stenbolê Wezîrê Deryayê Salih Paşa û li ser navê Heyeta Temsîliyeyê jî Mustafa Kemal, Rauf Beg û Bekir Samî Beg beşdar bûne, hin biryar tên stendin. Ew biryar wek "Protokolên Amasyayê" tên bibîranîn.

Di protokola diduyan de tê hişkerekirin ku, 'piştî muhafezekirina seltenat û xelîfetiyê hedefa bingehîn hate qebûlkirin û pêde, li ser qerarên di Kongreya Sêwazê de hatine stendin, madeyên Daxuyaniya Kongreya Giştî ku ew di 11'ê Rezbera 1919'an de hatine weşandin gotûbêjan dest pê kirin'. Li aliyê din di xala yekem a daxuyaniyê de tê gotin ku, "Sînorên Dewleta Osmanî yên ku hatine tesewirkirin û pejirandin ew erdên ku Tirk û Kurd li wan bi cih bûne digire nav xwe û ev piştî îzahkirina nemimkunbûna veqetîna Kurdan a ji camîaya Osmanî bi awayekî muşterek hat qebûlkirin ku ev sînor daxwazeke asgarî ye û divê bê temînkirin. Ligel vê, ji bo bi awayekî serbest pêşketina Kurdan bê temînkirin û bibin xwediyê destûra mafên nîjadî û civakî û bikevin rewacê û ji bo ku rê li ber tovên nîfaqê yên biyaniyan bê girtin, ku ew di bin navê serbixwebûna Kurdan de vê yekê dikin, minasib hat dîtin ku ev yek ji niha ve ji aliyê Kurdan ve jî bê zanîn.[105]

Li cepheya Tirkan ji bo pevrebûnê û mafên bidine Kurdan hewldan dom dikin. Li Sewrê jî Ingilîz, ji bo ku rewşê nerm bikin û Kurdan qezenc bikin di nav hewldanên mezin de ne. Li hêla din jî pê dadiketin ku Kurd û Ermenî di nav xwe de li hev bikin. Hin derdorên Kurd jî, mehekê du mehan di nav bêdengiyekê de li benda encama peymanê disekinîn.

[105] Naci Kutlay, bnb, r. 82

Piştî hin têkilî û gotûbêjan heyetên Kurd û Ermeniyan li Sewrê li ser Ermenistaneke azad û Kurdistaneke azad li hev dikin. Kifşkirina sînorê di nav her du welatan de jî, ji hevdîtinên ku dê pişt re bên kirin re dihêlin û tê ragihandin ku li her du dewletan ew ê mafên hindikahiyan bidin ber çavan. Peyman di şeklê memorandûmê de bû, ku di navbera nûnerê Kurdan Şerîf Paşa û nûnerê Ermeniyan Bagos Nubar Paşa û Dr. H. Ohanciyan de, di 11'ê Berfenbara 1919'an de li Parîsê hatibû îmzekirin.

Dema ev tê bihîstin bi piraniya Kurdan re aciziyek çêdibe. Ji aliyê hin derdorên Kurdan ve jî ev yekîtî dibe sedema kêfxweşiyê. Curzon jî di 20'ê Berfanbara 1919'an de bi telgrafê talîmat daye ku Komîseriya Bilind a Brîtanyayê ya Li Tirkiyeyê, bi hemû awayî destekê bide vê 'tevgerê'.

Kazim Karabekir di berhema xwe ya navbuhirî de, ji bo vê demê ku di hevdîtinên aşîtiyê yê li Sewrê bihevretiya Kurd û Ermeniyan derketibû holê, îfade dike ku, 'propogandayên ecêb ên mîna Kurd û Ermenî bira ne, ew ê bi hev re serxwebûna xwe bi dest bixin û ew ê rojhilat ji Tirkan bistînin' dihatin kirin. Ev wek -ku di vegotinên li jor de jî xuya ye- bermeqlûbê têkiliyên ku Kurdan bi devleta Osmanî re danîne. Ji ber vê yekê hin arîstokratên Kurdan ku gelekî nêzikî rêveberiya Osmanî ne di wê demê de neçar dimînin, di cih de bi şid li dijî Sewrê nerazîbûna xwe nîşan didin.

Bi taybetî, rewşenbîrên Kurd ên ku hîn berê mişextî Stenbolê hatibûn kirin û li wir hatibûn ser meqamên bilind, ji ber pêwendiya wan a bi împaratoriyê re û ji ber ku rêveberiya nû hin hêviyên nû bi wan re çêkirine, nikarin xwe ji Osmanîtiyê xelas bikin. A rast, wek ku dê di salên pêş de jî bê dîtin, çendî bi hêzên herêmê re hestên neteweyî xurt bin jî, elimandina pevretiyê ya ku ji ber bihevrebûna sedsalan pêk hatiye û pêwendiya ku di bin sîwana dînê îslamê de hatiye danîn, pirî caran li pêş e. Sedema ku Kurdan piştgirî daye Mustefa Kemal ew e ku xelîfetî û mislimantî kirine merkeza tevgera xwe. Heta hilanîna xelîfetî û padîşahiyê, wê bikira ku li rojhilat gelek reaksiyon çêbibûna û bi dû wê de wê veqetîna Kurdan hîn bêhtir ronî û zelal bibûya. Ji ber ku xelîfetî temsîliyeta Pêxember e fikara ku divê ew li cem vê yekê cih bistînin serdest e. Xelîfe di asteke wisan de ye ku di ser hemû neteweyan re ye. Ev ne tenê li cem Kurdan wilo ye, wê demê li cem hemû mislimanan ev heye. Ji lew re jî, rayedarên Ingilîz, gava li dijî mislimantiyê propaganda dihat kirin, pir ditirsiyan ku ew ê li mêtingeha wan Hindistanê jî tevlihevî û nerazîbûn çêbibin.



*Seyîd Abdulqadir*[106]

Serokê Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê Seyîd Abdulqadir, di kabîneya Ferîd Paşa de serokê Senatoyê ye, yanî mirovdewletê Osmanî yê li payeya herî jor e. Di dema Peymana Aştiyê ya Sewrê de Seyîd Abdulqadir, li ser weşandina şertên peymana di navbera Şerîf Paşa û Bogos Nubar de, daxuyaniyekê dide rojnameyê (27 Sibat 1920) û wiha dibêje: "Tirk birayên me yên xweşdivî ne û dînê me yek e. Wek mislimanan, ne mimkun e ku di navbera me de dijminahî hebe. Em tenê daxwaz dikin ku mafê bipêşketina azad bidine me. Ew îdiaya ku dibêje Şerîf Paşa û Bogos Nubar li dijî Tirkan li ser peymanekê li hev kirine, bi temamî bêbinî ye. Jixwe tiştekî wiha ji me re nabe mijar. Ev gişt encamên propagandayên ji bo hin mebestên diyar tên kirin in."[107]

Yek ji kesên ku li dijî Şerîf Paşa derketiye, Seîdê Kurdî ye. Di nivîsa ku li ser navê sê kesan; ji giregirên Berzenciyan parêzer Ahmed Arif, ji giregirên Hîzanê serdarê berdest Muhammed Siddik, ji ulemaya Kurd Saîd-î Kurdî hatiye nivîsandin û di rojnameya İkdam de roja 22'yê Sibatê hatiye weşandin; diyar dikirin ku hîn xwîna nêzî pênc sed hezar şehîdî ziwa nebûye, sêwiyên ku li şîşan hatine xistin û extiyarên ku çavên wan hatine derxistin bi bîr dixin û didin zanîn ku kesên bi dijminên xwe yên heyatî re bikevin nav îtifaqeke ku ziyana wê ji îslamiyetê re heye, nas nakin.

Gelek serokên eşîrên Kurdan jî telgrafan dişînin Konferansa Aştiyê ya Sewrê û di wan de diyar dikin ku ew dixwazin tevî birayên xwe yên Tirk bijîn:

Telgrafa Erzinganê
22 Sibat 1920
*Ji Komîseriya Bilind a Frensewî re*

[106] Susan Meiselas, bnb.
[107] Ahmet Mesut, bnb, r. 136

*Li gorî ku em ji rojnameyan hîn bûne, Şerîf Paşa ku niha li Parîsê rûdinê û îdia dike ew Kurd e, ji ber ku li Tirkiyeyê bi dek û dolabên xwe bi ser neketiye, tevî Bogos Nubar, ku ya rast ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî dixebite, xwedêgiravî ji bo Kurdistana serbixwe beşdarî Konferansa Aştiyê bûye. Ji ber vê yekê em bi Konferansa Aştiyê didin zanîn ku Kurd wek nîjad û ol ligel Tirkan di nav heman welatî de tevî hev bûne û birayên qanûnî ne. Ji bilî Hikûmeta Osmanî mafê tu kesî tune ku li ser navê Kurdan biaxive û tu kes nabe şîrovekarê hestên wan ên ku zindîtiyê dide wan. Di dîroka Osmanî de, di nav Kurdan de tu car cudahî nehatiye kirin. Û di hemû şeran de Kurdan tevî Tirkan di sefên pêş de xwîna xwe rijandine. Gelo Şerîf Paşa, ku wî niha bi Bogos Nubar re li hev kiriye, nizane piştî ku artêşên Rûs ji welatê me vekişiyan pê de, xelkê misliman ên ku ji hêla Ermeniyan ve hatin kuştin % 80'yî wan Kurd in? Ji ber vê ew hewlên wî yên ji bo hevalbendiya bi Ermeniyan re wê bêencam bimînin. Ji bo ku bidine Kurdan, veqetandina qismek ji erdên împaratoriyê, tê wateya haziriya welatekî nû ji Ermeniyan re di dahatûyê de.*

*Em pêşkêşî baldariya Konferansa Aştiyê dikin û radigihînin wan ku, ji bo me ji Împaratoriya Osmanî veqetînin, divê bêyî ku ji hebûna me tiştek bimîne me tune bikin.*

*Serekê Eşîreta Balaban Paşa Beg*
*Serekê Eşîreta Başûranî Yûsiv*
*Serekê Eşîreta Bodmanî Seyîd Yûsiv*
*Serekê Eşîreta Balê Eyûb*
*Serekê Eşîreta Medanî Çîçek*
*Serekê Eşîreta Gorçelî Yûsiv*
*Serekê Eşîreta Ebasan Seyîd Alî*
*Serekê Eşîreta Rolan Hesen*
*Serekê Eşîreta Şadiyan Yûsiv*
*Serekê Eşîreta Zîşanî Muhsîn....*[108]

Di belavokekê de jî, ku 22 eşîrên Kurdan li Elezîzê di 19'ê Adara 1920'an de îmzeya xwe avêtine binê wê, didine zanîn ku ew pêşiyê misulman in û îslamiyet jî cudahiya Kurd û Tirkan nake û ew bi şefekî tenê, bi Xelîfe ve girêdayî ne.

Kurdên Ruha, Mereş, Mêrdîn, Enteb, Edene û Hekariyê ku bi awayekî rasterast bi herekatên Ingilîz û Frensiyan re rû bi rû mane, ji bo ku biyaniyan ji welatên xwe derxin, têkoşînên mezin li dar dixin. Bi artêşa Osmanî re

[108] Hasan Yıldız, bnb, r. 101

hêzên milîs ên eşîretê ku xwedî qabiliyeta şer in, serkeftinên girîng bi dest dixin. Di dawiya meha Berfanbara sala 1919'an de, Kurd Frensiyan ji Mereşê derdixin. Her wiha li hemû bajarên ku îro li başûrê Tirkiyê ne li ber xwe didin û nahêlin hêzên Ewrûpî bikevin axa wan.

Di hefteya duduyan a meha Çileya 1920'an de hem nûnerên Komîteya Îtihat û Tereqiyê hem jî yên Cemiyeta Tereqiya Kurd a li Stenbolê, li Swîsreyê bi Şerîf Paşa re hevdîtinan dikin. Heyeta Cemiyeta Tereqiya Kurd dide xuyakirin ku ew, ji bo li ser navê Seyîd Taha, Simko Axa û serokên eşîrên Kurdistanê yên din xeber bidin û dan û stendinan bikin, xwedî raye ne. Kurd hikûmeteke merkezî ya ku grubên eşîretê yên wê bibin xwedî otonomiyeke cihkî ya berfireh kontrol bikin û di bin parastina biyaniyan de be dixwazin û ji bo Kurdistaneke yekbûyî jî israr dikin.

Kurd ne tenê li dijî hevalbendiya bi Ermeniyan re derdikevin. Li Sewrê bi piranî li ser perçekirina Kurdistanê tê sekinandin û esas ev e ya ku Kurdan gelekî aciz dike. Ji buroya Hîndistanê C. C. Garbet di rapora xwe ya bi mêjûya 29 çile 1920'an de wiha nivîsiye: "Kurd, bi nejidilbûna Tirkan a kevneşopî dizanin û xetereya vê plana Kurdistanê (pêşniyara yekîtiya Tirk û Kurdan E.Y.) ya ku sebeba wê îflasa Tirkan e Kurd fêm dikin. Dîsa jî Kurdistaneke yekpare, parastina hêzeke biyanî(wek Tirkiyeyê qels be jî) û şansê xweîfadekirinê ji parvebûneke ku li gor baweriya wan her tim wê wan tehdît bike baştir e."[109]

Rûdanên li Sewrê û tiştên ku hatine serê Şêx Mehmûd, kir ku di nav xelkê de bawerîanîna bi Ingilîzan qels bibe. Lazarev ji bo wan rojan ev nivîsandine: "Kurdên ku li herêmên li ser sînorên îro yên di navbera Tirkiye û Iraqê de dijîn, ketine nav rewşeke li dijî Ingilîzan; li Cizîrê, li Şirnexê û li deverên din di navbera yekîneyên Kurd û Ingilîzan de pirî caran pevçûn û lihevxistin qewimîne. Di nav Kurdên Zaxo, Hewlêr (Erbîl), Aqre, Koysancax û Silêmaniyê de, ji ber daxwaza Ingilîzan a ku dixwest van herêman ji nav sînorên Dewleta Kurdistanê derxin, ku pêşniyaz dihat kirin ew li herêma Kurdistana Tirkiyeyê bê avakirin, nerazîbûn û qayîlnebûneke mezin çêbûbû. Ligel ku kemalîst bi xwe jî li dijî damezirandina dewleteke wiha bûn, lê belê heta ji destê wan hatiye teşebûsên dijIngilîz ên li ser xeta sînor û Kurdistana Başûr geş û gur kirine."[110]

Meclîsa Mebûsan a Osmanî ya dawî ku bi hilbijartinên nû hatibû ser kar, di civîna 28'ê Çileya 1920'an de rîayetkirina li Mîsaqî Milî (Peymana Milî) pesend û qebûl kir. Di Meclîsê de gelek mebûsên Kurd hene û daxwazên

[109] Ahmet Mesut, bnb, r. 112
[110] M. S. Lazarev, bnb, r. 123

xakê yên ku di Mîsaqê Milî de tên diyarkirin, herêmên Tirk û Kurdan digirt nav xwe; yanî bi bihevretiya Tirk û Kurdan dewletek dihat damezirandin.

Ziya Gokalp Mîsaqê Milî wiha îfade dike: "Peymana (mîsaqa) me ya milî, ji bo me sînorekî etnografîk xêz dike. Ev cihên ku di nav vî sînorî de ne ku der in? Ev cih in ku du milet yanî Tirk û Kurd lê bi cih bûne. Çawan ku programa me ya milî razî nabe tu gundekî Tirkan li derveyî araziyê me yê nû bimîne, her wisan razî nabe ku tu eşîr an jî gundekî Kurdan ji miletê Kurd ê li vir, cihê bimîne."[111]

Vegotina Ziya Gokalp wiha berdewam dike: "Dana eynî qedr û qîmetî ya Tirk û Kurdan di mîsaqa me ya milî de dide xuyakirin ku, bendê wefayê û pêwendiya sedaqetê yê di navbera van her du miletan de xwedî samîmiyeteke wisan e ku di ser her cure tesewirî de ye. A rast ji dema Meşrûtiyetê ve, dewleta me li ser rûyê Kurdan duçarî tu nexweşiyê nebûye. Lew re ji şer û pevçûnên eşîretan tenê eşîret ziyanê dibînin. Ev şer û pevçûn wekî tê zenkirin, ne serhildana li dijî hikûmetê ne, ne jî eşqiyatiya li dijî şêniyan e. Ma ne ev miletê wefadar bû ku di dema Şerê Balkanan de, di rojên me yên herî xerab de wek dema Mutarekeyê, destê xwe yê dostaniyê dirêjî me kir û bû şirîkê derdê me? Ma ne ew miletê sadiq bû ku bi temamiya heyeta xwe ve tevî vî şerê serxwebûnê bû û ligel Tirkan got 'An tev an hîç!'? Tirk çawan dikarin wefakariya bêhempa ya birayêkî ew qas samîmî, hevalêkî ew qas hiqûqperwer ji bîr bike?"[112] ..."Bi kurtasî di encama ola miştерek, dîrokeke miştерek, cografyayeke miştерek a hezar salî de Kurd û Tirk hem ji aliyê madî hem jî ji aliyê manewî ve bûne yek. Îro jî li hember dijminên miştерek û talûkeyên miştерek in. Ji van xetereyan ancex bi berxwedaneke hevpar dikarin bifilitin. Nexwe em bi qenaeteke mezin dikarin bibêjin ku, hezkirina ji hev a van her du miletan, ji bo her du aliyan jî, ferzeke hem dînî hem jî siyasî ye. Heger Tirkekî ku ji Kurdan hez neke hebe ew ne Tirk e, Kurdekî ku ji Tirkan hez neke hebe ew ne Kurd e."[113]

Di van rojan de zemîna bihevrebûna Kurd û Tirkan her çûye xurtir bûye. Qewamên li Sewrê jî xelkê ber bi vê de dajo. Di nîveka meha Sibatê de Şerîf Paşa pêşniyaza Frensiyan a Konferansa Aştiyê ku çavê wan lê ye Kurdistanê bikin du herêm -Sêwaz û bakurê wê di bin mandeya Frensî de û Cîzîr û derdora wê jî di bin ya Ingilîzan de be- bi nameyekê radigihîne Stenbolê. Şerîf Paşa dide zanîn ku qet vê biryarê qebûl nake û îfade dike ku ew ê otonomiya Kurdistaneke neparçebûyî ya di bin serweriya Tirkan de çêtir bibîne.[114]

[111] Ziya Gökalp, Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler, r. 115
[112] Ziya Gökalp, bnb, r. 116
[113] Ziya Gökalp, bnb, r. 118
[114] Ahmet Mesut, bnb, r. 115

Di heman rojan de, Tirk û Ingilîz jî li ser Kurdistanê dikevin nav bazaran. Li gorî C. C. Garbett ê di buroya Hîndîstanê de, Tirk parlementoyeke ku Kurd jî lê bên temsîlkirin û Kurdistaneke otonom a ku bi otorîteya Sultan ve girêdayî be pêşniyaz dikin. Li gorî vê planê, wek îdareyên cihkî yên sivîl ew ê rêveber û jendirme jî ji Kurdan bûna. Ligel ku hinek jê wê ji xezîneya Împaratoriyê re bihata hiştin, beşeke mezin a dahatinên wê ji bo Kurdistanê bihatina xerckirin. Pêşniyazî Brîtanyayê tê kirin ku heger ew vê planê qebûl bikin, ew ê di cih de dawî li tevgera Komîteya Îtihad û Tereqiyê ya ku bi riya îslamê li dijî Ingilîzan dihat kirin, bînin; her wiha di serî de li Hindistanê ew ê li nav hemû împaratoriyê li ser bixebitin ku helwesta misilmanan a li hemberî Ingilîzan xweş û baş bibe.[115]

Di Sibatê de Hikûmeta Ingilîz dipejirîne ku bi temamî ji Kurdistanê vekişe û Silêmaniye jî tê de li tu derî berpirsiyariyeke îdarî negire ser xwe. Di belgeyê de, ku Wezîrê Karên Derve yê Ingilîzan ji Komîseriya Sivîl a Bexdayê re nivîsiye, dihat gotin ku "Heger Kurd serxwebûnê ji Tirkan bixwazin, Hikûmeta Ingilîz amade ye ku teahûdeke li gorî vê bike nav peymana bi Tirkan re û ji bo armancên Kurdan desteka moralê bidine wan."[116]

Lê belê ev yek wê pêk nehata. Nûnerên Ingilîzan di cih de li dijî biryara Hikûmeta Ingilîz a ku bi tevahî ji Kurdistanê vekişin derketin. Serheng Wilson li ber pêşniyaza Îngilterê ya vekişîna ji Mûsilê radibe û bi awayekî tund protesto dike; her wiha dide zanîn ku heger ew hebûna xwe li herêmên Mûsil, Silêmaniye û Hewlêrê nedomînin, ne bi tenê ew ê Kurdistanê winda bikin, ew ê nifûza xwe ya li ser Îranê jî winda bikin û heta rewşa wan a li Mezopotamyayê jî ew ê bikeve xetereyê.[117]

Ji bilî vê pêşketina îhtîmala Kurdistaneke yekpare ne bi dilê Ingilîzan e. Çawan ku Ingilîz qraliyeteke yekbûyî ya Ereban naxwazin, wisan bi erênî li fikra avakirina Kurdistaneke yekbûyî jî nanêrin. Difikirin ku avakirinên wiha ew ê di demên dahatûyê de ji bo wan talûkeyên mezin bi xwe re bînin. Karbidestên Hikûmeta Ingilîz ên li Hindistanê nêziktêdanên xwe yên der barê vê mijarê de wiha ifade dikirin: "Tiştê em dixwazin ne Erebistaneke yekbûyî ye, lê heta mimkun be, Erebistaneke ku bi prenstiyên biçûk ên di bin kontrola me de hatibe parçekirin û nikaribin di navbera xwe de hevkariyê bikin ku nebin xwedî hêzên karibin zehmetiyan ji hêzên rojava re derxin û qels û jihevdeketî bin."[118] Heman nêziktêdan her tim ji bo Kurdan jî heye.

[115] Ahmet Mesut, bnb, r. 112
[116] Ahmet Mesut, bnb, r. 121
[117] Ahmet Mesut, bnb, r. 126
[118] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 213

Simko Axa jî tim di nav têkoşînê de bû. Ew jî di vê demê de nêzî Tirkan e û ji wan alîkariyê distîne. Li balê nûnerên hêzên li dijî Ingilîzan ên Şamê jî hene. Têkçûna Şêx Mehmûd a li Silêmaniyê, kiriye ku hîn bêhtir meyla Kurdên Îranê biqulipe ser Tirkan ku wan wê çaxê Tirk ji xwe re hevalbend didîtin. Lazarev şîroveyeke wiha li ser helwesta Îngiltereyê ya wê demê dike:

"Ji ber ku wê zirarê bide berjewendiyên wan ên li Îranê Îngiltere bi dijminayî nêzikî tevgera Simko Axa dibe. Planên yekbûyînkirinê yên Simko Axa û hevalbendê wî yê wê rojê Taha, ne tiştên bên qebûlkirin in. Londonê di van planan de prototîpeke rast a Kurdistaneke serbixwe dîtibû. Ingilîz ji bo ku ew ê karibe di dema hevdîtinên aştiyê de bibe sebeba zor û dijwariyan, ji xurtbûna tesîra Tirkan a li ser Kurdên Îran û Iraqê jî tirsiyane."[119]

C.C. Garbet di rapora navbuhirî de îfade dike ku Kurd û Tirk hevdîtinan bi hev re çêdikin, hewcedarî bi biryareke lezgînî heye, heger ev yek îro neyê nirxandin wê ev firsend careke din nekeve dest. Tirsa Ingilîzan ya ji hêza bihevretiya Kurd û Tirkan, mirov kare di gelek hevnivîsên di navbera wezîfedarên wan de bibîne.

Di nav Cemiyeta Tealiya Kurdistanê de du nêrînên cuda hebûn; kesên serxwebûnxwaz û yên otonomîxwaz. Seyîd Abdulqadir ji baskê otonomîxwazan û bedirxanî jî ji baskê serxwebûnxwazan bûn. Cudahiya nêrînan ên di dema hevdîtinên Sewrê de, bû sedema feşkilandin û belavbûna rêxistinê. Li ser rûyê cudahiya nêrînên di nav komeleyê de, hin kes ji klûbê vediqetin. Ji ber beyanatên Seyîd Abdulqadir ku wî dabû rojnameyê, navbera wî û yên rewşenbîr û bedirxaniyan ne xweş dibe û wî ji serokatiyê ezl û ji klûbê jî veder dikin. Seyîd Abdulqadir jî radigihîne ku desteya rêveberiyê hatiye ezilkirin û ji lew re jî divê ew hilbijartinê pêk bînin. Di vê dema hesas de, nelihevkirina giregirên Kurdan, ji hin pozîsyonên nû re dibe mahne.

Nêziktêdana nû ya Ingilîzan, ji hêla hin derdorên Kurdan ve bi dilxweşî tê pêşwazîkirin. Di 24'ê Adara 1920'an de, Alîkarê Serokê Komeleya Pêşketina Kurd Emîn Alî Bedirxan, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurd Selîm Bekir, Serokê Yekîtiya Xwendekarên Kurd Baqî, li ser navê çapemeniya Kurd Kemal Fewzî, ji Serokwezîrê Brîtanyayê re spasnameyeke wiha dinivîsîn:

"Em nûnerên rêxistinên siyasî yên Kurdan ên îmzeyên wan li jêrê ne, ji ber îfadeyên vekirî yên ekselans ê der heqê rizgariya neteweyî ya Kurdan de ku di 25'ê Sibatê de li kamaraya lordan gotine, em spasiyên xwe pêşkêşî cenabê wî dikin..."[120]

---

[119] M. S. Lazarev, bnb, r. 94-95
[120] Ahmet Mesut, bnb, r. 131

Rewşa li Stenbolê bi hemû awayî tevlihev bûye. Di 16'ê Adarê de Stenbolê hatiye dagirkirin û hêzên çekdar ên Ingilîz gelek endamên Meclîsê girtine. Hin ji endamên Meclîsê ji Stenbolê direvin û li Enqereyê beşdarî Mustefa Kemal dibin. Di 23'yê Nîsana 1920'an de jî bi hev re hikûmeta Meclîsa Mezin a Miletê ava dikin. Ev dihat wateya ku edî temsîlkar tenê Hikûmeta Enqereyê ye.

Sekin ji Ingilîz û Frensiyan re tune ye. Ji aliyekî ve ji bo li herêmên ku ketine destên wan xwe bi qewet bikin dixebitîn û li aliyê din jî di nav xwe de li ser parvekirina erdên Osmanî peyman girêdidan. Li gorî peymana ku di 25'ê Nîsana 1920'an de çêkirin Îngiltereyê rêvebirina Filîstîn û Iraqê (Mûsil jî tê de) û Frensayê jî ya Sûriye û Libnanê stend. Ligel ku di navbera Frensa û Îngiltereyê de gelek pevçûnên ji ber berjewendiyan rû dabûn jî, ji ber ku Îngiltereyê % 25'ê petrola Mûsilê dabû Frensayê, Frensa razî bûbû ku ji wilayeta Mûsilê vekişe.

Şerîf Paşa ku dibîne hevalbend di Konferansa Aştiyê ya Sewrê de der barê pirsgirêka Kurdî de bi paş ve gav diavêjin, ji konferansê vedikişe (5 Gulan 1920). Li ser vê yekê Seyid Abdulqadir di telgrafa xwe ya bi mêjûya 17'ê Gulana 1920'an, ku li ser navê klûbên Kurdan dişîne, dide zanîn ku di konferansê de gelê Kurd nehatiye temsîlkirin, lewma jî qerarên ku bên stendin ew ê ne li rê û ne derbasdar bin.[121]

Li Stenbolê ji bo Mustefa Kemal û hevalên wî jî fermana îdamkirinê derketiye. Numreya dosyeya fermana ku biryara daliqandina Mustefa Kemal û hevalên wî dida 70 ye. Biryara ku Gerînendehiya Leşkerî ya Dadî ya Wezareta Şer wihan e:

FERMANA PADÎŞAH
Mehmet Vahidüddin
(ERÊKIRIN)

*"Ji ber bi navê Kuvayi Milliye (Hêzên Netewî) fitne û fesadiya ku dikin, li dijî makezagonê bi zorê ji gel stendina pereyan, berhevkirina leşkeran, li yên ku li dij dertên kirina îşkence û eziyetê, şewitandin û xerakirina bajaran, tunekirina ewlehiya hundirîn, ji ber ku serkêşiya van tiştan kirine der heqê Mustefa Kemal Efendiyê Selanîkî yê ku ji peywira Mufetîşiya Artêşa Sêyemîn hatiye girtin û ji pîşeya leşkeriyê hatiye derxistin, Kara Vasif Beyê Stenbolî yê fermandarê firkeya Bîstemîn yê berê yê ji serhengiyê malnişîn bûye, fermandarê berê yê*

[121] Hasan Yıldız, bnb, r. 106

*baskartêşa bîstemîn Mîrlîwa Fûat Paşayê Salacakî, balyozê Waşîngtonê yê berê û mebûsê Enqereyê Alfred Rustem, gerînendyê tenduristiyê yê berê Doktor Ednan Beyê Stenbolî û Mamosteya Wêjeya Rojava ya Zanîngeha Stenbolê ya berê Halîde Edîp Xanim wek ku kitekit di girteya biryarê ya bi dîroka 11 Gulan 1336 (1920) û hejmara 20'an de hatine diyarkirin, li gor fikraya yekemîn ya xala çil û pêncan a Zagona Cezayê ya Mulkiyeyê û li gor fikraya çaremîn a xala pêncî û pêncan û xala pêncî û şeşan biryar hatiye dayîn ku tevahiya rutbe û nîşanên wan yên mulkî û navên wan yên fermî bên betalkirin û bên îdamkirin, ji ber ku hîna firarî ne li gor hukmên zagonî dê malên wan bên hecîzkirin û li gor rêbazê bên birêvebirin, biryara ku ji aliyê Dadgeha Derasayî ya Yekemîn a Stenbolê ve bi paşpenî hatiye dayîn bi awayê ku gava bên girtin ji nû ve bên darizandin hatiye erêkirin.*

*Ji pêkanîna vê Fermana Padîşah Wezareta Şer berpirsiyar e*
*24 Gulan 1336 (1920)*

Li aliyekî daxuyaniya Hikûmeta Ingilîz a meha Sibatê, di meha Adarê de dagirkirina Stenbolê û îlankirina Qralitiya Sûriyeyê ya Faysal, fetwaya darvekirina Mustefa Kemal û hevalên wî ya di Gulanê de, vekişîna ji hevdîtinên li Sewrê yê nûnerên Kurdan Şerîf Paşa, ji aliyekî ve têkoşîna Simko Axa û li Başûr aloziyên têkiliyên bi Ingilîzan re... Bi kinayî di vê demê de tevliheviyeke mezin li Kurdistanê heye.

Di mehên Gulan û Hezîrana 1920'an de Qonfederesyona eşîran a Milî ku Mehmûd Smaîl, Xelîl Bahûr û Abdurehman Beg serokatî jê re dikir, dîsa serî hildaye. Wan ji bo serxwebûna Kurdistanê ji Sêrtê heta Dêrsimê ji bo yekîtiyê bangewazî li hemû eşîran kirine, bi Frensî û Ingilîzan re jî pêwendî danîne. Milî di 19'ê Hezîranê de mecbûr dibin vedikişin bi aliyê bakurê rojhilat ve; lê belê di meha Tebaxê de ji nû ve bi hêza xwe ya ku ji 3 hezar siwarî û hezar peyayan pêk dihat, careke din dest bi êrîşê kirine û Wêranşar stendine. Di destpêka Rezberê de Wêranşar dîsa ji destê wan derketiye. Gava di Rezberê de duçarî êrîşê dibin, dev ji warê bav û kalên xwe berdidin û derbasî Sûriyeyê dibin, ku ew di bin kontrola Frensiyan de bû.

Di heman demê de pêşewayê eşîra Cibran (yek ji fermandarê Alayên Hemîdî) Xalid Beg ligel hevalên xwe yên çekdar, li herêm û deverên Gimgim (Varto), Xinis, Melazgir û Kopê (Bulaniqê) li dijî helwesta li kongreyên Sêwaz û Erziromê, ji bo Kurdistana Serbixwe kampanya li dar xistiye. Haziriya serhildanê dest pê kiriye, Xalid Beg ji bo vê serhildanê bi


*Xalid Begê Cibrî*[122]

neteweperwerên Kurd ên li Stenbolê re pêwendî daniye. Endamên malbata bedirxaniyan jî ew destek kirine. Her wiha bi Başûrê Kurdistanê re jî di nav têkiliyan de ne.

Mustefa Kemal Paşa jî gelekî bi rêk û pêk tevgera xwe didomîne. Bi vekirina Meclîsê re, berpirsyariya dewletê û dana mafên Kurdan bi tevahî girtiye ser xwe. Di 1'ê Gulana 1920'an de, di axaftina xwe ya li Meclîsa Mezin a Miletê de wiha dibêje:

"Gava meseleya sînor dihat diyarkirin û tespîtkirin, ku me tim ew yek ji esasan belkî jî ya yekemîn qebûl dikir, sînorê me yê milî di başûrê Îskenderûnê re derbas dibe, ber bi aliyê rojhilat ve direêj dibe û Mûsil, Silêmaniye û Kerkûkê digire nav xwe. A me got ku, sînorê me yê milî ev e." Wek ku vekiri tê xuyakirin Başûrê Kurdistanê di nav sînorê dewleta ku wê bê avakirin de ye; yanî wek ku li jor ji aliyê gelek rayedaran ve hatiye nîşandan li gor biryarên ku hatine stendin erda dewleta nû divê ji erda Kurd û Tirk lê dijîn pêk bê.

Di pêşketina tevgera Mustefa Kemal de, cihekî girîng a desteka Kurdan heye. Di Gulana 1920'an de, li dijî fetwaya padîşah, fetwaya ku destek dida tevgera Mustafa Kemal hate îmzekirin. Di nav van kesan de yên piştgirî didan tevgera Mustefa Kemal, 13 alimên dînî yên Kurd jî hene. Dûre, her ku diçe Mustefa Kemal hîn bêhtir pêwendiyan bi Başûr re jî datîne.

Kurdên otonomîxwaz ên wek Seyîd Abdulqadir, bi sempatî li tevgera kemalîst dinêrin, lê ji mafên neteweyî yên Kurdan jî tawîzê nadin. Seyid Abdulqadir, carna di navbera nêrînên otonomîxwaz û azadîxwaz de diçe û tê. Hasan Yildiz, sedema vê helwesta Seyîd Abdulqadir bi rewşa Tirkan a di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de girêdide. Diyar dike ku "Seyîd Abdulqadir dibêje, 'di demeke wiha zor de ne rast e mirov Tirkan bi tena serê wan bihêle' û xwedî fikareke wisan e ku divê mirov alîkariya Mustefa Kemal bike." Hasan Yildiz wiha berdewamiyê dide gotinên xwe: "Lê belê ev fikarên xwedî niyeta baş, bi mahneya ku ew tevî Serhildana Şêx Seîd a 1925'an bûye, ew ê rê li ber

[122] Susan Meiselas, bnb.

darizandin û îdamkirina wî negirin."[123]

Seyîd Abdulqadir ku xwedî qedrekî bilind ê dînî û siyasî ye, ew ê tim di nav nêziktêdanên nerm û aştiyane de be. Esas bi gelek pêşewayên Kurd re nêziktêdanên nerm û aştiyane rûniştiye. Rehê nirxên rastiyê, mêraniyê, mirovahiyê kûr in û di pêşya gelek tiştan de ye. Di nameya Seyîd Abdulqadir de, ku wî di 5'ê Berfanbara 1921'ê de, ji Fermandeyê Artêşên Asûriyan Axa Petros re şandiye, mirov dikare niyeta wî ya baş û nêziktêdana wî ya xwedî aqlê selîm bibîne.

*Konstantînople, 5 Berfanbar 1921*

*Hevalê min ê ji dil û can General Axa Petros*

*Nameya we ya hêja ya bi mêjûya 19'ê Sermaweza 1921'an, ku behsa siheta we dike, gihîşt min.*
*Ji ber ku ez we wêrek, cidî û ji dil û can nas dikim, her dem ez we difikirim û bîranînên hêja jî muhafiza dikim. Ji bo ku heta vê rojê min ji we xeberek negirtiye, ez pir xemgîn im. Hûn jî pir baş pê dizanin ku çawan ez şadî û refaha neteweya Kurd daxwaz dikim, her wisan ez her tim a neteweya Asûr-Kaldeyî jî daxwaz dikim. Bi ya min, ji bilî olî ku tu qîmeteke wê nîn e, di nav van her du neteweyan de tu cudabûn nîn e. Ji ber van sedeman e ku ez dixwazim maf û berjewendiyên Asûr/Keldayiyan ji berê hîn bêhtir bi çelengî biparêzim. Li gorî min, şadiya van her du neteweyan ku bi sedsalan e bi fedekariya her du aliyan bi biratî, bi hev re jiyane, divê wek hev be. Ez wisan bawer dikim ku dê di dahatûyê de Asûr-Keldayî û bi heman awayî neteweya Kurd bi hev re bijîn. Ji ber van sedeman e ku neteweya Kurd, gava em pirsgirêka neteweyî diparêzin, ne ku em dixwazin mafên Asûr-Keldayiyan parçe bikin ne jî em dixwazin xwe li nenaskirina wan deynin..."*

*Serokê Komîteya Kurdistanê*
*Senatorê Osmanî*
*Seyîd Abdulqadir*

Bi heman hîsên paqij gelek ê piştgiriyê didin tevgera Tirkan jî hene. Wek ku vekirî tê xuyakirin, Kurdên ku bi temamî li dijî Mustefa Kemal bûn jî hene, yên destekê didinê hene û her wiha kesên ku ji aliyê pêbawerbûnê ve ketine nav dudiliyê jî. Lê di Peymana Sewrê ya ku piştî demeke kurt wê biha-

[123] Hasan Yıldız, bnb, r. 106

ta îmzekirin de, parçebûna Kurdistanê jî wê zelal bihata dîtin, wê ev yek nehata qebûlkirin û ji wir û pêde îcar di hevdîtinan de, beşê peymanan ên bi Kurdistanê ve eleqedar, bi temamî wê bi Meclîsa Mezin a Milet a li Enqereyê girêdayî bihata meşandin.

Peymana Sewrê ya ku Kurdistan bi fermî parçe kiribû, di 10'ê Tebaxa 1920'an de pêk hat. Pirsgirêka Kurdan, yek ji beşên girîng ên Peymana Sewrê ye. Xalên 62, 63 û 64'an, merhaleyên damezirandina Kurdistaneke serbixwe didan nîşandan. Peymanê, Kurdistan wek 'li rojhilatê Feradê, li başûrê sînorê başûrê Ermenistanê ku dê di dahatûyê de bihata xuyakirin, li bakurê sînorên Sûriye, Iraq û Tirkiyeyê' dida nîşandan. Otonomiya herêmkî ya cihên ku Kurd ji aliyê hejmarî ve li wan serdest in di hundirê şeş mehan de, ji aliyê komîsyoneke xwedî sê endamên ku ji aliyê hikumeta Ingilîz, Frensî û Îtalî ve bê tayînkirin, pêk tê û li Stenbolê li hev bicive, wê bê hazirkirin. 'Di nav mudeta salekê ya derbas be de, heger gelê Kurd bixwaze bi temamî ji Tirkiyeyê veqete û bibe serbixwe û serî li Cemiyeta Miletan bide, cemiyet jî qenaet pê bîne ku ev gel xwedî wê kapasîteyê ye ku dikare daxwaza serbixwebûnê pêk bîne û ji bo bicihanîna vê jî tewsiye bike, Tirkiye garantî dike ku ew ê vê bi temamî tetbîq bike û di hemû mafên xwe yên li vê herêmê bibihure.' Û beşa pêwendîdar a peymanê wiha tê qedandin: 'Piştî ku serbixwebûna dewleta Kurdistanê hat pêkanîn, heger Kurdên li wilayeta Mûsilê dijîn, ku ew parçeyekî Kurdistanê ye, bixwazin tev li Kurdistana serbixwe bibin, di vê rewşê de hêzên hevalbend wê nikaribin îtirazê li vê bikin.'

Diyarkirina sînorên Kurd û Ermeniyan ji hevdîtin û gotêbêjên paşê re hatibû hiştin. Bi qasî ku xuya dibe, bi otonomiyê destpêkirin û paşê jî derbasbûna ber bi serxwebûnê ve hatiye fikirîn; lê belê Rojhilatê Kurdistanê (beşa di Îran de) tevî wê nehatibû kirin, sînorên Bakurê Kurdistanê ne diyar bûn û tevlêbûna Başûrê Kurdistanê jî di bin talûkeyê de bû. Hem tevahiya Kurdistanê nehatibû fikirandin hem jî erdên hatibûn destnîşankirin di warên aborî û siyasî de hatibûn dabeşkirin. Di bin gotinên otonomî û serxwebûnê de xuya dikir ku wê welat têketa bin bandora îdareyên nû, îdareyên biyanî. Li aliyê din, diyarkirina sînorên di navbera Kurdistan û Ermenistanê de jî, dibû ku bi xwe re pirsgirêkên mezin bianiya. Vana hemûyan serê Kurdan tevlihev dikir.

Bi Sewrê, dewra Împaratoriya Osmanî hatibû girtin. Ji Împaratoriya Osmanî bi tenê herêma tengavan, ku ew di bin kontrola navneteweyî de ye, Stenbol û beşeke Anatoliyaya bakurê rojava maye. Hemû erdên din ên Împaratoriya Osmanî, ku ew heta dema Şerê Cîhanê yê Yekem li sê qitayan

belav bûbû, di navbera Îngiltere, Frensa û Îtalyayê de hatibûn parvekirin. Rayedarên Osmanî li Sewrê daxwaz kiribûn ku Kurdistan di nav pergala Osmanî de bê hiştin, lê daxwaza wan qebûl nebûbû û wan bêyî dilê xwe be jî ev peyman îmze kiribûn.

Xalên Peymana Sewrê, wê paşê bibûna hîm û bingehên peymanên din, lê tenê beşên bi Kurdistanê ve eleqedar wê neketina pratîkê. Fikara 'heger şertên Peymana Aştiyê yên bi Kurdistanê ve eleqedar pêk bên, dibe ku hewcedarî bi mudaxeleyeke leşkerî hebe,' hêzên Ewrûpî ditirsand. Desteka ji aliyê leşkerî ve pir zor û xeternak bû. Mafên ku hatibûn dayîn di teoriyê de bû û gelek mijar jî tam ronî û hişkere nebûbûn. A herî girîng Kurd li peymanê nebûbûn xwedî. Tiştên ku hatibûn gotin, ewletî û bawerî nedabûn, ji aliyê gel ve wisan hatibû fêmkirin ku ev destpêka gavavêtina biyaniyan a nav Kurdistanê ye ji bo paşê bibine xwediyê wê.

Ji bo Kurdan gavek di Sewrê de hatibû avêtin, lê belê gavavêtinên bi paş ve hîn bêhtir in. Rewşa piştî şer pir tevlihev e û bi nakokî ye. Ingilîz û Frensî westiyayê şer in. Li welatê wan pirgirêkên aborî gihîştine radeyeke bilind. Dixwazin kêlîk berî kêlîkê destkeftiyan par ve bikin. Wek ku Lazarev dibêje, Kurdistan bi awayekî fermî cara pêşî di nav Ingilîz û Frensiyan de hatiye parçekirin û parvekirin. Lazarev ji bo wê demê wiha dibêje: "Di 23'ye Çileya 1920'an de, li Parîsê konvansiyona Ingilîz û Frensiyan hat îmzekirin. Bi wê, erdên di bin mandeya van her du dewletan de yên li Iraq û Sûriyeyê ji hev dihatin veqetandin. Ji vê tarîxê bi şûn de Kurdistana Sûriyeyê bi awayekî fermî cih girt, çinku sînorê nû beşek ji erdên Sûriyeyê yên Kurdan cuda kiribû. Hin terefên sînor û qebîleyên Kurd ên ku xwediyên hev in û ji aliyê etnîkî ve bi heman baweriya dînî jî yek in, ku qebîleyên êzîdî yên Çiyayê Şengalê jî di nav wan de cih digirin, nêzî hev bûn."[124] Erê Ingilîz û Frensiyan li ser parvekirina Kurdistanê peyman çêdikirin lê hîn pêvajoya ku vê yekê bi Hikûmeta Enqereyê jî bidin pejirandin heye.

Di van rojên gelekî teng de yek ji piştgirên herî mezin ên Mustefa Kemal Rûsyaya Sovyet e. Hikûmeta Enqereyê û Rûsyaya Sovyet, ev her du teşekulên nû ku li ser împaratoriyên mexdûr ên ku erd winda kirine çêbûne, di cih de destên xwe dirêjî hev û din kiribûn. Mustefa Kemal piştî di 26'ê Nîsana 1920'an de wek serokê Mêclîsa Mezin a Miletê ya Tirkiyeyê tê hilbijartin bi sê rojan nameya xwe ya pêşî ji Lenîn re dişîne. Di vê nameyê de teklîf dihat kirin ku di gerewa êrîşkirina Sovyetê ya bi ser Gurcistanê de, ew jî êrîşî ser

[124] M. S. Lazarev, bnb, r. 239

Ermenistanê bikin û temîn bikin ku Azerbeycan jî tevî nav “dewletên bolşevîk” bibe.[125]

Halîl Paşa, di 16’ê Gulana 1920’an de wek temsîlkarê pêşî ê neresmî yê Enqereyê çûbû Moskowayê. Çawan digihîje Moskowayê hevdîtinê bi Çîçerîn, alîkarê wî Karahan û Komîserê Herbiyeyê Kamanev re pêk tîne. Wê demê biryar tê dayîn ku di serê pêşî de milyonek lîreyê zêr, 60 hezar tiving û 100 milyon fişek bişînin Anatoliyayê.

Paşê Çîçerîn, di bersiva ku ji Mustefa Kemal re şandibû de, teklîf dike ku ew dikare ji bo lihevkirina di nav wan û Ermeniyan de navbeynkariyê bike. Li ser vê yekê Mustefa Kemal qebûl dike ku pirsgirêka bi navbeynkariya Sovyetê çareser bike û êrîşa ku ji aliyê artêşa Erziromê ve dihat xwestin a bi ser Ermeniyan de wê bihata kirin, biavêje paş.

Di Tebaxê de, heyeteke Tirk ji bo hevdîtinan diçe Moskowayê. Dûre di Rezberê de Mustefa Kemal telgrafekê dişîne Erziromê û fermana destpêkirina êrîşa ku li dijî Ermeniyan hatibû plankirin, dide. Yekîneyên Tirk ên di bin fermandariya Kazim Karabekir de, di 28 ê Rezbera 1920’an de dest bi sefera ser Ermenistanê dikin û di 30’ê mehê de Sarîqamîş tê stendin. Li gorî S. Yerasîmos “Ji bo ku pêwendiya di navbera yekîneyên Tirk û Sovyetê de hêsan bike, di dema hevdîtinên li Moskowayê yên di 4’ê Tebaxê de ji aliyê heyeta Tirk ve hatiye pêşniyazkirin ku Sarîqamîşê (Qamuşan) bidine Tirkan û rêveberên Sovyetê jî ev pêşniyaz pejirandiye. Her wiha roja ku Sarîqamîş hatiye stendin Lenîn, tim bi Kîrovê ku li Tîflîsê bû di nav têkiliyê de ye û di Komîteya Navendî ya Partiyê de daye xuyakirin ku divê alîkariyeke birastî li tevgera Anatoliyayê bê kirin, ev bi lezgînî bê şandin û ji bo ku Ermenistan navbeynkariya Sovyetê bipejirînê, ew bê qanixkirin.”[126]

Martin van Bruinessen wan rojan rewşa li Kafkasyayê wiha vediguhêze: “Piştî ragihandina agirbestê, Kafkasyaya Jorîn ji aliyê yekîneyên Tirk ve hat valakirin û ji Ingilîzan re hate hiştin. Ingilîzan jî ev herêm ji komarên Azerbeycan, Ermenistan û Gurcistanê re hişt ku ew wê çaxê hê nû hatibûn avakirin. Gava hikûmeta Ermenî lê dixebitî ku erdê xwe berfirehî heta nav Anatoliyayê bike, rastî berxwedana tûj a mislimanan hat.

Êrîşeke ku kemalîstan di Rezbera sala 1920’an de li dar xist, kir ku yekîneyên Ermenî bi paş ve ber bi Kafkasyayê ve vekişin û di Berfenbara 1920’an de Komara Ermenistanê ku zêde biçûk bûbû, bi Hikûmeta Enqereyê re peymaneke aşitiyê îmze kir. Di Nîsana 1921’an de bolşevîkan

[125] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 334
[126] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 339

Ermenistan dagir kir û çend meh bi şûn de jî Hikûmeta Enqereyê bi hikûmetên bolşevîk ên Kafkasyaya Jorîn re peymaneke nû îmze kir ku li gorî wê Qers û Erdexan ji Tirkan re dihatin hiştin; bi vî awayî îmkana ku herêmên Kurdan bikeve destê Ermeniyan nemabû..."[127] Piştre, di 13'ê Kewçêra 1921'an de, di navbera Tirkiye û sê Komarên Sovyetê yên li Kafkasyayê (Azerbaycan, Ermenistan û Gûrcistan) de Peymana Qersê tê îmzekirin û bi vî awayî sînorê vê cepheyê zelal dibe.

Li dijî mudaxeleya leşkerî ya Yewnanan jî Yekîtiya Sovyetan li cem Hikûmeta Enqereyê ye. Bi Peymana Moskowayê jî, ku di 16'ê Adara 1921'an de hatiye îmzekirin, Yekîtiya Sovyetan bûye yek ji wan dewletên mezin a ku cara pêşî dewlata Tirk nas kiriye. Ji bilî vê bi vê peymanê, ji bo ku di warê aborî û siyasî de alîkariya hev bikin, di navbera her du dewletan de biryar hatibûn stendin.

Li cepheya Ewrûpayê, piştî îmzekirina Peymana Sewrê ne bi gelekî, erêkirina xalên der barê Kurdistanê de dikeve ber nîqaşê û behsa peymanên nû tên kirin. Frensî, Ingilîz û Îtalyanî ji bo ku rewşa nû binirxînin, biryar didin ku konferansekê pêk bînin, her wiha gazî Enqereyê jî dikin ku ev yek dihat wateya naskirina Hikûmeta Meclîsa Milet ya Mezin. Konferansa ku ji 21'ê Sibatê heta 14'e Adara sala 1921'an dom kiriye, li Londonê li dar xistine. Delegeyên ku ji Stenbol û Enqereyê derin, bi hev re komisyonek çêkirine. Di bin serokatiya Wezîrê Meclîsa Mezin a Miletê Bekir Samî Beg (mebûsê Amasyayê) de, kesên mebûs ên wek Camî Beg (Aydin), Husrev Beg (Trabzon), Yunus Nadî Beg (Îzmîr) û Zekî Beg (Edene) beşdar bûne. Delagasyona Tirk, di axaftinên xwe de dide xuyakirin ku Meclîsa Mezin a Miletê Tirk û Kurdan temsîl dike û her du irq beyan dikin ku di hesta hevpar, kultura hevpar û dînê hevpar de bûne yek.

Bi vî awayî Ingilîz, ji berpirsiya soz û hêviyên ku dabûn Kurdan jî rizgar dibûn. Di demeke ku der barê Ereban de berpirsiyên pêkanîna wan zor girtibûn ser xwe, taqeta wan a ku ji bo Kurdistanê têketana şer tunebû. Nederbasbarkirina xalên Sewrê yên bi Kurdistanê re eleqedar, bi awayekî din jî li hesabê Ingilîzan hatibû; bi vê yekê rîska ku Mûsil biketa nav Kurdistaneke serbixwe ya ku dê bihata damezirandin, ji holê radibû. Îcar ji niha û pê ve, tenê ji bo ku Bakurê Kurdistanê ji destê wan neçe wê bixebitiyana.

Di axaftinan de êdî dev ji serbixwebûna Kurdistanê hatiye berdan, behsa otonomiya wê ya di nav Tirkiyeyê de ku xwedî hin mafên berteng bûn, dihat

[127] Martin van Bruinessen, bnb, r. 148

kirin. Konferansa ku bi dehan caran li ser meseleya Kurdan rawestiyaye bi awayekî fermî Kurd tê de nehatine temsîlkirin û bi şiklê ku pêkhatina serbixwebûna Kurdistanê ketibe avê bi dawî dibe. Di gotûbêjan de hemû daxwazên Tirkan ên der barê Wilayeta Mûsilê de jî tên redkirin.

Jixwe li Başûr gavên ku Mûsilê tevli nav Iraqê bikin dihatin avêtin, lê gel bi tundî li dij radibû. Li Başûrê Kurdistanê Kurdan, li dijî beşdarbûna hikûmeta ku li Iraqê ji aliyê Ingilîzan ve cara pêşî wek demdarî (Kewçêr 1920) dihate organîzekirin a di bin serokatiya Abdurehman El Gêlanî de derdikeve. Di qanûna hilbijartinê de, mafên Kurdan ên ku li Sewrê hatibûn pejirandin, wekî tune hatine hesibandin. Bi vî awayî, ya rast yê ku Peymana Sewrê nederbasbar kiribû, Ingilîz bi xwe bûn.

Ji aliyekî ve jî serhildanên Kurdan li hesabê Ingilîzan dihatin. Redkirina tevlîbûna nav Hikûmeta Iraqê ya Kurdan, dibû sedem ku Ingilîz hêzên xwe yên leşkerî li Iraqê bihêlin û daxwazên xwe bi Hikûmeta Iraqê bidin qebûlkirin.

Bi tevlêbûna serokên rêveberiyên Brîtanyayê yên li Iraq, Filîstîn, Urdûn û li Misrê, rayedarên ji payeya herî bilind ên hêzên leşkerî yên Îngiltereyê yên li Rojhilata Nêzik û kesên sereke yên serwîsên îstixbaratê yên li herêmê li Qehîreyê (12-30 Adar 1921) konferansek tê lidarxistin. Li wir li ser dahatû û şeklê rêvebirina erdên bi destketî, hevdîtin û gotûbêj tên kirin. Jina jêhatî Gertrude Bell jî, ya ku li herêmê ji dewlet û miletê xwe re gelek xebat kirin beşdarî Konferansa Qehîreyê bûbû û xeyalên wê dihatin cih. Wek ku di serê serî de difikirî, Mûsil tevî îdareya Iraqê dibû.

Gertrude Bell, gava li ber maseyê rûdinê û ji bo sînorên dewletên ku wê nû bên avakirin xerîteyan vedikole, li hêla din ji bo bê ka wê kî Iraqê îdare bike, şeklê hikûmetê û qanûnên wan diyar dike, ji malbata xwe re ev nivîsandine: "Carinan ez xwe wek Afirînerê di nav wê hefteyê de his dikim. Wî jî mîna min, dibe ku meraq kiribe bê ka wê tiştekî çawan derkeve holê."[128] Erê xanima hêja ku xwe wek Afirîner didît, hayê wê ji Kurdên li teniştê tune bû. Di bernameya Bell de Kurdistan tune bû, wê çênebûya. Jê re ya girîng ew bû ku Mûsilê jî tevî nav Iraqa ku wê şekil didayê bike û wek tiştekî sirûştî ji bo dewleta xwe çi hewce bûya, bikira. Lê mixabin ev sînor wê ji gelê herêmê re bibûna sedema destpêkirina gelek şerên ku heta îro nesekinîne.

Musil ji wan re gelekî girîng e û destê wan jê nabe. Hîn di 9'ê Gulana 1919'an de, ji bo ku Mûsil wek herêmeke Dewleta Ereb a Iraqê bê naskirin, raye dane Serheng Wilson. Wê demê hatibû hişkerekirin ku raye heta biryara

[128] Stefanos Yerasimos, bnb, r. 144

Konferansa Aşitiyê ye, lê vê dûre jî berdewam kir.

Serkana Giştî ya li Bexdayê, di muxtirayekê de li ser girîngiya Mezopotamyayê ya ji bo Brîtanyayê wiha digot: "Hêza dinyayê ya di dahatûyê de petrol e. Kaniyên petrolê ku li başûrê Îranê hene û niha jî di bin kontrola Brîtanyayê de ne, hatiye tespîtkirin ku ew warên herî berdar ên petrolê yên dinyayê ne. Ligel ku tê zanîn devera Mûsilê û Hewzeya Firatê ya navîn, kaniyên zengîn ên petrolê vedihewîne jî, kapasîteya tam a wan deveran hîn jî nehatiye kifşkirin... Li Deryaya Spî, di nav deh salên li pêşiya me de, ku çêkirina rêhesin û xeta boriyan tê plankirin, dikare hêza sîtola Îngiltereyê ya li Deryaya Spî bike du qat; bi vî awayî jî di xeta me ya ragihana bi rojhilat de, hewcedariya girêdana me ya bi Kanala Suweyşê re, ku ew ji bo me nuqteyeke zeyîf û xav e, wê gelekî kêm bibe."[129]

Ingilîzan li Kurdistana Iraqê, li gorî biryarên Konferansa Qahîreyê, rejîmeke taybet damezirand. Li gorî danezana fermî ya Komîseriya Bilind a li Iraqê ya bi mêjûya 6'ê Gulana 1921'an, li Başûrê Kurdistanê ev sîstema birêvebirinê hatiye pêkanîn:

"Lîwaya Mûsilê, wê wek beşa sereke ya Iraqê bê birêvebirin. Ji herêmên wê yên Kurd di bin çavdêriya efserê siyasî yê Brîtanyayê de wê lîwayeke taybet pêk bînin û divê wezîfeyên rêvebirinên jêrîn jî, ji aliyê Kurdan an jî ji aliyê Erebên ku bi Kurdî diaxivin bên kirin, lê divê hemû ji aliyê komîserê bilind ve bên tayînkirin. Efserên siyasî yên Brîtanyayê, wê bibine 'şêwirmendên' îdareyên Hewlêr, Koysancaq û Rewandûzê. Silêmaniye jî wê ji aliyê mutesserifê ku ji hêla komîserê bilind ve hatiye tayînkirin ve wek 'muteserifi'yekê bê îdarekirin, şêwirmendê wî yê brîtanî jî di esasê xwe de wê xwedî rayeyên bêsînor be. Qeymeqam jî ji bo demekê wê ji Ingilîzan be, di rojên pêş de dikare ew bi Kurdan bên guhartin, ji bo Kerkûkê jî mutesarifekî din hatiye tayînkirin. Bi vî awayî, Kurdistana Iraqê di bin kontrola giran a rêveberên kolonî yên Brîtanyayê de bi çar beşên rêvebirinê hatiye veqetandin... Ev dişibe rejîma Brîtanyayê ya ku li gelek cihên Hindistanê pêk aniye...."[130]

Di vê navê re Hikûmeta Enqereyê jî bi lez û bez ji bo ku rehê xwe berde erdê dixebitî. Hîn gava ku Konferansa Londonê didomiya, wê bi Afganistanê re, bi Sovyetan re, bi Frensayê re peyman îmze kirin û xwe di qada navneteweyî de da qebûlkirin. Peymanên ku li Konferansa Londonê hatine îmzekirin, ji ber ku wek berdewama Sewrê hatine dîtin, ji aliyê Hikûmeta Enqereyê ve nehatine pejirandin û serokê delegasyonê jî bêraye hatiye hiştin. Li cepheya Egeyê jî, di serê sala 1921'an de, li dijî Yewnanan

[129] Janet Wallach, bnb, r. 361

[130] M. S. Lazarev, bnb, r. 197

zafera pêşî hatibû bidestxistin. Paşê, li hemberî êrîşên nû yên Yewnanan, serkeftina duyem a Înonu (31 Adar/ 1 Nîsan) û di pey de jî bi ya Seqaryayê, têkçûna Yewnanan qenc hişkere bû.

Di nav nivîsên Lazarev de, yên der barê Kurdên ku di şerê li dijî Yewnanan de cih digirin, nuqteyeke balkêş heye: "G. Astahov, vegotiye ku jineke Kurd (Fatma Xanim a xwediya Simko Axa) li nêzî Enqereyê, fermandarî li yekîneyeke Kurd kiriye ku ew bi sedan ji şerkaran pêk tê. 'Vê jinikê kincê leşkerekî mêr li xwe kiribû, bi helwestên xwe yên mêrane bal dikişand ser xwe û di nav leşkerên mêr de yên ku pêgirtiyên wê bûn xwedî otorîteyeke mezin bû. Tenê mufrezeya wê, wek yekîneya Kurdan di nav sefên artêşa li dijî Yewnanan şer dikir cih stendibû."[131]

Tevgera Serokê Eşîra Şikakan Smeîl Axa (Simko Axa) ku ew ê heta sala 1930'î ji Kurdên Îranê re pêşewatiyê bike, di meha ku Sewr hatibû îmzekirin, di Tebaxa 1920'an de dîsa germ dibe, heya Berfanbarê beriya Semas û Rûmiyê bi dest dixe. Simko Axa roj bi roj bihêztir bûbû û di nîveka pêşî a sala 1921'an de, serkeftinên mezin bi dest xistibû.

Hevalbendê Simko Axa Şêx Taha jî di Sibata 1921'an de bi hundirê Îranê de çûye û Haydarabad xistiye destê xwe. Simko Axa jî di Adarê de yekîneyeke Qazaqê Îranê têk biriye. Her ku serkeftin zêde dibe eşîrên derdorê bêhtir tev li wan dibin. Piştî ku Simko Axa û qebîleyên Sablaxê (Mahabada îro)- Mameş, Mengur, Debokrî, Zerza, Gevrik, Feyzulahbeg, Poştdar, Bane û Qadirxan- bûn yek, Kurd bi rihetî artêşên ku bi ser wan de dihatin şandin têk dibirin.... Di Kewçêra 1921'an de Simko Axa li Mahabadê qerargeha xwe ava kiriye û avşarî jî tabiî wî bûne. Artêşên Îranê yên ku ji aliyê serokê qerargeha artêşê General Amanola Mîrza Cahabanî ve dihat îdarekirin, piştî hin têkçûnan neçar mane ku bikevin rewşa parastinê û çend meh bi dû de jî herekatên leşkerî yên aktîf bibirin.[132]

Têkoşîna Kurdan a serxwebûnê, di 1921 û 1922'yan de derdikeve asteke bilind. Li rojava jî gel li ser piyan e û ji rewşa heyî nerazî ne. Serhildana Eşîra Milî ya ku di Hezîrana 1920'an de li Wêranşar û derdorê wê dest pê kiriye, tesîra xwe heta Rezber û Kewçêr 1920'an didomîne û Serhildana Qoçgiriyê jî, di Adara 1921'an de dest pê kiriye û herêmên Sêwaz, Qoçhîsar, Dîwrik, Zara, Sûşehrî, Erzingan, Kemah, Refahiye û Ovacixê xistine bin bandora xwe. Di destpêka serhildanê de, yekîneyên leşkerî yên Tirkiyeyê bi ser herêmê de hatine şandin, di Adar û Nîsana 1921'an de şer û pevçûnên mezin

[131] M. S. Lazarev, bnb.
[132] M. S. Lazarev, bnb, r. 215

qewimîne. Paşê jî yekîneyên teqwiyeyê şandine herêmê, piraniya pêşewa û pêşengan hatine girtin û hejmareke zêde jî mirov hatine kuştin. Qirqirina ku li herêmê çêdibe, dibe sedem ku li Enqerê li Meclîsa Mezin a Miletê gelek nîqaş bên kirin.

Di vegotina Hasan Yildiz a der barê wê serdemê de beşek wiha heye: "Di sala 1921'an tevî de, hemû ne bi ser hev ve bin jî Kurd dengê xwe derdixin û dipirsin bê wê pirsgirêka wan a neteweyî çawan be. Pirsên ku bi serhildana Qoçgirî û Eşîra Milî di seriyan de çêdibin, li deverên Wan, Mêrdîn, Bedlîs û Diyarbekirê bi awayekî zêde di nav gel de tên nîqaşkirin. Kurdên li van herêman bi danezaneke hevpar ji Meclîsa Mezin a Milet van daxwazan dikin:

1) Divê ji aliyê Hikûmeta Kemalîst ve Dewleta Kurd a otonom a li herêmên ku Kurd lê dijîn, bê naskirin.

2) Divê sînor ji aliyê Kurdan ve bên kişandin.

3) Divê jendirmeyên Tirk û wezîfedarên dewletê yên Tirk bi paş ve bên kişandin.

4) Divê Tirkiye destê xwe ji nav karên birêxistina Kurdistana otonom bikişîne.

5) Divê hemû bacên leşkerî û bexşên leşkerî yên ku ji aliyê Hikûmeta Enqereyê ve tên civandin, ji bo Kurdan bên terxankirin.

6) Divê mafên Kurdên ku di nav erdên Tirkiyeyê de dimînin bên parastin û Kurdên ku di nav artêşê de ne bên berdan (25 Hezîran 1921)"

Komîsyona ku ji mebûsên Kurd û Tirk pêk dihat a ku li Meclîsê hatibû amadekirin, ji bo li ser teklîfên Kurdan gotûbêjan bikin di meha Rezberê de derin Bedlîs û Wanê û dikevin nav dan û stendinan...[133]

Ji aliyê din ve Mustefa Kemal, dixwaze bi bayê bezê bi hêzên Ewrûpî re lihevkirinan bike. Wek ku paşê di "Nutuk"ê de dide xuyakirin, gava li riya rizgariyê digere, heta jê were wê hewl bide da ku dewletên mezin ên wek Îngiltere, Frensa û Îtalyayê nexeyidîne. Frensa jî, ji ber pirsgirêkên li Sûriyeya ku dagir kiribû, ji ber der barê hin tiştan de lihevnekirina wê ya bi Îngiltereyê re û ji ber ku Tirkiye ji Sovyetê alîkarî stendibû û li dijî Yewnanan hin mewzî bi dest xistibûn, rojekê berî rojekê dixwest nêzikahiyê bide Hikûmeta Enqereyê.

Frensî, ji dawiya sala 1920'an pê de, ji bo ku bi Hikûmeta Enqereyê re li hev rûnên, li riyekê digerin. Rayedarekî Frensî di 1921'ê de diçe Enqereyê û teklîf dike ku wek demkî xeta rêhesin bibe sînorê di navbera Tirkiye û Sûriyeya ku hêrema Frensiyan e. Ev ji bo her du aliyan jî riya herî hêsan e. Şuxilê nîşanên ku sînor bide xuyakirin an jî biparêze dibû ku bi salan biajo-

[133] Hasan Yıldız, bnb, r. 110

ta, riya hesin jixwe hazir bû û nîşaneke diyar bû. Di peymanên paşê de jî ev xeta ku bi awayê demkî hatibû pejirandin, dîsa wek sînor wê bê qebûlkirin. Riyên hesin ên ku Almanan bi xeyalên cuda çêkiribûn, bi awayekî berovajî bi kêrî muxalifên wan hatibûn û bûbûn sînorê ku Kurdistanê parçe dike. Ji vê jî xuya dibû ku, ew ne wek ku digotin xwedî endîşeya pergalên etnîkî bûn. Wek ku di cilda duyemîn de jî wê bê behskirin, riya hesin a ku ji vî aliyî ve ne nîşanderek bû, tam berovajî, dûre wê mirovên herî nêzî hev jî ji hev û din veqetîne.

Di 20'ê Kewçêra 1921'an de di navbera Hikûmeta Enqerê û Rayedarên Frensî de Peymana Enqereyê pêk hat û hema hema sînorê îro yê di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de hat qebûlkirin (Hatay ne tê de).

Hin xalên Peymana Enqereyê wihan in:

– Xeta di xala 3'yem de hatiye behskirin wiha hatiye çareserkirin: Sînor wê ji ser Kendava Îskenderûnê û di başûrê Payasê re ber bi Meydana Ekbezê ve biçe. Ji wir ber bi Sûriyeyê ve, bi awayê ku Karnaba û Kilîsê ji Tirkiyeyê re bihêle, di Îstasyona Çobanbey re wê rêhesin bê şopandin û rêhesin heta Nisêbînê wê di nav erdên Tirkan de bê hiştin. Riya kevn a di navbera Nisêbîn û Cezîreya Îbn Omer de ew ê ji Tirkan re bimîne û bigihîje heta Dîcleyê. Li ser rê her du welat jî wê xwedî eynî mafî bin. Piştî îmzekirina vê peymanê di nav mehekê de, komîsyoneke ku ji hêla nûnerên her du aliyan ve hatiye pêkanîn, wê vê xetê diyar bike.

– Hikûmeta Meclîsa Mezin a Milet wê îmtiyaza Rêhesina Bexdayê ya di navbera Pozantî û Nisêbînê de ligel mafên şubeyên wê yên li Edeneyê, tevî kargêrî, feyde û mafên qanûnî yên bazirganiya neqliyeyê bide grûbeke Frensî ya ku Hikûmeta Frensî bineqîne. Tirkiye wê ji Meydana Ekbezê heta Çobanbeyê, di nav erdên Sûriyeyê de karibe bi trenê ragihaniya leşkerî bike. Sûriye jî di nav erdên Tirkiyeyê de xwedî heman mafî ye.

– Piştî îmzekirina vê peymanê, wê di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de ji bo tespîtkirina peymaneke gumrikê, komisyoneke têkel bê damezirandin.

– Kesên ji herêmê yan jî yên koçer, li gorî tespîtkirina xala 8'an ew ê karibin ji çêregehên li vî alî yan jî li wî aliyê xetê û ji mafên xwe yên berê yên ji arazî yan jî ji mal û mewdanên xwe yên li wan deran, îstifade bikin. Ew ê karibin heywan an jî çêlîkên wan, amûr û pêdiviyên xwe bêyî ku gumrik an jî bacê bidin, veguhêzin wî aliyê xetê. Ew ê bacên bi van ve eleqedar, li welatê ku lê dimînin, bidin.

Bi vê peymana ku bi şertê sekinandina êrîşan li hev kirine, dilê Frensiyan rihet dibû. Lê belê, nexweşiyên ku di dema lihevparkirinê de li ser berje-

wendiyan di navbera Îngiltere û Frensayê de çêbûbûn, bi vê peymanê re hîn bêhtir xera bûn. Ingilîzan ji Frensiyan daxwaz kir ku wê xala bi herêmên xwedî girîngiyeke stratejîk ên riya hesinî ku ji Çobanbey heta Nisêbînê digirte nav xwe li Tirkiyeyê vedigerand re eleqedar biguherîne. Rayedarên Frensî baweriya wan anî ku wê peyman ziyanê negihîne Îngiltereyê.

Ligel fêdeyên siyasî ji aliyê leşkerî ve jî gelek alîkariya vê peymanê li Tirkiyeyê jî çêbûn. Bi tesfiyekirina vê cepheyê, Tirkiye ji aliyê başûr ve rihet bû û bû xwedî îmkan ku leşkerên xwe yên li vir bişîne cepheya rojava. Frensiyan ji artêşa Tirk re ku berê xwe dabû cepheya Yewnan melzemeyên leşkerî jî temîn kirin.

Bi vê peymanê, veqetandina başûrê rojava yê Kurdistanê, ji aliyê Hikûmeta Enqereyê ve jî dihat pesendkirin. Bi vî awayî parvekirina Kurdistanê ya li gorî hêzan fermî dibû. Ji Kurdistanê parçê herî biçûk bûbû para Frensa. Di van mehan de di navbera Tirkiye û Îranê de jî têkiliyên nêzikbûn û di hemberî Kurdan de pevrebûn dest pê dike, lê ev wê hinekî wextê bistîne.

Faysal, di Adara 1920'an de tayînî Qraliyeta Sûriyeyê bûbû û ji ber qewimîna hin pirsgirêkan destê wî ji qraliyetê hatibû kişandin. Îcar niha qraltiya Iraqê didanê. Faysal li Mekeyê mezin bûbû û li Stenbolê perwerde bûbû. Faysal ê ku ne di nav dorhêla neteweyî de, ne jî di nav gel de popularîteya wî hebû, di 23'yê Tebaxa 1921'an de hat ser text. Piraniya Kurdan beşdarî referandûma ku ji bo qral hatibû çêkirin nebûn, her wiha nexwestin ku bibin tabiê wî. Piştî vê yekê jî tevgera neteweyî ya Kurdan a li Başûrê Kurdistanê careke din bi pêş de çûye, serhildan her ku çûye bêhtir belav bûye û gel xwestiye ku Şêx Mehmûd Berzencî ji sirgûnê vegere.

Her ku li pêşiya tevgera neteweyî ya Kurdan asteng zêde dibûn, Kurdan hîn bêhtir dengê xwe derdixist. Wek ku tê îdiakirin têkoşînên Kurdan ji hev û din ne qutbûyî ne. Gelê ji Kurdistana Tirkiyeyê bi hêviyeke mezin destekê dide Simko Axa û jê re alîkariyê dişîne. Di serê Nîsana 1921'an de Wezîrê Karê Derve yê Îranê ji qasidê Ingilîzan re digot, 2 hezar milîsên Kurd yê ji Tirkiyê hatine axa Îranê dagir kirine û gazinê xwe dikirin. Di sala 1921'an tevî de, li Başûrê Kurdistanê jî sekin nakeve serhildanan û wek ku me berê got, Şêx Taha hevalbendê wî yê sereke ye. Bi vî awayî Simko Axa gelekî xurt dibe û dest bi amadehiyên ji bo êrîşkirina ser Mûsilê jî dike.

Di van rojên ku Kurd hemû li ser piyan in dewletên eleqedar jî, ji bo ku Kurdan ber bi aliyê xwe ve bikişînin dikevin nav hewldanan û mecbûr dimînin ku hin mafan bidine wan. Ingilîz li başûr lezê didin xebatên ji bo

otonomiyê. Wezîfedarên Ereb ên li herêmê tên vekişandin û Kurdan li şûna wan bi cih dikin. Dîsa jî gurbuna şer li herêmê dom dike. Ingilîzên ku mebesta wan a sereke wekî mêtingehên xwe yên din serwerîyeke bi temamî ye, li hemberî têkoşîna azadiyê ya Kurdan a ku ligel îmkanên gelek kêm ew didomînin û serî danaynin dikevin halekî nexweş.

Hikûmeta Îranê jî di dawiya sala 1921'an û di nîveka pêşî a sala 1922'yan de, destek daye aştiya qismî ya bi Simko Axa re û ji bo ku bi Simko Axa re li ser otonomiya Kurdan peymanê deyne xwe ceribandiye. Simko Axa di sala 1922'yan de gihîştiye pozîsyoneke gelekî xurt û dewleteke otonom a Kurd ava kiriye. Hêzeke eskerî bi qasî deh hezarî ya Simko Axa hebû. Di nav vê hêzê de Kurdên ji Tirkiyeyê jî hene. Simko Axa di Gulana 1922'yan de xwe wek "Qralê Kurdistana Serbixwe" îlan kiriye. Seyîd Taha jî fermandarê artêşê ye. Tevgerê, Mahabad kiriye paytexta dewletê, kiriye ku kovara "Rojî Kurd" bê weşandin, dibistan û nexweşxane vekirine û Kurdî jî wek zimanê fermî ragihandiye.

Derdorên ku pêşiyê destek didan Simko Axa dema dibînin Simko Axa biqewet dibe û ber bi Kurdistaneke yekbûyî ve dere dikevin nav tirsê û îcar di nav hev de lihevkirinan pêk tînin û pev re li dijî Simko Axa şer dikin. Berê Ingilîzan jî xwestibûn wî ber bi xwe ve bikişînin lê bi ser neketibûn. Hasan Yildiz der barê Simko Axa de van tiştan vediguhêze: "Li ser serkeftina Simko Axa ya ku warê tevgera xwe berfireh kiriye, ji generalên berê Kurd Mustefa ku li Iraqê serokatiya komeke Kurdan dike û ji aliyê Wezîrê Mêtingehên Ingilîz Churchill ve jî tê destekkirin, dixine dewreyê. Simko Axa, fikara Kurd Mustefa ya ku dixwaze li navîna Kurdistanê "Federasyona Dewleta Kurd" bê avakirin, zêde zelal nabîne û bersivê nade teklîfa wî. Ingilîz dixwazin bi vê riyê Simko Axa ber bi polîtîkaya xwe ve bikişînin, lê bi ser nakevin."[134]

Bi vî awayî hêviya rayedarên Ingilîz a ku Simko Axa bi Tirkan re şer bike jî şikestiye. Heta wê demê Tirk alîkariyê didin Simko Axa û tekiliyên wan xweş in. Kazim Karabekir jî di bîranînên xwe de behsa alîkariya ku bi Simko Axa re kirine dike. Simko jî di erdê xwe re destûr dida yekîneyên Tirkan ên ku diçûn li başûr li dijî Ingilîzan tevdigeriyan.

Di vê demê de navbera Ingilîzan û Îranê xera bûbû. Ingilîzan li hemberî Îranê jî dixwestin alîkariyê bidin Simko Axa û wî ber bi xwe ve bikişînin. Piştî şoreşa Îranê ya 21'ê Sibata 1921'an General Riza Xan artêşa Îranê ji nû ve sererast kiribû. Bi Rûsyaya Sovyet re têkilî bi pêş xistibû. Di 26'ê Sibata

[134] Hasan Yıldız, bnb, r. 115-116

1921'an de jî peymana Ingilîz û Îranê ya bi mêjûya 1919'an, ji aliyê Îranê ve hatibû betalkirin. Di navberê re pir derbas nabe, artêşên Ingilîz (hin bendergehên Îranê yên başûr ne tê de) herêma Îranê diterikînin. Ingilîz ji ber vê sarbûna têkiliyên xwe yên bi Îranê re û ji bo ku Simko Axa ber bi aliyê xwe ve bikişînin, ji hin alîkariyên ku bi riya Seyîd Taha li Simko Axa tên kirin re, çav digirin.

Hikûmeta Enqereyê ji bo Kurdan geh gavina pi pêş de geh jî bi paş de diavêje. Ji ber ku li beşên din hin gav tên avêtin, ew jî hewl didin ku tiştina bikin lê naxwazin dezgînan ji destê xwe berdin.

Der barê îdarekirina Kurdistanê de komîsyoneke taybet a meclîsa Enqereyê pêşnûmayeke qanûnê amade dike û ji bo nîqaş li ser bên kirin pêşkêşî meclîsê dike. Hin parlementerên Kurd li dij derdikevin. Parlementerên Kurd dadixuyînin ku 'bi tedbîrên di ser re pirsgirêka Kurd nikare çareser bibe û divê ku peşniyazên komîsyona ku li ser Serhildana Qoçgiriyê lêkolîn kirine, di qanûnê de cih bigirin'. Di heman demê de pêşniyaznameyeke li dij pêşkêş dikin. Digel îtirazên parlementerên Kurd, pêşniyaznameya komîsyona taybet a meclîsê di 10'ê Sibata 1922'yan de, bi rûniştineke veşarî li dijî 64 rayên red, bi 373 rayan tê qebûlkirin. Ji ber ku mebûsên Kurd pê nerazî ne raya erênî nadin. Belgeya Ingilîz a bi mêjûya 29 Sibat 1922, kurtasiya pêşnûmaya qanûnê wiha dide:

1) Meclîsa Mezin a Milet, bi mebesta ku miletê Tirk li gorî hewcedariyên medeniyetê bi pêş ve biçe, ji bo neteweya Kurd avakirina îdareyeke otonom a ku di nav ahenga kevneşopiya xwe de be, teahûd dike.

2) Ji bo herêmên ku şêniyên wan bi piranî Kurd in, li gorî ku wê Meclîs li serê biryar bide, tevî alîkarê walî, waliyekî giştî dibe ku Tirk an jî Kurd be, dikare ji aliyê giregirên vê neteweyê (Kurd nw.) ve bê hilbijartin.

3) Meclîsa Mezin a Milet, ligel vê yekê, ew ê rêveberekî xwedîtecrûbe yê ku ji aliyê hemû neteweya Kurd ve bê pejirandin û ew xwedî raboriyeke rûmetdar be, wek waliyê giştî hilbijêre.

4) Waliyê giştî wê ji bo sê salan bê tayînkirin, di dawiya vê demê de, heger piraniya neteweya Kurd nexwaze waliyê berê wezîfeya xwe bidomîne, wê waliyekî giştî yê nû ji aliyê Meclîsa Neteweyî ya Kurd ve bê hilbijartin.

5) Çendî Meclîsa Mezin a Milet kare qerarê bide bê ka waliyê giştî yê alîkar ew ê Kurd an jî Tirk be jî, ev rêveber rasterast wê ji aliyê Meclîsa Neteweyî ya Kurd ve bê hilbijartin. Ligel vê yekê, hewce ye ku ew tayînkirina waliyê giştî, waliyê giştî yê alîkar û mufetîş ji bo pesendkirinê bişînin ber destê Hikûmeta Enqereyê.

6) Meclîsa Neteweyî ya Kurd, wê li wilayetên rojhilat bi hilbijartina ku xwe dispêre raydanê ya giştî bê pêkanîn û her meclîs wê ji bo sê salan bê hilbijartin. Meclîs wê di 1'ê Adarê de dest bi rûniştinên xwe bike û wê çar mehan wezîfê bike. Heger meclîs di vê demê de karên xwe nebe serî, ew ê karibe demê li ser daxwaza piraniya endamên xwe û bi pesenda waliyê giştî dirêj bike.

7) Meclîsa Neteweyî ya Kurd wê xwedî heqê kontrolkirina butçeya xerckirin û dahatina wilayetên rojhilat û xwedî heqê pirsyarîkirina neheqiyên ku li wezîfedarên îdarî û sivîl ên ji qedemeyên jêr dibin be. Ev meclîs wê karibe ji bo pêşketina welêt û refaha wî, biryarên qethî bistîne û ev hemû biryar jî, ji bo zanîna Meclîsa Mezin a Miletê wê bi Hikûmeta Enqereyê re bên gotûbêjkirin.

8) Der barê hemû nelihevkirinên di navbera Waliyê Giştî û Meclîsa Kurdan de, Meclîsa Mezin a Milet wê biryar bide û her du alî jî mecbûr in rîayetî biryara Meclîsa Mezin a Miletê bikin.

9) Heta ku sînor ji aliyê komîsyona têkel ve bên diyarkirin, herêma îdarî ya Kurdistanê wê wilayetên Wan, Bedlîs, Diyarbekirê, Senceqa Dêrsimê û hin qeza û nehiyeyan bigire nav xwe.

10) Di der barê îdarekirina Kurdistanê de, li gorî ku bi rewşa herêmê re li hev bike wê li hin cihan rêxistineke muhakemeyê bê pêkanîn. Ev rêxistin ji bo niha, wê ji elemanên gihîştî pêk bê ku nîvî jê ji Tirkan û nîvî ji Kurdan e. Di dema teqawidbûna wan de, erkedarên Tirk wê bi erkedarên Kurd re bên guhertin.

11) Ji dema ku ev qanûn bikeve meriyetê û pê de, ne bi navê 'alîkariya ji bo şer' ne jî wê bi navekî din tu bac neyê stendin. Hemû bacên giran ên heta niha, bi şiklê ku dewrî selahiyeta rêveberiya cihkî bibin wê bên hilanîn û dana bacan jî wê tenê salê carekê be. Rêjeya dahatina safî ya ku wê bidine Hikûmeta Enqereyê, dê ji aliyê komîsyoneke têkel a ku wê ji endamên Meclîsa Mezin a Milet û Meclîsa Neteweyî ya Kurd bê çêkirin, were tespîtkirin.

12) Li wilayetên rojhilat, bi mebesta ku pergalê biparêzin, wê baskartêşeke jendirmeyan bê damezirandin. Meclîsa Kurd wê qanûna der barê pêkanîna vê baskartêşê de vekole, lê heta pêwîst bê dîtin wê xizmetên fermandeya raser a jendirmeyan di destê erkedarên Tirk ên ji rutbeya bilind de be.

13) Efser û leşkerên Kurd ên di nav artêşa Tirk de, heta gotûbêjên aşitiyê bi encam bibin, ew ê erkên xwe yên halê hazir bidomînin. Piştî gotûbêjan, ên ku bixwazin dikarin vegerin warên xwe.

14) Di dawiya gotûbêjên aştiyê de, bihayê pêdivî û heywanên beriya Şerê Cîhanê yê Yekemîn û piştî Şerê Cîhanê hatibû xwestin, wê berî hemû tiştî û herî dereng di nav 12 mehan de bê dayîn.

15) Zimanê Tirkî ew ê bi tenê li Meclîsa Neteweyî ya Kurd, di karên îdarî û di rêvebirina hikûmetê de bê bikaranîn. Ligel vê yekê, zimanê Kurdî dikare li dibistanan bê hînkirin û rêveberî bi awayê ku di dahatûyê de nebe hîmê daxwaza ku 'zimanê Kurdî bibe zimanê fermî yê hikûmetê', dikare ji bo bikaranîna vî zimanî teşwîk bike.

16) Avakirina zanîngeheke ku tê de fakûlteyên hiqûq û tibê hebe, ew ê wezîfeya herî pêşî a Meclîsa Neteweyî ya Kurd be.

17) Meclîsa Neteweyî ya Kurd, bêyî pesenda Waliyê Giştî û beyî agahdarkirina Meclîsa Mezin a Milet, nikare danheva tu bacê bike.

18) Di serî de, heta bi Meclîsa Mezin a Milet re hevdîtin pêk neyê û pesenda wê neyê stendin (ji aliyê Meclîsa Neteweyî ya Kurd ve-nw) tu îmtiyaz nayê dayîn."[135]

Nacî Kutlay di vegotina xwe ya der barê vê qanûnê de wiha dibêje: "Di wan tarîxan de tê zanîn ku Îngiltere pirsgirêka Kurd li Başûr dike rojevê. Mustefa Kemal jî, ji bo ku qozê 'Kurd' ê di destê Îngiltereyê de netê bike, di çarçoveyeke teng de li ser 'Otonomiya Kurd' axivî. Di 10'ê Sibata 1922'yan de otonomiya Kurd bû qanûnî. Niha, ji ber çi be, ev qanûn û gotûbêjên Meclîsê yên li ser vê qanûnê, ne di 'Zabtên Meclîsê' yên hişkere de, ne jî di yên veşarî de hene. Zabtên bi mêjûya 9 û 11 Sibatê hene, lê yên bi mêjûya 10'ê Sibatê tune ne. Çi tiştekî xerîb e, ne wisan? Dogu Perînçek ev peyde kirin û fotokopiyên wan weşandin..."[136]

Di dema Konferansa Londonê de jî, Hikûmeta Enqereyê li ser gotina bihevrebûna Kurd û Tirkan bi israr e. Bi Kurdan re destpêkirina tevgera Mustefa Kemal, li meclîsê hebûna hejmareke zêde ya mebûsên Kurd, bingeheke girîng a vê birêveçûnê pêk anîbû. Ji bo meclîsa Enqerê, piştî qanûna 10'ê Sibatê ya ku li jor cih girt, dema xwedî derketina li Başûrê Kurdistanê bû. Lê belê, wek ku wê piştre jî bê dîtin û di qanûnê de jî hatibû hişkerekirin, ji ber ku tevger li ser bingeha dana kêm a mafên Kurdan dimeşiya ew ê encameke erênî bi dest nehatibûya xistin. Di heman demê de, ji ber ku çavê wan nedibirî li dijî Ingilîzan cepheyeke şer vekin, ew ê serî li taktîkê ewiqandinê bidana û heta gava li Başûrê Kurdistanê hin gavên erênî ji bo Kurdan bihatina avêtin, ew ê ji vê re jî bibûna asteng.

[135] Ahmet Mesut, bnb, r. 138-140
[136] Naci Kutlay, bnb, r. 90

Bi gotinên bihevrebûna Kurd û Tirkan a di her qadê de, derxistina pêş a dîn, di dema gotûbêjên Sewrê de şandina telgrafên li dijî biryaran û piştî qanûna 10'ê Sibatê xwedî derketina zêde ya li Başûrê Kurdistanê, têra xwe bihevrebûna Kurd û Tirkan nîşanî hêzên Ewrûpî dabû. Her wiha, hinek jî alîkarî bi Simko Axa re hatibû kirin. Vê yekê jî dîmenên cepheyeke ku dikaribû pêk bihata, dida xuyakirin. Ji bo wilo êdî Ewrûpî heta ji wan bê wê nema dengê Kurdan bibin xwe. Di Konferansa Parîsê de, ku di demên 22-26 Adar 1922'yan de di navbera Îngiltere, Frensa û Îtalyayê de çêbûbû, nîqaşên li ser Kurdistanê gelekî di ser re bûbûn û ew ketibûn nav hewldanên ku bi Hikûmeta Enqereyê re têkiliyên baş bên danîn. Di pêvajoya Konferansa Lozanê de jî, tenê ji bo ku Başûrê Kurdistanê ji dest xwe bernedin, têkoşînê didomînin.

Li gorî gotina Mustefa Kemal, piştî cepheya rojhilat û rojava, dor hatibû ser cepheya başûr. Enqerê îcar berê xwe dabû başûr. Li gorî ku Lazarev îfade kiriye: "Di Adar 1922'yan de Hikûmeta Enqereyê ji bo Rewandûzê wek qeymeqam Remzî Beg û wek serheng jî Alî Şefîk Beg ku bi bernavkê Ozdemîr tê zanîn, tayîn kirine. Casûsên Tirk di nav Kurdên Iraqê de propagandeyeke mezin a panîslamîst û terefdariya Tirkan li dar xistiye, ji wan re pere û çek temîn kirine û ew teşwîqî serhildana li dijî hukimraniya Ingilîzan kirine."[137]

Ji bo wê demê em ji berhema C. J. Edmonds a bi navê "Kürtler, Türkler ve Araplar" (Kurd, Erep û Tirk) bi kurtasî van tiştan fehm dikin; ku wî ev agahî ji tiştên ew bi xwe jiyaye û ji raporên Buroya Mêtingehan bi dest xistine:

Remzî Beg di dawiya meha Gulanê de digihîje Rewandûzê, ji eşîran re dibêje, hêzeke gelek mezin a Tirkan dike ku were û bi alîkariya vê hêzê Silêmaniye, Kerkûk û Hewlêrê wê ji destê Ingilîzan bê derxistin. Serheng Alî Şefîk ku di nîvê meha Hezîranê de wî dişînin herêmê, hişkere dike ku wezîfeya wî bidestxistina temamiya wilayeta Mûsilê ye. Fermandarê Tirk ê ku ji cepheya Cizîrê berpirsyar e, ji kesên girîng ên bajarokê Rewandûzê re nameyan dişîne û diyar dike ku ew ê wilayeta Mûsilê ji Iraqê re nehêlin û banga beşdarbûna cîhadê li wan dike. Paragrafek ji îfadeyên di nameyan de wiha ye:

'Hewce dike ku hemû birayên me yên dîn ji bo vê bihevrebûna ku Hikûmeta Osmanî afirandiye biparêzin têbikoşin... da ku bawermendên rast ji nû ve karibin bêhnêke rihet bistînin. Kêmasiyên we yên der barê cebilxane û mihîmatan de, ji aliyê me ve li ber çav hatine girtin û ew ê di demeke herî

[137] M. S. Lazarev, bnb, r. 200

kin de bên temînkirin. Xwedê serkeftinê bibexşîne kesên ku di riya dîn de şer dikin û kesên mîna we ku xwîna xwe di riya Wî de dirijînin. Û laneta Xwedê li ser wan kesan be ku dînê xwe difiroşin Ingilîzan, Faysal û zilamên wî, ku êdî ew jî ji kafiran in. Amîn'[138] Van gotinan di nav xelkê de heyecanek çêkiriye, her wiha alîkariyeke mezin nebe jî, hêvî dane Kurdên Başûr.



*Smeil Axayê Şikakî-ê di nêvî de rûniştî*[139]

Ber bi dawiya Gulana 1922'yan ve rêveberê Kurdên Cebarî, li nêzî Çemçemalê, êrîşî erkedarekî Ingilîz dike û wî birîndar dike. Di vê dema ku tevgera Simko Axa li Îranê serkeftinan bi dest dixe û li Başûrê Kurdistanê kuştina erkedarên Ingilîz û serhildanê berdewam dike, Tirkiye di 15'ê Hezîrana 1922'yan de, heyetekê di bin serokatiya waliyê berê yê Mûsilê Haydar Beg de dişîne Şemzînanê. Ev heyet ji Simko Axa û Seyîd Taha re soz dide ku, heger ew li dijî Ingilîzan berxwedana xwe gur û geş bikin, wê alîkariyê bidin wan. Simko Axa, eşîrên Kurd ên girîng ên li herêmê dicivîne û biryara berxwedaneke xurtir dide.

Piştî şoreşa Şex Ûbeydullahê Nehrî serhildana Smeîl Axayê Şikakî (Simko Axa) di rojhilatê Kurdistanê de şoreşa herî mezin û demdirêj e. Simko Axa li herêmeke berfireh serwerî kiriye. Gelên ku xwedî ne, Lûr û Bextiyarî jî piştgirî didan serhildana Simko Axa. Yekîneyên Kurd di meha Hezîranê de gihabûn nêzî Tewrêzê. Gelek hêzên herêmê jî tevî têkoşînê bûbûn û destek dabûnê. Ji pêşewayên Kurdan Alî Merdan Xan û Serdar Ammenulah Xan ji van tenê du kes in. Konfederasyona Sencapan jî tevî serhildanê bûbû. Simko Axa bi Xanamên ji qebîleyên Lûristanê, ji bo hereketa hevpar a li dijî Tehranê peyman îmze kiribû. Ji bo hebekî aramî çêbibe zorî dane Hikûmeta Îranê da ku li ser mijarên veqetîna hêzên terefên dijber, pêkanîna azadiya ticaretê û pevguherîna dîlan, bi Simko Axa re peymaneke demkî çêke.[140]

[138] C. J. Edmonds, bnb, r. 324
[139] William Eagleton Jr. , The Kurdish Republic of 1946
[140] M. S. Lazarev, bnb, r. 218

Li Başûrê Kurdistanê jî, tevgerên ku Kerîmê Fetah Beg ê di sala 1919'an de tevî serhildana Şêx Mehmûd bûbû pêşengê wan e, her diçin sor dibin. Sitvan Bond û Sitvan Makant ku ji yekîneyên civandî re fermandetiyê dikin, di 18'ê Hezîranê de, ji aliyê zilamên Kerîmê Fetah Beg ve tên kuştin û Kerîmê Fetah Beg û zilamên xwe beşdarî serhildana ku ji aliyê Cebariyan ve hatiye destpêkirin, dibin.

Li Başûrê Kurdistanê bûyer û nerazîbûnên li dijî Ingilîzan her diçin zêdetir dibûn û beşdariyên nû tevî serhildanan dibûn. Axayên Pîşderê ku tevî nav serhildanê bibûn, ji bo ku alîkariyê bistînin heyeteke ji çar kesan pêkhatî dişînin Rewandûzê. Li gorî vegotina Edmonds, heyet bi nameyeke ku li ser kaxizekî fermî û bi sernavê "Fermandariya Miletê Îslam a Filîstîn û Sûriye" hatibû nivîsandin û bi navê "Fermandariya Miletê Îslam a Iraq û Kurdistanê" hatibû îmzekirin vedigerin. Di nameyê de dihat nivîsandin ku Mustefa Kemal û Cevdet ji xizmetên hêja yên axayên Pîşderê agahdar in, lê ji ber ku ew bi awayekî zêde li cepheyên rojhilat û rojava bi şer re mijûl bûn firsenda bi wan re bibin alîkar nedîtine, îcar ji ber ku niha destê wan serbest bûye ew ê Ahmed Taqî yê "Delegeyê Kurdistanê" ligel nêzî pêncî kesî bişînin Waznayê.[141]

Erkedarên Ingilîz, ji ber zêdebûna nerazîbûnê, hevkariya di navbera pêşewayên xurt ên têkoşîna azadiya Kurd û Simko Axa de û ji ber eleqedarbûna Kurdên Bakur a bi Başûr re, di nav endîşeyeke mezin de ne. Tirsa ku ew ê Başûrê Kurdistanê winda bikin, zêde dibe. Hêzên Ingilîz ji ber vê tirsê, li Başûr dest bi tedbîrên girantir dikin.

Tevî bi dehan balafiran di 10-11 Tîrmehê de, herekata hawayî ku li gorî dema xwe dikare wek herekateke pir mezin bê nirxandin, tê lidarxistin. Lê Edmonds ku di wê navê de li Ranyayê li ser wezîfeyê ye, dinivîse ku herekatê têra xwe ziyan negihandiye serhilderan û ji ber encamên herekatê jî hêvîşikestinek çêbûye. Her wiha li ser ku wek dixwest alîkarî ji rayedaran nestendiye, ev nivîsîne: "Ji ber îqaz û gazinên min, wan wek bersiv tenê mufrezeyeke ji yekîneyên civandî şand Derbendê û Rewandûz carek an jî du car hat bombekirin, lê tu encam bi dest neket; ji aliyê din ve ligel hemû hewldanên min, min Biryargeha Giştî, ji bo Sawanê bê bombekirin ku ew 12 kîlometre di nav sînorê Îranê de bû û heyeta Tirk li wir bi serokên eşîran ên ku ji her du aliyên sînor hatibûn, civîn pêk dianî, îqna nekir..." Vegotina wî ya piştre jî wiha berdewam dike: "Ez fikirîm ku bombekirina Sawanê û Kanîreşê ku ew li ser qadeke 2700 metreyî ya li ser sînor bûn û du efserên Tirk jî li wir

[141] C. J. Edmonds, bnb, r. 325

qamp vegirtibûn, wê tiştekî gelekî bi kêf be û min telgrafa li jêrê şand: Ez dixwazim hişkere bikim ku di vê nuqtê de sînorê Îranê tenê li ser kaxiz maye, çinku herêma Kanîreşê ji aliyê Pîşderan ve wek qampa havînê tê bikaranîn û li vir ne welatiyekî Îranê ne jî gundekî ava yê Îranê heye; li aliyê din di nav 115 kîlometreyî de şopa desthilatdariya Îranê jî tune ye û herêm bûye navenda çalakiyên dijminane yên li dijî hikûmeta me."[142]

Ingilîz her tim di nav lêgarîna pêşewayekî alternatîfê Şêx Mehmûd de bûn. Rayedarên Ingilîz piştî jihevbelakirina serhildana Şêx a pêşî a sala 1919'an, têkiliyên xwe bi Seyîd Taha yê pêşewayê devera Şemzînanê re xurt kiribûn û di nav xwe de li hev hatibûn. Seyîd Taha, tevî herêmên Îranê bandora wî li ser warekî fireh hebû û gelek caran jî ligel Simko Axa têkoşiyabû. Di têkiliya xwe ya bi Ingilîzan re jî bêyî ku ji daxwazên neteweyî yên Kurdan tawîzê bide, pêgiriya Ingilîzan qebûl kiribû, ji Ingilîzan alîkariya pereyan stendibû û dest bi danheva bacê ji herêmên Kurdan en ku girêdayî wî ne, kiribû. Rayedarên Ingilîz di vê dema ku ketibûn tengasiyê de, di 10'ê Tebaxê de, difikirîn ku bi Seyîd Taha re hevdîtinekê pêk bînin. Seyîd Taha, ji ber ku Simko Axa di bin tehdîda hêzên mezin de bû û jê alîkarî xwestibû, ku wî di dema serhildanên li dijî Îranê de jê destekeke mezin stendibû, diçe alîkariya Simko Axa û hevdîtin pêk nayê.

Li aliyê din rewşeke cuda dimeşe. Hikûmeta Îranê li dijî tevgera neteweyî ya Kurd a ku pir xurt bûbû, dest bi amadehiyên mezin kiribû. Rayedarên Îranê ji berê ve ji bo ku li dijî tevgera Kurd hevkariyekê çêkin bi Enqereyê re di nav dan û stendinan de ne. Bi piranî ji bo alikariya bi Simko Axa û hevalbendên wî re tê kirin betal bikin gelek caran hevdîtin pêk tên . Her çiqas dem girtibe jî xwestek tê cih û Îran, bi birîna alîkariya ji Simko Axa re tê kirin bi ser dikeve. Esas di vir de wê para tirsa Hikûmeta Enqereyê ya ji xurtbûna Simko Axa jî hebe.

Hebekî em herin serê têkiliyên Tirkiye û Îranê û bi hin jêgirên ji xebata Doç. Dr. Gökhan Çetinsaya ya bi navê 'Milli Mücadele'den Cumhuriyet'e Türk-İran İlişkileri 1919-1925'(Ji Tekoşîna Milî Heta Cumhûriyetê Têkiliyên Tirk û Îranê 1919-1925) em mijarê hinekî vekin.

Di Gulana 1921'an de Wezîrê Karê Derve yê Îranê ji Ingilîzan re radigihîne ku, balyozê Sovyetê jê re pêşniyaza ku 'ew, Tirkiyê û Afganîstan hevalbenditiyê çêkin' aniye. Li gora pêşniyazê hevdîtin dikarîbû li Moskovayê pêk bihata. Lê Îranê ji ber têkiliya di navbera Tirkiye û Simko Axa de aciz e. Li gorî ku Ingilîzan fêm kiriye, hikûmeta Îranê xwestiye ku temsîlvanekî bişîne

[142] C. J. Edmonds, bnb, r. 331

Enqereyê, têkiliyên nefermî deyne û lêpirsîna rewşê li cihê cih bike. Nêzikî dawiya Nîsanê jî serokwezîrê Îranê ji qasidê Ingilîzan re ragihandiye ku, hikûmeta Enqereyê ji bo hêzên Tirk ên li Azerbaycanê tevde vekişin, bi tu awayî hêzên Tirk alîkariyê nedin serhildêrên Kurd û eleqeya xwe ji hundirê sînorê Îranê neyne, biryara qethî daye.

Li gorî çavkaniyên Ingilîz hikûmeta Îranê, pêşiyê ne fermî temsîlvanekî bi navê Han-i Şewket şandiye Enqereyê. Armanca wan ew bû ku hikûmeta Enqereyê ji bo alîkariyê bi Simko Axa re neke û mudaxeleyî Azerbaycanê neke qanix bikin. Dûre jî dihat ragihandin ku, ji bo peymaneke siyasî di nav Enqere û Tehranê de bê avakirin heyeteke dîplomatîk di 24'ê Hezîrana 1921'an de gihaye Enqereyê. Li gorî vê, berî ku heyeta Îranê bigihê bi çend hefteyan hikûmeta Enqerêyê, bi temsîlvanên Bolşewîk û Afgan şêwiriye û metna ji bo peymana Tirk û Îranê hatibû amadekirin bi wan dane xwendin û fikra wan hatiye stendin. Ji bo hevdîtinan bimeşîne Yusuf Kemal (Tengîrşek) hatibû wezîfedarkirin û şêwirmendên eskerî û sivîl dabûnê. Ev peymana ku gelekî dihat veşartin wê bûbûya dewama peymana Tirk û Afganan û bi vî awayî wê sêçik temam bibûya.

Tekilî û hevdîtin dûre jî didomin. Hikûmeta Tehranê di Tebaxa 1921'an de wezîrê Perwerdehiyê Mumtazudevle ligel heyetekê ji bo çûna Enqerê wezîfedar dike. Heyet 17'ê Kewçêra 1921'an ji Tehranê vediqete, pêşiyê li Qefqasan têkiliyan datîne û ancex di Hezîrana 1922'yan de digihê Enqereyê. Wezîfeya herî muhîm a heyeta Mumtazudevle ew e ku, ji bo li dijî Simko Axa bihevre tevbigerin hikûmeta Enqereyê qanix bikin. Berî ku Mumtazudevle bigihê Enqereyê di rojnameya Hakimiyet-i Milliye (16 Hezîran 1922) de xetên 'hikûmeta Îranê ahd daye serhildana Kurdan a ku tiliya biyaniyan tê de heye biperçiqîne û dixebite ku bi hikûmeta me re jî hevkariyê bike' cih digire.

Di hefteya dawî a Hezîranê de wek 'sefîrê fewqulade' gihana Enqereyê ya Mumtazudevle, ji aliyê hikûmeta Enqereyê ve dibe wesîleya propagandayeke mezin. Mumtazudevle heta nîvê Tîrmehê tevgera xwe domandiye û gelek derban bi Mustefa Kemal re hatine cem hev. Di encamê de ji bo hevkariya li dijî Simko Axa bi Tirkiyeyê re li hev kirine.

Pişta wan qewîn bû û pê de di Tebaxa 1922'yan de leşkerên Îranê bi hêzeke mezin êrîşî Kurdan kirin û bi awayekî giran Simko Axa û alîgirên wî têk birin. Ev ketina miqabilî hev a du hêzên ku mirov ne dikare ji aliyê hêza leşkerî ve û ne ji aliyê amûrên teknîkî ve bide ber hev. Smeîl Axa (Simko Axa) ji aliyekî ve bi Îranê re ji aliyê din ve jî bi Tirkan re şer kiriye. Simko Axa piştî têkçûna li hemberî artêşa Îranê, bi heşsed siwarî, du top û bi qasî hezar kesê

bi çek derbasî Elbakê aliyê Tirkiyeyê bûye. Di êrîşa yekîneyên Tirkiyeyê ya di nîvê Rezberê de, Simko Axa mecbûr dimîne derbasî Başûr bibe. Di vê êrîşê de yekîneyên Tirkan jina Smeîl Axa (Simko Axa) kuştine, lawê wî dîl girtine û pênc top, deh tivingên mekînedarên giran û sê hezar û şeşsed zêr bi dest xistine.[143] Simko Axa ji ber hevkariya ku berê bi Tirkan re pêk aniye, li hemberî vê rewşê dimîne şaş û dûre jî her tim wê bibêje bêbextî li min bû.

Îcar têkiliya navbera Îran û Tirkiyeyê her biçe wê xweştir bibe. Li ser navê Hikûmeta Tehranê di bin serokatiya efserekî bi navê Salar Nîzam de heyetek di 22'yê Kewçêrê de li Enqereyê ye. Dema serdana Mustefa Kemal dikin, Quran û şûrê bi zêr xemilandî diyarî wî dikin. Mustefa Kemal girîngiya ku daye vê ziyaretê bi rojnemevanan re par ve kiriye û gotiye, heyet dibêje ku hewce bike em dikarin herekata Iraqê pêk bînin. Di 25'ê Kewçêrê de jî peymana Tirkiye û Îranê tê îmzekirin.

Piştî gelek nîqaşan be jî di 1'ê Sermaweza 1922'yan de Meclîsa Mezin a Miletê bi qanûnekê xîlafet û seltenat ji hev veqetandin û seltenatî rakir. Navê Vahdetîn Xan ji xutbeyan hat rakirin, ferdek ji xanedanê ji bo xelîfetiyê hat hilbijartin, lê tu hukmê wî yê sîyasî nehatibû hiştin û tenê wek navnîşaneke dînî hatibû hiştin. Ev wê rihetiyekê bide hêzên derdorê yên heyî. Dûre jî di 11'ê Berfanbarê de bi Mutarekeya Mûdanyayê, wê Tirkiye jî têra xwe rihet bibûya.

Em li Başûrê Kurdistanê binêrin. Dema Simko Axa di bin êrîşa Îran û Tirkiyê de ye li Başûr jî Ingilîzan bombe bi ser Kurdan de dibarandin. Ji hin hevnivîsînan em rewşa wir bişopînin. Hin nivîsên ku hêzên Ingilîz ji hev re şandine yên di 16 û 17'ê Tebaxê de wihan in:

"16 Tebax. Ji APO'yê (Efserê Alîkar ê Siyasî) ji bo PO (Efserê Siyasî) û HC'ê (Serekfermandariyê) re. Nameya Ozdemîr a ku wan vedixwîne nav hêza ku wî pêk aniye, li hemû pêşewayên (eşîrên) Nawdeştê hatiye belavkirin. Vê sibehê 40 Tirk, 2 tivingên makînedar û ligel 150 mêrên endamên eşîretê, çûn Lêwjayê. Ez daxwaz dikim ku hûn Mînkol (baskê Mînet ê fermandarê yekîneyên civandî yên Silêmaniyê) demek berî demekê bi rê bixin û destûrê bidin balafirên fîloya li Kerkûkê ku li gorî talîmatên min (Edmonds-E) bombebaranê pêk bînin.

Heman roj, piştre. Hatiye piştrastkirin ku Tirk li Yandîza û Lêwjeyê ne; gelek endamên eşîrê jî beşdarî wan bûne. Ji kerema xwe re, wan derhal bombe bikin.....

---

[143] Doç. Dr. Gökhan Çetinsaya–Milli Mücadele'den Cumhuriyet'e Türk-İran İlişkileri 1919-1925- Atatürk Araştirma Merkezi Dergisi, sayi 48, Cilt:XVI, Kasim

Ji PO'yê ji bo APO'yê. Ji ber ku hemû yekîneyên civandî di rewşeke perîşan de ne, ji kerema xwe re ji me şandina yekîneyên bejahiyê daxwaz nekin, ancex wek çareya dawî mirov dikare serî li riyeke wiha bide û wê çaxê jî ancex em dikarin yekîneyeke ji çar tivingên makînedar (mîtralyoz) û ji 200 peyadeyên xwedî tiving pêk hatî bişînin..."[144]

"17 Tebax, ji APO'yê ji bo PO û HC'ê.

Tam 48 saet di ser êrîşa Tirkan a li ser Nawdeştê re bihurî, lê me berxwedaneke herî biçûk jî nîşan neda û ez dixwazim hûn zanibin ku vê helwesta me kir ku dilê hemû navçeyê bi me bişewite.

"... Li gorî ku tê ragihandin, Tirk ligel nêzikî 400 leşkerên (eskerên eşîrên Kurdan) xurt ji Geliyê Nawkêwanê ketine Şawurê û ber bi Ranyayê ve dikişin, ku ez wê derê bi leşkerekî biçûk ên ku ji endamên eşîran pêk tê û ez bi temamî li wan amin nabim, diparêzim. Berî ku ew bigihên Ranyayê mutleq divê pişt li wan bê şikênandin. Ji bo ku çavê wan li her du aliyê sînor be mufrezeyek ku ji yekîneyên berhevkirî pêk tê wê li Derbendê bimîne. Di vê navê de, heger bi rastî hûn dixwazin bajarokê di destê xwe de bigirin, divê hûn jî bi awayekî zêde û bênavber Nawdeşt û Şawurê bomba bikin... Bi îhtimaleke mezin, beriya bibe sibeh wê xetên telgrafê bên birîn û hûn ê careke din xeber ji min nestînin, ji lew re ez êdî stendina hemû tedbîrên pêwîst ji we re dihêlim."[145]

Di 26'ê Tebaxê de Kurd Mergê bi dest dixin. Hêzên Ingilîz ku xwe bi yekîneyên nû (di nav wan de hêzên Hindistanê jî hene) teqwiye dikin, dîsa dest bi êrîşan dikin. Şer di bin bombardimana gur û zêde de berdewam dike. Ingilîz ligel teqwiyekirinan jî, ji ber êrîşên Kurdan ên ku her roj xurtir dibin, mecbûr dimînin di 1'ê Rezbera 1922'yan de ji Ranyayê vekişin. Di 3'yê Rezberê de hemû personelên Ingilîz û hindî, ji Silêmaniyê bi balafirê direvin Bexdayê. Beriya ku ji Silêmaniyê veqetin, xezîne û îdareyê ji Meclîsê re ya ku serokê wê birayê Şêx Mehmûd, Qadir bû dihêlin.

Di van şeran de li hemberî hin derdorên Kurd ên alîgirên Ingilîzan jî têkoşîn dihat dayîn. Ingilîzan, wek ku di dîroka Kurdan de pir tê dîtin, ji berberiya di navbera eşîran de gelek îstifade kiriye û li dijî eşîrên mezin ên ku li hemberî wan têkoşiyane, hin eşîrên biçûk ên qels destek kirine û berberiya di navbera eşîran de sor kirine. Ji ber têkiliyên Ingilîzan ên bi vê ramanê bi pêşewayên dijraberên Şêx Mehmûd re

[144] C. J. Edmonds, bnb, r. 333
[145] C. J. Edmonds, bnb, r. 334

kiribû ku navbera wan û Şêx xerabtir bibe.*

Rayedarên Ingilîz ji bo bi hemleyeke nû warên ku windakirine bidestbixin, careke din dest bi kar dikin. Bêhna wan ji têkiliya Kurdan a bi îstixbarata Tirkan re gelekî teng bûye. Di 14'ê Kewçêra 1922'yan de, Hewlêr ji nû ve tê dagirkirin. Edmonds, tevli êrîşên hewayî yên bênavber ên li ser Ranya û Mergeyê bûbû. Raman û hestên wî tiştên ku di wan rojan de qewimîbûn radixe ber çavan:

"Tesîra êrîşan hêdî hêdî xwe dida nîşandan; gelek serekên eşîran ku bi piranî ji ber pêla tirsê diketin tevgerê û her diçû hejmara wan zêde dibû, dest bi xeberşandina Hewlêr, Kerkûk û Silêmaniyê kiribûn û diketin bextê me. Hema bibêje ez tim li hewa bûm; an ez di navbera Kerkûk, Hewlêr, Koy, Kifrî û Bexdayê de diçûm û dihatim yan jî min cihê ku bombe bikin nîşanî balafiran dida. Min di 27'ê Kewçêrê de tecrûbeya xwe ya bombardimanê ku cara pêşî li min qewimîbû, bi vî awayî qeydî rojnivîska xwe kir:

'Me îro li ser Mergeyê bombardimaneke gelek gur da destpêkirin. Ez jî, ji bo ku hedefan nîşan bidim, li balafirê siwar bûm. Pîlotê min, di warê berdana hedefan de têra xwe serkeftî bû: Yek ji 'fiçi'yan (bombaya şarapnelê ya bi giraniya xwe 11, 5 kg) tam li ber deriyê serayê teqiya û bi awayekî muhtemel ziyaneke mezin gihande wan deran. Hesta bombakirinê heyecanê dide; hûn berê xwe didin hedefê û piştî ku hûn bombayê berdidin, berî ku hûn ji bo careke din a êrîşê vegerin, hûn xwe xwar dikin û li karê ku we kiriye dinêrin. Di dil xwe de hûn pir lezgîn in, lê mekîneyên din ji we re wek mozqirkên gelekî bişid û qeherî tên xuyakirin.

(...) Hatina bombeyên 45 kg û piştre jî hatina bombeyên 100 kg'î, heyecaneke mezin çêkiribû. Bombeyên qûndaxê cara pêşî di 1'ê Sermawezê de hatibûn bikaranîn. (...) Di du salên bi dû de, ji ber hewcedariya wezîfeya min, min xwest gelek caran êrîşên hewayî bên kirin."[146]

* Kurtasiyek ji vegotineke Edmonds: "Hevsera Osman Paşa ya ku niha bî ye, yê ji giregirên Eşîra Caf ku di serdema Osmaniyan de qeymeqamtiya Helepçeyê kiribû, di dema serhildanê de bûbû dosteke sadiq a îdareyê. Piştî bidestketina Helepçeyê General Fraser biryar dide ku bi xwe biçe Helepçeyê û spasiyên serekfermandariyê ragihîne Xanim Efendî ya qralîçeya bêtac a Şarezûrê. Wî, Greenhouse û lawên Xanim Efendî Ahmed û Îzet jî bi xwe re birin. Ahmed û Îzet, wek gelek begzadeyên Caf ên di bin maîyeta Xanim Efendî de, bi hevrîşmên buha û bi turbanên bi-xemil bûn. Di arazî de riyeke çêkirî tune bû. Gava ku heyet gihîşt seriyê aliyê rojhilat a deşta ku bi avê tije bûbû, erebeyan pêşiyê rê winda kir û paşê jî dingilên wan di heriyê de asê bûn. General ji bo xelasiya ji vî halî, ji erebeyê peya bû û dest bi dehfdana erebeyê kir. Gava ku erebeyê hereket dikir, heriya pîs a virçoqî ji bin tekerlekan dipijiqîn ser wî û ew ji serî heya binî di peşkên heriyê de ma. Çaxa çavên xwe ji wan peşkên heriyê paqij kir, dît ku begzade bi meraq lê dinêrin û tu lebta wan ji bo alîkariyê tune ye. Ji Greenhouse xwest ku ji wan re bêje, dilê wî ji vê sekna wan lihev dikeve û heger dixwazin bi Ingilîzan re têkiliya wan xweş bibe, hem bi wateya rast hem jî bi wateya mecazî ya peyvê 'tembî li wan dike ku milên xwe bidine bin tekerlek.' Ji zilaman ê mezin, bi awayekî gelekî rihet bersiva "Belê" da Greenhouse û got "General ê birêz tiştên xweş dibêje, lê hûn jî jê re bibêjin ka bila li kincên me binêre; temam ez di palto û turbana xwe bihurîm, lê belê ez çima vî bergê xwe yê ku bi tena serê xwe 300 rûpî dike (ûnîformaya general ê rengqulipî îşaret kir) ji bo kincên wî yên ku 20 rûpiyî nakin, mehf bikim?" (C. J. Edmonds, bnb, r. 79)

[146] C. J. Edmonds, bnb, r. 396

Wek ku hişkere tê dîtin, ev êrîşên hawayî di nav hestên macerayî de hatine meşandin û pê re ceribandina çekên nû jî heye. Kesê ku li jêr bombe bi ser wan de dibare ne di bîr û fikaran de ne. Lê di bin van bombebaranên zêde û gur de jî serhildan nesekiniye û gelekî zehmet hatiye bêdengkirin. M. S. Lazarev vê mijarê wiha dinirxîne:

"Bi kurtî, Ingilîzan bi tu awayî xwe wek efendiyê Başûrê Kurdistanê hîs nekirine. A herî girîng meh bi meh bêhtir ketine nav zehmetiyan. Ew ji bo perçiqandina Kurdên ku serî netewandine, ji aliyê fînansê û hêza leşkerî ve ketine nav tengasiyên herî mezin. Ji bo ku li dijî Kurdan serkeftineke tam bi dest bixin, ligel hemû tesîra wê, bombardimana hewayî jî têr nekiriye."[147]

Dema Komîsyona Neteweyên Yekbûyî di destpêka sala 1925'an de li Mûsilê lêkolîn kiriye efserê siyasî C. J. Edmonds, refaqet ligel nûnerê heyeta Ingilîz Jardine kiriye û wê demê jê re nêrîna xwe ya li herêmê wiha îfade kiriye: "Me tevde jî zanîbû heger Mûsil nebe, avakirina dewleteke ku bi Bexda û Basrayê tenê karibe li ser lingê xwe bisekine ne mimkun e... Em difikirîn ku tu ferq di navbera berjewendiyên tevayî yên Iraqê û berjewendî û prestîja welatê me yên wê gavê nîn e." Edmonds ji aliyê din ve, dinivîse ku wî ji ramana Layard a heştê û pênc sal berê îlham stendiye: "Ev herêma ku di navbera rojhilat û rojava de cih digire, xwedî pozîsyoneke bêemsal û kaniyên sirûştî yên zengîn in. Çemên wê yên mezin ku ragihanî û çûnûhatin dikare li ser wan bê kirin, Deryaya Spî bi Kendava Besrayê û Okyanûsa Hindê ve girêdide. Helbet cihekî wiha, ew ê di nav demê de bigihîje îhtişam û hêza xwe ya di dema Babîliyan, Asûriyan, Împaratoriya Persan û xelîfeyan de; lê ji bo vê jî hewcedarî bi guherîneke mezin û demê heye, da ku ew birînên ji ber perçiqandin, zilm û ew qas talan û îdarekirina xerab û îhmalkariyê çêbûne, karibin bêne girtin. Ez difikirim ku guherîneke wiha ku wê alîkariya wê li aştî û bazirganiyê, wel hasil li medeniyetê bibe, dikare bi destê Îngiltereyê pêk were û rûmeta vê yekê jî ew ê bibe nesîbê Îngiltereyê."[148] Lê mixabin tiştên dihatin kirin û yên dihatin xeyalkirin, qet li hev nedikir. Bi vî awayî, li ser navê medeniyetê barandina bombeyan a li ser serê mirovên bêparastin ku mafê wan ê herî sirûştî jî ji wan hatiye stendin, wê nikaribûna xwe bigihandina bilindahiya rûmeta van xakên pîroz.

Em li dawiya 1922'yan vegerin. Rayedarên siyasî yên Ingilîz dîbinin ku xetereya windakirina Mûsilê her roja diçe zêdetir dibe. Ji bo wilayeta Mûsilê bi destê Tirkan ve bernedin, mecbûr diminin ku daxwazên alîgirên Şêx Mehmûd qebûl bikin. Ji aliyekî ve ji bo reaksiyona di nav Kurdan de hinekî

---

[147] M. S. Lazarev, bnb, r. 197
[148] C. J. Edmonds, bnb, r. 518-519



*Kurdên Başûr li ber ala xwe-11 Temûz 1922*[149]

kêm bikin, ji aliyê din ve ji bo karibin daxwazên xwe bi arîstokratên Ereban bidin qebûlkirin, ku ew ê di 10 ê Kewçêra 1922'yan de bi wan re peyman îmze bikirina, biryarê didin ku Şêx Mehmûd ji Hindistanê bînin.

Şêx Mehmûd pêşiyê tînin Kuweytê, paşê jî di nîvê meha Rezbera 1922'yan de dişînin Bexdayê. Gelek serekên eşîran di rêwîtiya Şêx Mehmûd a Kurdistanê de pê re ne. Şêx Mehmûd, dema di 30'ê Rezberê de digihîje Silêmaniyê, wek qralan, bi kêf û coşeke mezin tê pêşwazîkirin. Nuh digihîje welatê xwe, xwe bi temamî dide doza xwe û di destpêka Kewçêrê de jî xwe wek hikumdarê Kurdistanê îlan dike. Di Sermawezê de jî, îcar wek qralê Kurdistanê deng belav kir. Paytext Silêmanî bû. Çapemeniya herêmî nivîsand ku wê Noel (tevî Şêx Mehmûd hatibû), ku wek efserê pêwendiyê tevdigeriya, mîna konsolosekî wezîfe bike û di dema danûstendinan de, bi komîserê bilind re jî wê navbeynkariyê bike. Di bin serokatiya birayê Şêx Mehmûd, Şêx Qadir de (ew jî bûbû serekfermandar) Hikûmeta Kurdistanê hatibû damezirandin. Bi belavoka ku di 10'ê Kewçêrê de li 'Paytexta Kurdistanê Silêmaniyê' hatibû belavkirin, hat ragihandin ku 'Hikûmeta Kurdistanê' ya xwedî heşt endamî ava bûye.[150]*

Têkiliyên dîplomatîk ên li Ewrûpayê jî qet nesekinîne. Di Konferansa

[149] Susan Meiselas, bnb.

[150] M. S. Lazarev, bnb, r. 200-204

* Her çiqas ev rewş nedomdar be jî ev têkoşîn û bidestxistinên vê demê bû bingeh ji berxwedanên dûre re û mirov kare bêje bandor li hebûna 'Dewleta Kurdistana Başûr a îro jî kiriye.

Lozanê de, ya ku di 20'ê Sermaweza 1922'yan de dest pê kiribû, Îsmet Paşa serokatiya delegasyona Tirkan dikir. Di xala 2'yan a dîrektîfa giştî ya ku didan heyetê de, sînorê Iraqê wiha tê diyarkirin:

2- Sînorê Iraqê: Ew ê senceqên Silêmanî, Kerkûk û Mûsilê bên xwestin. Di konferansê de, ku ji vê cudatir rewşin derkevin holê, wê ferman ji heyeta wekîlan bê stendin.

Der barê pirsgirêka îmtiyaza petrolê û mijarên din de, li ser temînkirina hin berjewendiyên aborî yên ji bo Ingilîzan, gotûbêj dikarin bên kirin.[151]

Kurdan, ji ber aloziya piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn alîkariya Îngiltereyê qebûl kiribûn, lê ji ber bûyerên ku di van çar salan de qevimîbûn nema baweriya wan bi Ingilîzan dihat. Ingilîz jî di vê demê de têra xwe li Iraqê bi cih bûbûn û ji ber ku Kurdan tawîz nedida wan, li dijî têkoşîna Kurdan nêrîna wan a neyînî zêde bûbû. Tirkiyeyê jî bi gelek dewletan re peyman çêkiribû û xwe dabû qebûlkirin. Tu taqeta wê ya ku xwe bida ber şerekî mezin jî tune bû. Îcar wê polîtîka û pratîkên ku hêdî hêdî xwe ji mijarên der barê serbixwebûna Kurdistanê yan jî otonomiya wê bi dûr bixin bihata dîtin. Di dema gotûbêj û hevdîtinên Lozanê de, kêşeya Kurd, meseleyeke navxweyî ya dewletên ku Kurd lê dijîn e û nîqaş li ser statuya hindikahiyan a Kurdan hene.

Di nav nîqaşên rûniştina roja 25'ê Berfanbara 1922'yan a Meclîsa Mezin a Milet de jî meseleya hindikahiyan heye:

Huseyîn Raûf Beg (Sêwaz): Gelî efendiyan wek hûn dizanin, hemû teşebûsên Ingilîzan ku wan dixwest Tirk û Kurdên li Tirkiyeyê rûdinên tune bikin, li ber yekîtiya van her du neteweyên esîl, îflas kiriye. Her cure tevliheviyên wan li hemberî van mirovan, ku ew birayên hev ên dîn in, xwînbirakên hev in û birayên hev ên hêviyê ne, têk çûne. Armanca wan a ku herî zêde wan dixwest têk bibin, a ev nuqte ye... Delegeyên me, nexwestine ku careke din balê bikişînin ser vê mijarê, ji ber ku qedera wan bi xelkê Tirkiyeyê re yek e. Ev nakevin statuya hindikahiyan; îro ji bo Kurdan wek hindikahî bê behskirin, wekî ku mirov behsa hindikahîbûna Tirkan bike. Ji ber wilo ve ev bi temamî red bûye (dengên spas ...)"[152]

Li Başûrê Kurdistanê jî li dijî nêrînên mafên hindikahiyan ên der barê Kurdan de ku li Lozanê dibûn dabaşa mijarê, reaksiyon hene. Di nivîsên rojnameya herêmî ya bi navê Rojî Kurdistan de, yên di Sermaweza 1922'yan de, mirov bi rihetî kare mebestên tevgera Kurdî, dilsoziya bi Şêx Mehmûd re û rexnegirtina li nêrînên der barê Kurdan de yên hevdîtinên aşitiyê yên Lozanê

[151] Hasan Yıldız, bnb, r. 150
[152] Hasan Yıldız, bnb, r. 152

bibîne:

"Ev rojname (rojnameyeke ku li Bexdayê bi Erebî tê weşandin) Kurdistan wek lîwaya Silêmaniyê bi nav dike û dibêje ku parçeyek ji Iraqê ye; li gorî wan sebeba vê, ji ber ku bi awayekî nêzik bi Bexdayê re têkiliyên vir ên bazirganî û aborî hene. Hikûmeta Kurdistanê jî wek 'Konseya Îdareyê ya Wilayetê' bi nav dike. Ev îfade bi tevahî dil dişewitînin. Aqil tu car qebûl nake ku mirovekî ronakbûyî ev çend neheq û xelet be. Me qet hêvî nedikir ku cîranê me yê mezin û dost, mafê me yê hezar salî, têkiliyên dostane yên di navbera hikûmetên her du welatan û her du gelan de binpê bike yan jî sînorên me îhlal bike. Ji Iraqê re, bi hezaran feydayên damezirandina Hikûmeta Kurdistanê hene; li aliyê din berdewambûna hebûna Iraqê ancex bi berdewamiya Hikûmeta Kurdistanê mimkun e... Dîrok û cografya wê bi delîlên bi xwe re şahid in ku her tim li dinyayê nasnameyeke gelê Kurd hebûye û her tim wesfê xwe yê neteweyî parastine. Ev gel ji aliyê perwerde, hunerên destkariyê, bazirganî, mafên mirovan, medeniyet, xak, nifûs û hwd. ve ji yên wek xwe li paş nemane, heta ji wan pêşdetir jî dibin. Hiqûq û mafê diyarkirina qedera xwe, di serî û ruhê her ferdê neteweyê de bi awayekî xurt cih girtine. Di nîmetê maf û sînoran de, ku ji aliyê Cemiyeta Miletan ve dest bi belavkirina wan hatiye kirin, para me jî heye. Ji bo parastina vê parê, em madî û manewî hemû cure fedekariyên ku hewce bikin, didin ber çavan... Em bi hemû jixwerazîbûna xwe, radigihînin ku em gelekî paqij û bêtirs in. Em ne kole, em azad in... Hemd ji Xwedê re ku şeva me bû roj û... rêveber û pêşewayekî wek Qralê Kurdistanê Mehmûdê 1'em mîna Mesîhê ku wê ji nû ve were ser rûyê erdê, ji bo me ji nû ve çêbû... Mebesta pîroz a Qralê Kurdistanê ew e ku sînorên sirûştî yên Kurdistanê û mafên wê biparêze û bi cîranên me re wek bira têkiliyên baş deyne.

Kurdistan. Gava yekî zane vê peyvê bi lêv dike, ne tenê herêma Silêmaniyeyê, qesta cografiyeke hîn firehtir dike û gelê Kurd ê yekbûyî, yê pir tîne bîra xwe. Sînorên sirûştî yên vî welatî kifş in. Digel ku nifûsa Mûsilê ji Kurdan pêk tê jî, çima mirovên ji derve, bi paş ve stendina vê wilayetê yan jî behsa bidestxistina wê dikin? Tirk, Ereb û Suryanî daxwazên xwe yên der barê vê yekê de, dispêrên hebûna mirovên xwe yên ku hejmara wan hindik e.... Hêviya me ji Konferansa Lozanê, ne bi awayê parastina hindikahiyê, teyîdkirina mafê jiyana li ser axa welatê xwe yê xelkekî mezin ê serbixwe ye."[153]

Di serdema Osmaniyan de jî, ji ber ku ji salên 1800'î ve herêmên Silêmaniye, Amediye û Botan li hemberî navendê di nav serhildanan de bûn,

[153] C. J. Edmonds, bnb, r. 398

ruhên têkoşînê yê Kurdên Başûr pêşketî ye. Her wiha hinekî dûrbûna wan ji Stenbolê jî kiriye ku hîn bêhtir azad bifikirin. Esas, Kurdên li her derê, di nav hewldanê de ne û pir baş dizanin bê çi dixwazin. Hêz û dewletên ku dora Kurdan girtine jî. Îsmet Înonu jî di 23'yê Çileya 1923'yan de, di gotûbêjên Lozanê de, wiha behsa Kurdan û xwestekên wan dike:

"Mafên ku mafên hemwelatîtiyê û qabiliyetê wan negire nav xwe û mafên ku tê gotin qaşo wê ji bo hêrêma otonom bên naskirin, tu carî wê têra nîjadeke esîl ê mîna nîjada Kurd neke.

Ev fikarên ku bi qasî Kurdên Mûsilê, ji bo Kurdên li Anatoliyayê yên li deverên din jî derbas dibin diyar dike, bê çima ev serê çar salan e ew otonomiya derewîn a ku dane rûniştvanên li beşa rojhilata wilayeta Mûsilê ew qayil nekirine û çima bi wan nedane qebûlkirin ku bibine wek wan însanên ku bi rastî ketine bin îdareya mêtingehiyê de."

Li Lozanê nîqaşa li ser Mûsil û Kurdan her diçe sortir dibe, ji aliyekî ve jî hikûmetên Ingilîz û Enqereyê di nav hewldanên ku bêjin va ye em bêhtir mafan didin Kurdan de ne. Di dawiya meha Berfanbara 1922'yan de, ji Bexdayê ev agahî li Başûrê Kurdistanê tê belavkirin:

"Hikûmeta Brîtanyayê û Hikûmeta Iraqê, di nav sînorên Iraqê de heqê avakirina Hikûmeta Kurdan a ji aliyê Kurdên ku li nav tixûbên Iraqê dijîn qebûl dike û divê ku bendên Kurd ên cuda cuda di demeke gelekî kurt de, di nav xwe de li hev bên da ku biryar bidin ew ê şeklê hikûmetê çawan be û sînorên wê kîjan deveran bigire nav xwe û li hêviyê ne ku ew heyeta wan a rayedarkirî bişînin Bexdayê da ku li ser têkiliyên aborî û siyasî yên ku wê bi hikûmeta Majeste re û bi hikûmeta Iraqê re bên danîn, gotûbêjan bikin."[154]

Di destpêka meha Çile de Şêx Mehmûd alaya Kurdistanê li Ranyayê daleqandiye... Di 8'ê Çileya 1923'yan de Simko Axa bi serbilindayî dikeve Silêmaniyê. Gava ku Smeîl Axa (Simko Axa) dikeve Silêmaniyê esker jê re merasîma fermî çêdikin, heft pare top tê avêtin, betlaneya ji bo rojekê tê îlankirin.[155] Rutbeyên qraltiyê didênê, unîforma li xwe dike. Rojnameyên herêmî Simko Axa wek "dilsoz û parêzvanê Kurdistanê" bi nav dike.[156]

Di hevdîtinên ku li Sîlêmaniyê di navbera Simko Axa û Şêx Mehmûd de pêk tên, yekbûna her du tevgeran û daxwazên hevpar tên rojevê. Dûre di bin serokatiya Simko Axa de desteya pêşewayên Kurd, li Hewlêr û Silêmaniyê bi efserên siyasî yên Birîtanyayê re hevdîtinan pêk tînin û biryar didin ku di

[154] C. J. Edmonds, bnb, r. 412
[155] C. J. Edmonds, bnb, r. 412
[156] M. S. Lazarev, bnb, r. 209

sînorê Tirkiyê û Îranê de dewleteke Kurd a ji aliyê Brîtanyayê ve destekkirî, bê avakirin. Di van civînan de Seyîd Taha jî heye. Jixwe di havîna 1922'yan de Noel ku ew wê çaxê li herêma Urmiyeyê bû, ji bo têkiliyê bi Seyîd Taha re deyne hatibû wezîfedarkirin. Seyîd Taha jî dema meha Kewçêrê diçe herêma Hewlêrê, ji Ingilîzan dixwaze ku rêvebirina Rewandûz, Aqre û Amediyê bidine wî.

Di vê serdemê de, di nav Kurdan de, nêzikbûna bi aliyê hebûna navendeke tenê tune ye. Kurdistan bi çend herêma xwedî hêzên cuda ye. Kurdên ku serwerê herêmekê bûn, rêz ji yên herêmên din re girtine. Li her herêmê, hin navên diyar ên ku bi qehremaniya xwe, bi pêşengî û pêşewatiya xwe derketine pêş hene. Van kesan, çendî carinan di nav xwe de li hev nekiribin jî, pirî caran bi hev re tevgeriyane. Ez bi xwe di çavkaniyan de lê rast nehatime ku van pêşengan şer bi hev re kirine, yan yekî yê din kuştiye, yan jî ji bo ku bikeve cihê yê din, li kuştina wî geriyaye. Ku em hema piçekî li vê bifikirin û lêbikolin, em ê bibînin ku her pêşewa rêz ji hemû pêşewayên cihkî re girtiye. Jixwe, di hevdîtinan de yên ku bi Osmaniyan re jî û bi Ingilîzan re jî hatine kirin, ligel ku her kes li war û qadên xwe biminin, wan biyekbûna di bin banekê de qebûl kiriye. Çendî caran her pêşewa diyar kiriye ku ew dikarin berpirsyariyê bigirin ser xwe, dikarin hêzan ber bi hev de bînin û wezîfeya organîzekirina Kurdistanê jî bigirin ser xwe. Her yek ji wan jî xwedî wê hêz û bingehê bû. Wek bedirxaniyan, Seyîd Abdulqadir, Şêx Mehmûd, Simko Axa, Seyîd Taha û hwd....

Hebûna hêzên cuda yên herêmkî yên Kurdan û tunebûna girêdana xelkê ya bi navendekê pirî caran wek sebeba têkçûna Kurd û Kurdistanê tê nîşandan. Lê ev berovajîkirina rastiyê ye û biçûkxistina Kurdan bi riyeke din e. Tê zanîn ku îro jî li Dinyayê ji bo otonomiya cihkî gelek hewldan hene. Li hêla din em dibînin ku li welatên herî serkeftî bi xwe jî gelek eyalet hene û her yek ji wan otonom e. Êdî gumana kesî tune ku tevgerandina dînamîkên cihkî, encamên serkeftî bi xwe re tîne. Ji qeyd û tomaran em fehm dikin ku Mustefa Kemal jî girîngî daye dînamîkên cihkî. Lê dûre ka bê çi dibe -ku hîn jî li ser sebebên wê nîqaş hene-, ev helwest hatiye terikandin.

Yanî hin kes sebeba neavakirina Kurdistanê bi hewldanên pêşewayên Kurdan ve û bi şeklê tevgera Kurdan ve girê dan û hîn jî ev tên îfadekirin. Ev ne rast e. Erê hin kêmanî û xeletî hene, lê di sebeba têkçûnê de hin rewşên din jî yên xwedî bandorên bingehîn hene. Berî hemû tiştî sed salî bi Kurdan re şer hatibû kirin û mîrekiyên wan ji holê hatibûn rakirin; bi vî awayî qels ketibûn. Saziyên wan ên serbixwe tune bûn û gelek jê di nav saziyên dewleta

ku heye de bûn. Her yek ji van sebebek xwedî bandora neyênî ne. Lê esas a ku Kurdistan perçe kiriye çavberdana dewletên mêzin a dewlemendiya wê ye, rewşa wê ya stratejîk e. Ma qey mezinên Kurdan wek ên Ereban, xelkê Kurd wek Ereban nedihatin. Lê Ereban gelek dewlet ava kirin û Kurd nebûn xwedî dewletekê jî. Wek ku me li jor got, erdên Ereban dûrî navenda Osmaniyan Stenbolê ne, Kurd di nav saziyên Osmaniyan de xwedî cihên girîng in, têkiliya Ereban bi biyaniyan re ne wek a Kurdan e; ev hemû rewşên cuda ne. Bi kinayî, dema mirov mijarê binirxîne divê mirov berfireh bifikire û ilmî rahêje meselê. Li vir tenê em li ser hin bûyeran disekinin. Vegotinên ji niha û pêde jî wê hebekî din karibin mijarê rave bikin. Lê bi berfirehî rahiştina van mijaran gelekî pêwîst e.

Di wan rojên ku Kurdan li Başûr gavên girîng davêtin karbidestên Îranî, ji ber tevgerên li Başûrê Kurdistanê ya di bin serweriya Ingilîzan de bû, Îngiltere protesto dikirin. Di Sibata 1923'yan de, di navbera Îran û rayedarên Ingilîzan de hevdîtin pêk tê. Di hevdîtinên di navbera balyozê Ingilîz Loraine û serokwezîrê Îran de herî zêde meseleya Kurd tê axaftin. Qasidê Ingilîzan ji bo ku Tehranê dilrihet bike vê bersivê dide: 'Em dizanin hûn nema dixwazin Tirkan li Mûsilê bibînin. Dema em li bakurê Iraqê têkoşîna ku Tirk pêşve neçin dimeşînin esas em berjewendiyên Îranê jî diparêzin. Ji ber wilo ve ji bedêla ku hûn gazinan ji hewldanên Şex Taha û Simko Axa bikin û astengiyan ji me re derxin  gerek we alîkarî bi me re bikira.'[157] Di encamê de li ser van mijaran li hev kiribûn: Îran, ji bo Mûsil negihê Tirkiyeyê wê destekê bide Ingilîzan, ew ê jî ji Simko Axa û Seyîd Taha re bibin asteng da ku ew têkilî Kurdên Îranê nebin û di nav wan de xebatan nekin. Wek ku di vegotinên berê de jî xuya dibe lîstik bi gelek lewnan tên lîstin. Bi vî şeklê ku hin mafên biçûk bidine Kurdên başûr Ingilîz wê tevbigerin, ên wek Simko Axa û Şêx Mehmûd der barê serxwebûna Kurdistanê de wê tawîzê nedin û wê dîsa li hev nekin.

Hikûmeta Enqereyê ji bo ku teşebûsên Ingilîzan ên li Başûrê Kurdistanê vala derxinin, hewldaneke mezin dide nîşandan û ji bo ku Kurdên di nav sînorên xwe de qayil bike jî dîsa gotinên 'Kurdistana Otonom' tîne holê.

Di 16/17 ê meha Çileya 1923'yan de li Îzmîtê, sernivîskarê Rojnameya 'Vakît' Ahmet Emîn Beg pirsa 'Pirsgirêka Kurdîtiyê çi ye? Heger hûn wek pirsgirêkeke navxweyî behs bikin dê baş be' ji Mustefa Kemal dike; ew jî pirsê wiha dibersivîne:

"Pirsgirêka Kurd; ji bo berjewendiya me, yanî ji bo ya Tirkan jî qet nabe

[157] Doç. Dr. Gökhan Çetinsaya, Milli Mücadele'den Cumhuriyet'e Türk-İran İlişkileri 1919-1925, Atatürk Araştırma Merkezi Dergisi, Sayı 48, Cilt: XVI, Kasım 2000

dabaşa mijarê. Ji lew re, wek ku hûn jî dizanin, Kurd ên ku di nav sînorê me yê neteweyî de hene, wisan bi cih bûne ku li kêm cihan zêde ne. Lê, ji ber ku ev zêdebûna xwe jî hêdî hêdî winda kirine û hingî ketina nav Tirkan, sînorekî wisan çêbûye ku heger em li ser navê Kurdîtiyê bixwazin sînorekî bikişînin wê gavê hewce dike ku em Tirkîtiyê û Tirkiyeyê mehf bikin. Mesela, divê ku em li sînorekî wisan bigerin ku heta Erziromê diçe, heta Erzinganê, Sêwazê diçe, heta Xarpêtê diçe. Û heta divê ku em eşîrên Kurd ên li çolên Qonyayê jî bînin ber çavên xwe. Lewma jî, li şûna ku em Kurdbûneke bi serê xwe bifikirin, li gorî pêwîstiya qanûna Teşkîlata Esasî, jixwe ew ê cureyek otonomiyên cihkî çêbibe. Bi wî awayî gelê kîjan lîwayê Kurd be, îcar ew ê xwe bi xwe wek otonom îdare bike. Ji bilî vê, gava ku ji gelê Tirkiyeyê bê behskirin, hewce ye ku tevî wan bên îfadekirin. Dema ew neyên behskirin, her tim mimkûn e ku ji vê yekê ji bo xwe pirsgirêkan çêkin. Niha Meclîsa Mezin a Miletê ya Tirkiyeyê hem ji wekîlên Kurdan hem jî ji yên Tirkan pêk hatiye û van her du gelan hemû berjewendiyên xwe û qederên xwe kirine yek. Yanî ew dizanin ku ev tiştekî bişirîkatî ye. Mirov rabe xetên sînorekî cihê bikişîne wê ne rast be."[158]

Tirkiye ji aliyê leşkerî ve jî bi ser meselê de dere. Ji rojên ewil ve li Başûr raperîn nerawestiyabû û gelek ji serbaz û eskerên Ingilîzan hatibûn kuştin. Ew rewşa Ingilîzan a nexweş hêvî dida hêzên Tirkiyeyê. İngiliz jî di nav heman hewldanan de ne. Wek ku li jor me da xuyakirin di belavoka ku ji aliyê Ingilîzan ve li Başûr hat belavkirin de dihat xwestin ku Kurd xwe bi ser hevdin. Şêx Mehmûd, Simko Axa û Seyid Taha di nav de gelek mezinên Kurdan li başûr civiyabûn û bi têkiliya bi Ingilîzan re dikirin ku hin gavên girîng biavêjin. Vê, tirseke mezin daye Tirkiyeyê û kêlî bi kêlî li dijî vê yekê tevger zêde kirine.

Di Çileya 1923'yan de, yekîneyên Tirkiyeyê ji bo ku êrîşî ser Başûr bikin, li Cizîrê li hev kom dibin. Di nav gel de propaganda tê kirin ku ew ê Mûsil careke din tevî nav axa Tirkiyeyê bibe. Li gorî Edmonds, du efserên Tirk ji Rewandûzê tên Silêmaniyê ziyareta Şêx Mehmûd. Di destpêka meha Sibatê de, xezûrê Şêx Mehmûd, Fetah Beg ku di artêşa Tirk de sitvan (yuzbaşî) e, bi waedên destekê ji Enqereyê hatiye. Di vê navê de hin hêzên leşkerî yên Tirkiyeyê û hêzên Kurdan li Başûrê Kurdistanê bêhtir belav dibin û beşa rojhilata bakur a Kurdistana Iraqê bi dest dixin.

Li gorî Lazarev, Şêx Mehmûd têkiliyên xwe bi rêxistina saloxgeriyê ya Tirk a li Iraqê û serokê wê Ozdemîr re xurt kiriye. Lazarev dibêje, Şêx

[158] İsmail Göldaş, Takrir-i Sükun Görüşmeleri, r. 42

Mehmûd ne ji bo bibe alîkar da ku hukimraniya Tirkan li Başûrê Kurdistanê çêbibe ev yek kiriye, ev taktîk e da ku çavên Ingilîzan bitirsîne û zorê bide wan ku ew ber bi lihevkirinê ve bên. Her wiha dadixuyîne ku, mebesta nêzikbûyîna aliyê Tirkan a li Başûrê Kurdistanê jî ne ji bo serbixwebûna Başûrê Kurdistanê ye, armanca wan ew bû ku wê tevî Tirkiyeyê bikin.[159]

Tirkiye di hevdîtinên Lozanê de jî wek ku berxwedanek mezin nîşan dide tê xuyakirin. Roja 23'yê Çileya 1923'yan, di dema gotûbêjên li ser Mûsilê de, yên di navbera heyetên Ingilîz û Tirkan de Lord Curzon behsa serhildanên Kurdan dike û diyar dike ku Kurd ji îdareya Tirkan ne memnûn in. Li hemberî vê yekê Îsmet Paşa hewce dîtiye ku bibêje "Bi qasî ku Hikûmeta Meclîsa Mezin a Milet ya Tirkan e, ya Kurdan e jî, Ingilîz hîn neketine Silêmaniyê, gelê Kurd û Ingilîz jî tim bi hev re şer dikin, fermandarên artêşa Tirk ên ku ketine Şerê Cîhanê û Şerê Serbixwebûnê, xizmetên gelê Kurd ên ku ji bo rizgariya welêt û fedekariyên ku nîşan dane bi rêz û heyranî pêşwazî dikin." û dadixuyîne ku, di van şeran de "Kurd û Tirk di nav hevkariyeke tam de bi hev re xebitîne."[160]

Ji ber ku yê li Kurdistanê tevdî bibe xwedî gotin wê karibe bibe xwediyê herêmê hemûyî û geleki bi hêz bibe, dewletên li herêmê xwedî hêz, di miqabilî vê de li ser piya mane. Yanî wek ku di vegotinên berê de jî derbas bûbû, dema Kurdistan ji destê yekî ji wan here rewşa wan a di herêmê de dikeve xetereyê. Ji ber van hewldanan ji bo bidestxistina Kurdistanê tevdî, şerê bi hemû hêzên li herêmê bi xwe re dianî. Kurd jî bi serê xwe ne xwedî hêza ku karibin li hemberî van hemûyan derkevin; ew mecbûr in xwe bi aliyekî ve bigirin. Dilê gelek Kurdan bi ser Tirkiyeyê ve ye, lê Tirkiye wê vî şerî nikaribe bide ber çavê xwe. Îngiltere di 1922'yan de ji aliyê aborî ve di qirîzê de ye. Rewşa Îranê jî li holê ye. Yanî tu yek ji wan ne xwedî wê hêzê ye ku karibe bi mudaxeleyeke leşkerî bi hêzên din tevde re şer bike. Lewma her yek ji wan ji bo parçeyê ku di destê wan de bû winda nekin têdikoşiyan. Di nav van tirsan de, îcar wê her cure dek û dolab jî bên gerandin. Ne Kurdistana yekbûyî, mafên Kurdan ên li parçeyan jî wê têkeve talûkeyê. Her kes ji bo Kurdên li nav parçeyên xwe haş bike, wekî ku tiştinan dikin dixuyên û her wiha vê yekê jî li dijî aliyê din bi kar tînin. Lê di heman demê de ji bo Kurd xurt nebin -ku vê talûkeya karibin dest bavêjin parçeyên din jî bi xwe re dianî- di nav hewldana de bûn.

Ji xwe berê rêxistinên Kurdan ên li Stenbolê û gelek rêveberên wan

[159] M. S. Lazarev, bnb, r. 203
[160] Hasan Yıldız, bnb, r. 169

hatibûn girtin. Piştî ku kontrola Stenbol û Trakyaya rojhilat ketiye destê hikûmeta Enqereyê, gelek asîlzadeyên Kurd mecbûr mane Stenbol terk kirine. Koçkirina vê hêza mêjî, dihat wateya qutkirina têkiliya têkoşîna Kurdan a ji gelek girêdanan. Li aliyê din, hêzên derveyî ku xwedî jêrxaneyê bûn, her ku çûbû li herêmê hîn bêhtir xurt bûbûn û şaxên xwe berdabûn; bi vî awayî çembera li dora Kurdan her çûbû tengtir bûbû.

Di dema gotûbêj û hevdîtinên Lozanê de jî mebûsên Kurd li ser navê neteweya xwe temsîlkar neşandibûn. Di gotûbêjên ku qedera wan dihat diyarkirin de, Kurd li ser navê xwe wek çavdêr jî beşdar nebûbûn. Di heyeta Meclîsa Enqereyê de hin Kurd hebûn lê ne li ser navê netewa xwe, li ser navê Meclîsa Enqereyê li wir in. Hatiye daxuyakirin ku heyeta Meclîsa Enqereê, Kurd û Tirkan temsîl dike. Îsmet Înonu serokê delegasyonê bû, li wê derê çendî ew Kurd bû û her tim wekheviya Kurd û Tirkan anîbe ziman jî ew ne wek temsîlê Kurdan bû. Bihevrebûna Kurd û Tirkan, ku gelek caran di gotin û axaftinan de dihat diyarkirin, wek fermî di tu qeydên peymanan de tune bû. Paşê jî li ser vê zemîna şemetok wê her kesî şîroveyên cuda bikira û wê rastî jî bihatina berovajîkirin.

Di hevdîtinên li Lozanê de roja 4'ê Sibata 1923'yan biryar hat dayîn ku kêşeya Mûsilê ji bernameya Konferansa Aşitiyê ya Lozanê bê derxistin û ji bo ku her du alî di nav xwe de li ser vê meseleyê li hev bikin dem hat dayîn. Ev ji bo Tirkiyeyê gava fermî ya ber bi windakirina Musilê de bû. Ji ber ku dihat zanîn, xistina bi paş de ya kêşeya Mûsilê wê li Meclîsê bibe sedema nerazîbûnan, Mustefa Kemal xwest ku vê rewşê zû bi zû negihînin meclîsê.

Piştî ne bi gelekî rayedarên Ingilîz li Bexdayê li hev dicivin û biryara ku hikûmeta Şêx Mehmûd belav bikin distînin; ji bo pêkanîna vê yekê jî planan çêdikin. Ji bo Şêx Mehmûd Silêmaniyê biterikîne jê re telgrafê dişînin. Şêx Mehmûd şaş dibe, fêm nake bê ji nişkê ve ev ji ku derket, dimîne ecêbmayî. Diçe buroya telgrafan û ji efserê siyasî dixwaze sebeba vê rewşê bê fêmkirin. Gelek telgraf derin û tên lê tu bersiveke zelal nayê stendin. Em jî bersiva gelek hewldanan zelal nizanin; ji ber ku wê demê gelek tevlihevî heye û ji bilî têkiliyên ber çavan miheqeq hin biryarên ku bi dizî hatine stendin jî hene. Tiştên ku tên xuyakirin, Ingilîz dîsa dest bi bombebaranên li ser Kurdan dikin.

Di 22'yê Sibata 1923'yan de yekîneyên Hindistanê tînin herêmê û fîloyeke mezin a ji 20 balafiran li esmanên Kerkûkê xuya dike. Di 24'ê Sibatê de beyan dikin ku dewleta Şêx Mehmûd nas nakin. Silêmanî careke din bi bombekirina Hêzên Hewayî yên Qraliyetê re rû bi rû dimîne. Mufrezeyeke

yekîneya civandî ya Asûriyan jî, ku hêzên Iraqê wê teqwiye dikin li nav sefên Ingilîzan e.*

Di vê deme de li Meclîsa Enqerêyê tevlihevî heye. Axilbe dema tê ragihandin ku pozîsyona Mûsilê li Lozanê ketiye rewşeke nediyar, di Meclîsê de gelek nîqaş tên kirin. Ligel ku mebûsên Kurd ên li Meclîsê vê qerarê bi tundî red dikin jî, der barê vê yekê de biryarekê bi meclîsê nikarin bidin stendin. Ji bûyerên piştî ku li Mûsilê xwedî derkevin û pê de biqewimin ditirsin.

Di rûniştina veşarî ya Meclîsê de, ya bi mêjûya 27 Sibat 1923'yan ku li ser meseleya Mûsilê gotûbêj di rewşeke bihararet û hêrs de dihatin kirin, Mustefa Kemal ev digotin: "Taloqkirina çareserkirina meseleya Mûsilê ya ji bo piştî salekê da ku em nekevin şer, nayê wê wateya ku me dev jê berdaye. Belkî ji bo ku em wê bi dest bixin, pêdiviya me bi zemanekî ku em xurt bin, heye. Em ê îro aşitiyê çêkin. Mehek bi şûn de, du meh bi şûn de, ji bo ku em kêşeya Mûsilê çareser bikin îcar em ê serî hildin. Gava em bixwazin îro em rabin meseleya Mûsilê hal bikin, ne tenê Ingilîz; li dijî we Frensî, Îtalyanî û Japon jî hene. Lê salek şûnde, em ê tenê bi Ingilîzan re rû bi rû bimînin. Heger em bixwazin em dikarin îro jî Mûsilê bistînin. Lê îcar em ê bikin ku li wir jî cepheyeke şer vebe."[161]

Li Başûr jî rewş gelekî nexweş e. Di 4'ê Adarê de Şêx Mehmûd mecbûr dimîne ku derkeve dervî Silêmaniyê. Pêşewayên ku tevger destek dikirin tên girtin, hin ji wan jî direvin ber bi Bakur ve. Teşebusên wan ên dûre jî, dîsan ji aliyê Hêzên Hewayî ve tên perçiqandin. Di vê navê de aliyê Ingilîz plana bidestxistina tevahiya herêmê dike û ji bo herekata mezin hemû amadehiyên xwe dike. Êrîşên hewayî jî bêsekin didomin...

Di nîveka dudiyan a Nîsanê de Kerkûk, Rewandûz û Koy dikevin destê Ingilîzan, mintiqeya Jasana cihê ku Şêx Mehmûd lê ye jî tim di bin êrîşên hewayî de dimîne. Di 8'ê Gulanê de, ji bo ji nû ve dagirkirina Silêmaniyê, teşebûs tên destpêkirin. Di dawiya meha Gulanê de Silêmaniye dikeve destê Ingilîzan û Şêx Mehmûd jî ber bi sînorê Îranê ve vedikişe.

Li hêla din tevlihevî û nîqaş li Bakur dom dikin. Li ser Mûsilê gelek êş tên kişandin, lê tiştekî bi dest naxin. Îcar wê hin cudahiyên der barê terîf û nêziktêdanên Peymana Milî (Misaqê Milî) de jî bên dîtin.

---

* Di bihara sala 1916'an de, Asûriyên ku li deverên çiyayên Hekariyê dijiyan, li ber Osmaniyan serî hildabûn, piştî pevçûnên dijwar wan dest bi revê kiribû û di bin muhafazeya hêzên Ingilîz ên ku li Îranê diman, li Iraqê, li Baqûbayê ku 50 km dikeve bakurê Bexdayê, li kampekê hatibûn bicihkirin. Di navbera salên 1919 û 1923'yan de, bi piranî li başûrê Hekariyê, qismek jî li sînorên bakur ên wilayeta Mûsilê, ku Ingilîzan dixwest li wir serweriya xwe pêk bînin, hatin bicihkirin. Di vê navê de piraniya zilamên gihîştî, di bin emrê efserên Ingilîz de xistin nav Yekîneyên Civandî Yên Iraqê

[161] Dr. Durmuş Yılmaz-Misak-i Milli'ye Göre; Musul, r. 101

Ji mebûsên Kurd ên li Meclîsê Yûsif Ziya Beg dibêje ku, veqetîna Mûsilê tê wateya parçekirina welatê Kurdan û divê ku ew bi birayên xwe re yên li Bakur bibin yek. Di 6 ê Adara 1923'yan de dibêje ku "...Kursiyeke Mûsilê di dîroka Kurdan de heye. Gelî hevalan, çawan mirov nikare insanekî bike du parçe yan jî parçeyekî wî jê bike, ji Tirkiyeyê veqetîna Mûsilê jî ne mimkun e, hevalino. Terk û li rastê hiştina Mûsilê, pi paş de avêtina ji bo salekê, ji bo şeş mehan, lîstikek pir bixeter e..." û li hemberî zêdebûna talûkeya windakirina Mûsilê îsyan dike.[162]

Kesên ku bi çavekî din li meselê dinêrin jî hene. Li gorî hinekan destnedana Mûsilê û hiştina wê di halê xwe de pirsgirêka vedihewîne. Di gotûbêjên veşarî yên meclîsê yên heman rojê de, mebûsê Erziromê M. Durak Beg axaftinekê dike û balê dikişîne ser ku, heger li Mûsilê dewleteke Kurdî ava bibe wê rewşên çawa derkevin holê.

M. Durak Beg (bi berdewamî):... "Bendeyê we ez, îro di herbê de Çeneqeleyê çiqas girîng dibînim, ez Mûsilê ji ew qas girîng dibînim. Çinku li wê derê Hikûmeta Kurdistanê çêbûye. Efendîno, herêma wê Kurdistanê bi qasî heşt saetan li başûrê Erziromêye. Efendîno, mesele pir girîng e. Heger em a rastî bibêjin, heta niha me li memleket îdareyeke baş ava nekiriye. Xelk ne memnûn in... Tu cihekî me yê ji îdareya me ya memleket yeqîn dike tune ye. Yanî tu temînata wê tune ye. Ji bo vê jî, ez pir rica dikim, vê meseleya Mûsilê wisan wek meseleyeke biçûk zen mekin. Heger meseleya Mûsilê li derdorê belav bibe û li Kurdistanê, çi bi propagandaya Ingilîzan çi jî bi pereyên Ingilîzan gelek tişt bên kirin û li wê derê gelek bingeh bên danîn, wê tu îmkana ku bi rihetî ev bê îmhakirin tune be. A wê gavê jî gelî efendiyan, ez ditirsim û zen dikim ku ew ê li rojhilat jî bûyerên girîng biqewimin..."[163]

Ji bo ku di xelitiyê de rudanîn heye û di heman demê de li herêmê rêveberiyên nuh dihatin avakirin tevlihevî dom dike. Di hevalbendiyê de jî di hundirê rojan de rewşên berovajî hev tên dîtin. Guhertinên hewldanên Îngîltere, Frensa, Sovyet, Tirkiye û Îranê kirine ku hewldanên pêşewayên Kurdan jî bên guhertin. Simko Axa bi sala ji Osmaniyan û dûre jî ji Tirkiyeyê alîkarî dîtiye. Heta hikûmeta Tirkiyeyê demên ewil gava navbera wan û Îran û Îngîltereyê gelekî ne xweş bû, eskerê di nav artêşa xwe de yê kurmanc 'çekên sivîl li wan dikirin, sîleh didan wan' û dişandin alîkariya Simko Axa. Lê wek ku berê di vegotinan de derbas bû, dema ku Îran bi Tirkiyê re ket têkiliyan, piştgirî jê stend û êrîş bir ser Simko Axa, Tirkiyeyê alîkarî bi Îranê re kir, jina Simko Axa kuştin, lawê wî hêsîr girtin. Piştî Simko Axa derbasî başûrê

[162] Hasan Yıldız, bnb, r. 159
[163] Hasan Yıldız, bnb, r. 170

Kurdistanê bû pê de ligel gelek pêşewayên din ên Kurd bi Ingilîzan re têkilî danîn. (Hemû ji sekna Simko Axa ya ku ji serxwebûnê bi paş de gav nediavêt aciz bûn, lê ji bo hin rewşan mecbûr diman pê re diketin nav dan û stendinan.) Dema bi Ingilîzan re li hev nekir û dîsa derbasî axa xwe ya di sînorê Îranê de bû, dîsa bi Kurdên her alîyî re ket nav têkiliyan û piştî demekê dîsan serî hilda.* Di vê demê de gava li hemberî hêzên Îran û Ingilîz zoriya Simko Axa dere (1924), dîsa derbasî aliyê Tirkiyeyê dibe û li wir gundekî li ser navê wî vediqetînin. Di têkiliyê Îranê de jî heman rewş heye. Geh bi Tirkiyeyê re li dijî Ingilîzan, geh bi Ingilîzan re li dijî Tirkiyeyê têkilî bi pêş dixistin.

Wê demê gelek rewşên bi vî rengî hene. Em li vir tenê behsa çend mînakan dikin. Ingilîz jî gelek caran der heqê Kurdan de diketin nav hewldanên ku dijberî hev bûn. Di têkiliyan de ew tevlihevî pevçûna li ser parvekirina Kurdistanê ye û piranî ji ber ku meseleya Mûsilê hîn li rastê ye çêdibe. Wek minak, Îngiltere ji ber helwesta li dijî Şêx Mehmûd, li Lozanê diket tengasiyê. Bi gotinên azadiyê Başûrê Kurdistanê ji Tirkiyeyê hatibû veqetandin, tu aliyên girêdana Mûsilê yên bi Iraqê ve ku bên qebûlkirin tune bûn. Heger îdareya Kurd nebûya, ji bo Ingilîzan li Lozanê parastina Mûsilê zehmet bû. Lê li aliyê din dema di warê heqê Kurdan de hebekî pê de diçûn Tirkiye bi ser de dihat. Ev rewş bi caran tê jiyîn. Ev tenê nêrînek ji aliyekî ve ye...

Heman rewş di Hezîrana 1923'yan de dîsa xuya dike. Dolaba ku bi dehan caran hatiye gerandin, careke din di dewreyê de ye. Tiştê heye her kêlî dem li dijî Kurdan meşiyaye; piştî her êrîşê Kurd hinekî din qels bûne û Ingilîzan jî her roj bêhtir rehên xwe li herêmê berdane erdê. Wexta gotûbêjên Lozanê didomiyan, Ingilîzan ji bo ku li dijî Tirkiyeyê hîn bêhtir karibin parastina xwe bikin, dagirkirina leşkerî ya li ser Silêmaniyê radikin.

Piştî 17'ê Hezîrana 1923'yan Silêmaniye careke din dikeve destê hevaelbendên Şêx Mehmûd. Pir di ser re derbas nabe, Şêx Mehbûd jî tê bajêr. Lê dixebitin ku hukmê Şêx Mehmûd tenê li Silêmaniyeyê derbas bibe û arîstokratên Kurd tayînî yekeyên îdarî yên Kurdistana Iraqê bikin.

Gotûbêjên aşitiyê yên Lozanê di 23'yê Nîsana 1923'yan de careke din dest pê kiribûn. Piştî bazarên ku heft mehan dom kiribûn, di 24'ê Tîrmehê de peyman tê îmzekirin. Di peymanê de kêşeya Mûsilê di cih de hatibû hiştin. Xala 3'yem a peymanê ya der heqê Mûsilê de wiha ye:

"Sînorê di navbera Tirkiye û Iraqê de, ew ê di nav neh mehan de, bi riya lihevkirina dostane ya di navbera Tirkiye û Brîtanyaya Mezin de bê

* Tevgera Kurdan a di bin serokatiya Simko Axa de heta 1930'î dom dike. Dawiyê ji bo hevdîtinên aşitiyê ji aliyê eskeriya Îranê ve tê vexwendin û li Şînoyê 21'ê Hezîrana 1930'î bi xayîntî tê kuştin.

diyarkirin. Di nav dema hatiye behskirin de, heger her du hikûmet li hev nekin, di vê rewşê de îcar ew ê mijarê bibine Konseya Cemiyeta Miletan. Hikûmetên Tirk û Ingilîz, heta der barê mijara sînor de bigihîjin biryarekê, ku qedera qethî ya herêmê girêdayî vê qerarê ye, teahûd dikin ku bi hawê rewşa niha ya herêmê biguherîne ew ê çalakiyeke leşkerî yan jî ya bi cureyê din nekin."[164]

Bi Peymana Lozanê, ku Îsmet Înonu Tirkiye temsîl dikir, Hikûmeta Enqereyê bûye xwedî fermîbûneke navneteweyî. Lê li gel ku hin erdên Kurdan di nav vê dewletê de bûn û di gelek gotûbêjan de heqê Kurdan hatibûn nîqaşkirin jî, mafên Kurdan hatine binpêkirin û di peymanê de qet behsa Kurdan nehatiye kirin. Ku ji serî ve mirov lê binêre, bi biryarên ku li London û Parîsê hatin stendin pêşiyê hinekî be jî Kurdistan hatibû destekkirin, paşê jî bi neheqiyên mezin bi çar parçeyan hatibû parçekirin û hatibû parvekirin. Ev statûyeke wisan bû ku manend û mînaka wê nehatibû dîtin.

Li aliyê din, ji ber ku kêşeya Mûsilê ji gotûbêjên ku wê dûre bên kirin re hatibû hiştin, peymanê berdewamiya tunekirina Kurda bi xwe re tanî. Di vê pozîsyona ku wê bi salan dom kiriba, ji bo ku daxwazên xwe bi wan bidin qebûlkirin, wê Kurd bihatina kuştin û bombe bi ser serê wan de bihatina barandin.

Dema nûnerên Ingilîz û Tirkan li gorî peymanê li Stenbolê li ser Mûsilê gotûbêjan dikin, nûnerê Tirk israr dike ku divê dawî li dagirkirina wilayeta Mûsilê bê û careke din wê li wan vegerînin, lê aliyê Ingilîz jî israr dike ku divê xet pir li jorî bakurê wilayeta Mûsilê derbas bibe.

Li aliyê Tirkan di seriyan de tevliheviyek heye. Di wê serdema ku hestên milî di nav Kurdan de derdiketin pêş de, dan an jî stendina Mûsilê her du jî pirsgirêk bûn. Nîqaşên li ser sedemên ji destberdana Mûsilê heta roja me jî berdewam kiriye. Wek sedema herî diyar û xuya, wisan tê fikirîn ku di dema şerê 8 salan de Tirkiye gelekî westiyaye, xizan bûye û hêza wê ya şerkirinê nemaye. Li gel vê yekê tê nîqaşkirin ku di bin neavêtina gaveke mezin ji bo Mûsilê de hin sedemên din hene. Ramanek jê ew e ku heger Mûsil bi dest bihata xistin wê giraniya nifûsa Kurdan zêdetir bibûya, pê re wê xwestekên wan zêdetir bibûna. Kurdên Başûr jî ji bo serxwebûnê ji şerkirinê re biryardar bûn. Vana hemûyan çavê Tirkan ditirsand. Li hêla din, bi parkirina pastayê re dilê Îngiltereyê jî dihat xweşkirin. Di vê derbarê de gelek ramanên din yên ku tên derpêşkirin hene...

[164] Vladimir F. Minorsky, bnb, r. 34

Helbûkî bizava Mustefa Kemal îhtimala ku Başûrê Kurdistanê tevî nav Tirkiyeyê bike derxistibû holê. Me di hin vegotinên li jorê de jî dîtibû ku, carinan hin gotinên ku ji Bakur tên çawan dibûn sedemên xwedanhev û biserxwehatina Başûr. Ji ber ku destekek ji dil a ji Bakur di nav xelkê de tesîra xwe di cih de dida xuyakirin, îhtimal hebû ku şerê di vê cepheyê de ji gelek cepheyên berê hîn hêsan û rehetir bûya. Lê paşê? Jixwe esas pirsgirêk jî ev bû.

Erê, ji ber ku ev îhtimal xurt bû, Ingilîz di biryarên xwe de zelal nedibûn. Vê îhtîmalê xetereya ku Mûsil ji destê Ingilîzan here xurt dikir û Ingilîz tim di nav vê tirsê de bûn. Ji lewma jî tim bi şik û guman nêzikî tevgerên Kurdan bûn, bi piranî ji bo ku cihê xwe qewîn bikin xebitîn û heta ji wan hat nehiştin Kurd bihêz bibin.

Hasan Yildiz, dide xuyakirin ku pozîsyona Berzencî rê li ber siyasîbûyîna Kurdan û bisazîbûyîna wan vedikir û Faysal û Ingilîz ji vê ditirsiyan. Yildiz, sedema rewşa Başûr û tevgera sist a Hikûmeta Enqereyê jî wiha şîrove dike:

"... Kurdên Başûr wê ji yekîtiyeke ku wan bi awayekî resmî qebûl nedikir re negota 'erê'. Ev jî, dihat wê wateyê ku dikaribû binyata Meclîsa Mezin a Miletê ya Tirkiyeyê xera bibûya. Rewşeke wiha, wê bibûya sedema ku Kurdên Bakur jî biketina bin tesîreke radîkal. Jixwe tim dilê wan bi ser Başûr ve bû. Li aliyê din, cepheyeke ku li Başûr bihata vekirin, wê bikira ku Ingilîz der heqê pirsgirêka Kurdan de gavên berbiçav biavêtina. Ev tehlîkeyeke mezintir bû. Naxwe riya herî baş ew bû ku, ji bo Ingilîz dev ji fikarên Kurdistaneke otonom an jî serbixwe berdin, serî li çi riya heye bidana û wan Mûsil jî wek problemeke ekonomîk daniya ser maseyê. Riya ku ji hêla kemalîstan ve hatiye ceribandin ev e."[165]

Ingilîz jî vê niyeta wan fêm dikin. Di belgeyeke Ingilîz de, ku di 4'ê Kewçêra 1923'yan de hatiye nivîsandin û ji Wekaleta Komîseriya Bilind a Iraqê ji bo Sekreteriya Wezareta Koloniyan re hatiye şandin, di derbarê sînorê Mûsilê de ev hene:

"Li gorî ku ez ji hin çavkaniyan hîn bûme, biryardarbûna Tirkan a der heqê Kurdistana Başûr de, xwe dispêre wê baweriyê ku em ê otonomiyê bidin herêmên Kurdan ên li Iraqê. Ev yek wê bibe sedem ku Kurdên di bin îdareya Tirkan de hatine hiştin reaksiyonê nîşan bidin û zorê bide wan ku ew jî otonomiyê bixwazin. Heger em bi awayekî resmî ji Tirkiyeyê re teahûd bikin ku di van mercên ku diguherin de me dev ji fikara dayîna otonomiyê ya ji Kurdan re berdaye, ku ew di peymana Sewrê de cih digere û mebesta me ew e ku em hemû herêmên Kurdan heta tixûbê li aliyê Mûsilê bi ser

[165] Hasan Yıldız, bnb.

Mezopotamyayê ve (Iraqê ve-E) berdin, ez wisa difikirim ku ew ê gotûbêjên der barê sînor de gelekî rihet bibin."[166]

Îcar biryar li gorî vê ramanê pêk tên. Ev helwesta hanê, ku di 1923'yan de hişkeretir dibe, tam berovajî riya ku berê pê de diçûn e. Di serî de Osmanî, piştre Hikûmeta Enqereyê û Ingilîz, li aliyê din jî Îranî, ji bo ku Kurdan qezenc bikin, hin maf didan Kurdan. Lê piştî di van çar salên dawî de her yekê pozîsyona xwe xurt kiribûn, wê wek ku tiştekî wilo tune bû tevbigeriyana. Hewldaneke herî biçûk a Kurdan li kîjan aliyî be bila bibe, bi fikara ku wê bandorê li Kurdên aliyê din bike, hemû bi hev re wê li dij bisekinîna. Di wê demê de di vê mijarê de hîna hemû alî gelekî li hev ne amin in; ji bo ku ji zimanê hev fêm bikin hîn wê hin tişt pêş hev bikirina û ev bi demê re hêdî hêdî wê rûnişta. Axilbe Tirkiye di 1924'an de li hemberî Kurdan wê gavên gelekî neyênî biavêtina.

Ji ber ku hîn gelek zelalî tuneye tevgera wekî din jî dom dike. Tirkiye di destpêka meha Tebaxê de, li hemberî hêzên Ingilîz ku wan hewl dida nifûza xwe li wilayeta Mûsilê xurt bikin, li aliyê sînorê bakur ê wilayetê dest bi tevgerê dike. Ligel bombardimana gur û zêde ya hêzên hewayî yên Ingilîzan, hêzên Tirkiyeyê bipêşdeçûna xwe berdewam dikin.

Gava ku Tirkiye diket dewrê, têkiliyên di navbera Şêx Mehmûd û hêzên Brîtanyayê de jî nexweş dibûn. Piştî Peymana Lozanê hate îmzekirin di Tîrmeh û Tebaxa 1923'yan de Ingilîzan careke din dest bi bombebarandina li ser Silêmaniyeyê kiribûn. Bombardimana 16'ê Tebaxê rojeke din a reş derbasî nav rûpelên dîrokê dikir. Bi van êrîşan Kurd qels dibûn, Hikûmeta Iraqê bi demê re xurt dibû. Şêx Mehmûd jî bêhtir derbasî aliyê Îranê dibû û ji ber ku Îranê jî xwe dabû hev, biqewet bûbû wan jî îcar êrîş dibire ser Şêx Mehmûd.

Piştî îmzekirina Peymana Lozanê Tirkiye di gelek waran de wê têketa riyeke cuda. Bi îmzekirina peymanê re Dewleta Tirkiyeyê ji aliyê navneteweyî ve dihat qebûlkirin û di warê têkiliyên bi hêzên derve re diket rihetiyê. Êdî li hundir awayê gotinan û helwestan jî tê guhertin, hîn hişktir dibin. Bi taybeti li hemberi Kurdan. Bi makeqanûna 1924'an jî zimanê Kurdan, çanda wan û kesayetiya wan tê înkarkirin.

Nêrîna Komisyona Makeqanûna 1924'an, raman û riya wê ji wê rojê û pêde bê meşandin bi awayekî hişkere îfade dikir. Di sedema Makeqanûnê de 9'ê Adarê wiha dihat gotin:

"Dewleta me dewleteke neteweyî ye. Ne dewleteke pirnetewe ye. Dewlet

[166] Ahmet Mesut, bnb, r. 141

ji Tirkan pê ve miletekî din nas nake. Di nav memleket de, kesên ku ji nîjadên din in û divê xwedî heman maf û hiqûqî bin, hene. Lê ne mimkun e ku mirov li gorî rewşa wan a nîjadî mafan bide wan an jî tiştên ku were wê wateyê bike. Wekî her miletekî nû, dibe ku miletê Tirk jî kesên ne ji heman nîjadî vehewîne nav xwe. Lê tenê miletê Tirk xwedî wê hunerê ye ku dikare hemû nîjadan li hev bike kom."[167]

Heyetên Ingilîz û Tirkan jî di hevdîtinên navbera 19'ê Gulanê û 5'ê Hezîrana 1924'an de li Stenbolê yên ji bo meseleya Mûsilê ku li Lozanê hatibû taloqkirin, bêyî bigihîjin encamekê dawî li gotûbêjên xwe anîbûn. Bi vî awayî çareseriya pirsgirêkê ji Meclîsa Cemiyeta Miletan re mabû.

Alozî ji her aliyî ve dom dikir. Herekatên leşkerî yên Ingilîzan li ser bakurê Kurdistanê hene. Nastûriyên xirîstiyan jî, yên ji aliyê Ingilîzan ve bi çek bûbûn, waliyê Hekariyê Halîl Rifat Beg dîl digirin (7 Tebax 1924). Dûre bi tekiliya hin eşîran walî û kesên pê re tên berdan. Herekata leşkerî ya Tirkiyeyê ya li dijî Nastûriyan ku bi qasî 3 hezar û pêncsed hêzên wan ên çekdar hebûn, di 10'ê Rezberê de tê destpêkirin. Herekat di 28'ê Rezberê te temam dibe. Piraniya Nastûriyan direvin Îranê.[168]

Ji ber van tevliheviyan Tirkiyeyê gelek caran giliyên herekatên hewayî yên li ser Rewandûz û Silêmaniyê û herekatên leşkerî yên Ingilîzan li ber Cemiyeta Miletan dike. Her du aliyan jî, îtirazên xwe li çalakiyên hev û din ku wan ev rewş li dijî sozên hatibûn dayîn dinirxandin, dom dikin. Tirkiye li dijî dagirkirina Silêmaniyê ya di 14'ê Tîrmeha 1924'an de ya ji aliyê leşkerên Iraqê ve, li dijî qebûlkirina temsîlkarên Mûsilê ji bo Meclîsa Iraqê, li dijî pêdeçûnên xiristiyanên Asûrî, li hemberî firîna balafirên Ingilîzan a li ser Tirkiyeyê derdikevin; rayedarên Ingilîz jî li dijî çalakiyên wezîfedarên sînor ên Tirkiyeyê derdikevin û her du alî giliyê hev li ber Cemiyeta Miletan dikin.

Tê zanîn ku Yekîtiya Sovyetan li dijî emperyalîzma Ingilîzan tevgera kemalîst destek kiriye û paşê jî, ji bo ku Tirkiyeyê ber bi hêzên rojava ve nedehfîne, eleqe û nêzikatî nîşanî wê daye. Li Başûrê Kurdistanê, wehşeta ku bi bomberdimana Ingilîzan dihate pê, di çapemeniya Sovyetê de cih digirt; Şêx Mehmûd bi nameyan çendî car ragihandibû ku ew dixwaze bi wan re têkiliyê deyne û ji wan alîkariyê dixwaze. Nameya sêyemîn a Şêx Mehmûd Berzencî, ku di 27'ê Tîrmeha 1923'yan de, li Silêmaniyê wek Serokê Hikûmeta Kurd ji Yekîtiya Sovyetan re nivîsîbû, tiştên ku di wê demê de diqewimîn vekirî nîşan dide. Beşek ji nameyê, wiha ye: "Hemû nifûsa Kurdistanê di bin bombardiman û êrîşên leşkerî de hatiye hiştin. Nêzikî 200

[167] İsmail Göldaş, bnb, r. 229
[168] Rafet Ballı, Kürt Dosyası, r. 59

malbatî, di bin zordariya hêzên dijmin de, ji Silêmaniyê koç kiriye. Bi dehan mirov hêsîr hatine girtin û di cih de ew mişextî Bexdayê kirine. Beşeke mezin ji malên wan hatiye talankirin. Em reca dikin ku hûn bi heqaniyet û edaleta xwe ya humanîst, li ber vê zilmê rabin." Ligel van hemûyan Yekîtiya Sovyetan li hemberî têkoşîna Kurdan a bi Ingilîzan re bêdeng mabû. Gelo ev ji ber pirsgirêkên wê yên navxweyî bû? An ji ber têkiliyên wê yên bi Hikûmeta Enqereyê re bû? Yan tiştin din hebûn...

Erê, têkçûna Kurdan qenc derdiket ber çavan. Wek ku berê hat îfadekirin ji bo mirov li ser sedemên vê têkçûnê bigihê rastiyan divê mirov vê mijarê berfireh bigire ber xwe. Lazarev dibêje, di vê demê de Kurdan, ew firsenda ku di dîrokê de mirov kêm carina bi dest dixe, baş bi kar neanîne: "Di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, Împaratoriya Rûs a ku beşeke mezin a Kurdistanê dagir kiribû, hilweşiyabû. Di dawiya şer de Almanya têk çûbû û ji herêmê vekişiyabû. Împaratoriya Osmanî felişîbû, dewleta Îranê jî serxwebûna xwe winda kiribû. Di heman serdemê de rêveberên dewletên Ewrûpayê, bi awayekî fermî û hişkere bûbûn alîkarê azadiya gelan û diyarkirina qedera neteweyan. Lê Kurdan ev derfetên dîrokî pêk neanîn."[169]

Li gorî Lazarev, sedemên ku Kurdan ev firsend bi kar neanîne hene. Bi kurtasî wiha dinivîse: "Di navbera gotin û mebestên dewletên Ewrûpayê de cudahiyeke mezin hebû. Ji ber mercên şerê navxweyî Yekîtiya Sovyetan nikaribû alîkariyê bike. Li Tirkiyeyê, li dijî nasyonalîzma Kurdan nasyonalîzmeke hîn xurt û organîze ya Tirkan hatibû danîn. Kurd ne xwedî rewşeke wisan bûn ku karibin êrîşî hêzên dijmin bikin û zora wan bibin. Paşdemayîna civaka Kurd a civakî û aborî, siyasî û çandî, ji dayîna têkoşîna ji bo serxwebûnê re, li pêşiya yekbûna hemû hêzên Kurdan bûbû asteng. Arîstokratiya eşîrî roleke neyînî lîstibû, wan pêşewayek û partîyeke rêveber a ku karibe girseyan bide ber xwe û bike nav tevgerê, dernexistibû. Ev mercên neyînî hemû, hewldan bêencam kiribûn û destûr nedabûn ku serxwebûna Kurdan a ji aliyê aborî, siyasî û leşkerî di bin hîmaya dewletekê de be jî, çêbibe." Vegotin dûre wiha berdewam dike: "Ya hîn girîngtir, salên destpêkê yên piştî şer, ji bo gelê Kurd ne demeke ku bi awayekî nehêja hatibûn windakirin. Di vê parçedema kurt û bi bûyeran jî têra xwe tije, pozîsyona aliyan a der barê pirsgirêka Kurd de û niyeta wan a rastîn, derket holê..."[170]

Ku em bên ser encamê, Kurdistana ji ber şerên ku sed salî berdewam kiribû qels ketibû, bi pozîsyoneke ku di dîrokê de kêm tê dîtin rû bi rû mabû,

[169] M. S. Lazarev, bnb, r. 272
[170] M. S. Lazarev, bnb, r. 272-73

bi awayekî bêmerhemet hatibû parvekirin û parçekirin. Yanî di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn û piştî wî de, ku avakirina netewedewletan di rewacê de bû, dîsan Kurd bûbûn qurbana xakên xwe yên zengîn. Di encamê de Kurdan winda kiribû û wê têketina rewşeke hîn nexweştir ku di dîrokê de tiştê wilo nehatibe dîtin.

Em vegerin perdeya dawî a Mûsilê. Perdeya dawî heye, lê birastî tune ye. Tiştekî ku zêde wê bê guhertin nîn e. Pir hindik pozîsyonên heyî wê bên parastin. Gotûbêj û hevdîtinên der barê Mûsilê de bi salan didomin. Welatê Kurdan dabaşa gotinê ye, lê Kurd di lîstikê de tune ne. Raporên komîsyonê behsa Kurdan û mavê wan dikin, lê belê dîsan encameke erênî ji bo Kurdan dernakeve holê.

Pirsgirêka Mûsilê dimîne li ber destê Cemiyeta Miletan; ew jî di 30'ê Rezbera 1924'an de biryara avakirina heyeteke tehqîqatê dide. Konsey, ji bo zanyarî û pêşniyazên xwedî taybetiya ku bibe alîkariya biryardanê pêşkêşî wan bibin, wê komîteyeke ku ji sê kesan pêk tê ava kiribûya. Aliyan jî soz dane ku ew ê biryara konseyê qebûl bikin. Ligel vê yekê heta biryar bê dayîn, li ser mihafizekirina pozîsyona sînor a wê rojê jî, li hev kiribûn. Di meha Kewçêrê de, di rûniştina civîna li Brûkselê de Konsey, ji bo komîteyê ji Swêd, Îspanya û Ûrûgûayê sê nûneran hildibijêre.

Di vê navê re ji aliyê veqetîna ji hev a qadên serwerî yên Tirkiye û Îngiltereyê kêşe hebûn û li Başûrê Kurdistanê dîsa jî bûyer diqewimîn. Ji ber vê yekê komîteyê di 28'ê Kewçêra 1924'an de ji bo demekê di navbera Tirkiye û Iraqê de bi navê "Xeta Brûkselê" sînorekî tespît dike. Her du alî soz didin ku ew ê rîayetî vê xetê bikin.

Komîsyona tehqîqatê ku ji aliyê konseyê ve hatibû tayînkirin, di 17'ê Sermawezê de dest bi xebatê dike. Komîsyon ji serokwezîrê berê yê Macaristanê Kont Telekî, ji Wezîrê Swêdê yê li Bukreşê Mr. Af Wirsen (serokê komîs-yonê) û ji Mr. Paulis (ku ew di artêşa Belçîkayê de wek serheng wezîfedar bû) pêk dihat. Komîsyon wê pêşiyê biçûya Londonê, paşê Enqereyê û dûre jî derbasî Başûrê Kurdistanê bibûya da ku serî li fikar û nêrînên xelkê bida. Ew di 16'ê Çileyê 1925'an de digihên Bexdayê. Di vê demê de ji bo ku bidin nîşandan bê bi Mûsilê re çiqasî di nav ahengeke tam de ne li cepheya Iraqê, xebateke bêsekin heye.

Di dema lêgerîn û çavdêriyên komîsyona Mûsilê de, pozîsyona Tirkiyeyê û ya Îngiltereya ku bûye serwerê herêmê, ne heqane ye. Li hêla din haya gelek Kurdan jî ji dek û dolabên dizîvirin tune ye. Edmonds rewşa bi avantaj a Îngiltereyê, nêziktêdana wan a neyînî ya li Kurdan û Şêx Mehmûd wiha ve-

dibêje:

"Gava ku ez, delegasyona me (qesta min a ji me, ji hikûmetên Ingilîz û Iraqê ye ku bi hev re hereket dikin) û Tirkan didim ber hev, avantajên taktîkî bi awayekî mezin wek ji aliyê me be, xuya dibûn. Polîs jî tê de, hemû îdare bi temamî di bin kontrola me de bû. Bi saya vê yekê, em xwedî îmkanên ku me karibû ji bo wan têxin tevgerê zorê bidin nifûsê cihê hemûyî yan jî beşek jê yê ku me bixwesta û ji bo ku em karibin tezên xwe bi awayekî ji me yeqîn bikin bînin zimên me karibû xwe bigihanda zanyariyên herî dawî ên hewce dikir û yên herî rast; her wiha yên ku îdiayên me rêz dikirin û yên memorandûma ku bersivên me yên me dabûn pirsên anketê tê de cih digirt, amade dikir an jî ji amadekirina wê re dibûn alîkar, ji temsîlkarên fermî û erkedarên fermî ku herêma xwedî nîqaş îdare dikirin bi xwe bûn."[171]

Ev hevoka ku Qral Faysal ji komîsyonê re nivîsiyê, ji bo ku awayê lênêrîna li Mûsilê wek deq dide xuyakirin, hêja ye mirov di bîr bîne: "Ji ber wê yekê ez dibêjim ku, seriyek ji bo parçeyê din ê bedenê çi be Mûsil jî ji bo Iraqê ew e û her çiqas mesele wek çareserkirina pirsgirêkeke sînor a di navbera Tirkiye û Iraqê de tê xuyakirin jî, ez ji dil yeqîn dikim ku mesele hebûn û nebûna Iraqê ye."

Jixwe di peymanên ku Iraqê bi Ingilîzan re pêk anîbûn, şertê ku divê Mûsil di nav Iraqê de bimîne hebû. Di 10'ê Kewçêra 1922'yan de, di navbera Brîtanyaya Mezin û Iraqê de peymana hevalbendiyê hatiye îmzekirin, bi vê peymanê Brîtanyaya Mezin ji Iraqê re teahûd dike ku 'heta berdewamiya peymanê, pêşniyaz û alîkariya ku hewce bike' ew ê temîn bikin. Ligel vê yekê Îngiltereyê teahûd dikir ku heta mimkun be, ji bo di demeke herî kurt de endamtiya Iraqê ya ji bo Cemiyeta Miletan bikeve bin garantiyê, ew ê alîkariyê pê re bike. Piştî merheleyên cuda û protokolên lê zêde bûn, di 24'ê Adara 1924'an de ji bo pesendkirinê peyman şandin Meclîsa Iraqê. Di beşa hişyariyê ya peymanê de ev jî hebû:

"... Heger Hikûmeta Ingilîz nikaribe mana wilayeta Mûsilê ya di hundirê Iraqê de biparêze, ev peyman û peymanên alîkarên wê, ew ê nema darbasdar bin."[172] Bi dû de biryara peymana ku di Meclîsa Iraqê de derbas bû, di 10'ê Sermawezê de ji aliyê Qral George ve û di 12'ê Berfanbarê de jî ji aliyê Qral Faysal ve tê pesendkirin.

Xelîfetiya ku ji bo gelên Osmanî pir girîng e, di 3'yê Adara 1924'an de li Enqereyê ji aliyê Meclîsa Mezin a Miletê ya Tirkiyeyê ve tê hilanîn; bi dû de

[171] C. J. Edmonds, bnb, r. 523
[172] Vladimir F. Minorsky, bnb, r. 90

Huseyîn xwe wek xelîfe îlan dike. Bi vî awayî yek ji kelehên îslamê ya herî girîng derbasî Ereban, yanî Ingilîzan dibû, ji ber ku Ingilîz serwerê wan bûn.

Bi rakirina Xelîfetiyê banê hevalbendiya ser bingeha misilmantiyê ji holê hatibû rakirin. Di navbera îmzekirina Peymana Lozanê û hilanîna xîlafetê de, hin rêzetedbîrên li dijî Kurdan jî hatine stendin. Girtina dibistanên Kurdan, qedexekirina axaftina bi Kurdî, cezakirina rêber û pêşengên Kurdan, înkarkirina hebûna Kurdan, zordarî û hwd. Înkara hebûna Kurdan û zextên li ser wan dike ku li dû hev serhildan çêbibin. Li Komara Tirkiyeyê serhildana pêşî a mezin Serhildana Şêx Seîd e. Bi awayekî giştî tê gotin ku hilanîna xelîfetiyê, xwedîlêderneketina Mûsilê û gotinên der barê hebûna neteweyekê tenê de, sedemên hîmî yên serhildana Şêx Seîd in.

Martin van Bruinessen, di berhema xwe ya navbuhirî de, rewşa piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn wiha dinirxîne: "... Kurd û Tirk, li ser erdên dawî ên ku di destê Împaratoriya Osmanî de mabûn, di bin alaya îslamê de hatibûn cem hev û wan dest bi şerê serxwebûnê kiribûn. Serkeftinên wan ên leşkerî bi Peymana Lozanê di qada navneteweyî de hatibûn naskirin û heman sal jî komar hat îlankirin. Mustefa Kemal piştî tedbîrên tund ên ku di demeke kurt de stend, bû sedem ku Kurd û misliman ji hev û din re bibin biyan. Bi awayekî lezgîn berê xwe da laîkbûnê û saziyên îslamî yên kevneşopîyê ji holê rakirin. Ji bo ku alîgirên komarê bike neteweyeke tenê, xwest Kurdan asîmile bike, nasnameya wan ji holê hilîne û wan bike Tirk. Kurd ku piraniya wan mislimanên dîndar bûn, ji ber vê nenasiya wan û rewşê, şikestibûn. Di sala 1925'an de şêxê Kurd ê ji Palo Şêx Seîd, bi alîkariya şêxên li heman herêmê yên Kurd ên nexşebendî serî hilda. Nifûsa li herêmeke mezin jî, destek da serhildanê û roleke aktîf stend."[173]

Serhildana Şêx Seîd, ku serhildana herî mezin a serdema komarê ye, cara pêşî di 16'ê Sibata 1925'an de di rojnameyan de cih digire. Tê behskirin ku Kurd dixwazin dewleteke Kurdan ava bikin û Diyarbekirê jî bikin paytexta wê.


Binyata serhildanê ji aliyê Cemiyeta Azadî ve ku di 1923'yan de navenda wê li Erziromê hatibû avakirin, hatiye danîn. Pêşewatiya cemiyetê, Xalid Begê Cibrî kiribû, ku ew yek ji serekên Eşîra Cibran e û ev eşîr jî di nav Kurdan de xwedî hurmeteke mezin e. Her wiha Xalid Beg di nav artêşa nîzamî de jî serheng (mîralay) bû. Li gelek deveran rêxistinên Cemiyeta Azadî hebûn, piraniya serkêşên wê jî di artêşê de efser (sûbay) bûn û tê de mirovên ji her beşa civakê cih girtibûn; wekî senator, mebûs, doktor, parêzer,

[173] Martin van Bruinessen, bnb, r. 91

helbestvan, şêx, mele û hwd.

Cemiyeta Azadî kongreya xwe ya pêşî di 1924'an de li dar dixe. Di nav kesên beşdar de Şêx Seîd jî heye. Di kongreyê de biryar tê stendin ku bi beşdariya hemû eşîrên li herêmê serhildanek bê lidarxistin û piştre jî serxwebûn bê îlankirin. Her wiha kite bi kite li ser karbeşiyê û plankirina serhildanê tê sekinandin.

Bûyera li gundê Pîranê ya bi ser nehiyeya Gêl a Diyarbekirê ve, ku di 13'ê Sibata 1925'an de diqewime, dike ku beriya dema hatibû plankirin serhildan bêhemdî dest pê bike. Di wexteke kurt de serhildan fireh dibe û belav dibe. Di 16'ê Sibatê de ku Şêx Seîd û hêzên wî navenda wilayeta Darahênê (Gêncê) bi dest dixin bi şûn de, bi ser Çepexçûrê (Bîngolê) re berê xwe didin Diyarbekirê. Meden, Siwêrek û Erxenê bi dest dixin. Milekî serhildanê jî, ku ji hêla Şêx Ebdulah ve tê îdarekirin, di ser Gimgimê (Vartoyê) re hereketî Mûşê dike. Serhildêr piştî ku Gimgimê dixin destê xwe, ber bi Mûşê ve dikişin, lê têk diçin û neçar dimînin vedikişin Gimgimê.


*Şêx Seîd*[174]

Li ser van qewam û rûdanan, hikûmetê di 21'ê Sibatê de li wilayetên rojhilat rêveberiya leşkerî îlan kir. Yekîneyên artêşê ku bi ser serhildêran ve hatibûn şandin, li hemberî hêzên Şêx Seîd xwe ranagirin û mecbûr dimînin ku vekişin. Dotira rojê, milekî din ê serhildanê ku di bin serokatiya Şêx Şerîf de ye dikeve Elezîzê, di demeke kin de bajêr dike bin kontrola xwe. Di 7'ê Adarê de hêzeke ku ji 5 hezar kesî pêk tê, ya di bin fermandariya Şêx Seîd de, berê xwe dide Diyarbekirê.

Li ser vê yekê Mustefa Kemal ji bo bi awayekî lezgîn bê Enqereyê gazî Îsmet Înonu -ku wê demê li Heybelîadayê bû- dike. Mustefa Kemal bi xwe diçe Gara Enqereyê Îsmet Înonu û malbata wî pêşwazî dike û ji bo ku di der barê bûyeran de agahiyan bidê wî ligel xwe dibe Koşka Çenqeyayê. Piştre jî îstifakirina Serokwezîr Alî Fethî Okyar

[174] M. M. van Bruinessen, Agha, Shaikh and State

dixwaze û Îsmet Înonu di 3'yê Adarê de dike serokwezîr. Heman rojê li Meclîsa Mezin a Miletê ya Tirkiyeyê qanûna 'Takrîr-i Sükun' (Bicihkirina Sukûnetê) tê pejirandin û bi vî awayî parlemento rayeyên rewşa awarte dide hikûmetê. Qedexeya ku pêşiyê ji weşanên ku cih didan serhildanê re hatibû, piştre berfirehtir dibe û hin tedbîrên din jî digire nav xwe. Di 5'ê Adarê de biryara avakirina du 'İstiklal Mahkemesi' (Dadgeha Serxwebûnê) tê stendin ku yek li Enqereyê û yek jî li Diyarbekirê be. Diviyabû cezayên ji aliyê dadgeha li Enqereyê ve hatine stendin ji hêla Meclîsê ve bên pesendkirin, lê hukmê ku li herêma serhildanê dihat dayîn, bêsekin dihat bicihanîn.

Di destpêka Adarê de desthilatdarên Tirk ji Fransiyan xwestin ku destûrê bidin wan da bi qasî 20, 25 hezar leşker û teçhîzat bi riya Rêhesina Bexdayê bişînin qada şer. Piştî sewqiyateke mezin û berfireh, yekeyên leşkeran bi hev re dest bi êrîşê dikin (26 Adar) û piştî ku li cepheyên cur be cur şerên giran û xedar qewimîn pê de, Şêx Seîd di 16'ê Nîsanê de dîl tê girtin.

Di dema operasyonê de ku bi qasî 30 hezar leşkerên Tirk tevlî bûbûn, tehde û zordariya li Kurdistanê pir dijwar e û bi awayekî bêmerhemet bi ser gel de diçin. Kesan didine ber guleyan... Operasyonan li dijî bajarên Kurdan li dar dixin.... Bi gotina nivîskarê berhema bi navê 'Kürt Ulusal Hareketi' (Bizava Neteweyî ya Kurdan) Chris Kutschera "Gundên li herêma serhildanê wê bi erdê re bikin yek, serhildêr û malbatên wan wê neyên bexşandin. Ew ê derseke wisan giran bidana wan ku li tevahiya welêt wê tu car nehata jibîrkirin."[175]

Di heman demê de serokê berê yê Şuraya Dewletê û serokê Komeleya Pêşketina Kurdistanê (Kurdistan Tealî Cemiyetî) Seyîd Ebdulqadir û 12 hevalên wî li Stenbolê tên girtin û wan dişînin Diyarbekirê da ku li wir bên darizandin; dadgeh jî li Seyîd Ebdulqadir û 5 hevalên wî cezayê darvekirinê dibire.

Şêx Seîd jî piştî ku ji aliyê Mehkemeya İstiklalê ve tê darizandin, tevî 46 hevalên xwe li Diyarbekirê tên daliqandin. Serê sibeha 29'ê Hezîrana sala 1925'an, piştî şeveke bêxew, diyarbekirî ligel dîmena erjeng a 47 kesên ku laşên wan li sêpiyan dihejin, dest bi lixwedan û şînê dikin. Rayedar termên ku ji bo ji gel re bibe îbret heta nîvro daleqandî dimînin nadin xwediyê wan û bi awayekî tomerî tên veşartin.*

Di vê demê de, ji ber ku Komisyona Neteweyên Yekbûyî li Başûrê Kurdistanê ji bo kêşeya Mûsilê dest bi lêkolînan kiriye, gelek fikar tên aqilê

[175] Chris Kutschera, Kürt Ulusal Hareketi, r. 101

* Der barê serhildanên Kurdan de, ji bo zanyarî û agahiyên berfireh dikare serî li berhema Ahmed Kahraman a bi navê "Kürt İsyanlari -Tedip ve Tenkil" bê dayîn ku ev vegotin tê de cih digirin.

mirov. Ji bo ku ev bi awayekî rast bê şîrovekirin, divê her tişt bi kitekit bê nirxandin û li ser wan bê rawestandin. Lê mirov dibîne ku di encamê de di serdema vê serhildanê de, tê zanîn ku li gorî xwestina Ingilîzan Mûsil bi ser Iraqê ve hatiye hiştin û Tirkiyeyê jî Mûsil ji dest berdaye. Naxwe sedema ew qas zordarî û lêxistina wan a bi hev re ya li Kurdan gelo ji bo qelskirina hêza wan bû? Çinkû Kurdên Başûr ji Komisyona Neteweyên Yekbûyî re digotin ku, ew ne dixwazin tevî Iraqê ne jî tevî Tirkiyeyê bibin. Kurdên Bakur jî bi awayekî qethî li dijî veqetandina Başûr derdiketin. Dewleta Tirkiyeyê jî ji bo bidestxina Mûsilê tu gavên berbiçav neavetine. Di nav propagandayan de jî gelek tiştên cuda hatine bikaranîn. Xuya dike ku dîsa pêş û paş perdê ji hev gelekî cuda ne.

Ji bo qenc dengê Kurdan bê kêmkirin, li Tirkiyeyê piştî serhildanê jî girtin û perçiqandin berdewam dike. Şevket Beysanoglu di cilda sêyem a kitêba xwe ya bi navê "Diyarbakir Tarihi" (Dîroka Diyarbekirê) de, kirinên ku hebûn wiha vediguhêze:

"Li herêmê rêveberiya leşkerî didomiya. Serhildana Şêx Seîd hatibû perçiqandin. Lê bizavên islah û paqijkirinê yên ku li herêma serhildanê dihatin domandin, hîn negihîştibûn encameke misoger. Wezîriya Karên Hundirîn dixwest ev bizav bi awayê ku ji bo dahatûyê bibin bingeh bê meşandin û di giştînameya xwe de, ya ku di 26 Gulan 1925'an de ji Dozgeriya Mehkemeya Îstiklalê ya Şerqê re, ji Mufetîşiya Artêşa Sêyem re, ji walîtiyên Erzirom, Mêrdîn, Dêrsim, Erxen, Dara Hênê (Gênc), Siwêrek, Wan, Bazid, Meletî, Diyarbekir, Mûş, Bedlîs, Elezîz û Sêrtê re şandibû, wiha behsa hawayê karê paqijiyê kiribû:

'Ji dest an jî ji malên kes û komikên ku bi serhildanê re bi devkî yan jî bi kirdarî eleqedar bûne, lê eleqe û şopa xwe veşartine yan jî yên ku ji berê ve gûmanên Kurdîtî û paşverûtiyê li ser wan hebin wê hemû cure çek û amrazên wan ku karin birîndariyê çêkin ên ku hatine qedexekirin wê bên berhevkirin.

Çi kesên ku ji ber sûc û kuştinan berguman û cezaxwarî ne û pişta xwe dane hêza eşîran û firar in, wê hemû bên girtin û wê sewqî dadgehan bên kirin û ji van kesan ên ku girtina wan û mehkemekirina wan a li derdora wan pirsgirêk hebin, ew ê li ser sebebên şandina wan a li dadgeheke bajarekî din bê fikirandin û ew ê bên şandin.'

'Hemû girtî û hikumxariyên ku ji girtîgehên herêmên serhildanê reviyane, ew ê bi awayekî zindî yan jî mirî bên tenkîlkirin û kesên ku bi saxî hatine girtin jî, ew ê li gorî rewşa wan an sewqî Dadgeha Serxwebûnê ya

Rojhilat bibin an jî ew ê sewqî dîwana herbê ya li herêmê bibin.'..."[176]

Bi çend jêgirên ji berhema Ahmet Kahraman, em wan rojan hinekî din ji nêz ve bişopînin:

"... 'Bernameya Islahan' a hikûmetê (ku ew ê heta Şerê Cîhanê yê Duyemîn biajota), paralelî axaftina Serokwezîr Îsmet Înonu ku li Meclîsê kiribû, didomiya. Îsmet Paşa gotibû ku, ji bo bûyer careke din dubare nebin, ew ê tedbîrên bingehîn ên hewce dikin bistînin.

"Seferên ku ji bo berhevkirina çekan di Hezîrana 1925'a de dest pê kiribûn, bi zilmî dihatin kirin. Dor li gundan dihat girtin, mirov li meydanan dihatin komkirin û ferza 'an çek an jî canê we' li wan dihat kirin. Kesên ku çekên wan tune bûn, lêdan dixwarin, heqaret, îşkence li wan dihat kirin, hin kesan jî ji bo ku xwe ji vê rewşê bifilitînin çek dikirîn û teslîm dikirin, hin kesan jî ji bo malbata xwe û canê xwe ji destê wan xelas bikin çi mal û halê wan hebûya wek bertîl dida wan."[177]

Ahmet Kahraman, dide xuyakirin ku hejmara kesên hatine daliqandin ji reqamên fermî bi gelek zêdetir in û wiha nivîsiye:

"Ji bilî navendên herêmî yên Mehkemeyên Îstîklalê, şax û milên wan ên bajar û bajarokan jî hebûn. Biryargeha sereke ya Mehkemeya Îstîklalê ya Rojhilat, li Diyarbekirê bû. Lê şaxên wê yên ku li bajar û bajarokên din jî belav bûbûn, biryarên îdamê didan û mirov didaliqandin.

"Di qeydên fermî de tune ye ku li Cizîrê îdam hatine pêkanîn. Lê kalekî cizîrî ku bûye şahidê wê serdemê wiha digot: 'Gava em serê sibehan radibûn, me didît ku meydan bi mirovên daleqandî tije bûye. Me ji bo wan ji bilî duakirinê, nikaribû tiştek bikira'... Necîp Fazil Kisakurek, di nivîsa xwe ya 'Kürt Feryadi" (Feryada Kurdan) de, saw û xofa Mehkemeyên Îstîklalê bi gotinên 'Heger wan bi hev re hikum xwaribe, pêşiyê law dihat îdamkirin û bi bav didan temaşekirin, paşê jî bav didaliqandin', vedigot."[178]

Di berhemê de çend hevokên ji vegotinên şahidên diyarbekirî jî wiha ne: "Ji Deriyê Çiyê heta Deriyê Mêrdînê, li rê hemûyî sêpê hatibûn vegirtin. Sêpê li wir her tim sekinandî bûn. Her serê sibehan ku em hişyar dibûn, me mirovên ku di navbera darên sêpiyan de dihejiyan, didîtin. Sibehan ku me yên daliqandî dihejmartin carinan hijmar digihîşt 10, 15 kesan. Rojekê min qafîleyeke ku dibirin ji bo daleqandinê dît. Destên wan mirovan girêdayî, lingên wan jî zincîrkirî bû. Di nav singûyan de dimeşiyan, diçûn. Wan wek kesên xizan xuya dikir. Perîşan..."[179]

[176] Şevket Beysanoğlu, Diyarbakır Tarihi. 3.Cilt, r. 1022
[177] Ahmet Kahraman, Kürt İsyanları, r. 188
[178] Ahmet Kahraman, bnb, r. 145-146
[179] Ahmet Kahraman, bnb, r. 191

Der barê vê serdemê de, gelek şahid hene. Têra xwe belav nebûbin jî serpêhatiyên wê demê di hin berheman de cih girtine. Di berhema bi navê "Adim Şeyh Said" (Navê Min Şêx Seîd) de, di derbarê wê dewrê de vegotineke wiha derbas dibe: "Li gorî îfadeyên Beşîkçî 'Şêxê kemalîst' mebûsê berê yê Wanê Îbrahîm Arvas, ku di 1923'yan de anîne Meclîsa 2'yem, di bîranînên xwe yên ku navê 'Tarihi Hakikatler' (Rastiyên Dîrokî) lê kiriye, rojên 1925'an wiha vedibêje:

'... Hemû makîneyên kampanyaya îftira, derew û tiştên bêbinî bi tundî dihatin xebitandin; xerabî û nepakiyên ku li dinyayê nehatine dîtin, li kesan dihatin barkirin û wekî ku heqîqet bin dihatin diyarkirin û kes dihatin cezakirin. Îcar li Mehkemeya Îstiklalê, li Elezîzê, muzayedeya seriyan dihat lidarxistin. Bi pêncsed zêrî seriyek dihat kirîn û firotin.... Û wek encam li wilayetên rojhilat, qira zêrên biqulp û bêqulb hat.

(... )

'Li bajarên me yên rojhilat karê tedîbê (terbiyekirinê), bû karesatek. Jixwe kirin ku gelek malbatên mehkûman xwîn bigirîn. Ji deh hezar guhastiyên êrîşkar, li wilayetên rojava û Trakyayê, bi hezaran mirov di nav tengasî û êşê de bûn. Carnan rayedaran bav dida wilayetekî law jî didan wilayetekî din, nikarîbûn bihatina cem hev. Di rastiyê de ji me mebûsên rojhilat ku bi raya sor me îtimada ademî dida, qat bi qat tol hat hildan. Ji bilî kesên mişextbûyî, hin kes jî sewqî Dîwana Herbê ya Urfî bûn û duçarî cure bi cureyên cezayan bûn. Vê rewşa esefnak sê salan berdewam kir. Û di nav kirasê jiagir de pelşewat bûn.'..."[180]

Di hin qeydan de, derbas dibe ku piştî serhildana Şêx Seîd 1400 malbat mişextî rojava bûne. Ji ber ku di van mijaran de di fermiyetê de her tim hejmar kêm hatine diyarkirin, muheqeq hejmar ji vê zêdetir e. Li hêla din, dûre jî wê sirgûn bênavber bidome. Her ji çend salan carekê qanûnek tê derxistin û bêyî ku yek biqede şapateke din dest pê dike. Pir baş tê zanîn ku sirgûn nîvmirin e û bi vê riyê jî texrîbateke mezin didine Kurdan. Ji ber ku di cilda duyemîn di beşa 'Sirgûn û Asîmilasyonê' de li ser vê mijarê wê bê rawestandin, di vê beşê de em nakevin kitekitan.

Dema Kurd li Bakur di vî halî de ne Komîsyona Tehqîqatê ya ji bo Mûsilê ji aliyê Cemiyeta Milletan ve hatiye vezîfedarkirin li Başûr e. Piştî lêkolînên ku sê mehan dom kiribûn, Komîsyona Tehqîqatê raporek amade kiribû. Komîsyon vê raporê di 16 Tîrmeha 1925'an de pêşkêşî Konseyê dike. Bi jêguhestinên ji pirtûka Minorsky a bi navê "Musul Sorunu"(Kêşeya Mûsilê)

[180] İlhami Aras, Adım Şeyh Said, r. 70-71

em hinekî li xetên sereke yên raporê binêrin:

– Kurd, piraniya nifûsê pêk tînin. Ew ne Tirk ne jî Ereb in. Bi zimanekî aryan diaxivin. Bi tenê Kurd û Ereb civatên qerebalix ên ku li warên mezin bi cih bûne pêk tînin. Ji bo çêbûna xeteke bi armanca veqetandina nîjadên cuda, mirov kare tenê belavbûna bi zêdebûn a van her du hêmanên nifûsê bide ber çavan. Ev xet, wê di çolên bibereket û xwedî nifûseke zêde de bibihure, Mûsilê bibire û ber bi nuqteya ku Çemê Dîcleyê û Zêya Biçûk digihên hev dakeve. Nîjadên din hemû, li her aliyê welêt belav bûne.... Heger tenê girtina ber çavan a delîla nîjadê mecbûrî bûya, diviyabû biryara avakirina dewleta Kurd jî mecbûrî bûya, çinkû ji heştan pêncê nifûsê Kurd in...

– Em di nav Kurdan de hişmendiyeke neteweyî ya ku mezin dibe dibînin ku bi awayekî hişk alîgirê Kurdayetîyê ye û ne ji bo Iraqê ye; ev hiş li başûr bi awayekî hîn xurt bi pêş ketiye û gava ber bi bakur ve diçe qels dibe, li çiyayên Eqreyê û li deşta Mûsilê bi tevayî winda dibe. Li hêla din di nav Tirkên li wilayetê de jî, bi awayekî hişkere hişmendiya neteweyî xurt e. (....) Hîsiyata giştî ya li herêma binîqaş... (Heger) beyanên li hemû parçeyên herêmê li ber çavan bên girtin, pir hindik, bi awayekî muhtemel wê ber bi Iraqê ve bikeve. Ligel vê yekê, ev beyan gelekî tên guhertin û ji aliyên şertan ve wisan hatine dorpêçkirin ku ji bo statûya siyasî ya welêt a di dahatûyê de, bi tena serê xwe wek bingeh nikare bê dîtin... Heger rejîma mandayê di wexteke kurt de bi dawî bibe, gelek alîgirên Iraqê wê bixwazin dîsa tevî Tirkiyeyê bibin.

– Rewşa Iraqê ya navneteweyî... li hemanê xuya dike... Ji ber rewşa ne xweş a di navbera sunî û şiiyan de mirov têra xwe rastî dijwariyan tên. Şiî ji ramanên modern ên reformxwaz re ne gelekî vekirî ne. Çendî piraniya nifûsa wilayeta Mûsilê sunî be jî, divê haya mirov jê hebe ku li wilayetên Bexda û Besrayê nifûsa şiiyan zêdetir in. Li hêla din têkiliyên di navbera Kurd û Ereban de jî ne diyar in. Komîsyon bi mebesta ku îmkanê bide bipêşketin û biqewetbûna dewleta nû, gihîştiye baweriya ku divê şeklê birêvebirinê yê heyî ya mandayê bi qasî nifşekê bê domandin....

– Komîsyon dipejirîne ku divê gelê Asûrî bê parastin... Ligel vê yekê, xwedî wê baweriyê ye ku çareseriya ji aliyê Hikûmeta Ingilîz ve hatiye pêşkêşkirin û prensîba wekheviyê li hev nake... Îtirazên Hikûmeta Tirk ên derpêşkirina daxwazên herêmî yên piştî Konferansa Lozanê, bi tu awayî di cih de nayên dîtin. Ji belgeyên konferansê derdikeve holê ku ji destpêkê ve heyeta Ingilîzan îdia dike ku sînorê Iraqê sînorê bakurê wilayeta Mûsilê ye. Pêşniyazên Hikûmeta Ingilîz ên ku li Stenbolê hatibûn pêşkêşkirin, ne sererastkirinên ji rêzê ne... Komîsyon gihîştiye vê encamê: Ji bo Asûriyan

çareseriya herî bêhtir dilxweşiyê bide, qebûlkirina pêşniyaza heyeta Tirk e a ku wê di Konferansa Stenbolê de rapêş kiribû û destûr dayîna Asûriyan a ku li welatên xwe yê berê vegerin teklîf dikir. Di vê rewşê de, divê lê bihata zêdekirin ku gerek Asûrî eynî mîna berê dîsan wek ku xwedî otonomiya cihkî bin berdewam bikin û divê ku ewlehiya wan bi efûyeke giştî ya tam eseh bibe.

"Komîsyon, ku bi temamî ji aliyê aborî ve dinêre difikire ku ji bo herêma binîqaş çareseriya herî rast girêdana wê ya bi Iraqê ve ye... Ligel vê yekê heger... bihata fikirîn ku herêma binîqaş hewce ye di navbera Tirkiye û Iraqê de bê parvekirin, çareseriya herî qebûlbar a ji aliyê nêrîna aborî ve ew e ku xeta sînor di bakurê Zêya Biçûk de bê kişandin..."

Vegotina di der barê biryara dawî de jî wiha ye:

"...Komîsyon, dema bi awayekî tevahî nîqaşên girîng ên der heqê avaniya cografîk û nemaze ekonomîk de û yên der barê hîsiyata piraniya şêniyên herêmê (ligel hemû îstisnayên diyar) dide ber çav, li gorî mercên li jêrê, girêdana hemû herêmên li başûrê 'Xeta Brûkselê' bi Iraqê ve, baştir dibîne:

1) Divê herêm, ku bi qasî demeke 25 salan dikare bê pêşniyazkirin, di bin mandaya fiîlî ya Cemiyeta Miletan de bimîne.

2) Divê rêz ji daxwazên Kurdan re bê girtin, yên derbarê li welatê Kurdan ê ku ew dibêjin, kesên ji nîjada Kurd wek erkedar ji bo rêveberiya belavkirina edaletê û perwerdehiya dibistanan bên tayînkirin û zimanê fermî yê di van hemû xizmetan de bi Kurdî be."

"Komîsyon îqna bûye ku, heger kontrola Cemiyeta Miletan a li ser wadeya peymana çar salî ya ku di navbera Brîtanyaya Mezin û Iraqê de derbasdar e, bi dawî bibûya û heger der barê mijara otonomiya herêmî de teqez aminiya Kurdan neanîna, ew ê piraniya gel serweriya Tirkan ji ya Ereban çêtir bidîta."

"Komîsyon, her wiha îqna bûye ku, di vê rewşê de ew ê feydeyên tevlêbûna herêma binîqaş a bi Iraqê re cih bi dijwariyên siyasî yên pir cidî re biguhere û komîsyon difikire ku di van mercan de hîn çêtir e ku herêm di bin serweriya Tirkiyeyê de bimîne, ji ber ku hem mercên wê yên navxweyî hem jî rewşa wê ya navneteweyî hîn bêhtir biqewet e ku mirov nikare wan bide ber yên Iraqê. Digel vê yekê, kîjan biryar bên dayîn bila bên dayîn, divê ji bo çareseriya kêşeya avdanê, Iraqê herêma Diyalayê ku bêyî wê nabe ji dest xwe bernede..."[181] Komîsyon dide xuyakirin ku biryara dawî dîsa jî ya Cemiyeta Miletan e.

[181] Vladimir F. Minorsky, bnb, r. 40-43

Piştî biryara dawî a Konseya Cemiyeta Miletan a di heqê kêşeya Mûsilê de, mijar di Meclîsa Îngiltereyê û di Kamaraya Aweman de dibe sedemên nîqaşan. Wek ku di axaftinan de jî wê bê dîtin, gelek mijar bi awayekî hişkere tên îfadekirin. Hin ji van nîqaşan wihan in:

Mr. Runciman (Lîberal): "Heger talûkeyên ku ez wan radixim ber çavan, bi rastî jî biqewimin û em neçar bimînin ku li Iraqê yan jî li Mûsilê dest bi kiryarên leşkerî bikin, bêyî ku em ji şerekî biçûk bêhtir haziriyên mezin bikin, gelo em ê çawan bikaribin 600 mîl ji welatê xwe dûr herekata leşkerî pêk bînin?..."

Serdar (bînbaşî) Glyn: "Tengasiya di tevahiya vê kêşeyê de, ji pirsgirêka mezin a Kurd diqewime. Heta ku pirsgirêka Kurd çareser bibe, ew ê tim dijwarî çêbibin. Kurd niha di navbera Îran, Iraq û Tirkiyeyê de hatine parvekirin. Serê Tirkiyeyê tim bi Kurdan re di belayê de bûye. Heger Kurd di bin rêvebirina Iraqê de jiyaneke murefeh bidomînin, ev wê bê wê wateyê ku Kurdên li Tirkiyeyê wê ne razî bibin û bi awayekî muhtemel ew ê li dijî Hikûmeta Tirk serî hildin û bibêjin 'çima em nebin wek birayên xwe yên li Iraqê?'..."

Sitvan (yuzbaşî) Cazalet (Muhafazakar): "Ez ji dil hêvî dikim ku em ê karibin bi Tirkan re gotûbêj bikin û belkî jî di mercên hêsan de bi alîkariya krediyeke ku em ê li Londonê pêşkêş bikin, dibe ku em karibin windabûna îtibara wan tezmîn bikin, a ku bi awayekî muhtemel ji ber ku nikarin sînorê Iraqê biguhêrînin tengasiya wê li Enqereyê dikişînin... Ji ber sebebên li jêrê, ez dibêjim divê Meclîs pêşniyaznameyê destek bike: Ya pêşî, ji ber sozên ku me di çarçoveya Peymana Anglo-Frensî de daye Ereban; a duduyan, ji ber ku hemû aştî û refaha Rojhilata Navîn bi vê pêşniyaznameyê ve girêdayî ye; ya sisiyan ez li mezhebên xirîstiyan ên di nav Qraltiya Iraqê de difikirim... A çaran; ez wisan yeqîn dikim ku li gorî nêrîna împaratoriya me, em mecbûr in li Îraqa ku li ser riya sereke ya Îngiltere û Hindistanê dirêj dibe em xwedî cihekî bin ku em lingê xwe deynin ser û depo û techîzatên xwe li wir bi cih bikin... (A pêncan), heger em pêşniyaznameyê nepejirînin... divê em di nav çend salan de ji Iraqê vekişin û ev jî tê wê wateyê ku hewce ye em ji Filîstînê jî veqetin û heger em ji Filîstînê veqetin, îcar divê em hemû polîtîkayên xwe yên li Misirê di ber çavan re derbas bikin.... Dawiyê, ez wek şexs bawer dikim ku ji aliyê rewşa fiîlî ve di nav tenzîmên niha de ji bo me mayîna li Iraqê, ji muhakemekirin û vekişîna bi paş ve erzantir e û ji hêla çavkaniyên ewledar ve jî ez wiha hatim agahdarkirin."[182]

[182] Vladimir F. Minorsky, bnb, r. 66-69

Ingilîzan di 21'ê Berfanbara 1925'an de, kêşeya Mûsilê di Kamaraya Lordan de jî nîqaş dikirin. Pêşniyaza berdewamkirina mandatiya Iraqê ya ku Komîsyona Cemiyeta Miletan ji bo maweya 25 salan teklîf kiribû, rast nedihat dîtin. Di van nîqaşan de, tirsa ku dibe êrîşek bibe, li pêş e.

Tirkiye îtiraz li rapora Komîsyonê kiribû. Li ser vê yekê, Konsey di 19'ê Rezbera 1925'an de, ji Dîwana Edaletê ya Laheyê fikara wan dixwaze. Ji aliyê din ve tekiliya di navbera dewletên ku bi Kurdistanê re eleqedar in biqewet dibe û rewş hîn zelaltir dibe. Doç. Dr. Gökhan Çetinsaya derbarê van rojan û lihevkirinên dewletan de wiha dibêje: "Rojnameyên Tirkan di 20'ê Rezbera 1925'an de dinivîsîn ku Wezîrê Karê Derve Tevfîk Ruştu pêşniyaz kiriye ku di navbera Tirkiye, Iraq û Îranê (û heger bixwaze Îngiltere) de yekitiyek, peymanek pêk bê. Vêna wek îspata xwesteka Tirkiyeyê ya aştîxwaz û hestên dostanî yên li hemberî Îranê pêşkêş kirin. Nivîsên di rojnameyan de bal dikişandin ser xetereya di encama hewldanên Ingilîzan ên der barê bikaranîna neteweperweriya Kurdan de bigihe Îranê. Îranê gerek tu carî ji bîr nekiribûya ku di vê mijarê de menfaeta her du dewletên xwedî nifûsa Kurd ên Îran û Tirkiyeyê muşterek in. Li gorî van nivîsan ji bo ku Tirkiye, Îran û Irak di nav lihevhatineke tam de bin her sebep hene."[183]

Di encamê de Meclîsa Cemiyeta Miletan, di 8'ê Berfanbara 1925'an de, daxuyand ku biryara Dîwanê dipejirîne. Çend rojan di pey wê de jî, di 16'ê Berfanbara 1925'an de rapora Komîsyona Pirsyariyê pejirand û biryara ku erdên li başûrê 'Xeta Brûkselê' ji Iraqê re bên hiştin qebûl dike, stend.

Li Enqereyê, li Meclîsa Mezin a Miletê jî li ser meseleya Mûsilê nîqaş û gengeşiyên mezin çêdibin. Lê dîsa jî Tirkiye bi Peymana Enqereyê ya ku di 5'ê Hezîrana 1926'an de hat danîn, hiştina Mûsilê ji Iraqê re pejirand.

Peymana Enqereyê bi navê 'sînor, têkiliyên cîraniya baş û hikmên giştî' bû û ji sê qisman, bi tevahî ji 18 xalan dihat pê. Xala yekem û ya duyem a peymanê, sînorê îro yê Tirkiye û Iraqê tespît kiribûn û xala 14'em jî hiştina ji %10'ê dahatina petrolê ya li herêma Mûsilê ji bo maweya 25 salan ji Tirkiyeyê re derpêş kiribû. Lê belê, Tirkiye piştre di gerawa 500 hezar sterlînê Ingilîz de di vî mafê xwe bihurî.

Di 7'ê Hezîrana 1926'an de, hin gelşên biçûk ên bi Frensiyan re jî, ji holê hatibûn rakirin, bi vî awayî bi giştî sînorê Tirkiye û Sûriyeyê yê îro hatibû pejirandin. Di 13'ê Çileya 1926'an de, ji bo ku hemû şertên di biryara Konseya Cemiyeta Miletan de bikevin meriyetê û ji bo ku bi awayekî tam

[183] Doç. Dr. Gökhan Çetinsaya, Milli Mücadele'den Cumhuriyet'e Türk-İran İlişkileri 1919-1925, Atatürk Araştırma Merkezi Dergisi, Sayı 48, Cilt XVI, Kasım

mercên ku tên gotin bên pêkanîn, di navbera Iraq û Îngiltereyê de jî peymaneke nû hatibû îmzekirin. Di navbera Tirkiye û Îranê de jî di 22'yê Nîsana 1926'an de Peymana Dostanî û Ewlehiyê hatibû îmzekirin.

Bi vî awayî Kurdistan hat parçekirin û parvekirin, sînorên ku îro di nav Kurdistanê re derbas dibin bûn xwediyê navnetewî. Hestên di nav gel de û tiştên li ser maseyan dimeşin ji hev gelekî cuda ne. Salên ewil xelk nizanin bê li ser maseyan çi bûye, ancex bi demê re wê bibînin bê çi bi serê wan hatiye. Ji vê demê heta roja îro ev dewletên ku ji paykirinê xwedî par in, wê di miqabilî Kurdan de hişkere alî hev bikin, wê piştgiriyê bidin hev û Kurd bi van sînoran wê ji hev bên veqetandin, ziman, çand û dîroka wan wê bên binpêkirin, wê bên asîmîlekirin û wê her tim di bin zilm û zordariyê de bin. Di cilda duyemîn de bi awayekî berfireh em ê li ser 'sînoran bi xwe re çi anîn' rawestin.

# CILD II

# SÎNORA BI XWE RE ÇI ANÎ?

*“Nûçeyan an jî radyoyê bi awayekî peryodîk radigihand ku Tirk, Îranî û Îraqî li ser sînorên hevpar ketine pey çeteyên Kurd, Dadgeha Serxwebûnê ya Tirk jî li qederê deh Kurdên ku serî hildabûn, cezayê mirinê biriye û hwd. Naxwe li holê meseleyeke Kurdan heye...”* (L’ O rient, 1 Rezber 1934)*

---

* Celadet Ali Bedirxan, Kürt Sorunu Üzerine, r. 7

# SÎNORÊN SEDSALA 20'AN

Sînorên dewletan, herî zêde di sedsala 20'an de, bi pirbûna avakirina netewdewletan bûn cihên ku kesî nikaribû di wan re bibihuriya. Di vê demê de li ser sînoran tedbîrên giran hatin stendin û li ser kesên di nav sînoran de jî formûlên nû hatin sepandin. Di têkoşînên ku heta wan rojan hatibûn kirin de, çendî li ser hîmê raseriya hêzê ya li dijî hev şer û zordarî pêk hatibin jî, tetbîqeke ku li ser ferdan hatibe kirin da ku şexsiyeta wan tune bike û nasnameya wan biguherîne, tune bû. Lê di nav netewdewletên ku nû hatin avakirin de, ji vî aliyî ve serî li tehde û zordariyên giran hatine xistin.

Netewdewlet di sedsala 20'an de bû wekî moda û wek ku diviyabû her kes wê modayê bişopîne. A rast, heger bi awayekî durist nêzikahî lê bihata kirin, dikaribû rê ji geşedan û pêşveçûnên mezin re vekira. Lê ji ber ku her kes li gorî têgihîştina xwe, bi awayên cuda cuda nêzîkî vê mijarê bû û li gorî xwe şîrove kirin; rewş veguherî kaosê. Problema herî mezin, bêtehemûliya cudahiyan bû. Li gorî têgihîştina hinan, diviyabû kesên ku di hundirê sînorên netewdewletekê de bûn hemû bi eynî zimanî bipeyivîna, xwedî heman çand û dîrokê bûna. Heger cudahî hebûya, ev dibû ku bibûya sedema veqetînê û her wiha windakirina axa dewletê. Loma diviyabû rojek berî rojekê yekrengî, yekçandî pêk bihata.

Gelek dewlet ji bo ku bigihîjin formula yeknetewetiyê, bi mebesta ku cudahiyên di nav sînorên xwe de tune bikin ketin nav hewldanan. Bi armanca ku hemû welatiyên xwe bişibînin hev û hemû kesî bikin yeknetew, nirxên ku ji bo neteweya serwer hatine afirandin li her kesî hatin ferzkirin. Vê yekê

jî kir ku di nav gelek netewdewletan de alozî û gelş derkevin holê, tehde û zilm bên kirin. Kurdên ku li dinyayê neteweya herî mezin a bêdewlet mabûn, di vê demê de ziyan û tehdeyeke zêde dîtin.

Li ser erda Osmaniyan 24 dewletên cihê hatibûn avakirin, lê Kurdistan nebûbû dewlet; heta ew di nav çar dewletan de hatibû parvekirin û parçekirin. Li gorî tespîtên Edmonds "Heta destpêka sedsala 20'an, sînorê berê yê Osmanî û Îranê ku ji Kendava Îranê heta Agiriyê (Araratê) dirêj dibû nêzîkî 2.000 kîlometreyî bû û 1200 kîlometreyê vî sînorî di Kurdistanê re derbas dibû. Piştî 1920'an Îraqê beşeke wê ya nêzîkî 1500 kîlometreyî ji Împaratoriya Osmanî dewr girt; ji vî sînorî jî beşeke biqas 700 kîlometreyî di nav axên Kurdistanê re derbas dibû."[1] Li aliyê din, qismekî Kurdistanê li hêla Sûriyeyê jî ma, ku ew di bin serweriya Frensiyan de hatibû hiştin. Kurdên ku li her du aliyên van sînorên navneteweyî man, ji aliyê siyasî û aborî ve ketin nav tengasiyên mezin. Ne bi tenê Kurdistan, ji ber nakokiyên ku ji sînorên di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de hatine kifşkirin û kişandin derketine holê, her aliyê Rojhilata Navîn jî bû gola xwînê û gelş û arîşeyan bi zêdebûn heta roja me dom kirine.

Kurd di navbera Îran, Tirkiye, Îraq û Sûriyeyê de hatibûn dabeşkirin û ji ber ku bêsînor bûn û bê parastin mabûn, hebûna wan hat înkarkirin. Li hemû parçeyên van dewletan duçarî zordariyan bûn da ku ew bibin miliyetên din. Li hêla din serdestan berê wan dan rewşeke wisan ku ew xwe ji xwebûniya xwe dûr bixin û nirx û hêjahiyên xwe jî tune bihesibînin. Di heman demê de hêzên serdest xwestin ku li ser çanda wan a ku bi hezar salan hatibû civandin, rûnên; an jî Kurdan ji bo ku karibin çanda xwe li ser linga bihêlin û berdewam bikin, kirasên nû li wan kirin. Tehde û zordariyên li wan pir hişk bûn, hatin mişextkirin, navên jîngehên wan û cografyaya wan hatin guhertin, zimanê wan hat qedexekirin, dîroka wan jî hat berevajîkirin...

Esas li gorî gotinên vê demê, dihat xwestin ku ber hemû miletan bê vekirin. An jî miletên bindest mafê diyarkirina qedera xwe, wiha fêm dikirin. Wisan hatibû xeyalkirin ku kesên bi eynî zimanî dipeyivîn ew ê bi awayekî tomerî bi nirxên xwe perwerdehiyeke baş bibînin, ew ê ji tecrûbeyên pêşiyên xwe dersê bistînin, li cih û warên xwe bibin xwedî û li ser hîmên wiha ew ê karibin hîn baştir û xweştir bi pêş bikevin. Gava ku neteweyekê ziman û çanda xwe bi pêş bixista, diviyabû ku heman maf ji miletekî din re jî rewa bidîta. Lê wê demê û bi dû de di gelek dewletan de neteweya serdest zimanê

[1] C. J. Edmonds, Kürtler, Türkler ve Araplar, r. 171

xwe, dîroka xwe, çanda xwe bi awayekî dûrî aqilan derxist ber perê esmanan û miletê li teniştên xwe, ku ew jî xwedî heman mafan bûn, kêm û biçûk dît, wekî tune hesiband.

Kurdistan di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de û di dema ku hat parvekirin de, yanî wexta ji bo serxwebûnê têdikoşiya gelek windahî dan. Madî û manewî ket halekî xerab. Lê rewşa nû ya ku li benda wê bû, hîn xerabtir bû. Sînorên ku li ser şaşî û çewtiyan hatibûn avakirin, ew ê bi xwe re gelek tiştên çewt û ne xweş bianîna.

Kurd di nav dewletên cuda de asê mabûn û duçarî cure cure zordarî, asîmilasyon û dek û dolaban dibûn. Ev yek, ji rewşa di dema Osmaniyan de gelekî cihê bû. Mudaxele rasterast li kesayetiyê, li genetîkê bû. Kurd ji ber zimanê xwe yê dayikê sûcdar bûn, ji ber navên xwe, ji ber awayên şadbûn û hezkirinên xwe, ji ber muzîka ku lê guhdarî dikirin... Rastî helwesteke wisan bêmerhemet û nehişmend hatin ku, tu riyeke revê jî, ya ku karibin pê de herin tune bû. Li hêla din, piştî Kurd û Kurdistan di navbera dewletan de hatin parvekirin, ji aliyê pênasekirinê de jî ew bi rewşeke nikînuh a cuda re rû bi rû man. Êdî pênase û navdanên mîna Kurdên Îranê, Kurdistana Îraqê, Kurdên Tirkiyeyê, Başûrê Biçûk û hwd. derketin holê.

Parçebûna Kurdistanê, kir ku ji bo hêzên serdest û serwer jî neyîniyên mezin biqewimin û derkevin holê. Çendî li ser navê neteweyên serwer, di hin waran de hin pêşketin pêk hatibin jî, ev feraseta ku li ser hîmên ne rast hatibû avakirin, her roja ku çû pirsgirêk hîn bêhtir mezin kirin. Ev sed sal e ku serhildanên Kurdan ên di nav van dewletan de nesekinîne û pirsgirêk jî her çû zêdetir bûne. Ji bo ku serhildan û têkoşîna Kurdan bê fetisandin gelek esker mirin, butçeyên giran hatin xerckirin. Ji ber vê yekê jî gelek êş û jan hatin kişandin, têkçûn û windakirinên aborî derketin. Ji bo nimûne, îro li dinyayê ji pênc dewletên ku deynê wan herî zêde ye, yek jê Tirkiye ye.

Kurdistan, ku ji ber zengîniyên wê parçe bi parçe hate parvekirin û dabeşkirin, bû welatekî wisan ku herî zêde duçarî mudaxeleya derveyî dibe. Kêşeya Kurdan, kir ku her tim deriyên dewletên ku Kurd li wan dijîn, ji mudaxeleyên derve re vekirî bimînin. Yanî ji ber ku wan di nav xwe de çareseriyek dernexist, mahneya mudaxeleya hêzên sêyemîn derdiket holê. Di salên dawî de, dinya qetlîamên ku Sedam anîn serê Kurdan û encamên vê rewşê, roj bi roj şopand. Ev, mînakeke pir vekirî ye.

Li hêla din, çendî hêzên serdest gelek caran li dijî Kurdan hêzên xwe kiribin yek jî, carinan wan bi xwe kêşeya Kurdan li hemberî hev bi kar anîn. Îran

a ku mafên Kurdên di nav xwe de nas nedikir, ji bo ku hin daxwazên xwe bi Îraqê bide pejirandin, demekê Kurdên li Îraqê destek kir; bi heman şêweyê Sûriyeyê jî Kurdên li Tirkiyeyê destek kir û hwd.

Kêşeya Kurdan, bûye sedem ku di siyaseta navxweyî de jî ya dewletên ku Kurd li wan dijîn, gelek şaşî û kêmanî bên kirin. Ji ber pirsgirêka Kurdan gelek rêxistinên ku ji xwe re dibêjin çepgir an jî rastgir, fikarên ku li ser kaxizan diparastin nikaribûn derbasî pratîkê bikin. Çunkî parastina mafên mirovan ên herî xwezayî jî, ji tirsa ku ew ê bi kêrî cepheya Kurdan werin hatin astengkirin. Ji aliyên din ve gavên herî biçûk ên di vî warî de ji bo muxalefetê dibûn melzemeyên antîpropagandayê. Bizav û tevgerên ku çavên xwe li rastiyan digirin û ji nûjeniyan re ne vekirî ne, ne mimkun e bi pêş de herin. Ji loma gelek tevger an jî partiyên ku hêvî bi wan ve hatine girêdan, ji ber ku ji daxwazan re nebûne bersiv, di demeke kurt de vemirîne û ji holê rabûne. Digel vê yekê, ji bo ku Kurd bên pasîfîzekirin û hêzeke li dijî wan bê meydanê, car caran ji tevger an jî ji rêxistinên derveyî qanûnê re, yan jî yên paşverû yên ku nedihatin erêkirin re jî derî vekirî hatiye hiştin. Ji ber van hemûyan, li van dewletan têra xwe geşbûn û pêşketin pêk nehatiye û tim alozî û tevlihevî çêbûne.

Bi kurtasî, pirî caran gelek mijar, ji ber nêziktêdana şaş a li rasteqîneya Kurdan, bi awayekî şaş hatin nirxandin û projeyên ku wê dewlet bi pêş bixistina bi paş de man. Ji aliyê din ve gelek problem jî, yên ku bi nêziktêdaneke rast dikaribûn bi hêsanî bihatina çareserkirin, her çû mezin bûn û bûn sedemên têkçûn û rûxanên madî û manewî; her wiha li pêşiya pêşketin û geşbûnan jî bûn asteng.

Lê belê, helbet ziyan û windahiyên Kurdan hîn mezintir bûn. Bi sînorên ku li ser wan hatin ferzkirin, ji xwedî û dostên xwe veqetiyan; li wî aliyê sînor memleketê wan, keda wan ma, bîranîn û bêrîkirinên wan man... Her wiha êdî Kurd li welatê xwe di rewşeke berovajî de bûn. Ji ber ku li dewletên ew dijiyan xwedî rîska ku ew ê ji wan karibin veqetin, her tim bi şik û guman li wan dihat nêrîn. Bi ramanên ku vê sendromê bi xwe re dianî, diviyabû Kurd tune bihatina hesibandin û ji bo ku ew bişibiyana neteweya serdest jî, diviyabû serî li her cure rê û rêbazên mîna asîmilasyon, mişextî (sirgûn) û hwd. bihata dayîn.

Van sedeman hemûyan kiribû ku her dem hem şerekî hişkere hem jî şerekî veşartî û di bin re li hemberî Kurdan bihata meşandin. Bi vî şiklî, Kurd hem bi awayekî ruhî hem jî bi awayekî bedenî tim bi tunekirinê re rû bi rû man. Di rewşeke wisan de jiyana Kurdan tim bêhizûr bû û ji ber rewşa aborî

ya ne xweş jî, tim di nav keft û leftan de bûn. Ji ber ku her aliyê welatê wan sînor bûn, wê bi pirsgirêkên cuda re jî biketina nav hewldan û kêferatan. Sînor û pevçûnên li ber sînoran jî dê heta dawiya jiyanê di mêjiyên zarokên wan de şopa xwe bihiştina, dîmenên bedenên parçebûyî yên ji ber mayinan jî dê tim li ber çavên wan bûna. Li hin deran wê her roj dengê sîlehan bihata û li hin deran jî ew ê di cih de zêdebûna mirovên seqet bal kişandiba ser xwe. Wê jin bî, zarok jî sêwî bimana. Ji bo ku bi vî halê ruhî karibe jiyana xwe bidomîne jî, hin ji wan wê bibûna xwedî şexsiyetên cihê û cuda. Bi kurtasî, di sedsala 20'an de ji her aliyî ve dor li Kurdan hatibû pêçan û di dereke teng de asê mabûn.

Serpêhatiyên ku ji ber sînoran bi serê Kurdan de hatine, ne bi gotinê û ne bi nivîsê xelas dibin. Em ê hewl bidin tenê di bin çend sernivîsan de, bi hinek mînakan arîşeyê, gelşê bi tevayî bînin zimên. Bi rastî hewce ye ku li ser her mijara sernivîsekê, lêkonînên berfireh bên kirin. Lê ez bawer dikim ku tenê bi dayîna çend mînakan be jî wê hin rastî bêne xuyakirin.

## SÎNORAN DÊ Û WELED JI HEV QUT KIRIN

Wateya sînorên di nav Kurdistanê de li cem desthilatdaran bi rengekî ye û li cem Kurdan, li cem şêniyên ku li ser sînoran dijîn bi rengekî din e.

Ji bo dewletan, piştî ku sînor hatin çêkirin û danîn bi şûn de, erdên ku di nav sînoran de man welat bû, kesên di nav van axan de jî welatî û wî aliyê sînor jî dijmin bû. Lê ji bo Kurdan wateya sînor cuda bû. Beşeke welat li wî aliyê sînor maye, li aliyê hember erdê wî heye; ew axa ku bi salan cot dikir û diçand, ew xaka ku nanê wê dixwar. Li aliyê din dostê wî heye ku gava di nav wan sînoran de, yên ku dor lê pêçabû, diket tengasiyê, dikaribû biçûya xwe li wî bigirta. Bi vî awayî Kurd bi van sînoran, ji kesên herî nêzî xwe, ji beşeke girîng a welatê xwe hatine qetandin û ji gelek zengîniyên axa xwe jî hatine mehrûmkirin. Diyarbekirî man bi hesreta Kerkûkê, mûsilî man bi hesreta mahabadiyan û hwd... Sînor ji bo Kurdekî zeviyeke mayinkirî ye, ku wî ji wî diqetîne, esker e ku her serê gavekê wî dixe bin çav. Jixwe kesên ku li ber tixûb (hidûd) dijîn; wexta li baxçeyê xwe rûdinên, li ser banê xaniyê xwe li derdorê dinêrin, tim li hember kulûbeyên leşkeran ên çekdar in û li ber mayinan in, ku bêhna mirinê ji wan tê...

Yên ku di demên pêşî de di sînoran de man, bê dilê xwe û bêyî daxwaza xwe ketine nav pêvajoyeke awarte. Kurd di nav sînorên dewletên cuda de, bi rewşên cihê cihê re rû bi rû ne. Wek mînak, piştî ku sînorên navbera Tirkiye û Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê (YKSS) hatin diyarkirin, Kurdên misliman ên ku li ser sînorên YKSS dijiyan koçî aliyê Tirkiyeyê û Kurdên Êzîdî û Ermenî jî koçî aliyê YKSS'ê dibin. Zehra Ayman, ku ew bi xwe jî

Qersî ye, di xebata xwe ya tezê ya bi navê 'Wek Cihê Vebîrê Sînor û Yêndintî; Bajarê Qersê' (Bellek Mekanı Olarak Sınır ve Ötekilik; Kars Şehri') de, di çaxa pêşî a diyarbûna sînoran de, der barê derbasbûnên di sînorên Qersê de û der barê mirovan de, yên ku ji jîngehên xwe hatine qetandin, van tiştan vediguhêze:

"Kesên ku bi eşyayên xwe yên hindik, mal û gundên xwe diterikandin û direviyan, kal û pîrên wan, yên ku zarokên xwe yên di pêçekê de hiştibûn, bi kulav û merşan li ser Erezê pergaleke wek pirê çêdikin û bi vê riyê derbasî vî aliyî dibin. Lê xuya ye wê demê av bilind e, hin kes li ber diçin û difetisin. Di nav vê gelemşeyê de, yên ku li heyatê dimînin tên li gundan bi cih dibin. Pêvajoyên mîna travmaya şer, mirin, bêmilkîtî, hatina wan a mecbûrî ya ji gundên xwe yên hema li ber wan, piştî hatinê ji ber axatiyê bêerdbûna wan, rû bi rû mayina wan a li hemberî rêveberiyeke nû, mecbûriyeta qebûlkirina nasnameya neteweyî ya Komara Tirkiyeyê û hwd. dest pê dike. Belkiz Ayman (ku diya min e), ji nifşê duduyan ê kesên koçber e. Di sohbeta me de ku me li Stenbolê di 28'ê Gulana 2005'an de kiribû, vedigot ku dapîr û bapîrê wê bi texmîna ku di 18 saliya xwe de koç kiribûn, heta mirine 'welat' ji devê wan neketiye. Dema baran bariyaye jî çûne jora gund û li aliyê din î sînor, li çiya û gundê xwe nêrîne. Hewl dane ku kevirên Çiyayê Elegezê yên piştî baran disekine dibiriqîn û gundê wan ê bi sayîbûna dinyayê re kifş dibe, bibînin û giriyane. Wan jê re vedigotin ku, li wê derê jiyaneke wan a dewlemend û bi bereket hebû. Yek ji tiştê aîdî wê demê yê ku gelekî tesîra wê li diya min bûye çîroka diya wê ye, ku di dema revbezê de ew hîn di pêçekê de ye: 'Gava qefle bi qefle ber bi vî aliyî ve meşiyane, nikaribûne diya min hilgirin. Diya diya min gava ew aniye dinyayê miriye. Yanî diya min sêwî bû. Wan li rê diya min daniye aliyekî. Kesên ku hatine hiştin pir in, mesela meteke me heye ku begek lê asê bûye, pîr û kalên din hene. Piştî demekê ku apê wê pê dihise, vegeriyaye çûye diya min aniye, yan na diya min li wir terkî mirinê hatibû kirin.'

"Seyid Beg ê ku li wir mabû, nikare di dema revbezê de were vî aliyî û li wir wek ku êzîdiyek be ji xwe re bi qasî şeş salan digere. Paşê aşiqî keçeke Ermenî dibe. Piştre gava pê dihisin ku ew misliman e, wî li trênekê siwar dikin û wî mişextî Sibîryayê dikin. Li devereke daristan xwe ji trenê diavêje, dîsan demekê wisan digere. Dawiya dawî Çemê Erezê yê ku tim bûye asteng, vê carê rê didê û tê Qersê malbata xwe dibîne. Tê gotin ku di salên pey re tim ji bo yar û evîndara xwe ya li wir giriyaye.

"Çîrokek jî li ser Arakel Eloyan e, ku ew di dema şer û pevçûnan de ji aliyê Agiriyê derbasî Ermenistanê bûye û di demên 1926'an de debar nekiriye li Erezê xistiye dîsa derbasî vi aliyî bûye, lê piştî ku sê mehan geriyaye ji ber xofa ajantiyê her du dewlet jî ketine alarmê.

Tesîra mirina heşt kesan ên ku xwestibûn di sala 1952'an de di sînor re derbas bibin miheqeq heye, ku hema bibêje ji wê demê û vir ve êdî kesî teşebûsî vê yekê nekiriye. Kesên ku bi rizaya xwe li wir mane, Peroya ku êzîdiyekî ew revandiye û lê asê bûye, çîroka qetlîamên çeteyan ku wan li dijî hev kirine, çîroka jinikê û sê zarokên wê ku Ermeniyekî ew xelas kirine, çîrokên li ser derdorên Erezê, bûyer û qewimînên di dema mubadeleya (pevguherîn) nefermî de, ya ji vî aliyî ya xiristiyanan û ji wî aliyî jî ya mislimanan, ev hemû raboriyek in ku ji pêşerojê re şop hiştine. Erez, ku tê qebûlkirin Adem û Hewa lê jiyane, ji Çewlikê (Bîngolê) dizê û ji çar çemên pîroz yek e ku di tevahiya dîrokê de wek 'sînorê sirûştî' hatiye pejirandin. Ew li hemû welatên ku di wan re derbas dibe hem zêde hatiye hezkirin hem jî ji ber taybetiya xwe ya ku bûye warê sînor û şer, bûye cihê tirsê."[2]

Zehra Ayman, serhildana cografyayê ya li dijî sînorên çêkirî, ne xwezayî jî, bi vî awayî tîne zimên:

"...Mekan tim wek ku mê be 'sekinî, girtî û pasîf' xuya dike; lê mîna Agirî ku qûntarên wê sînorên sê dewletan derbas dikin, wek Erez ku hem sînor e û hem jî diyar bi diyar digere, yan jî wek Asî ku bi qayîş ters diherike, tu dibêjî qey di nava xwe de berxwedaneke cuda dihewîne. Çiyayê bilind ê ku her komên li derdorê pîrozwerî û tedbîrên cuda lê bar dikin, çendî di xerîteyê de di nav sînorên Tirkiyeyê de be jî, Agirî yê ku li nêzîkî wê jî 'çav têra ku çiya hemûçkî bibîne nake' tam li hemberî Erîwanê, bi têgihîştinên li wê derê û bi muxeyîleyê wir re di nav têkiliyeke bêsînor de ye; eynî mîna Çiyayê Elegeza li wir, a ku 'ji vî aliyî' ve xuya dike."[3]

Vegotinên Zehra Ayman tenê çend mînak in, bi milyonan bûyerên bi vî awayî qewimîne. Bi salan û di her nuqteyê de, wê ev dramên bi vî cureyî pêk bên û werin serê kesan. Li hin cihan çemekî har ê ku pirên wî hatine hilweşandin, bûye sînor; ew çemê ku kî bikeve ber pêla wî, wan bi xwe re dibe û hey dibe. Li hin cihan jî, têl hatine kişandin an jî mayin hatine çandin û ew erdên bi xêr û bereket bûne kemînên mirinê. Dera herî nêzîk ya li ber çava bûye gelek cihê dûr û cihê ku insan nikaribin xwe bigihîninê. Di encamê de sînoran raboriya mirovan û bihevretiya wan a dîrokî parçe kirine; dil û keze-

---

[2] Zehra Ayman, Bellek Mekan Olarak Sınır ve Ötekilik; Kars Şehri. r. 92-93
[3] Zehra Ayman, bnb(berhema nav buhurî), r. 103

ba nas û dostên ku her yek ji wan li aliyekî sînor maye şewitandine; dawî li têkiliyên wan anîne, heta mêjiyên mirovan jî bi sînor kirine.

Hin sînor di destpêkê de sist hatine hiştin, lê bi demê re tedbîr hatine zêdekirin û derbasbûna di wan re hatiye asêkirin. Carinan ne tenê sînor bi xwe, kes nikaribû here cem war û qadên nêzî sînoran jî, nikaribûn herin wan deran bibînin, heta hin caran xwediyê araziyan jî nikaribûn erdên xwe biajon û bi kar bînin. Yanî sînorên ku hatine danîn û tetbîqên ku li van deran hatine kirin, her tim jiyana kesên li vir tehdît kiriye û jiyana wan zêde hatiye sînordarkirin.

Sînorê di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de cara pêşî di sala 1928'an de hat tescîlkirin. Di vê demê de hin gundan teref guhertine, tevîkirina hin gundan a nav sînorên Sûriye yan jî Tirkiyeyê tesadûfî bûye. Mala hin kesan li aliyekî, milkên wan li aliyê din maye û gelek jîngeh jî bûne du şeq.

Ji ber ku di salên destpêkê de astengên mîna têl û mayinan tune bûn, çendî ne bi qasî berê be jî, çûn û hatinê berdewam kiriye. Li Nisêbînê dema jinekê behsa wan rojan ji min re kiribû, gotibû ku gelek caran ji gundê xwe yê li nêzî sînorê Tirkiyeyê, ji bo berhevkirin û çinîna kerengan li sînor xistiye, derbasî aliyê Sûriyeyê bûye. Yeke din jî digot ku ji ber hewcedariya avê, rojinan çend caran derbasî wî aliyê sînor bûye av ji mala xwe re kişandiye.



*Sînorê di navbera Nisêbîn û Qamişlo de. Wek ku tê dîtin sînor Nisêbîn rapêçaye.(Wêne ji Google Earthê, 2008)*

Di Peymana Enqereyê de, ya ku di navbera Tirkiye û Frensiyan de hatiye morkirin, tê îfadekirin ku mafê îstifadekirina ji çêregehên vî alî yan jî wî aliyê sînor heye, her wiha kesên ku mal û milkên wan, araziyên wan hebûn jî dikaribûn ji mafên xwe yên berê sûdê wergirin. Dikaribûn heywanên xwe, amûr û pêdiviyên xwe, bêyî ku gumrik an jî bacê bidin, veguhêzin wî aliyê xetê. Di navbera salên 1938 û 1952'yan de jî kesên ku zeviyên wan li wî aliyê hember hebûn, ji bo hilanîna zadên xwe, ji bo çûn û hatina rojane, mecbûr bûn ku belgeya bi navê 'pasavan'ê ji xwe re bistînin.

Heta serê salên 1950'yî sînor bê mayin e, bi awayekî firk li ser sînoran qereqol û esker hene; kemîn jî gelekî firk in. Çendî derbasbûn bi destûr be jî, tedbîrên li ser sînoran ew qas ne zêde ne. Wek tê zanîn, di nav Kurdan de têkiliyeke xurt a xwedîtiyê heye. Di vê demê de, di navbera xwediyan de yên li ber sînor, hindik be jî têkiliyan dom kiriye. Xizm û lêzim çûne serdana hev, dan û anîna keçan berdewam kiriye, her wiha çûne şîn û dawetê hev û din jî.

Jixwe heta mayin nehatine danîn, sînorê di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de, di mêjiyê Kurdan de tune bû. Di peymanan de, ew xeta trenê bûbû sînorê veqetandinê, lê di nav xelkê de tenê Serxet û Binxet hebû. Her du alî jî welatê wan bû; ji xetê û wir de ne cihekî xerîb bû. Yên li wir dijiyan, xwediyên wan, nasên wan bûn. Êdî, tenê ji ber xeta trenê navê her du aliyan Serxet û Binxet e. Lê ji bo kesê pêşketî û siyasî, xeta trenê xeteke ji xwînê bû, ya ku welatê wan parçe kiribû. Xetek bû ku di parvekirina welêt de cihê hukmê Frensayê û yê Tirkiyeyê ji hev cuda dikir. Ji aliyê din ve, yê ku ji ber hukûmeta Tirkiyeyê bireviya, dema digihîşt xetê digot "Em xelas bûn." Li cihê diçûnê, xwediyên wan hebûn, deriyê xwediyê wan ji wan re vekirî bû. Lê li wir jî ji ber ku ji mal û warê xwe qut dibûn, dîsan bi êş û hesret bûn.

Bi kişandina têlan û bi çandina mayinan ji nişka ve her du aliyên sînor ji hev veqetiyan û hesret zêdetir bûn. Bi ser de, her roj jiyan ji dest çûn, mirin çêbûn. Di destpêkê de piraniya gel nizanibû mayinên ku hatibûn binerdkirin çi ne. Dema wek berê xwestin herin û bên, mayin ew parçe kirin û ew ber bi perê esmanan ve firandin. Piştî mayin bi wan de teqiyan û her ku derbas bûn tiştek bi serê wan de hat, ji nû ve di nav xelkê de ew xet bû sînor.



*Sê jinên ku têlan ber wan girtiye bi hesret li wiyalî sînor(Qamîşlo) dinêrin (Nisêbîn).*[4]

[4] Foto: Selmet Güler



*Salên ku mayin hatine danîn (1959) li aliyê sînorê Dîlokê taximê siwaran yê ku li ber sînor nobedar in. Ev sûret ê arşîva Ergin Konuksever e ku ew fermandarê van siwariyan bû.*[5]

Xelkê her du aliyan, xwedî û nasê hev ji hev qut bûn. Bi piranî zarokên ku nuh çêbûn û yên zarok bûn mezin bûn, xwediyên xwe yên ji sînor û wê de nas nedikirin. Dê û bavên wan carna behsa xwediyên wan ji wan re dikirin. Di dema ku xwedîtî di nav Kurdan de gelekî xurt bû, xweh û bira, xal û xwarzî yê her yekî li aliyekî sînor mabûn, hevdu nas nedikirin. Encex piştre bi salan, di dema cejn û îdan de, destûra hevdîtina hev ya li ber têlan derket. Xwediyên ku li her du dewletan dijiyan, li ser sînor her yekê li aliyekî têlên bi direh, di



*Demê berê hevdîtina di sînor de, Nisêbîn*[6]

[5] www.turksolu.org
[6] Foto: Hasan Aş



*Di cejnekê de hevdîtineke ber sînor*[7]

nav wê qerebalixa xilbe de bi zor hevdu didîtin, dengê xwe dibirin hev, pakêt di ser têlan re ji hev re diavêtin û hema piçekî be jî hesreta salan ji dilê xwe derdixistin. Bi dehsalan van dîmenên derî mirovahiyê dom kirin. Gelek caran, bi baheneyên cuda cuda ev hevdîtin jî dihatin betalkirin. Cara pêşî Rêbendana (Kanûna Paşîn a) 2000'î de, di Cejna Remezanê de çûna îdaniya hev a dersînor hat qebûlkirin.

A rast dîmenên li ber sînoran, gelek tiştan didin xuyakirin. Ji ber vê yekê demên serdana cejnan yek ji kêliyên taybet in. Hevdîtin û serdana cejnan a li ber sînoran, dîmenên kulturê yên ku sînoran nas nakin in. Ew sînorên ku xwedêgiravî ji bo parastina hemwelatiyan ji ber êrîş û mudexaleyên derve hatine danîn, di dema hevdîtin û serdanên cejnan de tê dîtin bê çawan gel ji hev û din qut kiriye. Ev hevdîtin dibe bersiveke herî bedew a Kurdan, ji bo hidûdê ji aliyê dewletan li ser wan hatiye ferzkirin. Di vê rewşa hanê de ku qerebalixî, gelemşeyî û hêsrên çavan lê serdest e, pirî caran demên hestiyar û sehneyên dramatîk çêbûne.

Bîranîna Hutî Aslan, yê ku li gundekî Nisêbînê hatiye dinyayê, di vê mijarê de nimûneyek e. Ev serpêhatî drama ferdên malbatekê vedibêje, ya ku bi salan hesreta hevdu kişandine:

[7] www.netkurd.com

“Xweha min a mezin bi coşekê û daweteke mezin hatiye guhestin. Li gor ku bavê min ji min re gotibû, wan xweha min li ser hespekî sor siwar kiribû û biribû gundê Girsor ê ku niha li Başûrê Biçûk dimîne. Dema xweha min diguhêzin, sînor tune ye. Xeta trênê wek sînor hatiye qebûlkirin, lê çûn û hatinê dewam kiriye. Tenê navê vir û wir bûye Serxet û Binxet. Kê bixwesta, ew bi rihetî û bê astengî diçû û dihat. Lê piştî têlên sînor tên kişandin, mayin tên danîn, xweha min ji mala bavê xwe qut dibe û bi salan hevdu nabînin. Pir hesretê dikişîne, wek gelek kesên din.

“Ka bê piştî bi çend salan di navbera Dewleta Tirk û Sûriyeyê de, di der heqê hevdîtinên li ser sînor peyman çêdibin. Di rojên cejnan de kesên dixwestin hevdu bibînin, li ser sînor kom dibûn û her yekê li aliyekî têlan, destên xwe yên ku nedigihîştin hev, ji hev re dihejandin.

“Bûyereke min a li ser sînor, ku wê demê tenê têl hebûn, ji bîra min nare. Ez hîn zarok bûm. Ji gundê Hatxê, bi meşê em çûn gundê Qesra, yê ku li ser xeta trênê, li ber sînor e. Wek me, gelek malbatên din jî dixwestin hevdu bibînin. Dema em gihîştin ser xetê, gelek însan ji her du aliyan gihabûn hev. Nîvî li vî aliyî û nîvî li wî aliyî, di navberê de têleke fireh û bilind û bi dirî hebû. Destê kesekî nedigihîşt hev. Xweha min pir digiriya. Dixwest min maçî bike. Bavê min rahişt min û weke topekê ez avêtim aliyê jêr. Hema ez bi hev re girtim. Piştî sê saetan ez dîsan avêtim aliyê jor. Ez bûme şêst salî, lê ez wê rojê tu carî ji bîr nakim. Ev dîmen ji bo min ma birîneke kûr û tije kul û keder. Ez difikirim ku gelê me bi salan e vê êşa giran dikişîne.”

Yên ku tenê ji bo hevdîtina xwediyê xwe bi rê ketine û canê xwe di sînor de dane jî hene. Bûyera bavê Ahmet Dînç yek ji vanan e. Ahmet Dînç di 12.12.2005’an de li Nisêbînê behsa kuştina bavê xwe ya li ser sînor ji me re kir. Minakên wek bûyera bavê Ahmet Dînç jî pir in û bi vî awayî gelek zarok bê bav mane. Beşek ji vegotina Dînç wiha ye:

“Nîvê xwediyê me li Binxetê ne û nîvî li Serxetê. Bavê min di 1966’an de ji bo ku xweha xwe ji Binxetê(Sûriye) bîne Serxetê (Tirkiye) çû gundê Karahasanê ku bi Qamişlo ve girêdayî ye. Erbetê (di sînorê Tirkiyeyê de) û Karahasanê (di sînorê Sûriyeyê de) li hemberî hev in. Ku derkevin nav erdê xwe karin bi hev re biştexilin; dengê wan diçe hev. Bavê min diçe Binxetê ku xweha xwe bîne. Di vegerê de ji bo bê Erbetê bi çend kesan re tê ser sînor. Bavê min tu carî qaçaxî nekiriye. Tenê wê derbê ji bo xweha xwe bîne çûye.

Bi esker re li hev kirine û bi wî awayî derbas bûne. Hevalê pê re dibêje, ‘Ez ê bi esker re biştexilim û ez ê bêm we bibim.’ Ber bi eskerê nobedar ve diçe. Dema ku hevalê wî bi esker re diaxive, eskerê ku di kemînê de ne li bavê min

direşînin. Bavê min li wir dimire. Ji ber ku bi destûra esker çûbû, bê sîleh bû. Ji nêzîk ve derb lê anîbûn, gelek fîşêk lê ketibûn. Digotin, piştî miribû jî fîşek berdanê. Yên pê re bi paş de vedigerin. Laşê bavê min heta sibehê di nav sînor de dimîne. Gundî pê zanin ku dîsa bûyerek li ser sînor qewimîye, lê nizanin bê çi bûye. Sibehê esker cenazeyê bavê min tînin gundê me Erbetê, teslîm dikin. Ez piştî bavê xwe bi 4-5 heyvan ji dayîk bûme; navê bavê min li min kirine. Em bûn du bira û xwehek..."

Di sînorê Tirkiye û Îraqê û Tirkiye û Îranê de jî eşîret, malbat û erd hatine parçekirin. Çendî berî bi çend sed salan sînorê Tirkiye (ku berê Dewleta Osmanî bû) û Îranê hatibû hişkerekirin jî, sînor tu carî bi qasî sedsala 20'an nebûbû asteng. Ji ber tedbîrên zêdê yên ku di vê demê de hatin stendin, sînor her çûye bêhtir bûye asteng. Di berhema Doç. Dr. Neşe Özgen de, ya bi navê "Teşeyên Bibîranîn û Jibîrkirinê yên Vebîra Civakî" (Toplumsal Hafızanın Hatırlama ve Unutma Biçimleri), sohbeta bi serokekî Eşîra Milan Elî Îhsan Beg re jî heye. Serokê Eşîra Milan, piştî ku behsa kuştina 33 kesên ji eşîreta xwe (Piştre em ê li ser vê bûyera 33 kesan bisekinin.) dike, gotinê tîne ser rewşa eşîrê ya li ser sînor jî. Di vegotinên xwe de diyar dike ku, Eşîra Milan ji çar milan pêk tê û zêdetirî 100 hezar malî ji wan li derdora Ruha û Sirûcê dimînin; zivingên wan li Îranê, zozanên wan jî li ber sînorên Tirkiyeyê ne û wiha didomîne: "Em gava li Qerqeliyê (Ozalpê) li zozanan bûne, ku wê çaxê hidûd vekirî bûye, piştî ku sînor hatiye danîn em li vir mane." Bi vî awayî diyar dike ku hin mensûbên eşîrê di nav sînorê Îranê û yên din jî di nav sînorên Tirkiyeyê de mane. Serokê Eşîra Milan vedibêje ku piştî Artêşa Osmanî bi hêza xwe ya 2 hezarî bi ser wan de çûye, kalikê wî derbasî aliyê Îranê bûye, ji Îranê jî lê xistine çûne Îraqê û di sala 1949'an de bi efûyê îcar vegeriyane Tirkiyeyê. Di vê navberê de wek vê mînakê, bi hezaran Kurd gelek caran bêyî dilê xwe, ji nas û dostên xwe, ji war û cihên xwe veqetiyane.

Wek Eşîra Milan gelek êl û êlat bi sînoran hatine dabeşkirin û parçekirin. Hin eşîr di nav sê dewletan de cih digirin. Mîna Eşîra Şikakan ku di navbera Tirkiye û Îranê de, Eşîra Herkî jî di navbera Tirkiye, Îran û Îraqê de hatine dabeşkirin. Bi sînoran, koçkirina bi awayê adetî ya havîn û zivistanan pêk dihat jî hat astengkirin. Ji aliyê din ve, çendî hindik be jî bazirganiya ku mabû îcar navê wê bûbû qaçax.

Îsmaîl Beşîkçî di berhema xwe ya bi navê "Pergala Rojhilata Anatoliyê" (Doğu Anadolu'nun Düzeni) de, ku di sala 1970'yî de hatiye weşandin, di derbarê mijarê de vana vediguhêze:

"Efyona ku di nava Tirkiyeyê de tê hilberandin û mihên ku bi taybetî li Rojhilata Anatoliyayê tên xwedîkirin, di dergehên sînor re yên mîna Elbak (Başqale), Qerqelî (Ozalp) û Bazîdê bi dizî tên derbaskirin. Li vê beşê têkiliyên eşîretî û xwedîtiyê gelekî dînamîk in. Çawan mirov kare hin milên eşîrên mezin ên li Îranê li Tirkiyeyê bibîne, hin milên eşîrên ku li Tirkiyeyê bi cih bûne jî li Îranê hene..."

Ji bo têkiliyên li sînorê Başûrê Kurdistanê jî şîroveya Beşîkçî wiha ye: "Pevguhertina 4-5 kîlo hirî, 4-5 bizin an mihan, an jî hin malên berxwarinê yên ku li gorî taybetiya herêmê hatine hilbirandin (mîna rûn, penêr û hwd.) yên zêdeyî hewcedariyê heye. Di miqabilî van malan de, ji wê derê hin malên lazimiya rojane yên mîna şekir, dohn, xwê û caw tînin. Wateyeke din a vê rewşê jî ew e ku, li ber sînor her kesek ji xwe re karekî cuda dike. Têkiliyên malbatî, lêzimtî, eşîret û terîqetê sedemên sereke ne yên ku van tiştan hemûyan destek dike. Ji ber ku mercên cografî dest nadin, hemwelatî nikarin bi navendên mîna Hekarî, Beytulşebab, Qileban û Geverê re têkiliyên aborî û civakî deynin û neçar dimînin ku bi Bakurê Îraqê re bikevin nav têkiliyan. Em li vir dibînin ku qaçaxçîtî tune ye, bûyera bi şeklê bihevguhertina malan a eynî ya qadên li ber sînoran derketiye holê. Di encama bandora dînamîk a têkiliyên malbatî, lêzimtî, eşîret û terîqetê de jî, em dibînin ku têgiha sînor a siyasî hinekî din bê tesîr e û li ser kaxiz maye. Ji ber wilo, di van têkiliyan de mebesteke bazirganî nîn e."[8]



*Dîmenek ji serhildana Qamişlo*

Niha em ê bi çend serpêhatiyan li ser hin rewşên din, derûniyên din ên ku sînoran bi xwe re anîne bisekinin. Pêşiyê, em ê li ser bûyera ku wek Qetlîama Qamişlo tê zanîn bisekinin. Ev bûyera ku çend sal berê qewimî, bêmerhemetiya sînor hîn bêhtir bi me da xuyakirin. Qamişlo di sînorê Sûriyeyê de ye. Ez wê demê li Nisêbînê bûm. Ez ê bûyerê ji Nisêbînê yanî bi nêrîna ji aliyê Tirkiyeyê ve veguhêzim vir. Nisêbîn di rex Qamişlo de ye. Hema hema her du wek bajarekî di nav hev de ne. Her sal dûxana agirê Newrozê yê her du ali-

[8] İsmail Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni, r. 278



*Malê pêşî ên Nisêbînê, yên dawî ên Qamişlo ne. Yanî di vê dîmenê de du dewlet hene. Xelkê her du aliyan yek e, xwediyê hev in, lê sînorê mayinkirî di navbera wan de heye.*[9]

yan tevlihev dibe. Kesek ku li ser Riya Hevrêşim (Riya İpekê-li jora Nisêbînê ye) be û li wan binêre nikare wan ji hev veqetîne, wan wek bajarekî dibîne. Gelek şêniyên ku li her du aliyan in xwediyên hev in. Lê sînorê Tirkiye û Sûriyeyê ew ji hev dûr xistine.

Di 12'ê Adara 2004'an de li Qamişloyê serhildana Kurdan çêbû. Li bajarê Qamişloyê yê Başûrê Rojavayê Kurdistanê, berî maça futbolê, ji ber êrîşa Ereban a li ser Kurdan bûyerên ku qewimîn dageriyan serhildanê. Xwepêşandanên li Hesekê, Amûdê, Dêrik, Dirbespiyê û paytexta Sûriyeyê Şamê, paşê li Heleb, Efrîn û Kobaniyê jî belav bûn.

Giranî di Qamişlo de bû. Gelek bûyer ji Nisêbînê dihatin sehkirin, xelk li ber têlan kom dibû lê ji ber sînor kesî nikarîbû tiştekî bike, dest û lingên wan girêdayî bûn. Jixwe bi destpêkirina bûyeran re Deriyê Sînor ê Nisêbînê hatibû girtin û çûn û hatin hatibûn qedexekirin.

Em gişt, ji bo ku em fêm bikin bê çi bûye û çi diqewime, em mabûn li ber televizyonan. Ji ber îhtimala ku telefon tên guhdarîkirin, me telefonî xwediyên xwe nedikir. Gava li Qamişloyê û li bajarên din ên Kurdan, xwepêşandan û numayîşên Kurdan ên ji ber protestokirina êrîşan didomiya, di der barê hejmara kuştiyên di bûyeran de jî agahiyên bi nakokî dihatin dayîn. Li gorî hin agahiyan, hejmara kuştiyan digihîşt 60 kesî û bi sedan kesên birîndar ên ku rakiribûn nexweşxaneyan hebûn, gelek ji wan jî jiyana xwe ji dest didan.

[9] Fot: Eslîxan Yildirim

Li ser mezinbûn û berfirehbûna bûyeran, artêşa Sûriyeyê jî helîkopter, tank, leşker û çekên giran dişand bajarên Kurdan û nêzîkî 2000 kes jî girtin bin çavan.


Li aliyekî li bajarên Kurdan rewşa awarte dihat îlankirin, li aliyê din jî Erebên çekdar kargehên Kurdan talan dikirin. Nûçeyên televîzyonan berdewam dikir: "Li gorî agahiyên ku ji çavkaniyên cihkî hatine stendin, polîsên Sûriyeyê bi awayê ketûber digirin ser malan û ciwanan digirin bin çavan. Tê ragihandin ku gelek dikan û malên Kurdan hatine talankirin û polîsên Sûriyeyê jî li hemberî vê bêdeng dimînin..."

Serhildan li her derê belav dibû, pevçûnên li nav kuçe û kolanan berdewam dikir, mirov dihatin kuştin, cihên kar û dikan dihatin talankirin, mirov dihatin binçavkirin. Bûyer di dema merasîma definkirina kesên kuştî de jî diqewimîn, bûyer mezin û belav dibûn. Vê rewşê bi rojan dom kir. Em, destên me girêdayî, me tenê li bûyeran temaşe dikir û em li benda nûçeyan bûn. Agahî jî ne sererast bûn. Encex piştî çend rojan, piştî çend mehan me yê bikaribûya esehiya bûyeran ji devên kesan guhdarî bikira.

Di vê demê de em, yanî nisêbînî, li gel ku ev tevlihevî û êş cîranên me, xwediyên me dijiyan me nikaribû tu tiştekî bikin; bêyî ku em dengê xwe derxin em li ber têlan asê mabûn û bûbûn temaşevanên bûyeran. Rewşeke wisan bû ku ew cihê ku tu bi gelek aliyan ve girêdayî wê bûyî agir pê ketibû, çavên te ew didît, heger te destê xwe dirêj bikirayê digihîştê, lê te tenê temaşe dikir...

Mijareke girîng a din jî heye, ya li ser veqetandinê ku sînor dibe sedem; ev mijar, mijara wan kesan e ku bi bûkanî, yanî dema dizewicin derbasî aliyê din î sînor dibin. Ev jin dema dizewicin û pê de, bi salan mala bavê xwe nabînin. Ji cihê ku lê mezin bûne, lê lîstine bi dûr dikevin û her tim bi hesreta wê dimînin. Ji heval û hogirên xwe vediqetin. Diherin cihekî ku ji wan re xerîb e. Bi piranî ji Binxetê bûkan tînin Serxetê. Li Nisêbînê gelek mînak hene. Gava tu li sînor dinêrî wek tu ji taxekê herî taxeke din xuya dike, lê mixabin ji ber sînorê asê, ew dera nêzîk gelekî dûr dibe.

Li Nisêbînê di bûyerekê de zarokên sê dayîkên binxetî bi hev re hatin kuştin. Ev zarok dema li erda bi mayin dilîzin, mayin bi wan de diteqe. Mayinên ku ew ji mala bavê wan qut kiribûn, vê carê zarokên wan ji wan stendibûn, kezebên wan şewitandibûn. Kalik û pîrik dengê mayinê dibihîzin, lê nizanin ku pirtikê neviyên wan pê bi hewayê ketine. Her sê diyan hawar dikir ji têlan û wir de, lê dengên wan nediçûn mala bavê wan. Mala wan xera bûbû, lê xwe

*Hizni Turan*

diyên wan nikaribûn bi ser wan ve bihatina. Yek ji wan, diya Hiznî Turan bû. Gava bûyer ji me re got, wek ku ew roj ji nû ve lê biqewime, dikeliya û hêsirên wê diherikîn:

“Ew çar roj bûn ku zavayê me nesax bû. Em çûn mala wan sersaxiyê. Lawikê min bi min re hat sûkê, got: ‘Yadê tiştinan ji min re bikire, em ê biçin geştê.’ Her roj bi min re dihat, wê rojê nehat. Min jê re tişt kirîn, ew vegeriya malê û ez çûm. Ez mam heta piştî nîvroyê, ber esrê min dît telefon ji min re hat. Dengê mayinê nehatibû min. Di telefonê de ji min re gotin, were mêvanê te ji Sûriyê hatine. De ne merivên min li Sûriyê ne. Min yeqîn nekir, min got tiştin bûne; ez hatim.

“Ez hatim, berî ez bigihêm malê, min dît ku va ye dinya xera bûye, li ber derî; ji polîsan, ji eskeran, ji xelkê. Kes di vî bajarî de nemaye ku nehatiye ber têlan. Min got: ‘Çi ye gidî, çi qewimiye?’ Gotin: ‘Zarok di nav mayinan de mane.’ Min got: ‘Pepûk! Ka yê min li malê ye, ne li malê ye?’ Gotin: ‘Em nizanin.’ Bavê yê me çûye ser dîreka ceryanê, dibêje: ‘Gumlekê yê me spî ye, ka ez mêze bikim bê xuya dike yan nake.’ Nabîne. Birayê wî lê digerin, nabînin. Hin ji wan re dibêjin, lawikê we jî bi wan re ye. Îcar me fêm kir ku yê me jî di nav mayinan de maye. Her du yên din derxistin, lawikê min saetekê bêhtir lê geriyan, bûbû parçe parçe. Saetekê lê geriyan heta dan hev. Birayê wî yê mezin wê salê di cih de nexweş ket, ji qehran; wilo parçeyên wî dîtin û lê digeriya. Heya salekê me bir textor heta baş bû.

“Wan laşê wî anibû malê, xwehên wî dilê wan êşiyaye; yek li vî aliyî ketiye, yek li wî aliyî ketiye. Heta eşayê dişon, dibin Mezelê Hecacan vedişêrin, em nizanin. Bajar gişt bi ser me de qoriya. Bû ecêb, digotin: ‘Çilo her sê

diyên wan ji Sûriyeyê ne' her sê zarok li hev bûne kom li kulîlkê. Ji bo kulîlkên şehfelê bidin hev çûbûn nav mayinan, ê min pê li mayinê dike. Îcar her sê mirin. Em diya her siyan xerîb in li vir. Bi sala hizn ji malên me derneket."

Me ev bûyer ji aliyê diyên din ve jî guhdarî kiriye û me di beşên din de daye. Serpêhatiyên di vî warî de jî pir in. Tenê ji bo mînak me çend heb stendin.

Niha tiştekî ku ne ji zû ve hatiye serê min bi xwe, ez ê bi we re parve bikim. Em ê di vê bûyerê de, ji ber sînoran şuxilê nîv saetê çilo dûvdirêj dibe, tiştê rihet çilo zehmet dibe û mirov ji hev çilo qut dibe, bibînin.

Li gorî adetê me, dema mirovek dimire, miheqeq hemû xwediyên wî li mala kesê ku jiyana xwe ji dest daye, kom dibin. Bi piranî, hemû kesên gelekî nêzîk, di veşartina wan de amade dibin. Bi dû de nas û nenas hemû kes tên serdana wan. Wek me berê got, li her du aliyên sînor, xwediyên hev hene û dema mirinek çêdibe gelekî dixwazin herin serdana hev. Lê mixabin dera ku bi çend deqîqeyan tu dikarî xwe bigihîniyê, ji ber astengiyan, çûyîn gelekî zehmet dibe û gelek kes nikarin herin. Niha der barê vê yekê de ez ê serpêhatiyeke malbata me bibêjim.

1'ê Reşemiya (Sibata) 2007'an, me bihîst ku lawikê metika me yê bi navê Xurşît li Qamişlo çûye rehmetê. Mala wî li Qamişlo ye, çar zarokên wî hene. Gelek caran hatibû Nisêbînê; têkiliyên me hebûn û me gelekî ji hev hes dikir. Emrê wî li dor pêncî salî bû, yanî hîn ciwan bû û zarokên wî hîn diçûn dibistanê. Ji ber wilo ve, em gelekî li ber ketin.

Dema cewaba nexêrê ji me re hat, êvar bû. Gelek kesan xwest ku di cih de herin ser cenaze û di van kêliyên zehmet de, li cem zarokên wî bin. Lê ji ber ku sînor di navbera wan de bû, wê êvarê nikarîbûn herin. Heta xwediyê nêzik hemû necivin, cenaze nayê veşartin. Îcar wan cenaze hişt sibehê, heta xwedî ji Serxetê bên. Jixwe di demên wilo de tenê çend kes ji me diherin. Dema astengiya sînor tune bûya, riya wan çend deqîqe bû, wê gelek kes karibûna di cih de biçûna.

Di wê şevê de malbat hemû bi riya telefonan ketin têkiliyê. Ji malbata me çend kesan me xwe kar kir ji bo em derbasî Binxetê bibin. Yek jê mezinê Eşîra Omeriyan, apê me Hesen Axa bû. Zarok û xanima Xurşît nedixwest heta apê me negihê wir, cenazeyê wan bê veşartin. Em fikirîn ku sibehê em bi destûra qeymeqam herin, divê ku di rojekê duduyan de em vegerin. Ev li hesabê me nedihat. Me dixwest em çend rojan di nav meeziya (şîn) wan de bimînin. Me biryar da ku em çend kesên xwedî peseport bi paseportên xwe dakevin Qamişlo û bi dilê xwe vegerin. Apê min, du birayên min, ez û lawekî apekî

me yê din, me biryar da ku em bi peseportê dakevin. Lê peseportên me newîzekirî bûn. Ka em ê çawan bikin? Divê ileh sibehê em li wir bin û di dema veşartina wî de em di nav zarokên wî de bin. Lê ji bo ku em karibin wîzeyê bistînin, gerek em herin Dîlokê (Entabê).

Di vê demê de ez jî li Stenbolê me, nîvê şevê ye; me berê nebihîstiye ku Xurşît nexweş ketiye. Ev xebera nexêrê ji nişka ve ez gelekî êşandim, ez tenê me, dikim dîn bibim. Berî wî, me du apên xwe winda kirine ku ew jî hîn ciwan bûn; em hîn di hizna wan de bûn. Windakirina Xurşît jî da ser û malbat tevde gelekî êşiya.

Ez difikirim, ka ez ê çilo xwe bigihînim ser cenazeyê wî, cem zarokên wî. Navbera Stenbol û Nisêbînê bi teyareyê du saet in, ew rihet e lê çûna Qamişloyê? Ez mam li benda birayên xwe ku ji min re biryara xwe bibêjin. Piştî gotin divê em herin Dîlokê, min di cih de bilêta xwe birî; sibehê zû ez ê bigihêm Dîlokê.

Ji bo ku apê min û birayên min jî sibehê zû bigihîjin Entabê û kêliyek berî kêliyekê wîzeya xwe bistînin, wê nîvşevê ji Nisêbînê dan rê. Difikirin ku wê rê 5-6 saetan bikişîne û wê bi ronkahiya sibehê re bigihin Dîlokê. Bi qehr û bê xew, di rê de bi xeyalê Xurşît re ne. Wan hîn jî yeqîn nekiriye ku ew miriye; ji ber ku wan nebihîstibû nexweş e û berî ne bi gelekî hatibû cem wan. Hatina wî jî, ji bo meeziya apekî me bû. Dûre ji me re gotin qet nexweş neketibû û ji nişka ve dilê wî sekiniye. Dema dilê wî sekiniye li dibistana xwe ya endezyariyê ye û li hemberî şagirtên xwe li ser kursî, bersivên pirsên wan dide. Hîn wilo diaxive, dinêrin ji piya ve ji ser kursî dixile.

Sibehê zû em gihîştin Dîlokê. Malên dostên pir hêja li Entabê hene û bi karê bazirganiya derveyî Tirkiyeyê re mijûl dibin. Me xwe gihand wan û em çûn cihê ku wîzeya Sûriyeyê didin. Ji ber ku gelek caran bi vî karî daketine, bi saya wan dostan me wîzeya xwe heta nîvroyê stend. Saet ji 12'an derbas bûye; ku em vegerin Nisêbînê û ji wir em xwe berdin Qamişloyê riya me nêzîktir e. Lê heta em bigihîjin wir, ew ê deriyê sînor bê girtin û wê rojê em ê nikarîbin herin. Xelkê me yê Qamişloyê jî li benda me ye, yanê heta em negihîjin wir, cenaze venaşêrin.

Li ser çûna xwe, ya ku di kîjan deriyê sînor re em xwe berdin, em û apê xwe peyivîn. Em fikirîn ku em di riya Kilîsê re dakevin em ê zû binxet bibin û em kîngê bigihîjin Qamişloyê jî xem nake. Me got, em niha dakevin hey em ê îro bigihên nav meeziya wan. Em negihîjin veşartinê jî, hema êvarê em ê di nav zarokên wî de bin. Me rabû berê xwe da Kilîsê û di wir re me xwe berda riya Helebê. Di deriyê sînor de em teqnekî sekinandin û wextê me hîn tengtir bû.

Yek ji wan dostên ku li Dîlokê alîkarî bi me re kirin, ji bo me, bi me re hat heta Helebê jî. Hîn em riyan nas nakin, riya ku berê bav û kalên me, sidê û ridê diçûn û dihatin, heta vî emrî em nas nakin. Em ê bi pirsê, bi nêrîna nexşeyê û bi texmînî bidin ser riya Qamişloyê.

Em ji deriyê sînor û ber bi Sûriyeyê ve daketin riyeke pir xweş, her du aliyê wê dar, darên çaman derketin hemberî me. Em bi texsiya xwe çûne. Teqnekî jî em çûne, her du aliyên erd bi qasî ku çavê me didît tije dar bûn. Bi piranî darên zeytûnan û fisteqan bûn; wek ên Dîlokê. Gelekî kêfa me hat. Me got, va ye wan ev erdê hêja baş bi kar aniye. Lê her em bi wir de diçûn û Erebeyên wan pirtir dibûn, em diman ecêbmayî. Erebeyên wan hemû gelekî kevn û tertoqî bûn. Ên nû gelekî kêm bûn. Di cih de xwe dida xuyakirin ku di navbera çend deqîqeyan de em ketibûn dinyayeke din, ferqîyeke mezin di navbera her du aliyên sînor de hebû.

Ji bo em zû bi rê bikevin, em bê firavîn çûbûn. Dostê me bi rê de ji me re mûz kirîn, her yekê me yek xwar, ket ber dilê me. Me nexwest em li cihekî bisekinin û wextê xwe derbas bikin. Me xwest em bi riya xwe de herin, kêliyek berî kêliyekê xwe bigihînin cihê xwe. Dostê me rê ji me re terîf kir û ew li nîvê Helebê daket. Me jî xwe berda riya ku ji me re hatibû gotin.

Hîn di nav Helebê de me riya xwe şaş kir. Carê du sê rê diketin ber me, me nizanibû em ê di kîjanê re herin. Em li riyeke bêdeng, li aliyekî rê sekînîn û me ji şifêrekî ku derbas bû riya xwe pirsî. Bi wî awayî em ji Helebê derketin. Rê xweş in, em dibêjin ku rê hemû wilo baş bin em ê zû bigihên Qamişloyê. Carê em li nexşeyê jî dinêrin ku em riya xwe şaş nekin. Nivîsên li ser rê, li devê riyên mezin hem bi tîpên Erebî hem bi tîpên latînî hene; lê du rê derdiketin pêşiya me ku nivîs lê tune bûn û me nizanibû em ê bi kîjanî de herin. Bi texmînî em diçûn. Ji aliyekî ve jî em gelekî aciz dibin ku ev axa bi me ve, axa bav û kalan çilo em nas nakin. Dema em diherin Diyarbekirê, an Mersînê yan Enqereyê em karin çavgirtî herin; ji ber ku em gelek derban çûne û hatine. Lê ev riya di nav guhê me de, bi me xerîb bû.

Carê zaroyên Qamişloyê telefon didan û dipirsîn bê em gihîştine ku derê. Me dît ku wê gelekî bibe dereng; apê min ji wan re got: “Cenaze li benda me nehêlin. Encex em bi şev bigihên wir. Em zanin xelk hemû ji bo cenaze li benda me ne, xelkê nebahdilînin, cenazeyê xwe veşêrin. Êvar be jî em ê îro bigihên cem we, ev jî baş e.”

Ez dûdirêj nekim. Em nizanin, gelo me riya xwe şaş kir, an jî ji ber ku me bi rê nizanibû em gelekî dereng gihîştin wir. Dema em gihîştin Qamişloyê saet 19.30 bû. Lê em hemû gelekî betilîbûn û rê bi me gelekî dirêj bûbû.

Nexasim ku li me bû şev û pê de em gelekî aciz bûn. Rêwîtiya me ji şevê heta şevê dom kiribû; yanê ku ji Nisêbînê em daketibûna Qamişloyê penc deqîqe bû, lê piştî nêzîkî bîst saetan û gelek zehmetiyan em gihîştibûn Qamişloyê, nav meeziyê. Dema çav bi me ketin, li aliyê jinan bû hawar û qîrîn: "Xurşît birawo!"

Mînakên ku ji Nisêbînê em didin, mirov dikare li her derê ber sînoran bibîne. Ji aliyê din ve wek Nisêbînê hemû herêmên li ber sînor di nav xelkê de kesekî ku xwediyê wan, nasên wan li Binxetê tune ye nîn e. Hemû bi deh salan e vê êş û hesretê dikişînin. Ev rewş heta îro jî berdewam dike. Nûçeyeke ku 5'ê Pûşpera 2005'an di rojnameyan de cih girtibû di vî warî de gelek tiştan dide xuyakirin. Vê beşê em ê bi vê nûçeyê biqedînin.

Li gorî nûçeya rojnameya Radîkalê, keçeke bi navê Leyla Ongun ji Qamişloyê li têlan xistiye û xwestiye di nav mayinan re derbasî cem diya xwe ya li Nisêbînê bibe. Ev keça ku ji bo diya xwe bibîne mirina xwe daye ber çavên xwe, keça yekî ku di sînor de hatiye kuştin e. Wek gelek kesan, bavê wê li ser qaçaxê di nav mayinan de hatiye kuştin. Dema bav tê kuştin, dê ji ber feqîriyê zarokên xwe dide xweha xwe ya bêzarok a ku li Qamişloyê dijî. Bi dû de bi salan ew û zarokên xwe hevdu nabînin.

Leyla li cem xaltîka xwe mezin bûye, heft salan diya xwe nedîtiye. Pêşiyê çûye Konsolosiya Helebê, ji wan xwestiye ku bibe xwedî peseport û bi riya fermî bê diya xwe bibîne. Lê li Sûriyeyê ji ber ku Kurd 'bê welat' tên qebûlkirin nasnameya wê tune û tiştekî bi ser naxe. Dawiyê nema îdare dike, li sînor dixe. Eskerên Tirkiyeyê wê digirin. Piştî meseleyê fêm dikin wê teslîmî diya wê dikin. Helbet her kes wek Leyla ne bi şens e jî. Dibû ku mayin pê de biteqiya, yan piştî girtinê encamin din derketina...



*Leyla û diya xwe.*

## LI KURDISTANÊ HER TIM ŞER HEYE

Windahiyên ku Kurdistanê di dema Şerê Yekemîn ê Cîhanê de dabûn û piştre tiştên ku di dema têkoşîna ji bo serbixwebûnê de qewimîbûn ne bes bûn; sînorên ku li ser maseyan li gorî dabeşa berjewendiyên biyaniyan hatibûn xêzkirin, ew ê gelek tiştên xelet bi xwe re bianîna û herêm wê sedsaleke din bi şer û pevçûnan derbas bikira. Di vê demê de, zordariya li ser Kurdan, di nav her çar dewletan de, bîstikekê be jî, wê qet ranewestiya.

Kurd, ku di nav gelek dewletan de hatibûn parkirin û dûçarî gelek pest, mişextî, asîmilasyonê û gelek miemeleyên derî mirovahiyê man, ev sed sal e ji bo jiyaneke birûmet têdikoşin. Di nav vê maweyê de, hin deman mirovên li her çar parçeyan alîkariya têkoşîna li parçeyekî kirine, gelek caran jî çendî ji hin parçeyên din alîkarî stendibin jî, her parçeyî bi awayekî cuda cuda li ber xwe daye û têkoşiyaye. Lê gava li parçeyekî ji bo Kurdan ber bi pêvajoyeke erênî tiştin qewimîbin, her çar dewletan mudaxeleyî wê kirine û li hêla din zorî dane Kurdên di nav dewleta xwe de jî. Kurd, ji ber ku sînorên wan tune bûn ji her cureyê êrîşê re vekirî mane. Wan jî tim li ber xwe daye. Loma tim di nav keft û leftê de mane. Her wiha ji bo çareserkirina meseleyê tu pêşketinek bi dest nehatiye xistin, her roja ku çûye dewletan hevkariya xwe ya li dijî Kurdan zêdetir kiriye û wan bi êrîş û zordariyên ji berê zêdetir serhildanên Kurdan perçiqandine.

Ji ber ku heta salên 1950'yî hebûna binyatî ya sînoran hema bibêje tune bû, çendî kêm bûbe jî çûn û hatina Kurdan a ba hev ên ku di dewletên cuda de dihatin xuyakirin berdewam kiriye û bandorê jî dom kiriye. Bi gotineke din, sînor di nav xelkê de hîn tune ye. Nîvê eşîrekê li vî aliyê sînor, nîvê din jî

li wî aliyê sînor bû, lê belê wan bi hev re hereket dikir. Wekî din têkoşîna aliyekî tesîr li aliyên din jî dikir û alikarî jî ji hev distendin. Şêx Mehmûd, ne tenê li Silêmaniyê û derdora wê, ku ew li wir dijiya û xwedî araziyekî mezin bû, li nav Kurdên Îranê jî xwedî tesîr û bandoreke mezin e. Endamên eşîra Celaliyan ên li Tirkiyeyê û Îranê jî, bi bend û têkiliyên germ bi hevdu girêdayî ne. Yanî sînorên li ser kaxizan hîn tesîra zêde nekiriye.

Di nîvê pêşî ê sedsalê de, têkoşîna Kurdan a li dewletekê ji Kurdên dewleteke din alîkariyeke girîng a mezin distend. Di dema Serhildana Agriyê de, ku li Tirkiyeyê qewimiye, ji Kurdên Îran, Sûriye û Îraqê alîkarî hatiye stendin. Beşeke girîng a hêzên leşkerî yên Komara Kurdan a Mehabadê, ya ku li Îranê dameziriye, ji hêzên berzaniyan pêk dihat ku ew ji Kurdên Îraqê bûn. Lê di van têkoşînan de ji bilî çar dewletên ku hişkere mudaxele dikin, bi awayekî ne rasterast be jî mudaxeleya hin dewletên mezin jî heye; ji lew re çiqas têkoşîn bi awayekî rast bê kirin jî, Kurd serkeftinê bi dest naxin, tim windahiyên mezin didin û roj bi roj ziyanê mezintir digihîje wan.

Li hêla din, kesên ku di têkoşînê de bi ser neketine û bi awayekî xwe gihandine dewleteke din, îcar mecbûr mane bi wê dewletê re jî şer bikin. Di vegotinan de jî ev wê bê dîtin. Wek nimûne, Şêx Mehmûd, Smaîl Axayê Şikakî, Ferzende Beg û gelek kesên din wexta sînorê dewleta ku tê de ne derbas kirine, îcar li wê derê bi zextê dewleta wir re rû bi rû mane. Digel vê yekê, derdorên wir ên ku alîkarî didan wan jî bê ceza nediman, illeh bi awayekî dihatin cezakirin.

Mijareke din a ku divê bê diyarkirin heye: Piraniya Kurdên alîgirên dewletê, gava ku hewcedarî bi wan nedima, ji ber ku wek potansiyeleke xeternak a Kurd dihatin dîtin ji dewletê re dibûn hedef. Yanî di her rewş û mercê de, kesên Kurd sûcdar bûn û diviyabû bihatina tunekirin. Ji lew re, hin kesên ku berê alîgiriya dewletê kirine paşê poşman bûne û tevî nav refên tevgera neteweyî bûne jî hene.

Di navbera Dewleta Osmanî û Sefawiyan de tim nelihevkirin û şer hebûn û wekî ku di beşa dîrokê de jî hat îfadekirin, Kurdistan qad û warê şer bû. Hema hema tevahiya sedsala 19'an bi belavkirin û hilweşandina binyata îdarî ya Kurdan derbas bû. Warên bicihbûnê bi erdê re hatin rastkirin, hatin şewitandin; bi sed hezaran mirov mirin. Di sedsala 20'an de jî dîsan şer, dîsan serhildan û dîsan îmha hebû. Lê di vê sedsalê de ji bilî demên ku li ser navê perçiqandina serhildanan êrîş dihatin kirin, di demên din de jî bi awayekî sîstematîk taktîk û tevgerên ji bo tunekirina Kurd û Kurdîtiyê hatin meşandin û hîn jî ev yek berdewam dike.

Di rêza pêşî a taktîkan de, ku wê paşê di beşê din de li ser bê sekinandin, stendina tedbîrên li ser sînoran hene. Dewletên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn çêbûne, çiqas xurt dibûn wisan jî tedbîrên xwe yên li ser sînoran zêdetir dikirin. Di salên 1950'yî de li ser û berê sînoran mayin hatin danîn; têl hatin kişandin. Bi vî awayî danûstendin û alîkariya di navbera Kurdan de gelekî kêm bû. Berî 1950'yî di pêvajoya gavavêtinên siyasî de gelek derban hevkarî û alîkariya Kurdên her çar perçeyan gelekî bi hev re heye. Avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) mînakek ji vana ye. Bi navê PDK li her çar parçeyan partî hat vekirin. Pêşiyê di sala 1945'an de li Îranê û paşê jî li dewletên din hatin avakirin. Di demên pêşî de ev partî di nav hevkariyê de ne. Lê paşê wan berê xwe dane bernameyên cuda û awayên tevgerên cihê. Piştre jî Kurdan rêxistinên cihê cihê damezirandin. Îro awayê têkoşîn û binyateke cuda ya her parçeyî heye. Kurd ku hêviya wan a Kurdistaneke serbixwe û yekbûyî şikestiye, îro her yekê di nav dewleta ku tê de ne, ji bo mafê xwe yê otonomî yan jî federasyonê têdikoşin. Têkoşîna Kurdan a ku di sedsala 20'an de bi awayekî bê navber dom kiriye, di sedsala 21'ê de jî wek têkoşîna neteweyî ya herî girîng a dinyayê berdewam dike.

Ji ber sînor û zordariyan, pirî caran haya Kurdan ji hemû bûyerên ku li welatê wan diqewimin tune ye. Helbet bi çend hevokan be jî, bi bûyerên mezin dihisin; lê belê yek bi yek bi bûyerên ku li her derê diqewimin nahisin û bê agahdarî dimînin. Wek ku tê zanîn, derfetên ragihandinê ji yên îro gelekî kêmtir in, her wiha ji ber ku ne xwedî statûyekê ne, ne xwediyê amraz û navgînên ragihandinê wê demê ne jî. Yanî derfeta wan a ku bi hemû bûyeran bihisin û rewşa xwe ya giştî bizanibin tune ye. Lewma gelek caran gel rewşa tevayî û mezinbûna talûkeyê fêm nekiriye û bîra gelek tişta nebiriye.

Îro hîn jî Kurd, ji ber rewşa ku heye, der barê dîroka xwe ya herî nêzik de jî ne xwedî zanyarî û agahiyên rast û durist in. Di demên dawî de, bi derfetên teknolojiya nû û bi derketina hin belge û şahidiyan, tabloya bêmerhamet a sedsala 20'an hîn bêhtir hişkere bûye. Lê hîn jî gelek nuqteyên ku nayên zanîn û gelek tiştên ku tam ne zelal in hene. Ya herî girîng jî, ji ber ku Kurd ji saziyên perwerdehiyê bêpar in, piraniya gel bi van tiştan nizane. Bi ser de, ji ber ku her kêlî bi empozekirina agahiyên şaş rû bi rû ne, bêyî ku Kurd hay ji xwe hebin, ji xwebûna xwe dûr dikevin û di der barê xwe û dîroka xwe de dibin xwedî baweriyên şaş.

Em ê di vê beşê de, li ser êrîş û zordariyên ku di sedsala 20'an de li Kurdan bûne û berxwedana wan a li hemberî vê bisekinin. Helbet em ê nikaribin bi berfirehî behsa tevahiya bûyeran bikin, lê bi çend hevokan be jî em ê gelekan

ji wan bînin zimên. Hingî bûyer û êş pir in, vegotin têrê nake û carna bûyer li dû hev wek lîsteyê derdikevin pêşiya mirov. Yanî dil û ziman pûç dibe û wek dubarekirina tiştan bûyer li dû bûyerê diherike...

Di vir de hindik be jî wê têkiliya di navbera şerên ku li çar perçeyên Kurdistanê qewimîne jî bê xuyakirin. Ji xwe bi baldayîna çend bûyeran jî mirov dikare zor û zehmetiyên têkoşîna Kurdan a bi rûmet bibîne. Ev beş, du parçe ne. Pêşiyê em ê li ser dema heta salên 1950'yî, dûre jî em ê li ser dema ku sînor hatin qewînkirin û pê de bisekinin. Li hêla din, ji ber ku tiştên qewimîne di nav hev de ne û bi hevdu re eleqedar in tiştên li her çar dewletan rûdane min ligel hev dan. Yanî bûyerên li dewletên cuda yên hatine serên Kurdan ne di bin sernavên cuda cuda de ne, ligel hev in. Ji lew re jî di vegotinan de, em ê tim ji dewletekê derbasî dewleteke din bibin.

**Rewşa Heta Salên 1950'yî**

Wekî ku di beşa dîrokê de jî hat diyarkirin, ji ber tesîra Îslamiyetê û ji ber encama bihevretiya bi sed salan, Kurdên ku di nav sînorên Dewleta Osmanî de bûn, ji bin tesîra ruhê osmanîtiyê dernediketin. Yanî Kurdan çendî di navbera salên 1919 û 1922'yan de dest bi teşebûsên girîng ên ji bo serxwebûnê kiribin jî, bi piranî bi Tirkan re tevgeriyane. Dema Tirkiye ava dikirin di dil wan de wek berê dewletek hevbeş ava dikin. Lê belê dûre nihêrîn ku ew ne xwedî tiştekî ne û her bi her kesayetiya wan jî dikeve xetereyê.

Hêzên rojavayî her çiqas hin soz û qerar dabûn Kurdên li Başûrê Kurdistanê, wan jî piştre ev yek neanîne cih. Di pey vê rewşê de, îcar ji bo rakirina ji holê ya hebûna Kurdan pêvajoyeke kesnedîtî dest pê dike. Ji ber vê, heta roja me gelek serhildanên Kurdan çêbûne. Hejmara serhildanan li gor hin derdoran diguherin. Bi îfadeya rayedarên Tirk, li Tirkiyeyê tevî ya PKK'ê hejmara serhildanên Kurdan gihîştiye 29'an. Hin rewşenbîrên Kurd jî dibêjin ku, di dîroka Komarê de hejmara serhildanên Kurdan ne 29 e, ya rast piraniya tevgerên ku wek serhildan û îsyan tên derbirîn berxwedanên li dijî zordariyên dewletê ne. Ji xwe li Îraqê serhildan qet nesekinîn û carna hin maf bi dest xistin. Li Îranê tevgerên girîng hatine meşandin, her çiqasî demeke kin jî ajotibe li vir dewleteke Kurd hat avakirin. Li Sûriyeyê jî têkoşîneke hêja hatiye meşandin. Yanî Kurd tu demê û li tu cihî bê têkoşîn nemane.

Basil Nikitin di berhema xwe ya bi navê 'Kurd' (Kürtler) de, têkoşîna Kurdan wiha dinirxîne: "... Berevajî soz û daxuyaniyên fermî yên xweş û xemilandî, sînor ne bi raman û exlakê mirovane, lê li gorî berjewendiyên

veşarî yên sermayedaran û li gorî endîşeya serokwezîriyan hatin xêzkirin. Piştre jî garantiyên ku ji bo telafîkirinê hatin dayîn û wesayeta Cemiyeta Miletan a ku li ser kaxizan ma, li gorî awayê daxwaza hikûmeta Sain-James (ya Îngiltereyê), bi awayekî qels ket pratîkê. Ji wê demê heta niha bûyeran bi ketin û rabûnê berdewam kir û ketin rewşeke wilo ku nedihatin kontrolkirin, lê pirsgirêka Kurdan ji holê ranebû; jixwe serhildanên bi xwîn, ku nîşaneyên îradeya Kurdan a wek pola bû û nedihat tewandin, tim û tim ev nîşan dane."[10]

Kurd gelek caran bûn qurbana niyeta xwe ya paqij. Di avakirina Tirkiyeyê de jî heman tişt hatiye serê wan. Ji ber ku dema Dewleta Osmanî feşkilî Anatoliyaya Rojava di bin dagiriyê de bû, berxwedana ku Tirk wek Şerê Rizgariyê bi nav dikin li Rojhilat, bi hevkariya Kurdan dest pê dike. Di beşa dîrokê de em li ser vê mijarê sekinîbûn; me îfade kiribû ku heta Peymana Lozanê biratiya Kurd û Tirkan li pêş e û ji ber ku tevlêbûna Mûsilê ya nav Tirkiyeyê di peymanê de zelal nebûbû, ev yek li Meclîsê bûbû sedema nîqaşên mezin. Her wiha me nêzikahiyên Mustefa Kemal ên der barê Kurdan de yên di salên Şerê Rizgariyê de û di berdewamiya gotûbêjên Lozanê de, bi mînak û nimûneyan hişkere kiribûn. Em dikarin helwesta Mustefa Kemal a di vê derbarê de di nivîseke bi mêjûya 28'ê Gulana 1919'an a ku wî ji Mebûs Kamil Beg re şandiye Diyarbekirê jî bibînin:

"... Tê bihîstin ku li Diyarbekirê di navbera Kulûba Kurdan û Tirkan de, hin berberî hene. Hûn ê jî xweş zanibin ku ev yek wê karibe zirareke mezin bide her du nîjadên ku bira ne. Wek usûla îdareyê, muhafezekirina mafên nîjadan meseleyên malbatî ne ku dikarin di navberê de bên halkirin. Di van rojên ku dijminên derve mafên me yên neteweyî û serxwebûna me kirine bin lingan, anîna holê ya van meseleyan wê bibe xiyaneteke mezin. Lew re ez ji bo selametiya memleket ji we rica dikim, ji bo xelaskirina welat hewce ye hûn bi nêrîneke ku armanc yekîtiya neteweyî ye şîretên pêwîst li Kulûba Kurdan bikin û ez li bendê me ku encam bi nivîsekê bê ragihandin."[11]

Wek ku ji îfadeyên li jorê jî tê fêmkirin, nelihevkirin û bihevketinên Kurd û Tirkan, mîna meseleyên nav malbatê ne, ku dikare bên çareserkirin. Mustefa Kemal heta Kongreya Îzmîrê vê nêziktêdanê didomîne. Piraniya Meclîsê jî, bi taybetî parlementerên Kurd wiha difikirin. Gava di gotûbêj û hevdîtinên li Lozanê de mijar dibe veqetîna Kurdan, li Meclîsê bertekiyên (reaksiyonên) mezin tên nîşandan. Der barê Kurdan de, Lord Curzon û

[10] Basil Nikitin, Kürtler, r. 17
[11] Ersal Yavi, Kürdistan Ütopyası-1. Dosya, r. 89

Îsmet Paşa bi hev dikevin. Mebûsê Erziromê Huseyîn Awnî Beg jî di axaftina xwe de ya ku dibû bersivdana Lord Curzon, wiha digot:

"Lord Curzon bi van gotinên xwe yên tewş û berevajî ne tenê dev davêje Kurdan, dev davêje mebûsên Tirkiyeyê hemûyan, ku Kurd jî di nav de ne. Helbet bersiva vê hatiye dayîn. Me tu kesê ku wesfê wî yê rewa nîn e, nexistiye nav xwe. Îsmet Paşa jî, Meclîsa Milet a Mezin a Tirkiyeyê hilbijartiye û şandiye... Ez yeqîn nakim ku îraqiyan di der barê Mûsilê de wekalet dabe Lord Curzon. Delegeyên Kurdan jî li Lozanê li ber çavên wan in. Di der barê Kurdîtî û Tirkîtiyê de gotin a me ye. Delegeyên me yên li Lozanê, nûnerên du bira, yên Kurd û Tirkan in."[12]

Halbûkî di van rojan de wê rêberên Tirkiyeyê Mûsilê bi ser Ingilîzan ve berdin. Di beşa dîrokê de em hebekî li ser nîqaşên li ser Mûsilê sekinîbûn. Sedema herî berbiçav ya ku Tirkiye dev ji Mûsilê berda ev bû: Ji ber ku 8 salê dawî bi şer derbas bibû Tirkiye gelekî di halekî nexweş de bû û hêza wê tûnebû bikeve şereke mezin. Îngîltere jî, girêdana Mûsilê bi Îraqê ve ji xwe re gelekî muhîm didît. Sala Peymana Lozanê hat îmzekirin wek ku di sûretê jêr de xuya dike, hîn gelek eskerê Osmanî li Bexdê hêsîr in. Mustafa Kemal ceger nake cepheke giran li başûr veke. Carna êrîşin biçûk dibin, lê nikarin zêde pê de herin.




Eskerê Osmanî yê ku li Bexdê di destê İngilîzan de hêsîr in(1923). [13]

[12] Dr. Durmuş Yılmaz, Misak-ı Milli'ye Göre; Musul, r. 100
[13] Susan Meiselas-Kurdistan In the Shadow of History

Tirseke mezin bi rêveberên Tirkiyê re heye; Dewleta Osmanî ku hukim li sê qit'a dikir ji hev tar û mar bibû, ne dixwestin tiştên di dest wan de maye jî winda bikin. Loma heke wê bi kêrî wan bihata, Mûsil wek bertîl jî dikarîbû bihata bikaranîn. Li gor hin zanyaran Mûsil di greva Stenbol de hatibû dayîn; loma bêyî tu xirecirê hêzên Ewrûpî bêdeng xwe ji Stenbol vekişandibûn.

Piştî Tirkiyeyê bi gelek welatan re peyman girêdan û dev ji Mûsil berda, ji dostaniya Kurd û Tirkan bêhtir êdî wê tenê behsa daxwaz û mafên Tirkan bihata kirin. Di demeke kin de di hundirê burokrasiyê de jî wê neteweperestiya Tirk dest bi serweriyê bikira. Di pey Makeqanûna 1924'an êdî awayê gotinan û helwest tev tên guhertin. 3'yê Adarê jî Xilafet hatibû rakirin. Mektebê Kurdan tên girtin, Kurmancî qedexe dibe û roj bi roj ji Kurdan re bêhtir xera dibe. Kurd jî vê rewşê qebûl nakin û serhildan çêdibin.

Halbûkî M. Kemal di destpêkê de bi hin rêberê Kurdan re ketibû têkiliyêke dostane, gelek soz ji wan re dabû û meclis nêvî bi nêvî ji Tirk û Kurdan ava bûbû. Lê her ku diçû netewperestiya Tirkan zêdetir dibû û pêvajoyek xerabtir destpê dikir.

Li gor B. Nikitin, Paul Achkar di nivîsa xwe ya bi navê 'Gera Dirêj a Gelê Kurdistanê û Çiyayan' de diyar dike ku "Mustefa Kemal li dijî dagirkirina Ingilîz, Frensî û Yewnanan, Kurd û Tirk ji bo heman mebestê sewqî têkoşînê kirine, hewldanên Ingilîzan ên ku xwestine Kurdan ber bi Xelîfe ve bikişînin encam nedane, her du gelan dest dane hev, Mustefa Kemal soza dayîna erdên hîn firehtir ji erdê ku Peymana Sewrê dida Kurdan daye wan, lê ji ber ku Peymana Lozanê Kurd ji bîr kirine, wan dest avêtiye çekan."[14]

Bi dû înkarkirina Kurdan û rakirina mektebê wan û rakirina xelîfetiyê; Kurd fêm dikin ku fen li wan hatiye û rewş gelekî xeter e. Di vê demê de serhildana Şêx Seîd çêdibe. Di beşa dîrokê de em li ser serhildana Şêx Seîd û encamên wê hebekî sekinîbûn. Di vir de divê em balê bikişînin ser mijareke din jî. Gelek dema bi bahaneya tedbîrên li hemberî Kurdan hin meramên din jî hatine bicîhkirin. Wek mînak ji bo Serhildana Şêx Seîd 'Takrir-i Sükun' tê derxistin, lê di heman demê de vê qanûnê dawî li pergala pirpartîtiyê aniye û rojname hatine girtin. Dadgehên Serxwebûnê ji ber serhildana Kurdan hatine avakirin, lê di vê navê de firsenda darizandina muxalîfan jî bi dest ketiye. Chris Kutschera di vê mijarê de wiha nivîsiye: "... Ev serhildan bû bahane û bi ser hemû muxalîfan de çûn, ew perçiqandin û hemû pêşewayên Kurd, têkilî serhildana Şêx Seîd bûbin an jî nebûbin, ji holê rakirin. Ji ber vê yekê,

[14] Basil Nikitin, bnb, r. 284

çiqas kesên neteweperwer ên ku beşdarî bûyerên sala 1919'an bûne (misyona Serdar Neol) an jî pêşewayên ku wek neteweperwerên Kurd tên zanîn, tevde hatin girtin û gule bi ser wan de hatin barandin."[15]

Heta bi roja me, li ser navê ku li hemberî Kurdan têkoşîn tê meşandin wê bi awayên cuda hewldan û saziyên derqanûnî derkevin holê û ev wê bibe wek kurmê ji darê ku darê bixwe, wê dewletê ji hundir ve birizîne. Çeteyên di hundirê dewletê de yên ku van salên dawî zêde hişkere bûne, encamê van nêzikahiyên xelet in. Mixabin ji tu tiştî ders nehatiye stendin û îro jî bi israr eynî xeletî dom dike. Îro çi kesê li himberî xeletiyê derdikeve dibe Kurdewar. Yanî civat hatiye rewşeke wilo ku nikare li heqiyê xwedî derkeve.

Xeletiyê dema ku Kurd hatin înkarkirin dest pê kir. Wek ku me li jorê îfade kir, heta makeqanûna 1924'an û qebûlkirina veqetandina Mûsilê, Kurd bi piranî bi Tirkan re wek du birayan, bi ruhê misilmaniyê ku li hemberî biyaniyan welatê xwe diparêze tevdigerin. Dema ku Tirkiye hatiye avakirin problema herî mezin li sînorên başûr derketine. Ji ber ku Derya Reş, Derya Egeyê û Derya Spî sînorên xwezayî ne, sînorên bi Îranê re jî (Ji ber berjewendiyên Ewrûpiyan) wek sînorê di dema Osmaniyan de hatiye qebûlkirin; herî zêde pirsgirêk li sînorên başûr derketine. Di dawiya Şerê Cîhanê yê Yekemîn de li gor Mutarekeya (agirbesta) Mondrosê, hêzên Osmanî ji Mêrdîn, Riha û Dîlokê vekişiyane û Frensî ji bo vegirtina van bajaran hatine. Gelên van herêman, yanî Kurdan ev qebûl nekiriye û li himberî Frensiyan rabûne. Di van deman de hêzên milîsan ên herêmî hatine avakirin û bi vê têkoşîna gel, sînorê ku di peymanê de derbas dibe daxistine ber bi başûr ve.

Piştî Tirkiye ava bû û Kurdan dîtin ku hatine xapandin, di herêmê de tevliheviyeke mezin dest pê kiriye. Di sala 1926'an de, li her derê Kurdistanê têkoşîn heye. Her herêm ji aliyê xwe ve berxwedanekê dike. Piraniya kesên ku berê alîkarî dabûn dewletê poşman dibin û ew jî tev li têkoşînê dibin.

Ji belgeyeke Ingilîzan em hînî gelek tiştên girîng ên vê serdemê dibin. Pêşiyê em bi bîr bînin ku 5'ê Pûşpera 1926'an de, Tirkiye peymana ku Mûsil ji Îraqê re dihişt îmze kir. Belgenameya Ingilîzan bi tarîxa 19'ê Pûşpera 1926'an e. Li gor belgeyê, ji Sancaqê nameyek ji Mûsilê re, ji Amîn Begê Rewandizî re hatiye şandin. Ev name ji hêla serekê eşîra Hevêrkiyan Haco, serekê eşîra Ramanan Mihemed Emîn, serekên eşîra Habizbiniyan Bedredîn, Yusif Ziya, Mihemed û Îbrahîm, serekê eşîra Hasariyan Smaîl Heqî ve hatiye îmzekirin. Hin notên ji nameyê wihan in:

"... Her çiqas Konseyên Kurdan ên hatibûn avakirin û kesên rewşenbîr bi

[15] Chris Kutschera, Kürt Ulusal Hareketi, r. 101

qedrê yekîtiya xwe zanibûn jî, dijberiyên eşîrî ku ji ber navtêdana Tirkan û çavnebariya di nav me de derdiketin holê, heta niha hêviya me şikênandiye û em ber bi hêsîriyê ve dehfandine.

...Niyeta Tirkan ew e ku serî li Kurdan bitewînin û paşê jî wan bikin Tirk. Ev yek heta ji hêla zarokên me ve jî baş hatiye fêmkirin. Ji ber rewşa xwe ya berê em poşman bûne û niha jî me di nav xwe de têkîliyên baş danîne.

...Niha em di nav Kurdên Aşîtan de li Senceqê ne, ku bi qasî nîv saetê li başûrê sînor e. Hêza Şatasî 500 kes e. Dema ku hewce bike ev hêz heta 1000 kesî wê zêde bibe.

Ji eşîra Omeriyan Ehmedê Silêman* jî koç kiriye û hatiye Başûr. Ew niha li Nagarayê ye ku şeş saetan dûrî ji cihê ku em lê ne. Niha 500 peyayên wî hene. Dema hewce bike ev hejmar dikare bibe 1000 kes. Hêza serekên gundê Deravarî Tewfo û Nurî ji pêncî kesan pêk tê û hewce bike dikare bibe sed kes. Hêzên serekên eşîra Omeriyan (Devera Sor) Alî Îbn Ehmed, Yusif Îbn Ehmed û Yusif Îbn Osman ên ku niha li Amûdê ne 50-100 kes in. Hêza Huseynê Sadûn, ê ji eşîra Dumbulan ku niha li Qehremaniyanê dimîne 100-200 peya ye. Hêzên Temo, Rizo û Hesen ku ji eşîrên Sînikan, Reşkotan û Bekiran in û niha di nav Kaşxaniyan de ne li derdora 1000-1500 kesî ne. Hemû jî li benda firsendeke bikeys in.

Li Rasilaynê 3000 peya bi Mehmûdê Îbrahîm Paşa yê Mîllî re amade ne û hewce bike ev hejmar wê derkeve 5000 kesî.

1000-2000 zilamên Abdulqadir Begê Darala Beg, ê ji êşîra Qeregeçiyê hene. Ew niha bi lawên Îbrahîm Paşa re di nav têkiliyeke xweş de ye.

(...)

Li wîlayeta Bedlîsê eşîrên Mele Şerîf, Mele Şêxo û Bedrî serî hildane û hema bêje ev salek e bi Tirkan re şer dikin.

Li qûntarên Çîta Spî ya li dorhêla Paloyê bi pêşengiya birayên Şêx Seîd Şêx Tahir û Şêx Abdurrahîm 500 Kurdên Zaza di rewşa xweparastinê de ne.

Ji nameyeke ku ji Doktor Ehmed Sebrî Begê serekê Eşîra Lolan ku di demeke nêz de ji Dersimê hatiye Mûsilê hatiye girtin, tê fêmkirin ku eşîrên li vê herêmê serî hildane..."[16]

Lê Dewleta Tirk tedbîrên tund stendine. Kurd rastî êrîşan hatine, hatine

---

* Axayê Eşîra Omeriya (li herêma Mêrdînê ye) Ehmedê Silêman yek ji kesên ku rê nedaye Frensiyan û bûye sedem ku Nisêbîn di nav sînorên Tirkiyeyê de bê hiştin. Li Nisêbînê, ji gelek kesan min ev mesele guhdar kiriye. Di dema ku Frensî hatine bikevin Mêrdînê kalikê bavê min Ehmedê Silêman, bi hêzên milîs di Nisêbînê de ye. Frensiyan konên xwe li jêra Nisêbînê vedane, lê kirine nekirine milîsên ku ji xelkê pêk dihatin rê nedane wan ku têkevin Nisêbînê. Piştî vê hiştina Nisêbînê ya di sînorê Tirkiyê de tê qebûlkirin.

[16] Ahmet Mesut, İngiliz Belgelerinde Kürdistan 1918-1958, r. 198-199

sirgûnkirin, bi komkujiyê re rû bi rû mane. Jixwe ji dema Serhildana Şêx Seîd ve tunekirin û rêlibergirtina Kurdan bê navber dom kiriye. Hin bûyer wek bûyerên li deverekê qewimiye xuya dikin lê çerx ji bo tunekirina Kurdan dizivire.

Li Îranê jî rewş ne cihê ye. Ji destpêka sedsala 20'an heta îro zext, alozî, şer û serhildan kêm nebûne. Piştî Şoreşa Cotmehê artêşên Rûsyayê ji Îranê vekişiyan û Kurdên Îranê pêşiyên rastî mudaxeleya Osmaniyan paşê jî rastî mudaxeleya hêzên Brîtanyayê tên. Kurd pêşiyê ji ber propagandayên olî bi Osmaniyan re tevgeriyane. Ji ber peymanên dawiya şer hêzên Osmanî vekişiyane, îcar Kurd û Ingilîz mane di hember hev de. Piştî ku Îranê hêzên xwe berhev kiriye Kurd neçar mane ku bi hêzên Îranê re şer bikin. Me têkoşîna Simko Axa ya wê demê di beşa dîrokê de dabû.

Hasan Arfa di pirtûka xwe ya bi navê 'Kurd' de li ser rewşa Kurdên li ser sînorê Îranê ya destpêka sedsala 20'an wiha dibêje: "Heta dema Şah Riza eşîrên li Îranê, mîna eşîrên li Tirkiyeyê û Îraqê bi çek bûn. Lê di dawiya salên bîstan de gav bi gav hatin bêçêkkirin, di dema Şerê Duwem ê Cîhanê de çend salan rawestiyabe jî, îro ev pêvajo qediyaye.* Serekên girîng ên Kurdan, berê ji hêla hikumetê ve wek muhafizên sînor hatin naskirin û ji ber xizmetên wan, bac ji wan nehat stendin.

Piştî şoreşa 1907'an ku desthilatdariya împaratoriyê bi dawî hat, ev eşîr bi awayekî fî'ilî bûn serbixwe. Beşeke welatê Kurdan di sala 1908'an de ji hêla artêşa Osmaniyan ve û di navbera salên 1911 û 1917'an de ji hêla artêşa Rûsyayê ve hat dagirkirin. Di dema Şerê Yekêm ê Cîhanê de ji bo ku li hemberî Rûsan alîkariyê bi wan re bikin Tirkan û Almanan çek dan Kurdan. Piştî şoreşa Rûsyayê dema ku serbazên Rûs hatin kuştin û artêş bi awayekî bi xof vegeriya Rûsyayê li pey xwe gelek çek û muhîmat hiştin, wan ev çek jî bi dest xistin."[17]

Di serdema nû de Kurd, wê bi salan bi zilma Riza Xan re rû bi rû bimana. Riza Xan di sala 1921'ê de bi piştgiriya Brîtanyayê derbeyeke leşkerî pêk anî û hat ser hukim. Riza Xan ku serbazek bû, di sala 1926'an de tac da serê xwe û bi vî awayî Xanedaniya Pehlewiyan dest pê kir. Rejîma Şah her ku çû desthilatdariya xwe qewîn kir û li gel berxwedana Kurdan berxwedana gelên din ên Îranê ango ya Lurîstan, Belûcistan, Xuzistan û Azerbaycanê perçiqand. Li Kurdistana Îranê birêxistinbûyîna civakî û aborî ya Kurdan hat qedexekirin, pêşeng û pêşewayên wan ên herêmî sirgûnî derên cihê yên Îranê hatin kirin,

* Pirtûk di sala 1966'a de hatiye çapkirin.

[17] Hassan Arfa, Kürtler-Tarih ve Politika, r. 64



*Smaîl Axayê Şikakî (yê di navê de rûniştî)*[18]

hin ji wan jî bi zorê li Tehranê hatin bicihkirin. Digel vê rewşê, di wexta desthilatdariya Riza Şah a şovenîst de, ku 20 salî ajotiye, li Kurdistana Îranê tim berxwedan û serhildan pêk tên. Di nav wan de berxwedan û serhildanên herêmî jî hene, serhildanên neteweyî û berfireh jî hene.

Di sala 1926'an de Mehmûd Xanê Kanîsananî li herêma Merîwanê, di salên 1928 û 1929'an de eşîra Mangurê bi rêberiya Mele Xelîl li derdora Mehabadê serî hildaye. Serhildana ku bi pêşengiya Salar-ed-Dewle di sala 1926'an de qewimiye, serhildaneke berfireh e. Salar-ed-Dewle di meha Rezberê ya 1926'an de piştî êrîşa artêşa Îranê, tevî alîkarê xwe yê herî mezin Serdar Reşîd derbasî Îraqê dibe. Serhildaneke din a girîng jî li başûrê Kurdistana Îranê di sala 1931'ê de diqewime. Ev serhildana ku ji hêla Cafer Siltan ve tê birêvebirin hikumeta navendî ditirsîne, ji ber vê Şah Riza hêzeke giran a leşkerî dişîne Kurdistanê û serîhildan bi awayekî hov tê perçiqandin.

Tevgera Simko Axa jî, heta ku di sala 1930'î de ji hêla rayedarên dewletê ve bi xayîntî hat kuştin, dewam kir. Di der barê hêza Simko Axa ya 1925'an de, ku wê demê jî di nav serhildanê de bû, Kakşar Oramar van agahiyan dide: "Riza Mîrpenc ku bi hevkariya Ingilîzan ji pileya serleşkeriyê bû şahê Îranê, di sala 1925'an de ji bo serlêdanekê çû Azerbaycan û Kurdistanê. Armanca

[18] Susan Meiselas, bnb.

wî ya herî mezin ew bû ku riyekê ji bo bidawîanîna serhildana Simko Axa peyda bike û desthilatdariya xwe li hemû Îranê bi rêk bike. Serleşkerên Îranî pir dawa ji Riza Şahê Pehlewî kirin ku dev ji vê sefera xwe berde, lê ew razî nebû û xwest ku ji nêz ve Simko Axa bibîne. Xuya ye hemû di wê baweriyê de bûn ku Riza Şah êdî ji wê seferê venagere û wê bi destê Simko Axa bê kuştin. Dema ew bi 62 kesên ji fermandar û hêza xwe ya taybet ve nêzî bajarê Selmasê dibe, di yekemîn dîtinê de 5000 siwarên Simkoyê Şikakî bi rûyekî sar û girij pêşwaziyê li şahê Îranê dikin û rêzeke taybet jê re nedigirtin. Simko Axa jî wek serokekî Kurd bi kincên Kurdî li hemberî şahê Îranê sekinî û bi pêşwaziyeke sar û bi serê lêvê bixêrhatina wî kir. Piştre her du bi hev re çûn karwanserayekê û li ser pirsgirêkên herêmê axivîn. Wek tê gotin, Riza Şah pir tirsiyabû ku Simko Axa wî û hemû kesên wî bikuje. Ji bo wê jî heta berê sibehê ji tirsan ranezabû û êdî dest ji jiyana xwe şûştibû. Ew her dem li benda wê hindê bû ku siwarên Simko Axa êrîşî wan bikin û tevde bên kuştin. Her çend piştî ew qas bûyerên tal ku Simko Axa bi çavên xwe dîtibûn, êdî baweriya wî bi desthilatdarên Îranê nemabû, lê derfeteke dîrokî ji dest da û wê şevê Riza Şahê Pehlewî nekuşt û ew ji destê wî filitî. Simko Axa piştre di hevdîtinekê ya bi serleşker Ebdulah Tehmasibî re gotibû: Mezintirîn şaşiya min di wê şevê de ew bû ku min Riza Şah nekuşt."[19]

Her çiqas carna ji hêz ketibe jî Simko Axa di navbera salên 1919 û 1930'î de serokatiya konfederasyona Eşîra Şîkakiyan kiriye. Piştî şoreşa Şêx Ûbeydullahê Nehrî (1880) serhildana Smaîl Axayê Şikakî di Rojhilatê Kurdistanê de şoreşa herî mezin û domdirêj e. Loma cihê vê têkoşînê di dîroka Kurdan de taybet e. Mixabin di dawiyê de Smaîl Axayê Şikakî jî bi xayîntiya rayedarên dewleta Îranê hat kuştin.



*Şêx Mehmûdê Berzencî*[20]

Bandora Şêx Mehmûd jî ya li ser Kurdên Îranê heta vê demê dewam kiriye. Têkoşîna Şêx Mehmûd Berzencî ya li Îraqê ku heta 1930'î dewam kiriye û têkoşînên hin Kurdên Îranê di nav hev de ye. Şêx Mehmûd Berzencî piştî êrîşên hikumeta Îraqê ya havîna sala 1925'an çûye Îranê û xwe spartiye Mehmûd Xanê Dîzlî û Mehmûdê Kanîsanan ku serek eşîrên Hewraman û Merîwan in. Hêzên hiku-

[19] www.Kurdistanmedia.com, Kakşar Oramar: 72 saliya Şehîdbûna Lîderê Kurd, Simkioyê Şikak
[20] Hassan Arfa, The Kurds

metê jî êrîşê tînin ser eşîra Kanîsanan û Şêx Mehmûd neçar dibe vedigere Îraqê. Piştî ku ew vedigere Mehmûdê Kanîsananî teslîm dibe û sirgûnî Tehranê dikin.

Êrîşkirina ser Şêx Mehmûd di sala 1926'an de jî dom dike. Vê carê jî hikumeta Îranê alîkariya hikumeta Îraqê dike. Di 3'yê Rezbera 1926'an de hêzeke artêşa Îranê ku ji 300 leşkeran û 700 siwariyan pêk dihat êrîşê dibe ser Kurdên Pişderî ku baregeha wan li bajarê Kela Diza ya Îraqê ye. Piştî pevçûnên çend saetan nêzîkî 100 windahiyên Îraniyan çêdibin û neçar dimînin ku ji qada şer paşve vekişin.[21]

Ferzende Beg ku di nav gel de li ser qehremaniya wî gelek stran hatine gotin, tevli serhildana Şêx Seîd bûye, piştî ku serhildan têkçûye tevî komeke ji 150 kesî pêkhatî derbasî Îranê bûye. Dema derbasî hêla Îranê bûne, bi hêzên ewlekariyê yên Tirkan re ketine şer û di vî şerî de Ferzende Beg birîndar bûye. Li wir hêzên Îranê ji wan xwestine ku çekên xwe teslîm bikin, lê Kurdan ev daxwaza wan qebûl nekiriye û şer qewimiye. Bavê Ferzende Beg jî di nav de, tevî gelek kesên girîng di vî şerî de windahiyên mezin çêbûne. Ferzende Beg di van pevçûnan de xwe xelas kiriye û heta demekê li Îranê maye. Lê di dema Serhildana Agiriyê de vegeriyaye Tirkiyeyê, tev li hêzên Kurdan bûye û bûye yek ji fermandeyên girîng. Piştî têkçûna Serhildana Agiriyê careke din diçe Îranê û li wir birîndar dibe. Di navbera Îran û Îraq, Tirkiye û Îraq, Tirkiye û Sûriye, Sûriye û Îraq, Yekîtiya Sovyetan û Tirkiyê de alîkariyên wisa didomin.

Li Tirkiyeyê, tiştên piştî serhildana Şêx Seîd hatine kirin bûne sebep ku serhildan bê navber berdewam bikin. Piştî serhildana Şêx Seîd ne bi gelekî



*İhsan Nûrî Paşa(Ji çepê ve yê çaran) Xalis Beg (ji çepê ve yê duyemîn), Ferzende Begê Hesenî(Ji rastê ve yê sêyemîn), Ehmedê Hacî Bro (li rastê)*[22]

[21] Chris Kutschera, bnb, r. 131

[22] Susan Meiselas, bnb.

Serhildana Agiriyê dest pê dike û bi salan dom dike. Serhengê Ingilîz W. C. Elphinston ku li ser Kurdan hin lêkolîn kirine, li ser sedemên Serhildana Agiriyê wiha dibêje:

"... Bi awayekî tund perçiqandina serhildana Şêx Seîd û darvekirina Şêx Seîd bûye sedema pêkhatina kîneke mezin, lê sebeba serhildanê ne ev tenê ye. Sedemeke din ya muhîm a vê serhildanê siyaseta Tirkan bixwe ye. Di vê navberê de siyaseta Tirkan, dixwest gelên din ên ku ne Tirk in bike Tirk, hemû hindikahiyan asîmîle bike û qet nebe hindikahiyên Misilman di nav neteweya Tirk de bihelîne."[23]

Serhildana Agiriyê di sala 1926'an de dest pê kiriye. Dema ku di sala 1926'an de, serekê eşîra Celaliyan Îbrahîm Beg (Broyê Heskê Têlî) serî hildide û li çiyayê Agiriyê bi cih dibe, ev dibe çirûska pêşî a serhildanê. Paşê bi pêngavên rêxistina Xoybûnê (Xwebûnê) serhildan bi awayekî xurt tê birêvebirin.

Rêxistina Xoybûnê piştî hin hewldanan di sala 1927'an de hat avakirin. Rêxistin di 'Nîzamnameya Umumî û Peymanî Milî' ya xwe de wiha qala avabûn û armanca xwe dike:

1-Bi biryara Kongreya Yekem a Kurdan ku di sala 1927'an de di roja pêncan a meha teşrînî ewel (Kewçêr) de kom bûye, bi navê 'Xoybûn' rêxistineke netewî ya Kurdan ava bû.

2) Mexseda cemiyetê ew e ku Kurdistan û Kurdan ji bin nîrê Tirkiyeyê azad bike û di nav sînor û miliyeya wê de dewleteke Kurdistanê ya serbixwe ava bike.[24]



*İhsan Nûrî û jina wî Yaşar Xanim*[25]

Rêxistina Xoybûnê General Îhsan Nûrî Paşa* wek 'Delegeyê Leşkerî yê Agirî û Fermandarê Giştî yê Tevgera Netewî' tayîn dike. Îhsan Nûrî ji Îraqê diçe Agiriyê û nû digihîje wir ji şervanên

[23] Rohat Alakom, Xoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması, r.75

[24] Rohat Alakom, bnb., r. 127

* General Îhsan Nûrî Paşa li Bedlîsê hatiye dinyayê. Di sala 1910'an de wek serheng tev li artêşê bûye. Demekê li herêma Bazîdê serleşkeriya hêzên li ser sînorê Osmanî û Îranê kiriye. Li Albanyayê, Yemenê, Erzeromê û di sala 1919'an de jî li hemberî Yewnanan şer kiriye. Di heman salê de bûye serokê Desteya Nûnerên Serbazên Garnîzonê ya li Stenbolê. Ji bo ku alîkariya M. Kemal bike li hemberî hikumeta Ferît Paşa serî hildaye û kiriye ku hikumet zû hilweşe... Ji bo daxwazên alîkariyê yên Kemalîstan ên ji Yekîtiya Sovyetan, li Bakuyê hatiye wezîfedarkirin. Di artêşa 12'emîn de ketiye wezîfeyê. Di sala 1920'an de tev li şerê Tirk û Ermenan bûye... Wexta piştî avabûna komara Tirkiyeyê, dît ku dewleta nû soza xwe ya ku wê Tirk û Kurd xwedî heman heqan bin negirt, bû endamê Komîteya Serbixwe ya Kurdistan...

[25] Susan Meiselas, bnb.

Kurdan hêzeke leşkerî kom dike (1927). Îhsan Nûrî ku di gelek wezîfeyên girîng ên leşkerî de cih girtiye, hêzên Kurdan perwerde dike. Şervanên xort unîforma li xwe dikin. Li ser kumên leşkerên bêpaye remzeke hesinî ya Çiyayê Agirî yê mezin û yê biçûk hebû. Li ser kumên serbazan jî li şûna Agiriyê remza Xoybûnê hebû û li ser wê jî nîşanên ku rutbeya wan diyar dike, hebû. Remza Xoybûnê jî xencer, simbilê genim, qelem û roj bû.[26]

Artêşa Tirk di bihara sala 1926'an de dest bi êrîşên li Çiyayê Agiriyê kiribû. Di sala 1927'an de dîsa êrîşê dibe, lê bi ser nakeve. Di êrîşa ku roja 13'ê Rezbera 1927'an dest pê kiribû, zêdetirî deh hezar leşkerî cih girtibû û di vê êrîşê de top, tanq û balafir hatibûn bikaranîn. Çiyayê Agiriyê du hefteyan li ser hev dabûn ber topan, firokeyan bombe bi ser de barandibûn, hêzên bejayiyê jî êrîş li ser êrîşê li dar xistibûn, lê dîsa jî encama ku dixwestin bi dest nexistibûn. Hêzên Xoybûnê yên ku di bin fermandariya Îhsan Nûrî Paşa de bûn, di demeke kin de Bedlîs, Wan, beşeke mezin a herêma di navbera Gola Wanê û Çiyayê Agiriyê de bi dest xistin. Chris Kutschera jî di berhema xwe ya navborî de îfade dike ku, êrîşa sala 1927'an a artêşa Tirk bi têkçûnê bi dawî bû.

Di vê navberê de Komara Tirkiyeyê ji bo bidestxistina piştgiriya Îran û Yekîtiya Sovyetan girîngiyê dide karûbarên dîplomatîk, dîplomatên Tirk di nav Îran û Yekîtiya Sovyetan de diçe û tê.[27] Di Tîrmeha 1927'an de li Moskowayê, di navbera Alîkarê Wezîrê Karên Derve yê Yekîtiya Sovyetan Karahan û Zekî Beg de (ku sefîrê berê yê Enqereyê Aralof jî amade ye), peymanek li dijî Kurdan tê danîn.[28]

Li gor ku Ahmet Kahraman vediguhêze, li ser rewşa sala 1928'an Dr. Riza Nur di bîranîna xwe de wiha dibêje:

"Ez bi yekî ku nû hatibû Stenbolê re axivîm. Gelek tiştan vedibêje. Tiştên gelekî xirab. Salih Paşa belavokeke wisa belav kir ku tê de dibêje, wan li Agiriyê Kurd hemû îmha kirine. Lê ya rast, di nav berfê de Kurdan du liwayên me têk birine. Mesrefekî pir mezin hatiye kirin. Kurd ji çiyê daketine araziyê me."[29]

Chris Kutschera di berhema xwe ya navborî de dinivîse ku, "Di Serhildana Agiriyê de di sala 1928'an de hikumeta Tirk li riya ji bo bi serhildêrên Kurd re hevdîtinê bikin digeriya. Hikumetê sirgûn rawestandin, darvekirin sekinandin. Rayedarên Tirk dibêjin ku, wan ji bo efûkirina Kurdên ku di nav sê mehan de vegerin, ji bo vegera Kurdên sirgûnkirî û serbestberda-

[26] Ahmet Kahraman, Kürt İsyanları, r. 232
[27] Ahmet Kahraman, bnb., r. 231
[28] Chris Kutschera, bnb., r. 116
[29] Ahmet Kahraman, bnb., r. 227

na girtiyan zagonek amade kiriye." Kutschera dibêje ku, van hewldanan tu encam nedane, rayedarên Tirk bi riyên cur be cur hewl dane ku bi Îhsan Nûrî re li hev bikin û wiha didomîne: "Hikumeta Tirk di Rezbera 1928'an de ji bo ku bi Îhsan Nûrî re rasterast bipeyive heyeteke girîng ku ji du mebûsan, waliyê Qerekîlîsê, fermandarê Liqa 29'emîn, qeymaqamên Giyadîn û Bazîdê pêk tê, dişîne Bazîdê... Ji Îhsan Nûrî re dibêjin ku, heger teslîm bibe û çekên xwe jî teslîm bikin ew û hemû hevalbendên wî wê bên efûkirin. Ji bo serokê leşkerî yê 'Komara Kurd' a Agiriyê ji hêla hikumeta Tirkan ve pêşniyara payeya generalî, meaşekî bilind û wezîfeya nûneriya leşkerî ya li welatekî Ewrûpayê tê kirin. Ji ber ku qala tu mafekî netewî nayê kirin Îhsan Nûrî vê pêşniyazê qebûl nake."[30]

Îhsan Nûrî bi biryar e, ew ê tu carî menfaeta xwe nexe pêşiya têkoşîna welatê xwe. Tu bertîl wê wî ji riya heqiyê venegerîne. Di vegotina Ahmet Kahraman a vê behsê de ev vekirî tê xuyakirin:

"Waliyê giştî Îbrahîm Talî Ongoren rasterast bi Îhsan Nûrî re têkîliyê datîne û li hember teslîmbûna wî gelek derfetên madî û manewî pêşniyaz dike. Dema ku ev tişt nayê qebûlkirin pêşniyaza 'hevdîtina aştiyê' tê kirin û ev pêşniyaz ji hêla Kurdan ve tê qebûlkirin.

Li gor ku Îhsan Nûrî di bîranîna xwe de dinivîse, hevdîtina herî girîng di Gulana 1928'an de bi delegasyoneke ku ji Enqerê hatiye re pêk hatiye. Di heyeta Tirkan de 12 mebûsan cih girtiye. Her wisa waliyên herêmê, qeymeqam û general...

Îhsan Nûrî Paşa ligel 60 siwariyan hatiye civîna li Pira Şexiyê; bi Biro Heskê Têlî, Ferzende û Xalis Beg re tev li civînê bûye.

Wan dixwest ku Xoybûn dev ji çekan berde; li hember vê yekê gelek diyarî û sozên cazîb pêşkêşî Îhsan Nûrî dikirin.

Heger Îhsan Nûrî dev ji çekan berda, wê biqedara zêr bidanê. Her wiha li nav welêt yan jî li jiderve dereke ku wî bixwesta, meqam û wezîfeyeke bi dilê wî wê bidanê. Di vê navberê de wê çarçoveya efûya giştî bihata firehkirin û tevahiya Kurdan wê jê îstîfade bikira. Kesên sirgûnkirî û yên girtî jî wê biketina ber vê efûyê.

Li gor ku Îhsan Nûrî dinivîse, piştî li van pêşniyaza guhdar kiriye gotiye ku, bi qasî ku bi bertîlan gelê xwe bifroşe biçûk nebûye û xwestiye ku 'leşkerên Tirk bê qeyd û şert ji Kurdistanê vekişin û derhal Serbixwebûna Kurdistanê bê naskirin'. Îhsan Nûrî dianî zimên ku ji xeynî van şertan li ser tu tiştî wê muzakereyan qebûl neke."[31]

[30] Chris Kutschera, bnb., r. 120
[31] Ahmet Kahraman, bnb., r. 228

Bi vî hawayî ji hevdîtinan tu encam nehatiye bidestxistin. Di vê pêvajoyê de tu rê nemaye ku li hember Kurdan nehatiye bikaranîn. Wek gelek mînakên di dîrokê de xapandin serê rimê ye. Komkujiya Eleqemşê (Li gor hin çavkaniyan 1928 e.) di dawiya lîstikeke wilo de pêk tê. Medenî Ferho, di nivîseke xwe de wiha behsa komkujiya Eleqemşê kiriye: "Piştî serîhildana Bagokê (1926), Haco û 18 eşîrên Federasyona Hevêrka direvin Binxetê. Di dema tevgera sazkariya Xoybûnê de, Dewleta Tirk, bi propagandeyeke xurt a devkî û tilbêtên kurtîlkuj, heydêniyeke efuwê bela dike. Dewleta Tirk baş zane ku hêza eskerî ya Xoybunê, Hevêrka û Berazan in... Armanca Dewleta Tirk ew e ku, bi propagandeya efuwê, hêza Xoybûnê kêm bike. Koçberên Kurd, bêzar û şepirze ne. Tirk bi riya kurtîlkujan dibêjin; kesên ku vegerin, nayên girtin, wê serbest biçin gundên xwe û dewlet wê mesrefa wan jî bide. Serkêşên Kurdan çiqasî dibêjin, 'derew e, davik in, xap in', kes guhdariya wan nake. Mêr, jin û zarok vedigerin. Roma Reş, kesên ku vedigerin, jin, mêr û zarokan, kişûmat, li gundê Eleqemşê kom dike. Mêran dikin hewşa mizgeftê, jin û zarokan jî dikin hewşa mala axayê gund. Dewleta Tirk, kesên vegeriyane jî bes nabîne. Li gundên girêdayî Nisêbînê, ji tixub/sînor heta bi qeraxên Bagokê, heta bi gundên Hezexê, bangî mêran dike ku biçin Eleqemşê.

Dibêjin; werin kom bibin, em ê ji bo kesên vegeriyane şahiyekê li dar bixin û bixêrhatina wan bikin. Balkêş e ku, gundiyan mecbûrî çûna Eleqemşê jî dikin. Piştî ku gundiyên derdoran jî li Eleqemşê kom dikin, di hewşa mizgeftê de mêran, di hewşa din de jî zarok û jinan gulebaran dikin. Piştî komkujiyê, cesedan teva dişewitînin.

Li gorî Cegerxwîn, di komkujiya Eleqemşê de 2500 kes, li gorî lêkolîna min, 4500-5000 kes, di yek rojê de hatine kuştin.

Ji komkujiya Eleqemşê 3 zarok xelas bûbûn. Her sê jî, ji hêbet û xezebê lal bûbûn... Birahîm yek ji van zarokan bû û li mala Hiseynê Hesenê Haco mezin bû. Lê dema ku behsa Eleqemşê dihat kirin, digiriya û axaftin jê çênedibû. Lal dibû."[32]

Şer û pevçûnên giran dom kirine. Di sala 1930'î de şerên berfireh qewimîne. Em hinekî bala xwe bidin hin vegotinên berhemên ku li ser vê mijarê sekinîne.

Hasan Arfa li ser rewşa 1930'î wiha dibêje: "...Di roja 20'ê Pûşpera 1930'î de li her du milên sînorê Tirkiye û Îranê Kurdên Eşîra Celaliyan ku li bilindahiyên Çiyayê Agiriyê (Çiyayên Biçûk û Mezin ên Agiriyê), li herêma Bazida li Tirkiyeyê û Makuya li Îranê dijîn, bi pêşengiya netewperwerên

[32] www.rojaciwan.com, 23.11.2009, Cawê Sifir

Kurdan êrîş birin ser qereqolên Tirkan ên li berahiya Zîlanê. Kurdên Heyderanî û Xelîkanî jî tev li vê êrîşê bûn û di roja 24'ê Pûşpera 1930'î de tevî Bêgiriyê (Muradiye) û Geliyê Zîlan, Çildêran jî bi dest xistin... Şer heta du mehan dewam kir. Generalê Tirk Salih Paşa, tevî dozdeh hezar leşkerên xwe di navbera Îdir û Wanê re ku nêzîkî sînorê Sovyetê ye ber bi rojhilat ve bi rê ket... Kurd baş hatibûn çekdarkirin û ji hêla pêşengên xwe ve ku di nav wan de hin serbazên berê yên artêşa Tirk jî hebûn, bi hosteyî dihatin birêvebirin.

Kurd li hêla Melazgîr û Qerqeliyê (Ozalpê) rastî êrîşê hatin û dema ku hêzên Tirk ji Qerekoseya ku Salih Paşa baregeha xwe lê danîbû ber bi Bazidê bi rê ketin, riya vekişîna Kurdan a ber bi Îranê ve ket xetereyê. Li Geliyê Zîlan ji hezarî zêdetir kuştî li pey xwe hiştin û bi awayê du koman ber bi hêla bakurê rojhilat ve vekişiyan. Hinan ji wan li herêma Avajeyê li sînor xistin û derbasî Îranê bûn. Lê hêza bingehîn vekişiya Çiyayê Agiriyê ku havînê her tim li wir bûn. Wan hêvî dikir ku zinarên lawê yên asê, yên vî çiyayî wê wan biparêzin û ew ê demeke dirêj li vir li ber xwe bidin..."[33]

Li gor Ahmet Kahraman, Garo Sasunî jî di berhema xwe ya bi navê 'Bizava Neteweyî ya Kurdan û Têkiliyên Kurd û Ermeniyan' (Ulusal Kürt Hareketi ve Ermeni-Kürt İlişkileri) de wiha qala bûyerên sala 1930'î dike: "... Di vê demê de, di serî de Dêrsim gelek deverên Kurdan bê liv û tevger bûn. Digel vê yekê, hêzên Kurdan ên li Abaxa, Pergîrî, Zîlan û Melazgîrê bi hev re tevgeriyan û li ser rêya wan çiqas navendên leşkerî û îdarî yên Tirkan hebin, bi dest xistin. Piştî pevçûnên bi xwîn wan bajarokên Ercîş û Zîlan bi dest xistin. Bi êrîşa Waniyan bajarê Wanê jî hat bidestxistin. Lê nikaribûn demeke dirêj bajêr di destê xwe de bihêlin. Şer û pevçûn belav bûn. Colemêrgê jî serî hilda, zoriya leşkerên Tirkan birin û bajar ket destê wan.

Tirkan hêzên xwe yên bingehîn li herêmên Zîlan û Ercîşê civandin. Şer gur bû. Kurdan heft balafirên Tirkan xistin. Wan bi hezaran qurbanî dan. Çek û cebilxaneyên şervanan neman. Ber bi Çiyayê Agiriyê ve vekişiyan. Tirkan heyfa xwe ji Kurdên sivîl ên bê çek hilanîn. Pênc hezar jin, zarok û pîr hatin qetilkirin. Bi qasî 200 gundî hatin talankirin û dûre hatin şewitandin. Heman hovîtî li herêma Wanê jî domandin. Bi sedan Kurd dan hev û avêtin gola Wanê. Şer û pevçûn li deverekê vedimirîn, li devereke din dest pê dikirin.

Hikûmetê ji bo ku hêzên xwe yên qelsbûyî qewîn bike seferberiya bi sînor îlan kir. Dihat nivîsandin ku di 15'ê Tîrmeha sala 1930'î de li herêma Çiyayê Agiriyê, artêşeke ji 60 hezar kesî û 100 balafirî kom bûbû."[34]

[33] Hassan Arfa, bnb., r. 54
[34] Ahmet Kahraman, bnb., r. 237

Jiyana kesên ku li herêmê dijiyan bûbû cehenem. Gelê sivîl perîşan bû. Cihekî ku xwe bispêrinê nemabû. Qetlîama ku hat serê kesên xwe spartibûn Geliyê Zîlan wê wek rûpeleke reş di dîrokê de cih bigirta. Dema ez di sala 2007'an de çûm Bazîdê, min dît ku hîn jî dema xelk qala Zîlanê dikin çavên wan tije hêsir dibin. Hinan jî wiha digot: 'Heger hûn îro jî herin wir, hûn ê li hestiyan rast bên.'

Bûyerên ku li Geliyê Zîlan qewimîne di nûçeyên roja 16'ê Tîrmeha 1930'î ya rojnameya Cumhuriyetê de cih girtibûn. Di nûçeyê de hatibû nivîsandin ku, li qûntara Çiyayê Agiriyê gundên ku tevî eşqiyayan bûne hatine şewitandin, xelkê van gundan sewqî Ercîşê hatiye kirin û hejmara kesên di operasyona Zîlanê de hatine tunekirin jî di ser 15000'î (pazdeh hezar) re ye.

Ahmet Kahraman wiha qala qetlîama Geliyê Zîlan dike: "Piştî têkçûna çiyayê Grîdaxê Kurdan ref bi ref xwe spart Geliyê Zîlan. Hejmara kesên ku kom bûbûn tu carî nehate zanîn. Lê ew Wanî, Bedlîsî, Agiriyî û Bazîdiyên ku ji tirsa direviyan, ji bo ku xwe ji leşkerê Tirkan biparêzin dihatin geliyê Zîlanê û xwe berdidan kurahiyên wê. Kesên ku digotin 'Ez tev li serhildanê nebûme û tiştek bi min nayê' jî kom bi kom li deşt û zozanan kon vedabûn.


Lê ew dixapiyan û di encama vê xapanê de wê komkujiya herî mezin a dîrokê biqewimiya. Çiyayên Zîlanê, qûntarên wan û Geliyê Zîlan bû şahidê qetlîameke wisa ku di dîrokê de nehatibû dîtin.

Li Geliyê Zîlan ku ji hêla bi deh hezaran leşker ve dor lê hatibû pêçan komkujiyê dest pê kiribû, hawar hawara mirovan erd û ezman dagirtibû. Ji dergûşên biçûk ên ku nû hatibûn dinyayê bigire heta bi pîr û kalên not salî her kes dan ber guleyên mîtralyozan, singûyan û wek ku tu palehiyê bikî hemû dan ber xwe û kuştin. Tu carî hejmara kesên ku li Geliyê Zîlan hatin qetilkirin nehat zanîn.

Rojnameya Cumhuriyetê ku rojnameya nîvfermî ya wê serdemê bû qetlîama li Zîlan hatibû kirin wek 'serkeftin' radigihand û di manşetê de digot ku 'Geliyê Zîlan heta bi qirikê bi termê mirovan tijî bû.'..."[35]

Di rojnameya Ozgur Gundemê ya roja 22.09.2007'an de, vegotinên hevdîtinekê hebûn. Nûçe-gîhanên DİHA'yê yên Wanê Ercan Oksuz û Oktay Candemîr bi şahidê komkujiya Geliyê Zîlan Kakil Erdem re axivîbûn: "...Kakil Erdem, yek ji şahidên qetlîamê ye ku yên wek wî ji mirinê filitîne pir hindik in. Erdem dide xuyakirin ku tu carî ew wan rojan ji bîr nake û wiha dibêje, 'Leşkeran zikê jinên bihemil diqelaştin. Wan jinên ducanî dikuştin û zarokên wan ji zikê wan derdixistin. Mirov li ber çavê min şerjê dikirin. Li

[35] Ahmet Kahraman, bnb., r. 244



*Kakil Erdem*

ber çavê min çermê serê sê xwediyên min gurandin. Min dît ku bi daran li du birayan xistin û ew kuştin.' Erdem dibêje, dema qetlîamê dest pê kiriye ber bi çiyayan reviyaye û li cihê ku xwe veşartiye li bûyeran nihêriye û wiha dom kir: 'Bi rojan li çiyayan em birçî man. Piştî ku leşker çûn em vegeriyan gundê xwe. 35 xizmên min kuştibûn. Li pêş çavên min gelek mirov şerjê kirin. Birayê min ê herî mezin jî hîn sax e, wî jî ew bûyer dîtin.'..."

Bandora Îranê ya li ser encama serhildanê gelekî mezin e. Di wê demê de sînorê Tirkiye û Îranê di Çiyayê Agirî re derbas dibû. Çiyayê Agirî yê Biçûk di nav sînorê Îranê de bû û ji ber vê Tirkan nikaribû dor li Çiyayê Agiriyê bigirin.[36] Di vê navberê de Tirkiye bi Îranê re ket têkiliyê, pareke axa wîlayeta Wanê da Îranê û li hemberî vê jî derdora Çiyayê Agiriyê yê Biçûk ku bi piranî serhildêrên Kurd xwe li wir vedişartin, stend. Bi vî awayî riya çûna nav Îranê ya serhildêran nema û dora wan hat pêçan.[37]

Îranê ne tenê guhertina sînor, daxwaza alîkariya leşkerî jî qebûl kir. Hassan Arfa di derheqê alîkariya Îranê ya ji bo Tirkiyê de wiha dibêje: "Hikumeta Tirk çend caran ji Îranê re notayên dijwar şandin da ku Îran nehêle Kurd bikevin axa Îranê û Kurd ji wir neyên Tirkiyeyê dagir nekin. Hikumeta Îranê dixwest têkîliyên baş ên bi Tirkiyeyê re bidomîne û ji ber vê jî hêzeke di bin fermandariya serheng Kalb Alî Xan Nahçewan de, ku di artêşa emperyal a Rûsan de serbazî kiriye şand. Vê hêzê li bakurê Makuyê li herêma Çiyayê Mûsa, êrîş bir ser Celaliyan û ew ber bi Çiyayê Agirî yê Biçûk ve ajotin. Di dema pevçûnan de serheng bi xwe jî hate kuştin. Digel vê jî hikumeta Tirk ji bo sînor were guhertin û Çiyayê Agirî yê Biçûk di nav sînorê Tirkiyê de bimîne israr kir. Bi vî awayî wê dor li Celaliyan (hejmara wan bi qasî pazdeh hezar kon bû) bihata girtin. Di dawiyê de di sala 1932'yan de ev guhertin ji hêla hikumeta Îranê ve hat qebûlkirin. Tirkan jî li hemberî vê li heman herêmê ji devera Bajirgeyê ku diket rojavaya Rezaiyê hinek ax da Îraniyan."[38]

---

[36] Chris Kutschera, bnb., r. 118
[37] Rafet Ballı, Kürt Dosyası, r. 64
[38] Hassan Arfa, bnb., r. 55

Moskowa jî ji bo şikênandina serbestiya tevgera Kurdan û ji bo ku Kurd nikaribin alîkariyê ji Ermenan bistînin, ji hêla bakur ve dor li Kurdan digirtin û rê didan derbasbûna hêzên Tirkan. Em guh bidin Chris Kutschera bê helwesta Sovyetan çawa dinirxîne: "Di sala 1930'î de li derdora Agiriyê şerên tund diqewimîn, Sovyetan jî dixwest li Ermenistana Sovyet serhildana netewî têk bibe. Kurd û Ermeniyên Yekîtiya Sovyetan jî alîkariya serhildêrên Agiriyê dikirin. Yekîtiya Sovyetan jî bi Tirkan re di nav hevkariyeke xurt de bû. Çemê Erez ê ku bûbû sînor, digel ku gerek bibûya bihureke siruştî, bi têlên direhî û bi kûçikan dihat parastin. Di mesafeyên diyarkirî de qereqol hatibûn danîn û hêzên siwarî yên Sovyetan jî bi nobedarî tim digeriyan... Digel van tevan, girtina sînor a bi temamî ne mimkun bû.

Di dawiya Tîrmeha 1930'î de berî êrîşa ser Agiriyê hêzeke Sovyetan a ku ji 500 siwariyan pêk hatibû tê gundê Davalu yê nêzîkî Çemê Erezê. Ev hêz piştî du rojan bi şev 'winda dibe'... Gundiyên Davalu bê şik bawer dikin ku ev hêz, ji bo li ba hêzên Tirkan şer bikin bi şev Çemê Erezê derbas kirine."[39]

Di sala 1930'î de, di dema êrîşa Çiyayê Agirî de, ku leşkeran bi desteka balafiran dest bi êrîşê kiriye, hêza her du aliyan ji hêla hejmar û techîzatê ve ew qas ji hev cuda ye ku mirov nikare wan bide ber hev. Ahmet Kahraman, di berhema xwe ya bi navê 'Kürt İsyanları (Serhildanên Kurdan)' de nivîsiye ku, Garo Sasonî wiha qala hêzên şer dike: "Her çiqasî hêzên Tirkan li Wanê, Colemêrgê, Mûşê, Xinisê û li ser sînorê Îranê bi eşîrên serhildêr re mijûl bûbin jî navenda resen a şer Çiyayê Agirî bû. Ji Çiyayê Agirî heta başûrê Gola Wanê hejmara şervanên tevgera netewî ya Kurdan ku tev li şer bûbûn 10.000 (deh hezar) bû. Halbûkî hejmara hêzên Tirkan 60.000 (şêst hezar) bû. Heta rojnameyên girîng ên Ewrûpa û Amerîkayê ev hejmar wek 100.000'î (sed hezar) didan..."[40]

Mustafa Akyol hin hejmarên cuda dide: "...Îhsan Nûrî Paşa ku berê di artêşa Osmanî de serbazî kiribû, di sala 1929'an de bû desthilatdarê herêmeke fireh ku digihîşt Bedlîs, Wan, Agirî û Botanê. Serhildan ew qas mezin bû ku encex di havîna sala 1930'î de bi artêşeke 45 hezarî hat têkbirin. Di 12'ê Tîrmehê de şerekî meydanî qewimî ku 15 hezar leşker, topên giran û balafirên cengê tev li vî şerî bûn. Di dawiyê de serhildêr têk çûn. Îhsan Nûrî Paşa jî di nav de beşek ji kadroyên pêşeng derbasî Îranê bûn, ên ku hatin girtin jî hatin darvekirin."[41]

---

[39] Chris Kutschera, bnb., r. 116
[40] Ahmet Kahraman, bnb., r. 242
[41] Mustafa Akyol, Kürt Sorununu Yeniden Düşünmek, r. 106

Di vê navberê de biryargehên Kurdan bi dizî ji Kurdên her çar parçeyî re, ji Cemiyeta Miletan re û ji navendên girîng ên mîna Beyrûd û Parîsê re, li ser armanc û kirinên xwe manîfestoyek şandine. Ji her çar parçeyan jî Kurdan piştgiriya Serhildana Agiriyê dikir. Komek ji van ji Kurdên Îraqê bûn. Hêzeke çekdar a ji 500 kesî pêk dihat, bi pêşengiya Şêx Ehmed Barzanî ku li başûrê Kurdistanê dima, sînor derbas kir û girt ser navenda leşkerî ya Oramarê (22 Tîrmeh 1930). Bi armanca ku balê bikişînin ser xwe, hinek leşker li başûr bimînin û bi vî awayî bêhnekê bidin serhildêrên Agirî ev êrîş hatibû kirin. Serhildan gihîşt herêma Şemzînanê... Ev tevger di 28'ê Tîrmehê de hat perçiqandin. Di rojên 3 û 4'ê meha Tebaxê de, bi planê Komeleya Xoybûnê êrîşeke din jî birin ser Mêrdînê. Hêzên serhilder ên ku ji Îraqê hatibûn û di bin fermandariya Ekrem Cemîl Paşa de bûn, ji ber ku wek hatibû plankirin nemeşiya, bêyî ku zêde tiştekî bikin mecbûr man paş de vegerin.[42] Kurdên Başûr wê dûre jî himbêza xwe ji Kurdên ji ber têkçûnê bireviyana vekirana û alîkariya wan bikirina.

Di dawiya Tîrmehê de ji bo piştgiriya Kurdên ku li Agiriyê têk diçûn, ji Kurdên li Sûriyeya ku di bin mandateriya Frensayê de bû jî hewldanek çêbû. Bi alîkariya rêxistina Xoybûnê Haco Axa, tevî dused çekdarên xwe sînorê Tirkiyeyê derbas kir û di 5'ê Tebaxê de gundê Xebatê yê nêzîkî Nisêbînê bi dest xist û belavokek da belakirin. Ji bo alîkariya birayên xwe yên li Çiyayê Agirî şer dikin gazî xelkê kir, da ku tev li serhildanê bibin. Di vê belavokê de daxwaza serbixwebûna Kurdan jî cih digirt. Lê leşkerên Tirk, dikin ku Haco Axa neçar bimîne û bi lez vekişe Sûriyeyê.

Cegerxwîn dibêje ku di wê demê de Celadet Bedîrxan û Haco Axa bûne mêvanê wî û Celadet Bedirxan jê re wiha gotiye:

"... Sed hezar leşkerên Tirk kişiyane ser Çiyayê Araratê. Mezinên Xoybûnê dixwazin bikevin serê çiya û hindik be jî, hin leşkerê dijmin bi ser xwe de vegerînin ko barê şorişgeran sivik bibî. Ev jî hem ji dijmin re ziyaneke mezin e û hem jî ji tevgera Araratê re kareke mezin û hêja ye."

Cegerxwîn ji bo paşê wiha dinivîse. "Mala Bedirxan, Haco Axa û hevalbendên xwe çûne çiyayê Hevêrkan. Mala Cemil Paşa, Îlyas Axa û hevalbendên xwe çûne çiyayê Xursê. Tenê Osman Sebrî Beg, bi çend peyan ve çûne rajorê Berazan û nuqtake dijmin şewitand. Çend tiving û hûravêjek anîn. Osman birin Madageşker..."[43]

Di heman rojan de li Colemêrgê (7ê Tebaxê), li nêzîkî Sêrtê (6'ê Tebaxê), Li Licê (dawiya Tebaxê) û bi taybetî li derdora Diyarbekirê (2'yê Rezberê) serhildanên herêmî hene.[44]

[42] Rafet Ballı, bnb., r. 65
[43] Cigerxwîn, Jînenîgariya Min, r.210
[44] Chris Kutschera, bnb., r. 124

Hêzên leşkerî yên Tirkan di 7'ê Rezbera 1930'î de careke din êrîşê dibin ser Agiriyê. Ji ber bombebarana dijwar a ku bi balafiran hatibû kirin, di serî de jin, zarok û heywan windahî û ziyanê mezin çêdibin.

Di van çar salan de bingeheke wisa hatibû danîn ku mirov dikare bêje dendika 'Komara Kurd a Agirî' hatibû avakirin. Kurdan wê herêmên rizgarkirî pêk bianiyana û serxwebûna xwe îlan kiribûna. Agirî wek 'wîlayeteke Kurdistana serbixwe' hatibû ragihandin. Komeleya Xoybûnê serokê eşîra Celaliyan Biroyê Heskê Têlî, bi payeya paşatiyê wek waliyê vê derê tayîn kiribû. Her wisa di navbera hêzên ku ji bo serhildanê amadekarî dikirin de, bi riya têlsizê toreke ragihandinê hatibû danîn. Bi çapxaneya ku Xoybûnê şandibû bi navê 'Agirî' û 'Gaziya Welat' du rojname dihatin weşandin. Her wisa bi navê 'Agirî Êgir Dibarîne' bûltenek jî dihat weşandin.[45] Lê belê piştî têkçûna 25'ê Rezberê komên Kurdan belav dibin. Hin komên ku xilas dibin derbasî Îranê dibin, komên din jî tên girtin.

Piştî têkçûna serhildêran dewlet dest bi 'tenkîl û tedîb'ê dike. Wezîfedar xwedî selahiyetên awarte ne. Operasyon dewam dikin. Li gor hin çavkaniyan di Serhildana Agiriyê de jin, mêr, zarok bi giştî 47 hezar mirov hatine qetilkirin.

Ji hêla din ve, her ku diçe di nav dewletên pêwendîdar de hevkarî xurtir dibe. Ji ber daxwaza dewleta Tirkan, dewleta Îranê di dema Serhildana Agiriyê de û piştî têkçûna Kurdan jî tim êrîş aniye ser Kurdan, şer û pevçûnên mezin qewimîne. Wek ku me berê îfade kir Smaîl Axayê Şikakî di dawiya Pûşpera 1930'î de bi xayîntî tê kuştin.

Zexta Îranê ya li hemberî Kurdên xwe bi awayekî sîstematîk didome. Di bihara 1931'ê de ji Kurdan tê xwestin ku çekên xwe teslîm bikin. Ji ber ku Kurd li dijî vê derdikevin li Makuyê şer û pevçûn diqewimin. Di vî şerî de ku di çavkaniyan de wek 'Serhildana Kurdan a Makuyê' derbas dibe, tevî serbazê Îranê yê ku tevgera leşkerî bi rê ve dibe, gelek leşkerên Îranê tên kuştin.

Piştî şerê li Makuyê, fermandariya leşkerî ya li Tewrêzê bi pêşengiya generalekî hêzeke mezin a alîkariyê dişîne. Ev hêza ku ji bi hezaran leşkeran pêk tê, ji balafiran piştgiriyê digirin. Hejmara Kurdan jî bi qasî hezar kesan e û xwedî çekên nûjen û otomatîk in.

Wekî ku li jor jî hat îfadekirin, piştî têkçûna serhildana 1930'î ya Agiriyê, hin kadroyên ku pêşengiya serhildanê dikirin derbasî Îranê bûbûn. Di serhildana ku li Makuyê qewimî bû, van pêşengan jî cihê xwe girtibûn. Biroyê Heskê Têlî û Ferzende Beg ku li Agiriyê wezîfeyên girîng girtibûn ser xwe di

[45] Rafet Ballı, bnb., r. 62-64

vê serhildanê de jî derketibûn pêş. Hin çavkanî dibêjin ku ev her du kes pêşengên vê serhildanê ne. Di van pevçûnan de Ferzende Beg birîndar dibe, Biroyê Heskî Têlî jî tê kuştin.

Êrîş her wê dom bikin. Li gor agahiya ku serokê komîsyona ewlekariya sînor daye, demê li derdora Agiriyê operasyon û şer dewam dikir, di rojên Tîrmeha 1931'ê de, Îran ji bo rêlibergirtina çûn û hatinê sînorê xwe digire, Kurdên li herêma sînor derdixe û êrîşê dibe ser kesên ku li dijî vê yekê derdikevin.

Pêwendiyên Tirkiye û Îranê di ser Kurdan re gelekî baş in. Di vê navberê de ji bo ku peymana guhertina sînorê Tirkiye û Îranê bi awayekî fermî were îmzekirin, hevdîtin dihatin kirin. Di destpêka sala 1932'yan de du heyetên Tirkan, bi armanca serdaneke fermî diçin Îranê. Celal Bayar, ku ew ê paşê bibe serokkomarê Tirkiyeyê, serokê heyetekê ye û bi Îranê re wê di der barê mijarên aborî û malî de peymanan çêbike. Serokê heyeta din jî wezîrê derve Tewfîq Ruştu bû.[46] Husrev Gerede jî di heyetan de cih girtibû. Gerede di bîranînên xwe de gotiye, “Îranê li hemberî Kurdên serhildêr operasyoneke hevpar qebûl kiribû û bi vî awayî dostanî, xêrxwazî û niyeta xwe ya qenc nîşan dabû.” Di derbarê peymanê de jî wiha nivîsiye: “Piştî hevdîtinên fermî yên ku di 15'ê Rezbera 1930'î de dest pê kir û gelek carên din jî hatin kirin, encex di 22'yê Rêbendana 1932'yan de peyman hat îmzekirin.”[47]

Rêveberiya Sûriyeyê (Di nav xelkê de Sûrî tê gotin û di nivîsan de carna em wek Sûriyeyê jî bi kar tînin) jî bi awayekî hişkere piştgiriya Tirkiyeyê (Di nav xelkê de Tirkî tê gotin û di nivîsan de carna em wek Tirkiye jî bi kar tînin) kir. Di vê demê de ji ber zextên hikûmeta Tirkiyeyê, li hemberî Kurdan hin mueyîde hatin danîn. Frensiyan ku Sûriye di bin hukmê wan de bû, hin pêşengên Kurd ên li Sûriyeyê ji sînorên Tirkiyeyê bi dûr xistin, hin ji wan xistin binçavan û hin ji wan jî dersînor kirin.

Kurdên li Sûriyeyê jî ji roja ku Sûriye hat damezirandin heta îro têkoşiyane, alîkariya têkoşîna Kurdên li dewletên din kirine. Berî ku Sûriye ava bibe, li vir di nav ên ku ji bo tevgera neteweyî ya Kurdî têdikoşiyan de, Eşîra Milî di rêza pêşî de bû. Çalakiyên Konfederasyona Milan, heta serdema pêşî a ku herêm ket destê Frensiyan berdewam kiribûn. Piştî ku sînorê Tirkiye û Sûriyeyê hişkere bû, beşek ji eşîra Milan û eşîrên din li hêla Sûriyeyê, beşa din jî li hêla Tirkiyeyê ma.

Sûriye jî bi peymanên li ser maseyan hat damezirandin û taybetmendiyên herêmê li ber çavan nehatin girtin. Heta piştî Şerê Cîhanê yê Pêşî parvekiri-

[46] Chris Kutschera, bnb., r. 128

[47] Husrev Gerede, Siyasi Hatıralarım, r. 208

na erda ku îro Sûriye ye ji aliyê hêzên Ewrûpî ve bi awayekî din hatibû plankirin, dûre bi awayê îro hatiye damezirandin. Lawê Şerîf Huseyn Emîr Faysal, bi desteka Ingilîzan di 1918'an de serweriya xwe pêk anîbû. Di 7'ê Adara 1920'î de jî, 'Kongreya Sûriyeyê' ya ku neteweperwerên Ereb ew saz kiribû, Emîr Faysal wek Qralê Sûriyeyê îlan kiribû. Lê belê piştre dewletên hevpeyman ku li Sanremoyê li hev civiyabûn, biryar stendin ku Filîstîn ji mandaya Ingilîzan re û Sûriye jî, ji ya Frensiyan re bê hiştin. Piştî vê Emîr Faysal ji qraltiya Sûriyeyê hat daxistin û paşê qraltiya Îraqê danê. Di 10'ê Tebaxê de Frensayê ragihand ku, ji ber xala 94'an a Peymana Sewrê, Sûriye ji Împaratoriya Osmanî veqetandiye û li wir rêveberiyeke manda pêk aniye. Paşê jî ev dewlet wê bibûya yek ji wan dewletên pêşî ên ku bi Tirkiyeyê re li ser betalkirina xalên Peymana Sewrê yên bi mafên Kurdan ve girêdayî li hev bihata.

Di vê serdemê de mîna her derê di vê cepheyê de jî polîtîkayeke rûniştî tune ye. Polîtîka û pêwendî her roj tên guhertin. Ligel vê yekê, ji bo ku Frensî li herêma ku lê xerîb in rêveberiya xwe berdewam bikin, hem ji bo ku bi Tirkan re li hev bike, hem jî ji bo ku bi Kurdan re têkiliyên baş bi pêş bixe wê bikeve nav hewldanan. Çunkî li Rojhilata Navîn tenê Sûriye mêtingeha Frensiyan bû; pêwîstiya wan bi piştgiriya Kurdan hebû. Bi piştgiriya Kurdan wan karibû alîkariya kesên nemisilman xurt bikira. Ji ber vê jî nûnerên Frensayê yên li Sûriyeyê, bi gelek malbatên navdar ên Kurdan re xwedî pêwendî û dostaniyeke baş bûn. Her wisa wan rê dida hin xebatên biçûk ên çandî. Yanî Frensa ji ber berjewendiya xwe li dijî daxwazên Tirkiyeyê dernediket û ji aliyê din ve hinekî jî dilê Kurdan xweş dikir.

Kurdên ku di nav sînorên Sûriyeyê de, her çiqas li hundir berxwedaneke mezin nîşan dabin jî wek berjewendiyên netewî tiştek bi dest nexistin; lê bi gelek tevlêbûn û alîkariya tevgerên Kurdên parçeyên din jî, di têkoşîna tevgera neteweyî de cihekî girîng digirin. Sûriye piştî serhildana Şêx Seîd bû spartgeha rewşenbîrên Kurd ên ku li Stenbolê ji meşrûtiyetê heta wê rojê karên Kurdewariyê dikirin. Bedirxaniyan, Hesen Hişyar, Memduh Selîm Beg, Mehmet Şukru Sekban û kesên din bi derbasbûna xeta trênê derbasî Binxetê bûne û xwe ji xetereyan xelas kirine. Li vir hin karên girîng kirine. Çalakiyên ku li vir hatine kirin ji bo siyaset û çanda Kurdî gelekî girîng in. Xoybûn ku partiya netewî ya Kurdan bû, li vir gelek çalakiyên cur bi cur bi rê ve birine. Piştî têkçûna Serhildana Agiriyê Celadet Bedirxan kovara Hawarê li vir amade kiriye û şandiye ji Kurdên ku li parçeyên din dijîn. Şexsiyetên girîng ên mîna Cegerxwîn ku li wir dijiyan, sûdewariyeke gelekî mezin gihandine çanda Kurdî û tevgera Kurdan a li Sûriyeyê û parçeyên din.

Lê piştî ku rêveberî ket destê Ereban rewşa Kurdên li Sûriyê her ku çû hîn xirabtir bû û ew rastî zext û îşkenceyan hatin.


*Kongreya Xoybûn, 1931, Şam*[48]

Ji hêla din ve tê dîtin ku di vê demê de hevkariya Îraq û Tirkiyê hîn xurt e. Pêwendiya Tirkan a bi Edmonds re, yek ji nîşana bê ka pêwendiyên rêveberiya Ingilîzan a li Îraqê û Tirkiyeyê çiqas baş in, pêş me dike. Li Tirkiyeyê, piştî Serhildana Agiriyê nedihiştin ku tu kes here herêmê, li ser çapemeniyê sansur hatibû danîn. Edmonds li hemberî Kurdan bi kîn bû û mîna ku di beşa dîrokê de hat nivîsandin, wî bi xwe li Îraqê di nav operasyonên ku li hemberî Kurdan dihatin lidarxistin û bombe bi ser wan de dibarandin de cih girtibû. Edmonds di vê demê de li Tirkiyeyê li herêmên Kurdan digeriya. Di nivîsên xwe de qala rewşa wêran û hilweşîna sala 1930'î ya herêmê dikir. Mîna ku em ê piştre li ser bisekinin, di heman demê de li Îraqê li hemberî Kurdan operasyon dihatin sazkirin. Chris Kutschera wiha qala gera Edmonds a li bakurê Kurdistanê dike: "...Hîn di sala 1930'î de Edmonds ku bi awayekî îstîsna hikumeta Tirkan rê daye ku here herêmê, di ser Mereş, Siwêreg, Amed, Bedlîs û Mûşê re –ji ber xirabûna rê neçûye Wanê- li herêmê geriyaye û ji xeynî avahiyên kavilkirî tu tişt nedîtiye:

'Bedlîs xwedî dîmeneke trajîk bû... Bi qasî du kîlometreyan xaniyên li her du aliyên çem bi ser hev de hilweşiyabûn... Bajarê ku nifûsa wî bi qasî 40 hezarî bû, îro bûye gundekî bi pênc hezar kesî.'

'Dîmena Mûşê hîn xirabtir bû... Ev bajarê 30 hezar kesî, îro bûye gundekî sê hezar kesî, heta gundekî wisa ku bi temamî hatiye kavilkirin.'..."[49]

Bêguman di navbera bûyerên ku di Serhildana Agiriyê de û di heman demê de li Îraqê qewimîn têkilî hene. Mîna ku di dema serhildana Şêx Seîd de bû, di dema Serhildana Agiriyê de jî li Îraqê tiştên girîng diqewimin. Ka em bala xwe bidin ser, bê di wê demê de li Îraqê çi dibû. Hikumeta Ingilîzan di Sibata 1929'an de dev ji mandateriya xwe ya li ser Îraqê berdide. Dema ku mijara rabûna mandateriyê tê rojevê hêviya Kurdan çêdibe. Çinkû di demên pêşî de gelek soz dabûn Kurdan. Lê heta wê rojê Kurd tenê xwedî hin mafên

[48] Bi alîkariya Jan Beth-Şawoce, Ji arşîva Koleja Södertörn, Stockholm
[49] Chris Kutschera, bnb., r. 130

biçûk ên çandî yên mehelî bûn. Kurd difikirîn ku, heger Ingilîz herin ew ê sozên hatibûn dayîn karibin bînin cih û ji ber wilo dixwestin rêveberiya xwe bi dest bixin.

Di beşa dîrokê de, behsa têkoşîna Kurdan a dema Şêx Mehmûd û xebatên heyeta Cemiyeta Miletan ku ji bo meseleya Mûsilê hatibû herêmê, hatibû kirin. Serokwezîrê Macaristanê Count Telekî serokatiya heyeta Cemiyeta Miletan dikir. Kurdan ragihandibû heyetê ku ew naxwazin di bin hikmê Îraq û Tirkiyê de bijîn. Cemiyeta Miletan notên girîng di raporên xwe de nivîsîbûn û sozên hatibûn dayîn hebûn. Ji ber vê yekê jî, Kurd li gorî biryara Cemiyeta Miletan a 1925'an difikirîn ku heger mandaya Ingilîzan a li ser Îraqê rabe, ew ê jî bigihîjin serxwebûna xwe. Ligel vê, gava wan dît ku di Rezbera 1930'î de bi mebesta hilanîna mandayê peyman hatin îmzekirin û tu rûdan û pêşketin ji bo Kurdan derneket holê, li Silêmaniyê careke din serhildanê dest pê kir.

Kurd li vir jî rastî êrîşeke mezin hatin. Artêşa Îraqê li Silêmaniyê gule direşand ser gel û bi dehan mirov dihatin kuştin. Hikumeta Îraqê waliyê Kurd ê Silêmanî Tewfîq Paşa ji wezîfeyê girt û bi mahneya navtêdêriya serhildanê gelek kes girtin. Ji ber ku ev bûyer tevde di dema têkçûna Serhildana Agiriyê de diqewimîn û di heman demê de Edmonds li Tirkiyeyê li herêmên kavilkirî yên Kurdan geriyaye, ji mirov re gelek tiştan îfade dike. Lê Kurdên Başûr ev yek nedîtibûn û hîn jî hêviya xwe ji Ingilîzan qut nekiribûn.

Şêx Mehmûd li ser bûyerên ku qewimîn ji Komîserê Bilind ê Ingilîzan ê li Baxdayê re nameyek şandiye û 'hovîtiya bê emsal a Ereban a li Silêmaniyê' şermezar kiriye.[50] Di Kewçêra sala 1930'î de kampanyayeke daxwaznameyan dide destpêkirin. Di van daxwaznameyên ku tê de îmzeya 32 şexsiyetên navdar ên Kurdan heye, giliyê zext û neheqiyên rêveberiya Ereban tê kirin û her wisa tê daxwazkirin ku bi parastina Ingilîzan rêveberiyeke serbixwe ya Kurdan bê avakirin.

Nameya ku dûre Şêx Mehmûd ji Cemiyeta Miletan re şandiye jî wiha ye:

*Parîs, 21 Adar 1931*

*JI SEROKÊ MECLÎSA ŞÊWRÊ YA CEMIYETA MILETAN RE*

*Serokê hêja,*

*Ez xwe birûmet dibînim ku, ez giliyên netewa ku we ew xistiye bin parastin û wesayeta xwe, ji we re radigihînim. Lewre wesayet tê wateya parastinê. Ev netewa ku ji bo ez jê me ez xwe bi şeref dihesibînim netewa Kurd e, ya ku başûrê welatê wan bi ser Îraqê ve hatiye berdan.*

[50] Chris Kutschera, bnb., r. 136

*Ez xwedî wê baweriyê me ku, ji bo min wezîfe ye da ez bala we bikişînim ser demên dawiya Şerê Cîhanê yê Yekemîn. Wê demê wek Mezopotamyayê, xakên Kurdan ên ku tevî Îraqê jî hatine kirin, ji aliyê hêzên artêşên dewletên hevalbend û hevpeyman ve nehatiye fetihkirin. Kurdan di 1918'an de bi serê xwe rahiştiye çekan, yekîneyên Tirkan mecbûr kirine ku ji welatên wan derkevin, wan serxwebûna xwe îlan kiriye û di bin navê 'Hikûmeta Başûrê Kurdistanê' de jî hikûmeteke ku îdare girt destê xwe ava kiriye. Di vê demê de Îraq di nav tevliheviyê de bû, yekîneyên dewletên hevalbend û yên hevpeyman li vir hîn bi hev re şer dikirin. Mixabin ku dûre erdên me bi ser Îraqê ve hatine berdan û Ewrûpaya ku digot ji bo parastina maf û wekheviyê dest avêtiye çekan, qeder û dahatûya gelekî ku ne bi awayekî hiqûqî be jî bi awayekî fiîlî niha xwedî hikûmetekê ye, li hemberî vê bêedeletiya hişkere ya ku ji aliyê nîjad, kevneşopî, dîrok, ziman, adet û fizyolojiyê ve bi neteweyeke cuda ve dide girêdan, deng dernexistiye. Ligel vê yekê, soz û wehda cemiyeta we ya mezin a dayîna otonomiyeke fireh a der barê Başûrê Kurdistanê de, piçek be jî vê neheqiyê hinekî sivik dike.*

*Lê digel ku di navberê re gelek sal derbas bûne ew soz nehatiye bicihanîn, her wisa ji ber ku em Erebbûnê qebûl nakin û ew sozên ku ji me re hatine danîn ji bo ku werin bicihanîn em dixebitin, jiyana me, jinên me, zarokên me, bavên me her roj di bin êrîşên balafir û mîtralyozan de ne.*

*Hikûmeta Ereb a li Îraqê, xwe ji bombebarandina ser xaniyên Kurdên paytexta Kurdistana Başûr Silêmaniyê ku beşdariya hilbijartinê qebûl nekirine, venekişandiye. Heman hikumet li pey peymaneke wisa ye ku dixwaze pê hemû mafên gelê Kurd ji holê rake û hemû hêviyên pêşerojê têk bibe. Em wisa bawer dikin ku, di ser laşên qurbanên van bombe û guleyên mîtralyozan re li Kurdistana Başûr êrîşê tînin ser îtîbara komeleya we ya bilind jî; ji ber ku Kurd di wesayeta cemiyeta we de ne, yanî ji aliyê cemiyeta we ve tên parastin.*

*Heger hêzên hikumeta Ereb a li Îraqê, bi balafir û yekîneyên Ingilîzan ku komeleya we ya bilind ji bo ser navê we bi rê ve bibe wek manda rêveberiya Îraqê dabû wan, piştgiriya wan nekiriba, ji bo Kurdan wek dîrokê meşa bi ser Bexdayê û bidestxistina wir wê bibûya karê rojekê. Em dikarin her tim welatê xwe ji Ereban biparêzin û em ê her tim jî wisa bin. Lê em naxwazin bi hikumeta Ingilîzan re ku bi navê cemiyeta we ya bilind tev digere, bikevin şerekî çekdarî û em dixwazin bi navê heq û edaletê dengê xwe bibin hev."*[51]

Daxwaza avakirina hikumeteke Kurd a di bin çavdêriya Cemiyeta Miletan de (bi pêşniyaz û piştgiriya majeste) tê redkirin. Bi vî awayî piştgiri-

[51] Basil Nikitin, bnb, r. 504-505

ya ji bo rêveberiya Îraqê hîn qewîntir dibû û êrîş heta Gulana 1931'ê dewam dike. Dûre Şêx Mehmûd mecbûr dimîne ku teslîm bibe. Me berê jî got ku di heman demê de hem li Îranê, hem jî li Tirkiyeyê operasyon tên kirin.

Her çiqas mandatiya hikumeta Ingilîz a li ser Îraqê rabe jî, ji ber ku rayedarên girîng ên Ingilîzan di wezîfeyên girîng de mane zêde guhertin çênebûye. Wek mînak bandora Edmonds a li ser herêmê heta demeke dirêj wê dewam bikira. Di komîsyona lêgerîna Cemiyeta Miletan de ku ji bo lêkolîna pirsgirêka sînorê Îraq û Sûriyeyê di sala 1932'yan de hatibû damezirandin nûnerê Ingilîzan ew bû. Wî di sala 1933'yan de di Komîsyona Destnîşankirina Sînorê Îraq û Sûriyeyê de cih digirt. Di vê salê de, di wezareta derve ya Îraqê de jî wek şêwirmend kar kir. Di navbera salên 1932 û 1938'an de di delegasyona Îraqê ya Cemiyeta Miletan de cih girt. Di navbera salên 1935 û 1945'an de bû şêwirmendê wezîrê karê navxweyî yê Îraqê.

Danûstendinên alîkariya hikumeta Tirk û hikumeta Îraqê berdewam dikin. Hikumeta Tirk ji bo li hemberî wan Kurdên ku piştî têkçûna sala 1930'î derbasî Îraqê bûn û li hember Şêx Ehmed operasyona derveyî sînor li dar bixe, ji hikumeta Îraqê destûrê dixwaze. Îraqê destûrê nade, lê ew bi kêfxweşî qebûl dike ku wê ew bi xwe operasyonan bike û li hemberî Şêx Ehmed operasyonê li dar dixe. Paşê jî di nîvê Pûşpera sala 1931'ê de sefîrê Îranê yê li Enqerê ji sefîrê Ingilîzan re qala 'hevkariya (li ser pirsgirêka Kurd) di navbera her sê hikumetên pêwendîdar de' dike û girîngiya bêtesîrkirina Şêx Mehmûd tîne zimên.[52]

Bi vî awayî berî îmzekirina Pakta Sadabadê her sê hêz û Brîtanya li hember Kurdan dibin yek û li ser ku bi hev re tevbigerin li hev dikin. Di vê rewşê de Kurd dikevin nav kaoseke ku çi dikin, bi kîjan aliyî ve diçin dikevin xetereyê. Di 26'ê Gulana 1932'yan de hêzên Îraqê li hemberî Şêx Ehmed operasyona dawî saz dikin. Bi alîkariya serbazên Ingilîz û RAF'ê bi awayekî sîstematîk, bombe bi ser qampên peyayên Şêx Ehmed (Birayê Mustafa Barzanî) de tên barandin. Di 21'ê Pûşpera 1932'yan de Şêx Ehmed ligel 400 zilamên xwe sînor derbas dike û teslîmî Tirkiyeyê dibe. Şêx Ehmed dibin Stenbolê û ji wir jî sirgûnî Edîrneyê dikin. Di vê navberê de hikumeta Tirk 10-15 peyayên wî wek Kurdên Tirkiyeyê ku di sala 1930'î de beşdarî Serhildana Agiriyê bûne û ji penaberiya Şêx Ehmed sûd wergirtine vegeriyane qebûl dike û bi vê bahaneyê ew şeniqandine.[53] Piştî derketina efûyê di sala 1934'an de Şêx Ehmed û yê pê re vedigerin welatê xwe, lê rayedarên Îraqê wê wan bigirin, pêşiyê sirgûnî Nasiriyê bikin û paşê jî sirgûnî Silêmaniyê bikin.

[52] Chris Kutschera, bnb., r. 128-129
[53] Chris Kutschera, bnb., r. 147

Ew sirgûnên ku li Tirkiyeyê qet ranewestiyan û heta dawiya sedsalê jî wê bidomiya, di sala 1934'an de jî dewam dikir. Bi hezaran kes tên sirgûnkirin û operasyon tên lidarxistin. Di heman demê de Kurdistan herêmeke qedexekirî ye û ji wir tu xeber nayê stendin. Hikûmeta Tirk di sala 1934'an de fermandarê baskartêşê Kenan Paşa dişîne Şirnexê û di meha Tebaxê de bi armanca 'şikandina berxwedana Kurdên ku bi awayekî girseyî tên sirgûnkirin' pênc rojan bombe bi ser çiyayên Kurdistanê de tên barandin. Ji xeynî vê General Kenan Paşa di sala 1934 û 1935'a de li Mamuret el Ezîz 'ji bo ku çavê kesên herî welatparêz jî bitirsîne' gelek Kurdan dadiliqîne. (Agahiyên giştî yên di derbarê sirgûnan de di beşa 'Sirgûn û Asîmîlasyon'ê de cih girtine.)

Di dema ku vê zilm û zorê berdewam dikir hin ji kesên ku ji Tirkiyeyê derbasî Îranê bûn, dîsa bi hêzên Îranê re jî şer kirine. Her wisa bi serokatiya Smaîl Axayê Celalî, di 19'ê Gulana 1934'an de bi şev êrîşî ser baregeheke leşkerî ya Îranê dikin. Li gorî mukirhatina serokê 'Komîsyona Ewlekariya Hemû Herêmên Sînor ên Îranê' Kerîm Xan Sayah, wê şevê bi sedan leşkerên Îranê mirine, bi sedan jî birîndar bûne û felaketeke mezin hatiye serê wan. Li Îranê jî li ser operasyonan her cure xeber tê sansurkirin. Leşkerên ku bûyeran hişkere dikin, di dîwana herbê de tên darizandin.[54]

Digel ku çar aliyê wan tê girtin jî Kurd li ber xwe didin, her derfetê bi kar tînin û di daxuyakirina hebûna xwe de bibiryar in. Kesên ku hatine sirgûnkirin bi hesreta welêt dijîn, kesên ku hestên wan ên netewî xurt in û hişyar in li ser zimanê Kurdî, li ser dîroka Kurdan dixebitin.

Di wê demê de Kovara Hawarê ya ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve li Şamê dihat weşandin, ji bo çand û edebiyata Kurdî xebateke pir hêja ye. Di nav xetê wê de axîna hesreta welat û hawara zilm û zordariya li ser welêt tê mirov. Ji kovarê, me helbesta bi mijara me ve girêdayî ya bi navê 'Sinor' stend. Helbestvan di helbestê de, li gor nêrîna xwe sînor û nifûsa Kurd û Kurdistanê daye:

SÎNOR

Kurd e dezanî le ko cîgir e xizmanî tu
Go ger e bo te bilêm cîgehê xelanî tu
Kêwê Ter(s)ûs û 'Emeq hewze Îskenderûn
Xerbiye ta Behrî Reş sînorê meydanî tu
Behrî reş û Erdehan awî Aras e bizan

[54] Chris Kutschera, bnb., r. 127

Heddê şîmal e eme bo kuç û colanî tu
Ehlî Wan û golî Ormî ta serê awî Aras
Sînorî rojhelat e hîbûke û keywanî tu
Hewaz û Kêwî Hemrîn jengar û rê Misêbîn

Sînor e bo cenûbî bexçe û baxanî tu
Le  nawî em sînore diwanze wilayet heye
Delên duwanze mîlyon nifûsê Kurdanî tu
Haşa dirû ye û te ra nifûsiyan nenûsra
Degate bîst mîlyon binûsray qewmanî tu
Le derye em sînore le Enqere w Xurasan
Bilûş û Ezirbaycan le wêşe xizmanî tu
Ey wetenê xwoşewîst nawtim ew ca ke bîst
Mindalekî sawe bûm debûme qurbanî tu
Witey welatê Kurd e le ser wizanît wird e
E êrey em halê te delîlî îmanî tu[55]

*Seyid Huseynzade Ebdulxaliq Esirî*

Di vê navberê de em hebekî li fikrên ser sînorê Kurdistanê binêrin. Ji ber ku desthilatdariyeke fermî ya navneteweyî di tevahiya Kurdistanê de bi dest neketiye, li ser sînorê Kurdistanê fikrên cuda hene. Ji loma nexşeyên ku Kurdistanê didin xuyakirin hemû ne wek hev in. Bidestketinê ku îro hene jî; wek Eyaleta Kurdistanê ya Îranê û Herêma Federe ya Kurdistana Îraqê, ne ji cihê ku Kurd lê dijîn hemûyî hatine avakirin. Di rastiya xwe de li Îraqê û li Îranê, cihê Kurdan ji sînorên cihê ku bi navê Kurdistan hatine danîn firehtir in. Ev tenê bidestketinên li gor derfetan in. Ji aliyê din ve dewletên desthilatdar roj bi roj di Kurdistanê de bêhtir bi rêxistin dibin û dema asîmîlasyon jî dikeve ser, rewş tê guhertin. Ji ber vê yekê, xuya ye mijara sînorên Kurdistanê wê hîn gelekî bê nîqaşkirin.

Osman Sebri jî di hejmara 29'emîn a Hawarê de (1941) di bin sernivîsa "Kurd û Kurdistan"ê de hinekî li ser sînorên Kurdistanê sekiniye. Di vî warî de hin kêmasî di xebata Emin Zekî Beg a ku bi navê 'Dîroka Kurd û Kurdistanê' nivîsiye dîtiye. Osman Sebri wiha dibêje:

"Di rûpelê 23'yemîn û benda 'Kurd li Tirkiyeyê' de li ser gotina (Sir Mark Saykis) sînorên welatê Kurdan, hêla bakur û roava holê nîşan dide: Alajgird-Erzirom-Zara-Egin-Meletî-Bêsnî-Bîrecîk-Riha.

[55] Kovara Hawar Cild-1, Hejmar 1-23(1932-1933), r. 514

Sir Mark bi xweyakirina vî sînorê han, sê welayetên Kurdan bi tevayî û sisiyan jî nîvê nîv bi ser Tirkan ve berdide. Bi vê yekê rohelat û nîvroyên Erdihan û Qersê; tevayiya Meraş, Entab û Kilisê, bi bakurê Helebê û rohelatê Skenderûnê ve derî sînorê Kurdistanê dimîne. Di vî erdê han da pirtirî milyonek Kurd heye."[56]

Osman Sebri wilayetê Kurdan ên li Tirkiyeyê bi navê, "Beyazid, Hezarom, Erzincan, Wan, Hekarî, Sêrt, Mêrdîn, Diyarbekir, Bitlis, Muş, Xarpêt, Dêrsim, Meletî, Meraş, Entab, Kilis û Riha" dide.[57]

Di Hawarê de Herekol Azizan di nivîsa xwe ya bi nave 'Kurdên Ecemistanê û Halê Wan' de wiha behsa Kurdistana Îranê dike: "Birê Kurdistana ko îro di bin hukmê Eceman de ye welatekî mezin e û xelkê wî xelkekî boş e. Roavayê Ecemistanê ji bakur heta nîvro, hesêb tevde Kurdistan e.

Di teşkîlata Eceman a kevn de wîlayeteke Kurdistanê jî hebû. Lê nemaze piştî ko Şahê Pehlewî li ser textê Ecemistanê rabû, bêjeyên Kurd û Kurdistanê li Ecemîstanê jî bûne kufir û bilêvkirina wan hate bendkirin...

Her wekî me got, roavayê Ecemistanê ji bakur heta nîvro tevde Kurdistan e. Ev Kurdistan bi Kurdistanên Tirkiye û Îraqê ve ye. Ji nîvro ber bi bakur ve Kurdistana Ecem, bir bi bir bi awayê jêrîn bi nav dibe: Loristan û eşîrên bextiyarî, Kirmanşanan, emareta Erdelan, Mikrî û Sawicblax, nîvroyê wilayeta Azerbeycanê. Roavayê gola Ûrmiyê: Di vê mintiqê de û di her sê qezayên Xoy, Selmas û Ûrmî de zehf Kurd hene. Herçî qeza Makû, hesêb tevde Kurdmanc e. Di hir ve Kurd digehin tixûbên Qevqasê. Di Loristanê re jî digehin behrê, Xelîca Besrê, bendera Benderbûşir.

Ev Kurdistana Ecemistanê ye ko her wekî me got, bi Kurdistanên Tirkiye û Îraqê ve ye. Jê pê ve li gelek cihên Ecemistanê de Kurd hene.

Di dora Tehranê de eşira Pozakî. Li Xuresanê eşîrên Cozkan. Li Mezindranê eşîra Modanlu. Di wilayeta Faris de eşîrên Şevankare. Erdê van eşîran digehe Xelîca Faris, Benderebasê. Di Îraqa Ecem de eşîrên Omerlû. Di her çar wilayetên Kirman, Gêlan, Xuzistan û Qehistanê de jî Kurd hene..."[58]

Abdurrehman Qasimlo jî ku profesorê zanistên aborî û sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bû, li ser vê mijarê sekiniye. Di berhema xwe ya bi navê 'Di Têkoşîna Azadiyê de Çil Sal' (1985) de li ser ax û nifûsa Kurdistana Îranê wiha nivîsiye: Kurdistana Îranê çar herêmên Îranê, ango Azerbaycana Rojava, Kurdistan, Kirmanşan û Elamê digire nav xwe. Hikumeta Îranê tenê herêma Kurdistanê (ku bajarê sereke Sine ye) wek

[56] Kovara Hawar-Cild 2, r. 730
[57] Kovara Hawar-Cild 2, r. 754
[58] Herekol Azizan, Sernivîs: Kurdên Ecemistanê û Halê Wan, Hawar-Cild 2, r. 854-855

'Kurdistan' bi nav dike. Qada Kurdistana Îranê 125 hezar kîlometre çarçik e (Ji % 8'ê axa Îranê ye) û hejmara gelê wê 7 milyon e. (Li gor Qasimlo ev nufûs ji %17'yê nifûsa Îranê ye û gurbûna nufûsê jî du qatî rêjeya giştî ya Îranê ye)[59]

A. M. Menteşaşvili jî di berhema xwe ya bi navê 'Ji Duh Ber Bi Îro Ve Kurd' (Dünden Bugüne Kürtler) de wiha qala Kurdistanê dike: "Qada Kurdistana ku di nav çar dewletên Rojhilata Nêzik û Navîn de hatiye parvekirin, 408 hezar kîlometre çarçik e. 194 hezar kîlometre çarçika vê axê Kurdistana Bakur an jî Kurdistana Tirkiyeyê, 124 hezar kîlometre çarçika vê axê Kurdistana rojhilat an jî Kurdistana Îranê ye, 72 hezar kîlometre çarçika wê Kurdistana Başûr an jî Kurdistana Îraqê ye û 18 hezar kîlometre çarçika wê jî Kurdistana Rojava yan jî Kurdistana Sûriyeyê ye."[60]

Li ser sînorên Kurdistanê û nifûsa Kurdan nerînên cihê hene. Bi taybetî ji ber ku Kurd gelek caran nikarin xwe bi awayekî azad îfade bikin, nifûsa wan tam nayê zanîn. Bi hin rêbazên zanistî û bi hin agahiyên kevn em dikarin bigihîjin encamekê. Ji vê mijara ku xebateke cihê jê re divê, em derbasî mijara xwe bibin.

Hewce ye em çavekî li rewşa Kurdên Yekîtiya Sovyetan jî bigerînin. Her çiqas Yekîtiya Sovyetan û Tirkiye di nav hevkariyê de bûn jî, Yekîtiya Sovyetan yek ji wan cihan e ku li ser çanda Kurdî xebatên girîng lê hatine kirin. Dema ku li Tirkiyeyê aloziyên mezin derdiketin li Sovyetistanê di der heqê Kurdan de hin pêşketinên baş ên siyasî çêdibûn. Lê bi wextê re Tirkiyeyê li ser destkeftinên Kurdên li vir bandoreke xirab kiriye. Wek mînak, li herêmên Laçîn, Kelbecer û Kubatli gelek Kurd dijîn û di demên pêşî de wan Kurdan hin maf bi dest xistine. Di vê herêmê de, di sala 1923'yan de 'Herêma Otonom a Kurdistana Sor' hatiye avakirin. Serokê şoreşa Sovyetê V. İ. Lenîn, di telgrafa ku ji serokê Azerbaycanê Nerîman Nerîmanov re şandiye wiha gotibû: "Ji hejarên Volga û Kurdistanê re bi qasî 40 milyonî alîkariyê bikin." Lê bi wêxtê re li gor pêwendiyên bi Tirkiyeyê re rewşa Herêma Otonom a Kurdistana Sor jî hat guhertin.*

[59] Dr. Abdurrahman Qasimlo, Özgürlük Mücadelesinde Kırk Yıl, r. 25

[60] A. M. Menteşaşvili, Dünden Bugüne Kürtler(Ji Duh Ber Bi Îro ve Kurd), r. 9

* *Herêma ku wek Kurdistana Sor tê binavkirin di navbera sedsalên 10 û 13'an de di nav sînorên dewleta Kurd a Şedadiyan de bû. Di sedsala 15'an de ev herêm wek herêma Ablan-Xaçîn hatiye binavkirin. Di sedsala 16'an de ev herêm ketiye bin desthilatdariya Îranê. Di sala 1805'an de, bi peymana Kurekçayê ketiye nav sînorên Rûsyayê. Di destpêka sedsala 20'an de deverên Qafqasyayê bi navê gelên ku tê de dijîn hatin binavkirin. Ji ber vê jî li Qafqasyayê, ji bo devera ku Kurd lê dijîn Kurdistana Sor hatiye gotin. Kurdistana Sor ji bajarên Laçîn, Kelbecer, Gubatli, Zengilan û ji sedan gund û bajarokên ku girêdayî van bajaran in, pêk tê. Her çar bajar jî xwedî axa biberhem in û ji bo çandinê û xwedîkirina ajalan guncaw in. Li Kelbecer û Zengilanê madenên zêr, malîbden, granît û cîwayê hene.*

Dema ku li Tirkiyeyê Serhildana Agiriyê dewam dikir, di sala 1929'an de statuya Herêma Otonom a Kurdan hat hilanîn. Perwerdehiya Kurdî bi dawî bû. Weşana radyoya Kurdî hat rawestandin. Di hevpeyvînekê de ku di Kewçêra 1989'an de hatiye kirin Kurdê Sovyetê Prof. Nadîr Nadîrov wiha dibêje: "Di sala 1923'yan de di nav sînorên Azerbaycana îro de, herêmeke otonom a Kurdan hat damezirandin. Ev herêm ji şeş bajarokan, ango ji Qereqişlaq, Kelbecer, Qoturlû, Qubatlî, Kurtgacî û Muradxanli pêk dihat. Navê wê Kurdistana Sovyetê bû. Laçîn paytexta herêmê bû. Li dibistanan heta lîseyê perwerdehî bi zimanê Kurdî bû. Rojname û pirtûkên Kurdî dihatin çapkirin. Sendîkaya Nivîskarên Kurd hatibû damezirandin. Radyoyeke me ya ku bi Kurdî weşan dikir jî hebû. Navê serokê herêma otonom Qutsî Haciyev bû. Bi navê 'Rojnameya Kurdistana Sovyet' rojnameyeke me dihat weşandin. Li bajarê Sûşe li ser zimanê Kurdî enstîtuyek hatibû damezirandin. Ji sala 1929'an şûnde ev tev li pey hev ji holê hatin rakirin. Rojname heta sala 1961'ê hat weşandin. Di sala 1929'an de dawî li perwerdehiya Kurdî anîn. Weşana radyoyê hat rawestandin... Radyoya Erîwanê weşana xwe domand. Pirtûkxaneya Kurd a li Azerbaycanê neqlî Erîwanê kirin. Li Ermenistanê xebatên li ser çanda Kurdî dewam kirin..."[62]




*Li Sovyeta Berê Herêma Otonom a Kurdistanê(Nexşe bi Tirkî hatiye amadekirin)*[61]

Ew xebatên ku li Ermenistanê wê demê û paşê jî hatin kirin, alîkariyeke mezin bi çanda Kurdî re kirine. Li Erîwanê gelek berhemên Kurdî hatine weşandin. Her wiha dibistaneke mamosteyên Kurdî û şanoyeke Kurdî hatiye damezirandin.[63] Rojnameya Kurdî 'Riya Teze' ku li Ermenistanê di sala 1930'î de dest bi weşanê kiriye, carna navber dabê jî heta niha weşana xwe domand û bi vî awayî bû weşana herî temendirêj a Kurdî. Li dinyayê kongreya pêşî a Kurdolojiyê di Tîrmeha 1935'an de li paytexta Ermenistanê ango li Erîwanê kom bû.

[61] Prof. Mehrdad R. İzady, Kürtler
[62] Rafet Ballı, bnb., r. 580
[63] Basil Nikitin, bnb, r. 346

Di sala 2006'an de di Rojên Wêjeyê ya li Amedê de, yek ji mêvanên me pisporê dîroka wêjeyê Çerkezê Reş bû. Dema min derfeta ku em hebekî sohbetê bikin bi dest xist, min behsa vê xebata xwe jê re kir û em hebekî li ser sînoran axivîn. Di sohbeta me de got ku, li Ermenistanê gelek xebatên baş hatine kirin lê ji ber hebûna sînoran ev xebat negihîştine çavkaniya xwe, xelkê Kurdistanê û ji ber vê jî ev xebat zêde bi pêş neketine. Dîsa jî ev xebat ji bo Kurdan gavên pir girîng in.

Li Tirkiyeyê ku xwedî nifûsa herî zêde ya Kurdan e, helwestên bi vî rengî qet çênebûne. Psîkolojiya şer tim bûye serdest. Her wisa li ku dera dinyayê li ser Kurdan çi gav hatibe avêtin Tirkiye pê aciz bûye, ji nêzik ve şopandiye, li dijî van gavan derketiye û di cih de li dij tedbîr stendine. Rayedarên Tirkiyeyê ji Kongreya Kurdolojiyê ku li Erîwanê kom bûbû jî aciz bûne. Abîdîn Ozmen ê Mufetîşê Artêşa Yekemîn ku wîlayetên Bedlîs, Diyarbekir, Wan, Colemêrg, Mûş, Mêrdîn, Riha û Sêrt digirt nav xwe, di derbarê kongreyê de agahiyan dide Enqereyê. Ozmen biryarên Kongreya Kurdolojiyê ya ku li Erîwanê kom bûbû wiha rêz dike:

A- Rizgarkirina Kurdan ji bin bandora çanda Tirkan.

B- Bi lêkolîna bûyerên qedîm, dîtina eslê Kurdan û nivîsandina dîroka Kurdan.

C- Vedîtina têkiliyên nîjadî yên Kurd û Êzîdiyan û Ermeniyan.

D- Çêkirina nexşeyeke Kurdistanê.

E- Bi anîna cem hev a zaravayên zimanê Kurdî, pêkanîna yekzimanî, amadekirina rêziman û ferhengekê û tespîtkirina nivîsê.[64]

Di rapora pêwendîdar a Ozmen de (ku ji sala 1935'an heta sala 1943'yan mufetişiya wî ya giştî wê dom bikira) tê gotin ku, divê li hemberî Kurdan bi lezgînî tedbîr bên stendin. Ozmen wiha difikire û xemgîn dibe: "Îro li Sûriyeyê gelek Kurd, Ermenî û Suryanî ku ji hêla hikumetê ve jî navên wan tên zanîn, ji bo Ermenî û Kurdan bêhtir bi hev ve girêbidin dixebitin. Bi îstîfadekirina hindikahiyên wek Suryanî, Asûrî û Êzîdî jî, dikin ku Elcezîre jî tê de bi awayê ku ji Torosan dest pê bike yekîtiyeke mezin a Ermenistan û Kurdistanê ava bikin..." Di raporan de, ji bo çareseriyan pêşniyazên Ozmen hene. Em ê di beşa sêyem de li ser pêşniyazên Ozmen ên ji bo asîmîlekirina Kurdan bisekinin.

Lêkolîn, rapor, pêşniyaz û tedbîrên li ser herêmên ku Kurd lê dijîn yek li dû yekê tên amadekirin. Hîn di sala 1930'î de Serokerkanê Giştî Mareşal Fewzî Çakmak jî li bajarên Kurdan geryaye û di vegerê de raporek ji

[64] Ersal Yavi, bnb., r. 308

Serokkomar Ataturk û Serokwezîr Înonu re pêşkêş kiriye. Di raporê de bal kişandiye ser potansiyela Kurdewariya Dêrsimê û li ser hewcedariya di cih de stendina tedbîran sekiniye. Piştî vê raporê Înonu heyetekê dişîne herêmê. Paşê wezîrê karê navxweyî jî tê şandin û li ser herêmê agahiyên bi kitekit tên berhevkirin. Wezîr di rapora xwe de dibêje ku, Dêrsim ji bo Tirkîtiyê birînek e. Ji ber vê jî pêşniyaz dike ku hin tedbîr bên stendin: Divê pêşiyê bi qencî û xweşikahî çekên Dêrsimiyan bên berhevkirin, paşê jî divê di serî de Seyid Riza, 347 malbatên axayan, bi şertê ku careke din venegerin, sirgûnî rojava, nav Tirkan bihatina kirin. Bi vî awayî 'terbiyekirin'a (tedîba)! kesên mayî wê rihetir bibûya...

Felaketa bi ser Dêrsimê de wê bihata her roj nêziktir dibû. Dora raporê hatiye Înonu. Înonu jî li Wan, Bedlîs, Diyarbekir, Mêrdîn, Riha, Elezîz û Dêrsimê digere, di 21'ê Tebaxa 1935'an de raporekê pêşkêşî serokkomar Mustafa Kemal dike. Înonu jî balê dikişîne ser Dêrsimê û ji bo rê li ber potansiyela Kurdayetiyê bê girtin, bicihkirina koçberên Tirk a li herêmê pêşniyaz dike. Hin beşên raporê wihan in:

"...Deştên Wan, Mûş û Erzînganê ji belavbûna Kurdan re vekirî ne. Em mecbûr in bi lez li Wan û Erzînganê, hêdî hêdî jî li Deşta Mûşê û li Deşta Elazîzê komên xurt ên Tirkan pêk bînin.

...Gelê xurt û bibandor ê Dêrsimê bi lez gundên vala yên nêzîkî Erzînganê tijî dike. Begên Erzînganê ji bo çandina zeviyan Dêrsimiyan wek mêreba (cotkar) digirin. Ev beg bi vî awayî xwe dispêrin Dêrsimiyan.

...Ev gund û çêregeh ji bo ketina herêmên hundir ji talankerên Dêrsimî re dibin zemîn. Heger di demeke nêzik de Erzîngan bibe navendeke Kurdan, ha wê gavê divê em ji pêkhatina Kurdistanê bitirsin."[65]

Piştî vê Înonu li ser îslehkirina Dêrsimê projeyekê amade dike. Di nav çend mehan de ev proje dibe qanûn. Di 25'ê Berfanbara 1935'an de bi hejmara 2884'an 'Qanûna Tuncelî' tê derxistin. Navê Dêrsimê wek Tuncelî tê guhertin. Digel ku qanûn ji bo 5 salan e, 6 salên din jî tê sepandin û bi giştî qanûn 11 salan di meriyetê de dimîne. Vê qanûnê rayeya walîtî û wezîrtiyê daye serbazekî xwedî payeya korgeneral û di benda (j) de, bi gotina 'Yên ku ji bo wan biryara darvekirinê hatiye dayîn, heger walî û fermande pêwîstî bi derengxistinê nebînin divê werin darvekirin' rayeyên awarte dide wan.[66]

Gava pêşî a bernameya îslehkirina Dêrsimê berhevkirina çekên di destê xelkê de bû. Her wiha diviyabû memûr hemû ne ji kesên herêmê bûna û dûre

[65] Ahmet Kahraman, bnb., r. 283
[66] Ersal Yavi, bnb., r. 310

jî diviyabû di nav Kurdan de koçberên Bulgaristan, Yewnanistan û Qafkasyayê bihatina bicihkirin. Di pêşniyazan de li herêmê çêkirina riyên bejahiyê jî hebû.*

Çapemeniyê jî alîkariya biryarên ku hatibûn stendin dikir. Roja 02.01.1937'an di rojnameya Cumhuriyetê de wiha hatibû nivîsandin: "Li gorî raporên Mufetîşiyên Giştî, hewce ye hilbijartina memûrên ku wê herin rojhilat bi baldarî werin kirin. Biryar hatin stendin ku li rojhilat dibistanên şevînî (mektebên leylî) bên avakirin, tora telefonê bê danîn û bûyerên eşqiyatiyê jî bên tunekirin."[67] Piştre jî ew ê di nav rûpelên xwe de bi awayekî ne rast binivîsandina ku, Kurd ji ber li dijî avakirina rê û dibistanan derdikevin serî hildane û hwd.

Li herêmê li gel qereqolên cendirmeyan pir û rê jî hatine avakirin û beravajiya propagandayan xelk tev li avakirina wan bûbû. Ji hêla din ve, yekîneyên leşkerî yek bi yek li gundan geriyane, ji mirîşk, bizin, mîh û hespan bigire heta keran hemû ajal hatine hejmartin, bi temen û cinsan mirov hatine hejmartin û tomarkirin, kêr jî tê de hemû çek hatine berhevkirin.

Yek ji kesên ku ji ber van bûyeran bi xem û bi fikar e Seyid Riza ye. Wî ji dostên xwe re digot ku, ev bûyer ne bûyerên xêrê ne û hewce ye li hemberî êrîşan xwe amade bikin. Çavê dewletê jî li ser Seyid Riza bû. Seyid Riza pêşewayê siruştî yê Dêrsimê bû. Seyid Riza kesekî hişyar bû, di mala wî de pirtûkxane hebû û ji hêla gel ve jî dihat hezkirin. Kesayetiya wî û bandora wî ya li ser xelkê bal dikişandin ser wî.

Di vê navberê de mîna her tim, li herêmê fitneya nav eşîran dewam dikir. Hin eşîr ji hêla dewletê ve dihatin destekkirin, xurtkirin û ji ber vê jî mêzîna hêzan dihat guhertin û tevlihevî çêdibûn. Ji ber rewşên wisa, di vê demê de kurê Seyid Riza ji hêla eşîra Qirgan ve hat kuştin.

Rewş ne xweş e û her kes tê derdixist ku wê tiştin biqewimin. Hin bûyerên şexsî wê ji bo bûyerên mezin ên bi êş û jan bibûna mahne. Wek mînak, serbazek dixwaze dest biavêje namûsa jinekê, mêrê wê (Mihemed Elî) serbaz dikuje û du leşkeran jî birîndar dike. Li ser vê bûyerê serokê eşîran dicivin û ji ber ku difikirin Mihemed Elî namûsa xwe parastiye wî teslîmî leşkeran nakin. Di vê navberê de bûyereke din diqewime. Li pirekê xortek nahêle ku leşker wî saxtî bikin û li ser vê, leşker li xort dixin. Paşê jî xort serbazekî dikuje û du leşkeran birîndar dike. Ev bûyer têra ku li herêmê agir dest pê bike

** Paşê jî wê rê bihatina çêkirin. Di salên sih û çilan de sê xetên riya hesinî ku Anatolyaya rojava bi wîlayetên rojhilat ve girêdide, tên çêkirin. Ji Sêwasê heta Erzirom û Erzînganê, ji Meletiyê heta Elazîz û Mûşê û xeta Diyarbekir û Misircê ku dixwestin heta Cizîrê û sînor dirêj bikin. Ev her sê xet jî xetên stratejîk in û rihetiyekê dide operasyonan.*

[67] Faik Bulut, Türk Basınında Kürtler(Di Çapemeniya Tirk de Rewşa Kurdan), r. 52

dike. Enqere van bûyeran, bi şiklê ku Dêrsimê bi pêşengiya Seyid Riza bi tevayî serî hildaye, dest bi kuştina leşkeran kiriye û pir tevde hatine hilweşandin nîşan dide.

Dema ku Seyid Riza ji van tiştan haydar dibe, ji bo pêşiyê li bûyeran bigire ji General Alpdogan re peyameke wiha dişîne:

“Ji we re tê gotin ku Dêrsimî dixwazin serî hildin. Lê ev ne rast e. Em ne alîgirê şer in. Em mirovên hejar in ku li pey cilekî û qetek nan in. Em şer naxwazin. Em li hêviya aştiyê ne û li benda destê dewletê ne ku were li Dêrsimê xizmetan bike. Guh nedin wan gotinan. Guneh e, mirovan nekujin...” A. Kahraman, di berhema xwe ya bi navê ‘Serhildanên Kurdan’ de piştî peyama Seyid Riza vê notê datîne:

“Lê êdî pir dereng bû.

Riyên çûnûhatinê û stareyên leşkerî hatibûn avakirin, danhevên pêwîst hatibûn komkirin û dema destpêkirina tevgerê hatibû. Di 21’ê Adara 1937’an de serê sibêha cejna Newrozê bi bombekirina mala Seyid Riza ‘Bernameya Îslahata Dêrsimê’ dihat destpêkirin.”[68]

Ji bo êrîşa giştî hemû xebatên pêwîst tên kirin. Ji hêla hikumetê ve biryar tên stendin. Hin beşên ji biryara Civata Wezîran a bi mora “pir veşarî ye”, ku di 4’ê Gulana 1937’an de hatiye stendin û ji bo sepandinê jî ji General Abdullah Alpdogan re hatiye şandin, wiha ne:

“Heger tevger tenê ji êrîşê pêk were kaniyên serhildanê tim wê di cihê xwe de bimînin.

Ji ber vê jî pewîstî hatiye dîtin ku kesên çek bi kar anîne di cihê de li wan wisa bê kirin ku êdî nikaribin zerarê bikin, divê gundên wan bi temamî werin hilweşandin û malbatên wan jî werin bidûrxistin.”

Du jêrenot jî di fermannameyê de hatibûn danîn. Di wan de wiha hatibû gotin:

“Not: Piştî ku hêzên ji Meletiyê û Enqerê hatine şandin bigihîjin cepheyê, hêzên li cepheyê divê werin talîmkirin û bêhna xwe vedin û tabûra ku ji Diyarbekirê tê, bê bicihkirin, ango hefteyek şûnde di 12’ê Gulanê de dikare tevger dest pê bike.

Not: Bêyî ku hûn li pereyan bifikirin, hewce ye ji nav wan gelek zilam werin bidestxistin û bikaranîn.”[69]

Gelê ku bi biryarên hatine stendin dihise ditirse û ji bo xwe biparêze amadehiyan dike. Lê gelê ku her tiştê wî jê hatiye stendin ma çawa dikaribû xwe

[68] Ahmet Kahraman, bnb., r. 302
[69] Ahmet Kahraman, bnb., r. 304

ji vê hêza mezin biparêze? Di tevgera piştre balafir jî hatin bikaranîn. Yek ji pîlotên ku tev li bombebarana hewayî bûbû 'keça manewî' ya Ataturk Sabîha Gokçen bû. Artêşa bejayî ya Tirk dor li çiya, çem, daristan û gundên Dêrsimê girtibû. Mirov dihatin girtin û sirgûnkirin, kesên ku li ber xwe didan dihatin kuştin, gund dihatin şewitandin; hêza hewayî jî bombe bi ser gundan de dibarandin.

Di propagandayan de hatiye gotin ku, Kurdan ji ber li dij reformên mîna avakirina dibistan û riyan derketine, serî hildane. Tu eleqeya van propagandayan bi rastiyan re tune ye, lê tesîra wan gihîştiye kovara Timesê jî. Balyozê berê yê Rûsyayê yê li Îranê wiha li dij nûçeya ku wê demê di kovara Timesê de hatibû weşandin, derketiye:

*HINDIKAHIYÊN KURD*
*(Ji weşangerê Timesê re)*

*Efendiyê Hêja,*

*Di hejmara we ya 16'ê Pûşperê de nûçegihanê we yê Stenbolê, bi sernavê "Kurdên Ku Li Dijî Perwerdehiyê Derdikevin – Serhildana Ku Yekîneyên Leşkerî Têk Biriye" nivîsek weşand. Di vê nivîsê de tê gotin ku xelkê herêmê li dijî perwerdehiya mecbûrî û reformên din derdikeve û ji ber vê Kurdên Dêrsimî hin alozî derxistine û artêş û hêzên cendirmeyan ku tê de pîloteke jin jî heye dawî li vê aloziyê aniye.*

*Divê wekî kesekî ku hinekî be jî Kurdan nas dike, ziman û dîroka wan dizane, bêjim ku vê nûçeyê ez êşandim. Kurdên ku di vê herêmê de rûdinên ji hêla nijad, ziman, ol, adet û taybetmendiyên civakî ve ji cîranê xwe yên Tirk bi temamî cihê ne. Di bûyerên Dêrsimê de em dibin şahidên serpêhatiyeke nû ku taybetmendiyên etnîkî yên Kurdan nîşan dide. Heger Kurd wek dijberê perwerdehiyê werin binavkirin, ev yek wê bibe xeletiyeke mezin, a rast ew li dij Tirkbûnê ne. Bi awayekî rûniştî û xwezayî pêşketina kesan encex bi perwerdehiya bi zimanê dayîkê dibe.*

*Li derên din mafên hindikahiyan ên Kurdan hatine qebûlkirin. Di dema meseleya Mûsilê de li gor daxwaza Cemiyeta Miletan, Kurd li Îraqê li sê wîlayetan ango li Hewlêrê, Kerkûkê û Silêmaniyê ji otonomiyeke çandî îstîfade dikin; bêyî ku rastî zexteke dewleta ku ew hemwelatiyên wê ne werin, bi zima-*

*nê xwe û kevneşopiya xwe digihîjin. Heman tişt li nav Kurdên li Ermenistana Sovyetê jî tê dîtin, Sovyet li hemberî wan siyaseta hindikahiyan pêk tîne.*

*B. NİKİTİNE*
*Konsolosê berê yê Rûsyayê yê li Îranê*
*29 rue George-Sand, Paris (Xvfe).*
*Times. 22 Tîrmeh 1937*[70]

Li Tirkiyeyê ji ber ku li ser çapemeniyê sansur heye û tenê ji nûçeyên propagandayê re destûr heye, di vê demê de jî raya giştî ji gelek bûyerên ku li herêmê diqewimîn bêxeber e. Gelek tiştên ku qewimîbûn an ji tirsan, an jî ji ber ku wê bibûya sebeba bûyerên nû yên biêş hatin veşartin. Lê piştî bi dehan salan hin şahid axivîne û bûyerên ku qewimîne hişkere kirine. Yek ji van şahidan di sala 1987'an de ji kovara Noktayê re axiviye. Di nivîsa ku li ser Dêrsimê bû, şahida bi navê Menez Akkaya li ser wan rojan wiha gotiye:

"Ez wê demê keçeke ciwan bûm. Çend caran leşker hatin gundê me. Tiştek bi me nekirin. Ji ber ku me bi Tirkî nizanibû, me ji gotinên wan fêm nedikir. Paşê careke din hatin. Tevahiya gundiyan kom kirin. Em hemû birin cihê ku kevirê aş lê ye. Ji me re gotin wê çekên me berhev bikin û paşê jî wê me serbest bihêlin. Lê wan em birin qiraxa rûbar û li wir gule li me barandin. Em sê kes filitîn. Min xwe bi darekê girt û wisa min xwe xilas kir. Bi rojan em tî û birçî li ba miriyan man. Êdî wisa li me hatibû ku, di dilê me de bi navê tirsê tiştek nemabû."[71]

Beşek ji gotinên Dr. Nûrî Dêrsimî yên li ser bûyerên ku di dema Serhildana Dêrsimê de qewimîne wiha ye: "Seyid Riza mecbûr mabû ku herêma xwe biterikîne, çûbû nav eşîrên bêalî, dikir ku wan bixe nav serhildanê û qada şer firehtir bike. Tirkan qûntara çiyayê Tûjik bi temamî bi dest xistibû û Kurdên ku li vir ketibûn destê wan bê merhamet kuştibûn. Bi hezaran zarok, jin û keçên ku xwe spartin şikeftên geliyê Îlksorê li qûntara Çiyayê Tûjik, ji ber ku devê şikeftan bi çîmentoyê hat girtin, hatin kuştin. Belgeyên van bûyeran hene. Di nexşeyan de li ser van şikeftan wekî 1, 2, 3 îşaret hatine danîn. Li ber devê hin şikeftan agir hatiye dadan û bi dixana êgir gelek kesên ku di şikeftan de diman xeniqîne, yên ku xwe avêtine derve bi singûyan hatine kuştin."[72]

Dema li Dêrsimê ev felaket diqewimîn, peymanên navdewletan dihatin morkirin û cepheya li hember Kurdan qewîntir dibû. Wê demê di navbera

[70] Basil Nikitin, bnb, r. 508-509
[71] Ahmet Kahraman, bnb., r. 312
[72] Ahmet Kahraman, bnb., r. 319

Tirkiyê û Îranê de di 27'ê Gulana 1937'an de, li ser sînor peymanek hat çêkirin. Piştî danûstandinên dûrûdirêj ên Sûriye û Tirkiyeyê bi protokola ku di sala 1937'an de hat qebûlkirin, xeta Yenîce û Nisêbînê ya Rêhesina Bexdayê ket aliyê Tirkiyeyê. Di 4'ê Tîrmeha 1937'an de Îran û Îraqê protokolên nû li peymanên li ser sînor zêde kirine. Di 8'ê Tîrmeha heman salê de li Tehranê Tirkiyê, Îran, Îraq û Afganistan li ser ku li dijî Kurdan bi hev re tevbigerin li hev dikin û peymanekê çêdikin. Ev peyman wek Pakta Sadabadê tê zanîn.

Serokê berxwedana Dêrsimê Seyid Riza, di 30'ê Tîrmeha 1937'an de ji Cemiyeta Miletan, wezareta karên derve ya Brîtanya, Frensa û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re nameyekê dişîne. Di nameyê de wiha tê gotin: "Bi salan e Dewleta Tirk Kurdan diperçiqîne, rojname û weşanên Kurdî qedexe dike, îşkencê dide kesên ku bi zimanê xwe yê dayikê dipeyivin, bi darê zorê û bi berdewamî xelkê koçî deran dike... Ev sê meh in şerekî ecêb li welatê min didome... Li hemberî berxwedana me, balafirên Tirkan gundên me bombe dikin, dişewitînin, jin û zarokên ku nikarin xwe biparêzin dikujin... Girtîgeh bi Kurdên aştîxwaz tije bûne û cih di wan de nemaye, rewşenbîr tên gulebarankirin, darvekirin û sirgûnkirin..."[73]

Lê di vê mijarê de tu bersiv, yan jî pêşketineke erênî nayê dîtin. Li hemberî peymana Sadabadê ku hêzên mezin di demeke nêzik de mor kiribûn, ma hêza daxwazên insanî wê çi bûya? Berevajî, bi peymanên ku dihatin morkirin dewlet bihêztir dibûn û li hemberî Kurdan dijwartir dibûn.

Li derdora Dêrsimê tevahiya havînê şer dewam kir. Dema ku payîza sala 1937'an nêzik dibû Dêrsim bi komkujiyan re rû bi rû bû. Tenê ji malbata Seyid Riza, tevî jina wî Besê, kurê wî Şêx Hesen, keçên wî, zavayên wî û nêviyên wî, bi giştî 47 kes hatine kuştin.

Halbûkî di meha Tebaxê de, ji waliyê Erzînganê pêşniyaza hevdîtin û aştiyê ji Seyid Riza re hatibû. Li gor daxwaza walî, heger Seyid Riza dev ji çekan berde û were hevdîtina lihevkirinê, wê tevgera Dêrsimê bi dawî bibe, wê efûyeke giştî were derxistin, zirar wê negihîje tu kesî û zirarên ku çêbûne wê ji hêla dewletê ve werin tenzîmkirin. Seyid Riza piştî ku bi hevalên xwe re axivî, di dawiya meha Tebaxê de ragihand ku ew lihevrûniştinê qebûl dike.[74]

Seyid Riza di roja 10'ê Rezbera 1937'an de, ji bo muzakereyan diçe Erzînganê û li wir tê girtin. Di 18'ê Sermawezê de tevî deh hevalên xwe yên pêşeng, kurê xwe û birayê xwe li Elezîzê tê daliqandin. Halbûkî Seyid Riza wisa bawer dikir ku di hevdîtinan de wê lihevhatinek çêbibe û dûre wê bi

[73] Ersal Yavi, bnb., r. 299
[74] Ahmet Kahraman, bnb., r. 329



*Seyid Riza bi rayedarên Tirk ên eskerî re*[75]

Ataturk re hevdîtinê bike. Lewre berî hevdîtinê daxwaza wî ya hevdîtina bi Ataturk re hatibû qebûlkirin. Seyid Riza, mîna gelek serokên Kurd ên ku di dîrokê de bi heman rewşê re rû bi rû mabûn, nizanîbû ku hatiye xapandin.

Di dema darvekirinê de jî wê dîrok dubare bibûya û li pêş çavên bavan wê kurên wan bihatina daliqandin. Beriya ku werin darvekirin daxwaza wan a dawî tê pirsîn, lê daxwaza wan nayê bicihanîn û beravajiyê wê tê kirin: Dema ku Seyid Riza û hevalên wî ji bo darvekirinê dibirin, bav û kur bi hevdu re hatibûn zincîrkirin. Milê Seyid Riza û kurê wî yê hevdeh salî Reşik Huseyn bi hevdu ve hatibûn kelepçekirin. Serokeşîrê Yûsifan Qemer bi kurê xwe Findik re hatibû kelepçekirin...

Daxwaza wan a dawî ji wan hat pirsîn. Daxwaza bavan a dawî ew bû ku, kurên xwe daliqandî nebînin û beriya wan werin darvekirin. Lê beravajiyê vê hat kirin. Di kêliyên bavan ên dawî de kezebên wan jî şewitandin. Mîna ku di darvekirina Seyid Abdulqadir û Şêx Seîd de bûbû, pêşiyê kur hatin daliqandin û bav mecbûr kirin ku şeniqandina kurên xwe bibînin.

Piştî darvekirina Seyid Riza jî operasyonan dom kir. Dema ku Seyid Riza hat darvekirin, li Enqereyê ji bo ku di bihara sala 1938'an de werin bicihanîn projeyên paqijiyê! dihatin amadekirin. Li ser awayê paqijkirina gund û jiyangehên din ferman hatin amadekirin û ji fermandarên ku wê ew bi cih bianiyana re hatin şandin. Serokwezîr Celal Bayar di 29'ê Pûşpera 1938'an de li meclîsa Tirkan wiha digot: "Artêş wê ji bo Dêrsimê wezîfê bistîne û bi tevgera lêgerîneke giştî, tevî hêzên şopandinê wê vê meseleyê ji binî ve çareser bike."[76]

[75] Susan Meiselas, bnb.
[76] Ersal Yavi, bnb., r. 299

Seîd Kirmizitoprak yek ji wan zarokên ku ji wan operasyonan xilas bûne. Kirmizitoprak di kitêba xwe ya bi navê 'Dr. Şivan' de wiha qala bûyerên Dêrsimê dike: "...Piştî yeko yeko kuştina serokan, hêzên berxwedêr ên Dêrsimê (bi taybetî li Dêrsima rojava) bi temamî bê serok mabûn. Di bihara 1938'an de hikumetê ragihand ku serhildêrên çekên xwe teslîm bikin wê bên efûkirin. Piştî vê bangewaziyê Qerebalî, Ferhadî, Pîlwengî, Şêxî, Memedanî û Qereceseyidiyên ku çekên xwe teslîm kirin, hema bêje bi temamî hatin kuştin. Paşê piraniya Kurdên eşîrên Mazgird, Qureyşan, Yûsifan, Bextiyarî jin, zarok, dergûşên ber şîr, jinên ducanî, kal û pîr tevde bi girseyên qerebalix bi piranî jî bi singûkirinê hatin kuştin.

Dawiya havînê, endamên eşîrên Nazimiyê Xormekan, Kureyşan û Alan, beşeke Mazgirdê û eşîra Baba Mansûr bi bombeyên gazê û singûyan hatin kuştin û termên wan bi neftê hatin şewitandin. Bi hezaran keçên Dêrsimî ji bo ku namûsa xwe xelas bikin, xwe ji zinar û kendalan avêtin û xwe kuştin. Bi vî şiklî li dijî zilm û kirinên derî mirovahiyê derketin. Ev komkujî, yek ji jenosîdên bi qutf û ecêb bû, ku di dîroka dinyayê de mînakên wê kêm bûn."[77]

Di kitêba serekerkaniya giştî ya bi navê 'Serhildan (Ayaklanmalar)' de, li ser van operasyonan gelek agahî hene. Hin vegotin wihan in:

"16 Tebax 1938. Fîloyeke balafiran bombe bi ser komeke 500 kesî ya rêbiran ku kêriyên wan jî li ba wan bû barandiye, bi çekên makîneyî gule li vê komê hatiye reşandin."

"19 Tebax 1938. Liqa 41'emîn a kolorduya 7'an ku ji bo merhaleya duyem bi pêş ve diçû, li herêmên çemê Munzûr, bajarokên Kalason û Sînê 290 rêbir kuştine, 52 rêbirên ku li Mazgirdê ji koma dawî a ku hatibû komkirin xwestine birevin, hatine kuştin. Liqa 12'emîn, piştî 12'ê Tebaxê, herêma qedexe û derveyî vê herêmê saxtî kiriye û gelek rêbir kuştine, 170 kesên ku cara dawî li ber xwe dane kuştine, gund û çandiniyên herêmê şewintandine. Liqa siwarî ya 14'emîn di tevgera xwe ya paqijkirina herêmê de 69 kes kuştine, liqa 15'emîn jî bi heman şiklî di dawiya karê lêgerînê de 150 rêbir kuştine, gund û zeviyên wan şewitandine."

"Li herêma ku hatiye saxtîkirin, di nav 17 rojan de 7 hezar 954 kes hatine kuştin, an jî bi saxi hatine girtin."[78]

Encam tevzînoka bi laşê mirov hildikşîne. Di serhildana Dêrsimê de tevî jin û zarokan bi hezaran kes hatin kuştin û şewitandin. Mîna ku hat vegotin, bi dehan balafir gund û çiya bombe kirin. Li gor agahiyên fermî hejmara kuş-

[77] Ahmet Kahraman, bnb., r. 358
[78] Ahmet Kahraman, bnb., r. 320

tiyan 15 hezar e. Ev hejmar di hin çavkaniyan de 40 hezar, di hin çavkaniyan de jî 50-60 hezar e. Serokwezîrê Tirkiyeyê Tayip Erdogan got, kesên wê demê hatine kuştin 50 hezar in. Her wiha zêdeyî 50 hezar mirovî jî sirgûnî wîlayetên din bûne.

Dema ev bûyer li Dêrsimê diqewimîn dîsa li aliyê din ê sînor felaketeke din a mezin hatiye serê Kurdan. Di sala 1937'an de li Amûdê ji ber hin nearamiyên etnîkî, di nav Kurd û Ereban de şer diqewime. Li aliyekî Kurd û Ermenî bi hevre ne, li aliyê din Ereb û hin "Kurdên ku dostên Ereban" in. Haco Axa serokatiya Kurdan, Şêx Daham Hadî jî serokatiya Ereban dike. Li bajarokê Amûdê şerên bi xwîn diqewimin. Di 9'ê Tebaxa 1937'an de dikanên Ermenan tên xerakirin û talankirin. Hêzên Frensî bi awayekî hişk bi ser meselê de diçin. Bajarokê Amûdê ji hêla van hêzan ve tê bombebarankirin. Di êrîşên ku balafir û hêzên piyade tê de cih digirin Amûdê xurîxopan dibe.[79]

Bi vî awayî dema ku Frensiyan bi balafir û hêzên piyade bajarê Kurdan Amûdê hildiweşandin, balafir û leşkerên Tirkiyeyê jî Dersim û derdora wê hildiweşandin. Di bûyera Amûdê de, bandora pêşniyaza Îsmet Înonu çiqasî heye nayê zanîn. Ev pêşniyaz di raporeke sala 1935'an de cih digirt û digot "Li hemberî nêzikbûna Frensî û Kurdan hewce ye Ereb werin destekkirin." Rastiyek heye ku, dewletek dikare bi hêsanî destê xwe dirêjî bajarên nêzik ên hêla din î sînor bike. Cihê herî rihet ê ku dewletek hakimiyeta xwe nîşanî cîrana xwe bike, sînor e. Ji ber vê jî, deverên li ser sînor her tim li gor derên din ji bo alozî û nearamiyê guncawtir in. Di van sînoran de her çi dibe bila bibe, her tim fature ji Kurdan re tê derxistin. Her çiqas bi awayekî fermî nehatibe xuyakirin jî, li herêmên sînor tim rewşeke mîna şer hatiye jiyîn. Divê mirov di vir de bi bîr bîne ku, piştî bi salan dîsa wê li Amûdê felaketeke din biqewime û ji ber şewata li sînemayê derdikeve wê bi sedan zarok bimirin.

Ji ber tevliheviya ku heye, li ser vê bûyera Amûdê jî şîroveyên cuda hene. Rastiya herî li ber çavan ew e ku, li her aliyî tevlihevî û zordarî li ser Kurdan heye û jiyan bi awayekî xerab dimeşe. Li gel ew qas tengasî jî, çi kesê Kurd her kes ji aliyê xwe de li ber xwe dide. Di bin ev qas zor û zehmetiyê de yek ji yên ku derfetên herî biçûk bi kar anîne û xebatên xwe yên netewî kiriye helbestvanê Kurd ê mezin Cegerxwîn e. Ji bilî berhemên xwe yên edebî Cegerxwîn, bi vekirina mektebeke Kurmancî jî ji xelkê xwe re xizmet kiriye. Ev mekteb li Amûdê bi dû xerakirina wê de bi salekê tê vekirin. Ji ber astengi û felekên ku hatine serê Kurdan dema ku gavek tê avêtin pir kêfa mirov tê. Cegerxwîn jî ji

[79] Rohat Alakom, Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması, r. 45

bo mekteba ku li Amûdê vekiriye pir kêfxweş dibe û heyecana xwe wiha tîne zimên:

"Ev cara pêşin e ko li nav Kurdên Cizîrê xortên Kurd bi zimanê zikmakî dixwînin. Tarîx û rewşa miletê xwe dibihîzin û dixwînin. Yekem car e ko rêçenasên Kurd di kuç û kolanan de derbas dibin. Ala sêrengî ya Kurdî, bi rengên xwe yên kesk û sor û spî ko rojeke zer di nav de ye pençên xwe dane riwê çiyayên Kurdistanê, li ser milên Kurdên ciwan û li ser serê dîwar û xaniyên bajarekî Kurdistanê bilind û pîroz û li ba dibe. Cara yekem e ko stran û xoşxwanên Kurdî bi dengê bilind li nav bajarê Amûdê tên gotin. Jin bi lîlan û mêr bi demança bersiva me didin..."[80]

Lê ev kêf dom nake û piştî salekê mekteba wan tê girtin. Li gor Cegerxwîn dibêje, ji xilaf wê mektebê dûre Hesenê Haco Axa, li bajarê Hesekê xwendegehek vekiriye û zarokên Kurd hînî xwendina Kurdî bi tîpên Latînî kirine. Osman Sebrî jî li Şamê, nadiyeyek (komele) xistiye bin destê xwe û xortên Kurd ên Şamê hînî xwendina Kurdî kirine. Lê demeke kurt di ser re dibore her du jî tên girtin.

Heger em hebekî bi tevayî li tevgera wê demê ya Başûrê Biçûk binêrin em ê bibînin ku tevlihevî li wir jî tu carî nesekiniye. Herêma Cizîrê ji % 65 Kurd û ji % 15-20 Fileh bûn, lê Frensayê ji berê ve têkiliyên xwe bi Filehan re danîbûn, gelekî bi wan bawer bûn û her tişt bi destê wan ve berdidan. Piraniya aboriyê di destên wan de bû. Dewlemend, xwendevan, tercuman, cendirme tev ji wan bûn.

Wek ku me berê jî dabû xuyakirin, destdana hev a Kurdan û Frensiyan hêza Frensayê ya li Sûriyeyê bihêztir dikir. Ji ber wilo Frensa gelekî bi pêş de neçûya jî carna têkiliyên erênî bi Kurdan re datanî.

Lê tesîra dîn a di nav Kurdan de jî berdewam dikir. Li Sûriyeyê beşek ji Kurdan bi Frensiyan re têkiliyên germ û xweş datanîn, lê belê hin ji Kurdan jî bi fikara biratiya mislimanan meyla wan li ser Ereban bû û wisan tevdigeriyan. Di bûyera Amûdê de ya ku me li jor behs kir, hin Kurdên hevalbendên Ereban hene û hin Kurdên hevalbendên Xiristiyanan hene. Bi vî awayî Kurd her tim bi hev jî daketine û şer û pevçûnên navxweyî jî kêm nebûne.

Di serê Şerê Cîhanê yê Duyemîn de jî dubendî di nav Kurdên Sûriyeyê de heye. Hin Kurdên Cizîrê dixwazin fermandariya Cizîrê di destê xelkê Cizîrê de be. Yanê Kurd û Fileh dixwazin dewleteke biçûk, di bin siya Frensayê de ji xwe re çêkin. Lê hin Kurd jî alîkariya Ereban dikin ku Frensa ji Sûriyeyê derxin û Cizîr bi ser Sûriyeyê ve bê berdan; bi vî awayî jî dewlet têkeve destê

[80] Cigerxwîn, bnb., r. 226

misilmanan. Di vê heyamê de gelek tevlihevî çêdibin, lê pêlekê Cizîr di bin destê Kurd û Filehan de dimîne.

Cegerxwîn, ji ber gelek astengiyên ku hebûn, xebatên li Sûriyeyê hatine kirin biçûk nabîne: "Bi rastî di wê çaxê de, Kurdên Sûriye û Libnanê gelek gavên hêja berepêş radabûn. Hawar û Ronahî li Şamê, li ser destê Mîr Celadet Bedirxan derdiketin. Çawa ko Stêr û Roja Nû jî li Libnanê, li ser destê Mîr Kamîran Bedirxan derdiketin. Dîwana min a yekem bi destê Celadet Beg hat çapkirin. Gelek tiştên din jî bi Kurdî, Erebî, Tirkî çêkirine.

Çawa ko Frensayê ji me re gelek sozên giranbiha didan ko heta serxwebûna miletê Kurd ji civata bistênî. Di Cizîrê de ji Kurdan re, dewleteke otonomî bistînî. Ji lewra Kurdên Cizîrê, hevalbendên Haco yan jî hevalbendên Frensa, daxwaznamek îmze kirin û li ser destê Frensa rêkirin Civata Miletan (İsbetilumem). Bersiva me li ser navê Haco Axa zû vegeriya û gotin: Daxwaznama we gihişte destê me. Niha em lê vedinêrin. Di çaxeke nêzik de, wê daxwaza we bi cî bibî.

Lê gelek neçû di 1940'î de Haco Axa serê xwe danî. Frensa di cengê de şikest û bû bêqîmet. Civata Miletan, di bin zincîrê tanq û tekelikên topan de, hate pelixandin û hew serê xwe rakir..."[81]

Wek ku Cegerxwîn daye xuyakirin, piştî mirina Haco rewş û hewldan diguherin. Dema Haco serê xwe danî lawê wî Hesen ket şûna bavê xwe. Di wê demê de Kurd ji Cizîrê heta Şamê dibin yek, hevaltiya Ereban dikin. Di Gulana 1941'ê de Sûriyeyê serxwebûna xwe daxuyand. Serokê tevgera azadiya Sûriyeyê Şûkrî Qewetlî dilxweşbûnê dide Kurdan. Kurd jî alikariyê didin wan. Şukrî Qewetlî di sala 1943'yan de dibe serokdewlet. Di vê demê de Hesenê Haco di perleman û dewletê de dibe milê rastê yê serokdewlet.

Tevlihevî û tehdehiya şer jî li ser Kurdan dom dike. Di dawiya Şerê Cîhanê yê Duyemîn de, sala 1945'an Ingilîz hêzên Frensiyan ji Sûriyeyê derdixin. Di vê navberê de li Cizîrê gelek tevlihevî çêdibe. Mala Cegerxwîn dema şer li gundê Çêlekê ye. Li gor nivîsa Cegerxwîn, leşkerê Ingilîzan ji aliyê Musilê ve ketine herêma Cizîrê û wê demê jî ji aliyê aborî ve gelek tehde li Kurdan kirine. Berx û karên Kurdan hatine revandin, çalên ceh û genimên wan hatine vekirin û ji leşkerên Ingilîzan re hatiye şandin. Nivîs wiha dom dike:

"... kaptanekî Ingilîzî ko tercûmanekî Durzî pê re bû, hatin gundê me û gotin: 'Bextê dewletê û Xwedê ji we re bi ko win dexlê xwe nîşanî me bidin û rast bêjin, emê têra we ji we re bihêlin. Lê ko win rast nebêjin û em derxin,

[81] Cigerxwîn, bnb., r. 231

emê tevî ji xwe re bibin.' Ne tenê ez, belkî jî gelek gundiyên me, bi vê gotinê hatin xapandin. Me çalên xwe ji wan re vekirin. Ji bîst çewalan pênc dane min û 15 ji xwe re birin..."[82]

Di sala 1946'an de hêzên Frensî li Sûriyeyê namînin. Piştî Ereb bi temamî gihîştin azadiya xwe û pê de tarîtiyek bi ser Kurdan de tê. Daxwazên Kurdîtiyê di paş de dimînin, tenê carinan bi dizî hinek tişt tên kirin. Piştî derbeyan zext zêdetir bûn, di dema Baasiyan de zilm, ceza û koçberî bû para Kurdan.

Têkoşîna Kurdan a li Îraqê cihê ye. Hema bêje tu carî Kurdistana Îraqê bi temamî neket bin desthilatdariya dewleta Îraqê. Serhildana xurt a dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn û piştî wê, ya ku pêşengiya wê Şêx Mehmûd Berzencî dikir û wextekî be jî bidestxistina hin mafan, bû bingeha têkoşîn û destkeftiyên heta îro.

Serhildan û têkoşîna malbata Barzanî ku îro li Kurdistana Başûr desthilatdar e, di destpêka sedsala 20'an de dest pê dike. Şêx Abdusselam Barzanî di sala 1910'an de li hemberî dewleta Osmaniyan serî hildabû. Şêx Ehmed Barzanî jî di sala 1930'î, 1932'yan û 1935-1936'an de têdikoşe. Di dema qraliyetê de herêma Barzanê gelek caran rastî êrîşên berfireh ên leşkerî hatine. Êrîşên artêşa Îraqê yên li ser herêmê bêhtir bi fermandariya serbazên Ingilîzan pêk hatine û mîna berê encex bi alîkariya Ingilîzan Ereb dikarin li hemberî Kurdan bi ser bikevin.

Mîna ku berê jî hat îfadekirin, dema Barzaniyan nikaribûn xwe li hemberî hêzên Îraqê bigirin derbasî Tirkiyeyê bûn û paşê jî bi efûya giştî vegeriyan Îraqê. Lê dema ku Barzanî gihîştin Mûsilê, leşkerên Îraqê Mele Mistefa jî tê de çend şêxên Barzanî girtin û şandin sirgûnê. Heta demekê li Nasiriyeya ku li başûrê Îraqê ye, Hilayê, Dîwaniyeyê û Kerkûkê man. Paşê derbasî Silêmaniyê bûn û li wir heft salan man.

Mele Mistefa Barzanî, di ser Serdeşt, Bane, Lacan û Mehabadê re xwe digihîne herêma Barzanê û piştî xwe da hev bi hêzên dewletê re ket şer. Di sala 1943'yan de 21 qereqolên polîsan bi dest xistin û dest danîn ser çekên wan. Bi serkeftinên xwe her roj bi hêztir bû. Mistefa Barzanî yê ku bingeha Herêma Otonom a Kurdistanê ya îro avêtiye, ji vê demê û pê de bû serokê têkoşîna azadiya Kurdên Îraqê. Piştî serkeftinên Mistefa Barzanî, hikumeta Îraqê pê re dest bi muzakereyan kir. Lê dewlet muzakere dirêj dikirin û tu encam nedidan.

Di muzakereyên dûre de ku ji bo otonomiya Kurdistana Îraqê dihatin

[82] Cigerxwîn, bnb., r. 262

kirin, serbazên Kurd ên artêşa Îraqê ji bo hikumetê qasidî dikirin. Paşê li ser van xalan li hev hatin:

1-Erdên ku ketine destê serhildêran wê di bin rêveberiya wan de bimînin.

2-Hemû kesên ku ji ber bûyerên bakurê welêt hatine girtin wê bên berdan.

3-Serhildêr tevî çekên ku di pevçûnan de dest danîne ser, hemû çekên wan wê bi wan re bimînin.

4-Wê li gor rêbazên adilane ji bo Kurdistanê pêwîstiyên pîşesazî û xwarinê werin peydakirin.

5-Rêveberiya herêmên Kurdan wê di destê Kurdan de be.

6-Di warê çand û perwerdehiyê de, di avakirina dibistan û nexweşxaneyan ên ji bo Kurdistana Îraqê çi pêwîst be wê bê kirin.*[83]

Serokwezîrê Îraqê Nûrî Seîd sê wezîrên Kurd ji bo desteya wezîran tayîn kiribûn. Lê di 1944'an de li Îraqê hikûmet tê guhertin û hikûmeta nû peymana ku bi Kurdan re hatiye çêkirin qebûl nake. Li ser vê Barzanî dîsa serî hildide. Îraq digel ku dewlet bû, bêyî alîkariya derve nikarîbû li hemberî Barzaniyan bi ser bikeve. Di sala 1943'yan de dema ku Îngîltere bi Almanan re ketibû şerekî man û nemanê, Îraq nikaribû li hemberî Kurdan bi ser bikeve. Di dawiya Şerê Cîhanê de bêhna Ingilîzan derketibû û bi hêzên xwe yên hewayî alîkariya Îraqê dikirin. Bi vî awayî artêşa Îraqê, ziyan û windahiyên mezin gihand Kurdan.

Di Rezbera 1945'an de ji eşîra Barzaniyan 60 hezar jin û zarok di şert û mercên zivistanê de mecbûr man derbasî Îranê bibin. Wê demê ji ber rewşa siyasî, li ser sînor leşkerên Îranê tune bûn. Mistefa Barzanî tevî 200 zilamên xwe li Kanîreşê ji dawiyê ve koçê diparêze û bi vî awayî alîkariya derbasbûna malbatan ji bo hêla din î sînor dike. Barzanî jî tev malbatên xwe derbasî Îranê dibin.

Di heman demê de li Îranê gelek bûyerên girîng diqewimîn. Van bûyeran wê Kurd ber bi damezirandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê ve bibirana. Ev, di sedsala 20'an de yek ji destkeftina herî girîng a Kurdan e. Barzanî dema ku derbasî Îranê bûn tev li xebatên damezrandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê bûn. Mirovên ku ji Îraqê hatibûn, ji bo Mehabadê bûn piştgiriyeke girîng a leşkerî. Çend serbazên Kurd ên ku ji hêzên artêşa Îraqê reviyabûn li ba Mele Mistefa bûn. Her wisa wek hêzeke Îraqî di têkoşîna

---

*Di van deman de di 30'ê Tîrmeha 1943'yan de, li Tirkiyeyê li sînorê Îranê 33 Kurdên bêguneh wê bihatina kuştin. Paşê em ê li ser vê bûyerê rawestin. Em ê hinekî şûnde jî li ser bûyerên ku di heman demê de li Îranê qewimîne, rawestin.*

[83] Ersal Yavi, bnb., r. 314



*Newroza 1944'an Şahpûr, hin endamên Komeleyê bi hin mamosteyên Kurd re*[84]

Kurdistana Îranê de bicihbûna Barzaniyan girîngiya navnetewî ya tevgera Kurdan zêde kir û bal kişand ser xwe.

Li Îranê têkoşînê pir berê dest pê kiribû. Birêxistinbûyîna veşirtî ku di nav Kurdan de di sala 1937'an de dest pê kiribû, bi bûyerên ku ji ber Şerê Cîhanê yê Duyemîn qewimîbûn bi awayekî qanûnî û xurt derket meydanê. Di dema şer de ji hêla bakur ve Sovyetî, ji hêla başûr ve hêzên Ingilîz û Amerîkayê ketibûn nav Îranê û van hêzan Îran xistibûn bin kontrola xwe. Şah Riza jî têk çûbû. Loma pêvajoyeke nû dest pê dikir. Ji nû ve bayê azadiyê dihat, partî û rêxistinên nû dihatin damezirandin. Di vê demê de Kurdan jî xwe bi rêxistin kirin û gavên girîng avêtin.

Di vê navberê de herêma başûr a Kurdistana Îranê ket bin tesîra Ingilîzan, lê herêmên navîn ji hêla tu hêzê ve nehatibûn dagirkirin. Li vê heremê hema bibêje wezîfedarên hikumeta navendî qet tune bûn. Nebûna desthilatdariya hikumeta navendî ji Kurdan re derfetên nû derxistibûn. Bi vî awayî li Kurdistana Îranê bi hezaran kesan çek bi dest xist û rêveberî ket destê hêzên herêmî (mihelî). Hîn di 25'ê Tebaxa 1941'ê de Artêşa Sor ketibû bajarê Banê, baregeha leşkerî hilweşandibû û paşde vekişiyabû. Îranê serî ji hevalbendan re danîbû û otorîteya wê felişîbû. Heme Reşîd ku berê ji ber hin meseleyên bi dewletê re li ser sînorê Îraqê dima ji Îraqê vegeriyabû, Baneyê û derdora wê bi dest xistibû. (Di sala 1944'an de Heme Reşîd têk çû, dîsa derbasî Îraqê bû,

[84] http://Kurdians.wordpress.com




*30'ê Adara 1945'an rêxistina Xoybûnê ev xerîte û daxwaza avakirina Kurdistaneke serbixwe pêşkêşî konferansa San Fransîskoyê kir ku amadekariya damezrandina NY'yê dikir.*[85]

dema ku Komara Mehabadê hat damezirandin tevî artêşa xwe ji Îraqê hat Mehabadê û tev li dewleta ku dihat damezirandin bû.)

Di 16'ê Tebaxa 1942'yan de, li nêzîkî bajarê Mehabadê 12 kes li hev civiyan û "Komeleya Jiyaneweyî Kurd" (KJK) damezrand. Digel şaxên wê yên li Kurdistana Rojhilat li Başûrê Kurdistanê li Mûsil, Kerkûk, Hewlêr, Silêmanî, Rewandiz û Şeqlewe şaxên xwe vekirin. Ev komele paşê wê bingeha PDK'ê pêk bianiya.

Komeleyê bi sazî û kesayetiyên ku li parçeyên din ên Kurdistanê dixebitin pêwendî danî. Di sala 1944'an de rêxistina Komelê, ji bo ku bi rêxistina Hêvî re, bi armanca pêkanîna hevkarî û xebata bi hev re danûstandinan bike, Mihemed Emîn Şerefî şand Kerkûkê. Di heman salê de (Adar) nûnerên Kurd ên ji Îraq û Sûriyeyê bi armanca danûstandinan hatin Mehabadê.

Her wisa li cihê ku sînorên Îran, Îraq û Tirkiyeyê digihîjin hev li çiyayê Dîlanbor, di meha Tebaxê ya 1944'an de, bi tevlêbûna berpirsiyarên Kurdên Îran, Îraq, Sûriye û Tirkiyeyê civînek li dar ket. Di civînê de bi dengê hemû beşdaran biryara hevkariyê hat stendin û peymanek hat morkirin. Ev peyman wek "Peymana Sêsînor" tê zanîn. Hassan Arfa ku wê demê serokerkanê

[85] Susan Meiselas, bnb.

Îranê bû wiha dibêje: "...Di civîna ku berpirsiyarên Kurdên Îran, Îraq, Tirkiye û Sûriyeyê li dar xist, li cihê ku sînorên sê dewletan digihîştin hev ji bo Kurdistaneke yekbûyî li hev hatin. Ev civîn wek "Peymana Sêsînor" tê zanîn. Di civînê de Qasim Qadiriyê Mehabadî nûneriya Kurdên Îranê, Şêx Ubeydullah Zînoyê Rewandizî nûneriya Kurdên Îraqê û Qazî Mele Wehab jî nûneriya Kurdên Tirkiyeyê dikir."

Ji hêla din ve rêxistina Komeleyê bi alîkariya Kurdên Îraqê "alaya netewî ya Kurdan" amade dike, "nexşeyeke Kurdistanê" ku di sala 1944'an de li Beyrûdê hatibû amadekirin, tê weşandin. Li gor vê nexşeyê sînorên bakur ên Kurdistanê ji Qersê digihîşt Mereşê, sînorê rojava Entebê dixe nav xwe û digihîje Efrînê, sînorê başûr jî ji xeteke ku ji Kobanê dest pê dikir û Kurdistana Başûr tev dixist nav xwe û digihîşt Xaneqînê, sînorê rojhilat jî ji gola Urmiyê diçû Hamedanê û bi hawê Sineyê bixe nav xwe dirêj dibû. Ala Kurdan ku piştî xebata salekê derket jî wiha bû: Li jor xeta sor, li navberê xeta spî û li jêr jî xeta kesk heye. Li ser alê rojek hebû ku ev, remza Kurdan bû, li her du aliyên rojê simbilên genim hebûn, li paş çiyayek û resmê qelemekê hebûn.



*Ala Kurdistanê-Dema Komara Kurdistanê Ya Mehabadê*

Bi kedeke zêde di demeke kin de gelek tişt hatin kirin. Kesayetiya bêhempa ya pêşengê xwezayî yê Mehabadê Qazî Mihemed, dike ku xelk li hev vehewe. Lîstika bi navê Dayika Nîştiman, ku rewşa gelê Kurd a piştî Peymana Sedabadê ya ku di navbera Îran, Tirkiye û Îraqê de hatiye îmzekirin, ji xwe re kiriye mijar, li Mehabadê tê pêşkêşkirin. Dayika Niştîman ku peyamên netewî didan, bi mehan hat pêşkêşkirin û li herêmê li ser Kurdan bandorake kûr hişt.[86]

Di vê navberê de li Ewrûpayê Nazîzma Almanya û Faşîzma Îtalyayê têk çû, Sovyetan serkeftin bi dest xistin û ji bo neteweyên bindest bû hêvî. Sovyetê di vê demê de pêwendiyan bi Azerî û Kurdan re datîne û soza alîkariyê dide wan. Rayedarên Kurd ên ku bi nêzikbûna germ a Sovyetan re bi hêvî bûne, çend caran bi rayedarên Sovyetê re civiyane û di hin mijaran de li hev kirine.

[86] Rafet Ballı, bnb., r. 511

Di destpêka Cotmeha sala 1944'an de bi bangewaziya serokwezîrê Îranê, Qazî Mihemed tevî pêşengên din ên Kurdan diçe Tehranê. Qazî Mihemed daxwaza Kurdan tîne zimên; dibêje ku rayedarên bêwesf bi awayekî xirab herêmê bi rê ve dibin û ji herêmên Kurdan re tayînkirina rêveberên Kurd daxwaz dike.

Di Rezbera 1945'an de, di civîna ku 106 pêşengên Kurd beşdar bûbûn, navê Komeleyê wek Partiya Demokrat a Kurdistanê tê guhertin. Qazî Mihemed ji ber îtîbara wî ya di nav gel de, ji ber kesayetiya wî ya ku biserketin rêvebertiyê dimeşîne û kare eşîran li hev ragire, wek serokê partiyê tê hilbijartin. Partî, bernameya xwe jî wek manîfesto diweşîne û van daxwazan tîne zimên:

- Di çarçoveya Dewleta Îranê de ji bo Kurdistana Îranê otonomî;
- Bikaranîna Kurdî wek zimanê fermî;
- Bi awayekî lezgîn hilbijartina konseya herêmî;
- Wezîfedarkirina karmendên ji xelkê deverê;
- Qebûlkirina qanûneke bi tenê him ji bo serdestan him ji bo gundiyan;
- Hevkariya bi tevgera Azerbaycanê re;
- Pêşxistina jiyana aborî û civakî ya Kurdistanê, pêşxistina xizmetên tenduristî û perwerdehiyê, pêşxistina çandiniyê.[87]

Tevgera Kurdan di xeteke demokrat û pêşverû de bi pêş dikeve û bi tevgerên peşverû yên Îranê re bereyekê dadimezirînin.

Kurdistana Îranê dibe kela demokrasiya Îranê û her kesê Îranî yê ku ji azadiyê hez dike hurmetê ji Kurdistana Îranê re dike. Kurdên navdar û nûnerên rêxistinên Kurdên Tirkiye, Îraq û Sûriyeyê tên Mehabadê.

Barzanî di 11'ê Cotmeha 1945'an de, li Îranê gihîştibûn herêma Şînoyê. Di nav hêzên Barzanî de, ku bi hezaran peyayên wan ên çekdar hebûn, ji Kurdên Îraqê yên serbaz, siyasetmedar û rewşenbîr jî hebûn. Hemû jî tev li Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bûn. Barzanî jî wê bibûya serokê artêşa Komara Kurdistanê ya Mehabadê.

Di 17'ê Berfanbara 1945'an de avahiya adliyeyê ya li Mehabadê ji hêla Kurdan ve hat bidestxistin, ala Îranê hat daxistin û ala Kurdan lê hat bilindkirin. Di 22'yê Rêbendana 1946'an de li Meydana Çarçirayê ya bajarê Mehabadê bi beşdariya nûnerên gelek deverên Kurdistanê damezirandina Komara Kurdistanê hat daxuyandin.

[87] Chris Kutschera, bnb., r. 201



*17 Berfanbar 1945-Li Mehabadê li avahiya adliyeyê ala Îranê tê daxistin û ya Kurdan tê hildan.*[88]



*22 Rêbendana 1946'an, li Meydana Çarçirayê daxuyandina Komara Kurdistanê*[89]

[88] William Eagleton Jr.,The Kurdish Republic of 1946
[89] Susan Meiselas, bnb.

Komara nû, serokê PDK'ê Qazî Mihemed ji bo serokkomariyê hilbijart. Paşê, kabîneyeke wezîran a ku ji 13 wezîran pêk dihat, hat avakirin. Di nav rêveberan de Kurdên ji çar parçeyan hebûn. Hêzeke jendirmeyan û artêşeke Komara Kurdan a Mehabadê hat damezirandin. Her wiha ji bo bazirganiya navneteweyî jî gav hatin avêtin.

Hikûmet ji van kesan pêk dihat:

Serokê Komara Mehabadê: Qazî Mihemed

Serokwezîr: Hacî Babe Şêx

Wezîrî Ceng û Parastin û Hevkarê Serokkomar: Mihemed Husên Xanî Sêyfî Qazî

Wezîrê Propaxande: Sidîq Heyderî

Wezîrê Perwerde û Hînkariyê: Menaf Karîmî

Wezirê Karê Hundirîn: Mihemed Emîn Mu'înî

Wezîrê Tenduristiyê: Seyid Mihemed Eyûbiyan

Wezîrê Aboriyê: Mîrza Ehmed Îlahî

Wezîrê Kar: Xelîl Xusrewî

Wezîrê Poste û Telegirafê: Kerîm Ehmediyan

Wezîrê Bazirganiyê: Hacî Mistefa Dawidî

Wezîrê Dadperweriyê: Mela Husên Mecdî

Wezîrê Kiştûkalê: Mihemed Welîzade

Wezîrê Karên Derve: Hacî Ebdulrehman Îlxanîzade

Wezîrê Rê û Baniyan: Îsmaîl Îlxanîzade

Di 23'yê Avrêla 1946'an de, di navbera hikumetên Kurdistan û Azerbaycanê de peymana dostaniyê hat îmzekirin. Bi vê peymanê hevkariya parastin û aboriyê hat danîn. Wan hikumetan ji bo ku xwe ji hikumeta Îranê ya ku ji hêla Amerîka û Îngîltereyê ve tê destekkirin biparêzin wê alîkariya hev bikirina.*

Komara Kurdistanê ya Mehabadê ku di dîroka Kurdan de xwedî cihekî pir girîng e, digel ku demeke kin jiyaye, saziyên xwe pêk aniye û mora xwe li pêşketinên girîng xistiye. Rojnameyên bi navê Kurdistan, Hawar, Agirî û Hilale hatine weşandin, pere, kaxêzên binirx û kaxêzên belgenameyên fermî hatine çapkirin. Her wisa rojane şeş saetan weşana radyoyê hatiye kirin. Qazî Mihemed perwerdehî pir girîng didît.** Jixwe ji sala 1926'an heta sala 1931'ê

* Her du tevger (Kurd-Azerî) digel ku li hember hikumeta Îranê bi hev re tevdigeriyan, kêm be jî li ser sînoran hin pirsgirêkên wan hebûn. Heta li hin deran şer jî qewimîbûn.

** Qazî Mihemed ji malbateke qedîm dihat û xelkê ji vê malbatê pir hez dikir. Dewleta Îranê payeya muftîtî û hakimtiya Mehabadê daye Qazî Mihemed. Qazî Mihemed di mertebeya zanyaran de bû û ji bilî Kurdî, Erebî, Farisî, Ingilîzî, Frensî jî tê de bi giştî bi neh zimanan zanibû. Birayê wî Qazî Sadrî jî wek nûnerê Kurdistanê yê meclîsa mîlî yê serdema 14'an li Tehranê bû.



*Mihemedî Hemîdî, Midurê Kovara Kurdistan*[90]

li Mehabadê midûrê perwerdehiyê bû. Pirtûkxaneya wî bi berhemên ku bi gelek zimanên cihê hatibûn nivîsandin, tije bû.


Bi ragihandina Komarê re zimanê Kurdî bû zimanê fermî. Dibistanên Kurdî û şanoya Kurdî hatin vekirin. Li welêt cara pêşî dibistaneke keçan hat vekirin. Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistanê hat damezirandin. Bi Kurdî pirtûk û kovar hatin weşandin. Şêst xwendekarên Kurd ên ku dibistana seretayî qedandine, di Avrêla 1946'an de ji bo dibistanên leşkerî û enstîtuyên pisporî şandine Bakuyê. Bi taybetî li ser xizmeta tenduristî û ewlekariya civakî sekinîne û girîngî dane avakirinên bajaran.*



*Endamên Hikûmeta Mehabad'ê*[91]

Kesên ku di sala 1946'an de serî dane Mehabadê, gotine ku rewşa bajêr aram û xweş bû. Dizî hema bêje nemaye, li hember bertîlxuriya li nav saziyên dewletê helwesteke bibiryar hatiye nîşandan. Di 11 mehên jiyana Komarê de tenê mirovek hatiye darvekirin. Lê li hêla din, di vê demê de li dinyayê ji ber Şerê Cîhanê yê Duyemîn hovîtiyên wisa qewimîne ku di dîroka mirovahiyê de ev wê bibe tabloya şermê û tu carî wê neyê jibîrkirin.

[90] http://wkomarik.blogspot.com
* Di 16.08.1946'an de bi hewldana Barzanî li Îraqê jî PDK-Î hatiye damezirandin.
[91] www.dirok.org



*Qazî Mihemed, 1946*[92]

Mîna ku di wêne de tê dîtin li paş kursiya Qazî Mihemed nexşeyeke mezin a Rojhilata Navîn heye û li ser vê nexşeyê jî sînorên Kurdistana mezin hatine xêzkirin. Beşeke Tirkiye, Îran, Sûriye, Sovyet û Îraqê di nav Kurdistanê de ye. Mîna ku berê jî bûbû, vê rewşê gelek kes ditirsand û îhtîmala pêkhatina van sînoran dikir ku gelek derdor li hemberî Kurdan bi neyînî tevbigerin.

Di vê dema xeternak de hikumeta Yekîtiya Sovyetan bi Îranê re li ser bikaranîna neftên herêma bakur peymanek mor kir. Ango dîsa li hemberî Kurdan bazara berjewendiyên mezin hat kirin. Ji hêla din ve Îngîltere û Amerîkayê ku ji piştgiriya Sovyetan a ji bo Kurdan nerihet bûn, nota dan Sovyetan û xwestin Yekîtiya Sovyetan ji herêmê vekişe. Di encamê de Yekîtiya Sovyetan di destpêka meha Avrêlê de dest bi kişandina hêzên xwe kir. Derdora Kurdên ku li hember hêzên mezin ji piştgiriya Sovyetan bê par man ji aliyê dijminan ve hatibû girtin û Kurd di cih de rastî êrîşan hatin. Hêza ji 600 kesî ya Îranê di dawiya meha Avrêlê de cara pêşî ber bi Mehabadê ve bi rê ket. Hêzên Kurdan ku fermandariya wan Barzanî dikir di 24'ê Nîsanê de li nêzîkî gundê Qehrebadê ev hêz têk bir. Digel ku di 3'ê Gulanê de di navbera hêzên Kurdan û hêzên hikumetê de agirbest hat danîn jî pevçûnan dewam kir.

Qazî Mihemed ji bo danûstandinan çû Tehranê. Bi serokwezîr Kiwamussaltana û Serokerkan Razmara re rûnişt. Di Tebaxa 1946'an de li

[92] William Eagleton Jr., bnb.

Tehranê hevdîtina Qazî Mihemed û hikumetê bi biryara pêkhatina eyaleteke nû ya bi navê Kurdistanê bi dawî hat. Ji bo derengxistina pejirandina vê biryarê hin mahne tên nîşandan. Di rastiyê de ew dixwazin hinekî wext bi dest bixin; di vê navberê de wê Artêşa Sor bi temamî ji Îranê derketa û sozên dayî jî wê nehatina bicihanîn. Jixwe herêma Kirmanşahê ji Eyaleta Kurdistanê hatiye veqetandin, Qazî Mihemed jî ji bo ku Ingilîzên li Kirmanşanê neft derdixistin neke dijminê xwe ev yek qebûl kiribû.

Di payîza 1946'an de Hikûmeta Tehranê ji bo ku li welêt hilbijartin pêk werin dest bi kampanyayekê kir. Qaşo ji bo ku hilbijartineke 'azad' were kirin dihat xwestin ku li Kurdistanê û Azerbaycanê hêzên Hikûmeta Îranê bicih bibin. Bi vî awayî wê hêdî hêdî hêzên dewletê dîsa li herêmê belav bibûna.

Di dawiya 1946'an de rêveberiya navendî ya Îranê bi qasî ku karibe tevgerên Kurd û Azeriyan têk bibe, ji hêla leşkerî ve bi hêz bû. Di meha Berfanbarê (Kanûna Pêşî) de artêşa împaratoriyê ket Azerbaycanê. Tevgera Azerbaycanê ku dixwest sîstemeke sosyalîst ava bike bêyî ku li ber xwe bide belav bû û pêşengên wê xwe spartin Yekîtiya Sovyetan. Piştî ku ev tevgera artêşa Îranê li Azerbaycanê bi ser ket, dor hat Komara Kurdistanê. Hin rêveberên herêmî wisa bawer kirin ku, li hemberî artêşeke binîzam liberxwedan tiştekî şaş e û ev berxwedan wê bibe mahneya komkujiyan. Ji ber vê jî wan biryar da ku li hemberî artêşa Îranê şer nekin. Qazî Mihemed jî xwest ku li hemberî artêşa Îranê li ber xwe nedin û bi vî awayî gel ji şer biparêzin.

Di 17'ê Berfanbara 1946'an de artêşa Îranê ket nav Mehabadê û bêyî ku rastî berxwedanekê bê bajar bi dest xist. Bi vî awayî Komara Kurdistanê ya Mehabadê bi dawî bû. Bi biryara fermandeyê artêşê, piraniya rêveberan tên girtin. Qazî Mihemed jî tê girtin û tevî bira û pismamê xwe di 30'ê Adara 1947'an de li Meydana Çarçirayê tê daliqandin. Milîtanên PDK'ê û kadroyên komarê jî yan tên darvekirin an jî tên hepiskirin.

Dûre jî girtin û daliqandina serbaz û serokeşîrên ku di nav Komara Kurdistanê ya Mehabadê de wezîfe stendibûn û alîkarî kiribûn dewam dike. Hikumet perwerdehiya bi Kurdî qedexe dike. Heta hemû weşanên Kurdî tên berhevkirin û li Meydana Çarçirayê tên şewitandin.

Dema Fermandarê Alaya Humayûnî dikeve Mehabadê, rojnamevan Necefkulî Pisyan jî li ba wî ye. Necefkulî Pisyan li ser rewşa piştî dorpêçkirina Mehabadê wiha nivîsandiye: "Di dawiya meha Sibatê de artêşa Îranê ku êdî hemû Kurdistan bi temamî kontrol dikir, bi balafiran li herêma Kurdistanê ev belavok belav kir:

'Bila haya hemû eşîr û mirovên Kurdistanê jê hebe. Di vê dema ku em li tevahiya Kurdistanê asayîşê pêk tînin, em eşîrên Kurdistanê hişyar dikin: Hemû çek û malzemeyên ku we ji Partiya Demokrat a Kurdistanê yan jî ji dereke din bi dest xistine li bajaran di nav sê rojan de li derveyî bajaran jî di nav hefteyekê de, lazim e hûn teslîmî fermandariya artêşê ya Mehabadê yan jî ya Urmiyeyê bikin. Ji hin tecrûbeyan hişkere bûye ku eşîrên niştimanperwer ên li ser sînor dikarin bi awayekî baş parastina sînoran bikin. Lê ew çekên ku ji Partiya Demokrat a Kurdistanê hatine stendin, li gor hejmar û pêwîstiyan wê li ba eşîrên Mameş, Gevurak û eşîrên din ên ser sînor bimînin. Lazim e destûra çekan ji fermandariya hêzên Kurdistanê ya li Mehabadê bistînin û ji bo parastina sînoran muhafizên herêmê wê ji wan pêk were.'..."[93]

Di vê navberê de hin rêveber teslîm nabin û derbasî Îraq, Sûriyeyê yan jî Yekitiya Sovyetan dibin. Barzanî jî teslîm nabin û biryarê didin ku vegerin warê bav û kalên xwe.

Barzaniyan berî ku Artêşa Îranê têkeve Mehabadê çek û cebilxaneyên xwe yên girîng didin hev û paşve vedikişin. Pêşiyê General Mistefa Barzanî û Generalê Îranê Humayûnî li hev rûdinên. Dûre Barzanî ji bo ku bikaribe bêyî ku bikevin şer vegerin Îraqê, 21'ê Berfanbara 1946'an diçe Tehranê û bi karbidestên hikumetê re hevdîtinê çêdike. Hikumet jî jê dixwaze ku çekên xwe teslîmî hikumetê bikin û li herêma çiyayî ya Elwendî ku nêzîkî Hemedanê ye bi cih bibin. Barzanî zanibû ku ev yek xapandinek e, naxwaze çekên xwe teslîm bike. Barzanî bi qasî mehekê li Tehranê tê sekinandin. Di vê demê de Mustafa Barzanî, ne ji balyozê Îngîltereyê li ser vegera Îraqê, ne jî ji hikumetê li ser bi awayekî ewle mayina wan a li Îranê tu bersivê nastîne. Ew jî bi teqtîkekê xwe ji nav lepên wan derdixe û vedigere.

Piştî demeke kin şer dîsa dest pê dike. Barzanî bi şer ber bi sînorê Îraqê ve vedikişe. Barzanî û yên pê re bi şer û pevçûnên dirêj û di bin bombebarana balafiran de meşa xwe didomînin. Di vê navberê de hin hêzên herêmê jî alikariya Barzaniyan dikin. Barzanî di şer û pevçûnan de serkeftinên mezin bi dest dixin û encex di 13'ê Nîsana 1947'an de Çemê Gadar derbas dikin, digihîjin Îraqê.

Hin rayedarên Kurd ên ku sînor derbas dikin teslîmî hikumeta Îraqê dibin. Gelek serbazên ku teslîmî hikumetê dibin, tên daliqandin. Mistefa Barzanî teslîmbûnê rast nabîne û di 27'ê Gulana 1947'an de tevî 500 siwariyan ber bi Yekîtiya Sovyetan ve bi rê dikeve. Bi rê de carna dikeve nav sînorên Tirkiyeyê, carna jî dikeve nav sînorên Îranê. Carê bi artêşa Îranê re ya ku

[93] Necefkuli Pisyan, Kanlı Mehabad'dan Aras'ın Kıyılarına, r. 51

ji 10 000 (deh hezar) kesî pêk dihat şer kiriye û bi vî awayî 300 kîlometre rê çûye. Di 16'ê Pûşperê de Çemê Erezê derbas kiriye û gihîştiye Yekîtiya Sovyetan.

Bi vî awayî Kurd digel ku ji bo aştî û jiyaneke mirovane gelek hewl dane, gava digihîjin nîveka sedsala 20'an di rewşeke pêrîşan û belawela de ne.

**Qewînkirina Sînoran û Piştî Wê**

Di sedsala 20'an de tu carî li Rojhilata Navîn îstîkrar çênebûye. Di salên 1950'yî de jî herêm dîsa dikeliya. Ji bo bend xwe bi hêztir bikin îtîfaqên nû çêdibûn.

Di vê rewşa bi gelemşe de hesab û planên hêzên mezin ên li ser herêmê, li gor demê û li gor derfetan dihatin guhertin. Di vê navê de dema ku şerên berjewendiyên hêzên mezin berdewam dike, êş û zordariyên ku gelê herêmê nekişîne jî wê nemînin.

Hin welatên rojawayî di 9'ê Avrêla 1949'an de bi Peymana Washingtonê NATO damezirandin. Bi vê peymanê dewletên endam soz didin da ku ji bo parastina hevpar hêzên xwe xurtir bikin; dema ku yekîtiya ax, serxwebûna siyasî û ewlekariya yek ji van endaman bikeve xetereyê wê werin ba hev û dema êrîş bê ser yek ji endaman, hemû endamên din mîna êrîş hatibe ser wan wê tevbigerin.

Piştre li hemberî damezirandina NATO'yê, Yekîtiya Sovyetan û welatên Bloka Rojhilat jî ji bo parastina xwe peyman mor kirine û dubendîtiya şerê sar bi awayekî zelal derketiye holê. Ev tevgera dostanî û hevkariya bloqa welatên Rojavayî ya ku wek PAKTA WARŞOVAyê tê zanîn ji sala 1955'an heta belavbûna Sovyetan dom kiriye.

Di dawiya salên 1940'î de polîtîkaya derve ya Tirkan hêdî hêdî ket bin bandora Amerikayê. Di sala 1946'an de sîstema pirpartîtiyê hat qebûlkirin. Partiya Demokrat (DP) desteka piraniya Kurdan stendiye û di sala 1950'yî de bi tena serê xwe bûye desthilatdar. Tirkiyeyê di dema serokwezîrtiya Adnan Menderes de bêhtir polîtîkayên alîgiriya Amerîkayê bi pêş xistine û di 13'ê Sibata 1952'yan de tev li NATO'yê bûye. Bi vî awayî Tirkiyeyê li Rojhilata Navîn helwestên li dijî Sovyetan nîşan daye û li hemberî Sûriyeyê polîtîkayên wê hêdî hêdî dijwartir bûne.

Herçî Sûriye ye, ber bi sala 1950'yî ve xwe pir nêzîkî Sovyetan kiriye û ciwanên Kurd jî piştgiriya vê nêzikbûnê kirine. Çepgirî, gotinên îdeolojîk yê ser aştiya cîhanê, nêzikbûnên entarnasyonal hêvî dane Kurdan.

Lê li Îranê xelkê xwe kişandiye qalikê xwe û bê hêvî maye. Çimkî piştî têkçûna Mehabadê hikumeta Îranê helwestên tund nîşan dane û heta salên 1950'yî zordariyeke mezin meşandiye. Tenê weşana Kurdî ji hêla radyoya Makuyê ve û hewlên derxistina rojnameya bi Kurdî kiriye ku xelk bêhnekê bistînin.

Di vê demê de kes nikaribû biketa herêmê û her tişt di destê cendirmeyan de bû. Bi hin mahneyan girtin û cezakirinan dom dikir. Abdurahman Qasimlo ji bo vê mijarê mînakeke wiha dide: "Di 4'ê Sibata (Reşemî) 1949'an de, li Zanîngeha Tehranê hina kir ku Şah bikuje. Hikumeta ku piştgirî ji Şîrketa Petrolê ya Anglo-Îran stendibû, bûyer wek firsenda têkbirina hemû tevgerên demokrat ên li Îranê bi kar anî. Li Kurdistana Îranê bi sedan mîlîtan û alîgirên PDK'ê hatin girtin û cezayê zindankirina bi salan li wan hat birîn."[94]

Di vê demê de piştî gelek tevliheviyên ku ji bo desthilatdariyê qewimîn, Dr. Musadik bi piştgiriya piraniya gel wek serokwezîr hat hilbijartin. Di sala 1951'ê de di dema serokwezîriya Musadik de, hêzên demokrat ên li Îranê ji nû ve bi hêz bûn û dest bi rêxistinbûnê kirin. Kurdan jî ji vê rewşê sûd wergirt û dest bi hin xebatan kir.[95] Lê dîsa jî reformên girîng nehatin kirin. Ji bo Kurd otonomiyê bistînin muzakere hatine kirin, lê tu encam nehatine stendin. Di hilbijartina 1952'yan de namzetê PDK'ê li Mehabadê hema bêje tevahiya dengan stendiye, lê hilbijartina Mehabadê nehatiye qebûlkirin û oldarekî Tehranî wek mebûsê Mehabadê hatiye tayînkirin.

Di sala 1953'yan de Şah hewl da ku Musadik ji wezîfeyê bistîne, lê serhildanê dest pê kir û mecbûr ma ku welêt biterikîne. Piştî bi sê rojan derbeya duyemîn çêbû û ev derbe bi ser ket. Wezîfeya Musadik jê stendin û xistin hepsê. Şah jî ji cihê ku reviyabû, ango ji Romayê vegeriya û dîsa îdare xist destê xwe.

Piştî ev qewimîn, Ingilîz dîsa bûn şirîkê petrola Îranê ku di dewra Musadik de ev petrol hatibûn milîkirin. Şahê ku bi desteka Ingilîzan bûbû desthilatdar, muxalefet zêde perçiqand. Bi hezaran kesên welatperwer hatin girtin, bi sedan milîtanên ji her baskên siyaseta dijber hatin darvekirin. Di vê demê de bi tevayî PDK hat perçiqandin. Gelek rêveberên PDK'ê hatin girtin û salên dirêj di hepsê de man, hin ji wan jî neçar man ku herin welatên din.

Di sala 1955'an de Îraq, Tirkiye, Îngîltere, Îran û Pakistanê Pakta Bexdayê îmze kirin. Dewletên Ereb, Pakta Bexdayê wek desteka Rojava ya ji bo Îsraîlê nirxandin û ketin nav hewldana pêkanîna hevkariya hêza li dijî vê. Çimkî

[94] Dr. Abdurrahman Qasımlo, İran Kürdistanı, r. 35
[95] Ersal Yavi, bnb., r. 420

Îsraîl ji bo dewletên Ereban pirsgirêkeke mezin bû. Ji bo vê yekê, di salên 1955 û 1956'an de di navbera Sûriye, Misir, Erebistana Siûdî û Yemenê de peymanên parastinê hatin danîn û van dewletan xwe nêzîkî Sovyetan kir. Vê jî, nakokiyên li herêmê kûrtir kirin.

Taybetmendiyeke din a vê paktê jî ev e ku, cepheya li dijî Kurdan bihêztir dibû. Bi pêkhatina van cepheyên dijber re hewldanên nû derketin holê. Bi taybetî dîsa li hemberî Kurdan gelek bûyerên girîng qewimîn. Tirkiyeyê li ser sînor dest bi danîna mayinan kir. Bi vî awayî Kurd bêhtir ji hevdu hatin veqetandin û mirinên li ser sînoran zêdetir bûn. Li Îranê jî di sala 1956'an de bi navê SAVAK'ê rêxistina îstixbaratê hat avakirin û zexta li ser Kurdan zêdetir bû.


Dr. Abdurahman Qasimlo ji bo zordarî û şideta ku wê demê li Îranê diqewimî wiha behsa eşîrekê dike: "Dema Şah piştgiriya endamên Pakta Bexdayê stend û êdî bawer kir ku dikare koka tevgera demokratîk biqelîne, di 4'ê Sibata 1956'an de li hemberî eşîra Ciwanro dest bi êrîşeke mezin kir. Eşîra Ciwanro li ser sînorê Îranê li bakurê Kirmanşahê bû û heta wê demê otonomiya xwe parastibû. Bi hezaran leşker, tank û balafir ber bi gundên Kurdan ve bi rê ketin. Hikumeta Nûrî Seîd jî, wê saetê çû alîkariya artêşa împaratoriyê. Ciwanroyiyan bi qehremanî li ber xwe da, lê hêza li hemberî wan pir xurt bû. Dor li wan hat pêçan, neçar man ku gundên xwe biterikînin û xwe bispêrin çiyayan. Daristanên Ciwanro ku remza azadiyan bûn hatin bombebarankirin û şewitandin."[96]

Lê li Îraqê ji bo Kurdan hin pêşveçûnên erênî hebûn. Partiya Komunîst di konferansa xwe ya duwem a Rezbera 1956'an de nêziktêdayîna xwe ya li tevgera Kurdan wiha vedigot: "Kurdên li Îraqê niha parçeyekî netewa Kurd in ku ji hêla Tirkiye, Îran û Îraqê ve hatiye parvekirin. Kurdên li her çar parçeya yek netew in. Ev netew wek hemû netewan xwedî taybetmendî ne. Digel parvekirina emperyalîst komên vê netewê li ser axake hevpar dijîn û xwedî dîrokeke hevpar in: Xwedî zimanekî hevpar, aboriyeke netewî ne ku pê dikarin yekîtiya xwe ava bikin û azadiya xwe bi dest bixin."[97]

Bi piştgiriya mezin a Kurdan, 14'ê Tîrmeha 1958'an li Îraqê şoreşek pêk hat. Li başûrê Kurdistanê şoreş bi coşeke mezin hat pêşwazîkirin. Çimkî hêviyên mezin dabûn Kurdan û li Îraqê Kurd tevî Ereban wek hêmaneke eslî hatibûn binavkirin.

[96] Dr. Abdurrahman Kasımlo, İran Kürdistanı, r. 40

[97] Chris Kutschera, bnb., r. 202



*Mustafa Barzanî û Abdulkerîm Qasim, 1958*[98]

Abdulkerim Qasim ku monarşiya Faysal hilweşandibû, çawa hat ser hukim bi Rûsyaya Sovyet û tevahiya welatên sosyalîst (komunîst) re pêwendiyên germ danîn. Di vê navberê de bi Barzanî re ket pêwendiyê. Li ser bangewaziyê, General Mustafa Barzanî û hevalên wî ji Yekîtiya Sovyetan ku lê sirgûn bûn, vegeriyan başûrê Kurdistanê. Dema Barzanî vegeriya Bexdayê bi merasîmên bi coş hat pêşwazîkirin(06.10.1958) û dema hevdîtinê, General Abdulkerîm Qasim, rêz û îhtirameke mezin nîşanî wî da. Dawiya civînan jî mafê otonomiyê yê Kurdan hat qebûlkirin.

Rewşa erênî ya li Îraqê tesîr li ser Kurdên parçeyên din kir. Di sala 1957'an de, bi awayekî veşartî Partiya Demokrat a Kurdistana Sûriyeyê (PDK-S) hat damezirandin. Vê partiyê ji bo Kurdên li nav sînorên Sûriyeyê otonomiyeke çandî û herêmî dixwest. Di nav damezirînerên vê partiyê de Nuredîn Zaza, Osman Sebrî, Hemîd Hecî Derwêş, Reşîd Hemo jî hebûn. Di sala 1958'an de partiyê navê xwe guhert, kir Partiya Demokrat a Kurdên Sûriyeyê. Li Tirkiyeyê jî Kurdên ku bi tesîra komkujî û zext û tirsa tevgera tedîb û tenkîlê ya piştî qetlîama Dêrsimê bê deng mabûn, bi avakirina Komara Kurdistanê ya Mehabadê hêviyek ji wan re çêbûbû, lê vê pir dom nekiribû û dîsa bêdeng mabûn. Bi tevgera Barzanî re ji nû ve bi ser xwe ve hatin. Li her derê liv û tevger çêbû. Wek mînak di sala 1958'an de li Amedê rewşenbîrên Kurd Mûsa Anter û Canîp Yildirim bi navê "İleri Yurt" (Welatê Pêşketî) kovarek derxistin.

[98] Susan Meiselas, bnb.

Li Îranê jî bi vegera Barzanî hêviyeke nû çêbû û PDK-Î ket rewşeke çalaktir. Di Cotmeha 1958'an de komek pêşengên Kurdên Îranê, ji bo ku danûstendinan bikin çûn Bexdayê. General Barzanî di dawiya Sermaweza 1958'an de, di civînekê de ku nûnerên PDK-Î jî tev lê bûbûn, pêşniyaza avakirina tenê partiyekê ku Kurdan tevde temsîl bike kir û got, "Ji bo min sînor tune ne." Di rewşa bihêvî ya wê demê de Barzanî sekreteriya giştî ya partiya yekbûyî ya Îran û Îraqê pêşniyazî yek ji nûnerên PDK-Î'yê kir. Barzanî ji ber ku xwedî helwesteke neteweyî bû di navbera herêman de tu cihêkarî nekiribû. Jixwe ji ber ku xwedî vê ferasetê bû, di heyama avakirina Komara Kurdistanê ya Mehabadê de jî bûbû hêzeke girîng.

Barzanî bi gavên ewle dimeşiya. Abdulkerîm Qasim qanûneke wisa danî ku vê qanûnê digot, Komara Îraqê dewleta hevpar a Kurd û Ereban e. Qasim, PDK a ku serokatiya wê Barzanî dikir wek hêzeke meşrû nas kir. Ji bo weşanên Kurdî destûr hat dayîn. Her wisa ji bo 'Konseya Rêveber a Îraqê' ya ji sê kesan pêk dihat, Kurdek tayîn kir.

Barzanî jî di tevliheviyên nav welêt de alîkariya desthilatdariya General Qasim kir. Bi vî awayî Kurd bi desthilatdariya Îraqê re di xeteke çep de, bûbûn hêzeke mezin. PDK'yê bi serokatiya Mele Mustafa Barzanî di Gulana 1959'an de manîfestoyek weşand û tê de wiha got: "Partiya me her tim bûye partiya têkoşîna hevpar a li hemberî emperyalîzmê, paşverûtiyê û feodaliteyê û niha jî wisa ye. Partiya me her tim berjewendiya tevahiya hindikahiyên etnîk, gelê Îraqê, çînên dijemperyalîst û dijfeodal parast û niha jî diparêze."[99]

Wê salê Kurdan li Silêmaniyê bi awayekî din Newroz pîroz kirin. Bajar bi wêneyên mezin ên General Qasim, Barzanî û lehengên netewî yên Kurd Şêx Seîd û Şêx Mehmûd tên xemilandin.

Vê rewşa erênî zêde dom nekir. Ji ber ku gelek derdorên ji vê yekê ne razî bûn, hebûn. Gelek Ereb li dijî van pêşketinan bûn. Ji hêla din ve, wekî her gavê, ji ber mafên ku Kurdan bi dest xistibûn Îran û Tirkiye ne razî bûn. Ji ber ku Îraqê berê xwe dabû Sovyetan, tirs ketibû nava Rojavayiyan.

Ji bo biserneketina şoreşa Îraqê di navbera Amerîka, Îngîltere, Tirkiye û Îranê de bi rêya telgrafê peyam diçûn û dihatin. Di nivîsa ku bi riya telgrafê ji wezareta derve ya Îngîltereyê di heman kêliyê de ji Tehran, Enqere, Amman, Beyrûd, Washîngton û baregaha hêzên li Rojhilata Navîn re hatibû şandin wiha hatibû gotin: "... Em fêm nakin bê çima Tirk û Îranî ji bo ku Kurdistana Îraqê di nav xwe de parve bikin tevnagerin û amadehiyan

[99] Chris Kutschera, bnb., r. 247

nakin..."[100] Tirkiye ji bo bêencam hiştina hewlên Kurdan ên ku dibû bibûna, xwe amade kir ku bikeve nav Kurdistana Başûr.

Dema li Îraqê, di warê berjewendiya Kurdan de pêşketin çêbûn, li her sê welatên din li hemberî Kurdan zext zêde bûn. Li Îranê di sala 1958'a de SAVAK'ê gelek rêveberên PDK'yî digire. Di sala 1959'an de dîsa bi sedan kes tên girtin. Di nav girtiyên bajar û gundan de hema bêje ji her pîşe û temenî Kurd hene. Lê hin rêveberên PDK-Î xwe gihandine Îraqê.*

Dr. Abdurahman Qasimlo bi vî awayî qala wan rojan dike: "Şoreşa 14'ê Tîrmeha 1958'an a li Îraqê yek ji kelehên herî xurt ên emperyalîzmê hilweşand. Ji bo hêzên demokrat û rêxistinên Kurdan derfetên nû derketin. Bandora şoreşê li Îranê, bi taybetî jî li Kurdistana Îranê çêbû. Tevgera Kurdan a li Îranê careke din di demeke kin de bi pêş ket.

Di payîza 1959'an de hikumeta Tehranê ku ji pêşketina tevgera demokratîk a Kurdan ditirsiya li hemberî muxalefetê dest bi tevgera têkbirinê kir. Li bajar û gundan bi sedan karker, gundî, mamoste û oldar hatin girtin. Cezayê daliqandinê dan çar mîlîtanan, sisê ji wan endamên komîteya navendî ya PDK'yê bûn. Lê bi hevkariya raya giştî ya Ewropa, tevahiya Rojhilata Navîn û bi taybetî jî ya Îranê kir ku Şah van cezayên darvekirinê biqulipîne hepiskirina heta mirinê."[101]

Li Sûriyeyê di sala 1959 û 1960'î de kadroyên pêşeng ên PDK-S hatin girtin. Paşê bi qasî pênc hezar endamên partiyê hatin binçavkirin.** Serokê PDK-S Nûreddîn Zaza ku ew jî wê demê hatibû girtin, di 8'ê Tebaxa 1961'ê de hat berdan. Di hilbijartina parlemanê de bû berendam. Di dema xebata hilbijartinê de ji ber ku bi Kurdî peyiviye careke din hatiye girtin. Digel ku hate hilbijartin, ji ber vê yekê parlementeriya wî hat betalkirin.[102]

---

[100] Ersal Yavi, bnb., r. 384

* *Ew jî gava navbera hikûmeta Îraqê û Barzanî xera dibe, wê ji wan bê xwestin ku ji Bexdayê herin û piştre jî wê wan mişextî Sûriye, Lubnan an jî Ewropayê bikin.*

[101] Dr. Abdurrahman Qasimlo, İran Kürdistanı, r. 41

** *Di vê demê de pêkhatina şewata sînemaya Amûdê gelo tesaduf e. Ku mirov bala xwe bidê çi demê ku wilo tevlihevî hebin bûyerên bi vî awayî diqewimin. Bi ser halan de, ev derba duduyan e ku Amûdê bi bûyerên bi vî rengî û mezin re rû bi rû dimîne. Amûdê wê çaxê jî di warê Kurdewarî û welatparêziyê de di asteke bilind de ye... Roja 13.11.1960'î, berpirsê Amûdê (midurê nahiyê) hemû şagirtên dibistanên seretayî yên bajêr mecbûrî çûna sînemayê dike. Dibêje, pereyên bên berhevkirin ji bo alîkariya Şoresa Cezayîrê ne. Zengîn û hejar, şagirt hemû tevlî vê tevgerê dibin. Ji ber ku sînema biçûk e û têra hemûyan nake, şagirtan dikin 2-3 beş. Cara dawî, ji du qatî zêdetirê kapasîteya sînemayê zarokan dixin hundir. Ne kêmî 400 zarokan e, piraniya wan şagirtên salên yekê ta pêncan in û cara pêşî ye ku diçin sînemayê. Ji nişkan ve, agir bi motorên sînemayê dikeve û tavêje perde, dîwar û deriyên wê. Tê gotin ku derî bi zanebûn demekê nehatiye vekirin. Di vî agirê biguman de, agir bi zarokan tevan dikeve û hawar û qîrîna zarokan erd û ezmên diqelêşe. Hin tên xelaskirin lê 283 bedenên teze dibin qirik. Di hundirê saetekê de lawên Amûdiyan hema qeliyabûn. Dê û bavên kezebşewitî, wan ji hev nas nakin û nizanin kîjan laşê zarokê wan e. Hemû dayîk li ser hemû tirban diqîrin. Li ezmanan qîra zarokan û ya diya wan tevlihev dibin. Ji bo ew qîrîn tu car ji bîr nebe îro di cihê bûyerê de, di cihê wan laşên teze de warê bîranînê hatiye çêkirin.*

[102] Rafet Ballı, bnb., r. 552

Wek Sûriyeyê li Tirkiyeyê jî dîsa kesên pêşeng û rewşenbîr hatin girtin. Yek ji rêbaza ji holê rakirina Kurdewariyê, êrîşkirina ser pêşeng û rewşenbîran e. Ev bi awayekî hişkere hatiye îfadekirin. Jixwe tiştên ku hatine kirin jî ev yek vekirî dane nîşandan. Faîk Bulut di kitêba xwe ya bi navê 'Di Çapemeniya Tirkan de Rewşa Kurdan' (Türk Basininda Kürtler) de wiha gotiye: "Di salên 1950'yî de dema desthilatdariya Partiya Demokrat a ku alîgirê Amerîkayê bû, xwedî xeteke rastgir û lîberal bû û li hemberî xelkê siyaseta zextê dida meşandin serokwezîr Adnan Menderes, Wezîrê Karên Derve Fatîh Ruştu Zorlu (her du jî, piştî derbeya leşkerî ya 1960'î hatin darvekirin), fermandar Cevdet Sunay (Di salên 1970'yî de bû serokerkanê giştî û serokkomar) li hev civiyan û li ser vê pêşniyaza midurekî emniyetê ya li ser Kurdan peyivîn:

'Heger ji Kurdan hezar kesên ku xwedî hişyariya siyasî ne werin darvekirin, meseleya Kurdan herî kêm 30 salan wê were lipaşxistin. Her wisa divê her tim damxeya Komunîstiyê li Kurdên siyasî bikeve da ku gelê Kurd ê misilman ji wan hez neke...' Cevdet Sunay ji bo vê pêşniyazê di cih de dibêje, temam. Heçî serokwezîr Adnan Menderes e dibêje, 'Di carekê de girtin û darvekirina hezar kesî wê bibe sebeba nerazîbûnan. A rast ku em pêncî pêncî wan bigirin û daliqînin. Bi vî şiklî em karin hezar kesî temam bikin.' Wezîrê Karê Derve, bi temamî li dijî pêşniyazê derdikeve û wiha dibêje: 'Me berê jî Ermenî qetil kirin û paşê jî me Rûm qetil kirin. Bi dû de jî Rûs û îca heger em qetlîama Kurdan bikin, em nikarin xwe li pêş raya giştî ya dinyayê biparêzin. Ez dev ji kar berdidim.' Ev pêşniyaz bi tevayî nayê bicihanîn, lê beşeke wê pêk hat, 49 pêşengên siyasî yên Kurd hatin girtin û bi salan li girtîgehan man."[103]

Mîna ku Bulut dibêje, di sala 1959'an de 49 rewşenbîr û pêşengên Kurd hatine girtin, bi mahneya ku dixwazin dewleteke Kurdî ava bikin, hatine hepiskirin. Di rastiyê de 50 kes in. Xwendekarê Zanîngeha Enqereyê yê Fakulteya Hiqûqê Emin Batu jî di nav girtiyan de ye. Di hucreyê de, di şertên ne baş de Emin Batu jiyana xwe ji dest daye, mane 49 kes. Loma ev mesele di dîrokê de wek Doza 49'an (49'lar Davası) derbas dibe. Bûyerên wisa li dewletên din jî yên ku Kurd lê ne, her tim qewimîne. Her ji çend salan carekê pêşêng û rewşenbîrên Kurdan an tên girtin û di îşkenceyê re tên derbaskirin, an tên kuştin, an jî tên sirgûnkirin. Bi vî awayî gel bê serî û di tariyê de tê hiştin û tiştên ku tên xwestin hê hêsantir tên kirin.

Ji hêlekê ve jî tedbîrên li ser sînoran hatine zêdekirin; mayin hatine danîn, li ser sînor hin gund hatine valakirin, çavdêriya leşkerî ya li ser sînor zêdetir

[103] Faik Bulut, bnb., r. 26

bûye. Wek ku bi awayekî berfireh wê di beşa 'Mayin û Qaçaxî' de bê qalkirin, ji vê demê û pêde sînor wê bibin goristana Kurdan. Yanî hişkere ye ku, dema li Îraqê gavin ji bo berjewendiya Kurdan hate avêtin, li Sûriye, Tirkiye û Îranê zext, girtin û hin kiryarên din ên nebaş ên li hemberî Kurdan zêdetir dibin.

Li Tirkiyeyê xuya ye tedbîrên ku hatine stendin têra wan nekirine û di 27'ê Gulana 1960'î de derbeyeke leşkerî pêk hatiye. Piştî bêdengiyeke dirêj a di pey Dêrsimê re, Kurd ku bi tevger û bizava Barzanî hinekî hêvî bi wan re çêbûye, îcar bi derbeya leşkerî dîsa bi wêranî û serûbinbûyîneke mezin re rû bi rû dimînin. Dîsan serkêş, pêşeng û pêşewayên Kurd wê duçarî mişextî, tecrît û girtinan bibûna û di nav gel de jî, wê alozî û tevlihevî pêk bihata.

Em binêrin bê lêkolîner Ahmet Kahraman çawa qala wê demê dike: "Ji bo Kurdan derbeya leşkerî ya sala 1960'î bi awayekî nerm vegera rewşa salên 1930'î bû. Kurd hemû wek 'potansiyeleke talûkeyê' dihatin îlankirin, li dû hev li gundan 'seferên berhevkirina çekan' dihatin lidarxistin, zext û tirs dihat zêdekirin. 55 Kurdên navdar bi mahneya ku 'axa' ne tên girtin û sirgûnkirin. Gundên ku hê jî navê xwe diparastin, bi yê Tirkî hatin guhertin, mîna salên 1930'î kampanyayên 'Welatiyo bi Tirkî biaxive' dihatin destpêkirin, kesên ku bi Kurdî dipeyivîn dihatin biçûkxistin. Serokê leşkerî yê derbeyê General Cemal Gursel ku ew bixwe jî Kurd bû, fikra, 'Kurd tune ye, tu carî jî çênebûye' parastiye û dema seriyek daye memleketê xwe Erziromê wiha gotiye: 'Yên ku ji we re bêjin hûn Kurd in tif bikin rûyê wan, hûn hemû Tirk in.'..."[104]

Dewletên pêwendîdar, ji bo tevgera Kurd a li Îraqê têk biçe hemû derfetên xwe di têkiliyên derve de jî bi kar dianîn. Li hember vê, rêveberiya Îraqê paşve gav avêt. Roj bi roj ji gotinên xwe dûr ket. Di rojnameya Tawra (şoreş) de ku weşana fermî ya rejîmê bû, nivîseke bi sernavê 'Netewa Ereb û Kêşeya Hindikahiyan' hatibû weşandin. Di vê nivîsê de dihat gotin ku, qedera 'hindikahiyên Kurd ên li Îraqê' bi netewa Ereb ve girêdayî ye, ji ber vê jî hewce ye 'Ev hindikahî were asîmîlekirin'. Di rojên ku 14 şaxên PDK hatin girtin, Qasim li hemberî rojnameyên Kurdî jî şer dikir; bi rêzê Kurdistan, Azadî, Dengê Kurd, Hetaw û paşê jî weşana fermî ya PDK'ê Xebat (Adar 1961) hat qedexekirin. Ji hêla din ve jî, di muzakereyan de hin mahne dihat kirin û bi vî awayî riya lihevhatinê dihat girtin.

Dîsa şer, dîsa bombe û kuştin... Hêzên çekdar ên Îraqê di sala 1961'ê de êrîş birin ser Kurdên bê çek û destvala, bi êrîşên hewayî Kurdistana Îraqê hat bombekirin. Hassan Arfa wiha qala vî şerî dike: "...Qasim, gund, qamp û

[104] Ahmet Kahraman, bnb., r. 401

heta bajarên biçûk ên ku ji hêla serhildêrên Kurd ve hatibûn bidestxistin dan ber bombeyan. Jin, zar û zêç, heywan, bêyî ku cudahiyê bixe navbera kesên ku şer dikin an nakin, dest bi kuştina tevahiya Kurdan kir. Lê Kurdan serî netewand. Qampên xwe û malbatên xwe li geliyên kûr belav kirin..."

Ligel her tiştî di sê salên bihurî de, li Kurdistana Îraqê ji aliyê Kurdan ve pêşketinên gelekî girîng çêbûn. Bi taybetî çapemeniya Kurdan bi pêş ket. Her wisa di nav Kurdên parçeyên din de liv û tevger pêk hatin. Ji ber vê jî, dema ku şer dest pê kir Kurdên li Tirkiye, Îran, Sûriyeyê bi kurtî Kurdên li her derê alîkarî dan Mustafa Barzanî. Di nav PDK'ya Îranê de dilsoziyeke xurt bi Barzaniyê ku li hêla din î sînor şer dikir hebû û ji bo General Barzanî torên alîkariyê hatibûn sazkirin.

Zext û zilma li Sûriyeyê bi awayekî sîstematîk berdewam kir. Di sala 1962'yan de, bi hijmartina nifûsê ya ku tenê li herêmên Kurd lê dijiyan hatibû kirin, nasnameya zêdeyî 200 hezar Kurdî ji wan hat stendin û hat gotin ku, ev ne hemwelatiyên Sûriyeyê ne. Bi vî awayî Kurd di welatê xwe de bê nasname man û ketin rewşa biyaniyan. Ji wê rojê şûnde, Kurdên bênasname ji mafên sosyal, çandî û aborî ya hemwelatiyê bêpar man. Wek mînak, Kurdên bênasname nikarin xanî bikirin, nikarin di daîreyên fermî de bixebitin, nikarin sûdê ji mafên perwerdehiyê bigirin, nikarin tev li hilbijartinan bibin, nikarin wek serdan herin derveyî welêt, nikarin zewaca xwe qeyd bikin û hwd. Zextên li ser çanda Kurdî zêdetir bûn, her wisa gelek kes hatin sirgûnkirin. Bi biryareke ku di sala 1996'an de hat derxistin jî, xanî û emlaqên Kurdên bênasname bi pereyekî ku ji wan re hatiye pêşniyazkirin wek 'Malê Dewletê' hatin îstîmlaqkirin.

Li aliyê din li Îraqê têkoşîna Barzanî dewam dikir. Di 8'ê Sibata 1963'yan de Abdusselam Arif û partiya Baas dawî li desthilatdariya General Qasim tînin. Di 4'ê Adara 1963'yan de di navbera Barzanî û delegasyona Îraqê de danûstendin çêdibin. Barzanî ji bo herêma Kurdan otonomiyê dixwaze. Danûstendin bê encam dimînin û Kurd dîsa rastî êrîşên leşkerî tên. Bi vî awayî Baas jî dest bi şerê li hemberî Kurdan dike.

Êrîş bêpîvan bûn. Çekên herî nû û herî kujer bi kar dianîn: Napalm, bombeya şewatê, bombardimana sîstematîk, tank û topên mezin dihatin bikaranîn. Digel vê Baasiyan ji bo serê Barzanî xelat danîn, hemû endamên PDK'ê girtin û di êşkenceyê re derbas kirin, bi şiklekî sîstematîk kuştin domandin û bi vî awayî xwestin ku tevgera Kurd bê pêşeng bihêlin.[105]

[105] Chris Kutschera, bnb., r. 280

Zext ew qas giran bûn ku, heya bi Komara Moxolistanê ev yek protesto kiribû. Di Gulana 1963'yan de Komara Gel a Moxolistanê, bi daxwaza rawestandina êrîşên hêzên hewayî yên Îraqê li hemberî gelê sivîl, wek protesto ji sekreterê giştî yê Netewên Yekbûyî xwest ku, di rûniştina din a Desteya Giştî de pirsgirêka Kurdan bîne rojevê.[106]

Piştî derbeya Baasê a li Îraqê, di 8'ê Adara 1963'yan de li Sûriyeyê jî partiya Baas desthilatdarî bi dest xist. Di şerê pêşî ê Baasa Îraqê de, artêşa Sûriyeyê jî li gel artêşa Îraqê li hemberî Kurdan ketin şer. Lê Kurdan ziyanên mezin gihandin hêzên Sûriyeyê. Her wisa Kurdên ku bûbûn şahidê vê pêvajoyê, didîtin ku li hemberî du dewletan şer dikin.

Di sibeha roja 9'ê Hezîrana 1963'yan de derketina kolanan tê qedexekirin. Artêş bi tanqan dora bajarên Kerkûk, Hewlêr û Silêmaniyê digire, bi girseyî xelk tê girtin, bi sedan kes tên kuştin û cesedên wan bi ser hev de dixin çalan. Heta meha Sermawezê ev şer bi bêmerhemetî dom dike.

Di derbarê van kiryarên ku wê bi salan dom bikira Chris Kutschera wiha dibêje: "Vê carê Baasê li herêmên Kurdan bi awayekî sîstematîk dest bi xebata Erebkirinê kir. Dema ku careke din di sala 1968'an de bû desthilatdar, wê careke din dest bi vê xebatê bikira. Beriya her tiştî artêşa Îraqê ji herêmên 'stratejîk' –herêmên sînor û neftê- Kurdan derdixe, van deran bombardiman dike, gundên Kurdan dişewitîne û paşê jî bi buldozeran hildiweşîne. Bi vî awayî tenê li herêma Kerkûkê 40 hezar Kurd hatin bidûrxistin. Bi awayekî sîstematîk Erebkirin, li deşta Hewlêrê jî hat kirin."[107]

Digel her tiştî, Kurdan bi derfetên xwe yên kêm şer kirin û teslîm nebûn. Heta li hin ciyan Kurdan serkeftinên mezin bi dest xistin. Wek mînak, şerê Metîna ku ji 28'ê Tebaxa 1963'yan dest pê kir û bi giştî 45 rojan dewam kir bi serkeftina Kurdan bi dawî bû û artêşa Îraqê paş ve vekişiya.

Piştî demeke kin li Îraqê derbeyeke din çêbû. Di Sermaweza 1963'yan de Abdulselam Arif bi desteka serbazan Baasî ji desthilatdariyê dûr xistin û bû desthilatdar. Piştî derbeyê di nav desthilatdarên nû û Kurdan de dîsa danûstandinan dest pê kir. Di 1'ê Sibata 1964'an de di navbera General Barzanî û serokê dewleta Îraqê Mareşal Arif de, peymana agirbestê hat morkirin. Serok Arif li ser agirbestê belavokeke dirêj belav kir:

- Naskirina mafên netewî yên birayên me yên Kurd, ku ev naskirin wê di makeqanûna demkî de jî cih bigire;

- Bi efûya giştî wê hemû girtî bên berdan;

[106] Hassan Arfa, bnb., r. 190
[107] Chris Kutschera, bnb., r. 281

- Li herêmên bakur rêveberiyên mihelî wê ji nû ve bên avakirin;

- Karmend û wezîfedarên ku ji karê xwe hatine bidûrxistin, wê vegerin ser karê xwe;

- Ew şertên sînorkirinê ku li ser bazirganiya kelûpelên xwarinê hatibûn danîn, wê werin rakirin;

- Bêyî ku wext derbas bibe wê bakur ji nû ve were avakirin.[108]

Li gor endamên PDK'ê di vê peymanê de mafên netewî yên Kurdan têra xwe nehatine îfadekirin. Ji ber vê jî li dijî vê agirbestê derketin. Bi vî awayî navbera wan û Barzanî xera bû. Barzanî dide xuyakirin ku, wî zanibû hikumeta Îraqê wê mafekî kamil nede, lê ji ber ku Kurd di wê rewşa ne xweş de karibin hinekî bêhna xwe berdin û bi ser xwe ve bên, ev peyman qebûl kiriye. Di vê demê de pêwîstiya Kurdan, ku di her warî de windahiyên mezin dabûn bi bêhnvedan û xwe bihêzkirinê hebû. Rojnamevanekî ku piştî agirbestê bi mehekê çûye Kurdistanê ji xirbeyan pê ve tiştek nedîtiye:

"Hemû gundên li kêleka riya Silêmaniyê hatibûn bombardimankirin, bi bombeyên napalmê hatibûn şewitandin û bûbûn xwelî..."

Barzanî di vê navberê de têkiliyên xwe yên bi Şahê Îranê re xweş kiriye û her ku çûye zêdetir alîkariya aborî û leşkerî stendiye. Hikumeta Îranê, di Rezbera 1965'an de bi awayekî hişkere alîkariya serhildana li Kurdistana Îraqê dike. Li hemberî vê alîkariyê Şah, ji Barzanî dixwaze ku Kurdên Îranê çalakiyên siyasî nekin. Di dawiyê de, di nav Kurdan de hat qebûlkirin ku li hemberî Şah bê deng bimînin û Kurdên Îranê yên ku vê yekê qebûl nekin wê wek xayîn bên dîtin. Ji vê şûnde, li gor polîtîkaya General Barzanî, Kurdan li Îranê çalakî pêk neanîne. Her wisa bi hezaran Kurdên mîlîtan ên Îranî ji bo ku li hemberî Îraqê şer bikin hatine tev li pêşmergeyan bûne.

Li Îraqê careke din desthilatdarî hat guhertin û ji nû ve danûstendinan dest pê kir. El-Bazazê ku di Hezîrana 1966'an de desthilatdarî bi dest xist, deklaresyonek weşand û bi awayekî hişkere ragihand ku dewleta Îraqê ji du netewan (Kurd û Ereb) pêk hatiye. El-Bazaz got ku, heger yekîtiya Îraqê nexe talûkeyê wê otonomiya herêmî qebûl bike. Lê piştî El-Bazaz peyman mor kir ne bi gelekî, bi derbeyekê ji desthilatdariyê hat bidûrxistin û peyman betal bû.[109]

Wek ku tê dîtin di nav Kurdan û dewleta Îraqê de gelek caran danûstendin çêdibin, agirbest tên ragihandin, hêvî tên dayîn, lê di dawiyê de lihevhatin pêk nayê. Tê fêmkirin ku ev hemû ji bo qezenckirina wext hatine kirin û

[108] Chris Kutschera, bnb., r. 280

[109] Kerim Yıldız, Irak Kürtleri, r. 44

serhildan ji nû ve geş dibe. Êrîşên artêşa Îraqê û hêzên hewayî qet nasekinin. Her ku çûye devlet bi qeweteke mezintir bi ser serhildanên Kurdan ve çûye.

Nirxandinên Kutschera yên li ser wê demê wihan in:

"... Piştî her derbeyeke hikumetê, desthilatdarên nû pêwendiyên bi Kurdan re datînin, Kurdên ku ji ber şerê berê kêm zêde lawaz ketine agirbestê qebûl dikin û rêveberên nû yên Bexdayê jî di vê demê de derfeta wan a ku desthilatdariya xwe qewîn bikin çêdibe. Dema ku hikumet xwe hinekî bi hêz dikin û êdî pêwîstiya wan bi Kurdan namîne, mîna desthilatdariya berê li hemberî Kurdan bi neyînî tevdigerin û dijminatî dîsa dest pê dike."[110]

Li Tirkiyeyê bi makezagona 1961'ê hindik be jî destûra birêxistinbûnê tê dayîn û kêm be jî riya hin pêşketinan vedibe. Di vê demê de li Tirkiyeyê çepgirî bi pêş dikeve. Kurd jî di nav tevgerên çepgiriyê de dibin xwedî cihekî girîng. Di nav TÎP'ê (Partiya Karkerên Tirkiyeyê) de, ku di sala 1961'ê de hatibû damezirandin, hejmareke zêde rewşenbîrên Kurd hene. Nêrînên çepgiriyê, yanî biratiya hemû gelan û têkoşîna ji bo guhertina tevahiya Tirkiyeyê li pêş e.

Di vê demê de, hin kovar û rojnameyên Kurdî derdikevin. Hin çalakiyên çandî tên lidarxistin. Lê mîna her tim, gava herî biçûk a ku tê de navê "Kurd" derbas dibe, ji hêla rayedarên dewletê ve wek daxwaza parçekirina dewletê tê binavkirin. Bi vê mahneyê gelek kes tên girtin. Wek mînak, di Hezîrana sala 1963'yan de 12 rewşenbîrên Kurd tên girtin. Wezîrê karê hundir ê wê demê Hifzi Oguz Bekata, di 28'ê Hezîrana 1963'yan de bi civîneke çapemeniyê, girtina van kesan radigihîne raya giştî. Bekata dibêje, 12 kesên ku ji bo di nav welêt de dewleteke Kurdî ava bikin birêxistin bûne, hatine girtin. Her wisa rêbaza ku me li jorê gotibû hatiye şopandin, di çapemeniyê de hatiye nivîsandin ku ev kes Kurdewarên komunîst in. Digel her tiştî xebatên Kurdan didomin; di hilbijartina 1965'an de ji lîsteyên TÎP'ê (Partiya Karkerên Tirkiyeyê) çar mebûsên Kurd tên hilbijartin.

Di sala 1961'ê de bi awayekî veşartî xebatên damezirandina PDK-T (Partiya Demokrat a Kurdistan- Tirkiyeyê) dest pê dikin û piştî xebata çar salan, di sala 1965'an de bi awayekî veşarî PDK-T ku navenda wê li Amedê bû, tê damezirandin. Partiya ku bi armanca federasyonê hatibû damezirandin, xwe wek cudakar nedidît. Di destûrnameya vê partiyê de tê xwestin ku xala "Dewleta Tirk ji Kurd û Tirkan pêk tê. Ev her du milet di her warî de wekhev in." di destûra bingehîn a Komara Tirkiyê de bê danîn. Piştî sala 1965'an li Sûriyeyê jî rêxistinên cihê yên Kurdan tên damezirandin.

[110] Chris Kutschera, bnb., r. 254

Rêxistinên li Sûriyeyê tim bi rêxistinên Kurdan ên li parçeyên din re di nav têkiliyê de ne.

Paşê li Tirkiyeyê bûyerên xeternak diqewimin. Faîq Bucak ku mebûsê Rihayê û damezirînerê PDK-T ye, di 5'ê Tîrmeha 1966'an de tê kuştin. Weşanên Kurdî tên qedexekirin. Di Rêbendana 1967'an de hikumeta Silêman Demîrel biryarnameyekê derdixe. Li gor vê biryarnameyê, bi çi awayî dibe bila bibe gerek tu weşanên Kurdî yên ku li derveyî welat hatine çapkirin nekevin Tirkiyê û neyên belavkirin. Helwest û nêrînên wê demê bi îfadeyên ku mirov ji însaniyetiya xwe fedî bike di çapemeniyê de cih girtibûn. Kutschera wiha qala nearamî û helwestên wê demê dike:

"...Otuken ku kovareke Panturanîst bû, hîn di Nîsana 1967'an de li dijî Kurdan nivîseke êrîşkar weşandibû. Di Hezîrana 1967'an de dîsa wezîfeya xwe dike û bi sernavê 'Ulemaya Kurdên Sor' nivîsekê diweşîne... Nivîskarê gotarê wiha dinivîse 'Heger ku dixwazin bi zimanê xwe yê hov û îptîdayî (paşvemayî) ku ji çar pênc hezarî zêdetir peyvên wan tune ne, bipeyivin û weşanên xwe bidomînin bila herin dereke din.

'(Li herêmên wan) ji aliyê piraniyê ve hejmara wan ji sedî sed be jî, xeyalên wan ên avakirina dewleteke li ser xaka Tirkan, ew ê wek xewna Yewnanan a Bîzans û xewna Ermeniyan a 'Ermenistana Mezin' tewş û vala be... Îranê, Pakistanê, cem Berzanî, ku derê dixwazin bila herin wir! Ji bo ku li Afrîkayê ji wan re welatekî peyde bikin, bila serî li NY'ê (Neteweyên Yekbûyî) bidin. (...)

'Hûn li ser hesabê neteweperweriya Kurdî dixebitin. Hûn tên cem me zimanekî serbixwe, dibistana serbixwe, weşanên radyoyê û çapemeniyeke cihê dixwazin. Ji bo hûn dewleta xwe ava bikin, hûn hîn jî civînên xwe yên veşartî didomînin, hûn Berzanî wek qehremanê xwe îlan dikin, hûn di civînên xwe yên taybet de gotinên bi Kurdî bi zarokên xwe didin xwendin.'

Nivîskarê gotarê wiha dawî li nivîsa xwe tîne: 'Dema ku hûn hewl bidin Tirkiyeyê parçe û parve bikin, hûn ê bibînin bê em ê we bişînin ku derê. Em li bendê ne!'..."[111]

Komeleyên xwendekarên 19 bajarên Kurdan li dijî vê gotarê derketine, ji ber bangewaziya komeleyên xwendekarên Kurd di 3'ê Tebaxa 1967'an de li Kurdistanê bi awayekî girseyî xwepêşandan hatine lidarxistin, li Farqînê 10 hezar kes û li Amedê 25 hezar kes tev li vê xwepêşandanê bûne.[112]

Mîna di vegotinan de jî cih digire, tawanbariya bi 'dabeşkirina dewletê' tim wek mertal hatiya bikaranîn. Bi vî awayî li hemberî Kurdên ku dixwazin

[111] Chris Kutschera, bnb., r. 396
[112] Chris Kutschera, bnb., r. 397

dewletê parçe bikin çi were kirin musteheq e. Vê helwestê heta îro jî berdewam kiriye. Lê ji ber rastiya di holê de ye, piraniya tevgerên Kurdan otonomî yan jî federasyon xwestine. Li Îraqê hîn di Avrêla 1962'yan de, weşana fermî ya PDK'yê 'Xebat' nivîsandibû ku, tevgera Kurd naxwaze başûrê Kurdistanê ji Îraqê veqetîne. Dema ku otonomî dihat xwestin, PDK ji bo ku Bexdayê û gelek welatên din ên Ereban qanix bike da ku ew bi xwe ne cudaxwaz e û otonomî jî yekîtiya welêt xirab nake, xebatên dîplomatîk kiribûn. Wek ku li jor hat gotin, PDK-T'ê jî di destûrnameya xwe de nîşan dabû ku ew ne cudaxwaz e. Paşê jî li Îranê ji Humeynî jî daxwazên wilo hatibûn kirin. Lê rayedarên van dewletan vî dengî hîç naynin xwe û bi taybetî jî bi gotina 'dixwazin welêt parçe bikin' rewşa êrîşkirinê pêk tînin. Lewre armanca sereke jiholêrakirina Kurdewariyê ye. Ango Kurd heger perwerdehiya bi zimanê dayikê ku mafê herî xwezayî yê mirovan e bixwaze wê sûcdar be, li stranên Kurdî guhdarî bike sûcdar e. Ev tev nîşaneya bêtehemuliya li hemberî hebûna Kurdan in. Mînakeke biçûk her tiştî bi awayekî zelal tîne ber çavan: Dema ku Mûsa Anter di sala 1959'an de helbesteke Kurdî dinivîse, agir ji nivîsên çapemeniyê dibare. Heta Falih Rifki Atay pêşniyaz dike ku, serê Mûsa Anterê ku helbesta Kurdî dinivîse 'were jêkirin'.

Kesên ku bi çavekî objektîf li herêmên Kurdan binêre, wê bi rihetî bibîne bê bi rastî kî cudakariyê dike. Li Îranê herêma herî paşdemayî herêma ku Kurd lê dijîn e. Kurdistana Îraqê gelek caran hatiye hilweşandin. Dema ku em li Tirkiyeyê dinêrin, di navbera Rojhilat û Rojava de cudatiyeke mezin derketiye holê. Ji ber ku bi ziman û çanda xwe dibistan ava nekirine, Kurd ji perwerdehiyê bêpar in. Ji ber ku perwerdehiyeke bisînor dibînin û ziman nizanin, ji ber ku tim heqaret li dîroka wan tê kirin û tên biçûkxistin, bi giştî derfeta xwebipêşxinê ya Kurdan çênebûye. Bi vî awayî ji ber ku bi deh salan bi tunekirinê re rû bi rû mane nikaribûn li gor demê xwe bi pêş bixin.

Di salên 1960'î de li Tirkiyeyê, ferqa di navbera Rojhilat û Rojava de pir zêde bû. Ji ber vê jî, bi navê "Xwepêşandanên şermezarkirina paşdamayîna Anatolyaya Rojhilat û Anatolyaya Başûrê Rojhilat" bi beşdariyeke mezin a gel, ev mitîng hatine lidarxistin:

Amed: 16 Rezber 1967
Farqîn: 24 Rezber 1967
Siwêreg: 1 Cotmeh 1967
Batman: 8 Cotmeh 1967
Dêrsim: 15 Cotmeh 1967


Agirî: 22 Cotmeh 1967

Enqere: 19 Sermawez 1967[113]

Diruşmeyên di mîtîngan de, bi kurtasî naveroka xwepêşandanan radixe ber çavan:

- Ji rojavayê re medeniyet, ji rojhilatê re cehalet, çima?
- Em ne cendirme, mamosteyan dixwazin.
- Ji rojavayê re kargeh û rê, ji rojhilatê re qomando û qereqol.
- Ji rojavayê re îmar, ji rojhilatê re îstîsmar.
- Rojhilat ne cihê sirgûnan e...[114]

Dema ku li Tirkiyeyê ev tevger pêk dihatin, li Îranê jî Kurdan dest bi tevgereke nû dikir. Alîkariya Kurdên li Îranê ji bo berxwedana Kurdên li Îraqê ku me berê qal kiribû heta sala 1967'an berdewam dike. Lê di sala 1967'an de, milîtan ji refên Barzaniyan vediqetin û vedigerin Îranê. Vê koma ku li dijî xeta PDK-Î ya nêzîkî Barzanî ye derket û çalakiyên ku dihatin kirin kêm didîtin, li Îranê dest bi serhildaneke nû kir. Vê serhildana ku tevgera netewî ya Kurdên li Îranê bi hêz kir û bi pêşengiya PDK-Î dest pê kir, heta 18 mehan bê navber dewam kir. Barzanî, li gor peymana ku pê ji Îranê alîkarî distend, li dijî têkoşîna Kurdan a li Îranê derket. Gerîlayên ku di navbera hêzên Îran û Barzanî de man, bi mêranî şer kirin lê piraniya wan hatin kuştin û tevger qels ket. Di sala 1968'an de, polîs rêveberên din ên PDK'ê digire. Lê têkoşîn dîsa jî dewam dike. Dûre Kurd kar û xebatên xwe bi awayekî veşarî (îlegal) dimeşînin. Di sala 1969'an de bi navê 'Komela' rêxistinek tê avakirin.



*Swêd-Meşeke di salên 1960'î de*[115]

Di heman demê de li Ewropayê jî gelek tevgerên Kurdan xebat dikirin. A rast di vê demê de li gelek welatên dinyayê liv û tevger hebû.

[113] İsmail Beşikçi, Doğu Mitingleri'nin Analizi (1967), r. 15
[114] İsmail Beşikçi, Doğu Mitingleri'nin Analizi (1967), r. 24
[115] Rohat Alakom, İsveç Kürtleri




Swêd-*1 Gulan 1968- Rêza pêşî, ji milê çepê ve Omer Şêxmûs û Bedo Anter*[116]

Ciwanên ku paşê wê wek nifşê 68'an bihatina binavkirin, di nav xebat û çalakiyên mezin de bûn.



*31 Nîsan 1969- Govenda Nisêbînê li Stenbol di Şeva Rojhilat de- Opr.Dr. İbrahim Yıldırım(ê rûniştî), ji çepê Parêzer Mahmut Aslan, Kimyager Şehmus Aslan, Battal Battı, Avukat Navaf Aslan ve Hüseyin Bozkurt*[117]

[116] Rohat Alakom, İsveç Kürtleri
[117] Ji Arşîva Necla Yersev

Li Tirkiyeyê jî tevgerê berdewam dikir. Li tevahiya Tirkiyeyê rêxistinên çepgir zêde dibûn û Kurdan jî rêxistinên nû ava dikirin. Di Gulana 1971'ê de Navendên Çanda Şoreşger ên Rojhilatê (DDKO) hat damezirandin. Li gelek deveran şaxê vê rêxistinê vebûn. Gelek mitîng, şevên bîranînan û civîn hatin lidarxistin.

Li hemberî tevgera ciwanan ku li her dera Tirkiyeyê belav dibû, tedbîr hatin stendin. Hêzên komando sevqî herêmên rojhilat û başûrê rojhilat dikirin, leşkeran digirt ser gundan. Di heman demê de, ji ber gelek sedeman di nav rêxistinên Kurdan de jî pirsgirêk derdiketin. Di sala 1969'an de piştî tevliheviyên di nav PDK-T de du mirovên girîng ên partiyê Seîd Elçî û Dr. Şivan hatin kuştin.

Li Îraqê jî di sala 1968'an de Baasiyan dest danî ser hukim û paşê jî li hemberî Kurdan êrîşên leşkerî pêk hatin. Lê ev êrîş bê encam man û tevgera Barzanî xurtir bû. Ji ber vê jî, li ser otonomiya Kurdan ji nû ve muzakereyan dest pê kir. Di 11'ê Adara 1970'yî de, di nav Kurdan û dewleta Îraqê de li ser otonomiyê peyman hat morkirin. Li gor peymanê li herêmên ku gelê Kurd lê zêde ye, ligel zimanê Erebî Kurdî jî wê bibûya zimanê fermî. Perwerdehiya Kurdî û çanda Kurdî wê bihata xurtkirin, Kurdî li tevahiya Îraqê wê bibûya zimanê duyem ê perwerdehiyê. Wêje û huner û xebatên çandî yên Kurdî wê bihatina destekkirin. Kesên ku li hember rejîmê şer kiribûn wê bihatina efûkirin. Yek ji alîkarê serokwezîrê Îraqê wê Kurd bûya, Kurd bi awayekî temamî wê tev li hikumetê bibûna, di desteya wezîran de û di artêşê de wê wezîfeyên girîng bigirtina. Hemû karmendên li Kurdistanê wê Kurd bûna yan jî wê bi Kurdî bipeyiviyana.[118]



*Xortên Kurd ên li Sûriyeyê (Hamid – Feleh Yûsiv- Abdulah - Sedîq–1972). Li gor ku Mamoste Sedîq ji me re vegot: Dema li Zanîngeha Helebê telebe ne, cara ewil Şeva Xortên Kurdan amade kirine. Newêribûn 21'ê Adarê vê şevê li dar bixin. Lê ev şev bi niyeta Newrozê di meha Adarê de tê lidarxistin. Li ser vê, ev xort çend rojan ji zanîngehê hatine dûrxistin.*

[118] Kerim Yıldız, bnb., r. 47

Dema otonomî hat ragihandin, Samî Abdurahman di hikumeta Îraqê de bû wezîrê karên Kurdistanê. Bi van pêşketinan Mustafa Barzanî bûbû hêviya hemû Kurdan û kabûsa dewletên cîran. Niha dîsa em ê bibînin bê eleqeya zextên li ser Kurdan çiqasî bi destkeftiyên Kurdên wî aliyê sînor re heye. Dema tevgera Mustafa Barzanî hin mafan bi dest dixe, Tirkiye di cih de dikeve nav gûmanan û dibe êrîşkar. Bi navê 'operasyonên komandoyan' gelek operasyon li hemberî Kurdan pêk tên. Chris Kutschera li ser van operasyonan van agahiyan dide: "Yek ji van operasyonan di 8'ê Avrêla 1970'yî de li Farqînê pêk tê. Bi şev ji hêla 2 hezar komandoyên ku perwerdehiyên taybet dîtine, bi 200 Erebe û 6 helîkopteran dor li bajêr hatibû girtin... Yekîne bi sariya sibehê re dikevin bajêr û bi mahneya lêgerînê hemû malan talan dikin... Hemû mêrên bajêr, ango 3144 zilam li derveyî bajêr tên komkirin û leşker li wan dixin. Di heman demê de leşker bi ser wan de diqîrin û xeberan ji wan re didin: 'Kûçikên Kurd! Sîxurên Barzanî, ka bêjin we çek li ku veşartin?'

Operasyanên wisa di salên 1970 û 1971'î de li Çêwlîk, Batman, Tatwan û li gelek bajarên biçûk, li gelek gundan dihatin dubarekirin."[119]

Bêgûman dîsa rewşenbîr di derbê de ne. Di Cotmeha 1970'yî de Dr. Tarik Ekîncî, Canîp Yildirim, Mûsa Anter, M. Emîn Bozarslan jî tê de bi dehan rewşenbîrên Kurd tên girtin. Li gel helwesta tund a dewletê, Partiya Karkerên Tirkiyeyê (TÎP) di 29 û 31'ê Cotmeha 1970'yî de kongreya xwe ya çaran li dar dixe û di kongreyê de wiha tê gotin: "Li rojhilat gelê Kurd dijî, ya rast de ev heqîqet e, lê rêveberî vê rastiyê înkar dike. Ji bo ku nebêjin Kurd, digotin 'Tirkên çiyayî', ji bo ku nebêjin Kurdistan digotin 'rojhilat'... Ji destpêkê heta niha rêveberiya faşîst û çînên serdest zordarî li Kurdan kirine, li hemberî wan teror û polîtîkayên asîmîlasyonê bi kar anîne û ev yek bêhtir bi êrîşên bixwîn pêk hatine."[120]

Digel ku operasyon tên lidarxistin, mirov tên girtin, tehde li însanan tê kirin; tirs ji dilê rêveberê dewletê dernakeve. Li hemberî destkeftinên Kurdan ên li başûrê Kurdistanê, tiştên tên kirin bêhna wan dernaxe. Dawiyê di 12'ê Adara 1971'ê de li Tirkiyeyê derbeyeke nû ya leşkerî pêk hat. Mîna ku di her derbeyê de dibe, her der û her tişt hatin serûbinkirin. Piştî vê derbeyê hemû rêxistinên çepgir hatin girtin. Milîtan û rêveberên Kurd ên ku endamên DDKO, PDK û TÎP'ê ne, hatin girtin. Gundî, bajarî, xwendekar, karsaz, karker, karmend û rewşenbîr bi sedan Kurd li baregehên leşkerî yên ku

[119] Chris Kutschera, bnb., r. 398
[120] Chris Kutschera, bnb., r. 399

wek girtîgeh dihatin bikaranîn, dihatin girtin, îşkenceyên giran li wan dihatin kirin û gelek ji wan rastî cezayên giran ên hepiskirinê dihatin.[121]

Li Îranê jî pêvajoyeke bi vî rengî dest pê kir. Vê carê wê zordariyên ji berê girantir bihatina kirin. Di 22'yê Adara 1972'yan de li Baneyê, endamê komîteya navendî ya PDK-Î dema ku ji civîneke partiyê derdikeve ro li nîvro, li kolanê tê kuştin. Di 15'ê Avrêla 1972'yan de du endamên PDK-Î li Sineyê tên kuştin. Di meha Gulanê de jî li heman bajarî zarokekî 17 salî ji ber dijberiya siyasî tê darvekirin. Di 19'ê Berfanbarê de jî pênc Kurdên welatparêz li Sineyê tên daliqandin û hwd.

Ev zextên li Îranê wê Kurd bixistina pevajoyeke nû ya têkoşînê. PDK-Î di sala 1973'yan de kongreya xwe ya sêyem (22-26 Îlon 1973) li dar xist û kete rewşeke çalaktir. Di kongreyê de, di bername û destûrnameya partiyê de hin guhertin çêbûn, Dr. Abdurahman Qasimlo bû sekreterê giştî yê partiyê. Her wisa biryara têkoşîna çekdarî û bi rêxistinên pêşverû yên Îranê re têkoşîna hevpar a li hemberî rejîma şah hat stendin.

Pêşerojeke xirab li benda Kurdên Îraqê jî bû. Lewre dema sozên ku hatibûn dayîn hatibû, lê tu pêşketineke erênî nehatibû dîtin. Berevajî, rewş tam li dijî vê yekê bû. Li gor peymana ku di sala 1970'yî de di navbera hikumeta Îraqê û Barzanî de hatibû çêkirin, di hundirê çar salan de deverên ku piraniya niştecihên wan Kurd in wê bibûna otonom. Li gor peymanê wê nifûs bihata hejmartin û li gor vê jî wê hin biryar bihatina stendin. Heger serjimariyeke normal bihata kirin, Kerkûk û Xaneqîn ku nîvê rezervên neftê yên Îraqê lê bûn, wê di nav herêma otonom a Kurdan de bimana. Rêveberiya Îraqê ev yek nedixwest û berî sala 1974'an ku di vê salê de otonomî wê biketa meriyetê, li deverên stratejîk ên Kurdistanê Ereb bi cih kirin û siyaseta 'Erebkirinê' meşand. Ji bo vê yekê jî Kurd dihatin sirgûnkirin û di şûna wan de Ereb dihatin bicîhkirin.

Ji ber ku gavên gerek heta 1973'yan bihatina avêtin, nehatin avêtin û li herêmê Ereb bicih dikirin, şer dest pê kir. Di sala 1974'an de, di bin pêşengiya Sedam de Îraqê li gor daxwazên xwe otonomiyeke ku bêhtir tê de reformên sûnî hebûn, derxist pêş. Kurdan ev yek qebûl nekir. Samî Abdurahman ji wezîrtiyê veqetiya û şer girantir bû.

Di vê pêvajoyê de hêzên ku alîkarî didan Kurdan hatin guhertin. Barzanî heta îmzekirina peymana dostaniyê ya di navbera Îraq û Sovyetan de, yanî heta 1972'yan ji Sovyetê alîkarî distend. Piştî peymanê alîkarî qut bû. Di vê

[121] Ahmet Kahraman, bnb., r. 402



*Mustafa Barzanî û Sadam Huseyin (Adar-1974)*[122]

navberê de gazî Barzanî dikin da ku here Tehranê. Li vir wezîrê karê derve yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîka Henry Kissinger, soza alîkariya girîng a leşkerî da û ji vê şûnde Kurdan ji Amerîkayê û Îranê alîkariyên girîng stendin.

Wê demê artêşa Kurdistanê ji 60 hezar pêşmergeyan û ew qasî jî ji hêzên nenîzamî pêk dihat. Ji ber ku alîkarî ji Amerîkayê distend di destê wê de çekên girîng hebûn. Hêzên Îraqê jî ji 90 hezar leşker, 1200 tanqan, Erebeyên bizirx û 200 firokeyan pêk dihat. Balafirên şer ên Îraqê li gundan, li navendên mezin ên bajaran, li sivîlên bêparastin û destvala yên li paş cepheyê xist. Ji sed hezarî zêdetir mirov reviyan û sînor derbas kirin...[123] Di dawiya meha Avrêlê de (1974) General Barzanî ji Şahê Îranê xwest ku penaberên Kurd qebûl bike. Di dawiya Rezbera 1974'an de 110 hezar penaberên Îraqî li qampên pênaberiyê yên li Îranê hatin bicihkirin.[124]

Digel şerê giran General Mustafa Barzanî bi xurtî têkoşîna xwe didomand. Barzanî di berxwedana 1974'an de ji Kurdên li her aliyê Îraqê, ji rewşenbîran, ji xwendekarên ku li Kurdistana Îraqê dixwendin, ji gel û rewşenbîr û xwendekarên dewletên din piştgiriyeke mezin distend.* Lê serkeftin

[122] http://Kurdtime.blogspot.com
[123] Kerim Yıldız, bnb., r. 54
[124] Chris Kutschera, bnb., r. 358
**Yek ji bîranînên min ên dema ku min li Erziromê dibistana mamostehiyê dixwend(1973-78) li ser General Mustafa Barzanî ye. Di betlaneyan de dema ku ez vedigeriyam Nisêbînê li ser têkoşîna Barzanî û bi taybetî jî li ser nûçeyên ku radyoya Barzanî diweşand sohbet dihatin kirin. Xweş tê bîra min, dema li Îraqê Leyla Qasim hat daliqandin ez pir pê êşiyabûm û min gotibû ez ê herim têkevim şûna wê... Lê dema ku ez vedigeriyam dibistanê, yanî Erziromê her tiştê ku bi Kurdan re pêwendîdar bûn, dicemidîn. Li dibistanê zexteke wisa hebû ku dev ji parastina Kurdewariyê berdin, di nîqaşên çepgir û rastgiriyê de jî navê Kurdan nedihat gotin. Lê min ji roja ewil de gotibû ku ez Kurd im û di dibis-*

nehat bidestxistin. Xelkê mal û milk û canê xwe da, xwendekaran dev ji dibistanên xwe berdan, rewşenbîran dev ji kariyera xwe berdan. Bi kurtî netewa Kurd her cure fedakarî kir, lê lîstik mezin bû, lewre li hemberî wan ne tenê dewletek, gelek dewlet hebûn. Tevan dîsa li ser dewlemendiyên ax û erdên wan li hev kirin; heq, hiqûq, mirovahî careke din dan aliyekî û bi vî awayî ev gelê esîl dîsa bi tenê ma.

Di sala 1975'an de dema ku Kurd bi hêz bûn, bi navbeynkariya Amerîkayê Îraq û Îran li hev hatin. Bi peymana ku wek Peymana Cezayîrê tê zanîn, Îranê daxwazên xwe yên li ser sînor û li ser meseleyên avê bidest dixist. Ji bilî vê Îraqê, dev ji daxwaza xwe ya li ser herêma Kuzistanê ku ji hêla neftê ve gelekî dewlemend bû, berda. Di miqabilî vê de Îranê jî alîkariya ku dida Kurdan qut kir. Wek ku vekirî tê xuyakirin, heta Îraqê tawîz nedan Îranê û piştgiriya Îranê ya ji bo Kurdan qut nekir nikaribû li hemberî Kurdan bi ser bikeve.

Di Peymana Cezayîrê ya 6'ê Adara 1975'an de çi qewimîbû, gelê Kurd nizanibû. Barzanî di meha Sibatê de çûbû Tehranê û ji rayedaran xebera ku ew ê ji bo Kurdan peymaneke 'bixêr' bê îmzekirin, stendibû. Li ser vê, hêzên Kurdan wisa hêvî dikirin ku bi navbeynkariya şah di navbera General Barzanî û Bexdayê de wê peymanek çêbibe. Ji ber vê jî, di demên pêşî de wan wateya Peymana Cezayîrê fêm nekir. Lê piştî peymanê bi rojekê Îraq bi hêzeke mezin û bi biryarî êrîş anî ser Kurdan û vê yekê jî nîşan dida ku Îranê dev ji alîkariya Kurdan berdaye. Mustafa Barzanî jî di 5'ê Adarê de wê ji serbazekî saziya veşartî ya Îranê ev peyam bigirta: "Sînor ji her awayê derbasbûnê re girtî ye. Êdî lazim e hûn li benda alîkariya Îranê nemînin û pêşmerge encex wek komên biçûk dikarin derbasî hêla Îranê bibin. Ji bo vê jî lazim e çekên xwe teslîmî Îranê bikin." Belê, dîsa xayîntiyeke mezin bi Kurdan re hatibû kirin.

---

*tanê de bûbûm yek ji wan çend keçên ku wek keçên Kurd dihatin naskirin. Li dibistana me nobedariya îdareyê hebû. Her roj du xwendekar dibûn nobedar û wezîfeyên ku dihatin dayîn bi cih dianîn. Yek ji wan wezîfeyan jî dana çayê ya mamosteyan bû. Rojekê ji bo dana çayê li odeya mamosteyan bûm. Mamosteyeke min gazî min kir û xwest bi min re bipeyive. Mamosteya min a jin ku mamosteya zimanê Tirkî bû li ser kursiyê rûniştibû û wisa diaxivî, ez jî wek xwendekareke dilsaf û şermîn li ser piyan rawestiyabûm û min guh dida gotinên wê. Mamoste ji min re qala Mustafa Barzanî kir. Ji min re got ku, kiryarên Barzanî eşqiyatî ne û ji min pirsî bê ka ez li ser wî çi difikirim. Min jî bi wêrekiyeke zarokane ji mamosteya xwe re gotibû ku Mustafa Barzanî lehengê gelê xwe ye û ew mafên gelê xwe dixwaze. Mamosteyekî min ê din jî ku min zanibû çepgir e, ji ber vê axaftina min a hişkere paşê ez pîroz kirim. Niha tê derdixim ku, wê demê zanîna min a li ser Mustafa Barzanî û tevgera wî gelek kêm bû. Lê ez nizanim çima mamosteya min zarokeke weke min mixatab girt û li dereke mîna Erziromê ku ji Barzanî gelekî dûr bû, ji min re wisa got. Belkî bi vî awayî dixwest hîn bibe bê ka zarokeke Kurdan a li Tirkiyeyê çawa nêzikî vê mijarê dibe. Belkî jî bi vê axaftina xwe, xwest xwe tatmîn bike yan jî xwest tiştina ji min re bêje, nizanim. Lê li gor ku bi min re nexeyidî xuya ye li zarotiya min negirtiye.*

Paşê li gor Peymana Cezayîrê rayedarên dewletên Îran, Îraq û Cezayîrê di roja 15'ê Adara 1975'an de hatine ba hev, piştî hevdîtina 48 saetan li ser bicihanîna Peymana Cezayîrê li hev hatine. Li gor vê, sê komîsyon hatine avakirin û biryar hatiye stendin ku li her du aliyên sînor nêzîkî 50 serbazên Cezayîrî werin bicihkirin.[125]

Piştî ku bi Peymana Cezayîrê şah alîkariya xwe ji Kurdan qut kir, rêvebeŕiya Bexdayê piştrast bûbû û hem di hewayê re hem jî di bejahiyê re bi hêzeke mezin dest bi êrîşê kir: Bi 300 tanq, 12 tabûrên Howîtzer, tabûreke Panhard a bi tifingên otomatîk ên makîneyî, bi artêşa bejahiyê ya ku ji deh hezaran leşker pêk dihat û bi hêzên hewayî ve.

Kesên ku ji mirinê filitîn ber bi sînoran ve kişiyan. Di hin deveran de destûra derbasbûna sînor derneket û bi hezaran kes man li rastê, bûn hedefa artêşê. Artêşa Îraqê heta demeke dirêj karê xwe yê komkujiyê domand. Sînorê Tirkiye, Sûriye û Îranê hat girtin û bi vî şiklî Kurdistan xistin nav ablûqayê. Di sînorên ku nêzîkî hezar kîlometreyî bûn, bi firehiya navbera pênc û sih kîlometreyan 'xeta ewlehiyê' hat danîn. Ji bo danîna vê xetê hezar û pênsed (1500) gund hatin valakirin û hilweşandin. Şeşsed hezar (600.000) kes li qampan hatin komkirin û sirgûnkirin.[126]



*Ev çend Kurdên ku derbasî Hekariyê bûbûn ji aliyê Tirkiyeyê ve teslîmî Îraqê tên kirin û gule li wan tên reşandin(1975)*[127]

Nirxandina Martin Van Bruinessen ya vê serdemê wiha ye: "... Di dawiyê de hikumeta Îraqê, ji bo herêmeke ku Kurdan di 1974'an de dixwest biçûktir, otonomî da Kurdan û hikûmeta vê derê jî wê ji aliyê Bexdayê ve bihata

[125] Chris Kutschera, bnb., r. 383
[126] Kerim Yıldız, bnb., r. 109
[127] Enver Özkahraman, www.yuksekovahaber.com

hilbijartin. Barzaniyê ku qadeke mezin di bin kontrola wî de bû, ev yek qebûl nekir. Barzanî hêza xwe ya mezin ku bi deh hezaran Kurdên ji bajarên mezin beşdarî wî bûbûn, heta salekê parast û hindik mabû bibûya dewlet. Sedam ji bo ku xwe ji vî halî xelas bike, li Cezayîrê di Adara 1975'an de bi şah re dest bi danûstandinan kir û di mijarên sînoran de tawîz dan. Bi vî awayî alîkariya şah ji Kurdan qut kir. Kurdên ku ketin rewşeke xirab têk çûn, nêzîkî sed hezar kesî reviya çû Îranê, yên man jî ketin destê hêzên Îraqê. Ji bo ku di demên bê de bûyerên wisa neqewimin, li berahiyeke 10-15 kîlometre ya ser sînoran çiqas gund hebin hatin şewitandin, xelk li qampan an jî li gundên stratejîk ku ji hêla artêşê ve bi hêsanî dihatin kontrolkirin, hatin bicihkirin. Hin gundiyan li ber xwe da, ji nû ve derketin serê çiyayan û çalakiyên xwe domandin(1976)."[128]

Kurdistana ku bê parastin mabû, tevî gelê xwe û xwezaya xwe êdî bûbû hedefa êrîşên dewleta Îraqê. Gund û bajarok yek bi yek dihatin hilweşandin; rez û baxçe dihatin şewitandin. Bi sed hezaran Kurdên ku li Îraqê mabûn ji cih û warên xwe dihatin bidûrxistin, li deverên Ereban, li çolên germ ên başûr dihatin bicihkirin.

Piraniya Kurdên ku derbasî Îranê bûbûn jin, zarok, kal û pîr bûn û hejmara wan digihîşt 250 hezarî. Di vê trajediya mirovahiyê de gelek alozî û tevlihevî qewimîn, gelek kes ji rastiyan dûr ketin. Gelek kesan dema zikê xwe têr bikirina, qorzîyeke ku lê bimana hebûya wê şikiriya xwe bianiyana. Hinekan ji wan wê îxaneta şah ji bîr bikira û ji ber ku derfeta jiyanê ya li Îranê daye wan, wê xwe minetarê şah bidîtina. Yekî ji gundên li ser sînorê Îranê di Sibata 1975'an de wiha gotibû: "Ji ber alîkariya şah a ji bo penaberên Îraqî em hemû kirinên şah efû dikin."

Li hêla din li Îraqê girtin, îşkence û kuştinan dewam dikir. Li gor ku Rêxistina Efûya Navnetewî di sala 1976'an de tomar kiriye bi mahneya ku bi PDK'ê re pêwendiyên wan hene, 60 hezar zilam hatine girtin. Halbûkî rizgariyê çiqasî nêzik xuya dikir. Chris Kutschera diyar dike ku, Kurdan di dema tevgera General Berzanî de, ji deh salan zêdetir xwe bi xwe xwe îdare kirine û ev yek di bin êrîşên artêşeke ku her çûye zêdetir xeternak bûye pêk hatiye. Kutschera, vê destkeftinê ji yên dema avakirina Dewleta Kurdan a Mehabadê girîngtir dibîne.[129] Her wisa dibêje ku, Barzanî li ser herêmeke ku firehiya wê digihîşt 35 hezar kîlometre çarçik desthilatdariya xwe daniye û ev, piştî mîrnîşîna Mîr Bedîrxan dewleta herî mezin a Kurdan e. Lê mixabin Barzanî yê

[128] Martin van Bruinessen, Kürdistan Üzerine Yazılar, r. 192
[129] Chris Kutschera, bnb., r. 410

ku jiyana wî bi têkoşîna azadiyê derbas bû, xwedî artêşeke ku di nav hêzên leşkerî yên Rojhilata Navîn de xwedî cihekî girîng bû û bi serokdewlet û rayedarên payebilind ên dewletên din re gelek hevdîtin kiribûn; wê mecbûr bima ku xwe bispêre Îrana ku pê re xayîn ketibû. Di sala 1979'an de jî, li Amerîkayê ku ji bo nexweşiya xwe çûbû, wê bi hesreta Kurdistana ku di hemû jiyana xwe de ji bo wê şer kiribû biçûya ber dilovaniya xwe.

Piştî vê têkçûna mezin, li Îraqê pêvajoyeke nû dest pê dike. Di nav PDK'ê de veqetîn çêdibin û mîna ku gelek caran dibe, Kurdan di nav wê naçariyê de kerbên xwe di serê hev re derdixin. Şerê ku di navbera Celal Talabanî yê ku YNK damezirandibû û PDK'ê de dest pê kir, wê heta salên 1990'î bidomiya. Bi vî awayî Kurdên Îraqê ku bûbûn du beş, wê hem bi hevdu re, hem jî bi hêzên dewletê re şer bikirina û windahiyên mezin bidana. Bi taybetî di dema ku Sedam di sala 1979'an de dest danî ser hukim û pê de, wê Kurd rastî qirkirinên wilo bihatina ku mirov nikare wê terîf bike.

Di dema tevgera General Mustafa Barzanî de ku heta sala 1975'an dom kir, li Îraqê çendîn cara derbeyên leşkerî qewimîbûn û rejîmên cuda hatibûn ser hukim. Li Tirkiyeyê jî mîna ku di vegotinên pêwendîdar de hatiye gotin, di sala 1960'î de derbeyeke leşkerî çêbû û her ji deh salan carekê wê dîsa derbeyek din çêbibûya. Bi kurtî li her çar dewletên ku tê de Kurd dijîn di sedsala 20'an de gelek pirsgirêkên siyasî çêdibin û pir caran derbeyên leşkerî dibin. Bêguman bandora pirsgirêka Kurdan li ser vê yekê zêde ye. Mîna ku di vegotinên navborî de jî tê xuyakirin, di guhertina rejîmê ya sala 1958'an a li Îraqê de rola Barzanî pir girîng e. Piştî serkeftinên Barzanî yên wê demê li Tirkiyeyê di sala 1960'î de derbe diqewime. Piştî bi salan, di 1970'î de dema ku Barzanî û Îraq li hev hatin û otonomî hat ragihandin, di sala 1971'ê de li Tirkiyeyê dîsa derbeyeke leşkerî qewimî. Di sala 1978'an de di guhertina rejîma Îranê de ango di hilweşîna rejîma şah û avabûna desthilatdariya Humeynî de jî Kurd çalak bûn. Di sala 1980'î de dema ku li Îranê şerê gerîla bi pêş ketibû û otonomiya Kurdan di rojevê de bû, li Tirkiyeyê di 12'ê Îlona 1980'yî de wê derbeyeke din a leşkerî biqewimiya. Ev bûyer çend mînakên diyar ên qeyranên siyasî ne ku Kurd bûne faktora sereke.

Di vê navberê de divê em li ser mijareke din jî bisekinin. Kurdan li her çar dewletan di desthilatdarbûna hin muxalefetan de rola sereke lîstiye. Lewre hin hêzên muxalîf bi sozan hêvî dane Kurdan, wan jî piştgiriya wan kiriye. Di hin hilbijartinan de jî, potansiyela Kurdan li hemberî desthilatdariya bizext derketiye. Wek mînak li Tirkiyê ji 55 axayên ku di sala 1960'î de hatin sirgûnkirin, 54 kes jê endamê Partiya Demokrat bûn. Gelek Kurdên ku berê bi

qirkirinê re rû bi rû mabûn, destek dabûn Partiya Demokrat. Her wisa mîna ku berê jî hat gotin, li Îranê Kurd ji bo ku bibin desthilatdar bûne alîkarê Musaddik û Humeynî. Li Îraq û Sûriyê jî bûyerên wisa qewimîne. Lê mixabin wan muxalefetên ku ji bo Kurdan bûne hêvî, dema ku bûne desthilatdar ji bo Kurdan tiştekî erênî nekirine. Kîjan cure raman bûbe desthilatdar, di dema muxalefetê de ji aliyê Kurdan ve çi parastibin, gotinên xwe ji bîr kirine, dev ji sozên xwe berdane û heta hin ji wan jî di derheqê Kurdan de ji desthilatdarên berê xedartir bûne. Çimkî ev sîstemên ku li ser îmha û înkara Kurdan hatine sazkirin, bi demê re bingeheke wisan pêk anîn ku kesên çareserî dixwestin jî di wexteke kin de difetisîn. Bi kurtî di sedsala 20'an de potansiyela Kurdan ku ji bo nûbûn û guherînê hêzeke çalak bû, nehat bikaranîn. Ji ber vê jî ne partiyan, ne jî dewletan nikaribûn guhertinên girîng bikin.

Heger em vegerin ser pêvajoyê, ji sala 1961'ê heta sala 1975'an ku Barzanî li Îraqê têdikoşiya li Tirkiye, Sûriye û Îranê têkoşîna netewî ya Kurdan lawaz e. Bi giştî piştgiriya tevgera Barzanî dikirin. Barzanî ji bo hemû Kurdan lehengê netewî bû. Bi taybetî weşanên radyoya Kurdên Îraqê li her çar aliyên Kurdistanê bi baldarî dihat guhdarkirin. Di heman demê de bi vî şiklî bûyerên ku li Îraqê diqewimîn, dihatin şopandin.

Di van salan de komên Kurd ên li Tirkiyeyê bêhtir di nav tevgera sosyalîst a Tirkiyeyê de cih digirtin. Tevger, rêxistin û kesên Kurd ên ku bi sosyalîstên Tirk re tevdigeriyan, tenê mafên bingehîn ên demokratîk dixwestin. Daxwazên ku wê zor bidana bingeha sîstemê yan jî daxwazên mîna dewletên otonom an jî serbixwe dernediketin pêş. Di vê serdemê de pirsgirêk, ne bi navê 'pirsgirêka Kurdan' wek 'pirsgirêka Anatolyaya Rojhilat û Anatolyaya Başûrêrojhilat' dihat binavkirin. Digel vê jî dewlet pir hişk bû. Bi derbeya 1971'ê dîsa civak ket bin zordariyê. Hîn şewata derbeyekê hênik nebûye, yeke din bi ser de tê. Ev zext û têkçûna tevgera Barzanî ya li Îraqê bû sebeba ku Kurd li hin riyên din bigerin û biryarên hîn radîkal bistînin.

Di nîveka duyem a salên 1970'yî de li tevahiya Tirkiyeyê, di nav ciwanên xwendekar de xebatên îlegal dest pê kir. Di heman demê de ji hev veqetîn û pevçûnan jî dest pê kir. Hema hema ku çend ciwan bihatina ba hev, di cih de gotinên wan ber bi hev ve diçûn û pevçûnên mezin çêdibûn. Di vê demê de di nav tevgera Kurdan de ji hev veqetînên îdeolojîk, civakî û siyasî çêbûn. Di rêbendana 1975'an de Partiya Sosyalîst a Kurdistanê hat damezirandin. Di sala 1976'an de rêxistina KAWA hat damezirandin. Baskê çep ê PDK-T di 1'ê Gulana 1978'an de veqetiya û bi navê Rizgarvanên Netewî yên

Kurdistanê (Kürdistan Ulusal Kurtuluşçuları-KUK) rêxistineke nû damezirandin. Bi kongreya ku di 27'ê Sermaweza 1978'an de li gundê Fîsê yê Amedê kom bû, Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) hat damezirandin. Bi kurtî di dawiya salên 1970'yî de gelek rêxistinên çepgir ên Kurd hebûn û îcar bêhtir daxwaza dewleteke serbixwe dihat kirin. PKK ku heta îro têkoşîna xwe didomîne bi armanca damezirandina 'Kurdistaneke serbixwe, yekbûyî û sosyalîst' hatibû damezirandin.

Li her derê Rojhilata Navîn tevliheviyê dewam dikir. Dîktatoriya şah di sala 1978'an de gihîşt asta herî bilind. Kurdistan ji herêmên din ên Îranê bêhtir bû herêmeke leşkerî. Artêş, polês û bi taybetî jî SAVAK bi rayeya fireh tevdigeriya. Xelk bi her awayî êdî di bin çavan de ye: Gundiyekî Kurd dema ku biçûya gundekî din, hewce bû ku muxtarê (keyayê) her du gundan agahdar bikira, muxtar jî mecbûr bûn ku vê agahiyê bidin polêsan. Piştî ku Îran û Îraq li Cezayîrê di sala 1975'an de li hev hatin û tevgera Barzanî têk çû, gelek Kurd li sînorê Îranê kom bûbûn. Vir jî tim di bin kontrolê de bû.

Êdî li tevahiya Îranê gel aciz bûbû û li rêyeke xelasiyê digeriya. Bi dû de li Îranê rejîmeke nû derket holê. Di dawiya sala 1978'an de rewş ne xweş û linavhevketî ye. Alîgirên Humeynî yê ku hatibû sirgûnkirin li her derê bûbûn serdest. Şah nema karibû vê pêvajoyê bisekinîne û di 16'ê Rêbendana 1979'an de Îran terikand. Di 1'ê Sibatê de Humeynî ji sirgûnê vegeriya Tehranê û ji hêla sê mîlyon kesî ve hat pêşwazîkirin. Bi vî awayî gelên Îranê bi hev re di sala 1979'an de şoreşek pêk dianîn. Çinku Humeynî gelek hêvî dabûn wan.

Kurdên Îranê, ji bo xistina şah bi gelên din ên Îranê re li hev kiribû û di refên pêşî de cih girtibû. Di vê navberê de li Sinê, Kirmanşan û Mehabadê xwenîşandanên ku bi hezaran kes tev lê bûbûn, hatin lidarxistin. Di Sibata 1979'an de hêzên polês û cendirmeyan di van bajar û bajarokan de dev ji qereqolan berdan. Fermandarên baregehên artêşê yên li Kurdistanê kontrol dan destê xelkê deverê.

Di nav du sê hefteyan de, li her dera Kurdistanê nûnerên ku gelek komên cihê yên siyasî temsîl dikirin, bi armanca avakirina platformeke siyasî ya ku dixwest demokrasî û otonomî were dayîn, ji budçeya dewletê ji Kurdan re bi awayekî wekhev pere were dayîn, li Mehabadê hatin ba hev. Vê platformê Îzedîn Huseynî ji bo ku bi desthilatdariya nû re danûstandinan bike, wek berdevk hilbijart.[130] PDK-Î û Komela, bi şaxên xwe yên cihkî, bi milîtanên xwe yên leşkerî, bi komîteyên xwe yên ku ji bo karên aborî şêwirmendî dikirin, bi perwerdehiyên siyasî di nav demeke kin de li Kurdistanê belav bûn.

[130] Martin van Bruinessen, bnb., r. 120

Çend roj piştî ku şoreş bi ser ket, hikumeta demkî ji Mehabadê re delegasyonek şand. Nûnerên rêxistinên Kurdan xwestin ku di nav dewleta federal a Îranê de hemû gelên Îranê mafê destnîşankirina çarenivîsa xwe bi dest bixin û her wisa ji bo Kurdan jî mafê otonomiyê were dayîn. Martin van Bruinessen tam jî di vê pêvajoyê de hatiye Kurdistanê û bûye şahid ku li gundan û bajaran her kes tenê li ser mijarekê, ango li ser mijara otonomiyê dipeyive.


Dr. Abdurehman Qasimlo ji bo wê demê wiha dibêje: "Valahiya ku ji ber hilweşîna monarşiyê pêk hatibû, ji hêla Kurdan ve bi lez hat dagirtin. Ji bo birêvebirina karên cihkî konseyên şoreşê hatin avakirin, milîsên gel bi cebilxaneyên ku hatibûn bidestxistin hatin biçekkirin. Jiyana çandî hat geşkirin û weşanên Kurdî ku ev sih sal bûn qedexe bûn, êdî dihatin dîtin. PDK dîsa xwe wek partiyeke legal nîşan da û ji bo rêveberên nû yên Îranê otonomiya fiîlî ya li Kurdistana Îranê qebûl bikin, dixebitî."[131]

Li gor axaftina Qasimlo ya ku em ê dûre behsa wê bikin, di dawiya havîna sala 1979'an de bi Humeynî re hevdîtinekê pêk tîne, lê Humeynî dibêje ku 'peyvên demokrasî û otonomî peyvên ku ji derve hatine', 'Em hemû, Îslam in, em birayê hev in' û bi vî şiklî otonomiya Kurdistanê qebûl nake. Di demeke kin de, di navbera muhafizên şoreşê û milîsên Kurd de şer dest pê dike. Humeynî bi fetwayekê, Kurd wek kafir bi nav kirine û ji bo şerê cîhadê gazî xelkê kiriye. Paşê artêş ji bo bidestxistina Kurdistana ku di dema şoreşê de ketibû destê Kurdan, di 17'ê Tebaxa 1979'a de êrîş biriye ser Kurdistanê. Heta 5'ê Rezberê hemû bajarên ku di destê Kurdan de bûn, ketin destê artêşê. Lê di Sermawezê de hêzên Kurdan hemû bajarên Kurdistanê ji wan stendin.

Şêx Îzedîn Huseynî daxwaznameyeke 8 xalî ku ji hêla PDK-Î û Komela hatibû îmzekirin, dabû hikumetê. Her wisa Kurdan di 1'ê Berfanbara 1979'an de dengdana destûra bingehîn boykot kir û rewşeke ne ewle derket pêş. Di nav meha Berfanbarê de ji bo nermkirina rewşê hikumeta Tehranê bernameyeke 14 xalî ragihand û ji bo hindikahiyên netewî otonomiyeke bisînor qebûl kir.

Di vê bernameyê de ku ji otonomiyeke rasteqîn gelekî dûr bû, gelek xalên ne diyar hebûn. Kurdan dixwest ku çar eyalet yek be, ev otonom be û bi vî awayî Kurdistan pêk bê. Ew çar eyalet ev bûn: Deverên Kurd ên Azerbaycana Rojava, Kurdistan, Kirmanşan, Îlam. Hikumetê ev pêşniyaz qebûl nedikir, heta dixwest eyaleta heyî ya bi navê Kurdistanê wek Mehabad û Sine bike du beş.

[131] Dr. Abdurrahman Qasimlo, İran Kürtleri, r. 97



*Meşeke li dijî hêzên Humeynî, salên 1979-1980'yî*[132]

Belê, li gelek bajarên Kurdan serîhildanê dîsa dest pê kir (14'ê Sibatê). Piştî demekê Ayetullah Teleganî hat serdana herêma Kurdistanê û soza otonomiyeke bisînor da (22'ê Adarê). Bi vî şiklî carna şer, carna jî hevdîtin çêdibûn. Li gor ku Sheri Laizer vediguhêze, Helga Graham ku di destpêka salên 1980'yî de xwestiye li ser Kurdistana Îranê hin dîmenan tomar bike, wiha dinivîse: "Ayetulah Xumeynî, di destpêkê de nêzikahiyeke germ nîşanî daxwazên pêşewayên Kurd ên der barê demokrasî û otonomiyê yên li Îranê dabû, lê piştî demeke kurt ji vê yekê bi paş ve gav avêtibû û Kurdan jî bi serhildanê bersiv dabû vê ferasetê. Gava min Kurdistana Îranê ziyaret dikir, di nîvê çiyayên bi heybet ên rojavayê Îranê de têkoşîneke tekûz a gerîla dom dikir. Armanca fîlmê me dikişand jî ev bû ku, ev şer bi çavê Kurdên Îranê yên ku ji hêla Dr. Abdurahman Qasimlo ku serokeşîrekî jîr û sofistîk bû, entelektûelekî bi perwerdehiya Parîsê bû (yê ku di demeke nêzik de li Viyanayê ji hêla Îraniyan ve hate kuştin) dihatin birêvebirin, bihata tomarkirin. Hikumeta Îraqê ku bi Îranê re ketibû şerekî bixwîn, bi dilxweşî destûr da koma me ya fîlmê ku di devera çiyayî, sext û vala ya sînorê her du welatan re derbasî Îranê bibe..."[133]

Graham, piştî ku heyraniya xwe ya li hemberî Kurdan û erdnîgariya wan vedibêje, wiha jî qala asta exlaqî ya tevgera Kurd dike: "Digel ku Humeynî li hemberî wan guleyên 'dom dom' (yên ku di bin çerm de diteqin) bi kar dianîn, çekdarên Qasimlo nedixwestin bi van guleyan şer bikin. -Çawa ku rejîma Sedam Huseyn îşkenceyên giran li hember Kurdên Îraqê dikir, lê Kurdên Îraqê ji bo agahiyên pir girîng jî îşkence li girtiyan nedikir.- Di hal û mercên Kurdan de ev asteke bilind a exlaqê ye."[134]

[132] Ji Arşîva Rohat Alakom
[133] Sheri Laizer, Ateş Altındaki Kürdistan, r. 9
[134] Sheri Laizer, bnb., r. 10




*Dr. Abdurahman Qasimlo (Meydana Çarçirayê-1974)*[135]

Ka em binêrin bê Martin van Bruinessen çawa qala wê serdemê dike: "... Piştî pevçûnên biçûk, hikumeta Îranê di meha Tebaxê de dest bi êrîşeke mezin dike. Bajar di demeke kin de tên bidestxistin, bi sedan kes tên kuştin. Bi hezaran Kurd dîsa derketin serê çiyayan û li wir dest bi şerê gerîla kirin. Ji ber pêşniyaza Ayetullah Humeynî rayedarên hikumetê û nûnerên Kurd civiyan, lê Kurdan pêşniyazên ku ji hêla hikumetê ve hatin kirin, kêm dîtin. Dema ku hevdîtinên xapînok dewam dikirin şerê gerîlatiyê berdewam dikir û hikumetê jî hin bajar bombe dikirin. Li gor agahiya ku sekreterê giştî yê rêxistina herî mezin a Kurdên Îranê PDK-Î Qasimlo daye, di Tebaxa 1980'yî de artêşa gerîla ya partiya wî bûye 7500 kes û dema ku hewce bikira jî partiyê karibû 45 hezar alîgirên çekdar bixista tevgerê. Di gera ewil a hilbijartina 14'ê Adara 1980'yî ya parlemanê de PDK-Î li gor dengên ku stendin, li Îranê bû duyemîn partiya mezin."[136]

Dema ku li Îranê hêzeke mezin a Kurdan derdiket holê, li Tirkiyeyê jî ciwan li ser piyan bûn. Piştî tevliheviyên gelekî mezin di 12'ê Îlona 1980'yî de careke din derbeyeke leşkerî çêbû. Her çiqas wê demê şerên xwendekaran û şerên komên rastgir û çepgir hebin jî, êdî her kes dizane ku ji bo derbe çêbibe, hêzên veşartî tevlihevî zêde kirine. Rewşa ku Kurdên li Îranê tê de bûn çiqasî li ser derbeya 12'ê Îlonê tesîr kir, nayê zanîn, lê mehek piştî wê pêvajoya ku Qasimlo qal kir, çêbûna derbeya leşkerî balkêş e. Di wê demê de bûyereke din a girîng heye ku pêwendiya van bûyeran nîşan dide. Di 22'yê Îlona

[135] www.rojiciwan.com
[136] Martin van Bruinessen, bnb., r. 286

1980'yî de bi mahneya nakokiyên li ser sînoran Îraqê êrîş bir ser Îranê. Kurdên li ser sînor li her du aliyan jî di nav qada şer de bûn. Di her du artêşan de jî Kurd hebûn. Di vê rewşa xirab de hêzên Kurd bi hevdu re şer dikirin. Ji hêla din ve jî Îraq û Îranê çekên kîmyewî bi kar dianîn. Bi vî awayî dîsa her çar aliyên Kurdan bi agir hatibû pêçan.

Beriya her tiştî bi vî şerî, tevgera Kurd a li Îranê xeniqî. Heta sala 1983'yan artêşa Îranê êrîş bir ser hêzên Kurdan (PDK-Î). Gerîlayên Kurd ên ku şer dikirin naçar man ku vekişin herêmên ser sînorên Îraqê. Artêşa Îranê sivîl û leşker cihê nedikir û bajarên Kurdistanê bombardiman dikirin. Piştî şerekî hundirîn ku heta çar salan kişand, di sala 1984'an de hemû deverên 'rizgarkirî' yên ku di destê pêşmergeyên Kurdên Îranî de bûn, ketin destê rêveberiya Tehranê.[137]

Dema ku têkoşîna Kurdan a li Îranê qels dibû, digel wendahiyên mezin ên şerê Îraq û Îranê, li Îraqê têkoşîna Kurdan bilind dibû û gelek deverên Kurdistana Îraqê hatibûn bidestxistin. Êdî rewşeke wisa derket pêş ku, ji ber îhtîmala avabûna dewleteke Kurdan xof bi Tirkiyeyê re çêbû, bi Îraqê re Peymana Ewlekarî û Hevkariya Sînoran îmze kir û paşê jî di 25'ê Gulana 1983'yan de artêşa Tirk cara ewil ket nav Kurdistana Başûr.

Li Tirkiyeyê bi nav şer tune ye, lê di rastiyê de heye. Derbeya leşkerî û bûyerên ku beriya wê derbeyê hebûn, mîna şer bûn. Martin van Bruinessen pêvajoya 12'ê Îlonê wiha dinirxîne: "Di dawiya salên 1970'yî de, li bajaran û wîlayetên Kurdan gelek rêxistin û partiyên îlegal ên Kurdan hebûn. Netewperwerî belav bûbû, daxwazên ku dihatin kirin pir radîkal bûn, hin rêxistinan qala Kurdistaneke serbixwe dikir. Ev pêşketina tevgera Kurd bûbû sebeba derbeya leşkerî ya sala 1980'yî û operasyonên mezin ên leşkerî yên li Kurdistana Bakur. Piraniya çalakvanên Kurd hatin kuştin, hin ji wan çûn derveyî welêt, bi deh hezaran jî hatin girtin. Artêşê ji bo têkbirina netewperweriya Kurdî û jiholêrakirina nasnameya Kurdî, dest bi êrîşeke fireh kiribû."[138]

Mîna ku gelek kesan daye xuyakirin, bi derbeya leşkerî qanûn hatin hilanîn. Piştre jî ji bo van helwestên derqanûnî, qanûnên nû hatin derxistin. Azîz Nesîn ji bo wan kiryarên ku ji 12'ê Îlona 1980'yî heta hilbijartina ewil qewimîbûn û ji bo qanûna kesên ku derbe kiribûn wek berpirsiyar nedidît gotibû ku, ev kirinên neaqilane ne, mînaka vê rewşê û nêrînê tune ye. Azîz Nesîn li ser vê mijarê wiha berdewam dike: "Serdema ku di dîroka me de herî zêde

[137] Rafet Ballı, bnb., r. 518

[138] Martin van Bruinessen, bnb., r. 198

îşkence hatine kirin, şerefa mirovan ji hêla dewletê ve hat binpêkirin, mafên mirovan hatine perçiqandin, dijminatiya li dijî rewşenbîran har bûye, serdema serokdewletî û serokkomariya Evren e. Li welatên din, di nav ên ku di nexweşxaneyên rehabîlîtasyonê de hatine tedawîkirin, hejmara herî zêde ew kesên ku ji hêla Dewleta Tirkiyê ve dihatin îşkencekirin in. Ji ber vê jî welatên medenî yên dinyayê mecbûr man ku, ji rêveberiya Tirkiyeyê daxwaz bike da dev ji kiryarên ne medenî berde, li gor peymanên ku Komara Tirkiyeyê îmze kiriye tevbigere, îşkence û darvekirinan rawestîne. Evren di televîzyon û radyoyan de wiha bersiva van daxwazan dida: 'Ewropayî dema ku dibêjin darve nekin, destê xwe dixin nav karên me yên navxweyî. Ma em qet ji wan re dibêjin, hûn çima darve nakin?' Gotineke din a Evren heye ku di vê mijarê de hatiye gotin û pir balkêş e: 'Ma em wan daneliqînin û xwedî bikin?'..."[139]

Azîn Nesîn derqanûnîbûna wan bûyeran wiha rave dike: "... Kesên ku ji ber kiryarên xwe yên ku heşt an jî deh sal berê dema ku şanzdeh, hevdeh salî bûn û ji ber ku kirinên wan wek sûc nehatiye qebûlkirin nehatine darizandin, vê demê hatine darizandin û bi cezayên hepiskirinê yên dirêj hatine cezakirin. Ev yek derî edaletê ye û wek ne berpirsiyar qebûlkirina kesên rêveber jî derî aqil, edalet û mantiqê ye."[140]

Belê, derbeya 12'ê Îlona 1980'yî şidet û kirinên dûrî aqilan bi xwe re anîn. Ciwan hatin kuştin, girtîgeha leşkerî ya Amedê bi kesên kal û ciwan tijî bû, girtî tev di îşkenceyan re hatin derbaskirin. Di vê demê de hemû rêxistinên li Tirkiyeyê hatin belavkirin. Lê li girtîgehan berxwedanên girîng qewimîn. Dûre Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ku karên xwe li derveyî Tirkiyeyê didomand, dest bi şerê gerîlatiyê kir û her roj xurtir bû.

Vedat Turkalî di berhema xwe ya bi navê "Özgürlük için Kürt Yazıları" (Ji bo Azadiyê Nivîsên Der Barê Kurdan de) ev dema hanê wiha şîrove kiriye: "Bi derbeya leşkerî êdî hişkere bû ku, sîstem bi riya dewletê şidet diafirand. Bi taybetî zext û îşkenceyên ku li Kurdan dihatin kirin gihîştibûn radeya herî bilind. Ji bo Kurdên ku di nav çepgirên Tirkan de bûn û hêvî û baweriya wan bi şerê legal nemabû, li hemberî sîstemê ji xeynî şerê çekdarî û piştgirî girtina ji hêza netewî ya gel, tu riyeke din nemabû. PKK bi vî awayî derket."[141]

Piştî ku gerîlayên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) di 15'ê Tebaxa 1984'an de li Dihê û Şemzînanê dest bi çalakiyên çekdarî kir, bi gotina Silêman Demîrel 29'emîn serhildana Kurdan dest pê dikir. Paşê ew polîtîkaya zext û girtin û tundî ku bi derbeya 1980'yî dest pê kiribû, zêdetir bû. Dîsa

[139] Aziz Nesin, Bulgaristan'da Türkler, Türkiye'de Kürtler, r. 213
[140] Aziz Nesin, bnb., r. 214
[141] Vedat Türkali, Özgürlük için Kürt Yazıları, r. 52

gund, bajarok, çiya û keviran ji vê şewatê para xwe stend.

Dema ku em bi awayekî giştî li vê pêvajoyê dinêrin, şerekî ku jê re 'şerê asta nizm' dihate gotin, bi dehan sal in didome û hîn jî bi çalakiyên mezin berdewam dike. Bi vî şerî bi deh hezaran kes hatin kuştin, bi deh hezaran kes hatin birîndarkirin, bi deh hezaran kes seqet man, bi deh hezaran kes hatin girtin, bi deh hezaran zarok bê bav man û pêrîşan bûn, gund hatin şewitandin û valakirin, bi koçberiyê li bajaran gelek pirsgirêk derketin, bi milyonan dolar ji bo mesrefên leşkerî hatin xerckirin... Digel ku xwedî çavkaniyên dewlemend e, welat paşde ma û hemwelatî tevde bêhizûr in.

Di heman demê de, di nav civakê de bingehên wisan çêbûn ku, ew ê hem pirsgirêkên rojane biafirînin, hem jî yên ku şopa wan bi salan bidome. Di serî de 'cerdevanên gundan' tê. Ev sîstema cerdevaniyê ku bira û bira dianîn hemberî hev û mînakeke Alayiyên Hamîdiyeyê bûn, di vê demê de hat avakirin. Vê sîstemê bi xwe re gelek pirsgirêk anîn. Cerdevanên ku hejmara wan nêzîkî 100 hezarî ye, zexteke cihê li derûdora xwe kir. Her wisa gundên ku cerdevanî qebûl nekirin, mecbûr man ku ji gundên xwe koç bikin. Ji ber vê jî, li bajarên ku koçber lê bi cih dibûn gelek pirsgirêk derketin, ji xwe ji bo koçberan jî pirsgirêkên mezin hene.

Ji hêla din ve jî gelek çete ava bûn, navê mirovên ku nêzîkî rêxistinên Kurdan bûn, hişyar bûn û di nav civakê de dihatin hezkirin wek lîste hat tomarkirin û her roj, li kolanan, li pêş çavên xelkê hatin kuştin. Bi vî awayî bi deh hezaran kuştinên kiryarê wan nediyar çêbûn.

Di vê demê de zext negihîştin armanca xwe, PKK di nav gel de bêhtir rûnişt û destek stend. Digel her tiştî serhildanê heta îro dewam kir û bû tevgera berxwedana Kurdan a herî dirêj. Di vê pêvajoyê de ne tenê Kurdên ku li parçeyên Kurdistanê ne, Kurdên ku li cîhanê belav bûne û heta ciwanên biyanî jî tev li gerîlayên PKK'ê bûn. Rêxistin, bi demê re bû xwedî piştgiriyeke girseyî. Alîkariyeke mezin a Kurdên li nav sînorên Sûriyeyê li vê tevger û bizavê bûye. Dîsa, Kurdên li Îranê ji dil û bi fedakarî alîgirê PKK'ê ne. Di serî de Urmiye, li gelek bajarên Îranê malên rêxistinê hatin vekirin. Hin gerîlayên nexweş û birîndar li Îranê hatine dermankirin. Îkmala çek û cebilxaneyan ji vir hatiye kirin. Li Îraqê ku şer û tevlihevî qet lê kêm nebûye, bingeheke xurt a PKK'ê çêbûye. PKK li Tirkiyê di salên 1990'î de giha astekê ku çalakiyên girseyî bi rê ve bibe. Paşê em ê li ser çalakiyên PKK'ê yên wê demê bisekinin.

Ji hêla din ve şerê Îran û Îraqê dewam dikir û tevgera Kurdan li Îraqê her ku diçû bi pêş diket. Di sala 1986'an de, rayedarên Tirk êdî li ser planên 'ku Kurdistan ava bibe dê mudaxeleyeke leşkerî ya çawa bê kirin' diaxivîn. Jixwe bi peymana 'şopandina germ' ku bi Îraqê re hatibû îmzekirin, Tirkiye gelek

caran operasyonên dersînor li dar dixe.

Di heman demê de, di şerê Îran û Îraqê de gelek windahiyên mezin tên dayîn. Di vî şerê ku heşt salan dom kir milyonek mirov mirin, bi milyonan mirov birîndar bûn û seqet man. Ji ber ku şer li cografyaya Kurdan pêk hat, windahiyên herî mezin jî Kurdan dan. Piştî ku di 20'ê Tîrmeha 1988'an de, di şerê Îran û Îraqê de bi awayekî fiîlî agirbest çêbû, Kurd bi jenosîdeke nû re rû bi rû man. Beriya ku em qetlîamên mezin, rewşa şerma mirovahiyê ya Îraqê bidin, em dêhna xwe bidin çend notên derbarê Îranê de.

Gelê Kurdistana Îranê digel ku ferqa hêzên wan pir bû, li hemberî rejîma Humeynî şer kirin û di vî şerî de bi deh hezaran kesên sivîl û bi hezaran pêşmerge hatin kuştin. Qasimlo di hevpeyvîneke ku di 9'ê Îlona 1988'an de hatibû kirin, li ser hevdîtina xwe ya di dema şoreşê de bi Humeynî re kiribû wiha digot: "Humeynî got ku, peyvên mîna 'demokrasî', 'otonomî' peyvên ku ji derve hatine. Wî got ku 'Em hemû Îslam in, em birayê hev in'. Lê paşê me dît ku wan Kurdistan di nav xwînê de hişt û bi vî şiklî me dît ka ew çawa misilman in û çawa bira ne. Heta niha, ji gelê me 45 hezar kes ji hêla Îranê ve hatiye qetilkirin û 4500 pêşmergeyên me jî şehîd bûne. Digel vê Îran negihîştiye armanca xwe. Em niha li hemû Kurdistanê, ji sînorên Tirkiyeyê heta Kirmanşanê hene..."[142]

Piştî xelasbûna şerê Îran û Îraqê, di navbera PDK-Î û hikumeta Îranê (Rafsancanî) de hevdîtinên bihêvî dest pê kirin. Lê di 13'ê Tîrmeha 1989'an de, li Viyanayê sekreterê giştî yê PDK-Î Abdurahman Qasimlo û du qasidên Kurd li ser maseya hevdîtinê hatin kuştin. Vê cinayetê kir ku PDK-Î di nav aloziyan de bimîne; Qasimlo rêveberekî wisa bû ku cihê wî nedihat dagirtin. Heman salê rêveberekî bilind ê Komalayê li Qibrisê bi destê Îraniyekî ku paşê hat fêmkirin mêrkujekî kirêkirî bûye, hat kuştin.[143]

Bi vî awayî dema bi sed hezaran Kurd li Îraqê dihatin kuştin û bi sed hezaran Kurd dihatin sirgûnkirin, tevgera Kurd a li Îranê jî derbeyeke giran dixwar. Li vir jî, bûyerên li dewletên cihê cihê çawa hevdu temam dikin û cepheya li hemberî Kurdan çawa bi hev re li ser kar in em dibînin. Lê mîna her tim, Kurdan dev ji têkoşîna xwe bernedaye. Yek ji rêveberên PDK-Î Hesen Şerîfî di hevpeyvîneke ku di Cotmeha 1989'an de hatiye kirin de wiha dibêje: "Ji herêmên bakur heta herêmên başûr ên Kurdistanê bi hezaran pêşmergeyên me hene. Rejîma Îranê bi sê hezar qereqol û 200 hezar leşker li Kurdistanê bi cih bûye. Lê digel vê, têkoşîna me dewam dike."


Heger em li Îraqê binêrin, di vê pêvajoyê de Sedam desthilatdar bû û

[142] Rafet Ballı, bnb., r. 529
[143] Martin van Bruinessen, bnb., r. 197

Kurd rastî jenosîdeke mezin hatin. Rejîma Baas ku Sedam serokatiya wê dikir, li ser bingeha netewkariya Ereban hatibû damezirandin û bi kiryarên nijadperest her roj zordariya xwe zêdetir dikir.

Hêzên çekdar ên Baasê, di bihar û havîna sala 1988'an de heşt caran li ser hev êrîş anîn ser Kurdistanê û navê Enfalê ku dihat wateya xenîmetên pîroz ên şer dabû van zincîra êrîşan. Di van êrîşan de çekên kîmyewî bi awayekî sîstematîk hatin bikaranîn û ji '180 hezar'î zêdetir mirov hatin kuştin.* Di demên dawî yên Sedam de, ango beriya ku were darvekirin, Sedam li ser van qetlîaman û 'Enfalê' hat darizandin. Dinyayê tevî bi zindî rûniştinên vê darizandinê temaşe kir û çapemeniya dinyayê bi berfirehî cih dayê. 'Enfal'a ku di dîrokê de wek rûpelên reş wê cihê xwe bigire, hîn jî di rojevê de ye. Di destpêka sala 2008'an de gorên komî yên mirovên ku di pêvajoya 'Enfalê' de hatibûn kuştin dihatin dîtin, termên wan li darbestan dihatin danîn û ji hêla Hikumeta Kurdistana Federe ve bi merasîmên fermî û şînê ji nû ve dihatin binaxkirin. Her wiha ji bo ku dewleta Îraqê bi awayekî fermî vê jenosîdê qebûl bike, hin hewl hatin dayîn.

Qetlîama Helepçeyê bi tena serê xwe îbretek mezin e. Dema ku şerê Îran û Îraqê didomiya Kurdistaniyên başûrî di 15'ê Adara 1988'an de Helepçe bi dest xistibûn. Di 16'ê Adara 1988'an de jî hêzên hewayî yên Îraqê bombeyên kîmyewî û napalmê avêtin bajarokên Helebçe, Duceyde, Înab, Xurmal û Sîrwa yên ku Kurd lê dijîn. Mirina ku bi bayê belav dibû, kesên di malan de jî berneda û benderuhek sax nehişt. Bi rojan di çapemeniya dinyayê de wêneyên mirovên ku li kolanan û li ber deriyên malan zarokên xwe hembezkirine



*Qetlîama Helepçeyê(Fot:Ramazan Öztürk)*

* *Ji bo agahiya berfirehtir mirov dikare li berhema bi navê 'Irak Kürtleri' ya Kerîm Yildiz binêre.*

û bê ruh li erdê dirêj bûne, nîşan didan.

Mîna ku berê jî hat gotin, di salên berê de jî firokeyên Îraqê bi bombeyên kîmyewî deverên Kurdan bombardiman kiribûn. Hovîtiya Sedam tenê bi qetlîama Helepçeyê nesekinî, bikaranîna çekên kîmyewî û bombeyên napalmê berdewam kir. Aliyek din jî yê vê bûyerê yê ku mirov diêşîne heye. Madeyên van çekên kîmyewî, ji welatên Ewropî yên ku bi salan xwe wek parêzvanên mafên mirovan bi nav dikin hatiye û veguhestina van madeyan li ser bendera Mêrsînê çêbûye.

Pêşmêrgeyan digot ku, wan zanibû ku dê Sedam êrîşê bîne ser wan, lê wan qet texmîn nekiriye ku Sedam piştî qetlîama Helepçeyê jî wê wêribe ku çekên kîmyewî bi kar bîne. Ji ber ku li hemberî qetlîama Helebçeyê ku qetlîama herî hov a sedsalê ye, tu reaksiyoneke berbiçav nehatiye nîşandan, qetlîamên nû pêk hatine.



*Qetlîama Helepçeyê (Fot:Ramazan Öztürk)*

Digel qetlîamê, di mehên Adar û Avrêla 1988'an de gelek gundiyên Kurd hatin girtin, di îşkenceyê re hatin derbaskirin û sirgûnî qampên taybet hatin kirin. Dema ku şerê Îran û Îraqê qediya û danûstandinên aştiyê dihatin kirin, tevgera jenosîdê dewam dikir. Di 27'ê Temûza 1988'an de agirbest hat ragihandin. Piştî agirbestê Îraqê beşeke mezin a hêzên xwe yên leşkerî ber bi bakur ve kişandin û dest bi êrîşeke bi tevahî kir.

Hedefa êrîşan wargehên sivîlan bûn û ev cih tev hatin hilweşandin. Li gor daxuyaniya berdevkekî PDK'ê, di 25'ê Tebaxê de li herêma Duhok, Zaxo û Amêdiyê di nav 6 saetan de 6 firokeyên Îraqê bombeyên kîmyewî bi ser pênc gundên Kurdan de dibarînin.[144]

Paşê yekîneyên leşkerî yên bi kincên ku ji xazên kîmyewî diparêzin, dikevin herêmê. Mîna li gundê Bartê, li hin deveran hêzên Îraqê bi tifingên makîneyî kesên ku sax mane kuştin û paşê jî termên wan bi buldozeran xistin çalên fireh û ser wan girtin.[145] Êrîşên bi çekên kîmyewî di rojên 27 û 28'ê Tebaxê de bi zêdebûn dewam kirin.

Gelê bêçare careke din ber bi sînoran ve kişiya; xaniyên xwe yên şewitî, zarokên xwe, hezkiriyên xwe, dost û evîndarên xwe li pey xwe hiştin. Hin ji xelkê ji ber tesîrên xazên kîmyewî, hinên din jî ji ber birçîtî û betilandinê bi rê de mirin.

Di vê rewşa xirab de, Kurdan kom bi kom sînorê Tirkiyeyê derbas dikirin û xwe dispartin gundan. Di rojên pêşî de xelkê kesên dihatin li mala xwe kirin mêvan. Gundiyan digot ku, em û penaber xwediyê hev in. Lê hêzên ewlekariyê penaber kom kirin û vegerandin Îraqê. Hin ji wan ji hêla leşkerên Îraqê ve, li ser sînor gule li wan hatin reşandin. Di heman demê de helîkopterên Îraqê li gor peymana şopandina germ, sînorên Tirkiyeyê derbas dikirin û hin gundên Kurdan û pêşmergeyan bombebaran dikirin. Di dawiyê de 20 hezar kes hatin kuştin, ew qas kes hatin birîndarkirin û zêdeyî 100.000 kesî jî bûbûn penaber.

Heger Kurd ne azad bûna jî, ku tenê di nav sînorên dewleteke de bûna her tişt wê cuda bûya. Bêguman ew dewlet wê bi awayekî din nêzîkî bûyeran bibûya, wê nirxandinên cuda çêbibûna. Sînorên ku di destpêka sedsala 20'an de bi biryarên xelet hatine xêzkirin, xirabiyeke mezin da jiyana Kurdan û tiştê nedîtî anî serê wan.

Her netew li ser axa xwe xurt e. Her kes kengî bixwaze dikare here hemû herêmên din ê welatê xwe. Lê van sînoran ev mafên herî xwezayî ji destên Kurdan stendine. Kurd digel ku welatê wan e, nikarin derbasî hêla din î sînor bibin, heger derbas bibin an dibin qaçax, an jî dibin penaber. Digel van, dema ku wan ji mecbûrî sînor derbas kirine û gihîştine parçeyekî din î welatê xwe, mafê ku ji bo hemû mirovan li dinyayê heye, mafê penaberiyê bi destê wan neketiye. Wek mînak, Kurdên ku ji Îraqê, ji şerekî man û nemanê reviyan û xwe spartin Tirkiyeyê, mafê penaberiyê bi dest wan neket. Bi vî awayî

[144] Sheri Laizer, bnb., r. 109
[145] Uluslararası Paris Kürt Konferansı/14-15 Ekim 1989, r. 111

dewletan bi van kiryarên xwe yên li hemberî Kurdan gelek peyman û têgihên navnetewî binpê kirine.

Tiştên ku di demên dawî de li Îraqê hatin serê Kurdan, qat bi qat ji buyerên ku di dîrokê de hatine serê wan, zêdetir in. Çiqas li dinyayê teknolojî bi pêş ket, Kurdên ji parastinê bêpar ew qas bedelên girantir dan. Ew neheqiyên ku ji bo hukimkirina axa Kurdan û ji bo bidestxistina dewlemendiya wan tê kirin, gelek zerarên mezin digihîne mirovahiyê. Lewre vegera wan, telafiya bûyerên ku diqewimin tune ye û tevde di dîrokê de cihê xwe distîne.

Îro li Ewropayê têgeha "netewdewlet"ê tê rexnekirin û sînor tên rakirin. Li bajarên Ewropayê mirov dikare rastî mirovên ji her neteweyê were û hurmet ji mafê hemûyan re heye. Lê ew, bi qasî ku hewce dike li dijî rewşa Kurdan ku ji ber sînorên wan bi xwe danîne û binpêkirina peymanên navnetewî derketiye holê, dernakevin. Heta carna ew bi awayekî hişkere alîkariya van bûyerên neheq dikin. Gelek pispor difikirin ku, di nav sebebê derketina van şeran de xwesteka firotina sîlehan ên fîrmayên mezin cihekî girîng digire. Ev şermeke mirovahiyêye.

Lê hin ji dêvla ku van bûyeran şermezar bikin, pê kêfxweş û serbilind bûne. Rafet Balli piştî koçberiya Kurdan a sala 1988'an wek rojnamegerekî li Bexdayê ye. Ballı wiha qala wan rojan dike: "...Dema ku em bi helîkopteran di ser gundên hilweşandî re difiriyan, serbazên Ereb ên Îraqî ev gund nîşanî me didan û digotin 'lê binêre, lê binêre me çiqasî xweşik hilweşandiye'. Yanî nizanibûn ku ev ji bo wan şermek e. Mirov tiştên wisa vedişêre. Lê wan nîşanî min dida û digotin 'binêre'. Tirkiye di vê mijarê de hinekî cihê ye."[146]

Dema ku bombe bi ser Kurdan de dibariyan, li dewleteke nêzîkî wan bayekî nuh ê azadiyê dihat. Glastnost û Perestroyka di sala 1985'an de bi desthilatdariya Gorbaçov dest pê kir û vê pêvajoya reforman heta şeş salan dom kir. Di sala 1991'ê de Yekîtiya Sovyetan bi awayekî fermî belav bû, hemû welatên di nav vê yekîtiyê de serxwebûna xwe îlan kirin û 15 dewletên nû pêk hatin.

Di wan rojan de li Sovyetan xebata hin Kurdan jî hebû. Di 20'ê Gulana 1989'an de Kurdan li Moskovayê li Qada Pûşkînê xwepêşandanek li dar xist. Wan xwest ku rewşa Kurdên ku di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de hatibûn sirgûnkirin baştir bibe û mafên çandî bidin wan. Di heman rojan de heyeteke Kurd bi Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetan re civiya. Heyetê xwest ku 'ziman, çand û nasnameya netewî' were parastin û herêma Laçînê ji nû ve statûya xwe ya berê bi dest bixe.

[146] Rafet Ballı, bnb., r. 426

Nadîrov di hevpeyvîneke Adara 1991'ê de, li ser wê pêvajoyê wiha dibêje: "...Pêşketina herî girîng, biryara di Îlona 1989'an de ya Parlamena Sovyetê bû. Li gor vê biryarê miletên ku hatibûn sirgûnkirin wê bi serbestî vegeriyana welatên xwe û mal û milkên wan ên berê wê li wan bihata vegerandin. Ev heta niha nehatine bicihanîn... Çawa ku min berê jî gotibû, Kurd berê li Laçîn û Nahçiwanê dijiyan. Li wê herêmê di dema Lenîn de, di sala 1923'yan de Kurdistana Sovyet hatibû damezirandin û vê Sovyetê heta sala 1929'an dom kir. Kurd dixwazin vegerin wê herêmê. Ji bo ku zû ev biryar were bicihanîn, me li Moskowê xwepêşandan li dar xistin û me bi rayedaran re danûstandin saz kirin. Wan ji me re got ku, 'niha rewşa Ermenistan û Azerbaycanê pir nazik e' û ji me xwestin ku em hinekî bisekinin... Di vê navberê de, me li Moskowê di Îlona 1990'î de bi navê 'Kurdên Sovyetê, Dîroka Wan û Rewşa Wan a Îro' konferansek li dar xist. Gelek kes ji derên mîna Parîs, Swêd, Avusturya tev li konferansa me bûn... Di dawiya vê konferansê de me ji Gorbaçov re memorandumek şand û me tê de got ku, rewşa Kurdan ne baş e, lazim e biryarên ku hatine stendin zû werin bicihanîn, lazim e mafên Kurdan di cih de werin dayîn..."[147]

Di Nîsana 1991'ê de hikumeta Azerbaycana Sovyet biryar da ku li dibistanên gund û bajarokên ku Kurd lê dijîn dersên Kurdî werin xwendin. Her wisa biryar hat stendin ku li Navenda Şaristaniyê ya li Bakuyê 'Beşa Kurdî' were vekirin.[148] Paşê di 18'ê Hezîrana 1991'ê de nûnerê komîteya Yekbûna Kurdan li Moskowê xwest ku herêma otonom a Kurdan a di navbera salên 1923 û 1929'an de hebû, ji nû ve were danîn.

Bi belavbûna Yekîtiya Sovyetan re rewşa dinyayê guherî; Sovyet bêyî ku xwîn were rijandin, belav bû, gelek xelkan azadiya xwe bi dest xistin, lê bombeyên ku li Kurdistanê bi ser Kurdan de dibariyan, her wê berdewam bikirina.

Qetlîama Helepçeyê û qetlîamên ku di pey re hatin kirin, koçberî û zext bi giştî di nav Kurdan de bûn sebeba nerihetiyeke mezin. Di vê demê de PKK gelekî bi hêz bû. Di salên 1990'î de bi deh hezaran gerîlayên PKK'ê hebûn û PKK'ê karibû di bajar û navçeyan de çalakiyên girseyî bi rê ve bibe.

Di salên 1990'î de li bajarên Amed, Şirnex, Mêrdîn, Nisêbîn, Qoser, Silopî, Misirc û Cizîrê serhildanan dest pê kir. Di Newrozê de li Nisêbîn û Cizîrê gel tevde radibû ser piyan, bi hêzên dewletê re pevdiçû û di van bûyeran de gelek kes dihatin kuştin. Di Newroza sala 1992'yan de tenê li Nisêbînê 17 mirov di bin panzera eskeriyê de can dan.

---

[147] Rafet Ballı, bnb., r. 584
[148] Rafet Ballı, bnb., r. 577

Rewş pir hesas bû. Ji aliyekî ve gel li ser lingan bû. Li aliyê din dîsa dihat gotin ku wê derbeyeke leşkerî çêbibe. Bi kurtî dewlet ditirsiya. Ji ber bûyerên ku qewimîn parlamentoya Tirkiyeyê heyeteke ku ji şeş kesên ji partiyên cihê pêk dihat şand herêmê. Heyeta parlamentoyê bi helîkopteran li herêmê geriya. Waliyê Herêma Rewşa Awarte Hayri Kozakçıoglu, kasetên vîdeoyê yên van bûyeran nîşanî wan da. Heyeta parlamentoyê bi rêveberên leşkerî, sivîl û herêmî re hevdîtin pêk anîn.[149]

Rewşa ku hebû heyet gelekî tirsandibû. Piştî ku heyet vegeriya Enqerê, bi serokwezîr Akbulut û serokên partiyan re hevdîtin pêk anîn. Paşê ji bo hevdîtinê çûn cem serokkomar Turgut Ozal. Di civînê de heyetê ragihand ku ew bi fikar in, talûkeya guherîna sînorên dewletê hene û li hemberî vê jî lazim e her kes û her sazî li ser polîtîkayeke ku bi destê parlamentoyê were danîn bibe yek. Beşeke axaftinê wiha ye: "...Yekîtiya welat û netewê di talûkê de ye. Xala yekem a rojevê ev e. Heta ku parlamento ji bo vê çareseriyekê nebîne, hewce ye li ser tiştekî din neyê axaftin.

Divê hiş û baldariya hemû welêt li ser vê mijara neteweyî be. Heger li parlamentoyê tedbîrên qanûnî neyên stendin, li ser van tedbîran lihevhatineke netewî pêk neyê û pêşewa di vê mijarê de tevnegerin, em ê li gor sonda xwe ya li ser yekîtiya vî welatî, di nav 30 rojan de ji parlamentoyê îstîfa bikin. Heger di nav sih rojan de ev neyên kirin em ê ragihînin ku serokên partiyan û serokkomar ku me bi wan re hevdîtin pêk anîn, rastiya bûyeran vedişêrin û ew ê ji mezinbûna bûyeran berpirsiyar bin."[150]

Faîk Bulut di berhema xwe ya bi navê "Türk Basınında Kürtler (Di Çapemeniya Tirkan de Kurd)" de dibêje, digel ku di navbera wan de problem hebûn, Ozal bi serokên partiyan re 'civîna bilind' pêk anî. Her wisa nîşan dide ku, ji bo asêkirina têkoşîna Kurdan ku her diçû bi pêş diket, çapemenî jî bi pêkanîna Biryarnameya Sansur û Sirgûnê ya di Avrêla 1990'î de hat ragihandin, li gel dewletê û li gor dewletê tevgeriyaye. Hin vegotinên pêwendîdar wihan in: "Di vê navberê de 27 rojnamegerên ku ji rêveberên weşana giştî, gerînendeyên giştî û xwediyên rojname û ajansên çapemeniyê yên li Tirkiyeyê pêk hatibûn, tev li Civîna Çankayayê bûn. Serokkomar Ozal serokatiya vê civînê dikir û gelek generalên Desteya Ewlekariya Netewî ku bi awayekî qanûnî yan jî neqanûnî siyaseta Tirkiyeyê pêk dianî tê de cih girtibûn. Di wê navberê de Metîn Munîr, ji kovara Tempoyê re ku kovareke heftane û xeta wê lîberalîzmeke rastgir bû, wiha gotibû: 'Di civîna ku birêz

[149] M. Sadi Koçaş, Kürtlerin Kökeni ve Güneydoğu Anadolu Gerçeği, r. 296
[150] M. Sadi Koçaş, bnb, r. 298

Serokkomar Ozal li Çankayayê li dar xistibû, ji mêvanan re qala bûyerên ku li Rojhilatê diqewimîn hat kirin û hin daxwaz ji me hatin kirin. Ev daxwaz ji hêla me ve hat qebûlkirin, ev helwesta me ya hevpar bû.' Metîn Munîr bi eslê xwe Tirk bû û ji Îngîltereyê ji bo rêveberiya weşana giştî ya rojnameya Guneşê ku xwediyê wê karsazê biguman ê hemwelatiyê Qibrisê Asîl Nadîr bû, hatibû tayînkirin.[151] Metîn Munîr bi awayekî hişkere wiha dibêje: 'Têkoşîna çekdarî ku di sala 1984'an de ji hêla PKK'ê ve hatibû destpêkirin êdî ji hêla xelkê ve hatibû qebûlkirin û ev yek ji bo Dewleta Tirk bûbû talûke. Rayedarên Tirk ji çapemeniya netewî ya Tirk xwestin ku, ji ber mafên mirovan an jî rêbazên nûçegihaniyê jî be nûçeyên li ser têkoşîna PKK û Kurdan belav nekin, di warê binpêkirina mafên mirovan, qetlîam, zext û zilm û valakirina gundan a ji hêla dewletê ve bê deng bimînin. Me jî ev daxwaz qebûl kir û pêk anî.'..."[152]

Ji ber ku PKK bi hêz bû û xelkê piştgirî didayê, dewletê rêbazên cihê bi kar anîn. Li bajarên ku Kurd lê dijîn hêzên şîdetê yên ku wek Hîzbulah (an jî Hîzbîkontra) dihatin zanîn, hatin bikaranîn. Li herêmên Kurdan, bi taybetî piştî sala 1991'ê hejmara kuştinên kiryar nediyar zêde bûn. Kontrgerîla, hin kesên ku bi navê Îslamiyetê tevdigeriyan û bi taybetî jî hin îtirafkaran ev kuştinên kiryar nediyar kirin. Li herêma Wilayeta Rewşa Awarte rêveberên partî û rêxistinên girseyî, rojnameger, rewşenbîr, sendîkavan, kesên ku wek muxalif tên zanîn û mafên xwe daxwaz dikin, bi kurtî ji her pîşeyê mirov hatin qetilkirin. Wê demê ku mirov dikare bêje qirkirineke bi tevayî pêk hat, carna mirov ji hêla kesên ku xwe wek polês didan naskirin, ji mala xwe dihatin revandin û paşê jî termên wan dihat dîtin. Hin ji wan li nav kolanan gule bi ser wan de hatin barandin.

Di sala 1992'yan de li civîneke bixwarin ku bi rojnamegeran re hatibû kirin, musteşarê MİT'ê Korgeneral Teoman Koman (paşê dê bibûya orgeneral û fermandeyê cendirmeyan) li hember pirsa 'Hûn ji bo Hîzbulahê çi dikarin bibêjin?' wiha bersiv dabû: "Kîjan Hîzbulah? Li Îranê û bi piştgiriya wê jî li Lubnanê Hîzbulah heye. Her wisa welatiyên me yên wisa hene ku girêdayî ol û bawerî û welatê xwe ne û li hemberî PKK'ê têdikoşin..."[153]

Em vegerin aliyê Îraqê. Di sala 1990'î de li Îraqê pevçûnên nû û koçberiyeke nû diqewimî. Sedam ku êdî bê kontrol tevdigeriya, li aliyekî qetlîama Kurdan didomand, li aliyê din jî di 2'yê Tebaxa 1990'î de Kuweyt dagir kir. Ji bo dewletên mezin vê carê rewş cihê bû. Ji ber ku Îraqê Kuweyt dagir kiri-

[151] Kovara 2000'e Doğru, 15.04.1990
[152] Faik Bulut, bnb., r. 47
[153] Fehmi Koru, Yeni Şafak; Umur Talu, Milliyet hwd.

bû, Amerîkayê di 7'ê Rêbendana 1991'ê de li hember Îraqê dest bi şer kir. Di pêşengiya Amerîkayê de hêzên NATO'yê di reşahî, behr û hewayê re êrîş bir ser Îraqê. Di 22'yê Sibatê de Îraqê têkçûna xwe qebûl kir.

Kurdan di 2'yê Adara 1991'ê de dîsa dest bi serhildanê kir. Paşê jî li Başûrê Îraqê serhildana Şîayan dest pê kir. Di bîst rojan de Kurdan tevahiya Kurdistana Îraqê xist bin kontrola xwe. Êrîşa hov a Sedam jî hema li pey wê, bi bikaranîna amûrên şer ên bi teknolojiya dawî dest pê kir. Kurd di demeke kin de têk çûn. Di 31'ê Adara 1991'ê de têkçûnê dest pê kir û bi sed hezaran Kurd ji tirsa çekên kîmyewî yên Sedam, mala xwe terikandin û ber bi sînorên Tirkiye û Îranê ve reviyan. Berf, serma, herî, çiya, birçîtî, tirs... Digel van hemû tiştan leşkerên Tirkan rê nedida wan. Kal û pîr û jin û zarok bi rojan birçî û tî li çolan man û hikumeta Tirkiyeyê encex di 16'ê Nîsana 1991'ê de biryara vekirina sînor da. Di vê demê de 500 hezar Kurdî xwe spart Tirkiyeyê û bi qasî milyonekî jî xwe spartin Îranê. Nêzîkî 500 hezar Kurdî jî li deverên nêzîkî sînorên Tirkiye û Îranê man.



*Kurdên ji ber Sedam û çekên kîmyewî direviyan-Nîsan 1991*[154]

[154] Foto: Coşkun Aral-Sipa Press



*Jineke Kurd a koçber. Ew jî wek welatê xwe Kurdistan, bi hemû xweşikbûna xwe di halekî gelekî ne xweş de ye.*[155]

Dewletên li wî aliyê sînor ku Kurdan ji neçarî xwe lê girtibûn, Kurd wek potansiyeleke bi talûke didîtin. Ên ku xwe spartibûn Îranê heta radeyekê alîkariyên navnetewî stendin, lê qampên ku lê hatibûn bicihkirin li deverên xalî bûn û pir bi baldarî dihatin parastin. Ji xwe Hikumeta Tirkiyeyê mafê penaberiyê jî neda Kurdan. Her wisa ji vê rewşê gelekî aciz bû. Hikumetê hebûna Kurdan înkar dikir, lê di wan rojan de ji ber van bûyeran her roj rewşa Kurdan dihat rojevê û ev yek ji bo hikumetê tiştekî xirab bû.

Welhasil Neteweyên Yekbûyî (NY) qebûl kir ku ji bo Kurdên qurbanên şer, çareseriya herî baş li nav Kurdistana Îraqê danîna deverên rizgarkirî ye û ji bo vê jî di Nîsana 1991'ê de xebatekê dest pê kir. Amerîkayê ji bo rêveberiya Sedam li bakurê paralela 36'emîn (sih û şeşemîn) ku bi qasî 30 kîlometreyî di başûrê Mûsilê re derbas dibû tevgera leşkerî qedexe kir. Di 24'ê Nîsana 1991'ê de nûnerên Kurdan û Sedam li ser şertên otonomiya 11'ê Adara 1970'yî li hev hatin.

Di vê navberê de Kurdan dest bi vegera ji Tirkiyeyê û Îranê kir. Sedam li dijî xebata danîna herêma ewle derket, ya ku bi alîkariya Neteweyên Yekbûyî dihat pêkanîn. Di payîza sala 1991'ê de di navbera leşkerên Îraqê û Kurdan de dîsa pevçûnê dest pê kir. Di Cotmeha 1991'ê de îdareya hikumeta Îraqê neçar ma ku ji deverên Kurdan vekişe. Hemû rêxistinên Kurdan ên li başûrê Kurdistanê hatin ba hev û ji bo avakirina hikumetekê xebitîn. Di 4'ê Cotmeha 1992'yan de Parlamena Netewî ya Kurdistanê avabûna "Dewleta Federe ya Kurdistanê" îlan kir.

Bi îlankirina Herêma Federe, Kurdan bi temamî herêm xistibûn destê xwe, lê rewşa li Îraqê hîn jî ne diyar bû. Kurd ditirsiyan ku dîsa rastî îxanetekê bên û hemû destkeftiyên wan ji destê wan herin. Her wisa bi qetlîamên

[155] Newsweek-April 22, 1991

salên dawî û koçberiyê perîşan bûbûn. Digel her tiştî Kurdan di demeke kin de xwe dan hev û ji bo ku saziyên xwe ava bikin, ketin nav hewldanên mezin.

Pêşketinên li Başûr rasterast tesîr li ser Tirkiyeyê dikirin. Li herêmê hakimiyeta Kurdan tam rûneniştibû û destê gelek dewletan di nav de bû, loma li vir tevliheviyeke mezin hebû. Li Tirkiyeyê jî çalakiyên girseyî dewam dikirin, her sal dema ku Newroz nêzik dibû rewşeke nazik derdiket holê. Di vê navberê de hejmara gerîlayên Kurd jî pir zêde bûbû. Li gor çavkaniyan tenê li Îranê di sala 1991'ê de 5-7 hezar gerîla hebûn.

Tevger û hakimiyeta PKK'ê ya li ser sînor zêde bûbû. Rêxistinê bi giştî li deverên nêzîkî sînor, bi taybetî jî li cihê ku sînorên Tirkiye, Îran û Îraqê digihîştin hev qamp ava kiribûn û bi çûn û hatina xwe ya xilbe sînor tune kirine. Her wisa ji ber ku di nav gund û çiyayê xwe de ne, gerîla bi xwezaya xwe re jî bûye yek.

Erdal Sarizeybek, di salên 1992 û 1994'an de fermandariya Tabûra Sînor a Şemzînanê kiriye. Sarizeybek di berhema xwe ya bi navê 'Şemdînlî'de Sınırı Aşmak (Li Şemzînanê Derbaskirina Sînor)' de agahiyên girîng dide. Dibêje ku, dema ew hatiye ser kar, gundên li ser sînor nexwestine bibin cerdevan û bi dizî bi terorîstan re hevkarî kirine. Wiha jî qala hakimiyeta PKK'ê ya li ser sînor dike: "Kes dernediket derveyî qereqolê. Bi şev kes nedigeriya. Ji xeynî deverên baregehên me, hemû dever ketibûn bin destê terorîstan. Lê heta pevçûna Alanê ya 30'ê Tebaxa 1992'yan ez bi vê yekê nehesiyabûm..."[156]

Hin jêgirên ji vegotinên Sarizeybek ên dûre wihan in: (Rojên pêşî ên Tebaxa 1992'yan) "... Min şandina raporên li ser komên terorîstan, ên ku ji deh-pazdeh kesan pêk tên û dest bi dorpêçkirina xeta sînor a sêgoşeya Şemzînanê kirine, berdewam kir. Min mesajên di der barê ku, dikare di heman demê de êrîşî ser Şemzînan, Alan, Durak, Bezele (Aktutun) û Derecîk, yanî li hemû bêlûk û qereqolan bikin, şandin... Ji ber ku ji aliyê bicihbûnê ve yekîne tam li ber sînor bûn û PKK'ê jî biryar stendibû ku 'wê sêgoşeya Şemzînanê ji xeta Geverê qut bike, wê vê derê bike herêma rizgarkirî, qereqolên cendirmeyan ên heyî bi dest bixe û ala PKK'ê li vir hilde', îhtimala êrîşê zêdetir dikir."[157]

Sarizeybek diyar kiriye ku bûyer ne tenê li Şemzînanê lê belê li tevahiya sînorên Îran, Îraq û Sûriyeyê diqewimin û qereqolên ku li hêla hundir in di talûkeyê de ne. Dûre jî wiha didomîne: "... Em hemû jî dizanin ku di havîna sala 1992'yan de, li Bakurê Îraqê desthilatdariyek tune bû. Hêzên Sedam ber

[156] Erdal Sarızeybek, Şemdinli'de Sınırı Aşmak(Li Şemzînanê Derbaskirina Sînor), r. 36
[157] Erdal Sarizeybek, bnb, r. 41

bi başûr ve vekişiyabûn, him xelk him jî milîtanên PKK'ê çek û cebilxaneyên ku li pey artêşê mabûn, talan kiribûn. Em dizanin ku paşê çekên ku hatin talankirin ji hêla hemwelatiyên Îraqê ve li Hewlêrê li sûkê difirotin. Her wisa em dizanin ku ev çek ji hêla PKKê ve dihatin kirîn û li endamên rêxistinê dihatin belavkirin. Me, wek rayedarên sivîl û leşkerî, maqamên bilindtir agahdar kir ku rêxistina terorê ya PKK'ê bi taybetî li Xakurkê bi cih bûye, perwerdehiyên çekdarî li dar dixe û di demeke nêzik de wê werin nav welatê me û çalakiyan saz bikin."[158]

"...PKK'ê li Xakurkê baregeheke navendî daniye û li Îranê li qampa Jermayê û li Îraqê jî li qampa Basyanê bi cih bûye. Van her sê qampan ji sê aliyan ve dora Şemzînanê pêçane. Bi hêzên leşkerî girtina sînorên Îran û Îraqê ku lê tu sîstemeke ewlekariya fizîkî tune ye, ne mumkun e. Di navbera qereqolên sînoran de valahiyên bi qasî 30 kîlometreyî hene; ne mumkun e ku hûn bizanibin bê ka kî di van sînoran re derbas dibe..."[159]

Tevgera Kurdan çiqas bi pêş de diçû, li Tirkiyeyê jî kuştinên kiryar nediyar ew qas zêdetir dibûn. Di salên 1990'î de hejmara kuştiyên kiryarê wan ne diyar bûn bi hezaran. Yek ji kuştinên kiryar nediyar kuştina Mûsa Anter e. Mûsa Anter yek ji zanayên Kurd ên sedsala 20'an e, ku hejmara wan pir hindik in. Anter, di demên dawî de di rojnameyên Yeni Ulke û Ozgur Gundemê de dinivîsî. Anter ji bo îmzekirina kitêbên xwe û hevpeyvînan çûbû Festîvala Çand û Hunerê ya Şaredariya Amedê û li wir di 20'ê Rezbera 1992'yan de hat kuştin. Parlementerê Mêrdînê yê HEP'ê ku di hilbijartina sala 1991'ê de bi SHP'yê re ketibû hilbijartinê Mehmet Sîncar jî, di 4'ê Rezbera 1993'yan de li Batmanê li nav sûkê, ro li nîvro hat kuştin.*

Ji ber ku ev kuştin bi roj û di nav qerebalixê de çêdibûn, hişkere ye ku mêrkuj ji hêla 'hinan' ve dihatin parastin. Di nav xelkê de ji wan re digotin Hizbulah, an jî Hizbîqontra. Li hemberî van kuştinan komeleyên mafên mirovan, partiyan û meclîsê ji bo lêpirsîna van kuştinan hin komîsyon ava kirin.

Di Tîrmeha 1993'yan de Midurê Asayîşa Batmanê û Alîkarê Waliyê Batmanê ji Komîsyona Lêkolîna Kuştinên Kiryar Nediyar a Parlamentoya Tirkiyê re gotibû ku, qampên perwerdekirinê yên vê rêxistinê li Batman, Wan û Diyarbekirê li nav baregehên leşkerî ne, JÎTEM (Saziya Îstîxbarata Cendirmeyan) û hin saziyên leşkerî bi awayekî fiîlî destekê didin wan û wan

[158] Erdal Sarızeybek, bnb, r. 48

[159] Erdal Sarızeybek, bnb, r. 65

** Di vê pêvajoyê de di 17'ê Nisana 1993'yan de Serokkomar Turgut Ozal bi awayekî ku jina wî digot 'mirineke biguman e' jiyana xwe ji dest da.*

diparêzin. Piştî ku ev daxuyanî da, midurê asayîşa Batmanê li Enqerê hat pasîfîzekirin.[160] Heta sala 2000'î hejmara kuştinên 'kiryar nediyar' ên Hîzbullahê, ku tê gotin li hemberî PKK'ê ji hêla dewletê ve hatiye avakirin û destekkirin, gihîşt 20 hezarî. Ji ber ku ev kuştinkarî gihîşt armanca xwe, dûre bi operasyonên dewletê ev rêxistin hat belavkirin.

Wezîrê berê yê dewletê û endamê Komîsyona Lêkolîna Kuştinên Kiryar Nediyar a Parlamentoya Tirkiyeyê, parlamenterê Trabzonê Eyup Aşik di sala 2000'î de wiha gotibû: "Hîzbulah ev deh sal in heye. Dewletê wê demê ev yek înkar dikir. Lewre dewletê ev rêxistin li hemberî PKK'ê bi kar dianî. Wê demê Hîzbulahê derbeyên mezin li rêxistina cudaxwaz dixistin." "Karê çete û mafya tim li ser pereyan e. Pereyê madeyên hişbirinê yên li navbera Colemêrg, Wan û Bedlîsê dizivirî bi qasî butçeya Tirkiyeyê ye. Divê hemwelatî ne li gor dewletê bên birêvebirin, hewce ye dewlet li gor hemwelatiyan bê birêvebirin."[161]

Dema ku ji bo têkbirina tevgera Kurd li nav welêt kuştinên kiryar nediyar dihatin pêkanîn, li derve jî Tirkiyeyê bi dewletên cîran re pêwendî saz dikirin û bi operasyonên derveyî sînor tevgereke mezin pêk dianî. Di sala 1993'yan de Tirkiye û Îranê li hemberî PKK'ê tevgereke hevpar a leşkerî li dar xist û qampên PKK'ê yên li Îraqê bombe kirin. Di vê derbarê de pêwendiyên Tirkiyeyê bi Îranê re her ku çû zêdetir bû. Di sala 1994'an de Serokkomar Silêman Demîrel cara duyem çû Îranê. Ev têkoşîna ku wek li hemberî PKK'ê dihat kirin, di rastiyê de li hemberî bidestxistinên Kurdên Kurdistana Başûr bû.

Dema ku li nav Tirkiyeyê kuştinên kiryar nediyar zêde bûn, li hemberî Rêberê PKK'ê Abdulah Ocalan jî suîqestek hat kirin. Ocalan ku di 6'ê Gulana 1996'an de li Şamê rastî êrîşeke bombeyî hat, bêyî ku birîndar bibe xilas bû. Tevgera PKK'ê ku di destpêka salên 1990'î de bi hêz bû, ber bi dawiya sedsalê de derbeyên mezin xwarin. Bi taybetî dema ku bi komployeke navnetewî Abdulah Ocalan di 15'ê Sibata 1999'an de ji hêla komandoyên Tirkan ve ji Kenyayê hat revandin û anîn Tirkiyeyê, Kurdan şoqeke mezin derbas kir. Bi dehan xortên Kurd xwe bi saxî şewitandin. Lê bi daxuyaniyên xwe yên nerm Abdulah Ocalan rê li ber şerê navxweyî yê muhtemel ê li Tirkiyeyê girt. Bi vê doza Abdullah Ocalan ya ku wek doza sedsalê tê binavkirin sedsal bi dawî bû.

Em çavekî li destpêka hezarsala nû bigerînin û vê beşê biqedînin. Em ji Îranê dest pê bikin. Îro li Îranê sîstema eyaletan heye. Sih eyaletên Îranê hene

[160] Rapora Komîsyona Lêkolîna Kuştinên Kiryar Nediyar a Parlamentoya Tirkiyê
[161] Akit, 26.01.2000

û navê yek ji van eyaletan jî Kurdistan e. Navenda eyaleta Kurdistanê Sine (an jî Senendej) ye. Lê ev eyalet ne ji hemû herêmên Kurdistana Îran pêk hatiye. Kurdistana Îranê bûye pênc eyalet: Azerbaycana Rojava, Kurdistan, Kirmanşan, Îlam û Loristan. Gelek rewşenbîr û lêkolîner eyaleta Hemedanê jî wek eyaleteke Kurdistana parçekirî dihesibînin.



*Îran û Eyaleta Kurdistanê*[162]

Kurd û Faris ji Aryenên herî bi esl in û xwediyê (xizm) hev in. Ji ber ku di dîrokê de her dem di nav hev de bûn, çand û zimanê Îraniyan û yên Kurdan gelekî nêzîkî hev in. Lê mîna ku berê jî hat gotin, Îranê di sedsala 20'an de gelek tehde li Kurdan kir. Ji ber vê jî herêmên ku Kurd lê dijîn li paş man û li gor heyamê bi pêş neketin. Di destpêka sedsala 21'ê de jî operasyon û zextên li ser Kurdan hîn zêdetir bûne. Lê di heman demê de têkoşîna hebûnê ya Kurdan jî didome.

Di salên dawî de ligel têkoşîna rêxistinên Kurdan ên li Îranê, PJAK jî (di sala 2003'yan de hat avakirin) li Îranê şerê gerîlatiyê dike. Îran jî bi hêzên mezin êrîşê tîne ser Kurdan. Heger em bala xwe bidin çend nûçeyên ku di çapemeniyê de cih girtine, ji bo fêmkirina pêvajoya dawî wê bibe alîkar. Di rojnameya Ingilîzî The Guardianê ya 4'ê Tebaxa 2005'an de hatiye nivîsandin ku, di sê hefteyên dawî de li ser sînorên Îraqê di navbera hêzên ewlekariya Îranê û hêzên Kurdan de şer qewimiye. Di bûyerên ku li herêmê qewimîne 20 kes hatine kuştin û 300 kes jî birîndar bûne. Li gor hin rojnameyan jî rêveberiya Îranê tevî helîkopteran 100 hezar leşker şandiye herêmê û zexteke mezin daniye ser gel. Bûyeran paşê jî dewam kiriye, bi dehan mirov hatine kuştin û bi hezaran kes jî hatine girtin.

Li gor nûçeya roja 2'yê Rezbera 2007'an a malpera înternetê ya kanala nûçeyan a CNN'ê, hikumeta Îranê bakurê Îraqê bombardiman kiriye. Li gor nûçeyê, Îranê du hefteyan li ser hev hemû deverên hundirê Îraqê, li deverên çiyayî yên ku PJAK lê ye operasyon li dar xistine. Her wisa di nûçeyê de hatiye gotin ku, rêveberên Herêma Xweser a Kurdan diyar kirine ku, Kurdên li ser sînor gundên xwe terikandine û hikumetê ji Îranê xwestiye ku operasyonan bisekinîne.

[162] www.wikipedia.com

Nûçeyeke roja 3'yê Berfanbara 2007'an jî wiha ye: "Hişkere bû ku artêşa Îranê li herêma Kelareşê operasyon saz kiriye û di vê operasyonê de êrîş biriye ser sivîlan. Di sê rojan de li herêma ku li hemberî hêzên PJAK'ê operasyon tê sazkirin, du sivîl hatine kuştin û sê sivîl jî birîndar bûne.

Li gor agahiya ku navenda çapemeniya PJAK'ê daye, operasyona ku li hemû herêmên Kelareşê belav bûye, heta gundên Germaveş, Simatil Stareş, Xonavîna Hewlêrê, Hespê Şîn, Qizilkent û Şapûrê daye ber xwe fireh bûye. Kelareş-ANF"[163]




*Kurdistan û bi xetên qalind Dewleta Federe ya Kurdistanê ya li nav Dewleta Îraqê*[164]

Li Îraqa ku di sedsala 20'an de têkoşîna Kurdan qet lê nesekiniye, di sala 1992'yan de "Dewleta Federe ya Kurdistanê" hat îlankirin, lê encex bi têkçûna rejîma Baas Kurdan nefeseke rihet stend. Li Îraqê rejîma Baas, di sala 2003'yan de ji hêla hêzên Koalîsyonê ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pêşengî jê re dikir hat hilweşandin. Rêberê Kurd Celal Talabanî bû Serokkomarê Îraqê. Ji bo hin wezaretan Kurd hatin hilbijartin.

Lê hîn jî pirsgirêkên wan ên girîng hebûn. Bi taybetî Tirkiye û Îran li dijî vê saziyê derdiketin. Herêma Federe ya Kurdistanê, ji aliyê dewleta Îraqê ve

[163] www.ozgurgundem.org
[164] www.dewletakurdistan.hk-mg.net

rihet bû, lê pirsgirêka herî mezin siyaseta dewleta Tirkiyeyê bû. Ji hêlekê ve bi hezaran hemwelatiyên Tirkiyeyê li Herêma Federe ya Kurdistanê dijîn, bazirganiyê dikin; ji hêla din ve jî hêzên leşkerî yên Tirkiyeyê tim operasyonên dersînor li dar dixin. Dewleta Tirkiyeyê dike nake nikare xwe ji tirsa ku wê parçe bibe bifilitîne. Tê gotin ku, heger Dewleta Federe ya Kurdan neftên Kerkûkê bi dest bixe, wê ji bo wan bibe xetereyeke mezin. Bi mudaxeleya Tirkiyeyê rewşa Kerkûkê bû rewşeke nediyar. Di rastiyê de potansiyela mezin a neftê ya Kerkûkê, bûye sebeba ku gelek dewlet mudaxeleyî mijarên li ser sînoran bikin. Bi vî awayî sînorên Dewleta Federe ya Kurdistanê yên aliyê Îraqê bi tevayî zelal nebûne.

Em niha jî bala xwe bidin ser başûrê rojavayê Kurdistanê. Sûriye di dema Hafiz Esad de ji hêla rejîmeke polêsan ve bi awayekî girtî dihat birêvebirin. Piştî mirina Hafiz Esad, kurê wî Beşar Esad hat ser hukim û yên ku li benda rejîmeke demokrat bûn, xapiyan. Kurdên li Sûriyeyê digel ku çanda xwe ji Kurdên li Tirkiyeyê pir baştir diparêzin, rewşa wan pir xirab e. Tevahiya rêxistinên wan veşartî kar dikin û pir parçe bûne. Lê piştî ku Amerîkayê li Îraqê rejîma Sedam hilweşand û dengeyên herêmê xera kir, di nav Kurdên li Sûriyeyê de jî tevgereke germ dest pê kir. Ev hewa li hemû herêmê belav bûye û statuko parçe bûye. Êdî Rojhilata Navîn ber bi aliyekî din ve diçe. Sûriye jî mîna dewletên din ên ku bihêzbûna Kurdan dibînin, bi hemû hêza xwe bi ser Kurdan de diçe. Wek mînak, çapemeniyê di Tîrmeha 2007'an de ragihand ku Sûriye dîsa li gundên Kurdan xelkê Ereb bi cih dike.

Li Tirkiyeyê ku îro nifûsa herî mezin a Kurdan lê ye, Kurd ne xwediyê tu mafî ne. Heta mîna ku li jor jî hat îfadekirin, Tirkiye ji bo nehêle Kurd li Îraqê jî tiştekî bi dest bixin çi ji dest hat, kir. Ji ber vê, di salên dawî de di navbera Tirkiyeyê û Amerîkayê ku çend dehsalên dawî bi hev re tevdigeriyan hin pirsgirêk derketin. Dema ku Amerîka ket nav Îraqê, Tirkiyeyê piştgiriya xwe jê kişand û bi vî awayî li Tirkiyeyê tevliheviyek qewimî. Paşê Tirkiyeyê bi Îran û Sûriyeyê re ku her du dewlet jî wek dijminê Amerîkayê dihatin dîtin, pêwendiyên hevkariyê saz kirin. Vê yekê navbera Tirkiyeyê û Amerîkayê xera kir û bi vî awayî Kurd li Rojhilata Navîn bûn hêzeke girîng a hevalbendê Amerîka.

Di vê navberê de PKK li ser sînorên başûrê Kurdistanê û Tirkiyeyê, bi taybetî jî li herêma çiyayî ku her sê sînor digihîjin hev bi cih bû û qamp ava kirin. PKK'ê ev herêma ku bi çiyayên asê dor lê hatiye girtin û geliyên kûr lê hene, wek 'Qadên Parastina Medyayê' bi nav kir û ev herêm xist bin kontrola xwe. Bi wextê re li vir bi hêz bû. Serokerkanê giştî di 17'ê Sibata 2007'an de got ku, sînorê Îraqê di bin destê PKK'ê de ye.

Ev gotin di rastiyê de nîşaneya êrîşa li ser Herêma Federe ya Kurdan bû jî. Di nûçeyên sala 2007'an de mijarên li ser sînor gelekî zêde bûn.

Di Hezîrana 2007'an de, li gor gelek nûçeyên ku di rojname û malperan de cih girtibûn, Tirkiyeyê û Îranê deverên Kurdan ên li Îraqê bi hev re bombardiman kirine. Di van nûçeyan de dihat gotin ku Tirkiye û Îran ji bo operasyoneke li ser Herêma Kurdistanê amade ne. Dihat gotin ku, deverên Kurdan bi şidet tên bombebarankirin û bêhtir herêma çiyayî ya Xakurkê ya li cihê ku her sê sînor digihîjin hev, gundên derûdora nahiyeya Sîdekan û herêma Xinereyê dihat bombardimankirin.

Di nûçeyên roja 08.06.2007'an de dihat gotin ku, hêzên çekdar ên Tirk berî bi rojekê saet di 12:00'an de bi saetan bi guleyên hewanê gundê Keste yê Berwariyê ku girêdayî Duhokê ye, bombardiman kiriye; herî kêm 30 guleyên hewanê li nava gund ketine û hêzên leşkerî yên Îranê jî herêma çiyayî ya Gulî ku li bajaroka Batufaya ser bi Duhokê ve ye top barandine.

Li gor nûçeyên roja 17.07.2007'an dîsa li Tirkiye û Îranê di navbera PKK'ê û hêzên her du dewletan de şer derketiye. Di van şeran de esker û gerîla hatine kuştin. Di Tebaxa 2007'an de çapemeniyê çend caran nûçeyên wisa belav kirin ku Îranê li hemberî PKK'ê operasyonên derveyî sînor kirine û bombe bi ser çiyayê Qendîlê de barandine. Di van mehan de di çapemeniyê de gelek nûçeyên wisa cih girtin. Di vê navberê de bêguman herêm hat valakirin û mirov dîsa mecbûr man ku koç bikin.

Di heman demê de Kurdên resen Êzîdî li warê bav û kalên xwe, li Şengalê rastî êrîşeke hovane hatin. Di 15'ê Tebaxa 2007'an de gundên Xidir û Tel Ezer ên bajaroka Bacê ya qezaya Şengalê ya Mûsilê û li bajaroka Kahtaniyê çar tankerên tijî neft hatin teqandin û di vê êrîşa terorîstî de ji 500 kesî zêdetir Kurdên Êzîdî hatin kuştin. Hikumeta Herêma Kurdistanê ji bo Kurdên Êzîdî yên ku di vê qetlîamê de hatibûn kuştin, bi fermî rojekê şîna giştî îlan kir. Bi vî awayî tevgera li dijî Kurdewariyê ya ku hemû rêbaz tên bikaranîn bi qeweteke zêde berdewam dikir.

Di meha dawî a wê salê de artêşa Tirk xwest operasyoneke berfireh li ser sînor û derveyî sînor saz bike. Leşker li deverên wek Şirnex, Colemêrg, Sêrt ku dewlet ev dever wek deverên ewlehiyê bi nav kiribûn, hatin komkirin. Armanca vê tevgerê ne tenê PKK bû. Di rastiyê de ev tevger ji bo başûrê Kurdistanê gefek bû. Vê tevgerê di heman demê de di mijara Kerkûkê de gelek astêngî derdixistin pêşiya hikumeta herêmî. Ji çapemeniya Tirkiyeyê dihat fêmkirin ku, yek ji armanca vê tevgerê têkbirina destkeftiyên Kurdên Başûr bû.

Heta demekê ji bo operasyonê amadehî hatin kirin. Hin leşker ku ji bo terhîsa wan wexteke kin mabû, şandin herêmê û piraniya wan li gor pîşeyên wan li deverê di avakirina qereqol, bircên çavdêriyê û riyan de hatin xebitandin. Di heman demê de gelek leşker şandin ji bo operasyonê ku li deverên sînor ên Qileban, Çelê, Şemzînan û Geverê dihat kirin.

Di dawiya sala 2007'an de Tirkiyeyê piştî ku bi Amerikayê re li hev kir, êdî ji bo operasyoneke mezin a derveyî sînor ku hêzên reşahî û hewayî wê bihatina bikaranîn, amade bû. Di 16'ê Berfanbara 2007'an de saet di 01:00'an de 50 firokeyên cengê yên Tirkan, dest bi operasyona dersînor kirin. Spîkerên televîzyonan dîmenên operasyona dersînor wek dîmenên fîlmên Hollywoodê pêşkêş dikirin û bi pesndayînê dihat gotin ku di operasyonê de çekên teknolojîk tên bikaranîn. Di operasyonê de her roj firoke li her du aliyên sînor bi dengekî bilind di ser mirovan re difiriyan û çiyayên ku gerîla lê ne, bombardiman dikirin. Gel li hemberî operasyonê xwepêşandanên girseyî li dar xist. Digel dijberiya gel, operasyonê di sala 2008'an de jî dewam kir. Di 21'ê Sibata 2008'an de bi piştgiriya hêzên hewayî operasyoneke reşahiyê ku bi deh hezaran leşker tev lê bûbûn, dest pê kir.

Di mehên zivistanê de vê operasyonê 9 rojan dewam kir û dema ku operasyon bi dawî bû hêviya raya giştî ya Tirkiyeyê şikest. Lewre çapemenî û siyasetmedaran wisa nîşan dabûn ku wê artêş Başûr dagir bike û ger hewce be wê artêş heta Mûsil û Kerkûkê here. Lê ev tev ji rastiyê dûr bûn. A rast, ev tev hesabên xelet bûn. Ji ber vê, her çiqas leşkeran got ku operasyon gihîştiye armanca xwe jî, hin kesên din bi awayekî din operasyon nirxandin.

Her roj bi her awayî Kurd windahiyên mezin didin. Ev rewş wilo dom bike dibe ku di navbera Kurd û Tirkan de şerê navxweyî dest pê bike. Ji dema ku ev operasyon hatiye destpêkirin li her bajarê Tirkiyeyê çalakiyên Kurdan hene. Haya Kurdan îcar bi riya teknolojiyê ji nûçeyên rast jî çêdibe û nûçeyên derew nema cihê xwe digirin. Ji ber wilo di nav ev qas neheqiyan de, dibe ku Kurd îcar bi awayekî din bifikirin. Bi van hewldanan ji xwe sala dawî xelkê Kurd giha asta ku bi tevlêbuna bi hezaran kesan çalekiyên 'Êdî Bes E' li dar bixin. Kesên zanist jî zanin ku piştî qonaxekê veger ji tiştina re ne mumkun e. Ji ber wilo çareserkirina pirsgirêka Kurdan rojekê berî rojekê dive têkeve qonaxeke erênî.

Ku em bi tevayî bifikirin, heke tevliheviyek mezin çênebe, tiştê ku îro xuya dike wê di pêşerojê de çar dewletên Kurdan çêbibin. Yanî her dewleta ku Kurd lê hene wê Kurdistanek lê ava bibe. Ev otonomî dibe yan wek federasyon. Bi demê re wê sînor sist bibin û têkiliya Kurdan zêdetir bibe. Ev ji

bo berjewendiyên hemû aliyan çêtir e. Lê wek ku me berî niha got, heger tevliheviyeke mezin çêbibe; mînak, ku artêşa Tirk di ketina Başûr de israr bike û bi vî awayî dom bike, dibe ku ev yekîtiya mezin a di navbera parçeyên Kurdistanê de pêk bîne û bibe destpêka damezirandina Kurdistana mezin. Ji ber ku me ji nêzik ve di vê operasyona dawî de dît; hewldanên bi vî rengî Kurdan bêhtir ber bi hev ve tîne. Îro bi hezaran gerîla di hundirê Tirkiyê de hene. Gerîla ji Qendîlê bigir, heta çiyayên Botan, Zagros, Mêrdîn, Dêrsim, Amed, Çewlik, Sason, Amanos, Toros û her devera Kurdistanê heye. Gerilayên PKK'ê ji Kurdên her çar perçeyên Kurdistanê ne. Her çiqas di operasyonan de dest û lingê xelkê girêdayî be jî dema behsa gerîla dibe kezeba dayîkan dişewite.

Mîna ku tê dîtin ev beş tev bi vegotinên êrîş, girtin, îşkence, sirgûn, rûxandin û şewitandinan dom kir. Peyva "jenosîd" ji bo bilêvkirina van kirinan kêm dimîne. Ne carekê, ne deh caran, bi sedan car bi girseyî Kurd rastî kirinên dijmirovî hatin, hatin kuştin. Her roj dinya di warê mafên mirovan de bi pêş dikeve, lê hîn jî Kurd di bin îşkenceyan de ne, bi awayekî neheq tên darvekirin, ji welatên xwe tên sirgûnkirin û digel ku xwedî axa herî biberhem a dinyê ne, birçî û tazî dimînin. Ev tev rastiyên ku di rûpelên dîrokê de cih digirin. Heta mirov dikare bibêje ev tiştên ku hatine nivîsandin beşeke biçûk e ji tiştên ku hatine jiyandin. Vêca hûn halê civakeke wisa bifikirin...

Û ev çi çandeke payebilind e ku digel van hemû bûyerên xerab, hîn jî ji bo jiyaneke xwişk û biratiyê destê xwe yê dostaniyê dirêjî her kesî dike!

## ASÎMILASYON, SIRGÛN Û KOÇBERÎ

Ji bo tunekirina Kurdan rêbazên herî giran ên din asîmilekirin, sirgûnkirin û koçberkirin in. Di sedsala 20'an de Kurd, ji hemû deman bêhtir hatin sirgûnkirin, koçberkirin û asîmilekirin. Bi vî awayî Kurdan gelek windahî dan û gelek zehmetî kişandin. Nifûsa Kurdan di belgeyên sala 1919'an de ji 13 milyonî zêdetir e. Li Tirkiyeyê hejmartina nifûsê ya ewil di sala 1927'an de çêbûye û li gor vê hejmarê nifûsa Tirkiyeyê bi tevayî 13 milyon û 600 hezar e. Helbet di hundirê wê de Kurdên ku di nav sînorên Tirkiyeyê de dijîn jî hene. Kêm zêde wê rastî nêzîkî van reqeman be. Îcar dema ku mirov van reqeman û hejmara îro bide ber hev û eynî tiştî ji bo dewletên din jî bike, mirov dê bibîne bê ka çi bûye. Di heman demê de, mirov ji hemû aliyan ve vê liberhevxistinê bike wê gelek tişt zelal bibin. Wek paşvemayîna Kurdan û wêrankirina Kurdistanê. Wekî mînak; Diyarbekir di destpêka komarê de wek bajarekî mezin di gelek waran de bajarê 3'yem e; îro di heman waran de dikeve rêza nêzîkî 50'yemîn. Bi kinayî bi van kirinan Kurd hatin tunekirin û feqîrkirin.

Divê mirov ewil li ser asîmilasyonê bisekine; ku îro di nav Kurdan de ketiye rewşeke jê re dibêjin otoasîmilasyon. Ew jî tê maneya asîmilasyona ku ketibe çerxekê û ji ber xwe ve bigere. Wek keseke ku li Tirkiyeyê dijî û bi gelek saziyên Kurdan re têkilî daniye ez dikarim bibêjim, zimanê Tirkî ketiye gelek sazî û malên Kurdan. Hin malbatên Kurdan her tim, hin jê jî gelek caran bi zarokên xwe re bi Tirkî diaxivin; heta di gelek saziyên ku li ser navê Kurdayetiyê hatine avakirin de jî bi Tirkî tê axaftin. Di her sê welatên din de

ne ew qas be jî, windakirina zimanê Kurdî û kesayetiya Kurdayetiyê pir zêde ye. Yê ku bi kurmancî diaxivin pir in helbet, lê dema mirov li tevahiyê binêre rewşeke xeternak tê xuyakirin. Ev, encama bandora asîmilasyonê ye ku ev nêzîkî sed salî ye ji aliyê çar dewletan ve bi rêk û pêk tê meşandin.

Îro di nav neteweyên pêşketî de asîmilasyon weke sûcekî mirovahiyê tê qebûlkirin. Nivîskar Îbrahîm Guçlu di nivîseke xwe ya der barê mijarê de bi bîr dixe ku asîmilasyon di peymanên navneteweyî de wekî sûcekî dijmirovahiyê hatiye qebûlkirin. Guçlu di vê nivîsê de asîmilasyonê jî wiha terîf dike: "...Asîmilasyon, nijadkujiyeke (jenosîdeke) netewî, çandî û zimanî ye. Tunekirin û jiholêrakirina milet û civakeke neteweyî ye. Ji hêla neteweyeke serdest û kolonyalîst ve redkirina hebûna neteweyeke din, xespkirina mafên wê, tunekirin û ji holêrakirina wê ye; bi tunekirina miletekî yan jî civaka gelekî re beşdarkirina nava civaka serdest e..."[165]

Ji aliyê din ve ji bo miletek zûtir bê asîmilekirin û tunekirin xala ku pêşiyê tê bikaranîn sirgûn û koçberî ye. Ev jî şeklekî din ê mirinê ye. Mirov bê reh û bê kok dimîne. Mirin bi demê re hêdî hêdî pêk tê. Yan jî mirov kare bibêje, ferqa kesê hatiye sirgûnkirin û masiyê ku ji nav avê bipeke û biperpite tune ye. Jixwe bi rê de birçîbûn, betilandin, şertên hewayê, xerîbiya cihê ku lê bimînin di serî de gelek bingehên neyînî datîne. Însan çiqasî bi qewet be jî zehmet e xwe li ber van hemûyan bigire.

Dîrok û cografya bi hev ve gelekî girêdayî ne. Cografyaya Kurdistanê şahidê zindî yê wêjeya devkî, dîrok, stran û çîrokên dengbêjan e. Bandora Kurdistanê ya li ser bîra welatparêziya Kurdan mezin e. Bandoreke mezin a sirgûn û koçberkirinê li ser neteweya ku hatiye koçberkirin heye. Bi taybetî jî ji ber ku di navbera Kurdan û cografyaya wan de danûstendineke zêde heye û Kurd zêde bi xaka xwe ve girêdayî ne, sirgûnî û koçberî bandoreke giran li wan dike. Loma jî, dewletên ku Kurd lê dijîn her tim ev rêbaz bi kar anîne; ji aliyekî ve bi hezaran Kurd sirgûn û koçber kirine û ji aliyê din ve jî ji bo asîmilasyonê planên xwe yên din meşandine.

Di sirgûniyan de bi piranî axa û rêberên civatê hatine sirgûnkirin. Piştî rêber çûne di civatê de tevlihevî çêbûye û li wir jî serûbinbûnek dertê holê. Eşîretî bingeha civata Kurdan e. Dema sîstemeke jê baştir nehat danîn û ew jî hat xerakirin pirsgirêkên mezin derketin holê. Civatê gelek nirxên xwe winda kirin. Di vê valahiyê de pevçûn, kuştin çêbûn û dijminahiyên nuh derketin holê. Guhertin ne bi dînamîkên hundirîn bên kirin û ji jor ve bi zorê tiştin bên meşandin, civat li bin guhê hev dikeve. Ji ber ku gavên tên avêtin

[165] www.haberdiyarbakir.com, 18.Sibat.2008

ne ji bo pêşxistina civatê ne, armanc berevajî vê ye jî, civata bindest bi her awayî winda dike.

Berî ku em di vê mijarê de li ser bûyerên di sedsala 20'an de rawestin, pêşiyê em çavekî li dîrokê bigerînin. Anatolî, Mezopotamya û Îran, bi kurtasî qada 'Împaratoriya Med û Persan ku yekem împaratoriya cîhanê ye, di seranseriya dîrokê de her tim di nava hevbandoriyekê de bûye. Heta sedsala 20'emîn di vê qadê de tu netewê ji xwe re sînorên asê çênekirine û bi netewperestî qirkirin û asîmilasyon nehatine meşandin. Di vê qadê de bi hezaran salan gelek miletên cihê bi hevdu re û di nava hev de jiyane. Di nav vana de serê pêşî mirov dikare Asûrî, Kurd, Ermen, Fars, Ereb û hwd. bihejmêre.

Ji ber hevbandoriya domdar, di çanda hemû miletên ku li ser vê qadê dijîn, gelek aliyên hevpar hene. Îro em dikarin vê yekê bi rihetî bibînin. Helbet bandoreke mezin a Kurdên ku bi hezaran salan e di navenda vê qadê de cih digirin wê li vê çandê hebe. Digel vê yekê bi kevneşopiyeke ku ji dîrokê tê Kurd miletekî wisan in ku baş dizanin bi gelek miletên din re bijîn. Heta mirov dikare bibêje Kurdan ev yek ji xwe re wekî şeklê jiyanê qebûl kiriye. Ji ber ku tu deman xwe di nava sînorên xwe de heps nekirine, her wiha her dem sînorê wan vekirî bûye û bi dora xwe re gelekî dane û stendine.

Her çiqas bi êrîşên Ereban re qetlîamên mezin hatibin jiyîn jî, sedsalên 10'emîn û 12'emîn yek ji demên herî geş ên hemû medeniyeta Îslamê bûn. Navendên cîhanê yên çandî û aborî bajarên Îslamê bûn. Alîkariya Kurdan a ji bo vê medeniyeta dewlemend, biheybet û xurt gelek mezin e. Kurd vê demê li Kurdistanê bi begîtiyan, bi Împaratoriya Eyubî ya ku navenda wê Misir bû û hetanî Kurdistanê dirêj dibû, di demeke geş de dijîn. Prof. Mehrdad Îzady diyar dike ku sedsalên 10'emîn û 12'emîn 'serdema zêrîn a Kurdan' bûye û dibêje, tê gotin ku dewra Mîrîtiya Merwanî ku di salên 990'î de li Amedê hatibû avakirin, wekî dema herî geş a Kurdan tê nirxandin.[166]

Berî niha bi hezar salî ji rojhilat mêvanin nû hatin vê qadê. Kurdan ev mêvanên ku dê paşê wekî Tirk bihatina binavkirin geh bi diyariyan pêşwazî kirin, geh bi wan re şer kirin, geh li hemberî hêzin din bi wan re bûn yek. Dogan Avcıoglu, di berhema xwe ya bi navê 'Turklerin Tarihi' (Dîroka Tirkan)(5.) de diyar dike ku Alpaslan serkeftina xwe ya Milazgirê bi piştgiriya mezin a leşkerên Kurd bi dest xistiye. Li gorî hin çavkaniyan dema ku Siltan Alpaslan di 1071'ê de li Milazgirê artêşa Bîzansê têk bir, li cem wî li dora 10.000 dildarên Kurd hebûn. Ji van pareke mezin endamên Mîrîtiya Mervaniyan bûn. Di artêşa Selahedînê Eyûbî jî ya ku li hemberî êrîşên

[166] Prof. Mehrdad Izady, Kürtler, r. 24

Xaçparêzan yekîtiya Îslamê pêk anî û mohra xwe li binê gelek serkeftinên mezin xist Ereb, Kurd û Tirk li rex hev cih digirin û hwd.

Wek ku li jorê jî hat îfadekirin, her çiqas pêşiyê bi mêvanên ku ji rojhilat hatin pêvçûn çêbûn jî, bêhtir li dijî êrîşên ku ji rojava tên tevgera bi hevdu re heye. Lê ev hêzên ku piştre hatina xwe bi hejmarên mezin berdewam dikin, herêmê xera dikin. Rojhilata Navîn di sedsala 13'an de felaketeke ji Seferên Xaçparêzan mezintir dibîne. Artêşên Moxol ên hov dikevin kîjan deverê, wê derê bi erdê re dikin yek, kavil dikin û mirovan hemûyan dikujin. Bi taybetî jî di dema Tîmûr de pirtûkxane jî di nav de her der tê şewitandin û xerakirin. Ev çand daneheva hezar salan bû. Bi vî awayî zirarên mezin gihîştine çanda herêmê û çanda cîhanê. Piştî vê demê herêm tu caran negihîşt asta xwe ya berê. Kurd bi çanda xwe ya kokdar û derfetên xwezaya xwe li ser piyan mane. Careke din xwe dane hev û mîrîtiyên xwe berdewam kirine. Her çiqas pişt re împaratoriyeke wekî ya Osmanî ku li sê parzemînan hukim kiriye li ser vê xakê hatiye damezirandin jî, di dîroka cîhanê de dewra paşketina Rojhilata Navîn dest pê dike.

Heger em derbasî yekîtiya Kurd û Tirkan a dawî bibin ku tesîra wê heta îro jî dom dike, divê em behsa sedsala 16'emîn bikin. Cihgirtina Kurdan a bi dilxwazî ya di nava Dewleta Osmanî de di serê sedsala 16'an de dest pê dike. Gelek Mîrîtiyên Kurd ên girîng piştî ku bi Dewleta Osmanî re li hev dikin, di şerê Çildêranê de li hemberî Sefewiyan bi Tirkan re tevdigerin û vê serdema nû didin destpêkirin. Her çiqas hin pirsgirêk çêbûbin jî di vê serdemê de Mîrîtiyên Kurd roleke baş dilîzin. Osmanî jî bi rêzdarî nêzîkî rêveberiyên herêmî dibin. Mîrîtiyên Kurd ên ku li aliyê Sefewiyan mane jî bi heman şeklî xwe bi xwe bi rê ve dibin.

Mîrîtiyên Kurdan dema ku di nava van her du Împaratoriyan de cih digirtin, di Împaratoriyan de di warê etnîkî de pirrengî hebû. Di nav Eyûbî, Sefewî û Osmaniyan de ne netew, ol (dîn) li pêş e. Yanî di warê etnîkî de zext tune bûn. Di nêzîkî 300 salên xwe yên demên dawî de, mîrîtî û eşîrên Kurdan hem ji bo Osmaniyan hem jî bo Îranê ji bilî bacdayîn û di rewşen şer de girêdayîna leşkerî, hemû rêvebertiya herêmî di destê rêveberên Kurd de bûn. Bi vî şeklî Kurd bi piranî bi çanda xwe jiyan û ew bi pêş xistin.

Ligel vê yekê hin kesên Kurd, di saziyên Împaratoriyên Sefewî û Osmaniyan de bêyî ku eslê xwe winda bikin derketin meqamên siyasî û leşkerî yên gelekî girîng. Wekî mînak hukimdarê Sefewî Şah Îsmaîl û Kerîm Xan Zend ê ku di navbera salên 1760-1779'an de li ser textê Îranê ma Kurd in. Li aliyê din, yek ji rêberên Mukriyan Ezîz Xan ê ku ji ezbeta Baba-Mîr, di

dema rêvebertiyên Mihemed Şah (1834-1848) û Nasredîn Şah (1848-1896) de xebatên leşkerî û dîplomatîk pêk anîn. Di nava sedsala 19'an de hetanî meqamê rêvebertiya leşkerî ya Tehranê bilind bû, piştre jî di Artêşa Îranê de bû serfermandar.[167] Jixwe di Dewleta Osmanî de jî gelek Kurdan di gelek waran de, di meqamên bilind de cih girtine.

Li aliyê din, hin alimên Kurd, di serayên van her du împaratoriyan de bûne zanayên herî girîng. Heta berî ku mîrîtiyên Kurdan bi Împaratoriya Osmanî re peymanê çêbikin jî, hin zanayên Kurd gelekî nêzîkî rêveberên Osmanî ne. Melayê Goranî* yê ku di serayên Osmanî de ji Fatîh Siltan Mehmed re mamostetî û şêvirmendî kiriye; Îdrîsê Bedlîsî yê ku nêzîkî 30 berhemên wî hene, bi berhema xwe ya bi navê 'Heşt Biheşt' cara yekem dîroka 8 padîşahên Osmanî bi berfirehî nivîsiye û di gelek mijarên girîng de şêvirmendiya padîşahê wê demê kiriye, ji vana tenê du mînak in. Di goristanên Eyub û Uskudarê yên li Stenbolê de, gorên gelek Kurdên ku di dema Osmaniyan de Şêxulîslamî kirine hene. Mirov dikare ji bo her du împaratoriyan jî gelek mînakên wiha bide.



*Tirba Şehabeddîn el Goranî, li Stenbolê nêzikî Aksarayê ye.*[168]

[167] A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 139

* *Mela Şehabeddîn Ahmed el Goranî, yek ji ramyar û felsefevanên Îslamê yên Kurd ên mezin e. Di sala 1410'an de li herêma Şehrezorê ya Başûrê Kurdistanê hatiye dinyayê. Melayê Goranî piştî ku perwerdehiya xwe ya seretayî li Bexdayê temam dike, li Şam, Qudus û Qahîreyê li ser felsefeya olî dersê dibîne. Piştî tekamula xwe vedigere Kurdistanê û li nêzikî Helebçeyê dibistaneke ku wekî Medresa Mela tê zanîn vedike. Piştî ku nav û dengê wî belav dibe bi teklîfa Siltanê Osmanî Muradê 2'yem di sala 1441'ê de tê Anatoliyê û li gorî qeydan piştî salekê li Bursayê bi cih dibe. Ji ber jîrîtiya xwe ya bêhempa û zanîna xwe ya kûr di demeke kin de terfî dibe û piştî salekê ji bo perwerdehiya zarokên siltan wekî mamosteyê berpirsiyar tê peywirdarkirin. Di vê serdemê de, dest bi dersdayîna Mehmedê 2'yem (Fatîh Siltan Mehmed) dike, yê ku di temenê zaroktiyê de ji bo senceqbegtiya Manîsayê hatibû wezîfedarkirin. Di heman demê de şêwirmendiyê jî dike. Melayê Goranî ku tê gotin xwediyê ramana fetihkirina Stenbolê ew e, piştî ku Mehmedê 2'yem Stenbol bi dest dixe, ji bo Qazeskertiya Rumeliyê ku berpirsyariya hiqûqa şerî û orfî di bin berpirsiyariya wî de bû, tê wezîfedarkirin. Melayê Goranî nêzikî 30 salî vê peywirê dike, di sala 1480'yî de dibe Şêxulîslam û hetanî wefat dike (1488-dema Yavuz Siltan Selîm) vê peywirê dimeşîne. (www.Kurdistan Time)Di warê dînî de gelek berhemên wî hene.*

[168] Fot: Eslîxan Yildirim

Di vê serdema ku Kurd di navbera du Împaratoriyan de parçe dibin, di nav Kurdan de di qada zanist û hunerê de gelek şexsiyetên girîng digihên, hin ji wan ne tenê di nav Kurdan de li çar hêlên van împaratoriyan têne naskirin, ji gelek cihan ên wan dişopînin çêdibin, heta şohreta hinekan ji wan sînorên dewletên ku lê bûn derbas kirine.

Bruinessen jî, ku li ser Kurdistanê xebatên wî yên girîng hene dibêje; Ulemaya Kurdan di hemû demên împaratoriyê de, li seraya Osmanî di meqamên bibandor de cih girtine û li Zanîngeha bi nav û deng El-Ezher a li Qahireyê û li bajarên pîroz ên Erebistanê mamostetî kirine. Her wiha bizavên ramyarî yên ku li Kurdistanê pêk hatine bandor li der û dorê jî kirine. Wekî mînak terîqeta Neqşîbendî li Kurdistanê hatiye avakirin û ji wir belavî nava Împaratoriya Osmanî bûye. Mewlana Xalid, bingeha têkilî û ragihandinê ya ku temamiya Kurdistanê digire nav xwe û digihîje quncikê herî dûr ê Împaratoriya Osmanî daniye û hwd.

Di vê serdemê de jî, ji seriyekî Împaratoriyên ku Kurdan tê de cih girtine heta seriyê din, bandorlihevkirinê berdewam kiriye, bi demê re ketina nav hev û têkilî xurtir bûne. Ji ber ku Kurd di navbera sê herêmên Îslamê yên çandî yên mezin de ne, gelek alimên Kurd ligel Erebî bi Tirkî û Farisî jî dizanîn. Vê yekê di danûstendinên misilmanên Hindistanî yên ku bi Farisî dinivîsandin û dinyaya ku bi Tirkî û Erebî diaxivî de rola navbeynkariya çandê da wan. Bi vî şeklî, çawa ku mamosteyên Kurd ên ku li Meke û Medîneyê ders didan hebûn, ên ku hetanî Endonezyayê bandoreke mayînde hiştin jî hebûn.

Ligel kesên di nav împaratoriyên ku ew tê de bûn hatine meqamên siyasî û leşkerî yên girîng û gihîştine mertebeya rêbertiya olî, di heman demê de di hundurê mîrîtiyên Kurdan de jî gelek kesayetiyên wekî Şerefxan, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî ku ji bo wêje û hunera Kurdan xizmetên mezin kirine jî çêbûne. Berhema Ehmedê Xanî ya bi navê Nûbihara Biçûkan, di dinyayê de berhema ewîl e ya ku ji bo zarokan bi nêrîneke pedagogî hatiye nivîsandin.

Di dewra Osmaniyan de, Kurdî di dibistanên resmî de û di Dar-ul-Finûnê de nedihat xwendin, lê di medreseyên Kurdan de dihat xwendin û ew medrese hema bibêje li hemû bajar, navçe û gundên mezin ên Kurdistanê hebûn. Her çiqas tenê komeke biçûk a bijarteyan xwedî derfetan bûn ku di perwerdehiyê de bi pêş de herin jî, medreseyên li Kurdistanê xwedî şohreteke baş bûn.

Medreseya Bedlîsê, Medreseya Cizîrê û Medreseya Zaxoyê hin ji medreseyên Kurdan ên navdar bûn. Di medreseyên Kurdî de edîb û hozanên nav-

dar gihîştine. (Perwerdehiya di van medreseyan de hetanî destpêka Komara Tirkiyeyê jî berdewam kiriye.) Ligel vê yekê, hejmareke pir zêde ku em ê nikaribin li vir navên wan bihejmêrin a şexsiyetên girîng ên ku di nav civakê de bi lehengiyên xwe bûne destan û mohra xwe li çanda Kurdan xistine jî hene.

Hetanî sedsala 19'an, ji derveyî herikîna xwezayî, asîmilasyoneke bi plan û program a bi darê zorê çênebûye. Her çiqas di navbera împaratoriyên Sefewî û Osmanî de hatibin dabeşkirin jî Kurd, bi çanda xwe dijîn. Çawa ku di bin bandora wan împaratoriyan de dimînin wisa jî bandorê li wan dikin. Dogan Avcıoglu di pirtûka xwe ya bi navê 'Türklerin Tarihi'(Dîroka Tirkan-5) de, diyar dike ku hin Tirk asîmîle bûne û bûne Kurd, hin Kurd jî asîmîle bûne û bûne Tirk. Avcıoglu dibêje ku ev danûstendin hê di dema mîrîtiyan de dest pê dike. Mustafa Akyol, di berhema xwe ya bi navê 'Kürt Sorununu Yeniden Düşünmek' (Ji Nû ve Fikirîna li Kêşeya Kurdan) de, di jêgira ku ji David Mc Dowall girtiye de wiha dinivîse: "...Berî pêşketina Osmaniyan (jî), bi giştî tê qebûlkirin ku koka eşîrên Tirkmen ên li Anatoliya Rojava ji tevlîhevbûna Tirkmen û Kurdan pêk tê..."[169]

Heta serê sedsala 19'an bi piranî ne netewe, dîn di pêşiyê de ye. Lê belê di her du sedsalên dawî de, di navbera neteweyan de gelek pirsgirêk derketin. Ev bayek bû ku li dinyayê tevî belav dibû. Bi pêşketina hişmendiya neteweyî re êrîşên neteweyan ên li dijî xwebûna hevdu zêde dibûn. Her neteweyê nirxên xwe bilind dikir û êrîşî neteweyên din dikir. Ev hişmendî li hin cihan xwezayî derketiye, lê li hin cihan bi sorkirina hin hêzên xwedî armancên cuda netewe bi ser wilo de hatine ajotin. Bi vî awayî şerên mezin derketin û gelek neteweyên ku di bin banê împaratoriyan de bûn ji hev veqetiyan.

Her çiqas êrîşên ku li dijî nirxen neteweyî yên Kurdan di sedsala 19'an de dest pê kiribin jî, sedsala 20'an di vî warî de hê gelekî girantir derbas bûye. Her wiha sirgûn û koçberiyên di vê sedsalê de hatine kirin jî, ji mînakên di dema Dewleta Osmanî de zêdetir û gelekî mezintir in.

Heger em derbasî serê mijara xwe, sedsala 20'an bibin, di dema destpêka Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Kurdên ku bi êrîşên Rûsyayê re rû bi rû man, ber bi başûr ve koçberiyeke mezin dijîn. Dûre koçberî û qetlîamên li dijî Ermeniyan pêk tên. Di heman demê de, gelên din ên xirîstiyan jî bi heman serencamê re rû bi rû dimînin. Ji bo nimûne, di dema şer de bi dehhezaran Asûrî ji bûyerên ku hatin serê Ermenan ditirsin û tevî malbatên xwe direvin Îranê, li herêma Rezaiyeyê bi cih dibin. Piştre xwestine paş de vegerin lê gelek

[169] Mustafa Akyol, bnb., r. 63

alozî û pevçûn pêk hatine. Bi vî awayî ev gelên ku bi hezar salan bi hevdu re jiyane, bi vî bayî re ketine dijberî hev. Di vê navberê de bi hezaran însan mirine, hatine sirgûnkirin û perîşaniyeke mezin bi serê wan de hatiye.

Di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Ermenî, bi windahiyeke nêzîkî mîlyon û nîvekê rastî nîjadkujiyê hatine. Dewleta Osmanî piştî şer xwest ku tiştên anî serê Ermeniyan bîne serê Kurdan jî. Vê carê ji bo Kurdan fermana sirgûnê tê dayîn. Ersal Yavî, di berhema xwe ya bi navê 'Kürdistan Ütopyası' (Utopyaya Kurdistanê) de li ser qanûnên ku ji hêla îtihatperweran ve hatine derxistin wiha dibêje, "...îtihatperwer, ji bo ku berî şer bidawî bibe bigihîjin armanca xwe, di der barê belavkirina xelkê Kurd ê li gundên Tirkan hin ferman û biryarname derxistin. Di vê tertîpkirinê de, xwestin ku hejmara Kurdan a li qadên nû yên îskanê ji %5-10'ê nifûsê derbas neke. Şexsiyetên Kurd ên ku dihatin nasîn û serekên eşîran jî wê li bajarên Anatoliya Rojava bihatina bicihkirin û wê di malên xwe de di bin çavan de bihatina girtin. Her wisa wê destûr nehata dayîn ku bi hevdu re yan jî bi mirovên xwe yên ku li herêmên bejahî hatibûn berbelavkirin re têkiliyan deynin. Demeke kurt berî bi dawîbûna şer, îtihatperwerên ku bi daxwazeke mezin ev polîtîka kiribûn meriyetê, bi eşîrên 'bi qayîş' ên ku hikumetê ji bo wan bîne ser rê zehmetî dikişand û serekeşîrên 'serhildêr' dest bi kar kirin. Bi hezaran Kurd bi darê zorê şandin qorzîkên windayî yê Anatoliya Rojava. Ji nîvê van sirgûniyan zêdetir, bi rê de ji birçînan an jî ji ber sermayê mirin an jî nexweş ketin. Piştî bi dawîbûna şer ji van pir kêm kesan karibûn li xaka xwe vegerin. Li aliyê din gelek kesên ku li cihê sirgûnê man di encama şert û mercên bêkarbûn û nexweşiyan de ketin halekî pir xerab.

Ji vê yekê jî wêdetir, Artêşa Osmanî bi hinceta mecbûriyeta leşkerî beşeke mezin a kesên ku li herêmên Amed, Mûş û Bedlîsê dijiyan ji erdên wan derxist û bê cih û war hiştin..."[170] Yavî, di jêrenota xwe de jî wiha dinivîse: "Di çavkaniyên cur bi cur de tê îfadekirin ku hejmara kesên şandine sirgûniyê ji 700.000'î ne kêmtir e."

Agahiyên Bruînessen ên têkildarî vê mijarê wihan in: "...di 1919'an de bi fermaneke hişkere ya ku ji hêla Hikumeta Stenbolê ve hatibû dayîn, hatibû plankirin ku Kurd ji serekên xwe yên eşîran û rêberên olî cihê, wekî komên ku 300 kesî derbas nekin bihatina dabeşkirin û li bajarên rojava bi awayekî ku cihê lê bên belavkirin gerek ji sedî pêncan derbas nekin, wê bihatina belavkirin."[171]

[170] Ersal Yavi, bnb., r. 85-86
[171] Martin van Bruinessen, bnb., r. 152

Li dewletên nû yên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn hatin avakirin, ev kirin hê dijwartir hatin pêkanîn. Bi taybetî jî ferasetên netewdewletî bi xwe re problemên mezin anîn. Ji ber ku van dewletan xwest ku her kesê di nav sînorê xwe de di potayekê de bihelîne û wan bike neteweyeke tenê. Împaratoriya Osmanî û Împaratoriya Habsburgê ya li Avusturyayê ku pirneteweyî bûn, li hemberî kêmneteweyên di nav xwe de ji dewletên ku piştî wan li ser heman erdê hatin avakirin zêdetir bi xweşbînî û musamaha bûn.

Di beşa dîrokê de em li ser 'piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn Kurd çawa hatin parçekirin' sekinîbûn. Kurdên ku bi sînorên piştî salên 1920'î hatin qebûlkirin di navbera çar dewletan de hatin dabeşkirin, êdî li Tirkiye, Sûriye, Îraqê koma etnîk a herî mezin a duyem in, li Îranê jî ya sêyem in. Bi vî şeklî ligel ku xwedî nifûseke mezin û jiyangeheke fireh in jî, di dewletên ku ew tê de ne diketin rewşa kêmeneteweyan. Di welatê xwe de bûne kêmenetew. Di encama vê rewşê de Kurd di nav dewletên cihê cihê de bi rêveber û rêveberiyên pir cihê re rû bi rû man. Lê belê, li hemû parçeyan tiştê hevpar ê ku bi serê Kurdan de dihat zordarî, asîmilekirin û koçberkirina wan bû.

Asimilasyon di dibistanan de pir bi rêk û pêk hat meşandin. Di perwerdehiyê de 'milî'bûn di ser her tiştî re hat girtin. Zimanê neteweyên serdest bû zimanê fermî, Kurdî jî hat qedexekirin. Dîroka fermî ne li gor rastiyan, bi awayekî siparîşkirî li gor xwesteka îdeolojiyên fermî hat amadekirin. Hema bibêje dîroka hemû neteweyên xwedî dewlet hat nepixandin, a Kurdên ku tu maf di destê wan de nehatibûn hiştin û wekî kêmenetew mabûn jî her tim biçûk hat xistin. Rastî hatin berevajîkirin. Bi kinayî ji bo asîmilasyonê plan û programên dûrî aqilan hatin çêkirin.

Axilbe li Tirkiyeyê di sala 1923/24'an de riyeke nû hişkere dibû. Piştî van salan êdî tenê 'Tirk' hebûn. Bi makeqanûna ku di sala 1924'an de ket meriyetê ziman, çand, kesayetî û hebûna Kurdan dihat înkarkirin. Hemû zanavên netewî û kêmnetew, êdî dê di çarçoveya têgihên 'Tirkîtî' û 'Hemwelatîtiya Tirk' de bihatina fikirîn. Li gor Îsmaîl Beşîkçî, "Ev dihat vê maneyê, êdî kesên ji neteweyên din bi qasî ku nasnameya xwe înkar bikirina, ango bi qasî ku bibûna Tirk dê bibûna xwediyê heq û hiqûqê. Ji bo ku ew bi Tirkan re miameleyeke hevpar bibînin lazim e ku ew nasnameya xwe ya rastîn înkar bikin."[172]

Halbûkî Kurd û Tirkan ev dewlet bi hevdu re ava kiribûn. Di salên ku Komara Tirkiyeyê dihat avakirin gelek kesên Kurd pêşiyê li cem Osmaniyan cih girtibûn, piştre jî piştgirî dabûn tevgera Mustafa Kemal. Mustafa Kemal,

[172] İsmail Göldaş, Takrir-i Sükun Görüşmeleri, r. 222

çawa ku tevgera xwe dide destpêkirin bi gelek rêberên Kurd re têkiliyeke germ datîne û wan ji bo ku bi wî re tevbigerin îkna dike.

M. Akyol diyar dike ku M. Kemal çend rojan piştî Kongreya Sêwasê, ji Hecî Kaya û ji Mustafa Axa re yê ji malbata Şatiyan e telgrafekê dişîne û dibêje, 'Hetanî mezinên wekî we bi namûs û oldar hebin, Tirk û Kurd dê wekî du birayên heqîqî ku nikaribin ji hev cihê bibin bi hev re bijîn.'[173] Di meclîsa pêşî de nêzîkî nîvê mebûsan Kurd in û di axaftinan de îfadeyên bi vî rengî her tim hatine bikaranîn. Yek ji sedemên biserneketina Kurdên ku ji bo serxwebûnê xebitîne jî helwesta vî qismî ye. Wekî mînak, Bedîuzzeman Saîdê Nursî, Ahmet Arif û Mehmet Siddik, li ser navê Kurdan bi nivîseke hevpar ku di rojnameya Vakîtê de dane weşandin Şerîf Paşêyê ku Peymana Sevrê îmze kiriye şermezar kirine. Vegotinên der barê helwestên bi vî rengî de di beşa dîrokê de cih digirin.

Têkoşîna ku di dîroka Tirkiyeyê de cihekî girîng distîne û wekî Şerê Rizgariyê tê binavkirin, bi piranî têkoşîna ku ji hêla Kurdan ve li başûr li dijî hêzên rojavayî hatiye meşandin e. Li gor peymana Sewrê sînorên Tirkiyeyê, bi gelekî di ser bajar û bajarokên wek Dîlok, Riha, Mêrdîn û Nisêbîn re derbas dibû. Ji dagirkeriyê rizgarkirina van herêman ku niha li başûrê Tirkiyeyê cih digirin, bi têkoşîna Kurdan pêk hatiye. Wekî ku berê jî hat diyarkirin, gel li hemberî dagirkerên biyanî welatê xwe diparast. Piştî ku welat ji dijmin bihata rizgarkirin, pirsgirêkên mayî dê di navbera her du miletên bira de bihata çareserkirin. Lê belê piştî demekê helwesta dewletê wê gelekî bihata guhertin, wê birayek tune bihata hesibandin û bi her awayî wê biketa bin tehdeyê.

Esas tevgerên Topal Osman der barê tiştên ku wê paşê bihatina kirin sînyal didan. Di dema serhildana Koçgiriyê de, di Nîsana 1921'an de Topal Osman bi şîdeteke dijwar êrîşî ser Kurdan kiriye. Wê demê encamên ku ji ber nêziktêdayîna nîjadperest derketine holê em ji nivîseke Lazarev neql bikin: "Di serê adara sala 1921'an de li Koçgiriyê ku li herêma Dêrsimê ye îsyaneke Kurdan a biçûk çêdibe, bi gelek yekîneyên ku ji eniya Yûnanan jî tînin ji bo perçiqandina îsyanê tên şandin. Encax ber bi dawiya meha avrêlê ve Nureddîn Paşayê fermandarê yekîneyan zoriya serhildêrên Kurdan dibe, piştî vê yekê jî wekî hemû caran rêveberan serî li cezayên giran dane.

Di warê bêdengkirina Kurdan û kêmnetewên din de bi taybetî nav û dengê feodal Topal Osmanê Gîresûnî belav bûye. 'Wî, bi mufrezeya ku ji danheva lazên dilxwaz pêk aniye herêmên Kurdan ên li Rojhilatê Anatoliyê

[173] Mustafa Akyol, bnb., r. 67

û herêmên Rûman ên li sencaxa Semsûnê wêran kiriye. Mufrezeyê rêbaz û qaîde li gorî xwe pêk anîne, yanî cihê ku ew tê re derbas bûye, xurî xopan bûye' M. V. Frunzeyê ku ev rêzik nivîsandine piştre behsa 'rewşa hovane ya têkoşîna netewî ya hayê wê ji merhametê tune û bêyî bibêje mezin û biçûk, jin û mêr miletekî bi miletekî din dide qirkirin' dike."[174]

Piştî 1924'an, êdî wê ji biratiya Kurd û Tirkan a ku heyanî Peymana Lozanê ji ser zimanan nakeve tu tiştek nemîne. Di xala 41'ê a Plana Islaheta Şerqê de ku di sala 1925'an de dikin meriyetê, Kurdî tê qedexekirin. Ahmet Kahraman di berhema xwe ya bi navê 'Kürt İsyanları' (Serhildanên Kurdan) de li ser vê mijarê wiha dinivîse: "...Biryara 'tunebûna' Kurdan ku heta berî bi salekê jî wekî 'bira' û hevparê dewletê dihatin nîşandan, zimanê wan qedexe dikin. Di xala 41'ê ya Plana Islaheta Şerqê de wiha dihat gotin: 'Li navêndên bajar û navçeyên Meletî, Elezîz, Amed, Bedlîs, Wan, Mûş, Riha, Erxenî, Xozat, Erdîş, Xelat, Palo, Çarsancak, Pulur, Semsûr, Besnî, Arga, Hekîmxan, Bîrecûk û Çermûkê, kesên ku di daîreyên hikumet û şaredariyan de û di saziyên din de, di dibistan, sûk û bazarê de ji bilî Tirkî zimanekî din bi kar bînin wê bi lidijderketina fermana hikumet û şaredariyan bên tawanbarkirin û bên cezakirin.' Piştî vê biryarê, li kuçeyê axaftina bi Kurdî sûc bû, cezayê vî sûcî jî peredayîn û lêdan bû. Gundiyên ku mehsûl û berên xwe dianîn bazarê, ji bo ku ji cezayê pereyan û lêdanê xilas bibin neçar diman ku bi mişteriyên xwe re wek lalan bi hereketên çepil û destan têkevin têkiliyê."[175]

Mustafa Akyol, di berhema xwe ya navborî de dinivîse ku bi serdema Takrîr-î Sukun a ku ji bo perçiqandina serhildana Şêx Seîd tê destpêkirin, projeya ku Kurdan ji hêla etnîkî û çandî ve tune dihesibîne û 'ji wan re vebêje ku esas ew Tirk in', tê pêkanîn. Sedema vê yekê jî wiha tîne zimên: "Komara nû, ditirse ku di encama vê serhildanê de vê carê jî li rojhilat trajediyên wek ên Balkanan pêk bên, loma jî polîtîkayên 'entegrasyon'ê yên ku di dema têkoşîna milî de bi awayekî serkeftî hatin pêkanîn diterikîne û bi lez derbasî polîtîkayên 'asîmilasyon'ê dibe." Ev vegotin, hişkere diyar dike ku di demeke kin de dev ji polîtîkayên dema Şerê Rizgariyê tê berdan. Akyol, dinivîse ku bi demê re nêziktêdayîna kesên wekî Riza Nur dikeve pêşiyê (ku wî wekî mirovekî nîjadperest û bêdenge terîf dike) û polîtîkaya Kurdan a salên pêş jî ji hêla vê ferasetê ve tê diyarkirin.[176]

Nivîskar Îbrahîm Guclu jî der barê mijarê de wiha dibêje: "Tiştekî ku pir zelal tê zanîn heye, ew jî piştî avakirina Komara Tirkiyeyê di demeke kurt de

[174] M. S. Lazarev, Emperyalizm ve Kürt Sorunu(1917-1923), r. 235
[175] Ahmet Kahraman, bnb., r. 115
[176] Mustafa Akyol, bnb., r. 83

hebûna Kurdan a netewî tê înkarkirin. Angaşta 'Kurd Tirk in' wek bîrdoziya fermî ya dewletê tê pejirandin. Piştî ku hebûna Kurdan hat redkirin, di Komara Tirkiyeyê de nîjadkujî û konsepta tunekirina Kurdan derket pêş.

Li gor pêdiviyên şert û mercan meşandina vê nîjadkujiyê geh bi awayekî veşartî û geh hişkere hat pejirandin. Yek ji kirinên vê nîjadkujiyê, qetlîam, jenosîd û tehcîr e. Komara Tirkiyeyê di demên cur bi cur de û bi taybetî jî di navbera salên 1919 û 1940'î de ev yek meşandiye. Pêkanîna duyem a nîjadkujiyê jî bi riya asîmilasyonê Tirkkirina Kurdan û ji holê rakirina wan e. Komara Tirkiyeyê ev nêzîkî 100 salî ye, vê sepana ku di dema Osmaniyan de dest pê kiriye pêk tîne."[177]

Hetanî salên 1930'î zordarî, êrîş û sirgûn bi hawayekî qebe tên meşandin. Lê belê piştî vê demê li Tirkiyeyê ji bo asîmilasyonê sepandinên hê sîstematîktir tên pêkanîn. Di sala 1930'î de û piştî wê ji bo vê yekê civîn tên lidarxistin, konferans tên dayîn, heyet tên sazkirin, riyên ku dê bên şopandin tên plankirin, pirtûkên têkildar tên nivîsandin. Bi van xebatan di heman demê de bingeha Saziya Dîroka Tirk û Zimanê Tirk tê çêkirin. Di vegotinan de bilindahî û mezinahiya nîjada Tirk û ezameta wî tê îfadekirin; tê destnîşankirin ku hemû şaristanî û çand ji hêla Tirkan ve hatine afirandin. Her wisa di Komcivînên Zimanê Tirkî de hewl tê dayîn da bê ispatkirin ku Tirkî çavkaniya hemû zimanên cîhanê, zimanên Hînt-Ewrûpî û zimanên Samî ye.

Ji bo ku ev roj baştir bên fêmkirin, em li giştînameyeke bi damgeya 'gelek veşarî û mexsûsî zat e' ya sala 1930'î ya Wezîrê Karên Navxweyî yê KT'yê binêrin;

"Divê neyê jibîrkirin, cilûberg, stran, lîstik, dawet û cemiyet, adet û çand ku hîsa miliyet û nîjadî daîma zindî digirin, ew pêwendiyên ku cemaetan bi rabirdûya wan ve girêdidin in. Ji ber vê yekê ligel lehçeyê divê ev adetên nelirê jî xirab û bizirar bên dîtin, bi taybetî xirab bên nîşandayîn û nehêlin dilbijandina wan bi tu awayî çêbibe. Divê tim bi devavêtin behsa wan bê kirin û divê kirêt bên nîşandayîn. Divê nav û leqabên kes û malbatên ji zumreyên ku bi wî lehçeyî diaxivin bên Tirkîkirin, bi her fersendê re qeydên wan ên di nifûsê de divê bên tashîhkirin û divê bi tu awayî leqabên wekî Boşnak, Çerkes, Laz, Kurd, Abaza, Gurcu, Tirkmen, Tatar, Afşar û Pomak ji bo wan neyên dayîn. Divê navên gundan ên bi wî lehçeyî bên guhertin û wekî mînak divê ji bo navên wekî Gundê Çerkez û ên cihê yên her wekî din destûr neyê dayîn û nehêle bête dayîn. Divê em niştecihan hînî vê yekê bikin, divê em wan di malên wan de bi Tirkî bidin axaftin û divê em bikin ku ji dil û can ji

[177] 18 Sibat 2008, www.haberdiyarbakir.com

xwe re bibêjin em Tirk in. Bi kurtasî ji bo her kesekî Tirk wezîfeyeke girîng û netewî ye ku divê em ziman, adet, daxwazên wan bikin Tirk û wan bi dîrok û qedera Tirkan ve girêbidin."[178]

Îsmaîl Beşîkçî, di berhema xwe ya bi navê 'Türk Tarih Tezi-Güneş Dil Teorisi ve Kürt Sorunu' (Teza Dîroka Tirk-Teoriya Zimanê Rojê û Pirsgirêka Kurd) de îdeolojiya fermî ya ku di salên 1930'yî de bi pêş xistine bi hemû aliyan radixe ber çavan. Beşîkçî, di merheleya çêkirina Teza Dîroka Tirk de, nêziktêdayînên ji derî zanistê yên kesên ku di Komcivîna Ocaxên Tirkan (Türk Ocakları Kurultayı) ku di 23'yê Avrêla 1930'yî de hatibû lidarxistin axivîbûn neqil dike. Beşîkçî axaftina yek ji axêvgerên komcivînê Bayan Afet (Înan)ê wiha dinirxîne: "Mamosteya Dîrokê Bayan Afet (Prof. Dr. Afet İnan), dema agahiyên Ewrûpiyan yên der barê Tirkan de derpêş dike, vegotineke muphem bi kar tîne û wek ku ev agahî kêm û şaş in; lê dema dibêje ku şaristaniyên Mezopotamya, Misir, Gîrît, Ege, Çîn û Latîn ji hêla Tirkan ve hatine avakirin û bipêşxistin bi zimanekî teqez îfade dike. Diyar dike ku Sumerî, Elamî, Akadî û Hîtîtî Tirk in û şaristaniyên Mezopotamya, Misir, Çîn, Gîrît, Ege, Latîn û Anatolî ji hêla Tirkan ve hatine avakirin û wek 'heqîqeteke mezin ku reda wê ya ilmî ne gengaz e' derpêş dike. Axêvgerên din jî bi heman awayî tevî van fikaran dibin.

Xala duyem a ku divê li ser bê sekinandin jî ev e: Axêvger, bi fikara ku di der barê dîroka Tirkan de bi zanetî agahiyên şaş û kêm derpêş dikin ji Ewrûpiyan bi gazin in. Lê belê ji bo ku ji ramana xwe re bingehekê deynin dîsa serî li zanayên Ewrûpî didin."[179]

Beşîkçî, di derbarê ku Tirk eynî helwesteke wekî ya Ewrûpiyan a ew bi xwe jê bi gazin in li hemberî Kurdan datînin wiha dibêje: "...'zanyarên Tirk' ên ku gazin dikirin û digotin 'navên Tirkan ji dîrokê derdixistin. Dixwestin ji pirtûkan, ji zimanan derxînin, tune bikin', ji bo ku hebûna Kurdan a di dîrokê de tune bikin, navê Kurdan, navê Kurdistanê ji ser zimanan rakin û ji pirtûkan derxînin ketibûn nav hewldaneke derasayî. Bi zanatî agahiyên şaş afirandin. Li hemberî hebûna Kurdan çavên xwe girtine û Kurd tune hesibandine. Ji ber vê yekê, divê em xaleke din jî deynin vir. Ji ber ku ev di afirandina bîrdoziya fermî de xaleke gelekî girîng e."[180]

A. M. Menteşaşvîlî jî di berhema xwe ya bi navê 'Dünden Bugüne Kürtler' (Ji Doh Ber Bi Îro Ve Kurd) de wiha dinivîse: "Pirtûkên Kurdî hatin berhevkirin û şewitandin. Peyvên 'Kurd' û 'Kurdistan' ji hemû pirtûkên

[178] Mehmet Bayrak, Kürtler ve Ulusal, Demokratik Mücadeleleri, r. 508-509
[179] İsmail Beşikçi, Türk Tarih Tezi-Güneş Dil Teorisi ve Kürt Sorunu, r. 21-22
[180] İsmail Beşikçi, bnb., r. 79

dersê hatin derxistin. Di van pirtûkan de ji bo Kurdan, Tirkên çiyayî dihat gotin. Axa Kurdan ji dinyaya derve hat tecrîdkirin. Gera biyaniyan a di bajarên rojhilat de hat qedexekirin."[181]

Di heman demê de wekî ku li jor jî behsa wê hat kirin, navên gelek gund û cihan hatin guherandin. Ev, di sala 1949'an de di qanûnan de jî hat bicihkirin. Di 23'yê Avrêla 2008'an de, Mebûsê DTP'ê yê Şirnexê Hasîp Kaplan ji bo ku navên kevn û nû yên mezrik, gund, nehiye, navçe, bajar û cihên cografîk ku navên wan hatine guhertin ji nû ve bi hev re bi nivîskî bêne bikaranîn, pêşniyazqanûnek da Serokatiya Meclisa Mezin a Miletê ya Tirkiyeyê (TBMM). Kaplan, der barê mijarê de di parlamentoyê de daxuyaniyek da, da zanîn ku guhertina navan 1925'an de dest pê kiriye, di sala 1949'an de jê re bingeheke qanûnî hatiye çêkirin û di sala 1957'an de jî 'Lijneya Îhtîsasê ya Guhertina Navan' hatiye avakirin.

Tiştên ku tên kirin, nivîsandin û gotin gelekî ji serdema em tê de ne dûr in. Dîtinên Bayan Afet (Înan)a ku di sala 1930'yî de, di Komcivîna Ocaxên Tirk de diaxivî û Tirk wekî miletekî xwedî dîrokeke bi deh hezar salan kevn, arî, medenî û ji nîjadeke bilind û xwedî qabîliyeteke mezin didit û pê serfiraz dibû, ji nêziktêdayîna zanistî gelekî dûr in. Li aliyê din Înan, wekî ku hetanî îro her tim tê kirin, hem arîtiya Kurdan dikir malê xwe û nirxên Kurdan dikir ên xwe, hem jî Kurdên ku ji nîjada wê bi pesn behs dikir tên, tune dihesiband. Heger ku em bibêjin di salên 1930'yî de hê lêkolînên der barê hin mijarên zanistî de rûneniştibûn, piçek be jî dibe ku mirov hinekî helwestê fêm bike. Lê belê, berdewamkirina vê helwesta derzanistî ya hetanî van demên dawî dibe sedema nêziktêdayînên trajîkomîk.

Azîz Nesîn, ev rewş bi uslûba xwe ya xurt, bi awayekî herî baş aniye zimên. Ji ber nivîsa wî ya ku li ser pirsgirêka Kurdan nivîsîbû doz lê hatibû vekirin. Di 30'ê Pûşpera 1988'an de, Azîz Nesîn di parêznameya xwe ya di danişîna li Dadgeha Ewlehiya Dewletê ya Stenbolê de wiha digot: "Serokatiya Serfermandariya Giştî ya T.C. hê beriya 12'ê Rezbera 1980'yî, ji bo ku ji gelê me re vê pirsgirêka Kurd a pir cidî vebêjin, efserên xwe peywirdar kir. Ev efser (kurmay subay) bajar bi bajar li hemû Tirkiyeyê geriyan û esehiya bê ka pirsgirêka Kurdan çi ye vegotin...

Rêzdar Serpel (Yüzbaşı) Oguz ku peywirdarê saziya Komara Tirkiyeyê ya herî cidî ya Serokatiya Serfermandariya Giştî bû, li ber mîkrofonê ji komek xilbe yê xelkê re, li ser Kurdên ku pirsgirêka herî cidî ya Tirkiyeyê ne, eynî wiha digot: (Ji axaftina wî tenê hin beşan digirim)

---

[181] A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 188

'.....Hevalno, em ê tu demê neyên lîstikê. Wê haya me ji gotinên me hebin. Me dît ku ezbeta (qebîle-boy) jê re dibêjin Kurd, birayên Tirkan in. Ji heman şaxê ne. Lê belê ji bo ku em keysa dijminan xweş nekin heta ku mimkun be em ê navdayîna "Kurd" bi kar neynin. Di hemû berhemên Serfermandariya Giştî de, di belgeyên dîroka herbê de ji bo wan Tirkmenên Rojhilatî tê gotin. (.......) Li herêmên bilind ên çiyayan de, li ser giran, berfeke ku havîn û zivistanan nahele hebû. Dema ku rojê lê dida rûyê vê berfê bi tebeqeyeke qeşayî ya mîna şûşeyê biroqonkî dihat girtin. Jora wê hişk dibû, binê wê jî nerm dima. Dema ku mirov li ser vê berfê dimeşiya, cihê ku mirov lingên xwe datanî diçû xwarê û dengê wekî "kart-kurt" derdixist. Sedema ji Tirkmenên rojhilat re "Kurd" hatiye gotin ev e. Yên cihêxwaz jê re dibêjin "Kurd", di rastiyê de navê dengê dema Tirkmen li zozan û herêmên bi berf digeriyan ji ber lingên wan derdiket e.'

Birêz Serok û Birêz Endamên Lijneya Dadgeran! Îcar ez, ji ber ku min ji Tirkmenên li çiyayên bilind ên ku dema pê li berfê dikin dengekî wekî "kart-kurt" derdixin gotiye Kurd û mafên wan ên çanda netewî parastiye ez têm sûcdarkirin, ez li pêşberî we me, ku tu carî ez bi vê xwe wek sûcdar qebûl nakim.

Qet hewce nake ez bikevim nav hewldana nîşandana nefsbiçûkiyê, ne tenê yê Tirkiyeyê ez yek ji nivîskarên mîzaha nûjen a dinyayê yê naskirî me; lê ez li xwe mikur têm ku ez ê nikaribim pêkenokeke wilo delal, ji şibandina dengê "kart-kurt" îlhamê werbigrim û bibêjim Kurd Tirk in, biafirînim. Bi ser halan de ev, gotinên serkan serpelekî ne û di nav weşanên Serfermandariya Giştî de derketiye ku divê saziya herî cidî ya Komara Tirkiyeyê be."[182]

Ji bo fêmkirina sedemên nêziktêdayîn û pêkanînên bi vî rengî divê ew serdem baş were fêmkirin. Demên dawî ên dewlata Osmanî bi şeran derbas bûye û her tim winda kiriye. Dema ku Tirkiye hatiye avakirin erdên mezin ji dest çûne. Tenê beşeke erdên Kurdistanê di destê van de maye. Ji bo ku ev erd ji dest neçe, çi pêwîst bike dê bê kirin. Hêrs û kîna ji ber erdê ku berê hatiye windakirin jî wê di vê navberê de bê derxistin. Ji ber wê yekê, bi awayekî dûrî aqilan bi ser Kurdan de diçin. Bûyerên di serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê de qewimîne ne normal in. Para derûniya vê yekê mezin e. Di bin vê bêmerhametiyê de hînbûna kuştin û mirinê ya di şerên ku bi salan berdewam kirine jî heye.

[182] Aziz Nesin, bnb., r. 50

Li aliyê din, her çiqas zêdetir acizî li hemberî Kurdan hatibe nîşandayîn jî, bêtehamuliya li dijî reng û dengên cihê problemeke giştî ye. Bi gotina Vedat Turkalî, 'Di rojên dema qetilkirina Kurdan a Koçgiriyê de, rêberên komunîst li Derya Reş di nav takayekê de hatine kuştin û ew avêtine behrê. Di salên nîjadkujiya Dêrsimê de, pêşengên şoreşa komunîst Dr. Hikmet Kivilcimli, Nazim Hikmet û Kemal Tahîr bi alîgirên xwe ve, bi darizandinên sexte yên Harbiye, Donanmayê di navbera 15 û 30 salan de cezayê hepsê hatine cezakirin.'[183] Piştî bi salan, li Tirkiyeyê di demên derbeyên leşkerî de bidarvekirina serokwezîr, cezadayîna hin serokwezîr û wezîrên din berdewama wê nêziktêdayînê ye.

Di vir de divê mirov nêziktêdayîna ji bo Tirkîtiyê bi bîr bîne. Di dema Dewleta Osmaniyan de problemên têkildarî Tirkîtiyê di vê serdemê de bûne sedema nepixandina têgiha "Tirkîtî"yê. Vedat Turkalî, di berhema xwe ya bi navê 'Özgürlük İçin Kürt Yazıları' (Ji bo Azadiyê Nivîsên li Ser Kurdan) de wiha nivîsiye: "Di dema Osmaniyan de Tirk her tim biçûk hatine xistin. 'Etrâk-ı bêidrâk' in. Nabiyê hozan ê Kurd dibêje, 'Heq ji Tirkan re çeşme-i îrfan heram kiriye. Di pêvajoya kapîtalîstbûna Osmaniyan de jî ev qeder neguheriye. Hemû çavkaniyên qezencê di destê Levantenên ku bi biyaniyan re bi hevparî kar dikirin de bûn, an jî di destê Osmaniyên ne misilman de bûn; zenaet û hunerên biçûk jî di nav de. Heger şûr girênedabe û nebûbe leşker, an jî bi riya 'ilmiye' û 'mulkiye'yê wekî memûr xwe neavêtibe nav îşên dewletê, li bajêr karê ku para wî dikeve hemaltî, li gund jî xebata wek koletî ye. Ji vê wêdetir tu mahareta Tirkan tune ye! Kemalîstan dema dest bi kapîtalîzmê kir, pêşiyê bi vî dîwarê moralê têk dibe re rû bi rû man. Tirkan wê çawa riyên hesinî bişixulandina. Belkî karibûn meqeskerî bikirina! Lê çi îşê wan bi xebitandina banqeyê hebû; encex dikaribûn dergevanî û qewastiyê bikin!... A herî girîngtir baweriya Tirkan jî bi vê yekê anîbûn. Loma di vê demê de, ji bo hêza pêngava netewî bi Tirkan bidin qezenckirin serî li dirûşmên wekî 'Tirko, wesfê xwe bide, bixebite, ji xwe bawer bike!' (Türk, öğün, çalış, güven!) û 'Xwezî bi wî ku ji xwe re dibêje ez Tirk im!' (Ne mutlu Türk'üm diyene!) hatiye dayîn. Ev bi hinceta ku bi kêrî hişyarkirina 'miletekî mazlûm' ku ji hêla der û dorên emperyalîst ve biçûk tê dîtin, wek gavinên pêşverû jî hatine hesibandin.

Lê belê vê helwestê, li aliyekî jî bingeha ramyarî ya zilma Dewleta Tirk a li ser miletekî din ê mazlûm, ji bo tunekirina Kurdan zilmeke hê girantir pêk aniye û dewlet veguhertiye saziya zordariyan."[184]

[183] Vedat Türkali, bnb., r. 48

[184] Vedat Türkali, bnb., r. 48

Beşîkçî jî li ser vê mijarê disekine û diyar dike ku, ew beşdarî fikra ku tê gotin 'di demên dawî ên Osmaniyan û salên Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, Ewrûpiyan Tirk biçûk didîtin, lewre jî ji bo Tirkan pêwîstî bi ruhekî nû hebû; ji bo vê yekê mirov dikare tiştên hatine kirin mazûr bibîne' nabe.

Heger ku em derbasî helwesta Îranê ya li dijî Kurdan bibin; Îran jî di sedsala 20'an de di gelek guherînan re derbas bû û li hemberî Kurdan gelek zordarî hatin meşandin. Esas di vê serdemê de li dinyayê tevî gelek guherîn, tevlîhevî û şer qewimîn. Împaratorî ruxiyan, şoreşên siyasî û civakî yên mezin pêk hatin û gelek dewletên nû yên xwedî şeklên rêveberiyên cur bi cur hatin avakirin. Di heman demê de, gelek têgihên wekî Sosyalîzm, Nasyonalîzm, Rasîzm (Pan-Turkîzm, Pan-Arabîzm hwd...) Faşîzm, Kolonyalîzm, Laîsîzm û Lîberalîzm ên nû, di vê serdemê de, di nav civakê de hatin guftûgokirin. Têgih hê tam baş nehatine rûniştandin. Bi piranî bi agahiyên kêm û nêvcî şîrove têne kirin, bername tên amadekirin û di pratîkê de têne cîbicîkirin.

Dema Dewleta Osmanî belawela dibe, efserekî ciwan ê bi navê Mustafa Kemal, dibe pêşeng û dewleteke nipînû ava dike. Xelîfetî tê rakirin, dewleteke bi komarê tê birêvebirin tê avakirin. Ev rewşek e ku di dema Şerê Rizgariyê de pareke mezin a însanan nikarin bifikirin û xeyal bikin. Di dema Şerê Rizgariyê de, di çarçoveya bidûrxistina dijmin a ji welêt gelek der û dorên cihê hatine cem hev û daxwaza her kesî ya ji vê rêveberiyê cihê ye. Lê belê piştî avakirina dewletê hêza razemeniyê ya hin der û daron zêde bûye, hinek jî bê bandor mane. Ji ber ku rêveberiyeke nipînû û cihê heye, memleket bi rewşên gelek cihê re rû bi rû dimîne. Hin tişt rast nehatine bicihkirin. Di vê rewşa aloz de, wekî înkarkirina Kurdan, ev rêveberî ketiye rotayeke ji rastiyê dûr û ev gava yekem a ku xelet hatiye avêtin her roja ku çûye bi xwe re xeletiyên hîn mezintir aniye.

Di vê serdemê de, li Îranê Riza Xanê ku efserekî Kazakî ye û di warê karên siyasî û çandî de tu tecrûbeya wî tune ye, derdikeve ser dika siyasetê û hin planên islahetê diavêje holê. Di dema navbera Şerê Cîhanê yê I'em û II'yem de, li Rojhilata Navîn islahet bi heman gotinan dihat kirin. Nûxwazî, rojavaparêzî, sekna li dijî bastûra kevneşopî û neteweperestî gotinên sereke yên hevpar bûn.

Di van gavên ku yek ber bi pêş, du ber bi paş ve ne, bandora sazîbûyîna kevn bi hêsanî nehat şikênandin. Di encamê de di sehneya siyasetê de, kesên ku di riya ber bi dîktatoriyê de meşiyan derketin. Li hin cihan, di guherînên çandî yên ku bi zorê dihatin pêkanîn biryarên radîkal hatin girtin. Hin caran, hin tiştên ku di dewletekê de dihatin pêkanîn, bêyî ku li rastiya wê bê

nêrîn bê ka lê tê yan nayê, di dewleteke din de jî dikirin meriyetê. Wek nimûne, li Îranê gelek pêkanînên li Tirkiyeyê mînak hatin stendin û ketin meriyetê.

Di temamiya 20 salên desthilatdariya Şah Riza de, gelên Îranê bi zordariyên gelek giran re rû bi rû man. Şah Riza dixwest ku Îranê bike netewdewlet. Tehrîfkirina dîroka kevn û nû, guhertina navên bajar û gundan û qedexekirina gelek kevneşopiyên netewî, hin ji wan tedbîran bû ku ji bo afirandina netewdewletê dihatin kirin. Halbûkî li Îranê gelek komên etnîk ên cihê hebûn û hejmara wan jî mezin bû. Ligel ku serjimara netewên ku ne Faris in bi qasî nîvê nifûsa Îranê bû jî, rejîma Şah tu mafekî netewî yê wan gelan nas nekir.

A. M. Menteşaşvîlî, di berhema xwe ya navborî de nêziktêdayîna li Îranê wiha neqil dike: "Hikumeta ku polîtîkaya dewleta mezin dişopand, hebûna gelek kêmneteweyên li Îranê red dikir. Rojnameya Îranê 'Setare' (Stêrk) wiha dinivîsand (28.V.1933): '... Kurd û Lûrî Îraniyên herî xas in. Heçî Tirkên Îranê ne (Azerbeycanî-A. M.), ew di hêla nijadî de ji Farsan ne cihê ne.' Rojnameyeke din a Îranê 'Şefaqê (30.V.1933) jî heman îdîa dida pêş: Hikumeta Îranê û Makeqanûna Îranê di navbera nîjad, ziman, ol û eşîrên ku dikevin bin banê dewletê de tu ferqê nabînin. Her wiha ew bi xwe jî, ji bilî navê Îranê yê bi rûmet naxwazin navekî din li wan bê kirin...'

Mebûsê Meclîsa Îranê Deştî, di rûniştina roja 21'ê Kewçêra 1930'î de ev daxuyanî dida: 'Ji ber ku Kurdên li Îranê wekî kêmneteweyekî nayên dîtin û bi Îraniyan re wekî birayên eşîretî tên qebûlkirin, li vir pirsgirêka Kurdan tune ye.' Mebûsekî dîtir jî bi gotinên 'Hemû eşîr û nîjadên li Îranê xwe wekî Îranî dihesibînin, xwe wekî ewladên malbatekê dihesibînin,' fikrên Deştî dubare dikir. "[185]

Gelek qelemên hêja nêziktêdayîna Îranê ya li hemberî kêmneteweyan gelekî zelal anîne zimên. Ebdurehman Qasimlo jî di vê derbarê de wiha nivîsiye: "Heger ku mirov dabeşbûna Azerî, Kurd, Belûcî û Ereban li ber çavan bigire, hingê mirov dê nikaribe bibêje ev sînor, sînorên neteweyî ne. Çanda ku îro li Îranê tê naskirin çanda Farisan e. Ev çand ne ya Kurdan û gelên din e, bila ev li aliyekî bimîne; çanda wan (Kurdan û gelên din) hatiye binpêkirin, dîroka wan hatiye berevajîkirin û bermayiyên wan ên çandî wekî malê Farisan hatiye nîşandayîn.[186]

[185] A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 180
[186] Dr. Abdurrahman Qasimlo, İran Kürdistanı, r. 53

Yusuf Ziyad jî dibêje, Îran dema ku dîrok û çanda Farisan mezin nîşan dide, li dîroka kêmneteweyan û çanda wan xwedî dertê û wekî malê xwe nîşan dide. Analîstê Navenda Lêkolînên Stratejîk a Kurdistanê di nivîsa xwe ya bi sernavê 'Polîtîkayên Îranê yên Asîmilasyon û Qirkirina Gelan' de helwesta li Îranê wiha vedibêje:

"...pîvana dîrokeke medenî, nûjen, xweşbînî, bi heybet û çandeke dewlemend ew e ku divê hûn Faris bin. Di pirtûkên dersên dîroka fermî yên li dibistanan de tenê Faris hene. Wekî xwediyên hemû qehremaniyên di dîrokê de, xwediyên vê cografyayê, hemû dewlemendiyên dîrokî yên li vir derketine holê, tekane xwediyên îcadan û xwediyê çanda qedîm, Faris têne nîşandayîn. Ji bilî Farisan, cih nadin Kurd, Azerî, Belûci, Ereb, Afgan û hwd. ên li Îranê dijîn. Ev rewş gelan ji dîroka wan û cografyaya wan dûr dixe. Bîra wan a civakî bi wan dide jibîrkirin. Heta îro, di vekolanên ku pêk hatine bi hezaran berhemên dîrokî hatine dîtin û ev berhemên dîrokî tev bar kirine birine muzeyên li bajarên wekî Tebrîz, Tehran û hwd. Di dîroka fermî ya Îranê de, ji ber ku Kurd ji Mediyan nayên hesibandin, ew wekî Persî tên dîtin û ji bo vê yekê jî dibêjin hemû berhemên dîrokî yên derketine holê yên Persiyan in..."[187]

Ligel ku têkoşîneke girîng hatiye meşandin jî rejîma Şah Riza, hebûna neteweya Kurd ku ne tenê di sînorên dewleta Îranê de hebûn, qebûl nekiriye. Wekî ku li jorê jî hat destnîşankirin, digotin Kurd di rastiya xwe de Faris in û weşanên ku ev yek dianîn zimên derdixistin. Doza Kurdan a ji bo mafên neteweyî yên herî kêm bi şidetê hat perçiqandin. Heta bi cilûbergên neteweyî yên Kurdan jî hatin qedexekirin.

Her du dewletan, yanî Îran û Tirkiyeyê cilûbergên herêmê qedexekirin û lixwekirina çaket, pantor û şefqe kirin mecbûrî. Di mijara lixwekirina cilûbergên rojavayî de her du dewletan jî zorî dan gel, lê zordariyên li Îranê pir zêde bûn û dijwariyên wekî hepis, cezakirin, lêdan, jêkirina poran û çirandina çarşefan ku rûmeta mirovan dişkênand hebûn. Ji ber ku Tirkiye hinekî nêzîkî Ewrûpayê ye û her wiha heyranbûna rewşenbîran a ji bo Rojava bû sedema ku ev pêkanîn li Tirkiyeyê di nav hin beşên civakê de zû bên pejirandin. Lê di nav gel de qebûlkirina vê yekê gelekî zehmet bû.

Di van her du dewletan de, nêziktêdayîna ji bo dîn (ol) cihê bû. Di dema Ataturk de hat qebûlkirin ku îbadetên wekî nimêj û bangê bi Tirkî bên kirin. Hêzên dînî hema bibêje bi qasî ku ferqa hebûn û tunebûna wan tune be hatin zeîfxistin. Hemû medreseyên olî yên dewletê hatin girtin. Salnameya

[187] Yusuf Ziyad, Kürdistan Stratejik Araştırmalar Merkezi analisti, www.lekolin.org

Hîcrî hat rakirin û li şûna wê salnameya Mîladî hat pejirandin(1925).[188] Lê li Îranê Şah Riza wek Tirkiyeyê zêde bi ser der û dorên dînî (olî) de neçû.

Li Tirkiyeyê weziyeta hin plan û programên asîmilasyonê ku ji sala 1930'yî dest pê kiriye û heta sala 1936'an bi heyecan berdewam kiriye, esas nîşaneya felaketeke nû ya mezin e. Rêveberên ku ji bo tunekirina Kurdayetiyê bi lezginî tevdigerin, wê serî li zordariyên mezin bidin û bi Serhildana Dêrsimê re dê qirkirin û qetlîamên mezin bên kirin.

Me berê jî destnîşan kiribû, di vê demê de raporeke Îsmet Înonu ya Rojhilat û Başûrê Rojhilat hebû. Piştî bi salan, cara pêşî ev rapora sala 1935'an, di rezbera 1992'yan de di rojnameya Hurriyetê de hat rojevê. Can Yucel (di nivîsa xwe ya ku di 20'ê rezbera 1992'yan de di kovara Gerçek de hatiye weşandin) ev rapor wiha şîrove dikir: "Pêşniyazên serokwezîrê wê demê ku gotineke wî nedibû dudu yê di vê raporê de, helbet kite bi kite têne pêkanîn.(...) Komara Tirkiyeyê di nav xetên ku li Lozanê hatine diyarkirin de, di Tirkkirina Anatoliyê de bi biryar e.(...) Warê hiqûqî û bîrdozî jî bi xetên stûr hatine diyarkirin. Di nav sînorê Tirkiyeyê de her kes hemwelatiyê Tirk e. Û ji bilî Ermen, Rûm û Yahûdiyên ku li Lozanê wekî kêmnetew hatine naskirin hemû alem Tirk e. Ma kare nebe, yên li ber xwe bidin wê bên tenkîlkirin, ên mulayîm jî wê bên asîmilekirin, yanî wê bên şibandin."[189]

Ji bo asîmîlekirina gelê Kurd, ligel ku rapor li ser raporê, plan li ser planê, qanûn li ser qanûnê tên çêkirin jî dilê hinekan rihet nabe. Yên dixwazin di demeke kin de bigihîjin mexseda xwe, ji bo ku ev çanda bi hezaran salan zû bi zû tune nabe xemgîn dibin û her carê hê xedartir bi ser gelê Kurd de diçin. Lê çiqas zilm û zordarî zêde dibin di nav Kurdan de jî hestên milî ew qas xurt dibin, her serhildan di nav gel de lehenginên nû diafirîne.

Li gorî raporeke ku Mufetişê Giştî yê Yekem ê Herêmê Abîdîn Ozmen di sala 1936'an de amade dike, Serhildana Şêx Seîd hesta Kurdbûnê bi pêş dixe û mezin dike: Çi mirî, çi zindî gelek şexsên wekî Ferzende Begê Hesenî, Ado yê Hesenî, Yado, Alîcan, Seyîthan, Adil ê Gevayî, Îzet, Mûsa, Simko Axa, Xalit Begê Cibrî, Xalitê Hesenî, Mazlup Ziyayê Bitlîsî, Îhsan Nûrî di nav gel de wek leheng tên qebûlkirin.

Ozmen, aktorê sereke yê zordariyên ku bi salan li herêmê hatin pêkanîn e. Li gorî fikrên wî, wê demê bi giştî meseleya Kurdan di rewşeke wisa de ye ku hê nehatiye helkirin û programkirin. Ozmen bi gotinên: "Ji bo rêlibergirtina zirara ku wê bizava Kurdayetiyê bide Komara Tirkiyeyê û lêgerîna çare-

[188] Tarihten Günümüze Türk İran İlişkileri Sempozyumu, r. 94
[189] Ahmet Kahraman, bnb., r. 285

serkirina vê yekê êdî dem hatiye, heta em dereng dimînin." tirsa xwe ya li hemberî mijarê tîne zimên.

Digel vê yekê pêşniyazên ku Abîdîn Ozmen derpêş dike jî pêşniyazên pir dijwar û bêmerhemet in. Ji van pêşniyazan hin jê ev in:

- Ji alternatîfên wekî bi riya asîmilasyonê helandina Kurdên li herêmê yan jî di bin kontrola hêzên ewlekariyê de berdewamkirina rewşa berê, dema ku siyaseta jiderve û hundir musaît bibe divê ya yekem bê hilbijartin. Ev kar divê berdewam bike hetanî kesên ku ji bo Kurdayetiyê dixebitin bikevin rewşeke wisa ku nikaribin Kurdekî li holê peyda bikin,

- Divê li bajarên rojhilat Hewzeya Gola Wanê, Deşta Mûşê, der û dorên Milazgir û Bulanixê (Kopê) cihên ku riya trenê tê de derbas dibe Mihacirên Tirk bên bicihkirin. Hewce ye komîsyonên ku tenê bi vî karî mijûl bibin bên çêkirin û her tim gund bên avakirin,

- Divê mamosteyên bi xîret ên ku Tirkîtiyê li herêmê belav bikin bên peywirdarkirin. Lazim e her kesî bikin rewşeke wisa ku li şûna Kurdî bi Tirkî bê axaftin. Ji bo vê yekê hewce ye dibistanên leylî bên avakirin. Di van dibistanan de divê mufredateke taybet bê şopandin,

- Divê Veterîner û Ziraetkar li gundan bi Tirkî propagandayê bikin,

- Divê li herêmê ji bo xizmetên tenduristiyê girîngî bê dayîn û pere stendina doktoran a ji bo muayenekirinê bê qedexekirin,

- Divê ji bo kesên ku ji herêmên rojava bên van deran bi keçên Kurd re bizevicin û bi cih bibin, erazî bê dayîn,

- Divê qet destûr neyê dayîn ku karmendên di daîreyên dewletê de bi Kurdî biaxivin,

- Divê karmend hewl nedin ku gundiyên bi Tirkî nizanin fêm bikin, ji gundiyên wiha re divê tercûmanên ne karmend in bên dîtin û bi vî awayî divê zor bê dayîn ku her kes bi Tirkî biaxive,

- Ji bo karmendên ku bi Kurdî diaxivin, ji îhtarê (şiyarkirin) heta avêtina ji karmendiyê divê ceza bê birîn,

- Kesên (wekî şêx, axa) ku Kurdan îstismar dikin divê bên neqandin û ji herêmê bên derxistin,

- Her sal divê 3 hezar kesan bişînin herêmên rojava û bi programeke 15-20 salan divê ev gel ji holê bê rakirin,

- Divê Malên Gel (Halkevleri) bên bihêzkirin, li van deran bi gel rojname û kovaran bidin xwendin û li gundan konserên bi Tirkî bên dayîn,

- Ji bo çûyîna her deverê di her demsalê de divê rê bên çêkirin û divê ji Kurdan tabûrên emeleyan bên pêkanîn û wan riyan bi wan bidin çêkirin,

- Divê rojhilat ji rewşa "cihê sirgûniyê" bê rizgarkirin, ji ber taybetiya herêmê divê karmendên serkeftî li vir bên peywirdarkirin; divê pirsgirêkên karmendan ên xanî, tenduristî û perwerdehiyê bên çareserkirin,

Bi vî şiklî Ozmen, ji bo ji holê rakirina Kurdan pêdivî pê dibîne ku serî li hemû riyan bê xistin. Her wiha Ozmen diyar dike ku, rêvebirina herêmê ya bi qanûnên ku giştiya welêt pê tê îdarekirin ne mimkun e.*

Pêşniyazên Ozmen di cih de bi dilxwazî tên qebûlkirin. Li ser tiştên ku Ozmen pêwîst dibîne û mahneyên ku ew nîşan dide, di sala 1936'an de li rojhilat û başûrê rojhilat hin malbat û ji Amedê Cemîlpaşazadeyî û kesên ji wan keç stendine li gor îskana mecbûrî tên sirgûnkirin û wan dişînin bajarên Anatoliya Rojava ên wekî Denîzlî, Ordu hwd. Wekî ku ji van agahiyan diyar dibe, însiyatîfa wezîfedarên dewletê bêsînor e.

Pêşniyaz, bername û ji bo pêkanîna van yekan ji çar hêlan ve xebatên wan berdewam dikin. Pêdiviyên asîmilasyonê di her kêliyê de dişixulin. Çapemenî jî dîsa di bin emrê îdeolojiya fermî de ye. Di vî warî de Faîk Bulut di berhema xwe ya bi navê 'Türk Basınında Kürtler' (Di Çapemeniya Tirkan de Rewşa Kurdan) de mînakên girîng dide. Bulut, balê dikişîne ser nivîsên berî mudaxaleya leşkerî ya Dêrsimê yên rojnameya Cumhuriyetê: "...'Ji bo Tirkên (!) ku ji bilî zimanê xwe yê dayikê Tirkî bi zimanekî din diaxivin, di warê çandî û civakî de bigihîjin asta birayên xwe yên din, biryar hatiye dayîn ku di bin bernameyeke bingehîn de bên xebitandin.'(Cumhuriyet, 11-3-1937)

Di nûçeyê de hem ji bo biçûkxistina Kurdan û kêmeneteweyên din, hem jî ji bo asîmilasyonê piştgirî heye. Bi vê tê xwestin ku fikra riya 'hemdembûn'ê di fêrbûna Tirkî re derbas dibe nîşan bidin."[190]

Di vê babetê de tehde û zordariyên mezin hene. Li çarşî û bazaran kesên ku qedexeya li ser Kurdî binpê dikirin dihatin cezakirin. Fîkret Başkaya di berhema xwe ya bi navê 'Paradigmanın İflası' (Îflasa Paradîgmayê) de li ser vê mijarê wiha nivîsiye:

"Li bajarên ku her kes bi Kurdî diaxivî axaftina bi Kurdî hatibû qedexekirin. (Di rewşên ne fermî de jî) Li navêndên bajarên ku Kurd lê dijiyan, bi armanca ku xelk riayetî vê qedexeyê bike memûr dihatin peywirdarkirin. Gundiyên Kurd dema ku ji bo firotina mehsûlên xwe diçûn bajaran, ji ber ku qet bi Tirkî nizanibûn, nikaribûn xwe ji 'memûrên kontrolê' xilas bikin. Li gorî ku Waliyê Erzîncanê Alî Kemal Beg nivîsiye, ji bo her peyveke Kurdî 5 quriş cezayê pereyan hatiye birîn. Di salên 1930'î de dema ku pezek bi 50 qurişî dihat firotin..."[191]

Canîp Yildirim di vegotinên xwe yên têkildarî salên ku Kurdî hatibû

---

* *Ji bo agahiyên berfirehtir hûn dikarin li cihên ku ev not jê hatin girtin; malpera T. C. İçişleri Bakanlığı, Araştırma ve Etütler Merkezi binêrin.*

[190] Faik Bulut, bnb., r. 65

[191] Fikret Başkaya, Paradigmanın İflası, r. 79

qedexekirin de wiha dibêje: "Salên ku ji bo kesên bi Tirkî nediaxivîn cezayê pereyan dihate birîn, ev kar ji hêla memûrên zabite ve dihat kirin, lezeke mezin dabûn vî karî, ji ber vê yekê jî êdî gundî nema dihatin bajêr." Her wiha Yildirim diyar dike ku derbeya leşkerî ya 27'ê Gulana 1960'î, kampanyaya 'Hemwelatiyo bi Tirkî biaxive' çêdike û progandaya 'Kurd tune ye her kes Tirk e' jî dimeşîne.[192]

Di hemû waran de û li her derî xelk hatin perçiqandin. Gelek caran di vî warî de sohbetên xerîb derketine holê. Sadî Koçaş di bîranîneke xwe de behsa bûyerekê dike ku mijara wê ev e. Helbet vegotinên S. Koçaş bi armanceke din in, lê ez dixwazim bê şîrove vê bîranînê bidim:

"Di sala 1942'yan de li Qamûşan (Sarıkamış) dema ez tegmen bûm, di manewraya ku Artêşa 3'yem li herêmên başûrê Erziromê dikir ez di qerergaha artêşê de wek sûbayê îrtîbatê hatibûm wezîfedarkirin. Em grûbeke biçûk a sûbayan ku ji qerergahê hatibûn neqandin di bin serokatiya Kurmay Serdar Cemal Tural (Dûre Orgeneral) de bi Orgeneral Kazım Orbay ve girêdayî bûn. Ez ne şaş bim, dema em bi siwarî di nêzîkî Gimgimê re derbas dibûn, ji bo bêhnvedanê û şûştinê û hespê xwe jî av bidin em 10-15 deqîqeyan li ser kaniyekê sekinîbûn. Li ser kaniyê gundiyekî extiyar û keçikek xort ku hema bibêje hîn zarok bû, tiştin dişûştin. Gundiyê extiyar dema Orgeneral dîtibû bi hurmet rabibû ser xwe û dest danîbû ser dest. Orgeneral qenc li mêrik nerîbû, piştî li hal û hewalê wan pirsî û li ber dilê wan çû û hat çend pirsê wek,

- Hûn ji ku ne, hûn kî ne? Kiribû. Gundî bi eynî hurmetê tenê gotibû:

- Em Kurd in paşeyê min. Orgeneral bi ken gotibû:

- Ez ji we dipirsim bê hûn ji ku ne, hûn kî ne. Hûn ji min re dibêjin, em Kurd in. Ev der Tirkiye ye. Em jî hemû Tirk in û ji Tirkiyeyê ne.

Li hemberî van gotinan wek ku gundiyê extiyar fedî kiribû. Lê dîsa jî bi dengekî wek ku nexwaze deng here der û dorê got:

- Helbet em Tirk in, bi saya serê we. Lê em ên ji van deran em Kurd in paşayê min. Ma yên mêrxas eslê xwe winda dikin? Ji ber wilo ve hema bi kinayî min got, em Kurd in.

Piştî hin gotinên wek vana, bangî qîza xwe ya hebekî ji me wê de kiribû û gotibû.

- Stakani (gotina peyvê dibe ku cuda be. Bi şiklê di bîra min de maye min nivîsî.) bişo û ji paşeyê min re çalkama bîne. Dema em difikirîn bê ka çi ji qîzê xwest, Orgeneral dîsa bi ken û dengekî nerm got,

- Çi bila çilo bike? Min fêm nekir bê te çi got.

---

[192] Mustafa Akyol, bnb., r. 122

Wî jî bersiv wiha dabû,

- Min got, bila stakanê bişo paşayê min. Wê ji we re çalkama(dew) bîne. Li malê em ji qedehê re dibêjin stakan.

Rûyê Orgeneral dikeniya û hêdî hêdî bi hawayê ku her kes fêm bike diaxivî. Dema got,

- Tu ji ku fêrî stakanê bûyî, ew gotineke Rûmî ye.

Me jî meraq kir bê wê gundî çi bersivê bide. Ewî jî dest bi ken kiribû li ser van pirs û sohbetan dostayî. Dema got,

- Erê rast e, paşayê min. Tu rast dibêje. Dibêjin kalikê me ji Girîtê bûn. Ji Girîtê me koçî vir kiriye.

Ew Orgeneral Orbay ê ku her tim me giran û hişk dîtiye û bi dora xwe re zû li hev dike, bû tîqtîqa wî (dîsa jî bi usûl û bi adab bû). Me qet ew wilo nedîtibû.

- Çima tu nabêjî em hemşerî ne. Dibêjin bavê min jî komutanê Atînayê bûye. Ji loma paşnavê me bûye Orbay. Jixwe ji rûyê te, ji rengê wechê te min fêm kiribû ku hûn ji wan deran hatine. Ma tenê kalikê te? Bi eşîretî Tirkmenan koçî van deran kirine. Hem ji giravan, hem ji Anatoliyê. Hê! Naxwe kalikên te Kurd bûn; yanî tu, torinekî Kurd ê por zer û çavşîn ê ji kalekî koçer ê Tirkmen ê ji Gîrîtê yî?*

Kalê Kurd pêşiyê bi tirs dûre bi ken li axaftina orgeneral a nerm guhdarî kir û cesaret hatê. Bi ken û bi dengekî hîn bilindtir hin tiştên wiha gotibû;

- Em ji ku zanin paşayê min? Gotin hûn Kurd in, gotin em Kurd in, me jî got em Kurd in. Lê kalikên min gotine em ji Gîrîtê hatine. Xuya ye stakan ji wan maye."[193]

Wek ku di vê serpêhatiyê de tê xuyakirin, gelek caran xelk mecbûrî xweînkarkirinê maye û carna nema zanin wê çi navî li xwe bikin. Ji xwe di dibistanan de zarokên Kurdan ji zimanê dayîka xwe dûr, bi dîrokeke çewt perwerde dibûn. Kesên ku navên Kurdî li zarokên xwe dikirin diketin ber lêpirsîna dadgehê. Bi van pêkanînan ruh û manewiyata Kurdan dihat şikênandin.

Kurdên li Tirkiyeyê, berî bi 30 salên dawî, a rast berî ku amûrên ragihandinê yên wekî televîzyon û înternetê bikevin malan li dibistanan fêrî Tirkî dibûn. Yanî bi piranî ligel ku zarokan tenê bi Kurdî zanibûn hemû perwerdehiya xwe bi zimanê Tirkî didîtin. Ew ne bes bû, di bêhnvedanan de jî axaftina bi Kurdî qedexe bû. Yanî zarokên Kurdan di dibistanan de gelek zehmetî kişandine.

Bi awayekî zanistî tê qebûlkirin ku, bikarneanîna zimanê dayikê di kesa-

* *Xuyaye Orgeneral ya nizane ku Kurd ê çavşîn û porzer pir in, yan jî ji qazî ve naxwaze wilo qebûl bike.*

[193] M. Sadi Koçaş, bnb., r. 37-38

yetiya însên de rê li ber tehrîbatên mezin vedike. Însanekî ku zimanê wî bê qedexekirin bifikirin û dema biaxive bê cezakirin. Tenê mirov wan zarokên biçûçik ew ên bi zimanekî ku qet fêm nakin perwerde dibin bîne ber çavan… Ê ku ev tişt derbas kirine xweş zanin, zanin bê çi êş û nexweşî tê derbaskirin. Di kîjan dewletê de be bila bibe, çi Kurdê ku xwendiye ev êş derbas kiriye.

Em mînakekê ji serê sedsalê bibînin. Bîranîneke Sadî Koçaş di vê derbarê de ye. Wek ku me li jor îfade kir, Koçaş bi mebesteke din ev bîranîn nivîsiye, lê ji ber ku di der barê mijara me de ye me stend vir… Koçaş di sala 1919'an de ji dayîk bûye. Bîranîn wiha ye:

ÇÎROKA ELIYÊ KURD

Di dibistana seretayî de hevalekî me yê bi navê Elî hebû. Ew jî di sala ku em hatibûn, ji bajarekî Rojhilat hatibû Stenbolê. Şêweya wî li gorî Stenbolê gelekî cuda bû. Nuh hat, ji ber vê ferqa şêweyê henekê xwe pê dikirin û neqla (bizarî) devê wî dikirin. Ez dibêm qey ê herî zêde halê ku ew zarok diketê fêm dikir ez bûm û di dilê xwe de min li hemberî wî hezjêkirinek hîs dikir. Her ku min ew halê wî didît, ji bo ku heman tişt neyê serê min, ji bo ez şêweya xwe ya ku min dawiya wê hebekî dirêj dikir rast bikim, wek Çîçero ez xwe bi xwe diaxivîm û ji bo di demeke kin de devoka min bibe wek a dora min, min li ber xwe dida. Demekê min xwest ez Elî bielimînim heman tiştî, lê dikir û nedikir nikaribû tebîetê xwe hem ji aliyê devokê de û hem jî ji aliyê hin gotinên ku wateya wan gelekî cuda bû biguherîne. Dawiyê rojekê hevalekî me yê mekroh tevî hevalên xwe yên ku berê ew hatibûn şîretkirin, ji bedêla navê Elî bi şiklê (Lawê Kurdan, Eliyê Kurd, Kurd wer vir, Kurd ka qelem) dest bi henekan kiribûn. Cara ewil li wir min gotina Kurd bihîst. Min ji lawik pirsî. Tê bîra min dema got, 'ji xelkê ku li herêma me dijîn re dibêjin Kurd' ez mabûm şaş. Li cihê ku ez çêbûbûm û mezin bûbûm û heta 9 saliya xwe min lê xwend, li Ermenekê ji Tirkan pê ve kes tune bû. Wê ji ber vê be, henekpêkirina ku digotin Kurd Elî aqilê min ê zarotî fêm nedikir. Ew feqîr jî hem zarok bû, hem jî tenê bû û hûrik bû. Tebietê wî jî yekî bêdeng bû. Zanîbû nikare bi yên ku henekên xwe pê dikirin û dixwest bi xweşkayî vî îşî hal bike. Çiqas li ber wan digeriya û digot, 'ez ne Kurd im. Kalikê min ji Îzmîrê hatiye wir. Memûr bû. Bi pîrika min re li wir zewiciye, dema teqawid bûye li wir bi cih bûne. Digotin bavê bavê min jî ji Qeyseriyê ye.' Ên ku koçer bûn jî tevî yên Stenbolî dibûn û bêhtir henekên xwe pê dikirin. Min jê re digot, binêr Elî em her du dest bidin hev jî em nikarin bi wan. A baş em axaftina xwe bikin wek a wan, divê ferqa axaftina me ji yekî Stenbolî tune be.

Wê demê mahneya wan û henekpêkirinê namîne. Niha tê bibêjî, 'ez Kurd im. Ma hûn zanin bê Kurd çi ye? Helbestvanê Tirk Ziya Gökalp jî ji Diyarbekrê ye.' Û tê bi ser wan de herî. Kesê ku bi navê Kurdo bangî te kir qet bersiva wan nede. Tê bîra min, tişt miştin wilo min ji lawik re gotibûn ji bo ez hebekî bêhna wî derxim. Ev demeke dirêj e, ji wextê ez li ser vê mijarê lêkolînê dikim, her ez rastî bûyereke bi êş dibim ew rûyê Elî yê ku melûl bû tê ber çavên min û bi ser ku ev qas sal derbas bûye hîn jî kizînî dikeve dilê min. Di dawiya salê de Elî şagirtê herî serketî bû, bi qasî tu bibêjî bêqisûr û xweşik diaxivî û bûbû şagirtê ku herî zêde jê tê hezkirin. Lê hîn jî navê wî Eliyê Kurd bû. Ji ber ku wê salê ez ji wê mektebê veqetiyam di jiyana xwe de em qet nema li hevdu rast hatin."[194]

Em li salên 1960'î binêrin. Salên 1967 û 68 li Tirkiyeyê tevgera xwendekaran zêde dibe. Di van salan de înkarkirin û zordayîna ser Kurdan bi awayekî herî dijwar berdewam dikin. Di heman demê de nivîsên ku heqaretê li Kurdan dikin tên weşandin. Wek mînak, em li nivîseke ji kovara Ötükenê ya bi tarîxa Nîsan 1967'an hejmara 40'î binêrin. Ev kovar wek kovareke neteweperest heta bi gundan tê şandin. Ji vê kovarê, ji nivîsa Nihal Atsız çend hevok wihan in:

"Tirk bi kêmanî wêrisê çand, sazîbûn, dewleteke azad a 23 qirnan bûn. Kurd çi bûn? Ev ê ku hîn zimanekî wan li holê tune, ev ê bê tarîx, bê çand, bê dewlet ma wê aşiqî Tirkê ku dewleta cîhanê ava kirine bûna. Kurd ne milet bûn. Beşek çiyayî û hov ên Farisan bûn. Rastûrê eşqiyayê adî, qatil û dizek in... Berî ku serê miletê Tirk têxin belayê û berî ku ew jî tune bibin, bila herin. Wê herin ku? Dilê wan ku derê bixwaze, çavê wan ku derê bibîne bila herin wir. Bila herin Îranê, Pakistanê, Hindistanê, herin cem Barzanî..."[195]

Di heman demê de Tirkên li Bulgaristanê wek kêmnetewe muameleyeke gelekî cihê dibînin. Ji bo em ferqa navbera du nêrînan bibînin em li hevdîtina Azîz Nesîn a di sala 1965'an de ya bi Serokdewletê Bulgaristanê (Sekreterê Giştî yê Partiya Komînîst a Bulgaristanê) Todor Jivkov re binêrin. Hevdîtin di meqamê Jivkov de pêk tê. Jivkov di axaftina xwe de van tiştan dibêje, "Komara Gel a Bulgaristanê ku ji siyaseta wekheviya tam a hemû komên milî yên ku li memleketê me dijîn hereket dike, di 21 salên bihurî yên dema rêvebertiya gel de ji bo pêşketina madî, manewî û çandî ya ahaliya Tirk gelek tişt kirine... Wek mînak, Bulgaristana kevn a bûrjûva, di 365 dibistanên seretayî de tenê 35.000 şagirtên Tirk dida xwendin û li welatê me tenê

[194] M. Sadi Koçaş, bnb., r. 28-29
[195] Aziz Nesin, bnb., r. 74

167 dibistanên lîseyê û tehsîla olî hebûn; lê îro di 1556 dibistanên seretayî, navîn, lîse û dibistanên teknîkî de ji 158.000'î zêdetir zarok û ciwanên Tirk dixwînin. Di salên rêveberiya me ya gelî de 14.000 mêr û jinên Tirk lîse û tehsîla bilind xelas kirine. Niha her sal di lîseyan de nêzîkî 12.000 ciwanên Tirk dixwînin...

Di herêmên ku nifûsa qelebalix a Tirk tê de dijî, ji 600'î zêdetir dibistan hatine çêkirin. Li hemû gundan, malên gel û malên xwendinê yên ku pirtûkên Tirkî û yên edebiyatê yên pêwîst tê de hene hatine vekirin. Heta niha 700 pirtûkên Tirkî yên bi tîraja 3,5 milyon hatine derxistin. Îradeya me ya gelî, ji bo Tirkan rojname û kovarên wekî 'Yeni Işık', 'Halk Gençligi' û 'Yeni Hayat' derdixe..."[196]

Di serê salên 1970'yî de di pêkanîn û nêrîna dewletê yên li hemberî Kurdan de tiştek nehatiye guhertin. Dema mirov li pêşniyazên nivîskar Necmî Onur dinêre, mirov vê yekê bi rihetî dibîne. Di sala 1972'yan de, di dawiya hevpeyvîneke ku pê re hatiye çêkirin Necmî Onur dibêje, "Teqez divê ji bo Rojhilat emperyalîzma çandê were pêkanîn." Û van pêşniyazan dike:

"...li gor raporên kesên ku bi meseleyê re eleqedar in, mirovên li vê herêmê bê îstisna Kurd in. Û ji ber helwestên rêveberan, her tim wekî ku li nav çavên wan bê xistin, Kurdbûna wan tînin bîra wan. Li vir, ez dixwazim li gorî agahiyên ku min ji 'peywirdaran' berhev kirine ragihînim, ku mirov Kurdên li herêmên ku min sînorên wan destnîşan kir di nava 'îxanet'ê de bibîne û wisa jî bide nîşandayîn bêwijdanî ye. Lê çi fêde, zumreyeke 'wehş'iyane ya ku vê rewşê û mirovên di nav van sînoran de îstismar dike heye.

Belê, piştî van hemû tiştên qewimîn û bûyerên ku muhtemel e bibin, 'Lazim e çi bê kirin', ya herî girîng ev e. Bûyerên ku qewimîne bên tehlîlkirin û bi vî şiklî rê li ber bûyerên ku wê biqewimin bên girtin. Di vê mijarê de ez ji 'ewladekî paqij ê memleket' ku salên xwe wekî rêveber li Rojhilat xerc kiriye sûdê werdigirim. Binêrin, di encama vekolînên demdirêj û daketiye rastiyê ev rêveber tiştên ku divê bên kirin çawa xal bi xal tavsiye dike.

1. Divê herêm bi awayekî rast were etûdkirin, bi taybetî jî divê ji bo merciyên edlî û îdarî rayeyên awarte werin dayîn.

2. Bi avakirina sîstemeke nipînû a perwerdehiyê re têkbirin û belavkirina eşîran karê sereke ye. Ev yek jî encex paralelî 'seferberiyeke perwerdehiyê', bi zêdekirina dibistanên li herêmê dikare pêk bê.

3. Lazim e tedbîrên ku otorîteya 'axa'yên li herêmê ya li ser gel tune bike, di demeke herî kin de bên stendin. Ji bo vî karî ger ku pêwîst bike pêkanîna operasyonekê jî ji zirarê zêdetir dê sûdê bide.

[196] Aziz Nesin, bnb., r. 10

4. Divê em tevgera komandoyan, hê bêhtir bi plan bikin û bînin rewşeke hiqûqî. Hetanî ku hemû herêm bi riyên baş bi hev ve bê girêdan jî divê ev tevgera bi plan a komandoyan berdewam bike.

5. Divê irf, adet û şertên din ên herêmê li ber çavan bên girtin û li gor vê yekê sîstemeke hilbijartinê were dîtin û were pêkanîn. Lewre li gelek deveran di hilbijartinan de 'tenê mirovek' bi bandor e.

6. Divê li temamiya herêmê emperyalîzmeke çandî were pêkanîn. Ji bo pêkanîna vê yekê jî, divê 'mamosteyên bi kalîte' yên ku pirsgirêka wan a xanî û meaş hatiye çareserkirin bên peywirdarkirin. Bi perwerdehiya ku dê bê pêkanîn divê eseh zarok ji malbatê bê dûrxistin. Divê têkiliya nifşê nû ji nifşê kevn bê qutkirin.

7. Divê dewlet xizmeteke mezin bide herêmê. Gundî dema ku dewletê li cem xwe bibîne û xwe jî wekî parêzkarê dewletê bibîne, xwedî karekterekî wisa ye dê teqez rû nede kesên ku bixwazin wî bi awayên cur be cur îstismar bikin.

8. Tedbîra herî baş 'meseleya îskanê' ye ku di wextê xwe de bi awayekî xirab hatibû ceribandin. Însanên rojavayî yên ku li vê herêmê bên bicihkirin, wê di guherîna herêmê de rola herî mezin bilîzin.

Bi qasî zimanê min geriya û pênûsa min liviya, min hewl da ku ez ji we re 'tiştên ku li pişt çiyayan diqewimin' vebêjim. Piştî vê yekê, bar dikeve ser milê kesên ku van nivîsan dixwînin û xizmeta ji bo vî welatî ji xwe re kirine wekî peywir û bi taybetî jî bar dikeve ser milên 'rewşenbîr'an."[197]

Hewce nake piştî van belgeyan mirov şîroveyan bike. Her tişt vekirî ye û xweş tê fêmkirin. Em di meşa xwe ya di demê de berdewam bikin. Bilêvkirina hebûna Kurdan her tim sûc e. Yek ji wezîrên kevn Şerafettîn Elçî ji ber ku dibêje, "Li Tirkiyeyê Kurd hene, ez jî Kurd im.", di sala 1981'ê de bi 15 meh cezayê hepsê tê cezakirin. Di sala 1987'an de, ji ber gotinên wî yên têkildarî Kurdan ku ji kovara 'Ber bi 2000'î'('2000'e Doğru') re dibêje, der barê Azîz Nesîn de doz tê vekirin. Parêzer Velî Devecioglu ku li dadgehê Azîz Nesîn diparêze, diyar dike ku nêziktêdayîna di sala 1967'an de di salên 1980'yî de jî berdewam dike. Devecîoglu vê yekê wiha tîne zimên: "... gotinên wekî 'Ev ne Tirk in, komeke bê dewlet, bê çand, bê rabirdû... eşqiyayên adî, mêrkuj, diz in, bila bicehimin û biçin...' û gotinên wekî 'cihêxwaz, eşqiya, terorîst, hûn ne ji me ne, ji miletekî din in, em ê koka we biqelînin', ku îro der barê wan mirovan de bê navber tên dubare kirin, gelekî dişibin hev. Rewşa ku Azîz Beg tîne zimên wekî 'bi salan e rayeke giştî ya xelet hat afirandin' ev e.

[197] İsmail Beşikçi, Türk Tarih Tezi-Güneş Dil Teorisi ve Kürt Sorunu, r. 205-206-207

Ev ba hat çandin niha jî wekî bager tê çinîn.

Pêkanîn jî wek vê ye: Zordarî, îşkence, fermanên "bigire û bikuje", koçberkirina bi darê zorê... bi temamî di heman rê û îstiqametê de ne..."[198]

Min di salên li dor 1970'î de dibistan dixwend. Di vî warî de min jî wek hemû zarokên Kurdan gelek zehmetî derbas kirin. Dema min dest bi dibistanê kir, min gotinek bi Tirkî nizanibû. Heya min dibistana navîn xelas kir jî ez qenc fêr nebûbûm. Mirov dikeve halekî wisa ku ez ê nikaribim îfade bikim. Mamoste tiştina vedibêje tu jê fêm nakî. Tu zanî bîstikek din wê di wê der barê de tiştina bipirse û tu yê nikaribî bersivê bidî. Di hundirê xwe de tu dibêjî, Xwedo hema mamoste bila min nebîne û tu xwe diqurmiçînî, tu dixwazî xwe têxî qorzîkan... Yan jî tu dixwazî tiştina bibêjî, dil û mêjiyê te dikele lê zimanê te nagere, tu lal dibî...

Dema min enstîtu qedand û li welêt dest bi mamostetiyê kir, min dît ku bi hezaran şagirt van pirsgirêkan dijîn û min bi wan re heman êş dîsa dîsa di kurahiya dilê xwe de hîs kir. Li gel ku min hez ji mamostetiyê dikir jî ji ber ku min bi Tirkî wezîfe dikir ji min re gelekî zehmet bû. Wer hûn zanibin ji ber qedexebûyîna zimanê dayikê tehrîbatên mezin wê bên dîtin û hûn mecbûr in wê xetayê berdewam bikin. Îcar êşa min dibû duqat.

Ez dibêjim qey kes tune ku di vî warî de gelek bîranînên wî tune bin. Di vê der barê de gelek bîranînên min jî hene. Ji vana yek jê ya dema xwendina min a dibistana mamostetiyê ye. Ji salên ku min li Erzeromê dibistan dixwend, ez dibêjim qey 1975 bû. Ji ber ku me di dibistana leylî (yatılı) de dixwend me tenê bi destûra berpirsyarên dibistanê, di odeya mamosteyan de ji malbatên xwe re telefon vedikir. Rojekê min ji dayika xwe ya ku li Nisêbînê bû telefon vekir. Ez di odeya mamosteyan de me û bi Kurdî bi diya xwe re diaxivim. Mamosteyekê xwe aciz kir û mudaxaleyî axaftina min kir; xwest ku ez bi Tirkî biaxivim. Ez zarok im, ez hebitîm. Ji aliyekî ve jî difikirîm bê ka ez ê çawa bi dayika xwe re ya ku bi Tirkî nizane biaxivim. Ez naxwazim diya xwe jî bi rewşa xwe bihisînim, wê biqeherînim. Di vê kêliyê de bêhemdî xwe min bi Kurdî axaftina xwe berdewam kir. Ji bo ku min berdewam kir vê carê mamoste bi awayekî hişk erza min şikênand. Bi ser min de hilbû û ji min pirsî, bê ka ez bi kê re, çi diaxivim. Min jê re got, ez bi Kurdî bi dayika xwe re diaxivim. Lê ji min bawer nekir û got, 'bi navê Kurdî tu ziman tune ye, tu bi awayekî bi şîfre bi yarikê xwe re diaxivî.' Di vê navberê de ez şaşomaşo bûbûm, heyecanê bi min girtibû û min nizanibû bê ka ez ji dayika xwe re çi bibêjim. Ez mecbûr mam min axaftina xwe nîvco birî.

[198] Aziz Nesin, bnb., r. 74

Ji aliyê din ve axilbe di dersên dîrokê de behsa Kurdan bi nebaşî, bi xayîntî derbas dibû û ew dil û mêjiyê min î zarok ev ranedigirtin, ez tim dilbiêş bûm. Hemû şagirt li dibistanan ji aliyê dîrokê ve zêde êşiyan. Di hemû mekteb û zanîngehan de bi piranî di dersa dîrokê de perwerdeya dîrokeke çewt hebû. Beşîkçî kirinên di derbarê dîrokê de pir vekirî aniye zimên. Dibêje ku:

" ... ji bo dîroka Kurdan neyê zanîn belge tên tunekirin, tên şewitandin, ji holê tên rakirin. Îdeolojiya fermî piştî ku dibêje xelkekî bi navê Kurd tune ye, îfade dike ku ji xwe Kurd miletekî kole ye, di tarîxê de tu carî tu dewlet ava nekirine, her tim bi hinan ve girêdayî mane. Armanca wan bi vê, dikin ku Kurd ji ber dîroka xwe fedî bikin û xwe înkar bikin. Wan hêvî kiriye ku Kurdên ji ber dîroka xwe fedî bikin, xwe veşêrin wê Kurdayetiyê red bikin û wê bibin Tirk..."[199]

Wek ku di vegotinên berê de derbas bû di der heqê Kurdan de carna vegotin digihîşt asta heqaretê. Zanîn û rastiyên ku hebûn jî ji ber qedexe û tirsan di hinek cihan de, di qorzîkan de veşartî mabûn. Di van demên ku mirov zarok e, naşî ye û bîra gelek tişta nabe, carna mirov diteqine û dike nake heq ji bar dernakeve...

Bandora vê bi gelek awayan şax û perên xwe berdidin. Carna tu dinihêrî ku bê hemdî xwe te jî behsa dîroka xwe bi çewtî kiriye. Tu di xwe dernaxî ku tu di bin tesîra vê rewşê de şîroveyan dikî. Gelekî zor e mirov bi ser xwe ve bê. Ku mirov bi ser tiştina vedibe tu dibînî ku lehengên herî hêja yên di dîroka vî miletî de ketine şiklekî ku qet eleqeya wan pê tune.

Em karin çend mînakan ji serê sedsalê bidin. Dema dewleta Osmanî rûxiya, gelek Kurdên di meqamên herî girîng de dixebitîn hebûn. Ji bilî van rewşenbîr û rêberên gel jî pir bûn. Wek mala Bedirxaniyan, wek Seyid Abdulqadir, Mala Cemîlpaşa, Smail Axayê Şikakî û hwd. Di nav wan de fikarên cuda hebûna jî hemû ji bo Kurd û Kurdayetiyê têkoşiyane. Bêguman heke wê demê Kurdistan ava bibûya, şîroveyên li ser wan wê pir cuda bûna. Jixwe ku di dewleta Tirkiyeyê de wek di serî de hatibû gotin heq û hiqûqê Kurd û Tirkan bi biratiyê dom kiribûya, wê di kitêbên dîrokan de vegotin di şiklekî din de bûya.

Li aliyê din bingeh û tevgera rêberên Kurdan ne ji yekî wek Faysal hindiktir bû, ku bû qralê Îraqê. Her kes şîroveyan li gor berjewendiyên xwe dike. Halbûkî ku mirov bi çavekî mirovanî li meseleyan binêre ji ber ku rewşenbîr û rêberên Kurdan li hemberî toşa netewperestiyê- ku gelek miletên din ji bo wilo qetlîam çêkirin- bi xasiyetên mirovî tevgeriyane, gerek ji aliyê her kesî ve

[199] İsmail Beşikçi, Türk Tarih Tezi-Güneş Dil Teorisi ve Kürt Sorunu, r. 78

qedrê wan bê girtin.

Dema mirov bi kûrahiya meseleyan nizanibe, mirov gelek xeletiyan dike. Wek ku me li jorê got, Kurd bi xwe bêhemdî xwe di bin tesîra gotinên rojane de di warê dîroka xwe de şîroveyên xelet dikin. Ev ne tenê di der barê dîrokê de di gelek mijaran de wilo ye. Loma pirsgirêk her çûye mezintir bûye.

Heger em hinekî dewletan bidin ber hev, her çiqas li hemû deran zordarî û asîmilasyon hebe jî mirov kare bêje Tirkiye di vê mijarê de bê tolerans bû û bêhtir bi plan û program ev îş meşand. Wek me berê îfade kir bîrdoziya fermî ya Îranê jî nexwestiye Kurdan wek nasnameyeke cihê bibîne û ji bo asîmilekirina Kurdan xebitiye. Di gelek waran de pêkanînên li Tirkiyeyê ji xwe re mînak girtine. Demên dirêj Kurdî hatiye qedexekirin. Ji bo asîmîlekirinê gelek plan û program heta roja îro meşandine. Em mînakekê ji dawiya sedsala 20'an bidin. Yusuf Ziyad radigihîne ku, di sala 1999'a de li Îranê danezana asîmilekirina Kurdan a ku ji 39 xalan pêk tê, di hemû zanîngehan de hatiye weşandin... Li gel van hemûyan dîsa jî li Îranê di navberan de hin heqên Kurdan hatine qebûlkirin.

Demên ku li Tirkiyeyê Kurdbûn sûc bû, li Îranê radyoyên ku bi Kurdî weşan dikirin hebûn, gelek pirtûk û kovar hatin weşandin. Her çiqas demeke kurt berdewam kir jî di dema Komara Mehabadê de gavin girîng hatin avêtin. A niha li Îranê her çiqas hemû herêmên Kurdan negire nav xwe, ne gelekî xwedî maf be jî eyaleteke bi navê Kurdistanê heye.

Kurd û Faris aryanî ne û cografyaya wan di nav hev de ye. Ev her du xelk xwediyê hev in. Van xelkan wek împaratoriya Med û Persan bi hezarsalan dîrokeke hevpar afirandine. Ji ber wilo ve bi çanda xwe, bi gelek awayan nêzîkî hev in. Ligel ku gelek deman pirsgirêk derketine jî mirov dikare bibêje, di nava gel de ew hîsa xwedîtiyê û nêzikatiyê her berdewam kiriye. Wek ziman jî Farisî û Kurdî gelekî nêzîkî hevdu ne. Li Tirkiyeyê her çiqas bê gotin 'Kurd di rastiyê de Tirk in' jî, ji ber ku gelekî ferqa zimanê Kurdî û Tirkî heye, ev yek pûç dibe. Dîsa jî mirov nikare asîmilasyona li Îranê bide ber a li Tirkiyeyê.

Dema mirov li Îraqê dinêre, mirov dibîne ku zilma li wir hatiye kirin di dinyayê de belkî mînakên wê tune bin. Dîsan jî li wir nasnameya Kurdan gelek caran hatiye qebûlkirin û hin maf hatine dayîn. Heke sererast dom nekiribe jî, li vir gelek deman bi Kurdî perwerdeyî hatiye dayîn. Wek ku tê zanîn îro di nav sînorê dewleta Îraqê de Kurdistana Federe heye. Lê rotaya li Tirkiyeyê gelekî cihê ye. Ji destpêka komarê hetanî niha li vir her tişt li ser înkara Kurdan hatiye meşandin. Di encamê de Kurdên Îran, Îraq û Sûriyeyê

bi giştî zimanê xwe diparêzin, lê ji ber ku asîmilasyona li Tirkiyeyê di radeyeke gelekî bilind de ye di demên dawî de, di gelek malên Kurdan de jî Tirkî tê bikaranîn.

Martîn van Bruînessen di vê mijarê de wiha nivîsiye: "...Tirkiye di hewldanên 'netewekirin'ê de her dem bûye ya herî radîkal û ji bo tunekirina nasnameya netewî ya Kurdan heta tu bibêjî serî li hewldanên pir hişk û bandorker daye. Peyva Kurd bi xwe jî bûye tabû û demeke dirêj wisa maye. Wekî netew behskirina Kurdan hetanî niha wekî xirabkarî hatiye hesibandin, heta ev yek li Tirkiyeyê di nav rewşenbîrên bijarte de jî bûye sedema hişyarkirina helwestên hestiyarî yên bi şîdet. Her çiqas li Îran û Îraqê asîmilasyon wekî armanc hatibe meşandin, dîsa jî li hemberî çanda Kurdan hetanî cihekî musamaha hatiye nîşandayîn. Di Îrana Şah de, di dibistan û dadgehan de tenê destûra zimanê Farisî hatiye dayîn, ji bo weşanên Kurdî destûr nehatiye dayîn û hemû rêxistin û komeleyên Kurdan hatine qedexekirin. Îraq tekane welat e ku hetanî astekê xudmuxtarî (özerkî) daye Kurdan. Lê di heman demê de xwe wek parçeyekî neteweya Ereb ku qet ji hev nayê veqetandin hesibandiye. Herêmên Kurdistana Îraqê yên ku di warê aborî de gelekî girîng in, bi sirgûnkirina Kurdan û di şûna wan de bicihkirina Erebên ku ji Başûrê Îraqê anîne ev der hatine 'Erebkirin'..."[200]

Xaleke din a girîng a ku di encama pêkanînên asîmilasyonê yên Tirkiyeyê de derketiye holê heye, divê mirov li ser wê jî bisekine. Asîmilasyona ku li ser Kurdan hat meşandin, di heman demê de li ser hemû kesên ku li Tirkiyeyê dijîn hat pêkanîn. Asîmilasyona ku di salên pêşî ên komarê de wekî înkarkirineke qebe xuya dikir û ji salên 1930'yî pê de bi awayekî sîstematîk hat meşandin, bi demê re kir ku bîrdoziya fermî di nav gelek derdoran de rûnê. Dûre bi vê ferasetê nêzikatî li her tiştî hat kirin. Yanî çi kesê li Tirkiyeyê, ji kîjan derdoran be bila bibe nifşên nû bi fikarên xelet asîmile bûn. Ev bi demê re bû sedema kirina gelek xeletiyan. Hîn jî li ser wê bingeha xelet nêrîn û fikrên çewt derdikevin. Di encama vê yekê de, ji ber nêrîna wan a şaş a li hemberî Kurdan, van welatan li pey xwe dîrokeke ji nirxên demê dûr û ji mafên mirovan bêpar hiştin.

Berî her tiştî nifşê ku nû radibe, bi giştî bi dîrokeke ku li gorî îdeolojiya fermî hatiye sazkirin mezin bû, ji rastiyên civakê hat bidûrxistin. Bi taybetî du mijarên girîng hatin berevajîkirin. Hin deman Împaratoriya Osmanî wekî împaratoriyeke pir paşverû û xirab hat nîşandayîn; li aliyê din jî Kurdên ku bi sed salan bi wan re jiyabûn tune hatin hesibandin. Bi vê û ferasetên bi vî

[200] Martin van Bruinessen, bnb., r. 175

rengî têkiliya ciwanên Tirkiyeyê ya bi rabirdûya wan re hat qutkirin û asîmile bûn. Loma nifşên nû bi giştî nikaribûn rast bifikirin û bi helwest û şîroveyên xelet nêzîkî gelek mijaran bûn.

Fîkret Başkaya jî diyar dike ku, rewşenbîrên komarê ji bo mîsyona afirandin û belavkirina bîrdoziya fermî ketine pêşbaziyê de û îdeolojiya fermî ya 'sûnî' jî her tim astengî ji pêşketin û hilberîna entelektueliya zanistî re derxistiye, qada ramanî bêber hiştiye û rê li ber demokratîkbûnê girtiye.[201]

Di vê pêvajoyê de Kurdan serî li gelek riyan dan lê belê ji ber feraseta ku li jorê em li ser sekinîn di nava temamiya civakê de bi cih bûye, tu riya çareseriyê peyde nekirin. Ji ber ku bi derbasbûna salan re hin tişt kronîk bûn û bi her roja ku derbas bû re astengiyên li ber çareseriyan hîn zêdetir bûn. Heta di hin deman de li ber hin rayedarên Tirk ên ku xwestin ji bo çareserkirina mijarê gavinê biçûk biavêjin astengî hatin derxistin. Me dît ku rê li ber kesê li herî cihe bilind e jî girtiye û nikarin tiştekî bikin. Wekî nimûneya herî berbiçav mirov dikare mînaka Tirgut Ozal bide. Turgut Ozal got, em dikarin 'federasyonê nîqaş bikin'. Ozal yekem peywirdarê dewletê yê herî payebilind bû ku ewil bi hişkereyî got bila bi Kurdî weşana TV'yê hebe. Serokomar Ozal di 21'ê Avrêla 1992'yan de daxuyaniyek wiha dabû: "Madem ku ew ji koka xwe Kurd in, madem ku em Kurdan ji xwe cihê nakin, wê demê divê em destûrê bidin ku bi zimanê xwe karibin weşanê bikin. Divê em weşana bi Kurdî bikin û xwe bi Kurdên li welatên din (Îran, Îraq, Sûriye û Ermenistanê) bidin guhdarîkirin. Heger ku em vê yekê nekin, hinek din wê bikin û wê bala Kurdên me bikişînin ser xwe."[202] Ev daxuyanî di nav gelek derûdoran de rastî nerazîbûnan hat. Di çapemeniyê de bi awayekî pir tund hate rexnekirin.

Nivîsa Oktay Ekşî (30-04-1992) ku wê demê sernivîskarê rojnameya Hurriyetê bû wiha ye: "Belkî jî em bi tezahura hezkirina birêz Turgut Ozal a ji bo pîrika wî ku dibêje Kurd e, rû bi rû ne. Em hurmetê ji girêdana birêz Turgut Ozal a ji bo pîrika wî dikin. Lê heger ku li qisûrê mêze neke, qet niyeta me tune em xîmê dewleta Komara Tirkiyeyê, ji bo xatirê pîrika Ozal biguherin. Gotinên wekî weşana TV'yê ya bi Kurdî, ji bo Kurdan federasyon, îfadeyeke ku 'dewleta unîter' a em ji 1923'yan ve xwediyê wê ne bêqebûl dihêle."[203] Nûçeyeke ku di Milliyetê de hatibû weşandin jî wiha bû: "Der barê Ozalê ku got bila weşana bi Kurdî bê kirin de, parlamenterên Partiya Riya Rast ji îxaneta li hemberî welêt, dozê vedikin."[204] Wekî tê zanîn di encamê de jiyana Ozal bi awayekî bi guman bi dawî bû...

[201] Fikret Başkaya, bnb., r. 9-10
[202] Faik Bulut, bnb., r. 70
[203] Faik Bulut, bnb, r. 74
[204] Faik Bulut, bnb, r. 70

Demîrel, realîteya Kurdan pejirand lê dewama wê nehat. Piştre Serokwezîra Tirkiyeyê Çiller (di serê sala 1995'an de) rojekê di balafirê de got, 'dibe ku em jî Modela Baskê bi kar bînin.' Lê paşê qet xwedî li gotinê xwe derneket û di dema wê de, pêkanînên li dijî Kurdan hîn tûjtir bûn. Mesut Yılmaz got, 'Riya Yekîtiya Ewrûpayê di Amedê re derbas dibe' û li pişt gotinên xwe nesekinî. Herî dawiyê jî Erdogan li Qibrîsê got, dibe ku modela Belkçîkayê were bikaranîn û di pratîkê de tu pêşketin pêk nehatin. Yanî zemîna heyî di halekî wisa de ye ku, di vî warî de bilêvkirina gotineke pir biçûk jî di cih de rastî nerazîbûnan tê û tu gav nikarin bên avêtin.

Li Tirkiyeyê bingeheke wisa pêk hatiye ku kî dibe bila bibe, dema ku di der heqê Kurdan de hevokekê bi niyeta baş saz dike rastî nerazîbûnên mezin tê. Mînaka Kenan Evren a herî balkêş e. K. Evrenê ku derbeya leşkerî ya 12'ê Rezbera 1980'yî çêkir û dema ku serokomar bû fikrên wekî; "Bi navê Kurd tiştek tune ye. Ew Tirkên çiyayî ne. Ev têgihek e ku, dema mirovên me yên li başûrê rojhilat li çiyayan di berfê de meşiyane, ji dengên kart û kurt ên lingên wan pêk hatiye. Ji ber wê yekê bi vî navî hatine binavkirin" diparast, dema ku got pêwîst e Tirkiye derbasî sîstema eyaletê bibe, der barê wî de ji 'xwestina parçekirina welêt' lêpirsîn hat destpêkirin!

Berê, pir qels bûya jî hin dengên muxalif dihatin guhên mirov. Lê îro desthilatdarî û muxalefet li hemberî Kurdan xwedî heman gotinê ne. Ev rewşeke pir xeternak e. Rewş gihîştiye asteke wisa ku dema mijara gotinê Kurd bin, der û dorên ku wekî çepgir tên zanîn jî dikevin nav helwesteke nîjadperest. Halbûkî di salên 1960 û 1970'yî de li Tirkiyeyê Tirk û Kurd di rêxistinên çepgir de bi hevdu re bûn. Rêxistinên Kurdan, bi giştî bi rêxistinên çepgir ên Tirk re di nav hevkariyê de bûn. Têkoşîn ji bo bipêşvebirina Tirkiyeyê tevdî dihat meşandin. A rast, di nav der û dorên çepgir de wê demê jî bi giştî dema behsa Kurdayetiyê dibû, digotin ku ev yek nîjadperestî ye û nerazîbûn dihat nîşandayîn. Heman muamele li Sûriyeyê jî di nav der û dorên çepgir de heye. Dema hinekan xwestiye behsa Kurd û Kurdayetiyê bikin ew bi şovenîstiyê hatine sûcdarkirin. Lê çi dibe bila bibe, li gel kaos û zordariyên mezin ên ku di wê demê de pêk dihatin, asteke ji rewşa îro pêşketîtir hebû. Qet nebe, biratiya gelan dihat bilêvkirin, mirov dikaribû li dengên cihê rast bihata û hin caran nîqaşên girîng dihatin meşandin.

Lê li rûdanên dawî mirov ecêbmayî dimîne. Wek nimûne, Prof. Mumtaz Soysal ê ku di sala 1971'ê de ji hêla rêveberiya leşkerî ve bi mahneya ku 'propagandaya komunîzmê dike' tê girtin û darizandin û di hilbijartinên giştî yên sala 1991'ê de ji SHP'ê wekî parlamenterê sosyal demokrat ê Enqereyê tê

hilbijartin, vê dîtin û ramanê dide pêş: "Li Tirkiyeyê gelê Kurd tune ye, ji lew re dayîna mafan a ji bo Kurdan dê kirineke xelet be." Bi gotina wî, îbareya "Gelê Kurd..." bi Makeqanûna Komara Tirkiyeyê hatiye qedexekirin. Soysal Beg "ji ber ku" dibêje û binêrin ji bo sebeba wê çawa dom dike: "dema ku hûn bibêjin gel, bi awayekî xwezayî mafê vî gelî yê tayînkirina çarenûsa xwe (self-determination) jî ji ber xwe ve derdikeve holê. Ji ber vê yekê divê îbareya gelê Kurd were qedexekirin..."[205]

Li Tirkiyeyê înkarkirina Kurdan bi israr hetanî salên 1990'î berdewam kir. M. Sadî Koçaş, di pirtûka xwe ya bi navê 'Koka Kurdan û Rastiya Başûrê Rojhilatê Anatoliyê' ('Kürtlerin Kökeni ve Güneydoğu Anadolu Gerçeği') de, ku di sala 1990'î de hatiye weşandin, hewl dide ispat bike ku Kurd Tirk in. Di zemanekî ku teknolojî û zanistî ew qas bi pêş ketiye, ev feraset çawa hîn jî tê meşandin bi rastî ez fêm nakim. Polîtîkaya înkarê wisa bi awayekî sîstematîk hat meşandin ku gelek caran navê nasnameya Kurdan jî wekî tehdît hat destnîşankirin û ji bo têgihên Kurd û Kurdistan neyên bikaranîn hewldanên mezin hatin dayîn. Kî dibû bila bibûya li hemberî kesên ku ev têgih bi kar dianîn, îfadeyên ku digihîştin heqaretê dihatin bikaranîn. Nivîseke ku di 06.05.1992'yan de di rojnameya Tirkiyeyê de hatiye weşandin wiha ye: "Konseya Ewrûpayê ku ji bo Başûrê Rojhilatê Anatoliyê têgiha 'Kurdistan'ê bi kar anî dîsa kustaxtî kir. Li hemberî mafên me yên desthilatdariyê zimandirêjî kirin û careke din rûyên xwe yên rast nîşanî me dan. Di rapora ku bi kustaxî hatiye nivîsîn de, 'Tirkiye bi lez ber bi şerekî navxweyî ve diçe' jî di nav de, cih dane gelek îdîayên ji derveyî rastiyê..."[206]

Polîtîkaya înkarkirina Kurdan ku bi israr hat meşandin tu fêde neda, berevajî, vê yekê bi xwe re rêlibergirtina çareserkirina pirsgirêkan anî. Velî Devecîoglu, bi zimanekî baş diyar kiriye ku înkarkirina Kurdan ne çareserî ye. Di doza Azîz Nesîn de ya ku berê me behs kiribû, parêzerê wî Velî Devecioglu wiha digot: "...Di vemirandina agir de qebûlkirina hin rastiyan gava yekem e. Berî her tiştî divê wekî komeke etnîkî hebûna gelê Kurd nema bê nîqaşkirin. Gotinên wekî 'Kurd tune ne' û tunehesibandina milyonan, bi tehdîta hepsê bêdengkirina rewşenbîrên ku ji ber berpirsiyariya xwe ya li hemberî serdem, dîrok û civakê ji neçarî berevajî van gotinan dibêjin, wê bi kêrî tiştekî neyê. Gotineke xweş heye, dibêjin, 'Roj bi bêjingê nayê veşartin.'..."[207]

Niha jî em di derbarê zimên de li ser problemeke din a mezin ku bi danîna sînoran re bi awayekî otomatîk ketiye dewreyê bisekinin. Yek ji pirsgirê-

[205] Faik Bulut, bnb., r. 70
[206] Faik Bulut, bnb., r. 37
[207] Aziz Nesin, bnb., r. 75

kên herî girîng ên ku sînorên di sedsala 20'an de hatine xêzkirin bi xwe re ji bo Kurdan anî ew e ku dewletên ku Kurd lê dijîn alfabeyên cihê cihê bi kar tînin. Zimanê fermî yên van dewletan ji hev cihê ne. Li Îranê di dibistanan de zimanê perwerdehiyê yê fermî Farisî ye û alfabeya Erebî tê bikaranîn. Li Tirkiyeyê tîpên Latînî tên bikaranîn û zimanê fermî Tirkî ye. Kurdên li Yekitiya Sowyetan bi giştî alfabeya Krîlî bi kar tînin. Li Îraq û Sûriyeyê jî zimanê fermî Erebî ye û alfabeya Erebî tê bikaranîn. Di vir de jî derbeyeke piralî heye. Yanî di heman demê de hem ziman tê guhertin hem jî alfabe. Bi vî şiklî Kurd ji aliyekî ve bi zimanekî ku nizanin perwerdehiyê dibînin, ji aliyê din ve jî bi bikaranîna alfabeyên cihê di nava xwe de parçe dibin. Yanî bi zimanên cihê cihê, lewre bi çandên cihê tên asîmilekirin. Ev tê wateya ku bi hezaran sazî û dezgeh, ev nêzîkî sed salî ye ji bo tunekirin, perçekirin, cudakirin û jihevqutkirina Kurdan dixebitin. Ji ber cihêbûna zimên û alfabeyê, Kurdên li parçeyekî nikarin ji xebateke Kurdên ku li parçeyekî din kiriye sûdê werbigirin. Wekî nimûne, ji ber ku li Tirkiyeyê alfabeya latînî tê bikaranîn, Kurdên li Tirkiyeyê (ji bilî îstisnayan) nikarin nivîsên ku ji hêla Kurdên Îran, Îraq û Sûriyeyê ve hatine nivîsîn bixwînin. Di heman demê de Kurdên li Îran, Îraq û Sûriyeyê jî nikarin berhemên ku li Tirkiyeyê yan jî cihekî din bi tîpên latînî hatiye amadekirin bixwînin û hwd. Bi vî awayî, xebatên girîng ên ku tên kirin tenê digihîje ber destê beşeke biçûk. Ji xwe pirsgirêkên çapê û bêderfetî jî rê li ber xebatan digirin, bi vî awayî yekcar xebat tên fetisandin. Heger ku em ji bo vê çend mînakan bidin, wek nimûne li başûrê Kurdistanê carna hin xebatên ku hebekî ji Kurdî re rê vekirin çêbûn. Jixwe heta niha herî zêde li Îraqê perwerdehiya bi zimanê Kurdî hat kirin û xebatên weşangeriya Kurdî pêk hatin. Kurdên Tirkiyeyê ji van xebatên ku bi tîpên Erebî hatine kirin (ji bilî kesên ku karin Quranê bixwînin) nikaribûn sûdê werbigirin. Heman rewş ji bo xebatên ku li Îranê hatine kirin jî heye. Wekî nimûne di salên ku li Îranê Komara Kurd a Mehabadê hat damezirandin de, di Kurdî de pêşketineke girîng çêbû, lê hem ji ber zordariyan hem jî ji ber rewşên ku me li jorê behs kir, weşanên navborî baş belav nebûn û pêş de neçûn. Gelo çend kesan karibûn kovara Hawarê ku li Sûriyeyê dihat derxistin û di hebûna Kurdî ya îro de roleke wê ya girîng heye bixwînin?

Jixwe li Tirkiyeyê gelekî bi derengî di 12'ê Avrêla 1991'ê de qedexeya li ser axaftina bi Kurdî hat rakirin. Yanî ne tenê alfabeyên cihê, zimanên cihê, bi hebûna sînoran qutkirina têkiliyan; axaftin jî pirsgirêk bû. Pir kêm hinekan xebat kiribin jî bi dizî û bêdeng tevgeriyane. Loma windahî piralî çêbûye.

Di vê navberê de divê em behsa perwerdehiya Kurdî ya li Ermenistanê bikin. Ji ber ku cara yekem li wê derê gavên girîng hatine avêtin. Ji bo Kurdên Ermenistanê hin mafên çandî hatine dayîn û li wê derê xebatên girîng hatine meşandin. Li Ermenistanê di sala 1921'ê de bi tîpên Ermenkî alfabeya Kurdî hat çêkirin. Dîsa li Ermenistanê di sala 1928'an de alfabeya Kurdî ya bi tîpên Latînî hat çêkirin. Wekî ku me berê jî anî zimên, li wê derê dibistanên Kurdî û hin weşanên cur bi cur ên Kurdî hebûn, lê ji ber sînorên ku bi tundî hatine parastin û guherîna alfabeyê qutbûnek pêk hatiye, Kurdên li dewletên din nikaribûn ji xebat û pêşketinên li wê derê sûdê werbigirin. Lê mirov kare bêje, tenê weşanên radyoyê ji hêla hemû Kurdan ve dihatin guhdarkirin. Bi weşanên Kurdî yên di Radyoya Yêrîwanê de, dengê Kurdên wê derê, stranên Kurdî digihîşt hemû Kurdan û heyecan bi wan re çêdikir. Li cem me, li Mêrdînê 40-45 sal berê hema hema bibêje bi cihên dûr re tu têkilî tune bû. Radyoya hemû malan jî tune bû. Xweş tê bîra min radyoyeke baş a kalikê min hebû li gund, havînan li ser banê qesra xwe dengê Radyoya Yêrîwanê bilind dikir û dikir ku deng here gund tevî. Îcar dema ku Meryemxan û Mihemed Arifê Cizrawî distiran kêf kêfa gundiyan bû.

Di warê hejmarê îstatîstîkan de jî pirsgirêk hene. Îstatîstik û tespîtên fermî ji bo gelek dewlet û miletan bingeha fêmkirina gelek tiştan e. Lê ji ber înkarkirina rastiyê di vî warî de jî xeletiyên mezin hene. Wek ku di mînakan de jî vekirî tê xuyakirin gelek caran Kurd mecbûr mane xwe înkar kirine. Loma di îstatistîkên ku hene de rastiya wan nayê xuyakirin. Jixwe di gelek belgeyan de qet navê wan jî derbas nabe. Wek mînak, di hejmartina nifûsê de li Tirkiyeyê ji ber ku nasnameya Kurdan nehatiye qebûlkirin Kurd wek Tirk tên hejmartin. Loma hejmara nifûsa Kurdan a sererast tune ye. Bi texmînî hin hejmar tên gotin, lê ji ber ku gelek ên veşirtî hene mirov nikare bêje ev rast e.

Ne tenê li welatê xwe li welatê biyaniyan jî gelek caran Kurd nikarin bi nasnameya xwe bijîn. Ji ber ku ne xwedî dewlet in, bi nasnameya dewletin din dibin xwedî mafan, mecbûr dimînin rastiya xwe nadin xuyakirin. Li gelek dewletên Ewrûpayê bi piranî Kurd bi nasnameya Tirkan in. Ev li gelek deran wisa ye. Li cihê ku karin li ser nasnameya xwe bin jî ji ber hin sedeman hejmara wan hindik didin xuyakirin. Di hin hevpeyvînan de Prof. Nadîr Nadîrov gotiye, ji ber ku Kurd ne xwedî komarê bûn û ji bo ku ji îmkanên komarekê îstîfade bikin gelek Kurdên ku li Kazakîstanê dijiyan xwe wek Tirk dane nivîsandin. Nadîrov diyar dike ku, di hejmartina 1989'an de tenê 25.000'an xwe wek Kurd dane nivîsandin, halbûkî bi kêmanî 30-40 hezar in.

Ji bilî vê Nadîrov dibêje ku: "Di hejmartina 1923'yan de tenê li Azerbeycanê hejmara Kurdan 48 hezar dihat xuyakirin. Lê ev hejmar di 1939'an de daxistin 3 hezarî, di 1951'ê de jî daxistin 1 500'î."[208]

Ên ku mecbûr man xwe veşartin an jî înkar kirin, zarokên wan bêhtir bêyî ku nasnameya xwe ya rastîn zanibin mezin bûn. Nifşê nuh ji ber ku zêde bi çanda Kurdî nejiyan di rastiyê de jî ew bûn xwedî nasnameyin din. Halê Kurdên Êzîdi hîn xerabtir e. Êzîdî Kurdên herî 'hur û 'esîl in, gelek caran bi qirkirinê re rû bi rû mane. Hîn jî heta ji wan tê xwe nadin xuyakirin. Em li nivîseke rojnamevan Bîrgul Ozbariş Arda ya di vê derbarê de binerin:

"Sînorê bê oxir: Ava Reş

Bi kincên xwe yên spî, deqên li dest û ruyên xwe û çemberên xwe yên pîroz, wek çîrokekê bûn. Bi sed salan vekişiyan çiyayan û di jiyaneke veşartî de çîroka xwe parastin. Lê ev lehengên vê çîrokê çiqas vekişiyabin serê çiyayan jî, ji me ne dûr bûn û bi taybetiyên xwe ve di nav me de bûn. Lê mixabin kesekî nedixwest ne wan û ne jî taybetiyên wan bibîne. Lewra ew ÊZÎDÎ bûn. Navê ola wan di nav misilmanan de qedexe bû. Hîn jî, hin kes van helwestên xwe diparêzin.

Piranî jî Êzîdiyên aliyê Qers, Îdir û Agiriyê, ji ber vê helwestê hîn jî nikarin li ola xwe xwedî derkevin. Lewra komkujiyeke mezin dîtine.

Di dema komkûjiyê de dixwazin di ser Ava Reş re birevin û xwe xelas bikin, lê mixabin li gor gotinên kal û pîrên me, wê demê gelek Êzîdî di nav Ava Reş de tên kuştin. Loma jî, Ava Rêş di dîroka Êzîdiyên Êrîwan û Rûsyayê de xwedî taybetiyeke mezin e. Ava Reş Êzîdiyan dike du perçe û di nav wan de dibe wek sînorekî bê oxir...

Ava Rêş, di navbera bajarê Qersê, bajaroka Dîgorê û sînorê Rûsya û Ermenîstanê de ye. Çemekî zirav û bi rastî jî reş e. Dema mirov destên xwe didê, av spî ye; lê dema diherike, ji ber komkujiya sed salan û ji ber êş û kulên xwe, çem rengekî reş digire...

Êzîdiyên ku dema komkujiyê nikaribûn birevin Ermenîstan û Rûsyayê, li Qersê man û dengê xwe birîn. Hezar mixabin ku ola xwe înkar kirin û ji ber tirsa kuştinê gotin 'em misilman in'. Ev helwest ji bo wan êşeke pir mezîn bû. Piştre hemû malbatên Êzîdiyan ketin bin bandora misilmanan û deriyên xwe girtin. Careke din navê ola Êzdatiyê neanîn ser zimanên xwe û zarokên xwe jî ji Êzdatiyê bi dûr mezin kirin. Lewra wan komkujiyek dîtibû û nedixwes-

[208] Rafet Ballı, bnb., r. 585

tin zarokên wan jî bên kuştin. Ji ber vê sedemê, ola xwe di nav xwe de jî veşartin.

Ne vekirî gotin 'Em Êzîdî ne', ne jî bi dil û can gotin 'Em misilman in'. Êzîdiyên Qersê ku li ser axa xwe man, bê deng bûn û rastiya xwe ji xwe jî veşartin, tu carî hişkere nekirin. Lê wan tu carî dev ji kevneşopiyên ola xwe jî bernedan. Li pişt deriyên girtî, ev kevneşopî heta îro anîn. Bi taybet li Qers, Îdir û Agiriyê, hema hema di mala her Kurdekî de wêne û peykerên Têyrê Tawis hene. Her wiha di malên hinan de jî, Mishefa Reş heye, lê vedişêrin. Û ev navên mîna Melekê Tawis, Mishefa Reş û Çiyayê Gulê, di dua û nifiran de rojane tên bikaranîn...

Me çîroka ola xwe nizanibû û jixwe me ola xwe jî nizanibû. Mezinan ji me re digotin: 'Em misilman in'. Lê tu carî jî doza pêdiviyên îslamiyetê li me nedikirin û nedixwestin em mîna misilmanekî jî bijîn.

Me nedizanî ola me, Êzdayetî çi ye, lê çîrokên ku di Radyoya Dengê Êrîwanê de dihatin gotin, bala me gelekî dikişand. Tew min gelek gotinên ku dihatin gotin fam jî nedikir, lê ew tona deng, stranên Eyşeşanê sebra min dianî û ez heta dawiya bernameyê ji ber radyoyê ranedibûm. Ew deng û stran hîn jî di guhê min de ne.

Mezinên me dema li Radyoya Dengê Êrîwanê guhdar bikirina, tu car kesekî nikaribû deng bikira û heta weşan biqediya jî wê bêdengiyê berdevam dikir. Ew saetek, bi vî awayî derbas dibû.

Di salên 90'î de ev çîrok ji pişt deriyan derket û di nav zarokên Kurdan de jî, êdî hat axaftin. Lê dema bihata gotin jî, wek çîroka oleke xerîb dihat gotin. Hîn jî kesek nikare bi tu awayî bibêje: 'Em Êzîdî ne, kal û bavên me Êzîdî bûn'..."[209]

Li Ewrûpayê jî îro gelek kesên ku bi eslê xwe Kurd in û nizanin bi Kurdî biaxivin hene. Hin jê xwedî potansiyelên gelekî hêja ne û kezeba wan li ser Kurdayetiyê dişewite lê bi zimanekî din berheman didin. Gelo yên ku xwe înkar nekirin û li himberî hemû zehmetiyan li ber xwe dan rewşa wan çawa ye? Ew kesên xwe înkar nekirin, bi salan li ber xwe dan lê ji ber ku zimanê wan ne zimanê fermî bû, zimanê wan gelek caran qedexe bû, berhemên bi zimanê wan zêde tune bûn; kirin û nekirin zêde bi pêş neketin. Heger hin berhem hatibin afirandin jî, li gor pêşketinên li dinyayê qels man. Ji aliyê aborî ve jî yê ku xwe înkar kirin bûn xwedî mertebeyên bilind û yên xwe înkar nekirin îşê wan nemeşiya, kêm ketin, zeîf ketin, di civatê de nebûn xwedî cihekî bi qewet. Jixwe yê ku hebekî dengê xwe ji vê bêedaletiyê re der-

[209] Birgul Ozbariş Arda, 19.07.2007, www.amidaKurd.com

xist, ya hat girtin, an jî hat kuştin.

Sermayeya miletekî ya herî mezin zimanê wî ye. Ziman ji holê rabe, nasname jî ji holê radibe. Ji ber vê yekê wekî ku di vegotinên li jorê de jî tê dîtin, ji bo tunekirina miletekî yek ji hedefên pêşî ziman e. Wek ku tê zanîn di asîmilekirinê de jî faktora herî mezin ziman e. Miletê serdest dema ku zimanê xwe empoze dike şiklê fikirandina xwe û çanda xwe jî neqil dike. Bi vî awayî bi tunekirina zimanê miletekî re hebûna wî tê tunekirin. Ji loma ji ber ku zimanê Kurdan ev bi dehan sala ye qedexe ye û ew bi zimanê çar dewletên ku lê dijîn perwerde dibin, em dikarin bêjin îro Kurdan ji kesayetiya xwe ya neteweyî gelek tişt winda kirine.

Ji bilî çend mînakên qels tu derfeta ku Kurd çanda xwe bi pêş bixin tune ye. Ji aliyê din ve wek ku me berê îfade kir, her dewlet hewl dide çanda xwe bi pêş bixe û belav bike. Di vê navberê de Kurd jî di bin bandora çandên cihê de dimînin. Ev yek jî di navbera Kurdên ku li dewletên cihê cihê dijîn sînorekî nû çêdike.

Di Adara 2007'an de, dema ku ji bo lêkolîna li ser sînor ez çûm Binxetê (Sûriye), bi hin hevalên nivîskar re em hinekî li ser vê mijarê axivîn. Wan jî ev yek dianîn zimên û digotin: "Di xewnên me de Şam heye, di xewnên we de jî Stenbol heye." Ev gotin gelek tiştan zelal dike. Ev rewş Kurdan bi problemên cur bi cur re rû bi rû dihêle. Di vî warî de Şairê Kurd Ehmed Huseynî şîroveyên girîng kirine. Di hevpeyvîneke ku di dema 3'yemîn Rojên Wêjeyê yên Amedê ya sala 2005'an de pê re hatiye çêkirin de Huseynî diyar dike, "...Ez Kurd im, min bi Erebî xwend, ez wekî Ereban difikirim. Kurdekî ku li Tirkiyeyê mezin bûye jî wekî Tirkan difikire. Ev, tehlîkeyeke pir cidî ya li ser nasnameya Kurdan e. Tiştê herî bi talûke ev e ku em çanda zimanê ku em pê perwerde dibin distînin. Alfabe pirsgirêkeke hê biçûktir e. Mesele di vir de dibe girêk." Û wiha gotinên xwe berdewam dike: "Problem ne problema ji hevdufêmkirinê ye, problem problema mantalîte û ferasetê ye. Em dest bi dibistanê dikin, em zimanekî nû fêr dibin. Wekî nimûne, Ereb ji me re dibêjin, 'miletê herî baş ê li dinyayê Ereb in. Fêkiya herî baş xurme ye. Xwezaya herî xweş ya Ereban e. Li Tirkiye û Îranê jî tiştên wiha tên gotin. Em bi wê çandê radibin, ew çand dibe zimanê hestên me. Li Sûriyeyê Kurdek bi straneke Erebî ji dest xwe diçe. Li Tirkiyeyê bi heman awayî. Zimanê ku ji me re rast tê, feraseta me pêk tîne. Di kêliya em rûdinên ku em li mamoste guhdarî bikin de, her tiştê me ji me tê dizîn. Zimanê me yê zikmakî, bi axaftina rojane, peyvên ku li kuçeyan tên bikaranîn û axaftina dayikan bi sînor dimîne. Di vir de giyanê me dibe qurban, çanda me dibe qurban. Em wekî însa-

nekî ku paşê hatiye afirandin dijîn. Di kêliya vê guherînê de, feraseta me ya bi dîrokê re tê guhertin, klasîkên me bi me dibin tiştin cihê. Folklora me dibe tişteke din. Di warê bîr û mejî de her tiştê me tê şûştin. Em encama pergalê ne. Heger em bi awayekî hîn kurtir herin, li Kurdistanê birinc bi çar awayan tê kelandin. Kîlera me jî hat guhertin. Di vê nuqteyê de, teqez zaravayên me ne problem in. Di warê nivîsê de em ê çawa careke din xwe saz bikin û kesayetiya (xwebûna) xwe ya winda peyda bikin. Em gelek ji kalikên xwe dûr man. Hema bibêje ev sed sal e em çanda Kurdî nastînin. Ji bo ku em bigihîjin kalikên xwe ji me re demeke dirêj lazim e. Ji ber ku em fêrî hevokên xwe nebûn. Hişmendiya me, mejiyê me bi vê nermbûnê ve bi Tirkî, Erebî û Farisî re di têkiliyê de ye. Problema herî mezin ev e..."

Di vê mijarê de ew qas pirsgirêkên mezin pêk hatin/pêk tên ku em ê nikaribin li ser hemûyan cihê cihê bisekinin. Ku em mijarê hebekî top bikin, em karin bêjin di encamê de têkiliya Kurdan a bi dîroka wan re hat qutkirin, her tim êrîş li ser kesayetiya wan hebûn û di rewşeke ku nikarin ziman û çanda xwe bi pêş bixin de ketin sedsala 21'ê. Ligel vê yekê Kurd gelek kêmasî û pirsgirêkên ku bi dehan salan hewl bidin dê nekaribin ji ser xwe biavêjin, di hundirê xwe de dihewînin. Wekî mînak îro li Îraqê Kurdî piştî Erebî wekî zimanê fermî yê duyem hatiye pejirandin. Li Başûrê Kurdistanê perwerdehiya bi Kurdî heye. Lê belê dîsa jî di warê bikaranîna zaravayên Kurmancî û Soranî de pirsgirêk hene û hewldanên ji bo standartkirina zimên bê encam dimînin. Wek ku tê zanîn ji serê sedsala 20'an ve carna li vir Kurdan hin heq stendin. Di dema van bidestxistinan de ji bo ku zaravayê Kurmancî ku di nav Kurdan de herî zêde tê bikaranîn li wê derê neyê bikaranîn Tirkiye kete nava hewldanan û mudaxale kir. Îro jî li wir, li Kurdistana Federe li ser vê bingehê pirsgirêk dewam dikin.

Pêkanînên ji bo asîmilekirina Kurdan di nava demê de ne sekinîn ne jî kêm bûn. Berî em derbasî gotinên li ser sirgunkirin û koçberkirinê bibin divê em dîsa bi bîr bînin ku di van pêkanînan de ne tenê Kurdan zirar dîtiye. Di sedsala 20'an de her çiqas alozî û pevçûn pêk hatin jî li dinyayê roj bi roj pêşketinên girîng çêbûn, lê dewletên ku Kurdistan di nav xwe de par kiribûn li gor serdemê roj bi roj paş de çûn û problemên wan her tim zêdetir bûn.

Rêbazeke din a ku ji bo tunekirina nasnameya Kurdan û birina serî ya plan û bernameyên asîmilasyonê, bêguman sirgûnkirin û koçberkirin e ku me di serî de behs kiribû. Wek ku di destpêkê de me îfade kir, hîn di heyama Osmaniyan û Safawiyan de sirgûnkirin zêde ye. Wekî mînak, di sedsala 19'an de wek mala Bedirxaniyan gelek Kurd hatin sirgûnkirin. Lê sedsala 20'an

tevde wîlo derbas bû û hejmara yên ku hatin sirgûnkirin û koçberkirin gelekî zêde bû. Di vê sedsalê de li çi dewleta ku Kurd lê dijîn, bê rawestan sirgûn û qanûnên sirgûnê li hemberî Kurdan bi şêweyekî hovane hatin bikaranîn. Hin ji yên ku hatin sirgûnkirin bi rê de bi tevkujiyê re rû bi rû man, gelek ji wan jî di vê riyê de nexweş ketin. Nivîskar Serkan Brûsk di nivîseke xwe ya di vê mijarê de wiha dibêje: "...Başûrê Kurdistanê sirgûn, windakirin, tevkujiya ku ji aliyê Sadam Hisêynê hov ve dihat kirin birîna xwe îro jî teze ye. Li Başûrê Biçûk rejîma Esadê mezin û biçûk, bi sîstema xwe ya hovane hiştiye ku gelê Kurd di welatê xwe de, di jiyana sirgûnê de bijî. Hovîtiya sofiyên Îranê li hemberî gelê Kurd pir dijwar e, mirov nikare bi çend peyvan bîne zimên. Sirgûn li hemberî gelê Kurd hetanî roja me vekirî yan jî sergirtî didome."[210]

Ji gotinên Îsmaîl Beşîkçî yên di vê mijarê de çend hevok wihan in: "Şandina Kurdan a sirgûniyê û xebata ji bo li şûna wan bicihkirina Tirk, Ereb û Farisan, li Kurdistanê, li ser erdên herî bi adan çêkirina Çewlikên Hilberînê yên Dewletê û avakirina Garnîzonên Leşkerî, polîtîkayek e ku ji hêla dewletên ku Kurdistanê ji xwe re wekî mêtîngeh bi kar tînin, bi israr tê meşandin."[211] Bi desteserkirin û pêkanînên van polîtîkayan her tim Kurd man birçî, tazî û koçber. Ev jî wek xwesteka yên ku vî karî pêk tînin, bi Kurdan dide windakirin û wan dike xwedî gelek nexweşî.

Heger em bi şopandina pêvajoyê re ji pêkanînan hin mînakan bidin, pêwîst e em careke din vegerin serê sedsalê. Li Tirkiyeyê, ji sirgûnên ku ji salên pêşî ên komarê dest pê kirine û gelek caran di plan û programan de cih stendine sirgûna mezin a ewil piştî Serhildana Şêx Seîd pêk hatiye. Di vê sirgûniya mezin de, ji bo kes û malbatên ku ji herêma serhildanê sirgûnî rojavayê Anatoliyê hatine kirin, tevger li gorî "Qanûna di Der Heqê Eşîr, Mihacir û Multeciyên ku Cih û Warên Xwe Yên Mihelî Bêdestûr Terk Kirine" hatiye pêkanîn. Ev qanûn bi tarîxa 10'ê Berfenbara 1925'an û bi hejmara 675'an e. Li gorî tespîta Mustafa Akîf Tutenk, li gor vê qanûnê ji Amed û der û dorên wê hin kesên ku sirgûnî Îzmîr, Aydin, Saruhan (Manîsa), Antalya û Bursayê hatine kirin ev in:

Refet Begê kurê Abdusselam, Abdul Begê kurê Ahmet Axayê Avineyî, Ahmet Axayê Kerkhî, Haci Mehmedê Hasiliyî û kurên wî Mustafa û Hamo, Muharremzade Mehmet Beg, Haci-Hamitefendizade Eşref Beg, Ganizade

[210] Rûpelek ji dîroka me ya winda: Reva ji sirgûnê a Ehmedê Silêman, Serkan Brûsk, Zarathustra News, 21.8.2007
[211] İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan(Kurdistan, Mêtîngeha Navdewleta), r. 16

Dr. Cevdet û Reşat Beg, Cercisagazade Abdulkerim Beg, Nakipzade Bekir Sidqî Beg, Nakipzade Osman Recai (Ocak) Beg, Halifezede Sait Axa û Salih Axa; Cemilpaşazade Kasim, Omer, Memduh, Bedri, Fikri û Muhittin Beg; Mirikatibimizade Şevket, ji Sarigiburmayan Fikri Beg, Ulahefendizade Siddik û Celal Beg; Mahmut Begê Şemrahî, Arifefendizade Nedim û Edip (Pirinççioğlu) Beg, Emîn Axa, Hesenê Kogulu, Îlyasê Dêrikî, Salihê Dêrikî û Rifat Begê Hevedanî. Hejmara kesên ku ji herêmê hatine sirgûnkirin ji 500'î zêdetir e..."[212] *



*Nifşek ji yên ku hatine sirgûnkirin*[213]

Piştî vê li Tirkiyeyê bi navberên kin gelek caran ji bo sirgûniyê qanûn hatine derxistin, sirgûn li dû sirgûnê hatiye û gelek kesên Kurd sirgûnî Anatoliya Navîn û Rojava hatine kirin. Qanûna Îskanê ya bi tarîxa 31'ê Gulana 1926'an û bi hejmara 885'an yek ji van qanûnan e. Piştre jî qanûna bi tarîxa 10'ê Pûşpera 1927'an û bi hejmara 1097'an ku wekî "Qanûna Derbarê Ji Mintiqeya Şerqê Neqilkirina Hin Şexsan a ji bo Parêzgehên Xerbê" tê derxistin. Di xala yekem a vê qanûnê de wiha tê gotin; "Ji ber sedemên îdarî, leşkerî û civakî, ji bo hikumetê destûr hatiye dayîn ku, ji herêmên rêveberiya awerte ya Rojhilat û ji parêzgeha Bazîdê, bi qasî hezar û çarsed (1400) şexs û malbatên wan, malbatên heştê (80) kesên serhildêr û mehkûmên cezayê giran ên li herêma navborî, neqlî bajarên rojava bike."

Basil Nikitin, di berhema xwe ya navborî de, derbarê sirgûnên vê demê de ev têbinî qeyd kiriye: "...Wekî tê zanîn, di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Ermenî ji hêla Tirkan ve hatin sirgûnkirin û li wir hema bibêje qet Ermenî

[212] Şevket Beysanoğlu, Diyarbakır Tarihi Cilt 3, r. 1026

** 270 malbatên Kurd sirgûnî tenê bajarê Nîgdeyê hatine kirin. Tê diyarkirin ku di heman demê de ji girtîgehên li Kurdistanê nêzikî 50 hezar girtî sirgûnî girtîgehên derveyî Kurdistanê hatine kirin.*

[213] Şevket Beysanoğlu, bnb., r. 1026

nemabûn. Lê Kurd jî piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, bi darê zorê ber bi rojava ve hatine koçberkirin ku ev yek zêde nayê zanîn. Bi taybetî jî di zivistana 1926 û 1927'an de, piştî têkbirina serhildana Şêx Seîdê Pîranî, meqamên leşkerî yên Kemalîst, nêzîkî milyonekî Kurdên ku ji mêr, jin û zarokan pêk dihatin, bi tundîtiyeke wek koçberkirina Ermeniyan a salên Şerê Cîhanê yê Yekemîn, ber bi rojavayê Anatoliyê ve şandine. Lîsteyeke ku gundên wê demê hatine şewitandin û hejmara qurbaniyên bûyerê diyar dike, ji hêla Komîteya Neteweyî ya Kurd Xoybûnê ve di broşûra heft rûpelî ya bi navê 'Li Dijberî Tirkiyeyê Doza Kurdistanê' de hatiye dayîn. Her wisa di 5'ê Gulana 1932'yan de jî qanûnekî ku koçberkirina Kurdan raber dike hatiye derxistin. Ev qanûn bi berxwedana Kurdan a çekdarî re rû bi rû maye."[214]

Dema mirov li piştgiriya Kurdan a di Şerê Rizgariyê yê avakirina Komara Tirkiyeyê de difikire, mirov dibînê ku Tirk gelekî deyndarê Kurdan in. Lê Tirkan qet ev neanîne ber çavan. Heta gelek şexsên ku piştî avakirina komarê hatine îdamkirin, gelek kesên ku hatine sirgûnkirin û gelekên ku ji serhildanan re rêberî kirine, di pêvajoya avakirina komarê de, di meqamên bilind de wezîfeyên girîng meşandine. Gelek ji van kesan, di encama dinavhevdebûnê de ku me di serî de jî behsa wê kir, di dema Şerê Rizgariyê de bihevrebûna Kurd û Tirkan wekî riya herî rast dîtine û li gor vê yekê tevgeriyane. Hasan Yildiz di vê mijarê de hin navan dide: "Şexsiyetên girîng ên polîtîk û leşkerî, riya yekitiyê ji bo rizgariya welêt pêwîst dîtine. Yusuf Ziyayê mebûsê Bedlîsê û Hasan Hayriyê* mebûsê Dêrsimê ku wê di serhildana Şêx Seîd de bihatina îdamkirin, yek ji kevne fermandarên Alayên Hemîdiyeyê Xalid Begê Cibrî, General Îhsan Nûrî yê serekê dîrokî yê Serhildana Agiriyê ya 1929'an û hevalên wî, ji bo biratî û rizgariya her du gelan di nava têkoşîna milî de cih girtine. Di kongreyan de, di hevdîtinên meclîsê de, di nav raya giştî de, bi qasî rayedarên Kurd, rayedarên Tirk jî bi rihetî û vekirî behsa tifaq û biratiya gelên Tirk û Kurd kirine..."[215]

Bîranîna Dr. V. Nurî Dêrsimî vêna pir zelal dide xuyakirin. Dêrsimî di berhema xwe ya bi navê 'Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim'(Kürdistan Tarihinde Dersim') de wiha dibêje:

[214] Basil Nikitin, bnb, r. 79

** Hasan Hayrî Beg kurê Murtaza Begê ku yek ji serokê eşîra Şêx Hesenanî ya Hozatê ye. Di artêşê de wekî serheng (binbaşı) wezîfe kiribû. Di BMM'ya 1'em de, di Îstida, Îktisad û Encumentiya Mudafaa-î Milliyeyê de cih girtibû. Ji Meclîs-î Mebûsana Osmaniyan a Stenbolê hatibû Meclîsa 1'em. Hasan Hayrî Beg negirtin II'yem TBMM'ê(Meclisa Mezin ya Millet ya Tirkiyeyê). Di sala 1925'a de endamê Cemiyeta Serxwebûna Kurdan AZADÎ bû. Di dema Serhildana 1925'a de bi îdîaya 'hevkarîkirina bi serhildêran re' û 'dijberiya komarê' hate darizandin û di 23'yê Sermaweza 1925'a de hate şeniqandin.*

[215] Hasan Yıldız, Fransız Belgeleriyle Sevr-Lozan-Musul Üçgeninde Kürdistan, r. 190

"Min di rûpelên borî de gotibû, di sala 1924'an de, Hasan Hayriyê rehmetî li bal Seyid Riza derbasî Dêrsimê bûbû. Di vê navberê de, rojekê, min, Hasan Hayrî û serekeşîrên Dêrsimê me li mala Cemşîdê reîsê Eşîra Ferhadan a Xozatê civînek li dar xistibû. Di vê civînê de Hasan Hayrî mafê axaftinê xwestibû û wiha gotibû: "Di konferansa sulhê ya Lozanê de dema behsa Peymana Sevrê bûye, pirseke di der heqê 'bê Kurd dixwazin ji Tirkan cihê bibin an na' tê kirin. Ev mijar di 1922'yan de bi telgrafekê ji Meclîsa Mezin a Miletê (BMM) re hat îzahkirin. Di celseyeke veşartî de, Mustafa Kemal xwest fikra mebûsên Kurd fêm bike. Ez rabûm, min bi zimanekî teqez beyan kir ku Kurd ji Tirkan venaqetin û min bi hejmartina bûyerên ku ji dema Muaviye û heta niha pêk hatine hewl da ku ez bi dîrokî gotinên xwe ispat bikim. Mustafa Kemal ji ber van gotinên min pir dilxweş bûbû, ji kêfan lingên xwe li erdê dixist û bi coş ji min re li çepikan dixist. Heta roja dîtir, ji min rica kir û xwest ku ez bi cilûbergên netewî yên Kurdan herim Meclisê. Ez û hevalên xwe yên mebûsên Kurd, roja dîtir em bi cilûbergên milî yên Kurdan çûn meclîsê û me ji Konferansa Lozanê re telgraf şand, me ragihand ku Kurd ji Tirkan venaqetin." Piştî van gotinan 'bi edayeke xerîb ez destnîşan kirim û gotinên wekî: "Hevalê min Doktor Nûrî bi salan e doza serxwebûna Kurdistanê dimeşîne ku ew jî tim û daîm tê maneya mehfkirina Dêrsimê. Ez pir ji Doktor Nûrî hez dikim, lê belê ez li dijî armanca wî me. Piştî ku em bi Tirkan re hevkariyê bikin û miletê xwe tenvîr (rohnî, hişyar) bikin, îstiklal wê ji ber xwe ve pêk bê..." bilêv kir.

Min di bersivê de got:

Rêzdar Hayrî Beg, tu niha mebûsekî Kurd î û ji Tirkan veqetiyayî û tu bi hêvî yî ku careke din bi saya Partiya Terakîperwer bibî mebûs, lê tu xwe dixapînî. Wê rojek bê tu yê nikaribî navê Kurd jî bilêv bikî. Ji ber ku niha demeke qels a hikumeta Tirkiyeyê ye, ji bo Kurdbûna te di rûyê te de dikene, cilûbergên Kurdan li te dike, wê zemanek bê, belkî jî ji ber ku we cilûbergên Kurdan li xwe kirine wê ji we re ceza bê birîn."[216]

Emîr Celadet Bedirxan, di sala 1933'yan de, bi navê 'Ji Rewşenbîrekî Kurd Ji Bo Mustafa Kemal Nameyeke Vekirî' ji bo Mustafa Kemal nameyek weşand. Di wê nameyê de C. Bedirxan, di der barê Hasan Hayrî Beg û helwesta Mustafa Kemal a piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn a li hemberî Kurdan wiha dinivîse:

"...Hûn Zatifehîme jî li Amedê li muhîtekî Kurd bûn. Li hemberî hevalên me hûn muxalîf bûn û yên piştî şer û tiştên ku li pey parçebûna Tirkiyeyê qewimîn şopandin belkî yên yekem bûn. We xwest hûn xwe bi Kurdan şîrîn

[216] İsmail Göldaş, bnb., r. 215

bikin û cara yekem we di bin fermana Mebûsê Dêrsimê Hasan Hayrî Beg de, yê ku muharen li Elazîzê we da daliqandin, we girêdayî biryargeha xwe tabûreke Kurd da çêkirin. Qiyafetên vê tabûra ku efrad û zabitên wê kamil bûn bi temamî qiyafetên Kurdan bûn. Efradê vê tabûrê şal, şapik û kolos li xwe dikirin, xencera Kurd di ber xwe dadikirin. Qumandan nebin jî emîr di navbera xwe de bi Kurdî diaxivîn. Ev rindiyek bû ku cara yekem di Artêşa Osmaniyan de ji bo Kurdan dihat kirin."[217]

Gelek şexs û malbat bi eynî aqûbetê re rû bi rû mane. Yanî gelek kes û malbatên xwe yên di demên pêşî de di nava kadroya Şerê Rizgariyê de cih girtine û Ataturk bi xwe bi hin ji van kesan re têkilî daniye piştre hatine sirgûnkirin, an jî hatine îdamkirin. Îsmaîl Beşîkçî jî li ser vê mijarê sekiniye. Beşîkçî li ser mînaka Cemîlê Çeto dibêje, Mustafa Kemal ji Cemîlê Çeto re bi hîtaba 'birayê min' name nivîsîne, Cemîlê Çeto jî ji Mustafa Kemal re bersivên wekî 'birayê min' nivîsandine, lê di dawiyê de ew jî hatiye daliqandin û malbata wî jî hatiye sirgûnkirin.[218]

Jiyana kalikê bavê min Ehmedê Silêman jî bi sirgûnî, koçberî û girtinê derbas bûye û dawiyê bi îşkenceyê jiyana xwe ji dest daye. Me di beşa 2'yem de behs kiribû ku Axayê Omeriyan Ehmedê Silêman nehiştiye Frensî Nisêbînê bi dest bixin. Lê piştî komar hatiye avakirin ew jî pir caran sirgûn bûye. Di sirgûna ku tê gotin li dor 1943-44'an pêk hatiye Ehmedê Silêman sirgûnî bajarê Denizliyê dibe, kesên din ên ji malbata wî jî li bajarên din belav dikin. Piştî ku haya giregirên eşîretê ji biryara sirgûnkirinê çêdibe, ji bo ku qet nebe hin kesan ji vê çûyîna ku dawiya wê ne diyar e rizgar bikin, hin jin û zarokan bi dizî dişînin gundên nas, hinekan jî dişînin Binxetê (Sûriyeyê) cem xizmên xwe. Ên mayî bi temamî berê wan didin riya sirgûnê. Yek ji zarokên ku çûye sirgûnê bavê min Reşîtê Misto ye. Demekê li Buldana Denizliyê dimînin. Dûre, piştî wextekî bi dizî vedigerin warê bav û kalên xwe. Lawê Ehmedê Silêman Hesen Axa ku wê demê zarok bû, wiha behsa destpêka roja vê sirgûnê dike: Dema sirgûnkirinê baş nayê bîra min, lê dîsa jî hinek dîmen di serê min de zindî mane. Bi berbangê re bi sedan leşkerên siwarî dora gundê Çalê girtibûn. Dayika min û gelek ji jinapên min tevî zarokên xwe bi şev ji gund reviyabûn. Gelek ji wan daketibûn Binxetê. Mala xalê min jixwe li Binxetê bû. Gelek ji zarokên ku dayikên wan bi me re bûn jî, bi dizî li cem xalanên wan hatibûn bicihkirin. Lê dîsa jî hejmareke mezin jin û zarok di gund de mabûn. Tevî bavê min, her sê kurên Silêmanê mala Mihemed Cizîrî

[217] İsmail Göldaş, bnb., r. 216
[218] İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan, r. 240

(Mecît, Mihemed û Evdela) sirgûnî bajarê Denizliyê kiribûn. Leşkeran em dan pêşiya xwe û em birin. Dema em gihan Denizlî em ji hev veqetandin, her apekî min û kufletê wan dan derkê..."[219] Wek ku me li jor îfade kir ji bilî sirgûn û koçberiyan, Ehmedê Silêman çend caran tê girtin jî û dawiyê di encama kemîna li ber qereqolê jiyana xwe ji dest dide.

Di heyama Dewleta Osmanî de jî kesên ji Eşîra Omeriyan û mezinên wê gelek caran hatine sirgûnkirin. Geh sirgûnî Reqayê geh sirgûnî Erxenê Palûyê bûne, geh sirgûnî Konyayê bûne... Di heyama ku mîrekî feşkilîn û Mîrê Botanê Bedirxan sirgûnî Stenbol û Girîtê bû, ji ber ku hevalbendê Mîr Bedirxan e, axayê Omeriyan Sadûn Axa jî sirgûnî Rusçuka Bulgaristan dibe. 11 salan li wir dimîne dûre efû derdikeve, vedigere.

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, li Îranê jî hemû rêberên herêmî yên Kurdistana Îranê hatin sirgûnkirin; hinek mehkûmî bicîhbûna li paytexta Îranê hatin kirin, hinek jî li cihên dûr hatin belavkirin. Li vir jî sirgûniyan bi sedsalan berî niha dest pê kiriye. Hîn di sedsala 16'an de dema ku Kurdistan hat parçekirin, ji ber problemên ku ji sînoran diqewimîn gelek eşîret hatine sirgûnkirin. Dûre jî sirgûnkirinê bê navber berdewam kiriye. Yusuf Ziyad di vê mijarê de van agahiyan neqil dike: "Di serdema Safewiyan de, Şah Abas di bin navê ewlehiyê de hemû gundên Urmiyeyê dan valakirin û li şûna wan Azerî bi cih kirin. Li cihên ku ev yek ne mimkun bûye jî di navbera du gundên Kurdan de gundekî Azeriyan daye bicihkirin. Navên Kurdî yên hemû gundên Kurdan hatine guherandin û li şûna wan navên Azerî li wan hatine kirin. Navên çiya, rûbar, hemû cihên cografîk, taxên di nava bajaran de û semtan û navên cihên dîrokî jî di nav de hemû hatin Azerîkirin. Navên Kurdî niha bi awayekî fermî qedexe ne. Ev rewş heta roja me ya îroyîn jî wekî polîtîkayeke dewletê tê berdewamkirin."[220]

Yek ji riyên girîng ên ku Şah Riza jî li hemberî Kurdên di sînorê Îranê de serî lê dida sirgûn bû. Ji xwe di sala 1926'an de, Tirkiye, Îraq, Îran û Sûriyeyê di navbera xwe de peymanên dostanî û ewlehiyê îmze kiribûn, di van peymanan de hatibû nivîsîn ku wê destûr nehata dayîn ji erdên yekî li hemberî erdên dewletên din êrîş bihatina kirin û bi vî şeklî her yekî di nav erdên xwe de hîn bêhtir zorî daye ser Kurdan. Di heman demê de, di vê mijarê de ji hevdu mînak girtine.

Niha em bi çend jêgiran, hê ji nêzik ve li pêkanînên serdema Şah Riza binêrin. Ji vegotinên M. Van Bruînessen ên têkildarî mijarê çend hevok wihan in: "...cilûbergên kevneşopî yên Kurdan hatin qedexekirin, hate der-

[219] Rûpelek ji dîroka me ya winda: Reva ji sirgûnê a Ehmedê Silêman, Serkan Brûsk, Zarathustra News, 21.08.2007
[220] www.lekolin.org

pêşkirin ku Farisî bi temamî bikeve şûna zimanê Kurdî. Tedbîrên herî hişk li hemberî koçeran hatin stendin. Bi darê zorê kirin ku ew dev ji koçberiyê berdin. Serekên eşîran dihatin îdamkirin an jî sirgûnî herêmeke din a welêt dibûn (Kurdên Sunî yên ku koçî herêmên din ên Îranê kirin, ji ber baweriya xwe di bin zordariyan de bûn)... Encamên aborî yên tedbîrên ku Şah pêk dianîn dehşetwarî bûn: Pareke mezin a keriyên heywanan dihatin tunekirin û eşîr bi birçîbûnê re rû bi rû dihatin hiştin."[221]

Ji vegotinên têkildarî mijara me, çend rêz nivîsên pirtûka M. R. Îzady a bi navê 'Kurd' wihan in: "Li Îranê, di serdema ku Şah Riza Pehlewî li ser text bû (1925-41), beşeke mezin a eşîr/malbatên berxwedêr ên Şikak û Celaliyan, sirgûnî parêzgeha Farsê ya ku li başûrê Îranê ye hatin kirin. Ji vana beşeke girîng, di dema Şerê Cîhanê yê 2'yemîn de ku Îran ji hêla mutefîkan ve hatibû dagirkirin, paş de vegeriyan. Beşek jî li wê derê man; hê jî mimkun e ku mirov li nêzîkî Şîrazê li wan rast bê. Aqûbeteke hê zêdetir trajîk jî li benda Eşîra Bayranvend a dîrokî bû ku ew eşîr li Başûrê Dûr ê Kurdistanê bû. Piştî şerên gelek caran ên bi xwîn, ku Şah Riza bi xwe di seferan de rêveberiya wan dikir, beşeke pir mezin a vê eşîrê di sala 1927'an de koçberî aliyên cur bi cur ên dewleta Îranê hatin kirin. Beşeke bi şans a ku hejmara wê nêzîkî 5000 malbatî bû jî li Qazvîn, Varamîn û Karê (herêma giştî ya nêzîkî Tehranê) ku xwedî erdên bi bereket in hatin bicihkirin. Ên ku şansê wan hê kêmtir bû jî li Çola Xwê ya Kevir a li Xorasanê hatin bicihkirin û beşeke wan a mezin li wê derê tune bû..."[222]

Qasimlo, di berhema xwe ya bi navê 'Kurdistana Îranê' de, di mînakên têkildarî mijarê de wiha dinivîse: "Ji 10 000 endamên Eşîra Celalî ya ku li ser sînorên Îran, Tirkiye û Yekîtiya Sovyetan, yên ku ji koça bi darê zorê ya ber bi navenda Îranê ve sax xilas bûne û di 1941'ê de vegeriyane ser axa xwe, tenê çend sed in. General Ehmed Xan bi tasfiyekirina Lûran bûye xwediyê navekî xirab û wekî 'Qesabê Lûristanê' hatiye naskirin. Heman bûyer bi serê Eşîra Galbaghî de jî hatine. Eşîr koçberî Hemedan û Îsfahanê hatiye kirin, li ser xaka wan jî kesên ku bi Tirkî diaxivin hatine bicihkirin. Şertên ku di dema koçberiyê de hatibûn danîn wisa giran bûn ku, gelek kes derketibûn çiyayan û bi mehan wekî serhildêran şer tercîh kiribûn."[223]

A. M. Menteşaşvîlî jî wiha nivîsiye: "Di navbera her du şerên cîhanê de, ji hêla hikumetên Îran û Tirkiyeyê ve bi darê zorê koçberkirina eşîrên Kurd bi xwe re gelek encamên giran anîn. Bi van koçberiyan eşîretên pir mezin tune

[221] Martin van Bruinessen, bnb., r. 272
[222] Prof. Mehrdad R. İzady, bnb., r. 208
[223] Dr. Abdurrahman Qasimlo, İran Kürdistanı, r. 22

bûn. Di encama parçebûna Kurdistanê ya teqez û bi taybetî sazkirina rejîma tund a sînor a di navbera Tirkiye û Îranê de, eşîrên nîvkoçer ên ku çêregehên wan ên havînî yan jî zivistanî di nava sînorên dewletên dîtir de man, ji mafê xwe yên bi rihetî derbasbûna sînor, bêpar man."[224]

Sirgûnên ku hatine pêkanîn yek ji sedemên herî girîng ên serhildanan in. Bi vî şeklî li hemberî pêkanînan serhildan, li ser şopa yên di serhildanan de jiyana xwe ji dest dane ji nû ve serhildan, wisa li pey hev berxwedana Kurdan berdewam kiriye. Wekî mînak, sirgûnkirinên piştî serhildana Şêx Seîd ji bo serhildaneke dîtir, ji bo Serhildana Agiriyê bûye yek ji faktorên herî girîng. Lê belê ji bo asîmilasyon û helandina Kurdan sirgûnkirinan berdewam kirine. Hema hema di dema hemû sirgûnkirinan de jî problemên girîng derketine holê. Wekî nimûne li ser pêşniyaza Sererkanê Fermandariya Giştî Fevzî Çakmak, ji bo gundên Aşkirik, Kurk, Dagbey û Haryî yên Pilemûriyê neqlî rojavayê Anatoliyê bê kirin di navbera 24'ê Kewçêrê û 14'ê Sermaweza 1930'î de, li herêmê operasyona leşkerî tê lidarxistin.[225]

Bîranînên mirovekî nêzîkî 60 salî, rewşa wê demê û rewşa dûre ya kesên sirgûn dibûn radixe ber çavan. Di hevpeyvîna ku li Bazidê di 08.09.2007'an de me kiribû, bi me re ev hatin parvekirin:

*"Ez ê bi gotinê ku bavê min ji min re gotine dest pê bikim. Bavê min li herêma Bazîdê li gundekî li ber Grîdaxa Biçûk ji diya xwe bûye. Di sala 1927'an de 15 salî ye. Dema ew 15 salî ye Serhildana Agiriyê dest pê dike. Bavê min salixê van tiştan dida. Di şer de gelek caran gelek bidestxistin hatine pêk hatin; gelek caran jî jidestçûn çêbûne. Heta 1930'î şer dom kiriye. 1930'î de desthilatdariya Tirkan bi Îranê re hevdîtinek çêkiriye; Îranê rê daye Tirkan, eskerê Tirkan di hidûdê Îranê re jî ketiye pişta Grîdaxê, milet xistiye zorê û serhildan têk çûye.*

*Bavê min digot,*

*"Esra teng her bi her roj diçû ava; berê me dan Grîdaxê. Em ketin milê Rûsyayê. Em li geliyekî asê bûn jê re digotin Zemyan. Em gihan serikê Zemyanê, Zemyan gelekî kûr e (Ez jî çûme serê wê, gelekî kûr e, 600-700 metro heye.) jin, zarok û pîr em tevde dimeşin. Qundaxa zarokê di pêçekê de xistibûn têran; têrên li ser pîşta hespan. Em ketin berojkê, çêreyek lê hebû. Ew beroj gelekî kûr bû. Çi hespa ku xwe dida ser çêreyê tê de dişeqitî û têwerdibû. Yê ku hefsarê wê girtibû û tevî zaroka di têrê de diketin binê Zemyanê, dimirin. Di wir de bi 500'an bi 1000'an xelk qir bûn.*

[224] A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 187
[225] Rafet Ballı, bnb., r. 65

*Çi kesê ku mirin, çi kesê ku me xwe xelas kir. Em derbasî aliyê Îranê bûn. Xeberdana Îranê bi Tirkan re hebû. Li Îranê em girtin. Her 20-30 malên me birin teslîmî maleke xwe kirin. Li aliyê Îranê jî Kurdên ku hebûn gelek jê xwediyê yên li Tirkiyeyê ne. Kurdên li Îranê jî û em tevde sirgûnî cihên cuda cuda dikirin.*

*Em li Senendec, Xoy, Sine, Seqizê belav kirin. Em her bîst mal sih mal teslîmî cihekî dikirin. Em birin teslîmî kedxudayekî kirin. (Li wir ji muxtaran re dibêjin kedxuda.) Kedxuda em pênc mal, şeş mal birin her yek xistin gomekê, haşa tewlekê. Li wir me neqedand ku em zikê zarokên xwe têr bikin. Me şivantî xwest şivantî bi dest me neket, me gavantî xwest gavantî bi dest me neket. 12 salan me di wê zilmê de îdare kir. Diya min behecî mir, xwişka min behecî mir.*

*Piştî 12 salan ku Ûris hat Îranê em serbest berdan. Yanî Îranê dest ji ser me hilda. Wexta dest ji ser me hilda em derbasî Îraqê bûn. Li Îraqê jî hikum di destê Ereban de bû. Kurdên wê derê jî perîşan bûn. Li wir jî me neqedand ku em îdare bikin. Li wir sê salan em bi qaçaxî man. Em 7-8 mal in. 3 salan bi hêsîrî em li wir man. Nanê em bidin zarokên xwe tune bû.*

*Me bihîst, gotin, li aliyê Hekariyê Kerem Axa, Kerem Zayîdan heye. Gotin têkiliyê wî bi dewletê re hene, lê ku xelkê hêsîr here cem nahêle têkeve destê dewletê. Li ser vê fikrê îcar em derbasî Tirkiyeyê bûn."*

*Îcar di vir de tiştek hatiye serê wan, ez dixwazim wê bînim zimên. Digotin:*

*"Dema em ji Îraqê derbasî hidûdê Tirkiyeyê bûn, em hatin gundekî, reîsê wê eşîrê jê re digotin Ferhan Axa. Ew jî ji aliyê Kerem Axa ye. Ferhan Axa merivekî baş bû. Me got, heke em karibin li vir îdare bikin em ê li vir bimînin. Me zaro maroyên xwe kirin rêncberê wan. Ê me jî me xwest îşekî bidin me; xulamtî be dibe, şivantî be, gavantî be dibe. Ji bo em karibin zarokên xwe xwedî bikin. Em neh deh rojan man me nihêrî ku îdareya me nabe, nanê zarokên me dernakeve, me rabû îzna xwe ji Ferhan Axa xwest. Me got, em dixwazin xwe biguhêzin. Tek tûk însanên me li wan deran mane belkî ji me re bibin çare; em dixwazin xwe bigihînin Grîdaxê.*

*Ciwamêr îzna me da û sê zilamên xwe jî bi me re kar kirin. Ji wan re gotin, 'Hûn ê van merivan bibin bigihînin mala Kerem Axa.' Em şeş mal bûn, 50-60 nifûsên me hene; em çûn.*

*70-80 gund di bin mahiyeta Kerem Axa de ne. Serpay ji gundan distend. Em gihan gundekî, yekî kal hat pêşiya me; her du zilamên bi me re hatibûn nas kir. Ji wan re got, 'We xêr e, ev kî ne?' Gotin, 'Hêsîrên Girîdaxê ne.' Yê kal got, 'Wê herin ku derê?' Wan got, 'Wê herin mala Kerem Axa.' (Gundiyan gotiye, madem wê herin mala Kerem Axa, wan teslîmî me bikin. Em ê dûre wan bişî-*

*nin wira.) Gotin: 'Li vir Yasîn Axa heye, serpayê Kerem Axa top dike. Ew jî dibêje ez Celalî me. Yasîn niha ne li vir e. Bela Yasîn bê, em ê teslîmî Yasîn bikin, wê Yasîn wan bigihîne Kerem Axa.' Her sê zilamên bi me re hatibûn zivirîn mala xwe û em li wir man.*

*Em birin di bin siya darekê de em rûniştandin. Av mavin, nanin –ka bê wê demê çi hebû- dan me. Esra teng, me nihêrî ku va ye Yasîn siwar e û hat. Birayê min ê ji min mezintir hebû, extiar bû. Gava Yasîn hat, çav bi me ket li birayê min nihêrî, jê re gotin ew jî xwediyê te ne, Celalî ne. Dema çav bi me ket giriya, qaşo li ber me ket. Got, 'Çawa wilo li we hat, çilo hûn wilo perîşan bûn.'*

*Hêviyek bi me re çêbû. Me got, ev însan ev qasî nêzîkî me dibe, ev însan wê ji me re bibe bersiv. Yasîn got, 'Qet meraqa nekin, ji vê deqê şûnda ez nahêlim siqintî ji we re çêbibe. Niha li vir bin, ez ê we bibim cem Kerem Axa, em ê gotinên xwe jê re bibêjin; ji bo hûn nekevin destê hikûmetê. Ka bê Xwedê çi dike.'*

*Em li wir man. Qîzeke apê min heye navê wê Sultan bû. Sultan jî di nav me de qîzeke zehf bedew bû. Sultan 18-20 salî ye. Gundiyekî Yasîn jê re bi dizî dibêje, 'Yasîn tu karî vê keçikê ji min re ji wan bistînî? 'Yasîn dibêje, 'Bise bila bibe êvar, em ê ji wan bistînin.'*

*Bû êvar me nihêrî va ye Yasîn hat. Got, 'Em di riya deştê re naçin, em ê di riya çiyê re biçin. Riya deştê eskerî hene, filan bêvan...'*

*Ew qasî em li Yasîn amin bûne, Yasîn çi bibêje rast e. Yasîn ew qas xwe nêzîkî me dike, tu fikra xerab nayê bîra me. Heta dema em bi rê de, qutiya xwe ya cixareyê ya ku zîv bû da birayê min û wî jî cixareya birayê min jê stend û jê re got, 'Ez û te bira ne, hem li vê dinyê û hem li wê dinyê.' Ew qasî xwe dost dide xuyakirin.*

*Êvar e em dimeşin, kolek, dudu, sisê me derbas kir; me nêrî siwarek ji pişt me ve tê dibê, 'Hop! Hop! Hop!' em sekinîn. Got, 'Hina îxbarî kirine. Hûn mêr ji nav jin û zarokan derkevin, belkî em jin û zarokan xelas bikin.' Em ji Yasîn gelekî piştrast in. Em rabûn me xwe ji nav jin û zarokan da alî. Kodek li wir heye, me xwe da ber. Sedmetrokî em ji jin û zarokan dûr ketine. Hema wilo dengê zîrezîrkê hat. Em zivirîn pê de me dengê jinbira xwe kir. Navê wêCeharê bû. Ceharê digot, 'Heseen!! Sûltan birin!' Em çûn bi wan ve, me nêrî ku 12 siwar ketine nav jin û zarokan û li wan dixin; Sûltanê siwar dikin, Sûltan xwe ji ser hespê tavêje. Zarok û diya wê pê ve tên. Di wê hînê de milê diya Sûltanê şikênandine.*

*Birayê min gazî Yasîn dike, dibêje, 'Hey bê wijdan, me ev hêsîrê xwe dan destê we, ji bo namûsa xwe me ew qas perîşanî, tehde derbas kir. Ma biratiya te li ku ma?'*

*Me li hev xist. Xwedê bi me re alîkarî kir, Yasîn ket destê me. Me dasik li serê wî xist, hema hema serê wî bû du perçe. Em çar pênc zilam bûn. Me jin û zaro girtin ber destê xwe. Wan jî Hesen û jina wi girtin û birin. Yanî dê û bavê Siltanê birin bi xwe re. Em ji hev dûr ketine di vê navê re. Yasîn jî bi xwe re birin.*

*Em xerîb, belengaz, em nizanin em ê bi ku de herin. Em mecbûr man em dîsa berê xwe bidin mala axayê wan. Em nêzîkî gundekî wan bûne. Di wê qerebalixê de deng çêdibe. Me dît hin gundî pêrgî me ve hatin. Gazî me kirin. Gotin, 'Hûn kî ne?' Me salixê xwe da, me got, em mêvanê mala filankes in û hal û hewalê me ev in, ev ev hat serê me. Man şaş, gotin, çilo hûn mêvanê mala Kerem Axa û ev hatiye serê we.*

*Dan pêşiya me û wê şevê em birin mala Kerem Axa. Ku em gihan wir, ev her sê çar zilamê bi me re hatin bi Kerem Axa re diaxivin û jê re meseleyê dibêjin. Dibêjin 50-60 jin û zaryên hêsîr hene û 4-5 mêr hene. Hatine gundê Yasîn, Yasîn ev tişt aniye serê wan. Meseleyê jê re dibêjin. Kerem Axa gazî me kir, em çûn cem. Em dan rûniştandin. Got, 'Keko çi ye çi mesele ye?' Me salix da. Ji serî heta binî me mesele jê re got. Kerem Axa got, 'Ez ê sibê têkevim pey vî tiştî. Ev tişt rast be, ez ê cezayê Yasîn bidimê.'*

*Li aliyê din ew 12 mêr, Yasîn û Hesen û jina wî dibin mala Yasîn. Dibêjin, evana serê Yasîn birîndar kirine; Yasîn çi cezayî dide wan ew zane. Milê Hesen jî şikestiye. Yasîn jî serê wî birîndar e, ji ber birîna xwe debar nake. Êrîş dike ser Hesen, Hesen dest tavêje lingê Yasîn, Yasîn dikeve. Her duyê birîndar hevdu dibin û tînin. Ê derdora wan, wan ji hev dikin.*

*Jina Yasîn qîza apê Kerem Axa ye. Jineke baş bûye. Jina Yasîn ji Yasîn re dibêje, 'Hesîriya Kurdan ne besî wan bû, te jî ev tehde wilo li wan kir. Heta tu van însanan bernedî ez ji te re jinîtiyê nakim.' Li ser gotina jinikê Yasîn mecbûr dimîne Hesen û jina wî berdide. Ew jî hatin, xwe gihandin me, mala Kerem Axa.*

*Rihspiyekî mala Kerem Axa heye. Kerem Axa jê re dibêje, 'Here, tu tiştî nebêje, tenê bêje êvarê qerebalixek hebû, ev çi mesele ye? Ka binêr bê çi ji te re dibêjin. Ew 10-12 kesên ku tevlî meseleyê bûne, serê her yekî ji wan çar pênc pezan tu yê ji wan bistînî. Hespekî rihspiyê wan jî heye, tu yê wî hespî jî ji wan bistînî.'*

*Dibe sibeh, wek hatiye gotin, diçin pirsyanê. Ji wan re dibêjin filankes, filankes çûbûn. Radibin serê wan her yekê çar pênc pezan ji wan distînin. Hespê yê rihspî jî jê distînin. Yasîn tînin; dema tê hundir dike ku here aliyê jinan, ji bo xwe bide efûkirin. Kerem Axa dibêje, 'Nehêlin ew bêheya têkeve odeya jinan.' Dema Yasîn tê aliyê mêran, kurapekî Kerem Axa heye, ji piya yekî lê dixe li erdê*

*rûdinîne.*

*Kerem Axa jê re dibêje, 'Hey nebaş, min jî bêwijdanî kir, min gelek zirar gihandiye Kurmancan. Hema belkî hin tişt hebûn ez mecbûr bûm. Lê ev jin û zarokên hêsîr, ev serê 20 salan li ser riyan perîşan; ka tu çilo karî vî tiştî bi serê wan bikî?' Li me vegeriya got, 'Ev pez hûn ê ji xwe re şerjê bikin. Hûn ê li vir li cem min bin. Heta hûn bi ser xwe ve bên ez ê ji we re bibim destek.'*

*Kir nekir me qebûl nekir. Me got, te ev qencî bi me kir bes e. Rû li me danî. Ez çar salan li cem wî bi xulamtî mam. Zaroyên me hin ji wan bûn rêncber. Bi wî awayî me qedand. Piştî çar salan, gundek vala hebû (Jê re Nêriyê digotin, ez ne şaş bim. Hemû xerabe bû. Berê gundê Ermeniyan bû. Ew jî mîna me kiribûn. Gundê wan hemû xera bûbû.) ew gund da me. Çar pênc salan jî em li wî gundî man. Me gund bi temametî topî hevdu kir.*

*Piştre cardin eskeriyê li me pirsî. Me ew îmkanê xwe dîsa hiştin û em derbasî Îranê bûn. Li wir em pênc şeş salan man. Li wir jî cira me gelekî nexweş bû.*

*Li aliyê Tirkan efû derket, di sala 1951'ê de cardin bi perîşanî, bê mal bê tiştek, tenê me rahişt zarokên xwe û em derbasî Tirkiyeyê bûn. Dema em derbas bûn eskeriyê got, qeydên xwe derxin. Me qeydên xwe derxistin, qeyda min tune bû. Hevalê min hatin bicihkirin, ez mam. Sê mehan ez di hepsê de mam. Karê min kirin ku min sirgûnî Îranê bikin. Ji ber ku nifûsa min tune ye gotin, em ê careke din te bidin Îranê. Îcar hin kes pê eleqedar bûn, îşê min rast kirin û ez neşandim Îranê.*

*Di sala 1952'yan de em bi cih bûn, em bi star bûn. Tiştekî me tune ye. 8-10 zarokên me hene. Em perîşan in. Em ê çawa zarokên xwe îdare bikin em nizanin. Îcar wê demê hidûd ne wilo asê bû. Em çûn Îranê û hatin. Me ji Îranê hine dianî, desmal dianî. Me tiştek diavêt ser û ji xwe re difirot. Bi wî awayî me zarokên xwe xwedî dikir. Heta 1976'an bi vî awayî qediya."*

*Heta wê demê ew gundên wan hîn yasax li ser hebû. Wê demê ez jî bîrewer bûm. Tê bîra min me xwest em herin wî gundî. 1976'an em çûn wî gundî. Heta gund ava kirin, heta îmkanên wan çêbûn, hebekî bi ser hev de anîn, halê wan xweş bû. Heta 1984'an heke zehmetiyên wan hebûna jî peşkekî rihetiya wan çêbû.*

*Ez li ser belengazî û perîşaniya bavê xwe dibêjim. Di 1984'an de li Grîdaxê cardin şerê serhildanê dest pê kir. Dema di 1984'an de şer çêbû... Hevalek hat kuştin, yek hat girtin, sêçarek birîndar bûn, ê dihatin girtin; ji 1984'an heta 1991'ê bi vî şiklî bû. Operasyon, pêkutî, zilm, şer, şerpezetî... her roj me digot, gelo îro wê çi bibe? Ev bi vî awayî dom kir. Ji 1991'ê şûnde cardin bavê min ji*

*wir sirgûn kirin. Cardin mala me ji wê derê dan derxistin. Em mecbûr man, em hatin di hundirê Bazidê de me mal ji xwe re çêkir. Carinan diya min derdiket baxçe. Baxçeyê me çar hezar metre kare bû. Dora wî girtî bû. Diya min hingî bêriya gundê xwe dikir dibehecî, digot, 'Çilo te ez xistime nava vê sûrê!' Heta 1995'an gundê me yasax bû. Nedihiştin kesek here gundê xwe. Bavê min di sala 1999'an de çû rehmetê. Diya min jî 6 mehan piştî wî çû rehmetê."*

Ev rewşa malbatekê bû. Ji ber sirgûn û koçberiyan bi hezaran kes bi rewşên mîna vana re rû bi rû man. Em bi Chris Kutschera vegerin serê salên 1930'î: "Di Rezbera 1931'ê de muhtemel e ku Celalî bin 2 000 (du hezar) Kurd bi keriyên xwe ve, bi qasî 40 hezar heywanî ve di bin refaqeta alayek leşkeran de li hemû deverên Tirkiyeyê hatin belavkirin. Êdî piştî wê demê, wê Tirkiye hînî derbasbûna Kurdan a ku piraniya wan ji zarok û jinan pêk dihat, di gund û bajaran re derbas dibûn, nîv tazî, pêxwas, bi erebeyên ku nexweş û mirî û çend parçe eşyayên wan ên şexsî tê de, bibûya."[226]

Sirgûnkirinê di seqema zivistanê û di germa havînê de berdewam kiriye. Bi vî şiklî gelek kes berî ku bigihîjin cihê ku wê biçûnayê telef bûne. Vegotina li jêr ku ji xebata Lêkolîner Ömer Yildirim a bi navê 'Kürt Diasporası-4' hatiye stendin, behsa yek ji sirgûna zivistanê dike: " ...di Rojnameya Akşamê ya bi tarîxa 7'ê Sermaweza 1931'ê de, di der barê eşîra Xelikanî de ku îskana mecbûrî li wan hatibû ferzkirin, nûçeyek wiha cih digire:

'Qefîleya duyem a efradên (kesên) Xelikanî tê'

Ji bo ku hin eşîrên li hidûdê şerqê li bajarên xerbê bên bicihkirin ji berê de biryar hatibû dayîn. Li ser vê yekê, serê pêşî neqilkirina Eşîra Xelikanî ya li palên Çiyayê Agiriyê dabûn ber xwe û qefîleya yekem hatibû Trabzonê, ji wir jî bi vapûrê hatibûn sewqkirin. Eşîra Xelikanî bi koka xwe Tirk e.* Û li gor eşîrên din pir qelebalix e. Qefîleya duyem jî ya mensûbên wê eşîrê bi heywanên xwe ve hatine derûdorê Trabzonê. Qefîle di navbera Trabzon û Maçkayê de li benda vapûrê ye..."[227]

Hin ji yê ku koçî deran kirin bi riyan de û li cihên çûnê bi rewşên pir xerab re rû bi rû man. Wek mînak, dema Haco Axa ji Serxetê derbasî Binxetê bûye bi rê de hin ketine pêşiya wan ew tazî kirine, heta bi zêrê pîrekên wan ji wan stendine. Ji ber ku Tirkiyê gotibû, kî serê wî bîne em ê wan dilxweş bikin, Haco Axa li cihê ku çûbûyê jî her tim bêhizûr bû. Lawê Haco Hesen Axa

[226] Chris Kutschera, bnb., r. 129

* Eşîra Kurd wekî Tirk tê binavkirin.

[227] Kürt Diasporası-IV, Ömer Yıldırım, Mizgîn/Hejmar 26

wiha behsa vê meseleyê dike:

"Berî ko (Saroxan Axa) here Serxetê, bavê min, xuşka wî -Peyrûze Xanima jina Haco Axa, xuşka Saroxan bû- bi kurê wê ve şand li nik wî. Ji kurê xwe Nayif Axa re got:

- Ji xalê xwe re bêje; bavê min gotiye ko bextê Xwedê jê re bî, ez hew doza axatiya Hewêrka dikim. Tenê bera bela xwe ji min vekî.

Çawa birayê min û jinbava min çûne cem Saroxan, ji Nayîf re got:

- Xwarzê! Turkan ji bo kuştina bavê te du sed hezar kaxet razandine. De were bavê xwe bikuje û bera ew pere ji min û te re bin!

Çawa Nayif vegeriya ji me re got:

-Eger Haco naxwazî xalê min bikujî, ez ê bikevim pêşiya wî û xalê xwe bikujim.

Çend caran em ketin riya wî, lê me nexwest mirovê xwe bikujin."[228]

Ji bo kesê ku hatine sirgûnkirin zeîf û bêtaqet bikeve çi riya heye hatiye bikaranîn. Dema Kurd hatine sirgûnkirin malbat bi xwe jî perçe kirine, her yek dane derekê. Abdulmukit Septîoglu yek ji torinên Şêx Seîd ê ku li sirgûnê hatiye dinyayê ye. Diya Septîoglu di vê der barê de jê re wiha gotiye: "Me rojên gelekî bi êş derbas kirin, bavê min hat daliqandin, birayê min hemû firarî bûn, apêd min hatin kuştin, mal û milkê me ji me stendin, lê tu tişt ji wan wek wê rojê ez ne êşandim; ew roj, roja em birin Vîzeyê (navçeya Kirklareli), ji wir her yekî ji me em li derekê belav kirin, em ji hev veqetandin. Ez êş û janên wê rojê tu carî ji bîr nakim."[229]

Dema raperîna Agiriyê û piştî wê jî li herêmên sînor ên Îranê jî pevçûnan berdewam kiriye. Li vir jî ji ber sirgûnkirinan alozî û tevlihevî hene. C. Kutschera, berî ku sirgûna li Tirkiyeyê vebêje ji bo Îranê wiha nivîsiye: "Hikumeta Îranê, Kurdên Celalî yên ku li herêma di navbera sînorê Sovyetê û Agiriyê de dijîn, girse bi girse sirgûn dike. Di serê meha Nîsanê de seyahek, rastî qefîleyeke Kurd a ku sirgûnî Bakur bûye hatiye. Qefîle deh kîlometre dirêj e û hema bibêje di nav de mêr tune ne, hemû zarok û jin in. Ji ber ku bi hejmareke gelek erebe û heywan hene texmînkirina kesên ku hatine sirgûnkirin zehmet be jî tê gotin ku mirov dikare bibêje, nêzîkî 5 hezar kesî bûn.

Ji reîsên eşîra Celaliyan Xalid Axa, li dijî valakirina gundê xwe derdikeve û bi mirovên xwe re derbasî Tirkiyeyê dibe. Di heman rojan de kesekî din ê ku li herêma Îdir û Bazîdê seyahet dike, derbasî qeydan dike ku; li herêmê hejmareke mezin yekîneyên Tirk hebûn û li aliyê Agiriyê dengê pevçûnan dihat -tifengên makîneyî û avêtina topan-."[230]

[228] Cigerxwîn, bnb., r. 159

[229] Ferzende Kaya, Mezopotamya Sürgünü Abdulmelik Fırat'ın Yaşam Öyküsü, r. 58

[230] Chris Kutschera, bnb., r. 126

Di heman serdemê de li Sûriyeyê jî Kurd tên sirgûnkirin. Şexsiyetên girîng ên Xoybûnê ku li Sûriyeyê bûn û di Serhildana Agiriyê de roleke wan a girîng hebû, ji ber zordariyên Hikumeta Tirkiyeyê ji hêla Frensiyan ve ji sînorên Tirkiyeyê tên bidûrxistin, hinek jê tên binçavkirin, hinek jê jî ji Sûriyeyê tên dersînorkirin.

Bi sirgûn û koçberkirinan Kurd koçeke girîng a mejî jî didin. Êrîşên ewil û giran ji xwe li ser rêber û zanayan in. Piştî Serhildana Şêx Seîd û Raperîna Agiriyê gelek şexsiyetên girîng ên Kurd neçar dimînin ji Tirkiyeyê koçî Sûriyeya ku di bin desthilatdariya Frensayê de ye, dikin. Kor Huseyîn Paşa, Hecî Mûsa Begê Xwêtî, mîrên Xerzan, mîrên Palo, mîrên Dara Hênê, xizmen şêx Seîd, şêxên Çanê, şêxên Xarpêtê, şêxên Farqînê, şêxên Butê û ji axayan Haco, Sarohan, Emînê Ahmed, kurê Hacî Elî Bedirxan, Îsmaîlê Mihemed, Çeto, Eliyê Ûnis, Tewfo, Ehmedê Silêman û Ûsivê Osman ji vana çend kes in. Piştre ji malbata Cemîl Paşa û Bedirxan Paşa hin kes û şexsiyetên wekî Doktor Ahmet Nafiz Beg, Şewket Zulfî, Osman Sebrî û Reşîdê Kurd jî neçar dimînin koçî Sûriyeyê dikin.[231] Ev jî tê wateya koçeke mezin a mejî û rêberan. Wek ku li jor hat behskirin li wir jî bi pirsgirêkan re rû bi rû mane lê, wê demê Sûriye di bin desthilatdariya Frensiyan de ye û car caran di zextên li ser Kurdan de sistayî çedibin. Di van demên ewil de tevliheviya zêde axilbe li Tirkiyeyê heye.

Di demên ku serhildan li Tirkiyeyê çêbûne û têkçûne, rêberên ku beşdarî serhildanê bûne û bi rê ve birine û pareke mezin a rewşenbîran sînor derbas kirine çûne Sûriyeyê cem Kurdên li wê derê. Vê rewşê her berdewam kiriye. Malên Kurdên Sûriyeyê her tim bûye sitareya kesên ku serê wan ketiye tengasiyê. Li Tirkiyeyê di derbeya 12'ê Rezbera 1980'yî de jî, ji bo xelasiyê riya ku serê pêşî dihat bîra mirovan ew bû ku sînorê Sûriyeyê derbas bikin û herin xwe biavêjin bajarên Kurdan ên wekî Qamişlo, Amûdê û yên din. Jixwe paşê gelek kes bi vê riyê derbasî Ewrûpayê bûn. Bi vî şiklî, ji ber koça rewşenbîran Kurd, ji gelek şexsiyet û hunermendên xwe yên hêja, yên wekî Cegerxwîn, Mehmed Uzun, Ciwan Haco û hwd. dûr mane û ji hilberînên wan têra xwe sûd wernegirtine. Ji bilî sirgûniyan jî rêber û rewşenbîrên Kurd her tim bi êrîşan re rû bi rû mane û ketine heps û zindanan. Bi vî şiklî, yên ku rê nîşanî Kurdan dane û ji Kurdan re rêbertî kirine her tim hatine berterefkirin. Bi vê yekê jî desthilatdaran bêhtir karibûn daxwazên xwe yên li dijî Kurdan pêk bînin.

Heman tişt berê jî hatiye meşandin. Dema ku behsa berê û sirgûnê tê kirin, serê pêşî Bedirxanî tên bîra mirov. Wekî ku berê jî hat gotin, piştî ku di

[231] Cegerxwîn, Jînenîgariya Min, r. 168

sedsala 19'an de dawî li mîrîtiyên Kurdan hat anîn, rêberên ku man hatin sirgûnkirin. Di vê demê de jî li Kurdistanê koçeke mezin a mejî bi vî şeklî pêk hatiye. Piştî têkçûna 1847'an ku bû sedema rûxîna mîrîtiyê, Bedirxanî bi sirgûniyeke mezin re rû bi rû man. Van sirgûnkirinan piştre dîsa dem bi dem berdewam kir. Hin Bedirxaniyên ku li Stenbolê man jî, piştî komarê neçar man koçî welatên cur bi cur bikin. Ji Bedirxaniyan hin kes ku di demên cihê de li gelek memleketan bi jiyaneke sirgûniyê re rû bi rû man, ketin nav gelek şert û mercên dijwar.

Bi kinayî em tenê jiyana Celadet Bedirxan di ber çavan re derbas bikin, em ê bibînin bê çawa cih û war ji wan re nemaye û di gel vê de ji bo welatê xwe kedeke mezin dane. Celadet Bedirxan li Stenbolê çêbûye. Di 1919'an de di nav wan kesên ku bi serhengê Ingilîz E.W. Noel re bi mebesta lêkolînê çûbûn Kurdistanê de bû. Wek ku berê em li ser sekinîn Mustafa Kemal ji bo vê tevgerê bisekinîne, emrê girtina wan dide, lê bi ser nakevin. Dûre bi birayê xwe Kamûran Bedirxan re ji bo perwerdehiyê diçe Almanyayê. Di salên 1922-24'an de li Munîhê dimîne û hiqûqê dixwîne. Dûre diçe cem bavê xwe Misrê. Dema di 1926'an de bavê wî diçe rehmetê, derbasî Lubnanê cem apê xwe dibe. C. Bedirxan ji wir derbasî Sûriyeyê dibe. Di 1927'an de di nav damezirînerên Xoybûnê de cih digire. Di 1928'an de diçe Îraqê. Dema li Agiriyê şer zêde germ dibe, ji bo bala artêşê hebekî bela bibe li başûr ji hin tevgeran re rêbertiyê dike. Di dema dawî a serhildanê de derbasî Îranê dibe, demekê li Tehranê dimîne. Dûre bi awayekî dîsa derbasî Sûriyeyê dibe.[232]

Ligel hemû dijwariyên jiyana sirgûnê Bedirxaniyan ji bo nasnameya Kurdan, bi taybetî jî ji bo dîrok û wêjeya Kurdan xizmetên gelekî girîng kirine. Celadet Alî Bedirxan ku di nav wêjeya Kurdan de cihekî wî yê taybet heye û wek ku li jor hat îfadekirin ew bi xwe jî li gelek welatan di şert û mercên dijwar ên sirgûnê de maye, di nivîsên xwe de li ser sirgûnê sekiniye. Di meqaleya xwe ya bi navê 'Li ser Kêşeya Kurdan' de, dema li ser qanûna der barê sirgûnkirina Kurdan a di 5'ê Gulana 1932'yan de hatibû îlankirin disekine, dibêje, gelê ku tekane sûcê wî Kurdbûna wî bû, bi gelek kirinên kêfî re rû bi rû maye. Di nivîsa C. Bedirxan de, hin jêgirên ji nivîseke ku wê demê vedibêje û di rojnameyeke Erebî de hatiye weşandin hene:

"... Em ê ji meqaleyeke ji Al-Kabasê ku di roja 19'ê Gelawêjê de bi sernavê 'Berxwedana Kurdan a li dijî qanûna sirgûnê' hatiye weşandin û hemû bûyerên têkildarî pirsgirêka Kurdan ên li Komara Tirkiyeyê vedibêje, bi kurtasî hin pasajan neqil bikin:

[232] Rohat Alakom, Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması, r. 37-38

'Sê sal berî niha Hikumeta Tirk, ji bo ku Kurdên li bajarên rojhilat sirgûnî Anatolî û Trakyayê bike û li şûna wan Tirkên Balkanî bi cih bike, zagonek amade kiribû. Zagon hetanî niha nehatibû pêkanîn. Bi wesîleya serdana Şahê Îranê ya Enqereyê, her du hikumetan li ser pirsgirêka Kurdan a ku di heman demê de hem li Tirkiyeyê hem jî li Îranê hebû li hev kirin. Piştî vê lihevkirinê, Hikumeta Enqerê zemîna ku qanûnê bike meriyetê dît. Û di heman demê de, ji bo astengkirina Kurdên ku ji sirgûnê birevin û xwe bispêrin Sûriye û Îraqê, bi Frensî û Îngilizan re ku wan bi yekîneyên leşkerî girtina sînorê van deran girtibûn ser xwe, li hev kir. Piştî ku bi alîkariya hikûmetên cîranê xwe pişta xwe qewîn kir, Hikumeta Enqerê, li herêma Botanê dest bi operasyonê kir. Ev herêma çiyayî ya li başûrê rojhilatê Tirkiyeyê ku bi Sûriye, Îraq û Îranê re hemsînor e, ji bo xwespartina Kurdên ku ji ber operasyonan ji herêmen bakur reviyane hatine û vê derê wekî cihekî berxwedanê bi kar tînin musaîd e. Bi vî şiklî Enqere, herêmeke ku avantajên stratejîk dide Kurdan vala dike û ji bo bikaranîna xwe amade dike...

Li aliyekî zor didan ser xelkê herêmê ku xwe ji bo sirgûnê amade bike, li aliyekî jî 'yekîneyên leşkerî yên Tirk ku li Cizîrê li hev civiyabûn' navenda Şirnexê dagir dikirin. Kurdan li hemberî fermana rayedarên dewletê, ji bilî xwespartina çiya, zozan, gundên biçûk û li bendemana riya ku qedera wan bide pêşiya wan riyeke din nedîtin. Kenan Paşayê ku fermandarê Qolordiya Diyarbekirê bû, çû Şirnexê û kontrola operasyonan girt ser milên xwe.

Fermandarê ku dît Kurd dikarin bi xwespartina çiyayan ji yekîneyan birevin, topên ku hê ji berê de neqlî vir kiribûn, anî Cizîrê û stargehên Kurdan da ber bombeyan. Li navçeya Dîcleyê ya li Sûriyeyê ku hemsînorê herêma Botanê ye, bi taybetî bi şev dengê mîtralyozan dihat. Fîloyên balafiran çar pênc rojan li ser hev beşdarî xirakirina gundan bûn.

Piştî bombebaranê fermana paqijkirina herêmê dan piyadeyan. A di vê demê de, Kurd û yekîneyên Tirk ketin hemberî hev. Kurd ji bedêla ku di riyeke bi hezaran kîlometreyî de bimirin, bi biryar bûn ku li ser axa xwe bimirin. Kurdan bêhêvî şer dikir, lê di dawiyê de du pêlên (boluk) piyadeyan hêsir girtin; ev yek bû sedema bidestxistina çek û cebilxaneyê ku karibin pê li ber xwe bidin.

Eşîrên cîran ên ku didîtin bê çi zehmetî li pêşiya wan însanên ku heman welat par vedikirin, biryar dan ku alîkariyê bidin wan û hatin di hawara wan de. Di 15'ê Gelawêja 1934'an de, di navbera yekîneyên leşkerî û eşîrên ku wê bihatina sirgûnkirin de ji nû ve pevçûnekê dest pê kir. Qada pevçûnê ya bi lat û zinarên asê ji ber ku rê nedida manevrayên yekîneyên nîzamî, Tirkan zêde windahî dan û pareke mezin a malzemeyên şer ket destê Kurdan.

Li Kurdistanê, ev bûyera ku hat vegotin, ne wekî ku hin rojname dibêjin serhildan e, tenê li dijî meqamên Tirk, ên dixwazin wan ji axa ku lê hatine dinyayê dûr bixin û sirgûnî rojava bikin berxwedaneke Kurdan e.'..."[233]

M. R. Îzady jî li ser heman qanûnê sekiniye: "Qanûna ku di sala 1932'yan de hat derxistin koçberkirina Kurdên li Tirkiyeyê, lê bi taybetî jî belavkirina wan û asîmilekirina wan bi hişkereyî ferz dikir. Li gor vê qanûnê;

Wekî ku wê di nexşeya ji hêla Wezîrê Karên Navxweyî ve bihata amadekirin û ji hêla wezîrên din ve bihata erêkirin de bihata diyarkirin, li Tirkiyeyê wê di çar kategoriyên cihê de cihên meskûn bihatina tespîtkirin.

Herêmên yekem wê warên ku hewcedarî bi zêdekirina kesên xwedî çanda Tirkî, herêmên duyem wê warên ku kesên pêwîst e di nav çanda Tirkî de bên asîmîlekirin li wir bên bicîhkirin be; herêmên sêyem wê warên ku destûr bê dayîn koçberên xwedî çanda Tirk bêyî alîkariya rayedaran bi serbestî karibin lê bi cih bibin be; herêmên çarem wê warên ku biryara valakirina wan bê dayîn û ji bo sebebên madî, çandî, siyasî, stratejîk an jî ewlehiyê û siheta giştî bihata girtin bûya."[234]

Di Qanûna Îskana Mecbûrî ya bi tarîxa 14'ê Pûşpera 1934'an û bi hejmara 2510 de ji bo mihacirên Tirk ên ku wê ji derve bên jî agahiyên bi kitekit hene. Pêkanîn ji bo yên Tirk û ne Tirk cihê cihê ne:

'Yên ne ji irqê Tirk in, ji hikumetê alîkarî nexwazin jî mecbûr in li cihê ku hikumetê wekî wargeh nîşanî wan daye bimînin û heta hikumet destûrê nede mecbûr in li van deveran bimînin.'

Ji yên ku zimanê wan ê dayikê ne Tirkî ye qedexe ye ji nû ve bi hev re komên gundan, taxan, karker û sinetkaran ava bikin, an jî kesên wek vana nikarin gundekî, taxekê, karekî yan sinetekî dewr bike bide kesekî ji qewmê xwe.

'Mihacir û multeciyên Tirk dikarin li cihên xizm û xwediyên wan lê ne îskan bibin.'[235]

Şevket Beysanoğlu ku dibêje, 'îskana koçberên Bulgaristan, Yûnanistan, Qudusê piştî salên 1934'an li gor qanûnên bi hejmarên 1505 û 2510'an hatiye çêkirin', ji bo heman serdemê ev yek nivîsîne:

"Ord. Prof. Dr. Ömer Celal Sarç, der heqê qanûna bi hejmara 2510 de vê nirxandinê dike:

'... Qanûna îskanê ya bi dîroka 14 pûşper 1934, di siyaseta îskana Tirkan de nuqteyeke pir girîng e, ya rastî bingeha siyaseta heqîqî ya îskanê û destpê-

[233] Celadet Ali Bedirhan, Kürt Sorunu Üzerine, r. 33-34-35
[234] Prof. Mehrdad R. İzady, bnb, r. 213
[235] İsmail Beşikçi, Kürtlerin Mecburi İskânı, r. 146

ka wê teşkîl dike. Karên îskanê ku heta niha bi awayekî ketûber dihatin kirin bi vê qanûnê dikeve çarçoveya siyaseteke mantiqî ya ku armancên aborî, civakî û neteweyî dide ber çavan.'

Armancên qanûnê jî wiha rêz dike:

'... 1- Temînkirina hatina memleket a mihacirên ku bi çanda Tirkan ve girêdayî ne û zêdekirina nifûsê,

2- Li gorî pêwîstiyên sedemên aborî, netewî û leşkerî di hundirê welat de guherandina belavkirina nifûsê,

a) Li hin cihan zêdekirina (teksîfkirina) nifûsa xwedî çanda Tirkî,

b) Bi neqilkirina nifûsa ku ne girêdayî çanda Tirk e, xistina wan a nav çanda Tirkî

c) Neqilkirina gundên ku li ser erdên teng û xirab in û ji amûrên debarê bêpar in a ji bo cihên ku şertên wan ên jiyanê û tenduristiyê baş in,

3- Bicihkirina eşîran.'

Di berhema bi navê 'Cumhuriyetin 15. Yılında Diyarbakır' (Di 15 saliya komarê de Diyarbekir) (Diyarbakır Matbaası, 1938) de, der heqê xebatên ku di vî warî de hatine kirin ev agahî tên dayîn: 'Yek ji karên mezin ên rêveberiya me ya komarê karê koçber û îskanê ye. Fedakariyên hikumeta me ya komarê ya di derbarê anîn û bicihkirina wan a li welat a birayên me yên Tirk ên ku ji derveyî hidûdên me yên netewî mane û dixwazin vegerin niştimanê xwe û ji bo wana bike wek hemwelatiyên me yên din ên Tirk ku bi îdeala welêt ve girêdayî ne û xwedî tehsîl in, wesifdan têrê nake.'..."[236]

Wek ku di vegotinan de bi awayekî vekirî tê xuyakirin mihacirên Tirk ên ku ji derve bên, an bên anîn bi awayekî tên bicihkirin û li hemberî Kurdan haweyeke din heye. Bê heq û hiqûqiya li dijî Kurdan hatiye pêkanîn wê heta roja me berdewam bikira. Di sala 1983'yan de dewletê 5000 penaberên Afgan anîn Tirkiyeyê û di her warî de alîkarî da wan. Azîz Nesîn, di berhema xwe ya bi navê 'Bulgaristan'da Türkler Türkiye'de Kürtler' (Li Bulgaristanê Tirk, li Tirkiyeyê Kurd) de vê mijarê wiha şîrove dike: "Mirovên me, ji ber bêkarî û pirsgirêka debarê ji çolên Erebistanê hetanî welatên sar ên bakur di heft îklim û çil quncikan de derî bi derî li nan digerin, bi milyonan mirovên me ji welatên xwe dibin û di xizmeta biyaniyan de dixebitin, li aliyekî jî ji bo nifûs pir zêde nebe propaganda tê kirin; li gel vana hemûyan Evren di ziyareta xwe ya Pakistanê de ji bo ku ricaya biraderê xwe Ziya-ul-Hak bi cih bîne, Afganên ku Tirkiyeyê nizanin û bi Tirkî jî nizanin ku tê gotin bi eslê xwe Tirk in, kiriye ku bên Tirkiyeyê, mal daye wan û her

[236] Şevket Beysanoğlu, bnb., r. 1028

wisa miaş ji wan re hatiye girêdan. Ji ber zordayînên giran ji bo tu kesî derfeta rexneyê nehatiye hiştin û ev kirin wekî kirinên ji bo rûniştandina demokrasiyê hatine şîrovekirin."[237]

Beşîkçî jî di şîroveya vê mijarê de dibêje: "Tirkiye ji aliyekî ve hewl dide ku Tirkên li Afganistanê bîne û wan li ser erdên herî berhemdar ên Kurdistanê bicih bike, ji aliyên din ve li riyên sirgûnkirina Kurdan ên ji herêmê digere..."[238]

Hin Afgan, li şûna Kurdên ku berê hatine sirgûnkirin û dest li ser malê wan hatiye danîn, hatine bicihkirin. Wek mînak, piştî qetlîama Geliyê Zîlan ên ku sax dimînin sirgûnî hêlên din ên Tirkiyeyê dibin; piştî bi gelek salan dema vedigerin gundên xwe li gel ku tapoyên wan hene jî, dibînin ku mirovên ji Afganistanê anîne li ser eraziyên wan bi cih kirine. Di nivîseke nûçegihanê DÎHA'yê Sıddık Güler de, vegotinên şahidekî ku ev rewş jiyaye hene:

"Susak ê ku di bûyerên Geliyê Zîlan ên di 13'ê Tîrmeha 1930'î de qewimîbûn bi tesedûfî xilas bûbû, niha li Bulanixê parsekiyê dike. Susak ku piştî bûyeran hişê xwe winda kiriye û niha 95 salî ye dibêje, wî ji kesên ku bi saxî ji bûyeran xelas bûne tu xeber nestendiye û ji ber vê yekê jî bi salan e bi tena serê xwe dijî. Susak diyar kir ku li Bulanixê di rewşeke dijwar de dijî û wî ew tiştên bi serê wî de hatine qet ji bîr nekiriye.

Susakê ku li Bulanixê di nav gel de wek 'Tayfûnê Zîlanê' tê naskirin, ew roj wiha anîn zimên: 'Leşkerên girêdayî Serpel Derwêş Beg, bi mahneya ku em ê serhildanê çêkin ji nişkan ve girtin ser 7 gundên li Geliyê Zîlan û gule barandin. Dest bi kuştina her kesî kirin. Di demeke kin de her der bi cesedan tijî bû. Ez jî dema ku reviyam ez ketim xwarê. Ez di bin cesedan de mam. Dil wan de ez mirime. Cesed hemû bi ser hev de kom kirin, ez jî di bin cesedan de mam. Piştî ku leşker çûn ez derketim holê. Lê ji malbata me tenê ez sax mabûm. Bavê min, diya min û hemû xwediyên me hatibûn kuştin. Pir kêm kes sax xelas bûn. Ên ku xilas bûn jî wekî min dîn bûn.'

Susak diyar kir ku ew piştî bûyeran careke din ji hêla leşkeran ve hatiye binçavkirin û wiha domand: 'Piştî demekê leşker careke din hatin gund û kesên ku sax mabûn birin Mûş, Agirî û Bazîdê. Ez jî di nav wan de bûm. Em li wan deran bi rojan birçî man û îşkence li me hate kirin. Piştre, çend salan min wekî hêsîrekî ji bo leşkeran şivantî kir. Piştî şivantiyê ez şandim Nexweşxaneya Dînan a Elezîzê. Ez demeke dirêj li wê derê mam. Li wir miameleya heywanan bi me dikirin. Di nexweşxaneyê de min gelek êş û jan

[237] Aziz Nesin, bnb., r. 213
[238] İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan, r. 47

kişand. Li wir piştî ku rewş hinekî sererast bû wan ez serbest berdam. Min jî xwest ez careke din werim gundê xwe. Lê dema ez çûm wê derê, min dît ku mal jî li holê nemane. Ez jî hatim Mûşê û li navçeya Bulanixê bi cih bûm. Ji wê rojê ve, li van deran ez bi parsektiyê debara xwe dikim.'

Susak, ragihand ku Şaredarê Bûlanixê yê wê demê xaniyek ji bo wî terxan kiriye, ew bi tena serê xwe di xanî de maye û wiha berdewam kir: 'Dewletê, Afganî li gundên me bi cih kirin, em ên sax mabûn jî li holê man. Ji wê demê û pê de ez li vir mam. Ez parsektiyê dikim lê polês nahêlin ez li kuçeyê bigerim.'

Susak ku diyar dike wî ji wê rojê şûn de ji xizmên xwe tu xeber nestendiye, xizmên wî yên ku li navenda navçeya Erdîşê rûdinên jî gotinên Susak sererast kirin û dan xuyakirin ku bi salane wan ew nedîtine."[239]

Heger em li pêvajoyê vegerin, berî ku Serhildana Dêrsimê dest pê bike jî sirgûnkirin heye, di dema serhildanê de jî û piştî serhildanê jî. Lijneya Wezîran bi biryareke ku di 4'ê Gulana 1937'an de distîne, li herêma Dêrsimê –tenê ji bo wê demê- ji bo neqilkirina 2000 kesî tevdigerin. Kesên ku li pey qetlîama Dêrsimê sax dimînin jî sirgûn dibin. 6'ê Tebaxa 1938'an di Lijneya Wezîran de biryara ku ji gelê Dêrsimê, ji nav herêmên qedexekirî û derveyî wan 5000-7000 kesî neqlî bajarên rojava bikin û li vir wan bicih bikin derdikeve. Ji bilî vê, biryara serekeşîr, serekê şaxan, seyid û şerûd û malbat û xwediyên wan jî yên ku ji derveyî herêmên qedexekirî ne, lê hiştina wan a li cihên wan ne caîze bên sirgûnkirin (...) û înfazkirina cezayê mehkûmên ku bên girtin, derdikeve.[240]

Wek ku berê hat îfadekirin, ji ber rewşa ku heye bûyer hemû ne diyar in û bi tevayî hejmara kesên ku di dema berxwedana Dêrsimê de hatine sirgûnkirin nayê zanîn. Heta hin çavkanî diyar dikin ku piştî berxwedanan jî ji bo sirgûnê zorê didin ser 3 000 (sê hezar) malbatên din. Li gor hinekan ev hejmar hê zêdetir e.

Di vê demê de jî, sirgûnî vediguherî berxwedana hebûn û tunebûnê. Perîşaniya di riyan de, birçîbûn û nexweşiyên ku ev yek bi xwe re dianîn û hwd. ji xwe mirov dikuştin. Ahmet Kahraman di berhema xwe ya navborî de, der barê sirgûniyên Dêrsimê de wiha dinivîse:

"Neqilkirina sirgûniyan trajediyeke dîtir bû. Mirov, wekî dîlên şer ên serdemên pêşî, bi werîs û zincîran bi hev ve dihatin girêdan û pêşiyê li navendên danheviyê li hev dihatin civandin, dûre qefle bi qefle dibirin îstasyona trenê

[239] www.rojhilda.net, Sıddık Güler/Dîha/Van

[240] Türkiye Cumhuriyetinde Ayaklanmalar (1924-1938), Genelkurmay Harp Başkanlığı, r. 451

ya herî nêzik... Yên li garên trênan jî di nav de dora hemû navendên danheviyê bi têlên direhî hatibûn rapêçan. Li derveyî têlên direhî leşkerên nobedar digeriyan. Mirov, di germa havînê de, di seqema zivistanan de li van deran li benda roja neqilkirinê diman."[241]

Kahraman, cih dide vegotina neviyê sirgûniyekî Dêrsimê jî:

"Pîrika min wan li Erzîncanê hepişandine vagona trênê. Rê û rêwanî di vagonê de nemaye. Mirov, bê nefes, di vagonên teng de, bi ser hev de ketî, bi rojan tî û birçî, di nav bêhna pîs de rêwîtî kirine. Li Balikesîrê ji trênê peya kirine û birine gundekî. Lê belê gundiyan ên me nexwestine. Bi gotinên wekî 'bicehemin herin' ew pêşwazî kirine. Piştre li cem leşkeran bi dar û keviran êrîş kirine. Bi vî rengî di meydana gund de êrîşî kalikê min kirine û kuştine. Piştî ku gundî destûrê nadin, ji wir diçin devereke din."[242]

Trajediya sirgûnê, bi mahneyên cur bi cur ji çend salan carekê dîsa hatiye destpêkirin û hetanî roja me berdewam kiriye. Tenê di navbera salên 1925 û 1938'an de, yanî di hundirê 13 salan de der barê îskanên mecbûrî de deh (10) qanûnên cihê hatine derxistin û her carê jî Kurd hatine sirgûnkirin.[243] Ji van qanûnan hinek jê ev in: Qanûna bi hejmara 1178 ya 12'ê Berfanbara 1927'an derketiye, qanûna bi hejmara 1505 a 11'e Pûşpera 1929'an, qanûna ji bo lêzêdekirina xalekê ya bi hejmara 2263'yan di 11'ê Pûşpera 1933'yan, qanûna bi hejmara 2510 a 14'ê Pûşpera 1934'an derketiye. Li vê qanûnê bi qanûnên hejmarê 2848 3657, 3683, 4062, 5098, 5227, 5420, 5826'an hin lêzêdekirin çêbûne, yan jî hin xalên wê hatine guhertin.[244]

Li Sovyetan jî rewşên ku paralelî bûyerên li Tirkiyeyê meşiyan berdewam kirin. Di dema Serhildana Agiriyê de çawa ku Otonomiya Kurdan a li Sovyetan hat rakirin, di dema qetlîama Dêrsimê de jî Kurdên li Sovyetê bi sirgûnên mezin re rû bi rû man. Di Newroza 1937'an de mala Seyid Riza hatiye bombekirin û 'Bernameya Islahetê ya Dêrsimê' ketiye meriyetê. Li Sovyetan jî plana sirgûnkirina Kurdan bi biryara roja 7'ê Temûza 1937'an ketiye meriyetê.

Di vê biryarê de hatibû plankirin ku bi dehhezaran Kurdên li ser sînorên Ermenistan û Azerbeycanê dijiyan sirgûnî Qazakistan û Ozbekistanê bêne kirin. Di meha Sermawezê de bi dehhezaran kal û pîr, jin û zarok sirgûnî Qazakistan û Ozbekistanê hatin kirin. Akademîsyen Knyaz Mirzoyev ku di vê mijarê de lêkolîn kirine wiha nivîsiye, 'di bihara sala 1937'an de ji Qafkasan 2000 (du hezar) malabatên Kurd sirgûnî Qazakistanê hatin kirin.'[245]

[241] Ahmet Kahraman, bnb., r. 395
[242] Ahmet Kahraman, bnb., r. 394
[243] İsmail Beşikçi, Kürtlerin Mecburi İskanı, r. 207-208
[244] Şevket Beysanoğlu, bnb, r. 1027
[245] K. İ. Mirzoyev, Küçük Kürt Ansiklopedisi, r. 53

Azîz Ziyo Aliyev, di xebata xwe ya bi navê 'Kurdên Qazakistanê' de, wê demê wiha neqil dike: "Di payîza sala 1937'an de, li ser xeta sînorê Ermenistan û Tirkiyeyê yê îro û bi dehan jîngehên Kurdan ên li Nahçivanê, ji hêla leşkerên ku hê ji berê de li vê herêmê hatibûn bicihkirin ve hatin dorpêçkirin. Zilam hemû hatin girtin, ji bo ku jin, kal û pîr xwe ji meşeke dirêj re amade bikin demeke pir hindik hat dayîn. Ji wê kêliyê û pê de, ji bo mirovan rêvitiya mirinê ya bi erebeyên bar a ber bi beriyên Asyaya Navîn û Qazakistanê ve dest pê kir."[246]

Di nav kesên ku wê demê hatine sirgûnkirin de Nadîr Nadîrov jî heye. Di hevpeyvîna Cotmeha sala 1989'a de Prof. Nadîr Nadîrov wiha dibêje:

" ...di 1937'an de Kurdên ku li Nahcivanê dijiyan sirgûnî Asyaya Navîn û Qazakistanê hatin kirin... Stalîn di 1937'an de, dema ku ez pênc salî bûm malbata min sirgûn kiriyê. Derketina derveyî gund an jî navçeya ku em çûbûnê qedexe bû..." Ji bilî van Nadîrov diyar dikir ku, nêzikbûna herêma Nahçivanê ya bi sînorê Tirkiyeyê re bûye sebeba vê sirgûnkirinê; ji bo çûn û hatin çênebe.[247]

Em bi mînakeke din li berdewamiya sirgûnkirinê li Sovyetê binêrin. Helbet di şert û mercên giran de mirin û windahiyên bi riyan de jî divê em bi bîr bînin. Ji bo sirgûneke Kurdan a mezin a li vê derê Omer Yildirim wiha nivîsiye: "Tê texmînkirin ku di sirgûniya meha Sermaweza 1944'an de ya ku demsala payîzê dest pê kir, li dora 40 hezar Kurdî koç kiriye. Kurd li 14 eyaletên Qazakistanê, li zêdetirî 110 jîngehan, li gundên ku bi kîlometreyan ji hev dûr in hatine belavkirin.

Li her gundekî herî zêde 10 malbatên Kurd hatine bicîhkirin. Kurdên ku sirgûnî Ozbekistan û Qirgizistanê bûne jî di heman rewşê de ne. Piştî van sirgûnan, serdana Kurdan a ji bo xizmên xwe yên ku li gundên din hatine bicihkirin jî hatiye qedexekirin. Tenê bi kaxizên destûrê karibûn rêwîtiyê bikin. Û gelek caran ev destûr nehatine dayîn. Her wiha li gorî biryara Parlamentoya Yekîtiya Komarên Sovyet ên Sosyalist (YKSS) ya bi dîroka 26'ê Sermaweza 1948'an, gelên ku hatine sirgûnkirin mecbûr bûne ku 'heta bi hetayê' li cihên ku hatine sirgûnkirin bijîn. Reva ji van jîngehan jî bi cezeyê 20 sal 'keda mecbûrî' dihatin cezakirin."[248]

Me di bin sernavê duyem a vê cildê de, dema şerên ku li Îraqê qewimîbûn vegotibû û em li ser hin sirgûnkirin û koçberkirinan jî sekinîbûn. Ji ber vê

[246] Kürt Diasporası-I, Ömer Yıldırım, Mizgîn-Hejmar 23
[247] Rafet Ballı, bnb., r. 586
[248] Kürt Diasporası-I, Ömer Yıldırım, Mizgîn-Hejmar 23

yekê em ê di vir de bi kurtasî bi çend mînakan çavekî li sirgûnkirinên li Îraqê bigerînin. Dema behsa sirgûnkirinên li vir tê kirin, helbet ên ku pêşiyê tên bîra mirov Barzanî ne. Şêx Ehmed Barzanî piştî ku bi hêzên Îraqê re şer kiribû derbasî Tirkiyeyê bûbû. Dema di 1934'an de efû derket û cardin vegeriya Îraqê, Barzanî bi malbata xwe ve ji herêma Barzanê hat sirgûnkirin. Pêşiyê sirgûnî Diwaniyeya li başûrê Îraqê, piştre jî sirgûnî Basra û Nasiriyeyê, herî dawiyê jî sirgûnî Silêmaniyeyê bûn. Wekî ku me berê jî destnîşan kir, dema Mustafa Barzanî di 1941'ê de firsetê dibîne û vedigere welêt têkoşîna xwe ya neteweyî berdewam dike. Çend salan têkoşîneke serkeftî dimeşîne, lê dûre têk diçe. Piştî têkçûna M. Barzanî, di Rezbera 1945'an de ji xizmên wî û eşîra Berzan 35 hezar jê mêr, ji 60 hezarî zêdetir jin û zarok, di şert û mercên zivistanê de ber bi Îranê ve dest bi koçberiyê dikin. Hetanî gihîştin Mehabadê, bi rê de ji birçîbûn, nexweşî û sermayê gelekan jiyana xwe ji dest dan.[249]

Barzanî wê hîn gelek caran bi koçberiyê re rû bi rû bimînin. Piştî ku Komara Kurdan a Mehabadê hilweşiya Mustafa Barzanî û yên pê re bi malbatên xwe ve, bi artêşa Îranê re di hundirê şer de ne û pê bi pê vedigerin Îraqê. Dema digihên Îraqê gelek ji wan çekên xwe teslîmî dewleta Îraqê dikin. Lê Mele Mustafa Barzanî teslîm nabe û bi 500 mirovên xwe yên nêzik re bi rêwîtiyeke 14 rojan, 350 kîlometre rê li pey xwe dihêle û di ser Tirkiye û Îranê re derbasî Yekîtiya Komarên Sovyet ên Sosyalist (DYKSS) dibe. Barzanî û kesên pê re, 11 salan li YKSS'yê dimînin. Di vê navberê de, gelek caran ber bi Îranê ve, ji vê derê jî ber bi Kurdistana Îraqê ve û cardin ji bo Sovyetan çûn û hatin çêdibe.

Piştî sirgûniya 11 salan dema ku Barzanî û kesên pê re paş ve vedigeriyan, Tirkiyeyê li sînorên xwe mayin datanîn. Piştî ku di nîveka salên 1950'î de li ser sînor mayin hatin bicihkirin, hatin û çûyîn bi dawî nebin jî kêm bûn û Kurd hê bêhtir ji hev hatin bidûrxistin. Piştî vê yekê, li hemberî sirgûnan dest û pê bêhtir hatin girêdan. Çimkî di sirgûniyên berî vê rewşê de kêm be jî carnan komin jê li sînoran dixistin û ji sirgûnan direviyan. Lê piştî ku parastina sînor hat zêdekirin û mayin hatin danîn, ev yek pir zehmet bû.

Li aliyê din bi vegera Barzanî re ji ber ku li Îraqê Kurdan hin maf bi dest xistin, Kurdên li parçeyên din dîsa bi çewisandinên mezin re, bi sirgûnên ku digihîştin hejmareke mezin re rû bi rû dimînin. Li Tirkiyeyê di derbeya leşkerî ya 27'ê Gulana 1960'î de ku hikumeta Partiya Demokrat hilweşand, bi sedan kes hatin girtin û ji vana gelek kes sirgûnî bajarên rojava bûn. Yek ji

[249] Ersal Yavi, bnb., r. 315

qampên civandinê li Sêwasê ye. Di 1'ê Pûşpera 1960'î de 485 kes, ji hêla Fermandariya Artêşa 3'yem ve di qampeke Sêwasê de hatin binçavkirin. Pişt re, ji van 55 kes hatin girtin û yên din serbest hatin berdan.

Navên 55 kesên ku ji axa, şêx û serekeşîran pêk dihat ev in:

İbrahim Abikoğlu, Hacı Topo Aktoprak, Zeki Bayar, Faik Bucak, İsmail Hakkı Bucak, Hacı Ali Bucak, Mehmet Cemal Bucak, Hasan Abik Bucak, Ali Abik Bucak, Mithat Bucak, Bekir Bucak, Reşit Çeçen, Mehmet Dal, Abdulkadir Ekinci, Ebubekir Erdaş, Mahmut Erdaş, Bahattin Erdem, Abdulrezzak Ensarioğlu, K. Latif Ensarioğlu, Sait Ensarioğlu, Şeyh Ali Fırat, Şeyh Ahmet Fırat, Şeyh Selahattin Fırat, Şeyh Gıyasettin Fırat, Mehmet Fuat Fırat, Faruk Fuat Fırat, Mehmet Emin Fırat, Halil Fırat, Ömer Fırat, Gıyasettin Fırat, Hüseyin İleri, Zeynelabidin İnan, Mustafa Işık, Kinyas Kartal, Abdulbaki Kartal, Hamit Kartal, Bala Kartal, Şeyh Mehmet Emin Karadeniz, Cemil Küfrevi, Cemil Zeki Küfrevioğlu, Abdulbaki Karakuş, Feyzullah Keskin, Mehmet Kayalar, Abdullah Öztürk, Osman Öztürk, Köroğlu Öztürk, Şamil Peker, Sait Ramanlı, Kutbettin Septioğlu, Zeynel Turanlı, Cafer Yağızer, Mecit Yalçın, Derviş Yakut, Kazım Yıldırım, Süleyman Yıldırım.[250]

Di vê demê de jî Tirkiye wekî herêmên cur bi cur hatiye dabeşkirin û kesên ku hatine sirgûnkirin li gor vê hatine belavkirin. Li ser bingeha xala 2'yem a qanûna bi tarîxa 19 Kewçêr 1960 û hejmara 105'an Tirkiyeyê dikin sê beş.

"1. Cihên ku tê xwestin nifûsa bi çanda Tirkî lê bê zêdekirin.

2. Cihê ku ji bo neqil û îskana nifûsa ku tê xwestin di warê çandê de bên Tirkkirin.

3. Cihên ku tê xwestin ji ber sedemên cih, sihet, aborî, çand; siyaset, leşkerî û înzibatî ve bên valakirin û ji îskan û bicihbûnê re bên qedexekirin."[251]

Tevgera Barzanî tesîreke mezin li Sûriyeyê jî dike. Di van deman de li Sûriyeyê Kurd bi muameleyên pir xerab re rû bi rû dimînin. Di sala 1962'yan de nasnameya wan ji wan hat stendin û di welatê xwe de wek 'xerîb' hatin binavkirin. Îro hejmara Kurdên bê nasname gihaye nêzîkî 300 000'î. Ev însan bê nasname ne û ji gelek heqan mehrûm in.


Di sala 1963'yan de jî xebatek Tegmen Muhamed Talep Hîlal çêdibe. Di vê xebatê de ji bo ku Kurd di nav Ereban de bên helandin, hin pêşniyaz hebûn. Li gor vê xebatê navên gund û bajarokên Kurdan bi yên Erebî hatin

[250] Şevket Beysanoğlu, bnb, r. 1030
[251] Şevket Beysanoğlu, bnb, r. 1027

guherandin; qeyda Kurdên ku navên Kurdî li zarokên xwe kirin nehat çêkirin. Her wiha weşana Kurdî hat qedexekirin û hê gelek pêkanînên cihêker hatin rojevê.

Piştre jî, di sala 1967'an de rêveberiya Sûriyeyê, di sînorê Tirkiye û yê Îraqê de, 'Kemera Erebî' ya ku dirêjiya wê 375 km û firehbûna wê 15 km bû çêkir.[252] 120 hezar Kurd, ji 332 gundên xwe hatin derxistin û li şûna wan Ereb hatin bicihkirin. Bi vî awayî, di vê qadê de di navbera Kurdan de dîwarekî ku ji însanan pêk dihat jî hat avakirin. Yanî sînorê bi dirî û mayin kela wan hênik nekiriye, ev jî bi ser vekirine. Bi vê riyê dixwazin hem Kurdan ji hev qut bikin hem jî dorê li Kurdan bigirin û di nav xwe de asîmîle jî bikin, bihelînin.

Ji bo vê xebata sînor, di meha Adarê ya sala 2007'an de ez çûm Binxetê. Min xwest ji hemû aliyan ve ez sînor bibînim, bi xelkê re biaxivim û lêkolînê bikim. 16.03.2007'an de ez û çend merivên xwe ku mala wan li Qamîşlo ye, me berê xwe da rojhilat, aliyê ku sînorê Tirkiye û Sûriye û Îraqê digihê hev. Piştî saet 10.00'an em ji Qamîşlo derketin. Wê rojê roja Komkujiya Helepçeyê bû. Dema em gihîştin Tirbespiyê saet 11.00 bû. Xelk hemû şipya rêzkirî li ser cadeyan sekinîbû. Ji bo bîranîna Komkujiya Helepçeyê rêz digirtin.




*Kemera Erebî(xeta dirêj ya sipî ya di sînorê Tirkî û Iraqê de)*[253]

[252] The Colonial Policy of the Syrian Baath Party in Western Kurdistan, Dr. Jawad Mella, r. 368
[253] www.jawadmella.net

Piştî em hebekî derbas bûn ê ku bi min re bûn, li ser rê hin qesrên Malbata Haco jî pêş min kirin; gotin, berê ew li vir dijiyan. Di herêma me de Mala Haco bi nav û deng in. Dema min dît ku ew malê wan bûne xirbe ez careke din êşiyam. Wek ku di vegotinan de derbas dibe, di salên ewil ên avakirina Komara Tirkiyeyê de ew jî mecbûr mabûn ji warê xwe koçî Binxetê bikin. Di salên dawî de jî bi piranî koçî Ewrûpayê kirine.

Heta em gihan Tilkoçer saet bû 12.00. Em di hundirê Tilkoçerê de hinekî geriyan. Ji wir em vegeriyan ser riya Rimêlan. Ji Tirbespiyê heta Rimêlan û ji wir heta nêzîkî sînor tije hifarê (çalên) petrolê bûn. Her serê gavekê zikê erdê hatibû qelaştin û wek çakûç hesin bi erdê de diçû. Bi dehan hifare, erd hemû fetih kiribûn. Dûre ji Dêrikê em derbasî Eyndîwerê bûn. Li wir aliyekî çem Sûriye bû, aliyê din Tirkiye.

Li hemberî me bajarê Cizîrê xuya dikir. Çemê ku bi hezar salan jiyan dabû mirovan, kirine sînor. Dîcle ji bo ku erdê xwe bi bereket bike diherikî lê jê re dibejin tu axa xwe ji hev vediqetînî. Serê çiyayê Cûdî bi berf bû, bayekî cemidî ji wir li rûyê me dixist. Cûdî bêyî deşta xwe bû. Yan jî em bêjin Cûdî û deşta xwe ji hev qut bûbûn. Hin xort li ser wan tehtan rûniştibûn û ji xwe re li derdorê dinêrîn. Ez bawer dikim ku dile wan li ser her çar aliyê wê xwezaya xweşik dikeliya ku erebeyên xwe bi hêsanî lê bigerînin, lê gera wir tenê bi nêrîna çavan bi dest wan diket. Bi texsiya ku em pê hatibûn me xwe ji ser kêş bera ber çem da. Em ber bi Dîcleyê ve daketin û çûn bi jor ve, ber bi sînor. Min dixwest ez herim heta nuqta ku mirov dikare here. Lê baranê dayê, em ji nîvê rê vegeriyan. Piştî kêlîkê em hinekî vegeriyan û me da ser riya Zihêriyê,



*Sûretên ku min bi rê de kişandin.(2007)*



*Meriv li aliyê Sûriyeyê ne, li bajarê Cizîrê yê ku di sînorê Tirkiyeyê de ye dinêrin. Ev nuqte niçika ku sînorê navbera Tirkiye, Sûriye û li rastê wê jî sînorê Sûriyê û Îraqê ye. Di nexşeyê de dema li Cizîrê bê nêrîn wê ev cih bêhtir bê fêmkirin.*

ji bo em xwe bigihînin sînorê Îraqê jî. Kêlî bi kêlî dinya ditengijî û baran xurt dibû. Me riya xwe dewam kir û saet li dor 16.00'an em gihîştin Zihêriyê. Yên ku em li mala wan bûn mêvan gotin, em torinê Simko Axa ne. Li ser rewşê bi tevayî em axivîn.

Ciwamêrekî ji wan got:

- Di sala 1962'yan de Erebên elewî ji Himisê anîn, hikûmetê erd ji xelkê stend û da Ereban. Tu pere jî nedan xwediyê erd. Gelek erd ji xelkên gundên Zihêriyê, Xerabreşk, Girasor, Girkendal, Girbarad, Tilîlûn, Melemez sitendin û hikûmet ji xwe re diçîne û hiltîne. Gundî man bê erd. Zarokên wan diçin li bajaran kar dikin, pê xwe xwedî dikin. Di vê erda Kurdistanê ya bi bereket de çilo xelk li nanê xwe diheyirin.

Em cardin vegerin ser başûrê Kurdistanê. Wek me berê anî ziman, carna li Îraqê Kurdan hin maf bi dest xistine lê hed û hesabê qetlîam û sirgunên li vê derê tune. Hîn di dema ku Îraq nehatibû damezrandin sirgûna Şêx Mehmûdê Berzencî heye. Di salên 1940'î û 1960'î de sirgûn û koçberkirinên mezin dest pê kirine. Hetanî ku Sedam ji desthilatdariyê hat xistin sirgûnên Başûrê Kurdistanê berdewam kirin. Sirgûn û koçberî bi wextê re qat qat zêde bûye; hejmara kesên ku koçber û sirgûn bûne di salên 1975'an de ji dehhezaran derketiye sedhezaran, di salên 1990'î de jî ji sedhezaran derketiye mîlyonan û trajediyên nedîtî bi serê Kurdan de hatine...

Me berê jî neqil kiribû, dema ku difikirîn xweseriyê (otonomiyê) bidin Kurdan, ji ber kaniyên petrola wê yên dewlemend ji Kerkûkê û hê gelek cihû-

warên din ên girîng û stratejîk Kurd hatin koçberkirin û li şûna wan Ereb hatin bicihkirin.

Her wiha Mehrdad R. İzady, diyar kiriye ku, hê di salên 1965'an de ji sînorê Îranê ta seranserî çemê Diyalayê hema bibêje heta waroşên bakurê rojhilatê Bexdayê û ji başûr hetanî Mandeliyê, ji 50 hezarî zêdetir Kurdên Feylî yên li vê qadê dijiyan, ber bi aliyê din ê sînor, yanî sirgûnî Îranê hatine kirin.[254]

Piştî têkçûna Kurdan a 1975'an jî artêşa Îraqê careke din bi tundî berê xwe da başûrê Kurdistanê. Di encama êrîşên hewayî û bejayî de, Kurdistan hat dorpêçkirin û nêzîkî hezar û pêncsed gund hatin şewitandin û rûxandin. Bi dehhezaran mirov hatin qetilkirin. Di êrîşên 1975'an de 250 hezar jin, zarok û pîr reviyan Îranê. Ji yên mayî jî bi sedhezaran însan ji cih û warên xwe bûn û ber bi bajarên Ereban ên dûr, ber bi germa başûr û çolê ve hatin sirgûnkirin. Li şûna Kurdan jî Ereb hatin bicihkirin.

Mesût Barzanî, di hevpeyvîna Tebaxa 1988'an de diyar dike ku, hikumetê çek, pere, kredî, amûrên çandiniyê û hwd. daye Erebên ku li şûna Kurdan hatine bicihkirin, navên Kurdî yên cihûwaran bi navên Erebî hatine guherandin û di 1975'an de qeydên giştî yên nifûsê hatine guherandin. Mesût Barzanî di berdewama hevpeyvînê de wiha dibêje: "... Di cih de bi Tirkiye û Îranê re dest bi paqijkirina qadên li sînor kirin; ber bi hundirê Îraqê ve qadeke 50-70 km ji mirov û heywanan hatibû paqijkirin û ev der bû qadeke ku guleberdan lê serbest be. Hezar û pêncsed gund bi dînamîtan ji holê hatin rakirin û gel ber bi başûrê Îraqê ve hate neqilkirin. Di 1976 û 1977'an de, her çar an jî pênc kes dan gundekî û di nava nifûsa Ereb de hatin belavkirin... Vê yekê di salên 1970'yî û 1980'yî de û di seranseriya şerê Îran û Îraqê de jî berdewam kir. Dûre dîsa tarûmarkirinê dest pê kir. Hejmara gundên ku hatin xerakirin zêde bû û niha bi qasî çar hezarî gund bi temamî xirbe ne."[255]

Martin van Bruinessen, diyar dike ku di dema valakirina gundan de cihûwarên Êzîdiyan jî di bergeha polîtîkaya Erebkirina Îraqê de ye:

"Li Îraqê du herêmên cografîk ên bingehîn ên ku Êzîdî lê zêde ne hene; Li bakurê Mûsilê herêma Şexan (cihê ku tirba Şêx Hadî ya li Laleşê jî lê ye ku yek ji mabedên wan ên herî girîng e) û Çiyayê Sîngalê ku li rojavayê vî bajarê ber bi hundirê Sûriyeyê ve dirêj dibe. Her du herêm jî di salên 1970'yî de ketibûn ber polîtîkaya Erebkirinê ya Îraqê û gelek gundên ku piştre Ereb wê lê bên bicihkirin hatin valakirin..."[256]

---

[254] Prof. Mehrdad R. İzady, bnb, r. 208
[255] Sheri Laizer, bnb., r. 123-124
[256] Martin van Bruinessen, bnb., r. 25

Gelek dewlet li himberî vê trajediya mirovahiyê ku li Îraqê pêk hatiye wê bêdeng bimînin, heta alîkariya wan a çekan a ji bo Îraqê wê berdewam bike û heman dîmen wê gelek caran bi awayekî xerabtir dubare bibin.

Di sedsala 20'an de, li hemû dewletên ku perçeyekî welatê Kurdan tê de hebû qet dawî li sirgûn û koçberiya Kurdan nehat. Bi taybetî jî piştî derbeyên leşkerî û li dû guhertinên desthilatdariyan, rewşên wiha zêdetir bûne. Wekî mînak li Îranê piştî şoreşa Humeynî dîsa sirgûn ketiye rojevê. Yek ji vana ya ku Yusuf Ziyad behs dike, cardin bicihkirina Azeriyan a li Kurdistanê ye: "...Piştî 1979'an, li navenda bajêr a Nexede (nufûsa wê li dora 100 hezarî ye) ya ku nifûsa Kurd lê zêde ye piraniya însanan hatin qetilkirin, ên mayî jî hatin koçberkirin û li şûna wan Azerî hatin bicihkirin. Bi heman şeklî li gel ku bajarên Maku, Xoy, Selmas, Şahindej, Miyanduab, Tikap û Urmiyeyê bajarên Kurdistanê ne jî, bi eyaleta Azerbeycana Rojava ve hatine girêdan û li gel ku navenda bajaran bi piranî Kurd e jî, Kurd jê hatine derxistin û li şûna wan Azerî hatine bicihkirin. ... Li ser navê sîstemê Azerî li Kurdistanê bi awayekî fermî ketine rewşeke dagirker. Ji ber vê yekê jî di navbera Azerî û Kurdan de her tim acizî pêk hatine..."[257]

Li Tirkiyeyê di heman demê de, yanî beriya derbeya 12 ê Rezbera 1980'yî û piştî wê, ji ber pirsgirêkên siyasî bi hezaran kesî bi dizî li sînoran xist û derketin derveyî welêt. Bi mezinbûna pirsgirêkên siyasî re îhlalên sînoran jî zêde bûn. Bi awayekî giştî mirov kare bibêje, di 1980'yî de ji bo qaçaxê li sînor xistin di demeke kin de bi dawî dibe, lê îcar zêdetir wekî salên 1920 û 1930'yî, bi armancên siyasî li sînor xistin pêk tên. Vê carê dema dengê sîlehan ji aliyê sînor dihat xelkê li ber sînor dijiya digot, "Dîsa telebe derbas dibin, gelo xwe xelas kirin an na?" Wê demê di nav xelkê de navê xortên welatparêz 'telebe' bûn.

Di sala 1984'an de, dema Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) dest bi şerê çekdarî kir wateya sînoran û ji nû ve sazkirina wan ket pêvajoyeke nû. Di vê demê de dîsa li ser sînoran mayin hatin çandin. Bi hezaran gund hatin valakirin, hatin şewitandin. Di vê dema ku çalakî pir zêde bûn de, bi milyonan Kurd koçî rojava kirin. Li qadên ku hatin valakirin jî mayin hatin danîn. Vê rewşê heta dawiya sedsala 20'an bi tundî berdewam kir.

Li Îraqê jî koçên herî mezin di salên 1980'yî û 1990'î de pêk hatin. Di 'Enfal'a sala 1988'an de bi sedhezaran Kurd hatin kuştin, bi hezaran gund hatin şewitandin, hatin xerakirin; gel li herêmên din hatin bicihkirin. Bûyerên di dema qetlîama Helepçeyê û piştî wê de qewimîn, kirin ku gelek caran bi sedhezaran Kurd bi tirs ber bi sînoran ve biherikin; hin jê derbasî

[257] www.lekolin.org

Tirkiyeyê, hin jî derbasî Îranê bibin.

Xebata hêja ya têkildarî mijarê ya Mehmet Ali Aslan a bi navê 'Kürt Mülteciler' (Penaberên Kurd) û dokumanên 'Konferansa Kurd a Parîsê ya Navneteweyî' ku di 14-15'ê Kewçêra 1989'an de hat lidarxistin, me bêhtir serwextî tiştên vê demê qewimîne dikin. Li jêr hin jêgirên ji van xebatan hene.

Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mesûd Barzanî, di Tebaxa 1988'an de, ji bo ku penaberan bigirin Tirkiyeyê bang li hikumeta Tirkiyeyê dike. Her wiha diyar dike ku êrîşên Îraqê yên kîmyewî bi berfirehî berdewam dikin û pevçûnên di navbera yekîneyên Îraqê û Pêşmergeyan de jî bi tundî didomin. Di 29'ê Tebaxa 1988'an de bi deh hezaran xelk li ber sînor civiyabû û Tirkiyeyê hê jî destûra wan nedabû ku sînor derbas bikin. Mesûd Barzanî bangeke nû li dewletan û saziyên navneteweyî dike:

"Bi dehhezaran xelkê sivîl, li derûdora sînorê navçeya Çelê ya girêdayî Colemêrgê civiyaye. Birîndar, ji ber tunebûna derman û xwarinê, serma û şertên din ên dijwar yek bi yek jiyana xwe ji dest didin. Ji rêveberên Dewleta Tirk, bi taybetî ji bo jin, zarok û pîran ji bo însaniyetê, em dixwazin ku îlticaya wan qebûl bike. Heger rêveberên Dewleta Tirk, daxwazên wan mirovan bi cih neynin, em ê Tirkiyeyê wek hevalbend û alîkarê rejîma Îraqê ya ku li hemberî gelê me çekên kîmyevî bi kar anî, bihesibînin. Em ji Sekreteriya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî, Xaça Sor û Komîsyona Bilind a Penaberan dixwazin ku hewl bidin, ku rêveberên dewletan û rêveberên Dewleta Tirk mafê îlticayê bidin gelê me û nekevin pêşiya alîkariya ku rêxistinên alîkariyê yên cîhanê dixwazin bigihînin gelê me. Em, ji bo gelê xwe yê ku bi gaz û çekên kîmyewî tê qetilkirin banga alîkariyê li dewletên cîhanê û saziyên navneteweyî dikin."[258]

Ji bo li ser sînor lêkolînan bikin ji meclîsa Tirkiyeyê heyet diçin, wezîfedarên Wezareta Karên Derve, Tehran û Bexdayê ziyaret dikin, Walîtiya Herêma Awarte bi helîkopteran li ser sînor lêkolînan dike, Lijneya Ewlehiyê ya Neteweyî dicive û axirê dengê cihê bilind bibin jî di 31'ê Gelawêjê de destûra ku penaber sînor derbas bikin derdikeve.

Tirsên Tirkiyeyê hene. Tirkiye bi Îraqê re peymana 'şopandina germegerm' îmze kiribû û bi vê di rabirdûyê de Îraqê rê dabû Hêzên Çekdar ên Tirk ku bikevin erd û qada hewayî ya Îraqê. Rayedarên Tirk ditirsiyan ku Bexda jî vê peymanê bi kar bîne. Her wiha hin parlamenter dibêjin, dibe ku penaberên Kurd di pêşerojê de ji Tirkiyeyê re pirsgirêkan derxin. Serokê Komîsyona Edaletê ya Meclîsa Mezin a Milet a Tirkiyeyê (TBMM)

[258] Mehmet Ali Aslan, Kürt Mülteciler, r. 49

Alpaslan Pehlivanlı, ji nûçegihanê Cumhuriyetê re wiha dibêje: "Çima me di axa Îraqê de şopandina germegerm pêk anî? Yên li dijî welêt û dewletê bûn reviyabûn wê derê ji loma, ne? Li gorî ku ew jî a niha wan dişopînin -helbet hestên însanî girîng in- ew jî li dijî dewleta Îraqê, li dijî welatê Îraqê derketine. Ne tenê jin û zarok tên, mêrên ku di destê wan de tifing û bazûka hene jî hatine. Xuya ye ev li hemberî dewleta Îraqê xayîn ketine. Madem ku bûyereke însanî ye, wê demê em nikarin wan bişînin Îraqê, lê em karin wan bişînin Îranê."

Bi fikara ku wê encamê neyînî ji polîtîkaya hundirîn re bîne, teşkîlatên partiya desthilatdar qebûlkirina penaberan napejirînin û ji bo wilo gelek mektup û telgrafan dişînin navenda xwe ya Enqerê. Bi qanûneke ku piştî 12'ê Rezberê hat derxistin zimanê Kurdî dîsa hatibû qedexekirin. Lê penaber di roportajên di televîzyonan de hatin weşandin bi Kurdî diaxivîn, heta axaftina Kurdî ya di sohbeteke ku Serokwezîr Ozal jî tê de bû, di televîzyona dewletê de hat weşandin. Vê yekê bi îdeolojiya fermî re li hev nedikir. Bi taybetî jî gotina Turgut Ozal a wekî 'li Tirkiyeyê hemnîjadên penaberên Kurd hene', bû sedemên nerazîbûna parlamenteran. Digotin, ev îfade tê wateya ku bi awayekî fermî hebûna kêmneteweya Kurd a li Tirkiyeyê tê qebûlkirin û ev yek jî dibe ku di hêla moralê de ji bo PKK'ê bibe destek.

Di vê tevliheviyê de bi deh hezaran Kurdên penaber derbasî Tirkiyeyê bûn. Penaber li vir jî bi pirsgirêkên nû re rû bi rû man. Kurdên ku ji Îraqê hatin di qampên li Mûş, Amed, Colemêrg, Cizîr, Silopî û Mêrdinê de hatin bicihkirin. Qampên bi têlan rapêçayî... Sînorê bi dû sînor de... Di encamê de ev rewş wê windahiyên mezin bi xwe re bîne. Di qampa Amedê de, ji ber xwarin û vexwarina kêm 280 zarok mirin. Di axaftina Mehmet Ali Aslan a di Konferansa Kurd a Parîsê de, di der barê jiyana qampê de ev agahî hebûn: "Penaber xistibûn qampên ku her çar aliyên wan bi têlên bidirî hatibûn pêçan. Pêdiviyên wan ên xwarin/vexwarin, cil û berg û tenduristiyê xweşik nehatin bicihanîn. Nehiştin ku ji xwe re bixebitin. Rê li ber alîkariya gel û saziyan hat girtin. Zarok ji perwerde û fêrkariyê bêpar hatin hiştin...

Ji ber ku alîkariya saziyên derve nehat qebûlkirin û ji ber ku ji Kurdên penaber re statuya penaberiyê nehate qebûlkirin, alîkariya jiderve jî pêk nehat...

Nêzîkî 100 hezar kesî xwe spart Tirkiyeyê. Ji vana beşek çû Îranê yan jî hatin şandin. Yên mayî li dora 65 hezaran bûn. Beşek ji vana jî wek ên din neçar man ku ji Tirkiyeyê herin. Dema ku Birêz Mitterand Xanim hat hejmara penaberan 36 hezar bû, lê îro daketiye dora 30 hezarî..."

Lê belê Tirkiyeyê, berê ji bo penaberên ku ji deverên din hatin û xwedî heman şert û mercan bûn, helwesteke din nîşan dabû. Wekî nimûne dema Tirkên penaber ên ku ji Bulgaristan û Afganistanê hatin, hikumeta Tirkiyeyê ew bi eleqeyeke mezin pêşwazî kirin û pêdiviyên wan bicih anîn, lê ji bo Kurdan heman tişt nehat kirin. Nivîskarê rojnameger Sheri Laizer vê çewtiyê wiha îfade dike:

"Destûr nehat dayîn ku Kurdên Tirkiyeyê û Kurdên birayên wan ên ji Îraqê hatibûn hevdu bibînin. Li derûdorê qampan têlên rêsayî hebûn. Ji bo penaberan jî destûr tunebû ku bi kesên dîtir re hevdîtinê çêkin. Ji bo hevdîtinan, destûra taybet pêwîst bû û ev yek jî kêm carinan bi destê wan diket. Hejmareke zêde leşkerên Tirk û kesên ji MÎT'ê hebûn. Kurdên Îraqê, di nav xof û gumanan de bûn; ditirsiyan ku rayedarên Tirk bi Îraqê re ji bo rêveberên wan bi paş de vegerînin hevdîtinê bikin. Wek hêsîrên herbê tim di bin çavan de bûn...

Di sala 1983'yan de dema ku 5000 (pênc hezar) penaberên Afgan hatin Tirkiyeyê, cihê herî baş ên ku lê bimînin, pereyekî ku bêhna wan fireh bike dabûn wan û heta bi îş jî ji wan re hatibû peydakirin.

Ev yek, ji serî heta binî dijberî helwesta hikumeta Tirk a li dijî Kurdên Îraqê bû; Kurd di şert û mercên zivistanê de di rewşeke ne diyar de, li cihekî ku çile û seqem dadiket hetanî kêmî çil dereceyî mecbûr mabûn di çadirên ku ji bo havînê hatibûn çêkirin de bimînin..."[259]

Gelo yên ku li Îraqê mabûn çawa bûn? Belê, yên mabûn bi darê zorê li herêmên din ên Îraqê hatin bicihkirin. Li şûna Kurdên ku hatin qetilkirin û koçberkirin jî Ereb hatin bicihkirin. Agahiyên S. Laizer yên di vî warî de ev in: "Îraqê, ji bo hemû Kurdên Îraqê yên penaber gotibû; ku hûn paş de vegerin û dev ji dijminatiyê berdin em ê efûyê derxin. Lê bêhna hîleyê ji teklîfê dihat û kêm kesan ev qebûl kir. Ji kesên ku ev qebûl kirin careke din tu xeber derneket. Şahid, di der barê kesên ku vegeriyan Îraqê de ku leşkerên Îraqî li sînor li benda wan bûn, behsa îdam û veşartinên tomerî dikin."[260]

Hîn jî ne bes e! Ka di sala 1991'ê de çi qewimiye em hinekî binêrin. Di dema ku Sedam êrîşî Kendavê kir û pê de, di bihara 1991'ê de cardin li dijî Kurdan êrîşeke tund dest pê kir. Kurdan dîsa dev ji malên xwe berdan û li sînorê Tirkiye û Îranê kom bûn. Vê carê hejmara kesên ku li ser sînor civiyan wê derkeve 2 milyonî. Dema direvin, ên ku bi rê de dimirin hene. Hin jê malbata xwe winda kirine û her yekî bi derekê de bazdaye. Di nav vana de zarokên ku dê û bavên wan mirine û xwe spartine xwediyên xwe hene. Bi rojan ev

[259] Sheri Laizer, bnb., r. 114-115
[260] Sheri Laizer, bnb., r. 111



*Nîsan 1991-Penaberên Kurd di ser Pira Zapê re derbas dibin.*[261]

însan birçî û li ber sermayê mane... trajedî, trajedî, trajedî!

Nivîsa nivîskar Enver Ozkahraman (2007.03.29) ku hê di roja pêşî de çûbû ser sînor cem penaberan, wan kêliyan baştir vedibêje:

“Bihara 1991'ê...

Berî bi şazdeh salan di van rojan de, yanî 27 û 28'ê Adarê, nîvê meha remezanê bû... 13 yan jî 14'ê mehê bû...

Ez ne li malê bûm. Piştî ku min rojnamevan-nivîskar Jon Randal danî Şemzînanê, ez ji bo karê xwe çûbûm Wanê. Danê êvarê Fahrî (Adiyaman) ji Colemêrgê telefon kir, got;

“Bira... Zû were ji jêr jin, keç, zarok marok, xelk hatine Çelê.”


Min got; “Bise bêhnçikyayî nebe! Tu qenc zanî ku wilo ye?”

“Wwêêê bira, min kengî derew kirine, ez ji te re dibêjim xeberê bide hevalên xwe û rojnamevanan.”

Ez di heman şevê de, di saetên dereng de li Colemêrgê bûm û bi berbanga sibehê re ez û Fahrî ber bi Çelê ve bi rê ketin. Me li nêzî gundê Biyadirê, li aliyê din ê Zê (Zap) 50-60 mirov dîtin. Em bi wan daneketin, ji ber ku em nedigihan hev. Ji xuşexuşa Zê, me nikaribû dengê xwe bigihînin wan.

Bi îşaretên destan me ji wan xwest ku ber bi pira jêr ve bimeşin. Ji aliyêkî ve jî min hewl dida ku ez sûretê wan bikişînim. Em ji wir ber bi jor, ber bi Çelê ve hilkişiyan. Li derdora kevirê 49'emîn ê sînor 100-150 kesên ku ji jin, zarok û extiyaran pêk dihat hebûn.

[261]Fot: Osman Yıldız


*Dawiya Adara 1991'ê, Kurd ber bi sînor koç dikin.*[262]

Ji çiyê mirov qefle bi qefle dihatin xwarê...

Bi lez û bez min wêneyên wan jî kişand, diviyabû berî li me bibe şev em vegerin Colemêrgê.

Her çiqas Fahrî got, "Ka em venegerin, em alîkariyê bi wan re bikin." jî, min guh nedayê, em saet li derdora 19-20'an de gihan Colemêrgê. Ez bi lez li 10-15 rojnamevanên ku min ew nas dikirin ên li vir û li derveyî welêt geriyam û min girîngiya meseleyê ji wan re got. Ev bû karê min ê yekemîn. Me ji bo 200 nanî tembî li firinê kir û em çûn malê ji bo em razên.

Li malê jî telefona min nesekinî. Di jiyana min de tu carî fatûreya telefonê ew qasî zêde nehatibû.

Serê sibehê, em di riya Çelê de ne.

Xwediyê çend wesayîtan ên ji Colemêrgê jî bagajên xwe tije nan û zexîre kiribûn û ji bo ku xwe bigihînin xelkê, di ruhê xwe dibuhirîn û di fitlokên rê de wesayîtên xwe bi lez diajotin.

Yên li aliyê din ê Zê 1000 kes lê yên li kevirê sînor ê 49'emîn 2-3 hezar kes hebûn.

Em hebitîbûn...

Teknolojiya wê demê, ne bi qasî ya îro pêşketî bû. Me li halê wan mirovan dinihêrî û ji girî pêve tu tiştek ji destê me nedihat.

Me pêlavên xwe, goreyên xwe, sako û qocixên xwe da wan lê têrî nekir.

Mirov şerpeze bûn...

Êvarê, bi awayekî şilfîtazî û bi çavên werimî em ber bi Colemêrgê ve bi rê ketin...

Em serê sibehê bi gelektir colemêrgiyan re, wesayît, mirov, nan û xwarina zêdetir dîsa di riya Çelê de ne. Danê êvarê hevalên rojnamevan ji Stenbolê hatibûn û ew jî di şoqê de bûn.

Berê incex ji mehê carekê yan jî ji hefteyê carekê li ser riya Çelê wesayîtek

[262] Fot: Enver Ozkahraman

xuya dikir, lê niha her der tije wesayît bûn. Geverî, şemzînanî û colemêrgiyan bi qemyonê ji erzaqan bi serîkirî, bi wesayîtên xwe yên modelên nuh, bêyî ku guh bidin riya bi zixur û herî, Çelê dagirtin. Heta bi qoltixên dawî ên wesayîtan jî tije erzaq kiribûn.

Serê din ê pirê bi rojan mîna qada mahşerê bû.

Zarokên ku malbatên xwe winda kiribûn, dê û bavên ku zarokên xwe winda kiribûn...

Kesên ku di şerê Kuweytê de bi saxî xelas bûbûn û li benda malbatên xwe bûn, li serê din ê pirê disekinîn û li wir digihîştin hev. Me xwediyê wan ên ku ew nedidîtin ji wan re dianîn.

Me hezkiriya wî ya 12 salan Mahcemîn ji pêşmerge Hamdî re, dergistiya Dr. Recep Gulê jê re, Êzdînşêrê Spîndarî ji apê wî re bir, Xunava Batûfanî ya 7-8 salî jî li aliyê din ê pirê teslîmî diya wê ya jinebî kir.



*Ji aliyekî ve însan dikişin, ji aliyê din ve Kurdên li aliyê Tirkiyeyê ji wan re alîkariyê tînin.*[263]

Wê rojê serxweş, ayaş û qumarbazên ku min qet ji wan hez nedikir mîna melekên qenciyê bûn û weke fîlekî jî dixebitîn. (Niha dema ez wan dibînim, bêyî ku ez wan himbêz û maçî bikim ez di wan derbas nabim.)

Bi rojan bêyî ku em guh bidin herî û baranê me mil dan hev û li ser pişta xwe me qût hilgirt, zarok û nexweş hilgirtin.

Li aliyê din ê wê pirê hin zarok hatin dinyayê, di nav pîneyê kirasekî de pêçayî, bêyî ku zanibin çima li vir hatine dinyayê. Hin zarok berî wextê xwe çêbûn, ji ber hin pîrekan çû; hem jî di nav wê qelebalixê de û ne digotin kip.

Kal mirin rûyê wan bi cemedaniyê pêçayî. Pîrên ku bi fîstanên xwe hatin pêçan û wisa hatin definkirin. Bi dehan kes wisa... Li wê derê...

Min bi hevalên xwe re, zêdetir erzaq dibir konên ku cemaetên Asûrî, Êzîdî û zarokên nexweş tê de bûn... 8-10 rojan ji derên din, ji bo van bi sed-

[263] Enver Özkahraman, www.yuksekovahaber.com

hezaran mirovî tu alîkarî nehat. Tenê Geverî, Colemêrgî, Şemzînanî û Waniyan erzaq anîn. Ji gundên Colemêrg, Gever, Çelê torbeyên tije nanê tenûrê, penêr, jajî dihat, hêkên kelandî dihatin. Gewdan Çeto, pincarê ku ji çiyan dianî her roj dişand vir.

Ez di wê baweriyê de me ku kesên ji Çelê û gundiyên feqîr ên wan rojan betaniyên xwe dabûn, wê taqeta wan a ku careke din ji xwe re betaniyan bistînin tune be.

Keçika rûken, por zer a rûyê wê bi pizik a 18-19 salî ku di stûyê wê de zincîreke bi xaç hebû û ji malbateke Asûrî bû ya me her roj qût dida wan û me ji wir hevdu nas dikir, em vexwendin xwarinê. Me di dilê xwe de got, 'em erzaqên wan kêm nekin', me spasî wê kir û me got, 'em ne birçî ne'.

Keçikê israr kir û wiha got:

- Apê Enver, ji ber ku em Xirîstiyan in hûn xwarina me naxwin, ne wisa?

Ev gotina wê bû wek xencerekê ku tu li nivê kezeba min bixî.

Me torbeyên li pişta xwe danîbûn û em li bendê bûn ku ji me re xwarinê bîne. Savara ku me duh anîbû, di nav pelinan de pêçabûn; epraxeke bê rûn, bê tam û bê xwê, xwarin hemû ev bû. Lê me her yekî pênc şeş heb bi efiyet xwar û me tasek av jî bi ser de vexwar. Dema ku ji bo birêketina kar em rabûn ser xwe, keçika rû bi pizik a Asûrî bi ken got:

- Apê Enver, min ji qestî wisa got ku tu hêrs bibî û bê bi me re pariyek nan bixwî.

Bi sedan mamoste, mîmar, endezyar, dermankar, bijîşk, karmend, karker û gundî...

Ji bo wan mirovên ku bê sako, bê şal, bê kiras, bi zarok marokên xwe re li serê wan çiyayan, bê xwarin, tî, bê sabûn, bê cih, bê lihêf şev û rojên xwe li wir derbas dikirin, odeyeke bê siwax jî luks dixuya.

Piştî 8-10 saet şûnde bijîşk û rojnamevanên sînornenas, ji hundir û derveyî welat bijîşkên dildar, hawirdorparêzên dildar...

Ji çar aliyên dinyayê rojnamevan, televîzyonvan di weşana zindî de ne.

Lê ji alema Îslamê tu deng tune ye.

Di nav wan 45-50 rojên em li wir, me nedît ji welatekî misilman ji van misilmanan re dev ji nanekî berde piskivîtek jî hat, kesî ev yek nedît. Wan rojan Wezîrê Karê Derve yê DYA'yê James Baker bi helîkopterê hat Çelê.

Baker di axaftina xwe ya ku ji xelkê re kir, got;

'Meraq nekin hûn birçî namînin. Îro sibê balafirên me wê ji we re ji hewayê erzaqê bavêjin.'

Li ser vê gotinê Mamoste Seydayê ÎSA BAMERNÎ ku ez navê wî piştre hîn bûm, ji nav qelebalixê bi dengekî bilind û bi Ingilîziyeke xweşik qîriya û got:

‘Birêz wezîr birêz wezîr… Me mala xwe ji bo gepek çoreka we terk nekir. Di mala me de gepek nanê ku em bixwin hebû, lê Dehaqên zalim xwestin vî nanî bi xwînê bidin me… Welatên medenî bila vê rewşa me bibînin û li azadiya me bifikirin, bes e. Em ji we jî vê daxwaz dikin…’

Li ser vê gotinê Baker wiha bersiva Bamernî da:

‘Heqê we heye. Em rewşa we dibînin, ji sibê û pêde ji bo ewlekariya we wê hemû tedbîr bên stendin.’ Û piştî wan rojan, jorî paralela 36’emîn ketibû bin ewlekariyê.”[264]

Em niha jî li dokumanên Şaxa Komeleya Mafên Mirovan a Stenbolê binêrin. Ji nivîsa di bin sernavê ‘Di welatê xwe de sirgûn in’ (Kendi Yurtlarında Sürgünler) çend paragraf wihan e:

“Leşkerên Tirk ji bo ku nehêlin mirovên li ser sînor kom bûne nêzî sînor bibin, dem bi dem ‘guleyên hişyariyê’ diteqandin. Heta dawiya meha Avrêlê hejmara kesên ku ji ber guleyên hişyariyê mirin 4 in. 12 birîndar jî ji bo dermankirinê rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Şirnexê. Di nav 50 hezar kesên sînor derbas kiribûn, gelek mirovên ku ji ber bombeya napalmê, gaza fosforê û bi çekên cuda birîndar bûbûn hebûn. Li Nexweşxaneya Dewletê ya Şirnexê bijîşkekî diyar dikir ku di nava hefteyekê de 20 dergûş mirine. Mirovên ku dihatin jî diyar dikirin ku di dema êrîşê de bi sedan mirov mirine û bi hezaran jî birîndar bûne.

Ji ber ku di baranê de koç kiribûn, hemû di nav heriyê de bûn. Di dema hatinê de kesên ku dev ji zarokên xwe berdabûn jî hebûn. Ên ku bi rê de miribûn hin ji wan qefilîbûn û hin ji wan jî nexweş ketibûn û miribûn. Dihat texmînkirin ku di dema koçberiyê û ji ber êrîşan bi giştî 500 hezar însan mirine.

[264] Enver Özkahraman, www.yuksekovahaber.com, 29.03.2007



*Nîsan 1991- Sînorê başûrê Kurdistanê û Tirkiyeyê*[265]


Zêdeyî 200 hezar însanî xwe spartibûn gundê Deştanê yê (Uzumlu) Çelêya li ser sînor. Lê bi sedhezaran mirovên ku di navbera Kanîmasî ya li aliyê Îraqê bû û gundê Deştanê de mabûn, ji derve bûn û di bin baraneke dijwar de, bêyî cihekî ku xwe biparêzin hebe hewl didan ku bijîn. Ji ber ku li vê herêmê ava paqij kêm bû, mirovan ava qirêjî vedixwar. Ji ber tengasiya çûn û hatinê, erzaqê ku Colemêrgî û Geveriyan ji bo alîkariyê dabûn hev, ji penaberan re li ser pişta hesp û hêstiran dibirin. Gelek mirovên ku em li Wargeha Bilovê (Işıkveren) bi wan re axivîn, digotin ku, dema cara ewil ber bi sînor ve meşiyane, 60-100 kes ji ber guleyên leşkerên Tirk hatine kuştin. Hin ji wan jî ji ber van guleyan birîndar bûbûn.[266]

...

Hewaya sar, ava qirêjî, xwarina kêm, tunebûna qedemgehan, qirêjî û sergoyê li derdorê dibû sedema zêdebûn û belavbûna nexweşiyan. Însiyatîf nedabûn bijîşkên di nav penaberan de, ji wan hatibû xwestin ku tenê wekî elemanê alîkar ê tenduristiyê bixebitin..."[267]

Di çapameniya rojava de dihat nivîsandin ku Tirkiye bi awayekî baş nêzî penaberan nabe, wan bi qedera wan re rû bi rû dihêle, alîkariya ku ji welatên rojava tê rastî astengiyê tê û leşkerên Tirk dest datînin ser hin malzemeyên ku ji derve tên. Di Nîsana 1991'ê de, di rojnameya Ingilîz 'The Independente' de nûçeyeke wiha belav bûbû: "Leşkerên Tirk dest datînin ser alîkariya ku ji penaberên Kurd re tê."

[265] L_evenement_du_jeudi_11_17_avril_1991(Ji arşîva Enstîtuya Kurdî Ya Parîs)
[266] Komeleya Mafê Mirovan a Stenbolê, Raporê Mafên Mirovan yê 1991-1992, r. 92
[267] Komeleya Mafê Mirovan a Stenbolê, bnb., r. 96



*Penaberên Kurd ên derbasî Îranê bûne*[268]

Rafet Ballı, di pirtûka xwe ya navborî de, ji bo rojên ku Kurd li ber sînoran kom bûbûn ev tişt nivîsandibû: "Hikûmeta Enqe-reyê di daxuyaniya xwe de hişkere kir ku destûra derbaskirina sînor tune ye... Wan got, lêxe; burokrasiya sivîl û leşkerî ya li herêmê penaber kuştin. Bi mahneya ku 'Ferman a Enqereyê ye' rê li ber bi dehhezaran penaber li serê çiyayên ku 3 hezar metre bilind in, li ser xeta sînor hat girtin. Li wir çûn û hatina bejayî hema hema ne mimkûn bû û zivistan hîn xelas nebûbû. Heke 300-500 metre destûr bihata dayîn, ev xelk ku piraniya wan zarok û jin bûn, dikaribûn xwe berdin geliyên rast û germ."[269] Nivîskar tev li îdiayên ku peywirdar li hemberî penaberan muameleyeke xirab dikin jî dibe.

Di vê demê de Amerîkiyan bi helîkopteran ji penaberan re alav û amûrên alîkariyê avêtin. Ez wê demê li Nisêbînê bûm. Qemyon, terektor, heta bi erebeyên hespan li kuçeyan digeriyan û hema hema çi mala heye tiştê jê diqediya diavêt ser van erebeyan. Gelê herêmê tevde, ji bo penaberên li sînor alîkariyeke mezin dişand. Feqîr-dewlemend, extiyar-ciwan her kes, di wan rojan de ji bo alîkariyê seferber bûbû.

Hejmara penaberên ku xwe avêtine Îranê nêzî milyon û nîvekê bû. Yanî wê demê rêveberiya Sedam, ji du milyonan zêdetir mirov ji cih û warên wan kiribûn.




*Li sînorê Îraq û Tirkiyeyê balafır qût ji penaberên Kurd re tavêje*[270]

[268] Bi alîkariya Kitêbxaneya Kurdî ya li Swêd ev wêne bidest ketiye.
[269] Rafet Ballı, bnb., r. 37
[270] Fot:Osman Yıldız



*Penaberên Kurd ji bo gepek nanê tisî bidest bixe diket vî halî*[271]



*1991, Başûrê Kurdistanê, Çadirên Neteweyên Yekbûyî*[272]

Penaberên li Tirkiyeyê encex piştî ku welatên rojava li Bakurê Îraqê 'herêma ewlekariyê' saz kirin, di Gulan û Hezîrana 1991'ê de derbasî başûrê Kurdistanê bûn.

Ji çar aliyan ve bi ser Kurdan de diçin. Di sala 1988'an de Kurdên li Sovyetê jî careke din hatin sirgûnkirin. Li Ermenistana ku gelek heq dabûn Kurdan, vê carê ji bo Kurdan rewşeke neyînî pêk tê. Pevçûna Azerî û Ermeniyan dibe sebeba vê yekê. Li gorî gelek çavkaniyan Kurdên misilman ên li Ermenistanê, di Adara 1988'an de bi zorê hatin koçberkirin û li Ermenistanê bi tenê Kurdên Êzîdî man.

[271] Donnerstag, 2 Januar 1992 (Ji Arşîva Enstîtuya Kurdî ya Parîs)
[272] Fot: Osman Yıldız

Prof. Nadîrov di Adara 1991'ê de, di hevpeyvîneke xwe de behsa vê dike: "... Lê piştî ku pevçûna Azerî û Ermeniyan dest pê kir, Kurdên misilman jî bi Azeriyan re ji Ermenistanê koçî Azerbaycanê kirin. Li Ermenistanê bi tenê Kurdên Êzîdî man. Ji sê behra behrek Kurdên ku ji Ermenistanê hatin derxistin li Azerbaycan û Bakuyê bi cih bûn, behrek çûn Kazakistanê. Di nav van kesan de nivîskarê me yê navdar Alî Abdurrahman jî heye. Her wiha Mîrzoyê Kinyasê Brehîm jî çû Alma Atayê û niha li Zanîngeha Kazakistanê profesoriyê dike. Kurdên din ên sirgûnkirî jî çûn Federasyona Rûsyayê û herêma Krasnadorê. Yên rewşa wan herî xirab e, ev in. Destûrê nadin wan ku ji xwe re xanî û kar bibînin. Di nav sê salên dawî de hejmara yên sirgûnkirî bû 18-20 hezar kes."[273]

Nadîr Nadîrov di axaftineke xwe ya berê de jî dibêje ku, Kurd li gelek komarên Sovyetê belav bûne, yên pêşiyê tên hişê min Ermenistan, Gurcistan, Kazakistan, Kirgizistan, Ozbekistan, Tacikistan, Turkmenistan, Rûsya û Azerbaycan in.[274]

Di vê navberê de hewce ye mirov li ser Wargeha Mexmûrê jî bisekine, ku hîn jî pirsgirêkeke navneteweyî ye. Di destpêka salên 1990'î de, di dema ku şer giran bûbû nêzî 20 hezar Kurdên li sînorên Tirkiyeyê ji ber zilm û zordariyê neçar man ku ji Colemêrgê û bajarên nêzî wê koçî herêmên sînor ên Îraqê bikin. Heta sala 1997'an penaber li herêma Etrûşê di du wargehan de bûn. Dema girtina wargehê hat rojevê, hin ji wan vegeriyan Tirkiyeyê. Bi qasî 4-5 hezar kes jî li Îraqê bi cih û war bûn. Kesên ku nexwestin herin her du aliyan jî nêzî salekê li herêma sînor a di navbera Herêma Xweser a Kurdistanê û rejîma Sedam Huseyîn de man. Piştre di sala 1998'an de li Wargeha Mexmûrê ya ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve hat avakirin bi cih bûn. Ev mirov hîn jî li Mexmûrê dijîn. Li gorî agahiyên NY'ê hejmara kesên ku li Mexmûrê dijîn 12 hezar e.

Sacîde Sezek yek ji koçbera Mexmûrê ye û ji gundekî Girikê Emo ye. Ertuğrul Mavioğlu bi Sacide Sezek re axiviye û bi sernavê '**Bes e, ev 17 salê min li sirgûnê derbas bûn**' gotinên wê daye. Em niha guh bidin Sacîde Sezek, a ku gelek bi halê wê hene:

*"Di sala 1993'yan de girtin ser mala me. Gelek erdê me hebû, têra me dikir. Pir caran digirtin ser malan. Balafirê li gundê me xist, bi dû de esker hatin. Qûtê gund hemû dan ser hev û bi qasatûreyan perçe kirin. Jehra ku me dida hin heşaratan bi ser dakirin. Gelek zilamên gund girtin, heywan telef bûn. Me dev*

[273] Rafet Ballı, bnb., r. 586
[274] Rafet Ballı, bnb., r. 579

*ji gund berda û em her yek bi derekê de belav bûn. Edene, Şirnex, Girkê Emo... Em çûn Girikê Emo. Li vir jî zordariyê bi zêdebûn dewam kir.*

*Dûre me sînor derbas kir. Ewil em hatin Şeranîşê. Em pênc kes bûn. Zarokên min bi min re bûn. Em sê rojan meşiyan. Roja çaran em gihan Şeranîşê. Ji vir heta em gihan Mexmûrê me heft wargeh guhertin. Di dema êrîşan de, gelek cîranên me mirin. Du zarokên min hindik mabû ji birçînan bimirina. Me berû hûr dikir û dida wan, ji bo nemirin. Nema karibûn wê jî bixwin. Tim berdidan wargehê. Piştî bi salekê em anîn Etrûşê. Ji wir jî em birin Nînowayê. 13'ê Sibatê bû. Nînowa ya ku di herêma tampon de bû, tije dûpişk bû. Ji gundên teniştê sîleh berdidan. Di êrîşan de çar zilam ji wargehê hatin kuştin û gelek birîndarên me çêbûn. Piştî bi salekê, dîsa 13'ê Sibatê gotin, hûn nema karin li vir bimînin. Me nikaribû em heywanên xwe jî bibin. Keçika min î biçûk tim digiriya û digot, bizinê min ji min stendin. Di serê Hezîranê de jî em hatin Mexmûrê. Gelekî germ bû. Ava vexwarinê tune bû. Yên ku av vedixwarin di cih de nexweş diketin. Em 10 hezar bûn. Bi tankêran av dihat lê du bîdon bi destê me nediket. Ne elektrîk ne jî çadir hebûn. Hema tiştikin me dan ber hev û em ketin bin. Me digot, de îro de sibê em ê vegerin, loma em bi cih nebûn. Dûre av û elektrîk hat. Piştî 2003'yan derfeta kar dan. Wê demê em gelekî perîşan bûn, me gelek nexweşî derbas kirin. Niha rewş hebekî din baş e. Em dixwazin wek mirovan bijîn; em nasnameya xwe, zimanê xwe zanibin û li gor wê bijîn. Rêberê her kesî hene. Rêberê me girtine, xistine navbera çar dîwaran. Bila rêberê me azad be. Gerek her kes destekê bide Kurdan da ku em heqê xwe bistînin. Êdî bes e. Ez bûm 45 salî. 17 salên min li sirgûnê derbas bûn."* [275]

Heger em salên dawî ên li Tirkiyeyê binirxînin, ku vê demê bûyerên şîdetê yên mezin qewimîne, li herêma ku Kurd lê dijîn 6800 gund hatine valakirin. Ji vana, 3500 gund wisa hatine wêrankirin ku mirov careke din nikarin vegerin wan gundan. Her wiha tê gotin ku ji ber ewlehiyê wê tu caran destûrê nedin ku gundî vegerin van gundên xwe.[276]

Ji bilî sirgûniyên mecbûrî, di demên ku ewlehî tune bû, bi taybetî di dema ku kuştinên kiryarnediyar zêde bûn, koçberiya ber bi rojava ve zêde bû. Di encamê de nêzî 5 milyon mirov ji cih û warên xwe bûn. Piraniya van mirovan an çûn navendên bajarên wek Amed, Wan û Êlihê yan jî koçberî bajarên dûr ên mîna Stenbol, Enqere, Îzmîr, Edene û Mêrsînê bûn. Li gorî îstatîstîkên koçberiyê yên salên 1985 û 1990'î ku di pirtûka Weqfa Dîrokê (Tarih

[275] www.radikal.com.tr, 07.11.2010, Berhevkar: Ertuğrul Mavioğlu

[276] Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik, Gelenekten Geleceğe Antropoloji( Ji Kevneşopiyê Ber Bi Dahatûyê Ve Antropolojî), r. 118

Vakfı) bi sernavê 'Li Tirkiyeyê Koçberiya Hundirîn' (Türkiye'de İçgöç') hatiye weşandin, bajarên Kurdan di nav tevgereke zêde ya koçberiyê de ne. Mînak, 17167 kesî koçî Agiriyê kiriye lê 54 474 kesan ji Agiriyê koç kiriye. 21 281 kesî koçî Mêrdînê kirine lê 56 031 kesan ji Mêrdînê koç kiriye. 30 660 kesî koçî Rihayê kiriye lê 57 460 kesan ji Rihayê koç kirine.[277] Ev tenê çend mînak in. Koçberiya di salên 1990'î de jî hîn zêdetir e.



*Salên 1990'î dema gund dihatin valakirin mirov gelek caran pêrgî van dîmenan dibû.*[278]

Kurd ji bo nebin 'qorucî' ji gundên xwe malên xwe bar kirin û koçî bajarên mezin kirin. Gelek ji wan çûn bajarên rojavayê Tirkiyeyê û nizanibûn bê ka li wir çi li benda wan e. Him welatê xwe berdan him jî ne dûr di wexteke kin de, ji ber asîmilasyonê wê bibûna Tirk. Ew nebin jî wê zarokên wan bibin. Zarokên wan dema li wir mezin bûn û pê de wê çiqasî karibin çanda xwe, kesayetiya xwe ya Kurdewarî biparêzin? Ev xelk ji bo li hemberî gerila ranehêje sîleh ji mala xwe ji gundê xwe koç kir, lê mixabin li dera ku çûyê xefikeke mezintir li pêşiya wan bû. Bi kinayî mirov kare bêje, ku li dor mirov çember teng bûbe ji hin tiştan xelasî tune ye...

Jixwe ji ber paşdemayîna rojhilat û başûrêrojhilat û newekheviya aborî ya herêman, her tim ber bi rojava ve koçberî çêbûn. Weke di navbera salên 1975 û 80'yî de, di demên ku li Tirkiyeyê tevlihevî û pevçûn zêde bûn, ber bi bajarên mezin ve koçberî jî zêde dibû. Li dewletên din ên ku Kurd lê dijîn jî heman rewş hebû. Li gorî texmînan nifûsa Kurdan ji sê behran behrek li

[277] Türkiye'de İçgöç, Tarih Vakfı, r. 141-142
[278] 1993, Fot: Osman Yıldız

cihên ku koç kirine dijîn. Bi taybetî jî hema hema li hemû bajarên mezin ên van dewletan nifûsa Kurdan zêde bûye. Mînak, li Stenbol, Enqere, Îzmîr, Şam, Bexda û bajarên wekî Tehranê nifûseke zêde ya Kurdan heye. Di encama vê yekê de rewşên cuda jî derketine holê. Mînak, koçeberiya Kurdan a li Tirkiyeyê ya ku em behsa wê dikin, li herêmên Anatoliya Navîn, Trakya, Ege, Deryayaspî û Deryayareş, Kurd ji aliyê nifûsê ve xistine rêza 2'yemîn. Yanî îro pirsgirêka Kurdan ne tenê di welatê wan de heye ...

Dema mirov bi awayekî giştî lê dinihêre mirov dibîne ku nîvê Kurdan di nav sînorên Tirkiyeyê de, yên din jî li Îraq, Îran, Sûriye û qismekî pir kêm jî li Ermenistan û Azerbaycanê dijîn. Kurdên ku ji welatê xwe pir dûr û li cihên cuda yên dinyayê belav bûne jî hene. Ev Kurdên ku em behsa wan dikin, di demên bûyerên şîdetê de ji bo ku xwe ji zilm û zordariyê xilas bikin, li her derê dinyayê belav bûne. Piştî 12'ê Rezbera 1980'yî gelek rewşenbîrên ku ji Tirkiyeyê reviyane, derbasî Ewrûpayê bûne. Îro piraniya wan li Almanya, Frensa û Swêdê, li gelek welatên Ewrûpayê koloniyeke penaberên siyasî yên Kurd pêk hatiye. Li gorî texmînan li Ewrûpayê zêdeyî milyonekî Kurd dijîn.

Heger mirov rewşa dawî binirxîne, rewş qet ne erênî ye. Îro li welatên Ewrûpayê çandên cuda weke dewlemendiyê tên dîtin lê li welatên ku Kurd lê dijîn, yanî li dewletên ku Kurdistan di nav xwe de parve kirine hîn jî li dû yekrengiyê ne. Bi vê armancê, ji bo asîmîlekirina Kurdan hemû teknolojî û derfet tên bikaranîn.

Îro ji gelek miletan bi milyonan mirov li Ewrûpayê dijîn. Dema hûn li bajarên sereke yên mîna Berlîn, London û Parîsê digerin, hûn li kuçe û kolanan rastî gelek mirovên cuda tên. Xerîb ew qas zêde ne ku mirov kare bêje, ew ji gelê niştecih zêdetir in. Ev tablo nîşaneya xweşbîniya wan welatan e. Ji kîjan miletî be bila bibe, li wê derê her kes dikare bi awayekî serbest çanda xwe bi pêş bixe. Bi zimanê xwe karin perwerdehiyê bibînin. Bi qasî ku dixwazin bi rihetî xebatên çandî tên kirin û ji bo pêşvebirina van xebatan piştgirî tê dayîn. Rewşenbîrên Kurd jî yên ku çûn Ewrûpayê derfetên li vir baş bikaranîn, gavên girîng avêtin û gelek berhemên giranbuha afirandin. Mirov kare bêje edebiyata modern a Kurdî li vê derê bi pêş ket.

Rojnameya Kurdî ya yekemîn 'Kurdistan' jî li sirgûnê dest bi weşanê kiribû û wek xwediyên xwe wê jî gelek cih û war guhertibû. Rojnameya Kurdistan, di 22 Nîsan a 1898'an de li Qehîreyê dest bi weşanê kir. Xwedî û sernîviskarê rojnameyê entelektuelê Kurd, Mîkdat Mîthed Bedirxan bû. Li Qehîreyê 5 hejmarên Kurdistanê derketin lê ji ber sirgûniya Osmaniyan hejmarên ji 6'an heta 19'an li Cenewreyê, hejmarên ji 20'î heta 23'yan li

Londonê, hejmarên 24'an heta 29'an li Folkstonê, hejmarên 30 û 31'ê jî dîsa li Cenewreyê hat weşandin.

Divê em xeletiyên ku Ewrûpayiyan di serê sedsalê de kirine nekin û rastiyên ku îro gihîştine ji xwe re mînak bigirin. Nêrîna xelet a li netewedewletê, di serê sedsalê de ji dinyayê hemûyî re êşên giran anîn. Ev ji aliyê Ewrûpiyan ve hat dîtin û îro heta ji wan tê sînorên di nav xwe de hiltînin, di welatê xwe de destûra pêşxistina gelek çandan didin. Divê em jî wek her tim dûrî nêrîna netewedewletê ya xişk bikevin û wek dîroka xwe pirçandiyê wek dewlemendî bibînin.

Di serê vê mijarê de jî em li ser asîmilasyonê sekinîbûn. Ji aliyekî ve Tirkiye ji bo ji asta ku Ewrûpa gihayê sûdê werbigire û ji hemwelatiyên xwe re mafan bi dest bixe di nav hewldanan de ye, lê li welatê xwe li hemberî Kurdan helwesteke dijberî vê nîşan dide. Serokwezîr Erdogan di 2008'an de, di axaftineke xwe ya li Almanyayê de got ku, asîmilasyon sûcekî mirovahiyê ye. Her wiha Erdogan ji ber ku li hemberî asîmîlasyonê li ber xwe dane, spasî Tirkên li Almanyayê dijîn kir û xwest ku li Almanyayê zanîngeh û lîseyên Tirkî bên avakirin. Lê dema ev tişt digotin, ne di fikara ku di welatê xwe de ji bo Kurdan heman helwestê nîşan bide de bû. Nivîskar Îbrahîm Guçlu, di nivîsa xwe ya 18'ê Reşemiya 2008'an de mijar wiha nirxand:

"Serokwezîr ji bo Tirkên li Almanyayê dixwaze ku lîse û zanîngeh bên vekirin, lê 25 milyon neteweya Kurd ku li Tirkiyeyê dijî ji hemû mafên neteweyî, civakî, siyasî, aborî û desthilatdariyê bêpar in. Hebûna neteweyî ya Kurdan bi awayekî hiqûqî nayê naskirin. Ziman û çanda Kurdan qedexe ye. Dev ji perwerdehî û hîndekariya Kurdî berdin, Kurd nikarin bi nasnameya xwe rêxistinên siyasî, civakî, sivîl û demokratîk ava bikin. Parlamento û saziyên desthilatdariyê yên Kurdan tune ne. Radyoyên Kurdan, televîzyonên Kurdan qedexe ne. Axaftina bi Kurdî jî di warê naveroka axaftinê de tê darizandin. Neteweya Kurd û Kurdistan jî weke têgeh mijara darizandinê ne. Ji bo asîmîlekirina Kurdan çerxa dewletê bi awayekî bê wijdan û hovane digere."[279]

Ya rast divê mirov li hemberî vê yekê nemîne şaş. Ji ber ku li Tirkiyeyê rewşên wisa tim çêbûn. Wek mînak, heman helwest di salên 1980'yî de hebû. Li Tirkiyeyê gelek kes li dijî guhertina navên Tirkan ên li Bulgaristanê derdiketin, rexne dikirin û qiyamet radikirin, lê van kesan di eynî mijarê de zext û zordariya mezintir a ku li ser Kurdên li Tirkiyeyê dihat meşandin nedidîtin.

[279] 18 Reşemî 2008, www.haberdiyarbakır.com

Çend salên dawî Tirkiye ji bo ku bikeve Yekîtiya Ewrûpayê weke ku hin gavan davêje xwe dide xuyakirin. Lê di rastiyê de ev gav şeklî ne û bê bingeh in. Ji aliyê din ve li hemberî gavên ku divê bên avêtin gelekî qels dimînin. Wek mînak, mafê vekirina qursên taybet ên bi Kurdî û weşana TV'ê ya bi Kurdî hatiye dayîn; lê ji bo ku ev maf neyên bikaranîn her cure astengiyê derdixin pêşiya xelkê.

Li Sûriyeyê jî niha nêzî 2 milyon û 200 hezar Kurd dijîn. Ev jî ji % 12 nifûsa Sûriyeyê dike. Li wê derê jî Kurd li gelek bajaran belav bûne. Her wiha li vê dewletê jî dibistaneke Kurdan tune ye. Heta mirov kare bêje ku ev rewşa niha ji rewşa destpêka sedsalê, yanî ji dema Frensî li Sûriyeyê desthilatdar bûn jî paşdetir e. Wê demê wek Celadet Bedirxan gelek rewşenbîrên Kurd ku sirgûnî Şamê kiribûn jî, li wir gelek xebatên hêja kiribûn. Ji ber vê yekê Şam bûbû yek ji navendên girîng ên netewperweriya Kurdan a modern. Li vê derê li ser ziman û dîroka Kurdan xebatên girîng hatin meşandin û hatin weşandin. Lê piştre xebatên ku li ser nasnameya Kurdan hatin kirin tim hatin astengkirin. Kesên ku ev xebat meşandin rastî zordestiyeke mezin hatin. Wek mînak, helbestvanê Kurd Cegerxwîn gelek caran hatiye girtin, di îşkenceyê re derbas kirine û asaqek nemaye tê nekirine.

Ku em li rojhilatê Kurdistanê binêrin, li gor çavkaniyan, li Îranê nifûsa Kurdan li dor 12 milyonan e. Li vir, ji 30 eyaletî yek bi navê Kurdistan e. Wek ku me berê da xuyakirin ev eyalet tenê ji beşeke biçûk a Kurdistana Îranê pêk hatiye. Bi nav 'Eyaleta Kurdistan'ê ye lê wek netew tu heqê Kurdan ên berbiçav nehatine dayîn. Tenê di warê çapemeniyê de hin xebat tên kirin. Televîzyon û radyo bi Kurdî hene, çend kovar û rojnameyên Kurdan tên weşandin. Sekreterê Giştî yê Partiya Demokratên Kurdistanê ya Îranê PDK-Î Abdullah Hasanzade, di hevpeyvîneke ku di 2001'ê de hatiye kirin, dibêje ku 'Îran û Kurdistana Îranê îro jî di bin zordestiya Komara Îslamî de dinalin' û wiha dewam dike: "Îro jî zimanê Kurdî li Îranê li herêmê wek zimanê resmî nehatiye qebûlkirin. Zimanê Kurdî di perwerdehî û nivîsbariya resmî de nayê bikaranîn. Li gel vê yekê gelê Kurd ku neteweyeke xwedî taybetmendiyên resen e, bi awayekî resmî nehatiye qebûlkirin."[280]

Piştî ew qas hewldanên asîmîlasyonê yên ku me li jorê behsa wan kir, niha Kurd bi otoasîmilasyonê re rû bi rû ne. Bi hezaran sazî û dezgeh wan ber bi xwe ve dikişînin. Ji ber ku zimanê neteweya desthilatdar di jiyana rojane de serdest e, Kurd bivên nevên vî zimanî hîn dibin û ji zimanê xwe dûr dikevin. Her wiha mirov ji bo karibin di îşê xwe de bigihên asteke payebilind ji mec-

[280] Kovara DENG, Hijmara 59, Nisan-Gulan 2001

bûrî xwe înkar dikin. Malbat ji bo ku pêşerojeke baş ji zarokên xwe re ava bikin, ji gelek tiştan tavîzan didin. Çimkî kesên ku xwestine bi nasnameya xwe hin tiştan bikin, tim hatine astengkirin û kesên ku xwe înkar kirine jî hemû derî ji wan re hatine vekirin.

Li Îranê jî eynî rewş heye. Wek hemû qadên din, hunermend û şexsiyetên civakî yên ku helwesteke pan-Îranî nîşan dane di qada civakî de hatine tebeqeyên jorîn. Kesên ku helwesteke berevajî vê nîşan dane jî tim mewkiyên xwe winda kirine. Ev jî bivê nevê mirovan mecbûr dike ku xwe înkar bikin. Yusuf Ziyad der heqê vê mijarê de wiha gotiye: "... ji ber ku hemû derfetên dewletê di xizmeta çanda Farisî de ne, ji ber ku tenê Farisîbûn li ber deriyê dewletê xwedî qedrekî bilind e, bi vê yekê şixul peyda dibe, ev yek baweriyê dide; hemû ziman û çandên din ên etnîkî bêwate dibe. Heta gelek caran ji ber ku mirov ziman û çanda xwe li ber pêşketina xwe weke astengiyekê dibînin, bi her awayî ji ziman û çanda xwe direvin. Îstiqameta vê revê ber bi çanda serdest, çanda Farisî ve ye."[281]

Îro jî di mînaka Bahman Ghobadî de mirov dikare bibîne bê kesên ku li Îranê bi zimanê xwe xebatan dimeşînin rastî çi helwestê tên. Ji bo astengkirina xebatên hêja yên derhênerê Kurd Ghobadî her rê tê ceribandin. Di 05.02.2007'an de, di çapameniyê de li ser vê rewşê wiha dihat gotin: "Bahman Ghobadî ku di dinyayê de di nav 100 derhênerên herî baş ên dijîn de hatiye hilbijartin, nikare li Îranê fîlm bikişîne. Destûra kişandina fîlman a Ghobadî ji aliyê Daîreya Sînemayê ya Wezareta Çandê ya Îranê ve hat îptalkirin. Ghobadî got, ji ber ku ew Kurd e kişandina fîlman jê re hatiye qedexekirin. Ghobadi ji ber ku di fîlmên xwe de cih daye temayên Kurd û Kurdistanê bi 'cudaxwaziyê' dihat sûcdarkirin, wê êdî ji vir û pêde nikaribe li Îranê fîlman bikişîne.

Ev biryara Wezareta Çandê ya Îranê, ji bo nîşandana rewş û astengiya derhênerên Kurd ên li Îranê pir balkêş e. Ev yek bêtehamûliya li hemberî nasnameya Kurdan nîşan dide.

Her wiha Ghobadî di der heqê mijarê de daxuyaniyek da û diyar kir ku, tenê sedemeke vê biryarê heye, ew jî Kurdbûna wî ye."[282]

Ji ber vê yekê Kurdan bi gelemperî xebatên xwe bi nasnameya neteweya serdest meşandine û encax bi vê yekê gihîştine hin qedemeyan. Bi hezaran Kurdên xwediyê vê helwestê li Tirkiye, Îran, Sûriye û Îraqê hatine ser karûbar û peywirên girîng; di nivîs, muzîk, sînema, edebiyat û beşên din ên hune-

[281] Yusuf Ziyad, www.lekolin.org

[282] 05.02.2007, Kurdish Magazin, Devrim Kılıç, ANF

rê de xebatên girîng kirine. Gelek însanên hêja, biserketî keda wan axilbe ji çandeke din re çûye. Îro li Tirkiyeyê dema behsa edebiyatê tê kirin herî pêşiyê navê Yaşar Kemal tê bîra mirov. Bêşik, Yaşar Kemal di dinyayê de yek ji nivîskarên herî serkeftî ye, pirtûkên wî li gelek zimanan hatine wergerandin û pirtûkên wî bi milyonan hatine xwendin. Lê Yaşar Kemal ji ber rewşa ku heye bi Tirkî berhem dane, yanî berhemên wî ne ji zimanê wî yê zikmakî re, ji Tirkî re xizmeteke mezin kiriye. Di muzîkê de ev gelek sal in Îbrahîm Tatlises di nav xelkê de di tebeqeya herî jor de ye. Li tevahiya Tirkiyeyê zêde tê hezkirin û gelek berhemên wî hene. Lê xebatê wî bi piranî li ser bingeha çanda Kurdan û bi Tirkî ne. Her wiha mirov dikare di gelek qadan de, gelek navên Kurdan ên bi ziman û çanda serdest serkeftinên mezin bi dest xistine nîşan bide.

Esas çavkaniya van hemû serkeftinan çanda Kurdan e û ev yek di berhemên ku tên hilberandin de xwe nîşan dide. Mînak di berhemên Yaşar Kemal de şewq û şopa çanda Kurdî heye. Çimkî gelek vegotin, nêrîn û karekterê lehengên wî yên di berhemên wî de ji çanda Kurdî hatiye wergirtin. Xebatên din jî wisan in. Versiyoneke xweser a Îbrahîm Tatlises heye. Ziman bi Tirkî be jî ev versiyoneke cuda ya çanda Kurdî ye.

Çanda Kurdî bi vî awayî, xwe di nava kirasekî din de pêşkêş dike. Bi vî awayî li aliyekî nirx û çanda Kurdî tê fetisandin û li aliyê din folklora Kurdan weke folklora Tirkan tê pêşkêşkirin. Esas bi van xebatan çanda Kurdan tesîra xwe nîşan dide. Dema mirov van tiştan difikire ev yek tê hişê mirov: Îro Tirkiye çiqas Kurd e? Yan jî tesîra Tatlises û kesên mîna wî ku bi milyonan heyranên wan hene li ser çanda Tirkiyeyê çi ye? Her wiha tê gotin ku nifûsa Kurdên ku li Stenbolê dijîn li dor 3 milyonan e. Yanî bajarê herî mezin ê ku Kurd lê dijîn Stenbol e. Weke ku li jorê jî hat destnîşankirin, Kurd li hemû bajaran belav bûne. Keç dane hevdu, bi hev re kar kirine. Kurd bi her awayî bi gelên Tirkiyeyê hemûyî re di nav hev de ne. Ji ber vê yekê bi zorê û bi sîstematîk nebe jî tesîra çanda Kurdî ya li ser tevahiya Tirkiyeyê heye. Loma divê mirov li ser tesîra çanda Kurdî ya li ser Tirkiyeyê jî bisekine. A rast divê bi awayekî giştî tesîra çanda Kurd a li ser çandên Ereb, Tirk û Fars bi awayekî berfireh bê vekolandin.

Beriya em vê beşê biqedînin bi çend hevokan em li ser Herêma Federal a Kurdistanê ku îro hêviya Kurdan e bisekinin. Herêma Xweser a Kurdistanê ku bi gelek bedelên giran li Îraqê ava bû, niha ji bo pêşketina şexsiyet, çand û edebiyata Kurdan qadeke pir girîng e. Li vê derê gelek xebatên çandê tên kirin. Niha Kurdî, li Kurdistana Îraqê ji dibistana seretayi bigire heta zanîn-

gehê zimanê perwerdehiyê ye. Li bajarên Silêmaniye, Hewlêr (Erbîl) û Duhokê zanîngeh hene. Tenê di Zanîngeha Selahedînê ya li Silêmaniyê de 11 hezar şagirt dixwînin. Her çiqas kêmasî hebin jî bêguman wê her bi her baştir bibe. Deriyê vê derê ji xebatên hemû rewşenbîrên Kurd re vekirî ye. Lê wek ku me li jor da xuyakirin, ji ber ku ziman û alfabe tê guhertin sûdwergirtina ji hev gelekî kêm dibe. Her çiqas mirov dixwaze ku rojekê berî rojekê ji bo tevayî hin guhertin çêbibin jî, divê ev bi bêhna fireh û bi plan û programên zanistî bên kirin.

# HEVALBENDIYA DEWLETAN A LI HEMBERÎ KURDAN Û OPERASYONÊN DERSÎNOR

Niha em derbasî taybetiyeke din bibin a ku sînorên di nava Kurdistanê de bi xwe re aniye. Her kesê hebekî bala xwe bidê dikare bibîne ku di destpêka sedsala 20'emîn de bi parvekirina Kurdistanê re, eniya dijberî Kurdan pir berfireh bûye, Kurd jî parçe parçe bûne û qels ketine. Hemû têkoşînên wan jî bi têkçûnê bi encam bûne. Digel hemû hewldanên wan, sebeba ku rê li ber Kurdan asê dike û wan têk dibe, hevgirtina hemû dewletên ku Kurd lê dijîn a li dijî Kurdan e. Digel ku di navbera Sûriye, Îran, Îraq û Tirkiyeyê de di gelek mijaran de nakokî hene jî dema dor tê ser Kurdan biryarên hevpar digirin û bi hev re tevdigerin. Ji ber ku pirsgirêka Kurdan pirsgirêka wan a hevpar e, li ser ku nehêlin Kurd ber xwe bibînin pir baş li hev dikin. Bi fikara ku li parçeyekî serkeftineke biçûk jî pêk bê wê hêviyê bide Kurdên li parçeyên din, li kîjan parçeyî hewldaneke biçûk pêk tê, rastî nerazîbûna hemûyan tê.

Di salên avabûna Îraqê de daxuyaniya ku li ser hin mafdayînên bi sînor ên Kurdan dihate dayîn, pêkanînên ku piştre wê bikevin dewreyê nîşan dida. Sekreterê Dewleta Kolonî ya Brîtanyayê Yarbay L. Amery, fikiriye ku divê mafên çandî yên Kurdan bi awayekî berfireh bê dayîn lê piştre ji encamên vê yekê ketiye xofê. L. Amery, nêrînên xwe wiha vegotiye: "Weke roja îro armanca me ew e ku em Kurdan bi dewleta Îraqê re li hev bînin. Heger Kurd wisa bên razîkirin, em hêviyê ji wan dikin ku tu carî li aliyê din ê sînor nenêrin û nekevin dû xeyala Kurdistaneke serbixwe ku di navbera Tirkiye û Îranê de hatiye parçekirin..."[283]

[283] Vladimir F. Minorsky, Musul Sorunu, r. 78

Prof. Dr. Doğu Ergil, di nivîseke xwe ya ku di sala 1990'î de nivîsandiye mijarê bi awayekî zelal îfade dike: "...Îran, Îraq û heta Sûriyeya ku di nav xwe de nifûseke qelebalix a Kurdan dihewîne, nikarin piştgiriyê bidin cudaxwazên Kurd. Çir ku ev yek parçebûna wan e jî. Çir ku serxwebûna li welatekî, heyvanê serxwebûna li welatên din e jî..."[284]

Ne tenê ji bo dewletên ku Kurd lê dijîn, ji ber ku hebûna Kurdan ji bo gelek dewlet û neteweyan rîsk e, piştî ku Kurd û Kurdistan hat parçekirin, ji bo tunekirina wê her rê hat ceribandin. Digel ew qas neheqiyên ku li Kurdan hatin kirin jî tu welatî bi awayekî rast û dirust li dijî van neheqiyan dengê xwe dernexist. Ji ber ku berjewendiyên wan di vê yekê de hebûn. Gelek welatên ku ne dijminê Kurdan in jî li hemberî vê yekê helwest nîşan nedan, nikaribûn nîşan bidin. Di roja îro de mixabin berjewendiyên dewletan berî îdeolojiyan cih digirin. Îro her çiqas li ser mafên mirovan gelek tişt tên gotin jî di têkiliyên dewletan de ya ku esas tê girtin berjewendî ye.

İsmail Beşikçi di berhema xwe ya bi navê 'Mêtîngeha Nav Dewletan, Kurdistan' (Devletlerarası Sömürge Kürdistan) de, mijar pir vekirî li ber çava raxistiye. Beşikçi, daye zanîn ku parçebûna Kurdistanê ne wek parçebûna Almanyayê, ne wek parçebûna Koreyê, parçebûna Vîetnamê ye. Çir ku van parçebûnan dewletên cuda cuda derxistine holê; lê Kurdistan di navbera dewletên ku piştî belawelabûna Împaratoriya Osmanî derketine holê û Îranê de ji bo tunekirina şexsiyeta Kurd û Kurdistanê hatiye parçekirin û parvekirin. Beşikçi dema rewşa Filistîn û Kurdistanê dide ber hev jî wiha dibêje: "...Li Rojhilata Navîn di navbera rewşa Filistîn û Kurdistanê de cudahiyên pir kûr hene. Derdora Kurdan tim bi hêzên neyar hatiye dorpêçkirin. Kurd weke ku di nava cehenemê de hebûna xwe diparêzin û hewl didin hebûna xwe berdewam bikin. Lê derdora Filistînê tim bi hêzên dost pêçayî ye yan jî qet nebe ne dijmin in. Tenê neyarekî Filistînê heye; Îsraîl. Lê ne tenê Filistîn, 22 welatên Ereb û 42 welatên misilman jî neyarên Îsraîlê ne, yan jî qet nebe ne dostê wê ne..."[285]

Li ser erdnîgariya ku Kurd lê dijîn, berjewendiyên gelek welatan hene. Ji destpêka sedsalê heta niha li ser vê erdnîgariyê gelek têkilî hatin bipêşxistin. Têkiliyên berjewendîparêziyê çiqas zêde bûn, eniya dijberî Kurdan jî her roj zêdetir bû. Petrola ku ji bo parçekirina Kurdistanê sedema herî bingehîn bû, hîn jî girîngiya xwe diparêze. Li Tirkiyeyê hemû petrola ku tê derxistin li erdnîgariya Kurdan e. Li Sûriye û Îranê jî rewş wisa ye. Piraniya petrola ku li

[284] M. Sadi Koçaş, bnb., r. 282
[285] İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan, r. 20

Îraqê jî tê derxistin li herêma Kurdan tê bidestxistin. Riyên transît ên Tirkiyeyê ku Îran, Rojhilat û Ewrûpaya Rojava bi hev ve girêdidin jî di vê erdnîgariyê re derbas dibin. Bi van re têkiliyên aborî ku bi pêş dikevin hene. Dema ku ev têkilî tên danîn gelek dewlet ji bo ku bikaribin têkiliyên xwe yên bi van dewletan re xurt bikin, neçar in ku di cepheya li dijî Kurdan de cihê xwe bigirin. Her çiqas senaryoyên cuda hatibin fikirîn jî Amerîka û Rojava ku bi Şah, yanî bi Îranê re û bi Tirkiyeyê re di nav têkiliyên baş de bûn, ji bo ku têkiliyên wan xera nebin li dijî Kurdan tim ketin nav helwestên neyînî. Ev rewş ji bo hemû welatên Ereb û dewletên ku bi wan re di nav têkiliyê de ne jî wisan e.

İsmail Beşikçi çi dibêje em berdewam bikin: "...Dewletên ku dixwazin bi welatên Ereb re têkiliyên xwe bi pêş bixin, mecbûr in ku piştgiriyê bidin Filistîniyan û Rêxistina Rizgariya Filistînê. Xwe ji bo piştgiriyê neçar dibînin, lê pirsgirêka Kurdan pirsgirêkeke li dijî Ereban e. Ji ber vê yekê dema dewletên din bixwazin bi Ereban re têkiliyên xwe xurt bikin, mecbûr dibin ku li hemberî Kurdan cihê xwe li gel polîtîkayên Ereban bigirin, piştgiriyê bidin Ereban, Îraqê û Sûriyeyê. Têkoşîna Kurdan ne tenê têkoşîneke li dijî Ereban e. Ev têkoşîn di heman demê de weke têkoşîneke dijtirk, dijfars bi pêş dikeve. Ji ber vê yekê, dewletên ku bixwazin bi Tirkiye û Îranê re têkiliyên xwe xurt bikin, çavên xwe ji têkoşîna mafdar a Kurdan re digirin..."[286]

Di bingeha gelek probleman de nêzikahiya netewedewletê jî heye. Divê mirov tim vê yekê di bîra xwe de bîne. Neteweperestiya ku di vê sedsalê de derketiye holê bûye sedema gelek şaşî û xeletiyan. Di Konferansa Kurd a Parîsê de Midûrê Radyo û Televîzyona Îraqê yê berê Selîm D. Fahrî, di axaftina xwe ya bi sernavê 'Cîhana Ereb û Pirsgirêka Kurd' de vê mijarê wiha tîne ziman: "Di nav hikûmetên Ereb de prensîbeke bi bandor heye, 'rast an jî xelet divê em piştgiriyê bidin birayên xwe'. Meyleke xelet a vê prensîbê ev e ku li dijî Ereban an jî Kurdan helwesteke çawa dibe bila bibe, wê piştgiriyê bidin polîtîkaya hikûmeta Îraqê."[287]

Di demeke wiha ku neteweperestî li pêş e, heger van sînoran bi rastî jî du netew yan jî memleketên cuda ji hev veqetandina, bi îhtîmaleke mezin wê di navbera van her çar dewletan de pirsgirêkên mezin derketina. Heger ev pêkanînên li ser Kurdan, li welatekî din li ser yek ji wan neteweyên serdest pêk hatibûna wê çaxê wê qiyamet rakiribûna. Wek mînak, heger li Bakurê Îraqê Tirk bijiyana û Sedam tiştê ku dianî serê Kurdan bianiya serê Tirkên li wê derê, wê çaxê wê di navbera Sedam û Tirkan de problemên mezin derketi-

[286] İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan, r. 21-22
[287] Uluslararası Paris Kürt Konferansı, r. 127

na. Lê belê ev nêzikî sed salî ye van dewletan hem zilm li Kurdan kirin û hem jî di ser Kurdan re bi awayekî pir baş li hev kirin. Guhertina sînoran jî tê de, li hemberî hev gelek tawîz dan û di vê mijarê de tim alîkariya hev kirin.

Heger em ji aliyê van dewletan ve li meseleyê binêrin, Kurd di navbera çar dewletan de bûn tampon jî. Dewletên cîran ku bi sed salan neyarên hev bûn, ji ber ku mecbûr in li hemberî Kurdan bibin yek, bûn dostên hev. Di dema Îran û Osmaniyan de Kurd dîsa ji bo van welatan di rewşa tamponê de bûn. Lê di navbera rewşa wê demê û ya vê demê de cudahiyên mezin hene. Wê demê her du dewlet neyarên hev bûn, di navbera wan de gelek caran şer derdiketin. Yên ku her du dewlet diparastin mîrektiyên Kurd ên sînor bûn. Lê di demên dawî de dewletên ku li ser heman xakê hatin damezirandin li hemberî Kurdan ji hev re bûne dost û bi hev re êrîşî Kurdan dikin. Balyozê (Buyukelçî) berê yê Îranê yê li Tirkiyeyê Furûgî, ev yek pir hişkere aniye zimên. Furûgî, di sala 1934'an de berî ku Şah Riza bê serdana Tirkiyeyê, di axaftina xwe ya di Parlamentoya Îranê de wiha gotiye: "Rêzdarên hêja baş tê bîra we, di demên borî de di navbera milet û dewleta Îranê û milet û dewleta Tirkiyeyê de fikr û ramanên xelet û îhtilaf hebûn. Helbet vê yekê zirareke mezin da her du dewlet û miletan. Di dawiyê de siûda me bû alîkar û Xweda efû kir. Îrana nû û Tirkiyeya nû, her yek ji wan ketin nav fikr û ramanên maslahatê û di bin vê ferasetê de miletên Îran û Tirkiyeyê ber bi bilindahiyê ve sewq bûne û niha ramana ku di navbera wan de çêbûye dostanî, samîmiyet e û her du jî pir dixwazin hevdu bibînin..."[288]

Eynî rewş di navbera Tirkiye û hêzên Rojava de jî pêk hatin. Hêzên Rojava Dewleta Osmanî parçe kiribûn, li hev par kiribûn û di demên dawî de heta bi Stenbolê dagir kiribûn. Lê Tirkiyeyê li ser parvekirina Kurdistanê bi wan re peyman çêkir û pê de têkiliya wan ket şiklekî din. Dûre her du aliyan dest bi alîkariya hev kirin. Hîn di 1921'ê de Tirkiyeyê bi Frensayê re li hev kiribû. Li Lozanê jî Tirkiyeyê ji bo daxwaza Ingilîzan a di derbarê Başûrê Kurdistanê de deriyên xwe vekirî hiştibûn û peyman qebûl kiribû. Weke ku me di beşa dîrokê de jî îfade kir, di vê demê de, piştî Brîtanyayê dît ku wexta li Îraqê Kurd hin mafan distînin rastî êrîşa Tirkiyeyê tên, hêdî hêdî ji sozên ku ji Kurdan re dabûn paş de vegeriyan.

Mustafa Barzanî jî li ser hevkariya li dijî Kurdan gelek tişt gotine. Çend hevok jê ev in: "Hemû dinya dizane ku di navbera Îranî, Tirk û Ereban de şer û nakokiyên dîrokî hene... Lê belê kengî meseleya Kurd û Kurdistanê bê rojevê, ev dewlet dijminahî û şerê di navbera xwe de ji nişkê ve ji bîr dikin û

[288] Tarihten Günümüze Türk İran İlişkileri Sempozyumu, r. 95

li ser têkbirina têkoşîna azadiyê ya Kurdan dest bi îtifaqê dikin. Kîngê nîşaneyeke serhildana Kurdan derkeve holê, ev dewlet derhal ji bo ku riya çareseriyê bibînin di navbera xwe de dest bi hevdîtinan dikin û îhtilafên di navbera xwe de datînin aliyekî..."

Niha em derbasî pêkhatinên di nava pêvajoyê de yên derbarê vê mijarê de bibin. Îmkan tune ku em hemû hevkariyên li hemberî Kurdan ên van dewletan û hemû têkiliyên ku li ser vê bingehê hatine kirin karibin raxin ber çavan. Berî her tiştî, hişkere ye ku peymanên bi awayekî veşirtî hatine danîn ji yên tên zanîn zêdetir in. Bêguman weke hemû sernavên di vê pirtûkê de, li ser vê mijarê jî hewcedarî bi lêkolîneke berfireh heye. Ji bo vê mijara ku di vê xebatê de tenê wek beşeke biçûk cih digire, mirov encex dikare çend mînakan bide.

Di beşa dîrokê de me dabû xuyakirin ku heman nêrîn û nêzikahî li hemberî tevgera Simko Axa û Şêx Mehmûd ên piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn hatine nîşandan. Ji bilî vê me di bîr anîbû ku sînor kiribû ku Ingilîz li hemberî Şêx Ubeydulahê ku di dawiya sedsala 19'an de şerê serxwebûnê dimeşand, di navbera Osmanî û Îranê de îtifaqê pêk bînin. Yanî sînor ji bo yekitiya her sê hêzên mezin a li hemberî tevgera Kurdan zemînek ava kiribû. Li aliyê din, hîn di peymanên ku di bihara 1921'ê de Yekitiya Sovyetê bi Îran û Tirkiyeyê re îmze kiribûn, biryara qedexekirina piştgiriya her cure tevgerên Kurd ên neteweyî ku parçekirina yek ji van welatan bixwaze, hatibû dayîn.[289]

Rejîma Îranê bi peymana 26'ê Sibata 1922'yan, têkiliyên xwe yên bi Yekitiya Sovyetê re hîn baştir kiribûn. Ji ber vê yekê, dema Simko Axa ji bo ku ji Sovyetê alîkarî bixwaze di bihara 1922'yan de nûnerek şandibû Bakuyê, bersiveke erênî negirtibû. Her wiha Îran jî ji bo ku alîkariya Tirkan a bi Simko Axa re bibire, di 25'ê Cotmeha 1922'yan de bi Tirkan re peymanekê îmze dike. Şahê Îranê piştî van peymanan hêsantir tevdigere. Hedefa Şah ew bû ku, çekên di destê hemû eşîran de ji wan bistîne, desthilatdariya serokê wan ên kevneşopî bişikêne û hemûyan bixe bin kontrola otorîteya navendî. Şah piştî van peymanan ji bo vê armancê hîn bêhtir ji xwe bawer tevdigere.

Di vê demê de di navbera dewletan de peyman çêbibin jî, ev mijar bi qasî îro ne zelal e. Hîn di ser Şerê Cîhanê re gelek derbas nebûye, rejîmên nû û dewletên nû ava bûne, gelek tiştan cihên xwe nedîtine. Ji ber vê yekê, guman û tirs zêde ne. Heger hemû Kurd û Kurdistan bi dewlemendî û potansiyela xwe tenê bi welatekî ve hatibûya girêdan, dê ev welat bibûya hêzeke mezin. Di wê demê de her kêliyê îhtimaleke wilo hebû; ji bo ku ev yek pêk neyê hemû aliyan ji hev şuphe dikirin û pir bi şiyarî tevdigeriyan. Yanî hîn di helwesta li hemberî Kurdan de baweriya dewletan gelekî bi hev nedihat.

[289] Chris Kutschera, bnb., r. 115

Faktoreke din jî ya ku bû sedema rewşa îro tê hişê mirov. Mirov difikire ku tu dewletê cesaret nekiriye ku hemû Kurdan bi tena serê xwe di nava xwe de vehewîne. Lewre heger Kurd hemû bi yek ji van dewletan ve hatibûna girêdan, wê çaxê wê nifûsa herî zêde ya wê dewletê Kurd bûna. Bi vî awayî jî dê wê dewletê nikaribûya li hemberî hêza Kurdan hebûna xwe biparasta. Bi kurtasî di nava vê tevliheviyê de parçebûna Kurdistanê li hesabê hemû hêzan hatiye. Helbet daxwaza dewletên ku dinya bi rê ve dibirin di pêşiya hemû tiştî de bû. Jixwe ev rewş hê di serî de, bi zora parvekirinên dewletên rojavayî yên herî bi hêz derket holê. Aloziyên piştre ya van dewletan, ji ber têkoşîna wan a ku ji Kurdistanê pariyekî baş bidest bixînin e. Her kesî bi qasî quweta xwe pariyê xwe dixwest. Divê di vir de em vê yekê jî bibêjin, rastiyeke wiha heye; bazarkirin û firotina malê hinên din, keda hinên din rihet e. Ji ber vê yekê jî dewlemendiya welatê Kurdan ji aliyê biyaniyan ve bi hêsanî dihat parvekirin.

Ev destdanheva li ser berjewendiya axa Kurdistanê ava bûye, ew qas mezin bûye ku dewletên herî mezin bi xwe dilê wan tê de hebûya jî ceger nekirine ku li himberî van hêzan bisekinin. Kurd ji ber astengiyên ku tê de bûn gelek derban ev rewş nedidîtin û hêviya xwe ji van dewletên ku dijminahiya wan dikirin nedibirîn.

Dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn û piştî wî jî, ku gelek dewletan serxwebûna xwe bi dest xist; Kurdan jî heviya xwe nedibirîn. Hayê gelekan ji lihevkirina mezin tune bû û bi dewletên ku li ser wan gelek lîstik dikirin têkilî datanîn, hêviya ku hin gav bên avêtin ji wan dikirin. Her çiqasî tabloya rastîn, lihevkirinên pişt perdeyan li ber çavên Kurdan ne gelekî zelal bin jî, li cihna jê ev rewş hatiye zimên, lê dîsa jî dev ji niyeta xwe ya paqij bernedane.

Bersiva tevgereke biçûk ji vê rewşê re mînakek e:

Dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn dest pê dike, Haco Axa bi Cegerxwîn re diaxive û dibêje here Qamişlokê, ji kaptanê Frensayê re bêje, em ê deh hezar esker ji we re pêşkêş bikin, hûn jî alîkariya me bikin. Cegerxwîn vê behsê wiha dom dike: "Lê çawa ez vegeriyam Qamişlokê, Deladyê ne rûniştî bû. Kaptanê Serêkaniyê Şinêdir li şûna wî rûniştibû. Çawa min daxwaza bi dilpaqijî jê re got, Şinêdir, li min vegeriya û got:

- Bê çilo bi dilekî sade tu ji min re dibêjî, ez jî dixwazim wilo dilsade bersiva te bidim. Lê berî ko em bikevin nav dabaşê, ez dixwazim tiştekî ji te bipirsim: Heger tu serokomarê Frensayê bî û ji te re van tiştên jêrîn bibêjim, tu yê çi bersiva min bidî.

Wilo got û dest bi pirsiyarên xwe kir:

- Heger Frensa deh hezar Kurdên bê çek û bê perwerde bixe bin çekan û leşkerên Tirk, Îran, Îraq û Sûriyeyê ji xwe bixeyidîne û bike dijminê Frensayê, tu yê çi bibêjî?

Wê çaxê weke ferekî aşê bi ser serê min de berdî, ez gêj û sersar bûm. Di bersiva wî de sivik min got:

- Na, naxwazim her çar leşkerên bi çek û tekûz bikim hevalbendê dijmin û deh hezar Kurdên bê çek û bê perwerde bikim dost û bikim bin çekan."[290]

Wek ku me berê jî da xuyakirin, her çi bi serê Kurdan dihat jî, hêviya xwe ji dewletê Ewrûpayê qut nedikirin û gelek derban bi wan re, axilbe bi Koma Neteweyan re diketin nav têkiliyan da ku heqekî bistînin. Lê her tim destê wan vala vedigeriyan. Îro bi xwe ku ev têkilî ew qas vekirî li ber çavan e jî, hîna gelek Kurdan hêviya xwe ji Ewrûpayê qut nekirine. Ji ber wilo mirov bêhtir heq dide yê wê demê. Ewrûpa li dinyayê hemûyî hêviyek belav kiriye, çiqas heq dike yan heq jê derdikeve yan na, ev mijareke din e...

Em dîsa vegerin ser têkiliyên desthevgirtina dewletan. Piştî peymanên 1926'an ku di navbera Tirkiye, Îran, Îraq û Sûriyeyê de çêbûn hevkariya dewletan hîn bêhtir wê hişkere bibe.

Em hin mînakan bidin. Dema serhildana Simko Axa ya 1926'an di operasyona ku balafir û yekîneyên siwarî jî beşdar dibin Îran zoriya Simko Axa dibe. Kurd bi windahiyên mezin xwe vedikişînin sînor. Ji bo hêsankirina hevkariya hêzên Tirk û Îranê ateşeyê leşkerî yê Tirk yê li Îranê bi hêzên Îranê re li hemberî Simko Axa tevdigere. Dema Simko Axa li aliyê din ê sînor, li aliyê Tirkiyeyê tê dîtin nayê dîtin, hêzên Tirk wî dixin çemberê, dest datînin ser sîlehân û wî bêtesîr dikin.[291]

Li hemberî têkoşîna Şêx Mehmûd, îcar Îranê alîkarî dida Îraqê. Dema Şêx Mehmûd derbasî Îranê dibe, rastî êrîşên hêzên Îranî jî tê. Carinan jê jî di şerê navbera Şêx Mehmûd û Îraqê de, hêzên eskerên Îranê alîkarî bi hêzên Îraqê re dikirin.

Di dema Serhildana Agiriyê de, alîkariya dewletan bi hev re hîn bêhtir bû. Jixwe di destpêkê de, wexta Îhsan Nûrî Paşa bi hin peyayên xwe ve ji Îraqê di ser Îranê re tê Agiriyê astengî derdikevin. Xoybûn, Îhsan Nûrî Paşa wek serokê eskerî yê serhildana Agiriyê hilbijartibû û ji bo wilo ji Îraqê diçû Agiriyê. Dema di Îranê re derbas dibin, mufrezeyeke leşkerên Îranê li ser riya wan kemînê datîne û hevalê wî tê kuştin. Wê demê hin kesên ku bi Îhsan Nûrî re ne, mecbûr dibin vedigerin Îraqê, lê Îhsan Nûrî û hin hevalên xwe xwe digihînin Agiriyê.

[290] Cigerxwîn, bnb., r. 226
[291] Hassan Arfa, bnb., r. 84

Serhildana Agiriyê bi navberan ji sala 1926'an heta sala 1930'yî berdewam kir. Dewletê bi operasyonên xwe yên li hemberî serhildanê tu serkeftin bi dest nexistibû. Tirkiyeya ku di erdnîgariya asê ya Agiriyê de tevî bi deh hezaran artêşa xwe li hemberî Kurdan nikaribû bi ser bikeve, encex piştî piştgiriya Îranê ev herêm bi dest xist.

Prof. Dr. Neşe Ozgen, dibêje ku Tirkiye di rojên dawî ên Serhildana Agiriyê de, di 19'ê Tebaxa 1930'î de bi Îranê re ketiye nava hevkariyê û li beramberî teslîmkirina Kurdên serhildêr nahiyeya Koturê ji Îranê re hiştiye. Ozgen vegotina xwe wiha dom dike: "...Li gorî destnîşankirina Kalman, 'Rêveberên Tirk pirsgirêka sînor a di navbera Îran û Tirkiyeyê de hal dikin. Îran hin gundên li herêma Agiriyê dide Tirkiyeyê, Tirk jî hin gundên li herêma Wanê didin Îranê. Bi vê yekê re derdora serhildêrên Kurd ku neyarê wan ê hevpar in, tê pêçan.'..."[292]

Îran ji bo ku karê artêşa Tirk hêsan bike, ji bilî qebûlkirina destguhertina axê, bi awayekî leşkerî jî êrîşî Kurdan dike û ji bo têkçûna serhildanê alîkariyê dike. Alîkariya Sovyetê ya ji bo Tirkiyeyê jî berdewam dike. Weke peymana 1921'ê, di sala 1927'an de jî di navbera Yekitiya Sovyetê û Tirkiyeyê de li hemberî Kurdan peymanek tê çêkirin. Piştî têkçûna Serhildana Agiriyê şervanên Kurd ji Sovyetê dixwazin ku wan bihewînin. Lê Sovyet vê daxwazê qebûl nake û rê nade wan. Di beşa 'Di Welêt de Her Tim Şer Heye', di derbarê alîkariya Sovyetê de me hin mînak dane. Fermandarê Giştî yê Serhildanê Îhsan Nûrî, di bîranînên xwe de dinivisîne ku di Serhildana Agiriyê de Îran û Rûsyayê alîkarî dane Tirkiyeyê û balafirên Tirk bêyî ku cudahiyê bixin navbera Kurdên Tirkiye û Kurdên Îranê bombe barandine ser serê wan.

Husrev Gerede ku di salên 1930'yî de li Îranê sefîr bû, di hevdîtinên bi Şahê Îranê re, tim hewl dide ku Kurdan weke 'dijminê hevpar' nîşan bide. Di hevdîtinan de li ser, li hemberî 'dijminê hevpar' Kurdan dostanî bê bipêşxistin û bihêzkirin, sekinîne. Li hemberî Kurdan operasyonên hevpar hatine plankirin.[293]

Husrev Gerede di berhema xwe ya bi navê 'Bîranînên Min ên Siyasî' ('Siyasi Hatiralarım') de, cih daye hin detayên hevkariyê yên di salên Serhildana Agiriyê de: "...Di dawiyê de bi saya siyaseta azîmkar a Gazî, bi îdareya mahîrane ya tevgera tedîpê, bi kabîliyeta bilind ku yekîneyên çiyê û siwariyên me nîşan dan, serhildêr têk çûn. Li hemberî têkçûna bi lez û bez a serhildêran Îranî bi tedbîrên zarûrî yên dereceya duyemîn tevli vê operas-

[292] Prof. Dr. Neşe Özgen, Toplumsal Hafızanın Hatırlama Ve Unutma Biçimleri, r. 6-7
[293] Hüsrev Gerede, bnb., r. 68-69

yonê bûn; Îraniyan kesên ku reviyan nav axa wan berhev kirin û ew enterne kirin, mecbûr man ku li hemberî çeteyên çekdar şer bikin, sûbayên îrtibatê şandin biryargeha me, eşîretên xwe yên Kurd ên nêzî operasyonê dûr xistin. Bi vî awayî reîsên serhildêr 'Îhsan Nûrî', 'Şêx Abdulkadîr', zarok û pêgirtiyên 'Paşayê Kurd Huseyîn' enterneyî Tebrîzê kirine û piştre ew veguheztine 'Tehranê'.

Di wê demê de rojekê ji qesrê 'Teymurtaş' telefon kiribû û ji min re gotibû, ji bo karekî lezgîn ez dixwazim te bibînim. Ez çûm odeya wî ya li qesrê ku ez berê jî tim diçûmê. Nexşeya Rûsan a (50 000) mikyasî ya bêhempa, ya li ber xwe nîşan da. Got ku, li ser girekî rohilata çiyayên 'Aybeyê' ya axa Îranê wan derdora serhildêrê Kurd Brohaso (Bro Heskî Têlî) bi 60-100 pêgirtiyên wî ve dorpêç kirine. Lê Fermandarê Alayê 'Kelb-i Ali' şehîd ketiye. Parastina Kurdan a bi inyad dewam dike. Ji me rica kir ku, em di cih de alîkariyê bidin wan. Tabî, me derhal ji yekîneya xwe ya li çiyayên 'Aybey'ê mufrezeyeke biçûk şand. Bi vî awayî pirsgirêka Brohasso jî ji holê hatibû rakirin..."[294]

Wek ku tê fêmkirin, êrîşeke din jî li benda kesên ku piştî têkçûna serhildanê xwe spartin Îranê sekiniye. Pîvanên navneteweyî yên li ser sînorên dewletan li van sînoran derbas nabin. Weke ku Gerede got, kesên ku derbasî Îranê dibûn îcar mecbûr diman ku bi hêzên Îranê re şer bikin. Rêberên Serhildana Agiriyê Ferzende Beg û Broyê Heskî Têlî piştî ku derbasî Îranê bibin, vê carê wê bi hêzên Îranê re şer bikin. Di vî şerî de Ferzende Beg birîndar dibe, Broyê Heskî Têlî jî dimire. Bûyerên bi vî rengî tim çêbûne. Yanî cih û warekî ku Kurd biçinê tune ye. Heger ji dewletekê derbasî dewleteke din bibin jî, tenê encamek li benda wan e: Mirin.

Aliyekî din ê berdewama alîkariya Îranê hebû. Bi tedbîrên ku li sînorê Îranê hatin danîn, Tirkiyeyê 'tenkil û tedîba' ku piştî serhildanê da destpêkirin bi dilê xwe meşand. Her wiha ji ber peymanên ku hatibûn çêkirin, kesên ji bo serhildaneke ku li welatekî din hatibû destpêkirin alîkarî kiribûna, rastî zordestiyeke mezin a dewleta lê diman dihatin. Ji ber ku li gorî peymanan ji vê alîkariyê rasterast dewleta ku ew kes lê diman berpirsyar bû. Ji bo ku Kurdên li Îranê nikaribin alîkariya Kurdên li Tirkiyeyê bikin, Îranê li sînorê xwe tedbîr stendibû. Sînor ji aliyê muhafizên Îranê û cendirmeyan ve bi awayekî bi bandor di bin kontrolê de bû. Ji ber van tedbîran Kurdan nikaribû herin alîkariya hev. Ê ku ev bida ber xwe, şerê bi muhafizên ser sînoran jî didan ber çavên xwe. Wek mînak, Smaîl Axayê Celalî di 1931'ê de piştî

[294] Hüsrev Gerede, bnb., r. 152-153

serhildana Agiriyê dixwaze bigihîje hawara yên li Agirî û derdora Agiriyê. Lê pêşiya wî ji aliyê yekîneyên Îranê ve tê girtin û ji ber vê yekê di navbera wî û yekîneyên Îranê de pirsgirêk derdikevin. Bi kinayî, bi awayekî rasterast an jî bi awayekî din dewlet bi her awayî alîkariya hev dikin.

Helbet di encama van alîkariyan de berjewendiyên her du aliyan jî hene. Weke ku di vegotinan de jî derbas dibe, li ser Kurdan heta bi peymana destguhertina axê jî tê kirin. Îranê, di dema Serhildana Agiriyê de hem ax bi dest xistiye, hem jî bi alîkariya ku bi Tirkiyeyê re kiriye Kurdên di nav sînorên xwe de qels kiriye.

Lihevkirinên bi vî rengî di hemû sînoran de wê her tim berdewam bikin. Tirkiye ji bo rêlibergirtina alîkariyê ku wê ji aliyê Başûr ve ji Kurdan re hatibûya, ji Frensa û Brîtanyayê piştgirî stendiye. Di serhildana Şêx Seîd de alîkariya Frensayê bi Tirkiyeyê re çêbû. Bi xwesteka Tirkiyeyê, qismekî pêşengên Kurd ên li Sûriyeyê hatin sirgûnkirin. Qismek ji wan hatin dersînorkirin. Wê demê rêveberiya Sûriyeyê di bin desthilatdariya Frensayê û ya Îraqê jî di bin destê Brîtanyayê de bû.

Bûyerên di dema Serhildana Agiriyê de, didin xuyakirin ku ji bilî tiştên tên nîşandan lîstikên din jî hene û mesele ne tenê serhildan e. Dema mirov li tevahiya Kurdistanê binêre, wê mirov bibîne ku wê demê li hemberî Kurdan operasyoneke bitevayî hatibû destpêkirin. Ev jî nîşanî me dide ku hesabên veşirtî, bazarên veşirtî hene.

Di dema Serhildana Agiriyê de dawî li rêveberiya mandatiya Ingilîzan a li Îraqê tê. Di vê demê de Kurd jî dixwazin sozên ku hatine dayîn bi cih bên û xweseriya Başûrê Kurdistanê bistînin. Ingilîz vê daxwazê red dikin û radigihînin ku Başûrê Kurdistanê bi qraliyeta Bexdayê ve hatiye girêdan. Dema ku Kurd vê yekê qebûl nakin, yekîneyên artêşa Ingilîz li hemberî Başûrê Kurdistanê operasyoneke bi şîdet didin destpêkirin. Di dema ku ev li Başûr diqewimin, Tirkiye di 15'ê Tîrmeha 1930'yî de li herêma derdora Çiyayê Agiriyê bi artêşeke ku ji 60 hezar kesî pêk tê û bi 100 balafiran dest bi operasyonê dike. Li vir dîsa bi awayekî rasterast an jî veşartî li hemberî Kurdan alîkariyeke wan a hevpar heye. Berî her tiştî dema ku Ingilîzan dawî li rêveberiya mandayê ya li Îraqê anîn û Başûrê Kurdistanê bi Bexdayê ve girêdan, Kurdan li hemberî Ingilîzan dest bi serhildanê kir. Operasyona ku Tirkiyeyê li hemberî Çiyayê Agiriyê da destpêkirin, pêşiya Kurdên ku ji bo piştgiriya Kurdên Başûrê Kurdistanê diketin rê birî. Di heman demê de fikirîne ku di encama nerazîbûna Kurdên li Başûr, dibe ku Kurdên Başûr bixwazin bi Kurdên Bakur re bibin yek û bi Tirkiyeyê ve bêne girêdan. Lê bi

vê yekê pêşiya vê îhtimalê jî hatiye girtin. Propogandaya 'Kurdan bi navtêdana Ingilîzan serî hildane' tê kirin, lê berevajî vê yekê hişkere tê dîtin ku li vir, a bi Brîtanyayê re li hev kiriye Tirkiye ye.

Tirkiye dewleteke mezin bû û bi hemû sazî û dezgehên xwe ve dixebitî, helbet nerazîbûna Kurdên li Başûrê Kurdistanê ya li hemberî tevgera Ingilîzan zanibû. Heger nêzikahiya wê ya li hemberî Kurdan cuda bûya, di vê demê de dibû ku hewldanên cihêreng çêbibûna. Li vê derê Tirkiye û Brîtanya li ser vê parvekirinê lihevkirine. Helbet lihevkirina her du dewletan û bihevre destpêkirina operasyonan, di têkçûna Kurdan de roleke mezin lîstiye.

Tevgereke din jî heye ya ku lihevhatina her du dewletan zelaltir dike. Weke ku di vegotinên berê de hat îfadekirin, di vê demê de Tirkiye tu kes nedixist herêma serhildanê. Lê rayedarê payebilind ên Ingilîz Edmonds, piştî têkçûna serhildêran li Tirkiyeyê li herêmên Kurdan ên hatine xerakirin hatiye gerandin.

Di vê demê de weke ku me li jorê jî got, Îran jî parçeyek ji vê planê ye û wê jî peywira xwe bi cih aniye. Bi vî awayî sê artêşên tekûz di eynî demê de dora Kurdan pêçane. Dema her dewlet ji aliyê xwe ve bi ser Kurdên di nav xwe de çûye, yekitiya Kurdan bê îmkan bûye û hêza wan qels ketiye. Bi vî awayî jî encama ku em hemû dizanin pêk tê.

İsmail Beşikçi jî balê dikişîne ser vê mijarê. Beşikçi dibêje ku, di mehên havîna 1930'î de li Başûrê Kurdistanê şer bi hemû dijwariya xwe dimeşe. Beşikçi vegotina xwe ya di derbarê salên 1930'î wiha berdewam dike: "Di heman dîrokê de Kurdên di bin rêberiya Simko Axa de jî li Îranê ji hikûmetê doza heqê xwe yên 'neteweyî', maf û azadiya xwe û doza 'xweseriya' Kurdistanê dikin, lê belê Simko Axa di Temûza sala 1930'î de ji aliyê hikûmeta Îranê ve tê xapandin. Simko Axa bi 'qehpetî' tê kuştin. Yekîneyên artêşa Îranê li hemberî Kurdan dest bi êrîşeke mezin dikin.

Her wiha Kurd di van deman de li Agirî û Zîlanê, ji hikûmeta Tirk mafên xwe yên neteweyî, demokratîk û azadiyê dixwazin. Hikûmeta Tirk bi hikûmeta Îran, Ingilîz û Frensayê re li hev dike û daxwazên Kurdan bi xwînê difetisîne, lê belê berxwedana Agiriyê di mehên Hezîran, Temûz, Tebax û Rezbera sala 1930'î de bi hemû dijwariya xwe berdewam dike. Di heman dîrokê de rêveberiya Frensayê ku Sûriye di bin destê wê de ye, ji bo ku Kurdên li Sûriyeyê bi Kurdên din re têkiliyê daneynin û alîkariya wan nekin, zordariyeke mezin dimeşîne. Kurdên ku ji ber zilma artêşa Tirk û Îranê direvin Yekitiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê, dixwazin penaberî wir bibin.




*Êvara roja 30.06.1930'î li bajarê Şîno termê qehremanê dîroka azadîxwaziya Kurdistanê Simko Axayê Şikakî li ber piyên leşkerên Îranê ye.*[295]

Lê Sovyet mafê penaberiyê nade wan. Heta li hemberî Kurdên ku penaberiyê dixwazin dest bi êrîşê dike.

Piştî salên 1930'î di navbera serokwezîrên Tirkiye, Îraq, Îran, Wezîrên Karê Derve yên Îran, Îraq, Brîtanya, Frensa, Komîsyonên Sînor ên Tirkiye û Îran û Yekitiya Sovyetan, Tirkiye û Îran, Tirkiye û Brîtanya, Tirkiye û Sûriye (Frensa) de, di demên cuda û cihên cihê de civîn tên lidarxistin. Di hemû civînên ku di navbera Tirkiye, Îran, Îraq, Sûriye, Frensa û Brîtanyayê de Kurd weke 'dijminê hevpar' hatine îlankirin. Ji bo ku li hemberî neyarê hevpar têbikoşin hevkariya îdeolojîk, polîtîk û leşkerî hatiye kirin û planên ku hatine amadekirin bi hev re pêk anîne. Fetisandina bi xwînê ya mafên neteweyî û demokratîk a Kurdan, nedayîna mafên penaberiya Kurdên ku ji ber zordariya 4-5 artêşan li sînor asê mane, berdewama êrîşa artêşan a li hemberî Kurdan, êrîşa 4-5 artêşan a li ser Kurdan, heman êrîşên li ser zarok, kal û gelê sivîl, şewitandina gund, xanî, çandinî, daristan, sewalan, sirgûn û dadgehkirin, hemû encama polîtîkayên hevpar in."[296]

Wek ku tê xuyakirin gelek dewlet û hêzên mezin biryar dabûn ku li hemberî Kurdan bibin yek û çi ji wan dihat bi serê Kurdan de dikirin. Ji bo wilo Kurdan çiqas hewl didan jî bi ser nediketin. Gelek derban Şêx Mahmûd û hin serokên Kurdan ên din têkilî bi dewletan re danîne, mexdûriyeta miletê xwe anîne zimên, lê tiştek bi ser nexistine. Wek ku em berê jî li ser sekinîn, di

[295] www.Kurdistanmedia.com, Kakşar Oramar: 72 Saliya Şehîdbûna Lîderê Kurd, Simko Axayê Şikak
[296] İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan (Kurdistan, Mêtîngeha Nav Dewletan), r. 249-250

21'ê Adara sala 1931'ê de Şêx Mehmûd Berzencî ji serokê Şûraya Koma Neteweyan re nameyek şandibû. Di nameyê de dinivîse ku Dewleta Îraqê bombekirina Kurdan û kuştina wan dom dike. Ji aliyekî ve jî sozê ku berê dane Kurdan tîne bîra wan û daxwaza serxwebûna welatê xwe dike. Şêx Mehmûd dide xuyakirin ku ne ji hêza Ingilîz û destgirtina Koma Neteweyan (Cemiyeta Miletan) be ew têra xwe hene. Ji aliyekî ve jî balê dikişîne ser berpirsyariya Koma Neteweyan û dibêje ku, Ingilîz li ser navê we hikum li Îraqê dikin, ji ber vê yekê em naxwazin berê xwe bidin Ingilîzan û em ji we heqiyê dixwazin. Lê bi vê serîlêdanê jî wek her tim nagihên tu encamê.

Mesele ne heqî û neheqî ye. Hêz û berjewendî di pêşiya hemû tiştî de ye û çi gavên ku ji aliyê Kurdan ve hatine avêtin bi hevkariya gelek dewletan hatiye pûçkirin. Husrev Gerede, li ser hevkariya li dijî Kurdan a Îraqê û sê dewletên din wiha nivîsîye:

"Wek ku tê zanîn, Kurdên Mûsilê ji bo ku dewleteke mustakîl (serbixwe) ava bikin serî li Cemiyet-i Akvam dabûn. Hikumeta 'Îraq'ê ji me rice kiribû ku, em li hemberî biryara ku Komîsyona Mandayê di meha Rêbendana 1931'ê de stendibû pê re bi hevkarî tevbigerin. Hikûmeta me, ji ber ku Îran jî bi qasî me bi vê mijarê ve eleqedar e, munasib dîtibû ku ew jî di nav vê hevkariyê de be. Li ser vê bingehê ji bo ku bi 'Furugî' Xan re hevdîtinê çêkim di dawiya meha Pûşperê de hikûmeta me talîmat dabû min."[297]

Piştî ew qas hewldan wê çilo Kurd bi ser bikevin. Wek gelek tevgerên din ên Kurdan tevgera Şêx Mehmûd jî her çiqas li ber xwe dabin û demeke dirêj têkoşîna xwe kiribin jî, ji ber wilo bi ser neket. Dawiyê jî Artêşa Îraqê, di bin parastina Ingilîzan û hevkariya Îranê de di Avrêla 1931'ê de êrîşeke dijwar bir ser Başûrê Kurdistanê. Şêx Mehmûd mecbûr ma derbasî Îranê bû. Lê li Îranê jî êrîş çû ser. Ji ber wilo ji mecbûrî Şêx Mehmûd dîsa bi nûnerên Ingilîzan re dan û stendin danî û bi wan dîsa vegeriya Îraqê.

Bihevrebûna dewletan a li dijî Kurdan roj bi roj xurtir dibe. Û her van dewletan peyman bi hev re çêkirine, miheqeq bi dû de êrîşên dijwar birine ser Kurdan. Di 8'ê Tîrmeha 1937'an de li Seraya Sadabadê ya li paytexta Îranê Tehranê ye, nûnerên Afganistan, Îraq û Îranê Peymana Sadabadê îmze kirin. Di beşeke peymanê de li ser lihevkirina li dijî Kurdan desthevgirtin heye. Yanî ji bo ku li dijî Kurdan alîkariyê bi hev re bikin, her serê çendekê dîsa dîsa bext didan hev.

Di vê demê de li Bakurê Kurdistanê Serhildana Dêrsimê heye. Piştî vê peymanê hêzên Artêşa Tirk, hîn bi tundî bi ser Kurdan de diçin. Ev peyman

[297] Hüsrev Gerede, bnb., r. 153

e ya ku qirkirin bi ser Dêrsimê de aniye. Ev peymanên wilo ne yên ku li Başûrê Kurdistanê bombe bi ser Kurdan de barandine. Ev peyman in ên ku li Helepçeyê bi hezaran însan li kolanan bi ser zarokên wan de bê can xistine. Loma di çi dewleta ku Kurd tê de tehdeyê dibînin ne tenê ew dewlet sucdar e; yên ku li ser vê bingehê li hev kirine hemû şirîkên vî sûcî ne. Ew qas vekirî tê xuyakirin ku dema lihevkirineke berfireh tune be ev zilma zêde ji aliyê kesî ve nedihat qebûlkirin.

Heger ji aliyekî din ve em lê binêrin, dema ku xwediyê (eqreba) hemwelatiyê dewletekê li tenişta wan di bin ew qas zilm û zordariyê de be, dibe sedema ku dewlet bi cîranê xwe re şer jî bike. Lê wek hemû rewşan, ji ber sînorê di hundirê Kurdistanê de ev nêrîn jî serûbinî hev kirine. Bi ser halan de dema aliyekî li Kurdan xistiye aliyê din jî li wan xistiye û mirov kare bêje di sedsala 20'emîn de ji bo qirkirina Kurdan gelek dewletan dest dane hev.

Wek ku me berê jî da xuyakirin, ji ber ku li ser parvekirina Kurdistanê gelek dewletan dest daye hev, taqeta kesî tune ku li himberî vê hêzê bisekine, yanî destekê bide Kurdan. Taqeta dewleta herî mezin a dinyayê jî têra ku nexşeya çar dewletan biguherîne tune ye. Yên ku xwestin bi qorzîkekê bigirin jî mecbûr man ku di demeke nêzîk de ji vê vekişin. Mînaka Sovyetê dema avakirina Dewleta Kurdan a li Mehabadê mirov kare bide. Sovyet, ku dewleteke herî mezin a dinyayê bû; di dema avakirina Dewleta Kurdan a li Mehabadê de xwest alîkariyê bide Kurdan, lê xwe li ber vê hêzê ku li hemberî Kurdan heye negirt.

Ji aliyekî din ve jî ku mirov lê binihêre, mirov dikare bibêje berjewendiyên ku ji Kurdistanê tên bidestxistin têra hemûyan kiriye. Belê, wek ku tê zanîn Dewleta Mehabadê, ji ber ku Sovyet xwe li ber dewletê din ên mezin negirt û ji sifreya Kurdistanê bi pareke biçûk qayîl bû hat rûxandin. Yanî dema bi Îranê re li ser şirîkatiya petrolê li hev kir û pê de Sovyetê alîkariya xwe ji Dewleta Kurdistanê ya Mehabadê qut kir.

Ji xwe sebeba rûxandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê ne tenê kişandina alîkariya Sovyetê bû, bi dû de bi alîkariya Ingilîz û Amerîkayê ku dan Îranê jî Mehabadê winda kir. General Mustafa Barzanî ku wê demê bi artêşa Îranê re şer kiribû, wiha digot; heger Ingilîz û Amerîkayiyan piştgiriya Îranê nekiribûna, heger çekên giran nedabûna artêşa Îranê, qet artêşa Îranê bi me nikarîbû.

Ev dewlet li hemberî tevgera Barzanî tim bi hev re di nava hevkariyê de bûn. Em tenê li rewşa Barzaniyan a sala 1947'an binêrin. Barzaniyiyan dema ku piştî hilweşîna Komara Kurd a Mehabadê Îran terk kirin, bi rê de tim bi

yekîneyên leşkerî yên Îranê re pevçûne. Di pevçûnan de ji her du aliyan jî bi dehan kes mirine. Barzaniyî ku di dawiya Adarê de nêzî sînorê Îraqê bûn, li vir zêdetir ketine tengasiyê. Îran, Îraq û Tirkiye, ji bo girtin û tunekirina Barzanî û hêza wî di nava hevkariyê de ne.

Li ser daxwaza rayedarên artêşa Îraqê, fermandarê hêza operasyonê ya li Kurdistanê yê Îranê Humayunî û yek ji fermandarên hêzên Îraqê Ş. A. Hîcazî, di 19'ê Adara 1947'an de li Îraqê, li Hac Umranê ji bo hevkariyê hevdîtin çêkirine. Ji berhema Rojnamevan Necefkulî Pisyan a bi navê 'Ji Mehabada Bixwîn Ber bi Qeraxên Arasê ve' (Kanlı Mahabad'dan Aras'ın Kıyılarına) em hinekî detayên hevkariya van dewletan bibînin:

"Barzaniyî ji ber ku ji berê de serê dewleta Îraqê diêşandin, dewletê ji bo têkçûna wan pereyên mezin veqetandibû... Li vir divê mirov bîne bîra xwe ku dewleta Îraqê herêma Barzan tarûmar kiribû. Daristanên li wê derê şewitandibû û ew herêm bê mirov hiştibû. Lê digel vê yekê jî ji vegera Barzaniyan aciz dibû û ji bo ku ji wan xilas bibe her cure alîkarî bi artêşa Îranê re dikir. Di hemû hevdîtinan de hat dîtin ku daxwaza hemû rayedarên Îraqê ew e ku Mele Mustafa û hemû pêşmergeyên wî ji aliyê artêşa Îranê ve bên perçiqandin...

Fermandarê hêza leşkerî ya Îraqê, her du alayên xwe yên Bagiştiyan û Mêrgesorê nîşanî fermandariya hêzên li Kurdistanê ya Îranê da û ragihand ku li Balafirgehên Kerkûk û Mûsilê 12 balafir ji wezîfeyê re amade ne. Rayedarê artêşa Îraqê da xuyakirin ku, dema hewcedarî bi vê hêzê hebe, wê karibin di hundirê 24 saetan de li sînor amade bibin. Di heman demê de destnîşan kirin ku her du alayên navên wan derbas dibin, ji 15 tugay û 6 tabûran pêk tên... Li ser îhtîmala ku Barzaniyî di ser Newala Bînarê re dikarin derbasî Tirkiyeyê bibin, rayedarên Tirk li Tehranê bi fermandariya artêşê re têkilî danîbûn. Li herêmên nêzî sînor sê garnîzonên artêşê hebûn. Yek ji wan li ser Girê Emirê ya ku sînorên Îran, Îraq û Tirkiyeyê digihîjin hev, a din li Newala Bînarê û yekîneya din jî li nav sînorê Tirkiyeyê, li hemberî Zerka û Nîrgeyê bû. Nûnerê artêşa Tirkiyeyê yê li Tehranê jî ragihand ku ew ji bo bi artêşa Îranê re Barzaniyan têk bibin, ji her cure alîkarî û hevkariyê re amade ne. Vê ramana xwe ji fermandariya artêşa Îranê re got. Rayedarê artêşa Tirk, diyar kir ku heger Barzaniyî derbasî Newala Bînarê bibin an jî bikevin nav sînorê Tirkiyeyê, wê Barzaniyan biperçiqînin..."[298]

Vegotina ku niha em ê ji kitêba bi navê 'Kurdistan' a Hassan Arfa bidin, dide nîşandan ku beriya Barzaniyî derbasî Îranê bibin jî, Tirkiyeyê li hemberî

[298] Necefkuli Pisyan, Kanlı Mahabad'dan Aras'ın Kıyılarına, r. 85-86

hêza di bin pêşengiya Barzanî de bi Îraqê re hevkarî kiriye: "... Di destpêka sala 1945'an de ji bo otonomiya Kurdistana Îraqê bi hikûmeta Îraqê re hevdîtin pêk hatin, lê li hev nekirin. Li ser vê şerekî dijwar dest pê kir. Kurdên di bin fermandariya Barzanî de serê pêşiyê serkeftinên baş bi dest xistin, lê dûre bi zêdekirina artêşa hêzên asîmanî hatin dorpêçkirin. Tirkiyeyê jî bi hêzên xurt li sînor qereqol danîbûn û hemû buhêrkên ku diçûn Tirkiyeyê girtibûn..."[299]

Dema piştî hilweşîna Komara Kurd a Mehabadê Barzaniyî vedigeriyan Îraqê, yekîneyên artêşa Îranê heta sînor bi dû wan de diçin; li gorî nêrîna wan heta ku paqijî xilas bibe wê operasyonên xwe bidomînin. Malbata Barzanî û yên pê re, dema derbasî Îraqê dibin, çekên xwe teslîmî dewleta Îraqê dikin. Lê Mele Mustafa Barzanî, bi 500 mirovên xwe re ku di nav wan de ji artêşa Îranê sûbay jî hene, teslîm nabin û derbasî sînorê di navbera Îraq û Tirkiyeyê dibin. Dema Mistefa Barzanî li sînor e, ji aliyê meqamên Îraq û Tirkiyeyê ve di der heqê wî de biryara lêgerîn û girtinê heye. Barzaniyî jî dixwazin xwe bigihînin Sovyetê û di vê rêwîtiyê de dem bi dem bi her sê hêzan re, bi hêzên Îraq, Tirkiye û yên Îran re şer dikin.

M. Barzanî û hêzên pê re dema ber bi Sovyetê ve bi rê dikevin, gelek caran mecbûr dimînin ku geh derbasî sînorê Îranê û geh derbasî sînorê Tirkiyeyê bibin. Di 26'ê Gulana 1947'an de bi şev careke din dikeve nav axa Îranê û diçe gundê Hişkî yê li herêma sînor. Em bi vegotinên Necefkulî yên di derbarê wê demê de berdewam bikin: "...Vegera Mele Mistefa derhal bi qenala Tumena 4'emîn ji fermandariya artêşê re hat ragihandin û ji bo perçiqandina wan fermanên ku pêwîst dike hatin derxistin... Dema ku hêzên dewletê nêzî wan dibûn û talûke hîs dikirin, riya xwe diguhertin û diketin Tirkiyeyê. Lê ji ber ku mayîna wan a li Tirkiyeyê ne rast bû, careke din vedigeriyan Îranê. Bi vê rêguhertin û revê gihîştin sînorê Makoyê. Li herêmên çiyayî yên Makoyê ku wek girên Susuz û Skar tên zanîn, li Daş Fişil di navbera hêzên dewletê û çekdarên Barzanî de pevçûn derketin." Di van pevçûnan de ji her du aliyan jî kuştin çêbûn. Barzaniyan 20 rojan li herêma sînor a Agiriyê xwe parastin. Vegotinên Necefkulî yên di derbarê dema ku Barzanî bi hêzên dewletê hatin rapêçan û pê de wiha ye: "Barzaniyan dît ku rewş bi talûke ye, di reşahiya şevê de paşve vekişiyan û ber bi bakur ve bi rê ketin. Lê hêzên dewletê dev ji şopandina wan bernedan. Çekdar di herêma sînorê ku di navbera Îran û Yekitiya Sovyetê de ye û ji herêma Siracli ya

[299] Hassan Arfa, bnb., r. 169

Sovyetê, di çemê Arasê re derbasî Yekitiya Sovyetê bûn û penaberî wir bûn."[300]

Di nîveka pêşî a sedsala 20'emîn de çav û hişê dewletên mezin hemûyan li ser herêmê bû, lê wê di nîveka duduyan de hêza Amerikayê derkeve pêş. Amerîka ber bi bûna hêza herî mezin a dinyayê ve diçû û ev bêyî Rojhilata Navîn (ji xwe Kurdistan jî di nav de ye) nedibû. Di dîrokê de jî hêzên ku di dinyayê de serî dikişandin dabûn ser heman riyê. Di encama vê tevgerê de di destpêka salên 1950'yî de li herêmê dubendîtiyeke hişk derket holê. Ji ber ku di armanca sereke de Kurdistan hebû, fatoreya herî giran ji Kurdan re hat birîn. Ji bo ku lîstika mezin xera nebe, diviyabû zêdetir bi ser Kurdan de herin. Kurdên ku gelek caran bi êrîşan re rû bi rû mabûn, taqet di wan de nemabû û di lîstikan de cih nedigirtin, di vê demê de jî bi zordariyên mezin re rû bi rû man.

Weke heta wê demê, ji vir û pê de jî di hemû lihevkirinên li herêmê de, li hemberî Kurdan hevkarî pêk tê. Çir ku divê Kurd bi ser xwe ve neyên; ji bo ku karibin hespên xwe li gorî dilê xwe bibezînin, divê bi ser Kurdan de herin, wan gêj bikin û nehêlin çav û seriyan ji hev vekin. Di vê demê de, dîsa li ser herêmê bi beşdarbûna gelek dewletan peymaneke bi navê 'Pakta Bexdayê' pêk hat. Dr. Abdurrahman Qasimlo, ji bo vê peymanê ev tişt nivîsîne: "Di 23'yê Sibata 1955'an de Îran, Îraq, Tirkiye û Pakistanê 'Pakta Bexdayê' damezirandin. Piştî demeke kin di 4'ê Nîsanê de Brîtanya jî ket nav vê Paktê. Her çiqas Amerîka ne endama vê Paktê bû jî bi awayekî birêkûpêk alîkariya xebatên komîteyan dikir. Ev Pakt jî li gel hin armancan, mîna Peymana Sadabadê ya 1937'an li dijî tevgera Kurd hatibû çêkirin."[301] Piştî vê lihevhatinê, sînor hatin mayinkirin. Bi danîna mayinan re dest û ling û mejiyê mirovan hat belawelakirin û welatê Kurdan hemû bû mezel.

Ji aliyê din ve wek ku di bûyerên beşa 'Li Kurdistanê Her Tim Şer Heye' cih girtine daye xuyakirin, dema di perçeyekî de Kurdan destkeftinek biçûk be jî bi dest xistine, Kurdên di perçeyên din de bi mahnayekê hatine girtin, îşkence li wan hatine kirin û bi salan di girtîgehan de mane. Mînakek jê ya dema şoreşa Îraqê ye. Me îfade kiribû, li Îraqê pêşveçûnên ku ji bo Kurdan erênî bûn ê di 1958'an de, Amerîka, Brîtanya, Tirkiye û Îranê xistin nav tirs û fikaran, kiriye ku di navbera van dewletan de agahdarkirineke xilbe çêbibe û Tirkiye ji bo ku bikeve Başûrê Kurdistanê amadekarî kiriye. Di wê demê de hed û hesabê zordariya ku li Îran, Sûriye û Tirkiyeyê bi hev re hatine kirin tune ye. Heman rewş axilbe di salên 1970, 1980, 1990'î de, di gelek deman de çêbûne.

---

[300] Necefkuli Pisyan, bnb., r. 155-156
[301] Dr. Abdurrahman Qasimlo, İran Kürdistanı, r. 40

Digel van hemû tiştan hin dewletan karta Kurdan weke koz ji xwe re bi kar anîn. Bazara ku di sala 1975'an de li Cezayîrê di navbera Îraq û Îranê de çêbû mînakek ji vanan e. Di van hevdîtinan de Amerîka navbeynkarî dikir. Îraqê li hemberî ku Îran piştgiriya xwe ya ji bo Kurdan bikişîne, gelek tawîz dan Îranê. Ev helwest wê di lihevkirina Îran û Îraqê ya di sala 1988'an de jî xwe bide xuyakirin.

Di operasyonên dersînor de, derdikeve holê bê dema mijar Kurd bin, ev dewlet li hemberî hev çiqas bi tolerans in. Piştî ku Kurdistan bû çar parçe, hema hema her çar dewletan jî li hemberî Kurdan operasyonên dersînor pêk anîne. Operasyonên dersînor sebebê şer in, lê dema çûn bi ser Kurdan de be dewlet sînorê xwe vedikin û alîkariyê jî didin ên ku sînorê wan binpê dikin. Bi demê re ji bo van operasyonan peyman û pêkanînên van dewletan zêde bûne. Em ê di vir de hemû operasyonên dersînor yek bi yek nikaribin bidin. Çir ku li gorî hejmarên resmî tenê Tirkiyeyê heya 2008'an 25 caran operasyonên dersînor pêk anîne. (Li gor Muhamed Akîf Cemal, tenê ji Adara 2005'an heta Tebaxa 2006'an hêzên Tirk li hemberî Kurdistana Îraqê 53 operasyonên leşkerî pêk anîne.)[302] Her wiha di demên dawî de, di mehên ewil ên 2008'an de, hejmara operasyonên ku Tirkiyeyê li hemberî Başûrê Kurdistanê li dar xistine pir pir zêde ne. Her operasyonê jî çend caran sînor tê binpêkirin bêhijmar e...

Niha ji ber teknolojiya pêşketî hebekî haya mirov digihê van operasyonan, lê ji ber ku operasyonên berê bi piranî veşartî dihatin kirin, agahiyên der heqê wan operasyonan de ne esehî ne. Li vê derê wê tenê çend mînak bên dayîn û wê mijar bi awayekî giştî bê nirxandin.

Berê operasyonên dersînor pêk hatibin jî yekemîn operasyona leşkerî ya mezin, a ku Sûriyeyê alîkarî dabû Îraqê ye. Di 1963'yan de rêveberiya Baasê li Îraqê hatibû ser kar. Barzaniyan û Îraqê wê demê bi hev re şer dikirin. Di vê demê de Sûriye ji bo ku alîkariya Îraqê bike, yekîneyeke ku ji 6 hezar kesî pêk dihat sînor derbas kir û di ser Zaxo re êrîşî Barzaniyan kir. Lê ji ber ku vê yekîneyê windahiyên mezin dan, mecbûr ma ku paşve vegere.

Yek ji operasyonên dersînor ên ku Tirkiyeyê li dar xistine, ya Qamişloyê ye. Tirkiyeyê di şeva 12'ê Berfanbara 1980'yî de li hemberî Qamişloya li kêleka Nisêbînê li sînorê Sûriyeyê dest bi operasyonekê kir. Hêzên Taybet bi vê operasyonê ji Nisêbînê derbasî taxa Çirmikê ya Qamişloyê dibin. Li wê derê di malekê de 8 rêberên Rêxistina Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê 'KAWA' qetil dikin. Her wiha ji malbata ku rêberên KAWA kirine mêvan jî 7 kes tên

[302] 28.08.2006, rojnameya Radîkal

qetilkirin, bi giştî 15 kes tên kuştin. Hêzên Taybet dema ku operasyon diqede dîsa di heman şevê de sînor derbas dikin û tên Tirkiyeyê.*

Di lêkolîna Soner Yalçın a bi navê 'Mikurhatinên Serbaz Ersever' (Binbaşı Ersever'in İtirafları) de behsa Komkujiya Qamişloyê jî tê kirin. Ji vê kitêbê em hin vegotinên di der heqê A. Ö. ku bi salan li herêmê Kurda peywirdar bû û di operasyona Qamişloyê de cih girtiye, çend pasajan bidin:

"... Di dema 12'ê Rezberê de ku 1500 subay bi awayekî resen tên teqawîtkirin, ew ji bo cuntayê roleke aktîf dilîze. Astsubayek di derheqê A. Ö. de wiha dibêje: 'Ew di sala 1978'an de di 22'emîn Tugaya Sînor a Mêrdînê de peywirdar bû. Ew bi 'yuzbaşi Cem' ku hevalê wî yê herî nêzîk bû û bi hev re dixebitîn, tevli gelek operasyonan bûn. Piştre di Îstixbarata Cendirmeyan de jî bi hev re xebitîn. Subayên ku li vir peywirdar in kincên mîna yên gerîla li xwe dikin. Ew bi xwe ne Kurd in lê bi Kurdî pir baş diaxivin.'

...

Me lêkolîna xwe berdewam kir: A. Ö. yek ji wan sûbayên ku tevli operasyona dersînor a piştî 12'ê Rezberê ya ewil dibe. Di operasyona 12'ê Berfanbara 1980'yî ya li hemberî wargeha KAWA'yê ya li Sûriyeyê de serkêşê tîmê ye. Endamê Komîteya Navendî ya KAWA Huseyîn Aslan jî tê de 15 kes di vê serdegirtinê de hatin kuştin. A. Ö. piştî 12'ê Rezberê demeke kin bû Şaredarê Mêrdînê."[303]

Em rewşa piştî kuştina rêberên KAWA ji hemşîreya ku wê demê li Nisêbînê di nexweşxaneyê de dixebitî guhdar bikin:

*"Gelekî baş tê bîra min. Em li Nexweşxaneya Nisêbînê bûn. Gotin, eskera li 5-6 kesên ku bê peseport di sînor re derbas bûne reşandine. Wê rojê jî wê bavê min çûbûya Qamişlo. Min got qey bavê min jî di nav wan de ye; ez gelekî qehirîm, ez gelekî giriyam. Ji bo laşan bînin Nisêbîn textor, dozger û hin polês wê daketina Binxetê (Sûriye-Qamîşlo). Min jî xwest ez bi wan re herim. Min ji dozger re got, ez xistim nav koma çûnê. Em tevde tevî midûrê emniyetê, yuzbaşî û eskeran li erebeya fermî siwar bûn û çûn. Tu zanî, navbera nexweşxaneyê û hidûd 50 metro tune ye. Em gihan hidûd me nêrî tiştek tune ye. Eskeriyê zanibû çi mesele ye, lê ji me re negotibûn. Piştî me sînor derbas kir ji me re hat gotin ku, 9 kesên siyasî hatine kuştin, lê me nizanibû KAWA'yî ne. Mesele ji me re venekiribûn. Rast em birin nexweşxaneya Qamişloyê. Piştre me fêm kir ku 9 KAWA'yî hatine kuştin. Ji Nisêbînê îxbariya wan bûbû.*

*Min bi çavê xwe dît, hemû anîbûn nexweşxaneya Qamîşloyê li odakê avêtibûn ser hev. Hemû miribûn. Cihekî wek komirxaneyê bû, laş hemû li ser*

---

* Kesê ku bixwaze di der heqê vê operasyonê de agahiyên berfireh bibîne, kare li kitêba Mahmut Baksî (xweha wî jî di vê operasyonê de hat qetilkirin) ya bi navê 'Kamışlı Katliamı'(Qetliama Qamişloyê) binêre.

[303] Soner Yalçın, Binbaşı Ersever'in İtirafları, r. 20

*hev bûn. 8 zilam û pîrekek bûn. Yek tenê birîndar filitîbû. Em hemû tevde li nexweşxaneyê çûn cem. Me jê pirsî, bê kê wilo li wan kiriye; got, elektrîk tefiyabû, me nedît kê wilo kir. Bi Erebî dipeyivî. Dûre ji esker û polêsên bi me re gotin, werin cesedên xwe bibin.*

*Di jiyana xwe de min rojeke wilo xerab derbas nekiriye. Di erebeyeke wek nîvqemyonet ên pişta wan vekirî, laş hemû avêtin ser hev û me anî Nisêbînê. Li nexweşxaneya Nisêbînê li bodromê tenê kevirekî nahş, yanî cihê laş hebû. Dîsa li odak bodromê laş hemû avêtin ser hev, tenê pîrek danîn ser wî kevirî. Ew pîrek hîn jî li ber çavê min e. Pîrekeke gelekî spehî bû. Cilin reş lê bûn. Te digot qey nemiriye. Min cihê birîna wê jî nedît. Digotin pîrek jina Şefqelî bû, ew jî serokê wan bû. Jinik çar mehî biheml bû. Dema otopsi kirin, dîtin ku çar mehî biheml e.*

*Dilê mirov diêşiya, mirov nikaribû li wan binêre. Min fêm nekir bê mêrê wê kîjan ji wan bû. Em daketin otopsiya jinikê, hê em li wir bûn dê û bavê wê hatin. Hîn em li Qamîşloyê bûn dê û bavê wê pê hisiyane ku hatine kuştin. Dûre diya wê got, ez dixwazim laşê qîza xwe bibînim, ez pê re daketim. Diya wê newêribû bigiriya, di ber xwe de hêdî hêdî digiriya. Kî dizane çi agir di nava wê de bû, lê ji tirsa eskeriyê newêribû.*

*Hewşa xestexaneyê tije esker û polês bûn. Wê wextê kesî din nehat ser laşê xwe, tenê dê û bavê keçikê pê ve hatibûn. Ew ji Amedê hatibûn. Digotin, qîza me mamoste ye. Zû de me tu xeber jê nestendibû. Me nizanibû bê bi ku de çûye. Dozger got, ma we nizanibû bê keça we li ku ye? Wan got, na, ji malê bazdabû.*

*Du hungilîsk di destê keçikê de bûn, dozger her du hungilîsk dan diya wê. Yek jê ya zewacê bû. Dê gelekî digiriya, lê ew giriyê wê yê bêdeng tu carî ji bîra min naçe. Wê şevê çûn li otêlê man, bû sibeh hatin laşê keçika xwe birin Amedê. Wê sibehê pê de xwediyê yên din jî yek bi yek hatin laşê xwe birin.*

*Di jiyana xwe de min gelek mirî dîtin, di nav wan de xwediyê min jî hebûn, lê ez gelekî di bin tesîra vê jinê de mam û tu carî ji bîra min neçû. Te digot qey nemiriye, di rengê wê de tu guhertin çênebûbû."*

Wê demê ji ber derbeya leşkerî gelek zordarî hebûn û xelk di nav tirsê de bûn. Loma rastiya gelek bûyeran nedihat zanîn. Encex piştre bi gelek salan hêdî hêdî tiştin dihatin ronîkirin. Li gel teknolojiya îro hîn jî, gelek dem û bûyerên di tarîtiyê de mane hene.

Tirkiye her roja ku derbas dibe operasyonên xwe yên dersînor zêde dike û bi hêzeke mezintir vê yekê dimeşîne. Dema ku şerê Îran û Îraqê di sala 1980'yî de dewam dikir, Başûrê Kurdistanê hêdî hêdî ket destê PDK'ê.

Tirkiye ji ber pêşveçûnên li Başûr ket nav tirs û gumanan û ji ber vê yekê tim li sînor leşker bi cih kirin. Di heman demê de piştî têkiliyên germ, di navbera Enqere û Bexdayê de 'Peymana Ewlehiya Sînor û Hevkariyê' hat îmzekirin. Li gorî vê peymanê artêşên her du welatan jî ji bo tunekirina şervanên Kurd wê bikaribûna sînorê hev derbas bikirina. Piştî vê peymanê Tirkiyeyê cara ewil di 25'ê Gulana 1983'yan de dest bi operasyona dersînor kir; bi 6500 leşkerên xwe Bakurê Îraqê dagir kir û qederê 5 km'yan sînor derbas kir. Vê yekê dida nîşandan bê ji bo tunekirina tevgera Kurdan hevalbendî û hevkariya Tirkiyeyê ya bi cîranan re bi demê re çiqasî bi pêş ketiye.

Di van deman de hevkariya li hemberî Kurdan zêde berfireh e. Di şerê Îran û Îraqê de Amerîka û gelek dewletên Ewrûpayê piştgirî û alîkariya çekan dan Îraqê. Bi taybetî di vê demê de Îraqê gelek çekên kîmyewî bi kar anîn û Kurdan zirareke mezin dît, lê belê yekê ji van dewletan jî nerazîbûn nîşan neda. Bi ser de jî operasyonên dersînor ên Tirkiyeyê dom kirin.

Di 1986'an de artêşa Tirk li Îraqê dest bi operasyona dersînor a mezin a sêyemîn kir. 10 balafir tevli operasyonê bûn. (15'ê Tebaxê) Îraqê jî li Bakurê Îraqê li hemberî herêmên ku di bin kontrola PDK'ê de bûn dest bi êrîşan kiribû. Êrîşa her du dewletan jî di eynî tarixê de pêk hatibû. Li gel ku dihat gotin, ji bo em PKK'ê bişopînin em operasyona dikin, di dema operasyonan de gelek kesî jiyana xwe ji dest da û piraniya kesên ku miribûn ji Kurdên Bakurê Îraqê bûn. Hem însan dihatin kuştin, hem jî bi van operasyonan çavê gel ditirsandin. Bi vî awayî vekirî tê xuyakirin ku, gelek armancên operasyonên bi navê li hemberî PKK'ê dihatin kirin hebûn.

Di 4'ê Adara 1987'an de Tirkiyeyê di nav sînorên Îraqê de bi tevlibûna 30 balafiran operasyoneke din a dersînor da destpêkirin. Hêzên asîmanî yên Tirkiyeyê bi mahneya ku wargehên PKK'ê lê ne, careke din bombe bi ser herêmên Bakurê Îraqê (Başûrê Kurdistanê) de barandin. Car caran operasyonên dersînor peyameke wiha didan raya giştî ya hundir; pirsgirêk ne pirsgirêkeke hundirîn e, çavkaniya pirsgirêkê ji derve ye. Digel van tevger û operasyonên zêde, PKK qels neket, berevajî vê yekê her roj xurtir û bihêztir bû.

Di heman demê de, di şerê Îran û Îraqê de Kurd bi komkujiyên mezin re rû bi rû dimînin. Bi bombebarana her du aliyan, bajar û gundên Kurdan tên xerakirin û wêrankirin. Wek mînak, di êrîşa Îranê ya fuzeyî ya li ser Kerkûkê de, zarok û jin jî tê de gelek mirov hatin kuştin. Di heman demê de balafirên şer ên Îraqê bi ser gundên Kurdan de bombeyên kîmyewî dibarînin, bi sedan mirov tên kuştin û birîndarkirin.

Dema digel van hemûyan Sedam dît ku nikare bi pêşmergeyan (hijmara pêşmergeyan ya di 1988'an de 45 hezarî derbas dike) giranî da ser bikaranîna çekên kîmyewî. Her çiqas li Îraqê li ser serê Kurdan çekên kîmyewî dihatin barandin jî, Tirkiyeyê jî operasyonên dersînor berdewam dikirin.

Di vê demê de çapameniya Ewrûpayê wiha dinivîsîne: Rayedarên Tirkiyeyê ditirsin ku bi alîkariya Îranê Kurd dewleteke serbixwe ava bikin. Li gorî nûçeyeke rojnameya Hurriyetê ya 1'ê Nîsana 1988'an, Tirkiye ji bo ku mudaxaleyî Bakurê Îraqê bike, yekîneyên komando yên li Bolu, Sêwas û Kayseriyê li sînor kom dike. Yekîneyên komando bi otobûsan, bi eskortên polîsan, di derengiya şevê de di ser Mêrdînê re dibin Şirnex û Qilabanê. Di vê demê de Dewleta Îraqê li hemberî Kurdan çekên kîmyewî bi kar aniye û hîn jî bi kar tîne. Dîmenên mirovên ku di Komkujiya Helepçeyê de di malan de, li kuçeyan can dane, hîn jî di rojevê de ne.

Di heman rojnameyê de dinivîsand ku wê Ozal ji bo serdaneke resmî here Bexdayê. Serdan wê di 1-3'ê Nîsanê de bi tevlibûna 11 parlamenteran pêk bê. Ji hin saziyan jî wê burokratên payebilind di serdanê de cih bigirin. Cengiz Çandar, di nivîsa xwe ya rojnameyê de dibêje ku serdana Ozal a Bexdayê bi Îranê ne xweş e: "Derdorên dîplomatîk ên Îranê, tirsa xwe anîn ziman. Tirsa wan ew e ku heger di navbera Serokwezîr Turgut Ozal û Rêberê Îraqê Sedam Huseyîn de, li piştî deriyên girtî hevdîtinek çêbibe, wê Îraq ji Tirkiyeyê bixwaze ku 'bikeve Bakurê Îraqê'." Di nivîsa Çandar de tê gotin ku li gorî rayedarên Îranê, gerek Tirkiye ji ber qetlîama Helepçeyê Bexda protesto bikira, lê belê berevajî vê Tirkiye wê bibe yekemîn dewleta ku piştî vê bûyerê destê Sedam digire. Li gorî Çandar, Tirkiye di salên dawî ên şer de bi Îraqê re ne tenê têkiliyên siyasî, têkiliyên aboriyê jî bi pêş xistiye û Tirkiye di 1987'an de îxracata xwe li gorî sala berê ji sedî 71 zêde kiriye.

Dema ku balafirên şer ên Îranê di mehên Adar û Nîsana 1988'an de di ser sînorê Xabûrê re û balafirên Îraqê jî ji bo ku Îranê bombe bikin di ser sînorên Tirkiyeyê re derbas bûbûn, Colemêrg bombe kiribûn. Di dema şer de her du dewletan jî gelek caran sînor îhlal kiribûn û bombe bi ser serê Kurdên di sînorê Tirkiyeyê de barandibûn.

Weke ku berê jî hat gotin, hêzên mudahîl ne tenê ev her çar dewletên ku axa Kurdistanê li hev parve kirine. Di serî de dewletên dinyayê yên herî mezin di meseleyê de ne. Ji ber ku Kurd ber bi bidestxistina Kerkûkê ve diçin û ji ber îhtimala ku giraniya Kerkûkê ji ber alîkariya ku dide Kurdan derbasî Îranê bibe, Tirkiye û Amerîka bi tirs in. Rayedarên Tirk û DYA'yê (Dewletên Yekbûyî yên Amerîka) ji bo ku vê mijarê biaxivin, biryar dan ku

li Enqereyê civînekê pêk bînin. Di heman demê de ketina Başûrê Kurdistanê bi awayekî cidî tê nîqaşkirin.

Rojnameya Hurriyetê di 3'ê Nîsanê de, cih daye van gotinên Wekîlê Serokê Koma DYP'ê (Partiya Riya Rast) ya demê Koksal Toptan: "Tirkiye divê macereya dagirkirina herêmên petrolê Mûsil û Kerkûkê ji hişê xwe bavêje. Çir ku ne Rojava û ne jî Rojhilat vêna napejirînin. Lê divê Tirkiye ji bilî rewşa niha ya vê herêmê qet destûrê nede awayekî din, yanî dagirkirina tu dewlet û komeke cuda jî nayê qebûlkirin."

Sedam jî di hevdîtina bi Ozal re digot, çi dibe bila bibe ew ê destûrê nedin ku li Bakurê Îraqê dewleteke Kurdan bê avakirin. Di 17'ê Nîsana 1988'an de di heman rojnameyê de, wiha dinivîsand: "Madeyên ku di çêkirina çekên kîmyewî de tên bikaranîn, di serî de li Swîsre, Belçîka û Almanyaya Federal û dewletên Ewrûpayê tên hilberandin. Bi riya deryayê ev made anîne Tirkiyeyê, li Bendera Mêrsînê danîne. Ambalaja van madeyan li vir ji aliyê fîrmayên Tirk ve hatine guhertin û neqliyevanên Tirk ew birine Îraqê."

Komkujî berdewam dike. Di nûçeya 11'ê Tebaxa 1988'an a rojnameya Hurriyetê de wiha hatibû nivîsandin: "Piştî şerê ku heşt salan dom kir, niha di navbera Îran û Îraqê de pêvajoyeke agirbestê hatiye destpêkirin. Di demeke wilo de Îraq bi yekîneyên giran û helîkopteran li hemberî Kurdan 'operasyona paqijiyê' ya ku di 3'yê Tebaxê de dest pê kiribû didomîne." Di heman rojnameyê de dihat nivîsandin ku, di navbera her du aliyan de pevçûnên dijwar diqewimin, dengê topan ji gundên sînor tê bihîstin û Kurd dibêjin, li hemberî me çekên kîmyewî tên bikaranin. Li gorî nûçeyên 16'ê Tebaxa 1988'an a vê rojnameyê, di vê tarîxê de hejmara Kurdên ku derbasî Tirkiyeyê bûne zêdeyî deh hezaran e û hinek ji wan jî paşve hatibûn vegerandin. Her wiha di rojnameyê de nûçeyeke bi sernavê 'xapandina duyemîn a Îranê' (İran'dan ikinci kazık!') hatibû weşandin û digot ku, Îranê di 1975'an de jî Kurd di nîvê rê de hiştibûn. Di nûçeyê de dihat gotin ku, Îraqê herêma Şatul Erebê daye Îranê û piştî vê peymanê Îranê piştgiriya xwe ya ji bo Kurdan paşve kişandiye.

Heta dawiya meha Tebaxê êrîşa Îraqê bi dijwarî berdewam kir. Di nûçeyên rojnameyan de bombeyên ku avêtine aliyê Tirkiyeyê jî cih digirtin. Di vê demê de her çiqas Kurdên di bin bomberanê de mabûn xwe spartibûn sînorê Tirkiyeyê û di rê de ji birçîbûn û nexweşiyan jiyana xwe ji dest didan jî, Tirkiyeyê hîna jî biryareke erênî nedabû. Nûçeya ku di 29'ê Tebaxa 1988'an de li ser mijarê hatiye weşandin wiha ye: "Li Îraqê operasyonên li hemberî Kurdên cudaxwaz berdewam dike û li gundên me yên sînor bombe

bariyan. Bombeyên ku li nêzî Qilaban û Çelê hatin xwarê, bûn sedema tirsê, lê şansekî mezin e ku kes nemir. Daxwaza ketina nava axa me ya pêşmergeyên ku ji hêzên Îraqê reviyan jî hat redkirin. (Di civîna dawî a Desteya Ewlehiyê ya Milî de, biryara girtina sînor hatibû dayîn.)"

Di 30'ê Tebaxê de, Musteşarê Wezareta Karên Derve Nuzhet Kandemîr çû Bexdayê û Tehranê û ji bo destûrdayîn an jî destûrnedayîna Kurdên ku li sînor kom bûne, hin hevdîtin pêk anîn. Axir, di 31'ê Tebaxê de, di rojnameyan de gotina Ozal a 'dibe ku em sînor vekin' cih digirt. Yanî di vê demê de, piştgiriya şerpezekirina gel a ji aliyê Îraqê ve hatibû kirin. Di wê demê de mirovên ku ji mirinê filitîbûn jî êdî nîvînsan mabûn.

Dema mirov bûyerên ku weke lokal xuya dikin tîne ba hev, bi awayekî zelal tê dîtin ku ji her çar aliyan ve tunekirineke sîstematîk tê meşandin. Di 11.12.1974'an de li Wêranşarê bi saxî 22 kes hatibûn girtin û biribûn li ser sînor ew kuştibûn. Li sînorê Îranê di 1988'an de dîsa komkujiyek heye. Ev dema ku li Îraqê Herekata Enfalê tê meşandin, li sînorê Îranê jî rewşa awarte heye. Penaberên ku ji Îranê tên, di dawiya meha Temûza 1988'an de ji aliyê peywirdarên Tirkiyeyê ve tên girtin û teslîmî rayedarên Îranê tên kirin. Wan dibin sînor û guleyan li wan direşînin. Ev yek di heman demê de xelata Îranê ya ji bo Îraqê ye. Ji ber ku Îran di 27'ê Temûzê de bi Îraqê re li hev hatibû. Gunay Aslan, di xebata xwe ya bi navê '33 Gule' (33 Kurşun) de, vê bûyerê di bin sernava 'Tirkiyeyê firot, Îranê gule li wan reşand' dinivîsîne û wiha vedibêje:

"Renaulta Station a spî, li ber Otela Çaldiranê ya Wanê sekinî. Ji wesayîta 65 AU 661'ê sê polêsên sivîl peya bûn, çûn lobiya otelê. Li lobiyê penaberên Îranî li benda wan sekinîbûn. Yek ji polêsan ji dosyaya di destê xwe de, ji 34 penaberên li otelê navê 16 penaberan xwend. Aslan, Murat û Sîbel ji wê derê çûn otelên xwe. Ji 58 penaberên Îranî re mizgînî anîbûn. Rojeke din yanî di 29'ê Temûzê de, di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de wê ew bibirina wargehên penaberan ên li Kayserî, Çorum, Eskîşehîr û Kutahyayê.

Kesên ku navên wan hatin xwendin firaxên xwe dan hev û ji yên mayî xatir xwestin. Tam di wê saeta ku hatibû gotin de çûn ber Midûriyeta Ewlehiyê û li wesayîtên ku wê wan bibin siwar bûn. Piştre wesayîtan berê xwe dan rojhilat, berê xwe dan Îranê. Li herêma Çemê Koturê penaber teslîmî Fermandariya Pastaran kirin. Her tişt fermî û li gorî pîvanan bû. Zabitnameya 'teslim û teselum'ê ji aliyê peywirdarên Qaymeqamiya Qerqelî (Ozalp), Fermandariya Cendirmeyan a Hidût a 120/2 û Midûriyeta Ewlehiyê ya Wanê ve hatibû îmzekirin.

Berdewama bûyerê Fehriyan Afşarî wiha vedibêje: 'Dema min bihîst 58 kes ku du kurên min jî bi wan re bûn ber bi Îranê ve birin, min wesayîtek kirê kir û ez bi dû wan ketim. Dema ez gihîştim Qerqeliyê rayedaran got ku, wan ew birine sînor. Min heta herêma qedexekirî ew şopandin, lê ez negihîştim wan. Ez çûm ser girekî û sekinîm. Hêj çend saet derbas nebûbûn, dengê guleyan hat min.'

Muhafizên Şoreşê yên Îranê, di cih de li ber rayedarên Tirk ên ku penaber teslîmî wan kirin, penaber dabûn ber guleyan."[304]

Di vê demê de agir li Kurdistanê gur bûye. Zordarî çiqas zêde dibe, nerazîbûna gel jî her bi her zêdetir dibe. Di destpêka salên 1990'î de tevgerên berxwedana Kurdan bihêztir bûne. Nerazîbûna gel çiqas zêde dibe, zordarî û hevkariya dewletan jî zêdetir dibe. Li bajarên Kurdan ên Tirkiyeyê serhildan çêdibin û mirov di bin panzeran de tên perçiqandin. Di vê demê de, di dawiya sibata 1991'ê de piştî êrîşa Sedam a Kuveytê, Amerîkayê mudaxaleyî Îraqê kir û zoriya wê bir. Di destpêka meha Adarê de Kurdên li Îraqê dîsa dest bi serhildanê kirin û di demeke kin de herêmên Kurdan bi dest xistin. Sedam di dawiya meha Adarê de careke din bi hemû hêza xwe êrîş bir ser Kurdan. Îcar hejmara Kurdên ku ber bi sînor ve koçber bûn ji milyonan zêdetir bûn. Di heman demê de Tirkiyeyê jî li hemberî Başûrê Kurdistanê dest bi operasyoneke dersînor kiribû.

Di dema ku bi sed hezaran Kurdên Başûrî li sînorên Tirkiyeyê berhev dibin, Hêzên Çekdar ên Tirk jî bi navê li hemberî wargehên PKK'ê dest bi operasyonê dikin û Kurdên Başûrî vê carê dibin hedefa bombebarana balafirên Tirk. Di dokumanên Komeleya Mafên Mirovan Şaxa Stenbolê de, li ser operasyonên dersînor ev agahî cih digirin:

"Ji sala 1984'an û vir de ji aliyê Tirkiyeyê ve di bin navê 'têkoşîna li hemberî PKK'ê' de operasyonên dersînor pêk tên. Tirkiye di van operasyonan de hin caran bi awayekî nepenî û hin caran jî bi awayekî hişkere di serî de Îraq, dikeve nav axa welatên cîran. Herêmên ku gelên sivîl lê dijîn ji aliyê balafirên Tirkiyeyê ve bêyî ku armanc diyar be, bi eletexmînî tê bombebarankirin, tê wêrankirin. Di van êrîşan de gelek sivîl mirine, bi sedan birîndar bûne û nîvînsan mane. Van êrîşan di sala 1991'ê de jî berdewam kirine.

...

Di 5'ê Tebaxê de, di êrîşa ku ji aliyê Hêzên Çekdar ên Tirkiyeyê ve dihate kirin, gelê sivîl zirareke mezin didît. Nûçegihanê rojnameya Yenî Ulkeyê, li Bamerniyê bi rêberekî pêşmergeyan re hevdîtinek pêk anîbû. Wî rêberî diyar

[304] Günay Aslan, Yas Tutan Tarih-33 Kurşun, r. 79-80

dikir ku, armanca êrîşê ne tenê PKK ye û wiha digot: 'Êrîş li hemberî hemû gelê Kurd e. Em ê li ser vê mijarê bi hikûmeta Tirk re hevdîtinê pêk bînin. Li Kanîmasiyê ji gel û ji pêşmergeyan bi dehan birîndar hene. Ger ev êrîş neyê rawestandin, em ê jî neçar bimînin ku xwe biparêzin.'

Balafirên şer ên Tirk, nêzî 150 carî xwe bi jêr de berdane û êrîş kirine, di êrîşê de napalm, mîsket û bombeyên kazan jî bi kar anîne. Balafir bi qasî 40 km'yî ketibûn hundir û di hedefa wan de cih û warên ku gelê sivîl lê dijiya hebû. Di encama bombeyên ku avêtibûn herêmên Xakurkê û Dolanê de gundên Xorezokê, Bersiyan û Kev tar û mar bûbûn. Li gorî vekolînên rojnamevanên ku li herêmê digeriyan, bi taybetî li cihê ku bombeyên napalmê hatibûn bikaranîn erdên çandî bi temamî şewitîbûn.

...

Hejmara mirî û birîndaran ji aliyê me ve tam nehatiye tespîtkirin lê li gorî bijîşkên ku di konên tenduristiyê yên 'Neteweyên Yekbûyî' de peywirdar in, di dema êrîşê de bi sedan birîndar anîne konên tenduristiyê. (Rojnameya Yeni Ülke, hijmar:18, 24 Tebax 1991)

...

...Li gorî daxuyaniya peywirdarên NY'ê ku dabûn rojnameya Financal Times, balafirên şer ên Tirk cihên sivîl jî bombe kiribûn, di dema bombebarana li gundê Khera Zonk a li herêma Diyanayê de 12 kes mirine û 15 kes jî birîndar bûne.

...

Yekîneyên girêdayî Hêzên Asîmanî yê Tirkiyeyê, di 11.10.1991'ê de li Bakurê Îraqê dest bi operasyoneke nû kirin. Di operasyonê de, balafirên şer ên F-104, F-14, 4 helîkopterên apaçî, tîmên taybet, cerdevan, piyade, cendirme û komandoyên çiyê jî cih digirtin. Hejmara tevahiya wan ji hêzeke 5 hezar kesî pêk dihat... Dihat tespîtkirin ku di operasyonê de bombeyên kîmyewî yên napalm û fosforê jî hatibûn bikaranîn. Balafirên Tirk li ser gundên Banik, Şîlan, Siyar û Begovan ku li başûrê rojhilatê Zaxoyê ne bombe dibarandin. Ev gund 30-35 km dûrî sînorê Tirkiyeyê bûn. Di encama bombebaranê de ev gundên navborî bi temamî tên wêrankirin, 9 gundî û 3 pêşmerge jiyana xwe ji dest didin. Di encamê de nêzî 55 gundî jî hatibûn birîndarkirin. Di encama bombebarana bombeyên napalmê de eraziyên çandî, baxçe û hin xanî bi temamî şewitîbûn. Gundiyekî ji gundê Begovan ê bi navê Salih Mûsa ku ji bo nûçegihanê rojnameya Yeni Ulkeyê axivîbû, wiha digot: 'Ji ber ku mala min ji aliyê leşkerên Sedam ve hatibû şewitandin, ez bi malbata xwe re, li zeviyê di nava konan de dijiyam. Dema ku balafirên Tirk

hatin, me taştê dixwar. Dema ku me dît bombeyan diavêjin, em ji hundirê konan reviyan û me berê xwe da aliyê çiyê. Dema bombebaran xelas bû, tiştek di kon de nemabû. Jixwe di destê me de tu tişt tune bû. Em niha nizanin em ê çi bikin.'

...

Rojnamevan Ragip Duran ku di dema êrîşê de li Zaxoyê bû, di 20-26'ê 1991'ê de, di Rojnameya Yeni Ulkeyê de çavdêriyên xwe nivîsandibûn. Duran, wiha digot:

'Ji bo vekolîna bûyerên li Silêmaniyê, em li Zaxoyê di biryargeha Eniya Kurdistanê de bûn. Pêşmergeyekî purtelaş, extiyar ket hundir. Navê hin gundan got û ji devê wî peyvên teyare, bombe, jet derketin.

Roja înê, li dora nîvroyê bû. Em bi texrîbatên operasyona dersînor ên jetên Tirkan ên li herêma Zaxoyê hisiyabûn: Êrîşî pênc cih û warên ku sivîl lê dijîn kiribûn û zêdeyî 30 kesî birîndar bûbûn. PDK'iyan got ku, li Begovanê jî 3 pêşmerge mirine. Banik nêzî Zaxoyê bû. Em ber bi Banikê ve bi rê ketin. Dîmen qet ne xweş bû. Hîn jî ax dişewitî. 6 kesên ku di zeviyên bacanan de dixebitîn bi giranî birîndar bûne û ew di cih de rakirine nexweşxaneyê. Banik ne li çiyê ye, li deştê ye, li kêleka riya asfaltkirî ye. Ji 30 malan pêk dihat. Dev ji pîlotê êrîşkar ê şer berde, zarokek jî binêre wê fêm bike ku ev der ne wargeha gerîla ye.

Dîmenên li Nexweşxaneya Zaxoyê bêhtir dil dişewitandin. Me 9 birîndarên ku mil, pişt û rûyên wan şewitîbûn dîtin. Me wêne û dîmenên wan kişand. Bijîşk Buşra Kriakos, got ku şewata wan a dereceya 2'yemîn û 3'yemîn e, muhtemel e ji ber napalmê wisa bûne..."[305]

Operasyonên dersînor yek bi dû yekê de tên. Balafirên Hêzên Çekdar ên Tirkiyeyê di 25'ê Cotmeha 1991'ê de ketin nav axa Îraqê û operasyoneke din a dersînor pêk anîn. Cara ewil bû ku hêzên herêmî yên Kurd jî di vê operasyonê de piştgiriya Tirkiyeyê dikirin. Her wiha li Hewlêr, Selahedîn, Duhok û Zaxoyê hêzên ewlekariyê yên Tirk ji bo îstîxbaratê hatin bicihkirin. Hejmareke zêde ya leşkerên Tirk bi mehan di navbera çarçika Amêdiye, Duhok, Zaxo û Heftanînê de man li ser wezîfeyê. Di dawiya payîza 1991'ê de di dema ku Tirkiyeyê ev operasyon pêk dianî, gelek caran êrîşên Sedam jî yên li ser Kurdan berdewam dikirin.

[305] Komeleya Mafên Mirovan a Stenbolê, Raporên Mafên Mirovan ên 1991-1992



*Sevkiyata leşkerî, Stesyona Trênê ya Nisêbînê,1991*[306]

Ligel hemû awayî bi alîkariya Neteweyên Yekbûyî û Amerîkayê, Kurdan di 4'ê Cotmeha 1992'yan de li Başûr 'Dewleta Federe ya Kurdistanê' îlan kirin.

Di meha ku 'Dewleta Federe ya Kurdistanê' ava bû, Tirkiye bi qewetir operasyonên xwe yên ji sînor û wir de dewam dike. Di operasyona Tirkiyeyê ya Cotmeha 1992'yan de ya ku li Bakurê Îraqê pêk anî, PKK'ê gelek windahî dan. Di pirtûka Soner Yalçin a navborî de tê gotin ku di vê operasyonê de nêzî 1500-2000 milîtan hatine kuştin û bi qasî 4000'î jî winda bûne. Cem Ersever di berdewama van vegotinên xwe de wiha dibêje: "Li hin herêmên wargehên PKK'ê heta ku we destmala şilkirî neda ber devê xwe, hûn ji ber bêhnê nikaribûn biketinayê. Ew qas cesed hebûn."

Di 1995'an de armanca Tirkiyeyê ew bû ku li Herêma Federal a Kurdistanê herêmeke tampon ava bike. Di meha Temûzê de operasyoneke mezin pêk anî. Di vê operasyonê de jî darbeyeke mezin li PKK'ê xist; hat hişkerekirin ku 500 PKK'yî hatine kuştin. Di van tarîxan de di heman demê de di navbera PKK û PDK'a ku mecbûr bû bi Tirkiyeyê re tev bigere pevçûnên çekdarî diqewimîn.

Kerîm Yildiz, di berhema xwe ya bi navê 'Kurdên Îraqê' (Irak Kürtleri') de, encama operasyona dersînor a ku di 1995'an de bi tevlîbûna 35 000 leşkeran pêk hat, wiha dinirxîne: "Dewleta Tirk, bi hinceta PKK'ê, li Kurdistanê bi cih bûbû û dixwest sekna xwe ya li wir mayînde bike. Di rastiyê de ev tehdîdeke li hemberî Kurdistanê bû. Di êrîşên Tirkiyeyê de sivîl zêde nemirin. UNHCR bi hezaran Kurd ji herêmên pevçûnan derxistin. Komên mafên mirovan, xerakirina nêzî 70 gundan, îşkence û kuştinên hêzên dagir-

[306] Fot:Osman Yıldız

ker bi belgeyan tespît kirin. Gelek binpêkirinên mafên mirovan û binpêkirina hiqûqê ya dagirkeran tespît kirin. Projeya Mafên Mirovan a Kurd, doza 7 şivanên Kurd ku di operasyona dersînor a 1995'an de hatibûn kuştin, bir Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê û li wir doz vekir."[307]

Tirkiyeyê her ku diçû hejmara leşkerên ku tevli operasyonan dibûn, zêde dikir. Di 14'ê Adara 1997'an de bi tevlibûna nêzî 50 hezar leşkerî careke din ket Herêma Federal a Kurdistanê. Kerîm Yildiz destnîşan dike ku di vê demê de, artêşa Tirk li Herêma Federal a Kurdistanê ji 15 kîlometreyan 'herêma ewlehiyê' ava kiriye û di vê herêmê de 5 hezar leşker bi cih kiriye. Di heman mehê de operasyoneke bi navê Balyoz hat lidarxistin. Di vê operasyonê de 35 hezar leşkerî cih digirt û hêzên asîmanî jî tevli vê operasyonê bûbûn. Leşkerên Tirk heta havîn xelas bû li Bakurê Îraqê man. Dema ku di Cotmehê de vegeriyan, hezar leşker li ser sînor hatin bicihkirin.

Me ji operasyonên dersînor tenê çend mînak dan û ev jî me ne berfireh da ber xwe. Bêguman di kitekitên her operasyonê de gelek rewşên girîng ên veşartî jî hene. Lê li vir me tenê operasyonên dersînor ên li Kurdistanê bi nêrîneke giştî dan. Her wiha me behsa tevliheviya li ser Kurdan û zêdebûna hêzên dijberî Kurdan kir.

Îro dîsa pirsgirêka Kurdan ne tenê pirsgirêkeke herêmî ye, ev pirsgirêk hemû dinyayê eleqedar dike. Ji ber ku pêvajoyeke nuh li erdnîgariya Kurdistanê dest pê kiriye û bi vê re dibe ku li herêmê gelek tişt bên guhertin. Gelo dema di rewşa Kurdan de guherînek çêbibe, wê ev yek tesîrê li ser kîjan hêzan bike? Heger Kurd bigihîjin statûyekê, bi awayekî zelal mirov kare bibîne ku wê dengeyên li herêmê û hemû dengeyên hêzên li Rojhilatanavîn bên guhertin. Helbet tesîra vê yekê pêşiyê wê li ser Îran, Îraq, Sûriye û Tirkiyeyê hebe. Lê bûyer tenê bi guhertina sînorên her çar dewlatan bi sînor namîne. Dema ku Îraq tê gotin, dewletên din ên Ereban jî dikevin nav meseleyê û ev yek bandora xwe li ser 22 welatên Ereban dike. Ev yek Îsraîlê jî pir eleqedar dike. Ewrûpa jî ji destpêka sedsalê û vir de li herêmê ye. Amerîka niha serî dikişîne. Dewletên Ereb pir dewlemend in û bi hemû dinyayê re di nav têkiliyên girîng de ne. Ev yek wê tesîrê li ser hemû derdorên ku bi van dewletan re di nav têkiliyê de ne bike. Yanî mirov bi kurtasî dikare bibêje ku, dilê hemû dinyayê li vir diavêje. Ji ber vê yekê taqeta tu hêzê tune ye ku bi tena serê xwe herêmê bixe bin destê xwe.

Sînor ne pîroz in, hatine guhertin, tên guhertin û wê bên guhertin. Di 1880'yî de li ser rûyê dinyayê 25 dewlet hebûn, îro nêzikî 300 dewletî hene.

[307] Kerim Yıldız, bnb., r. 144

Tevahiya dewletên ku di demeke nêzik de ava bûne, yan ji bin statûya mêtingerî, dagirkerî, mandayê rizgar bûne û yan jî ji federasyonê veqetiyane û bûne dewlet. Îro li Afrîkayê nêzî 50 dewletên serbixwe hene û ev dewlet bi sînorên ku ji aliyê hêzên Rojavayî ve hatine xêzkirin serbixwe bûne. Di dawiya Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, dema ku di çarçoveya Cemiyeta Miletan de mêtîngerî ava dibûn, di nav şertan de ev hebû; dewletên emperyalîst û mêtînger piştî ku hêza aborî, siyasî û îdarî ya cihê ku mêtine bi hêz bikin, divê ji wir veqetiyana û wir serbixwe bibûya. Ji ber vê yekê gelek dewletên li Afrîkayê ne bi têkoşîna çekdarî, bi hevdîtinên makeqanûnî serxwebûna xwe bi dest xistine. Dewletên Ereban jî piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi hevdîtinên makeqanûnî serxwebûna xwe bi dest xistin. Lê belê dema îro navê Kurdan û welatê wan di axaftinekê de jî derbas bibe qiyamet tê rakirin û ji bo Kurdan hîn jî ronahiyek xuya nake.

Ev dused sal in ku hêzên Rojavayî ji bo vê erdnîgariyê senaryoyan çedikin û van senaryoyan pêk tînin. Heger hêza yekê ji wan têrê bikira wê bi awayekî rasterast piştgirî bida Kurdan û ji bo Kurdistana Yekbûyî wê têkiliyên pir bi hêz bi pêş bixistina. Lê weke destpêka sedsalê niha jî hêza yek ji wana têrî vê yekê nake.

Ji ber van sedeman hemûyan, tu kes li Kurdistanê guhertina sînoran naxwaze û ji bo parastina vê statûya heyî her kes çi ji wan tê dikin. Tiştê ku tê serê Kurdan ne xema tu kesî ye. Yên ku peyva mafên mirovan ji devê xwe nedixistin, digel hemû zilm û zordariya Sedam, piştgirî nedan Kurdan. Sedam piştî ku êrîşî Kuveytê kir, êdî hêzên derve bi awayekî neyînî li Sedam nêrîn. Yan na nerazîbûnên li hemberî pêkanînên li ser Kurdan di asteke pir biçûk de mabûn û heta piraniya van dewletan bi awayekî hişkere yan jî veşartî alîkariya Sedam dikirin.

Amerîkî, Ingilîz, Frensî û bi kurtasî Rojavayî difikirin ku di nava sînorên heyî de çareseriyekê peyde bikin. Tevahiya wan jî naxwazin ku sînor bên guhertin. Tenê behsa hin mafên biçûk ên çandî tê kirin. Piştî hovîtiya komkujiya Helepçeyê li hin bajarên Ewrûpayê çend civîn pêk hatin lê ji wan civînan jî biryarên pir girîng derneketin. Weqfa Azadiyan a Frensayê ku di bin serokatiya jina Serokomarê Frensayê yê berê Daniella Mitterand de ye û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê bi hev re li Parîsê konferansek li ser Kurdan li dar xistin. Konferansa Navneteweyî ya Kurd a Parîsê di 14 û 15'ê Cotmeha 1989'an de pêk hatibû. Ji Frensayê wezîrek û jina serokomar, ji Brîtanyayê Serokê Komîsyona Mafên Mirovan a Parlamentoyê û ji Amerîkayê Serokê Komîsyona Têkiliyên Derve yê Senatoyê û endamekî senatoyê beşdarî kon-

feransê bûbûn.[308] Yanî asta temsîliyetê pir bilind bû. Her çiqas hewldaneke bi niyeteke baş û hêjayî teqdîrê jî bû, biryarên pêkirinên girîng jê derneketin. Di civînê de hat daxuyandin ku wê di Temûza 1990'î de li Swêdê konferansa duyemîn bê lidarxistin. Konferansa Kurd a Stockholmê di navbera 15 û 17'ê Adara 1991'ê de pêk hat. Lê bi awayekî giştî ji bo Kurdan pêşveçûneke girîng bi xwe re neanî.

Di sala 1999'an de girtina rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a bi hevkariyeke navneteweyî, mezinbûna hêza dijberî Kurda ya li dinyayê bi awayekî gelekî hişkere raxist ber çavan. Ocalan beriya ku bê girtin çûbû hin dewletan. Her çiqas Ocalan li van dewletan bi rayedarên payebilind re hevdîtin pêk anîbûn û li hev kiribûn jî, penaberiya Ocalan nehat qebûlkirin. Serokwezîrên ku hişkere ji dinyayê re gotin ku bi erênî nêzî mijarê dibin jî, neçar man paşve gavê bavêjin. Mecbûr man ku Ocalan ji welatê xwe derxin. Tê zanîn ku di girtina Ocalan de rola Amerîkayê mezin e. Di operasyonên li hemberî PKK'ê de jî her cure alîkariyê bi Tirkiyeyê re dike. Piranî bi Brîtanyayê re jî tim di nav hevkariyê de ne. Li hemberî van her du hêzan kesek nikare dengê xwe bike.

Tê gotin ku Amerîkayê ji ber hebûna xwe ya li Başûrê Kurdistanê, Ocalan wek torpîl teslîmî Tirkiyeyê kiriye. Weke ku her kes jî dizane, bi piştgiriya Amerîkayê 'Herêma Federal a Kurd' hate avakirin. Her çiqas Amerîka û Kurdên Başûr dibêjin, em guhartina sînoran nafikirin jî destkeftiyên Kurdan ên li Bakurê Îraqê dewletên li derdorê aciz dike. Li hemberî pêşveçûnên li Bakurê Îraqê, Tirkiye, Sûriye û Îranê li dijî Kurdan dest bi hevkariyên mezintir kirin. Amerîka niha hêza super a dinyayê ye. Quweta wê bixwe jî nagihîjê ku alîkariya rizgarkirina tenê parçeyekî Kurdistanê bike. Her çiqas Amerîkayê ji bo berjewendiyên xwe ji bo avakirina wê derê piştgirî dabe jî, di hêla parastina vê statûyê de pir dikeve zorê. Lewre li vê derê hesabên pir mezin hene. Yanî hikûmkirina li vir, hikûmkirina li dinyayê ye. Li vê herêmê menfaetên ew qas mezin hene ku bidestxistina qismek ji van menfaetan jî gelek caran bi xwe re destkeftiyên mezin tîne. Ji ber vê yekê, her kes hewl dide ku bi serê parçeyekî bigire û nahêlin ku ev yek bikeve destê dewletekê bi tenê.

Di destpêka sedsala 21'emîn de Îran û Tirkiyeyê operasyonên dersînor pir zêde kirin. Em mînakekê ji serî bidin. Bulent Çelîk, li ser bûyera di sala 2000'î de ya Kendekolê ku di encama operasyona dersînor de pêk hatibû, pirtûk nivîsandiye. Çelîk di pirtûkê de cih daye vegotinên kesên ku bûyer jiyane, dîtine û wêneyên ku kişandina jî wek belge di pirtûkê de bi cih kirine.

[308] Rafet Ballı, bnb., r, 366

Çelîk di destpêka pirtûka xwe ya bi navê 'Kendekol Katliamı'(Qetlîama Kendekolê) de, wiha dibêje:

"Di 15'ê Tebaxa 2000'î saet li derdora 16.05'an, di encama bombebarana balafirên Tirk a herêma Kendekola Başûrê Kurdistanê de zarok, jin û extiyar jî tê de ji 30'î zêdetir mirov mirin û bi dehan kes jî birîndar bûn... Balafirên ku ji aliyê din ên sînor hatin, li herêma ku çend saetan bombe kirin de qirkirineke mezin kiribûn û paşve vegeriyabûn. Dîmenên li Kendekola ku hatibû xirakirin û şewitandin yên me bi çavên xwe dîtin, dilê mirovan diêşandin; ji ber bombeyên kazanê hovîtiyeke mezin kiribûn. Mirin çêbûbûn, li derdorê parçeyên cesedên mirovan hebûn, rewşa mirovên ku her tiştên wan hatibûn xerakirin û şewitandin..."[309]

Bulent Çelîk ji şahidên bûyerê guhdar kiribû; ev êrîşa 5'an bû. Berê jî di salên 1992, 1995, 1997 û 1999'an de, balafirên Tirk bombe bi ser heman herêmê de barandibûn. Di van bombebaranan de bi dehan sivîl hatibûn kuştin. Alikarê serokwezîr ê wê demê Mesut Yılmaz, diyar kiribû ku ew herêm bi xeletî hatiye bombebarankirin.

Bi çalakiyên Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê(PJAK) ku di sala 2003'yan de li Îranê dest pê kiribûn, bi xwe re li Îranê pêvajoyeke nû anî. Piştî vê tarîxê Îranê di nav sînorên xwe de û li derveyî sînor operasyonên xwe zêde kirin. A rast bi pêşveçûnên li Başûrê Kurdistanê li herêma ku sînorên her sê welatan digihîjin hev, tevgereke mezin dest pê kir. Armanca herî mezin a operasyonên ku li hemberî Bakurê Îraqê dihatin lidarxistin, astengkirina statûya Kurdistana Federal bû.

Tirkiye û Îranê di salên 2006 û 2007'an de li ser hev operasyonên dersînor pêk anîn û her du dewletan bi hev re ev operasyon li dar dixistin. Muhamed Akîf Cemal, di 28.08.2006'an de, di rojnameya Radîkalê de ev tişt nivîsandibûn: "Tirkiye û Îranê, di van çend hefteyan de li Bakurê Îraqê li sînorê xwe yê hevpar hejmara leşkerên xwe zêde kirin. Nûçe didin nîşandan ku van her du welatan bi awayekî hevpar bi hezaran leşker, bi sedan tanq û top li ser sînorê hevpar ê herêma Kurdan danîne. Li wir çeper kolane. Weke ku tê dîtin li hemberî wargehên PKK'ê yên li Kurdistana Îraqê, her du welatan kordînasyoneke hevpar ava kirine. Hêzên Tirk ji meha Adara borî û vir de, li hemberî Kurdistana Îraqê 53 operasyonên leşkerî pêk anîn. Hêzên Îranê jî di heman demê de heşt operasyon li dar xistin. Balkêş bû ku yek ji van operasyonan hevpar bû. Îranê di rojên dawî de bi topan li hemberî herêmên sînor ên Kurdistana Îraqê êrîş pêk anîn. Di van êrîşên ku çend rojan dom kirin bi dehan kes mirin, hin şêniyên gund malên xwe terk kirin."

[309] Bülent Çelik, Kendekol Katliamı, r. 5

Weke ku berê jî me îfade kir, em ê nikaribin li ser hemû operasyonên dersînor bisekinin. Niha em ê behsa çend operasyonên ku di salên 2007 û 2008'an de pêk hatin bikin û dawiyê li vê mijarê bînin. Bi çend mînakan be jî ez hêvî dikim me hebekî rewş raxistibe ber çavan.

Li gorî nûçeyên Adara 2007'an ên televîzyonên Tirkiyeyê, bi sed hezaran leşker li sînorê Başûr bi cih dibûn. Weke her carê, em kesên ku li herêmê sînor dijîn bûn şahidê van sewqiyatan. Herêm dîsa kete nav tirsan. Di nîvê Nîsanê de konvoyên leşkerî yên li sînorê Îraqê, nîqaşên li ser Kerkûkê û gotinên wekî 'wê mudaxaleyî Başûr bikin' derdor kir cehenem. Digel ku li sînor tevgereke zêde hebû jî kesî nizanibû wê çi bibe, çi biqewime. Ji ber ku nûçeyên derdikevin dibe ku ne rast bin, armanceke wan a cuda hebe û gelek tişt veşartî dimînin, gel nizane çi dibe çi diqewime. Li aliyekî jî digel hemû zordarî û bêderfetiyan çapameniya alternatîf hewl dida ku hin agahiyan bide gel.

Di nivîsa 20'ê Tebaxa 2007'an de ya bi navê 'Sınırda Kürt Köyleri Bombalandı' (Gundê Kurdan yên di Sînor de Hatin Bombekirin) Mehmet Nurî Ekîncî wiha dinivîsand: "Derket holê ku di operasyona hevbeş a Tirkiye û Îranê de ku li hemberî gerîlayên HPG'ê û PJAK'ê li dar xistin, Kurdên li sînor jî bûne hedef. Gundiyên ku bi topebaranê re rû bi rû mane ji mirinê filitîne û bi zorê xwe xelas kirine. 200 malbat mecbûr mane ku terka gundên xwe bikin.

Îran ku bi Tirkiyeyê re operasyonên leşkerî yên hevbeş li dar dixe, gelê sivîl ku li herêmên sînor dijîn topbaran kir. Ev sê roj in Îran bê navber herêmên li sînor bi topên hawan û katyûşayan topbaran dike. Topbaranê ziyaneke mezin da gel. Bax û baxçeyên gel ên ku diçin zozanan hatin şewitandin û sewalên wan mirar bûn. 200 malbatên ku ji topavêjan canê xwe bi zorê xelas kirin, gundên xwe terk kirin. Di van çend mehên dawî de, dewleta Îranê li gelek kesên ku li herêmên sînor debara xwe bi sewalkarî û qaçaxçîtiyê dikin, xist. Ji bo çavê wan bitirsînin hin kes jî belasebeb girtin. Ji 14'ê Tebaxê ve li Herêmên Parastina Medyayê êrîş pêk tên. Ev êrîş berdewama wan êrîşên din in. Di van êrîşan de gelê li vir zirareke mezin dît. Di topbaran û avêtina katyûşayan de xaniyê gundiyên başûrî şewitîn, bax û baxçeyên wan zerar dîtin."[310]

Di berdewama nûçeyê de dihat gotin ku Îranê jî li Kendekolê xistiye: "Gelê li herêma Kendekolê ye bi zorê canê xwe ji topbarana Îranê xelas kir. Tirkiyeyê jî di 15'ê Tebaxa 2000'î de bi balafirên şer li Kendekolê xistibû. Di dema ku her du bira Kerîmxan û Mecîd li Kendekolê sewalên xwe

[310] 20'ê Tebaxa 2007'a, www.dengemed.net

diçêrandin, top li xaniyên wan ket. Di encamê de xaniyê wan şewitîn. Her du birayan bi gotinên 'tiştê ku Îran tîne serê me cihû naynin serê filistîniyan' li hemberî topbaranê nerazîbûn nîşan dan. Gelê ku li sînor dijî piştî êrîşan ket nava endîşeyeke mezin û herêmên li nêzî sînor terk kir, berê xwe da herêmên dûrî sînor."

Di 5'ê Rezbera 2007'an de, di nûçeya rojnamevan nivîskar Îbrahîm Karagul de ev agahî hebûn: "Ev çend hefte ne ku artêşa Îranê li ser hev Bakurê Îraqê topbaran dike. Li mewziyên baskê PKK'ê PJAK'ê dixe. Pevçûn diqewimin û gundên li sînor tên valakirin. Li gorî çavkaniyên Bakurê Îraqê û Bexdayê, Tirkiye jî di eynî demê de bi Îranê re hin herêmên Bakurê Îraqê topbaran dike. Angaştên li hemberî Tirkiyeyê ew qas mezin bûn ku rêveberiya Bakurê Îraqê îdia kir ku Tirkiyeyê çekên kîmyewî bi kar anîne."[311]

Di 17'ê Cotmehê de jî Parlamentoya Tirkiyeyê TBMM'ê tezkereya destûrdayîna operasyonên dersînor qebûl kir. Tezkere heta salekê derbasdar e. Serokwezîr diyar dikir ku ji 28'ê Sermaweza 2007'an û pê de Hêzên Çekdar ên Tirk ji bo operasyona dersînor hatine peywirdarkirin. Piştre Hêzên Çekdar ên Tirkiyeyê di 16'ê Berfanbara 2007'an de, saet di 01.00'ê de bi 50 balafiran dest bi operasyona dersînor kir. Operasyonê 4 saetan dom kir. Di heman demê de Îran jî tevli operasyonê bû û diyar kiribû ku wan li PJAK'ê xistiye. Bi hev re li Herêma Xweser a Kurdistanê xistibûn. Di 16'ê Berfanbara 2007'an de di rojnameya Hurriyetê de nûçeyeke bi sernavê 'Türkiye-İran PKK Anlaşması!'(Lihevkirina li Ser PKK'ê ya Tirkiye û Îranê) belav bû. Di nûçeyê de wiha digot: "Biryarên ku Komîsyona Bilind a Hidûd a Tirkiye û Îranê dan, di rojnameya resmî de hatin weşandin û ketin meriyetê. Balkêş e ku peyman û operasyona Tirkiyeyê ya li hemberî Bakurê Îraqê di heman rojê de ketin meriyetê."

Her wiha çapameniya Tirkiyeyê diyar dikir ku li wargehên PKK'ê yên li Çiyayê Qendîlê xistine û zaiyateke mezin dane wan. Kurdistan TV'ê jî digot ku gundan zirar dîtiye, jinek miriye, gelek birîndar hene û gelek sewal jî mirar bûne. Di 21'ê Sibata 2008'an de jî bi piştgiriya hêzên asîmanî, operasyona bejayî dest pê kir. Operasyona ku di şert û mercên zivistanê de zor dihat meşandin, 9 rojan berdewam kir. Artêşa Tirk di vê operasyonê de windahiyên girîng dan û mecbûr ma ku paşve vekişe. Ji ber ku operasyon di demeke kurt de qediya, ev yek ji aliyê siyasiyan ve bû sedema nîqaşên mezin...

[311] www.gazeten.com

## MAYIN Û QAÇAX

Ji roja rojîn de, Kurdistan ji Ewrûpa heta bi Çînê, ji Çolistana Erebistanê heta bi Kafkasyayê bûye navend û çaryana ticaretê. Heta dema ku sînor bi darê zorê hatin danîn, hatin têlkirin û mayinkirin, ji çûn û hatinê re li her devera Kurdistanê xanên ku karwan li wan dibûn mêvan hebûn. Karwanan barê xwe li Kurdistanê bar dikirin û li çarhawêrê dinyayê belav dibûn.

Berî destpêka sedsala 20'an, yanî berî sînor bên danîn ji bo Kurdên Bakur, Mûsil, Heleb, Şam, Qahîre ne dûr bûn, ev bajar bajarên ku mirov kengî bixwesta karibû here wan. Çûn û hatina van bajaran hêsan bû û têkiliya bi wan re xurt bû. Heta, ev bajar bûne mijara gelek stran û çîrokên Kurdan jî.

B. Nikitin di vê derbarê de wiha nivîsiye: “Bi rastî jî Kurdistan bi sewal û dewarên xwe navendeke ji bo xwedîkirina Bexda, Stenbol û Sûriyeyê bû. Di heman wextê de hirî, berhemên ku ji hiriyê pêk tên, hungiv, mazî û hinek madeyên boyaxê ji Kurdistanê diçûn van deveran... Kurdan jî çek û cebilxane, caw û pertalên hevrêşim û pembûyî, şekir û gelek xwirek ji derve dikirîn. Bi vî awayî hatina firotinê ji lêçûna kirînê zêdetir bû, lewre pereyekî baş ji Kurdên niştecih û koçer re dima.

Stenboliyan her sal 1.5 milyon bizin û mî bi saxî ji Kurdistanê dikirîn.(...) Di nav fêkî û sebzeyên dihatin firotin de li derdora buhayê 35 hezar Sterlînî darê mazî hebûn. Ji fêkiyê dara benavê dohnekî ku di çêkirina sabûnê de dihat bikaranîn dihat derxistin. Boyaxa ji qurman jî di nav tiştên ku Kurdistaniyan îxrac dikirin de bû.(...) Bi vî awayî di salên nêzikî nîveka sed-

sala 19'an de dihat hesibandin ku, Kurdistana di bin serweriya Osmaniyan de, salê buhayê 700 hezar Sterlînî mal difirot."[312]

Lê di destpêka sedsala 20'an de, bi danîna sînoran, ev dan û stendin hatin birîn. Sînorên ku civak bi gelek awayan parçe kirin, bazar jî qut kirin û têkiliyên aborî fetisandin. Ji bo Kurdên li Tirkiyeyê êdî çûyîna Edîrneya li wî seriyê din hêsan bû, lê Heleba li kêleka wan bûbû taliya dinyayê, çûyîna wê ew qasî zehmet bû. Piştî demekê bi çandina mayinan û ristina têlên bi dirî re, yekcar her der bû xefik. Digel van astengiyan jî gelên her du rexan terka rêz û rêçikên xwe nekirin, digel mirinê, kuştinê çûn û hatina xwe berdewam kirin. Lêxistina sînoran her çend bûbû riya mirinê, riya çûn û nehatinê jî dîsa rê dihatin vekirin û sînor dihatin binpêkirin.

Wek ku tê zanîn, heta destpêka sedsala 20'an sînorên dewletan ne derên ku mirov nikaribû derbas bibe. Çûn û hatin rihet bû. Ji her neteweyî tucar, mêvan ji dewletekê diçûn û dihatin dewletên din. Kurdistan di her demê de xwedî dan û stendineke xilbe bû. Bi vê re jî çi kesê ku li deriyêkî bixista û bigota ez mevan im, bi mêvanperweriyê pêşwazî dibûn. Cîhan pê dizane, ev taybetmendiyeke Kurdan e. Lê di sedsala 20'an de dewletan sînorê xwe gelekî asê kirin û ji bo mirov ji dewletkê derbasî dewleteke din bibe hin derî çêkirin. Ev derî jî tenê ji kesê xwedî peseport re vekirî bûn. Îcar derbasbûnên bê peseport, bûn derbasbûnên bi qaçaxî; yanî dibû sûc û yê ku bi qaçaxî di sînoran re derbas dibûn bi piranî yan mayin bi wan de diteqiya yan jî di şerê ku di navbera wan û eskeran de derdiket, dihatin kuştin.

Yek ji sînorê ku di Kurdistanê re derbas dibe sînorê di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de ye. Ev sînor bi peymana ku di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de di sala 1921'ê de ya bi navê Peymana Ankarayê hat îmzekirin û bi pêvekê protokolên sala 1926'an de hat qebûlkirin. Lê sînor di sala 1928'an de tescîl bû. Ji Hatayê heta bi rawestgeha Çobanbeya Entabê, tu tiştekî ku bi xwezayî bibe sînor tune bû. Ji rawestgeha Çobanbeyî heta bi Nisêbîne, xeta trênê sînor hatibû qebûlkirin. Di demên ewilî de ji bo sînoran bidin xuyakirin tenê kêlikên kevirîn hatin danîn.

Sînorên navbera Îraq û Îranê, li gorî peymana 1915'an hat destnîşankirin. Yanî wek dema Dewleta Osmanî ma. 126 kêlikên sînor hatin daçikandin. Piştre bi demê re astengî hatin zêdekirin. Di sala 1975'an de jî 593 kêlikên din hatin daçikandin.

Zêde nedabin ser devera hev jî li ser sînoran hin nîqaş di navbera dewletên ku Kurdistan pay kiribûn dom kirine. Ji bo mînak xeta di navbera

[312] Basil Nikitin, bnb., r. 9

Nisêbîn û Cizîrê de, her dem di navbera Sûriye û Tirkiyeyê de bûye mijara minaqeşeyan. Bi peymana ku di 1937'an de hat girêdan, xeta hesin a Bexdayê, beşa Nisêbîn û Yenice derbasî aliyê Tirkiyeyê bûye.[313] Piştre Hatay kete bin serweriya Tirkiyeyê û êdî sînorên navbera Tirkiye û Sûriyeyê bi vî şiklî heta niha berdewam kirin.

Çiqasî van sînorên ku me li jor behsa wan kir di Kurdistanê re derbas dibin, çiqasî wan ne di Kurdistanê de ne em li ser nesekinîn. Ji ber ku Kurd nebûne xwedî dewleteke netewî, her tim nîqaş li ser sînorên Kurdistanê hene. Mijara me jî ne ev e. Sînorên ku di hundirê Kurdistanê re derbas dibin ji ber ku bêyî rizaya gelê wê hatine danîn gelek xetere bi xwe re anîne û ev îro bêhtir tên nîqaşkirin. Em bêhtir li ser astengiyên van sînoran disekinin û di vê beşê de em ê li ser qaçaxî û mayinan bisekinin.

Wan kêlikên li ser sînor, leşkeren dewriye û baregehên ku libliban bi awayeki firk li ser sînor hatibûn danîn nikaribûn çûn û hatinê bidin rawestandin; lê bi demê re hêdî hêdî astengî lê hatin zêdekirin û sînor hatin qewînkirin. Ji xwe armanc û plan jî ev bû; ji bo ku hêrsa xelkê nekişînin ser xwe ne bi carekê re, hêdî hêdî wê sînor asê bikirina.

Ticareta ku bi hespan dihat kirin û ya ku mirovan bi piştê dikir digel hemû astengiyan heta 1980'yî nehat rawestandin. Di serê ewil de, qaçaxî ango ticareta li ser sînor gelekî rihet bû. Tiştekî rojane û ji rêzê bû. Di salên 1950'yî de ji Serxetê (Tirkiye) pezê sor dibirin Binxetê (Sûriyeyê). Hingî pez dibirin Binxetê li bajarê nêzikî sînor pez nedima û gelek caran ji bajarên dûrî sînor jî pez dihat kirîn. Wan salan ev mal ji Binxetê dianîn: gaz, xwê, pelên cixareyê, ampûl, fitîla lembeyê, kaxez. Ji bilî pez ev mal dibirin Binxetê: Tûtin, berû, dims, text, dar, komura dara berûyê.

Di dawiya sala 2005'an û di serê sala 2006'an de em gelek caran bi Mele Brahîm re rûniştin û di sohbetan de bîranînên xwe yên di derbarê vê mijarê de bi me re parve kir. Seydayê me Mele Brahîm ê ku li Nisêbînê dijî û li dor 70 salî ye bi bîranînên xwe rewşa wê heyamê û çûn û hatina ser sînorê di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de radixe ber çavan. Beşek ji bîranînên wî, ji dema berî ku mayin bên danîn e:

"Ez li dor 15 salî bûm, ji bo xwendinê ez çûm Tilmerûf, cem mala Şêx. (Heyama Şêx Mihemed Mehsûm kurê Şêx Ehmed min xwend.) Gundê Tilmerûf li Binxetê û mala me jî li gundê Kerşafê li Serxetê bû. Ji bo ku ez herim xwendina xwe her ez diçûm min sînor derbas dikir, her havîn ji bo ez

[313] Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik, Gelenekten Geleceğe Antropoloji (Ji Kevneşopiyê Ber Bi Dahatûyê Ve Antropolojî), r. 108

bêm cem mala bavê xwe jî dîsa ez di sînor re derbas dibûm. Havînan 2-3 mehan destûra me didan ku em herin malên xwe. Di heyama min dixwend de li dor 70 feqeyî di medreseya me de dixwendin. Her yek ji wan ji derekê hatibû. Ji medreseya me re digotin Medreseya Herî; ji ber ku bi kerpîçên heriyê çêkiribûn. Xwarin û razana me hemû li ser mala Şêx bû. 5 salan xwendina min dom kir.

Carekê ji gundê xwe ez û xalê xwe hatin Girefşê, gundê nêzikî hidûd, ji bo ku em derbasî Binxetê bibin. Ez ê ji bo xwendina xwe biçûma mala Şêx, xalê min wê bihata ziyaretiya mala şêx, ê din wê malê xwe derbas bikirina. Em nêzikî 70 kesî bûn. Di koma ku em ê bi hev re derbasî Binxetê bibûna hin seyidên Qertmînî, hin fileh, hin Êzîdiyên Geliyê Sora û Mezrikê hebûn. Qederê 30 kesê Qertmînî barê xwe li keran kiribûn, xwe hazir kiribûn. Em man li hêviya karwanê mezin. Bi keriya pez û dewar derbas dikirin, bi bara mewîj, bastêq, benî, fasûlî, kizin dibirin, ji bo li Binxetê bifiroşin. Em saetekê bêhtir man me dît ku va ye karwanê mezin ê pez û dewar û kerên barkirî bi wan re hatin. Ji me re gotin, zû rabin ser xwe hevalên we hatin, hûn ê derbas bibin. Xuya bû ku esker destûr dabû. Carna esker rê dida carna nedida. Em ê di cem qereqola Sirûciyê (bareşê Eznawirê) re biçûna, a ku di serê gir de bû û çem jî di ber re derbas dibû.

Em ji Girefşê derketin, du kerî pez, dewar, kerên barkirî, karwanekî pir xilbe di pêşiya me de û em meşiyan. Bê pêjin, bê hiska diviyabû em bimeşin. Rêber ji me re digot, nepeyivin, qet cixareyê pênexin ji bo qereqol û gundî bi me nehisin.

Rêber tivingên eskeran (6-7 esker bûn) ji wan stendibû û dabû xwediyê pez, ji bo xwediyê pez yeqîn bike ku esker bêbextiyê lê nake. Di hidûd de her serê sed metroyekî kêl hebûn, wan kêlan hidûd didan xuyakirin. Dema em gihan ser hidûd, cihê ku kêl lê bû, rêber tivingên eskeran ji xwediyê pez xwest. Got, va ye em gihan sînor, îcar em ê tivingên eskeran bidin wan û oxir be ji we re. Ez hîn zarok bûm jî, dema ku tiving dan destê esker min hîs kir ku esker wê xayintiyê bike. Dema eskeran rahişt tivingan, min ji xalê xwe re got, xalo bilezîne em hidûd derbas bikin. Hîn me çend gav neavêtibû, esker çilo tiving ketin destê wan xayîn ketin, dest bi teqandinê kirin û gotin, rawestin. Her eskerekî ji aliyekî ve dest bi teqandinê kirin, wek ku tu xwê di êgirxî. Teq û teq û teq! Dema teqandinek çêdibû, eskerên li ber sînor hemûyan her yekê li texma xwe dest bi teqandinê dikir. Gelekan jê devê tivingê didan jor û bi hewa de berdidan.

Bi teqandinê re ew qas pez, dewar, mal û karwan her yekê bi derekê de terqiyan, bela wela bûn. Bû mehşer, dê weledê xwe avêt, ew li wî ku xwe xelas bike! Pîrek jî bi me re hebûn ên ku qaçaxî dikirin, nanê zarokên xwe derdixistin. Hin jê bi paş de vegeriyan, hinekan jê xwe şaş kiribûn pêşiya xwe nedidîtin û bêhemdî xwe li çem diqelibîn (Ava Girê Biya li pêşiya me diherikî), hin ji me em daketin Binxetê. Esker dest danî ser ew qas mal. Hema tiştê ecêbmayî bi serê wî karwanî de hat.

Ez û xalê xwe me xwe xelas kir û bi selametî em gihan mala Şêx. Dema em çûn cem Şêx, ji me pirsî bê em di ku re û çawa derbas bûn. Xalê min got, 'em di qereqola Sirûciyê re hatin qurban, bi me re pez û karwanê Êzîdiyan, Filehan jî hebûn' û tiştê di serê me re derbas bûbû hemûçik ji Şêx re got. Şêx gelekî pê êşiya, serê xwe hejand û bû niçeniça wî.

Xalê min di wexteke kin de vegeriya malê û ez li medreseyê mam. Neh deh mehan min xwendina xwe kir pê de havînê destûra me dan ku em herin malê. Min ji xwe re hinek cil kirîn, min rahişt kitêbên xwe û ji bo ez Serxet bibim min dan û stendin danîn. Vê carê ji bo em sînor derbas bikin, em hatin gundê Binxetê yê hemberî Eznawirê. Em pazdeh bîstek hebûn. Karwan û bar hazir kiribûn. Du rojan em li wî gundî li benda vekirina rê man, eskeran rê nedan. Roja sisiyan hingî ez aciz bûm min got, ez ê bi tenê bidim ser rê, herim Serxet bibim. Ê ku li dora min, gotin: "Tu dîn bûyî? Çilo tê vê roj li nîvroyê tenê herî? Wê te bikujin." Ez naşî bûm, min got, çi dibe bila bibe ileh ez ê herim. Min rahişt cil û kitêbên xwe û min da ser rê. Berî nivroyê bi du saetan bû. Min rast xwe li gundê Eznawirê girt.

Gund li binya gir, qereqol jî li ser gir bû. Min dît ji qereqolê eskerek xwe berda pêşiya min. Bi min re xeyidî got, tu çawa vê nîvroyê têyî. Ez birim hundirê qereqolê, ez li ser ranzayê danîm, pirs ji min kirin û tiştên bi min re saxtî kirin. Dîtin ku ji cilên min û kitêbên min pê ve tiştik bi min re tune ye, yeqîn kirin ku ez ne qaçaxçî me. Lê eskerekî xwe gelekî qehirand; xwe zer kir tivinga daliqandî, tiving siwar kir, berê wê da min, xeber ji xwe re da û got, ez ê a niha te bikujim, çilo tu wilo bi serê xwe û bi roj hatiyî; bi ser halan de mezinê me jî li vir e. Bi rastî wê min bikuşta; hema eskerekî din xwe avêt tivingê û got, 'çilo tê vî xortî bikujî, bise tu çi dikî?' Teqnekî xwe circirandin hev, hevdu birin û anîn. Dema ji destê wî tiving girt, tiving lê rast kir û got, 'tu rihet rûnenê ez ê te bikujim'. Ew eskerê ku ez xelas kirim, ez derxistim derve û got, 'Bazde, here.' Ez gelekî tirsiyabûm. Min got, tu nahêlî min bikuje? Got, 'Na, de here cihê ku tu jê hatiyî, nesekine.'

Bi bayê bezê re ez weke teyr firiyam, di hundirê çend deqîqeyan de ez giham gund. Min li dawiya xwe nihêrî ku va ye ew esker hîn li min dinêre. Ew çavê tirsê ez çiqasî xurt kirim. Ez bêhn çikiyayî li mala ku ez jê çûbûm vegeriyam. Li dora min civiyan û pirsîn, ‘Te çi kir?’ Min henek li wan kir, got, esker gotiye, ‘Derbas bibin xem nake.’ Gotin, ‘Ma tu bi rastî dibêjî?’ Min got, ez henekan li we dikim, esker ez girtim û kirî ez bikuştima. Dema tiştê bi serê min de hat min ji wan re got, hin ji wan giriyan; hinekan got, ‘Tu ji mirinê filitiyî.’

Di heman rojê de êvarî destûr ji esker derket û me hidûd derbas kir. Perê ku dihat stendin esker û mezinê gund payê dikirin. Esker em anîn heta ber gund. Em çûn mala mezinê gund û ji wir jî em li gundê xwe belav bûn.

Niha tiştekî din hat bîra min. Ez neh deh salî bûm, bi diya xwe re cara ewil ez ê biçûma Binxetê. Me karê xwe kir ku em di Nêrgizlokê re derbas bibin. Xalê min û jina apê min jî bi me re bûn. Karwan pir bû, belkî 60-70 heywanên barkirî hebûn. Pîrek jî bi me re hebûn. Karwan hemû derbas bûn, em li dawiyê dimeşiyan; ji ber ku şêx gotibû, divê jin hebekî ji zilaman dûr bisekinin. Ji bo derbaskirinê serê şexs pere didan esker. Dema em ketin derba esker ku em derbas bibin, esker doza pera kir. Xalê min got, ‘Ev jin in feqîr in, tu mal bi wan re tune ye, ji bo herin mala şêx diherin.’ Esker jî got, ‘De derbas bibin, xem nake.’

Heta wê demê min sînor nedîtibû. Wexta xelkê behsa çûn û hatina xwe dikir; geh digotin, piştî kêla teqandin li me çêbû, geh digotin, berî em bigihên kêla nizanim çilo bû. Îcar min digot binê bê kêl çi ne, çilo ne. Diya min dema em gihan hidûd, kêl pêş min kir û got, binêre lawê min, ji kêlikê û bi jêr de Sûriye ye, ji kêlikê û bi jor de Tirkiye ye. Kêl ji çîmento bûn, bi qasî nîv metroyî bilind bûn, çar qorzî bûn. Ez hilkişiyam ser kêlê û min ji diya xwe re got, yadê binêr ez niha ne li Tirkiyeyê me û ne li Sûriyeyê. Dûre ez daketim, min her lingekî xwe avêt aliyek kêlê. Min xwe carê bi ser lingekî de diavêt, dihejand û digot binêre yadê ez li Sûriyeyê me, ez li Tirkiyeyê me, ez li Sûriyeyê me, ez li Tirkiyeyê me. Diya min bi min re xeyidî got, ‘Were kuro were em herin.’ Bi lez min da dû diya xwe. Em çûn mala Şêx. Cara pêşî min Şêx Ehmed wê gavê dît.”

Ev çend serpêhatiyên ser sînor tenê yên kesekî bû. Wek ku tê fêmkirin, di vir de behsa demên ku hîn di sînoran de mayin nehatibûn danîn, tê kirin. Niha em dîsa vegerin ser pêvajoya asêkirina sînoran. DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê) û Kanada, 4’ê Nîsana 1949’an Saziya Peymana Atlantîka Bakur NATO damezirandin. Ber bi salên 1950’yî de meyla

Tirkiyeyê bi ser Amerîkayê ve diçû û 1952'yan de jî tevli NATO'yê bû. Bi vî awayî roj bi roj di herêmê de di nav dewletan de dubendîtî xurt bû. Ji ber ku di vê demê de navbera Sûriye û Sovyetê xweş bû, pêwendiyên Tirkiye û Sûriyeyê xera dibin. Wekî din Tirkiye ji ber têkoşîna serxwebûnê ya başûrê Kurdistanê jî ditirsiya û li sînorê navbera xwe û Sûriyeyê, ji sala 1956'an û pê de mayin çikandin. Ji wê demê û vir de zeviyên bi xêr û bereket tevde bûn mayin, têlên bi dirî, kolikên nobedariyê û baregehên leşkerî. Vê demê zêreveniya sînor teslîmî cendermeyên seyar hat kirin. Bi vê mebestê du tugay hatin avakirin. Navenda yek ji van tugayan bû Entab, a din jî bû Mêrdîn. Alay, tabûr û beşên din ên van tugayan li deverên cihê hatin bicihkirin û di tevahiya hidûd de qereqolên wan çêbûn.

Sînorê Tirkiye û Sûriyeyê, dirêjtirîn sînorê bejî yê Tirkiyeyê ye. Sînorê ku dirêjahiya wî 877 km ye, sînorê başûrê bajarê Hatay, Entab, Ruha, Mêrdîn û Şirnexê ye. Ev qada ku lê mayinên bejî yên antîpersonel hatine çikandin, li hin deveran firebûna wê digihîje 350-500 metroyî. Ev der nêzikî 3,5 milyon donum erdê berdarî çandiniyê ye. Ji ber ku ev erd beyar tê hiştin, li derveyî çandinê hatine hiştin, salê bi trîlyonan zerar li welêt dibe. A herî girîngtir ev e ku ev erd bûne cihê mirinê.

Ergin Konuksever eskeriya xwe li ber sînor, li Akçakoyunluyê kiriye. Li gor ku serbazê yedek Konuksever dibêje, dema li sînor mayin dihatin danîn (1959), li Alaya Gerok a 122'ya de fermandarê liqa siwariyê bûn û Alaya wan berpirsyarê danîna mayinan a li herêma wan bû. Konuksever wiha behsa wê demê dike: "Mayinkirina sînorê Sûriyeyê bi xwesteka Artêşa Tirk û bi destûrdayîna serokwezîrê demê Adnan Menderes hat meşandin. 3 Alayên Gerok ên Jandarmayê mayinkirina sînor girtibûn ser xwe: Alaya 121'emîn a ku navenda wê li Ruhayê bû, Alaya 122'yemîn a ku navenda wê li Kilîsê bû, Alaya 123'yemîn a ku navenda wê li Antakyayê bû. Ev her sê Alay jî bi 1'emîn Tumena Jandarmayan (navenda wê li Dîlokê bû) ve girêdayî bû. Fermandarê wê Tumgeneral Alaattin Kral bû. Ê ku dixwest li sînor mayin bên danîn ew bixwe bû. Heta A. Kral sebeba rastî ya qaçaxê berî bi salan dîtibû. Nirxandineke ku min ji devê wî bihîst heye. Digot, qaçaxvanî vî îşî ne ji bo pereyan dikin, ji bo serhildaneke Kurd pere didin hev û digot, loma mayinkirin pir girîng e. Destûra kuştina kesên ku di sînor re derbas bibin dabû me."[314]

[314] www.turksolu.org, 06.07.2009, hejmara kovara turksolu 243



*Ergin Konuksever (ê di navînê de) û du esker li ber deriyekî pasawanê yê bi tabûra Akçakoyunluyê ve girêdayî.*[315]

Piştî mayinan derbaskirina sînor bûye meseleyeke hebûn û tunebûnê. Wa wextên pêşî mirov xerîbî mayinan bûn û sînor qebûl nedikirin, gelek caran mirina xwe didan ber çavên xwe û di erdê bi mayin re derbas dibûn, ticareta xwe dikirin û diçûn ziyareta xwediyên xwe. Lê belê bûyerên pêk dihatin roj bi roj sînor di mêjiyan de didan rûniştandin.

Ji bo lêkolîna vê mijarê cihê ku ez çûmê yek jê Sirûc (Pirsûs) bû. 5'ê meha Çile ya sala 2006'an ez çûm wir. Wek ku tê zanîn Sirûc, navçeyeke di sînorê Tirkiye û Sûriyeyê de ye. Piştî hevdîtinê di hundirê Sirûcê de em derbasî gundekî bûn, gundekî bi sînor ve. Em li maleke civat geryayî rûniştin. Dema em li ser vê mijarê diaxivîn civata me ji 9 kesan pêk dihat. Ew hemû jî kesên ku berê bi karê qaçaxê mijûl dibûn, an jî ew kesên ku li ser sînor bûyerek bi serê wan de hatibû. Ji ber ku berî em herin me têkilî danîbû û me armanca lêkolîna xwe anîbû ziman, hevalên ku alîkarî dikirin bi wan kesan re têkilî danîbûn û ew dabûn hev. Nêzikî du saetan li wir em li ser sînor, mayin û qaçaxê axivîn. Çend gotinên bîranînên vê civatê wiha bûn:

"Gelek esker hatibûn ji bo mayinan deynin. Te dinerî, gelek çadir rêz kiribûn; mayinin jê gelekî mezin bûn, hin jê yên biçûçik bûn, hin jê nîvçe bûn. Dema mayin dixistin erdê me dît, tev rêz kirin. Esker pir bûn, ma dawiya esker dihat! Esker ne bi hesaba bûn, çadir jî ne bi hesaba bûn.

[315] www.turksolu.org

Dema dikirin ku mayinan bixin erdê, xelk dixistin hundiran, heps dikirin; digotin, dernekevin. Ji bo em nebînin bê li ku û çilo datînin. Ez wê çaxê hîn nezewicîbûm (1959). Me nizanibû mayin bi mirovan de diteqin. Digotin, dikin ku mayinan bixin erdan ku xelk here Sûriyeyê wê bi wan de biteqin. Heta bi Eshed de teqiya îcar me fêm kir ku însanan dikuje.

Kurmancan pêşiyê mayin rakirin, rê vekirin, di wir re diçûn û dihatin; qaçaxî dikirin. Ji vir bi keriyan heywan dibirin, ji wir de firax dianîn. Xelkê tevde berê qaçaxî dikir, niha qaçaxî nemaye.

Ku teqandin çêdibû, şirildaq hebûn, şirildaq, hemû der ronî dikir. Dinêrîn barê wan li ser piyê wan e, didan wî miletî qeb qeb qeb! Giş dikuştin. Kuştina layê apê min kezeba dişewitîne. Bi qaçaxî xelk diçûn Hecê. Ew jî dixwaze bi lawê apê xwe re here, li hev nakin. Hat ji min re got, 'Va ye ez dikim herim.' Min got nere, we li hev nekiriye, nere. Çilo çû mayin pê de teqiya. 7 saetan di nav mayinan de ma. Baran, berf! Destmala xwe jî li nigê xwe gerandibû, nigê wî perçe bûbû. Bang dikir digot, 'Werin min derxin.' Esker îzin nedida ku em derxin. Ji windakirina xwînê mir. Eskerekî laz hebû, ez nas dikirim dihat cem me carê çay vedixwar; got, 'Qet çênabe.' Heta ji dest xwe çû ji esker re got, 'Qey hûn zalim in, zimanê min ji dest min çû. Li pişta xwe kirin anîn danîn. Ez liviyam min rûnin 'hiland û bi qirikê de berda, me dî şûr kir. Me du siwar rakirin şandin Sirûcê, ji bo texsiyekê werînin. Baran e, der e, hemû herî ye ma texsî tên gund? Heta berê sibehê hatin, hatin ew li pişta xwe kirin ku wî bibin, li ser pişta wan ruhê wî kişiya, anîn danîn. Kurmancên me kişiyan, te ax bavêta li erdê nediket. Dema hat kuştin 20-25 salî bû.

Em ji xwediyên xwe yên jêr jî qut bûn. Niha xwediyên me dema mirinek hebe em ji wan re îstekê (daxwaz) dişînin, îcar bi mektûban dikarin bên."

"Berî mayin bên danîn li ber sînor esker hebûn jî em derbas dibûn. Esker em diqewitandin digot, hidûd yasaq; me xwe lê diqeliband em diçûn û dihatin. Erdê me li wir hebûn em diçûn me diajot, me diçand û hiltanî. Pasawan dabûn bavê min, pê serbest diçû û dihat. Ên ku erdên wan li wiyalî sînor mabûn pasawan didan wan, ji bo bi erdên xwe dakevin.

1959'an de bû. Ez 14-15 salî bûm. Dema kirin ku mayina deynin li ba gundê me çadirên xwe vegirtin, sê mehan li wir man. Esker pir bûn, çadir pir bûn, belkî 20 çadir hebûn.

Mayin sê şikil bûn, hinek bi qasî nîvkîloyê hesinî bûn, hinek hebekî dirêj bûn, hinek jî sê binê wan hebûn, mezin û girover bûn. Dema dikirin ku mayinan deynin em kirin malan, derî li me girtin. Gotin, bila hûn nebînin. Piştî

derba gund xelas kirin em serbest kirin. Mayin jî datanîn, têlên xwe jî dikişandin. Cihê ku mayin lê danîne nav sînorê Tirkiyeyê ye. Esas sînor xeta trênê ye. Ji xeta trênê û wir de bi 15 metroyan jî sînorê Tirkiyeyê ye.

Me pêşiyê nizanibû qaçaxî çi ye. Ev hevalê me (*ji yê tenişta xwe re dibêje*) pisporê ku rê vedikir. Bi serê xwe elimîbû mayin radikirin. Qaçaxçî çakêt, çay, qehwe ji Binxetê dianîn, rihelên bûkan diçûn dianîn."

"Dema mayin tune bûn jî çûn û hatin yasax (qedexe) bû.  Berî mayinan deynin bi salekê, 1958 bû. Ceh çinîbûn, nîsk çinîbûn, genim mabû. Êvarekê işildaq (işildaqên eskeriyê hebûn) avêtin ser sînor û musademeyê dest pê kir. Heta sibê teqandinê dom kir. Îxbarî li wan bûbû, eskerî li pêşiya wan rabû û berdan hev. Sibehê me dît, çar kes hatibûn kuştin, em nizanin bê çend birîndar hebûn. Malê wan giş girtibûn, heta qemyonek mal bar kiribûn. Em çûn me nihêrî ku ew ciwamêr giş çekên wan ji wan kirine û şilfî tazî rêz kirine.

Berî mayin bên danîn mayinin din hebûn; tayek pê vedikirin û darek datanîn ew ta pê ve girê didan. Dema hinek li wî tayî biqelibiyana diteqiya û derdor ronî dibû, esker tavêt wan."

"Carna qaçaqçî dibûn 30 kes, 50 kes. Hin bi hespan diçûn, hin bi nigan diçûn, haşa, hin bi keran diçûn. Keriyê pez bi hezaran derbas dikirin. Bi destûra eskeran, bi destûra sûbayan derbas dibûn."

"Pirê însanan ji bo çewalek çay hatin kuştin. Kesek bi qaçaxê dewlemend nebû, kêliya qaçax dihat birîn zarokên wan birçî diman. Gelek ên ku diçûn û dihatin hemal bûn. Bi çend qurişan canê xwe didan."

Mirov nikare ji xwe nepirse; çawa mirovan ceger kiriye ev qasî çûne û hatine? Zanibûn ku ji nişkan ve karin pê li mayinekê bikin û bibin piçik û parî, bifirin hewayê. Hevalên wan, xwediyên wan li ber çavê wan ev tişt derbas dikirin. Çawa van çûn û hatinan dom kirine! Xuya ye mayinan û têlên direhî nikaribû fêrbûna van riyên ku heta duh hatine bikaranîn û têkiliyên germ bide rawestandin. Ji xeynî vana, aborî jî yek ji sedemên herî mezin e. Qaçaxî bazarek e ku hewcedariya her du aliyan pê heye. Aboriya ku her dem nebaş bû, tunebûna kar û şixul, herêmên sînor mehkumî qaçaxê kiriye. Wek ku di bîranînan de jî hişkere xuya dike, xelkê qaçaxî ji bo debara xwe dikir. Ji bo çar qurişan mirovan bi mirineke ecêb jiyana xwe ji dest didan.

Çi dibirin û dianîn? Ber bi salên 1960'î derbaskirina mih û dewaran didome. Piştre cureyên malên dihatin zêdetir bûne; alavên elektrikî, bedlên zilaman ên hazir, qumaşê Ingilîzan, porselen, lambe, pîl, termos û hwd. Salên 1960'î li Nisêbîn û bajarên wek Kilîsê sûkên qaçaxçiyan vebûne. Gava sal ber

bi 1970'yî ve tê êdî pasajên qaçaxçiyan hene.

Îsmail Beşîkçî, di pirtûka xwe ya bi navê 'Doğu Anadolu'nun Düzenî (Pergala Rojhilata Enedolê)' de li ser qaçaxçîtiya van deman wisa nivîsiye. "Di van salên dawî de malên ku ji Îran, Îraq, Sûriyeyê tên welatê me û malên ku ji welatê me bi qaçaxî diçin van welatan guherîne. Berî niha bi 20 salan malên ji van welatan bi qaçaxî dihatin welatê me cil û bergên qedîfeyî û hevrîşimîn, her texlîdên porselen (çaydan, tepsî, taximên çay û qehwê), semaverên mişvarî, xurme, hine, gaz, lambeyên luks, texlîdên alavên camîn (fincan û sûrahî), gelek xalî, qumaş, pêlavên çermîn, qerewat, gomlek û hwd. bûn. Li hemberî vana, qaçaxiya sewalan bi taybetî mîh, wekî din eyar, rûn, pêlavên lastîkî, ji bo nexweşiyên sewalan dermanên cur be cur dihat kirîn. Lê belê îro malên ji derdorên welatên ciranên me bi qaçaxî tên welatê me ev in; xalî, cureyên qumêş, teyb, sîleh, radyo, xurme, zêrê Sûriyeyê û hwd. Tiştên ji welatê me bi qaçaxî diçin ên sereke mîh in û ji xeynî vana afyon, eroîn, esrar, çerm, rûn, betanî, porteqal, derman û hwd. in."[316]

Tiştên ji sînorên Sûriyeyê bi qaçaxî derbasî Serxetê dibûn li her bajarên mezin ên Tirkiyeyê belav dibûn. Bi nivîsên ku Beşîkçî li ser vê mijarê nivîsandine em berdewam bikin:

"... ev malên serfkarî ku bi zêdebûn ji sînorên me derbasî welatê me dibin, ne tenê li bajarokên me yên li ber sînor û ne tenê li Mêrdîn, Ruha, Amed û Antabê ji xeynî vana heta nava Enedolê, li bajarên mezin ên ticaret û endustriyê, wek Enqere, Stenbol, Edene, Erzerom jî belav dibin. Li vê derê têkiliyên ku dibêjin qaçaxî hemû li holê ne, li ber çavan in. Li vê derê têkiliyên malbatî, hevnasî, eşîret û olî bi hevdu ve ne. Lê qaçaxî nema saziyeke ku ji aliyê malbat, hevnas, eşîret û olê ve tê meşandin e, ev rasterast dezgeheke aborî ye."[317]

Li Tirkiyeyê ji ber ku muhtacî heye ji aliyekî ve çav ji qaçaxê re tên girtin, li aliyê din jî di sînoran de bi deh hezaran mirov tên kuştin û tên seqetkirin. Ev bi piranî ji ber ku di sînoran de Kurd hene ye. Windakirinên Kurdan ên li ser sînor, li hesabê rêveberan tê, wek meseleya ku bi kevirekî gelek nîşan bên hilanîn e.

Ku em ji aliyekî din ve binêrin, qaçaxî bi têkiliyên navbera dewletan re jî eleqadar e. Wê wextê têkiliyên ticarî yên navbera dewletan ne hatibûn rûniştandin. Ev sedemeke berdewamkirina qaçaxê bû. Mirov li avakirinên sînor û qaçaxiyê, malên tên derbaskirin binêre, mirov ê li ser têkiliyên di navbera her du dewletan de, cudatiya wan û li ser gelek mijaran ên derbarê

[316] İsmail Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni, r. 273
[317] İsmail Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni, r. 279

van dewletan de karibe şîroveyan bike. Her çiqasî di vî warî de gelek xalên bi mijara me ve girêdayî hebin jî ev mijareke din e.

Qaçaxvanan di nav têlan de ji xwe re rê vedikirin. Ev şivîleyên teng bi paqijkirina mayinan pêk dihat. Gava mayin dihatin paqijkirin, mayin bi gelekan de diteqiyan û dihatin kuştin. Yanî heta şivîleyek vedikirin ew rê bi xwîna xwe avdidan. Car caran di çemên ziwa yên bê mayin ên ku sînor derbas dikin re jî diçûn û dihatin.

Mayinkirina sînoran her wê berdewam bike. Bi demê re deverin din ên sînoran hatine mayinkirin û li şûna mayinên teqyayî yan jî derxistî hinekên nû hatine çandin. Demên pêşî navbera qerekolan û qerekol û bolukan û navendên tabûran hema mirov kare bêje rê tune bûn. Lê sala 1975'an ji aliyê qewînkirina sînor ve demeke girîng e. Di vê salê de Tirkiye li sînor têlên direhî bilindtir kirin, kemîn zêdetir û dijwartir kirin. Li Başûr têkoşîna Mustafa Barzanî di qonaxeke serkeftî de bû; loma Tirkiye ji bo ku alîkariya Kurdên di sînorê başûr de neyê kirin, sînorên xwe qewîntir kiriye.

Sûriyeyê tu carî ji bo parastina sînor tedbîr nestendine. Bi tevahî erdên xwe heta ber sînor çandine. Wek ku berê di vegotinan de derbas bûbû, di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de xeta trênê di sînor de ye. Gelek kesên ku li deverin guncav xwe ji trênê avetinê aliyê Sûriyeyê, yên li stesyona mal kirîne, yên bi hêsanî derbasî wî aliyê din î sînor bûne çêbûne û bi tu astengiyên girîng re rû bi rû nemane. Lê belê Tirkiyeyê, her çend salan tedbîrên xwe zêdetir kirine û dîsa dîsa mayin çandine. Wek ku me li jorê behs kir sala 1975'an dîsa mayin hatine çandin, ji nû ve têl hatine kişandin, her serê 50 metroyî eskerek xistine quleyeke raçavkirinê û derbasbûna Binxetê dijwartir kirine.

Di rapora Komîsyona Meclîsê ya ku sala 1975'an de li ser sînor vekolîn kiriye, beşek ji nivîsa bi sernivîsa 'Tedbîrên Muhafezeyî Ya Li Ser Sînor' wisan e: "Deverên ku riya trênê lê tune ye, ji Derya Spî heta Îstasyona Çobanbeyê ji hidûd ber bi hundir ve qadeke mayinkirî hatiye pêkanîn û derdora vê qadê qiraxa hundir bi têlên direhî yên helezonî hatiye dorpêçkirin. Li deverên ku riya trênê tê re derbas dibe jî, riya trênê û bi dû de 7-12 metro şerît li derve hatiye hiştin û bi qiraxa hundirîn ve têlên direhî û helezonî hatine kişandin.

Hê jî bi xebatên ku gelekî bi buhayî didomin, li qiraxa hundir a qadê stûnên bilind û betonî yên ku di şiklê tîpa "Y"yê de ne û navbera wan heft metro ye tên çikandin, li nava van stûnan 32 rêz têlên direhî tên kişandin. Bi vî şiklî erdên mayinkirî û xeta trênê li aliyê Sûriyeyê tê hiştin û sînorê Tirkiyeyê 150-200 metroyî bi şûn ve hatiye kişandin.



*Têlên sînor ên ber riya Nisêbînê*[318]

Îstasyonên li ser riyên trênê, bê mayin hatine hiştin û li her îstasyonekê ji bo ku mirovên ji Sûriyeyê ji trênê îstifade bikin deriyekî ku li Sûriyeyê vedibe ava bûye."

Her çiqas tedbîrên giran hatibin stendin jî salên 1970'yî li jiyangehên derdorên sînoran pasajên qaçaxçiyan zêde bûne. Pasaj bi her cureyên firaxan, bi taybetî jî bi alavên elektronîkî, parçayên yedek ên makîneyan, valêz, termos, firaxên midbexan, parfûmen giranbuha, alavên maqyajê tên dagirtin û ji her aliyên Tirkiyeyê miştêrî bi ser wan de diherikin.

Li dor salê 1975'an ji aliyê aboriyê de salên herî baş ên qaçaxê ne. Mirovên ku ji bo kirîn û firotinê tên Nisêbîn û Kilîsê bê hejmar in. Li herêmê ev sektor roj bi roj mezin bûbû. Li jiyangehên derdorê yên ku bi vî karî ve mijûl bûn, zêde dibûn. Ji bo mînak, Hezex, Silopî heta Licê ya li bakur jî bi ruh û aborî bi Nisêbînê ve giredayî bû. Hîn jî gava behsa qaçaxê tê kirin ileh Licêyî tên bîra mirovan. Li gorî daxuyaniyeke 20'ê Gulana 1975'an her sal bi 5 milyaran firaxên qaçax derbasî hundirê Tirkiyeyê dibûn û dihat ravekirin ku li başurê rojhilata Tirkiyeyê 60.000 kesî qaçaxçîtî dikir.

Sala 1975'an tenê li Kilîsê nêzikî 27.000 kesî pasaport stendiye. Wê demê li Kilîsê seraqet pasajên mezin û xan hatine avakirin. Di hundirê heşt salan de tenê li ser kolaneke Kilîsê, 25 xan û pasaj hatine avakirin. Di wê demê de di cureyên malên dihatin û diçûn de zêde guhertin tune bû. Ji Tirkiyeyê bi

[318] Fot: Eslîxan Yildirim

tevahî mîh, rûn, şekir, ku xwarinên sereke ne diçûn; ji Sûriyeyê bi taybetî malzemeyên elektronîk û wek ku li jorê hat ravekirin gelek cureyên firaxan derbasî Tirkiyeyê dibûn.

Di vê demê de ji ber ku mal bi çûn û hatina bi pasaportan dihat kirin, qaçaxçîtiyê kirasekî din li xwe kiribû. Malên bi rihetî di deriyên sînoran re derbas dibûn di riyan de dibûn bela. Li ser riyan, lêgerînên gelekî dijwar hebûn. Ji bo mînak, kesên ji Sûriyeyê bihatina û di Kilîsê re derketina li deriyê sînor ê Oncupinarê rastî kontrolkirinên gumrikê dihatin, piştî 1,5 km li hundir cendirme li wan digeriyan. Ev jî ne bes bû, piştî 15 km eskerên Qerekola Martavanê dîsa li wan mirovên rêwî digeriyan.

Firaxên qaçax, bi awayekî meşrû û bê talûke dihat pasajan, bi tevahî û bi rihetî dihat firotin. Lê ku hinekan bi zanebûn an bi nezanî ev firax bikirîna û bi rê de, di otobusekê de di lêgerînekê de li ser bihata girtin, ev dibû qaçax û mirovên pê re hatiye girtin jî dibû qaçaxçî. Bi kurtasî qaçaxçîtî, yan jî divê mirov bibêje ticaret, veguherîbû lîstikekê. Tevî her tiştî jî cureyên firaxên balkêş diçûn Edene, Îskenderûn, Kilîs, Anteb, Ruha û Amedê li pasaj û xanên mezin li dikanan dihatin raxistin û firotin. Heta ev mal, digihîştin sûkên bajarên wek Stenbol û Enqerê jî.

Bi çêbûna sektoreke mezin a bi qaçaxçîtiyê ve giredayî, li herêmê têkiliyên nû, rêxistinên nû pêk dihatin. Qaçaxçiyan bi serê xwe dinyayek ji xwe re ava kiribûn. Di dema birin û anîna qaçaxê de bihevrebûneke taybet pêk dihat. Gelek caran bi dehan kesên qaçaxçî bi hev re sînor derbas dikirin. Hin ji wan ketine xetereyê û hevalên wan ruhê wan xelas kirine. Hinan ji wan ruhê xwe daye ber çavê xwe û laşê hevalê xwe ji nav mayinan li nav pişta xwe kiriye, aniye daye malbata wan. Bi vî awayî qaçaxçiyan têkilî û civateke nuh di nav xwe de, bi derdorê re û bi eskeran re ava kiribûn û di herêmê de cihekî cuda girtibûn.

Bi piranî qaçaxçî, bi destûra eskerên Tirkiyeyê di sînor de nobedar bûn sînor derbas dikirin. Hin riyên qaçaxvaniyê di ber qereqolan re bûn. Hin qaçaxçî û esker dibûn dost û têkiliyên cuda berfireh dibûn. Carna qaçaxvanî tenê ji bo firaxên ku eskeran ji xwe re xwestine bînin, çûne Binxetê. Lê carna jî ji aliyê eskeran ve bêbextî li wan bûye û kemîn li ber wan hatiye danîn. Axilbe rojên ku mal gelekî zêde tê derbaskirin xayîntî çêbûye. Di demên wilo de destkeftiyên qaçaxçiyan ê çend caran, di carekê de winda dibû. Di vê navberê de di nav xelkê de îxbarî jî pir dibe. Wek ku wê di serpêhatiyan de bê gotin, hin ji wan dualî xebitîne.

Qaçaxçî dema diçûn Binxetê bi piranî li malên xwediyê xwe diman. Lê carna jî li cem malên ku bi vî îşî dadiketin diman. Li her du aliyên sînor ê ku ev kar dimeşandin hebûn. Li ser sînoran hin herêmin jê, di destê hin kesan de bûn. Bêyi wan, kes nikaribû di wir re derbas bibe.

Rêberê qaçaxvaniyan hebûn. Ne tenê qaçaxvanî, çi kesê sînor derbas bikira bê rêber nikaribû here. Ji ber ku her der mayin bû, tenê yê rêber zanibûn di ku derê re rê hatiye vekirin, yanî mayin jê hatine paqijkirin. Gelek rêberan riyên xwe bi xwe vekirine. Rêbertî mêrxasî bû. Gelekan jê di gotûbêjan de bi serbilindayî behsa mêrbûna xwe ya demên derbasbûna sînor dikirin. Di gotinên wan de 'Ez qet neditirsiyam.' 'Rojina ez çend caran diçûm û dihatim.' 'Ma kes wek min hebû!' pir derbas dibûn.



*Rêberekî ji Menderê (Nisêbîn) Eshedê Celîlo*

Eshedê Celîlo yek ji rêberên qaçaxvaniyan bû. Dema em pê re axivîn nêzikî 80 salî bû. Gelek birînên xwe yên ji bûyerên di sînor de hatibûn serê wî nîşanî me dan û serpêhatiyên xwe bi me re par ve kirin. Li gor vegotinên wî, Eshedê Celîlo yê ji Menderê di hidûdê Nisêbînê de gelek salan rêbertî kiriye. Rêberekî mêr û jêhatî bû û gelek caran di sînor de birîndar bûye. Dema li Nisêbînê li mala wî me hevdu dît, hîn jî cihê gelek birînên wî xuya dikirin. Ji hevpeyvîna wî çend gotin ev bûn: "Ebede sekna min tune bû. Ez ê barê qefleya xwe ji Binxetê bar bikim wan bînim malê (Serxetê) wê ew herin, tê binêrî va ye qefleyeke din hat. Ebeden sekna min tune bû. Eyb e ku mirov wesfê xwe bide lê ez tiştekî ecêb jêhatî bûm û ez qet neditirsiyam." Jina wî jî digot, "Gelek caran dihat ku va ye pantorê wî ji derbên fişekan bûye serad, lê dîsa jî terka çûn û hatinê nedikir."

Di serê salên 1980'yî de dema salên pêşî ên serokwezîrtiya Ozal de, destûr derket ku her mal dikare di gumrikan re derbas bibe. Piştî demeke kin, malên ku pêşiyê li jiyangehên derdorên sînor peyde dibûn îcar li her derê peyde bûn. Ji ber ku eynî mal li deverên din jî peyde bûn qîmeta ticareta li ser sînoran nema. Loma roj bi roj hêdî hêdî qaçaxçîtî vemirî.*

* Hevdîtineke ku li Bazîdê me pêk anî dida xuyakirin ku di vê demê de derbaskirina sewalan didomiya. Di 08.09.2007'an de li navçeya Agiriyê Bazîdê Mehmed Seferoglu ji min re got ku, gava 1984'an derbasbûna di deriyê sînoran de serbest bû, wî bi hezaran sewal di deriyê sînor ê Nisêbînê re derbasî Binxetê kiriye.

Her çiqasî îstisna hebin jî qaçaxçîtiya li ser sînorê Sûriyeyê di serê salên 1980'yî de xelas bû, lê di pey xwe re gelek tiştên nexweş hiştin. Bi tevayî li ser sînoran bi deh hezaran mirov mirin, bi deh hezaran însan seqet man. Bi vê ve giredayî bi sed hezaran zarok sêwî man û dîsa bi hezeran jin bî, feqîr û perîşan...*

Sînorên din ên ku di nav Kurdîstanê re derbas dibin, yanî sînorên di navbera Tirkiye û Îraqê, yê Tirkiye û Îranê, yê di navbera Îran û Îraqê de, Sûriye û Îraqê de naşibin hev. Sînorên di nav Kurdîstanê re derbas dibin li gor erdnîgarî û têkiliyan xwedî teybetmendiyên xweser in. Sînorê di navbera Tirkiye û Îranê di çiya de ne. Li wan deran heta van demên dawî tu tedbîrên giran, avaniyên kontrolê zêde tune bûn.

Erdal Sarizeybek ê ku di navbera salên 1979 û 1981'an de li bajarê Qersê navçeya Aralikê (Başan) li ber sînorê Îranê serdarî kiriye, li ser demê ewil wisa dibêje:

"Wê wextê li Îranê Şah hebû. Têkilî baş bûn. Gava em bi armanceke protokolî derbasî Îranê dibûn bi rûkenî em pêşwazî dikirin û em bi rê dikirin. Di serê sînorê me yê hevpar de kaniyeke avê hebû. Gundiyan navê Sureya lê kiribûn, digotin Kaniya Sureya. Di wextê xwe de Kralîçe Sureyayê ev kiribû diyarî. Bi Îranê re tu astengiyên me yên ji aliyê terorî ve tune bûn. Lê belê heta tu bibêjî bes qaçaxçîtî hebû. Li ser sînor tu tedbîrên ewlehiyê nedihatin stendin.

Serê her çend kîlometreyan du yan sê eskeran nobedarî dikirin, dibû sibe vedigeriyan. Sînorê Îranê li ku û yê Sûriyeyê li ku yên niha bi têl in, qulube, erdên mayinkirî, ronîkirî..."[319]

Mayinên li ser sînorên Îranê ne weke yên li ser sînorên Sûriyeyê ne. Lê piştî salên 1980'yî li vir jî mayin têra xwe hatin danîn. Ji berê ve jî sereqat têkiliyên ticarî hebûn. Ligel ku dîroka vî sînorî gelekî kevntir e jî, têkiliyên germ ên di navbera mirovên her du aliyan de heta demên dawî berdewam kirine. Îsmaîl Beşîkçî di berhema xwe ya ku sala 1970'yî de nivîsiye li ser rewşa sînorê Îranê wisa gotiye, ".... Bi taybetî mihên li Rojhilata Enedolê tên xwedîkirin di deriyên Başkale, Ozalp, Bazîdê re derbasî Îranê tên kirin. Li vê derê têkiliyên xwedîtî û eşîrtiyê gelekî xurt in. Mirov dikare milên eşîreteke Îranê li aliyê Tirkiyeyê bibîne û yê eşîreteke mezin ku li Tirkiyeyê bi cî bûye milên wê li Îranê hene..."[320] Ku em li demên dawî ên Îranê binêrin, ji bo ku li sînor dîwar bên lêkirin û qereqol bên avakirin hewldaneke mezin heye.

---

* Li gor çavkaniyên BBC, tenê di sinorê bakur û başûrê rojava de (Sûriye û Tirkiye) 35 000 kes mirine û 70-75 hezar kes jî seqet mane ( Yê ku ji çavkaniyên BBC ji me re ragihand: Wergêr Feysel Nerse)

[319] Erdal Sarızeybek, bnb., r. 31

[320] İsmail Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni, r. 278

Ji ber ku sînorê Îraq û Tirkiyeyê bi piranî herêmeke bi çiya ye, çûn û hatina di vir re jî ne rehet e û bi salan ev der nehatine mayinkirin. Pir zehmet be jî têkilî û danûstendinên mirovan seraqet berdewam kirin. Wek ku di berhema Îsmaîl Beşîkçî de tê gotin, qaçaxçîtî li ser sînorê Îraqê nedihat kirin, li herêmên sînor bi pevguhertina tiştan danûstendina mal dihat kirin. Ji ber ku têkiliyên malbatî, xwedîtî, eşîrî, terîqetî xurt bûn, dan û stendin ne bi armanca ticaretê dihat kirin.

Di pirtûka 'Eşqiyayên Heyamên Berê' (Eski zaman Eşkiyaları') ya Muhsîn Kizilkaya de vegotineke wisa heye, "Heta sala 1974'an, heta serîhildana Mele Mustafa Barzanî ya li dijberî Hikumeta Îraqê têk çû, Musil ji bo Colemergê û herêmên derdorê navendeke bazirganiyê ya sereke bû. Her kesî bi riya pevguhertinê her tiştên xwe ji vir dikirîn. Ji vî aliyî hirî, mazî, wek tiştên xwarinê jî penêr, li aliyê din ji bo zivistanê bi erzaqên xwarinên hişkkirî dihatin guhertin. Çûyîna Musilê ya mirovên li seranserî sînorê Tirkiyeyê dijîn ji çûyîna Wan û Colemergê hesantir bû."[321]

Heman demê têkiliyên mirovên li seranserî sînorên Sûriye û Îraqê û li sînorên Îraq û Îranê gelekî baş in. Bandora Mustafa Barzanî ya li ser her du aliyan her dem berdewam kiriye û bi hev guhertina malan jî dom kiriye. Tê gotin ku ev herêma sînorên Îranê ku paşmayî hatine hiştin, bi têkiliyên Kurdên Îraqê li ser piyan maye.

Ji ber sedema erdnîgariya sêgoşeya ku sînorên Tirkiye, Îraq û Îranê digihên hev bi çiya ye, parastina vê derê herdem dijwar bûye. Ji van çiyayên asê, yên ku li nav sînorên Îraqê dimîne berê stargeha pêşmergeyan bû. Gelek caran pêşmergeyên ku şerê azadiyê dikirin xwe dispartinê. Vê taliyê ev dever bûye stargeha gerîlayên PKK'yî.

Ji roja ku PKK'ê dest bi şerê çekdarî kiriye, tevgerên li ser sînorên vê herêmê zêde bûne. Niha em bi çavên Erdal Sarizeybek ên ku salên 1992 û 94'an fermandariya Tabûra Sînor a Şemzinanê kiriye, li vê herêmê binêrin. Sarizeybek, di xebata xwe ya navborî de li ser vê herêmê ev nivîsandiye:

"Wan rojên pêşî ku min nû dest bi kar kiribû, min xalên girîng ên têkiliya qaçaxçîtî û terorê bi dest xistin; mezraya Mağaraönü ya li ser xeta Îranê bi cî bûye, ji ber sedemên erdnîgariyê bûye yek ji rêgehên herî girîng ên teroristên diçûn û dihatin Tirkiyeyê. Di vê şivîleyê re bi hêsanî xwe digihandin Qampa Jerma û dîsa bi eynî rêgehê dihatin Mağaraönüyê, qût ji xwe re peyde dikirin. Ev şivîle ji aliyê qaçaxçiyan ve jî gelekî dihat bikaranîn. Yanî terorîst û qaçaxçî bi hevdu re bûn. Di heman demê de terorîstan nokteyeke gumrikê ava

[321] Muhsin Kızılkaya, Eski zaman Eşkiyaları (Eşkiyayên Heyamên Berê), r. 24

kiribûn, ji qaçaxçiyên diçûn û dihatin baca rê distendin û bi vî awayî ji partiya xwe re pere didan hev. Di vê de sûda qaçaxçî û terorîstan her duyan hebû, loma tu zerar nedidan hevdu. Lê piştî bi demekê ev mezra hat valakirin, bi hindikayî be jî qaçaxçîtî hatiye rawestandin û rêgeha girîng ketiye bin kontrolê."[322]

Vegotineke Sarizeybek a din jî wisa ye: "Ji bo ewlehiya xeta sînor, ji ber tehdîtên terorî me nikaribû bi qasî pêdiviyê tedbîran bistînin. Qerekola Mağaraönüyê ji bo qaçaxçîtiyê rawestîne hatibû avakirin, lê ji bo li ser axeke mehkûm bû ev der hatibû girtin. Insan bi rehetî derbasî Îranê dibûn, gava diçûn bi xwe re qumaşê Tirkiyeyê dibirin û li vegerê mîh, sifir, hirî û hwd. bi xwe re dianîn Tirkiyeyê. Di vê navberê de riya xwe qaşo bi gumrika PKK'yê dixistin û qaşo baca xwe didan. Terorîstan ji aliyekî ve xeraca xwe distendin û ji aliyê din ve qewêtiya tiştên ji wan re lazim li qaçaxçiyan dikirin û îstixbaratên hêzên ewlehiyê didan. A rast her du alî jî, ji vê meseleyê razî bûn. Her kesî zanibû PKK li ser sînorê Îraq û Îranê bacê distîne, lê ji bo tu astengî di navbera dewletan de dernekevin tiştek nedihat kirin."[323]

Cevat Özcanan bi nivîseke ku roja 31'ê Kewçêra 2007'an nivîsiye li ser qaçaxçîtiya herêmê rawestiyaye. Özcanan dibêje ku, gava em ji aliyê erdnîgariyê ve li Colemergê binêrin, ji ber ku li rojaveyê bajêr sînorê Îranê û li başûrê bajêr jî sînorê Îraqê heye ev der bûye rêgeheke herî girîng. Loma li vê deverê qaçaxçîtiya eroînê, sîlehan û petrolê tê kirin û li vê herêmê gelek mirovên sivîl ên bi sîleh hene. Özcanan wisa didomîne: "Mirov bicîbûna bajêr bîne ber çavên xwe dîsa ji ber ku ew dever li ser sînor e, eroîna ji Afganîstan û Îranê tê di ser Colemergê ya wek pirekê dixebite dikeve nav Tirkiyeyê... Bi kurtasî Colemerg û gelek bajarên li herêmê ji ber ku di sînor de ne, dibin wargehên mirovên jiyana xwe li ser qaçaxçîtiya sînor didomînin an ên ku wisa difikirin. Divê were qebûlkirin ku qaçaxçîtî qedera herêmê ye, ji ber ku ev dever ciyê ketina nav Tirkiyeyê û piştre jî rêya derbasbûna Ewrûpayê ye."[324]

Her kesî wek Sarizeybek û Özcanan serboriyên xwe û tiştên ku dîtine binivîsanda tiştên li sînor qewimîne çêtir wê li ber çavan bihatina raxistin. Yanî serboriyên gelê li vir dijî, esker, gerîla, qaçaxçî, wezîfedaran bihata nivîsandin û çapkirin Xwedê dizane wê çi derketa hole. Lê ma çi fêde, ji sedî yekê bûyeran jî nehatine nivîsandin, piraniya wan hatine veşartin, hatine jibîrkirin. Di vir de divê ez vê jî îfade bikim ku, ji ber sedemên qedexekirin û

[322] Erdal Sarızeybek, bnb., r. 33-34
[323] Erdal Sarızeybek, bnb., r. 34
[324] www.yuksekovahaber.com

nerihetiya çûyîna herêmên sînoran, ji ber ku me bi hêsanî nikaribû bi saziyên berpirsiyar re têkevin têkiliyê û lêkolînekê berfireh bikin wê kêmasiyên mezin di ravekirinên vê xebatê de hebin. Loma divê mirov bi vî çavî li vê xebatê binêre û zanibe ku gelek tiştên nehatine nivîsandin hene.



*Dîmenek ji rêwîtiya qaçaxa mazotê ya bi hespan û qantiran- Sînorê Îran û Tirkiyeyê*[325]

Divê em behsa qaçaxçîtiya mazota li ser van sînoran jî bikin. Ticareta mazotê ya di deriyên sînoran de tê kirin li aliyekî, li ser sînorê Tirkiye, Îraq û Îranê seraqet bi qaçaxî jî mazot hatiye kişandin. Qaçaxçîtiya mazotê ya li ser van sînoran hîn jî didome. Roja 26'ê Adara 2007'an di bernameyeke bi nav û deng a televizyoneke Tirkiyeyê de, li ser mijara qaçaxçîtiya mazotê ya li ser sînorê Îranê rawestiyabûn. Di bernameyê de wisa dihat gotin, "Niha vê demê jî, benzîn bi qaçaxî li ser pişta hêspan ji Îranê derbasî vî aliyê sînor dibê. Li gor buhayê normal benzîn, bi nîvê heq, heta bi hîn hindiktir li deverên nêzikî sînorên Îranê, li her dikanê peyde dibe."

Qaçaxiya mazotê bi tevahî li ser pişta hespan tê kirin. Li van sînoran, bi hindikayî be jî qaçaxiya ku bi milan tê kirin jî heye. Fêda qaçaxçîtiya bi milan zêde tune ye. Carna li ser sînorê Îranê qaçaxçîtiya ku 30-40 kes bi hevdu re, di ziwistan û berfê de barê wan li ser milên wan qederê sê rojan, bi hilkişîna çiya, bi kedeke mezin tê kirin, têrî nanê ku bixwin nake. Ravekirina Prof. Dr. H. Neşe Özgen vê mijarê xweş dide fêmkirin. Ji ravekirina Özgen ku li ser qaçaxçîtiya li ser sînorê Îranê tê kirin çend hevok wisan e: "...qaçaxçîtiya sînor niha jî bi anîna mazotê ya bi hespan û bi derbaskirina penaberan didome. Qaçaxçîtiya mazotê di tariya şevê de, bi bîdonên şîn ku jê re dibêjin celikan (jelîkan) û bi her du aliyên hespan ve tên daliqandin tê kirin. Bi saloxan, li derdora Saray û Ozalpê û li qûntara çiyayê Tendurekê Bazîdê 10-12 hezar hesp hene. Buhayê hespekî di navbera 200 an 600 milyonî tê guhertin û serê celîkanekî 70 lt. mazot tînin. Li gorî ku gundî radigihînin, aliyê Îranê serê hespê 5 milyonan bertîlê distîne. (2002, 1 dolar=1.680 000

[325] www.aksam.com.tr

TL, 5 milyon TL=2.7 dolar) Hespekî ku şevêke mazotê derbas dike 20 milyonî kar dike. Ne mimkun e ku her şev mirov here qaçaxa mazotê û gelek caran dibe ku hesp werin kuştin."[326]

Digel van şertan de domkirina qaçaxvaniyê hin pirsan tîne bîra mirov. Gelo wateyên din ên cuda hene yên ku dike qaçaxçîtî wisa bidome? Ma gelo cihgirtina di sînoran de mirovan bi ser qaçaxçîtiye ve didehfîne? Yan, ma gelo teşwîqkirinek heye? Em dinêrin ku gelek mirov li van deran xwedî erdên herî dewlemend û berdar in; ma gelo sedema qaçaxçîtiye ya herî mezin bi rastî jî feqîrî ye? Ku li dawiyê mirin jî hebe ma gelo ya herî girîng ev çûn û hatin e û ev têkiliyên mirovan e? Û gelek pirsên din mirov ji xwe dike. Hewce ye zanyarên di vî warî de pispor in li van qadan lekolînên berfireh bikin.

Berî niha jî hatibû ravekirin ku her aliyekî sînorên nava Kurdistanê xwedî cihekî cuda ye. Bandora têkiliyên navbera dewletan, erdnigarî û bi taybetî bandora şoreşa azadiya Kurdan li ser vê yekê gelek e. Ji bo mînak, ji ber ku li Îraqê têkoşîna Kurdan seraqet bi germî dom kiriye gelek hereketên derveyî sînor li ser sînorên Tirkiye û Îraqê, Îran û Îraqê hatine kirin. Qaçaxçîtî jî herî zêde li ser sînorê Tirkiye û Sûriyeyê hatiye kirin û li vî sînorî bê hejmar mayin hatine çandin û hwd. Vê bandor li vê xebatê jî kir. Ji bo mînak, di beşa operesyonên derveyî sînor de, giraniya sînorê Tirkiye û Îraqê zêdetir bû. Di vê beşê de mijara me mayin û qaçaxçîtî ye. Ji ber ku qaçaxçîtî gelekî lê bûye û mayin herî zêde li vir hatine çandin em di vê beşê de gelekî li ser sînorê Tirkiye û Sûriyeyê rawestiyan.

Em ê niha dîsa derbasî sînorê di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de bibin. Le vê carê em ê li ser çûn û hatinê ku bi siyasetê ve girêdayî ye bisekinin. Erê qaçaxçîtiya li ser sînor di serê salên 1980'yî de xelas bû, lê pirsgirêkên sînor bi awayekî din dom kirin. Ji ber sedemên siyasî, Tirkiye bi zêdebarî li ser parastina sînorê Sûriyeyê sekinî. Sala 1983'yan li sînor mayinên bi hêztir hatin çandin. Wekî din berî derbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê û piştî wê, ji ber zilm û zordariya tund gelek mirov bi qaçaxî derketin derveyî welêt. Ew derketin piştre jî wê bidomiya.

Di vê demê de gelek kesên welatparêz mirina xwe dan ber çavên xwe, di nav erdên mayinkirî re derbas bûn û bi qaçaxî derketin derveyî welêt. Erê rêwîtiya wan wilo dest pê kir; li nav erdên mayinkirî bi mirinê re rû bi rû man û hinek ji wan bi tesadufî xelas bûn. Yek ji wan mirovan Mehmed Uzun bû, yê ku bi xebatên xwe yên li Ewrûpayê hiştiye ku edebiyata Kurdî nefeseke girîng bistîne. Uzun, sala 1977'an mirina xwe da ber çavan, xwe li nav erdên

[326] Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik, bnb., r. 120

mayinkirî qeliband û dest bi rêwîtiya xwe ya ber bi Ewrûpayê kir. Xwedê zane, gelo çend Mehmed Uzun, bêyî ku xebera kesî ji wan çêbibe di van riyan de jiyana xwe ji dest dane, yan jî felekek hatiye serê wan.

Ka em li wê dema ku Mehmed Uzun tesadufî ji mirinê xelas bûye guhdar bikin. Uzun, çend caran derdikeve ber dadgehê, du caran tê girtin û zêdetirî du salan di girtîgehê de dimîne. Piştî ji girtîgehê derdikeve ji ber dozên didomin, dibû ku dîsa biketa girtîgehê. Ji ber vê sedemê Uzun, biryarê dide ku bi qaçaxî derkeve derveyî welêt. Uzun di berhema xwe ya bi nave 'Keskesora Ruh' (Ruhun Gökkuşağı) de derbasbûna xwe ya sînor û destpêka rêwîtiya xwe ya ber bi derveyî welat wisa vedibêjê: "... min li ser dozên xwe yên ku didomiyan heftê û şeş rûpel parêzname nîvîsand û bi postayê ji dadgeha nû ya li Enqerê ku wê min darizîne re rê kir. Min kopiyeke wê jî teslîmî parêzerê xwe kir. Ez li benda Necmedînê ku li Rojhilata Navîn an li Ewrûpayê bi karên dîplomatîkî û siyasî re mijûl bû mam. Piştî çend mehan ku ez li bendê mam û min amedekarî kirin min û Necmedîn li bajarê xwe yê zarokatiyê me hevdu dît. Ji wir em çûn Amedê û ji Amedê em derbasî Nisêbînê bûn. Şeveke nîvê şevê, devereke ji bajêr dûr, li qelaçên çiya, di bin qûna qerekoleke eskeriyê de, bi boxçika ku min çend pirtûk û defter xistibûnê avêtibû pişta xwe, li pêşiya me qaçaxçiyên bi çek û rext, piştre em li dû wan, me erdên mayinkirî derbas kirin û me xwe gihand Sûriyeyê.

Di vê derbasbûnê de ez dîsa bûm şahidê zîrekbûn û jêhatîbûna Necmedîn, her tişt bi mukemelî plan kiribû. Ji ber ku em dostê hev bûn ne tenê alîkarî bi min re dikir, jiyana xwe jî ji bo min dixist xetereyê. Wê şeva tarî, me dengên wawîkan ji dûr ve his dikir û em ketibûn nav erdên bi çaqil û mayinkirî, ber bi Sûriyeyê ve diçûn. Ji nişkê ve rêberê me di cihê xwe de rawestiya, li qelevîska rûnişt û bi pistepist ji me re got ku, em hew dikarin herin, em mecbûr in vegerin. Bi ser riya ku berê zanibû ya li nav mayinan ku wek şivîleyekê bû, venedibû. Eskeran dîtibûn ku di wê riyê re seraqet însan derbas dibin, ciyên mayinan guhertibûn; her tişt tevlihev kiribûn da ku kes nikaribe derbas bibe. Rêberê me gelekî tirsiyabû, ji dest xwe çûbû, nema karibû gavekê bavêje. Lê divê em biçûna û heger em vegeriyana dibû ku eskerên qereqolê bi me bihisiyana û em bihatina girtin. Necmedîn bi sebir piştî ku rêber haş kir, ew çû pêş û ez jî xistim pişt xwe. Bi destê min girt û bêyî ku çîmên xwe yên dirêj ji ser rûyê erdê rake, lingê xwe bi ser rûyê erdê ve dixijikand, gava tiliyên lingê wî rastî mayinê dihat berê lingê xwe diguhert, her car li min dizivirî digote min ku ez jî eynî wek wî bikim. Ji şopa wî ez milîmekê şaş nebûm û min jî lingên xwe wek ên wî bi erdê ve dibirin. Wê

şeva germ ji her derên bedena me xwêdana sar û cemidî xwe berdida. Piştî çend saetên dûvdirêj ên rêwîtiya mirinê, me xwe gihand wî aliyê din ê sînor, axa Binxetê devera Kurd lê dijîn.

Ku ne ji Necmedîn bûya min ê qet nikaribûya derbas bibûma. Min xwe xelas kiribû, ez ji dozan, ji cezayên didan ser pişta min, ji girtîgehan hinekî dûr ketibûm, lê min hîn nizanibû ku ev ji aliyekî ve sirgûn e û min ne tenê tirs û mitaleyên xwe, lê belê her tiştên ku min dikirin min jî li dû xwe hiştiye."[327]

Piştî derbeya leşkerî ya sala 1980'yî bi hezaran mirov koçî xeribiyê kirin. Hinekan ji wan piştî demeke kurt biryara şoreşa çekdarî dan û dîsa li welat vegeriyan. PKK'yiyan sala 1984'an dest bi têkoşîna çekdarî kirin. Ev bû destpêka demeke nû. Bi têkoşîna çekdarî re çûn û hatina di sînor re zêde bû û îcar armanceke wê ya cuda hebû. Dema pevçûnên li ser sînor pêk dihatin vêca yan di navbera mirovên ku diçûn bibin gerîla, yan jî mirovên perwerdehiya gerîlatiyê stendibûn û vedigeriyan Tirkiyeyê û eskeran de bûn. Şerên gerîlayên PKK'yî û hêzên ewlehiyê yên li ser sînor roj bi roj li her deverên Tirkiyeyê belav bûn û piştre ev şer derbasî derveyî sînoran jî bû.

Di encama bûyerên piştî vî şerî de, mayin ne tenê li sînoran, li deverên dûrî sînoran jî hatin bikaranîn. Di navbera 1989 û 1992'yan de li Rojhilat û Başûrêrojhilatê Tirkî(Kurdistana di sînorê Tirkî de) li derdorên tesîsên ewlehiyê, ji nû ve 39 hezar û 569 mayin hatine danîn. Li derdorên gundên hatine valakirin jî mayin hatin danîn. Gelek ji van gundan li ser rêgeha mirovên sivîl bûn, mirov li ser van riyan diçûn û dihatin. Vê neqlê gelek mirov li mala xwe, li nav erd û zeviyên xwe, li ser riya çûn û hatina deverekê, bûn qurbana mayinan. Lê belê dîsa jî çikandina mayinan nesekinî. Wek mînak, li gorî rapora sala 1997'an a Komeleya Mafên Mirovan a Tirkiyeyê, mirovên herêmê gotine, gundên Farqîna Amedê Akyol, Karcalar, Ferhend, Gürme, Sulak, Eşme, Tokluca û pêncên din ji ber ku gel nexwestiye bibe qoricî ji aliyê fermandariya Tabûra Cendirmeyên Farqînê ve ji serê Tîrmehê ve der dora van gundan bi mayinan hatiye dorpêçkirin.[328]

Dîsa li gorî heman raporê, sala 1997'an, di encama pêlêkirina mayinên li riyan an li çolê, kesên bi bombeyên bêxwedî yan mermiyên topan lîstine li Herêma Rewşa Awarte û bajarên derdorê 63 mirovên sivîl mirine û bi kêmanî 93 kes birîndar bûne. Gelek kesên birîndar ji ber ku yan dest, mil, an jî piyên wan jê bûne seqet mane. Ravekirina di raporê de wisa didome:

[327] Mehmet Uzun, Ruhun Gökkuşağı, r. 353-354
[328] Rapora 1997'a a Komeleya Mafên Mirovan a Tirkiyeyê, r. 149

"Sala 1997'an, serokê beşa Ortopedî û Travmatolojiya Zanîngeha Dîcleya Amedê Doç. Dr. Serdar Necmioğlu ravekir ku, van pênc salên dawî ji ber teqîna mayinan 500 kes hatine nexweşxaneyê. Necmîoglu da xuyakirin ku, qewimînên sala 1997'an ne di nav vê hejmarê de ne û wisa domand, 'gelek mirovên birîndar çeng û paqên wan qut bûne, hinek ji wan bi giranî bi birînên mayînde bîrîndar bûne.' Necmîoglu bal kişand ser, ku bi taybetî mirovên bi mayinan birîndar ji derdora Mêrdîn, Şirnex, Licê û Qulpê ne û got: 'Heger mirov herêmê hemûyî deyne ber çavan, wê ev hejmar pênc qatan zêde bibe. Van pênc salan tenê hejmara mirovên birîndar ku hatine nexweşxaneya me û derman bûne 500 kes in. Ji xeynî vana gelek mirovên birîndar li nexweşxaneyên navçeyan tên dermankirin. Gelek mirovên birîndar bi îmkanên xwe, li malên xwe derman dibin. Ev jî dibe sedema seqetiyên mayinde.'..."[329]

Ji bo ev mirin tenê bi hejmaran nemîne em ê çend navên mirovên ku sala 1997'an bi mayinan, an bi bombeyên bêxwedî jiyana xwe ji dest dane bidin.

- Li gundê Yeşîlalana Stewrê ya bi Mêrdînê ve girêdayî, zarokekî bi navê Seydo Karataş (15) li şikefteke nêzikî gundê xwe, roja 19'ê Rêbendanê pê li mayinê kir û jiyana xwe ji dest da.

- Li bajaroka Bukardî ya bi Paloya Elezîzê ve girêdayî, gundiyekî bi navê Hasan Temizkan (21) 21'ê Rêbendanê, nîvroyê gava êzing didan hev pê li mayinê kir û jiyana xwe ji dest da.

- Li gundê Sirmalîovaya Gênca Çewlikê, roja 27'ê Rêbendanê zarokan li çolê guleya hawanekê dîtine, anîne gund û bi wan de teqiyaye; Mahmut Onay (20) û İdris Onay (18) jiyana xwe ji dest dane.

- Li gundê Oncupinara Kilîsê, Ahmet Kut (37) meha Gulanê gava erdê xwe cot dikir mayin pê de teqiyaye û jiyana xwe ji dest daye.

- Roja 16'ê Gulanê li nêzikê gundê Asmakayaya Solhana Çewlikê, zarokên bi navên Hatice Turan (14) û Mesut Demir (9) ji ber ku pê li mayinê kirine, jiyana xwe ji dest dane.[330]

Ev lîsteya ku her roj hinekên din bi ser ve zêde dibin dûvdirêj dibe. Bûyereke ku di Mijdara 2005'an de qewimiye mînakeke din a ji vanan e. Bûyer ji aliyê kesa ku mayin bi wê de teqiyabû, yanî ji aliyê Xanima Çalî (75 salî) ve ji min re hat gotin. Tiştên gotin bi kurtayî ev bûn:

Xanima Çalî, bi xweha xwe Edla (77 salî) û tiyê xwe Mihemed Seîd (82 salî) re sibehê rabûne li kerê siwar bûne, ji Çalê (gundekî Nisêbînê ye) der-

[329] Rapora 1997'a a Komeleya Mafên Mirovan a Tirkiyeyê, r. 150
[330] Rapora 1997'a ya Komeleya Mafên Mirovan a Tirkiyeyê, r. 150-151

ketine, çûne panava mezin, ji bo berûyan. Xanimê li kaşekî dimîne; tiyê wê dadikeve newalê berûyan dide hev. Xanima Çalî li ber dareke berûyan rûniştiye, berûyan ji bin darê dide hev. Mayin li ser şivîleyê ye, têla wê bi vê darê ve ye. Destê Xanima Çalî li têla mayinê dikeve û mayin pê de diteqe. Navbera wê û şivîlê 5-6 metro ye. Ji ber ku mayin li ser şivîleyê ye ew pê nehatiye kuştin, lê aliyekî wê û tevî destê wê perçeyên mayinê lê dikevin. Ew alî heta bi rehnê wê, tenişta wê hemû dişewite, birîndar dibe. Çakêtê ku lê, bi tesîra bayê mayinê bi hewa dikeve, tenê zendika destê ku birîndar bûbû maye. Bi bayê mayinê Xanima Çalî bêhiş dikeve. Dema bi ser hişê xwe ve tê, dinêre ku destê wê hemû xwîn e. Laşê wê ji aliyekî ve şewitiye. Pirtik ji hewa dibarin. Xwe bi qûnkişkê dikişîne serê kaşikekî û bangî hevalên xwe dike. Xweha wê û tiyê wê pêve tên, lê vedihewin. Dibêjin, çi bi te hatiye? Cihê mayinê bi destê xwe nîşanî wan dide, dibêje mayin bi min de teqiya. Li kerê siwar dikin, tînin Çalê. Dûre telefonê didin lawê xweha wê, tirimpêlê jê dixwazin, wê lê siwar dikin û tînin Nisêbînê nexweşxaneyê...

Bûyera ku me li jorê vegot, li derdora gundê Çalê ku bi Nisêbînê ve girêdayî ye derbas dibe. Ev gund jî gundekî ku berê hatibû valakirin bû. Wek ku me berê da xuyakirin, ev pirsgirêk li hemû herêmên gundên vala heye. Ji ber wilo piştî veger serbest bû jî gelek gundî nema karîbûn li gundên xwe vegerin. Çapameniyê jî bal kişand ser ku, her çiqasî projeya vegera gundan hebe jî, Kurdên gundên wan hatine valakirin û koçber bûne, ji ber ku li gund û derdorê mayin hatina danîn, tu kes naxwaze vegere gundê xwe. Lê heta niha ji bo vê mijarê tu çareserî nehatiye dîtin.

Mayinên li ser sînor hîn jî canan distînin. Sînorin jê wek ên Nisêbînê bi jiyangehan ve ne û erdên mayinkirî vekirî ne. Gelek caran însan bi hemd an bêhemd derbasî vê deverê dibin û tên kuştin yan jî seqet dimînin.

Ji sê behran behrek kesên ku di bûyerên herêmên li ser sînoran mirine û ji çar behran behrek ên ku birîndar bûne jî zarok in. Gelek caran bûyerên bi vî rengî pêk tên. Ji ber ku zarok tiştên ku wê biteqin nas nakin, radihêjinê û pê dilîzin, piştre jî bi wan de diteqe. Nûçeyeke Hezîrana 2005'an a ku her dem di rojnameyan de em mînakên wê dibînin vê rewşê radixe ber çavan: "(DHA -Mêrdîn) Hat ragihandin ku li navçeya Nisêbînê nêzikî çemê Çex-Çexê (Bûnisra) li sînorê Sûriyeyê, guleyeke topan a cureyê 106, a neteqyayî hat dîtin. Polêsan ji ber ku alavên wan ên îmhakirinê kêm in ew rê kirin Mêrdînê. Gule li devera ku berî niha koma komandoyan lê bi cî bûbû ji aliyê zarokan ve hatiye dîtin û zarokan ew firotine atarekî. Atar dîtiye ku ev tiştekî teqînê ye, ew biriye avêtiye çem. Lê belê ji aliyê zarokên ku di çem de sobaniyê dikin, dîsa ev tiştê bi talûke hatiye derxistin û danîne nav erdan."



*Zarok di navbera malên Nisêbînê û erda mayinkirî de ye.*[331]

Hinek zarok gava ji xwe re dilîzin bêhemdî xwe ber bi erdên mayinkirî ve diçin. Hinek ji wan gava sewalên xwe diçêrînin û sewalên wan direvin nav mayinan ew jî bi dû wan de dikevin nav mayinan. Salên dawî zarokên ku ji bo qepariyê (*Caparicaceae sp.*) bidin hev çûne nav erdên mayinkirî û canê xwe ji dest dane jî ne hindik in. Gelek qeparî (kumber, an şahfel) di nav erda mayinkirî de şîn tê. Dema xelkê bihîst ku ji qeparî derman tê çêkirin û tê firotin, wexta ku kulîlka wê derdiket zarokan ji xwe re didan hev û difirotin. Di vê navberê de mayin bi hinekan de diteqiyan, hinek seqet diman, hinekan jî jiyana xwe ji dest didan.

Gelek beşên vê mijarê hene ku gerek mirov beş bi beş li ser bisekine. Lê wek ku me berê jî îfade kir em mijarê bi tevayî di ber çavan re derbas dikin. Li ser mirovên li sînor birîndar bûne yan jiyana xwe ji dest dane, bi hindikayî be jî hinek lêkolîn hatine kirin. Yek ji van xebatan, di bin banê 'Hewldana ji bo Tirkiyeyeke bê Mayin' hatiye kirin. Em bi hin jêgirên ji xebata parêzer Sedat Yurttaş ku ji baroya Amedê berpirsiyarê Projeya Dijberiya Jibermayinên Teqandinê yên Şer û Mayinan bû, mexdûrên mayinan çi gotine em bibînin.*

Hacer Akkuş: Keça Îbrahîm û Karanfîlê.

Roja bûyerê 45 salî ye.

Navnîşana malbata wê ev e: Taxa Yildirimê, Kuçeya Tokay, Nimro:1 Nisêbîn

Dema bûyerê: Sala 1995'an

[331] Fot: Eslîxan Yildirim

* Hevpeyvîna bi mexdûran re ji aliyê Stj. Av. Cihan Güçlük, roja 01.10.2003'yan li Nisêbînê hatiye kirin, wêneyên wan hatiye kişandin û rapor hatiye amadekirin.

Cihê bûyer pêk hatiye: Navenda navçeya Nisêbînê ‘Devera ber sînor’

Em çûn mala Hacer Akkuşê û hevdîtin bi keçên wê û bûka wê re pêk hat. Ew dibêjin, bûyerê bi tevahî nizanin. Li gorî ravekirina wan, roja bûyerê gava Hacer Akkuş sewalên xwe li devara ku berê jî teqînên mayinan ên bi vî rengî pêk hatine diçêrand, pê li mayinê kiriye û jiyana xwe ji dest daye. Di teqînê de ji stûyê xwe brîndar bûye û li gor ku ew dizanin ji windakirina xwînê wefat kiriye. Wan qet tu carî ji aliyê qanûnî ve serî li tu derê nedane. Li ser bûyerê ji dadgehê carekê du caran teblîgat hatiye, lê belê wan ev neşopandiye û ew nizanin çi bûye. Hacer Akkuş bêyî ku bigihê nexweşxaneyê wefat kiriye.

Zilamê Hacer Akkuşê û 8 zarokên wê, li navnîşana li jorê nivîsandî ye dimînin. Ew bi xwe debara xwe ya aborî dikin.



*Süleyman Demirağ*

Süleyman Demirağ: Kurê M. Emin û Siltanê ye

Rojbûna wî: 1986, Nisêbîn

Navnîşan: Taxa Yenî Turan, Kuçeya Karanfîl Nimro:37 - Nisêbîn

Dema bûyerê: 03.07.1997

Ciyê bûyer pêk hatiye: Navenda navçeya Nisêbînê ‘Devera ber sînor’

Bi malbata xwe re rûdinê. Lîse di sala 2003’yan de qedandiye, a niha diçe dersxaneyê amadekariya azmûna zanîngehê dike. Rastûrê bi mexdûr re hat axaftin û pêk hatina bûyerê ji devê wî wisan e:

“Roja ku bûyer qewimî êvarê hîn reş neketibû erdê, ez û hevalê xwe Xeyredîn Coşar li ber sînor me sewalên xwe diçêrandin. Devera bûyer lê qewimî erda mayinkirî bû û berî niha jî bûyerên bi vî rengî pêk hatibûn. Lê belê ne têl, ne lewheyên şiyarkirinê û ne jî eskerên nobedar hebûn. Eskerên nobedar têra xwe dûrî devera bûyerê, di quleya raçavkirinê de nobedarî dikirin. Em ketin nav erdê, li derdora 30-35 mayinên kesk ên tarî û di şêweya qutîkên konserveyan de li ser axê xuya dikirin. Bela wela bûn. Me zanibû ku ew mayin in. Xeyredîn rahişt yekê ji wan û ji xwe re pê lîst. Piştre da min û min jî hinekî xwe pê daxist. Wê kêliyê sewalên me dûrî me ji xwe re diçêriyan. Min xwest bi destên xwe mayinê bikim du parçe, lê min kir nekir

min nikaribû. Piştre bêyî ku ez bavêjim, min bi destê xwe li kevirê mezin ê pêşiya xwe ku nîvê wî di axê de çiqyayî bû xist. Çilo min li kevir xist teqiya. Ez ketim erdê. Dîsa ez rabûm ser xwe min du gav avêtin lê çavên min neditîn û ez dîsa ketim. Gava ez dîsa ketim min destên xwe peland, min fêm kir ku destê min ê rastê qut bûye. Ji destê xwe, rûyê xwe û ji paqa xwe ez birîndar bûbûm. Ez dibêm mayin nîv mayin bû, yanî berê hina pê lîstibû. Ji ber bi min wek ku bûbû du parçe û qelpaxê wê ne li ser bû, loma min pê lîst. Teqîn jî ew qasî ne dijwar bû. Ez dibêm berê hinekên din pê lîstibûn, loma teqîna wê ne dijwar bû.

Ez li ser hişê xwe bûm. Yekî nêzikî me hat bi min ve û ez birim nexweşxanê. Xeyredîn ew qasî birîndar nebûbû. Tenê hin deverên wî zelitîbûn û hew. Ez li Nisêbîn, Mêrdîn, Amedê li fakulteyê hatim dermankirin. Li fakulteyê çar rojan ez di bin guhdaneke bê navber de razam û bi tevahî 12 rojan ez li vê nexweşxaneyê mam. Li beşên çav û ortopediyê ez ameliyat bûm. Berî niha bi çar sal û nîvan li Nexweşxaneya Çavan a Kartala Stenbolê ez dîsa tedawî bûm. Niha çavê min ê rastê ji % 5 dibîne. Çavê min ê çepê jî zerar dîtiye, destê min ê rastê tune û çîmên min zelitîne. Li ser rûyê min dewsên barûdê û li ser çeneya min dewsa birîneke mezin heye. Dê û bavên min tirsiyane û doz li îdareyê venekirine. Lê gava ez bibim 18 salî, ez bi niyet im ku ez dozê vekim. Heta ji ber vê min dixwest ez bibim hiqûqnas, lê min fikara xwe guhert. Ez niha dixwazim bibim endezyarê genetîkê, yan jî kompîturê. Par ez ketim azmûnê lê belê min qezenc nekir. Piştî bûyerê min dest bi dibistana navîn kir, min gelek zehmetî kişand. Ez ji çavên xwe seraqet nexweş bûm û ji ber min destê xwe yê rastê windakiribû, min hewl dida bi destê çepê binivîsim û ev jî ji bo min gelekî zor bû. Niha ez elimîm, rihettir im. Bavê min pîr e, em 9 xwişk û bira ne û 4 ji wan zewicîne. Ez ê 7'emîn im. Birayê min ê mezin û xwişka min a li Stenbolê dixebitin, debara malbata me dikin. Tu sixorta me ya civakî tune ye. Ez bi qarta kesk tedawî bûm. Lê belê dîsa jî heqê gelek mesrefên min ê dermankirinê û bi taybetî heqê ameliyata min a li Kartalê malbata min da. Ez naxwazim di cihê destê xwe yê rastê de protez bi kar bînim. Bi min protez tiştekî ku divê ez ji mecbûrî hilgirim e, bi min tiştekî xerîb tê, loma ez naxwazim bi kar bînim."

Berî niha em li ser rawestiyabûn ku bi sedan, bi hezaran malbat di encama teqîna mayinan de şeperze bûne. Malbatên mirovên ku bi teqîna mayinan birîndar bûne jî bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû dimînin. Ev pirsgirêk bandorê li ser hemû civakê dikin. Berî her tiştî li kuçe û kolanên bajar, gund û navçeyên li ber sînor ên wek Colemêrg, Şirnex, Sêrt û Mêrdînê mirov pêrgî

gelek kesên dest û piyên wan qutbûyî dibe û ev dilê mirovan diêşîne. Li aliyekî din mirovên ji ber teqîna mayinan filitîne xwedî gelek pirsgirêkên dijwar in. Pirsgirêkên herî girîng ên fizîkî, ciwakî û psîkolojîk in. Gerek dewlet bi hemû awayî xwedî li van kesan derketa lê beşeke hindik ji van kesan alîkariya dewletê dîtine. Ev xizmet ji aliyê dewletê ve nayên dayin, mirovê mexdûr bi tena serê wan tên hiştin. Bi wan re malbatên wan jî mexdûr dibin. Ji ber ku teqîna mayinan pirsgirekeke hiqûqî ye jî, gelek mexdûr ji bo li heqê xwe bigerin serî li riyên hiqûqî nadin û ew bi xwe tedawiya xwe dikin. Ev jî têkçûna madî û manevî bi xwe re tîne. Jixwe heta van demên dawî tu derên vê xizmetê bidin jî tune bûn. Niha tenê navenda rehabilîtasyonê li Zanengeha Dîcleyê heye û ew jî têra hemû tiştî û hemû kesî nake.

Çawa netewdewletan guh nedabe mirovên ev bi hezar salane di nav hev de jiyane, dê û welediyê, welat û dilsoziyê û ew parçe kiribin; mayinan jî eynî tişt kirin û hêjî dikin. Welatê Kurdan, erdên herî bi bereket ên cîhanê bi mayinan, bi têlên direhî veguheriye cihê mirinê. Bi kurtasî Kurdistan bi van sînoran her kêliyê di nav êgir de ye.

Heger em rewşa mayinên li Tirkiyeyê bi tevahî bidin ber çava, li herêmê sînor ên Tirkiyeyê gelek antîpersonel mayin hene. Sala 2002'yan mehên Hezîran û Gulanê berpirsiyarên Tirk dan xuyakirin ku, di navbera 1956 û 1969'an de 900 000 an 935 000 mayin li sînor hatine danîn. Hat ravekirin ku, gelek ji wan (615 419) li sînorê Sûriyeyê ne. Li gorî raporên Komeleya Mafên Mirovan (İHD) nexşeyên van mayinan jî nîn in. Yanî berpirsyar jî nizanin bê mayin li ku û ku hatine danîn. Wek ku me gotibû, dem bi dem danîna mayinan dom kiriye. Di salên 1990'î de ne tenê li deverên sînor, li gundên hatine valakirin, li derdorên tesîsên ewlehiyê danîna mayina berdewam kir. Ev mayin hemû di kemînê de ne, her mayinekê ji wan an wê ruhê yê ku di ser re derbas bibe bistîne, yan jî wê seqet bihêle. Dema şer û aştiyê ji mayinan re ferq nake, ew hey canan distînin; sivîl, zarok, karmendekî ewlehiyê, milîtan qet ferq nake. Li Tirkiyeyê her serê sê rojan mirovek bi teqîna mayinê jiyana xwe ji dest dide, yan jî seqet dimîne. Ji bo welatekî çiqasî ev ne rewşeke xweş be jî, ji ber ku yên mexdûr Kurd in, kes ceger nake bi ser vê mijarê de here û meseleyê raxe ser maseyê.

Li Tirkiyeyê ji aliyê fermî ve cara pêşî Parlamenterê Mêrdînê Nurettîn Yilmaz û 45 hevalên wî, roja 15.01.1975'an ji bo ku mayinên li ser sînorên Sûriyeyê bên paqijkirin û dever ji bo cotkariyê werin vekirin, bi daxwaznameyekê serî li parlementoyê dan. Di daxwaznameyê de tê ravekirin ku, li Başûrêrojhilat 350 hezar dekar erd ji sala 1955'an ve hatiye mayinkirin, bi

têlên direhî hatiye dorpêçkirin û ev der bûye devera qedexe. Li ser vê daxwaznameyê komîsyona parlementoyê ya lêkolînê komîsyoneke di bin banê xwe de ava kir, li herêmên sînor xebat hatin kirin, lê belê dawiyê encameke erênî nehat bidestxistin. Heta berovajî vê parastinên li ser sînor zêdetir bûn û dîsa mayin hatin danîn.


*M. Emîn Alp (Salên 1960'î). Bi birîndariya li ser sînor lingê wî jî seqet ma.*

Jixwe mayin û bikaranîna mayinan pirsgirêkeke gerdûnî ye. Niha li tewahiya cîhanê di nav axê de nêzikî 110 milyon mayin hene. Mayin dibe sebeba ku her serê 20 deqîqeyan însanek û salê 25 hezar însan bên kuştin. Mayin sîleheke wisa ye ku, bi rihetî û zû tê bidestxistin, lê piştî bidestxistinê îmhakirina wan pir zehmet e. Mayin bi 3 dolaran tê çêkirin, di navbera 50 û 100 salî de emrê wan heye û encex bi mesrefeke 300-1000 dolarî tên paqijkirin.

Sala 1992'yan bi alîkariya çend saziyên sivîl ên Ewrûpa û Amerîkayê qampanyayek hat dêstpêkirin. Di dawiya xebata 5 salan a vê qampanyayê de, bi Sondxwarina Ottowayê mayinên bejahiyê hatin qedexekirin. Îro zêdetirî 1400 saziyên sivîl piştgiriyê didin vê qampanyayê. Qampanyaya Qedexekirina Mayinan a Navnetewî (ICBL), di sala 1997'an de, ji bo alîkarî û keda wî ya bi rûmet ya di amadekirin û xistina meriyetê ya teksta kampanyayê de di şexsê Joly Williams de layîqî xelata Nobelê ya Aştiyê hat dîtin.

Ku em bi kurtasî bibêjin, 'Sondxwarina Qedexekirina Bikaranîn, Depokirin, Çêkirin û Dewirkirina Mayinên Antî Personel û Îmhakirina Wan' ku wek 'Sondxwarina Ottowayê' jî tê zanîn, 4.11.1997'an li Ottowayê (Kanada) derdikeve ber îmzêyan, 1'ê Adara 1999'an jî dikeve meriyetê. Ev ji aliyê 150 dewletan ve hatiye îmzekirin û nêzikî 140 dewletî li gor vê sondxwarinê tevgeriyaye.

Dewletên ku Sondxwarina Ottowayê îmze kirine, divê di nava çar salan de mayinên depokirî îmha bikin û di nava deh salan de jî mayinên hatine danîn rakin. Li gorî ku lêkolînan ragihandiye, bi tevayî mayinên di depoyan de li dor 220 milyonî bûn.

Ji bo cîhaneke bê mayin, li gor vê sondxwarinê li dewletên berpirsiyar konferans tên lidarxistin, tespît tên kirin, pêdiviyên ji bo stendina tedbîran tên bicihanîn. Dewletên ku ev sondxwarin îmze kirine gelek ji wan dest bi

îmhakirina bi milyonan mayinên xwe kirine. Bi van hewldanan hêviya cîhaneke bê mayin tê kirin.

Li Tirkiyeyê jî, ji wan demên pêşî ve li ser vê mijarê konferans hatin lidarxistin, lêkolîn hatin kirin, ji bo paqijkirina mayinan were destpêkirin proje hatin çêkirin. Her çiqasî Tirkiyeyê berî vê tevlêbûnê dest bi karên di vî warî de kiribê jî, encex sala 2003'an bû alîgirê vê sondxawrinê. Qewlên li gor vê sondxwarinê ji Tirkiyeyê re hatine ferzkirin 1'ê Adara 2004'an dest pê kirin. Li ser mayinên li Tirkiyeyê tespît hatin kirin. Di rapora Koma Miletan a Nîsana 2004 û Tebax 2004'an de ev agahî hene: Di depoyan de 2 milyon û 976 hezar û 165; di bin axê de 921 hezar û 80 mayin hene. Li 15 bajarên Kurd lê dijîn di bin axê de mayin hene. Li gorî tabloyeke di malpera 'Rexistina Tirkiyeyeke Bê Mayin' de Mayinên Antîpersonel ên depokirî ev in.

| | |
|---|---|
| DM-11 | 1,741,864 |
| Seriyên M2 | 146,882 |
| Seriyên M14 | 1,005,461 |
| Seriyên M16 | 43,853 |
| Seriyên M18 | 18,236 |
| ADAM | 22,788 |
| Ên nayîn zanin | 81 |
| Bi tevahî: | 2,979,165 |

Li gor qewlê ku Tirkiyeyê bi 'Sondxwarina Ottowayê' re daye divê heta 1'ê Adara 2008'an hemû stoqên xwe yên mayinên antî personel tune bike. Û wekî din, divê Tirkiye heta sala 2014'an nêzikî milyonek mayinên ku di erdê de çikandiye jî paqij bike.

Li gor çavkaniyan hin kitekit jî wihan in: Ji bo ku Tirkiye karibe heta sala 2014'an van mayinan paqij bike, wê di bin rêveberiya Wezareta Maliyeyê de bi teknîka outsourcing erdên mayinkirî paqij bike. Pêşiyê sînorên Sûriyeyê ku erda wê ya mayinkirî 510 km ye û 615.419 mayin di bin erdê de ne; dûre sînorê Îraqê ku 42 km ye û 75.115 mayin lê hene; sînorê Îranê ku 109 km ye û 191.428 mayin dibin erdê de ne; sînorê Ermenîstanê 17 kîlometre ye û

21.984 mayin di bin axê de ne wê paqij bike. Ji bo paqijkirina mayinan îhale hatine vekirin. Îhaleya yekem Sibata 2006'an têk çûye û îhaleyeke nû vebûye. Li gor van tevgeran diyar e ku paqijkirina mayinan hîn wê demeke dûdirêj bigire.

Û heta bên paqijkirin wê ev mayin hê jî canan bistînin. Em ji hin nûçeyên çapemeniyê li windahiyên van salên dawî ên bi teqîna mayinan pêk hatine binêrin:

20.04.2004: Li herêma Rojhilat û Başûrêrojhilat di vê sala dawî de 7 zarokan jiyana xwe ji dest daye û 21 zarok jî seqet mane.

25.11.2005: Li gor rapora Rexistina Şopandina Mayinên Bejahiyê tenê li Tirkiyeyê, di navbera salên 2004 û 2005'an de ji ber mayinan 24 sivîlan jiyana xwe ji dest daye, 111 sivîl birîndar bûne; 52 eskeran jiyana xwe ji dest daye û 229 esker birîndar bûne.

Li gor îstatîstîkên Hewldana Tirkiyeyeke bê Mayin, sala 2006'an li Tirkiyeyê 145 kes bûne mexdûrên mayinan an alavên eskerî yên neteqiyayî: 106 kes birîndar bûne û 39 kesan jiyana xwe ji dest daye.

17.04.2007: Li Kilîsê mirovekî dixwest ji Sûriyeyê derbasî Tirkiyeyê bibe pê li mayinê kiriye û birîndar bûye.

20.05.07: Li Amedê ji ber teqîna mayina ku ji alî PKK'yê ve hatiye danîn 2 kes birîndar bûne.

23.07.2007: Li navçeya Çildêrana Wanê, ji ber mayina ku li çolê hatiye danîn, du birayên li ber pêzê xwe birîndar bûne.

04.08.2007: Li navçeya Dîcleya Amedê, ji ber teqîna mayinê 3 esker mirine û eskerek birîndar bûye.

14.09.2007: Li navçeya Erûha Sêrtê li bejahiya Dağdöşüyê, şêva berê saet 20:30'an de 3 qoriciyên dewriye digeriyan pê li mayinê kirine. Di encamê de Abdulselam Sevgin û du qoriciyên navên wan nediyar birîndar bûne.

18.09.2007: Li Çewlikê di encama alaveke teqîner de mirovekî ku di karê ewlehiyê de ye birîndar bûye.

29.10.2007: Li naveçeya Perwariya Sêrtê, ustegmenekî pê li mayinê kiriye, birîndar bûye.

29.10.2007: Li Dersimê, bi teqîna mayinê Uzman çawîşek mir.

08.10.2007: Li navçeya Licêya Amedê, bi teqîna mayinê astsubayek mir, 3 esker birîndar bûn.

11.11.2007: Li navçeya Gevera Colemergê li devera çiyayî, duh ji ber ku sewaleke wî pê li mayinê kiriye mirovekî ku sewalên xwe diçêrand birîndar bûye.

Li Qilebana Şirnexê li devera çiyayî, ji ber sedema ku dewarên diçêriyan pê li mayinê kirine hêstirek telef bûye.

23.04.2008: Li Tetwana Bedlîsê, bi teqîna mayinê du zarok birîndar bûne.

Heke mayin bên rakirin ev hemû mirin, birîndarbûn û pirsgirêk wê ji holê rabin û ku erdên ji van deran bên bidestxistin li gundiyên bê erd bên belavkirin, bi texmînî 4000 (çar hezar) malbatên bê erd wê bibin xwedî erd. Yanî paqijkirina mayinan bêguman bi her awayî erênî ye.

Xebatin ji bo rakirina mayinan hene lê ne bes e, berî hemû tiştî divê aştî hebe. Heke sedemên şer ji holê bên rakirin mayin jî bi tevahî dikarin ji jiyana mirovan derkevin. Devera ku heskirin û aştî lê hebe, wê kesek tehamulî mayina, van sîlehên xedar neke.

Li ser vê mijarê barê herî girîng dikeve ser milên hikûmet, dewlet, hunermend û mirovên zanist. Her çiqasî ji ber van mijaran gelek mirov bi rewşên xedar re rû bi rû mabin jî, bi awayekî berfireh têra xwe li ser mayin û sînoran nehatiye rawestin. Bi hindikayî be jî xebatên gelekî hêja yên ku ev mijar radestî xwe kirine hene lê, zêde belav nebûne. Di deh salên dawî de li ser vê mijarê hin fîlmên sînemayê û yên televizyonan hatine çêkirin. Fîlmê derhêner Şerîf Gören ê bi navê ‘Katırcılar’, ê bi navê ‘Kara Çarşaflı Gelin’, ê Sînan Çetîn ‘Propaganda’ mînakên hêja yên berbiçav in.

Derhênerê Kurd Bahman Ghobadi jî, ku li her deverê cîhanê bi nav û deng e, di fîlmên xwe de li ser vê mijarê disekine. Di fîlmê wî yê bi navê ‘Dema Hespên Serxweş’ de mijar ticareta sînor a di navbera Kurdên Îranê û Kurdên Îraqê de ye. Çîroka fîlmê wî yê bi navê ‘Kûsî Jî Difirin’ li qampeke penaberên di sînorê Tirkiyeyê û Îraqê de yê di gava mudehaleya Amerikayê ya li Îraqê dihat nîqaşkirin de derbas dibe û zarokên ku ji sînor mayinan berhev dikin û difiroşin li pêş in. Vî fîlmî xelatên navnetewî stendin. Di nûçeyeke 24.11.2007’an de di der barê vî fîlmî de wiha dinivîsî: “Senaryoya fîlmê rejîsorê Kurd Bahman Qubadî ‘Kûsî Jî Difirin’ ku li San Sebastiyanê xelata ‘Îstîridyeya Zêrîn’ li Portekîzê ‘Xelata Fibresci’, Li Kraliyeta Yekbûyî ‘Xelata Azadiya Ramanê’ û li gelek welatan bi giştî 40 xelat girtibû niha wekî pirtûk derket pêşberî xwendevanan.” Wek vê mînakê ku xebatin hêja bên kirin bêguman wê bal bêhtir bi ser vê mijarê ve bê kişandin.



*Ev wêne ji fîlimê "Kûsî Jî Difirin" hatiye girtin. Selika li pişta keçikê bi mayinên ji erdê hatine berhevkirin dagirtî ye.*

Rojnameger Ahmet Şık jî ji bo balê bikişîne ser mirovên bi mayinan jiyana xwe ji dest dane û birîndar bûne du caran pêşangeh li dar xist. Ahmet Şık, bi navê 'Nêrîna Li Janên Mirovên Din' (Başkasının Acısına Bakmak) 2 pêşangeh ji wêneyên mirovên ji ber mayin û şer birîndar bûne li dar xistine. Ahmet Şık li ser van pêşangehan dibêje, "Min xwest ez aciziyê bidim. Mirovên ku dipirsin dibêjin, 'Ma li Tirkiyeyê mayin hene?' jî bela aciz bibin. An jî mirovên bi vana dizanin û li mala xwe rûdinên û xwe bi mahneyan dixapînin jî bila ne rihet bibin." Û bi ser vedike, "Ji ber ku encex dema hejmara mirovên dilbiêş zêde bibe wê çareserkirin jî zû pêk were. Û erê em hêvî bikin ku hinek vê êşê hîs bikin." Hin sûretên ku Ahmet Şik kişandine û di pêşangehê de cih stendine, di vê behremê de hatin bikaranîn.



*Fot: Ahmet Şık*

Berî em derbasî serpêhatiyan bibin ka em guh bidin 'Nameya Yilmaz Erdogan', a ku bi riya rojnameyê di Tîrmeha 2006'an de hatibû weşandin:

Nekin!

Mayinan daneynin rêgeha pêşeroja me.

Ne diyar e bê ev bêbext wê kîngê biteqe.

Carna piştî bi salan, pêrgî keçikeke biçûk ku kulîlkan berhev dike tê, carna mirov hîn bîst salî ye, li devereke ku te qet berê nedîtiye, li nav mirovên ku te qet ew nas nekirine di rêwîtiyeke hem makezagonî, hem siyasî, hem pîroz de...


Benîademan her tiştê xerab îcat kir; lê ji mayinê qehpetir tune ye.

Her sîleh dikare bikuje, her dem potansiyela kuştinê pê re heye; lê mayin TEQEZ DIKUJE.

Mayin derba xwe vala bernade! Ew hey yekî dikuje! Heta ku canek pê lê bike biteqe, dikeve kemîneke bêyom.

Tiştê HERÎ KIRÊT Ê ku însan îcat kiriye sîleh e!

Û sîleha HERÎ KIRÊT JÎ MAYIN e!



*Husametîn Kar di sala 1946'an de ji dayik bûbû û xwedî sê zarokan bû. Di sînorê Nisêbînê de hat kuştin.*

Her mirin mirineke bêwext e, lê mirina bi mayinan a herî zû ye û kuştineke bi bêbextî ye. Mayinên ku ferqê naxin navbera tu tiştî, zarokan, dayîkan, eskeran, xwediyên xwe, dijminê xwe, ajalan, xwezayê parçe dike, tune dike; dijminekî dijwar e. Mayin di vî qirnê me de rûreşiyeke mirovahiyê ye... Ez çiqasî bêjim ez ê nikaribim mayinan îfade bikim. Herî bêhtir em mirovên ku li ber sînor dijîn, ew kesên ku erdên mayinkirî derbaskirine û ew ên li vir birîndar bûne zanin. Gotin têra vegotinê nake, dema ev behs dibe nava me diricife...

Navçeya me Nisêbîn, wan demên ku qaçaxî gelekî dihat kirin her roj bi xeberên mirovên li sînor dihatin kuştin an birîndar dibûn tevlihev dibû. Sala 1971'ê bû. Yek ji cîranên me li ser sînor hat kuştin. Ev bûyer tu carî ji bîra min neçû. Navê vî xortê spehî Husamettîn Kar bû. Hîn xort bû, 3 zarokên wî hebûn. Li sînor mayin pê de teqiyabû.

Wê demê ez 11 salî me. Dema laşê wî anîn ez jî li zikakê bûm. Gelek xelk li ber deriyê wan civiyabû. Digotin, zavê wî ew ji nav têlan derxistiye, li pişta xwe kiriye, aniye. Di heman demê de hinên din jî hatibûn kuştin. Xelkê digot, xortikek ji wan serê wî ji stûyê wî qetyaye li ser rehekê maye. Ev gotin tu carî ji bîra min neçû. Her behsa mayinan tê kirin ew gotin tê bîra min. Gelekên din jî yê ku hatin kuştin tên bîra min. Yek jê Hebîsî bû; digotin heta sibehê di nav têlan de kiribû hawar û nalîn, lê ji tirsa esker kesî nikaribû here pê ve û ji xwînwindakirinê miribû. Yek jî Talatî bû, li ser xanî fişeka esker lê ket û mir. Ji ber ku nas bû bavê min bi laşê wî re çûbû gundê Talatê. Jixwe yên ku seqet diman me her tim li kuçeyan, li sûkan didîtin. Bêguman bandoreke xeternak a van bûyera li ser hemû kesan û bi piranî jî li ser zarokan çêbû.

Kuştinên bi mayinan ji xwe bi serê xwe kuştinên bi ecêb bûn. Ji bilî vê zilma ku li ser sînor bi însanan dihat kirin jî tiştekî bêterîf bû. Dema niha jî tê bîra min tevzînok bi min ve hildikişin. Di mêjiyê şêniyên herêmên sînor hemûyan de êşa bûyerên li ser sînor gelek e. Sînor, tenê peyvek e lê çiqas tiştan û êşê tîne bîra me, bîra yên li ber sînoran dijîn. Di vir de em li hin bîranîn û serpêhatiyan binêrin, bêguman wê ji gotinên min gelekî bêhtir tiştina bidin xuyakirin. Ewil ez dixwazim hebekî behsa danheva van bîranîn û serpêhatiyan bikim.

Wek ku tê zanîn bi sed hezaran kes gelek caran ev sînor derbas kirine û ew qas car jî bûyer qewimîne. Ji aliyê din ve bi deh hezaran mirov li vê riyê jiyana xwe ji dest dane, yan jî birîndar bûne. Yanî serpêhatiyên li ser sînor bêhejmar in. Loma serpêhatiyên ku me dane hev ji deveyê ne guh in jî.

Serpêhatiyên ku me dan hev ji xelkê Nisêbîn û derdora wê, Qamişlo, Serêkaniyê, Sirûc (Pirsûs) û gundên wê, Amûdê, Wanê û Bazîdê hatin danhev. Ji bilî yên ku min bi xwe bi hevdîtinan dan hev, min ji çavkaniyan jî hin serpêhatî stendin. Dera ku ez negihamê, hin hevalan ji bo vê xebatê ji bedêla min ve bi kesên ku qaçaxî kirine, bi kesên ku di sînoran de birîndar bûne têkilî danîn, bîranînên wan guhdar kirin, qeyd kirin û ji min re şandin. Bi vî awayî me xwe gihand hin kesên ku li Sûriyeyê dijîn jî. Dostekî pir hêja, sala 2005'an ji bo vê xebatê bi hin kesên ku berê qaçaxî kiribûn tekilî danî, hevpeyvîn bi wan re kir û dengê wan xist kasetan. Kaset ji me re hat û me ew hevpeyvîn ji kasetên teybê derbasî nivîsê kir. Hin ji van hevpeyvînan li Şamê, hin jê jî li Amûdê hatinê kirin. Sohbet çilo hatibû kirin bêyî ku em dest bidinê, me wilo derbasî nivîsê kir. Tenê wek ku me berê da xuyakirin ji bo hin sedeman me nav guhertin. Wek ku hûn ê bibînin ev sohbet gelek tiştan li ber çavan radixe. Serpêhatiyên ku me dane hev ne tenê di jêr de ne, di vê beşê de li cihên cuda cuda ne û hin jê jî di beşên din de ne.

Ji bo em serpêhatiyan bidin hev me pêşiyê çend navên kesên ku li sînor, di nav mayinan de hatibûn kuştin dan hev û li xwediyên wan pirsî; bê em karin li ku û kîngê hevdu bibînin. Gelek caran em ji bo navekî diçûn hevdîtinê, me didît ku ji malekê yên ku hatine kuştin ne yekî tenê ye. Li Nisêbînê Lema Beyhan a mala wê li ber sînor e, yek ji wan bû. Em ji bo ku bûyera bi serê mêrê wê de hatibû ji me re bibêje çûbûn hevdîtinê, lê me dît ne tenê mêrê wê li ser sînor hatiye kuştin. Bavê wê û kalikê wê jî bi eynî aqûbetê hatibûn kuştin. Jixwe yên bi wan re hatibûn kuştin jî hebûn.

Dema yên ku bîranînên xwe bi me re par ve kirin û kesên behsa wan demên birîndariya xwe dikirin kezeba mirov dişewîtandin. Hin jê di nav têlan de bi saetan, bi rojan birîndar mane. Kirine hawar, heta sibehê dengê wan ji guhê xelkê şêniyên ber hidûd neketiye. Kezeba xelkê şewitiye lê tişt ji destê wan nehatiye. Destûra malbatên wan bixwe nedane ku bi birîndarê xwe ve herin. Gelek ji vana ji ber xwînwindakirinê ruh dane. Yên di nav mayinan de hatine kuştin carna laşên wan nedane malbatên wan û perçeyê bedenên wan di devê heywanan de di ber xwediyê wan re derbas bûye. Dinyaya gelek dayîkan li van herêman tarî bûye, dengê kûzekûza wan li ber van sînoran betal nebûye.

Hinek jê jî, tu eleqeya wan bi sînor tune ye û bi tesadufî hatine kuştin. Li herêma me havînan ji german bi piranî xelk li ser xaniyan radizê. Tê bîra min, gotin zilamek li ser xanî di nav cihê xwe de fişekeke ji aliyê sînor hatiye lê ketiye û miriye. Li gor ji me re hat gotin, xortekî 16 salî di nav erdê pembo de li gundê Nisêbînê yê li ber sînor, li Gundikşikro cot dike. Gelek derb avêtinê û kuştine. Yek jê jî li hewşa xwe razayî ye, dema şer di nav ên qaçaxçî û esker de derdikeve ji qereqolê derb lê dikeve. Birîna wî ji dilê wî ye, 23 rojan li Nexweşxaneya Mêrdînê dimîne û jiyana xwe ji dest dide. Hinek jê bi dû heywanên xwe de çûne nav erdê mayinkirî ku wan ji wir vegerînin, mayin bi wan de teqiyaye. Hin jê ji bo heywanên xwe biçêrînin dane nav erdê hidûd û mayin bi wan û pezê wan de teqiyaye...

Xwediyê kesên ku hatibûn kuştin, dema behsa kuştiyê xwe dikirin xilolîkên wan dibariyan û em dibirin rojên bûyerê. Heta min li van serpêhatiyan guhdar kir û nivîsî min êşeke gelek giran derbas kir. Ew demên ku mirov ji însaniyetê derdikeve kêlî bi kêlî dîsa em dijiyan.

Di vê xebatê de gelek serpêhatî hene. Me bi dehan kesan re hevdîtin çêkirin. Ên ku di hidûd de birîndar bûbûn bi saetan tiştên di serê wan de bihurîbûn bi me re behr kirin. Ji van vegotinan tenê hinek me stendin. Kesê ku ez bi wan re dipeyivîm gelek jê ne rihet bûn. Hîn jî tirsek li ser wan hebû.

Di nav gotinên wan de xuya bû, tiştin ku ji xwe re vedişartin hebûn. Ên ku min ji nêzik ve nas nedikirin digotin, “Tu ji bo çi vana didî hev?” Hinan jê digot, “Qey tu ji bo bernameya televizyonê vî karî dikî?” û bi tirsa ku wê ji wan re sibe, dusibe bibe kelem bi guman dipeyivîn. Lê wek ku min di serî de gotiye, bi piranî kesên Nisêbînî, ji ber ku ez li wir dijîm û em xweş hevdu nas dikin gelek tişt bi min re par ve kirin, ez jî bi we re.

Dibe ku gelek hest û êş min qenc neanîbin ziman, lê ez bawer dikim hebekî be jî ev serpêhatî wê rastiyan bide xuyakirin. Wek ku min li jorê da xuyakirin kesên ku bîranînên xwe bi me re par ve kirin bi tirs bûn û nedixwestin ku bên hişkerekirin. Ji ber wilo, min jî wek ku min ji wan re soz dabû, min di vegotinan de nav guhertin. Yanî navê ku di serpêhatiyan de derbas dibin hemû ne navên rast in. Di vir de armanca me, em rewşa wan dema bi tevayî fêm bikin. Loma min nav guhertin. Ji aliyê din ve gotin ne li gorî rastnivîsê bin jî, min bi piranî dest nedayê û wek hatiye gotin min derbasî nivîsê kiriye. Bê şîrove, bê destdan ez dixwazim van serpêhatiyan bidim, ku her kesek li gorî nêrîna xwe ji wan tiştekî bigire û belkî ji bo mijarên cuda jî bibe alîkar. Û bêguman a herî girîng li gorî zanistiya sibê wê şîroveyên cur be cur li ser van serpêhatiyan bên kirin. Ji ber wîlo heta ji min hat ji hin guhertinên biçûk pê ve min dest neda vegotinan. Niha em derbasî bîranîn û serpêhatiyan bibin.

**Hin Bîranîn û Serpêhatî**

**Cihê Hevpeyvînê:** Nisêbîn
**Sal:** 2005

**Xanima bi navê T. A. nêzikî 60 salî bû.**
**Zêdeyî 50 salan li Nisêbînê jiyabû.**
**Bûyera ku wê bixwe dîtibû wiha ji me re vegot**:

"Meseleya lawikekî li Nisêbînê bi navê Mehmûd heye, hîn ez zarok bûm qewimîbû. Yanî berî niha bi 35-37 salî (salên berî 1970'yî). Lawik orteoqul dixwend. Mekteba wan hat şewitandin, xistin stûyê wî û 3-4 hevalên wî. Hevalên wî hatin girtin cezayê xwe derbas kirin, wî xwe neda destê polêsan, ma mehkûm. Di malê de çendakî veşartî ma. Polês li mala wî dipirsin, nas dikin; carekê du carî digirin ser mala wan, lawik zept nakin. Lawik dinêre ku xelasiya wî tune ye çû Sûriyeyê (Binxetê).

Çendakî li wir ma, ber eydê kirî bihata malê. Digotin, mirêkek pê re bû, ji xweha xwe re anîbû û her birakî xwe gumlekek ji wan re anîbû. Biryantîna poran ji xweha xwe re anîbû. Wexta hat, eskeran bêbextî pê re kirin. Rê danê, lê wexta hat, lê teqandin û kuştin. Bi derba esker hat kuştin. Bûyer li biniya malan bû, xelkê hema didît. Em diçûn ser xanî me kesên diçûn û dihatin didît. Mala diya wî jî li ber têlan bû. Bavê wî ne sax bû. Lawik miqabilî mala xwe bû, birîndar mabû di nav têlan de, nalenala wî dihat heta sibehê. Bang dikir digot, ji bo Xwedê hûn ê herin ji diya min re bêjin bila bê min xelas bike. Xelkê ew nas kiribû, kesî newêribû xwe bida ser. Bangî eskeran dikir digot, werin min xelas bikin, esker pê ve nediçû.

Lawik a dinî rojê mir. 15-16 rojan laşê wî di nav têlan de ma, li ber wê germa havînê; nizanim ne Temûz bû ne Hezîran bû. Xwediyê wî çiqasî rica kirin ji eskeriyê, ji emniyetê laşê wî nedan wan. Gotin, ileh wê li wir be, bila îbret be ji xelkê re. Îcar carê kûçik û wawik diçûn ser cenazeyê wî, goştê wî dixwarin. Diya wî jî miqabil bû. Diya wî debar nekir, aqlê xwe berda. Carê wê ji ber malê bazda bigota, hewara! Hewara! Lawo! Lawo! Lawo û biçiwa ku laşê lawê xwe bîne. Em zarok jî lê vedihewiyan, me digot qey cenazê xwe xelas kiriye.

Carkê çû rahişt laşê lawikê xwe esker kirî li ser daniya, dev jê qeriya. Kitana wê di nav têlan de ma. Destekî layê wê di destê wê de mabû, esker ew jê stend û destê layê wê bi kitana wê bi têlê ve girêda. Mezinê wan ji eskeran

re got, ku vê neqlê diya wî hat li ser deynin, bikujin. Heta 15-16 roj qediyan ji xwe hestî tenê mabû, şekala wî mabû; kûçikan û wawikan goştê wî hemû xwaribûn. Li ber germa havînê bêhn pê ketibû.

Dareke tûyan li ber riya ber têlê hebû, li miqabil hestiyên lawik bû. Esker li ser wê tuwê danîn ku nobedariyê li hestiyan bike kes neyê nebe. Ji esker re gotin, ku diya wî hat li ser deyne, bikuje. Diya lawik dibîne kûçik dirin ser laşê layê wê, bû hewar hewara wê û xwe dadayê. Ê esker jî di xewre çûye. Em pê ve bazdan. Tê bîra min diya wî hestiyê layê xwe dabû ber sênga xwe, lingek lawik tev solê pêve daliqiyayî bû dihejiya. Zavê wê hema fotak ser doşeka anî û ew hestî xistin nav, pêça wek buxçikê û ji destê wê revand û çû.

Heya esker ilm da qereqolê û esker hatin, xwe xelas kirin. Eskerî li ser wan hestiyan gelekî sekinîn; digotin, an hûn ê wan hestiyan bînin an em ê malên we hemûyan bişewitînin. Eskerê nobedar di xew re çûbû. Jê re gotin, çima tu di xew re çûyî? Ew bi dû cemsa eskeriyê vekirin û heta qereqolê vîqasî bi dû xwe de kişandin, xwînê di dev û bêvila wî re avêt. Hina digot, miriye, hina jî digot birine xestexanê; îcar mir, ma em nizanin.

Diya lawik dan mehkemê; jê re digotin, te ew hestî kirine ku bêje. Dê ji xwe aqil berdabû, nema zanibû îfada xwe bide. Hestî geh dibirin li mala cîranan vedişartin. Carekê xistibû qefesa morîkan, carekê xistibûn bin zembîlkê; cih bi cih vedişartin ji ber lêgerîna eskeriyê. Şevekê bi şev çûn tirbek jê re kolan û ew veşartin. Tirba wî wek a zarokekî ye, komikek hestî bû, xistinê. Mehkemê jî dî ku diya wî aqil berdaye, dev jê berdan."

**Cihê Hevpeyvînê:** Nisêbîn
**Sal:** 2006

**Zilamê bi navê H. T. 57 salî bû**

**Jiyana wî bi piranî li Nisêbînê derbas bûye û ji biçûkahiyê de dest bi qaçaxî û rêberiyê kiriye. Dawiyê bavê wî di nav mayinan de jiyana xwe ji dest daye**:

"Berê em li ser sînor diçûn û dihatin. Ez rêzan bûm. Em di Kanîka (Nisêbîn) de dişixulîn. Me ji Nisêbînê zilam dibirin Hilêlîkê (Gundekî bi Qamişlo ve girêdayî bû û gelekî nêzikî wê bû. Îro navbera wan tije mal bûne, ew û Qamişlo bûne yek). Min heqê rêbertiyê ji wan distend û min ew digihandin Hilêlîkê; bazara me ew bû. Ji wê derê îcar hinek diçûn Beyrûdê şixul. Kesên ku diçûn Bexdê, li ser derasa (karê çinîna erd), hemaltî (valakirin û danîna bar), dirûtina çewalan de dixebitîn. Meha mewsîmê li wir dişixulîn û vedigeriyan ji xwe û zarokên xwe re kinc dikirîn. Piştî xwe kar dikirin dîsa dihatin cem me, me bi heqê xwe ew dîsa derbas dikirin Serxetê.

Ji wir de me ji xwe re firax dianîn. Me bar ji xwe re kar dikirin. Ji Binxetê me ji xwe re wek birincê, wek xurme, qumaş, xalî, taximê qeryolê, fincanên qehwê, taximê çingo, qedehên çayê, çakêt û qapût û êlekên balya, morîkên çarikan, gerdeniyên wek qirîstal, xarên zarokan, îzolabant, radyoyên biçûçik dianî. Ji Serxetê jî me cixare (yaka, cixarên dûvsor, pakêtên tûtinê, tûtina Xursê), dewar, pez dibirin.

Rojekê ez li Sûriyeyê bûm. Sê zilam hatin ba min, ji Serxetê bûn. Li dora 35 salî bûn. Ez bixwe 13 salî bûm. Got, "Birazî ma ka bavê te?" Min got, bavê min li Serxetê ye. Ew bi navê bavê min dihatin cem min. Gotin "Ma tu karî me bibî?" Min got, erê. Ji ber ku ez zarok bûm baweriya wan bi min nehat. Got, "Ma wê bavê te bê pêşiya me?" Min got, bavê min li ser têlê ye, li pêşiya me ye. Piştî min wilo got, qinyata wan hat.

Piştî esirê baraneke gelekî ecêb xurt dihat; ji erd û ezman baran dibariya. Maleke me li Hilêlîkê jî hebû. Mala me ya li Hilêlîkê li serê gund bû. Carê eskerê Sûriyeyê derdiket, li ser têlê diket pûsûyê ji bo me bigirin. Piştî wê baranê lê kir min got, werin ji vê kêlîkê çêtir tune ye, em ê derbas bibin. Ez û birayê min î ji min biçûktir û her sê zilam, em karê xwe dikin. Di navbera Hilêlîkê û hidûd de 800 metro hebû tune bû. Min xwe û birayê xwe tena derpîkê kinik kir. Me kîsê firaxên xwe xistin kîsekî naylon, tevî cil û şekalên xwe. Di wê barana gelekî xurt de (wê kêlîkê însanan nikaribû li derve bisekinin.)

me kîsên xwe avêtin ser pişta xwe, bi her du destan me her du guhkên wan zept kir û me ji hevdu re got, hetanî bi têlê em ê bazdin. Hema got, erê û em bazdan. Hetanî nav têlan em nesekinîn.

Em hatin ber têlê. Bavê me li pêşiya me li bende me ye. Zanîbû em ê kîngê herin. Mala me li ber têlê bû. Bavê min diçû ser xaniyê me disekinî li aliyê me dinêrî, li benda îşareta me bû. Tûyek di nav mayinan de hebû ji mala me ve xuya bû. Carê min destmala stûyê xwe bi wê tûyê ve didaliqand, bavê min fêm dikir ku ez li wir im. Li malê, me ji tenekeyan îşaret çêkiribûn; bavê min digot, tîra ji tenekê bi kîjan aliyî de xwar bibe hûn ê di wî aliyî re bên.

Piştî min destmala xwe bi tûyê ve kir, bavê min destmala min dît, berê tenekê da aliyê kaniyê. Em hatin di aliyê ku bavê min pêş me kir, me li têlan xist. Ez û du zilam û birayê xwe me têl derbas kirin û zilamek di nav têlê de ma (têla ku esker nobedar in li ber). Min rahişt kîsê wî ji nav piyên wî û esker bi ser me de hat. Çav me kir, dîn bû. Got, “Vegere ez ê te bikujim!” Bavê min jî giha ba me. Çiqas li ber esker geriya esker razî nebû. Wê çaxê tivingên Qiriqqale hebûn di destê esker de, pênc fişek dixwarin. Çiqas em li ber geriyan qanix nebû. Surma tivingê qulipand û fişek da ber. Got, diya min jina min be hûn venegerin ez ê we bikujim. Ê di nav têlê de ket heyecanê, ji tirsa re xwe li têla xist û hat aliyê Serxetê. Tivinga esker bê hemd filitî û zilam ket erdê. Got, “Ay hûrê min.” Bavê min esker girt, got, “Hûn bazdin.” Min ji birayê xwe û her du zilamên din re got, hûn herin bazdin. Zilamê li erdê yê birîndar tiving li zikê wî ketiye, çermê zik qetandiye û rovî ketine erdê. Derb ji teniştê ve lê ketibû, wek ku tu kêrê bidiyê, zikê wî şîş kiribû. Roviyên wî ketin erdê, li erdê bûn kom. Hewar hewarê zilêm digot, “Ji bo Xwedê hûn min tenê nehêlin, min bi xwe re bibin.” Bavê min û ê esker bi hev girtine. Esker diricife ji tirsan û dibêje, “Min zilam kuşt.” Esker ji desthilanîn de ket û li erdê rûnişt. (Em bi mêranî mezin bûbûn. Ku em bihatina me bigota hina li me xistiye wê bavê me em bikuştina. Diviyabû em bêjin, me li xelkê xistiye.)

Min nêrî ku roviyê mêrik li erdê ne û qirşik mirşik pê ve bûn. Min ew qirşik xweşik jê neqandin û min roviyê wî xistin zikê wî. Wî jî alî min dikir. Min got destê xwe deyn ser, heya ez destmala serê xwe li pişta te girêdim. Şewitandibû, gelek xwîn jê nedihat. Me bir malê. Ez û diya xwe û yê birîndar in. Min got, yadê ka em çilo bikin? Bavê min li ba esker ma, dewsên me xera kirin û esker hedinand. Heta esker bi hişê xwe de hat û pê de bavê min hat malê cem me.

Diya min li birînê nêrî got, “Lawo divê tu wî bibî xestexanê, divê birîna wî bê dirûtin.” Min got, wextê ku wê bidirûn em jî karin bidirûn. Diya min got,

"Tê çilo bidrû?" Min got, tayê lihêfan û derziya eba ji min re werîne. Ka ji min re lewento jî werîne. Min ta xist derziyê. Bavê min hîn nehatiye, dema min didirût hat. Bi lewento min ew ta qenc şil kir û min bi lewento ew dera ku qelişîbû xwîn û xwêdana di wir de paqij kir. Min girêkik li serê ta girêda û wek ku tu lihêfê bidrûyî ez ketim ber çerm, min çerm dirût. Hewar hewarê zilêm di nav destê min de. Piştî min dirût, hindik ma xelas bibe, bavê min hat. Yekî sixye hebû ez çûm balê, min jê re got, yekî me wilo heye û min ew anî malê. Wî jî pembo û tenterdiyot û melhema birînan bi xwe re anî û em tevde çûn malê.

Hat li nexweş nêrî got, ev kê zikê wî dirûtiye? Ez tirsiyam pêşiyê min negot. Diya min got, wileh wî dirût. Got, kuro te roviyên wî nexistibe ber! Bi wê ava sor paqij kir û dûre melhem tê da. Bang diya min kir got, xwakê çarîkek te hebe werîne, em ê lê girêdin. Rabû diya min çarîkek paqij anî û da yê sixye. Sixye ew çarîk bi meqesê kir sê qet li ser dirêjbûnê û ji diya min re got, her sê seriyan bi hev ve bidrû. Perçeyek ji wê çarîkê jî jê kir, li gorî birînê sê çar qat kir, ew melhem di ser kitanê da û li ser birînê danî. Çarîka ku dirêj hatibû jêkirin li newqa wî li ser birînê gerand.

Ez hatim sûkê min cîbek Landiwer kirê kir û anî. Min ji şifêr re got, tê vî zilamî bigihînî filan deverê. Mêrik ji gundekî di navbera Amed û Mêrdînê bû. Me zilamê xwe tevî firaxên wî şand gundê wî.

Gelek wext tê re çû, bi salan. Ez ji eskeriyê vegeriyam, piştî bi salekê daweta min çêbû. Me bang Xidirê Omerî, Hiseynkê Omerî kiribû; heft şev û heft rojan bi dahol û zirne, bi kemançe daweta min hat kirin. Dawet geriyaye! Min dît du xort û zilamekî navsere ji hevalên min dipirsin dibêjin, ma mala filankes kîjan e? Ez di dawetê de me, lawikê hevalê min tiliya xwe ber bi min ve kir. Min zanibû ku xerîb in, lê min nizanibû bê kî ne. Piştî ez ji dawetê derketim ez çûm ba wan min got, hûn bi xêr hatin. Gotin, ma filankes layê filankes tu yî? Min got, erê. Got, ma te ez nas nekirim? Min lê nêrî min got, weleh min tu nas nekir. Got, ew ê ku te zikê wî dirût ez im. Min got, tu yî? Got, erê. Min got, weleh ez ê te bikujim, çilo heya niha tu nehatiyî cem me? Got, te ruhê min xelas kiriye, tu distînî tu zanî. Me wilo henek li hev kir, xwe avêt destê min ku destê min maçî bike min nehişt. Belkî deh carî ez maçî kirim. Ji her du layên xwe re got, binêrin lawo vî ciwamêrî ruhê min xelas kiriye. Heta ez sax bim ez mêraniya te ji bir nakim. Bazinekî Erebî jî kirî û bi pîreka min ve kir, pîreka min xelat kir.

Ma serpêhatiyê me yên li ser sînor bi sedan in. Ez kîjanî bêjim ez kîjanî nebêjim. Serpêhatiyeke min a din vê kêlîkê hat bîra min; wek ku niha dîsa ez

wê lêxistinê dixwim... Ez neh salî me. Bavê min çêlekeke zayî kirî ji Serxetê, me ew çêlek di Kanîka re derbasî Binxetê kir. Bavê min got, here bibe mala me ya li Binxetê. Ez çûm min têl derbas kir, li nav baxçeyê Mala Mihemed Seîdkê li Binxetê min çêlek çêrand, şuxlê deh deqîqeyan. Qereqola şirta (polês) li qapî bû. Bi dûrbînê şirta min dibîne û bi piskilêtê ji qapî di nav baxçeyan re daye dû min, hayê min jê tûne. Ez giham nîvê gundê Hilêliyê, berî ez bigihêm malê, yê şirta li piştî min sekinî û bi çengê min girt. Werîsê çêlekê bi destekî min ve girêda û destê min ê din bi taliya piskilêtê ve girêda. Ez birim qereqola qapî ya şirta. Li wê derê îfadeya min stendin, zepta min girêdan û ez birim Hepsa Reş. Li hepsê midûrê wan bangî min kir. Ez bi hewa xistim, ez birim cihê îşkencê. Midûrê wan ji Dêra Zorê bû, qama wî 1.80 bêhtir hebû û dagirtî bû. Got, kopalê hêzeran! Şirta jê re anî. Ji min re got, xwe dirêj bike. Şirtan lingên min xistin qayîşa tivingê, li lingê min pêça û hilgavtin. Yekî lingê xwe danî ser sênga min, midûr kopal hilgavt û bi wê quweta xwe ... Bi kopalê pêşî re min hezar xeber jê re dan, di kopalê sisyan de min bi xwe de mîz kir, di yê dehan de ez ji hiş de ketim. Tevî cilan bi tenekeyan av bi min dakirin, ez ne li ser hişê xwe bûm. Ez nizanim bi dû wê re çiqasî li min xistiye. Ez bi ser hişê xwe ve hatim ku xwê bi erdê dakirine û min li ser xwê dimeşînin. Midûr li ser kursî rûniştiye, her ku min di ber re dibin û tînin dibêje, en'el ebû Ekrad, ji Kurdan tevan re xeberan dide.

Vêca dîtin û gotin nabe wek hev; lingê min, ez nema karim xwe bidim ser wan, heta bi kabokên min reş û şîn bûne. Her ku ez di ber re dirim, ez diya wî, xweha wî, hemû kesên wî didim ber xeberan. Ez li ber xwe nakevim, çi hatiye ber devê min min gotiye. Ez avêtim hepsa zarokan. Bavê min pê dihise ku ez girtî me. Bavê min jêhatî bû; hat û bi riya mehkemê ez dam berdan. Di îfada de kir û nekirin gotin tu ji Serxetê yî, min got ez ji Binxetê me. Ji ber wilo ez berdam û hem çêlek û golika min jî dan min.

Piştre ez hatim du rojan ez li ber wê qereqola şirtan veketim. Dora wê hemû dar bûn. Qewsika min a çûkan bi min re ye. Min xarik dindoqî xist qewsika xwe, ji bedêla kevir ve. Ew ê ku bi piskilêtê ez girtibûm hat nêzikî min li ber dîwêr mîz kir. Navbera me 15 metro hebû yan tune bû, ji pişt ve min qewsik berdayê li nîvê qehfê wî xist û ez bazdam. Qîr jê çû, ez nizanim çilo bû. Roja din min li sûkê dît, paçikê spî li serê wî girêdayî bû. Wê çaxê min fêm kir ku min serê wî şikênandiye. Wê çaxê min temamê lêxistina xwe ji bîr kir. Sê çar rojên din ez li mala xwe ya Hilêlîkê mam û dûre ez hilkişiyam Serxetê, Nisêbînê. Ji xwe wek ku tu ji mihelekê herî miheleke din, em carna rojê sê caran diçûn û dihatin."

**Cihê Hevpeyvînê:** Qenterê (gundê Nisêbînê)
**Sal:** 11.12.2005

**Zilamê bi navê N. K. 53 salî bû:**

"Ez rêber bûm û min mal jî ji xwe re dibir û dianî. Ji Deriyê Xabûrê û heta Serêkaniyê min di vî hidûdî de qaçaxî dikir. Çi devera em tê re diçûn min mayinên wê radikirin. Şevina jê min sed însan derbas dikir. Min rêbertî, rêzanî dikir. Bi esker em diçûn û dihatin. Li ser pereyê qaçaxê esker hevdu dikuştin. Berî mayina deynin carekê eskerekî hevalê xwe kuşt, navê wî S. bû. Yê hat kuştin jê re digotin H... Çawîş. Piştî hevalê xwe kuşt bazda, welhasil ew girtin. Kifş hatibû ser cenaze. 'Eyn wê êvare istikam hat. Cemseyên eskeriyê ji vir û belkî heya Nisêbînê wilo li pey hev rêz bûbûn. Xelkê gund gelekî tirsiya; me got qey ji bo yê kuştî hatine. Dawiyê muxtar got, ji bo mayina deynin hatine.

Di vê riyê de 17 însan bi min re hatin kuştin û tevî min 27 kes jî birîndar bûn. Şeva ez birîndar bûm 84 kes bi min re hebûn. Wê şevê 12 fişek li min ketin. Meha 10'an a sala 1979'an bû. Du salan ez li erdê nexweş mam. Berî niha bi du mehan (yanî piştî bûyerê bi 27 salan) min fişekek ji destê xwe derxist.

Wê şeva ku ez birîndar bûm min 84 kes bar kiribûn, ez û du sê kesên din şirîk bûn. Her 84 hemal me ji perçeyê bîçerê yê Qreyso bar kiribûn. Ji wir de jî me saet, morîk, kevirên çeqmaqan, qumaş (qedîfê Swêd bûn wê gavê, taximê çakêt û etekên pîrekan jê çêdikirin, tenê ji wan min 40 hemal bar kiribû) derxistin.

Du eskerên ji Mereşê hebûn li wê qereqolê, me anlaşme bi hev re kiribû. Esker gotibû dema hûn bên ku teqwiye hebe ez ê fişekekê ber bi Sûriyeyê ve biteqînim, hûn ê fêm bikin, neyên. Ku teqwiye rabû ez ê fişeka duduyan berdim, îcar hûn ê bên. Dema em ê hilkişin Serxetê, heta ez çûm min hemal birin gundê biniya hidûd min layê apê xwe li ber hidûd hişt. Min got, tu li vir be guhdar bike li benda îşareta esker be.

Dema min mal bir gund min dengê fişekekê kiribû lê, wexta ez hatim ba layê apê xwe min got fişek teqiya neteqiya? Got, na min his nekiriye. Tu nabêjî raza ye, xebera wî ji fişeka teqiyayî çênebûye. Weke tereduttekê bi min re çêbû. Min 84 hemal limandin di nav sînor de, min gote wan hemalan, hûn li vir bin û ji her du hevalên xwe re min got, hûn bi min re werin. Em çûn qontrolê.

Cihê em tê re çûbûn jêr, wê demê vala bû. Gava em daketin tiştek lê tune bû, li derketinê parkekî eskeriyê li wir daliqandibû. Min gote hevalê xwe, min got hinek li van deran hene. Hevalê min got çima? Min got dema em hatin tiştek li vir tune bû, niha parkek li wir daliqandî ye. Di wê rojê de me mal ji Serxetê biriye Binxetê di wê riyê re û ji wir de jî me mal bar kiriye em tên. Min ji hemalan re got, heta 200 metroyî ez ne li pêşiya we bim, hûn nemeşin.

Ez û hevalên xwe meşiyan, Xwedê zane; min got tiştek heye, em ê vegerin. Hevalê min got, ev qas hemal ketine têlê û em ê çi bikin ji vî malî, em ê bi ku de bibin? Min got, em vî malî bibin careke din em ê derxin, belaya xwe ji min veke. Got, na, çima tu ditirsî? Min got, em hatine, ne heywanek difire, ne pêjnek tê, berî me hinek hatine vir, muheqeq tiştek heye. Got, na. Min got, madem tu dibêjî na, rabe em biçin. Em meşiyan em gihan ser têlê, min dît hevalê min rûnişt. Min deh metroyan da pêşiyê, min got rabe bimeşe çima tu rûniştiyî? Got, min pêjna însanan kir. Min got, ez û tu du însan in û 80 însan li pey me ne, teqandin li me çêbibe em du kes in lê ku li yê din çêbibe wê 20 heb bên kuştin.

Hema em deh gavên din bi jor ketin min dît dîsa rûnişt. Wilo ez tirsiyam, min got hevalê min wê qeleşiyê li min bike. Min ew xist derba xwe û min got, rabe bimeşe. Hevalê min got, he! He! He! He! Û keleşkof teqand. Ew rûniştiye, ez ji piya me. Du guleyên wî li min ketin. Tu nabêjî esker li pişt min e, ez di navbera wî û esker de mame. Esker li pey min radibe ku li ser min deyne. Hevalê min neteqanda wê esker ez bikuştima, ji ber ku ez ketim ser esker. Esker baz da, min dît esker bazda, reviya esker. Ji pey min ve esker teqand hema ez rûniştim. Min ji hevalê xwe re got esker ez birîndar kirim, tu şerê xwe bike ez ê xwe xelas bikim. Eyn min halo got. Du car sê carî min ban kirê pêjin jê nehat, reviya, bi aliyê Sûriyeyê ve reviya.

Ez rabûme ji pê, min nêrî newqa min piçekî şewitî. Nêzikî 15-20 cercûran bi min re hebûn, fişekên din jî 300 heb hebûn. Fişekên qarşî panzêrê jî 5 heb hebûn. Dema ez rabûm, tu nabêjî neferekî wan tirsiyaye nereviyaye, ji paş ve avêt min, deh dozdeh heb li min ketin. Hema ji çogên min heta singê min û heta bi destê min kir gule. Saet dozdeh û çarîkek e. Tava heyvê ye. Min dêhna xwe dayê, min dît baz dide, min jî avêtê lê min ne ji kuştinê re avêtê; min got ji bo here belkî ez xwe xelas bikim.

Ez mam li wê derê, ez rabûm ji piyan û çogên min nema li pey min hatin, şikestin. Ez rûniştim, hinek qumaş zêdeyî hemalan mabû min li pişta xwe gerandibû, min ew ji pişta xwe vekir û li birîna çoga xwe gerand. Du panzêr û cemseyek hatin wir, navbera min û wan 40-50 metro heye. Min fişekek ji

yên qarşî panzêrê xist serê keleşkofa xwe, me gule diteqand lê diket û ew diçû panzêrê. Min got heke ez ketim sixintiyê ez ê vê bavêjimê. Min xwe mirî hesêb dikir, min got ez nema karim bazdim û sibehê jî wê bên min bigirin. Min kuştina xwe dabû ber çavên xwe, min got heta bi roj jî çend heb bên min ez ê wan jî bikujim. Panzêr hat hat, min gule lê da, min zanibû min lê da. Ew gule tu çilo bavêjî dere li panzêrê dikeve. Panzêr gêrî gêrî çû bazda, min yek avêt a din jî, her du panzêr çûn, vegeriyan.

Hevalê min giştik bi Sûriyeyê de bazdane, ez bi tenê mame. Du kesên xerîb, seyid bi me re hebûn, ew jî nema zanin bê wê bi ku de herin, tu nabêjî bi Tirkiyeyê de direvin. Diçin diçin diçin nema zanin herin cihnan, vedigerin. Min meyzand bû xuşexuşa giha û bi ser min de hatin. Min got qey esker in, min nizanibû ew in. Giyakî wilo tarî hebû, karûş, li ser rexê çepê; ez xwe dikişînim ber, rexê min ê rastê -ji birînan- çûye.


Saet dudu ye, min dît bi kurmancî şitexilîn, min bangî wan kir. Min got, werin ez birîndar bûme, min jî bi xwe re bibin. Nehatin. Qederê saetekê ez mam dîsa xuşexuşa wî gihayî hat. Dîsa min bangî wan kir; min got, werin ez birîndar bûme. Hatin ku ew her duyên seyid in, nema zanin ne bi wir de herin ne bi vir de. Min got ez birîndar im, min li vir nehêlin. Yek ji wan merivê min bû; got, ya ez ê jî bi te re bêm kuştin yan ez ê te xelas bikim. Ez li pişta xwe kirim, keleşkofa min û cercûrên min da hevalê din, ez li pişta xwe kirim û bi çelepikan di nav giha re meşiya. Em gihan nêzikî hidûd ez li ser pişta wî me, lawik ji min pirsî got, ma em di ku re herin? Min got, di vir re. Min dide şitexilandin, tu nabêjî dil wî de min hişê xwe winda kiriye. Lê hişê min hîn li serê min bû. Ew sê saet e min xwîn winda kiriye, lê hîn ez ji ser hişê xwe neketime. Di heft û nîvê sibehê de ez ji ser hişê xwe ketime. Ez di dozdeh û çarîkekê de birîndar bûme, di heft û nîvan de ji ser hişê xwe ketime. Li min gelekî sar bû, te digot qey ez di nav qeşayê de me. Havîn bû.

Eskeran dîsa avêt me. Li ser pişta hevalê min yeke din li min ket. Ew hevalê bi me re jî gindirî gindirî û ket. Min got hat kuştin. Xwe dirêj kir. Li ser aliyê çepê min xwe kişand ber. Min destê xwe di ser re bir bê ka birîna wî heye tune ye. Ev destê min ê rastê birîndar e xwîn jê te, tu nabêjî xwîna destê min li gumlekê wî dikeve min got qey birîndar bûye, xwîna wî ye. Min got, va ye li vir ketiye. Zilamê me xwe mirand. Hevalê ku ez li ser pişta xwe dikirim got, ka em çi bikin. Min got, heyran wî bikişîne ber hidûd û vegere min bibe. Hevalê min got, na, hey ew miriye bila li vir be û ez ê te bibim. Dema ku got ew miriye ez ê te bibim, rabû li qûn rûnişt. Me got ma li te ketiye? Got, vê dera min têşê (bin singê xwe pêş me dike). Em çûn, hema radibe ji pê û dikeve, radibe ji pê û dikeve. Welhasil em bi Sûriyeyê de çûn.

Navbera me û eskerên Sûriyeyê xweş bû, ez birim qereqola Sûriyeyê. Li wir îfadeyek ji min re hazir kirin û saet di heft û nîvan de ez giham xestexanê. Çar saetan, pênc saetan ez ji ser hişê xwe dikevim, xwînê ji min re dixwazin, min tedawî dikin. Ez bi ser hişê xwe ve hatim min got, divê ez ilm bidim bavê xwe. Tu nabêjî bavê min hatiye. Xelkê wan deran xwedî li min derket, gotin em ê te bibin Helebê, Şamê. Min got, na. Ambûlansa Sûriyeyê ez birim Qapiyê Tirkiyeyê, ambûlansa eskeriyê ya tabûrê hat ez siwar kirim birim tabûrê...

Me ji feqîrî, ji mecbûrî qaçaxî dikir. Piştî ez rihet bûm baston di destê min de dîsa ez diçûm û dihatim. Ku xayîntî tê de tunebûya fêda wê gelek bû, lê bîst carî em biçûna û bihatina ku derbekê malê me bihata girtin ew fêda me hemû diçû. Eskeran hem alîkarî bi me re dikir û hem jî qeleşî li me dikirin...

Ji bo qaçaxçiyan, eskeran gelek eziyet li gundiyan jî dikir. Ên ku hayê wan ji tiştekî tune bû jî ew digirtin, îşkence bi wan dikirin. Muxtarê gundekî girtin, gotin te qaçaxî kiriye. Digot, min nekiriye. Wan digot, ileh te kiriye. Birin kirin ber cercelê, ji bedêla heywanan û esker lê siwar dibû, vêca gêre pê dikirin û lê didan..."



*Fot: Ahmet Şık*

**Em ê niha li sohbeta 4 kesan guhdar bikin. Hin ji wan gelek caran di sînor re çûne û hatine, gelek bûyer di serê wan re derbas bûne. K. A. ji bo me pirsa ji civatê dike. Em guh bidin hevpeyvîna ku li Şamê hatiyê kirin û bi piranî behsa bûyerên sînorê li texma Amûdê û Nisêbînê tê kirin:**

*K. A. : Bavê Xebat, maşeleh tu wek ferhengekê yî li ser vî sînorî. Hemû tişt di mêjiyê te de maye. Ev bîst salên te ne tu li van deran î, lê ew tişt hîn di bîra te de ne. Tiştin ji wan kesên ji xeynî te ku rêberî dikirin, qaçaxî dikirin wek Xelîlê Sîtî wek hinekî dîtir, Seyid Hîskê hebû, qala wî dikirin, digotin bûyereke mezin hatibû serê wî. Tiştekî wiha di bîra te de mabe tu dikarî ji me re bibêjî?*

B. X. : Xelîlê Sitî li Amûdê bû, xortek bû. Wî qaçax maçax li Amûdê nedikir. Vê taliyê çû Qamişlo dest bi qaçaxê kir. Rêberî dikir ji Nisêbîniyan re. Li Nisêbînê jî wê çaxê şixûlekî mezin ê qaçaxê çêbûbû. Rabû Xelîlê Sîtî malê Nisêbîniyan derxist, bi piştê, bi emrê esker. Ji Qamişlo bi emrê esker mal derxistin û li jor davêtin qemyonê. Qemyona xwe bar kirin, li sahakê sekinandin. Xelîlê Sîtî ban kir, got, “Werin malê xwe bibin.” Xelk hatin; îxbara wan bûbû, di wir de şer çêbû.

*K. A. : Şev bû?*

B. X. : Erê şev bû. Ez çûm cihê wî; Xwedê wekîl be, te li wî dîwarî dinêrî giş şûna guleyan bû. Hingî şer bûbû. Ahlê Nisêbînî reviyan. Xelîlê Sîtî ban wan dike, dîbêje, lawo kuro werin malê xwe bibin, lawo werin malê xwe bibin! Kes nayê. Xelîlê Sîtî jî musademe dikir bi wan re, feqîro mudafaa xwe dikir. Rabû yê yuzbaşî kuşt. Navê wî T.... Yuzbaşî bû. Yê yuzbaşî hat kuştin û Xelîlê Sîtî reviya xwe xelas kir. Tenê şer dikir. Kesekî xwediyê mal nema, mal hat girtin, Xelîlê Sîtî çû û bazda hat binê xetê. Rabû Tirkan doz rakir. Xelîl di meseleya vî hidûdî de bû mehkûm, feqîro mehkûm bû. Li Qamişlo, li hikûmeta Sûriyeyê ma mehkûm û li Tirkiyeyê jî ma mehkûm. Ji xwe re xwe vedişart.

Min mesela wî çilo bihîst, çima bihîst? Rojekê ez li malê me, min qaçax terikandiye. Hevalekî min hebû, em geleki bi hev re li çolan mane, Brahîmê Bihêrkî jê re digotin. Îcar Brahîm hat cem min, got, “Bavê Xebat.” Ez mam ecêbmayî, mala wî li Tirkiyeyê bû. Berê li Amûdê bû, pênc salan ma, vê taliyê çû Dirbêsiyê û mala xwe derxist jorê (aliyê Tirkiyeyê). Got, “Şixulê te çawa ye?” Min got, wele perîşan im Brahîm. Got, “Ez birayê te me. Ez ê ji te re hidûd vekim, ji Dêrikê heta Serê Kaniyê.”

*K. A. : Dêrika Hemo, ya ba Qamişlo?*

B. X. : Belê. Min got, Xwedê bike tiştekî wilo hebe Brahîm, ev bi rastî tu

dibêjî? Em wilo ji xwe re diştexilin. Min got, xêr e, çi heye? Got, "Îşê te jê tune." Min got, nabe. Divê tu ji min re bêjî te çi kiriye, bi Tirkan re te çi şirîkatî daniye. Ji min re got, "Ez ji te re tiştekî bêjim, di nav min û te de. Ji te pê ve ez bi kesî ewle nabim. Tirkan ez şandime. Ez li hidûdê Îranê hatibûm girtin, ez girtim ez anîm Tûxaya Mêrdînê. Tûxaya Mêrdînê şertek daniye ber min, bi sebeba ew yuzbaşiyê ku li Nisêbînê ji aliyê Xelîlê Sîtî ve hatiye kuştin. Wê ji min re hidûdekî vekin. Keleşnîkofek dane min, demançeyek çardexur dane min, gotin, bes ku tu herî Xelîlê Sîtî bi hosteyî bînî ber hesinê sînor, tu bînî teslîmî me bikî." Got, "Qiseta min ev e Ebû Xebat û ez bi kesî ewle nabim."

Min got, Brahîmê Bihêrkî. Got, "Çi ye?" Min got, ez û te dostê hevdu ne û em weke bira ne. Ez gişî dikim, lê ev tişta ha, min di emrê xwe de van tiştan nekiriye. Bes ez ricayê ji te dikim, dûrî min û wileh ez sira te jî dernaxim, îşê min pê tune. Ji cem min da rê û çû. Bes got, êvarê tu yê bi min re bêyî, em ê herin cem esker. Min jî got, ez ê bi ya vî însanî bikim, ka bê çawa dibe?

Em çûn Dirbêsiyê ji Amûdê, bû şev saet li dora dehan wan bû. Keleşnîkofa wî ya Tirkan dayê û demançeyeke çardexur jî pê re bû. Min got, kanî demançê bide min, bila qe keleşnîkof bi te re be. Wele em çûn. Berî em bigihên biniya hesin, li serê miheta Dirbêsiyê dengekî ban kir. Îşareteke wan hebû, parolek da, îşaret da, ban kirinê, gotin, "Brahîm abê gel." (Kekê Brahîm were.) Dema ban kirinê em çûn. Selamûn eleykûm. Eleykûme selam. Sê esker li ser têlê bûn. Em rûniştin, ez neditirsiyam. Bi seba wî min zanibû tişt tune. Em bîstikekê man, me nêrî du hebên din jî hatin. Ew jî esker bûn. Şev bû jî, yek ji wan gozluk li ber çavan bû. Got, "Brahîm abê ev kî ye bi te re ye?" Got, "Lawê apê min e." Got, "Li Binxetê ye mala wî, şifêr e, bi min re hatiye û alîkariya min jî wê bike." Got, "Pir baş e." Wexta ku wilo got, esker ji min re got, "Tu li ku rûdinê?"

Min got, li Amûdê.

*K. A. : Ev kîngê bû?*

B. X. : Dora 1965'an bû. Dor 64-65'an bû. Ev çîrok a Xelîlê Sîtî ya wê demê ye. Êvarê em li wê derê man. Min dît bûn çar pênc nefer, hatin Brahîm birin tabûrê. Ez jî li cem esker mam. Dinya jî, baran tê, wilo xunavik baranê tê, ya star e. Min qapûtek li xwe kiriye, min şemedana xwe daye serê xwe. Min ji esker re got, ez ê dakevim biniya têlan, ez ê dakevim biniya hidûd. Kîngê Brahîm hat bê wa ye hevalê te li wê derê sekiniye. Got, "Na abê em jî ji xwe re dişitexilin." Got, "Tu va ye zanî bi Tirkî biştexilî." Min got, na na ez ê dakevim jêr. Ez daketim, min rast berê xwe da Dirbêsiyê. Baranê dayê. Min got,

ma Brahîm çûye cem bêlûkê, çûye cem Tûxay Qomûtanî, Tûxaya Mêrdînê, ez ê li vir çi bikim.

Ez rast daketim Dirbêsiyê, baranê dayê. Ez hatim Dirbêsiyê. Ez rabûm çûm maleke merivên me. Li wir bû sibeh. Bû sibeh Brahîm jî daket, got, "Lawo tu li ku bûyî?" Min got, lawo tu li ku bûyî? Ma ez karim li ber wê baranê bisekinim kuro? Wê çaxê kir nekir ez pê re neçûm. Welhasil em vegeriyan, em hatin. Min got, binêr Brahîm... got, "Çi ye?" Min got, ev tiştê ha ez dûrî wê ha! Tu ji xwe re çi dikî çi nakî heya vir û bes, min fêm kir gişt.

Brahîm çû cem Xelîlê Sîtî li Qamişlo. Min got, tu bi cem min nekevî, ne min tu dîtî ne te ez dîtim. Ez sirê te jî dernaxim. Dere cem Xelîlê Sîtî. Xelîl dibîne, li Qamişlo. Brahîm gelekî li Sûriyeyê jî maye. Dibê "Lawo min efyon aniye, ez bi kesî ewle nabim." Te dît, ev Xelîlê Sîtî û apê wî û apê Brahîm -Hecî Selîmo dikana wî hebû li Nisêbînê- hevdu nas dikirin. Dibê "Lawo min 50 kîlo efyon aniye û ez bi kesî ewle nabim. Tu yê bêyî em ê ji xwe re bifiroşin. Ez jî feqîr im, tu jî feqîr î." Xelîlê Sîtî lê vedigerîne dibêje, "Erê lawo Brahîm, wele ez mirî me. Ji du dewletan ez  mehkûm im, ji meseleya Nisêbînê de."

Du roj çûn roja sisiyan ez li malê me, Brahîm ji cem min çûye. Min xwe kur dikir. Min dît carekê Brahîm got, teq, teq li derî xist, vekir hat rûnişt. Min xwe xelas kir, min dît got, "Tu zanî bavê Xebat?" Min got, çi ye? Got, "Lawo ez ê çawa wî xortî bikujim yaho?" Got, "Min wilo lê nêrî, wijdanê min tehemûl nekir. Wi xortî ez ê îşev bibim, teslîmî nav lepên Tirkan bikim, lawo wijdanê min tehemûl nekir." Min got, wa Brahîm, got, "Çi ye?" Min got, tu vî tiştî neke, tu çi bixwazî ez ê ji te re bikim. Got, "Ez tiştekî ji te naxwazim, bes here zarokên min ji Mêrdînê daxe. Zarokên min û pîreka min li wir in." Ev giş mesela çi ye? A hidûd e, ya Tirkiyê ye.

Wele rabû ez derketim, ez çûm Tirkiyeyê. Berî ez herim min got, lawo Brahîm perê min tune. Got, "Em ê demançê bifiroşin, ev demança ku Tirkan daye min." Me demançe da Şatala, yekî Amûdî bû. Min perê xwe xist berîka xwe û ez çûm. Ji min re gotibû, tê ji filan birayê min re bibêjî. Navê wî nema tê bîra min. Birê wî mihendiz bû. Got, "Ji wî pê ve bila kes pê nizanibe, bila bavê min jî pê nizanibe." Rabû ez çûm. Min got, xeyo, got, "Çi ye?" Min got, ez ji ba Brahîm hatime, ez ê zarokên wî bibim. Got, "Lawo Ebû Xebat tu dostê me yî, em wek kufletê malekê ne. Te nan û avê me pir xwariye, me jî nan û avê te xwariye. Tiştê ku vî Brahîmî bi serê me kiriye! 24 saetan hikûmet li ser serê me ye. Hikûmetê ew şandiye û dibêjin kanê Brahîm û kanê Brahîm?" Min got, xeyo Brahîm nema tê, îcar hûn çawa dikin hûn zanin. Li ser jina Brahîm jî ji min re got, "Wele pîreka wî em nikarin bişînin. Em bişînin wê

namûsa me li ber lingan here."

Min da rê ez hatim. Di vegerê de min Brahîm dît. Min got, Brahîm! Got, "Çi ye?" Min got, birayê te zarokên te û pîreka te neda. Wele çendak tê re çû, - Xezûrê wî jî li Dirbêsiyê bû. Ji Dirbêsiyê zewicîbû.- axir li vir hevdu qanix kirin, çûn zarokên Brahîm daxistin û anîn. Piştî zarokên wî daxistin, fitrak tê de çû Hikûmeta Sûriyeyê Brahîm girt. Mişkuleyeke wê heye, başqe ye. Yanî ne li ser Xelîl hatibû girtin.

Piştî çendakî mixeberatê eskerî ez xwestim, ez mam ecêbmayî. Ebû Nizar li cem me bû, muxaberatê Dêrî yê Ereb ji min re got, "Ebû Xebat, muxaberata Qamişlo te dixwaze." Serê sibê ez rabûm, saet neh, ez çûm. Min bihîstiye Brahîm hatiye girtin. Bes çi mesele ye ez nizanim. Ez daxistim, min got, navê min Mecîd Tahirê Nezir e, ji Amûdê. Gotin, "Ehla û sehla." Du xort bûn, di qebyê de bûn. Hîn bêceme li wan bû, sibeh bû, şiyar bûn. Gotin, "Ya Mecîd, tu şahid î, me şandiye dû te, Alah wekîl tişt li ser te tune, tu yê vê şahidiyê rast bikî û tu yê herî mala xwe." Min ji wan re got, ahlen we sehlen. Hûn çi dixwazin, ez ê wilo bêjim. Got, "İnte tehrif Brahîm Hesen Hemîd?"(Tu Brahîm Hesen Hemîd nas dikî?) Min got, erê. Got, "Eşlon te'rifû?"(Tu çawa wî nas dikî?) Min got, hede, xems senê fil Amûda û be'dên beytû fil Dirbêsiyê ken."(Ev pênc salan li Amûdê bû û dûre mala wî li Dirbêsiyê bû.) Ez ji muxaberatan re dibêjim. Got, "Seh, hada mezbût." (Ev rast e) Got, "İnte rahit me'û fil hidûd."(Tu pê re çûyî ser hidûd?) Min got, ebeden ev tişt tune. Gotin, "Te çardexur daye kê?" Min got, ebeden tişt tune ye. Min fêm kir dema Brahîm girtine tiştin ji wan re hatine gotin. Ez hatim rûniştim. Ji min re got, "Roh." Textekî eskerî tê de bû, giş cihê kahrebê bû. Min zanibû cihê tahzîbê ye (işkence); di qebê de bû. Ez bîstikekê mam, min dît mixaberatê me hat rûnişt. Got, "Êh ya Mecîd, rast biştexile, wele tê herî mala xwe. Şahidiyê bide, bê rast e ev tişt li Brahîm." Min got, Brahîm bînin ber çavê min, bila li min vê îfadê bide, jixwe giş li min rast e. Got, "Tu Brahîm nabînî." Tu nabêjî wê çaxê Brahîm rakirine Şamê. Ji min re got, "Binêre, tu dolabê dibînî? Tu kahrebê dibînî?" Ê min jî tu nefera min nema, min zanibû wê çi ji min bikin; min bi dengê şid zirtin lê kirin. Hebekî firêzak min jî li cem wan hebû. Çawa ez bi ser hilbûm dengê xwe bi min re nema kir. Çû û hatin, ji min re gotin, "Qûm (Rabe)." Ez rabûm ser xwe. Got, "Roh (Here)." Derence bû, min got, ez herim ku? Got, "Here malê." Ez hatim malê. Ev qiseta Brahîmê me yê Buhêrkî, Xelîlê Sîtî û hidûdê me û teşqeleyên hidûd bûn.

*K. A. : Min ê ji te pirs kiriba, girtina Brahîm bi mesela Xelîlê Sîtî bû yan na?*

B. X. : Na ew çîrokek din bû.

*K. A. : Di dema we de kî dihat û diçû? Di nav wan kesan de kî hatin kuştin?*

B. X. : Gelek hatin kuştin.

*K. A. : Ew Helîmê Karçî hebû, bavê Seîdê Nazo, ew tê bîra te?*

B. X. : Ew Helîm, Bavê Seîdê Nazo berî me bûn. Min ew nedîtine. Ne dewra me bû, berî me ye.

*K. A. : Di dema we de kî dihat, kî hebû?*

B. X. : Xeyredîn hebû. Bi me re hat kuştin. Xeyredînê Henîfa, bi eslê xwe ji Qirbê Qeplo bû. Şevekê me pez daxistibû. Îcar deh pazdeh zilam bûn. Xwediyê pez bûn, li cem mala Mehmûdkê bûn.

*K. A. : Ew Xeyredînê Henîfa jê re digotin.*

B. X. : Belê. Şevekê Mehmûdkê ban min kir got, "Xalo were van mêvanan ji ser çavên me bibe, bes e. Hesab mesabê xwe kirine. Pezê xwe firotine." Em rabûn çûn Curnikê.

*K. A. : Pez ji jorê (Ji Tirkiyeyê) anîbûn?*

B. X. : Erê pez ji jorê daxistibûn.

*K. A. : Pez jî dadixistin?*

B. X. : Weh! Bi hezaran dadixistin. Min bi hezaran pez derbas kiriye. Em çûn Curnikê, me mêvanê xwe biriye, Mehmûdkê jî bi me re ye. Em çûn Curnikê, rehmetiyê Xeyredîn bi me re ye. Xeyredîn êvarê li oda mala Mehmûdkê rûniştiye, derbekê me dît got, "De rabin lo." Min got, îşev çi mesela te ye? Lawo çi ye îşev tu rûnanê? Em li odê rûniştî ne. Min dît Xeyredîn got, "Ebû Xebat de rabin em ê herin riya xwe bibînin." Rê berê vekirî ye. Giş peya ne. Pez anîne, em ê wan derxin îcar. Min got, lawo de rê vekirî ye Xeyredîn lo, ez hebekî jî têşim, kengî saet qediya em ê wan bibin. Selîmê Gaso Xursî bû, wî jî rêberî dikir, ew jî hat kuştin. Xeyredîn û Cemalê Hiso. Cemalê Xursî.

*K. A. : Ew li ku bû?*

B. X. : Li cem me bû, li Amûdê. Ev bi xwe ji Tirkiyeyê bû, ji bo qaçaxê dadiket. Bi serê xwe dihat û diçû. Ev jî tesadûf li Amûdê bû, bi me re bû. Rabû got, "Bimeş Xeyredîn, ez û te em ê herin." Xeyredîn got, "Bimeş." Ji Cemal re got, "Rabe, Mecîdê Tahir nayê, ez û te em ê herin." Nûredînê Curnikî ew jî bi wan re çû. Nûredîn li ber hidûd rûniştiye û Cemal û Xeyredîn derdikevin. Çûne ji xwe re bipêjinin. Rê berê vekirî ye, dan rê çûn. Rûniştine, ev riya vekirî ye ha. Xeyredîn rûniştiye, hebkî jê wir de, Cemal dire, li esker dipêjine, ka şiyar e yan di xew de ye, îcar wê bên. Wexta Cemal vedigere tê cem wî, Cemal dibêje "Xeyredîn bang zarowa bikin, bila bên em ê derbas bibin." Ê me em li gund li odê rûniştine. Tu nabêjî Xeyredîn rişaşa

xwe li ser mayinê daniye. Destê xwe çilo dike ku rahêje rişaşê (tiving), gotiye gurm û mayin pê de teqiyaye! Xeyredîn, wexta min meytê wî daxist nîvê wî ji vir û pê de (*Cihê di gotinê de derbas dibe pêş ê cem xwe dike.*) tune bû, ne serî ne tiştek, gewde nemabû, dilê wî derketibû derve. Defa sêngê firandibû. Min destê xwe avêtê, destê min ket nav dilê wî. Hinavên wî vekirî bûn. Hedîseya wî ya muhîm, wexta bimbe teqiya, dema em li hundir bûn, yek derket got, wele bimbe teqiya. Em giş rabûn hatin, ku dudu ne. Sê heb çûbûn, Nûredîn bû, ew jî bi wan re bû yê Curnikî û Cemal bû. Me nêrî ku dudu ne, Cemal li pişta Nûredîn e. Cemal serê wî heta vê dawiyê (*Tiştê dibêje bi desta pêş guhdêran dike*) birîndar bûbû, giş perçeyên bimbê lê ketibûn. Ê Xeyredîn tişt tê de nemabû. Em çûn ber hesin, Mehmûdkê got, "Mecîd Tahir." Min got, çi ye? Got, "Meytê Xeyredîn di nav mayinan de bimîne em ê bibahdilin. Em ê di nav xelkê de rezîl bibin." Li cem me qebeheteke mezin bû, tebîetekî me yê wilo hebû. Bergîlê me dihat kuştin, me hefsarê wî jî tanî, me naniya ji me re kêmanî bû, ev tebîetê me hebû. Rabû ez û ew ê Hesarî hebû, em çar heb çûn ku wa ye li erdê ye.

*K. A. : Tu û kê û kê bûn?*

B. X. : Ez bûm, yekî Hesarî bû, Hîskê Şûtî bû û Mihemedê Nofa, a niha li Avênîkê ye. Em her çar çûne. Wexta ku min destê xwe avêtiyê! Em ê hinekî wî bikişînin bînin ser rê yanî, li kêleka rê ketiye. Wexta min destê xwe avêtiyê, destê min ket nav dilê wî, yaho! Germ bû! Giş xwîn! Ev der nemabû (*Cihê ku çêlê dike pêş guhdaran dike*). Min dît piyekî wî li erdê, min rahişt piyê wî, wek lastîkê, li ser çerm mabû, nehat hilanîn. Ez wegeriyam. Mehmûdkê got, "Te çawa kir?" Min got, nayê hilanîn, ez ê herim gund, betaniyekê bînim, em ê têxin navê. Got, "Ha ji te re kurkê min bibe." Min rabû kurkê Mehmûdkê anî, Xeyredîn xist navê û me anî ser dika Curnikê danî, li gund. Bu sibeh, serê sibehê Mehmûdkê çû melûmat da hikûmeta Sûriyeyê û hat. Hikûmeta Sûriyeyê (esker) hat ser meyt, meyt li Curnika Amûdê bû. Esker ji Amûdê derket, alem hat û hatin Curnikê. Henîfka jî bi me re hat; yanî diya wî û xweha wî jî hatin, çûn ber lingê Xeyredîn, ser dikê. Betanî avêtibûn ser. Diya wî got, "Ez vê derbê jî lawikê xwe bibînim." Zanibû hatiye kuştin. Çû biniya lingê wî rûnişt. Min got, wer ber serê wî rûnê. Wexta betanî rakir, qajîn jê çû, ew qas axa Curnikê bi serê xwe de dakir. Rabû me Xeyredînê xwe anî, veşart. Ev sînorê hanê wilo li xelkê kir, qaçax ev bû, bi sedan, bi hezaran xelk kuştin.

Ez ê niha meseleyeke din bêjim. Ya seyidî, ez şevekê li Mêrdînê bûm, kirêciyek ji min re lazim bû, ez ê daketima Binxetê. Me kirêcî digirtin, ew û hespên wan. Zahirê Qubalî hebû, zilamê mezin bû. Gotin, Zahir betal e, li cem

mala Bilalê Evdilwehab e. Bilalê Evdilwehab du malên wî hebûn. Yek li Mêrdînê bû, yek li Amûdê bû. Ez çûm min nêrî zilam rûniştine, me şand dû Zahir. Min got, Zahir tu bi min re nayê? Ji min re kirêciyek lazim e.

*K. A. : Zahir ji Mêrdînê bû?*

B. X. : Erê ji Mêrdînê bû, eslê wî Qubalî bû. Got, "Lawo Mecîd Tahir, Xwedê teala ruhê min bistîne. Şevê din em çûn mintîqa Qesra, em vegeriyan û em derbas nebûn û va ye îşev jî, hema Xwedê ruhê min bistînê, vê feqîriya min." Min got, yabo tu zanî, tu tê nayê, tu bi qîma xwe yî. Wele em daketin. Karwan mezin e, pir e. Min 13 bar mirhiz aniye ji Sêrtê. Mûyê mirhiz, min çîka Amûdê deman kiribû, febrîqeya sicadan. Wele em hatin ser hidûd, li me teqiya, li wî qelaçê ser pişta Curnikê, nîşanek di wir de heye. Karwan kişiya û bû şer, bû qîr û qiyamet. Wilehîlezîm 97 hesp bûn, giş barkirî. Yên bi me re vala ne, tên barê xelkê wê qaçaxê bibin. Em daketin, berî em bigihên hesin, yek ji Zahir re dibêje de bimeşe kuro, de bimeşe kuro! Ez jî giham nêzikî wan. Dibê "Lawo agir bi kezeba min ket, ji bo Xwedê lawo ez birîndar im lawo, ji bo Xwedê." Ew Zahir ha, ew ê berê got Xwedê teala ruhê min bistîne. Ew bi xwe birîndar bû, ew ê ku li Mêrdînê ji min re wilo got. Erê Xwedê wekîl be. Li pişta hesin sê gule li vê dera wî ketibûn (*Bi destê xwe cihê birînê dide xuyakirin.*), di aliyê din re avêtibû. Min gihand biniya hesin mir, ruh jê çû.

*K. A. : We bi xwe re anî?*

B. X. : Weh! Çawa! Me birîndarê xwe di nav têlan de nedihişt. Piştî karwan daket, me hesp mesp şandin. Me cih digirtin, li gundan bûna li hundirê bajêr bûna, me ji her yekî re digot hûn ê herin filan derê. Me ew şandin. Mehmûdkê got, "Xalo tu zanî em ê çawa bikin?" Min got, em ê çawa bikin? Got, "Em ê meytê wî li hinda Xerezê deynin, em ê li wir misaderê bikin, ji bo şopa vir xuya neke." Min got, tu zanî. Rabû me ew avêt pîqabê û me anî ber serê Xerezê wir de, li wir hesin û cade digihên hevdu. Me rahişt meytê wî, me li wir danî. Îcar bi rê de wilo dibû, dihejiya. Selîmê Gaso digot, binêr tivîst direqise. Wê çaxê me rabû danî û ez çûm ber serê wî, min çakêtê wî jê kir, avêt ser. Me danî pişt hesin, bi deh pazdeh gavan em pê de çûn û li wir me danî. Min cercûrek di ser serê wî re berda, ji bo laşê wî ew bibin. Me dî qereqolan jî tiving berdan; xir û xir û xir. Em li pîqaba xwe siwar bûn û em hatin. Serê sibeha emeleyan, emeleyên hesin laşên wan didît. Datanîn ser hesin, ilmê hikûmeta Tirkiyeyê û hikûmeta Sûriyeyê dikirin. Ku ji Sûriyeyê bûna teslîmî Sûriyeyê dikirin, ji Tirkiyeyê bûna teslîmî Tirkiyeyê dikirin. Ew Zahir jî bi me re wilo bû. Nifûsa wî di berîka wî de bû.

*K. A. : Gelek hatine kuştin. Ev tenê yên mintiqa Amûdê ne û yên tên bîra te ne.*

B. X. : Min jî jibîra kirine. Gelek hatin kuştin. Bi min re gelek olayî çêbûne di hidûd de; îcar hidûdekî ku bûbû belayek ji xelkê re. Xelk jî feqîr bû, zeman jî wilo dixwest.

*K. A. : Ew Girê Kemaliyê berê navê wî Girê Amûdê bû, vê dawiyê Tirkan navê wî kirin Girê Kemaliyê.*

M. X. : Erê li ser nivîsandine "Ne mutlu Turkum diyene".

*K. A. : Di çîroka Kulikê Mandî de, -niha li Amûdê hene- çîrok û stranek li ser Kulikê Mandî heye, ew û birayê wî. Kerê bira jê re digotin. Vêca serpêhatiyek wana heye. Cihe kuştina vî, kuştîgeha wî di navbera Girê Amûdê û Darê de ye. Heta niha jî komek kevir heye, ew koma keviran wek nîşangehekê ye, cihê kuştina Kulikê Mandî ye. Vêca Textor Mihemed Bekiro weke neviyekî Kulikê Mandî xwe dibîne. Ew şiîran dinivîse. Du sê belavokên wî hene yên şiîran. Di yekê ji wan de bi bapîrê xwe Kulikê Mandî re diaxive. Tîne bîra xwe wê demê, halê Kurdan çi bû, berî sînor bên danîn û niha çawa ye? Ew helbest xweşik nayê bîra min. Vêga jê re dibêje: "Babo va ye çêra pezê me bûye Serxet û Binxet." Di bîra xwe de tîne. Wek ku berê sînor tune bû welat yek bû. Berê pezê me dadiket jêr, diket beriyê, diçêriya, digeriya. Lê niha bûne sînor, bûne bimbe û halê me perîşan e. Ew çîrokek dîrokî ye, di bîra xwe de tîne. Beramberî hev dike wê demê û ve dema hanê.*

*Mamoste Xweşnav çilo bû meseleya Eliyê Dêrî, li Dirbêsiyê? Wexta derbas bû jorê, gava gule lê ketibû, derb lê ketibû?*

M. X.: Agahiyên ku li cem min jî hene, ne wilo bi belge ne. Wek min bihîstiye, girûbek qaçaxçî ne, sînor derbas dikin û li kozikên Tirkan diqelibin; an jî qerebalixê çêdikin, Tirk bi wan dihisin. Ew jî yek ji koma qaçaxçiyan bûn. Taxim mezin bû, dora pazdeh bîst kesan bûn. Li ser sînor pevçûn çêdibe, di navbera qaçaxçî û eskerê Tirkan de pevçûneke giran çêdibe. Kuştî û birîndar hene. Çend kes li ser sînor, du sê rojan di bin tavê de laşê wan ê kuştî dimîne. Ew Elî, xwe li nav wan mayinan bi mirîtî datîne. Eskerê Tirk tê ser wî, bi potînê, sola xwe li wî dixin û dibêjin eviya miriye. Dibêjin, heyfa fişekê em lêxin, miriye, qediyaye. Piştî esker derbas dibin hêdî hêdî xwe dikişkişîne aliyê Sûriyeyê. Îcar tevî wê birînê, tevî wê êşê dimîne. Heta niha nîşana wê birînê di laşê wî de ye. Lingê wî seqet kiriye. Niha bi wî lingê seqet, bi dijwarî bi zehmetî dimeşe. Dema qala vê bûyerê dike pir wilo tirajedî ye, rengekî bi êş tê ser rûyê wî.

*K. A. : Bavê Xebat, ji bajarê Amûdê, te dev ji me berda û tu hatî Şamê, ev bîst sal in tu li Şamê yî, tu bûyî Şamî.*

B. X. : Erê.

*K. A. : Dîsa em ê li bîrhatinên te vegerin û wê demê di bîra te de bînin Bavê Xebat. Kîjan salê tu ji Serxetê daketî Binxetê?*

B. X. : Ez di 1954'an de daketime.

*K. A. : Wexta tu daketî li ser hidûd tu mayin hebûn?*

B. X. : Na tune bûn.

*K. A. : Wê çaxê tu hatî Amûdê ne?*

B. X. : Erê, ez hatim Amûdê.

*K. A. : Tê bîra te kîjan salê mayin hatin danîn?*

B. X. : Piştî ez hatim bi salekê gotin, bimbe danîn. Qenc nayê bîra min, lê ez dibêjim di 1956'an de danîn.

S. S. : Destpêka 56'an bû.

*K. A. : Tê bîra te pale û karker ji Serxetê dadiketin. Çûn û hatin çêdibû. Berî mayin bên danîn têkilî, tevger çawa bû, di navbera Serxet û Binxetê de.*

B. X.: Sînor wê çaxê gelekî sist bû, tu hidûdê şidandî tune bû. Xelk ji Serxetê bi pênc wereqeyan dihatin Binxetê ji xwe re dişixulîn. Pale, karker ji wê derê dadiketin. Xelkê beşt dianîn, dar dianîn, fêkî dianîn; ji jorê. Hidûd gelekî zeîf bû. Mesela Tirkan di hîdûd de tune bû. Vê taliyê piştî îcar ku tirsek derket, tirsek li Sûriyeyê çêbû di meseleya Şûiyan de, rabû wê çaxê Tirkan mayin danîn. Xelkê digot, gelo ev mayin ji bo çi ye? Îcar vê taliyê digotin, ji bo qaçaxçiyan danîne. Lê ne ji bo qaçaxçiyan mayin danîn.

*K. A. : Tu dibêjî ji bo çi bû?*

B. X. : Tiştekî siyasî bû, tirsek hebû. Tiştê ku min bihîstiye li Amûdê, di meseleya şûiyan de, di meseleya Rûsan de, girêdana wê bi Sûriyeyê re, tiştin wilo hebûn. Li ser vî awayî Tirkan ev mayin danîn.

S. S. : Ji Amûdê re digotin Küçük Moskowa, yanî Moskowaya biçûk.

*K. A. : Wê çaxê ji Amûdê, ji Qamişlo yanî ji malê Binxetê çi dibirin di bazirganiyê de?*

S. S. : Pantolon, çakêt, bi piranî cil bûn.

B. X. : Li Tirkiyeyê tişt tune bû. Çakêt, êlek, tişt miştê wilo dibirin. Ez gihamê, min bi xwe barê çakêtan, êlekan biriye Mêrdînê. Min bi wereqe û nîvekê êlek dikirîn û bi pênc weraqeyan çakêt dikirîn, min didan bi deh, dozdeh wereqeyan.

S. S.: Fileyên Amûdê jî hebûn. Sûk dagirtî bûn, sûka Amûdê li ser hesabê hidûd dişixulî. Ev Ermenî, sûka Şêx Dawid, tevde ya çakêt û pertalan bû. Heta dikana Mele Sîrac, ji van tevda Serxetî dihatin mal dikirîn. Tiştek li cem wan tune bû. Cil tune bûn, ebeden. Bar bi topan dihat. Ermeniyan Heleb zept kiribûn. Ji Lubnanê mal dianîn tev difirotin xelkê.

*K. A. : Berî ku mayina deynin, xelkê aboriya xwe bi bazirganiyê dikir, diçûn û dihatin.*

B. X. : Bes bi emrê hikûmeta Tirkiyeyê diçûn û dihatin. Tu tişt tune bû, tiştekî xeter tune bû.

*K. A. : Tê bîra min em zarok bûn. Li gundan pale hebûn. Wê çaxê patos, bîçer tune bû. Pale bi qefleyan dihatin, dasê wan li ser piyên wan bûn. Xelkê digot, va ye paleyên Serxetê hatin. Gund bi gund digeriyan, paleyiya wan dikirin. Mehekê du mehan li binê beriyê diman. Ji vir re digotin, Beriya Mêrdînê. Xelkê vir nizanibû paleyî çi ye. Ewana paleyî dikir, kar dikir. Mewsîmê xwe xelas dikirin, tişt mişt ji xwe re dikirîn û diçûn. Piştî ku mayin hat danîn hinekî astengî li pêşiya milet çêbû. Hidûd hatin girtin, tengav bûn. Êdî zehmetî çêbûn, lê dîsa karekî din derket, ew qaçaxî derket.*

B. X. : Berê jî qaçaxî hebû.

S. S. : Bes kêm bû.

B. X. : Qaçaxî hebû lê kêm bû. Qaçaxçî ji Mêrdînê dihatin, ji Licê dihatin. Berî mayinan jî ji Licê dihatin.

S. S. : Erê bavo! Bi siwarî dihatin.

B. X. : Ez wê çaxê ne qaçaxçî bûm. Min nedîtiye berî mayinan daketine. Li Amûdê îxbara wan, a Liciyan bûye û bi ser xetê ketine, malê wan hatiye xwarin.

*K. A. : Mecît Tahir Bavê Xebat tu ji Tizyanê daketî, cara pêşî tu hatî Amûdê?*

B. X. : Erê, yekser ez hatim Amûdê.

*K. A. : Di Amûdê de tiştê me dibihîst, berî em bên Amûdê jî min dibihîst navê Mehmûdkê bi nav û deng bû, tu jî pê re bûyî daîma û te gelekî tişt dîtin. Çi dibû, çi tê bîra te, ji wê çûn û hatinê? Qaçaxçîtî çilo bû? Tu karî behsa ew xelkê ku carina bi karwanî bi hespan dihat bikî? Tê bîra min tûtin dianîn. Çi dibirin û çi dianîn?*

B. X. : Ez ê li ser qaçaxiyê bejim, li ser sînor.

*K. A. : Vî sînorî çi kir li serê xelkê. Destê xelkê ji hev qut kir. Erdê xelkê kir du perçe. Malbatin li viyalî man û hinik jî li viyalî man. Gava hidûd hat danîn destê bira ji bira qut bû. Tê bîra min girê Amûdê li jorê ma. Gir bû Serxet, Amûd bû Binxet. Erdê Amûdê gelek jê li jor ma. Ez dibêjim ne li Amûdê tenê, gundê li ser vî sînorî tevî, milkên wan tevde di hidûdê Tirkiyeyê de man.*

B. X. : Gundê li Tirkiyeyê jî erdê wan di Sûriyeyê de heye. Gelek gundên Amûdê giş ên Çelebiyan bûn, Çelebiyên Mêrdînê.

*K. A. : Ên Amûdiyan jî li jorê man.*

B. X. : Kanîguriyê hetanî Darê (*Di hidûdê Tirkiyeyê de ye*) ev giş milkê Amûdiyan bûn. Bîrziravê, heta diçe qûntara çiyê ev giş milkê Amûdiyan bûn. Qanûnin derketin, milkê Sûriyeyê ma di Sûriyeyê de, yên li Tirkiyeyê man li Tirkiyeyê. Yê dihat ser milkê xwe dihat qebûlkirin. Ez hazir bûm hat gotin. Wexta ji Çelebiyan Eshedililû hat vê derê, Qijlê gundê wî bû giş. Hecî Helîmo muxtarê gund bû, tê de bû. Rabû lijne çêbû. Ji Eshedililû re gotin, tu bêyî ser milkê xwe milk ê te ye. Wexta tu neyê ser milkê xwe tiştekî te li vir tune. Eshedililû şewqeya xwe derxist ji serê xwe û got, ez vê şewqeya xwe nadim bi Sûriyeyê gişî.

*K. A. : Ew ji ku bû?*

B. X. : Ji Mêrdînê bû, Çelebiyên Mêrdînê bû.

*K. A. : Tiştên li herêma Amûdê tu zanî. Dema çûn û hatinê ji ku heta ku hûn derbas dibûn?*

B. X. : Hema ji Qamişlo û vir de û heya Serêkaniyê me qaçax kiriye.

*K. A. : Vêca ji wê qaçaxiyê çi tê bîra te? Ji wî xelkê ku dihat, bi nav jî heger tu zanibî hinekan ji me re bêje baş e. Ew şevên zivistanê û ew herî. Tê bîra min carna dibû gurmegurm; digotin, çi bû? Digotin, teqîn çêbû li ser sînor. Cephe vedibû.*

B. X. : Cephe bû, erê. Ez ê ji te re qaçaxa me bêjim. Li binê xetê Mehmûdkê merkezek bû ji qaçaxçiyan re.

*K. A. : Navenda wan bû.*

B. X. : Erê. Qaçaxçiyên aîdî Amûdê dema bihatina, ku ne bi wî bûya nikaribûn. Ji aliyê hikûmeta Sûriyeyê ve têkiliyên wî hebûn. Ê min ez însanekî qaçaxçî bûm, ez diçûm û dihatim, ez mesûlek bûm. Di pêşiya karwan de, di rê de, di rê vekirinê de ez rêberek bûm heta Diyarbekirê. Malê me jî di nav de hebû, qaçaxiya me jî di nav baran de hebû. Îcar pêşiyê di vî hidûdî de heya pênc şeş salan min dît em derbas dibûn bi emir, bi emrê esker. Me pere didan eskerê Tirkiyeyê. Serê hespê pênsed wereqe bû, hezar wereqeyê Tirkiyeyê bû, distendin û em derdiketin.

*K. A. : Hemû qereqol bûn?*

B. X. : Ere. Ê Sûriyeyê jî me hevdu didît. Me li Sûriyeyê teqîn çênedikir, yanî me bi hikûmeta Sûriyeyê re şer nedikir. Piştî wî awayî hidûd hat şidandin. Bes ku tu bi hidûdê Tirkiyeyê ketî pê ve bêminetî bû; yanî, heta ku ew tiving bi te re bû, barê qaçax bi te re bû, çi di ber te keta te şer dikir. Hevalan gotin, em ê vê derbê bi anlaşmê (bi raya esker) derbas bibin. Me rabû çawa dikir? Me çewal dadigirtin em diçûn ser hidûd, hinek çaya qaçax hebû, me çewalek direşand, me giş ew qutîk mitîkên wan li wan deran

davêtin, bergîlekî pîsik jî me dikûşt, yanî va ye em bi şer derbas bûne. Û bi devê esker bû.

*K. A. : Yanî va ye me şer kiriye.*

B. X. : Erê. Piştî hin bi jorê diketin em jî dadiketin ser hesin. Ên ku diçûn Serxetê û yên ku diman li Binxetê, me teqîn çêdikir.

*K. A. : Wek temsîlekê bû.*

B. X. : Erê, di nav me û eskerên Tirkiyeyê de. Bi vî awayî me qaçax dikir. Vê taliyê ew tişt bi carekê nema, xelas bû, îcar bû bi qewetê. Me çawa dikir? Pêşiyê em diçûn vî hidûdî. Melûm e her tim 40-50 siwar bûn, carinan dibûn 100 siwarî bi me re. Eyn sed siwarî, sed hesp me daxistiye Binxetê. Ku em bêyî esker biçûna, me digot em ê îşev bi dizî dakevin. Em ê biçûna me yê riya xwe vekira. Em ê biçûna ber têlê û hesp li dû me. Xeter li ser me çêdibû. Wan bera me dida. Vê taliyê me got, em ê vê teqtîkê biguherin, bi vî awayî nabe. Rabû îcar ku me riya xwe vekira, em diçûn ser hidûd, çar pênc heb musaleh û rasen hîn hesp dûrî me ne di nav mayinan de ne, tên, wê çaxê me bera Tirkan dida, teqîn ji wan çênedibû. Gelek jê, me hêsîr girtine. Me digirtin, me tivingên wan ji wan distendin. Em çûne me xwe xelas kiriye, me tivinga wan ji ser ling xistiye, dûre me dida wan; vê taliyê.

*K. A. : Ji bo çi bû?*

B. X. : Ji bo karwan derbas bibe, me şer dikir. Tim pênc şeş zilam li taliyê ne, li ser têlê dimînin, cihê ku esker tê de ye. Mesele, kemînên wan yek di vir de ye yek li dera hanê ye; me şer dikir, heta hespê me bi xelasê diketin. Bi vî awayî, demekê bi şiklikî wilo me qaçax dikir. Berî ku têkeve mesela hespan bi piştê bû, bi emrê esker bû wek min ji te re got. Me li mintiqa Girbeşkê xist, 13 heb hatin kuştin.

*K. A. : Girbeşkê li ku ye? Li jor e, li jêr e?*

B. X. : Girbeşkê li ber Dirbêsiyê ye.

*K. A. : Girbeşka me ye, ya Sûriyeyê ye?*

B. X. : A me. Me li Girbeşkê xist bi emir. Bi emrê esker bû. 13 însan bi min re hatin kuştin, ez di nav wan de bûm. Wê şevê du mayin teqiyan.

*K. A. : Ev çawa çêbû?*

B. X. : Hemal ji Serxetê dadiketin

*K. A. : Tê bîra te kîjan salê bû?*

B. X. : Li dora 1965'an wan bû.

*K. A. : Hûn diçûn, hûn dihatin?*

B. X. : Em diçûn, em derdiketin jor.

*K. A. : Hespê we hebûn?*

B. X. : Qaçaxçî bê hesp bûn. Xwediyê qaçaxê hemalê xwe ji jorê digirtin. Hemalan her yekê çewalek davêtin pişta xwe, heya derdiketin pişta têlan. Hesp giş di pişta têlan de disekinandin, ji wê de. Wê çaxê bi devê Tirkan bû. Me li ber Girbeşkê xist, şaş bûn, pê li du mayinan kirin, mayinên mezin. 13 heb hatin kuştin. Heta Qîzikek di nav wan de bû. Ev Ş.yê Bafawî; Selman tê bîra te, li cem me bûn.

S. S. : Belê.

B. X. : Xaniyê wan ê ku Mihemedê Sofî Emin kiriye, di wir de bûn. Keçikek hatibû cem wan, bi mêvantî, xweha wê bi mêr bû; ew keçik perçe a li vê dera wê ket, di serê pêsîra wê re avêt. 12 heb mirin û keçik, me ew anî.

*K. A. : Keçik jî bi we re bû?*

B. X. : Keçik jî bi me re bû, wê biçûya jorê cem bavê xwe. Ev giş bi mayinê hatin kuştin. Perçê mayinê lê ket, eynî di serê pêsîra wê re avêt. Me bir heta Qamişlo, li Qamişlo mir. Ev bû 13. H. hebû ji Birtawa bû,

*K. A. : Bîrtawa li jêr e yan li jor e.*

B. X. : Bîrtawan li jor e. Ma di nav mayinan de, sê rojan.

*K. A. : Bîrtawa nêzikî kîjan bajarî ye?*

B. X. : Tu derdikevî rasta Mêrdînê gelekî nêzikî hidûd e, di beriyê de ye. H. heya sê rojan ma di nav mayinan de. Sax mabû. Îcar digot, min serê xwe bilind dikir esker bera min dida. Sê rojan ma. Piştî sê rojan hatin ew derxistin... Ew mal giş çû. Wê çaxê tê bîra min digotin, qîmeta wî malê Sûriyeyê bi dused û pêncî hezarî bû; ew mal giş çû. Wê çaxê min nas kir; E. hebû, layê Mala Hitê bû, ji Tûmikê bû. Ew jî hat kuştin.

*K. A. : Tûmikê li jor e?*

B. X.: Erê li jor e. Ev qaçaxa wan bû, daketibûn, me yê derxistibûna bi esker. Me birîndarên xwe bi xwe re rakirin, em tên. Gundê Girbeşkê, di ber hidûd de ye, li Sûriyeyê. Wan jî tiving bera me dan, wê çaxê. Mehmûdkê ban wan kir got, lawo karwanê min in, çima hûn wilo dikin? Axirê Mehmûdkê çû nav gund ji wan re got, sekinandin. Piştî wê em hatin, meşiyan, gihaştin Amûdê. Qaçaxçî hemû daketin Binxetê, kes bi jor neket, ên hatin kuştin hatin kuştin, ên din giş vegeriyan. Me giş anîn Amûdê. Bû sibe Hikûmeta Sûriyeyê Mehmûdkê girt, xistin hepsê. Me karê xwe kir; wê bibe êvar, em ê herin wî malî derxin ji hidûd. Me karê xwe kiriye, zilam pir in, giş bi sîleh in. Cewab ji me re hat got, esker ji Tirkiyeyê di hidûd re daketiye, giş hatiye ser hesin sekiniye. Wê çaxê me betal kir. Yanî em ê biçûna me yê ew mal derxista, şeva dinê. Gotîn, esker daketiyê ser hidûd, rabû me betal kir. Ew mal hemû çû.

*K. A. : Çima ahlê Girmeşkê li we teqand?*

B. X. : Qaçax bû, di ber gundê wan de bû, nedixwestin, ji ber hikûmeta Sûriyeyê. Gundê wan bû. Girbeşkê li ser hidûd e.

*K. A. : Bavê Xebat, ew meseleya girtina we, di kîjan salê de bû, çilo bû, çawa çêbû, hûn gelek hatibûn girtin?*

B. X. : Em bîst heb bûn. Wê derbê em hatin girtin. Dora 1970 û 72'yan bû ez dibêjim. Wê şevê li dora 80 siwariyên me wê dakevin Binxetê. Îşareteke me hebû, me got saet 11'ê şevê em ê li ber filan qereqolê bin. Qereqola Çadiran heye, li ber Xerezê ye.

*K. A. : Xerezê li aliyê Sûriyeyê ye?*

B. X. : Xerezê li Sûriyeyê ye, Qereqola Çadiran a Tirkiyeyê ye, di ber pirê de ye. Ez bi ro jî çûme wir. Rabû Mehmûdkê ji min re got, here rê veke, rê berê xuyanî ye. Wê çaxê min rê vedikir. Em çûn ser hidûd. Hevalin jî bi me re hebû, em ê hîn herin pêşiya karwanê xwe. Karwan wê ji jor bê. Îşareta me, wê bên pişta qereqolê derbekê berdin, em ê bera ekser bidin wê karwan dakevin. Em çûn, rêyeke wê hebû, kevn bû, me rê dernexist, rê ne xuya bû. Me hebekî rê vekir; Kermo hebû Kurimî bû, bi dû min de ji min re reş dikir. Wexta min xencer li erdê dixist, wî jî rê reş dikir. Ji bo em rê vekin, ji bo hesp dakevin.

*K. A. : Wek xaçerêkê?*

B. X. : Erê, xaçerêkek me vekir.

*K. A. : Wê çaxê qaçaxçiyê we li cem we bû?*

B. X. : Li Tirkiyeyê ne, hespên me jî li wir, li jor in. Me mîada saetê daye wan. Saet 11 em ê li ber qereqolê bin. Me gotiye, ku saet bû 11 em ê tivingekê berdin, hûn ê hazir bin û hûn ê dakevin.

*K. A. : 11'ê şevê?*

B. X. : 11'ê şevê ye. Me got, îşê we ji me û esker tune. Ez çûm min rê vekir, hingî giş kevir in, hişk e û riya kevn winda ye. Hinekî, mişwarekî min rê vekir, ez çûm min dît, di bin çonga min de mayineke ji yên biçûk teqiya. Dengê wê çûbû Xeraza jêrîn; Heto ji min re got. Heto jî li jêr bû, ew û rehmetiyê Berzan bûn. Dema teqiya min dît qaqilek ket ber min. Hîn germ bû, bes tiştek bi min nehat. Ez vegeriyam. Mehmûdkê li bin hesin rûniştibû, got, "Te çawa kir?" Min got, ez ketim nav mayinan û rê ne xuya ye, ez ê bêm kuştin. Ji min re got, "Baş e, ev karwan wê bê, heftê heyştê siwarî ne, ka em ê çawa wan li nav mayinan biqelibînin? Em ê çawa bikin? Ne divê ku rê vebe." Min got, tu li vir be, emrê min ji Xwedê re, hema ku ez bêm kuştin jî tê bê min xelas bikî. Got, "Ez ê jî bêm." Tebîetekî wî yê wilo hebû. Em çûn, me riya xwe vekir. Em gihan heta ber têlê, me xelas kir. Saet li dora deh û nîvan bû, me li

ber têla jorîn pal da. Em li ber qereqolê ne, wek vir û deriyê hewşê em nêzik in. Saet bû 11, me dît li qereqola Tilşiîrê teqîn çêbû.

*K. A. : Tilşiîrê li jor e?*

B. X. : Li ser hidûdê Serxetê ye, bes dûrî me ye. Me dît teqîn li wir çêbû, Mehmûdkê got, “Ew çi ye?” Mehmûdkê guhê wî giran bû. Min got, zaro şaş bûne. Wî jî got, “Weleh şaş bûne.” Hîn em wilo ne, me dît di hundirê qereqolê de li ber me cêba wan pê ket, esker derket wê herin. Rabû wê çaxê me her duyan bi du keleşkofan bera wan da. Îcar me bang qaçaxçiyan kir. Şev e, sê çar pûsî heta cem me hene. Yekî qaçaxçî rastî me hat kuştin. Gihan rasta me, me bang wan kir, hatin. Derbasbûna me bû bi zorê. Me giş daxistin. Yekî Girherînî pênc gule li lingê wî ketibûn. Qaçaxçî bû, Tat bû, gule li rehnê wî ketibû.

*K. A. : Derba gulê bû, we şer dikir?*

B. X. : 5 gule lê ketibûn. Şer bû, wek ku tu xwê bavêjî nav êgir. Axir me ew anî, me ew daxistin. Piştî karwanê me daket Mehmûdkê ji min re got, “Tu û Berzan vî lawikî bigihînin mala we, Amûdê.” Me avêt siyarê, me anî Amûdê. Me li mala me danî. Birîndar bû. Mehmûdkê kar û barê xwe kir, bar marê xwe birin, veşartin. Barê tûtinê bi wan re bû, veşartin. Wê derbê 80-85 siwarî bûn. Bû serê sibehê, şeveqê bi tirimpêla Xelîl Begê min birîndarê xwe bir Qamişlo. Doxtor B. hebû, me birîndarên xwe giş dibirin wir. Serê sibehê ez daketim, ez çûm ku ez herim sûkê, min nerî Mehmûdkê li ber derî ye; got, “Xalo vegere malê, weziyet ne baş e.” Ez hatim malê, nîv saet tê re neçû min dît carekê li deriyê me xistin. Min nêrî sê çar siyare, muxeberat û midûrê nehiyê û muxeberatên Qamişlo, yên Serêkaniyê û yên Dirbêsiyê hemû hatibûn. Olayî mezin bûye. Li derî xistin, min derî vekir, derbas bûn. Gotin, “Hada beyt Mecît Tahir wê? (Ma vir mala M.T. e)” Min got, erê. Xwe çem kirin min. Demança min bi min re bû, bi ruxset bû. Yaho ne şixulê muxaberata lo, kes nemabû, hemû hatibûn. Qewlikê demançê û du cercûrên wê di kêleka min de bûn. Demança min ji min stendin. Ez girtim, birim mexferê. Ez çûm mexferê, deh pazdeh heb anîbûn. Hemalên bi me re jî yên ku çewal mewal bar kiribûn, ew jî girtibûn. Heçî bêhna qaçaxê ji wan dihat hemû girtin. Welhasil em bîst heb qediyan, tevî Mehmûdkê bû 21. Mehmûdkê rakirin birin Qamişlo, yê me em man li Amûdê.

*K. A. : Ew kesên ku bi we re girtin bîst heb qaçaxçî bûn. Ên jor bûn?*

B. X. : Na yên Amûdê bûn. Kesekî Tirkiyeyê bi me re nehat girtin. Hemît Brahîm hebû, ji Hesîça bû; ez avêtim erdê. Di nav textê mexfera me ya Xeyalê de, di ya merkezê de.

*K. A. : Ji mexferê re bi Tirkî çi dibêjin?*

B. X. : Qereqol e. Du mixaberatan li min dixist, lingê min xistin felaqê. Ji min re gotin, "Rast bibêje." Kirin ne kirin min ji wan re negot. Min got, haya min ji tiştekî tune. Hemît got, "Rakin." Ez rakirim, şibake vekir, got, "Şûf (binêre)." Min nêrî ku li ber belediyê tirimpêla Îshaq.

*K. A. : Yanî ambûlans?*

B. X. : Erê. Muxeberata bi piyê min girtin, ew şirta, giş em çûn. Derî vekirin, ji mêrik re got, "Qûm (Rabe)." Rabû ser xwe, min dît lingê wî di cesê de ye.

*K. A. : Birîndar di wir de bû? Yê li cem doxtor B.?*

B. X.: Erê, ji wir anîne. De biner çawa girtine. Çil pêncî neferên Tirkan daketine Qamişlo. Ji Qamişlo hatine heya Ewênîkê. Eskerê Tirkan ev gund giş dane ber xwe. Ji wan yek hatibû kuştin, ji ber wî awayî. Îcar rabûn min dît got, "Qum (rabe ser xwe)." Got, "Ev kî ye?" Wî jî bi Erebî zanibû, got, "Mecît Tahir." Got, "Tu li mala wî bûyî şevê din?" Got, "E." Berê îfade hatiye dayîn. Got, "Wî tu aniyî ji çolê?" Got, "E." Got, "Tivingên Rûsî pê re hebûn?" Got, "E." Îcar min xwe nedît, ez avêtim erdê, wek fitbolê. Ew her du qehweyên me yên Amûdê li min vehewiyane. Welhasilî ew jî çû. Em di wir de hiştin. Bû şeva dinê, em hewaleyî Qamişlo kirin. Em bîst heb bûn, di wir de. Eskerê Tirkan daketibûn, bi meseleya usteymenê hatibû kuştin em girtibûn.

*K. A. : Bavê Xebat, te qala sînor kir, bes min fam nekir. Tu dibêjî têla jorîn, a jêrîn, ew têl çawa çêbûne? Çend rêz in? Mayin çend rêz bûn û çi şikil bûn, ew mayin çilo hatine danîn?*

B. X. : Min pêşiyê ji te re got, tu ji vir de diçî ser hidûd, tê 20-25 gavan bihejmêrî ji şiva hesin wê de, ber bi jor de, rêzek danîne.

*K. A. : Piştî 20 gavan rêzek tê?*

B. X. : Piştî 20 gavan rêzek tê, ew rêza hanê dibe sê rêz. Tirk jê re dibêjin 'avci zincîrî', tu çawa herî tu yê lê biqelibî. Tu wilo herî, tu çilo bêyî tu yê lê biqelibî. Ev rêza pêşî ye, sê rêz in, ji vana re dibêjin avci zincîrî. Piştî tu vana xelas dikî, tu digihêyî têla navê. Têla navê jî tu derbas dikî bi heman teqtîkê sisêyên din danîne, ev bû şeş.

*K. A. : Navbera ya pêşnî û ya din çiqas e?*

B. X. : Deh gav ji viyalî têla navê û deh ji wiyalî ve ye, şebeke ye. Tê ji têla navê deh gavan bi jor de herî rêza duduyan dîsa mayin in. Şeş rêz mayin hene.

Tu yê herî mişwarekî, dimîne dora pazdeh bîst gavekî, tu yê bigihêyî têla jorîn, esker li ber te ye.

*K. A. : Girêdana wan çawa ye?*

B. X. : Girêdana wan yek li vir e yek li dera hanê ye, yek li wir e, sêkuçî ne.

*K. A. : Celebê wan çilo ne?*

B. X. : Antî tanq hene, yanî li dijî tanqan; tiştê bê ser wê mayinê di biniya pêncî kîloyî re be nateqe. Jê re dibêjin antî tanq. Û antî personel heye, yanî li dijî mirovan û yên pîmpo heye.

*K. A. : A anti personel çawa ye?*

B. X. : Qapaxa wê di ser de ye, du aliyên wê bi neqir in. Qepsûna wê heye, dirêj e wek bûjiyê seyareyê ye eynî. Ew xeta li ser siwar tê tu pê li wê xetê dikî, kupîlik zirav heye, tu pê lê dikî diteqe.

*K. A. : Çi di nava wan de heye?*

B. X. : Ew a wek qutiya helawê giş TNT ye, tiştekî din tê de tune, bes mezin e. Ew a tanqan e. Ya antîpersonel giş perçeyê hesin in û ew jî TNT tê de ye. Tije bizmar in û hesin in, ji bo belav bibin. A din Tirk jê re dibêjin 'gurultulu'. Wexta diteqe însan şaş dibe. Ema ev giş aîdî kê ne. Aîdê însanan e. Wir wek behrekê ye, tu diherikî tu li ya din diqelibî.



FOT: Ahmet Şık

*K. A. : Carina te ew vekirine?*

B. X. : Wexta mirov venedikir, mesele xencer bi mirov re ye. Ew sîxikê wan giş davêtin, têl pê ve tune. Ew têlên min ji te re got pêşiyê ew riziyan, salekê girêdabûn bi ev ên antî personel, ew çûn. Ev ê dinê diviyabû te yan lêxista, li kêlekê serê wê zirav in, gelekî zirav in. Gelek jê ne xuya ne, bizmarên serê wê gelekî ziravik in, tûj in û av ketiye ser wan. Me bi wî awayî kişif dikir. Me dora wê vedida heta me vedikir. Me radihiştê, me datanî ber têlan, xelkê dihat ji xwe re dibirin.

**Sohbetên ku li Amûdê hatine kirin**:

*K. A. : Apê Birahîmê Hecî Qasim, êvara te bi xêr.*

B. H. Q.: Ahla û sehla.

*K. A. : Vê êvarê em li Amûdê ne, li mala te ne. Em ê şevbuhêrka xwe bi te re derbas bikin.*

B. H. Q. : Ser çavên min.

*K. A. : Çavên te hezar salî bin. Tiştê ku min bihîstiye te jî kar di vî sînorî re dikir, tu derbas dibûyî, tu dihatî, qaçaxî te dibir. Li ser vî sînorî gelek xelk hatin kuştin. Hin bi mayinan çûn û hin bi şerê eskeran.*

B. H. Q. : Erê weleh, gelek hatin kuştin.

*K. A. : Te jî bêşa xwe da, te lingekî xwe da.*

B. H. Q. : Min bêşa xwe da, belê.

*K. A. : Berî her tiştî tu karî çîroka lingê xwe ji me re bêjî, paşê tiştê ku te bihîstine û bûyerên ku bi te re çêbûn li ser vî sînorî? Ji bo xatirê ev tişt winda nebin, ji bo xatirê nifşên li pey me bên jî zanibin bê vî sînorî çi kir ji miletê me. Welatê me perçe kir, kir Serxet û kir Binxet û berê ev tişt tune bû. Kerem bike, çi di bîra te de heye?*

B. H. Q. : Şeva ku wilo li min hat, ne bi qaçaxî min lê xist. Şeva ku wilo li min hat, bi rêber ez derbas bûm.

*K. A. : Tu bi tenê bû, yan tu bi karwan re bû?*

B. H. Q. : Na. Ez û Şêx Ehmedê Şêx Xelîl bûn û Remziyê ‘Ewênî. Ew hevalên min bûn.

*K. A. : Ew jî li Amûdê bûn?*

B. H. Q. : Erê, ew jî li Amûdê bûn. Em ê derketina jor. Ez û yê rêber em li pêşiya wan çûn.

*K. A. : Zivistan bû, havîn bû?*

B. H. Q. : Havîn bû. Bi şev em derketin. Em çûn ji Mihetê û bi rohilat de.

*K. A. : Miheta Dirbêsiyê?*

B. H. Q.: Miheta Hemdûnê. Me jê û bi rohilat de rê vekir û em çûn. Ez û yê rêber em çûn. Bavê Bîrhîmkê bû, ev Bîrhîmkê me yê vê derê.

*K. A. : Rêberê we ji Amûdê bû, yan ji jor bû?*

B. H. Q. : Na, rêber ê Şêx Mistefa bû. Me da dû hev, ez û wî tenê em çûn. Barê min 75 kîlo bû, min rahiştibûyê. Wê heywan bên ser hesin re, ser esker re bi sed gavekî din wê heywan bên pêşiya min, ez ê lê bikim, ez ê herim, em ê herin jorê. Me şivîleya ewil derbas kir, Şêx Ehmedê Şêx Xelîl, Remziyê ‘Ewênî bergîl bi wan re ne, wê hîn bi dû me de bên; em ê li wan vegerin. Me

şivîleya ewil derbas kiriye, em gihan a duduyan. Tava heyvê ye, em ê bi esker derbas bibin. Esker li ser hesin e, em li wan dinêrin. Li şivîleya jorîn mayin bi min de teqiya. Barê min giran bû, ez di aliyê mayinê de ketim. Zeynîkê Emîno rêber bû, li pêşiya min bû. Li min vegeriya, bazda. Min got, wey Zeynî! Ma tê min li vir bihêlî? Got, "Na." Got, "Bisekine." Wî jî barê xwe li wir avêt, li min vegeriya. Got, "Tu dikarî rabî ser xwe?" Ez rabûm ser xwe. Destê xwe avêt piyê min. Riya me heye; ji rê ez daxistim. Heta nêzikî hesin deh pazdeh gavan, li wê derê tişt tune ye. Min kir nekir ez nebirim jorê, ez vegerandim. Got, "Ez te bibim jorê wê esker tifingê bera te bide. Eva tu di nav destê min de kuştin, me çi jê fêm kir. Divê ez te bibim Binxetê." Ez berjêr kirim binê xetê. Ez anîm ser pişta hesin, li wê derê ez danîm. Reha lingê min a qalind ew çûye, wek ku tu şûrekî lê bixî, pehnî û reh tevde çûne. Wek bilîneka misîn xwîna min davêt. Ah ev zend û bendên min bûn, ez xort bûm. Ev va ye bû çend sal. Li wê derê ez danîm. Got, "Ez nema karim te bibim derekê." Got, "Ez ê herim, va ye Şêx Ehmed û Remziyê Ewênî wê bergîlê bînin, ez ê bergîlê bînim û bêm. Em ê te lê siwar bikin, te bibin." Berjor bû. Min bang kirê, min got, Zeynî. Got, "Hê." Min got, malxerab, tu min li vir nehêlî ha. Got, "Xwezka te wilo negota, çilo ez ê te li vir bihêlim." Çû. Min dît Remzî û Şêx Ehmed bergîl vala anîn. Rahiştin min ez li bergîl kirim. Lawo ev heywana hanê bêhna xwînê çûyê, ê xwe hiltanî û li erdê dixist, xwe hiltanî û li erdê dixist. Îcar yekî ji wan bi serî girtibû, duduyan jî bi viyalî û wiyalî min girtibûn. Ez anîm gundê mala Hecçolê, Hemdûna wiyalî, li wê derê ez danîm. Remezan got, "Îşev em nema derin." Zeynîkê Emîno jî got, "Pismam." Min got, hê. Ji min re digot pismam. Got, "Bextê Xwedê di navbera min û te de be, heya ez barê te nebim ez ê xwe nabim. Mekeve mitala barê xwe, ez ê barê te berî yê xwe bibim, xelas bikim û dûre ez ê li yê xwe vegerim." Remziyê Ewênî hat. Min got, Remzî. Got, "Hê." Min got, tê herî (bavê min extiyar e, wek min û aniha bû), here ber derî (eyn mala me dîsa li vir bû), ku tu çûyî ban bike; bêje, Apê Hecî derkeve were îşê te heye. Bi dizî jê re bêje, bila maliyên min pê nehisin. Wê bikin lûblûb, pîrek in. Bi dizî ji bavê min re bêje mayin pê de teqiyaye, rihet e.

Jê re digotin Hûto, cîbeke wî hebû, li vê derê bû, niha mala wî li Qamişlo ye. Tim qaçaxa min dibir ber hesin û vedigeriya. Berî ku wilo li min bê, ji min re got, "Binêr, carekê ez ji te re lazim bibim çi wext be ez hazir im." Min ji Remziyê Ewênî re got, ji bavê min re bêje. Ji zaroyên min Mûsa jî temam e. Ehmê li eskeriyê ye. Min got, bila Mûsa here, mala wî nas dike, bila here jê re bêje, bê, bavê min mayin pê de teqiyaye; bê, gotiye bila zû bi min ve bê.

Remzî hat, ji wan re got. Çûn ji Hûto re gotin. Hûto wê saetê, ew, bavê min û Mûsa hatin ser meytê min. Heta hatin ez ji hişê xwe ketim. Ne kesî birîna min girêda! Du cemedan bi min re bûn, ku min girêdabûya tiştek bi min nedihat. Li halê xwe xwîn sekinî. Hatin ez xistim cîbê. Îcar ez di kur re anîm? Ji Hemdûna viyalî ez berjêr kirim di sînor re, ez anîm Dîkê. Ji Dîkê ez birim Tilhebeşê û ji Tilhebeşê avêt Mûza.

*K. A. : Tê herî Qamişlo?*

B. H. Q. : Erê wê min bibin textorê Qamişlo. Avêt Mûza, Girê Dimdim, jê û wê de ez birim wir û ez birim Çemê Sebahiyê û ez hilkişandim ser cedê. Di gundê Mala Cim'a re ez hilkişandim ser cedê. Got, "Ji vir û ha Amûdê ye û ji vir û ha de jî Qamişlo ye." Dewriya Qamişlo jî li me rast bê em jê natirsin. Ez birim Qamişlo. Li deriyê Misteşfa mezin ez danîm. Ji bavê min re got, "Apo ew hişê wî nemaye. De va ye ez ê herim, esker hat kî hat, bêje, kê em anîn em wîna nas nakin; yekî bi xêra xwe em anîn li vir danîn û çû. Ne mehkeme, ne filan û ne bêvan, îşe we bi min tune." Ew çû. Rohilat em gihandine ber misteşfê. Textor tune. Axir ev mumeridên din bi textor re şitexilîn, gotin, "Zû were pê ve." Yek hat, got, "Tiştek tê de nemaye, yê mirinê ye." Got, "Xwîn jê re lazim e." Rehma Xwedê li miryê we be, lê be, bavê min got, "Xwîna min bigirin û berdinê." Ê mumerid got, "Kalo va ye tu berê miriye, em ê gunehê te jî di stûyê xwe xin." Axir, derziyek li min xistibûn û mêrik li gor aqilê xwe lingê min jêkir. Lingê min ne yê jêkirinê bû ha. Min her pênc tiliyên xwe dileqand. Lingê min rihet bû. Rabû pê ket lingê min ah di vir de jêkir. Hema te di vir re jêkiribûya (*Bi destê xwe cihê dibêje dide xuya kirin*). Derbeke din, ji Xerezê û vir de çar rêber hatin pêşiya me.

*K. A. : Ew çi wext bû?*

B. H. Q. : Ew jî havîn bû, bi şev em lê dixin. Her çar ji jorê daketin, çar rêber hatin. Dûrî hizûra we, kûçikên wan hebûn. Berê li qereqolan kûçik digirtin, ji bo ku pêjnê bikin herin wan. Em çûn her çar rêber hatin pêşiya me, gotin, "Lawo em çar in, hûn ne ji me çêtir in û em ê lêxin." Em nêzikî 15 kesan bûn.

*K. A. : Hesp bi we re hebûn?*

B. H. Q. : Şeş ker bi me re hebûn. Ê min bi xwe kerek ez lê siwar bûm, lingê min tune bû. Min firaxên xwe lê kiribûn û ez lê siwar bûm.

*K. A. : Bi ser wî halî de, lingê te çûbû hîn jî te dev ji karê xwe bernedabû? Wek mereqê tê xuyakirin.*

B. H. Q.: Wek ku ez herim dawetê. Rêberan got, va ye em ê herin. Em jê re dibêjin Qereqola Çadiran, kûçikên qereqolê reyan. Ban wan kir, got,

“Lawo em hatin, bê bêbextî.” Bi Tirkî ji wan re got.

*K. A. : Rêberan ji qereqolê re got?*

B. H. Q. : Erê. Reqandin hev. Berdan hev, dudu ketin vî aliyî û dudu ketin wî aliyî. Bi du cihan li me teqandin. Em derbas bûn. Buxçika hevalekî min li bin min danîbûn. Li ser ceda wan ew buxçik ket, ez daketim. Min ban ê rêber kir, Hemîd, Hemîd. Got, “Ehe! Li min malxerabê, çi bi te hat?” Min got, wer, tişt bi min nehatiye, wer bi min ve. Hat. Min got, ha wa ye buxçik ketiye, ya hevalan e, wê bê ji qazî ve avêtiye. Çû, rahiştê anî. Got, “Malxerab ma ev der cihê buxçikê ye?” Xist bin min, ez siwar kirim got, “De here.” Hey reqîn e, li viyalî li hev diteqînin û li wiyalî li hev diteqînin; toz û icac e. Min ajot, kerê min xurt bû. Ez çûm, giham hevalan. Ez çûm Bixeydîkê. Min ban Şeban kir, min got, were buxçika xwe.

*K. A. : We xwe xelas kiriye?*

B. H. Q. : Em xelas bûne, em li Bixeydîkê ne. Şeban got, “Buxçik ne ya min e.” Min got a kê ye? Got, “A M. Axa ye, M. E. ê Qurdîsî.” Min got, lawo hey te d... Bi Xwedê ku min zanibûya ya M. E. e ez danediketim û ez lê venedigeriyam. Lawo min got qey a te ye û wê bê ji qazî ve avêtiye. A va ye Hemîd. Hemîd got, “Lawo ez çûm min buxçika te anî, dîsa xist bin wî; di wê teqînê de ji bo wê destmalê daketibû.” Wê derbê em wilo xelas bûn. Carekê li Zeytûna,

*K. A. : Zeytûna li ku dikeve?*

F. Ş. : Qublêyê Merdînê ye?

B. H. Q. : Navbera me û Mêrdînê sê saet in, bi meşê. Zeytûna jê û vir de ye, di qelaç de ye, di pala çiyê de ye. Niha bi vê seqetiya xwe ez herim ez ê bigihêm Zeytûna, hîn şeveqê lê nexistiye.

*K. A. : Naxwe ev navê ji we re dibêjin Zeytûnî, ji ber gund ji we re dibêjin?*

B. H. Q.: Navê gund Zeytûna ye, erê. Em hatin wê derê me şîv xwar, me şevbuhêrka xwe kir, li gundê Zeytûna, em rabûn hatin. Hevalekî me bi rê de raneza. Me pal da me got, dinya zû ye û tava heyvê ye. Me got, bila heyv here çêtir e. Em meşiyan, em hatin pişta Gurgurî. Em li wê derê pêjna esker nakin. Em hîn ne gihane hidûd, me dît derbekê got, kuro! Derba din got, kuro! Bera me dan. Me berê xwe da heyvê û em meşiyan.

*K. A. : Esker bûn?*

B. H. Q. : Eskerê qereqola Qesra bûn, cendirme bûn; wê biçûna Tilşiîrê ser yekî firar. Yekî firar xwe teslim nedikir, wê bi şev biçûna bigirtina ser mala wî. Me wilo bihîst. Em ketin fesalê, ez û hevalekî min. Min dît, hevalê min bi stû ve çû erdê. Havîn bû. Min got, belkî komên axê çûbin xwarê. Ez derbas

bûm min got, kuro bimeşe kuro! Deng jê nehat. Em ji derba fişekan derketin. Cih bilind bû, em qulipîn. Sê çar hevalên me li pêşiya me diçin. Ew çûn ez mam sekinî. Xalê min Mihê tiving pê re bû, ew jî bi me re bû, hat giha min. Min got, hevalê me ma. Vegeriya, çû ser. Hey reqîn e, berdidinê. Çû, got, “Wele temam bûye.” Min got, çawa? Got, “Erê wele, ez çûm ser, temam bûye.”

*K. A. : Ew ji ku bû?*

B. H. Q.: Zeytûnî bû, mala wî li Qazamûkê bû. Ya min jî li Qazamûkê bû, em ê daketina Binxetê.

*K. A. : Mal bi we re hebû?*

B. H. Q. : Erê her yekê me têra xwe mal anîbû. Berê me capûn ji vê derê dibir, me li wir difirot, me dida dikançiyan. Li vir erzan bû, li wir buha bû. Derba ewil li qafê wî ketibû. Bi dev ve ketibû.

*K. A. : We çi kir jê?*

B. H. Q. : Ew li wir ma.

*K. A. : We li wê derê hişt?*

B. H. Q. : Em nikarin bînin, hidûd dûr e. Hidûd zêdeyî saet û nîvekê hîn heye. Giran e, ma em ê çilo rahêjinê. Me ban hevala kir, me heval vehewandin.

*K. A. : Heywan bi we re tune bû?*

B. H. Q. : Na. Em derbas bûn, em hatin. Me ew li wê derê hişt. Sibehê Gurguriyan hatin ser, ew birin. Li wê derê ew şûştin, xistin mezelê Gurgurî. Ew yek ji yê bi me re hatibû kuştin.

*K. A. : Ji bo vegotinên te, saeta te xweş.*

B. H. Q. : Tu înan bike ji me re bûbû wek kurmekî. Ma ez yekî tenê bûm, tu birayên min tune bûn.

*K. A.: Çawa destê te li te digeriya? Te çawa qiymişî bavê xwe dikir, te xwe li van sînoran diqeliband?*

B. H. Q. : Rehma Xwedê li miriyên te be û li wî be, digot, “Lawo ji bo Xwedê nere. Ji me re ne lazim e qaçaxî.” Dikir û nedikir min dev jê nediqeriya.

*K. A. : Ew Miradê Sêvê hebû, te nas dikir?*

B. H. Q.: Li Qamişlo bû, ewî mayin radikir.

*K. A. : Tiştek ji çîrokên wî nayên bîra te?*

B. H. Q. : Ew li Qamişlo bû, em li vir bûn.

*K. A. : Hûn ne tevde bûn?*

B. H. Q. : Na. Ez behsa çûneke din ji te re bikim. Em li biniya Kemaliyê

gihan hev, em ê ji Amûdê herin ber bi jorê de. Em şêst zilam ji Qezamûkê û ji Dîkê û ji Erebkendê û ji Amûdê, em şêst zilam gihan hev. Sih hesp û bîst tiving bi wan re bû.

*K. A. : Cebheyek bû.*

B. H. Q. : Erê. Em çûn.

*K. A. : Barê we çi bû?*

B. H. Q. : Barê me qaçax bû. Me ji Amûdê bir, em ê bibin jorê. Em çûn ber hesin, me dît du rêber ji jorê ve hatin. Berê ilmê wan kiribûn gotibûn, îşev wê karwan bê, werin pêşiya me, em ê derbas bibin. Hatin. Kîne yên ku şitexalî bi wan dibe? Bilalê Evdilwehab û Smaîlê Evdilwehab, ev serkarwan in. Hatin ji wan re gotin, wele îşev teqwiye heye, çawîş gotiye ji bo Xwedê bila neyên. Teqwiye, eskerê li pişt eskerê din in.

*K. A. : Yanî xetek eskerên din danîne.*

B. H. Q. : Erê. Gotin, “Bila neyên.” Hevalê me gotin, “Em nikarin vî îbadelî lê biqelibînin, çi heqê me li wan heye.” Vegeriyan. Yilmezê Xursî hebû, nizanim we navê wî bihîstiye? Yilmezê Xursî bangî min kir.

*K. A. : Ew jî ji Amûdê bû?*

B. H. Q. : Mala wî li Amûdê jî bû û li Xursê jî bû. Got, “Pismam.” Min got, ha. Got, “Tu çawa yî?” Min got, lawo ma ez ji te çêtir im, ma tu fedî nakî? Wê çaxê lingê min hebû. Got, “De were.” Min got, hevalekî min heye. Ez û yekî Qelenderî bûne şirîkê hev, me mal kiriye. Got, “Ew jî bila bê.” Her sê siwaran, xwediyên sê hespan gotin, “Ê me em ê herin.” Me got, em ê jî bi we re bên.

*K. A. : Ji nav wî karwanî?*

B. H. Q. : Ew karwan giş vegeriyan. Em sê siwar û du peya ne. Rabû me barê xwe bi nêvî kir, me avêt ser hespan û em siwar jî bûn, ez û hevalê xwe. Ew her sê bi tiving in, li pêşiya me bazdan. Gotin, “Hema reşê me bibînin, ku we dît em ji hev belav bûn û me li hev teqand hûn di aliyê din re herin, venegerin, herin.” Me got, baş e. Me li wan nêrî, me dît winda bûn. Hespan xwe kişand; em di wan de derbas bûn, me tişt nedît. Wek vir û sûkê em derbas bûn, me tişt nedît; neteqiya. Min ji hevalê xwe re got, bajo. Me civan daye wan, em ê herin qelêç. Cihê ku me ji hev re gotiye, em çûn wir. Em peya bûn, hebekî me bergîl gerandin, me dît va ye hatin. Yilmez bang kir, got, “Pismam.” Min got, ha. Got, “Ma wilo ye malnexerab? Ma ne me got, dema em li hev neteqînin hebekî hûn berjor hatin bisekinin.” Min got, erê, ji bo ku tu siwar bûya û îcar min li dû te bazda. Hema me li hev teqand û va ye em gihan vê derê.



*Fot: Ahmet Şık*

*K. A. : Yilmez ne wê çaxê hat kuştin?*

B. H. Q. : Na. Yilmez derbeke din hat kuştin.

*K. A. : Ew çawa hat kuştin?*

B. H. Q. : Yilmez tê hidûd, ji jorê dihatin; ew li pêşiyê ye. Hevalê wî bi xayintî beradayê, bi bêbextî. Ji Mêrdînê sibehê kifş hat ser, li hidûd; got, "Ev gule ne ya esker e." Hevalê wî ew kuştibû. Îcar hikûmet hat. Berê navê wî di hikûmetê de pir bû, Yilmezê Xursî. Avêtin dû cîbê, kişandin bi dû xwe de, heta ba Qiziltepe. Li wê derê çûn tenekeyek gaz anîn ku bi ser dakin bişewitînin. Vêca ciwamêrên wek te, çûn xwe avêtin tûxayê, nizam e çi ye, gotine, "Bavo, ma niha ev çûbe çûye, mena ku hûn bişewitînin ji bo çi ye? Ka bidin wan, bila bibin veşêrin." Li ber wan geriyan, meytê wî dan wan. An na wê bişewitandina.

Smaîlo hebû ji Qereqûmê bû? Smaîlo jî bi lingekî bû, ez jî bi lingekî bûm. Li wê derê dihat ba min. Em her du jî li keran siwar bûbûn.

*K. A. : Heta wê çaxê jî we qaçaxî dikir, ew kengî bû?*

B. H. Q. : Ew vê taliyê bû, wilo li lingê min hatibû.

*K. A. : Belkî wî jî lingê xwe di nav mayinan de winda kiribû.*

B. H. Q. : Erê, erê, wî jî lingê xwe di nav mayinan de winda kiribû. Ew bi lingekî bû û ez bi lingekî bûm.

*K. A. : Welehî cotekî temam bû.*

B. H. Q. : Em her du tenê. Çi bi me re bû? Du çifte bûn. Em çûn di cem Tûkê re, vê Tûkê, ne Tûka viyalî, Tûka mala Hecî Osman.

*K. A. : Rojavayê Amûdê.*

B. H. Q. : E, e. Em çûn nav têlan, ewî mayin rakirin. Smaîlo mayin radikirin. Min got, de lawo ez ê li ber her du keran bim, tu here rê veke û em ê herin. Çû, ma, ma, ma; hat got, "Esker heye." Min got, esker çilo heye? Got, "Esker heye em ê vegerin." Wê şevê em hilnekişiyan. Bû ya din î şevê dîsa em çûn di wir re. Dîsa çû, nêzikî du saetan ma, hat got, "Esker heye." Min got, lawo weleh ez fedî dikim vegerim. Wê pîrek henekên xwe bi me bikin. Wê bêjin, hûn diçin ser hesin û vedigerin. Hema bi Xwedê ez venagerim. Got, "Wa! Ma ez ditirsim? Bimeşe!" Her du ker bi min re ne. Da pêşiya min, got, "Bimeşe." Da pêşiya min em meşiyan, çûn. Hema me nihêrî em li têlê qelibîn. Têla jorîn a ku em ê derbas bibûna. Hema me wilo danî, me her du kerên xwe derbas kirin. Me tiştek nedît. Em meşiyan, min got, ha ji te re kerê te. Min kerê wî dayê û ez li yê xwe siwar bûm, min ajot. Em çûn, me barê xwe firot, qaçaxa xwe.

*K. A. : We li ku firot, li bajar?*

B. H. Q. : Em çûn gundê xwe, Qelendera û li Tixûbê me difirot.

*K. A. : Qey hûn li gundan digeriyan.*

B. H. Q. : Erê erê! Bi serê te, ji wir de dîsa em daketin. Her yekî ji me 60 kîlo me li kerê kiriye, em li ser jî siwar bûne. Em hatin, dîsa ser têlê, mêrik li min vegeriya, min got, çi ye? Got, "Va ye esker." Min got de binêre, ew ne esker e. Got, "Belê." Min got, em ê sed gavî wilo herin, em ê dakevin. Em sed gavî wilo çûn. Min got, de bimeşe. Min dît dîsa li min vegeriya, got, "Va ye esker." Ez nabînim, lawo îcar bû çi? Ma em ê vê şevê vegerin ku? Tilkîtepe, te navê wê nebihîstiye?

*K. A. : Na.*

B. H. Q.: Va ye li vê derê ye. Me got, em ê Tilkîtepe derbas bikin û em ê di wir re dakevin.

*K. A. : Gundek e?*

B. H. Q. : Gund e. Em lê fitilîn wek sedgavekî û em daketin.

*K. A. : Ma hûn ji mayinan neditirsyan?*

B. H. Q. : Em ji mayinan bitirsin netirsin divê em dakevin. Derdê me ku em dakevin. Hevalê min li pêşiya min e. Min dît dîsa li min vegeriya û derbas bû çû. Min got, çi bû lawo? Em gihane têlê ha. Kuro tê herî ku? Kuro tê herî ku? Mêrik bi ser cedê ket, çû. Ez gihamê. Ez bi çifte me û ew bi çifte ye, min lê da şîqamê. Got, "Wa! Tu li min didî şîqamê." Min gotin motinin jê re gotin, min kerê wî jî berda û got, tu bi ku de derî here. Ez û tu nema hevaltiyê bi hev re dikin. Ê min ez çûm gundikê Mala Mele Derbik...

**Hevpeyvîneke din**:

*K. A.: Birayê Mihemed Kerîmê Rişwanî, êvara te bi xêr. Em hatin şevbuhêrka te, civata te, em dixwazin hinekî li ser vî sînorî biştexilin. Vî sînorê hanê erdê me, welatê me perçe kiriye, em di navê de bûne Serxetî û Binxetî. Gelek bûyer çêbûn. Bi mayina gelek xelk hat kuştin. Tişt miştên wilo di bîra te de, dema rehmetiyê bavê te Şikriyê Rişwanî de, tiştin wilo te ji me re bigotina, ji bo ku ji bîra nebin. Ev bûyer winda nebin.*

M. K.: Ser çavan, tiştê ku ez zanim tarîxa ku ez zanim, wextê bavê min kiriye, bi dû bavê min de Mehmûdkê jî kiriye, gelek ciwamêran jî kiriye, gelek ciwamêr hatine kuştin û te dît tiştê ku ez zanim. Zemanekî bavê min got, "Lawo tiştek li Tirkiyeyê tune bû, em dihatin Sûriyeyê me dohnê gazê dibir. Piştî dohnê gazê me lastîk ji vir dibirin, xelkê ji xwe re dikirî, dikir çarox." Wê wextê fileh li vir hebûn. Baboz hebû, ji me re tanîn. Ev lastîk me dibirin dikirin çarox û piştî vana xurme dibirin. Xelkê me yê Tirkiyeyê gelekî feqîr bûn, direviyan dihatin Sûriyeyê. Xela mela çêbû, bavê min mala xwe anî Tilhebeşê. Birayê wî biraziyê wî pê re bûn. Li Tilhebeşê li cem Hecî Brahîm ma. Te dît bavê min xwe nedixist bin tesîra tu kesî. Dîsa xela li jor rabû, xelkê dihat genim ji vir dibir, ên ku liqat dikir; xelk feqîr bû, mirov ji xwe re digeriyan. Ên ku olçekek ên du olçek ê ku ji xwe re ker tanîn, te dît bi keran jî dihatin. Got, "Rojekê em hatin, melûm e xelk li min vedihewiya, cemaet dihat cem min. Min jî dixwest qenciyê bi feqîr û fuqara bikim. Min feqîr derdixistin, bi devê tivinga xwe min derdixistin. Melûm e biraziyê min bi min re ye, xwarziyê min bi min re ye." Te dît melûm e ne ew tenê ye. Digot, "Hinek ji min bêhtir bidesthilanînbûn lê nav dibû navê min. Te dît ew ê din ji min jêhatîtir bûn. Bes nav dibû navê min. Kê çi dikir digotin Şikriyê Rişwanî ye." Digot, "Lawo însanek tenê be, Şêrê Elî be deng jê nayê." Ne got ez, bê ez nabe. Got,"Wexta cimaeta min a ku bi min re bû ji min xurtir bû, me çûn û hatina xwe kir." Got, "Rojekê em hatin li Tilhebeşê man." Got, "Hecî Brahîmê Heso xeyîdî." Berê xelk û mehkûm hemû lê vedihewiyan. Ji bavê min re dibêje, "Yabo te gundê me kiriye yê qaçaxçiyan, em qebûl nakin tu di gundê me de qaçaxçiyê bikî." Bavê min dibêje, "Heyran ez nema dikim."

*K. A. : Ev di zemanê ku Frensa di vir de bû.*

M. K.: Erê, di wî zemanî de ye. Bavê min got, "Me dît pêncî şêst kes ên bi (heşa) keran, ên ku genim xistine nav pişta xwe, hatin cem min. Çûne cem kê xelkê gotiye, kes nikare encex Şikrî kare wan derxe Tirkiyeyê. Ew jî hatin li gund vehewiyan. Min got, lawo ez nikarim. Ez dixwazim we bibim, bes Hecî

Brahîm qebûl nake. Heyran herin cem Hecî Brahîm, heke got erê, ez ê we derbas bikim. Ku bê na ez jî wek we." Diçin ji Hecî Brahîm re dibêjin, xwe davênê, dibêjin Hecî Brahîm, Şikrî gotiye, "Wexta Hecî Brahîm nebêje bila wan bibe, ez jî nikarim." Hecî Brahîm li alemê dinêre, te dît, heşa ker û der, di nav çavê xelkê de... Hecî Brahîm bangî bavê min dike dibêje, "Tu serbest î." Wexta tên dibêjin serbest e, bavê min jî karê xwe dike. Melûm e lawe apê wî pê re ne, biraziyê wî Hemîd e, Cimo ye, Simo ye; te dît ne ku ew tenê ye. Radibin lê dixin wî karwanî ji Tilhebeşê bar dikin; ên ku bi keran, ên ku bi firaxan wan derdixin, derdixin Tirkiyeyê û vedigerin. Vegera ku vedigerin, gumrik û derek berê hebû, siwarî bûn, dikevin pişta gund, Tilhebeşê, pêşiya wî. Li hevdu rast tên, bera hevdu didin, teq teq teq. Bavê min digot, "Min esker nedikuşt, min di ser serê wan re berdida." Got, "Min xwe xelas kir ên ku fişekên xwe avêtin, ên gumrikê, ên ku -dereka- hespê xwe hiştin reviyan nav gund. Filtî filtî reviyan, kes nizane çûn ku. Hesp hiştin, fişekên wan ji wan ketin." Got, "Ez eleqa xwe ji fişekên wan naynim û ez hatim me xwe da alî." Got, "Min got, lawo xwe bidin alî, bi Xwedê ev wê lîstikê li me çêkin." Got, "Me xwe da alî." Sibehê eskerî digirin ser gund, digirin ser Hecî Brahîm, li Tilhebeşê. Dibêjin, Hecî Brahîm ev zilam di vî gundî de ye, va ye fişekên wan jî, hespê wan, derê wan. Ê melûm e şitexaliya zilamê baş dimeşiya. Jê re digotin Qayîfesîh, qey Hecî Brahîm dere cem wî. Qayîfesîh jê re dibêje, yabo tu vî zilamî ji ku tînî tu yê bînî. Bavê min got, "Hecî Brahîm hat cem min, got, yabo ez ê te bibim teslîmî wî bikim." Qey Qayîfesîh ji cem xwe qanix kiribû. Ji bavê min re gotiye, "Weleh ez çar gundên xwe li ser te bidim jî ez ê te xelas bikim, netirse."

F. Ş. : Xalo wê çaxê Frensa li vê derê bû?

M. K. : Ez nizanim, wî wextî li vir e, ne li vir e ez nizanim. Got, "Ez hatim ez çûm cem Qayîfesîh, min got, "Ez tu caran esker nakujim, em mudefaya şexsê xwe dikin." Hecî Brahîm ew qanix kiribû. Bavê min got, "Dev ji min qeriya." Ê melûm e navê wî heye, nas e, her ku tiştek dibû ban dikinê. Di wê dewrê de mala wî li Tilhebeşê bû. Bavê min got, "Ew dewre çû, dewrek din hat." Te dît, dewra pezê sor çêbû, ji Serxetê tanîn.

*K. A. : Yanî demekê genim derbas kirine, demekê pez derbas dikirin.*

M. K. : Dohnê gazê derbas kirine, piştî dohnê gazê genim derbas kirine.

*K. A. : Ji wir tiştek bi xwe re nedianîn?*

M. K. : Carna fişek dianîn, demançe dianîn.

*K. A. : Pez jî ji wir dadixistin.*

M. K. : Bi dû vê re -ez jî wê çaxê zaro bûm- min dît pezê sor dikirîn. Pezê

Wanê bû. Pez dihat, îcar ahilê Bihêrkê Dawidê Selmano hebû, dikirî dadixist. Mala Hitê dadixistin. Em bêjin, keriyek pez bikirîna gelek, heta Merwan Axa dibû şirîk, lawê apê wî dibû şirîk. Dibûn şirîkê hevdu. Mesele yekî hezar wereqe datanî, yekî du hezar datanî, yekî sê hezar datanî.

*K. A. : Yanî bazirganî bû.*

M. K. : Wexta esker berdida diçûn, wexta esker bernedida bi zorê lê dixistin, bi devê tivingan.

*K. A. : Wê çaxê mayin tune bûn?*

M. K. : Mayin tune bûn, na. Bavê te Mehmûdê Hecî Qaso, Hecî Hemîdê Alya, ev jî dihatin pêşiya pez. Licî jî dihatin cem bavê min, siwarê Liciyan bîst sih siwar dihatin cem.

*K. A. : Licêya cem Amedê?*

M. K. : Erê. Ew Licî bi hespan dihatin. Malê metroyê, malê erînê ji xwe re dibirin. Mesele dihatin heta mala we jî. Min jî dîtin, hespên wan wê bihatina vir, wê Êta ji wan re mal kirîbûya. Qelemsultan bûn, pelê cixareyê bû, çakêt bûn, êlek bûn. Hemû ji sûka Amûdê dikirîn. Bar dadigirtin, Licî ji xwe re dihatin. Bîst, sih, çil hespên wan dihatin, ji cem me bar dikirin, ji xwe re dibirin, difirotin.

*K. A. : Dibirin Amedê?*

M. K. : Erê, hemû Carbekirî bûn. Ev qaçax dewrekê wilo bûn. Dihatin cem mala bavê te (*Ji yê tenişta xwe re, yanî ji kesên di civatê de yê din re dibêje.*), cem Hecî Hemîd. Wextê ew pez dadiket. Vêca ev ê Sûriyeyê dihatin pêşiya pez, pez risas dikirin. Berê diçûn cem gumrikê, yanî va ye wê pez ji me re dakeve. Yanî, wextê pez dadiket hikûmetê eleqeya xwe jê nedianî, heta zilam tevî tivingê bihatina jî eleqeya xwe jê nedianîn. Îcar mabû Hecî Hemîd, bavê te û Mehmûdkê vê dawiyê rabû. Her yekê li halê xwe û ji xwe re bi hevdu re ev qaçax dikirin. Mala Hitê dihatin cem Mehmûdkê jî.

*K. A. : Mehmûdê Hecî Hesen, Mehmûdkê û Hecî Hemîd*

M. K. : Mala Hitê dihatin cem Mehmûdkê, bavê min dihat cem Mehmûdê Hecî Hesen û Hecî Sebrî vana; qonaxa wan başqe bû, qonaxên ev ên din başqe bû.

*K. A. : Wê çaxê derbaskirina sînoran rihet bû?*

M. K. : Na na, mayin tune bû, bes dîsa bi zorê bû, kuştin çêdibû.

*K. A. : Wan û eskeran li hev dixistin.*

M. K. : Li ser kuştinê jî ez bêjim. Bavê min got, em derbekê li ba vî Gundikê Evdirehman pişta Hazdê. Bavê te ew çûn pêşiya wan. Mehmûdê Hecî Qaso, Hecî Şerif çûn pêşiyê.

*K. A. : Navê gund çi bû?*

M. K. : Hazdê.

F. Ş. : Şikriyê Rişwanî û bi barê xwe ve wê dakeve?

M. K. : Ew wê pez bîne û bar jî, te dît, hesp jî bar kiriye.

*K. A. : Barê wî çi bû?*

M. K. : Tiştê ku ji jor dadiketin şima bû, hingiv bû. Te dît, em nikarin van tiştan bêjin... Ev li ser pişta hesp kiribûn, wê dakevin. Xwarziyekî wî, biraziyê wî di nav de ji sê kesan re gotibû, "Ev hesp ê we ye, hûn ê bi vî hespî re bin, hûn hespê xwe bernedin. Malê din here jî, hema vî hespî (malê xelkê), xelas bikin." Got, "Em daketin." Got, "Yekî xwe ziqziqandibû, -xortek Xirbamitî bû, xalanê min bû-" Gotiye, "Kanê serê hespê bidin min, ma ez ê çilo hespê berdim." Wan jî gotiye, "Ha ji te re." Hesp, danêyê. Bavê min dadikeve; çend hevûrî kirîne. Ev hevûrî başqe ne, ev ê mintîqa me Omeryan in. Ji Kurka Çeto li pêşiya xwe kirîne. Gotine berê em ê van hevûriyan derbas bikin û dûre pez bi dû me de bînin.

*K. A. : Hevûrî çi ne?*

M. K. : Nêrî ne. Ew wan nêriyan derbas dikin, esker li wan diteqîne, vedigerin. Ew hesp ji destê wan difilite. Piştî hesp ji destê wan difilite, hezar pezê sor heye, nikarin dev jê berdin, didin dû pez. Got, "Em daketin." Bavê min gotiye, "Ka hespê we?" Got, "Devê wan ket hev." Yek xwarziyê wî ye, yek biraziyê wî ye. Gotine, hesp filitiye. Got, "Mehmûdê Hecî Qaso hat pêşiya me, got, Şikrî were." Got, "Min gotiye, ma ez ê bêm ku? Ez ê malê xelkê ji ku bînim." Bavê min dibêje, "Heydê namûsiz." Ji xwarziyê xwe re, navê wî Şêxmûskê bû û biraziyê wî bû. Gelek pê re bûn. Evdikê Hecî Selîm bi xwe bi wan re bû. Hemû direvin, bavê min vedigere. Xwarziyekî wî pê re dimîne. Te dît, vedigerin didin dû hesp, pez jî daye dû; mayin tune. Ceda Îpêk Yoluyê hebû, ev ceda wilo resmî tune bû. Got, "Hesp ket ser wê Îpekê." Pez daye dû hesp û diçin. Got, "Şev e, em jî didin dû hespê." Got, "Me kir û nekir pez xwe ji dû hespê berneda. Esker bera me da." Xwarziyê wî yekî dirêj bû, xurt bû, siheta wî lê bû. Wê çaxê gidîş hebûn ên ceh, xwe tavêje pişt gidîşê, dibêje, "Xalo, gule li min ket." Bavê min got, "Ez vegeriyam bi xwarziyê xwe ve, ez û wî tenê ne." Got, "Min ew danî ser pişta xwe, sîleha wî û ya xwe min rahiştê ez meşiyam; dîsa li me reşandin." Te dît tiving bûn, wê çaxê. Got, "Bera me dan, ji dûv me venegeriyan." Got, "Xwarziyê min got, xalo yeke din jî li min ket. Li ser pişta min derbek din lê ket." Xwarziyê wî dibêje, "Xalo min deyne, bila ez bimirim û tu here." Bavê min got, "Min got, lawo ez ê çawa te li vir bihêlim." Got, "Qey yekî esker jî birîndar bûye, esker ji ser me vegeriya." Got,

"Min bangî wan kir, ên li jêr." Got, "Mehmûdê Hecî Qaso got, wer bila ew bimîne." Bavê min got, "Min xeber meberin ji wan re dan, hinekî li me vegeriyan." Simê hebû lawê apê wî bû. Jê re dibêje, "Wer em vî meytî bibin." Got, "Hina bi dû xwe de dikişand." Ê birîndar dibêje, "Kuro we ez êşandim." Axir meytê xwe xelas kirin, nemir. Ev pez, ew mal tevde çû. Ew çend nêrî filitîbûn, berê derbas kiribûn. Bavê min got, "Lawo em hatin me nêrî birin firotin. Xwarziyê min ê ku birîndar bûbû ket nav destê min."

*K. A. : Te ji nêriyan re got hevûrî?*

M. K. : Hevûrî yê salekê ne. Got, "Em hatin, min lawik bir Qamişlo ser textor." Got, "Heqê wî çil hevûrî min li birîndarê xwe da." Got, "Çar pênc şeş tivingên me hebûn." Rehma Xwedê li wan be, Mehmûdê Hecî Qaso, Hecî Hemîd, Hecî Xelef e, evana Bêrtî ne. Got, "Yekî Licê jî, - Evdê Hiso- ê Licî jî bi me re ye." Ev mal bi deyn kirîne, pere yê Liciyan e, yê sih, çil însanan e. Got, "Min got, ev tiving mane, ez ê wan bifiroşim. Heqê vana jî, ez ê bi wan pereyan bidim. Malê erînê ye, qelemsultan hebû ... pelê cixareyê ne. Di bedêla wan de, em ê tivingên destê xwe bifiroşin, em ê heqê xelkê bidin wan." Bavê min got, "Derbekê min nihêrî hatiye bi wan re bazar kirine, bi Liciyan re; ji bo erzan ji nav destê wan derxin." Got, "Min dît bangî min jî kirin. Ez jî hatim hundir, gotin, va ye me ji Evdê Hiso ev sîleh kirîn. Çar pênc tiving in." Got, "Ez aciz bûm. Min got, yabo tu û Evdê Hiso zanin. Evdê Hiso ka tu yê pereyê xelkê, malê xelkê ji ku bidî kuro? Malê xelkê çûye, divê em vî malî bidin. Ev çar tivingên me li ortê ne, em ê bifiroşin, pereyê xelkê bidin wan. Ê çil însanî ne. 40-50 însan li benda me sekinîne. Siwarî ne, hemû ji Lîcê hatine, feqîr in. Hemû li gundê Rişwanê sekinîne." Got, "Fedî kirin." Bavê te (*Di civatê de ji yê tenişta xwe re dibêje*) û yên Licî gotine tu dizanî. Axirê, got, "Me firotin. Me rabû ji wan re malê qelemsultan, çaqar, pelê cixareyan û qutiyên cixareyan, hema 40 hespên wan bûn hemû me ji wan re dagirt." Got, "Lawo yê ku sed wereqê min bi ser ve çû, yê ku 50 wereqê min bi ser wan ve çû." Got, "Ev xisar jî derket." Digot, "Xelkê pereyê min dixwar, min ê xelkê nedixwar. Hûn pereyê xelkê nexwin layê min, ev tiştê hanê eyb in." Ev şîret li min dikirin, digot, "Bila xelk ê me bixwin em ê xelkê naxwin." Got, "Ew jî çûn bi riya xwe de, malê wan jî hat dagirtin." Û xwarziyê wî jî salekê li wir ma.

*K. A. : Ew ê birîndar?*

M. K. : Ew ê birîndar, lingê wî seqet mabû. Berî bi sê çar salan çû rehmetê. Bi vî sûretî ji xwe re qaçax dikirin, xelk bi wan re dihatin kuştin, gelek bi wan re dihatin kuştin. Derbek din dewar û pez daxistin ên mala Merwanê Şefîq. Derbina hidûd asê dibû û sawa bavê min jî ketibû zikê Tirkan.

*K. A. : Kî bi bavê te re bû, wê çaxê?*

M. K. : Cimo biraziyê wî bû, Hemîd biraziyê wî bû.

*K. A. : Ji vir an ji jorê bûn?*

M. K. : Ji jorê, ji Rişwanê bûn.

*K. A. : Û bavê te li Amûdê bû?*

M. K. : Zemanekî mala wî li Tilhebeşê maye. Zemanekî li Amûdê maye. Geh li vir dima geh li Tirkiyeyê bû. Merivê wî bûn, pismamên wî bûn, giş pê re bûn.

S. S. : Li vir kê pê re dikir?

M. K. : Vê dawiyê, bavê te bû. Hecî Hemîdê li Amûdê bû. Bavê min ne li Amûdê bû, bavê te li Amûdê bû. Hecî Mehmûd li Amudê bû. Mehmûdê Hecî Qaso li Amûdê bû, Hecî Hiso bû. Bavê min digot, Hecî Hiso hebekî xwe diziqziqand, neditirsiya.

S. S.: Bavê min jî ne mehkûm bû wê çaxê, xalo?

M. K.: Li vê derê bû, li Tirkiyeyê mehkûm bû. Yabo, wê çaxê yê ji ber eskeriyê reviyabûn, ên ji ber tiştin din reviyabûn...

*K. A. : Çiroka te digot...*

M. K. : Erê, îcar tê bîra min bavê min li Sûriyeyê bû, hat. Lawekî apê min hebû? Dewar dikirîn. Eskeriyê hat dewarên wan li Tirkiyeyê girtin, eyn li gund, li Rişwanê girtin. Girtin û berdan. Dîsa dewar gelek bûn û çiqas dihatin hidûd vedigeriyan, newêribûn lêxistina. Yên mala Axê, Xelîlê Ehmed bûn (layê Ehmedê Şefîq), Merwan Axa bû, pezê tevda bû, dewarên tevda bûn. Lawekî apê min hebû, Necîmo.

S. S. : Merwan Axayê me yê Amûdê?

M. K. : Na. Merwan Axayê Qurdîsê, berê Axê Omeriyan bû. Ew bi xwe nedihat, ji xwe re pez û dewar dadixist. Odeya wî hebû, Mehmûtkî tev li odeya wî vedihewiyan.

S. S. : Xwarziyê Mehmûdê Hecî Qaso bû.

M. K. : Erê, erê. Bavê min got, “Axê Qurdîsê Merwan çend derban hat cem min, got, weleh Şikrî, divê tu vî dewarî derbas bikî.” Bavê min got, “Ez jî wê şevê hatibûm malê.” Tê bîra min jî; ez pê re hatim çolê, ez zaro bûm. Got, “Lawo Merwan gotiye; bi Xwedê divê ez vî pezî derbas bikim.” Melûm e, ê Mêrdîniyan e, yê Rişmiliyan e, yê gelekan e. Yanî her yek ji cihekî hatine, her yekê çend qurişên wan tê de ne. Ez jî derketim çolê bi wan re, di navbera Xirbê Qeplo û Rişwanê de ye, çiya ye. Bavê min henek kir got, “Lawo îşêv em ê hinekan ji we bispêrin evara înê, ka îro wê kî ji me bê kuştin gelo.” Êvara înê ye. Bavê min ev şitexalî got: “Weleh lawo veger tune ye, em ê herin vegera bi paş de tune ye.”

*K. A. : Wilo neditirsiyan, çavê wan nedişkest?*

M. K. : E. Gotin, heydê bimeşin. Dewar û pez lê xistin di biniya Xirbê Qeplo re, ez vegeriyam. Tên ba pişta Curnikê li neqeba Curnikê lêdixin. Dewar û pezê xwe xelas dikin. Çend dewar hatine kuştin, hespekî wan ketiye ber trênê, tevî malê xwe. Biraziyekî wî heye, tê, hayê bavê min jî ji biraziyê wî tune ye ku bi karwên re ye. Ji Serêkaniyê hatiye; du ga jî bi xwe re kiriye, ew her du ga tenê ne û ew jî ketiye nav wan.

*K. A. : Serêkaniya Tirkiyeyê?*

M. K.: Erê, bi Tirkî jê re dibêjin Ceylanpinar. Ew jî du ga ji xwe re kiriye, ketiye nav wan, nav karwan. Xelkê çend dewar dianîn û çend quriş jê fêde dikir. Bavê min got, "Em jî xwe dihejmêrin, kî heye kî tune ye?" Yê me, me li Tirkiyeyê bihîst yekî esker û yekî Kurmanc hatine kuştin. Ev jî dibêjin, kî heye kî tune ye?

*K. A. : Şer bi şev çêbûye?*

M. K. : Bi şev şer çêbûye, daketine, îcar bi roj li Amûdê hevdu dihejmêrin. Dinêrin şeş heft dewar çûne. Gotine, "Ne xem e." Bavê min got, "Ew nehat bîra min."

*K. A.: Xwediyê her du gayan?*

M. K.: Erê. Xwediyê her du gayan jî biraziyê bavê min e. Bavê min dibihîze ku biraziyê wî hatiye kuştin, dibêje, "Ka em ê çawa bikin?" Gotine, "Madem ev însan hatiye kuştin, em ê her yekî tiştekî bidin bavê wî, ji bo kesek dewa mewa li me veneke." Wê çaxê du hezar sê hezar wereqe me dabûnê. Lawik çû! Nema vedigere. Îcar fesadiya wê çaxê jî heye, dijminahiya wê çaxê di navbera însanan de hebû. Yekî Çalî hebû, Mihemed Nûrî û Bedirê Çalî, li vê derê ew jî lê dixin diçin Qurdîsê. Tiştekî wan di nav tiştan de tune ye. Ê malum e, xelk dibêjin. Yekî li biraziyê bavê min dabû (layê apê min ha), gotibû, ewî ew esker kuştiye. Xelîlê Ehmed layê Ehmedê Şefîq bû, mehkûm bû. Ew hatin girtin, tevde.

*K. A. : Li jorê bûn?*

M. K. : Erê li jorê bûn.

*K. A. : Li kîjan gundî bûn?*

M. K. : Li Kurima bûn. Layê Ehmedê Şefîq ew hatin girtin û Qurdîsî jî hatin, ew yekî Çalî hebû, Nûrî bû.

*K. A. : Ew jî ji bo wî eskerî hatin girtin?*

M. K. : Lê xistin, tiştekî wan di nav tiştan de tune bû. Yekî ji wana got, "Ez di nav de bûm, em di nav de bûn." Layê apê min jî girtin. Bavê min tenê mabû. Em li malê bûn, bavê min got, "Lawo wê esker bê me." Wê şevê li malê raket, me dît eskeran dora mala me girtin.

*K. A. : Li kû?*

M. K. : Li Rişwanê. Di qesran de xeşîme çêdikirin. Bavê min xwe avêt xeşîmê. Saeta ku xwe avêt xeşîmê dîtin û girtin. Birin xistin hepsê. Salekê bavê min û biraziyê xwe di hepsê de man. Ew ê din sê çar salan di hepsê de man. Tiştekî wan jî di meseleyê de tune bû. Dostê bavê min hebûn; bi riya dostê xwe Hecî Şemsî (layê wî li Mehsertê bû, wê çaxê sawcî nas dikir), salekê di hepsê de ma, berdan. Îcar ez ji we re bêjim, di dewama qaçaxê de gelek bi wan re hatin kuştin û gelek bi wan re hatin girtin û dihatin vê derê. Îcar miletê me gelek feqîrtî dîtiye. Wextê ji jorê dihatin beriyê derbina jê li vê derê alîkarî bi wan re dikirin. Digotin, li Amûdê Qedriyê Hecî Omer hebû, ji xelkê re baş bû. Ne Qedrî, bavê Qedrî.

*K. A. : Ev Binxetî bûn?*

M. K. : Ji Amûdê bûn.

S. S. : Xalo, naxwe wê çaxê dan û stendina vî miletî, Serxet û Binxet hemû li ser vê qaçaxê bû?

M. K. : Hemû li ser qaçaxê bûn. Hinek jê zadê wan hebû. Bavê min digot, "Însanên baş hebûn, alîkarî bi xelkê re dikirin." Digotin, bavê Qedrî, Hecî Omer, însanekî hingî xelkê behsa wî dikir.

*K. A. : Bavê Saliho û Qedrî wan bû.*

M. K. : Erê. Digot, însanekî deriyê wî vekirî bû. Eynî Şexmûsê Heso, li milet miqate bû. Seqet û feqîr hebûn, li wan miqate bûn. Vê dawiyê îcar xelkê ji xwe re qaçax dikirin, pez û dewar dianîn.

*K. A. : Tê bîra min em li gundan bûn, em zarok bûn, ev pale bi qefleyan dihatin ji jorê de. Das û qeynaxên wan li milê wan dihatin. Li van gundan mehekê du mehan, sê mehan paleyî dikirin.*

M. K. : Dihatin li ser qemyonan û derasa hemaltî dikirin. A niha li Tirkiyeyê, ji wextê Turgut Özal û vir de ne wilo ye. Şixulê Tirkiyeyê berê li ser deh metro qeremsultan xelk digirtin. Berê qeremsultan hebû, çaqar hebû. Berê deh metro qumaş bi kê re bigirtina ew dixistin hepsê. Bîst metro bi apê min re girtin, çar salan hikum danê. Apê min tiştekî wî di nav tiştan de tune bû, di hewşa wî de girtin.

*K. A. : Vê dawiyê, ez dibêjim hinekî navbera Sûriye û Tirkiyeyê xera bû, li dora 1955'an û 56'an de mayin danîne.*

M. K.: Îcar piştî mayin danîn, her kes nema kare li nav mayinan bixe. Mehsûmê Xursî rabû ser xwe, ew çûbû eskeriyê, dersa mayina dîtibû.

*K. A.: Mehsûmê Xursî li jorê bû?*

M. K. : Mehsûmê Xursî li jorê bû, ji Xursê bû û Şemoyê Hiskê bû, Bêrtî

bû; wî jî dersa mayinan dîtibû. Ev vana mayin rakirin, îcar ev bûn rêber, di mintiqeya me de. Miradê Sêfê bû rêberê wiyalî, wî mayin radikirin. Şemoyê Hiskê mayin radikirin. Wê mayin rakirina, patîka (şivîle) vedikirin ji pez û dewaran re patîkeyên mezin vedikirin. Ji hespan re rê vedikirin. Îcar piştî vana ev rê ket destê Şemoyê Hiskê. Mehsûmê Xursî bû. Vana xwe didan hevdu. Ez jî giham vî karî. Ez jî di nav karê wan de bûm. Evana bûn rêber.

*K. A. : Mayin radikirin û milet derbas dikirin?*

M. K.: Erê, mayin radikirin û esker jî qanix dikirin. Wextê esker dihişt, ahilê hidûd jî pere distendin. Cihê li ber hidûd Kemaliyê ye, Curnikê ye, gundikê Evdirehman e, gundikê Semho ye. Evana dema qaçaxî dikirin bi devê esker û bi hev re dikirin. Esker jî rê berdida. Îcar ew pere nîvî ji esker re bû û nîvî ji ahilê gundan re bû. Gelek caran bi esker re qaçaxî dikirin.

*K. A. : Piştî mayinan zor çêbû.*

M. K. : Patîkayên xwe vedikirin, mayin radikirin. Sofî Ebo hebû, Marûfê Qetfo hebû. Yê ku eskerî kiribû dersa mayinan dîtibû, ewana mayin radikirin, ji xwe re rê çêdikirin. Piştî patîke çêdikirin îcar pez û dewar dadixistin. Li vir jî diçûn pêşiya pez û dewar risas dikirin. Serê pez du wereqe û serê dewaran pênc wereqe didan gumrikên Sûriyeyê. Serbest derbas dibûn. Ez bi wan re bûm carna.

*K. A. : Gelek tişt çêbûn li ser vî sînorî, mayin teqiyan, gelek di nav mayinan de man. Kesên bi nav ên ku te bihîstibin û yên ku di şerê bi te re qewimiye hatine kuştin an jî birîndar bûn kî tê bîra te?*

M. K.: Hema ez derbekê çûm ba vê Qesra Serçixan. Berê ez daketibûm Sûriyeyê, tûtina min hebû min di nav mayinan de veşartibû. Ez çûm min ker birin, min tûtina xwe lê kir û da hevalan; wan daxistin. Ez daketim ber hesin, min dît mayinekê got gurm teqiya. Ji bêhna wê ez jî hebekî êşiyam. Ez rûniştim, ez pêjinîm, min dît hewar hewar hat.

*K. A. : Dinya şev e?*

M. K. : Şev e tabî.

*K. A. : Hinek bi te re hatibûn?*

M. K. : Ew ê bi min re çûbûn, ez tenê bûm. Ev ê din haya min ji wan tune ye, ev başqe hatine. Wexta mayin teqiya ez jî mam, min got, ez ê guhdar bikim ka kî heye, kî tune ye. Nêzikî min in. Hebekî ez mam, min dît got, “Ay ji bo Xwedê, hewarê ji bo Xwedê.” Ez bi dengê wan ve çûm, min got guneh e. Ez wan jî nas nakim, ne hevalê min in. Ez çûm min got, kuro çi ye, xêr e? Ez hebekî ji hidûd neditirsiyam. Ku tivinga mirov bi mirov re be, mirov natirse. Şev e, kîm kîme ye. Ez çûm, kuro kî ye, kî ye? Min nihêrî yekî ji Qesra Serçixan e, jê re dibêjin Arifê Hemîd.

*K. A. : Ji Sûriyeyê ye, ji Binxetê ye?*

M. K. : Na, ji jorê ne. Mala wan di ber hesin de ye. Vana rêberî dikirin. Qesra Serçixan li ba Tilkêfê ye, di miqabil Tilkêfê de ye. Hemû merivên hev in. Ji ber hidûd hinek li vî aliyî mane û hinek li aliyê din mane. Her kesî qaçaxî dikir, yanî hemû li ser qaçaxiyê xwedî dibûn. Ez çûm pêşiya wan, min dît yekî got, "Kirîvo ez di bextê te û Xwedê de." Min got, bise kuro tişt tune, metirse. Yek maye tişt pê nehatiye, yê din peşk meşkin lê ketine. Gotin, "Ezîz hatiye kuştin." Min got, lawo ka Ezîz li ku ye? Gotin, "Wele em nizanin." Kuro heydê ev însan li ku ye? Dibêjin, "Wele em nizanin, em zanin miriye." Yekî din jî heye; gotin, "Birîndar e, birîna wî xedar e." Min anî danî wir. Min got, çênabe, ez li cem we hukimî me. Bihar e. Hebekî min ew daxistin. Ê ku peşk lê ketibûn min anî teslîmî xwediyên wî kir, mala apê wî li gundê ber hesin in.

*K. A. : Esker bi we ve nehat?*

M. K. : Na esker dûrî mayinan e. Esker newêre, wê bê çi? Min got, ew lawik va ye, me teslîmî wan kir.

*K. A. : Kîjan gund e?*

M. K. : Li ba Tilkêfê. Ev layê apê Ebû Qasim bi xwe ne. Gundê mala Ehmed. Gundê wan eyn di ber hesin re ye. Me hat lawik teslîmî wan kir, ez vegeriyam. Min got çênabe, ez vî lawikî, yê birîndar bihêlim. Ê kuştî hey hatiye kuştin bes ev ê birîndar divê em herin, sax mirî divê em herin pêve. Min yek bi xwe re vegerand bi zorê. Me dît carekê di nav giha de got, "Va ye ez li vê derê me." Ez çûm ser, min nas kir. Em hevdu nas dikin. Ew û yê dî, ne merivên hev bûn. Yanî navbera wan ne gelekî xweş bû. Yê din jî bi min re ye. Got, "Ez ketim bextê te û Xwedê." Min got, ne hewce ye tu ji min re bêjî, were ser piyê min. Min danî ser piyê xwe. Ew ê din hey şaşo maşo ye. Te dît, mîrato malê dinyayê şîrîn e. Got, "14 hezar û pênsed wereqe min daye Arifê Hemîd." Arif jî bi min re ye. Got, "Ji bo Xwedê zarokên min feqîr in."

*K. A. : Ew dibêje belkî mêrik bimire, ketiye tirsa malê xwe.*

M. K. : Erê. Min got, xem nake, tişt nabe. Min danî ser piyê xwe û min rahiştê. Ev sivanoka wî, hestiyê wî bûye wek mejî. Tu carî dilê min li hev nediket, min gelek kuştî û birîndar dîtine, dilê min li hev nediket. Bes ew lawik destê min ket nav hestiyê wî, dilê min li hev ket. Hestî bûbû wek mejî. Got, "Ji bo Xwedê min deyn, ez êşiyam." Min danî, bi teqla meqla axir min anî gund, ez serê te neêşînim. Em hemû di nav xwînê de mane, lawik gelek xwîn jê çû. Li ser hişê xwe ye, dişitexile.

*K. A. : Eynî ew gund bû?*

M. K. : Eynî ev gundê ber hesin, navê gund Gundikê Ehmed, li ber Tilkêfê. Me danî wir. Kirîvê min in jî. Me danî wir, me got, va ye lawik, divê hûn herin ilmê şirta bikin. Bes hûn ji şirta re nebêjin filankes aniye, bê ez bi halê xwe hatime. Wextê ku bêjin filankes ez anîme wê min jî bixwazin. Ez jî firarê eskeriyê me. Şirta birin zebta wî girêdan, anîn misteşfa Qamişlo. Lawik li misteşfê heya nîvroyê çû rehmetê. Di wir re, di derî re derbasî Tirkiyeyê kirin.

*K. A. : Ew ji kîjan gundî bû?*

M. K. : Ji Qesra Serçixan bû, navê wî Cemal bû. Kesê bi me re hatiye kuştin em nikarin behsa hemûyan bikin, kuştin pir çêbûye. Di tarixa me de kuştin pir çêbûye, tu dev ji hemû kesî berde. Em ê li ser xwe bêjin. Me bi hespan lê dixist. Me û Mehmûdkê bi hevdu re qaçax kiriye. Mehmûdkê însanekî neditirsya. Ji hikûmetê re cesûr bû. Cesûrî wek a wî zilamî tune bû. Lêxistin lê diket nediket cesareta wî pir bû ji hikûmetê re ha û Mehmûdkê însanekî baş bû. Her kes dibêje ez, lê wexta însanek dijminê hev bûya na, bavê hev kuştibûna jî, yê ku di riya Mehmûdkê de bûya, bi munesebeta wî kesî elaqeya xwe ji kesî nedianî. Yanî Mehmûdkê însanekî lêxistin jî lê diket, dîsa jî ji eskeriyê re gelekî jêhatî bû. Zimanê wî xurt bû, heta bi midûrê nehiyê ku diket cem şaş dibû. Vê taliyê hespên Meşkîniyan dihatin cem. Hemû malê metroyê, saet û şîfon, ev elektrîkên ku mirov pêdixe hemû bi bara dibirin, li Tirkiyeyê tune bûn. Barê elektrîkan sax me dibirin.

*K. A. : We ji vir dibirin?*

M. K. : Ji vir me dibirin, tiştek li jor tune bû. Ji xeynî tûtinê tişt tune bû. Tûtin û şima ji jor dihat, yan jî sîleh, demançe dihat, dewar û pez dihat. Ev heye sih çil sal dewar jî ketin. Ji çil salî wir de xelkê qaçaxî bi hespan dikir. Wexta karwanê wî dihat, Mehmûdkê hikûmet qanix dikir. Di sûka Amûdê de 50-60 hesp me bar dikir û em diçûn. Derbekê sê kesan wefat kir, kî ket û kî ma. Vê dawiyê lawê Elî Fewaro hat kuştin. Ez çûm eskeriya Tirkan. Tirkan ez li gund, li Rişwanê girtim. Piştî ez girtim bavê min ji wan re got, bernedin; ji eskeriyê re. Ez firarê eskeriyê bûm. Tiştin din jî li ser min hebûn. Ez birim Mehsertê, qeza me Mehsertê ye. Wê şevê ez di nizaretê de me; wê şevê Mehsûmê Xursî li hidûd dixe, eskerek birîndar dibe, dixin stûyê min.

S. S. : Tu di hepsê de yî?

M. K. : Ez di hepsê de me. Tişt xweş e ku Xwedê çêke. Dîsa dora gundê me digirin. Diçin mala me, bavê min dibêje, “Hûn çi dewê li min dikin. Wa ye ji doh ve lawê min girtî ye, ma qey kes ji wî pê ve nema ku qaçaxê bike.” Ahilên van hidûdan hemû muxbîr bûn, heta niha jî muxbîr in. An wê pere

bixwarina yan wê bi devê wan bûya, yan jî ji kesê ku qaçaxî bikirina qebûl nedikirin. Ez di hundirê nezaretê de me min dît carekê dengê cemseyên wan, seyareyên wan hatin. Ev başçawîş e, yê din usteymen e; ez derxistim, riha min jî reş bûye. Emrê min 26, 27 sal e. Ez derxistim, bangî min kirin. Bavê min jî hatiye Mehsertê. Başçawîşek bû, got, "Bêje, bêje!" Min got, ez ê çi bêjim. Got, "Te şevê din li hidûd xistiye." Min got, ez şevê din li cem we bûm. Başçawîş got, "Va ye şevê din li cem me di nizaretê de bû." Zirt li min kirin. Min got, "niha ez ji we re bêjim ez qaçaxê nakim ez derewan dikim, ez qaçaxê dikim, girêk mirêkên min hene. Ev qaçax dere heta Diyarbekir, herin rê bigirin. Ê min ku ez eskerê we bûma, min nedihişt însanek di vir re derbas bibe. Esker bi kêr nayên, ma sûcê kê ye? De a niha ez ê li vî hidûdî eskeriyê bikim, heger kesek di vir re derbas bû..." Min wilo got. Got, "A niha em te di hidûd xin, eskeriya te di wir de bikin çawa ye?" Hebekî ez di wir de nerm bûm. Vê dawiyê siqintî dan min. Ew başçawîşê me yê merkezê bû, got, "Erê usteymenim tu û yuzbaşî, hûn siqintiyê didin vî însanî, heger mehkeme be em ê bidin mehkemê. Dinya hemû qaçaxê dike, ma te bi qirika vî însanî girtiye, ew qasî lingê xwe ranede. Tu bixwazî, bide mehkemê; va ye mehkeme li ber te ye. Tu çi dozê li vî însanî dikî? Ji duh ve li cem me girtî ye. Va ye duh te girtiye ser mala wî, esker birindar bûye, te xistiye stûyê wî. Belkî dijminê wan hene." Ev tişt qebûl nekir, rabû bera wan dan. Ewî başçawîşî got, "Nikarin tiştekî bikin." Ez rojekê di nizaretê de mam, a dinî rojê ez birim Mêrdînê, Mehsertê qeza Mêrdînê ye. Bavê min got, "Lawo here eskeriyê." Min dilê bavê xwe nehişt. Bavê min bi min re û sê esker, destê min di kelepçeyê de. Apê min, diya min û muxtar jî bi me re ne, hatin Mêrdînê. Îcar bavê min şîretan li min dike, dibêje "Here eskeriya xwe." Îcar em çûn metamê, me yên esker jî nan da wan. Min got, hevalekî min jî li Mêrdînê ye, hesabekî me tevlihev heye, jê re bêjin bila bê em ê hevdu bibînin, pereyê me li hev in. Çûn, ev dostê me -Meşkînî ye-, anîn hatin ba me. Min got, heyran va ye ez çûm, hin pereyên te li cem min mane. Yên min jî li cem te mane. Va ye bavê min. Rabû ez teslîmî nezaretê kirim, du şevan di wir de mam. Min dît yekî başçawîş hat makîneyek li porê min xist, porê min meqes meqesî kir, ez kirim wek meymûnekî û sê çar şiqamên baş li min xist. Min got, Xwedê ji te re nehêle. Welhasil ez çûm eskeriyê.

**Bi Hin Kesên Din Re Hevpeyvîneke Din**:

*K. A. : Birayê Ebdulqadir Cindî, evî sînorî gelek eziyet gihand xelkê, gelek hatin kuştin. Gelek jê mayin bi wan de teqiyan. Gelek ji wan û eskerên Tirkan li hev xistin û hatin kuştin, gelek mal xera bûn. Çi ji wan bûyeran di bîra te de ye? Bi rastî vî sînorî mala xelkê xera kir, piştî mayin hatin danîn. Mirovan jî ji feqîrtiyê, ji xizaniyê xwe li mirinê dixistin. Îcar çi tê bîra te? Te ji me re bigota baş bû.*

E. C. : Tê bira min derbekê ev Mehmûdkê bi me re bû û layê Hiso yê Xursî û layê Brahîmê Ehmedo bû, ew û bavê xwe û du layên wî bi me re bûn. Ji Amûdê barê xwe me bar kiriye û me li ba Tûkê xistiye, li vê derê. Yekî Xursî bi me re hat kuştin. Me nêrî hespê wî tê bi me re. Me got, kanî xwediyê vî hespî ? Dengê wî nehat me. Esker berdayê, gule lê ketiye. Şev e, em pêncî hesp in. Her yekî bi serê hespê xwe girtiye. Yê min pênc in. Ên yekî din sisê ne, yê din şeş in. Her yek bi serê hespê xwe digire. Yên hemal serê hespan digirin. Xwediyên tivingan şer bi esker re dikirin. Wextê ev lawik hat kuştin, dengê wî nehat. Şev bû, em nema karin vegerin jî, eskerî hebû li wir. Heta nebû sibe jî me nizanibû hatiye kuştin. Wek vî qelaçê Curnikê jî gelek kes lê hatin kuştin, pir lê hatin kuştin. Xeyredînê Henîfa li wir, ew û layê Hiso bi hevdu re bûn, ez ne bi wan re bûm. Layê Hiso yekî Xursî bû. Ev her du derin, Mehmûdkê wan datîne ku pêşiyê mayinan vekin. Xeyredîn û Cemalê Hiso ne. Cemalê Xursî lawikekî bi destê xwe gelekî baş bû, hevalê me bû.

*K. A. : Xeyredîn ji ku bû?*

E. C. : Xeyredîn Xirbeqeplî bû, mala wî li Amûdê bû. Cemal dire mayinan radike, ew bi dû de ye, şaş dibe; riya xwe şaş dike, bê çawa dike; Xeyredîn bi quwet bû, nigê wî dikeve ser mayinê, mayin pê de diteqe. Li serê wî dikeve, serê wî difirîne. Cemal tişt pê nehat.

*K. A. : Laşê wî anîn Sûriyeyê?*

E. C. : Vegeriyan, laşê wî vegerandin, anîn Sûriyeyê. Wê çaxê te dît esker li jorê bû, em diçûn nav mayinan, em diçûn heya ber esker tişt tune bû. A niha esker daketiye pişta hesin, biniya mayinan. Niha 40-50 gavî li jora têlê, mayin tune ne û 40-50 gavî jî li pişta hesin mayin tune ne. Yanî 40-50 gavî pişt hesin wir de mayin tune ne. Du têl in, pişta têlê, dîsa mayin 40-50 gavî tune ne. Me hemû der nas kiribû, bê çilo û di ku de mayin hene. Ev qelaçê Curnikê, Xeyredîn layê Henîfa tê de hat kuştin. Sofî Sedo yekî Qurdîsî bû, tê de hat kuştin. Ev, ên ku tên bîra min in. Lawekî apê min ew û yekî esker tê de hatin kuştin. Îsa, yekî Ewênî bû, birayê Osmanê Ewênî bû, tê de hat kuştin.

*K. A. : Ew di şer de hatin kuştin?*

E. C. : Ên ku mayin bi wan de teqiyan, ên ku di şer de hatin kuştin. Ez li ser vî qelaçê Curnikê dibêjim ha. Yanî ev qelaç, gelekî însan lê hatine kuştin. Carna em dihesibînin digihê 15-20 heban, ên ku ez nas dikim.

*K. A. : We birîndarên xwe li wir nedihiştin, we radikirin?*

E. C. : Ê ku zilam bûna, birîndarê xwe nedihiştin. Ê ne tiştik be, wê birindarê xwe bihêle. Ez û ew Ebû Fexrî...

*K. A. : Ebû Fexrî kî bû?*

E. C. : Epşî bû, bi min re bû.

*K. A. : Ew ê dirêj, navê wî çi bû?*

E. C. : Ew ne ji zû de ye, berî bi 30 salî bû. Navê wî Ebdurehman bû, Şemoyê Hiskê bi me re bû. Hecerê Qelaçî bû, Celalê Rajnî bû û melûm e kirêçiyê me jî hene. Em şevekê vegeriyan, muxbîrî li me hat dan.

*K. A. : Ew kêsên ku bi kirê dihatin, we ji ku kirê dikirin?*

E. C. : Me ji jorê kirê dikirin. Her kes bi kiriya xwe dihat. Ên ku bi me re, hinan bi serê hespan digirtin, hin jê wilo dihatin. Em şevekê hatin, îxbar li me çêbû. Me dît, Şemoyê Hiskê got, "Va ye esker di pêşiya me de ye." Me got, de em ê vegerin, di Şikeftên Letanê re em ê herin. Wê şevê em vegeriyan. Esker firset neda me, em bi qaçaxî derin. Em zanin muxbîrî bi dû me de heye, muxbîrî jî, ya Mala Xêro ye. Me got, lawo navbera muxrib û eşayê de em ê bigirin ser pûsiya Kemaliyê û em ê bi zorê lêxin (hidûd derbas bikin).

*K. A. : Pûsî çi ye?*

E. C. : Pûsî, kemîna ku esker tê de ye. Hevalan gotin, "Na." Min got, divê em wilo bikin. Me got, ka wê kî bide pêşiyê? Welhasil me got, wê yek di pêşiyê de here, ew û hespê xwe wê wilo dakeve newalê, em ê esker zeft bikin û em ê bimeşin.

*K. A. : Wê çaxê hûn kî û kî bûn?*

E. C. : Ez bûm, Şemoyê Hiskê bû. Xwediyê sîlehan ez dibêjim, Hecerê Qelaçî bû.

*K. A. : Wê çaxê Şemoyê Hiskê mala wî li ku bû?*

E. C. : Mala wî li vir bû, li Tilkoçer bû. Em hatin me Îpek qulipand. Sê hespên bi min re, dudu ê min bûn, yek ne yê min bû. Çar, pêncek jî di ber hespê min re bûn. Malê me gelekî li ser wî hespî bûn. Min ji wan pênc, şeşkan re got, binêrin hûn ê bi vî hespî re bin. Tiştek pê bê, bar biqetînin, li ser piyê xwe kin. Gotin, "Erê erê." Hemdînê Eyo jî bi me re bû. Em jî hatin, me Îpêk qulipand (derbas kir). Ez û Şemoyê Hiskê em ketin ser pûsiyê. Ew ê din, me got tu here wî aliyî, li wî aliyî zêde esker tune ye. Hecer li wî aliyî ma. Em

gihan ber pişta pûsiyê, Şemo got, “Berdê, berdê!” Min got, kuro bise niha ne hewara berdana wî ye. Welhasil dengê me kir pê de, me bera esker da, berî ku esker bera me de.

*K. A. : Hûn ê wî bikujin?*

E. C. : Ne ku em ê wî bikujin. Ji bo ku serê xwe ranekin, firseta wan li me neyê. Me bera esker da, esker melisî di cihê xwe de. Yê me jî, însanê xayîn bi hev re ne baş in. Hiseynê Kermêtî heye, te dît hemal e, got, “Va ye ez daketim.” Min got hespê xwe daxin, netirsin. Te dît, wexta li me diteqe, em ban hevdu dikin, dibêjin metirsin. Min dît got, “Hespê min ket.” Ez çûm cem hespê wî, min got Şemo, di fikra min de Şemo bera ser pûsiyê daye. Paşmêr divê paşmêr be. Min got, Şemo tu li ser pûsiyê be, ez ê herim ba wî hespî, em ê hesp rakin. Ez çûm cem hesp, me kir nekir hesp ranebû. Me carekê nêrî îcar esker tiving bera me da.

*K. A. : Paşmêr reviya?*

E. C. : Reviyaye, daketiye Sûriyeyê.

*K. A. : Paşmêrê te kî bû?*

E. C. : Şemoyê Hiskê bû.

*K. A. : Tirsiya?*

E. C. : Neditirsiya, bes xayîn ket. Ew jî, Hecer jî û Celalê Rajnî meşiyabûn; hayê min jê tune, şev e. Yekî got, kuro hespê te li pişta ceda (rê) Îpekê ketiye. Ew hesp jî gelek mal li ser e. Gotin, “Va ye me mal xelas kiriye.” Dîsa qinyata min bi wan nehat. Gelek malê biqîmet li ser bû. Ez vegeriyam, ez li Hemdînê Eyo rast hatim, ên din hemû reviyabûn. Min got, Hemdîn bi min re were. Em çûn dewsa hespan geriyan. Me dît ban me kirin, gotin, kuro va ye me mal xelas kiriye, werin bi me ve, em birîndar in. Esker ew birîndar kiribûn. Ez dîsa vegeriyam ser esker, min bera wan da, esker di cî de melisî. Melûm e em banî wan dikin, ber bi me de nayên. Ku te firset jê stend tirsonek in, nikarin serê xwe rakin. Serê xwe dixin erdê.

K. A. : Na. Ma ji bo çi wê bên kuştin.

E. C. : Em daketin. Gotin, va ye me mal xelas kiriye. Ez çûm ba wan, min nihêrî, Ebû Fexrî û yekî din, her du birîndar bûne. Evdurehman e û yekî din birîndar bûye. Got, em her du birîndar in. Min got, netirsin. Min got Hemdînê Eyo, yekî bavê ser piyê xwe, Ebû Fexrî bavê ser piyê xwe û firaxan bide min, ez ê rahêjim firaxan. Du heb birîndar bi me re çêbûne. Wê çaxê jî însanekî zana yê siyasî jî bi me re bû. Dere, dadikeve biniya hesin dibêje, “Hevalên me man, çem e, ka em ê li wan vegerin.”

*K. A. : Hûn di Kemaliyê de ne?*

E. C. : Em di Besta Kemaliyê de ne. De de de de! Firax miraxên xwe, her

du meytên xwe me derbasî newalê kirin. Min got, bise li vir bin, heta ez firaxên xwe xelas kim ez ê li we vegerim. Me dît Şemoyê Hiskê jî gule lê ketiye; ku gule lê neketibûya me yê li wir hevdu bikuşta, me yê berdayê. Çima tu yê paş de herî? Me dît gule li wî jî ketiye. Li lingê wî ketiye, lingê wî tiştek pê nehatiye, hema hestiyê wî qul kiriye. Ev ê din jî gule lê ketiye, ev ê birîndariya wî xedar Çetoyê Kurimî ye. Min got, em ê herin Çeto bînin. Em çûn me li ser pişta xwe kir, me Çeto jî anî. Me daxist biniya hesin. Ji dest xwe çûye, însanê birîndar e. Min got, rabin; firaxên me hene, divê kes nebîne. Me li ciyekî danî û em hatin. Min erebeyek ji Amûdê biriye, erebeya hespan. Min got, pereyan jî ji kîsê xwe ez ê li her sê birîndaran bidim. Quweta min hebû, ne xema min e. Şemo hevalê dewletê bû jî wê çaxê.

*K. A. : Dewleta Sûriyeyê?*

E. C. : Erê. Me got, binêr tu netirsî, tenê bê ez birîndar im û hew. Te dît, ew neditirsiya. Bes ev ê din em qaçax bûn. Me textor biriye ser Ebû Fexrî. Birîndarekî me yê din yekî Zeytûnî ye. Li wî Aşê Alewiyê li cem mala Mihdî ye, ew jî merivê wan e. Em textor dişînin ser wan, wan derman dike, me nêrî birîndar nema yên mirinê ne. Birîndar rihet bûn. Heqê textor mextoran min da. Îcar yabo, welehî em tarîxan bêjin heta çar pênc salan xelas nabe. Ciwamêrê ku başî kirine baş in. Ên nebaşî kirine jî hene. Ahilên van hidûdan hemû ne tiştek in. Çi gundên di ber hesin de ne, te dît, vana rêberî kirine, pere ji xelkê xwarine. Diçûn esker qanix dikirin. Îcar wextê esker qanix nedibû, muxbîriya me dikirin. Me bi qaçaxî lê dixist, muxbîriya me dikirin. Ji ber ku muxbîriya me dikirin, star ji me re nedima. Îcar welehî miletê me di vî hidûdî de gelek çûn. Xeyrî me jî kirine. Mala Seroxan kirin. Mala Seroxan pê rabûn, pê gund kirîn. Şakirê Seroxan a niha gund kirîn.

*K. A. : Ji ku ne?*

E. C. : Ji Tûmikê ne. Mehmûdkê pê tiştek nekir. Bavê me nekir tiştek. Bavê min heta pîrekek, zarokek jî di hidûd hebûya, ruhê xwe jî li ser bida heya xelas nekira nedimeşiya. Dest ji wan nediqeriya.

K. A. : Mecîd Tahir digot, heger wextê yek birîndar biketa 'eyb bû ku me bihişta. Çênedibû birîndar li nav têlan bimana.

E. C. : Mecîd Tahir bi destê xwe baş bû. Mecîd Tahir ji tivinga xwe re jêhatî bû. Rojekê yek mir. Me dît ket, ez daketibûm jî, ji fediyan re me anî. Min ji Mehmûdkê fedî dikir, ne ji Mecîd Tahir. Barê wan me diqetand û dianî. Me birîndarê xwe xelas dikir, ji mecbûrî ji fediya hevdu. Em difikirîn ku sibehê xelkê bibêje filankes layê filankes dest hilnanî; eybeke gelekî mezin bû.

K. A.: Saeta te xweş.

**Bazîdê**
**08.09.2007**
**Miroveki 29 salî**

“Ez 18-19 salî bûm. Wê demê ji aliyê me carna vala hesp dibirin û ji wir de pense dianîn, pîl dianîn, tornawîda, perçê hesin ên erebeyan dianîn.

Wê hingê çar kes derbasî aliyê Îranê bûbûn. Dema tên aliyê Tirkiyeyê berbanga sibê ye. Eşyayê xwe li cihê di çiyê de li jora gund vedişêrin. Dikevin ser riya erebeyan û dadikevin ber bi gund de. Siwarî tên, firax veşartine. Heta tên nava gund. (Serê êvarê esker hatine li jora gund Saxlik Ocaxi (binke) heye, li derdora wê hin kevir hene, li wir ketine pûsûyê. Xuya ye berê îxbarî bûye.) Berî bikevin nava gund, esker li wan direşînin. Di cih de yek ji wan hat kuştin. Yek gelekî giran birîndar dibe. Yê din ji qiça(ling) xwe birîndar dibe, lê ew kare bimeşe; ew xwe xelas dike, dikeve nav gund xwe digihîne malê.

Tê bîra min ê hat kuştin cihê serê wî di berfê de çêbûbû. Du hesp jî hatin kuştin. Yek tevî hespê xwe qey tiştek pê nehatiye û reviyaye.

Miletê şikayet kir, kifş hat ser. Qomûtan birin ser şopê. Hingî xwîn li ser berfê pijiqîbû û gelek xwîn hebû. Eskerek ji qomûtan re dibêje: “Gundiyan pez serjê kirine û li ser berfê reşandine; ya na ev xwîn hemû çawa ji hespan wilo belav bûye.”

Ê di vê bûyerê de hat kuştin, du birayên wî yên din jî li ser sînor di bûyerin din de hatin kuştin. Digotin, yek ji wan dema dikeve destê esker birîndar e. Dûre bi ben wî dixeniqînin. Digotin stûyê wî tevde reş bû; xuya ye ku xeniqandine. Di vî hidûdî de bi hezaran însan hatine kuştin.

Tu tişt qezenc nedikirin jî. 4 caran tiştek qezenc bikirina cara 5’an dihat girtin, ew fêda wan hemû diçû. Ji xwe yê li Îranê bihata girtin, bi qasî malê xwe curm jî didan. Ji ber wilo gelek derban dema malê wan dihat girtin xwe li malê xwe nedikirin xwedî.”

**Bazîdê**
**08.09.2007**
**Mirovekî temenê wî nêzîkî 60 salî***

"…Ez bêm ser qaçaxçîtiya me. Piştî 1976'an ez bixwe jî diçûm Îranê. Min mal dibir heta Tehranê. Carna em bi destê qereqolên hidûd diçûn. Me pere didan wan, em diçûn me ji xwe re mal dianî. Me wê çaxê taximên qehwê ji Îranê dianîn, me saet dianîn. Vê taliyê merq diçû û dihat, zêr diçû û dihat, qumaş diçû û dihat. Tiştên elektronîk diçûn û dihatin. Ev qaçaxçîtiya li ser hespan dibû. Hinan ji vir pez derbas dikirin aliyê Îranê. Li ser pişta hespan me mal dibir û dianî. Alavên elektronîk dihatin, qumaş dihat, taximên qehwê dihatin, taximên xwarinê dihatin, hine dihat.

Gelek caran jî qeleşiyên mezin bi me re hatine kirin. Em xapandine birine pereyê xwe ji me stendine; dema em çûne li ser hidûd em girtine. Pênc sal ceza dane me, em xistine hepsan. Gelek caran em xapandine, em çûne li ser sînor hevalê me kuştine. Yê min bixwe 4-5 hevalên min ên zehf hêja wilo hatin kûştin. Yê di nava me de ye yê koka me dixwe, herî zêde vî kurmî ev di serê me de dane kirinê.

Ez mînakekê bidim. Em bi destê eskeriyê diçûn û dihatin. Gelekî jî pereyê zêde em didin. Heger em sed milyonî kar bikin, em 50 didin wana, 50 ji me 4-5 hevalan re dimîne. Du heb xayînên me hene, diçin ên ku em bi destê wan derbas dibin, bi wan re bûne heval. 25 barên me hene em ê bibin Îranê. Çawîşekî qereqolekê heye; hat me hevdu li cihekî dît, got, 'Temam werin.' Min gelekî jî israr kir, hin xofên min hebûn. Min got, hûn tiştina nekin. Wî jî soz da got, ' Amin be, qet em nakin.' Wexta em çûn, em ketin bin devê hidûdê Tirkan em berjêr bûn, em di nîvê hidûdê Tirkan û Îranê de ne; ji jor de ûçaqsewarê li viyalî û li viyalî li me girêda. Ûçaqsewara Tirkiyeyê ji jorê ve li me girêda. Hevalê me tevda bi hespên xwe ve reviyan xwe xelas kirin. Em derketin devê newalê. Li serê newala jêrê qereqoleke Îranê heye. İlm dane qereqola Îranê, ewan jî ji pêşiyê dan me. Yanî em bi aliyê Îranê de bazdidin ku em xwe xelas bikin, eskerê Tirkiyeyê ilmî qereqola Îranê kirine; eskerê Îranê jî ji aliyê din ket pêşiya me. Xwedê alîkarî kir, hevalên me kes nehat kuştin, xwe xelas kirin. Çend heb bar marên me man.

Yanî îxaneteke pir mezin bi me re hat kirin. Ez tu carî wê îxanetê ji bîr nakim. Eva îxanetan jî ji destê du heb ajanên me bûn. Ew jî ji bo menfaeteke

* Serê vê vegotinê di beşa sirgûnê de ye.

biçûçik. 25 mêran, 25 baran didin tunekirin ji bona 500 milyonî yan jî 100 milyonî. Em ji destê ajanan gelekî dikişînin. Di ticareta me de be, di siyaseta me de be wisa ne. Gelek kes li ser vî sînorî hatin kuştin.

Di sala 1981'ê de li wê texmê dest bi danîna mayinan kirin, heta 1984'an bi temametî hidûd bû mayin. Axilbe Agiriya Biçûk, em jê re dibêjin ji Araliqê bigire heta derkeve Qoziliyê, heta derkeve Girîdaxê temam mayin e. Yê herêmên din ez gelekî nizanim. Heta niha ew mayin hîn hene. Ji xwe têlên pûsûyê kişandine. Ew têl laşê însanan qut dikin. Çi jê re dibêjin? Jê re 'çelîk biçaq' (yanî kêra pola) dibêjin. Di nîvê wan de mayin hene. Niha jî wir tijî ye. Ku yek ket wira kes nikare jê bifilite."

**Bazîdê**
**07.09.2008**
**Miroveki 50 û tiştek salî.**

"Ez ji eşîra Celaliya me. Bes em ji şaxê Qota ne. Eslen em li vî aliyî rûdiniştin. Sînor tune bû. Merivên me li her du aliyan jî hene. Li her du aliyan navê gundên me eynî ne. Yanî du gund hene, her yek li aliyekî sînor e û navê wan eynî ye.

Em ji Îranê dihatin em dihatin zozanê Sînegê. Em diçûne delavê Bûdê, em diçûn Arê Mûsa Axa, em diçûn Hecî Emerê Heso em diçûn Kîrta Eliya. Ev hemû arê (cihê çadir tê vekirin-zozan) Qota ne.

Berî bi 70-80 salî gelek pezê kalikê min li Îranê hebû. Navê wî Mûsa Axa bû. Li wê derê pezê wî qir dibe. Tê aliyê Tirkiyeyê gundê Qarabûlaxê û nema diçe. Xwediyê me yê li Îranê, ji eşîra ku jê re dibêjin Eşîra Xelikan in.

Bavê min di zemanê Şah de pez derbasî Îranê dikirin. Wê demê ne qedexe bû. Gelek kesan karibûn pez bibirina. Hema ku te sînor derbas kir tu xelas dibûyî. Yê Îranê bi dilê wan bû ku pez ji wan re diçû.

Dema me pez derbas dikir, me dibir cem Rizayê Qotî (kurapê me ye). Çi kesê ku ji Bazîdê pez dibirin, diçûn cem wî. Li her du aliyan şirketên wî hene. Bazirganiyê bi heta Ewrûpayê re jî dike. Li ser vê bazirganiyê Şah alîkarî dikir.

35-40 sal berê bi zêdebûn pez dibirin û nokê daxlî. Şevê qet neçûya 50 bir pez derbas dibû. 20.000- 30.000 pez şevê diçû. Xurmeyên Îranê, çaya Îranê, tebeq, saet ji aliyê din dianîn.

Carê 5 hezar bi hev re diçûn. Ji xeynî şivanan neh deh kesên ku bi sîleh û nobedar bûn bi pez re diçûn. Bi kêmanî 4-5 şivanan jî alîkarî bi wan re dikirin; ji bo pez derbas bikirina. Wê çaxê qet mayin tune ne. Tiştek tune bû.

Ez hîn zarok bûm, ez 13-14 salî me ez bi şivanan re çûm Îranê. Bi zorê min destûr ji bavê xwe xwest. Kir nekir min got, ez ê herim. Cihekî avî hebû, jê re Lîça Îsê dihat gotin. Di navbera her du çiyayên Agiriyê de bû. Em gihan wir bi pez re, em li wir sekinîn. Dikir tarî têkeve erdê. Em li serê avê ne, li wê derê min hebekî efendîtî kir (ez naşî bûm.), min gelek nan nexwar. Şivanan nan giş revandin, xwarin.

Heta şev tarî bû em rabûn me da rê. Em nêzikî sînor in. Sînorê Îran û Rûsyayê (Piştî Agiriya Biçûk, di sêçika her sê dewletan de). Li wir qereqola Tûjik jê re dibêjin, a Tirkiyeyê, heye, li wê piştê ez ditirsim. Ji aliyê din ve ez birçî me. Ez taqet nakim jî ku ez bi wan re herim. Ez bimînim li wê cihê

nenas, di hidûd de ez ê winda bibim. Ji aliyê din ve ez poşman bûm ku min bi ya bavê xwe nekir. Min got gerek ez nehatibûma.

Ew dimeşin ez bi dû wan de dimînim, taqeta min nemaye. Geh ez hebekî ji wan vediqetim. Ez bimînim ez ê di hidûd de winda bibim. Hebik berf hebû. Ji birçînan ez şeqitîm, dişemitim; min anîşka xwe bi erde de zept dikir. Jêra min kortal bû, çi bû min nedidît. Reş bû. Min anîşka xwe dida erdê bi wilo ez disekinîm. Di berfa nuh a hindik de ez dişemitîm.

Em gihan hidûd, gihan kevirekî mezin-zinarekî mezin, ê rêber gotin, 'Va ye em xelas bûn, me hidûd xelas kir.' Em ketin axa Îranê, du sê bir pezê Îranê me dîtin. Ên li ber wan agir kiribûn, çay danîbûn serê. Gundê Celaliyan bû. Encex li wir em sekinîn, me nan xwar. Bi rê de qiça (lingê) pezekê şikest. Şivanan got, 'Em ê bihêlin.' Min got, ileh em ê bi xwe re bibin. Min peza ku lingê wê şikestibû jî bi xwe re bir ber agir. Piştî min nan û çay xwar li ba agir min pal da û di cih de ez di xew re çûm. (Zik jî têr bû.) Di nav kulavê şivanan de ez di xew re çûbûm. Heta sibehê ez bi xwe nehisiyam. 2-3 bir pez biribûn, ez bi xwe nehisiyam. Carekê ez bi qorna erebeyê şiyar bûm, di ser min re bû. Ez tenê li wir mabûm û peza xwe ya lingşikestî. Erebe ji bo min şandibûn. Em çûbûn gundê Haco (li Îranê). Li ber çiyayê Agiriya Biçûk ez di xew re çûbûm.

Ez û pezê min avêtin maşînê (qemyonetê), ez birim gundê Haco mala Selhîng. Li wir me peza lingşikestî şerjê kir û li wir xwar. Li wir 5-6 rojan em man. Me pezê xwe firot Rizayê Qotî, Egîtê Qotî. Wan jî ew pez birin li Tehranê firotin. Li wir jêdikirin û belav dikirin.

Li wir çend rojan em man. Dawetê merivan hebûn, gazî me dikirin, em çûn dawetan. Çi kesê dihatin dawetan sîlehê wan hebûn (keleş). Sîlehê xwe li dîwar pal didan. Ez dimam şaş, ez zarok bûm, min got ev çi ye? Dema bûk hat hemû derketin, sîleh berdan hewa di ser serê bûkê re.

Bi pereyê pez saetên Seîko Orîent kirîbûn. Piştî hefteyekê 5-6 hesp bar kirin û em vegeriyan aliyê malê (Tirkiyeyê). Hesp bi rê de di bin saetan de westiyabûn. Hevalê min qamçiyek li hespê xist, hespê çift avêt û lingê hevalê min keştand (şikênand). Ew heval li ser hespekî ku barê wî hebekî sivik bû kirin. Em bi şev sînor derbas dikin. Em hatin gundê aliyê Tirkiyeyê, li wir şevekê man; ez nas nakim bê kî bûn. Bû sibe em hatin Bazîdê.

Niha mala min li Bazîdê ye. Ez bi peseport derbasî Îranê dibim û bi piranî ji sedî heştê ez li Îranê me. Bi piranî ez li aliyê Makûyê, Xoyê, Tebrîzê û Pîranşehrê (gundê Pîranşehrê), Nexedê dimînim. Ez bi ticareta her du aliyan de dadikevim. Ticareta bi şeref.

Bîçer giha diçinin, me gelek anî, van demên dawî. Giş bi piştê hespan dihatin. Ev çûn û hatin hemû li ser pişta hespan e. Derdor hemû çiya ne; ji hespan pê ve kes nikare vê tevgerê bike. Ji aliyê Îrane ve gelek mazot dianîn (2000 û 2006'an de). Ew jî bi hespan dikirin.

Hin kesên ku di vê çûn û hatinê de saxlem bûna, wan kesan tu carî xayîntî bi hevalên xwe re nedikirin. Di hin cihan de carinan dema di dan û stendinê de dubendî hebûn ê ku bi bendikê re diçû û dihat, ji aliyê benda din ve îxbara wan dibû."

**Nisêbîn**
**20.12.2005**
**Miroveki nêzî 70 salî**

"Li Elûca ez mele bûm (Salên serê şêstî de). Her çendakê serîna em diçûn ziyaretiya mala Şêx. Vê neqlê gava em çûn dewra Şêx Eledîn bû. Em çend rojan li mala Şêx man, îcar em ê vegeriyana Serxetê.

Ez û hevalekî xwe yê sofî em çûn Tilzîwan, gundekî li ber sînor aliyê Binxetê bû. Em ê çûbûna mala Xelîlê Misto, wê em di sînor re derbas bikirina. Em gihan keviya gund, sê zilam her sê bi rext û tiving, bergîlek bi wan re, em pêrgî hev bûn. Me silav li hev kir, ji me pirsîn bê em ê herin ku derê. Me got, em ji cem Şêx tên em ê herin mala Xelîlê Misto ji bo em Serxet bibin. Yekî ji wan got, 'Ez bi qurbana we û Şêxê we bim, weleh em jî dikin herin Serxetê, ma hûn bi me re nayên?' Dema ew gotinên xweş got û piştî em bi hev şêwirîn, min û hevalê xwe aminî bi wan anî, me qebûl kir ku em bi wan re herin.

Me bi hev re da rê, ji Tilzîwanê em çûn gundê Girkêzêra. Hevalê wan li wir li benda wan bûn. Şev bû, sê çaryek an jî saetekê em meşiyan, heta em gihan ber gund. Ji me re gotin, 'Hûn rûnên em ê herin gund û vegerin.' Me got baş e, lê em nizanin bê wê herin çi bikin. Qederê du sed gavan li bakurê gund em rûniştin, me limêja eşayê kir, bi dizî cixareyên xwe vexwarin û em man li benda wan. Me dî va ye hatin ku bûne sê bergîl û 9 zilam; her neh bi rext û tiving bûn. (Gelek tivingên wî wextî yên Elmanan bûn.) Rextê wan selîbkî li sing û pişta wan girêdayî bûn. Dema xwe dileqandin, diçûn û dihatin rextê wan diçurisandin. Bergîlê wan di ser cokên avê re xwe diavêtin, gelekî xurt bûn. Her bergîlekî şeş telîs bar hilgirtibû.

Me berê xwe da bakur, bi dû wan de ber bi hidûd ve em meşiyan. Em nêzikî hidûd bûn, me dît ê peşiya me sekinîn bi hev re peyivîn û dûre barê xwe qulipandin, danîn erdê. Ji me re gotin, 'Heke hûn cixareyên xwe vexwin jî gelekî bi dizî vexwin, em nêzikî hidûd bûne.' Zêdeyî du saetan em li wê derê man rûniştî. Me dît xelbexelbek ji jêr ve hat û reşayîn xuya kirin. Yek ji yên cem me beziya çû pêşiya wan. Hevalê wan ê ku li bendê bûn hatibûn, cardin bi bez li me vegeriya got, 'Barê xwe bar bikin, hevalê me hatin, em ê bimeşin.' Ez û hevalê xwe dîsa em nizanin bê em li benda çi bûn, tenê dema dibêjin bisekinin em disekinin, dema dibêjin bimeşin em dimeşin. Rêber her yekê ji me pere ji me stend, barê xwe bar kirin (tev ê ku hatin em bûbûn zêdeyî 30 kesî, jin jî hatibûn û çend kesin din jî bê sîleh bûn) û em meşiyan.

Em gihan ber têlan, ku va ye esker têlê ber hidûd xistine neqeba devê tivingê û şîşê, hilgivandiye bi qasî ku bergîl karibi derbas bibe.

Ew kesê bi sîleh dora bergîla hawîrdor girtibûn ku bi vir de wir de nerin. Bi wî awayî me sînor derbas kir. Betanî jî di derba têlan de di binê lingê bergîla de danîbûn ji bo şop çênebe.

Bi gotina bilezînin! Bilezînin! Me sînor derbas kir û ber bi Tilminarê ve diherikin; lê kelemek din di pêşiya me de bû. Rêber ditirsiyan ku, esker xayîntiyê bi wan re bikin û di pira pêşiya me de di pêşiya me keve. Berî em bigihên pirê bi sed metroyan deh zilam pêşiyê bi lez çûn pira qenala bareşê Tilminarê saxtî kirin bê kes heye tune ye û li me vegeriyan gotin, 'Zû bimeşin kes tune ye.' Bi lez û bêdeng me pir jî derbas kir, qederê 200 metroyan em çûn. Ê bi rext û tiving, bergîl bi lez dan pêşiya me, rêber Ebdulahê Mendikanî sekinî. Em ên bê bar li dora xwe kom kirin û got: 'Mala min li vî gundî ye, hûn tên cem me hûn zanin, hûn diçin derinên din hûn dizanin.' Hîn peyva wî di devê wî de, me dî esker nêzikî me bûn. Ebdulah got, 'Bazdin va ye esker hatin.' Em her yek bi derekê de pijiqîn. Dengê Ebdulah dihat bang esker dikir digot, 'Memet tu yî?' Esker got, 'Erê ez im.' Ebdulah lê vegerand got, 'Vegere, tu venegerî ez ê cenazeyê te bi ser mala bavê te de bişînim.' Heya ew wilo dipeyivîn bergîl qederê 400 metroyî bi dûr ketibûn, xwe xelas kiribûn.

Ez di Tilminarê re derketim, hevalê min jî di Mindikanê re; kes nizane bê kî bi ku de teriqiya. 500 wereqên hevalê min ên ku li Binxetê dabû min jî bi min re mabûn. Sibehê em çendik li erebeya heywanan siwar bûn, em gihan Girikê Moris. Min dît ku va ye hevalê min li wir li benda min e. Got, min zanibû ileh hûn ê di vir re derbas bibin, ez mam li benda we. Em tevde hatin Nisêbînê û ji wir ez çûm gundê xwe.

Bîranînên me gelek in û li ser vî sînorî kesên ku hatine kuştin bêhijmar in. Jixwe defter têra yên birîndar nake. Piştî te ji min re got li ser vê mijarê em ê biaxivin, min navê çend kesên ku li vî sînorî jiyana xwe ji dest dane dan hev. Lê ez paşnavên hinan ji wan nizanim. Bi awayê ku ez pê dizanim çend nav jê ev in:

Ên ku li ser sînor hatine kuştin:

Ji Sîtê: Etûyê kurê Xelîlê Etû, Eshedê kurê Mehmûdê Hisê, Smaîlê Mihemedê Xano, Şerîfê Mihemedê Şerîf

Ji Qesra Serçixan: Cemal Alpxan (Layê Silêman), Ezîzê Silêman

Ji Menderê: Brahîmê Kurê Hacî

Ji Zorava: Abdulkadir Yaşar

Ji Xerêb: Nîmet Kurê Osman

Ji Sarincê: Mihemed Emînê Melê (Bi vî kesî re 8 heb hatine kuştin.)

Ji Miqrê: Çeçan Ağirman, İbrahim Ağirman, Hemo Ağirman, Sebrîkê Xelef, Nayif Akalan (Kurê Hiseyno), Beşîrê kurê Ferho, Brahîmê kurê Hemê Ebdê, Sebrî kurê Hemê Ebdê

ji Çuva: Ehmedê Gürbüz, Xelîl, Silêman ê kurê Seyid Nebûnî, Felîto kurê Hiseynê Huto (ev her sê ji aliyê eskeran ve li sînor hatine kuştin), Cemîl Yarici (di sala 1979'an de li ser riya ber sînor ji aliyê esker ve hat kuştin),

Tahirê (Serdêfî), Mihemed Gok (Erbetî), Ebdullah layê Hiseyn (ji Şiwêşkê),

Hesenê Elî (ji Şîwêşkê), Şikriyê Mala Enter, Mahmut Adiyaman ji Pîrebokê, Seyid Elî ji Dêrê (Mayin pê de teqiyaye, esker jî ew timam kiriye), Qasim ji Cinata. Li miqabilî qereqola Sirûciyê-Nêzikî gundê Eznewirê- esker ji 5 kesan re dibêje derbas bibin, ew jî derbas dibin nabin em nizanin; bêbextî bi wan re kirin. Dibêjin esker ev 5 kes di qereqolê de kuştin. Her pênc Qertmînî bûn. Îcar wan di sînor de dikujin, di qereqolê de dikujin em nizanin. Navê wan ev in: Ferhan kurê Yusiv Erces, Fehmî kurê Hecî Osman, Mihemed kurê Qencûr Elgan, Silêman kurê Mihemed Xemo, Seyid Yusiv kurê Îsayê Şexmus.

Ê di nav mayinan de hatin kuştin:

Îsa kurê Şêxmûs Sikût (Surgucî), Elî kurê Şaro (Surgucî), Evdilah İnanç (ji gundê Bafê-Hezex), Mihemed Îlhan layê Silêman (ji Bafê), Ehmed Cengiz kurê Mihemed (ji Bafê), Reşît kurê Evdilah (Deşta Darê-Hezex), Nezîr kurê Mihemed (ji Bafê), Evdilah kurê Ehmed (ji Hezexê), Tahir kurê Qasim (ji Sêrtê), Miradê Sêvê (ji Siwêşkê, rêber bû), Suleyman Ozturk (Ji Tilyaqûbê) layê Hemo, Zubeyir Yilmaz (Ji Tilyaqûbê) layê Brahîm, Hemo Yilmaz (Ji Tilyaqûbê) layê Xelîl, Mihemed Sedîq (ji Nisêbînê), Ebas kurê Tahir (ji Nisêbînê), Hiznî (Irnasî, li Tilyaqûbê mezin bûye), Xelefê Rebîa (Tilzîwan-Bînxetê), Mihemedê Hêvo (Dalînî), Mehmûd kurê Bedriya (ji Mêrdînê), Ebdulah (ji Bişêriyê), Qenco ( ji Darê), Mihemed Emîn Kol (ji Çuva), Xetîb (ji Xursê), Abdulah kurê Ereb (ji gundê Deşta Darê, bi Hezexê ve girêdayî ye), Mîrza kurê Mele Ehmed Akman (ji gundê Deşta Darê, bi Hezexê ve girêdayî ye), Seyid Mihyedîn kurê Nesredîn Aslan (ji Sirsirkê ye,

li aliyê Cizîrê), Seyid Abdurahman (ji gundê Batêlê, li aliyê Cizîrê), Hamid Kurê Mihemed (ji gundê Delcanê, Hezexê), Bahaedîn kurê Hamid Tekmonoray (ji gundê Delcanê, Hezexê), Seyid Yasîn kurê Şêx Silêman, Hesen kurê Hiseynê Elî, Smaîl kurê Hiseynê Melê (paşnav Elgan), Îbrahîm kurê Hiseynê Mûsa (paşnav Denîz), Îsa kurê Silêyman (paşnav Kiliç), Reşît kurê Elî (paşnav Yildiz), Hiseyn kurê Elî (paşnav Alp), Ebas kurê Ehmed (paşnav Akinci), Ehmed kurê Mehmûd (paşnav Ozdemîr), Elî kurê Hamza (paşnav Ozdemîr), Osman kurê Hiseyn (paşnav Akinci), Mihdî birayê Hecî Yûsifê Sîtî (ji seyidên Kerboranê)

**Nisêbîn**
**14.12.2005**
**Miroveki nêzî 60 salî**

“ ‘Emrê min 16 salî bû. Bavê min li eskeriyê bû. Em feqîr bûn. Diya min diçû çiyayê Xerêb, ew û hevalên xwe; êzing li keran bar dikirin, dianîn dibirin Amûdê. Wê çaxê ev mayin tune bûn, sînor vekirî bû. Bi rihetî bi roj em diçûn û dihatin. Sê çar malên apê min li Amûdê bûn. Hîn jî li wir in. Ji ber ku bavê min esker bû diya min ew êzing difirotin û em pê xwedî dikirin. Piştî wê, min radihişt piştiyek êzing û min dibir Amûdê difirot. Min ji xwe re kîloyek xurme, nanek an jî hinek helaw dikirî û di roja xwe de, carina di saeta xwe de ez vedigeriyam gund, Gundikê Evdirehman. Ne ez tenê diçûm, em gelek diçûn; jin, zilam, zarok. Heta bi Ceftê me dibir. Me êzing ji çiyayê Gurik û Xerêb dianîn. Ji Gurik heta bigihê Qûzo, Xerêb hemû daristan bû.

Piştî bavê min ji eskeriyê hat diya min got, ‘Îleh tu yê herî ber berxên mala apê xwe.’ Mala apê min li Sûriyeyê bû, pezê wan hebû. Gava ez diçûm ber berxên wan ez aciz dibûm. Deh, pazdeh rojan ez li mala apê xwe dimam ez vedigeriyam malê. Diya min bi min de dixeyidî, ez dîsa dişandim.

Şixulê 2 mehan 3 mehan ez li ber pezê wan mam. Bavê min ji apê min re got, ‘Tu jî were, mala xwe werîne Gundikê Evdîrehman, ma tu yê li vir çi bikî?’ Apê min ê ku ez diçûm ber pezê wan, mala xwe anî gundê me, Gundikê Evdîrehman. Li gund gelek hesp hebûn. Ji Sûriyeyê mal bi wan dianîn li Serxetê difirotin. Malê dianîn dibirin Amedê, Midyadê. Xaliyên dîwaran, sicade, çarşefên pîrekan dianîn.

Li Nisêbînê di şûna Pasaja Hemo de wê çaxê xana heywanan hebû. Xwediyê wê Hemo bû, jê re digotin Xana Hemo. Şevekê, du şevan xelkê heywanên xwe dixistin xanê, bi heqê xwe. Dema ji Omeriyan mewîj, dims, bastêq dianîn difirotin li Nisêbînê li xanê diman. Ên ku malên wan ên nas li bajêr hebûna li cem wan diman, ên din li xanê diman.

Ez û çend hevalên xwe li bergîlê xwe siwar dibûn dihatin Nisêbînê. Me ji Nisêbînê hêk dikirîn. Me selik dixistin xurcikê bergîlê (têr), ka dixist hundirê selikan, qederê 300 hêkî lê rast dikir û li bergîlê dikir, dibir gund.

Serê sibehê berî rohilat me hêkên xwe diavêtin piyê xwe, selikek li vî aliyî yek li wî aliyî me sînor derbas dikir, em diçûn Amûdê, me ji xwe re difirotin. Me ew pere didan bi qapût, çakêt û êlekan, me sînor derbas dikir û em dihatin Serxetê. Gelek derban me dibirin Mêrdinê ji xwe re difirot. Şevekê em li Mêrdînê diman, a din î rojê me rê digirt em dihatin gundê xwe. Em peya diçûn û dihatin.

Piştî wê bi çend salan mayin danîn. Gava eskeriyê mayin danîn em giş xistin nav gund û esker li ber me danîn ku em nizanibin ka çi dikin. Me nizanibû bê mayin çi ne, ev çi dikin. Rastî gundê me hinek mayin danîn, li aliyekî dananîn (aliyek bê mayin ma).

Piştî mayin hatin danîn qereqol zêde bûn. Her qereqolek 30 nefer tê de hebûn. Sînor hin bi hin şidiya.

Rojekê bavê min li min xist (em pevçûn), ez çûm Amûdê. Gava sînema Amûdê şewitî ez li wir bûm.* Wek îro ez daketim, bû du rojên din sînema şewitî. Bi şev piştî eşayê bû (tiştê ji min re hat gotin), zarokên kurmancan çûbûn sînemayê. Gava agir bi sînemayê ket esker jî li ber devê derî bûn. Dema sînema şewitî, Mihemedê Seîd Axa li qehwê ye; gava dibihîze ku sînema dişewite radibe bi lez bazdide ku here sînemayê. Layê wî pergî wî dibe dibêje, yabo ez va me, tişt bi min nehatiye. Wî jî gotiye, 'Lawo ma zarokên kurmancan giş wek te ne, ew jî zarokên min in.' Û çûye hundirê sînemayê. Digotin, wek betlekî bû. Carê radihişt sê, çar zarokan derdixist derve. Carecara zarokan di erşê Xwedê re derketiye. Heya çil, pêncî zarokî wî xelas kiriye. Dema ku zaroka dawî diavêje derve, wê kêliyê derî jî dişewite û bi serde dikeve, ew jî dişewite û dimire. (Layê Seîd Axa ye, Axê Dekorya).

Piştî çendakî ez ji Sûriyeyê hatim, li gundê xwe vegeriyam. Çend rojên me qediyan. Em tim diçûn ba eskerên qerekola gundê me. Em şev û roj li ba hev bûn. Kurmanc jî di nav wan de hebûn. Navbera me xweş bû.

Yekî esker ji Qersê bû, navê wi Ebas bû. Got ez tezkerecî me tê herî Sûriyeyê ji min re pelê cixareyan, çaqmak, qutiyên cixareyan bîne, ji bo hediyeyan. Ez çûm Amûdê. Bû a din î rojê, du hevalên min hebûn gotin, 'Em ê jî bi te re bên Tirkiyeyê.' Her yekê me ji xwe re çakêtin û êlekin kirîn û em hatin nav mayinan, şev e. Min got, civanê min û te saet 12-1 (ê şevê), ji Ebas re. Bi şev ez hatim ser pûsûya wan. Ew û hevalên xwe di pûsûyê (kozikê) de razabûn. Min deng li wan kir, ji xew veciniqîn, gotin, 'Tu hatî?' Min got, erê ez hatim. Ez û hevalên xwe, me sohbet dikir, xewa me hat em razan. Tropên qelem hebûn, serê wan zêr bûn. Min hinek ji wan jî anîbûn. Min emanetê wan teslîmî wan kir, hinik xurme jî min dan wan. Xurme xwarin, bîstikê em li hev rûniştin. Ji cem esker bi bazdan ez vegeriyam ba hevalên xwe, ji bo ku ez ji hevalên xwe re bêjim em ê karibin derbas bibin û rahêjim barê xwe yê çakêt û êlek tê de ne. Şuxlê 100 gavî ez daketim nav mayinan, min rê şaş kiribû û mayin bi min de teqiya.

* Şewata sînemaya Amûdê di 13.11.1960"î de bû.

Gava min pê li mayinê kir wek du sersotan ku tu pêxî ket ber çavên min, qîrîn bi min ket û ez bi hewa ketim. Piştî ez li erdê ketim, ez rabûm ser xwe, ber bi hevalê xwe de beziyam û min banî wan kir got, werin bi min ve ez birîndar im. Esker jî dema mayin teqiya ji tirsan re dest bi teqandinê kir. Hevalên min jî tirsiyan û bi min ve nehatin, ez nizanim bê bi ku ve çûn. Min nema wêribû ne ez herim cem esker ne jî herim bi aliyê Sûriyeyê ve. Hema şuxlê çendsedmetrokî ji esker û wir de ez derbasî Tirkiyeyê bûm.

Pişta sitûyê min, destê min, pişta min hema hemû derên laşê min tije berê mayinê bûbûn. Sê tiliyên destê min ên çepê li ser rehikan mabûn bi destê min ve. Xwîn ji her derê min tê û bi wî halî min xwe gihand gundê xwe. Navbera sînor û gundê me kîlometreyek hebû.

Havînan em li ser xaniya radizan. Saet yek û nîvê şevê ye. Dengê mayinê çûye gundiyan lê nizanin bê çi qewimiye. Ez hêdî hêdî bi derenceyê ve hilkişiyam ser xaniyê mala cîranê me. Mala me û ya cîranê me bi hev ve bû. Tas li ber cerê ava wan bû, min hinek av vexwar. Ehmed cîranê me yê xwediyê xanî bi min hisiya got, ‘Tu çi dikî?’ Min got, mayin bi min de teqiya. Ji wir em derbasî ser xaniyê me, cem diya min bûn.

Berê text tune bûn. Holikên tehliyê hebûn. Diya min, bavê min û zarok li ser holikê razayî bûn. Min hêdîka deng li diya xwe kir, lê min negot ez birîndar im, tenê min got, yadê rabe ser xwe, dakeve, jêrê ji me re pêxe. Daket hundir, lempe pêxist, hê nû ez dîtim. Gava çav bi destê min û xwînê ket diya min bêhiş ket. Bavê min jî hat, gundî bi me hisiyan, hemû hatin mala me. Eynî şeva ku înqilaba Gürsel ku li Menderes kir, wê şevê wilo li min hat.

Ji ber înqilabê dem ne xweş bû. Mayin jî teqiyabû. Xelk ditirsiyan û hemû gundî, heta bi bavê min xwe ji ser min dan alî. Tenê du zilam (gundiyên me) li ba min man. Wan zilaman, wê şevê çûn berxek şerjê kirin û eyarê berxê li ser destê min girêdan. Piştî eyar li destê min girêdan nema xwîn ji destê min hat.

Bû serê sibehê, zilamek ji yê ku li cem min bû çû qereqolê, haya yuzbaşî gihandê got, ‘Va ye gundiyekî me birîndar e, mayin pê de teqiyaye.’ Yuzbaşî hat ser min. Bi aramî bi min re da û stend. Wek, çilo mayin bi te de teqiya? Li ku derê? Pirs ji min kirin û îfadeya min stend. Qehwe ji yuzbaşî re çêkirin, lê wî venexwar got, ‘Cenaze li erdê ye ez ê çilo qehwê vexwim. Xwezika benzîna min hebûya, min ê ew bibira xestexanê.’ Rabû telefon da Nisêbînê, otobozek tertoqî hebû ew xwest gund. Otoboz hat gund, rehmetiya diya min û zilamekî gundiyê me bi min re hatin Mêrdînê, ez birim xestexanê.

Ez derbasî acîlê kirim, textor hat ser min, ew eyar ji ser destê min rakir. Halê destê min dît got, 'Divê ez destê te jêbikim.' Min û diya xwe nexwest ku destê min jêbibe lê textor got, 'Ku ez dest jê nekim wê gelekî xerabtir bibe, dibe ku tu ji ber bimirî.' Em mecbûr man ku em qebûl bikin dest jê bibe.

Tiştek dan ber bêvila min, min nema xwe dît; ez ji ser hişê xwe de ketim. Piştî wê, ez nizanim bê bi çend saetan ez hatim ser hişê xwe, min dît ku va ye diya min tenê li ber serê min e. Şuxlê deh rojan ez li xestexana Merdînê mam û pêve ez bi rê kirim.

Piştî sê, çar mehan kaxetek ji min re hat a ku diviyabû ez herim mehkemeyê. Ez rabûm çûm Mêrdînê mehkemeyê, bi şuxlê ez di sînor re derbas bûme û mayin bi min de teqiyaye, mehek ceza dan min û ez li hepsa Mêrdînê razam."

**Heman kes roja 21.12.2005**:

"Serê sala 1970'yî bû ez ne şaş bim. Em ji Binxetê dihatin, me sînor derbas kir, em ketin binya Riya Îpekê. Min ji hevalan re got, hûn li vir bisekinin, ez ê herim şopa xwe xera bikim; ji bo sibehê esker şopê nebînin. Em bêyî esker hatibûn. Saet yekê şevê bû. Ez vegeriyam min şopa xwe xera kir. Ji aliyê rojava de li ser cadê şewqek avêtin ser me, em rabûn ser xwe, di cih de li reşahiya me reşandin. Ji bo ez şopa xwe winda bikim min xwe xwas kiribû, dema teqandin çêbû min şekala xwe hişt û ez bazdam. Hevalên min mal hiştin û reviyan bi aliyê Tirkiyeyê de, ez jî vegeriyam aliyê Sûriyeyê nav mayinan. Di sînor de min sicada diya xwe û qutikê kufleta xwe dixist bin lingê hevalên xwe, ji bo şop xuya nekin. Piştî bêhnekê ez li nav mayinan mam, ji bo barê min sivik bibe min sicada diya xwe û qutikê pîreka xwe avêt nav mayinan, hêdî hêdî ez di riyeke din de derketim Serxetê, çûm gundê xwe, malê.

Ez razam, lê ez gelekî ditirsiyam. Serê sibê bi şiveqê re bû wîzewîza têlsizê eskeran li ser xaniyê me. Banî min kirin, zilamê gundiyê me û em tevde xistin pîqabê û em birin sînor ser şopê. Malê me girtibûn. Saet bû li dor heşta hîn fêm nekiribûn bê kî derbas bûye. Yekî gundiyê me ji yuzbaşî re got, 'Destûra min bidin ez dakevim Sûriyeyê, ê wir wê ji min re bêjin bê kî şevê din hilkişiyaye.'

Ew daket Sûriyeyê, em jî xistin pîqaba eskeran û em birin qereqolê. Saetek qediya neqediya, zilamê gundiyê me yê ku daketibû Binxetê hat hewşa qereqolê, bangî min kir, usteymen jî li bal bû. Gundiyê me ji min re got, 'Ez tiştekî ji te bipirsim tu yê rast ji min re bibêjî.' Min got, erê. Got, 'Ev sicade ne ya diya te ye û ev qutik ne yê pîreka te ye?' Min got, na.

Em tevde bi pîqaba eskeriyê birin gundê me. Bangî pîrekên gundiyan kirin. Qutik û sicade pêş wan kirin û ji wan pirsîn, 'Ev qutik ne yê pîreka viya ye, ev sicade ne ya diya wî ye?' Gundiyan gelek derban ew dîtibûn, gotin, belê.

Min ji gundiyê ku qutik û sicade anîbû re got, lawo ev hikûmet e, ji xwe malê min hatiye girtin, ez di bextê te û Xwedê de tu bi hikûmetê bi min neke, lê li gund tu çi bi min dikî bike. Qebûl nekir, bû birbira wî û çû malê. Ez hatim girtin. Du şevan ez li nezareta qereqolê hiştim. Dûre ez anîm tabûra Nisêbînê. Heft rojan ez di nezareta wir de mam. Piştî heft rojan li Nisêbînê hinekên din girtin (tu nabêjî ew jî hevalên min in) û xistin aliyekî din ê nezaretê. Piştî eşayê bangî min kirin, bi pîqaba polêsên Mêrdînê yê narqotîkê wê şevê ez û her du hevalên min em birin Mêrdînê.

Li serê meydana ku rê diçe Midyadê cihê tîman bû; heft rojan li wir em di nezaretê de hiştin. Hevalê min, bi bertîlan xwe dan berdan û ez mam. Piştî wê bi du rojan, çend pirs ji min kirin, min got qet haya min ji vî tiştî tune ye. Ez jî berdam. Li Nisêbînê jî îfadeya min stendibûn, min digot ew tişt ne yê me ne, lê ji ber ku şahid li min rabûbûn qebûl nedikirin. Dema ez li Mêrdînê berdam ji min re gotin, 'Duşemê tu û pîreka xwe hûn ê bên mehkemê Mêrdînê, tu xwe nedî aliyekî.'

Duşemê saet duduyê nîvroyê texsiya polêsan hat gund, ez û pîreka min birin Mêrdînê. Em birin salona mehkemê, min nêrî ku va ye qutik û sicade di destê polês de ye û anî. Min ji pîreka xwe re got, binêre wê ji te bipirsin bê ev qutik ê te ye, ev sicade ya xesiwa te ye, eman eman tu nebêjî yên me ne. Divê gotinên me jî li hev derkevin. Heke ji te bipirsin bê gundî çima li ser we îfadeyan didin, tu bêjî, gundî hemû xwediyê hev in, em xerîb in, ji ber wilo me naxwazin.

Pêşiyê bangî min kirin mehkemê. Hakim û sawcî bûn. Hakim got, 'Gundî hemû dibêjin ev qutik û sicade yên te ne, tu dibêjî na.' Min got, gundî hemû xwediyên hev in, em xerîb in, ji ber wilo me naxwazin. Bi dû min de bangî pîreka min kirin, wê jî eynî tişt ji wan re gotiye û xwe li qutik û sicadê nekiriye xwedî. Piştî wê em berdan."

**Nisêbîn**
**12.01.2006**
**Mirovekî 61 salî**

"Min 15 salî dest bi çûn û hatina Binxetê kir. Di sînor de li derdora me, di nav mayinan de çend cihên ku hatine vekirin (ji mayinan hatine paqijkirin) hene, ji bo çûn û hatina Serxet û Binxetê. Riya Doqsan Bîrê min vekir. Heta wê wextê di wê riyê de çûn û hatin çênebûbû. Çend salekê em şixulîn, çûn û hatin. Lê ez ê cara ku mayin bi min de teqiya, ez birîndar bûm û tiliyên min jêbûn ji we re bêjim.

Nav me û eskeran, nav me û qereqolê xweş bû, ji ber ku em bi wan diçûn û dihatin. Bi sedan dewar û bi hezaran pez me derbas dikir. Em rojekê hatin qereqolê, esker got, 'Îstîqam hatiye, eskerê qereqolê hemû derxistin û em birin, mayin li ber bestê danîne, hayê we jê hebe.' Lê me ew gotin nekir tiştek.

Em çûn Xursê, me 3-4 bar tûtin anî. Hevalê min ê Ebas, ji Xursê şirîkê me bû. Em çend kes, me hazirya xwe kir, barê tûtinê li pişta xwe kir û di bestê re ber bi sînor de em çûn. Ji bestê wirde, di Axirê re (axir makîne di wir de danîbûn ji loma navê wê wilo bû) derbas bûn. Me tûtina xwe li aliyê Sûriyeyê di nav mayinan de veşart û bi roj me xwe berda Hilêliyê û Qamişlo, me miştirî anîn. Me malê xwe anî bin xeta trênê û firot.

Hinik tûtina me ma, me got, divê em veşêrin ji bo kes bi ser venebe. Yên bi min re nexwestin di bestê de ber bi jor de hilkişin. Ez ciwan bûm, kelegerm bûm, min bi ya wan nekir û di pêşiya wan de ez meşiyam. Em li cihekî kûr digeriyan, ji bo ku em tûtina xwe ya mayî lê veşêrin. Hîn çend gavekê ez neçûbûm di nav bestê de min pê li mayinekê kir û pê re ez firandim bi hewa xistim. Hevalê min bi min ve nehatin, gotin: 'Me ji te re got, te bi ya me nekir, serê te jî here em bi te ve nayên.' Mayinê bi qasî devê çalekê erd vedikir. Ez bi meşê çûm cem hevalên xwe, bi qasî 20-30 metroyî dûrî min bûn. Hevalan xwestin min bibin Serxetê, min nexwest, min got, bila dê û bavê min jî bi min nehisin.

Cîba yuzbaşî hatibû ser riya Îpekê şewq dan nav mayinan, me xwe daqûl kir, em nedîtin. Dûre hevalên min rahiştin min, ez birim gundê Binxetê Tilehferê mala dostekî me. Hevalê min gotin, 'Te wilo birîndar nahewînin.' Min got, îşê we pê tune, min bibin li devê derî deynin û hûn vegerin. Em êvarê jî ji mala wan derketibûn. Ez birim wê malê, li derî xistin, jina malê got, 'Wî derbas bikin hundir.' Bedlekî xakî li min bû, derbên mayinê bedlê min qulqulkî kiribûn, lê li laşê min neketibûn, tenê tiliyên lingê min bi jora wê ve

qut kiribûn. Jina malê zemberîşê spî xist bin lingê min, li halê min dinêrî û li ber serê min digiriya.

Muxtarê gund pê hisiya, hat mala ku ez lê bûm, got, 'Wê hikûmeta Sûriyeyê me perîşan bike, ka em bedlek livîn jê re bibin sînor û wî li ber riya trênê deynin.' Xwediyên malê gotin, 'Ku gund bişewitînin jî, ku lo lo tê de nemîne em vî zilamî ji vî gundî dernaxin.'

Berî wê çaxê ez gelekî çûbûm û hatibûm. Derba ewil ku ez çûm Binxetê ez hîn zaro bûm, berê min ber bi xortaniyê de bû. Em sê çar xortên nûgihayî (deh dozde salî), ji bo em ji xwe re bixebitin, çend qurişan qezenc bikin û bedlek çek bikirin, me karê xwe û çûna Binxetê kir. Me her yekê pênc wereqe dan esker û em di bin pira Bexdayê re derbasî Binxetê bûn.

Me li Qamişlo dondirme difirot. Roja ewil me rahişt dondirmeyên xwe û em bi kuçeyan ketin ku em bifiroşin. Çend kuçe min derbas kirin, yekî bangî min kir got, 'Tu ne kurmanc î?' Min got, belê. Got, 'Ka dondirmê li van zarokan hema belav bike.' Her zarokekî min yek da destê wan, di cî de min hemû firotibûn. Mêrik heqê wan da min, kulma min tijî pere bûn. Ez bi kêf vegeriyam, bi rê de ez pêrgî hevalên xwe hatim. Hevalê min man şaş, hîn wan ên xwe nêvcî jî nekiribûn. Ji min re gotin here careke din jî ji xwe re werîne, tu yê bikaribî wan jî bifiroşî û tu yê bêhtir qezenc bikî. Min wek wan kir, careke din jî min rahişt nifşek dondirme û bir firot. Wê rojê gelekî kêfa min hat, ji ber ku min xebateke bedew kiribû.

17-18 rojan me ew kar kir. Bi pereyê ku me derxistin me ji xwe re çek û firax kirîn û vegeriyan Serxetê.

Ez ne şaş bim, sala 1961'ê bû. Ez bi dergistî bûm. Em çar kes hebûn, ji Diyarbekirê me mal ji xwe re bi şirîkatî kirî û em hatin Nisêbînê. Li texma Kanîka rêberê me esker bertîl kiribû, em derbasî Binxetê bûn û çûn Hilêlîkê. Berî em herin yekî şirta (polês) ji Binxetê tembiya mal li me kiribû gotibû, 'Kêliya we ev mal anî ez ê ji we re bifiroşim, îşê we jê tune ye.' Nuh em gihan wir me mal da wî polêsî û perê xwe stendin. Me malê xwe gelekî bi qezenc dabû. Yek bûbû pênc.

Bi wî pereyî me malê ku li Serxetê tê xwestin kirî, wek saet, mayo (ji Îzmîrê ji me xwestibûn), hemra û bodra (ên ji bo spehîbûna jinan), qumaşê qeremsultan. Yanî me perê xwe tevî kara xwe da bi mal, hin tiştin ji malbata xwe re kirî, piştî hefteyeke me qediya, me rahişt malê xwe û em hatin Hilêliyê ku em derbasî Serxetê bibin.

Berê rêberê me bi esker re peyivîbû, esker jê re gotibû, 'Wek îro saet di nehan (ê sibehê) de hûn karin derbas bibin.' Em saet di nehan de derketin, me esker di qulûbê de dît, destê xwe ji hev re hilda û em ber bi sînor ve meşiyan, ew jî ji qulûbeya xwe daket. Dema em gihan cem esker, wî bi xwe lingê xwe danî ser têlên sînor, ji me re daxist û bi wî awayî sê hevalên me sînor derbas kirin. Hîn du hevalên me di nav mayinan de bûn, ji nişkê ve pênc sûbay ji pûsûyê derketin û devê demançeyên xwe li me rast kirin. Tu nabêjî xefik li ber me danîbûn, em teng zept kirin. Her du hevalên me yên ku hîn sînor derbas nekiribûn, berûpaş bûn, xwestin vegerin bi Sûriyeyê de. Eskerê nobedar got, 'Bisekinin, nerin, bertîl ji kîsî min, werin. Dema hûn bazdin ez jî mecbûr im sîleh berdim we, hûn ê bên kuştin, werin xwe teslîm bikin.'

Em tev ber bi wan ve çûn û li hev kom bûn. Esker, sûbay û hevalên me bû kurtipista wan ji bo tiştekî safî bikin. Ez di wê navê re, barê min li pişta min, bêpêjin bi çend gavekî bi paş ketim û min hêdîka xwe di nav giyayê liqamê de veziland. Ew bi aliyê qereqolê de meşiyan, ez jî bi aliyê din ve, barê xwe bi dû xwe de dikişkişînim bêyî ku ez rabim ser xwe, ji bo ku min nebînin.

Nav têlan hingî kes bi nav de nediçû û avî bû giya gelekî bilind dibû. (Heta van salan jî havînan dema giya hişk dibe, agir pê dixin û dişewitînin, ji bo nav têlan bê dîtin û kesên ku derbas bibin bên dîtin.) Her min çewalê xwe bi dû xwe de dikişand şopa min di nav giya de çêdibû. Ji bo şopa min xuya neke ez sererast nedimeşiyam, min çep û rast dikir.

Berî texma eskerê din min xwest ez sînor derbas bikim, lê erda pêşiya min rast bû û şûv bû. Min dî ku ez derbas bibim wê eskerê nobedar min bibîne; min got a qenc ez ê li xwe bikim şev ku ez di reşê de derbas bibim. Di nav giya de ez rûniştim û min pişta xwe da çewalê malê xwe. Nivê rojê ye, şixulê saetekê ez wilo di cihê xwe de mam, difikirim. Dil min de min fenek ji xwe re kir û min malê xwe xelas kir. Ez nizanim bê hevalên min çi bi serê wan de hat. Gelo bi ku de birin, hatin girtin an hatin berdan, çi ji hev safî kirin?

Dengê şopekê hêdî hêdî ber bi min de hat. Min dît ew eskerê nobedar ê em derbas kiribûn û sûbayê em girtibûn hatin, gihan ser serê min. Devê silehên xwe dirêjî ser min kirin, gotin, 'rabe ser xwe.' Ez rabûm. Li çewal nêrîn û pirsîn, 'Ma ev mal ê te ye?' Min got, erê. Gotin, 'Rahêjê li ser piyê xwe bike, ne li çep û rastê xwe binêre û ne li me, bimeşe.'

Bi wî awayî em tevde çûn cihê ku min xwe ji hevalan vedizîbû. Çewalên malê hevalên min jî hîn li wir bûn. Dema girtin ser serê min, dil min de hevalên min li min mukir hatine, gotine hevalekî me yê din jî heye, di nav têlan de maye, ji loma hatin ez peyda kirim. Lê dûre min dît ku ne wilo ye.

Malê min jî xistin nav ê hevalên min. Sûbayekî ji min re got:
- Ez ê du pirsan ji te bikim. Tu yê rast ji min re bibêjî?
- Erê.
- Hûn di ku re çûn Binxetê?
- Di Kertiwênê re.(Min ne rast got.)
- Hûn di ku re hatin?
- Em di vir re hatin.
- Ma haya nobedar ji we hebû?
- Erê, em bi destûr derbas bûn.
- Ma ev esker bû yê destûr da we?
- Ez esker nas nakim lê ku wê saetê ev nobedar be, wê wî em derbas kiribin.

Îcar sûbay bi kulman, bi pêhnan, bi şiqaman, bi enîşkan ket ser dilê esker, heta jê betilî. Dilê min li ser esker êşiya, min dikir ku ez derbekê li sûbay bixim.

Sûbay ji min re got, 'Bide pêşiya min, bimeşe!' Em meşiyan ber bi qereqolê ve heta riya ku ji bakur dadiket. Ber rê hemû spîndar bûn. Ji min re got, 'Em mecbûr in teqandinê bikin, tu bazde.' Lê min newêribû ez bazdim, dil min de dema ez birevim wê bi dû min de derbekê li min bixin, min bikujin. Kirin nekirin min bazneda. Hema berê demançê da hewa û dest bi teqandinê kir. Wê wextê min fêm kir ku ne li kuştina min digerin, hema min dest bi revê kir.

Hîn jî haya min ji hevalên min tune ye, ez nizanim bê çi bi wan hatiye. Ez di nav spîndaran de bazdam. Ez nêzikî qijlê bûm, ji dûrayî ve min hinek dîtin, dil min de mitrib in; ji ber ku gelek derban konê mitriban li ba qijlê vegirtî bûn. Em ber bi hev de çûn, min dît ku hevalên min in.

Hevalê min behsa bazara xwe û esker ji min re kirin. Gotin, 'Me ji sûbaya re got, bila malê me ji we re be, hûn me bigirin wê me bixin hepsê, em ê perîşan bibin. Ma hûn ê çi bi ser bixin, hûn ê jî bi me re têkevênê, hûn ê jî bikevin mehkemeyê, biheyirin. Jixwe malê me we ji me stend, her serê şexs em ê pere jî bidin we û me berdin. Îcar em berdan. Lê ka em herin qereqolê, belki bi awayekî em malê xwe xelas bikin.'

Em rabûn çûn qereqolê. Eskerê ku em derbas kiribûn pêrgî me ve hat û gazin ji min kirin, got; 'Dema tu berepaş de çûyî min tu dîtî lê ez li te mukir nehatim, min got belkî tu xwe xelas bikî. Lê tu li min mukir hatî û min ew qas lêxistin xwar.'

Em derbasî hundir bûn, me kir û nekir me tişt bi ser nexist. Ji me re gotin, ‘Ew mal çilo anîn rast birin tabûrê, qet xelasiya wî malî tune ye.’ Kolî poşman em vegeriyan. Bi malekî giran em xesirîbûn. Bi wê neqlê re ez bi 800 wereqeyî xesirîm. Min rabû erdekî xwe firot û di ber de da. Piştî wê ez dîsa gelek derban çûm û hatim, min bi zêdebûn ew xisar derxist.”

## HER DERÊN KURDISTANÊ BÛN HERÊMÊN SÎNORAN Û JI HEV HATIN QUTKIRIN

Deh salên dawî, lêkolînên li ser herêmên sînoran hatine kirin dane xuyakirin ku herêmên sînoran herêmên cuda ne; bi tevgera xwe, bi saziyên xwe, bi nerînên dewletan. Bi vê re herêmên sînoran xwedî çandên cuda ne û ji ber ku têkiliyên di sînoran de bi demê re gelekî tên guhertin, her dem herêmên sînor bi serê xwe çandên nû diafirînin.

Rohat Alakom di berhema xwe ya bi navê 'Arîstokratên Kurd, Torin' de wiha balê dikişîne ser herêmên sînoran: "Gelek lêkolîner dibêjin ku, li derdora sînoran gelek caran çand (kultur) û baweriyên (ol-dîn) cihê, çandên têkel û baweriyên têkel pêk dianîn. Ji vê rewşê re halet-î sînor (rewşa sînorî) hatiye gotin."[332]

Wek ku me di beşên din de da xuyakirin, Kurdistan di sedsala 16'emîn de bûye du perçe, di serê sedsala 20'emîn de jî bûye çar perçe û her perçeyek ketiye destê dewleteke. Ji ber wilo her derê Kurdistanê bûye herêmên sînoran; her aliyekî Kurdan bi têkiliyên cuda re rû bi rû mane û dimînin. Ji ber wateya sînorên di hundirê Kurdistanê de û ji ber tevgera bi vê ve girêdayî jî, roj bi rojê re di nav Kurdan de çandên cuda derdikevin holê.

Bûye tebîet, em dibêjin Kurdistan bûye çar perçe. Ya rast Kurdistan bi sînorên di hundirê xwe de bûye perçe werçe. Ku em Kurdistanê bînin ber çavên xwe, em ê bibînin ku hemû derên Kurdistanê bûne herêmên sînoran û her aliyek di destê rêveberiyeke cuda de ye. Ev jî li her aliyekî tevger û çandeke cuda bi xwe re tîne. Kurdên di nav Tirkiyeyê de yên bi Sûriyeyê re cîran in di rewşeke cuda de ne. Rewşa wan ji rewşa Kurdên li Tirkiyeyê yên bi Îranê

[332] Rohat Alakom, Arîstokratên Kurd: Torin, r. 29

re cîran in re cudatir e. Her wiha Kurdên li Îranê yên ku bi Tirkiyeyê re cîran in, jiyana wan gelekî cuda ye ji ya Kurdên di hidûdê Tirkiyeyê de û cîranê Îranê bin. Mirov hemûyî veke: Kesên di hundirê Tirkiyeyê de û cîranê Sûriyeyê, yên di Tirkiyeyê de û cîranên Îraqê, yên di Sûriyeyê de û cîranên Tirkiyeyê, yên di Sûriyeyê de û cîranên Îraqê, yên di Îraqê de û cîranên Sûriyeyê, yên di Îraqê de û cîranên Tirkiyeyê, yên di Îraqê de û cîranên Îranê û, û... mirov bi gotinê be jî nikare van perçeyan hemûyan bîne zimên. Îcar her aliyek di nav jiyanên cuda de ye û bêguman ev rewş bi xwe re dinyayên cuda rûdinîne.

İsmail Beşikçi rewşa ku Kurd ketinê wiha tîne ziman: "Neteweya Kurd ku di navenda Rojhilata Navîn de ye ji hev hatiye veqetandin, hatiye perçekirin û tu statuyeke wan a siyasî jî tune ye. Di bin desthilatdariyeke wisa de ne, ku ev ji nîrê kedxwariyê wêdetir e. Bi erdên mayinkirî, bi kuleyên çavdêriyê, bi balafirên veşartî, bi hêzên ser û binê wan tev çek û sîleh ji hev hatine veqetandin. Hêzên ku Kurdistan ji hev parçe parçe kirine, ji binî ve qutkirina têkiliya navbera Kurdan dane ber xwe."[333]

Kovara Atlasê di hejmara xwe ya Tîrmeha 2002'yan de nivîsek bi navê 'Sınırdaki Hayatlar' (Jiyanên Li Ser Tixûban) weşand. Ev nivîsa ku di encama lêkolînên li bajar û gundên di tixûban de, wek Nisêbîn, Hezex, Cizîr û Girkê Emo û gundên wan de hatiye kirin amade bûye wiha dest pê dikir:

"Têlên bi dirî, erdên mayinkirî, deriyên sînoran, gumruk, kuleyên çavdêriyê... Gund û bajarokên ku bi sînoran ve û debara xwe bi tevgera sînor dikin... Bazirganî, qaçaxçîtî, binpêkirina mafan, ziyaretên rojane yên derveyî sînor ên ji bo hevdîtinên bi xwediyên xwe re ku derbasbûnekê di nav hev re tîne, her jiyaneke bi rengê meşa li ser pira siratê..."

Pirtûka bi navê 'Sînor' a ji aliyê Hastings Donnan-Thomas M. Wilson ve ku bi gelemperî li ser sînorên dewletan hatiye nivisandin, di vî warî de xebateke girîng e. Di vê pirtûkê de tê gotin ku, "Herêmên sînoran qadên desthilatdariyê ne û nîşaneyên wê ne. Kuleyên ewlehiyê û têlên bi dirî nîşaneya erdên herî dawî ên desthilatdariya dewletan in."[334] Ev desthilatdarî helbet bi awayê ku dixwazin bidin fêmkirin û nîşandan wê bidin xuyakirin. Ji ber ku li her dewletê wateyên cuda li sînoran hatine barkirin. Mesela nêzikahiya dewletê ya li hemberî hemwelatiyên xwe yên li ber sînoran bandorê li ser sazûmaniyên li ber sînor dike. Ji aliyê din ve ji ber ku têkiliya dewletekê bi cîran û ziyaretvanan re pêşiyê li ser sînoran dest pê dike, ew

[333] İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan, r. 235
[334] Hastings Donnan-Thomas M. Wilson, Sınırlar (Sînor), r. 11

dewlet bixwaze çi nîşanî wan bide, ew di sazûmaniya li ser sînoran de bandorker e. Carina sînor dibe qada hevdîtina nûnerên dewletê û saziyên wê. Di heman demê de sînor deriyê ku li gelek dewletan vedibe ye. Di wî deriyî re têkiliyên civakî, têkiliyên bazirganî û danûstandinên çandî pêk tên. Her wiha sînor ji bo dewletekê gelekî girîng in û gelek tiştan di xwe de vedihewînin.

Komara Tirkiyeyê, Komara Îslamî ya Îranê, Rejima Sadam a Îraqê, desthilatiya Sûriyeyê ji aliyê sazûmaniyê ve ne wekî hev in û ji hev gelekî cuda ne. Her çar dewlet jî ji bo 'Pirsgerêka Kurdan' nêzikahiyên cuda cuda nîşan didin. Rêbazên rêveberiya wan, di têkiliyên navneteweyî de ji hev cuda cuda ne. Ji ber vî awayî, li her parçeyekî Kurdistanê roj bi roj jiyan bi awayekî cuda ji nû ve xwe ava dike. Her wiha ji ber têkiliyên cuda yên aborî, polîtîk û civakî, parçe bi demê re ji hev cihê dibin. Wek ku me di beşa asîmilasyonê de jî vegotiye, yek ji bandorên mezin ên ku Kurdan ji hev dûr dixin, cudahiyên ziman û alfabeyên van dewletan in. Her dewletên desthilatdar bi sazî û dezgehên xwe û bi asîmilasyonê, Kurdên nava sînorên xwe ber bi xwe ve dikişînin. Ji ber pêşîlêgirtina bi zorê ya di sînoran de ev cudahî her roj kûrtir dibe.

Îzady li ser vê mijarê wiha dibêje: "Kurd di nava gelek blokên jeopolîtîk de ji hev veqetiyane û bandora çand û nêrîna dinyayê ya dewletên cuda cuda li wan bûne. Ji ber vê jî ji hev de ketine û parçe bûne. Di roja me ya îroyîn de ji Kurdên Rojhilat û hin ji yên Başûr tê xwestin ku li gorî bîr û baweriyên kevneşopî yên Îslamî yên Îranê tevbigerin. Kurdên ku li Îraq û Sûriyeyê dijîn divê ku li gorî radîkalîzma Ereban a dijberê Rojava tevbigerin û hebûn û kevneşopiyên xwe li gorî vê eyar bikin. Kurdên li Anatoliyayê dijîn jî bi dewleteke ku xwe wek xwediyê çandeke Ewrûpayî dide xuyakirin, modern û girêdayiyê Rojava ye rû bi rû ne. Van hêzên çandî, aborî û polîtîk her yek bi awayekî Kurdan bi aliyekî ve dikişîne..."[335]

Ji aliyê din ve bandora siyaset û saziyên dewletan li ser sînoran heye. Her wiha ji ber ku êrîş ji sînoran dest pê dikin tiştên ku ji bo ewlehiyê di sînoran de tên kirin ji bo dewletan gelekî girîng in. Li gorî têkiliyên di navbera dewletên cîran û li gorî pirsgirêkên hundirîn, kar û barên ewlekariyê yên li ser sînoran tên guhertin. Mînak, qewîkirina sînorên ku di nava Kurdistanê re derbas dibin û stendina tedbîran a li ser van sînoran li gorî rewşên polîtîk û yên madî her tim hatin guhertin.

[335] M. R. İzady, Kürtler, r. 350

Me di beşa mayin û qaçaxiyê de xwest ku em merhaleyên avakirin û rewşên li ser sînoran bidin xuyakirin. Di vir de bi taybetî me dît ku Tevgera Barzanî, berberî û bendîtiya navbera dewletan bûye sedema ku li ser sînorên di hundirê Kurdistanê de mayin bên danîn û kar û barên ewlekariyê yên li ser sînoran girantir bibin. Ku bi tevayî mirov lê dinêre, mirov fêm dike ku ji ber pirsgirêka Kurdan sazûmaniyên li ser sînorên dewletên ku Kurd lê dijîn cuda ne. Yanî kar û barên li ser van sînoran û têkiliyên navbera van dewletan li gor tedbîrên li hemberî Kurdan ava bûne.

Bi giştî di dinyayê de herêmên sînoran gelek xetereyan di xwe de vedihewînin. Niha em ê li ser xaleke girîng a ku sînor bi xwe re tînin bisekinin. Wek ku tê zanîn sînor bi piranî cihên şer in. Dema di navbera du dewletan de pirsgirêk derdikevin, ewil di sînoran de alozî tê dîtin. Ku mirov li gor sînorê îro ji duperçekirina Kurdistanê ya bi peymana di navbera Osmanî û Safawiyan de dest pê bike û heta îro bide ber çavan, mirov dibîne ku ev 500 sal e Kurd di sînoran de dijîn û her tim jiyana wan di alozî û şer de derbas bûye. Ji aliye din ve ji ber ku di her du aliyên sînoran de Kurd hene, di van sînoran hemûyan de dema şer çêbûye di artêşa her du aliyan de jî Kurd hene. Sazî wê bi xwe re tîne, reva ji vê tune ye; ligel ku armanceke wiha tune be jî her tim Kurdan li dijî Kurdan şer kiriye.

Di esasê xwe de ev awayê ku gelek pirsgirêk bi xwe re aniye heta îro, di dîroka Kurdan de ji zû ve ye. Bi kurtayî ku mirov bîne ziman, Kurdistan ji hilweşandina Împaratoriya Persan û heta serkeftina Selahedînê Eyûbî, yanî nêzikî hezar û pênsed salî di navbera hêzên Rojhilat û Rojava de bû qada şer. Di vê demê de serdemekê Kurdistan diket bin destê Rojhilatiyan, serdemekê jî diket bin destê Rojavayiyan. Vî şerî pêşiyê di navbera Mekadonî û Persan de dest pê kiribû. Dûre bû şerê di navbera Part û Mekadonî, Sasanî û Romayî, Selçûqî û Bîzansî, Eyûbî û Bîzansiyan.

Di van şeran de di artêşa her du aliyan de Kurd hebûn. Ji bo şerê navbera Rojhilat û Rojava heke em mînakekê bidin; şerek ji van şeran şerê heyama Bîzansî û Selçûqiyan e, yê li Meydana Melazgirê ku di sala 1071'an de bûye. Di vî şerî de di artêşa her du aliyan de jî Kurd hene. Hinek Kurd li aliyê Bîzansiyan in û li aliyê din jî hejmareke zêde Kurd hene. Di çavkaniyan de derbas dibe ku ji 60.000 leşkerên Alpaslan zêdeyî 10 hezarî jê eskerên Kurd bûn. Gelek ji van leşkerên Alpaslan ji siwariyên Dewleta Mervaniyan bûn.

Heke em derbasî heyama Safewî û Osmaniyan bibin, di vê demê de jî gelek caran şer di navbera her du dewletan de çêbûye û her tim di artêşa her du aliyan de jî Kurd hene. Jixwe di şerê mezin ê pêşî ê ku di navbera her du

dewletan de çêbû şerekî dijwar bû û di her du aliyan de jî gelek Kurd hebûn. Ev şer di 23'yê Tebaxa 1514'an de li Çildêranê çêbû. Gelek mîrekên Kurdan ji ber ku wan bi salan gelek tehdeyî ji Şah Smaîl dîtibûn, bi dilê xwe di Şerê Çildêranê de li cem artêşa Osmaniyan cih girtibûn. Ji ber ku berê girêdan bi dewleta Safawiyan re heye helbet hin ji mîrekên Kurdan jî li cem artêşa Safawiyan cih girtibûn. Ev şerê ku demeke dirêj di erda Kurdan de dom kiriye, dîsa kiriye ku Kurd qels bikevin. Jixwe bi dû vî şerî de Kurdistan bû du perçe. Vê rewşê kir ku, di demên dûre de, di her du aliyan de Kurd li dijî dewleta ku tê de ne, bê taqet bimînin. Heger Kurd hemû bi ser hev ve bûna wê rewş gelekî biguheriya. Lê wek ku tê zanîn dewletên wê demê ne netewdewlet in. Tesîra olê jî gelek e. Ji loma mirov nikare bi çavên îro li wê demê binêre û bêje çima Kurd hemû bi hev re tevnegeriyane. Ku mirov li ser mijarê bisekine divê mirov di wê heyamê de kûr bibe û bi wî awayî şîrove bike.

Piştî duperçekirina Kurdistanê her du dewletên ku her yek bû xwediyê perçeyekî, wilo mezin û xurt bûn lê roj bi roj mîrekiyên Kurdan qels ketin. Van her du dewletan ji bo desthilatdariya xwe li Kurdistanê dom bikin her tim bi hev re şer kirin û her tim ev şer di nav Kurdan de bû. Kurd him leşker bûn di her du aliyan de, him jin û zarokên wan di nav lingan de diman, him mal û erdê wan wêran dibûn.

Ji aliyê din ve ev dewlet ji bo Kurd ji dest wan neçin bi gelek awayî tevdigeriyan. Geh erd û navên giran didan mîrekiyan, geh ew berdidan hev, geh di hundirê malbatên sereke de nakokî derdixistin, an jî nakokiyên ku hebûn gur dikirin. Yanî roj bi rojê re ji Kurdan re xerabtir diket.

A. M. Menteşaşvili di kitêba xwe ya bi navê 'Ji Doh Ber Bi Îro ve Kurd (Dünden Bugüne Kürtler) de ji bo wê demê wiha nivîsiye: "Osmanî û Safewiyan ji bo ku li ser Kurdistanê desthilatdariya xwe pêk bînin her tim bi hev re şer dikirin. Vê jî xisarên mezin dida gelê herêmê. Ev rewş bi lihevnekirinên feodalan girantir dibû. Vana tevde, hêzên hilberînê yên Kurdistanê paşde dixistin û rewşa aborî ya welat xerabtir dikirin. Nifûs, bi taybetî jî ji nifûsa aştîxwaz, gelek bajar û keleh ji holê dihatin rakirin."[336]

Wek ku me berê jî îfade kir danûstendinên herêmên sînor cuda ne. Mîrekên ku li ser sînoran bûn peywireke wan a din jî hebû, ew jî parastina sînoran bû. Dewletan nêzikahiyên taybet nîşanî hin ji van mîrekan didan. Ji bo mînakekê em karin li vegotina Menteşaşvili binerin. Menteşaşvili ji bo dema Qanûnî Sultan Suleyman wiha nivîsiye: "Sultan Suleymanê I'em (1520-1566) piştî ku tê ser text li Kurdistanê desthilatdariya Osmaniyan

[336] A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 180

xurt dibe. Desthilatdariya Osmaniyan di van salan de dixwest ku di navbera sînorên Osmanî û Safewiyan de ji mîrekiyên Kurdan dîwarekî zindî ava bike. Gelek eşîr û yekîtiyên eşîrên Kurdan ji bo parastina sînoran xizmet dikirin û mêrg û araziyên herî baş ji bo heywanên wan eşîran hatibûn veqetandin. Hin ji eşîrên Kurdan bac nedidan. Wekî mînak, bi fermana Suleymanê I'em ji rêveberê Xoşabê û serokê eşîra Kurd a Mehmûdî Hesen Beg bac û xerac nedihat stendin."[337]

Her wiha li ser sînorên Safewiyan jî heman tişt dihatin kirin. Şah ji bo ku deshilatdariya xwe bidomîne peywir dida serokên eşîrên Kurdan, nav û nîşan didan wan û erd ji wan re dikir xelat. Em karin mînaka serokê 24 eşîran Xelîl Beg bidin. Xelîl Beg, serokekî ji eşîrên Kurdên Mensûrê Reş bû. Di navbera salên 1552/3'yan de Şah, bi şertê ku Xelîl Beg '3 hezar esker bide artêşa Şah, sînor û riyên navbera Tebrîz û Kazvînê biparêze' Sultaniyê, Zencan, Abxar, Zarîn-Kamar û çend herêmên navbera Azerbeycan û Îraqê jê re kirin xelat.[338]

Ku em bên heyama nêzik, di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, şerên herî giran ên ku di navbera Rûs û Osmaniyan de diqewimîn di axa Kurdistanê de çêdibûn. A rast Kurdan qirara vê herbê nedabûn. Lê ji ber ku şer di axa wan de bû bedelên herî giran wan dida. Di encamê de, bi êrîşa eskerên Rûsan, bi destdanîna li ser qûtê xelkê, bi ruxandina hêzên di herêmê de, xelkekî ji birçîbûn û nexweşiyan perîşan û welatekî wêran maye. Li Kurdistana Îranê jî eynî rewş heye. Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, ji ber ku li vî cihê ku sînorên Rûsyayê, Îranê û dewleta Osmanî digihîştin hev de bû, tehdeya herî mezin Kurdistanê dîtiye. Bi dû de çar salên heta Kurdistan hat perçe perçekirin, dîsa bi vî awayî bû. Ji wê demê û heta niha îcar bi awayekî din, rasterast ji bo tunekirina Kurdan ji çar aliyan ve êrîş li ser Kurdan heye û di vê qadê de şer her tim berdewam kiriye.

Tiştekî din ê ku sînor bi xwe re tînin heye. Ji bo xelkê ku di sînoran de dijîn, ji hevalbendiyeke aliyekî sînor derbasbûna aliyê din ne gelekî tiştekî ecêb e. Çinku têkilî bi aliyê din re jî her tim hene û ev nêzikahiyekê ji aliyê din re jî çêdike. Jixwe ku weke sînorê di hundirê Kurdan de di her du aliyan de eynî çand hebin û nexasim dema xwedîtî û têkiliya pir hebe, ji aliyekî derbasbûna aliyê din ne gelekî zehmet e. Mirov kare bêje xelkê di sînoran de ji her du aliyan re jî ne dostekî sadiq û ne dijminekî dijwar in. Vê mijarê bi gelek şaxan mirov dikare veke lê em ê bi çend mînakan û bi kurtayî li ser hin aliyên wê bisekinin.

337 A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 178
338 A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 179

Dema ku Kurdistan di navbera Safawî û Osmaniyan de bû du perçe û pê de, gelek mîrekên ku niştecihên sînor bûn geh hevalbendên Osmaniyan geh ên Safawiyan bûn. Hin eşîran di hundirê sê dewletan de cih digirt û têkiliya wan bi gelek aliyan re dom dikir. Ji bo mînak, Eşîra Zîlanê li derdorê sînorê Rûsyayê, Îranê, Dewleta Osmaniyan û li Serhedê dijiyan û bi vî awayî di nav eşîrekê de têkiliya sê dewletan derdiket holê. Bi vê rewşê dema bixwestina, hevalbendiya xwe bi rihetî karîbûn biguherînin. Mîrekiyên ku hêza wan gelek bûya carna serê xwe li van dewletan giran dikirin. Ji bo mînak, hin eşîrên Kurdan ji bo ku ji Şah hin tiştina werbigirin gelek caran bi sultanê Osmaniyan re têkilî danîne. Dewletan jî ji bo wan ji dest xwe bernedin, ji hinan ji wan bac nedistendin.

Têkiliya bi vî şiklî jî hin aloziyên din bi xwe re tîne. Di vê rewşê de her du dewlet nikarin amîniyê li van kesan bînin û ji bo qelskirina wan çi ji wan hatiye kirine. Şah, car caran ji bo ku Kurdan bitirsîne ne tenê li Îranê, girtiye ser Kurdên li aliyê Osmaniyan jî. Wekî mînak di sala 1554'an de Şah Tahmaspê I'em di talankirina eşîrên Kurdan ên ku di sînorê Osmanî de bûn, gelek zilm û zoriyên mezin li xelkê kiriye.

A. M. Menteşaşvili, di pirtûka xwe ya ku navê wê me li jor da wiha nivîsandiye: "Piştî ku Şah Smaîl miriye lawê wî Şah Tahmasb li ser şopa bavê xwe meşiyaye û eşîrên Kurdan ên ku carina îradeya Siltan carina jî îradeya Şah nas dikirin lê di hîmê xwe de serbixwe bûn, ji holê rakiriye. Wekî mînak, bi fermana Şah ji Eşîra Dumbiliyan 400 Kurd hatine kuştin. Dîsa Eşîra Çîgînan a ku di nav Kurdên Îranê de bi wêrekî û egîdî û qehremaniya xwe nav û deng daye, kom bi kom hatine zeptkirin û zilm û zorî li wan hatiye kirin. Heta ferman hatiye dayîn ku, wan derxin derveyî sînorên Îranê. Li gorî Şeref Xanê Bedlîsî, ji esilzadeyên vê eşîrê bi qasî 500 kesî biryar daye ku ji Îranê koçî Hindistanê bikin.[339]

Ji aliyê din ve hin ji eşîrên qels jî ji bo ku her du aliyan dilxweş bikin bac didan her du dewletan. Menteşaşvili ev mijar jî wiha destnîşan kiriye: "Pirê caran eşîreke Kurdan di heman demê de hem di bin kedxwariya Îranê û hem jî di bin a Osmaniyan de diperçiqî. Hinek Kurdên ku di bin desthilatdariya împaratoriya Osmaniyan de bûn (ên wekî Şiîwerzûrî, Pîresanî, Rewandûzî, Surçî, Harkî, Kurê Zasarî û hwd.) ji bo ku mêrg û merayên havînî yên aliyê Îranê bi kar bînin, bac didan meqamatên dewletê yên her du aliyan jî. Kurdên ji herêman li ser sînorê Mergewerê (nêzî gola Urmiyê) bacên xwe didan şêxên xwe yên ku li Tirkiyeyê diman. Di heman demê de waliyê

339 A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 179

Urmiyê û Xoyê jî, ji bo xezîneya Îranê bac ji wan dixwest. Dema ku Kurdan fermana walî neanîna cih, ji aliyê memûrên şah ve bi darê zorê ji wan dihat stendin. Ji ber zoriyên giran û zextên neteweyî, Kurdan pirê caran tevlihevî derdixistin û serhildan li dar dixistin. Ev jî dibû mahneya ku Îran û Osmanî mudaxeleyî karên hev ên hundirîn bikin, zorê bidin ser hev.[340]

Guhertina hevalbendiya xelkê di sînor de, di her demê û di her aliyî de dom kiriye. Di sînorê Osmanî û Rûsan de jî eynî tişt hatiye jiyandin. Di vî sînorî de hin eşîrên Kurdan geh hevalê dewleta Osmanî ne, geh ê Rûsan in. Carna jî xwe ji şerê navbera her du aliyan vekişandine. Wek mînak, di sala 1828'an de, di şerê navbera Osmanî û Rûsan de Mîrekên Kurdan ên Rewandûz, Botan û Colemêrgê nexwestine bikevin nav şer.

Di sedsala 19'an de Kurd bi piranî di hundirê dewleta Osmanî de bûn, lê di nav sînorên Rûsyayê de jî gelek eşîrên Kurd dijiyan. Weke Redikî, Celalî, Birûkî, Êzdî, Cûnikî, Belyanlî, Dilxêranlî, Cemaldînî, Mîlanlî û Qaskanlî. Beşeke Kurdan di nav artêşa Rûsan de kar kiriye û hatine dereceyeke bilind. Yek ji wan serekên Kurdan ku Rûsan zêde baweriya xwe pê aniye, Qasim Xan bû. Di sala 1854'an de bi destûra Împaratorê Rûsyayê rutbeya albayitiyê didinê.

Torinên herêma Serhedê di sedsala 19'an de hin caran li ba Osmaniyan û gelek caran jî li ba Rûsan cî girtine. Di van salan de sînoran gelek caran dest diguhertin. Rohat Alakom di kitêba xwe ya bi navê 'Arîstokratên Kurd: Torin' de di derbarê vê herêmê û tekiliyên wê de, hin agahiyan dide. Ji vê vegotinê çend hevok wihan in:

"Di sedsala 19'an de her diçû pêwendî û têkiliyên Kurdên Serhedê, (yanî Kurdên li Qersê, Qaqizmanê, Îdirê, Ardahanê, Dîgorê û Bazîdê dijiyan) û Rûsyayê bi hev re zêde dibûn... Eşîra Şemdîn Axa di sedsala 19'an de hêzeke mezin e û di çend şerên dijî Osmaniyan de li ba Rûsyayê cî girtiye. Li gorî çavkaniyan hin mezinên Torinan (serekên Serhedê) beşdarî şerê 1853'an bûne... Gulî Cewer Axa di sala 1855'an de yuzbaşî bû û serekê Kurdên Rewanê bû... Di roja 12.06.1855'an de bi sereketiya Gulî Cewer Axa, aliyekî Kurdên Rewanê êrîşî ordiyên Osmanî dikin ku wê çaxê li dorberên Bazîdê bûn. Di sala 1855'an de serektiya leşkerên Rûsyayê, nîşana bi navê "Svatoy Annî" dane Gulî Cewer Axa... Dema Gulî Cewer Axa dimire (1876) lawê wî Eyup Paşa, bi sed malbatî ve derbasî sînorê Dewleta Osmanî dibe. Eyup Paşa bi kurê xwe Resûl Axa re demekê tevli Alayên Hemîdiyê dibin... Ji aliyê din ve kurê Gulî Cewar Axa yê bi navê Elî Eşref Paşa, di nav ordiya Rûsyayê de

340 A. M. Menteşaşvili, bnb., r. 181-182

kar kiriye. Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de serektiya tabûreke Kurdan kiriye û bûye generalekî Rûsan. Ji ber navê bav û kalên xwe weke 'Elî Eşref Begê Şemsedinov' hatiye naskirin... General Elî Eşref Beg li dora salên 1900'î li navçeya Îdirê dima.. Elî Eşref Paşa ku yek ji mezinên Torinan e, xwedî 60 hektar erd bû. Rûsan bi zanebûn ev erd pêşkeşî Kurdan dikirin ku wan bikişînin aliyê xwe."[341]

Hemîd Beg jî, yê ku di nav torinan de xwedî hurmet û rêzdariyê bû, li Rûsyayê perwerdehiya leşkerî dîtibû, di şerê navbera 1876 û 1877'an de cih girtibû û Nîşana Qehremaniyê ya Zêrîn dabûne wî. Bêgûman ê ku alikarî bi Osmaniyan re dikirin pirtir bûn. Ji ber ku Kurd bi piranî di sînorên Osmaniyan de bûn. Ên ku alîkarî dane Rûsan çend kesên di sînor de dijiyan bûn. Wek ku li jorê me vegot, ji ber ku hevalbendîtiya van kesan ne gelekî rûniştiye, di heyamê şer de dewletên Osmanî, Rûs û Îranê gelekî hewl dane ku Kurdan bikin hevalbendên xwe.

Di heman demê de herêmên sînoran gelek caran dest diguherin. Wek mînak, bajarê Qersê berê di destê Osmaniyan de bû, ji sala 1877'an heta 1917'an, 40 salî di bin destê Rûsan de maye. Ji ber vê rewşê Kurd gelek derban di navbera du agiran de mane û di hevalbendîtiya xwe de mane şaş. Carna bêdilî xwe be jî ketine bin desthilatdariyeke din û bi piranî mecbûr mane ew alî girtine. Yanî ku ketin sînorê aliyê din, du rojên dîtir be jî dibe ku îcar li hemberî hevalên xwe yên doh şer bike. Dema mirov van tevan bîne ber çavan, mirov dibîne bê têkiliyên di sînoran de çiqasî zehmet û tevlihev in.

Ji bilî hevalbendîtiya ku di navbera her du aliyan de diçe û tê, kesê di sînoran de dijîn di bin bandora çanda her du aliyan de jî dimînin. Ji aliyê Serhedê ve mirov binêre, di Qafqasiyayê de pir rengî, pir zimanî, pir çandiyî hebû û vêna jî li ser Kurdên Serhedê bandoreke mezin hiştiye. Rohat Alakom di der barê vê de wiha nivîsiye: "Bajarê Qersê hem di dema Osmaniyan de hem jî di dema desthilatdariya Çarî ya Rûsan de wekî bajarekî serê sînor, an jî bajarekî li qiraxê bû. Torin, ên ku arîstokratên Kurdan û rêveberên Serhedê (yên li keviya sînoran) bûn bi piranî wek mîrekên sînoran dihatin zanîn. Ji ber baweriyên cuda cuda, zewacên cuda û danûstandinên çandî li ser sînoran 'rewşa sînorî' yan jî 'haletî sînor' derdiket holê. Mirov dikare vê rewşê, wekî encameke asayî ya herêmên sînoran bibîne. Çandên herêmên ser sînoran bandor li hev dikirin û di encamê de çandên têkel çêdibûn."[342]

[341] Rohat Alakom, Arîstokratên Kurd: Torin, r. 59
[342] Rohat Alakom, bnb., r. 95

Ku em dîsa bên sedsala 20'an, dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn, gumana ku Kurd hevalbendîtiya xwe biguherin tirs dida dewletên ku di şer de bûn. Ji ber vê, tu carî yeqîniyeke sererast di navbera Kurdan û tu dewletan de çênebû. Ev jî dîsa bi rewşa ku hebû ve girêdayî bû. Kurd hemû ne bi ser hev ve bûn. Bi salan di saziyên dewletên cuda de cih girtibûn û têkilî bi wî awayî bi gelek şiklan di civatê de rûniştibû. Vê jî hevalbendîtiyê cuda derdixistin holê û bi vê Kurdan hem qeweta xwe belav dikir, hem aminî nedidan kesî. Di encamê de her qetek di aliyekî de ma.

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, sînorên ku di hundirê Kurdistan de hatin danîn rewşên taybet bi xwe re anîn. Dewletên ku Kurd tê de dijîn li hemberî Kurdan hevalbendîtî danîn û vê, pirsgirêkên sînoran xist şiklekî din. Dîsa ev herêm her tim qada şer in û di her du aliyan de Kurd hene, lê bi piranî ev şer ne di navbera van dewletan de çêbûye. Şerên ku di van herêmên sînor de bûne bi piranî şerên ku li hemberî Kurdan hatine kirin in û di van şeran de dewletan hem alîkarî bi hev re kirine, hem her yekê ji aliyê xwe de êrîş biriye ser Kurdan.

Ji bilî vê rewşê dema şer di navbera van dewletan de derketiye, wek ku me berê îfade kir, ji ber ku şer bi giranî di sînoran de tên kirin û Kurd di herêmên sînoran de ne Kurdan gelek tişt winda kirine û tehdeyên mezin dîtine. Di heman demê de ji ber ku windakirina Kurdan ji her du dewletan re jî ne muhîm e, encama şer dibe tiştekî din. Mirov kare şerê Îran û Îraq di vê der barê de mînak bide. Bi sedan km sînorê di navbera Îran û Îraqê de di Kurdistanê re derbas dibe. Şerê Îran û Îraqê ku di sala 1980'yî de dest pê kir û heşt salan dom kir, bi piranî di vî sînorî de, yanî di erda Kurdan de bû. Dema êrîşan, di her du aliyan de jî Kurd di derbê de bûn. Ji aliyê din ve di nav leşkerên her du aliyan de jî Kurd hebûn. Ji bo wilo, di vê herbê de di her du aliyan de yên ku gelek tehde dîtin, ên ku bi çekên kîmyewî re rû bi rû man, ên ku bi hemû awayî winda kirin dîsa Kurd bûn.

Di sala 1983'yan de ev şerê Îran û Îraqê ku li her aliyê sînoran belav bû, ji her du aliyan ve jî werdigeriya qetlîama Kurdan. Martin van Bruinessen Tebaxa 1986'an, yanî berî Helepçeyê û qirkirin û koçberiya bi milyonan Kurdên başûrî yên di serê salên 1990'î de, di nivîseke xwe de wiha digot: "Nûçeyên ku ji Kurdistanê tên gelek xerab in û mirov pir li ber dikeve. Ji her du aliyên sînoran ve jî hikûmetên navendî, ji bo ku herêmên Kurdan bixin bin kontrola xwe û pêşmergeyên ku bi rêxistinên Kurdan ve girêdayî ne ji holê rakin kampanyayên zor û zextan li dar dixin; rasterast pevçûnên leşkerî pêk tên û pê re li hemberî gelê sivîl êrîşên tolhildanê pêk tînin. An bi hêzên

hikûmeta navendî yan jî bi hêzên dewletên cîran bi balafir û tanq û topan bombebaran tên kirin û bi vî awayî gelek gund hatin xerakirin. Roja ku bûyerên înfazkirinê pêk neyên tune... Di payîza 1985'an de Îraq, ji bo ku bingeha civakî ya berxwedana Kurdan hilweşîne êrîşa xwe ya dawî pêk anî. Hêzên dewletê li bajarokan kom bi kom însan bi gumana ku sempatîzan in girtin ... Kurdên penaber û yên ku ji eniya şer hatin bidûrxistin dibêjin ku, gundên wan hatiye xerakirin. Bi deh hezaran însan mecbûr mane ku koçî derveyî sînor bikin, gelek gundî jî mecbûrî jiyaneke ku di mercên wahşetê de di wargehên leşkerî de hatine kirin..."[343]

Di vî şerî de Kurdan gelek bedel dan. Kurdan gelek tişt winda kirin. Di vê demê de hêzeke mudaxil a din jî hebû. Bi navê 'Ewlehiya Sînoran û Hevkariyê' di navbera Enqere û Bexdayê de peymanek dihat îmzekirin û Tirkiye di 25'ê Gulana 1983'yan de, bi 6500 leşkerên xwe ve 5 km daketibû nava sînorên Îraqê û operasyona dersînor li dar dixist. Dûre jî ew ê operasyonên dersînor dewam bikirina.

Di vê navberê de Îraq, alîkariyê dide rêxistînên Kurdan ên li Îranê; Îran, alîkariyê dide rêxistinên Kurd ên li Îraqê. Bi vî awayî rêxistinên Kurdan jî bi hev dikevin; hin derdor dibin hevalbendên Îraqê, hin jî dibin hevalbendên Îranê û her tişt, her der li bin guhê hev dikeve. Ji ber ku ev rewş gelek pirsgirêkan bi xwe re tîne, di nav Kurdan de jî, xwe bi xwe pevketin pir in. Di sedsala dawî de ji ber van tevliheviyan di gelek şeran de, di nav Kurdan de bira û bira li hemberî hev şer kirine. Wek mînak, gelek salan Kurdên Îranê û yên Îraqê, ji aliyê din ve di Îraqê de KDP û YNK'ê bi hev re şer kirine.

Demina jê Kurdên li Tirkiyeyê jî ji ber pirsgirêkên ku hene şerê birakujiyê kirine. Dema ku artêşa Tirkiyeyê bi operasyonan diçe ser PKK'ê, wek ku tê zanîn Kurd di artêşa Tirkiyeyê de jî hene. Ku artêşa Tirkiyeyê bi ser Başûr de diçe dîsa di her du aliyan de Kurd hene. Ku hêzên Başûr û Tirkiyeyê carna bi hev re diçin ser PKK'ê, hêzên Kurd ên Başûr ên KDP û YNK'ê li hemberî gerîlayên PKK'ê şer kirine. Ya rast ev helwest bûye polîtîkaya van dewletan.

Di dîrokê de jî, pirî caran eynî tişt hatiye jiyandin. Wek mînak, mîrekiyên Kurdan di dema şeran de tevlî artêşa Osmaniyan dibûn. Dema ev şer li hemberî mîrekên Kurdan jî dihatin kirin vê têkiliyê dom kiriye. Mîrekên Kurdan axilbe ji ber wilo ve bi ser neketine. Têkilî û saziyên ku hene vê bi xwe re tînin. Lê gelek derban ev nehatiye dîtin û dijminahiya di herêmê de bi vî awayî kûr bûye.

[343] Martin van Bruinessen, bnb., r. 295-296

Ev tebîet di dema Alayên Hemîdiyê de dîsa dom kiriye. Alayê Hemîdiyê bi piranî li hemberî Ermeniyan hatin damezirandin. Di damezirandina alayan de, hin Kurd bûn alîgirên dewletê û hin jê jî ev qebûl nekirin. Heta hin ji yên ku ev qebûl nekirine koçî Îranê kirine. Alayên Hemîdiyê gelek pirsgirêk bi xwe re anîne. Hin ji hêzên Hemîdiyan bi wê qeweta ku dewlet li pişta wan e, tehde li derdora xwe kirine.

Ev çewtî heta îro jî dom dike. Wek ku me li jorê da xuyakirin, her tim alozî di Îran û Îraqê de hebû û di nav Kurdan de gelek perçebûn jî hebûn. Li Îraqê hêzên Kurd ên ku alîkarî bi dewletê re dikirin hebûn. Dewletê çek dida van kesan û ew ji aliyê madî û manewî ve dilxweş dikirin. Van hêzan bi hêzên Îraqê re êrîş dibirin ser Kurdan. Xelkê navê wan kiribû 'cehş'. Carna hejmara wan bi ser 100 hezarî ketiye. Ev pergal heta li Îraqê Dewleta Federe ya Kurdistanê hatiye avakirin dom kiriye.

Îro navê vî tiştî li Tirkiyeyê cerdevaniya (qoricitya) gundan e. Cerdevanî di herêmên ku Kurd lê dijîn di serê salên 1980'yî de derket holê. Ev saziyên ku ji Kurdên li gundan dijîn pêk hatiye, li hemberî tevgera PKK'ê hat damezirandin. Wek ku tê zanîn, kesê ku qoricîtî qebûl nekirin mecbûr man ji gundên xwe bar bikin. Komîsyona Koçê ya Konseya Ewrûpayê, di rapora xwe ya 1998'an de wiha digot: "Zoreke zêde ji aliyê artêşê ve li ser gundên ku nedixwestin tev li pergala qoricîtiyê bibin dihat kirin û dihatin valakirin. Ev bê çavdêriya sivîlan pêk dihat. Bi vî awayî pirê caran bi valakirina gundan re milk dihatin îmhakirin, tacîza cinsî (destavêtin), biçûkxistin, lêdan, kuştinên bê darizandin û bi gelek awayên din mafên mirovan dihatin binpêkirin."[344]

İsmail Beşikçi, di der barê qoriciyan de wiha nivîsiye: "Qoricî ji nava gel tên hilbijartin û bi destê dewletê çek li wan tên belavkirin. Pirê caran jî, gundî bi zor û zextan dibin qoricî. Dewlet ji bo ku qoricîtiyê pêş ve bibe û bala gel bikişîne ser qoricîtiyê gelek rê û rêçikan bi kar tîne. Hem ji aliyê madî ve hem jî ji aliyê manewî ve qoricî tên xelatkirin. Ji derveyî miaşê wan serê her kuştina gerîlayekî, serê serjêkirina her gerîlayekî bi milyonan lîra pereyan dide. (...)

Ji vana tevan wêdetir, ji bo ku meyla xelkê bibe ser qoricîtiyê, ji bo ku hejmara qoriciyan zêde bibe; bi kesên ku sûcên adî kiribin, bi taybetî jî meriv kuştibin bazar tên kirin. Dema ku li hemberî PKK'ê têbikoşin ku di hepsê de bin ew ê wan ji hepsê derxin, ku firar bin, qaçax bin ew ê li wan negerin, ew ê dosyaya wan bigirin... Ji sala 1985'an vir de, di navbera dewletê û van kesên ku meriv kuştine de bazar hatine kirin û gelek qoricî bi vî awayî hatine

[344] Kerim Yıldız, bnb., r. 150

jirêbirin… Qoricîtî, 'Operasyona ku Kurdan bi Kurdan Bide Kuştin' e… Êdî ev ji aliyê çapemeniya Tirk ve jî tê nivîsandin."[345]

Wek Alayên Hemîdiyê, van saziyên çewt bi xwe re gelek têkiliyên bi pirsgirêk afirandin. Qoricî ji bo menfaeta xwe ketine gelek îşên ne li rê. Li gor çapemeniyê heta bi kuştina mêran, qaçaxçîtiya sîleh û eroînê dikin. Bi qeweta ku dewlet li pişta wan e, tehdê li dora xwe dikin û meseleyên heremê kûrtir dibin. Bi kinayi, cerdevantiya ku îro jî dom dike gelek xetere bi xwe re anîn.

Di Nîsana sala 1991'ê de, gelê ku ji Sedam direviya li ber sînorên Tirkiyeyê bû. Pêşiyê nahêlin ku sînor derbas bikin. Li wî aliyê sînor gel birçî û perîşan e, bi hesreta pariyekî nan e. Di wê demê de, bi eskeran re qoricî jî li ser sînoran peywirdar bûn. Ji ber ku bi rihetî dikaribûn derbasî aliyê din bibûna û bi Kurdî dizanibûn, bi penaberan re bi rihetî dikaribûn têkiliyê deynin. Ji penaberan tiştên giranbuha yên wekî zêr û tiştên din distendin û li hemberî wan pereyekî pir hindik ku meriv pê bikene didan, an jî pir hindik xwarin didan wan. Wan bi devê xwe digot ku, ew û eskeran zêr û zîvên jinan ji wan distînin; her wiha bi torbeyek nan bi dehan mih ji wan distendin, heta av jî bi pereyan difirotin penaberan.



*Penaberên Kurd ên Îraqê*[346]

[345] İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan (Kurdistan, Mêtîngeha Navdewleta), r. 236-237
[346] Fot:Hans Dubber (Ji Arşîva Sara Distribution)

Qoriciyên Hedrîşê (Dagdibiyê) zêdetir pêşde çûne; heta 5 kîlometreyan bi nav sînorên Îraqê ve çûne, ji xelkê re gotine; "ev fermana dewletê ye" û 400 keleşnîkof berhev kirine û li qantiran bar kirine, derbasî vî aliyê sînor kirine.[347]

Ji nav vana nêzikî 100 hezar qoriciyan, hin jê bê dilê xwe be jî mecbûr mane vî tiştî qebûl bikin. Hemû dizanin ku ew sîlehê di destê wan de ji bo birakujiyê ye û gelek ji wan ji xwe diqehirin. Rafet Ballı di Tîrmeha 1991'ê de, bi navê 'Kürt Dosyası' (Dosyaya Kurdan) berhemek weşandiye û tê de ev mesele bi vegotineke bedew aniye ziman. Wiha dibêje:

"Bi salan e, di nava Kurdan de drameke mirovahiyê tê jiyîn. Çend sal berê, ez derbasî bakurê Îraqê (Başûrê Kurdistanê) herêma Barzaniyan bûbûm. Li gundekî Kurdan ê nêzî sînor li aliyê Îraqê li biryargeha fermandarê pêşmergeyan em sohbet dikin. Min bi xwe re Kurdekî Tirkiyeyê biribû, wî jî ji me re wergervanî dikir. Jixwe ku ew nebûya jî pirsgirêk dernediket. Lewra di nav pêşmergeyên Barzanî de hem yên ku bi Tirkî dizanibûn hebûn, hem jî yên ku ji Kurdên Tirkiyeyê bûn hebûn û kesên ku wê herêmê dizanin li vê rewşê namînin şaş.

Mesele hat ser rewşa eskerî. Di rojên dawî de hêzên rêveberiya Bexdayê êrîş dikirin. Dihat gotin ku hejmara wan gelekî zêde ye. Fermandarê pêşmergeyan xem nedixwar. Digot, ên ku êrîş dikin cehş in, li hemberî me nikarin li ber xwe bidin.

Dema ku wergêrê me hat ser peyva 'cehş' sekinî. Nizanibû ka ew ê çawa wergerîne. Lê min jî ji dema xwendina zanîngehê ve dizanibû bê wateya 'cehş' çi ye. Di ferhengê de di wateya 'dehşika kerê' tê gotin, lê di termînolojiya siyasî ya Kurdan de wekî 'xayîn', 'sîxur' dihat bikaranîn.

Wergêrê me nizanibû çawa bike. Hê jî li peyveke bi Tirkî digeriya ji bo ku bibêje 'cehş'. Min got, temam, min fam kiriye. Lê dîsa ew îkna nebûbû. Di hişê xwe de lê digeriya ka di dewsa 'cehş' de bibêje çi. Di dawiyê de gihîşt biryarekê, çavê xwe ji çavê min veqetand û got; 'cehş, yanî yên wekî min.'

Nizanim îcab dike ku ez bibêjim ew wergêrê min qoricî bû. Min pir bi hêzeke mezin xwe şidand lê min nikaribû ez li hemberî vê rewşa hanê ricfa xwe bidim sekinandin. Xwedêyo, ev çi rewş e! Ez dibêjim qey tu sofiyekî katolîk bi vî awayî ji dil û can nikaribû bihata ber gunehê xwe, tu Lenînîstekî klasîk jî bi vî awayî bi tundî nikaribû rexnedariya xwe bikira.

Bila çewt neyê fêmkirin. Ez tu kesî bi xayîntî û sîxuriyê sûcdar nakim. Tiştê ku min eleqedar dike, ev kes xwe çawa dibînin û xwe çawa hîs dikin e.

[347] Ji dokumenterên Komeleya Mafên Mirovan Şaxa Stenbolê ya sala 1991'ê, ji nivîsa bi navê 'Kendi Yurtlarında Sürgünler' (Li Welatê Xwe Sirgûn in).

Tiştê ku dikeve para min fedîkirin e. Çawa be ez rewşenbîrekî vê herêmê me, herêma ku însanên wê ji ber xwe fedî dikin.

(....)

Hûn çi dibêjin gelo ne pêwîst e ku psîkologên me li ser vê mijarê lêkolînan bikin."[348]

Erê, gelek gundiyên ku ji bo ji gundên xwe dernekevin mecbûr man bibin qoricî, di halê ku Rafet Ballı vegotiye de ne. Bi milyonan kesên ku qoricîtî qebûl nekirin û koçber bûn jî ji welatê xwe, ji mal û mewdanên xwe bi dûr ketin. Ew jî li derên ku çûnê, ji qoricîtiyê ne kêmtir zirar dîtin û dibînin. Yanî rewşa ku heye bi hemû awayî bi Kurdan dide windakirin. Wek me berê da xuyakirin, sazî van bi xwe re tîne û reva ji tiştina namîne.

Ji xwe herêmên sînor bi piranî bi rêveberiyeke cuda tên îdarekirin. Dema pirsgirêka Kurdan jî dikeve ser, dewlet li ser van herêman zêdetir disekinin. Ji dema Komara Tirkiyeyê ava bûye li bajarên Kurdan, ji derveyî çend demên kin her tim an rêveberiyeke tund an jî rewşa awarte (OHAL) hebûye. Di dema raperîna Şêx Seîd de, di 3'ê Adara 1925'an de Meclîsa Mezin a Miletê ya Tirkiyeyê (TBMM) qanûna Takrir-i Sukûn qebûl kir û bi vî awayî heqên rêveberiyeke awarte da destê hikûmetê. Bi vê qanûnê, jiyana pirpartiyî ya ku nû dest pê kiribû jî ji holê rabû û hikûmetê rêveberiyeke otorîter ava kir. Di 5'ê Adarê de, yek li Enqereyê ya din jî li Diyarbekirê du "İstiklal Mahkemesi" (Dadgehên Serxwebûnê) hatin sazkirin. Li herêma ku Kurd lê dijîn dadgehê biryar dida û di cih de înfaz dikir. Ne wekî ya Enqereyê bû, bê ku destûra meclîsê bistîne biryarên xwe dianî cî (înfaz dikir).

Li gorî qanûna 25'ê Hezîrana 1927'an a bi hijmara 1164'an, ku bi navê "Umumi Müfettişlik Teşkiline Dair Kanun" (Qanûna Di Derbarê Sazkirina Mufetîşiya Giştî) derket, destûra sazkirina Mufetîşiyên Giştî û dema pêwîstî hebe destûra rakirinê dida hikûmetê. Li ser vê qanûnê bi awayê ku navend li Diyarbekirê be û bajarên wekî Elezîz, Ruha, Bedlîs, Colemêrg, Wan, Sêrt û Mêrdînê bigire nava xwe 'Mufetîşiya Giştî ya Yekemîn' hat sazkirin. Bi salan Mufetîşiya Giştî dewam kir û li ser herêmê plan û bernameyên awarte û taybet hatin pêkanîn. Me di beşa asîmilasyonê (pişaftinê) de hinekî behsa plan û kirinên Abîdin Ozmen ên ku di salên 1936'an de mufetîşê giştî bû kiriye. Li ser van bajarên ku di çarçoveya vê plan û bernameyên taybet de bûn, zordariyeke tund hatiye meşandin. Her wiha memûrên dewletê yên ku

[348] Rafet Ballı, bnb., r. 15-16

li van herêman wezîfedar bûn, her tim di asteke payebilind de li wan hatiye nêrîn. Wekî nimûne di sala 1931'ê de qanûna ku bi hejmara 1850'yî hatiye derxistin li ser "ji 20'ê Hezîrana 1930'î heta 1'ê Kanûna Pêşî a 1930'î sûcên ku ji aliyê esker, memûrên dewletê û bi vana re notirvan, milîsên qoricî û yên din ve hatine kirin wekî sûc neyên dîtin" e.

Di serhildana Dêrsimê de, piştî ku Seyid Riza û her du lawên wî hatin bidarvekirin jî operasyonan dewam kirin. Di operasyonan de bi ser Dêrsimê de bombe hatin barandin. Di van êrîşan de bi deh hezaran esker, bi dehan balafirên şer hatin bikaranîn.

Li Dêrsimê rêveberiya tund (sıkı yönetim) heta 1946'an, dorvegirtina eskerî heta 1950'yî dewam kir. Jixwe piştî wan salan, her ji deh salan carekê darbeyeke eskerî dibû.

Li Îranê jî bi dehsalan rêveberiya tund (sıkı yönetim) û rewşa awarte hebûye. Li her çar dewletên ku Kurd lê dijîn pirî caran darbeyên eskerî çêbûne. Me berê jî anîbû ziman ku, ev darbeyên eskerî bi piranî bi tevgera Kurdan ve eleqedar bûn û di her derbê de zorî û zehmetiyên giran li ser Kurdan hatine meşandin.

Rewşên awarte yên li herêmên Kurdan heta roja îroyîn jî dewam dikin. Navên cuda cuda lê bên kirin jî her tim rêvebirinên taybet li van deran pêk hatine. Faîk Bulut di pirtûka xwe ya bi navê 'Türk Basınında Kürtler' (Di Çapemeniya Tirkan de Rewşa Kurdan) de, ji bo salên 1990'î wiha dibêje: "Tiştek pir tesaduf e gelo? Niha dewlet di van rojan de, li ser navê ku 'terora PKK'ê' ji kokê de biqelîne li hemberî gelê Kurd bi awayekî plankirî dest bi tevgera îmhakirinê kiriye û ji bo ku vê bike dîsa sererastkirina pergala asayîşê pêk tîne. Rojnameya Hürriyetê di 1'ê Gulana 1992'yan de ji bo vê nûçeyê wiha dibêje: 'Li Rojhilat (Kurdistanê) ji bo ku li hemberî terora PKK'ê têkoşîneke baştir bê meşandin, di navbera hêzên ewlehiyê û hêzên cendirmeyan de verastkirinên nû çêdibin. Taktîk û stratejiyên nû dikevin dewsa yên kevn. Ji bo herêmên ewlehiyê bên avakirin gund û mezrayên biçûk dikin yek, ev dibin belediye; ji bo her belediyekê hêzên parastinê tên diyarkirin...' Nûçe bi kanala taybet di Hürriyetê de tê xemilandin û di pêş de tê dayîn. Tiştê ku balê dikişîne ev e. Û ev pêşkêşkirina nûçeyan a ji derveyî nûçegihaniyê ve, ku li ser qetlîameke muhtemel a Kurdan; bi rengê 'cendirmeyên sivîl, pêşketin, bajarvanî, şaredarî û rêveberiya sivîl' tê pêşkêşkirin. Jixwe rengê nûçedayînê bi xwe jî nikare rastiyê veşêre. Ka hela li vî sernavî binêrin: 'Olaganustu Hal (Rewşa Awarte) radibe'. Dema mirov pêşiyê lê dinêre mirov dibê qey Hikûmeta Tirk li Kurdistanê dev ji rejima

eskerî berdide. Lê ne wisa ye. Nûçeya ku mirov ditirsîne di nava rêzikan de veşartî ye: 'Li her bajarî, li her herêmê ew ê waliyên bi rengê peywirdarên OHAL'ê û mekanîzmaya ewlehiyê bê avakirin da ku pêşî li terorê bê girtin'..."[349]

Bi van rêveberiyên awarte (olaganustu) li heremên ku Kurd dijîn sazîbûnên awarte pêk tên. Carna bi şîdet carna bê deng bên meşandin jî, her tim operasyon hatine lidarxistin. Hem ji ber ku herêmên ser sînoran in, hem jî ji ber ku pirsgirêk tê de hene, li her deverên erdnîgariya ku Kurd lê dijîn polîs, esker û biryargehên eskeran pir in. Di çavkaniyan de hatiye nivîsandin ku li bajarên ku OHAL heye bi qasî 400 hezar peywirdarên ewlehiyê hene. Kesên ku herin li wan deran bigerin, bi caran tên sekinandin û kontrolkirin. Rojên ku gumanin hebin, wê rojê li ser sînoran helîkopterên çavdêr her tim di ser serê mirov re diçin û tên...

Dema ku ev tişt tên kirin, di nav saziyên dewletê de riyên cuda vedibin û pê re rêxistinên veşartî ava dibin. Wekî mînak, em hinekî li Tirkiyeyê binêrin. Em li ser organîzasyonên ku berî 1980'yî û piştî wê li herêmê ava bûne bisekinin. Di pirtûka Soner Yalçin a bi navê "Binbaşı Erseveri'in İtirafları" (Mikurhatinên Serbaz Ersever) de li ser 'Kontrgerîlaya Mêrdînê' bi berfirehî agahî tên dayîn. Li ser jiyana serbazê kontrgerîlayan Cem Ersever bi kinayî wiha tê gotin: "Bi qasî 14 salan li Silopî, Hezex, Şirnex, Cizîr, Nisêbînê wezîfeyê distîne; navê wî ji qaçaxiyê heta îşkenceyê, ji mêrkuştinê heta dankuştinê, heta organîzekirina operasyonên derveyî sînoran di gelek peywiran de derbas dibe. Ji derveyî hinek demên kin, ji sala 1976'an û vir ve li başûrêrojhilat (Kurdistanê) wek îstîxbaratvan wezîfedar e. Di sala 1992'yan de li Zaxoyê wekî sivîl peywirdariyê dike, di navbera Cizîr, Silopî, Duhok, Zaxoyê de hertim çûye û hatiye. Bi Kurdî pir xweş diaxive, her tim xwe diguherîne, ew diçe ku derê li wir kuştinên kiryarên wan ne diyar pêk tên.

Yalçin, tiştên ku li ser qaçaxiya tiryak û çekan a li ser sînoran ku ji aliyê JÎTEM (Îstîxbarata Jandarmayê ya Têkoşîna li hemberî Terorê) ve hatiye kirin jê re hatine gotin wiha vedibêje: "Piştî gotinên ku bi dû de astsubay ji min re got ez hebitîm. Astsubay îdîa dikir û digot ku hinek subayên ku li başûrêrojhilat (Kurdistanê) peywirdar in qaçaxiya tiryak û sîlehan dikin! Cî û navnîşan dida û bi cî û cu'an dikir. Digot: 'JÎTEM ji bo armancên baş hat avakirin. Armanca wê tenê berhevkirina îstîxbaratê bû. Lê paşê hat guhertin û xerab bû. Ji ber ku serbazên tîman li gorî xwe grubên xwe ava dikirin, di

[349] Faik Bulut, bnb., r. 53

dewsa yên ku ji kar fêm dikin bigirin, ên ku ji bo menfaeta wî bixebitin, esker û îtîrafkarên ku li kirinên derqanûnî çavê xwe wê bigirin hatin hilbijartin. Gelek ji endamên wan tîman çavên xwe ji kirinên derqanûnî re girtin. Yên ku rutbeyên wan bilind bûn jî dengê xwe dernexistin. Di encamê de derqanûniyên ku biçûk dest pê kirin pir mezin bûn. Pêşiyê bi hezaran qala pereyan dihat kirin; şûnde ev hezar bûn milyar. Di dawiyê de hema bibêje hemû endamên JÎTEM'ê, li herêmê ketin nava qaçaxiya sîleh û tiryakê.' ..."[350]

Astsubayê ku ji Soner Yalçin re qala kirinên subayan dike, di mikurhatinên xwe de wiha jî dibêje: "Kara herî mezin a li ser sîlehan ji penaberên Kurd ên ku hatin Tirkiyeyê bi dest ket. 500 hezar kes li herêma Işıkveren a Altınyaylayê hatin bicihkirin. Bi tevahî 200 hezar sileh hatin berhevkirin. Herin mêze bikin, hejmara sîlehan di qeydiyan de tenê 1600 tê xuyakirin! Ew sîlehên din bi ku de çûn? Em dixwazin li vana bê pirsîn."[351]

Salina jê, ev saziyên derqanûnî hatine zêdekirin û bêyî ku xwe veşêrin heşkere karê xwe kirine. Bi van revêberiya, li van herêman di van sala de kuştinên di kuçeyan de yên pêş çavên gelek kesan ku ro li nîvroyê dihatin kirin, zêde dibû. Salên 1990'î demek ji van deman bûn. Di Dadgehên Ewlehiya Dewletê (Devlet Güvenlik Mahkemeleri-DGM) de, di sala 1995'an de bi tevahî 13 hezar û 655 dosyeyên bûyerên kiryarên wan ne diyar hene; ji vana 11 hezar û 699'ê ji wan li DGM'ya Amedê ne. Di nava salekê de yanî di sala 1996'an de hejmara dosyeyên kiryarên wan ne diyar dibe 15 hezar û 321.[352] Ji aliyê din ve di van salan de, di binçavan de lêdan, şoka elektrîkê, êrîşên zayendî, tî û birçî hiştin û gelek cureyên din ên îşkenceyê hatine kirin û windabûna kesên di binçavan de zêdetir bûye.

Kesên ku digirtin binçavan, sûcdar an ne sûcdar rastî muameleyên derînsanî dihatin. Wek potansiyel, li vê herêmê her kes sûcdar e. M. Van Bruinessen li ser vê mijarê wiha nivîsiye: "Rêveberiya Awarte (Sıkıyönetim) her çiqas li herêmên din ên Tirkiyeyê rabûbe jî, li herêmên ku Kurd lê dijîn bi salan şûn de jî dewam kir. Wekî ku di rojnameya Cumhuriyetê de, di 12'ê Sibata 1986'an de hatiye nivîsandin; di raporeke lêkolînê ya ji partiyên muxalîf ên meclîsê Sosyal Demokrat Halkçı Partiyê, Rojhilatê Anatolyayê (Kurdistan) dişibîne qampa hêsîran a ku hemû welatî di bin zenê de ne, zor û îşkence heye û ji aliyê eskeran ve biçûkdîtin wekî nêzikahiyeke giştî tê nîşandan."[353]

[350] Soner Yalçın, bnb., r. 25
[351] Soner Yalçın, bnb., r. 27
[352] Nadire Mater, Mehmed'in Kitabı, r. 262-263
[353] M. van Bruinessen, bnb., r. 370

Li gor bûyer û nûçeyên çapemeniyê yên salên dawî, mirov dibîne ku di nav dewletê de çete avakirin roj bi roj xurtir bûye. Van demên dawî di çapemeniyê de gelek nûçeyên eşkerekirina çeteyên nav dewletê hatin weşandin. Di hin ji van nûçeyan de tê eşkerekirin ku, hinek wezîfedarên ewlehiyê yên li herêmên ku Kurd lê dijîn li ser kar in, di bazara tiryakê (uyuşturucu) de erebeyên fermî bi kar anîne û bi riyên derqanûnî gelek pere bi dest xistine. Di hin ji wan de jî, gelek kuştinên kiryar ne diyar eşkere dibin.

Di sala 2008'an de pirî caran nûçeyên li ser Çeteya Ergenekonê wek bombeyê diketin rojevê û Tirkiye tevlihev dikir. Di serê sala 2009'an de operasyonên li ser vê çeteyê didomin û roj bi roj xeleka wezîfedarên di vê çeteyê de ku di nav wan de yê payebilind jî hene fireh dibe. Di operasyonên dawî de gelek cebilxane hatin derxistin û her roj kesên ku tên binçavkirin zêde dibin. Mirov dikare di vî warî de gelek dokuman û mînakan bide, lê em nikarin berfireh têkevin nava van mijaran. Li vir tenê bi kinayî em tevgerên ku li herêmên sînoran hene, tînin zimên.

Li van herêman sirgûn û koçberî jî pir e. Me ev mijar di beşa 'Sirgûn û Koçberî'yê de vegot. Lê dîsa divê mirov balê bikişîne ser ku di sirgûn û koçberiyê de jî, ji ber taybetiya van sînoran xelk dikeve rewşeke gelekî xerab. Wateya sînoran li nav Kurdan bi gelek awayan cihê ye. Ku em Vîetnama Bakûr û yan Başûr; Almanyaya Rojhilat û ya Rojava bînin ber çavan; ev dewlet bûne du par lê heman netewe ne û ew desthilatdar in. Li Almanyayê her du alî jî dewlet bûn û eynî netew bûn, bi tenê cudahî şiklê rêveberiyê bû. Dîsa jî di demeke kin de gelek cudahî derketin meydanê û gelek êş û azar hatin kişandin. Însanan mirina xwe dida ber çavê xwe û Dîwarê Berlînê derbas dikir. Lê dema kesek derbasî aliyê din dibû, rê ji wan re vekirî bû û dihatin qebûlkirin. Kesekî ji Almanyaya Rojhilat bi dizî bireviya û biçûya Almanyaya Rojava diçû memleketê xwe, ew jî dewleta wan bû. Ew însan diçû cihê ku desthilatdarî di destê miletê wî/ê de bû. Lê Kurd ji her çar aliyan ve hatine dorpêçkirin. Ji kîjan aliyî birevin, dikevin rewşeke xerabtir.

Di sedsala 20'emîn de bi hezaran Kurd ji ber zora dewletekê koçî dewleteke din bûn. Di vê koçberiyê de bi hezaran kes mirin. Me berê, piştî serhildanan koçberiyên mezin ên ku li Îraqê çêbûne anîbûn ziman. Gel dema ku berê xwe dida sînoran û ber bi sînoran ve hildikişiya digot qey ew ê ji rewşa xerab xilas bibe. Lê belê sînorên di nav wan de wekî gerînekê ne, xilasî hema bibêje tune ye. Kesên ku koç dikirin aliyên din, ji ber ku di nava dewletan de li hemberî wan peyman hebûn alîkariyeke sererast nedidîtin; perîşaniya di riyan de, birçîbûn û pê re nexweşî diketin ser hev û her kêlî bi

windakirinên mezin derbas dibû. Wek ku me berê jî gotibû, bi ku de jî herin ew ê encam ji bo wan yek be; perîşanî û mirin.

Ji derveyî demên koçkirin û operasyonan, tiştên ku li derdorên sînoran hatin jiyîn, di bingeha xwe de şerekî bi dizî yê domdar bûn. Ji ber ku kuştina yên ku sînor derbas dikin serbest bû, li wê qadê derfeta bi rihetî kuştina mirovan hebû. Gelek mirovên bêguneh li wê derê hatin kuştin û wek ku di encama sînorderbaskirinê de hatine kuştin hatin xuyakirin. Jixwe ji ber teqîna mayinan û di pevçûnên ji ber qaçaxçîtiyê de gelek kesan di sînoran de jiyana xwe ji dest dida. Ji ber vê yekê, mirov kare bêje sînor ji serî heta binî bûne xefikên ku li ber gelê Kurd vebûne.

Herkes dizane ku bûyerên li ser sînor qewimîne hemû nayên zanîn, ên ku tên zanîn ji yên ku nayên zanîn pir hindiktir in. Çi kesê ku bûyer bi serê wan de dihatin an jî bûyer didîtin nikaribûn vêna bînin ziman, ji ber ku bi dû de tiştên xerabtir dihatin. Vê jî bi xwe re bêdengî, yan jî berevajîkirina rastiyê anî. Bi vî awayî gelek rastî veşartî man. Hin bûyer piştî qewimînê bi gelek salan derketin holê. Bûyera 33 Guleyê ya ku li sînorê Îran û Tirkiyeyê pêk hatibû yek ji wan e. Ev bûyer bi derfetên kêm, piştî qewimî bi salan derket holê. Gelekan ji me ev bûyer bi saya helbesta Ahmet Arîf a bi navê 33 Gule bihîst.

Ku mirov hebekî li ser vê bûyerê bisekine wê tevgerên li ser sînoran hebekî din zelal bibin. Aliyê herî girîng ê vê bûyerê, li sînorê Îran û Tirkiyeyê, bê darizandin kuştina mirovên bê sûc e. Bûyer li navçeya Wanê Ozalpê, li gundê Yukari Koçkiranê li Newala Sefo nêzî kevirê bi hejmara 356 ê sînorê Tirkiye û Îranê, di 30'ê Tîrmeha 1943'yan de pêk hat.* Gunay Aslan di pirtûka xwe ya bi navê 'Yas Tutan Tarih 33 Kurşun' (Dîroka Şîngir 33 Gule) de ya ku mijara wê ev bûyer e wiha dibêje:

"Sal 1943. Ne serhildanek ne jî berxwedanek heye. Kurd bêdeng û bêlebt in. Lê di navbera du mehan de li navçeya Sarayê du qetlîam pêk tên. Li Xiretelê 20, li Newala Sefoyê jî 33 Kurdên gundî yên xizan tên qetilkirin. Fermana kuştina van gundiyên ku ji Kurdbûnê pêve tu sûcê wan tune fermandarê Artêşa Sêyemîn ê wê demê Orgeneral Mustafa Muglalı daye. Ji ber ku wî fermana 'bikuje' daye Orgeneral Mustafa Muglalı li dadgeha herî bilind a artêşa Tirk, li Dadgeha Fermandariya Giştî ya Eskerî tê darizandin û cezayê mirinê didinê...

Ji gundên Xirabêsorik, Milanengiz, Rûnexar, Xiretelê ji Eşîra Milan 33 kes, li vê newalê (Newala Sefo) destê wan li pişt wan hatine girêdan, çogên

* Gerek mirov balê bikişîne ser ku, di van deman de li Başûrê Kurdistanê Mistefa Barzanî di nav têkoşîneke serkeftî de ye.

wan berdane erdê û hatine kuştin. Di nav wan de mirovên kal ên ku nikarin bimeşin, ciwanên ku nû ji leşkeriyê hatine û zarokên ku haya wan ji tu tiştî tune hene. Yên destgirtî û nûzewicî hene. Yên ku bav û law, kek û bira, zava û xezûr in hene. Dengê guleyan dengê nifir, dua û qîrînên wan fetisandin..."[354]

Rojnameya Zaferê ya roja 16.08.1956'an digot ku, 'di der heqê yên ku di dema desthilatdariya CHP'ê de bê pirs û pirsiyar, derzagonî bira bi bira dane kuştin, ên ku li Rojhilat 32 hemwelatî kuştine lêpirsîna Meclîsê hatiye destpêkirin'. Roja 17.09.1956'an di heman rojnameyê de ev nivîs heye: "Qetlîamên li Rojhilat ne yek û dudu ne. Di navbera salên 1942 û 43'yan de li Elbak, Bargirî û Agiriyê qetlîamên ecêb pêk hatine, lê heta îro veşartî mane. Hemwelatî bê darizandin, bê pirs û pirsiyar hatine kuştin."

Bûyerên bi vî rengî her dom kirine. Bûyera ku di Tîrmeha 1988'an de 58 penaberên Îranî ji aliyê Tirkiyeyê ve ji bo Îranê hatibûn radestkirin û li sînor ji aliyê leşkerên Îranê ve hatibûn kuştin, me di beşa Hevkariya Li Dijî Kurdan de vegotibû. Vê bûyerê di Rojnameya Hürriyetê ya 1'ê Tebaxa 1988'an de jî cih girtibû. Li gor vê nûçeyê, hin penaberên Îranî ji bo ku radestî Îranê neyên kirin li Wanê xwe li avahiya SHP'ê girtibûn; digotin, 58 penaberên ku berê radestî rayedarên Îranê hatine kirin ji aliyê pastaran ve hatine kuştin. Nêzikî 50 penaberî dixwestin ku herin welatên Ewrûpayê yên cuda. Lê hinek hevalên wan çend roj berê radestî Îranê kirine û hatine kuştin. Nûçe wiha didome; "Penaberên dijberê rêveberiya Îranê dibêjin, roja înê 58 hevalên wan, ji otêla ku lê dimînin hatine stendin û li deriyê sînor ê Kapikoyê radestî rayedarên Îranê hatine kirin. Ev hevalên wan paşê nêzî sînor li derdora Kapikoyê ji aliyê pastaran ve hatine kuştin."

Di der heqê vê mijarê de em li bûyereke demên dawî ku di 4'ê Tebaxa 2003'yan de li navçeya Wanê Elbakê pêk hatiye binêrin. Erê, di vê rojê de 'bi sebeba ku bi awayekî qaçax bazirganiya mazotê tê kirin' 75 hespên gundiyan ji aliyê leşkeran ve bi saxî hatin şewitandin. Li ser vê bûyerê nûçegihanê DÎHA'yê Sidik Guler roja 29.03.2007'an di rojnameya Gundemê de wiha dinivîsî:

"Leşkerên Qereqola Piyadeyan a Koruyê, li ser giliyê ku 'ji Îranê mazota qaçax tê' roja 3'yê Tebaxa 2003'yan ber êvarê girtin ser gundên sînor Mahmûdabad, Guleçler, Açikalin, Salidere û Azikliyê. Bi mahneya ku pê mazota qaçax tê kişandin dest danîn ser 75 hespan û ji gundê Mahmûdabadê kesên bi navê Dursun Demîr û Selam Aldemîr û kesên Îranî yê bi navê Pîman

[354] Günay Aslan, bnb., r. 16

girtin bin çavan. Gundiyên ku ji ber dest danîbûn ser hespên wan serî li dozgeriyê dabûn bûyer wiha vegotibûn; 'Leşkerên Qereqola Piyadeyan a Koruyê ku li gundê Mahmûdabadê ye ber êvarê çûn gundan û hesp dan hev. Li ser vê yekê wek xwediyên hespan em çûn qereqolê û me xwest ku hespên me bidin me. Rayedarên qereqolê jî gotin, sibehê em ê hespan teslîmî we bikin. Em vegeriyan malên xwe. Serê sibehê dema ji bo em hespên xwe bistînin em ber bi qereqolê ve dihatin, me dengê çekan bihîst. Hespên me yên ku li devera Çîçekliyê hatibûn komkirin pêşiyê gule bi ser wan de hatibûn barandin û paşê jî hatibûn şewitandin. Dema em gihîştin cihê bûyerê piraniya hespan hîna nemiribûn. Xwe dilebitandin. Hesp bi saxî dişewitîn. Me jî bi neçarî lê temaşe dikir.'

Li ser nûçeya ku Dîcle Haber Ajansiyê (DÎHA) ragihandibû û rojnameya Ulkede Ozgur Gundemê di manşêtê de dabû, Qeymeqamê Navçeya Elbakê Mustafa Çoggun daxuyaniyeke nivîskî belav kir û got, êvarê dema ku hesp bi qaçaxtî hatine û ji ber ku guh nedane şiyariya 'raweste' leşkeran gotiye qey 'terorîst'in û gule barandine; hinek hesp mirine û ji bo ku nexweşî belav nebe yên ku birîndar mane hatine şewitandin. Dîmenên dema şewitandina bergîlan ên ku ji aliyê gundiyan ve bi dizî hatibûn kişandin jî, dîsa ji aliyê DÎHA'yê ve hatibûn weşandin. Daxuyaniya qeymeqam Çoggun a ku digot, ji bo ku nexweşî belav nebe bergîl hatine şewitandin jî, roja 5'ê Tebaxa 2003'yan di rojnameya Hurriyetê de hatibû weşandin."

Di sînorê navbera Tirkiye û Sûriyeyê, Sûriye û Îraqê, Îraq û Îranê, Tirkiye û Îraqê de jî, lewnê wan bi awayekî din be jî bi van teşeyan bi hezaran bûyer qewimîne. Ev mînakên ku me dane, ji deveyê ne guh in. Çiqasî mirov bêje, mirov nikare jiyana herêmên sînoran bi temametî bîne ziman. Encex ku mirov li wir bijî mirov ê baş fêm bike.

Niha em çavekî li bîranîneke Enver Ozkahraman bigerînin. Ev bîranîn behsa demeke li ser sînorê Tirkiye û Îraqê dike. Ozkahraman di nivîsa xwe ya bi navê Çel - Çukurca (1) de bîranîneke xwe ya salên 1970'yî vedibêje. Ev bîranîna ku behsa Çelê dike, di gelek waran de agahiya ji vê herêmê, yanî ji herêmên sînor dide. Hin ji vê nivîsê wiha ye:

"....

Çi li sînorê Tirkiye û Îranê, çi li sînorê Tirkiye û Îraqê di nîvê gelek gundan re çem derbas dibin û malên vî aliyê çem yên Tirkiyeyê ne û yên aliyên din jî yên dewleta din in...

Li hinek gundan bira, li hinek gundan jî pismam li aliyê din in. Carna xwişk bûk diçin wî aliyî, carna jî wek berdêlî tên vî aliyî. Jixwe Çelê bixwe li ser sînor e. Mêrgên Çeliyan ên li 49'ê di nav sînorên Îraqê de ne, lê giyayê wan Çelî diçinin.

Gava mirov li rojnameyên kevn dinêre mirov dibîne ku, balafirên Sedam çend caran ev mêrg dane ber bombeyan û Çelî kuştine û dûre ji bo wilo çend caran tazmînat daye.

Gava ku mirov ji Çelê derdikeve û di gundê Serêsêvê re dere gundê Şiliko, Erij, Hirkaş, Bircêlan û Şivrezan mirov mecbûr e di nav axa Îraqê re derbas bibe. Riya ku me çêkiriye jî di nav axa Îraqê re derbas dibe û piştî demekê di Sirta Şiliko de mirov dîsa dikeve nav axa Tirkiyeyê. Wesayîtên ku leşker û amûrên qereqolên havînî yên çadirîn dibirin, rêveberên parêzgeh û navçeyan, midûrên me û tevahiya wesayîtên şantiyeya me di vê riyê de derbas dibûn. Li ser girê teniştê jî Rabîaya Sedam (qereqolên di koncalên ser giran de) hebû, lê her der di bin kontrola pêşmergeyan de bû. Şirteyên (leşker) Îraqê yên di Rabîayê de ji tirsan newêribûn serê xwe derxin, ên ku derxistina jî pêşmergeyên nîşangir bi guleyekê îşê wan xelas dikirin.

Jixwe Sedam jî ji bo bi sînor ve herêmên tampon çêbike, di sala 1975'an de bi sedan gundên Kurdan ên wê herêmê vala kir (ew der hîna jî vala ne), lê bi salan ew bixwe jî nikaribû bikeve wê herêmê. Lê belê ji ber ku rejîma Sedam ji derve re girtî bû, pere û pûlên wê zêde bûn bi helîkoptêrên ku guleyan derbas nakin û bi mîrageyên şer ên malê Rûsan her roj, lê her roj heta ber pozê şantiye û qereqolên me yên çadirîn bi tonan bombe dibarandin.

Gava ku li Colemergê û li Bakurê Îraqê darek dihat şewitandin an jî birîn, carna di heman demê de carna jî di salekê de ji koka wê darê 6, 7 şax şîn dihat. Çi 'axa aliyê din' çi jî axa Tirkiyeyê gava ku hûn deh mihan bera vê herêma asê bidin, artêşên Amerîka û Alman jî bên bawer bikin di salekê de nikarin wan bibînin û bigirin. Li şantiyeyên YSE'yê, ji bo ku em nesîbê xwe ji bombeyên Sedam nestînin me al dadiliqand, lê ne bi dîrekan ve. Ji bo ku pîlotên Îraqê bibînin û bombe nekin, me al an li ser çadirekê yan jî li ser banê holikekê bi şerîtan radixist û bi vî awayî me xwe û şantiyeya xwe diparast.

Me pîlotên hundirê helîkopter û balefirên Îraqê yên ku dihatin û diçûn didîtin û carna jî me destê xwe ji wan re li ba dikir. Lê çi bi şev û çi bi roj kontrola bejahiyê di destê pêşmergeyan de bû. Bivê nevê me pêdiviyên xwe yên wek çay û ji bo lembeyên luks, gazyaxi ji wan distend. Fermandarê pêşmergeyan Mustafayê Nêrweyî herêm bi rê ve dibir. Şeveke havînê ya germ dilê me araq xwestibû, lê me nikaribû di nav karkerên şantiyeya li Şilikoyê de

yan jî li ser kaniya gund araqê vexwin. Me rahişt zewadeyê xwe û em çûn paleke bilind a nav axa Îraqê, li ser kaniyeke avcemidî me agirê xwe pêxist, sifreya xwe raxist (Ahmet, Mîrza, Hazer û ez), carekê me dît ku dora me hatiye pêçan, me nihêrî pêşmerge ne.

Bi dengekî bilind pirsîn; "Hûn li vir çi dikin, hûn kî ne?"

Me got: Em in, em xebatkarên şantiyeyê ne. Gund germ bû bêhna me çikiya, me got em li ser vê kaniya cemidî xwarinekê bixwin.

Çend kes hatin cem me, çend gep ji xwarina me xwarin û paşê jî gotin: Me agirê we dît, me meraq kir, me got ka kî ne, noşîcan be. Û çûn.

Dûre me bihîst ku ji fermandarê xwe re gotine, fermandar jî qehiriye gotiye, we çima şûşeyên wan neşikênandiye.

Lê îro piraniya wan gundan tune ne, şûna wan xurî xopan e. Tenê li Çelê –ku ez ne xelet bim- gundên Geremûs, Aşût, Geyman, Deştan û Serêspî, Kelatan û Biyadira ku cihên wan hatiye guhertin lê navê wan neguheriye çend mal mane.

Bajaroka Ertoşê ya bi navçeyê ve girêdayî jî tê de gundên din tune bûne, kund li ser xirbeyan dixwînin. Hem jî cihên wek Muksê cihên çandê kevnare, gundên qedîm ku li Çelê navê xwe dane bi dehan eşîretan.

Yek ji van gundan Zêdika xerabe ya li dor gundên Marûfan û Bilecanê ye. Vî gundî ji Pinyanişiyan re yên ku milê rastê yê mîrê Colemêrgê bûn dayiktî kiriye. Yê din bi çend kîlometreyan dûrî wî gundê Ertoşê ye, wî jî dayiktiya 12 eşîretên milê çepê yên mîr wek Gewdan, Mamxoran, Girawî, Jîrkî, Şerefan, Êzdînan kiriye.

Bi qasî ku ez dizanim Pinyanişî heta Bedlîsê, lê Ertoşî ji Mûsilê heta Bexdayê ji wê derê bigirin heta Îranê li gelek bajaran hebûna xwe domandine. Wek mînak apê dostekî min ê Îraqî, Mam Huseyn Toviyê Ertoşî ji Gerînendehiya Ewlekariya Mûsilê malnişîn bû...

Gundê Şêx Ehmedê Xanî, Xanê jî îro xerabe ye ...

Heta salên dawî jî wek zozan çûn û hatin li Deşta Xanê çêdibû. Êdî dîtina wê derê jî wek xeyalekê ye..."[355]

Wek ku Ozkahraman di dawiyê de daye xuyakirin, gelek gundên li ber sînoran hatine valakirin û xerakirin. Bi van valakirin û xerakirinan dîroka Kurdan jî tê windakirin. Cihê ku ji bo Kurdan gelekî pîroz in yek bi yek ji holê tên rakirin.

Ji aliyê din ve herêmên sînor qet ne ewle ne. Li van deran kesên ku erdê wan nêzikî sînoran e, her ku tê de dixebitin bi tirs û bi xof in; her kêlî nizanin bê wê çi bê serê wan.

[355] www.yuksekovahaber.com, 24.11.2007

Wek ku di mînakan de jî tê xuyakirin bajar û gundên di sînoran de her tim di gelcê de ne. Di herêmên sînor de her kêlî dibe ku her tişt bibe. Nêzikî derve ne û nêzik in ji yên ku ji derve bên. Ji ber wilo gelek dest dirêjî van deran dibin. Xelkê li van herêman dijîn di malê xwe de jî ne rehet in. Kesek li van herêman nikare jiyaneke aram derbas bike.

Kurdên ku di sînorê Sûriyeyê de dijiyan jî gelek bedelên giran dan. Sûriyeyê, di ber sînorê xwe yê bi Tirkiye û Îraqê re bi firehiya deh km'yî dest danî ser erdên Kurdan û xwest 'Kemera Erebî' (Hizam-ül Arabi) li dar bixe. Bi vî awayî sînorekî ji însanan jî di navbera Kurdên Sûriyeyê û Tirkiyeyê de, ji aliyê din ve sînorek di navbera Kurdên Sûriye û Îraqê de tê danîn.

Ji bilî vana gelek bûyerên mezin di herêmên sînoran de qewimîne. Ji bo mînak; Amûdê, bajarê di sînorê Sûriye û Tirkiyeyê de felaketên mezin derbas kirin. Di sala 1937'an de hêzên Frensî bombe barandin bi ser Amudê de û bajar bi erdê ve rast kirin. Di sala 1960'î de jî bi şewata sînemaya wê ya bigûman de 280 zarokên Kurdan bi saxî  şewitîn. Di 12'ê Berfanbara 1980'î de li Qamîşloyê ku ew jî bajarekî di sînor de ye qatlîamek hat lidarxistin û 15 kes hatin kuştin. Ên ku ew kuştin ji wiyalî sînor hatibûn. Li eynî bajarî di bûyerên Adara 2004'an de bi dehan kesan jiyana xwe ji dest dan û bi hezaran kes jî hatin binçevkirin, dikanên wan hatin talankirin. Ev tenê du mînak in. Li gelek cihên ber sînoran û di gelek deman de bûyerên wek vana qewimîne.

Hin derên wek Şemzînanê sê aliyên wan sînor in û her tim alozî tê de hene. Bûyerên ku di Mijdara 2005'an de rû dan, bi rojan di çapemeniyê de di rêza yekemîn de cih girtin. Di nivîsan de dihat gotin ku, bi çûna gel a ser bûyerê çeteyeke din a nav dewletê derketiye holê.

Tevliheviya li Şemzînanê bi salan e bi awayekî giran didome. Ev qada ku sê sînor lê digihîjin hev PKK jî gelek caran bi kar tîne û vê herêmê pir baş dizane. Fermandarê Tabûra Sînor a Şemzînanê Erdal Sarizeybek Şemzînanê wiha vedibêje; "Ka Şemzînan çi ye; sêkoşeyeke biçûk, li başûrê rojhilatê Tirkiyeyê, xala herî dawî ye. Sêgoşeyeke şeytanî ya ku sê aliyên wê bi wargehên PKK'ê dorpêçkirî ne. Ku tu terorîstan nehesibîni, beşek ji bihuştê ye. Warê lehengan."[356] Sarizeybek di berhema xwe ya navborî de ji bo sala 1992'yan van agahiyan jî dide: "...ji serê meha Tebaxê û pêve me di derheqê terorîstan de gelek agahî stendin. Bi gotina gundiyan herêma Xakurkê (Îraqê) tije terorîst bû. Kesên ku ji herêma Qersê ji bo tevlêbûna rêxistina terorîst tanîn di ber sînorê Îranê re sînor û sînor dadiketin başûr, di çiyayê ku terorîstan jê re digot Zagros re derbas dibûn û dihatin Xakurkê. Di vê

[356] Erdal Sarızeybek, bnb., r. 95

rêwîtiyê de, wek mînak li wargeha Jermayê ya li qûntara çiyayê Şehîdanê ya li rojavayê Şemzînanê bêhna xwe berdidan. Gelek cihên ku rêxistinê wek wargeh û cihê bêhnvedanê bi kar dianî hebûn..."[357] Ji bilî vana li gor ku Sarizeybek dibêje, her roj li qadên mayinkirî teqîn pêk dihatin; ev teqîn hinek jê ji ber ajalên ku di wê herêmê re derbas dibûn, hinek ji ber hêstirên qaçaxvanan, hinek jê jî ji ber pêlêkirinên gerîlayan ên ku derbas dibûn pêk dihatin.

Sarizeybek, li ser qaçaxvaniya ku li vê herêmê dibe jî disekine. Dibêje, PKK bi qaçaxvaniya ku li vir dike gelek pereyan bi dest dixe û li deriyên gumrikê yên ku li sînorê Îranê vekiriye pereyên ku bi dest dixe mirov nikare xeyal bike. Beşek ji vê vegotina Erdal Sarizeybek wiha ye: "Şemzînan li gel zirta terorê bi qaçaxvaniyê jî navdar e. Teror û qaçaxvanî di hundirê hev de ne. Di sînorê Îran û Îraqê de, di cihê ku qaçax tê re derbas dibe tevde PKK qaşo gumrik ava kiriye. Ji kesê derbas dibin hema xeracê distîne. Ku mirov bifikire, ligel bi milyonan pez û dewar gelek caran tiştên wek çerm, sifir, tiryaq, çek û berik derbasî nav sînorên welêt dibe, hatina ku tê bidestxistin mirov dikare bibêje bi trîlyonan e. Hatina pereyan li hêlekê, hêlên bûyerê yên îstîxbarî jî hene. Her yê ku tê û derbas dibe mecbûr e ku der heqê cih, hejmar û tevgera rojane ya yekîneyên leşkerî de agahiyan bide terorîstan..."[358] Sarizeybek, der heqê qaçaxvaniya cerdevanan de jî wiha dibêje: "Gerdî ji ber ku di sînorê Îraqê de bûn, tevahiya qaçaxvaniyê di kontrola wan de bû. Di wê rewşê de tu yê çawa mudaxaleyî qaçaxê bikî; ji bo ku hûn ji qereqolê derkevin divê hêzin din ên alîkar hebin. Cerdevan jî vê rewşê bi kar tînin, ji xwe xwediyên wan jî li aliyê din hene û bi hêsanî qaçaxvaniyê dikin..."[359]

Ev tenê çend gotinên ku ji aliyê wezîfedarekî dewletê li ser navçeyekê hatiye nivîsandin e. Li herêmê hemûyî her kêlî agir dibare. Di ev qas gelcan de her kes sûcdar e û kîngê bê xwestin karin bên girtin. Axilbe salên dawî rewşa Sêrt, Colemêrg û Şirnexê ji vî awayî de gelekî ne xweş bûye. Hewldanên çeteyan, qaçaxçîtî, operasyonên tên kirin... Ku mirov van hemûyan tîne ber çavan, halê ku Kurd tê de ne hîn bêhtir tê xuyakirin.

Ji xwe gelek derban mirov nikare here hin herêmên di sînoran de. Hin sînorin jê qet tu nikarî nêzikî wan bibî. Li wir tu nikarî sûret bikişînî. Heyamin hatine ku, bi rihetî tu karî xwe bigihînî gundekî li Ewrûpayê yan Japonyaya ku bi hezar km'yan dûrî me ne, lê tu nikarî xwe bigihînî gundekî Colemergê. Jixwe carna dera herî nêzik ji ber ku derbasbûna ji sînor û wir de

[357] Erdal Sarızeybek, bnb., r. 47
[358] Erdal Sarızeybek, bnb., r. 39
[359] Erdal Sarızeybek, bnb., r. 37

bêîmkan e tu nikarî xwe bigihîniyê. Wek dema serhildana Qamîşloyê ya 2004'an, dengê hawara xwediyê wan û şewata malên wan bi ser Nisêbîniyan de difûriya, lê deriyê sînor hatibû girtin, destûr tune bû; Nisêbînî li wir, li ber têlên sînor dest û lingên wan girêdayî bûn. Tenê dinêrîn û didîtin bê dera ku çar gav e çilo dûr dibe, dûriyeke ku tu nikarî bigihêyiyê.

Ne tenê sînor hin derin nêzikî sînor hene ku çûna wan deran jî qedexe ye. Xelkê ji wir bixwe gelek derban nikare here bi erdê xwe dakeve. Li derdora sînorê Îranê debar li ser xwedîkirina sewalan e. Bi taybetî qedexekirina çêregehan bandoreke zehf neyînî li mirovên herêmê dike. Lêkolîna bi sernavê 'Rewşa Civakî ya Navçeyên li Sînor' ku di navbera salên 2001 û 2004'an de pêk hatiye, di derbarê jiyana sînoran de gelek tiştan bi mirov dide fêmkirin. Rêveberê vê lêkolînê Prof. H. Neşe Ozgen di nivîsên xwe de gotiye ku, li Ozalpê li gundên sînor qaçaxvanî hîn bi piştê û hemaliyê tê kirin û qaçaxvaniyê kes dewlemend nekiriye. Gundî debara xwe bi piranî bi çandiniya ceh û genim, xwedîkirina 50, 70 mih, du sê çêlek û qaçaxvaniya sînor dikin. Ozgen dibêje, ji ber ku mêrgên ji bo êmê heywanan ê çele rêsî jê tê çêkirin di herêma qedexe de mane, berê jî niha jî çinîna van deran girêdayî destûra qereqolê ye. Di dema tetbîqatan de yan jî di dema ku gumana tevliheviyan li ser sînor çêbibe hebe, gundî ji bo zivistanê nikarin rêsiyên xwe bikin. Ev tişt tev dikin ku li herêmê sewalxwedîkirin ji holê rabe.

Herêmên ku em behs dikin bi gelek awayî ne wek aliyên din in. Di vî warî de mijareke din a balkêş heye. Li herêmê li ser çiya, li ser giran, di destpêka bajaran de nivîsên mezin ên ku xelkê wê derê biçûk dixe û wan dixe bin xof û tirsan hatine nivîsandin. Ev nivîs bi piranî li tenişta qereqolan û li cihê ku hemû kes bibînin hatine nivîsandin.

Niviskar Laleş Qaso ji Nisêbînê ye û gundê wî li ber sînor e. Ji ber wilo rewşa li ber sînoran baş dizane. Mijara Romana Qaso ya bi navê 'Sê Şev û Sê Roj', jiyana herêma sînor a heyama salên li dor 1969'an e. Di berhemê de, bi gelek awayî saziyên li ber sînor û jiyana gundên li ber sînor li ber çavan hatiye raxistin. Ku em ji Romanê çend gotinan bixwînin em ê rewşa van herêman çêtir bibînin:

"Qereqola hidûd di sala 1958'an de, di berpala başûrê girê Qesra de hatibû avakirin. Di serê gir de ji dema ku qereqol hatibû avakirin pênc dîrekên dirêj çikandibûn. Bi van dîrekan ve daliqandî gelek mirovan can dabû. Li hawêrdorê gir bi kevirên bestan, boyax û kilsê wiha hatibû nivîsîn:

'Tirkek bedelî cîhanê hemî ye! Her Tirk esker çêdibe! Ev welatê me ye! Welat yek perçe ye!'

Di rohilat û roavayî gir de dîsa ji kevirên bestan bi qasî deriyên sûr û dêrên kufarî mezin rengareng du wêneyên eskerê Tirk hebûn. Wêne bi haweyekî pir balkêş hatibûn çêkirin. Mirov ji wan heybet digirt! Serê eskeran bi mîxfer, newqên wan yekser bi rext û fişek û bomban rapêçayî bûn. Potînên wan ên bi niçik, bi qasî tabûtên zarokan dirêj û mezin bûn. Mîxên kubikî ku seranser di qiraxên potînan de çikandî bûn; mîna qesnaxên cenceran xwe dabûn der. Destên xwe yên çepê kiribûn kulm û danîbûn ser sênga xwe. Tivingên wan ê bi qezetorê di destên wan ên rastê de bûn û berê tivingan jî bi bakur ve bû. Qezetorê heta ku digiha lûla tivingê bi carekê ve ji boyaxê sor bûn. Ji serikên qezetoran mîna ku xwîn binisile bi lez dilopên boyaxê xwe berdidan. Di nav şeqên wan de kelaxekî bê serî, ji kelax hinekî dûr di bin lingê çepê de seriyekî devjihev û zimankişiyayî hebû. Li jêra gewdê serjêkirî ji boyaxa sor bi tîpên mezin jî wilo nivîsîbû:

'Xwezî bi dilê wî ê ku dibêje ez Tirk im! Tirk mezin e!'

Gava mirov bi terempêlê ji Qosarê ber bi Nisêbînê û ji Nisêbînê ber bi Qoserê de diçû û nêzikayî li gir dikir, gir ji esker û termê însên di çavên mirov de bi qasî çiyayekî bêper bilind dibû. Ji sawa ku vî girî dida, Reşo her ku diçû Nisêbînê xwe berdida ser rêya Menderê û li vegerê dîsa di rêya vî gundî re dihat malê. Gir, ji gundiyên derdor bêtir tesîra xwe li ser qesiriyan dikir. Remoyê qesrî di rojên ku wê ber bi derekê de biçûya, ji gund heta ku dihat ser rêya Îpekê, da ku gir nebîne, şifqa xwe dixist nav çavên xwe, ziq li erdê dinêrî û dimeşiya. Dûre jî ji ber gir mala xwe bar kir û li Zorava bi cih bû.

Li vê qereqolê sih û şeş esker diman. Ev hejmar carina bilind jî dibû. Li hewşa qereqolê seraqet cîb û cemsek û panzêrek sekinîbûn. Eskeran bi van terempêlan hidûd saxtî dikirin û didan pey qaçaxçiyan. Îcar di şevên ku teqîn dibû û bi qaçaxçiyan re remî dikirin, ji qereqola Kewke û Nisêbînê jî hewar bi qereqolê ve dihat, hejmara terempêl û eskeran bilind dibû. Li vê qereqolê wekî din jî di hundirê heftê de bi kêmasî sê, çar caran terempêlên ku ji hêla Nisêbînê ber bi Mêrdînê û Qoserê de diçûn, saxtî dibûn.

Qereqolê keriyek pez xwedî dikir. Li wir her roj du pez ser jê dibûn. Qesabiya qereqolê jî Cimoyê zoravî dikir.

Besta Zorava ji aliyê rohilat ve di ber gir re dirêjî nav mayinan dibû; biniya hesin derbas dikir û xwe bi nav erdê binxetiyan de berdida. Best heta bi çend sal berê jî seraqet diherikî; lê di dû re hêdî hêdî av ji ser qut bû û best ku lehî raneba, di zivistanan de jî nema herikî. Di jêra gir re rêya Îpekê derbas dibû. Deriyê qereqolê li rê dinerî. Di qiraxa rê de pêşberî hev du qulûbên eskerî hebûn. Bi tîpên mezin li ser hêtên kulûbê hatibû nivîsîn ku Tirk bahoz e!

Tirk birûsk e! Li jêr hema bi rê ve, dîrekên têlên erda mayinkirî ji hindama qereqola Kewke heta ku diçû Nisêbînê, yek di ber yekî de çikandî bûn. Gundê Qesra li jêra Îpekê dima. Navbera gund û qereqolê latek erd nedigirt. Derûdorên gund bi têlên ristîn rapêçayî bûn. Ji vî gundî bi tenê rêyek derdiket. Rêya gund di ber deriyê qereqolê re derbasî ser Îpekê dibû. Li jêra têlan mayin û li jêra mayinan jî rêya trênê bû. Trên di hidûdê Binxetê re derbas dibû. Li binya hidûd gelek gund hebûn. Eskerê Sûriyê têkilî hidûd nedibûn. Eskerên Tirk hidûd diparastin. Di vî warî de selahiyeta wan bêsînor bû. Heta carina xwe berdane gundên binya hesin, di van gundan de bi mebesta qaçaxê hin mirov girtine û di nav mayina de kuştine. Eskerên Sûriyê şêlû nedibûn. Di sala 1967'an de gava eskerên Tirkan êrîşî ser qereqola Doda dikin, Hemîdê hezexî digirin û di qereqolê de dikujin, ne eskerên Sûriyê dest hiltînin û ne jî dewleta wan bi xwe bersivekê dide dewleta Tirkiyê. Gelek bûyerên wiha çêbûne. Û eskerên Sûriyê jî tu carî li xwe neqewimandine..."[360]




*Nuh mirov dikeve Şirnexê, nivîsa 'Xwezî bi dilê wî ku bêje ez Tirk im.'(Ne mutlu Türküm Diyene) heye.*[361]

Doç. Dr. Neşe Ozgen ku wê jî li ser herêmên sînoran xebatên hêja kirine, di vê der barê de wiha nivîsiye: "Nivîsên çiyayan wek mohrên tundiya zêde ya dema salên piştî 1989'an, Herêma Başûrêrojhilat dax didin. Nivîsa 'Xwezî bi dilê wan ku dibêje ez Tirk im' li qadên bajarên wek Mêrdîn, Cizîr, Silopî

[360] Laleş Qaso, Sê Şev û Sê Roj, r. 5-6-7
[361] Fot: Osman Yıldız




*Dema mirov ji Qoserê diçe Mêrdînê, ev nivîsa 'Xwezî bi dilê wî ku dibêje ez Tirk im' li destê çepê li serê çiyê raserî mirov e.*

û Şirnexê bi taybetî hatine nivîsandin; nivîsên wek 'Berde, lêde, pesnê xwe bide', 'Em wêrek in bihêz in mafdar in' û nexşên wek heyv û stêrê li çiyayan bi kevirên spî boyaxkirî hatine xêzkirin. Wek vana li bilindahiyên derdora sînoran an jî li tabelayan gelek nivîsên ku namûs, welat, sînor û tundiyê di heman hevokê de derbas dikin hene:

'Em ji bo têkoşîna li dijî yên ku dixwazin welatê pîroz yadîgara bavûkalan perçe bikin bi biryar û bi ezîm in' Nivîsa li sînorê Sîlopiyê

'Sînor namûs e' Têketina qereqolên li sînor-Aliyê derve

'Em bê menfaet ji vî welatî hez dikin' Riya Şirnex û Cizîrê cihê saxtîkirinê yê Derbasoka Qesrikê

'Notirvaniya sînor nabe nesîbê her kesî' Tabûra (Gurdan) Sînor a navçeya Nisêbînê- Aliyê hundir

'Xwîna şehîdên me yên ezîz (Fotograf) li erdê nemaye (Nivîsa bin fotoya)' Tabûra (Gurdan) Sînor a Nisêbînê- Aliyê hundir

'Em amade ne ku li dijî yên ku dixwazin welatê pîroz yadîgarê bavûkalan perçe bikin bi xwîn û canê xwe têbikoşin' Sînorê Gundê Yakacikê yê Cizîrê Nivîsa li Çiyê"[362]

Ev herêmên sînor, herêmên ku Kurd tê de ne, herêmên herî paşdemayî û feqîr in jî. Ev bi zanebûn hatiye kirin. Herêmên Kurd tê de dijîn, ji aliyê xwezayê ve bi hemû awayî ji herêmên din dewlemendtir in; dema hebikekî xwestekek pêşxistinê hebûya wê encameke baş bihata bidestxistin. Ji ber wilo kesekî ku hebekî bi zanistî li herêmê binêre wê hemû tiştî ferq bike.

[362] Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik, bnb., r. 117-118

Li Tirkiyeyê herêmên ku bi piranî Kurd lê dijîn herêmên herî paşdemayî ne. Lê ji % 99'ê petrola Tirkiyeyê li herêma başûrêrojhilat, yanî li cihê Kurdan derdikeve. Tenê li herêma Êlihê ji 570 bîran rojê 20 hezar varêl petrol tê derxistin û ev ji sedî 60'ê nefta ku li Tirkiyeyê tê derxistin e. Li her çar welatên ku Kurdistan li hev parve kirine, piraniya petrolê li herêmên ku Kurd lê dijîn dertê. Îro jî ji bo petrola li Kerkûkê di navbera gelek dewletan de pirsgirêkên mezin derdikevin. Tenê ne petrol e jî, erdnîgariya Kurdan li her çar dewletan jî ji aliyê maden, sewalxwedîkirin û çandiniyê ve jî herêmeke dewlemend e. Lê tu feydeyeke wê negihîştiye herêmê. Dijberî vê ev dewlemendî, bi awayekî neyînî li vê herêmê û yên ku lê dijîn vedigere. Çinku sedemeke herî girîng a her tim dagirkirina Kurdistanê dewlemendî û nirxên vê herêmê ne.

Dewlet çavkaniyên li vir vediguhezînin herêmên din û zordarî û paşvemayîn jî dibe para herêmên Kurdan. Erda herî bi bereket û dewlemend a Sûriyeyê erdnîgariya ku Kurd lê dijîn e. Lê dewlet petrola ku li vir dertê û genimê ku li vir digihê hiltîne dibe. Îran jî bi heman awayî ye; tevî hemû dewlemendiya wê, herêma Kurdistanê yek ji herêmên paşdemayî yên Îranê ye.

Mirov dikare bandora van polîtîkayên ku tên meşandin di her qadê de bibîne. Digel van dewlemendiyan ji bo debara xwe bikin berê mirovên herêmê bi piranî didin qaçaxvaniya ku bi xwe re mirinê, seqetbûnê û gelek neyîniyan tîne. Bi taybetî li herêmên sînorê Tirkiyeyê û Sûriyeyê aboriyê li gor sînor teşe girtiye. Yanî sînorên ku malbat, gund û eşîret perçe kirine nan jî di nav xwînê de hiştine.

Di hevdîtinên ku min bi gelek kesan re kirin, min herî zêde ev dipirsî: "Tevî ku ev qas mirin û seqetbûn pêk dihat jî çima hîna ev kar dihat kirin?" Bersiva gelekan jî ev bû: "Karekî din ku me bikira tune bû, yan wê zarokên me birçî bimana yan jî me yê mirin bida ber çavên xwe." Gelek tiştên ku bihatina kirin hebûn lê tune xuya dikirin. Rastiyeke bi tenê hebû; ev mirov ji bo bijîn têdikoşiyan, lê di vê têkoşînê de tiştên ji mirinê xerabtir dihatin serê wan.

Qaçaxvaniya ku derdorên sînor dikir qada pevçûnê, di heman demê de çandeke nû afirandibû. Bi qaçaxiyê ve girêdayî têkilî û vegotinên cuda derketin holê. Di biwêjan de îcar mîna serxet û binxet, qaçaxçî, çaya qaçax û hwd. gelekî cih digirtin. Teqînên li ser sînor bûbûn perçeyek ji jiyana rûniştvanên sînor. Wek ku tiştekî adetî bû. Ev rewş ev qas di civatê de rûniştibû ku, ji hinan re wek ku ji derveyî qaçaxê jiyan nedimeşiya. Heta kesê

ku di nav mayinan de lingekî xwe yan jî perçeyek ji laşê xwe windakiriye jî, dîsa di wê riyê de çûye û hatiye.

Nêrîna li dewleta xwe ya mirovên ku li sînor dijîn, bi bandora tiştên li sînoran diqewimin, bi bandora aliyê din î sînor û atmosfera xweser a sînoran, ji nêrîna hemwelatiyên ku li herêmên din dijîn cihê ye. Ji aliyê din ve gava mirov li sînoran binêre, wê mirov bibîne bê têkiliya dewlet û gel bi hev re çawa ye. Nêrîna rayedarên dewletê yên li herêmê ya li dewletê jî, nêrîna wan a li hemwelatiyan jî, ji ber sînoran ji rayedarên derên din pir cihê ye. Dewlet bi xwe jî li sînoran xwedî pozîsyonên cihê ne. Ji ber vê yekê, ku mirov li tevgera herêmên sînoran binêre mirov dikare nêrîn û têgihîştinên ku hene fêm bike.

Berî hemû tiştî ji ber qaçaxvaniyê herêmên sînor her tim di gelcê de ne. Ya rast bi tiştên diqewimin, bi windakirinên derûnî û bedenî li herêmên sînoran şerekî domdar heye. Ji ber kêmbûna ragihandinê û bi taybetî nebûna-nehiştina lêkolînên der barê mijarê de, berê windahiyên sînoran ji hêla tevahiya gel ve nedihatin zanîn. Her kes tenê ji derdora xwe ya nêzîk agahdar bû; lê hejmara yên ku li sînor dimirin û birîndar dibûn wê bi deh hezaran bihata îfadekirin û wê herêm bi zarokên sêwî, bi jinên bî, yan jî bi kesên ku heta dawiya temenê xwe wê wek kesekî nêvcî bijîn tije bûbûya.

Li derdorên sînoran mijara sohbetan her tim çîroka êşên ku hatine kişandin in: "Tu xaltîka filankesê nas dikî? Cendekê lawê wê li nav zeviya mayinan perçe bûye. Ji ber ku leşkeran destûr neda cendekê lawê xwe bîne, bi rojan wek dînan li derdora sînor geriya. Ku derfet bidîta diket nav mayinan perçe didan hev. Hinekan perçeyên laşê lawik di devê wawikan de dîtine. Dawiyê jinik dîn bû, rebenê..." Erê, ev rastî ne, ev heqîqet in.

Ji aliyekî ve jî mayin bûbûn lîstika zarokan. Zilamekî wiha behsa bîranîneke zarotiya xwe dikir: "Şivîleya me hebû, me nedida hemû derî. Carekê min dît lingê min li ber mayinê ye. Xwêdaneke cemidî bi min ket, ez hêdîka di şûna xwe de du gavan vegeriyam. Min lingê ber mayinê li şûna berê vegerand. Min xwe hêdîka dirêj kir, ji dûrayî ve bi awayê ku destê min bi zor bigihê (divê ez dûr bim, ji bo ku dema di nav destê min de biteqe ez bi hewa nekevim.) Min dora mayinê bi destan veda, de û de û de min mayin derxist. Min mayin li ser destê xwe danî û di ser serê xwe re hilda. Min ji hevalê xwe re got, ez bavêjim we. Hevala kirin qîrîn: 'Kuro tu bavêjî wê biteqe, em ê hemû bên kuştin!' Em zarok in wek lîstikê tê ji me re. Milet li me civiya..."

Me di beşa 'Mayin û Qaçax'ê de hebekî behsa tevgera herêmên sînor kiribû. Me gotibû ku, qaçaxvaniyê bi xwe re tekiliyên cuda afirandin. Di nav

qaçaxvanan de zagonin bi serê xwe hebûn. Dostaniyeke kûr di navbera qaçaxvanan de çêdibû. Gelek qaçaxvaniyan mêrxasiyek danîne ku bûye deng û behs. Ê ku di çûn û hatina li ser hidûd de bitirsiya, ew jê re dibû eybek. Ji aliyê din ve, di nav qaçaxvan û wezîfedarên dewletê de tevger û girêdan an jî dijberiyên cuda derdiket. Herêm parselkirî bûn. Ên ku bi wezîfedarên hikûmetê re têkiliyên wan hebûn xwedî cihekî taybet bûn. Vana hemûyan civat dixist şiklekî din.

Niha bi çend serpêhatî û bîranînan em ê bibînin ku qaçaxvanî bi gelek awayî bandor li têkiliyên herêmên sînor kiriye. Ewil du nivîsên nivîskarê ji Nisêbînê Bro Omerî (Op. Dr. Îbrahîm Yildirim) hene. Bro Omerî li ser rica min, çend meseleyên li ser qaçaxvaniyê yên ku dihat bîra wî nivîsî û ji bo vê xebatê dan min. Yek ji wan meseleyan ev e:

"DERIYÊ HÊVIYÊ

Deriyê navbera Nisêbînê û Qamişloyê deriyê fermî yê navbera du dewletan e. Di wextekê de bûbû deriyê hêviyê; hêviya aborî û tenduristiyê. Berî ku Partiya Baas were ser kar, Sûriye bûbû navenda bazirganiya Rojhilata Navîn. Her cure mal û tişt li wir serbest dihatin firotin. Pirê esnafên Sûka Qaçaxçiyan bi paseport û pasewan bûn. Car caran jî bi nameya îdarî ku ji qeymeqamiyê dihat stendin derbasî Sûriyeyê dibûn. Malê sivik bi xwe re, di derî re derbas dikirin û yê giran radestî hevparên xwe yên li Qamişloyê dikirin, bi dizî (bi qaçaxî û nîvqaçaxî) di hidûd re bi şevê derbas dikirin, dianîn Nisêbînê.

Yên ku bi qaçaxî li hidûdê bi mayin dixistin, gelek ji wan tûşî mayinên çandî dibûn, an giyana xwe ji dest didan, an jî ling û çîmên xwe li ser dikirin û seqet diman. Yên bi nîvqaçaxî ku bertîl didan leşkerên nobedarê hidûd jî gelek caran bi xiyanetê re rû bi rû diman.

Min gotibû deriyê hêviya mefa û tenduristiyê jî bû. Heta van salên dawî jî nexweşxane li Nisêbînê tune bû. Nexweşên giran û bilez (acîl), bi rêdana qaymeqamiyê û ambûlansa binkeya tenduristiyê (saxlik ocaxi) di wî deriyî re derbasî nexweşxaneya Qamişloyê dibûn.

Gelawêja sala 1979'an bû, jixwe havînên bajarê Nisêbînê pir germ in. Wê demê klîma jî tune bûn. Êvaran tu kesî nikaribû di hundiran de debar bikira. Ji ber derdora bajêr gişt avî û baxçe bûn, ku ro diçû ava, derve hinekî hênik dibû. Piştî şîvan temamê şêniyên bajêr derdiketin ser banê xaniyan, şevbuhêrka xwe dikirin û ta sibehê li wir radiketin.

Dîsa şeveke pir germ bû. Her kes li ser banê xaniyê xwe di xewa şîrîn de bû. Qaçaxvanên navçeyê, peyayên mala ... û yên mala ... bi bertîl û agahdariya sitvanê (yuzbaşî) fermandarê Tabûra Hidûd ku bi parêzvaniya hidûd peywirdar (wezîfedar) e, di navbera bajêr û qereqola serê Pira Dîrokî re mal ji Qamişlo derdixistin Nisêbînê, nav malên terefî bajêr. Ji wir jî bi hemalan derbasî malên Taxa Qişlê û malên di ser şiva trênê re dikirin. Haya fermandarê mifrezeya deriyê navbera her du dewletan, serpelê bilind (ustegmen) ji meseleyê tune bû. Dema ji derî bi cîbê dike ku biçe mala xwe, ew û qaçaxvan li rexê pirê bi serî ve li hev diqelibin. Dinêre ku malê qaçax ji ber çem dikişînin nav bajêr. Serpel li wan hiltê, ango destwerdanî wan dike; li hev diteqînin. Qaçaxvan texsîr nakin, wî û leşkerên pê re bi ser hev de dikujin.

Piştî teqînê leşkerên tabûrê gişt tên nav bajêr, bi saetan (ta sibehê) malan, serê banan, serê kuçeyan, deverên xewle û qul û qawêran gulebaran dikin. Gelê bajêr dikeve hev, ji tirsa ku werin kuştin dadikevin hundiran. Li hundirên malên xwe jî nedistirîn, xwe bi zik ve diavêtin erdê, diketin ber dîwaran... Ta sibehê di wî halî de, xew bi çavên wan neket.

Leşker, sibehê temamê qaçaxvanên bajêr yeko yeko ji malên wan berhev dike, dibe tabûrê, binçav dike. Sê rojan pest, lêdan û îşkenceyeke kesnedî li wan dikin. Qaçaxvan tiştekî li xwe heq nakin. Dûre dibihîzin ku seyidê notirvanê karxaneya ta, bi leşkeran re li wan daye. Ew jî piştî hefteyekê tê kuştin."

Ji Bro Omerî bîranîneke din:

"DEREWA JI RASTIYÊ BIXÊRTIR

Hecî Hiseyn, ango Şêx Hecî Hiseynê Kinikê, mirovekî misliman ê di hedê xwe de, bi pîvanên Îslamê bi bizav û tevger, rastgo, bi rih, şaş û cibe, bi sofî û tekî, bi mela û feqe; xelîfe, ango xelîfeyê Şêx Ehmedê Xizna, tobekar, tobedar û di xizmeta ola Îslamê, gel û civaka hêrê de. Zatekî rêzdar ku bi van taybetmendiyên xwe li herêma Mêrdînê, ji layê Misliman, Êzîdî, Cihû û Mesîhiyan ve bi hurmet û heskirî bû.

Ku hûn bi berçavka 'timî ro, di rojhilat re dertê û di rojava re diçe ava' li gera dinyayê binêrin, hûn ê tûşî gelek kend û kosp, asteng û keleman bibin. Gelekê caran berevajî vê jî pêkan e. Li vê gerdûna ku em lê mêvan in, mêvantiyeke xweş û ku layîqê mirovahiyê be û mirov tamekê ji nîmetên vê gerdûnê bike, pêwist e car caran ro ji rojava hilê, di rojhilat re biçe ava.

Ro li nîvro sê mirovên serxetî, her yek buxçikek qumaşê qaçax li nav milê wan, hidûdê navbera Sûriye û Tirkiyeyê derbas dikin lê leşkerê nobedarê hidûd bi wan dihese. Ji ber ku qaçaxvan bê çek bûn, leşker li wan nateqîne, berî ser pişta wan dide ku wan bi destelepkê bigire. Her sê qaçaxvan xwe digihînin nava gundê Kinikê ku nêzî tixûb e û diçin mala Şêx Hiseyn. Dilê Şêx bi wan dişewite, bi lez û bez buxçikên wan radestî maliyan dike ku di nav kinc û rehelên xwe de veşêrin; her yekî şaşikekê dide serê wan û wan li tenişta xwe rûdinîne.

Dema leşker tê, Şêx dibêje: "Ev mirov ne qaçaxvan in, mirîdên min in. Ev ji doh ve li mala min in. Ji torê hatine ku tobeya xwe li nik min nû bikin. Hûn xelet in, biçin li nava gund li qaçaxvanan bigerin." Leşker dibêje: "Şêxê min, qaçaxvan ketin vê malê û jê derneketin; ev mirov in." Her çiqas Şêx dide mandelê jî leşker îkna nabe, wan digire.

Dotira rojê wan derdixin dadgehê, pêşberî dadger. Şêx jî bi wan ve diçe. Yê dadger ji Şêx re dibêje:

Tu dê sond bixwî?

Erê Hakim Beg.

Ser namûs, dîn û îmanê te, ev mirov ne qaçaxvan in?

Ser namûs, dîn û îmanê min ev mirov ne qaçaxvan in.

Kî ne?

Sofî, mirîd û tobedarên min in. Ji pêr ve hatibûn mala min ku tobeya xwe nû bikin. Leşker hat ew ji mala min birin. Min ji wan re got jî, lê li min guhdarî nekirin; ew girtin.

Nexwe mêvanên te azad in. Tu dikarî wan bibî. Dadger dibêje.

Dema şêx bi çend sofî, mela û her sê qaçaxvanan re di korîdora serayê de dimeşiya, leşkerên ku ew girtibûn ji şêx re dibêjin:

Şêx! Tu bi şaşik, rih, cibe, sofî û mele...

Erê kurê min...

Ya star! Tevî van nîşaneyan, te ew zir derew kir. (Bi pêsîra xwe girtibûn û dihejandin.) Ma derewên wilo bi yên mîna te dikevin?

Rast e kurê min; lê ew derewa min ji gelek rastiyan bi xêrtir e."

Piştî bîranînên Bro Omerî niha jî vegotinek ji sînorê Îranê heye. Mirovek 29 salî ku li Bazîdê roja 08.09.2007'an min pê re hevpeyvîn kir ev ji min re gotin:

"Gundê me li ber Girîdaxa Biçûk e. Nêzikî sînor e. Wê demê mala me li gund bû. Em diçûn zozanan. Ez şeş, heft salî me. Du xortan pezê xwe der-

xistibû çêrê. Pez bi 2-3 km nêzikî sînor bûbû, lê di nav erdê me de bûn. Du esker hatin nava zomê û her du xort girtin. Gotin, hûn çima nêzikî sînor bûne. Pêş çavê me, pêş jin û zarokan her du eskeran li wan her du xortan xistin, xistin nav lingên xwe. Pêhin li wan dixistin, pêl wan dikirin; ew qut qutî kirin. Ser çavê wan, dev û lêvên wan hemû werimandin. Kesî nikaribû bigota çima; me li wan dinêrî û dilê me dişewitî. Îro ez difikirim û ez dibêjim, çilo me wilo qebûl dikir. Erdê me bû û pezê me di nav erdê me de diçêriya; wan her du eskeran wilo ji kêfa xwe re ew tehde li xortên me kirin û me dest hilnanî.

Gelek salan bi vî awayî derbas bû. Kes li van deran tune ku tişt bi serê wana nehatiye li ser vî sînorî. Ez deh dozdeh salî bûm. Wê demê mala me li gundê nêzikî hidûd bû. Du lawikên meta min û yekî din gundiyê me bi hev re xwestin her yekê şelek (a ku li nav pişta xwe tişta dixinê.) çayê ji xwe re bînin. Zivistan e, berf e. Dema her sê derbas dibin, şopa wan di berfê de çêdibe. Berbanga sibê kes derbas dibin. Wek saet 2-3'yan de. (Xort nêzikî 30 salî bûn; ya wê bibûna rêncber, an jî wê di hidûd de ji xwe re bisebibîna.)

Nû dibe ronî esker şopa wan dişopînin. Navbera hidûd û gundê me çar pênc saet in (bi meşê). Şop anîn heta gundê me. Gotin, qaçaxçî hatine vî gundî. Ji ber ku berf bû, serme bû tiliyên eskerekî şewitîbûn.

Dema operasyonê îcar gelek esker hatin. Pêşiyê çûn mala muxtar. Gundî hemû derxistin derve, li mala hemûyan geriyan. Berbanga sibehê ye. Ez û xweha xwe tenê li malê bûn. Eskeran pasek li derî xistin û ketin hundir. Gotin, 'Anneniz, babanız nerede? (Dê û bavên we li ku ne?)' Me got, annemiz yok, babamız da asker götürdü (Diya me tune, bavê me jî eskeran bir.) Eskerekî got, 'Günahtır gidelim (guneh in ka em herin.)'

Dema ewîl esker hatibûn, zilam hemû top kirin, birin. Bavê me jî wê demê biribûn. Îcar bi dû de gelek esker hatin û ji nû ve li hemû malan dîsa geriyan.

Merivê me yek ji yê qaçaxçî di mala kalikê min de bû. Mala kalikê min di hemberî mala me de bû. Dema eskeran dikir ku bavê min bibin; di vê navê re, heta bavê min çekê xwe li xwe kir ji diya min re got, "Bi lez here mala bavê xwe, bila filankes xwe ji malê bide alî; qe bê girtin jî tu mal nekeve ber, yan na wê xwediyê malê jî bişewitînin. Diya min xwe vedizî, piştî nifşê esker ê ewil derket, çû mala bavê xwe. Ji wan re got, îcar ê qaçaxçî diçe nav pez, xwe li nav wan vedişêre.

Dema esker dihatin wek guran digirtin ser gund. Li derî jî nedixistin, digotin gurm xwe li deriyan dixistin, diketin ser malan. Ne nofek tenê bûn. Her hinek ji aliyê xwe de her yek bi aliyekî gund ve diçûn.

Zilam hemû birin. Pêşiya gundê me sazliq (qamirî) e. Ev sazliq zivistanê tije av dibe û dibe qeşa. Îcar berf û qeşa tevlihev dibû. Zilam hemû birin wir. Li wir hemû bi çalepikan li ser qeşayê dimeşandin. Xort, extiyar wan zilaman îşkence dîtin. Li ser qeşayê ew dimeşandin. Yekî kal dema li ser berfê bi çalepikan didin meşandin, hemû bi ser de diqîrin. Bavê min jî dibêje, guneh e, extiyar e. Esker bi bavê min de dixeyîde, dibêje, çima tu wilo dibêjî?

Piştî saet bû 9-10 derdor xêz û vêz bû, hinek jin diçûn avê, hin bi heywanên xwe de dadiketin. Pîrika min çekên jinan bir li yê merivê me yê qaçaxçî kir. Zilam bi awayê ku here avê ji malê derket bi kincên jinan û xwe ji çembera eskeran bi dûr xist. Di ber esker re derbas bûbû, tê dernexistibûn. Hebekî ji gund bi dûr ket û wê şevê xwe li wir vedişêre. Cihê ku xwe lê veşartibû jora çiyê bû, gund jê ve xuya bû. Li gund û dora wî dinêre, dibîne ku esker saet 2-3 yê piştî nîvroyê ji gund kişiya û çû.

Li gund hingî îşkence dan xelkê, yekî ji gundiyan navê bavê yê qaçaxçî ji eskeran re got. Eskeran bavê wî girt û birin. Dema sibehê yê qaçaxçî daket gund, pirsî bê çi bû çi nebû, jê re gotin, eskeran bavê te birin. Îcar ew çû teslîm bû. Bavê wî îşkence didît; ku neçûbûya teslîm nebûbûya, di nav gund de wê eyb çêbibûya. Wê bigotina, bavê wî yê extiyar di nav lepên esker de ye ji dêvla wî ve û çawa naçe teslîm nabe. Bavê wî ji bo wî girtîbûn; ji bo bavê xwe xelas bike çû xwe teslîm kir. Îcar ceza danê. Ez nizanim çiqasî girtî ma, nayê bîra min.

Her du qaçaxvanên din xwe xelas kiribûn, çûbûn xwe gihandibûn gundê xwe. Gundê wan di binya yê me re bû. Esker neçûn wî gundî. Ew wilo xelas bûbûn."

Hevpeyvînên ku K. A. li Şamê û li Amûdê bi kesên qaçaxvan re kiribûn me di beşên din de dabûn. Niha jî em ê sohbeta ku li Şamê K. A. bi N. E. re kiriye bidin. Wek ku me berê îfade kir, nav ne yê rast in:

*K. A. :Birayê Nezîrê Evdilkerîm, tu ji xelkê Dirbêsiyê yî, niha tu jî hatiyî Şamê. Me bi Mecîdê Tahir re hevpeyvînek kir. Ji ber ku ew li Amûdê bû, ji me re behsa herêma sînorê Amûdê kir. Me dixwest rewşa qaçaxiyê, qaçaxçiya li herêma Dirbêsiyê ka çawa bû? Çi tê bîra te ji wê çaxê? Tê bîra min ku di 1970 û 71'ê de Tirkan li van deran xindeq li aliyê din kolan. Ji wê çaxê çi tê bîra te ji van meseleyan?*

N. E. : Ev meseleya ku min ji te re got, em ji Xursê hatin, nêzikî Melhûm, em ê bi qaçaxî lêxin.

*K. A. : Karwanê we çiqas bû?*

N. E. : Zêdeyî bîst, sih siwarî bûn, hesp bûn, barkirî bûn giş, tûtin bû û çil ciwange bûn, pêncî şêst berx bûn, berxên dermale û em hatin nêzikî Melhûm.

*K. A. : Melhûm ku der e?*

N. E. : Gundekî Mêrdînê ye li Tirkiyeyê, yê mala Çelebiyan e, Çelebiyê Mêrdînê ne. Ev ên li Amûdê jî giş ên Çelebiyan bûn?

*K. A. : Tabiî Merdînê ne?*

N. E. : Tabiî Qoserê ne.

*K. A. : Erê.*

N. E. : Em hatin, gotin, rê nadin me. Me got, em ê bi qaçaxî lêxin. Bi qaçaxî em nasekinin, em nikarin vegerin wê li me bibe sibe, em ê giş bên kuştin. Em hatin, me got, lawo heft, heşt zilam giş ên bi rişaşe hinik muhafaza siwaran bikin. Hinekan jî got, em ê herin ser hidûd. Ez bi xwe giham ser hidûd, bi xêra ciwamêran. Em hatin viyalî sê heb, çar heb, çar pêncek jî çûn wiyalî û em hatin. Berî ku em bigihên têlê me reşand, me teqîn çêkir.

*K. A. : Ew ji bo çi bû?*

N. E. : Ji bo xatirê ku em nas bikin, bê ka esker di ku de ne. Eskerê Tirkan di kozikan de ye, em fêm bikin bê ka di ku de ne, em ê zanibin em di ku re li hidûd bixin. Em hatin, me dît li rohilatê me bû teqînî. Ku Tirkan kir teqînî, vêca vanê rohilatê me zorî dan wan û wextê li wan reşandin hidûd ji me re vala bû, em meşiyan. Em meşiyan meşiyan, qaşo ez li taliyê bûm; hew carekê min nêrî li ber me li me reşandin.

*K. A. : Ma wan teqîn çênekiribûn?*

N. E. : Sê heb di kozikê de bûn, heta hemû derbas nebûn neteqandin. Paşiya me ketê dûre teqandin, ma îşê reşandinê kirin. De îcar ev malê erînê min ji zarokên xwe re anîbû. Mala F. Î. giş pê zanibûn. Ez çûm odeyê min got, gidyano werin li pişta min binêrin. Pişta min jî xwîn nekiribû, sibhan ji Xwedê re.

*K. A. : Li çi ketibû, çawa?*

N. E. : Ev malê erînê min pêçabû, xistibû ber pişta xwe, ber rextê xwe. Li wî rextî ketibû.

*K. A. : Ew malê erînê qumaş bû?*

N. E. : Erê erê, li qundaxa tivingê ketibû, derbas nekiribû.

*K. A. : Ew ji te re bû star. Wê çaxê ji te pê ve kes birîndar nebû?*

N. E. : Na. De binêr ez ji te re pê de têm. Gule li min ket, ez devdirêjî erdê kirim. Min bi reşaşa xwe -qundaxa wê şikênandiye- nema karim pê berdim.

*K. A. : Wê tu xelas kirî.*

N. E. : Dema em li nav mayinan bûn min bang kir, ji van siwaran, ji van rişaşan yek venegeriya. Ji apê min pê ve kes venegeriya. Got, “Kî ye? Kî ye?” Gotin, “Nezîr e, Nezîr birîndar bûye.” Hat got, “Hela rabe ser xwe.” Ez rabûm ser xwe, min rabû nêrî, tişt bi min ve tune. Min got, tiştek bi dû min ve dikişe, ev roviya min e, çi ye? Min destê xwe avêtê min nêrî ew malê erînê ye. Kiriye wek tu ji dile xwe re li mengenê bixî. Li pişta min geriyaye û gule tê re çûye û hatiye, bê yek e dudu ne ez nizanim, ha yek li rişaşê ketiye şikênandiye. Me nêrî tişt tune ye, em meşiyan. Em hinekî wê de çûn, min nêrî berateyek li erdê ye. Çi ye? Du mih bi ser hev de, gule li wan ketine. Hingî bi erdê re bera didan, gule li wan ketiye. Hîn yek sax bû, apê min got, “Em ê vêna ji xwe re bibin Biniya Xetê, em ê bixwin lawo.” Min got, eyb e, rişaşa min çû, tu yê çawa rahêjiyê, de bimeşe em herin. Ew çû xwe xelas kir, çû Biniya Xetê, em jî hêdî hêdî çûn. Bû sibeh, Silo hebû, mêvanê Amûdiyan bû,

*K. A. : Ew ji ku bû?*

N. E. : Ji Xursa Navê bû, ji jor. Muxbîrî dikir, ji Sûriye û Tirkiyeyê re. Me barê xwe veşart, her barek li derekê. Li Sûriyeyê, her barek li derekê, em bêjin ê min li vir, ê te li dera hanê, hin jê li mintiqa Qitînê, her barek li derekê me veşart. Wî bêbav oxlî bêbavî Siloyê ji Xursa Navê îxbarî da qoçê Qamîşlo. Hamidê hebû li Amûdê,

*K. A. : Erê ez baş nas dikim.*

N. E. : Smaîl jî filê Torê bû, bi hev re ji Qamîşlo du jîb tije esker kirin û hatin. Ez jî nuh gihîştime malê. Min hespê xwe hiştiye û min barê xwe hiştiye ez hatime. Ez bi rohilat re gihîştibûm malê. Saet bûye neh, deh. Min dît carekê du cîb li dora mala me, yek çû mala muxtar, yek hat got, “Kanî mala Nezîr?” Çûn muxtar anîn û hatin. Muxtar got, “Ev mala Nezîr e.” Got, “Were” û ez xistim cîbê. Ji muxtar re got, “Saeta te xweş, îcar ez ê herim.” Ez birim nizaretê, got, “Ka îşev tu ji ku hatiyî, tu yê ji min re bibêjî? Em zanin tu di ku re hatiyî, çawa bûye, çilo hatiye serê te em zanin, tu yê ji me re rast bibêjî.” Min got, tişt li cem min tune ye. Got, “Niha bise em zanin.” Ez birim Qenterê, biniya Dirbêsiyê gundê F. İ. jê re dibêjin û ez anîm Xenamiyê, ez anîm Yarimciyê, li wir jî ez hatim ku Gumruk rêja Amûdê ya Dirbêsiyê bar tev top kirine, heylo heylo! F. Î. got, “Ya Nezîr tu çûbûyî Tirkiyeyê?” Min got na, ez neçûbûm. Got, “Va ye Seîd dibêje, ew çûye.” Seîdê şefê qolçiyan hebû.

*K. A. : Li ku rûdinişt?*

N. E. : Li Amûdê bû. Ma tu kîngê hatibûyî Amûdê?

*K. A. : Ez di 78’an de hatibûm.*

N. E. : Wê çaxê ez ketime hepsê, ev berî te ye. Got, "Va ye wê bê li ruyê te bisekine, wê bêje. Wa ye Seîd bi me re ye." Min got, wê bê ruyê min bisekine? Ez li odeyê danîme bes tu halê min tune ji lêxistinê. Tu li ku dera min dinêrî wek kursiya bin te, reş bûye. Gotin, "Va ye secilandiye, ji Tirkiyeyê hatiye gotiyê, Nezîr e," filan û bêvan, giş gotiye. Min got, ê gotiye ew qaçaxçî ye, ne ez im. Barê me jî çûn. Bû şeş meh ket wê navê dîsa em hatin girtin û saeta te xweş.

*K. A. : A te xweştir. Birayê Nezîr tiştê ku li gor te bihîstiye, te dîtiye ji qaçaxçiyan, ji meseleya ew xelkê dihat kuştin û meytê wan di nav wan mayinan de dima, tiştê wilo di bîra te de tune ye?*

N. E. : Yek ji Dirbêsiyê bi me re bû, me li Barûd xist, te bihîstiye? Ji Serêkaniyê wê de ye, mintîqa Barûd jê re dibêjin. Me li wir xist, em ê di wir re herin Tirkiyeyê. Em çûn gundê Şêx Ehmedê Birşemo, yê xelk bir'î dikir. Em rabûn çûn wê de. Em bi ro hilkişiyan ser gir, em dinêrin bê em ê ji xwe re li ku derê xin, li ku derê rêber wê bê pêşiya me. Me kir nekir rêber nehat pêşiya me. Me got, îşev em ê bi qaçaxî lêxin. Şêx Marûf hebû ji Dirbêsiyê bû. Got, "Ez ê jî bi we re bêm." Me got, de heydê. Em rabûn çûn. Ez serê te neêşînim, wê şevê em ê lêxin.

*K. A. : Kî û kî bûn?*

N. E. : Em dîsa gelek in... Zilam jî hebûn, zilamkok jî hebûn. Zilamê baş serê bergîlê nedigirt. Ê ku mîna min kêm bû serê bergîlan digirt. Ev birayê S. G. jî bi me re bû, muxbîrî li Tirkiyeyê jî dikir û li Sûriyeyê jî dikir.

*K. A. : Wek Silho?*

N. E. : Ji Silho jî xerabtir bû. Li wir Tirkan hat xwe da bendê. Gotin, tu yê herî Sûriyeyê. Ji Sûriyeyê vegeriya hat, çû mintîqa Elok -li cem Serêkaniyê ye- li wir gotin, were. Hat wir, kuştin.

*K. A. : Kuştin?*

N. E. : Erê. Me got, bila her kes serê bergîlê xwe bigire, yên bi tiving bila bisekinin û yên destvala bi serê bergîlan bigirin, birevin herin. Şex Marûf tivingeke Elmanî pê re bû û bi serê bergîlê xwe jî girtiye. Em çûn wek sed, sed û pêncî gavî bê teqîn.

*K. A. : We hidûd derbas kir?*

N. E. : Me hidûd derbas kiriye. Em çûn, gihan wê derê. Tu nabêjî teqwiye di pêşiya me de ye. Eskerê Tirkan li wir pûsî datanî û li aliyê din eskerê piyade datanîn. Digotin heke em qaçaxçiyan di hidûd de negirin, em ê wan li jorê bigirin. Em ketin navbera her duyan. Em çûn bê teqîn, gihîştin sêsed gavî jî. Rêyeke din heye, viya ya ber mayinan e, rêyeke din ew jî ya teqwiyê ye. Tirkan

li wir rêyeke din çêkiriye û li wir me dît got tereq û li me reşandin. Şêx Marûf di cî de ket, li vira wî ket di vir re derket (*cihê derb lê ketiye li ser xwe dide xuyakirin*).

*K. A. : Mir?*

N. E. : Na hîn nemiriye, birîndar bû. Me got, lawo filankes vegerin, lawo vegerin. Lawê apê wî bû; got, "Ez ê jî bêm kuştin, layê apê min e lê ez nikarim vegerim." Min ban kir apê xwe, min got, em vegerin, hema wî bavêjin ser bergîla wî. Got "Ebeden îmkan tune ye, kes nikare vegere." Ez jî min bi serê bergîlê xwe girt, ez lê siwar bûm, me meytê wî hişt û em çûn.

*K. A. : Ew li wir ma? Birîndar?*

N. E. : Erê. Ew li wir ma, birîndar. Esker, projektora wan hebû, ma nayê bîra te? Projektor pê xistin, nêrîn ku meytek li erdê ye. Hatin ser Şêx Marûf, li erdê jî berdanê. Sibehê me malûmat bir Qoserê, me ji ahlê wî re got, ahlê wî çûn ew anîn.

*K. A. : Ahlê wî li Qoserê bûn?*

N. E. : Li Xursê bûn, li Qoserê bûn. Li vir li Dirbêsiyê jî hebûn. Ji Qoserê du seyare girtin û çûn. Gotin, "Layê me ye, xeyîdîbû, li hidûd xistiye hatiye kuştin." Eskeran got, "Qaçaxçî bû!" Gotin, "Na." Debirandin. Meytê wî birin, Şêx Tajdîn heye meytê wî li wir veşartin.

*K. A. : Ma li wir mayin tune bû?*

N. E. : Na li wir tune. Barûd bombe lê tune, vala ye. Mayin li cihnan heye li cihnan tune ye. Texma Ebû Ciradê, jê re dibêjin Xubeyrê, Mexfera Xubeyrê biniya wê ser sed û pêncî gavî niha vala ye, bê mayin e, heyvanê mayinan tê tune ye. Ji berê de Tirkan dananîne. Qelaçik heye cem Miqublê, jê re dibêjin Taşlidere, li wir jî mayin tune.

*K. A. : Spas ji bo vê hevpeyvînê, saeta te xweş.*

Di van bîranînan de mifteyên gelek rewşan hene. Carna hevokek dibe şahidê mijarên pir girîng. Jiyan û tevger zelaltir tê fêmkirin. Loma di navberan de min xwest hin bîranîn û serpêhatî hebin. Wek mînak di serpêhatiyan de jî tê xuyakirin ku qaçax gelek derban bi destê wezîfedarên dewletê hatiye kirin. Lê di heman demê de kemîn li ber qaçaxvanan hatiye danîn, hatine kuştin û dest li ser malê wan hatiye danîn. Ji aliyê gelek wezîfedarên dewletê ve destûrdayîna qaçaxê û şirîkatiya wan her tim dom kiriye. Ev ji aliyê gelek kesan ve hatiye gotin û ev tişt bê gûman e. Ev mijar di gelek çavkaniyên din de jî derbas dibe. Niha di çend çavkaniyan de li ser vê mijarê çi hatiye gotin em bibînin. İsmail Beşikçi, di berhema xwe ya bi navê Pergala Rojhilata

Anatoliyê (Doğu Anadolu'nun Düzeni) de li ser bazara ku di navbera qaçaxvan û leşkeran de pêk tê wiha sekiniye:

"Parêzgeriya Dîlokê daxuyaniyek şandiye kongreya sewalvaniyê ya ku 23'yê Adara 1970'yî de li Enqereyê civiyaye. Di daxuyaniyê de tê gotin ku, welatê me bi taybetî ji bo welatên rojhilata Derya Spî ji bo qaçaxvaniyê herêmeke ku mirov ber bi xwe de dikişîne ye û di der barê pêkhatina qaçaxê de bûyereke balkêş tê vegotin. Mînaka ku xwe dispêre gotinên cendirmeyekî wihan e:

'Cendirmeyekî ku me li otomobîla xwe siwar kir ji me re got ku, sewal bi bazara di navbera qaçaxvan û parêzvanên sînor de pêk tê, di sînor re tên derbaskirin, ev derbaskirin di ciyên diyarkirî de pêk tên, heta ji bo ku baweriya qaçaxvanan bi wan bê heta ku mihan ji sînor derbas bikin esker mekanîzmayên çekan didin wan. Qalûqurtên wek viya di nav gel de jî digerin. Ji bo derbasbûna her sewalekê rayîcek hebûye. Wek mînak serê mihê 10 lîre, serê dewarê 40 lîreyê Tirkiyeyê. Dîsa ji qalûqurtan tê fêmkirin ku li parêzgeriyên sînor, hin kes hene ku heqdestekî distînin û pereyên leşkerên parêzvanên sînor, yên bi vî awayê ku bi rêyên derzagonî bi dest dixin dibin memleketê wan teslîmî malbata wan dikin."[363]

Erdal Sarizeybek di berhema xwe ya navborî de, bûyerên ku van demên dawî li sînorên Îranê pêk tên wiha vedibêje:

"... Gelo li gor ramana we her sal bi milyonan mihên ku ji Îranê tên welatê me çawa tên derbaskirin? bibêjim:

Îran, ji bo polîtîkaya xwe piştgiriyê dide qaçaxvaniyê. Qereqolên Îranê ku tê gotin ji hêla şirketa EN-KA'yê ve hatine çêkirin, wek libên tizbiyê li sînor rêz bûne, ji her tiştê ku bi qaçaxî derbas dibe pere distînin. Lê ji roja ku sînorê Tirkiyeyê û Îranê hatiye diyarkirin heta îro dewleta me tedbîrên pêwîst nestendine. Li sînorê Îranê pergalên ewlehiyê yên wek ronîkirin, xetên rê yên yekemîn û duyemîn (rê hene lê zivistanê tên girtin, riyên çiya yên xam in), mayin û têlên ji bo astengkirinê nehatine danîn.

Bi taybetî piştî zêdebûna xetereya terorê, bi armanca ewlehiya canê leşkerên me, qereqolên cendirmeyan ên li sînor ên ku cihê wan ne baş bûn hatin girtin. Bi qereqolên heyî sînor nikarin bên kontrolkirin. Ji ber vê yekê mih bi rihetî di sînor re derbas dibe. Li gundê pêşî xwedî yan jî navbeynkar tê pêşiya mihan, rasterast dibin ba muxtar. Muxtar daxuyaniyekê amade dike û mihan zagonî nîşan dide. Ji wê derê diçin qeymeqamiyê, ji bo Yekîtiya Xizmeta Gundan (Köylere Hizmet Götürme Birliği) pere didin razandin û

[363] İsmail Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni (Pergala Rojhilata Anadoluyê), r. 276-277

mihan dibin ba beytar. Bi hin bertîlan rapora tenduristiyê tê stendin û paşê destûra rê ya qeymeqamiyê tê stendin û mihên me di qamyonên duqat de ku bi sedan çêdibe, dest bi rêwîtiyê dikin. Êdî tiştekî ku cendirme û polisên di rê de saxtîkirinê dikin, bikin nemaye. Ev mih pêşiyê tên mezbahaya Wanê, li wê derê tên serjêkirin û sewkî nav welat dikin. Hinek jê jî bêyî ku riya wan bi Wanê bikeve derbas dibin. Niha jî min bihîst ku riyeke din hatiye dîtin; êdî li ciyên wek Şemzînan û Elkê mezbaha hatine vekirin, mih bêyî ku bibetilin tên serjêkirin.

Di 13'ê Nîsana 1999'an de, der barê qaçaxiya sewalan de raporek dane Fermandariya Asayîşê ya Wanê û ji vê derê jî, ji bo merciyên têkildar agahdarî pêk hatiye. Li gor vê raporê: Hejmara sewalên ku bi awayekî qaçax bi riya Şemzînan, Elkê û Geverê tên welat nêzî 500 000'î (pênsed hezar) ye. Di wê demê de buhayê wan ê piyasayê 15 trilyon TL. ye û pereyê ku PKK ji vê qaçaxçîtiyê digire tirîlyon û nîvek e.

Dîsa li gor vê raporê; li gor daxuyaniya Qeymeqamiya Elkê, Yekîtiya Xizmetên Gundan 30 milyar TL pere stendiye û hejmara pezê ku derbas bûye nêzî 400.000'î ye. Qeymeqamiya Geverê ji pezê ku sewkî vê yekîtiyê kiriye 110 milyar TL stendiye û Qeymeqamiya Şemzînanê jî 80 milyar TL pere stendiye.

Li gor hejmarên ku li jor hatine dayîn, bi tevahî tu komî ser hev bikî li Elkê 400.000 pez heye gelo? Potansiyeleke ku her sal ev qas pez û dewar bigihîne û bifiroşe heye gelo? Rêveber û beytarê navçeyê qey bi vê yekê nizanin? Zanin. Lê her kes bextewar e. Îran bextewar e, lewre para xwe jê distîne. Xwediyê mal û navbeynkar bextewar in, Yekîtiya Xizmetên Gundan û Yekîtiya Xizmetên Tenduristiyê bextewar in, lewre para ku ji vê qaçaxê ji wan re dikeve bi meqbûzên fermî digirin. PKK jî bextewar e, rêxistin pereyê lazim ê ji bo ji nû ve sazbûnê ji vir bi dest dixe."[364]

Wek me berê jî behsa wê kir, di navbera salên 2001 û 2004'an de li Tirkiyeyê li sînorê Îran, Îraq û Sûriyeyê bi navê 'Rewşa Civakî ya Navçeyên Li Sînor' lêkolînek pêk hat û rêvebera vê xebatê Prof. H. Neşe Ozgen bû. Di pirtûka bi navê 'Ji Kevneşopiyê Ber Bi Dahatûyê Ve Antropolojî' (Gelenekten Geleceğe Antropoloji) de beşek ji nivîsa Ozgen a di bin sernavê 'Antropolojiya Sînor a Aborî: Li Sînorê Sûriyeyê û Îraqê Du Navçe' de heye. Di dawiya vê beşê de wiha dibêje: "Bi serê xwe yan jî wek sazî yên ku di karê dewletê de dixebitin jî, tevî ku karê wan ê fermî astengkirina van karên derqanûnî ye jî, em dibînin ku bi awayekî veşarî ji bo berjewendiya xwe van

[364] Erdal Sarızeybek, bnb., r. 109/118

karan dikin. Tevî ku bi awayekî devkî yan jî nivîskî nehatibe gotin jî, dibe ku polîtîkayên dewletê piştgiriyê didin xebatên bi vî rengî. Ne wek alaveke armancên fermî yan jî armancên ku hatine daxuyandin, di nav kar de dibe ku ji bo hinek derbasbûnan destûr bê dayîn, lê dîsa jî ev nefermîbûn ne ji derveyî fermiyeta dewletê ye."[365]

Gunay Aslan, gava ku bûyera Geliyê Sefo ya ku 33 gundî tê de hatibûn qetilkirin vedikole, li Xalê Xeyro jî, yê ku di dema bûyerê de di nav 100 girtiyan de bû guhdar dike. Xalê Xeyro bûyereke din jî ya ku hatiye serê wî vedibêje. Bûyera Xalê Xeyro, di derbarê rayedarên dewletê de ye, yê ku li sînor peywirdar in:

"Çend sal piştî 33 guleyan bû. Yan 1945 an jî 46 e. Şevekê dîsa ez girtim. Ez birim kirim axokî. Zêde derbas nebû çend 'tawanbarên hevkariya bi min re' jî anîn. Ez, Şukru Bulut û kesên bi navê Şahvelet, Gulmehmet û Settar Arslan bi tawanbariya ku me ji depoyên Gerînendehiya Tekelê ya Sarayê 90 ton xwê diziye girtibûn bin çavan. Qet haya me jê tune ye. Camêran bi şev û roj li me xistin. Em dibêjin wiha nekin, bavê min me nediziye, lê dîsa jî ew li me didin! Ji me re dibêjin, bibêjin 'me di şevekê de diziye'. Me qebûl kir. Zabitek nivîsîn. Me qebûl kir ku, me pênc kesan di şevekê de di quleke ku tenê kesek dikare tê re derbas bibe 90 ton xwê bi gayan biriye Îranê. Em birin Dadgeha Cezayê Giran a Wanê. Dadger dipirse 'niha we bi çend gayan bir?' Ka em nizanin, em bibêjin me bi gayekî bir, gayek herî zêde dikare 90 kîlo xwê hilgire. Ango bi gayekî di şevekê de divê em hezar carî herin Îranê û werin. Ne karê aqilan e, em bibêjin bi hezar gayî dev ji berhevkirina ew qas ga berde, barkirina wan karê mehan e. Me got a baş hûn biryarê bidin, ka me bi çend gayan biriye. Em avêtin girtîgehê. Zar û zêç perîşan in, me ji mal û dewaran hinek firot û parêzerek girt. Parêzer li dosyeyê nihêrî ji Enqereyê venêrîner (mufetîş) xwest. Di vê navberê de em razan û hey razan. Tam piştî heft mehan venêrîner hat. Tu nabêjî Gerînendeyê Tekelê yê Sarayê Abdullah Karabulut, pereyê xwêya ku hêdî hêdî difiroşe li Wanê dide qûmarê. Piştî ku xwê xelas dibe di kaseyê de pere tune, ew û bînbaşi bi hev re rûniştine fikirîne û di dawiyê de biryar dane ku di şevekê de me bi gayekî ev qas xwê biriye Îranê. Heta ku bûyer zelal bû tam di navberê de heft meh derbas bûn, ziyana mal û dewaran li hêlekê lêxistina ku me xwar ji me re kar ma..."[366]

Çend hevokên nivîsa Cevat Ozcanan a 31'ê Kewçêra 2007'an wihan in: "Gava ku mirov ji herêma Rojhilata Anatoliyê ber bi rojava ve tê; wek mînak,

---

[365] Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik, bnb., r. 122

[366] Günay Aslan, bnb., r. 38

tê zanîn ji Colemergê heta derketina Agiriyê herî hindik 8 caran saxtîkirinek zêde ya leşkerî heye. Her otobusa rêwiyan, erebe, qamyonên bar û hwd. bi kinasî her wesayît qul bi qul tê saxtîkirin. Di van venêrînan de derbaskirina tiryakê û tiştên qaçax ên wekî din hema bibêje ne mumkun e. Tevî ku merc wihan in, ji rojhilat ber bi rojava di van saxtîkirinan de ne bi piştgirî û heta hevkariyê be wê çawa malên qaçax karibe derbas bibe. Ev wek bêbextiyekê xuya bike jî rastiyeke hişkere ye. Yanî di pirsgirêka qaçaxvaniya navborî de, wek ku ji bo derdorên rantxur baş e, çav jê re tê girtin. Wekî din hunerweriyeke çawa tê hişê we, ku carinan bi tonan malê qaçax tê derbaskirin."[367]

Li sînoran dîmenin din ên ku bal dikişandin, hevdîtinên li ber sînoran bûn. Piştî gelek salan, deh salên dawî di rojên ʻeydan de destûra hevdîtinê derketibû. Di van rojan de di herêmên sînoran de tevgereke berbiçav çêdibû. Berî rojên hevdîtinê, haziriya hevdîtinê dihat kirin. Bi hesret û bê sebir çav li riya wan kêlîkan diman. Ev hesretên demên dirêj, di wan kêlîkên hevdîtinê de geh dibûn hêsir û diherikîn, geh dibûn qîrîn û ber bi ezmanan ve hildikişiyan.



*Dîmenek ji hevdîtina berê ya li Sînor-Nisêbîn*[368]

Rojên hevdîtinê di sînoran de dîmenên ku ji mirov re gelek tiştan bibêjin derdiketin holê. Berê xelk dihatin ber têlan û li her du aliyên têlan destên xwe ji hev re dihejandin. Li Nisêbînê di saetên hevdîtinê de li her du aliyên têlan însan rêzkirî, xelbexelbek li wan diket; her yekê hewl dida ku dengê xwe bibe xwediyê xwe, nas û dostên xwe. Torbeyê xelata ji hev re di ser serê hev re diavêtin. Dema hevdîtin bû bi destûra ku çend saetan li hev rûnên, dema hevdîtinê destê xwediyan bi kêliyan dima di stûyê hev de û hêsir diherikîn...

[367] www.yuksekovahaber.com
[368] Fot: Selmet Güler

Di vê navberê de divê mirov qala bi pasaportê yan jî bi destûrê derbasbûna di deriyên sînor de jî bike. Bi qasî berê nebe jî bi vê rêyê têkiliyên xwediyan jî didomin. Lê heta îro jî, hîn li Sûriyeyê Kurdên ku nasnameya wan ji wan hatiye stendin nikarin peseportê bistînin û derbasî aliyê din bibin hene. Di sînorê Îranê de jî bi peseport çûn û hatin heye. Di Kewçêra 2007'an de li Bazîdê min bi gel re hinek hevdîtin pêk anîn. Li wir ji min re hat gotin ku, hinek kes bi paseportê gelek caran diçin Îranê. Yên ku heta Tehran û Tebrîzê diçin û têkiliyan datînin ne hindik in. Heta ji ber ku erzan e hin jê nexweşên xwe jî dibin cem bijîşkên Îranê yên ku nasê wan in.

Gava em li bazirganiya ku li deriyên sînor tê kirin dinihêrin, di cih de bazirganiya mazotê ya ku li Deriyê Xabûrê yê Sînor tê kirin tê hişê mirov. Ji sala 1984'an heta sala 1990'î li Deriyê Xabûrê yê Sînor dema mazotê ya serbest bû. Gel pêşiyê dît ku mazota erzan tê anîn, ji bo debara xwe bike çi yî wî hebû firot û kir wesayîteke ku li vê riyê bixebite. Bi vî awayî di demeke kin de bi deh hezaran qemyon di vê riyê de xebitîn.



*Li Deriyê Xabûrê qemyonên mazotê di rêzê de li benda dora xwe ne.*[369]

Ji ber ku avakirinên li sînorên di Kurdistanê de pêk tên û biryarên ku tên stendin ne li gorî gelê herêmê ne, li van deran bi piranî pêvajoyeke domdar a ku pêşxistinê bi xwe re bîne pêk nayê. Vê yekê jî her tim bandoreke neyînî li gelê herêmê kiriye. Di karê mazotê de jî heman tişt pêk hatiye. Bi Şerê Kendavê yê sala 1991'ê Deriyê Xabûrê yê Sînor di cih de hat girtin, bi deh hezaran qamyon man avêtî. Riyên Xabûrê bûn goristana qemyonan. Nehat fikirîn ka wê gel têkeve çi rewşê û ji bo telafîkirina vê rewşê li ser çareseriyê nesekinîn. Di dawiyê de bi deh hezaran mirovên ku bi vê riyê debara xwe dikirin, ji aliyê aborî ve ketin halekî nexweş.

[369] Fot: Osman Yıldız

Xelkê di sînoran de her tim bi rewşên guhertî re rû bi rû ye. Li gorî rewşê, di hundirê rojan de dikare biryarên cuda yên ku bi gelek awayan bandorê li jiyana mirovan bike derkevin holê. Pêvajoya anîna mazotê di 92'yan de dîsa dest pê kir. Lê ji ber rewşa siyasî tevliheviyê dom kir. Derî geh dihat vekirin geh jî dihat girtin. Di 1993'yan de Deriyê Xabûrê yê Sînor dîsa hat girtin, di 1995'an de dîsa hat vekirin. Tevî vê yekê jî salên navbera 1992 û 97'an ji bo Deriyê Xabûrê û bazirganiya mazotê salên herî bi tevger bûn. Hinek çavkanî dibêjin ku, wan deman rojê nêzikî 1500 qamyonî derbas dibûn, lê di salên 2000'î de ev hejmar daketiye 100 wesayîtî. Li gor çavkaniyeke din, di navbera salên 1989 û 1995'an de li herêmê hejmara barkêşan bûye nêzî 50.000'î, lê di navbera salên 1995 û 2002'yan de ev hejmar bûye 63.000. Bi vê tevgerê Qoser bi xeta Hezex-Cizîr-Sîlopî û Xabûrê bi Îraqê ve hatiye girêdan.[370]

Li Deriyê Xabûrê yê Sînor her tim pirsgirêk hebûn. Tirkiye li hemberî 'Herêma Federal a Kurdan' her tim li ser piyan e û giraniyeke zêde dide ser vî 'Derî'yî. Gava di navbera her du aliyan de pirsgirêk derdikevin, pêşiyê rewş xwe li Deriyê Xabûrê yê Sînor dide xuyakirin. Wek mînak, di Avrêla 2007'an de navbera Tirkiyeyê û Mesût Barzanî ne xweş bû, Tirkiyeyê leşker li ser sînor kom kiribû û dest bi amadehiyên operasyona dersînor kiribû. Ji ber vê yekê senaryoyên ku wê ji Deriyê Xabûrê yê Sînor re bibin alternatîf hatibûn rojevê. Di derî de çavsorî dihatin kirin û hwd. Ji ber vê yekê tu carî li vir îstîkrar pêk nehatiye. Bi vî awayî bi deh hezaran kesên ku li ser Deriyê Xabûrê dezgeha kar ava kirine piştrast nebûne û her bi ketin û rabûnê karên xwe domandine.

Di gel ev qas zixtên li ser xelkê Kurd, feqîr û belengazhiştina wan, paşdehiştina wan; xwezaya wan jî di derbê de bû. Her çiqas ji serê sedsala 19'an û pê de şerekî gelek giran di Kurdistanê de hebe û hemû derên wê hatibe xerakirin û talankirin jî, piştî ku Kurdistan bu çar perçe hîn bêhtir bi plan û bi program ev rewş hat meşandin. Cografya Kurdistanê îro bi hemû awayî hatiye talankirin û wêrankirin.

Ku em ji serê sedsalê û pê de dest pê bikin; di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de hema hema her derê Kurdistanê bûbû qada şer û di wan salan de wek xelkê wê, cografya Kurdistanê jî gelek zerar dît. Bi hilweşîna bajar, navçe û gundan re gelek berhemên dîrokî jî hilweşiyan û daristanên Kurdistanê jî ji yekîneyên leşkerî zirareke mezin dîtin. Ji bo çêkirina xwarinê û xwegermkirinê gelek dar hatin birîn. Di wan rewşên pir zor de, riyeke din a mirovên jihaldeketî tune bû. Ev rewş felaketên ku şer bi xwe re derdixistin holê bûn. Lê ji derveyî şer bi zanebûn û bi pergal zirardayîna xwezayê tiştekî din e. Pir

[370] Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik, bnb., r. 120

hişkere bûye ku bi deh salan e daristanên li Kurdistanê tên şewitandin. Cihê dîrokî di bin avê de tên hiştin. Îro tevahiya dinyayê pêwîstiya parastina xwezayê bi lêv dike û ji bo vê yekê bi hezaran sazî dixebitin. Lê bêdengiya li hemberî zirardayîna ku li erdnîgariya Kurd lê dijîn pêk tê, ji bo asta ku mirovahî gihîştiyê nakokî ye. Li vir dîsa gelek pirsên cihê tên hişê mirov...


Piştî ku Kurdistan wek çar perçeyan hat veqetandin bi hezaran donum erda biber hat mayinkirin, bi têlan hat dorpêçkirin û kirin xefik li ber xelkê vekirin. Li sînorê Tirkiye û Sûriyêyê, ji Antakyayê heta Girikê Emo, li 877 km.'yî mayin hatine danîn. Firehiya wê cî bi cî digihîje 350, 500 metroyî. Ev qada ku nêzî 350 hezar dekar e, bi piranî erdên ajotinê yên biber in. Ku ji aliyê aboriyê ve lê bê nihêrîn ev zirareke mezin e. Odeya Ziraetê ya Amedê dibêje, ku ev erd ji bo ajotinê bên bikaranîn wê bi qatirilyonan fêde bigihîje aboriyê.

Ji aliyê din ve hin erdên Kurdan ên pir bedew di destê dewletê de ne. Ji vir sûdeke pir mezin çêdibe lê ew tevde dibe agir û bi ser xelkê wê de dibare. Erda Çewlika Hilberînê ya Serêkaniyê ya Dewletê, ya ku warê bav û kalên Eşîra Miliyan bû 1.761.000 donum e. 60 km sînorê Tirkiye û Sûriyeyê di vî erdî re derbas dibe û bi hezaran donum erd mayinkirî ye. Dîsa jî ev çewlik, çewlika herî mezin a dinyayê ye. Gelek pêdiviyên artêşa Tirkiyeyê ji vir tên bidestxistin. Bi çandiniya xwe, bi hemû awayî ev erd erdekî bêhempa ye. Di serî de genim, nîsk, garis bi sed hezaran ton zad ji vir tê hilanîn. Bi deh hezaran donum darên fisteqan hene. Bi hezaran pez û dewar li vir xwedî dibin. Rastî wê li rexê Sûriyeyê jî bi heman şiklî bi dar û ber û bi çandinî ye. Lê mixabin wek petrolê û gelek dewlemendiyên axa Kurdan, ev jî dibe qeweteke li dijberî wan.



*Çewlika Serê Kaniyê. Tê gotin ku hejmara xezalên li vê çewlikê li dora 1500'î ye.*[371]

[371] http://wowturkey.com



*Di cihê ku mayin hatine paqijkirin çala neftê-Sînorê Nisêbînê*

Me li jorê bi çend hevokan dewlemendiya erda Kurdistanê û ferqa wê hebekî îfade kiribû. Axilbe di warê petrolê de di dinyayê de cihekî girîng digire. Hin axa ku ji aliyê petrolê ve dewlemend e jî di nav cihê ku hatiye mayinkirin de, yanî di sînor de maye. Di malpera bi navê 'Haber Vitrini' de roja 1'ê Tebaxa 2007'an di nûçeya bi sernavê 'Di Axa bi Mayin De Petrol Dipijiqe' (Mayınlı Topraklar Petrol Fışkırıyor) de wiha hatiye nivîsandin:

"Ji 25 bîrên ku Şirîkatiya Anonîm a Petrolên Tirkiyeyê (TPAO) li sînorê Sûriyeyê vedaye, di 21 bîran de petrol tê derxistin. Gerînendeyê TPAO'yê yê Herêma Êlihê Bayram Kara dibêje ku, me di van du salên dawî de li sînor 25 bîr vedane, ji 21 bîrî petrol derketiye."

Ji aliyê din ve, wek ku tê zanîn van demên dawî girîngiya vekolanên arkeolojîk zêde bû û xebatên vê qadê hatin zêdekirin. Di van vekolînan de hat dîtin ku gelek cihên dîrokî li herêmên sînor in û bûne qadên mayinan. Nisêbîna ku bajarê ez û bav û kalên xwe em jê ne û ez niha lê dijîm, li gor daneyên ku heta niha hatine bidestxistin xwediyê rabirdûyeke 6 hezar salî ye. Li gor Strabon di salên li dor berî bi 2 hezarî bajarê herî mezin yek jê Babîl e, yek jê jî Nisêbîn e. Niha beşek bajarê kevn ê Nisêbînê di nav mayinan de maye. Pênc stûnên ku li rex hev rêzbûyî ne û wek perçeyên Dibistana Nisêbînê (yek ji zanîngeha ewil a dinyayê ye) ya ku di sedsala 4'emîn de hatiye avakirin tê zanîn li nav mayinan, di nav têlan de ye. Di heman demê de bermahiyên sûrên bajêr niha li pişt têlan û di qada mayinkirî de ne. Digel hewldanên girîng ên kesên rayedar jî, ji bo vekolana arkeolojîk destûr nehat dayîn. Dîsa gelek berhemên dîrokî yên girîng li qada mayinkirî ya Karkamişê ne. Ev tenê du mînak in. Ev jî aliyekî din ê texrîbata sînor e.



*Dîroka Nisêbînê di nav mayinan de*[372]

Nemiqatebûna cihê dîrokî ne tenê li derdorê sînor hatiye meşandin. Gelek cihên dîrokî roj bi roj hatine xerakirin, hin ji wan jî wek ku me berê îfade kir, di bin ava bendavan de mane. Bajarê dîrokî Heskîfê, ji ber plana avakirina Bendava Ilısû, tevde wê di bin avê de bimîne. Bi vê projeyê ne tenê Heskîf, nêzikî 300 girên ku kaniyên zanîna dîrokê ne, wê bên tunekirin. Bi salan, bi sedan çalakiyên sivîl ji bo bajarê antîk ê Zeugmayê hatin lidarxistin, lê ew jî di bin ava bendavê de ma.

Sûrên Amedê, di dû sûrên Çînê de, di dinyayê de sûrê herî mezin ên 2'yemin in. Bi biryara rayedarên dewletê di sala 1930 û 1931'e de bi dînamîtan dest bi xerakirina sûrên Amedê kirin.[373] Ev qetliameke dîrokê bû. Tu kesê ku hişê wî li serê wî be, vê zirarê nade welatê xwe. Ev tê wateya hêzên ku vana xera dikin, ne xwediyê van hebûn û nirxan in. An na ku ev ax axa mirov be û mirov wilo bibîne, mirov wê bi hemû awayî xwedî lê derkeve.

Jixwe ji serê avakirina Komara Tirkiyeyê û heta niha xerakirin û wêrankirina gundan nesekiniye. Çend mînakên xerakirin û wêrankirinên ku bi destê hêzên eskerî hatine kirin em bibînin. Mînakên di vir de, ne ji hezaran yekê tiştên hatine jiyîn in. Bi van çend hevokan, tenê em ê balê bikişînin ser vê mijarê.

A. Kahraman di berhema xwe ya navborî de qala bûyerên piştî serhildana Şêx Seîd dike û dibêje, di nav armancê de texrîbkirina xwezayê jî hebû: "Welatê Kurdan seranser qada şer bû û di nava agir û xwînê de mabû. Tawanbar û netawanbar yek bûn, nedihatin cihêkirin. Ku ji gundekî yekî bi

[372] Ji arşîva Eslîxan Yildirim
[373] Şevket Beysanoğlu, bnb., r. 9

tenê jî dil dabûya serhildanê yan jî bi çeka xwe beşdar bûbûyayê tevahiya gund dihat cezakirin.

Ku em mînakan bidin; gundên ku tu agahî û têkiliya wan bi serhildanê re tune bûn dihatin şewitandin. Mirovên ku ji gundan dihatin berhevkirin bi komikî dihatin kuştin. Xwezayê jî behra xwe ji şewat û kuştinê distend. Ligel bax û baxçe û zeviyên çandî daristan jî dihatin şewitandin. 'Plana Islahatê' navê kirinên ecêb bû."[374]

Di dema serhildana Agiriyê de jî bi sedan gund hatin hilweşandin, bi hezaran xanî hatin şewitandin. Dema berxwedanên Dêrsimê jî mirov bi komikî dihatin qetilkirin, daristan û xweza dihat texrîbkirin, sewal dihatin telefkirin. Bi kinayî, dikirin ku kes li van qadan nikaribe bijî. Li gor vegotina Dr. Nurî Dersîmî 'hêzên leşkerî yên Tirk, ji ber ku daristan dişewitandin, agir li gelek deverên Dêrsimê belav dibû û bi şev dîmenên kesnedîtî yên çiyayên ji agir derdiketin holê.[375]

Heman rewş li Îraqê jî pêk hatiye. Beriya her tiştî herêma Barzanê gelek caran hatiye xerakirin. Piştî ku Barzanî di sala 1945'an de derbasî Îranê dibin, dewleta Îraqê herêma Barzanê ji binî ve hildiweşîne, daristanan tune dike û herêmê ji mirovan xalî dike.

Di sala 1975'an de jî bi armanca ku tu jîndar nemînin digel gelê wê êrîş li ser xwezaya Kurdistanê jî heye. Di vê demê de nirx yek bi yek dihatin rûxandin, gund û navçe dihatin hilweşandin, bax û baxçe dihatin şewitandin. Di sala 1975'an de piştî ku tevgera Kurdan têk çû li qadên derdorên sînor bi qasî firehiya 10-15 km'yan gundên ku hebûn tevde hatin hilweşandin, gel di qampan de yan jî di gundên stratejîk ên ku artêşê bi rihetî dikaribû kontrol bike hatibû bicihkirin. Bi taybetî li Kerkûk û Xaneqînê ku nîvê petrolê ji wan deran derdiket bi lez û bez Ereb dihatin bicihkirin. Jixwe bi sedan penaber jî derbasî Îranê, cem Kurdên li Îranê bûn. Bi gotina Kerîm Yildiz, "Tevgerên dijmirovahî yên li hemberî Kurdan ji bo leşker û polisên Ereb 'rewa' bûn. Mal, gund û navçe dihatin şewitandin, bi makîneyên hilweşandinê dihatin rastkirin, mal û hebûna wan dihat talankirin, ew bi xwe ji welatê xwe dihatin derxistin, bi qefleyan sirgûnî çolên jêrîn dihatin kirin, Ereb li ser ax û ava wan dihatin bicihkirin."[376]

Di heman derbarê de vegotina Martin van Bruinessen jî wiha ye: "Di sala 1976'an de hikûmata Îraqê bi firehiya 10-20 km'yan dest bi valakirina sînor û sînorê navbera Îran û Îraqê kir. Gund bi tevahî hatin hilweşandin û gundî

[374] Ahmet Kahraman, bnb., r. 192
[375] Ahmet Kahraman, bnb., r. 318
[376] Kerim Yıldız, bnb., r. 12

mecbûr kirin ku li wargehên nû yên nêzî bajaran rûnên. Li bakur gelek gund hilweşandin, darên fêkiyan birîn û bîrên avê xitimandin."[377] Rêxistina Efûyê ya Navnetewî dibêje ku, di sala 1976'an de 60 hezar mêr hatine girtin, hezar û çarsed gund hatine hilweşandin û valakirin, şeşsed hezar kes li qampan hatine komkirin.[378]

Ku em herin salên şerê navbera Îran û Îraqê, tê zanîn ku di heyama vî şerî de li derdorên sînor çekên kîmyewî hatine bikaranîn. Di dawiyê de jî, di salên 1988 û 89'an de rejîma Sadam ji aliyekî ve li hemberî gundên Kurdan çekên kîmyewî bi kar dianî, ji aliyê din ve gundên nêzî sînor dirûxand, Kurd dibirin li navçeyên ku li deştên dûr hatibûn avakirin bi cih dikirin, an jî di qampên nêzî navendên mezin ên wek Silêmanî, Mûsil û Hewlêrê yan jî banliyoyên ku Kurd bi hêsanî tê de dihatin kontrolkirin bi darê zorê dihatin bicihkirin. Vê helwestê heta serê salên 90'î dom kir û di encamê de bi deh hezaran gund hatin rûxandin.

Yanî, heta ku Dewleta Federe ya Kurd hat avakirin, rejîma Sadam her tim malên Kurdan şewitandiye û hilweşandiye. Dîsa rê û zevî hatine mayinkirin, ji bo ku li wê derê jiyan ji nû ve ava nebe çi hewce kiriye hatiye kirin. UNOSP'a girêdayî Neteweyên Yekbûyî (NY) ji sala 1996'an ve bernameyên paqijkirina ji mayinan dimeşîne, ji ber ku bi hejmar û nexşeya mayinên ku li vir hatine danîn nizane zehmetî kişandiye. Di raporên xwe de jî dibêje, di hezar û sed wargehên ku tê xwestin ji nû ve ava bibin, mirov lê bi cih bibin, xizmetên bingehîn ên wek çandinî, av û elektrîkê bên dayîn ku qadeke bi qasî 900 kilometrekareyî ye, sê hezar û çarsed hezar deverên mayinkirî hene. Sekreterê Giştî yê NY'yê dibêje, di sala 1998'an de paqijkirina mayinan pirsgirêkeke mezin e, ev mayin encax di hundirê 35 û 75 salan de dikarin bên danhev.[379]

Em dîsa vegerin sepanên ku li Tirkiyeyê pêk tên. Di dawiya sedsalê de, di van demên ku di navbera gerîlayên PKK'ê û hêzên dewleta Tirkiyeyê de şer heye, nêzikî 7 hezar wargehên Kurdan hatin valakirin. Di vê navberê de gelek gund hatin valakirin, dibistan û binkeyên tenduristiyê hatin girtin. Li gelek herêman daristan hatin şewatandin. Hîna ji bo nîveka duyemîn a salên 1980'yî M. V. Bruinessen wiha nivîsiye: "...veguheztina yên ku li derdora sînor dijîn a ji bo gundên stratejîk didome. Tê xwestin ku li sînor qadeke bêmirov bê afirandin û ev polîtîka li herêmên dûrî sînor jî tên meşandin. Bi ketina meriyetê ya 'Zagona Parastina Daristanan' a nû, pêşiyê wê nîvê

---

377 Martin van Bruinessen, bnb., r. 306
378 Kerim Yıldız, bnb., r. 109
379 Kerim Yıldız, bnb., r. 241




*Salên 1990'î li ser riyên Kurdistana Bakur mirov gelek caran rastî dîmenên wiha dibû.*[380]

gundên li herêma Dersimê bên rakirin."[381] Di berhema bi navê 'Ji Kevneşopiyê Ber bi Dahatûyê ve Antropolojî' de, ji bo gundên ku di salên 1990'î de hatine valakirin wiha tê gotin: "Hejmara gundên ku hatine valakirin 6800 e. Ji vana 3500 ketine rewşeke ku bi tu awayî veger jê re tune be, yan jî tê gotin ku 'ji ber ewlehiyê' wê tu carî destûra vegerê neyê dayîn."[382]

Şewata daristanan hîn jî didome. Di nûçeyeke 15.09.2007'an de wiha dinivîsî: "(Tunceli-DİHA)- Gundên Kozkozulca, Danzî, Derekoy, Amutka û Kozulca yên girêdayî Xozata Dersimê li nêzî navçeyê ji aliyê helîkoptêran ve hatin bombebarankirin û şewata ku bîst roj berê dest pê kiriye bi hezaran hektar daristan tune kir. Dûxana şewata ku hîn dom dike heta navenda navçeyê jî tê."


Me berê gotibû piştî ku gund hatine valakirin mayin lê hatine danîn. Di salên 1990'î de piştî ku şer gur bû dest bi valakirina gundan kirin, derdorên avan, bîr, şiverê (şivîle), riyên ku sewal û mirov tê de derbas dibin, berhemên dîrokî û şikeftên xwezayî bi tevahî hatin mayinkirin. Hatiye fêmkirin ku herêmên herî zêde mayin lê hatine danîn Mêrdîn, Şirnex, Colemerg, Sêrt, Amed, Bedlîs, Êlih, Wan û Çewlik in. Bi vî awayî li tevahiya herêmên ku Kurd lê dijîn, ewlehî tune ye. Ev yek li pêşiya 'vegera gundan' jî astengeke mezin e. Li gor lêkolînên ku herî dawiyê pêk hatine di navbera salên 1990'î û 2002'yan de ji ber bûyerên teqîna mayinan û alavên leşkerî yên neteqiyayî 975 kesî jiyana xwe ji dest daye, 1150 kes jî birîndar bûne.

[380] Fot: Osman Yıldız
[381] M. v. Bruinessen, bnb., r. 372
[382] Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik, bnb., r. 118


*Sêrtê-Berwarî, Sabrî Tunç, dema heywanê xwe diçêrîne mayin pê de diteqe.*[383]

Dîsa qadên ku bi dehsalan e çandinî lê tê kirin û qadên mayinkirî li kêleka hev in. Hema bibêje di nav hev de ne. Ev rewş hem ji bo kesên ku di zeviyan de dixebitin, hem jî ji bo zarokan xetereyeke mezin e. Axilbe erdên mayinkirî yên vekirî, yên di sînorê Tirkiye û Sûriyeyê de tehlîkeyeke pir mezin e.

Li derdorên sînor gelek wargeh hene. Hinek ji vana bi sînor ve ne. Hinek jê perçe bûne, perçeyek li vî alî, perçeyek li aliyê din maye. Ku em li mînaka Nisêbînê binêrin; sê aliyên navçeyê wek kevanekê bi sînoran dorpêçkirî ye, bi têlên bistrî û mayinan. Yanî bi têl û mayinan hêsîr hatiye girtin. Wek ku di wêne de jî xuya dike di navbera hinek malan û têlên sînor de 3-4 gav jî tune.


*Têlên sînor û malên Nisêbînê*


Ev fotograf ji xebata berpirsiyarê 'Projeya Dijberî Teqemeniyên Bermayiyên Pevçûnan û Mayinan a Baroya Amedê' Prz. Sedat Yurttaş hatiye stendin. Di nav têbiniyên wê de ev agahî hene: "Ev Fotograf ji QADA MAYINKIRÎ hat kişandin. Tu tedbîrên ewlehiyê tune ne. Qada mayinkirî û wargehê tenê riyeke bi qasî 2 metreyan ji hev vediqetîne. Wî aliyê sînorê ku 300 metreyî bi başûr de daxistine, navçeya Qamişloyê ya Sûriyeyê ye.

[383] Fot. Ahmet Şık

Rayedaran pêwîstî nedîtiye ku astengiyeke parastinê, bergirtinê û şiyarkirinê têxin navbera gelê Nisêbînê û mayinan.

Mirov dikare vê dîmena sînor û sînor ku di ber malan re diçe, heta çend kîlometreyan bibîne. Ji ber ku vî aliyê sînor di salên 1991'ê de yan jî 1993'yan de 300 metro paşve birine, bi qasî ku xuya dike pêdivî bi têla ku tê dîtin nemaye. Ya girîng ew e ku, sînor 300 metre paşve birine lê mayinên ku ji berê ve binaxkirî ne nehatine rakirin."

Piştî ku sînor 300 metroyî paşve birine û heta niha, gelek bûyer qewimîne, gelek kesan jiyana xwe ji dest daye an jî seqet mane, bi dehan sewal telef bûne. Ji xebata Berpirsiyarê Projeya Dijberî Teqemeniyên Bermayiyên Pevçûnan û Mayinan a Baroya Amedê ku beşek ji 'Hewldana Tirkiyeyeke Bêmayin' e Prz. Sedat Yurttaş, em ê beşên di der barê mexdûrên bi navê Makbule Kaymaz û Harun Elçeoglu de veguhezînin vir.[384]



*Makbûle Kaymaz-Meqo*[385]

Makbule Kaymaz

Keça Hasan û Zeynebê ye. Nêzî 55 salî ye.

Navnîşan: Taxa Yildirimê. Kuçeya Ay. Num:54 Nisêbîn

Tarîxa bûyerê: Mehên havîna 1993'yan

Cihê bûyerê: Navenda navçeya Nisêbînê 'herêma sînor'

"Di dema bûyerê de, dema teqîn çêbû, min li wê derê giha dida hev. Devera ku ez çûbûmê berê herêma qedexe bû, kesî nikaribû têkevê, 'herêma sînor' bû û dora wê têlkirî bû. Lê paşê sînor 300 metre berjêr hat kişandin û ew der jî serbest bû. Di roja bûyerê de dora qada mayinkirî ne têlkirî bû. Her wiha lewheyek an jî notirvanek jî tune bû. Lê min zanibû ku ew dever mayinkirî ye û berê jî li wê derê mayin teqiyane. Lê berî bûyerê wek ku li qadê xebatên mayinpaqijkirinê dimeşandin. Roja bûyerê saet li dora 9'an bû. Ez ketim qadê û pêşde çûm. Min ê ji bo heywanên xwe giha bida hev. Bêyî ku ez tiştekî ferq bikim mayin bi min de teqiya. Ez ketim erdê. Hacer Akkuş (ew bixwe jî piştî vê bûyerê bi du salan di eynî deverê de mayin pê de teqiya û jiyana xwe ji dest da.) nêzikî min heywanên xwe

[384] Rapor, ji aliyê Parêzer Cîhan Guçluk ve di tarîxa 01.10.2003'yan de li Nisêbînê -bi mexdûran re hevdîtin hatiye pêkanîn û fotografên wan hatine kişandin- hatiye amadekirin.
[385] Fot: Ahmet Şık

diçêrand, ew hat bi min ve, ez rakirim nexweşxaneyê. Ez bi dorê li nexweşxaneya Nisêbînê, Nexweşxaneya Dewletê ya Mêrdînê, Nexweşxaneya Zanîngeha Dîcleyê, Zankoya Tipê ya Balcaliyê ya Edeneyê tedawî bûm. Tedawiya min a li nexweşxaneyê bi tevahî 50 rojan dom kir.

Di dema teqînê de ez ji singê xwe û ji lingê xwe yê çepê birîndar bûm û lingê min ê rastê qut bû. Ji ber bûyerê me serî li tu riyên zagonî neda, li dijî me jî tu lêpirsîn an jî doz nehat vekirin. Mêrê min ji zû de wefat kiriye, kurê min min xwedî dike. Ji ber bûyerê min ne ji rêveberiyê ne jî ji dereke din tu alîkarî nestendiye. Hinek tedawiya xwe min bi sîgortaya SSK'yê kir. Yên din jî me bi deyn meynan da. Min bi sîgortaya SSK'yê (mêrê min ji SSK'yê malnişîn bû) lingên protez stend. Niha lingê min ê rastê bi protez e. Di dema bûyerê de em tirsiyan me doz venekir. Em fikirîn me got bila tiştekî din nexwazin bes e."

Ji xebata Sedat Yurttaş mînakeke din wiha dest pê dike:

"Di encama vê bêbalî, bêtedbîrî û kêmasiya giran a ku nêzî qestê ye, li Tirkiyeya sedsala 21'emîn roja 21.05.2001'an Harun Elçeoglu (11) di encama pêlêkirina mayinê de tiliya xwe ya mezin a destê rastê û çavê xwe yê çepê winda kiriye.

Harun Elçeoglu, di sala 1993'yan de hatiye dinyayê. Di pola 4'emîn a dibistana seretayî de xwendekar e. Ji bo ku ji Nexweşxaneya Balcaliyê ya Edeneyê derkeve senedekî bi 1.200.000.000.TL'yî bi bavê wî dane imzekirin. Ji ber ku bavê wî nikaribû senedê bide, dane îcrayê. Ji ber ku daxuyaniya malê xwe nedaye jî 10 roj cezayê hepsê lê birîne, cezayê hepsê kişandiye. Tenê ew e? Bêguman na..."

Li vir divê mirov balê bikişîne ser mijareke din jî. Ji ber ku ez li Nisêbînê dijiyam ez bixwe bûme şahid; tevî ku dihat dîtin mayin diteqin, bi taybetî zarok û sewal dimirin jî çûna wê deverê, devera bi mayin dom dikir. Hinek diçûn devera mayinkirî ji xwe re digeriyan, lê rûdiniştin nan dixwarin. Û gava ku min dipirsî digot, ma hûn nizanin ku li wê derê mayin hene, hûn çima diçin lê rûdinên? Digotin; "Me zanibû lê dîsa jî em çûn lê rûniştin. Tew me henek jî li hev dikir, me derên nêzî xwe nîşan dida û digot, binêre wa ye mayinek. Piştî çend rojan li cihê ku em rûniştibûn bombe teqiya."

Wargeh bi dora xwe re di nav tekiliyê de ne û ji ber vê yekê mirov nikarin xwe bi sînor bikin. Bajarekî ku tê de jiyan hebe, kesek nikare aliyekî wî jêbike û bibêje ji vir û pêve tune ye. Yanî bi gotinê, ew tune nabe û ew sînorkirin her tim wan niştecihan aciz dike. Mirov bêyî ku haya wan jê hebe wê qadê bi kar tînin. Ku astengên fizîkî yên mirovan baş asteng bikin tune bin, mirov bi xwe

nikarin û ber bi wan deveran ve diçin. Ev mijareke ku bi serê xwe lêkolîneke zanistî jê re divê ye. Em niha derbasî bûyereke din bibin.

Bûyerek din heye ku bi gelek awayan xwedî êşeke mezin e. Di vê bûyerê de dîsa di qada ber malan a bi mayin de, bi teqîna mayinan sê zarokan jiyana xwe ji dest dan. Her sê diyên van zarokan ji Binxetê bûn; sînor derbas kiribûn û bûbûn bûkên Serxetê. Her sê bûbûn dê û li malên ber têlan, têlên li ber sînor bûbûn cîran. Di dawiyê de kezeba her sê dayikan bi hev re şewitîbû, di navbera van dayikan û malbata wan de sînor hebû, di sînor de mayin hebûn. Gelek derban bi hesreta mala bavê xwe mabûn, hevdu nedidîtin. Sînor û mayinên destê wan û malbatên wan ji hev diqetand, vê derbê zarokên wan perçe kiribûn. Malbatên wan ên ku bi çend gavan bi wir de bûn nikaribûn bi hawara wan de bên. Kî dizane belkî dengê mayinê çûbû kalik, xaltîk û xalê wan, lê nizanibûn vê derbê dora wan bû.

Em bi van diyan re 06.09.2005'an de peyivîn. Bûyer berî bi 11 salan qewimîbû, lê hîn rivîna dilê wan êşeke mezin dida wan û xuya ye ew êş heta mirinê jî wê dom bike. Me birîna wan nuh kiribû, dema bi me re axivîn hey kela girî di qirika wan de bû.



*Silêman Arik e, yê ku 9 salî bi mayina li ber mala wan, li nav sînor jiyana xwe ji dest da (Nisêbîn).*

Diyek ji van Ş. A. bû û wiha ji me re axivî:

"Navbera nîvro û 'esirê bû. Kurik li malê firavîn xwar û ji malê derket çû. Vegeriya got, ka tiştina ji min re hazir bike em ê ji xwe re herin pîknîkê. Lawikê cîranê me jî bangî diya xwe dikir, wî jî hazirî dikir. Min bang kirê, min got, Elî qey hûn ê herin berajê. Got, na li van deran em ê ji xwe re pîknîkê çêkin. Me torbeyên wan tije tişt mişt kirin û çûn. Qederê nîv saetekê derbas bû, ez rabûm min limêja xwe kir û min got bîstikekê ez ê ji xwe re derkevim.

Min deriyê xwe mifte kir, min dît dengekî teqînê hat, mayin teqiya. Me dît kes nebîne! Zikaka me jî piçekî dûdirêj bû. Min bazda, min xwe li deriyê mala cîranê xwe xist, çengelê wê di pişt de bû; ji hineriya min çengel pekiya, ji ber çû. Ez çûm ber têlê. Her tim xelkê, zarokan ji nav têlê kulîlk didan hev, ji xwe re difirotin. Ev kulîlkên kûmberê (qaparî) dibêjin dermanan ji wan çêdikin, hûn hemû zanin. Ê ku kulîlk didan hev ji nav têlan bazdidan, min got çi bû? Kesî ji min re tişt negot. Pîrekek hat got, jinxalê her sê zarokên te ne. Ya Rebî bê lome, me dît kes nebîne! Ez îcar nizanim bê çi


bi min hat, min nema xwe dît. Ez li wir ketim, av mavin bi min dakirin, ez hebekî bi ser hişê xwe ve hatim. Ez rabûm min xwe avêt nav têlan. Cîrana me û zilamê xwe jî di nav têlan de ne, cîrana min dike ku here keçika xwe bîne zilamê wê nahêle, dibêje mayin e neçe. Ez çûm li pişt serê keçikê sekinîm. Keçik li ser piştê ketiye. Ez çavê xwe li yê xwe digerînim nagerînim ez nabînim. Çekên wî hingî şewitîbûn û ax bi ser de hatibû nêzik bû jî min nedidît. Du xortên cîranê me hatin bi çepilê min girtin ez ji nav têlê derxistim, gotin xaltîkê were yên te di nav wan de nîn in, ne yên te ne. Yê min jî dilê min piçekî xweş bû, min got ê min di nav de nîn e, ez derketim. Keçika me jî baş mezin bû, got, yadê min bi çavê xwe dît, heta min bang kir Silêman! Silêman! Mayin pê de teqiya. Yanî got, di nav de ye.

Dinya rabûbû ji cemseyan, ji eskeriyê, mezinê eskeriyê hemû hatibûn û hingî milet li ber têlan vehewiyabû. Ji wiyalî têlê ji cem qapî û heta aliyê din eskeran bi destê hev girtibûn nedihiştin ku kesek bi nav têlê de here. Digotin, mayin hene wê bi we de jî biteqe.

Gotin, lazim e kes neçe nav têlan. Uzmanê mayinan zanin çilo danîne, encex ew bên herin nav mayinan. Rabû ez anîm malê. Gotin, ew jî ne li vir e, çûye Bagokê. Rabû eskeriyê helîkopter bir û ew anî. Ew hesinekî wan hebû, pê pêşiya xwe saxtî dikirin û çûn laş derxistin. Ê keçikê zû derxistin. Ahlê wê ew biribûn, digotin hîn sax e. Laşê wê hîn germ bû, birin xestexanê. Ilm hat gotin, keçika wan jî miriye. Hîn di nav têlan de miribû. Yê me jî derxistin, şûştin û birin di nav mezel de veşartin. Lawikê min 9 salî bû, sinifa 2'yan xelas kiribû wê çûbûya 3'yan. Lawikê min qapaxa serê wî hatibû hilanîn, laşê wî şewitandibû. Mayin a mezin bû. Mezinê eskeriyê jî maye ecêbmayî gotiye, çawa bi zarokekî encex 30 kilo heye de teqiyaye, yên 70-80 kîlo pê lê bikin encex biteqin. Lawikê min ê jê mezintir jî pê re bû, ew birîndar bû. Qederê sê heyvan me tedawî kir. Ê ustegmen ji zilamê min re got, tu yê gilî bikî? Zilamê min got, na.

Me didît gelek kes diçûn nav têlan, em qet nediçûn. Lawikê min jî tu carên din neçûbû, wê rojê çawa çûbû ez nizanim. Dil min de wê herin barajê. Min ji ku zanibû wê berê xwe bidin nav mayinan. Mayin li pişta xanî danîne. Navbera xaniyê me û hidûd deh metro nîn e. Heqê wan tune bû ku ev qas nêzik mayinan deynin. Têl rakirine sedik erd bi wir de danîne, nobedarê wan jî li wir in û mayin danîne ber xaniyan, tiştek li ber tune. Têl vekirî bûn, zanibûn mayin lê hene û xelk jî dere navê. Piştî mayin teqiyan û zarok mirin ji nû ve têl asê kirin. Berê heywanê mala dişa min ketibû nav mayinan, esker bi xwe li wan reşand ew kuştin. Bi dû wê çaxê de mayin dîsa danîn. Piştî

havînê wilo li zarokên me hat, çele jî mayin bi çêlekekê de teqiya. Kezeba wê hemû li derve bû û li ser linga bû, nediket. Çilo behsa mayinê dibû eskerî, cemse li wir hazir bû. Cemsa wan hat, mêzand ku wa ye kezeba çêlekê ji derve ye. Giriyê me li ser wê çêlekê kir, me digot, niha zarokên me jî wilo li wan hatiye. Vêca esker hatin bi sîlehên xwe sê çar fişek di serê çêlekê de berdan heta ket. Xwediyê çêlekê ne li wir bû, ji xwe dûre pê hisiyabû, bû sibeh hat. Ji yên mihelê re digot, hema we gurandibûya ji bo Xwedê. Me got, goştê wê nema dihat xwarin, perçeyên mayinê ketinê hemû derên wê, yê bixwara jî wê bimira."



*Sîrac Nergiz jî yek ji wan zarokên ku di nav têlan de jiyana xwe ji dest daye.*

Em li vir tenê li ser beşeke navçeyeke biçûk û çend bûyeran sekinîn. Qadên li ber sînor hemû bi van bûyeran rû bi rû mane. Ev tradejî îro jî didome. Wek gelek deverên cîhanê mayinên li sînorên me û li derdora gundan hatine danîn, wek xefika li cihê ku lê veşartî ne gelê sivîl ji xafil de zep dike. Nûçeyên TV'yan ên roja 21.04.2007'an digotin ku, dîsa li Şirnexê zarokan tiştek dîtiye û di destê wan de teqiyaye, zarokek miriye û du zarok jî birîndar bûne.

Ji aliyê din ve, Îran û Tirkiye van salên dawî bombebarana xwe ya li hemberî başûrê Kurdistanê didomînin. Li herêma tampon a ku li sînor pêk anîne, çalakiyên xwe zêde kirine. Her roj bi herikandina ser tixûbê Başûr a bi sed hezaran leşker û alavên teknîkî yên kujer, tê wateya ku herêm her roj ji nû ve tê dagirkirin. Digel van hemûyan Tirkiye û Îran, di hundirê plana herêma tampon de, ji bo dîwarekî li sînor ava bikin amadekariyan dikin.

Vê hewldana nû bi avabûna Herêma Federal a Kurdistanê re dest pê kir. Armanca van hewldanan pêşîgirtina derbasbûna ji sînoran û kêmkirina bandora destkeftiyan a li ser Kurdên li dewletên din e. Îran û Tirkiye dixwazin li sînorên xwe yên aliyê Herêma Federal a Kurdistanê bi kîlometreyan dîwaran lêkin.

Nivîsa rojnameger û nivîskar Îbrahîm Karagul a 5'ê Îlona 2007'an ku der barê vê mijarê de bû, di gelek malperên înternetê de cih girt. Beşek ji vê nivîsê wiha ye:

"Angaşta herî dawî a di der barê tevliheviya ewlehiyê ya li sînor û operasyonên leşkerî de biryara dîwarlêkirina Îranê ya li sînorê Bakurê Îraqê ye. Ji bo rêlibergirtina PJAK'ê û ewlehiya sînor li herêma Hacîumranê

dîwarekî 5 metreyan bilind, 2.5 metreya fireh û 4 kîlometre dirêj wê lê bike û ji bo vê yekê xebat hatiye destpêkirin. Rayedarên Bakurê Îraqê dixwazin ku lêkirina dîwar û herêma tampon a ku wê pê re çêbibe bên rawestandin."

Îbrahîm Karagul, projeya Tirkiyeyê ya dîwarlêkirinê ya ku bi Îranê re hat rojevê jî wiha vedibêje: "... Projeya ku Tirkiye li ser dixebite ne tiştekî bi çar kîlometreyan e, hîn mezintir, berfirehtir û buha ye. Wiha:

Dirêjahiya wî 470 kilometre. Ev xebata hevpar a Hêzên Bejahiyê û Hêzên Hewayî ye. Pêşniyar ji Hêzên Hewayî hatiye. Seranserê sînor wê ne dîwarê bi awayê ku em zanin be. Cihên ku nikaribin dîwar lêbibin wê dîwarên elektronîk termal bên lêkirin. Li seranserê dîwar wê kamerayên normal û ultravîole bên bicihkirin. Bi vî awayî wê li sînor tevdî çavdêriyeke bêrawest pêk bê. Panelên ceribandinê li Gerînendehiya lojîstikê ya Fermandariya Hêzên Hewayî ya li Enqereyê tên hilberandin û hatin ceribandin. Berên saxlem ên ku Hêzên Hewayî ji bo stargehên balafiran çêdike, niha ji bo sînorê Tirkiyeyê û Îraqê tên amadekirin. Lêçûna tevahiya projeyê digihîje 2.3 milyar dolarî.

Gava ku dîwarê Berlînê hilweşiya hatibû gotin ku cîhaneke nû ava bûye. Serdema salên şerê sar a ku li ser tirsa çekan û hêzê ava bûbû bi dawî bûbû. Wê heq û edalet, azadî û xweşhalî derketina pêş. Wê qampên tûj ên li himberî hev û dîwarên qalind ên li ser sînorên dewletên netewî tune bibûna. Tam tiştên dijî van nêrînan pêk hatin. Şer zêdetir bûn, xebitandina hêzê û dagirkirin berfirehtir bûn. Pêleke dagirkeriyê ya nû dest pê kir. Ji hev cihêbûnên etnîk û mezhebî zêde bûn. Encamên herî tund ên tevahiya neyîniyan her tim xwe li erdnîgariya ku em lê dijîn nîşan dan." Nivîskar piştî qala gelek dîwarên ku li Rojhilata Navîn tên lêkirin dike wiha dinivîse: " Ma di sedsala 21'emîn de ku li cîhanê sînor radibin, welatên cuda nêzî hev dibin, yekîtiyên herêmî zêde dibin, li welatên ku li erdnîgariya me ne, lêkirina dîwarên qalind di navbera hêrêman, bajaran, cîranan û malbatan de, tunekirina çi tiştên 'li ser navê pevrejînê', bi hev qirkirin û ji hev bidûrxistina yên ku bi sedsalan e bi hev re dijîn, gelo qeder e?"[386]

Bi cildan mirov binivîse têra bûyer û vegotina qadên sînoran nake. Ev bûyer tevde û tiştên tên jiyîn ji ber sînoran e. Her derê Kurdistanê jî bûye sînor û herêmên sînoran. Dema ev hemû bên fikirîn her kes dikare rewşa ku Kurd tê de ne fêm bike. Di nivîseke çapemeniyê de dihat gotin ku, Rojhilata Navîn niha bi her awayî kirine ku veguhere hepisxaneya gelan. Kurd di nîvê vê qadê de cih digirin. Ji loma di vê qadê de, di nav gelek diranan de Kurd

[386] www.gazeten.com

bêhtir tên perçiqandin û bi her awayî zêdetir tên perçekirin. Ev mayin, têl û dîwar her ku diçe Kurdan zêdetir tune dikin, wan ji hev dûr dixin, di têkoşîna ku ji bo azadiyê dimeşînin de rê li ber wan tên girtin, wan bêhêz dikin.

## BANDORÊN LI SER PSÎKOLOJIYÊ

Bûyer û tevgerên li sînoran pir cihê ne. Ji loma kesên li ber sînoran û li herêmên sînoran dijîn xwedî jiyaneke cuda ne. Her wiha bandorên cuda yên van tevger û bûyeran li ser psîkolojiya mirovan çêdibe. Ev bi piranî bandoreke neyînî ye. Ji ber ku mijar rastûrê derûniya mirovan e di vê beşê de jî bi piranî me cih da serpêhatiyan. Serpêhatiyên ku hin jê gelek mijaran vedihewînin û hewcedariyê ji vegotin û şîroveyan re nahêlin.

Li seranserê sînorê Tirkiye û Sûriyeyê navçeyên wek Nisêbîn û Qamişloyê, Serê Kaniyê û Rasil'eynê yên bi hev ve bi sînoran ji hev hatine qutkirin. Ku sînor bên rakirin yek bajar in. Li her du aliyan xwediyê hev hene, lê bi salan hevdu nedîtin û bi hesreta hev man. Li aliyê din erda bav û kalên wan bû lê nikaribûn herinê, nikaribûn xwedî lê derkevin.

Li Serê Kaniyê di hin cihan de navber bi qasî Nisêbîn û Qamişloyê jî tune. Li her du aliyên riya hesinî ya ku di nava bajêr re derbas dibe bi qasî navbereke du sê metroyan têl hatine gerandin û ev têl bûne sînor. Roja ku ez ji bo lêkolînên vê xebatê çûm Serê Kaniyê, li her du aliyên sînor jî zarok dilîstin û dengê wan tevlihev dibû. Ku ne qedexe bûya, ligel têlan jî wê zarok bi hev re bi gogê bileyîstina. Ew zarok bin jî hatine hînkirin ku bi çavên melûl li heval û xwediyên xwe yên ku bi qasî destê xwe dirêj bikin wê bigihîjin wan nêz in, binihêrin. Zarokek çawa dikare bisekine beyî ku biçe cem zarokên di temenê wî de ne û li hemberî wî bazdidin û bi gogê dilîzin. Vê dîmena bidilêş gelekî bandor li min kiribû lê ya jê bêhtir kezeba min êşandibû, hînbûn û qebûlkirina vê rewşê bû, ev rewş bûbû tiştekî ji rêzê...

Divê ji aliyê zarokan ve ez behsa bîranînên salên zarotiya xwe jî bikim. Dema ku di sînorê Nisêbînê de qaçaxî zêde bû, me li ser xaniyan li derbasbûna qaçaxvaniyan dinêrî. Em dibûn şahidên ku qaçaxçî çewal li nav pişta wan, di nav erdê mayinkirî de xwe diqulizînin û vir de wir de diçin heta derbas dibin. Carna esker li wan diteqand, wan xwe davêt erdê û xwe bê pêjin dikirin. Wek ku me li sînemayê dinêrî. Hema hema her roj li ber çavê însanan şer çêdibûn, birîndar û kuştî hebûn. Îcar zarokan jî li hewşan, li zikakan bi lîstika qaçaxvaniyê dilîst. Zarokan qapalin tavêtin ser pişta xwe, yanî ew barê wan ê qaçaxê bûn û xwe ji kevirekî tavêtin pişt kevirê din. Ên hemberî wan jî esker bûn, ku serê yê ber keviran derdiket dengê wek ê tivingan derdixistin û li wan direşandin. Lîstika zarokên ber sînoran yek jê jî ev bû.

Li gundê Kilîsê yê bi navê Akinci têlên sînor ji malên gund bi du metroyan wir de derbas dibin. Mizgefta gund di nav devera mayinkirî de ye, lê derdora wê nemayinkirî ye. Pencereyên mizgeftê ketine şûna sînor; dem bi dem cendirme, yên ku tên nimêjê dijimêre, di derketinê de jî dîsa dijimêre, dinêre bê ka yên ji Sûriyeyê hatine beşdarî cemaetê bûne yan jî yên ji cemaetê derbasî Sûriyeyê bûne hene yan na.

Em ên ku li derdora sînoran dijîn em bi vana û gelek bûyerên wek vana re rû bi rû ne. Di van qadan de gelek rewşên ne asayî hene. Ev ji bo yên ku ji derve ve lê dinêrin ecêb in, lê ji bo me bûye tiştekî ji rêzê. Ez ji xwe karim minakikê bidim. Dema niha ez difikirim bi min gelekî xerîb tê. Ez nizanim ez çawa şîrove jî bikim. Demên ku ez ji zarotiyê ber bi xortaniyê ve diçûm li Nisêbînê her tim li ser sînor teqandin (şer) hebû. Şevên havînan em ji derve li ser textan li ber dengê sîlehan di xew re diçûn. Ez 13 salî çûm Erzirûmê, ji bo xwendina Mekteba Mamosteyan. Salên ku min li Erziromê dixwend, min dengê teqandinên ser sînor ên bi şev xistibûn kaseta teybê û bi xwe re biribû. Min li wir carê li wî dengî guhdar dikir. Ew deng dengê bajarê min bû, ew deng ez dibirim Nisêbînê. Hevalê min digotin, ev çi deng in? Min ji hevalê xwe re behsa sînor û qewimînên wî dikir û min digot her şev em li ber van dengan radizên. Hevalê min ecêbmayî diman, yeqîn nedikirin; lê ew bûyer ji min re bûbûn tiştekî rojane. Min li wan dengan guhdar dikir û xwe li Nisêbînê hîs dikir...

Ev tenê çend mînakên xetereyên ku bi bandora sînoran çêbûbûn. Sînor bi gelek awayî bandoreke neyînî li ser psîkolojiya niştecîhên herêmên sînoran dikin; bi piranî li ser zarokan. Ji bo lêkolîneke li ser sînoran li Nisêbînê ji xwendekarên lîseyê tê xwestin ku wêneyê navçeya ku lê dijîn xêz bikin. Xwendekarên lîseyê wêneyên navçeya xwe xêz kirin: Pêşiyê têlên raçandî û



*Rê û rê di ber sînor re gelek têl û quleyên wilo yên eskerên nobedar hene. Her roj, her kesên di van riyan re derbas dibin bi van dimenan re rû bi rû ne.*

kuleyên nobedaran hatin xêzkirin, paşê navçe di nav vê dîmenê de hat bicihkirin. Hinekan jî tenê têlên raçandî xêz kirin û gotin 'va ye Nisêbîn' û wisa hiştin.[387]

Niha em dîsa bi riya hin serpêhatiyan bibînin bê çi hatine jiyandin. Bîranîn û serpêhatî gelek tiştan zelal dikin, loma me giranî da wan da em hîn çêtir karibin hin tiştan bibînin. Bîranîneke din a Hutî Aslan ê ku ji Nisêbînê ye wiha ye:

"Li herêmên ku îro Tirkiye ne û Sûriye ne, berê sînor tune bûn û bazirganiyeke xurt hebû. Piştî sînor hat danîn di domkirina vê bazirganiyê de bedelekî pir mezin hat dayîn. Ê ku berî mayin bê danîn bazirganî bi Binxetê re dikir, piştî mayinan jî mirina xwe dida ber çavê xwe û karê xwe berdewam dikir. Hin jê bi raya eskerên nobedar diçûn û dihatin lê dîsa jî bi hezaran kes, an bi fişekên eskeran an jî bi pêlêkirina mayinan hatin kuştin. Bi hezaran kes seqet man, bi hezaran jin bî man û bi hezaran zarok jî man sêwî.

Sibeha piştî şeveke dirêj ku bi xurmîna sîlehan û teqîna mayinê hat derbaskirin, yek ji kesê ber bi mizgeftê de bazdida ez bûm. Ez hîn zarok bûm. Biçûk, mezin, zarok em hemû li hewşa mizgeftê kom bûbûn. Li hewşa mizgefta Zeynelebdin sê laş li ser betonê dirêjkirî bûn. Serê wan perçe bûbûn, destê wan ji wan bûbûn, hestiyên kabokên wan li derve bûn. Gotin û dîtin nabe wek hev. Tiştên li ber çavan em qutifandibûn. Ji kesî deng

[387] Kovara Mehane, ATLAS-Hijmar: 112, Temûz 2002, r. 129

dernediket. Hemû bê deng mabûn li wan cesedan dinêrîn. Belkî xwediyê wan jî li wir bûn, lê ji cendermeyên ku li wir sekinîbûn ditirsiyan û xwe nedidan ser laşan. Ez bawer nakim li tu dera dinyayê destûra ku zarok li wê dîmenê binêrin hebe, lê em li wir bûn... Bi zarotî tiştên ku wê rojê min dîtin tu carî ji ber çavên min neçûn.”

Nivîsa bi navê ‘Zarokê Sînor im’ ya nivîskarê ji Nisêbînê Hasan Kaya jî gelek tiştan bi me dide fêmkirin:

“Ji roja roj de, wê têla bê ser û ber a ku heta çavê min didît her û her dirêj dibû... diçû û hey diçû, ramanên min ên di barê nexşeyan de diteriqandin. Di rojên zarokatiya xwe de, min çavên xwe digirtin û nexşeya ku mamoste, di pola çaran de hînî me kiribû dianî ber çavên xwe. Min her wisa dizanî ku ew dewletên ku di nexşeya dinyayê de hene; hemû bi têleke wekî vê têla ku di nêzikî hewşa me re dibihure, hatine veqetandin. Ay yadê sînor çiqas dirêj in... ji ku dest pê dikin û li ku diqedin? Pirs, pirs û pirs...

Di navbera hewşa dibistana min a seretayî û sînor de metreyek an du metre hebûn. Ango dibistana min li ser sînor bû. Pênc salên min ên gilover li ser sînor derbas bûn. Her çiqas havînê dibistan girtî bû jî, me di hewşa wê de bi gogê dilîst. Dema em diwestiyan, li ber siya dîwêr vedizeliyan, li ber sînor... bi gotineke din me westa xwe li ber dîwarê ku cîranê têla bi dirî û zeviyên bi mayin bû datanî.

Belkî ji ber wê yekê ye ez xwe ‘li ser xetê’ dibînim. Dema hinek dibêjin felankes ‘Serxetî’ ye, an bêhvankes ‘Binxetî’ ye, ji nişkê ve xeta sînorên zarokatiya min dora hişê min dipêçe û goga min diçe nav têla bi dirî û keçek gogê bi rûyekî ken ji min re diavêje, ew pira ku di navbera mala me û binya xetê de, bûye ‘Xet’ ango ‘Sînor’; wekî dîmeneke reş û spî di bîbika çavê min de dadiçike û dernayê.

Lewre ez ‘li ser xetê me’, tu caran nebûm ‘Serxetî’, tu caran nebûm ‘Binxetî’ yanî ne ‘Serxetî’ û ne jî ‘Binxetî’ me. Ji bajarê Nisêbînê me, ku ew cêwîkê Qamişloka têrkeser e.

Hilêlik, Qudurbeg, Taxa Filehan, heçku li ber mala me ne. Dengê melayê mizgefta meheta Qamişlo gelek caran ez ji xewa sibehê rakirime. Pismamê bavê min melayê wê mizgeftê bû. Di dibistana seretayî de, gelek caran goga me diçû aliyê Binxetê, me fediyokî ji keçên xama yên ku li aliyê din aşêf dikir, -lewre li wê derê beşek ji zeviyan ne bi mayin bûn, gundiyên derdora Qamişlo çandinî dikir- goga xwe dixwest. Lê carnan gog, tam di nav têlên bi dirî de dima. Wê demê ew gog ji dest diçû. Çend gogên me di nav têlên bi dirî yê sînoran de man yadê... !

Ew têlên bi dirî ên ku niha di navenda xewnên zarokatiya min de daçikandî ne, 40-50 metroyî dûrî hewşa xaniyê me bûn… Dema qaçaxçiyan li sînor dixist û leşkerên Tirk bi hezaran gule berdidan û fişek di ser textê me yê li ser banî vedayî dibihurîn, me wekî pisîngan di nav nivînan de dipernisand, di binê lihêfê de me çavên xwe digirtin, heta ku careke din em di xew re diçûn… ay yadê xew çiqas şêrîn e…

Li pêşberî mala me, li biniya xetê girek hebû. Jê re digotin 'Goristana Cihûyan.' Herî zêde sed û pêncî metre bû navbera gir û textê ku li ser radiketim. Piştî wextê şîvê çira li ser gir vêdiketin. Min li çirayên vêketî temaşe dikir carnan, heta çavên min diqerimîn û radiketim. Di tariya şevê de sînor tune bûn, lê dengê reyîna kûçikên leşkerên Tirk û dengê sîsirk û beqan têkel bûn.

Reyîna kûçikên nobedaran ne nîşaneya xêrê bû. Dema li ser hev kûçikan bikira ewte ewt, wisa dixuya ku qaçaxçî derbas dibin, an jî derbas bûne… Naxwe dîsa guleyên Keleşkofên qaçaxçiyan û guleyên Geûçên ku tivingên leşkeran in ew ê ezmên biqelêşin. Ay yadê ma çiqas fişek hene… Li ezmanê di ser mala me re, çiqas stêr hene yadê…!

Niha jî ew tevzînokên tirsê di xwîna min de, nefret e, helwest e.. serî hildidin li ber dengê reyîna kûçikan, li ber dengê fişekan. Em bivin nevin, em zarokên sînoran in, mayin û têla bi dirî, kolikên leşkerên Tirk ên nobedariyê, dengê kûçikên sînor, goga di nav têla bi dirî de mayî, ronahiya fişekên ronahîker li ser hişê me nexşeyeke dirandî ye. Em zarokên bajarê ku nexşeya wan hatiye dirandin in.

Ez, zarokê li ser sînoran im… nexşeya zarokatiya min dirandî ye, cawê hişê min bi dengê kûçikên sînor, ronahiya fişekên hewayî û bêhna zeviyên têrmayin û têrbombe hatiye honandin.

Niha jî dema sînor tên ber çavên min, dema bêhna min hildiçike, teng dibe berê xwe didim asîmên… li asîmanekî şîn digerin çavên min… wek asîmanê zarokatiya min. Lê cihê daxê ye…

Ez ne 'Serxetî' me, ne jî 'Binxetî'… 'Li ser xetê' me… Xwediyê xeteke bê al û bê nîşan im…!"

Mirov di nivîsên gelek nivîskarên Kurdan de bandora vê jiyanê dibîne. Axilbe nivîskar û helbestvanê ku ji herêmê sînoran in, di xebatên xwe de li ser mijara sînor sekinîne. Yek ji van nivîskaran Laleş Qaso ye. Qaso ji gundêkî Nisêbînê, ji Zorava ye. Gund nêzikî sînor e û gelek qaçaxvan di vî gundî re derbas bûne. Wek gelek gundên din ên ber sînor, xelkê vir jî di vê derbarê de xwedî gelek bîranîn e. Laleş Qaso jiyana van gundan di Romana

xwe ya bi navê ‘Sê Şev û Sê Roj’ de pir bi hosteyî honandiye. Bîranîneke lehengê Romana navborî psîkolojiya xelkê herêmê pir vekirî dide xuyakirin. Leheng gava ku qala bîranînên xwe dike wiha diaxive:

“Ji wê roja ku van bêbavên romiyan ev mayin danîne û heta roja îro, bi bafîka qaçaxçîtiyê ezabên giran dane me, temamê gundên ser keviya mayinan û xelkê mentîqê. Gava ku Dawidê Osmên hat kuştin tu wî çaxî di pêçekê de bû, qîza min. Û ez jî xortekî di benga xwe de lihevhatî, pir bi difr û paye bûm... Heyvreş bû. Saet li dor yekê şevê bû qiyamet! Mîna ku tu çewalek xwê biavêje tenûrê, wilo fişek teqiyan û dormedor ji hewa de gule bi ser me de bariyan.

Xelkê zarokên xwe ji ser xaniyan revandin hinduran. Lêbelê ez ji ser xênî daneketim. Qaçaxçiyan nav di xwe didan. Dengê navtêdanên wan mûyê laşê min bi carekê ve kiribûn mîna perên sîxuran. Dengê yekî ji wan mîna kewê ribat li ên hemiyan ferq dikir û digot, ‘îşev şeva me kurmancan û eskerê Tirko ye, lêxin! Lê lawo, heta ji we bê tivingên xwe ber bi hewa de berdin. Wan nekujin ku ew jî van gundên dor xetê neşewitînin...’ Di wan kêlîkan de wilo diket serê min ku hema ez jî rahijim tivingê û xwe berdim nav hofka şer, da çend eskerên qûncilik bikujim. Hingî ku dabû ser dilê min. Hîn jî wilo me. Ez wê şevê heta sibehê ranezam. Min dizanibû bê wê sibehê çi bi serê me bînin. Min dikaribû xwe ji ber lêdanê bida alî; lê mîna îro hîn ji wan deman de navê temamê gundiyan li ba teresan qeydkirî bû. Ew ê bihatana gund yek bi yek navê me hemiyan bixwendana û ez ê jî ne li gund bama. Wilo nedibû. Wê her tişt di sitûyê min de bima. Dawiya vê yekê jî kuştineke pir pîs bû!

Şeva ku dîsa qaçaxçiyan bi teqîn li hidûd xistin, di wê şevê de Dawidê Osmên li Nisêbînê mêvanê xezûrê xwe bû. Hîn nezewicîbû, bi dergîstî bû, bêmirado. Ê ne te ne dît bê çi xortekî delal bû! Di temenê Temo de bû. Temo bi sê mehan jê mezintir bû. Dawid mirovekî pir bi edeb û kemlan bû. Di salên ku me û Circîs berberiyeke dijwar bi hev re dikir û me hevdu dikuşt, vî lawikî tu carî xwe neda terefekî û dijminayî bi terefê din re nekir. Lêbelê kuştin. Kuştin lê çawa kuştin! Li Nisêbînê cemseke tije esker digire ser mala xezûrê wî û hay û bayê Dawid jî ji tiştekî tune ye. Xwedê mala Osmên biviritîne, xwe li ber lêdanê negirt, di lêwik hilda û lawik da dest.”

“Ma we nikaribû qasidek bişanda Nisêbînê ku Dawid xwe ji wir bida alî?”

“Na qîza min na. Ma qey îro jî em dikarin gelo? Wê demê jî mîna îro bi sariya sibehê re derdorên gund zeft dikirin û nedihiştin ku çîçikek ji gund derkeve. Îro di gundê Sitilîlê de du, sê terempêl hene. Him terempêl hebana wê bûba çi, wey li vî aqilê min be! Ez jî bi xwe nizanim çima carina ez wilo

xeşîm dipeyivim. Hîn ji berê de, bi şev çûn û hatina terempêlê bêyî emirê qomandarê qereqola hidûd qedexe ye. Ma ne tu jî dizanî keçê. Qey nayê bîra te şeva ku Celîlo  ji eskeriyê hatibû gund, eskerên hidûd dabûn pey wî û ew û şifêrê texsiya ku ji Mêrdînê kirê kiribû, di hundirê malê de bi lêdanan (...) Îcar qîza min eskerên tabûra Nisêbînê Dawid di hundirê malê de qepaçe digirin û wî rast dibin tabûrê. Li tabûrê tam şev û rojekê lê dixin. Piştî ku Dawid dikujin, îcar termê wî tînin li texma gundê me diavêjin nav mayinan.(...) Ronîvro û qiça qiça germa havînê bû. Wawik li ser cendekê Dawid kom bûbûn û cendekê wî ji hev vediçirandin. Gundiyan bi dûrbînê lê temaşe dikirin. Ez bi xwe wê rojê tam sê caran bi ereba heywanan çûm Nisêbînê û hatim; da ku ez ji nêzik de cendekê Dêwid bibînim û çend fatîhan li ser ruhê wî bixwînim. Hey mala min! Gava di cara pêşî de ez di ber term re derbas bûm, wawîkan hinavê wî bi carekê ve xwaribûn û milekî wî revandibûn. Di cara duduyan de, li vegerê serî ji gewde kiribûn û kelax dikevajtin. Di cara sisêyan de min nema dikaribû taqet bikira ku min berê xwe bida mextela bêmirado..."[388]

Cîhan Sîncar a ku di du hilbijartinan de bû Seroka Şaredariya Qoserê, serpêhatiyêke dema zarotiya xwe ya li ser sînor wiha vedibêje:

"Bavê min di sala 1960'î li cem Barzanî pêşmerge bû. Ji aliyê hêzên Îraqê ve hat girtin û spartin Tirkiyeyê. Dema diya min, birê min ê mezin û birayê min ê biçûk, em tenê man li Îraqê me qerar da ku em vegerin Tirkiyeyê. Diya min bi sê zarokên xwe ve da ser riya Sûriyeyê. Dema me sînorê Îraqê û Sûriyeyê derbas kir, diya min rahişt birayê min ê biçûk û birayê min ê mezin jî bi dawa wê ve zeliqîbû, wilo em dimeşiyan. Lê ji ber ku ez gelekî biçûk bûm, ez zû betilîm û di nîvê sînor de ez rûniştim. Diya min bi her du zarokên xwe ve, ciwan û tenê û bi tirsa ku têkeve destê dijmin, bi girî dimeşiya. Taqeta min nemabû ku ez xwe bigihînim wan, min bi dû wan de dinêrî û hêdî hêdî ji min dûr diketin. Di wê navê re jina ku bi diya min re bû, ku tê bîra min nexweş bû, li gel hemû talûkeyan li min vegeriya, ez hilgirtim û ez birim cem diya min. Diya min bi girî ez himbêz kiribûm. Ez wê kêliyê tu carî ji bîr nakim.

Piştî em çûn Sûriyeyê diviyabû em derbasî Tirkiyeyê bibin, cem bavê xwe. Vê carê diya min bi zanebûn karê xwe kir. Bi qaçaxçiyekî ku mal hildigirt re, ji bo dema em sînor derbas bikin rahêje min li hev kirin. Tê bîra min zilamê ku di sînor de rahişt min destmaleke spî li serê wî bû. Di vê demê de jî şer li ser sînor derket, di navbera qaçaxçî û eskeran de. Ez ji mecbûrî bi zilamê ku

388 Laleş Qaso, bnb., r. 19-20-21

ez hilgirtibûm ji diya xwe veqetiyam. Min ew şev ji diya xwe dûr derbas kiribû. Tirsa ku ez ê nema diya xwe bibînim laşê min hemû dilerizand û xew bi çavê min neket. Lê dema bû sibeh ez gihandim malbata min. Sala 1961'ê jî bavê min bi efûya giştî hat berdan."[389]

Sînor cihên ew qas cuda ne û ew qas bandoreke wan a giran heye ku, mirov nizane bê mirov rahêje kîjan û kîjanan. Wek mînak, gelek caran li gundê di hidûd de bi şev kesekî nikaribû şewqên xwe pêxistina, nikaribûn derkevin zikakan. Ev jî dikir ku xelk her tim bêhizûr be, bi tirs be. Li gundekî Sirûcê dema em bi xelkê re li ser mijara sînor dipeyivîn, ji civatê yekî got: "Ê qaçax bikira nekira, li vir cira wî nexweş bû. Bi şev gelek derban dengê sîleh hebû. Esker dihatin gundî didan hev digotin, bêjin qaçaxçî di ku de ne? Îşkence didan xelkê. Digotin, êvaran bila şewqên we tune bin, yan na qaçaxçî dibînin xwe li gund digirin, xwe xelas dikin. Piştî saetekê hatin û çûyina ji gund qedexe bû, yê bihata gerek pêşiyê ji qereqolê re bigota."

Di beşên din de em li ser bandora mayin û qaçaxê sekinîbûn. Bi çend gotinan be jî divê mirov dîsa vê mijarê bi bîr bîne. Hesêb bikin ku mala mirov li ber sînor e. Dengê teqandinekê hat û we fêm kir ku mayin bi yekî de teqiyaye. Dengek ji sînor tê û hûn dizanin ku dengê kesekî birîndar e, lê hûn nikarin herin pê ve. Rojeke din hûn dibînin perçeyek ji laşê di nav mayinan de di devê kûçikekî de yan ê wawikan de û di ber we re derbas bû.

Qaçaxvanekî bifikirin, ku di civata xwe de bibêje: "Me pê li tiştekî kir, reş bû, me xwe lê daqûl kir ku hestiyê însanekî ye, di bin me de şikestiye. Goşt pê ve nemabû, tenê hestî mabûn." Bajarekî bifikirin ku gelek kesên seqet lê hebe...



*Fot: Ahmet Şık*

[389] Rojnameya Evrensel – Pêveka Mêrdînê

Malekê bifikirin, navbera wê malê û sînor du gav in û jê û wir de mayin hene. Her ku zaroka wê malê derkeve, dê û bav wê bi tirs be, wê bifikire û bêje, gelo kêlîkekê em xafil bibin û zaroka me here nav mayinan em ê çawa bikin? Gelek mînakên ku bi çavê xwe dîtine jî hene; zarok bi hewa ketine û her pirtikekî wan bi derekê de pekiyaye... Ma ev tenê! Gelek tiştên ku însên ji însanetiya wan derdixe li sînoran di Kurdistanê de tê jiyîn. Îcar kesekî ku her tim di vê rewşê de be, gelo çi û çi winda dike?...

Gotineke Kurdan heye; dibêjin, 'mirin heye ne bi vê ecêbê.' Mirinên bi mayinan û di nav sînoran de mirinên bi ecêb in. Dîsa em ê vegerin ser serpêhatiyan û bila dengê kizîna kezeba dayikan û qîrîna birîndaran bê me. 3 zarokên malekê derdikevin devê derî, lê piştî bi çend kêliyan di nav sînorê li ber mala wan de mayin bi wan de diteqe. Wan kêliyên tije êşên giran pêşiyê em ji devê dayikê bibihîzin.

X.T.

"Tiştek nema tê bîra min. Ji wextê we duh behs kiriye heta niha ez gelekî têşim, tu dibê qey nuh duh wilo bûye. Lawikê min, wê salê wê lîse bixwenda. Berî bi 11 salan bû, mayin ji nû ve danîn. Berî ku mayina deynin zarok diçûn kulîlk ji xwe re dianîn. Zarok elimîbûn, piştî mayin hatibûn danîn jî dîsa diçûn. Hinan ji wan nizanibûn ku mayin hatine danîn.

Min keçika xwe xist xewê ez jî di ber re di xew re çûm. Tu carî bavê wan li malê nedima, wê rojê bavê wan li malê bû. Em di xew de ne. Dema me his kir xanî di bin me de hejiya. Ez bazdam. Ji min re gotin, zarokên te birîndar bûne. Ya Rebî kesek nebîne, ez nizanim ku keçika min a din miriye. A birîndar ji xestexaneyê anîn, giriya got, yadê xweha min li wir e. Xwedê zane îcar ez û bavê ketin çi halî. Me bi hev girt û em dikin û nakin nahêlin em herin nav têlan, ba cenazeyê qîza xwe. Dibêjin, mayin hene wê bi we de jî biteqin. Keçika me ji me û bi dera hanê de ye, navbera me 2 metro tune ye lê nahêlin em herin bigihênê. Min xwe nedît, hawar hawara me, bi serê kesî de neyê Rebî. Ez şikiriya xwe tînim ku her du zarokên min ên din filitîn.



*Eylem Turay a ku di sînorê Nisêbînê de bi mayinê hat kuştin.*

Esker keçika me li ser piyê xwe kir û anî, got, sax e. Laşê wê germ bû, birînê li tu derên wê xuya nedikir. Dema me bir xestexaneyê, me derba li pişta stûyê wê dît, wek ava spî jê dihat. Otopsiya wê kirin, heta em hatin malê bû muxrib. Min got, dinya xera bibe îşev ez nahêlim hûn veşêrin, bela mêvana me be. Sibehê min jê re gotibû, lawo textê ser xanî bişo. Got, yadê ez ê sibehê bişom; îcar li ser wî textî danîn heta sibehê.

Ez 5 salan ji hundir derneketim. Her kêliyê zarokên min dihatin ber çavên min. Ên li dora min bi min de dixeyidîn digotin, şikiriya xwe werîne, Xwedê her du zarokên te li te vegerand. Xwedê neyne serê kesî."

Eynî Bûyer Ji Devê Keçika Birîndar:

"Nîvro bû. Betlaneya mekteban bû. Bi cîranan re biçûk û mezin em diçûn nav mayinan, me kulîlkên qaparî didan hev. Ez jî zarok im, dilê min bijiya wan, ez bi wan re çûm. Me mayin didîtin, em di ber wan re derbas dibûn me ji hev re digot, binêre va ye mayineke din. Wek ku lîstik bû, em ji mayinan neditirsiyan.

Nîv saetê me qaparî dan hev. Her yek ji me bi aliyekî de çûbû. Her em di ber mayinan re derbas dibûn me digot, binêre va ye yeke din jî. Bi carekê re dengê teqînekê hat, teqîneke ku guhê mirov ker bike. Hemû der bu toz û dûxan; hemû şaş bûn, bazdan. Lawikê ku pê li mayinê kiribû min li hewa jî dît. Em her yek bi deverekê de bazdidin, lê em nizanin bê em bi ku de diçin. Wê demê bêhtir dibû ku em pê li mayinan bikin, me ber xwe jî nedidît, me bi vir de wir de bazdida. Perçeyê mayinê ketine zendê min û stûyê min, lê ez bi xwe nehisiyame. Bi dengê mayinê re milet hemû li ber têlan kom bû.

Min laşê xweha xwe dît, ez ji dest xwe çûm, ez nema zanim min çi kiriye. Porê dirêj li ser bû! Dil wan de hîn sax e, laşê wê li ber rokê germ bûbû.

Her tim, ber êvarî piştî ro diçû ava em diçûn nav têlan. Çinku nîvroyê gelekî germ bû. Nizanim çilo çêbû wê rojê em piştî nîvroyê çûn. Hema hema bêje her roj em diketin nav têlan, me qaparî dida hev. Heta berî teqînê ne bi gelekî mayin nehatibûn danîn. Em elimîbûn, piştî mayin hatin danîn jî em zarokên mihelê tevde dîsa diçûn.

Qenc nayê bîra min, ez di şoqê de bûm. Min nedixwest ez ji cem xweha xwe herim, ez bi zorê birime xestexaneyê. Hemû derên min di nav xwînê de mane.

Dema dê û bavê min hatin ez ji nav têlan derketibûm. Diya min dixwest here ser laşê xweha min, bavê min ew dikişkişand, digot, dibe ku mayin di bin laş de jî hebe.

Gelek xelk hatibûn ber sînor, esker jî li ber têlê bûbûn rêz, nedihiştin kesek bi nav têlan de here. Diviyabû kesên pispor bên laşan derxin. An na dibû ku felaketên xerabtir biqewimin. Piştî ji eskeriyê kesên di warê mayinan de pispor hatin, rê pêş malbatên zarokan kirin ew ji nû ve çûn ser laşê zarokên xwe û anîn. Heta êvarî danheva perçeyên laşê wan dom kir. Tirba wan niha li Nisêbînê li Zeynelebdîn û Mezelê Hecacan e.

Dûre wextekî dirêj me nikaribû em derkevin devê deriyên xwe, li wan têlan binêrin. Piştî bi çend salan hêdî hêdî me bêhna xwe fireh kir û me êşa xwe avêt nava xwe.


Hîn jî yên ku diçin nav têlan hene, ji tiştê ku hatine serê me ji xwe re aqil negirtine.

Piştî teqînê me dîsa têl asê kirin û lewhe li ser xistin. Li ser lewheyê 'ketina nav vir qedexe ye' dinivîse."

Di herêmên sînoran de ji bilî yên ku hatine kuştin, gelek kes seqet mane û piraniya wan zarok in. Hin ji wan dikevin halekî ku nikarin li xwe binêrin û heta sax bin divê kesek li ber destê wan be. Ev bar bi piranî li ser pişta malbatê dimîne. Ji ber ku yekî bi vî awayî xwedî gelek pirsgirêk e, jiyana malbata wî kesî hemû pê re tê guhertin.

Yek ji pirsgirêka herî girîng a kesên ku piştî teqîna mayinan difilitin, pirsgirêkên psîkolojîk in. Mexdûrên ku di bûyerê de destê xwe, lingê xwe, yan jî perçeyekî din ji laşê xwe winda kiribe, ji ber ku karekî li gora wan peyda nabe nikare tu şixulî bike û ji civatê jî qut dibe. Ev însanên ku nebikêrhatî tên xuyakirin û ji derûdora xwe qut dibin, jiyaneke pir zehmet derbas dikin. Ji xwe di dema teqîna mayinê de, tirs û hebitandina ku hatiye jiyîn ji bo psîkolojiya wan bi serê xwe pirsgirêkeke pir mezin e. Dûre jî dibînin ku li ser milê malbata xwe bûne bar, hinek jê têra xwe jî nakin, ji heval û xeyalên xwe bidûr dikevin û hwd. Ev hemû bandoreke neyînî li ser ruhê wan dike. Wek ku me li jorê da xuyakirin malbat jî gelekî pê diêşê û ev, bandorê li ser psikolojiya wan jî dike.

Ehmed Sakîn, yek ji wan zarokên ku ev çend sal in di nav cihan de jiyana xwe derbas dike. Li Nisêbînê mayin pê de teqiya û niha hîn jî li wir dijî. Ehmed di encama teqîna mayinê de ji her du lingan felc bû û ma di malê de. Di eynî bûyerê de birayê wî û yekî din hatin kuştin û tevî wî du kes jî birîndar bûn. Ehmed, hevaltiyan di şibakeya ber livînên xwe de ava dike. Diya wî digot, her ku nifşek zarok mezin dibe diçe, nifşekî din ê biçûk digihên, tên dibin hevalên wî yên ber şibakê. Li wir sohbeta xwe dikin, li halê hev dipirsin.



*Ehmed û hevalên wî yên ber şibakê*[390]

Ji xebata Sedat Yurttaş a ku berê ji hat behskirin, vegotinên li ser bûyera ku Ehmed felc bûye wihan in:

***Ahmet Sakîn:*** Kurê Îbrahîm û Besna
Rojbûn: 1986 Nisêbîn.
Mexdûr ji 10 xwîşk û birayan ê heştemîn e.
Bi teqîna mayina pê de felc bû.

***Osman Sakîn:*** Kurê Îbrahîm û Besna
Rojbûn: 1984
Di bûyera ku birayê wî Ahmet Sakîn birîndar bû, wî jiyana xwe ji dest da.

***Ugur Gumuş:*** Kurê Latîfe û Îsmaîl
Rojbûn: 1984.
Di bûyerê de mir.

***Alaattîn Gumuş:*** Pismamê Ugur Gumuş ê ku di bûyerê de mir. Bi birînên sivik ji bûyerê xelas bû. Niha rewşa wî baş e û dike biçe leşkeriyê. Di laşê wî de birîn an jî windakirina endaman tune.

Mêjûya bûyerê: 15.07.1993

Cihê bûyerê: Navenda navçeya Nisêbînê 'herêma sînor'

Hevdîtin bi Ahmet Sakîn ê mexdûr û diya wî Besna Sakîn re li mala wan pêk hat. Li gor vegotina mexdûr bûyer: "Ez û kekê min Osman, Ugur Gumuş

[390] Fot: Ahmet Şık

û Alaattîn Gumuş, em ber bi agirê ku li cihê bûyerê hatibû pêxistin ve diçûn. Zarokên ku beriya me li wê derê bûn agir pêxistibûn. Lê di dema bûyerê de em bi tenê li wê derê bûn. Dema ku em ber bi agir ve diçûn teqîn pêk hat. Min pê li tu mayinan nekir û min nedît ku yên din jî pê lê kirin. Tiştê ku ez dizanim gava ku em dimeşiyan teqîn pêk hat. Osman û Ugur nêzî agir bûbûn. Ez û Alaattîn li dû wan dimeşiyan. Kitekit nayên bîra min. Bi teqînê re ez ji ser hişê xwe çûme. Gava ku min çavê xwe vekir, li nexweşxaneyekê hewl didan ku delingên pantorê min jê bikin. Li cihê teqînê têl tune bûn û zarok jî bi gogê dileyîstin. Li cihê bûyerê notirvan an jî leşker tune bûn. Ew li jêrtir bûn."

Dayika mexdûr Besna Sakîn bûyerê wiha vedibêje: "Berê jî li cihê bûyerê mayin teqiyabûn. Berî sala 1993'yan ew der bi têlan dorpêçkirî bûn û leşkerên notirvan hebûn. Ketina herêmê qedexe bû. Lê em nizanin bê çawa ew têl hatin hilanîn û herêm serbest bû. Ango zarok li wê derê dilîstin. Niştecihên taxê, pez lê diçêrandin an jî giha didan hev. Ji ber ku li cihê bûyerê têlên saxlem, lewheyên şiyarkirinê yan jî notirvan tune bûn, mirov bi serbestî diçûn wê derê. Ji ber vê yekê 'herêma sînor' a ku berê qedexe bû, îro ji aliyê mirovan ve tê bikaranîn.

Roja bûyerê zarokên min û hevalên xwe gava dilîzin mayin diteqe. Bi teqîna mayinê kurê min Osman Sakîn û Ugur Gumuş jiyana xwe ji dest dan. Kurê min ê din Ehmed Sakîn bi giranî birîndar bûye û hinek endamên laşê xwe winda kiriye. Alaattîn Gumuş jî bi sivikahî birîndar bûye. Osman, ji kezeba xwe birîndar bûye, Ugur jî ji gewdeyê xwe. Tiştek ji laşê xwe winda nekirine. Ji ber vê yekê bi baweriya me teqîn ne ji ber pêlêkirina mayinekê, bi pêlêkirina têleke funyeya mayinên ku wek torê bi hev ve hatine girêdan pêk hatiye.

Di dema bûyerê de Ehmed pola yekemîn a dibistana seretayî, Osman jî pola 4'emîn qedandibû. Ehmed mecbûr ma ku dev ji dibistanê berde. Ji bûyerê û heta niha di nav cihan de ye. Li Nisêbîn, Mêrdînê, 33 rojan li Amedê û 6 mehan jî li Enqereyê li nexweşxaneyeke SSK'ê tedawî bû. Birîn carna kul dibin, edab digirin û em wî ji bo tedawiyê dibin Edeneyê. Piştî bûyerê demekê mesref li ser TÎHV'a (Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê) Îzmîrê tedawî bû.

Kurê min gelek endam ji laşê xwe winda kir û li ser piştê ma. Ji newqê berjêrtir felc e. Şiklê pişta wî bi tevahî hatiye guhertin. Gava kurê min Osman birine nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest daye. Ugur Gumuş jî li Nexweşxaneya Dewletê ya Mêrdînê jiyana xwe ji dest daye. Alaatîn Gumuş bi birînên sivik ji bûyerê xelas bû.

Ez debara xwe bi miaşê malnişîniyê ya ku ji mêrê min maye dikim. Mesrefên tedawiyê hinek ji sîgortaya SSK'ê bûn ên din jî me dan. Ji xeynî şaxa TÎHV'ê ya Îzmîrê me ji tu derê alîkariya tibî yan jî madî ji tu derê nestendiye. Me li rêveberiyê doz venekir. Me serî li riyên zagonî yên wekî din jî neda. Li dijî me jî tu doz û lêpirsîn nehatin vekirin. Di salên 1992 û 1993'yan de gelek teqînên mayinan pêk hatin û di encama van teqînan de gelek mirov û sewal mirin an jî birîndar bûn. Ji bo vana kesî doz venekir. Em jî tirsiyan ku dozê vekin. Em tirsiyan me got, wê zordariyê li me bikin. Piştî bûyerê carekê du caran dîsa têl girêdan di navberê de dîsa rakirin. Herî dawiyê di sala 2002'yan de dîsa têl girêdan. Lê ew têl jî kevn bûn û niha hema bibêje têl nemane. Her tim dibe ku bûyereke nû biqewime."

Gelo pirbûna van bûyerên di salên 1990'î de tesaduf e. Gelek bûyerên li ser sînor diqewimin dizivire tê ser pirsgirêka neteweyê, lê dema bûyer yek bi yek diqewimin gelek kes bîra wilo nabe û qewimîn wek bûyereke rojane tên dîtin. Esas di serê salên 1990'î de agir li her derê Kurdistanê gur bûye. Wek ku di vegotinên berê de derbas bû, di van salan de kuştinên kiryar nediyar jî pir zêde bûbûn. Gelo eleqeya îhmalkirinên ber sînoran jî bi tiştin din tune ye...

Em vegerin ser hîsên bi sînoran ve girêdayî. Hin kes hene, her ku li sînoran dinêrin dilê wan diêşê. Ew mirov, mirovên ku zanin bi van sînoran çi bi serê welatê wan hatiye. Her ku li sînor dinêrin hîs dikin ku sînor Kurdistan perçe kiriye, di heman demê de yê ku perçe bûye û li hev hatiye dabeşkirin netewa Kurd e û bi xwe re gelek pirsgirêk aniye. Têlên li sînor dilê wan birîndar kirine û zanin ku her mayina di sînor de teqiyaye Kurd ji hev belav kirine.

Pêşiyê xeta trênê ya ku bûye sînor û gelek meneya derbasbûna wê çêbûye. Sohbetên ku di beşa 'Mayin û Qaçax'ê de jî cih girtin ên ku li Şamê hatine kirin, beşek biçûk jê wiha bûn:

...

*K. A. : Vî sînorî çi kiriye û çi nekiriye!*

*Birader F'ê Kurd, hûn li Amûdê bûn û bavê te jî beşdarî şoreşa Rehmetiye Şex Seîd bûbû. Hûn jî hevalê wî bûn. Piştî hûn hatin Amûdê, carina jê welat dihat bîra wî û li van sînoran dinêrî, bêhna wî teng dibû. Derdiket bi ber sînor de, li ser sînor wan deran ji xwe re li jorê dinêrî (li aliyê Tirkiyeyê), li welêt dinêrî, li wan çiya dinêrî, li beriyê dinêrî û li şiva hesin dinêrî, keser hiltanîn. Tu jî zarok bûyî, tu carinan pê re diçûyî, çi di bîra te de maye ji wan kêlîkan, ji wê demê?*

F. K. : Belê, her pêlekê derdiketin, wek seyranê diçûn ser şiva hesin. Ew bû, Reşîdê Kurd bû, Evdê Têlo, Usivê Hecî Hisan bû. Ev nifşê ku li Amûdê bûn, wek Qedrî Can bûn…

*K. A. : Ew nifşê ji jor daketibûn. Ew rewşenbîrên Kurd bûn, serhildêrê Kurd bûn. Ew kesên bîrewerê wan bûn.*

F. K. : Belê belê. Wextê Xoybûnê bû. Wê çaxê derdiketin seyranê. Ji ber ku bêriya welat dikirin. Tev ji welat daketibûn, bêhna xwe berdidan. Extiyarên me li şiva hesin dinêrîn keser dikişandin, wilo kesereke kûr, digotin, "Aax, ax! Ev şiva ha li ber çavê me rengê wê sor e, hingî xwîn li ser rijiyaye. Ev welat behr kirine" Keserê dirêj dikişandin.

*K. A. : Dilê wî diêşiya, digot çawa sînor li ser sîngê welat e û perçe perçe kiriye, bûye Serxet û bûye Binxet.*

F. K. : Ew jî wexta ji welêt daketiye di sih û çaran de xwe bi jêr de berdane. Rê nas nedikirin, bi şev dimeşiyan, wê demê bombe hîn nehatibûn danîn. Ew û mifrezeya xwe digihên pê li hesin dikin, ji nû ve nas dikin ku wir Binxet e; bêhna wan derketiye û gotine, em xelas bûne ji zehmetiyê.

Di beşên din de di nav hevpeyvîn û vegotinan de mirov kare gelek mînakên ku bandora sînor û tevgerên wê yên li ser psîkolojiyê bibîne. Wek kesên qaçaxvanî, dema hevalê wî dihat kuştin, an dema esker xayîntî pê re dikir û hwd. Loma me nexwest em li vir jî behsa wan bikin û tiştin dubare bibin. Ev mijar ew qas berfireh e ku hema bi çend hevokan be jî em ê hewl bidin da em balê bikişînin ser gelek aliyên wê. Niha em ê derbasî aliyekî wê yê din bibin. Divê mirov bide xuyakirin ku hîsên kesên nêzikî tixub û yên dûr ne gelekî wek hev in. Hin Kurd hene ku bi xwendin û bi vegotinan dizanin ku sînor hene, lê dema sînoran nabînin û di jiyana wan î rojane de cih nagirin, wê zêde hîs nakin. Lê dema mirov bibîne û nezikî wê bijî dibe tiştekî din.

Di 'Rojên Wêjeyê' de (2006) Kek Îsmaîl Slêman û Ezzat Findî jî li Amedê mêvanên me bûn. Li Şarederiya Mezin a Amedê li ser lingan hevalekî em bi hev dan nasandin. Piştî lihevpirsînê her du rewşenbîrên ji Kurdistana Îraqê hatibûn dest bi vegotina êşa ku bi rê de kişandine kirin. Dema têlê di sînor de, yên li ser singê welêt dîtine pir pê êşiyane. Bi vegotinên wan re agir bi kezebên wan diket. Xuya ye heta niha ev wêne nedîtibûn.

Piştî çend gotinan ez ketim navberê û min got, ez niha li ser sînorê di Kurdistanê de dixebitim, ku wextê we hebe em karin li cihekî rûnên û li ser vê mijarê biaxivin. Em rûniştin û hebekî din bi berfirehî behsa hatina xwe,

dema di sînor re derbas bûne û dema çav li sing û têlên di sînor de ketine çi hest bi wan re çêbûne vegotin. Min xwest van hestên xwe, ramanên xwe ji min re binivîsin. Ji ber bernameyê dema wan tune bû jî, ji min re çend rêz nivîsîn. Ez spasiyên xwe pêşkêşî wan dikim û nivîsên wan bi we re par ve dikim.

**Helbestvan Îsmaîl SLÊMAN HACANÎ**
Serokê Senterê Sêmêlê yê Rewşenbîrî
Sêmêlê-DUHOK

"Dema ez zaro bûm li ber singê diya xwe, cara yekan çavê min bi asîman ketî; min pir hez ji rengê şîn kir û hej ji bilindahiyê kir. Wê çaxê min tenê asîman bi sînorê xwe zanî, an ku cîhan hemû bi memleketê xwe zanî. Lê dema ku ez mezin bûm, digel zarokên gund derketim yariyan û li çol û beyaran li dû hêlînên çivîrkan digeriyam, çaxê girek an zûrek ketibûya pêşiya min, min ew wek sînor dizanibû. Lewra zû bi lez û bez bi ser wan gir û zûran diketim. Çir ku min ji sînoran hez nedikir û dixwest zû wan sînoran bibezînim.

Mala me li gund bû, gundê me li çemê ava mezin (Dîcle) bû. Ez çar salî bûm cara yekan digel dayika xwe çûme bal avê û çavê min bi Dîcleyê ketin; mîna marekî şasiwar dibeziya bi çep û çîr zevî dubir dikir. Wê çaxê min Dîcle wek sînor zanî. Ji min re bû kovaneka mezin; kengî wê rojek bê vî sînorî derbas bikim. Dema bûm heft salî carna bi dizî ji malê direviyam û digel zaroyên ji xwe mezintir diçûm ser rûbarê Dîcleyê, min xwe fêrî avjeniyê kir. Havînan li aliyê din werzên zebeş û xiyaran û şemamokan hebûn. Evên mezin derbasî aliyê din dibûn, ez dixeyidîm û tûre dibûm; divê vî sînorî derbas bikim! Rojekê heta nîvê Dîcleyê çûm, baskên min qerimîn, westiyan, hindik mabû bixeniqim. Lê bextê min spî bû, hind gamêş nêzikî min bûn min xwe bi kurya gamêşekê ve girt heta bêhna min hat û baskên min rihet bûn. Careke din ketim avjeniyê û derbasî aliyê din bûm, şemamokek xwar û hest bi mêraniyê kir ku ev sînor bezand.

Di sala 1971'ê de taze çûme dibistanê. Şansê min baş bû, wê salê xwendinê li başûr bi zimanê Kurdî dest pê kir. Dema mamoste bi jûr diket, min û hevalê xwe bi dengekî bilind sirûda niştimanî (ey reqîb her maye qewmê Kurd zeman, naşikê û danayê bi topê zeman) digot. Me rojê pênc caran digot. Wê çaxê min ji mamosteyê xwe zanî ku welatê me Kurdistan e û Kurd hemû bira ne, yekziman e, hebûna me yek e, mirina me yek e; lê pênc perçe ye, li bin desta ye. Lê tim û tim di mejiyê min da sînor tune bûn, sînor an ku çi? Heta roja 14-11-2006'an

Dema ji Zaxoyê derbasî Silopya bûm hindek kesên ne navê wan bi Kurdî û ne rûyê wan weke Kurdan û ne hizirên wan weka Kurdan tenê, li wê kêlîkê şikestim, hejiyam ku ev sînor e. Dema wan deh gavan ji polêsan ve derbas bûm deşta Silopya bi min re bi Kurdî peyivî, çivîrkên wan bi melodiyeke Kurdî awaz dixwendin, kulîlk û pemboyê wê bi Kurdî sema dikir. Li Cizîrê min Cizîrî û Selwa dîtin; di nav baxê îrem de rûniştî bûn, Zîn û Mem li ser pirê destên wan têk de û dimeşiyan û Xanî pertoka wî di destde bû, ji mizgefta sor derdiket.

Piştî ji Cizîrê bihurîm bi demeke kurt hin stûnikên bejin kurt û pirdirî û têl û sîm milên xwe dabûn hev. Zaroyekî li Qamîşlo yarî dikir û topa wî derbasî xetê bû, giriya û bi hêstiran ve vegeriya malê bê top. Yekî dî li Serxetê dimîzit mîza wî diçû Binxetê. Li Nisêbînê dayikekê lorîk digotin zarokek di dergûşê de li Binxetê radiza. Tirba yekî mirî kêla serê wî li Serxetê bû û kêla piyên wî li Binxetê bû. Hind pîrekan li Nisêbînê pempo diçinî û stranên xerîbiyê digotin û li Binxetê hind pîrekên dî lê vedigerand. Fîtefîta şivanekî ji Dêrika Hemo dihat, li Dêrika Çiyayê mazî deng vedida. Dema ji Nisêbînê borîm her li xwe dizivirîm, ew stûnik û têl û sîm nizim dibûn û biçûk dibûn. Çaxê gihîştim Mêrdînê li xwe zivirîm hemû stûn û xet sorgun û winda dibûn. Ew deşta pan û fireh ji Silopî û Nisêbînê û Dêrik û Serêkaniyê û Deşta Dubanê (Deşta Sêmêlê) warê hesna û mîran heta çiyayê Şingalê dibûn yek perçe. Min destmala xwe bilind kir çavê xwe û hêsirên xwe ziwa kirin û got ax sînor!”

**Ezzat Findî**
Mamosteyê Ziman li Zanîngeha Duhokê

“Di hiş û hizrên min de tu ciyek peyva ‘sînor’ nebû, her ji zarokînî heta mezinbûnê û her ji zarokînî û heta em mezin jî bûn her me şiîrên Melayê Cizîrî û Xanî û Teyran û Cegerxwîn dixwendin û jiber dikirin weke şairên Kurdên mezin, ne weke şairên pişt ‘sînor’, nirxên weke şairên Kurdistanê. Heta li koçberiya sala 1991’ê ji bo derveyî Îraqê em gihîştin devera Hekariyê, me tu sînor li wê derê nedîtin û em darebar nebûn, çunko em her di nav axa xwe de bûn, tu tişt nehat guhertin; lê li roja 14-12-2006’an, dema derbas bûnê ji xala Îbrahîm Xelîl me hin kesên din dîtin, me zimanek dibihîst, me pirs û bersiv dîtin, ev karekî nexweş bû. Çunko yek av, yek ba, yek ax... Heta em gihîştin Cizîrê û dîwarê Birca Belek wisan hilweşiyayî û rûxiyayî dît xemgîniya me pirtir bû. Ji wê xerabtir û kambaxtir ‘sime’ li ser erd û pêşçav di

nav gund û bajaran re diçit; ev ji me re karesateke pir mezin û mezin bû. Ji nû ve me hest bi êş û azarên hewe kir û ji nû ve Şerê Çaldiranê û dabeşkirina welat hat pêş çavê me, paşê Şerê Cîhanê yê Yekemîn ka çi bi serê miletê me hat. Lew ez dibêjim êşa sînor a li ba we ji nû ve hat cem me!”

Em bi nivîseke Nivîskara Xort Sîdar Yîgît (Niha li Swêdê dijî) ku di 20.01.2007'an de nivîsiye dawiyê li bîranînan bînin:

“Sînor; Serxet û Binxet

Bajarên din ên welatê min, li min negirin, bihêlin ez hinekî ya dilê xwe bêjim. Qamişlo nazdar û ezîz e, şîrîn e li ber dilê min.

Bajarê yekem piştî Nisêbînê, ku ez navê wî fêr bûm, Qamişlo ye. Girêdaneke taybet a Nisebînê bi Qamişlo re heye û bi vê ve girêdaneke min Nisêbîniyê jî bi Qamişlo re heye. Girêdaneke wiha ku Nisêbîn û Qamişlo hev tînin bîra min. Weke du cêwiyan in Qamişlo û Nisêbîn.

Ji gundê zaroktiya min, dema şevên havînan, ji ser xênî, me her dem berê xwe dida aliyê ji rêya Hevrêşim û wir de, ronahiyên aliyê binê xetê ve û digot ‘wê derikê Qamişlo ye’. Bi bilêvkirina ‘Qamişlo’ re awirên çavên me bi wate dibûn. Her çiqasî ne dûr bû jî, çavên me bi wateya hesretekê, li dûrahiyekê dinêrîn. Qamişlo bi qasî nêz bû ew qasî dûr bû. Sînorê nemayî ew dûrî rave dikir lê tevî wê jî me Qamişlo ji nêz ve hest dikir.

Em ji mezinan fêr bûbûn ku meseleyeke vê Qamişloyê heye, lê çi bû, me di nava salan de fêm kir. Me baştir fêm kir çima ew nêrîna li wî aliyî bi wate ye. Erê, me fêm kir ku li Nisêbînê hal û dewran e û li Qamişlo hewal û ferman e. Me fêm kir ku ew, bêdil, ji hev hatibûn cûdakirin, xeteke ji ‘stiriyên hesinî’ di nava wan de hatibû kişandin û mayinên kor û bêbext di erda wan a hevbeş de hatibû çandin. Me fêm kir ku qedera wan bi hev ve hûnandî ye û êşa yekê ya din e. Me zû û baş wateya gotinan fêm kir; di ‘Qamişlo, bajarê evînê’ de evîndariya Nisêbîniyan û di ‘Nisêbîna rengîn’ de jî evîna Qamişloyiyan veşartî ye.

Sînor. Ew bû ewanê di navbera wan her duyan de, di navbera vî aliyê xetê; Serxetê û wî aliyê xetê; Binxetê de. Erê, xetek hebû. Û erê, ser û binê xetê hebû. Lê Serxet û Binxet ji xetekê zêdetir behsa serekê û binekê dike. Wateya gotinê hemû di vê de ye; xet di navbera yekbûna wan de hatibû kişandin. Lê vê xeta xwedênehiştî dîsa behsa têkiliya di navbera wan de dikir. Behsa qedera wan a bi hev ve hûnandî dikir.

Belkî jî trajediya cudabûnê û hesreta yekîtiyê ya Kurdan di ser û binê xeta di navbera wan her du bajaran de zêdetirîn hestbar e. Nisêbîn hest dike dema dibêje 'Qamişlo'. Dil bi dilan dizane. Rojên eydan, di 'gorişmeyan' de çav li çavan digere û torbe li hewa dizîzikin û bi vî aliyî û wî aliyî ve difirin aliyê din ên sînorê xayin î ewan. Halhal û qîrîna xwedî û dostan digihîje ezmanan. Ew qelebalixa ku çêdibe bi xwe bûye parçeyek ji pîrozbahiyên eydê.

Gelek serpêhatiyên Serxetiyan, ên ehlên Nisêbînê bi Binxetiyan, ehlên Qamişlo ve girêdayî ne. Biwêjên mîna 'wesîqe', 'çaya qaçax', 'qaçaxçiyên zemanê berê', 'hepriyên rengareng ên hevrêşim' û 'qutikê çox ê li ser kiras û xeftanan' ku li Binxet û Serxetê girêdidan, di hişmendiya Serxetiyan de cihê xwe kûr girtine.

Belkî carna Binxetê ji kerbê dinyayê xweziya xwe bi cewrikên guran aniye, lê bawer bikin ew tenê birayê şîrîn û jîr e. Carna jî jê re gotine Başûrê biçûk, lê digel ku parçeyê cografîk ê herî biçûk e jî, bi zîrekiyê yeke din nikare lingê xwe li yê wî bixe. Qamişlo û Rojavaya me bi gotineke cihgirtî; 'şatir' e; jêhatî ye.

Binxetê her dem bûye hembêz û çeper ji mehkûmên Serxetî re. Siyasî û Rewşenbîrên mehkûmên edaleta tune, yên ku debara wan a ewleyî li Serxetê nedima, dadiketin binê xetê û li wir bi mêvan û Kurdperweriyeke mezin dihatin pêşwazîkirin. Binxetê her dem merd bûye ji birayên xwe re.

Êşa Pîrika min, dayika Batalê Serxetî û ya dayika Reşoyê Binxetî yek êş e. Mesele tev axa Nisêbînê û Qamişloyê ye. Qedera Nisêbîn û Qamişloyê bi hev ve hûnandî ye. Ew sînor ne bi me heye lê bi me tune dibe. Sînor ne qeder e. Ne qeder e, Nisêbîna min, Qamişloya min; welatê min!"[391]

Ligel gelek awayên rastûrê, bandorên neyînî yên pirsgirêkên ku di encama rewşa heyî de derdikevin holê jî hene. Xelkekî ku her tim şer di welatê wî de hebe; her tim welatê wî, mala wî bê wêrankirin; bê sirgûnkirin, koçberkirin, birçî û tazî bimîne; di girtîgehan de îşkenceyê bibîne, li pêşberî wan jin û zarokên wan bên tazîkirin wê bibe xwediyê derûniyeke çawa?

Digel van rastiyan ev gel bi çanda xwe ya xurt û bi dîroka xwe ya bi hezar salan heta îro li ser piyan maye. Ne mumkun e mirov heyranî têkoşîna ku ji bo ev nirx bigihîjin van rojan hatiye meşandin nemîne. Li gel ku di sedsala 20'emîn de bayê netewdewletê li cîhanê tevdî xetereyên pir mezin anîn, nîjadperestiyê kêmaniyên mezin anîn ser mirovahiyê. Îro ji aliyê gelek derdorên zanistî ve, netewdewletî û nîjadperestî wek xelitiyek mezin tê dîtin. Lê gelekî dereng ev hat fêmkirin. Kurdan esaleta xwe domandin û li ber vî bayî

[391] www. netKurd.info, 20.01.2007

nepekiyan. Mixabin bedelê vî tiştî pir giran dan. Di bin zilm û zordariyeke giran de man. Ne mumkun e ku ev qas zordarî, êş û çewtîtî jî bandorê nekin. Ji ber vê yekê civaka Kurd niha bi gelek pirsgirêkên civakî û derûnî re rû bi rû ye. Carinan di nav vê tevliheviyê de em gelê xwe baş fêm nakin û tiştên ku heq nekiriye em lê bar dikin. Ez naxwazim bi nêrîneke di ser re bikevim nav van mijaran. Ji bo ku rewşa civaka Kurd bê şîrovekirin, bêguman divê ji aliyê pisporên mijarê ve, ya rast ji aliyê pisporên mijarê yên ku xwediyê nêrîneke ne alîgir in ve bi awayekî kûr û berfireh bê vekolandin. Tenê ji bo ku ez balê bikişînim ser mijarê, min hewl da ku di der barê bûyerên li sînor pêk tên û di nav civakê de texrîbatên piralî pêk tînin çend mînakan bidim.

# ÇEND GOTINÊN DAWÎ

Ez bawer nakim ku di dinyayê de li tu axê, bi qasî axa Kurdistanê şer çêbûbe. Ligel ku şer tê de nesekiniye jî ev bi hezar salan e Kurdan erdê xwe parastine. Gelek hêzên biyanî carinan hikum lê kirine, bes nebûne xwediyê wê. Wek ku tê zanîn milet bi qasî keda ku ji bo axa xwe dane, pê ve girêdayî ne. Di oxira welatê xwe de çiqas xwîna xwe rijandibin ew qas qedrê wê li bal wan bilind bûye. Helbet ev bi hêjabûna axê ve jî girêdayî ye. Di vê navberê de divê mirov bîne zimên ku gelek biyaniyan jî ji bo vê axê canê xwe dane. Lê mirov dikare bibêje, Kurdan axa xwe, bi xwîna xwe avdane.

Mareşal Moltke yê Alman, ku ji salê 1835'an heta 1839'an di artêşa Osmanî de xebat kiriye û li Kurdistanê geriyaye wiha nivîsiye: "Kurd gelekî bi erda xwe ve girêdayî ne. Ew çend ku di dinyayê de tu milet ji wan bêhtir bi axa xwe ve ne girêdayî ye."[392] Ev bi piranî ji dîroka Kurdan tê. Wek ku me li jorê got, Kurd ev bi hezar salan e li ser erda xwe, li welatê xwe dijîn û ji bo erda xwe gelek şer kirine, gelek bedel dane.

Heger em bên roja me, her çiqas li ber xwe dabin jî rewşa Kurdan îro li ser erda wan ne baş e. Kurdistan jî ne di tu halî de ye. Ev dused sal in Kurd û Kurdistan ji bo ku li ser linga bimînin gelekî li ber xwe dane. Lê ji ber ku ji aliyê gelek dewletan ve bi hevparî li dijî Kurdan şerekî dijwar hatiye meşandin roj bi rojê re qels ketiye, talan û wêran bûye. Zirara vê ne tenê li Kurdan bûye. Dibe ku di vê navberê de hinek ji bo demeke kin, hin serketin bi dest xistibin, lê bi rewşa ku Kurd ketinê ji bo hemû mirovahiyê win-

[392] Kovara Hawar Cild-1, r. 468

dahiyên mezin çêbûne. Lewre windahiya Kurdistanê, yan jî windahiya axa pîroz, windahiya hemû mirovahiyê ye. Ji ber ku dîroka mirovahiyê di vê axê de veşartî ye, ji bo ku ev ax welatê hemû ol û hestên pîroz e.

Dused sal berî niha li Ewrûpayê pêşketinên mezin çêbûn, Împaratoriya Osmaniyan jî bi paş diket. Gelek Ewrûpiyên ku wê demê hatin axa Kurdistanê çav berdanê. A vê pêvajoyê bi hatina wan re dest pê kir...

Di sedsala 19'an de Împaratoriya Osmanî hem ji aliyê rojhilat ve, hem jî ji aliyê rojava ve rastî têkçûneke mezin hat û axa wê ji dest çû. Di heman demê de bi domdarî êrîş dibir ser Kurdistanê û saziyên xweser ên herêmî tarûmar dikir. Kurd li aliyekî di nav artêşa Împaratoriyê de beşdarî şeran dibûn, li aliyê din rastî êrîşên wê dihatin. Bi kurtasî Kurd, di bin êrîşan, polîtîkayên rojane yên Împaratoriyê û şerên ku her tim diqewimîn de, bêyî ku li gor daxwaza serdemê bi pêş bikevin ketin sedsala 20'an.

Sedsala 20'an li dinyayê û di jiyana me de çiqas tişt guhertin. Wekî ku gelek pêşketin di nav xwe de vedihewand, ji du şerên cîhanê re jî şahidî kir û bû sedsala herî bixwîn. Li Kurdistanê bi milyonan mirovan jiyana xwe ji dest dan, koç kirin, xela dîtin û erdnîgariya wan serûbinî hev bû.

Di Şerê Yekem ê Cîhanê de Împaratoriya Osmanî parçeparçe bû. Li ser erdên wê gelek dewlet hatin avakirin. Nexşeya dinyayê li ser maseyan hat parselkirin û her aliyekî wê bi rengekî hat boyaxkirin. Êdî her rengek sînorekî wî hebû.

Roj roja avakirina netewdewletan bû. Lê Kurd ji bo vê yekê ne amade bûn. Di seranseriya sedsala 19'an de rastî gelek êrîşan hatibûn û ji taqet ketibûn. Li aliyê din Kurd, ji ber bi hevrebûna xwe ya demdirêj a bi Osmaniyan re, bi vê Împaratoriyê re wisa ketibûn nav hev, ligel ku sed sal bê navber rastî êrîşên wê hatin jî nekaribûn xwe jê qut bikin.

Her çiqas di sedsala 19'an de êrîşên Dewleta Osmanî zêde bûbin jî hejmara Kurdên ku di hemû qedemeyên dewletê de, li meqamên girîng cih girtine jî ne kêm e. Bi taybetî jî, bi Alayên Hemîdiyeyê ku bi deh hezaran çekdarên wê hebûn, padîşah dîsa beşeke girîng a Kurdan bi xwe ve girêdabû. Di pergala nû ya ku di serê sedsala 20'an de hat damezirandin de kesên ku di nava pergala Osmanî de mebûs û senator jî hebûn. Yanî Kurdên ku di gelek meqamên dewleta Osmanî de peywir girtin ser milên xwe, di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de û di dema belavbûna wê de bi piranî ligel wê cih girtin. Lê wê ev yek zirareke mezin bi xwe re bîne û bibe sedema dayîna gelek bedelan.

Helbet sedem ne tenê ev bûn. Kurdistan ji ber pozîsyona xwe ya stratejîk tam di navenda lîstikê de cih digirt û her kesekî dixwest wê ber bi aliyekî ve bikişîne. Li aliyê din rêgezên lîstikê ji hêla hinekên din vê hatibûn sazkirin û ji jorê ve li ser herêmê dihatin ferzkirin, lê di gelek waran de ev rêgez li herêmê nedihatin. Berî her tiştî Kurd li vî kirasê nîjadperestiyê yê teng, ku li ser wan dihat ferzkirin xwedî derneketin. Çimkî wekî dema dewleta Osmanî, Kurd bi hezaran salan bi gelek komên cuda yên etnîkî û dînî re jiyabûn. Wekî nimûne bi hezar salan bi Ermenan re jiyabûn, lê dihat gotin ku êdî Ermen dijmin in. Bi cedwelan (rastek) sînor xêz dikirin û digotin bila di nav van sînoran de yek ziman, yek ol û yek çand hebe. Ev yek gelek ji derveyî rastiya jiyanê bûn û li herêmê nedihatin.

Kurd di vê dema ku gelek netewdewlet ava bûn, di avakirina dewleteke serbixwe de bi ser neketin. Yek ji sedemên vê yekê ew bû ku Kurd hemû ne bi navendekê ve girêdayî bûn. Sedem çi dibe bila bibe, wê demê her herêmeke Kurdistanê xwedî saziyeke xweser bû, pirnavendî bû. Di têkoşîna milî ya Kurdan a 200 salî de, bi piranî hêzên herêmî bi rêzdarî nêzikî hevdu dibûn. Her çiqas li Kurdistanê di navbera hêzên herêmî de alozî û gengeşî çêbibin jî, hêzekî ji bo hezeke din tune bike serî li qetlîaman nedaye. Helwestek wiha li dijî çanda civaka Kurd e. Ev yek hem nayê erêkirin hem jî ew rê ne ya ku mirovan bibe serkeftinê ye. Heta bi piranî her eşîrekê wekî dewletekê bi serê xwe karê xwe yê navxweyî bi rê ve biriye. Ev yek jî ji bo têkoşîna wê demê problemeke mezin bû. Lewre, wê demê ji bo avakirina netewdewletekê girêdana bi navendeke tenê re gelekî girîng bû.

Ya rast ev bû gelo? Hîn jî gelek nîqaş li ser vê mijarê hene. Îro gelek dewletên pêşketî ji federasyonên ku li gorî rewşa hêraman hatine avakirin pêk tên. Hêzên li Kurdistanê jî gelek caran nîşan dane ku ew ji bo parvekirina hêzê amade ne. Gelek caran hevdîtin çêkirine û bi hevdu re biryar dane. Lê belê hêzên serdest û dilxwazên wan, ji bo bincilkirina hin rewşan gelek caran ev bahane dane pêş.

Helbet li ser pirsa, 'Kurdan kîjan xeletî kirin ku îro di vî halî de ne?' divê gelek lêkolîn û nîqaş bêne meşandin, lê belê divê bi çavekî bêalî bi awayekî zanistî, di warê dîrokî û rewşa heyî de, rûdanên wê demê yên li derveyî Kurd û Kurdistanê û bandora vê yekê baş werin tehlîlkirin. Nêziktêdayînên bêyî ku van xalan li ber çavan bigirin hem ji zanistîbûnê dûr in, hem jî rê didin ku neheqiyên mezin li gelê Kurd bên kirin.

A rastî mesele ne heq û neheqî ye. Bi gotina herî klasîk, wê demê jî hakimiyet di dest ê herî hêzdar de bû. Yên xwedî hêz bûn, şîroveyên li gor

daxwazên xwe û menfaetên xwe diafirandin. Hêzên Ewrûpî bi gotinên wekî 'ji bo netewan serxwebûn' bi hêz dibûn, lê bi demê re dihat dîtin ku, dewletên saz dikin ne li gor gotinên wan dihat damezirandin. Gotin û pratîkê li hev nedikir. Netewdewletên ku dihatin avakirin ne bi îradeya gelan bi xwe, li gor armancên dîtir ên ku di bin perdeya 'bidestxistina mafên xwe yên çarenûsî yên neteweyan' de hatibûn veşartin, li gor nexşeyên li ser maseyan û li pişt deriyên girtî dihatin xêzkirin, dihatin avakirin.

Armancên veşartî çi dibin bila bibin, gelek dewlet hatibûn avakirin, lê Kurdan wê demê mafekî biçûk jî bi dest nexistibû. Dengvedana Ewrûpiyan a wekî 'bidestxistina mafên xwe yên çarenûsî yên neteweyan' di pratîka Kurdistanê de îflas kiribû. Kurdan belkî jî ji gelên din ên derûdorê zêdetir hewl didan lê dewlemendî û pozîsyona axa wan ew bêçare hiştibûn. Ne Tirkiye, ne Îran, ne jî Ewrûpiyan dev ji Kurdistanê berdidan û ji bo wê ji şer venedikişiyan. Lê ji van hêzan tu yek ji wan ne xwedî wê quwetê bû ku temamiya Kurdistanê bike bindestê xwe.

Li aliyê din ne saziyên serbixwe yên Kurdan hebûn, ne jî hêzên wan ên çekdar ên yekbûyî. Her wisa ji ber rewşê, wê demê Kurdan bi gelek aliyan re didan û distendin. Lewre baweriyeke tam nedidan tu aliyî. Bo nimûne wekî ku li jorê hat diyarkirin girêdana Kurdan a bi Osmanîtiyê ve dibû sedema ku Ewrûpî li wan amin nebin.

Her çiqas Kurdan heta wê rojê serxwebûneke tam bi dest nexistibe jî tu demê ji serxwebûna xwe ya herêmî tawîz nedabû. Ji ber vê yekê li hemberî hêzên ku nû hatibûn serî neditewandin. Heger Kurdan wekî mêtingehên din li ber dewletên Brîtanî û Frensî serî bitewanda, dibe ku ew jî bibûna xwediyê dewletekê. Ji aliyê din ve, ji ber pratîka wan a di dema nêzik de û nêziktêdayînên wan ên olî, Kurdan jî ji Ewrûpiyan bawer nedikir.

Ji ber vana tevan komên etnîkî yên din di têkoşîna xwe de ji hêzên Ewrûpî destekeke mezin didîtin, lê Kurd rastî êrîşên Ewrûpiyan dihatin. Bi taybetî jî Kurdên Başûr ku serê pêşiyê ew bi hêzên Ewrûpî re hatibûn pêşberî hev, têkiliyên wan ên bi Ewrûpiyan re geh baş û geh jî xirab dibûn. Kurdên Başûr, neçar man ku demeke dirêj bi îmkanên kêm, li hemberî amûrên şer ên modern têbikoşin. Ewrûpî ji Şerê Dinyayê yê Yekemîn betilîbûn û muhîmatên leşkerî li wan kêm ketibûn; yanî hetanî desteka gelê herêmê bi temamî nestendina nikaribûn li ser temamiya Kurdistanê hikum biajotina. Loma geh bi Kurdan re diketin têkiliyên erênî û geh jî şer bi wan re dikirin. Wekî ku me di beşa dîrokê de hewl da ku em vebêjin, piştî têkoşîna ku 4 salan berdewam kir, li ser parvekirina Kurdistanê li hev kirin û Kurdistan kirin çar parçe.

Bi vî awayî Kurd bi encameke wisa re rû bi rû man ku, di tu demên dîrokê de rewşeke wisa nedîtibûn. Ew êdî li ber biryarên welatên ku hin axa Kurdan jî diket nav dewleta wan û dixwestin netewdewleta xwe ava bikin de bûbûn asteng. Diviyabû Kurd asîmile bibin, diviyabû deng ji wan dernekeve, diviyabû tune bibin. Ji wê rojê ve Kurd, di dewletên ku tê de wekî kêmenetew mane, çi dema ku ji bo mafên herî xwezayî yên însanî dengê xwe bilind dikin, bi êrîşên gelek mezin re rû bi rû dimînin. Wekî ku ev ne bes be, ji bo ku mafên Kurdan ên ku hatine xespkirin meşrû bên dîtin, bi mahneyên cur be cur neteweya Kurd tewanbar dikin û der barê wê de şîroveyên neheq dikin.

Li çar dewletên mezin ên ku Kurd lê dijîn, ji destpêka sedsala 20'an heta niha dawî li şerên ji ber pirsgirêka Kurdan diqewimîn nehat. Kurdistana ku di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de avêtin nava agir hê jî dişewite. Esas sedem û encamên Şerê Cîhanê yê Yêkemîn bandoreke pir neyînî li temamiya dinyayê kir. Serûbinbûna ku di wê demê de qewimî dinya ber bi felaketên nû û mezintirîn ve ajot. Bi taybetî jî Ewrûpayê di salên Şerê Cîhanê yê Duyemîn de ji wehşeteke mezin re şahidî kir, çar hêlen wê bûn xirbe. Bi vî şiklî yên ku li ser navê medeniyetê agir bi der û dorê xistin, mala xwe bi xwe jî şewitandin. Di vî şerî de li Ewrûpayê mirov zindî zindî di firinan de hatin şewitandin, di odeyan de bi tomerî, bi xazên kîmyewî hatin kuştin, her der hat şewitandin û kavilkirin.

Sînorên Rojhilata Navîn ên ji derve de lê hatin ferzkirin û li dijî jiyana wê ya xwezayî ya bi hezar salan in, ji roja ewil ve hetanî niha, her tim bûn pirsgirêkên mezin ên ku dinyayê diheyirînin. Her problemên ku ji ber sînoran qewimîn bi xwe re problemên nû afirandin û her çû pirsgirêk mezintir bûn.

Heger ku tê xwestin li herêmê îstikrar hebe divê problemên têkildarî sînoran baş bên tehlîlkirin. Bi taybetî jî dîvê bi hûrbînî li ser sînorên li Kurdistanê were sekinîn. Ez hetanî niha der barê sînorên li Kurdistanê de ku di encama bûyerên nêzikî sed sal beriya niha şekil girtine, rastî lêkolîneke/xebateke bi rêk û pêk nehatim. Kêm be jî xebatên cihê yên ku di beşên têkildar de mijara me jî digirt nava xwe û nêziktêdayînên rast hene. Hin tespîtên di nav kiteyên lêkolînên ku bi salan berî niha hatine kirin de cih digirin û esasen pareke mezin a rastiyên têkildarî mijarê vedibêjin. Lê belê di encama zordariyên heyî de, li ser mijarê bi qasî ku pêwîst dike nehatiye sekinîn, tespîtên ku me behs kir jî di navbera rûpelan de winda bûne. Bi vî şiklî kêmasî û xetayên heyî her çûne zêde bûne û birîn her çûye kûr û xedar bûye.

Bi van sînoran, bi qasî zirara ku Kurdistanê dîtiye, dewlet û miletên di vê herêmê de jî zirar dîtine. Polîtîkayên xelet ên ku ji ber pirsgirêka Kurd hatine

meşandin, di van welatan de gelek xeletiyên mezin ên ku çareserkirina wan ne mimkun e bi xwe re aniye. Wekî nimûne, bi berevajîkirin an jî veşartina dîroka Kurdistanê re, van welatan dîroka xwe jî bi awayekî tehrîfkirî fêrî ciwanên xwe kirin. Van welatan, gelek caran tedbîrên ku li hemberî Kurdan hatin stendin, êrîş û zordariyên li ser Kurdan hatin meşandin, bi awayekî berevajîkirî veguhestin; bi vî şiklî civaka xwe jî ji rastiyan bidûr xistin. Ev yek jî awayekî din ê asîmilasyonê bû ku li ser civaka xwe pêk anîn. Nifşê nû yê ku li ser vê bingehê rabû, ket rewşeke wisa ku êdî nikare rastiyan fêm bike. Ji lewre jî nikarîn bi awayekî rast nêzikî pirsgirêkan bibin û çareyekê bibînin.

Helbûkî, hetanî pirsgirêka Kurdan çareser nebe, şansê tu dewleteke herêmê tune ye ku bi ser bikeve. Bazîl Nîkîtîn, hê di 1943'yan de, di berhema xwe ya navborî de dibêje, "Der barê statuya navneteweyî ya pêşeroja welatên ku Kurdan di nava sînorên xwe de dihewînin, ji bo ku mirov ji niha de tiştekî bibêje hê zû ye; lê ev yek pir hişkere ye ku heger mafên vê kêmenetewa ku hay ji mafên xwe heye û ji bo bikaranîna van mafan bi biryar e, neyê dayîn, wê hemû cure peyman kêm û nîvco bin û ji bilî bincilkirina tevliheviyan ji bandora vê rewşê ya xwezayî ya di nav saziyên siyasî de wê tu encameke din nede."[393] Îro, digel ku ew qas dem di ser re bihuriye jî, ji ber ku rayedar wekî Nîkîtîn nêzikî pirsgirêkê nebûn, temamiya herêmê di bin pirsgirêkan de xeniqiye.

Bi rastî mirov nikare bibêje yên ku rast nêzikî pirsgirêkê dibin tune ne, lê bîrdoziyên fermî helwesteke wisa tund nîşan didin ku pêşniyazên ji bo çareseriyê yen kesên ku rast nêzikî mijarê dibin, di bin vê tundiyê de difetisin. Midûrê berê yê Radyo û Televîzyona Îraqê Selîm D. Fahrî di Konferansa Kurd a Parîsê de ku me berê behsa wê kir, dibêje, "Demokratên Ereb, wisa bawer dikin ku li Rojhilata Navîn di navbera Ereb, Kurd, Îranî û Tirkan de ne nakokî, lihevnekirin û parçebûn heye, zemîna pêşketinên aborî, çandî, civakî û berjewendiyên hevpar heye."[394] Heta hejmara kesên ku guh bidin feraseta di gotinên D. Fahrî de zêde nebe problem wê her berdewam bikin.

Kurdistan ku menfaeta hêzên mezin ên cîhanê tê de ye, wekî her tim îro jî gelek dewletan eleqedar dike. Lê belê bi pêşketinên li cîhanê pêk hatin, pozîsyona Kurdistanê ya îro ji rewşa serê sedsala 20'an gelekî cihêtir e. Nirxandina M. R. Îzady a têkildarî mijarê wiha ye: "Pozîsyona jeopolîtîk a Kurdistanê, di sedsala 20'an de, li ber avakirina dewleteke serbixwe ya gelê Kurd astengeke mezin pêk dianî. Kurdistan ku di roja me de ber bi heft

[393] Basil Nikitin, bnb., r. 17
[394] Uluslararası Paris Kürt Konferansı, 14-15 Ekim 1989, r. 128

sînorên navneteweyî ve dirêj dibe (û li du dewletên din jî cîgehên Kurdan ên serbixwe hene), di serdema bi bûyer ya 70 salî de ku hetanî 1991'ê dom kir, dişibiya xeteke parastinê ya ku Rojhilata Navîn ji xeta parastina Yekitiya Sovyetan a li Qafqasan vediqetand. Bi belavbûna Yekitiya Sovyetan re, Kurdistan li vê asoya bakûr a Rojhilata Navîn hê jî rola xwe ya herêmeke tampon a ne diyar, berdewam dike."[395]


Di van demên dawî de bandora Ewrûpa û Amerîkayê ya li ser herêmê zêdetir bûye. Amerîkaya pêşkêşa cîhanê rasterast li herêmê ye û bi Kurdên Başûr re di nava tifaqê de ye. Ango çavên dinyayê li ser Kurdistanê ye. Her çiqas bi operasyon û geremoleke mezin re rû bi rû dimînin jî Kurd di pozîsyoneke bi avantaj de ne. Îro kîjan dewlet Kurdên xwe qezenc bike û pê re têkiliyeke baş deyne ew wê gavekê li pêş be.

Ji 1990'î ve, yanî ji dema ku li Îraqê Kurdistana Federe hate avekirin çavên her kesî li ser Kurdistanê ye. Bêguman li Kurdistanê pêkhatina sazûmaneke nû wê bandorê li temamiya herêmê bike. Erênî be jî, neyênî be jî wê bandor li hemû herêmê bibe. Ji ber ku îro bi tevgera Amerîkayê dinya şeklekî nû distîne, îro pirsgirêka herî mezin a Rojhilata Navîn û heta ya dinyayê pirsgirêka Kurdan e. Hişkere ye ku wê welatên li herêmê bi înkarkirina realîteyê nikaribin çareseriyekê peyda bikin. Ev rêveberiyên sûcdar ji ber helwesta xwe ya li dijî gelê Kurd, pir bi rihetî tawîzan didin welatên derve. Ku ew nexwazin vê rastiyê bibînin wê xeletiyên mezin derkevin holê.

Her wiha heger ku Kurd hin şertan qebûl bikin, ji ber zilma ku li Kurdan hatiye kirin raya giştî ya cîhanê jî amade ye ku ligel Kurdan cih bigire. Wekî nimûne Sedam Huseyin ku zilmeke derî aqilan li ser hemwelatiyên xwe meşand bû sedem ku kesên di nav sînorên wî de, wekî hêzeke ku wan xilas bike hembêza xwe ji Amerîkayê re vekin û raya giştî ya cîhanê jî bi piranî maf da van kesan.

Ji bo Rojhilata Navîn senaryo û nexşeyên nû yên Amerîkayê ku di vê cîhana global de hêzeke bê himber e, hene. Di sala 2006 û 2007'an de nexşeyeke ku gelekî hat nîqaşkirin hebû; nexşeya ku Rojhilata Navîn a di xeyalê yarbayê ji artêşa Amerîkayê malnişîn bûyî Ralph Peters de nîşan dida. Ev nexşeya nû ya Rojhilata Navîn, di kovara Hêzên Çekdar a Amerîkayê de, ligel nivîsa Peters a bi sernavê "Sînorên Bixwîn: Dîmeneke Rojhilata Navîn a Baştir wê Çawa Bûya?" hatibû weşandin. Nexşeya navborî di akademiya leşkerî ya NATO'yê, ya li bajarê Romayê ya Îtalyayê hate pêşandan û li Tirkiyeyê rê li ber gelek bertek û nerazîbûnan vekir.

[395] Prof. Mehrdad R. İzady, bnb, r. 349



*Nexşeya navborî*

Di nexşeya nû de, "Kurdistaneke azad" a ku rojhilat û başûrê rojhilatê Tirkiyeyê, bakûrê rojhilatê Sûriyeyê û rojavayê Îranê digirte nava xwe hatibû avakirin, ji Îranê Azerbeycan û Belûcistanê hatibû veqetandin, li axa Îraqê jî ji bilî axa Kurdistanê, li ser erdên din dewletên Şiî û Sûnî yên Ereb hatibûn damezirandin.

Peters ê ku herî dawiyê wekî Alîkarê Serokê Îstixbaratê di Wezareta Parastinê ya DYA'yê de hatibû peywirdarkirin, îdîa dikir ku sînorên ku ji nû ve li vê nexşeya behsa wê hate kirin bêne xêzkirin wê pirsgirêkên Rojhilata Navîn bi awayekî bingehîn çareser bike. Peters bi israr angaşt dike ku ji bo hizûra Rojhilata Navîn guhertina sînoran ferz e û wiha dibêje: "Sînorên navneteweyî tu demê tam ne heqane ne. Ev sînorên ku bêedaletî ji gelên bi darê zorê ji hev cihê dikin an jî tînin ba hev aniye, ferqa di navbera azadî û zordariyê, xweşbîniya ji bo gelan û zilmê, dewleta qanûnê û terorîzmê û şer û aştiyê pêk tînin.


Sînorên herî xirab û kêfî hatine çêkirin li Afrîka û Rojhilata Navîn in. Ev sînorên ku ji hêla Ewrûpiyan ve hatine xêzkirin, dibin sedema gelek pirsgirêkan ku gelên herêmî nikarin wan çareser bikin..."[396]

Der barê Rojhilata Navîn de çend nexşeyên hişkere û veşarî yên Amerîka, Ewrûpa û dewletên li herêmê hene nayê zanîn, lê li holê ye ku wê ji niha û şûn de wiha berdewam neke. Rojhilata Navîn dikele û rûdan û pêşketinên li herêmê sînyala rewşeke nû didin.

[396] www.sendika.org, 23.11.2006

Xeyalên Kurdan jî ji bo ku pêşeroja welatê xwe saz bikin hene û ji bo ku hin mafan bi dest bixin têkoşîna xwe berdewam dikin. Bi pêşketinên dawî re di program û têkoşîna Kurdan de jî hin guhertin pêk hatin.

Dema her miletê ku di vê qadê de tenê ji bo berjewendiyên xwe tevbigere, bêguman di dilê her Kurdekî de jî wê hesret û bêriya dewleteke Kurd a yekpare hebe. Pozîsyona wan çi dibe bila bibe di sedsala dawî de hema hema hemû miletan ji bo dewleta xwe ava bikin şer kirine û gelek ji wan gihane armanca xwe. Lê Kurd ji ber ku nebûn nîjadperest û hestên wan ên hevpariyê li pêş bûn negihan dewleta xwe. Heger Kurdistaneke serbixwe bihata avakirin, bi erdên xwe yên fireh ên çandiniyê, bi kaniyên avê, rezervên neftê (petrolê) û hê gelek dewlemendiyên xwe yên din, wê bibûya dewleteke xwedî pêşerojeke ronak. Di heman demê de di nav hemû dewletên li Rojhilata Navîn de wê bibûya yek ji dewletên herî mezin û di qada polîtîkaya Rojhilata Navîn de jî wê bibûya aktoreke mezin.



*Rewşa Kurdistanê ya stratejîk.* *Îzady der barê rewşa stratejîk a Kurdistanê de daneyên gelek girîng dide. Di bin nexşeya li rex a ku ji pirtûka wî ya bi navê 'Kürtler'(Kurd) hatiye girtin de ev agahî cih digirin. Ji Hewlêrê (Erbîl) bi mesafeke 1000 km'yî wê de 12 paytext, ji 150'î mîlyonî zêdetir însan, ji sedî 60'ê temamiya ava paqij a Rojhilata Navîn, ji sedî 60'ê rezervên petrola Rajhilata Navîn cih digirin; ev hemû jî ji bo paytexteke li herêmê hijmarin rekor in. Di nava vê mesafeyê de, Derya Spî, Derya Hazarê, Derya Reş û benderên (lîmanên) Kendava Basrayê cih digirin; Li nêzikî tu paytexta li herêmê ev qas bender tune ne. Ji Hewlerê bi mesafeyeke 2000 km'yî wê de 25 paytext, ji 300 mîlyonî zêdetir însan (Ji sedî 98'ê nifûsa Rojhilata Navîn û hema bibêje temamiya kaneyên aboriya Rojhilata Navîn cih digirin.*

Lê belê Kurd dizanin di şert û mercên îroyîn de avakirina Kurdistaneke yekpare gelek zehmet e. Ji bo ku hêzên polîtîkaya cîhanê di dest xwe de digirin bi erênî nêzikî vê yekê bibin, lazim e ku temamiya Kurdan gelek daxwazên van dewletan qebûl bikin. Berî her tiştî divê hemû Kurd bibin yek.

Lê belê di sedsala bihurî de dewletan her roja bihurî xwe bêhtir di nava Kurdan de bi cih kirin û xwebirêxistin kirin; di nav Kurdan de jî di encama rewşa ku ketinê de parçebûna çandî û civakî her çû kûrtir bû. Dewleteke ku destekê bide wan ji bo ku li hemberî çar dewletên cihê şer bikin jî tune ye. Ji ber vê yekê jî vê gavê bihevrebûna hemû Kurdan zêde mumkun xuya nake.

Kurdên ku rastî rêveberî û pêkanînên cihê hatin, şiklên têkoşînê yên cihê bipêşxistin. Kurdên li her parçeyekî, li dijî dewleteke cihê têdikoşin. Têkoşîn, li her parçeyekî di pêvajoyên cihê de, stratejî û taktîkên cihê dişopîne. Îro, hema di her parçeyekî de têkoşîn li ser bingeheke xweser tê meşandin û her parçeyek bêyî ku guhertina sînorên dewletên ku lê ye bide pêş, alîgirê bi destxistina hin mafan e. Hêza Kurdan a çekdar a herî mezin PKK, ku di salên dawî de hema bibêje ji hemû parçeyan destekê distîne, ji bo Kurdistaneke yekpare dest bi têkoşînê kiribû. Lê belê îro PKK'ê ji fikra xwe ya Kurdistaneke serbixwe paş de gav avêtiye û daxwaza mafên demokratîk derxistiye pêş. Ev encama şert û mercên heyî ye. Demekê berî niha jî li Başûrê Kurdistanê bêyî ku yekparetiya axa Îraqê xera bibe dewleteke federe ya Kurd hat avakirin. Ev yek jî alternatîfa avakirina gelek Kurdistanan xurtir dike.

Xwe bixwe parastina her Kurdên li parçeyekî jî têkoşineke pir dijwar dixwaze... Ev nêzikî sed salî ye zordarî, koçberkirin û asîmilasyona ku bi plan û program li ser Kurdan tê meşandin bi Kurdan gelek tişt dane windakirin. Pozîsyona wan a di nava dewletên ku ew tê de ne, ji pozîsyona wan a di destpêka serê sedsalê pir cihêtir e. Wekî nimûne, Eyaleta Kurdistanê ya di nava dewleta Îranê de, parçeyekî biçûk ê Kurdistana Îranê digire nava xwe. Li Kurdistana Başûr jî tê xwestin ku gelek bajarên Kurdan ên wekî Kerkûkê ku dilê Kurdistanê ye, ji derveyî Herêma Federe ya Kurdistanê were hiştin. Di van yekan de, bandoreke mezin a sirgûnkirina Kurdan a ji bajarên xwe û li şûna wan bicihkirina komên din heye. Ango, li çar dewletan jî gelek cihên ku di serê sedsalê de bê nîqaş welatê Kurdan bûn, îro kirine rewşeke bi nîqaş.

Di vê navberê de, formûla wek sîstemeke federal ji nû ve sazkirina Tirkiyeyê ya ku Kurdan jî digire nava xwe de, ku hetanî niha wekî alternatîfeke mimkun di rojevê de bû, wisa xuya dike ku êdî ji hêla Kurdan ve zêde nayê pejirandin. Ji ber hînbûna bihevrebûna (xelet an jî rast) di dema Împaratoriya Osmanî de, bi giştî di Şerê Cîhanê yê Yekem û Şerê Rizgariyê de bi hev du re tevgeriyane, ji biryarên Kongreya Erziromê heta Peyman Lozanê rastiya Kurdan hatiye îfadekirin, lê belê piştre roj bi roj Kurd tune hatine hesibandin û rastî êrîşên nedîtî hatine. Ligel hemû êşan, her tim Kurd ji Tirkiyeyê bi hêvî bûn û li bendê bûn ku wê li Tirkiyeyê çareseriyek pêk

were. Lê mixabin tirsên ne di cih de bûn sedem ku rastî bên înkarkirin û her biçe şaşîtî zêde bibin. Êdî di nav gel de ku rastiyê baştir dibîne û zana bûye, li hemberî Tirkiyeyê ku hê jî polîtîkaya înkarê dimeşîne nerazîbûn û aciziyeke mezin derketiye pêş.

Di vê pêvajoyê de her du aliyan jî zirarên mezin dîtin. Her çiqas hin destkeftiyên demdemî hatibin bidestxistin jî, pirsgirêk her ku çû kûrtir bû û bû sedema windahiyên mezin. Bêgûman Kurdan hê zêdetir windahî dane û êş kişandine; lê Tirkiyeyê jî her bi hemwelatiyên xwe re bû xwedî pirsgirêk, butçeyeke bi 100 milyar dolara di şer de xerc kir û vê windakirina di warê aborî de bandor li jiyanê tevî kir.

Her wiha ji ber ku Kurd û Tirk nikaribûn di navbera xwe de vê pirsgirêkê çareser bikin, pirsgirêka Kurdan di destê hêzên biyanî de her tim wekî qozekî ma. Mudaxaleyên ji derve de hatin kirin, senaryoyên dinyayên cihê ne û ji ber ku bi rastiya herêmê re ne li hev in bêhtir bûne sedema mezinbûna pirsgirêkan. Ji Tanzîmatê hetanî niha hewldanên bi navên 'nûxwazî'yê tên meşandin, ji rastiya herêmê dûr in. Li gor reçeteyên hinekên din gav tên avêtin, lewre jî encama ku tê xwestin nayê bidestxistin. Ji Şerê Parvekirina Cîhanê yê Yekem heta niha, ji ber sazûman û sînorên ku ji Ewrûpayê hatine siparîşkirin Rojhilata Navîn her tim di nava alozî û kaosê de digevize. Geh jî bi derbeyên leşkerî rêveberiyên dewletan tên guhertin û bi awayekî çareseriyeke mayînde peyda nabe. Di navenda gelek pirsgirêkan de jî Kurdistan heye.

Îro di demokratîkbûna Tirkiyeyê de Kurd hêzeke lokomotîfî ya girîng in. Kurdistana Tirkiyeyê ji aliyê cografî ve parçeyê herî mezin e û nifûsa Kurdan a li Tirkiyeyê nifûsa herî zêde ye. Nifûsa Kurdan nêzikî 40 milyonî ye, li dora 20 mîlyonî ji van li Tirkiyeyê dijîn. Û Kurd ne tenê li cografyaya welatê xwe, hema bibêje belavî çar parçeyên Tirkiyeyê bûne. Nêzikî nîvê nifûsa Kurdan îro li rojavayê Tirkiyeyê dijî. Tenê li Stenbolê li dora 3 milyonî Kurd hene. Zewacên di navbera Kurd û Tirkan de, têkilî û danûstendinên wan ên di warên kar de asta bihevrebûna Tirk û Kurdan nîşan dide. Wekî encam ji hev cihêkirina Tirk û Kurdan ne mimkun e. Lê belê heger bê xwestin ev rewş, hem ji bo Kurdan hem jî ji bo Tirkan, dikare bibe bingeha gelek pêşketin û deskeftiyên erênî.

Mijareke din a ku divê baş were tehlîlkirin heye. Heger piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, pareke mezin a welatê Kurdan di nava Tirkiyeyê de cih bigirta û li ser bingeha yekitiya Kurd û Tirkan bihata avakirin bi qasî Dewleta Osmanî nebe jî ev dewlet wê bibûya dewleteke gelekî mezin û hêzdar. Em hesêb bikin

(bi awayê ku Kurd jî xwedî heqê xwe bin) ku Musil di nava sînorên Tirkiyeyê de cih digire û em bifikirin, gelo wê demê wê çi pêşketin pêk bihatina. Em hîs dikin ku hingê wê her tişt gelekî cihê bûya. Ji xwe hêzên Ewrûpî ji serî ve ev dîtine, loma tu demê ev yek nexwestine û wê nexwazin jî. Îro jî tu kes nabe alîgirê yekbûna Tirkiye û Başûrê Kurdistanê, ligel ku Kurd bûne xwedî federosyanekê jî. Ji ber ku Tirkiye wê hingê bibe xwedî pozîsyoneke gelekî hêzdar.

Xuya ye Tirkiye jî ji bo ew û ev hêz nekevin miqabilî hev, ligel vana tevda gavên girîng navêje. Berevajî gavavêtinê, Tirkiye li hemberî avêtina gavên herî însanî bertekên mezin nîşan dide û gel nikare vê yekê fêm bike. Bi hinceta ku beşdarî Konferansa Kurd a Parîsê ya di 14-15'ê Kewçêra 1989'an de hat lidarxistin bûn, 7 mebûsên Kurd ji partiya sereke ya muxalefetê, ji SHP'ê hatin avêtin. Dûre, her çiqas peyama biratiyê bû jî, ji ber ku hevokeke Kurdî di parlamentoyê de hat bilêvkirin mebûsên Kurd ji meclîsê hatin avêtin, hin ji wan ketin zindanê. Di şerê 30 salên dawî ê ku li hemberî PKK'ê tê meşandin de, gelê sivîl windahiyên mezin dan û rastî muameleyên xerab hatin. Di nav Kurd û Tirkan de dubendiyeke mezin hat pêşxistin ku hindik mabû bibe sedema şerê navxweyî. Ji ber aqlêselîmbûna gel dîsa jî kaosa ku dihat xwestin pêk nehat.

Kêm be jî carinan hin kesên ku dixwazin gavên erênî biavêjin derdikevin, lê ew jî yan tên cezakirin an tên kuştin an jî bi awayekî dengê wan tê birîn. Li Tirkiyeyê çend sal berê Amerîka nimûne dihat nîşandayîn û guftûgoyek dihat kirin. Dihat xwestin ku tarîfa netewetiyê ji nû ve were kirin û îfadeya hemwelatîtiyê bêhtir derkeve pêş. Lê ev hewldan tenê di gotinan de ma.

Rayedarên herî payebilind jî carna wekî ku gavên erênî diavêjin xuya dikirin lê bi dû de paş de gav diavêtin. Hinek ji wan di axaftinên xwe yên li herêmê de gotin em realîteya Kurdan qebûl dikin. Hinekan ji bo çareserkirina pirsgirêkê modela 'Bask'ê pêşniyaz kir, hinekan jî got riya Yekitiya Ewrûpayê di Diyarbekirê re derbas dibe... hwd. Lê wisa xuya dike ku hinekan kirin ku ev kes li gotinên xwe poşman bibin û nema dengê xwe bikin, çir ku piştî gotinên xwe bi demeke kin wan jî dev ji gotinên xwe berdidan.

Ê ku di fikara xwe de bi biryar bûn bi hawayekî din dengê wan hat birîn. Ozal ku hêvî dida wê hin gavên erênî ji bo Kurdan biavêje, bi awayekî bigûman jiyana xwe ji dest da. Bi mirina Ozal re pirsên di serê mirovan de her çûn zêdetir bûn. Bi krîza Kuveytê re, Serokomar Ozal ji bo Kurdên Îraqê têgiha 'hemnîjadên hemwelatiyên me' bi kar anî û ne yekser be jî hewl da ku bi PKK'ê re bikeve diyalogê. Wek Orgeneral Eşref Bitlis, gelek kesên din jî yên ku xwedî fikarên erênî bûn bi awayekî bigûman mirin.

Heger bi giştî em li ser welatekî bisekinin, kîjan dewlet dibe bila bibe heta ku guh nede dengê hemwelatiyên xwe û ji bo pêşketina wan rê li ber wan veneke nikare bigihîje asteke bilind. Wekî ku Fîkret Başkaya diyar dike, bi îhmalkirina yek ji parçeyên ku tevahiyê pêk tîne, ne mumkun e ku mirov der heqê tevahiyê de şîroveyeke bi sihet bike. Madî û manewî hemû rewş û halên hemwelatiyan divê dewletê eleqedar bike û bi taybetî jî divê ji bo pêşeroja ciwan û zarokên ku xwediyên pêşerojê ne, nêziktêdayîneke bi hûrbînî were nîşandayîn. Halbûkî niha tê xwestin ku kesayetiyeke ji rastiyan dûr, zimanê wê yê dayikê qedexe, dîroka wê hatiye berevajîkirin û xwe bi xwe înkar dike, were afirandin. Kesayetiyeke wiha wê çiqas bikaribe jiyaneke bi rûmet û ji bo welatê xwe sûdewar derbas bike?

Wekî ku berê jî hat îfadekirin, li Tirkiyeyê vê helwestê bandor li her kes û her tiştî kir. Pirsgirêka Kurdan, hin partî kirin rewşeke wisa ku nikarin hin fikrên ku di tuzika (rêzikname) xwe de bicihkirine, di pratîkê de biparêzin. Li Tirkiyeyê parastina mafên mirovan wekî destekkirina têkoşîna Kurdan tê fêmkirin. Ji ber vê yekê, rê li ber gelek rastiyan tê girtin...

Vedat Turkalî di pirtûka xwe ya bi navê 'Ji Bo Azadiyê Nivîsên li Ser Kurdan' de wiha dibêje, "Sedemên bingehîn ên vî mejiyê me yê fetisî, perçiqandinên dijwar ên ku bi salan li ser mejî û wijdanan hatin meşandin û astengiyên netewperwerî (!) ne. Di bin hemû zordariyên dewletê de, bi zanetî yan bi hestên jêrhişî pirsgirêka Kurdan heye. Tehta herî hişk a ku ketiye ber diranê çerxa zingargirtî, her çiqas parçe bibe û hûrhûrî bibe jî nayê tunekirin gelê Kurd e. Ev hêza berxwedêr a gelê Kurd wê çarenûsa gelê Tirk jî diyar bike. Îro bi tevayî em gihîştine wê nuqteyê ku heta gelê Kurd azad nebe, wê gelê Tirk jî azad nebe. Li Tirkiyeyê hetanî pirsgirêka Kurdan çareser nebe pirsgirêka demokrasiyê jî çareser nabe. Divê êdî em bibînin ku, makîneyên kuştinê yên bi salan e bi dijwarî tên şixulandin ne tenê Kurd di tariyê de hiştine, ev kirine ku em Tirk jî nikaribin bi çanda xwe bên stran û paşdemayî bimînin... Bifikirin xwemalîkirina Kurdan bi çiqasî li ser me bû mal, ev jî têrê nake; heger em nizanibin bê em ê hîn çi li ser bikin wê windahiyên me jî bêpîvan bin..."[397]

Nivîskar Orhan Pamuk ê ku xwediyê Xelata Nobelê ye jî di daxuyaniyên xwe de diyar dike ku, di bin hemû pirsgirêkên li Tirkiyeyê de pirsgirêka Kurdan heye. Pamuk dibêje, 'Çareseriya pirsgirêka Kurdan di demokrasiya tam re, di rêzgirtina ji mafên çandî re, di rêzgirtina hemû mafên Kurdan û di jiyandina wan re derbas dibe.'

[397] Vedat Türkali, bnb., r. 65

Ji ber asta teknolojiyê ya ku îro mirovahî gihîştiyê kesek nema dikare tiştên tên kirin veşêre. Saziyên cur bi cur ên cîhanê hema hema belavî her deverê bûne. Berê gelek caran nûçe û agahdariyên şaş li xelkê dihatin belavkirin, lê niha rastî di nava çend saetan de derdikeve holê. Di gelek meş û şahiyan de bi hezaran, bi deh hezaran Kurd bi yek dengî heman tiştî dibêjin. Di şahiyên Newrozê de bi sedhezaran Kurd di qadan de bi rengên xwe yên taybet xwe nîşan didin. Bi qeydiyan û di weşanên televizyonan de ev belav dibin. Ji aliyê din ve gerîla dikare her serê saetekê der barê operasyonan de dinyayê agahdar bike. Qewimînên berê jî dîsa bi riya çapemeniyê digihên gel, li gelek cihan tên belavkirin. Di heman demê de derfetên her kesî hene ku serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê bide û gelek bûyerên diqewimin derbasî qeydan dibin. Ev yek tev wê arşîveke nû ya dîrokê pêk bînin û wê tu tişt nema karibe bê veşartin. Tu kes jî wê nema karibe vana tune bihesibîne. Piştî demeke gelekî kin kesên ku mafên demokratîk binpê kirine, wê bi temamî bên heremolokirin û xeletiyên ku hatine kirin wê rê li ber tiştin din vekin. Wekî nimûne, qetlîamên dijwar ên ku Sedam Huseyîn li dijî Kurdan pêk anîn, kir ku hemû mudaxaleyên li dijî wî meşrû bên dîtin.

Ji niha û pê de tu kes nikare tenê di nav sînorê xwe de xwedî tevger be. Bi pêşketinên ku pêk tên, em dibînin bê ka cîhan çiqas biçûk bûye, her wiha em dibînin ku di gelek waran de sînor ji holê rabûne. Bûyereke ku li devereke ji rêzê ya cîhanê pêk tê dikare bandorê li gelek deverên din ên cîhanê bike. Di heman demê de bazarên neteweyî dikevin tengasiyê û toreke tîcaretê ya global bi pêş dikeve. Kesên ku di bazareke netewî û ji derve re girtî bi israr in winda dikin. Bi kurtasî divê mirov xwe adapteyî pêşketinên nû bike û di xetayên berê de israr neke. Civakên ku ji pêşketinên serdemê re girtî ne wê miheqeq winda bikin. Her wiha dema ku mirov li bûyeran dinêre, di cih de mirov dibîne ku ji şer kesekî qezenc nekiriye. Êdî divê mirov bi diyalogê, bi aştiyê xwe bigihîne çareseriyê.

Di sedsala 20'emîn de helwestên dewletan li gorî asta ku ew gihîştinê bi pêş ket. Ji bo hin dewletan tirsa guhertina sînoran bûye wekî kabûs û ji ber vê tirsê jî her tim xeletî kirin. Hinekan çavbirçîtî kirin û xwestin ku sînorên xwe berfireh bikin. Ji bo vê yekê jî di nîjadperestiyê de bi israr bûn, zilm kirin, hemû der şewitandin, xerakirin û di encamê de welatê xwe bixwe jî ajotin ber bi husraneke mezin ve. Li hin deveran jî ji xeletiyan ders hatin stendin û li gorî berê bêhtir çareserî û helwestên aştiyane hatin bipêşxistin.

Li hin dewletên ku ev pêvajo li du xwe hiştin, di demên dawî de ji bo ku sînor bê fonksiyon bimînin xebat tên meşandin. Civata Ewrûpayê ku yeki-

tiya di navbera hikumetên 12 dewletan de bû û bazareke hevpar wekî hedef dabû ber xwe, ji Zîrveya Maastrichtê ya 1992'yan vir ve, ji bo yekitiya pere û siyasî ya 15 dewletan, 'Hemwelatiya Ewrûpî' ya hevpar û ewlehiya maf û azadiyên bingehîn bigihîje îfadeyeke saziyî veguherî Yekitiya Ewrûpayê (YE).[398]

Di qada gera serbest a ku di çarçoveya peymana di sala 1985'an de li bajarokê Schengenê yê Luksemburgê hat îmzekirin, Almanya, Avusturya, Belçîka, Danîmarka, Spanya, Fînlandiya, Frensa, Yûnanistan, Îtalya, Luksemburg, Hollanda, Swêd, Norveç û Îzlandayê cih digirtin. Dûre li gorî biryara wezîrên karên navxweyî yên YE'yê Estonya, Macaristan, Letonya, Lîtvanya, Malta, Polonya, Slovenya, Slovakya û Komara Çek jî beşdarî qada Schengenê bûn.

Bi vî şiklî Ewrûpayê sînorên xwe yên hundirîn rakirin û rê li ber danûstendina mal, xizmet, fikir û sermayeyê ya nêzikî 400 milyon însanî vekir. Kesekî ku bikaribe vîzeyê ji welatekî Schengenê ku lê kontrolên li ser sînorên navxweyî hatiye rakirin bigire, wê bikaribe bi vê vîzeyê li van welatan hemûyan bigere.

Wekî ku me di beşên din de jî behs kir, ji ber xweşbîniya di hundirê van welatan de, îro gelek mirovên ku li welatên xwe di bin zilm û zorê de ne dixwazin herin Ewrûpayê û Amerîkayê. Welatê herî pêşî ku tê bîra kesên di bin zilmê de û dixwazin herinê ev welat in. Di dehsalên dawî de Ewrûpa, bi saya hiqûq û demokrasiya xwe bûye warê mirovahiyê. Gelek penaberên me jî li vê deverê dijîn. Ji ber vê yekê, mirov li welatên mezin ên Ewrûpayê rastî mirovên ji deverên cur bi cur ên cîhanê tê.

Her sal bi milyonan kes xwe li sînoran dixin û ber bi van dewletan ve diçin. Hin ji wan ji aliyê polîsan ve tên girtin, paş de tên vegerandin, hin ji wan jî di keştiyan de noqî binê avê dibin. Gelek keştiyên tije mirov ên ku derketibûn rêwîtiya hêviyê di avên Deryaya Ege û Deryaya Spî de noqî binê avê bûn.

Li Tirkiyeyê, di bultenên nûçeyên televîzyonan ên roja 27.03.2007'an de, dihat gotin ku 7 penaberên qaçax ên ku ji Îranê hatine ji ber sermayê qefilîne, jiyana xwe ji dest dane û ew rakirine nexweşxaneya Elbakê. Di beşeke malpera Artêşa Tirk de, hejmara kesên ku bê destûr sînor derbas kirine cih digire. Li gorî van nivîsan di mehan de hejmara kesên sînoran derbas dibin hezaran derbas dike. Ev di salekê de dike bi milyonan kes. Ev pirsgirêkên pir mezin in.

[398] Hastings Donnan-Thomas M.Wilson, bnb, r. 14

Roj bi roj şiklê pergala Amerîkayê wek mînak derdikeve pêş. Bi pirsgirêkên ku rû didin re, bi hewldanên Ewrûpayiyan ku dikin sînorê navbera xwe rakin, dikin ku bêhtir netewdewlet bên nîqaşkirin û nêziktêdayînên li netewdewletê bên guhertin. Di vî warî de pêşniyaz, wate û tarîfên nû tên kirin. Dîsa jî li gelek welatên cîhanê têkoşînên ku netew ji bo tayînkirina mafên xwe yên çarenûsê didin berdewam dikin. Bi taybetî jî miletên ku bindest in û zilm li wan tê kirin, wek liberxwedanekê vê têkoşînê her diçe gurtir dikin.

Kurd jî ji ber zilm û zora ku li ser wan hatiye meşandin, hê têkoşîna xwe didomînin. Di raporên hin saziyên Ewrûpayê de, tê diyarkirin ku Kurd li cîhanê neteweya herî mezin a bê dewlet e. Ligel berdewamiya alozî û kaosa li herêmê, asîmilasyon, sirgûn û nîjadkujiya ku dawî lê nayê Kurd, wek neteweyeke mezin li ser piyan e. Lê belê zilm û zora li ser wan hatiye meşandin nehiştiye ku Kurd bigihîjin sazûman û rewşeke hemdem. Her wisa ji ber ku ji dewlemendiya welatê xwe bêpar hatine hiştin, di rewşeke gelek feqîr û perîşan de ne. Lê dîsa jî her dem bûne alîgirê aştî û biratiyê.

Ji ber ku bi piranî dîroka Kurdan ji hêla hinên din ve hatiye nivîsandin, Kurd bi awayekî ji rastiya xwe cihê hatine danasandin. Ev dîrok bi piranî ne li gorî rastiyan, lê belê li gorî daxwaza alîgirên deshilatdaran hatine nivîsîn, ji lewre di vana de gelek caran neheqî li Kurdan hatiye kirin. Heta Kurdên ku haya wan ji vê rastiyê nîn in jî carna li gorî van nêrînan nirxandinan dikin.

Ligel ku bi sedsalan, gelek şexsiyetên Kurd di meqamên herî bilind ên Dewleta Osmanî de cih girtine jî, heta niha ez rastî tu çavkaniyê nehatime ku tê de bibêje Kurdan ji bo qelskirin û zeîfxistina Osmaniyan serî li lîstik û entrîkayan daye. Serhildanên ku çêbûne jî piştî zilm û zordariyekê pêk hatine. Hişkere û li ber çavan e bê çiqas bê tirs û mêr in. Şexsiyetên ku di şeran de bi lehengî cih girtibin û ruhê xwe dabin ma nikaribûn mirinê bidin ber çavên xwe û di vî warî de tiştekî bikin?

Berevajî vê yekê, di gelek bûyerên girîng ên dîrokî de em dibînin ku Kurd rastî îxanetê hatine. Taybetiyên Kurdan ên însanî gelek caran ji hêla hêzên dijber ve hatine bikaranîn û Kurd hatine têkbirin. Wekî nimûne, gelek serek û pêşengên Kurd ên ku piştî şeran ji bo hevdîtinên aştiyê hatine vexwendin, li cihê ku çûnê rastî îxanetê hatine, hatine girtin û tasfiyekirin. Wek Smail Axayê Şikakî (Simko Axa), wek Seyid Riza mirov kare gelek mînakan bide.

Ev yek bi temamî bi çandê re têkildar e. Merdî, li ser soza xwe sekînin û lehengî li pêş e. Kurdên ku mîrasgirên civaka maderşahî ya serdema Neolîtîkê ku afirînerê gavên ber bi movahiyê ye, dilbirehm û dilovan in.

Wekî ku her kes bi awayekî hişkere diyar û teqdîr dike mêvanperwer in. Mêvanperweriyê rehê xwe berdaye nava çanda Kurdan, lewre ew her tim bi niyeteke baş nêzikî biyaniyan dibin. Ji ber vê yekê ye ku hetanî sedsala 20'an her tim xelk bi rêzdarî nêzikî Kurdan bûye. Pevçûnên ji ber pirsgirêkan li aliyekî di dema Împaratoriya Osmanî de wekî milet, ji Tirkan ne berbiçavtir bin, ji wan ne kêmtir in.

Di dîroka Kurdan de xedarî tune ye, bi piranî helwest û nêziktêdayînên aştiyane û erênî hakim in. Di nav Kurdan de hema bibêje di hemû deman de ev nêziktêdayîn xuya dike. Ji bilî axa xwe, tu demê ji bo ku li ser erdên gelên dîtir hikumraniya xwe pêk bînin, neketine nava tu hewldanê. Ji dema Ehmedê Xanî ve hestên wan ên milî hişyar in, lê tu demê nefikirîne ku miletekî din tune bikin.

Di demên xwe yên dawî de jî Kurdan ji bo xwe riya terorê nehilbijartine. Der barê Kurdên ku hema hema di hemû mewqî û meqamên dewletan de, di radeyên bilind de cih girtine tu demê nehatiye bihîstin ku serî li riyeke ku wekî teror were nirxandin, dane. Her wiha gelek riyên navneteweyî yên neqeba rojhilat û rojava, başûr û bakur, kaneyên neftê û xetên petrol û gazê yên ku wekî şahdamarê gelek dewletan in tevde di Kurdistanê re derbas dibin. Heger ku Kurdan berê xwe bida wan wê gelek alozî û pirsgirêkên mezin çêbibûna. Lê belê ji bilî hin îstisnayên biçûk tu demê Kurdan li dijî wan êrîş pêk neanîne.

Berevajî vê yekê, Kurdan ji bo pêşketina dewletên ku ew lê ne, çi ji destê wan hatibe kirine. Li dewletên ku ew lê ne, ji bo rêveberiyeke baş her tim rola lokomatîfekê lîstine. Di programa PDK'a Îranê de tê gotin: "...Têkoşîna me bi qasî ku têkoşîna diyarkirina çarenûsa xwe ya gelê Kurd e, ew qas jî têkoşîna rizgariya temamiya Îranê ye..." Li bal rêxistinên Kurdan ên li parçeyên din jî heman nêziktêdayîn heye. Her muxalefeteke ku piçekî ji bo pêşerojeke baştir re hêvî dide, bi piştgiriya Kurdan dibe desthilatdar. Li Tirkiyeyê di dema nuh derbasî pirpartitiyê bûn sedema ku Kurdan piştgirî dan Partiya Demokrat (DP) ev e. Bi vî şiklî Kurdan bi destekkirina pêşketinên nû, kirine ku dewletên ew lê ne ber bi pêş ve gavan biavêjin. Lê belê piştî ev partiyên muxalefetê bûne desthilatdar barê ku dikeve ser milê wan neanîne cih. Bi helwesteke baş nêzikî Kurdan nebûne û ji lew re pirsgirêk jî nehatine çareserkirin.

Wekî ku ji jiyana derbasbûyî û vegotinên di vê kitêbê de jî diyar dibe, li cîhanê têkoşîna netewî ya Kurdan, têkoşîna herî dijwar e. Lê, wekî ku me li jorê jî behs kir, li gelek deveran avakirina dewletên nû, rewşa guherbar a

girîng a li parzemîna Avrasyayê û gelek mijarên din ên ku berê wekî mijarên radîkal û alozwarî dihatin dîtin û dihatin redkirin, êdî ji civaka navneteweyî destekê distînin. Ev rewş hêviyê dide Kurdan jî.

Di şaristaniya Rojhilata Navîn de keda gelek civat û miletan heye. Ji loma her tim xwedî çandeke rengîn e û ev rengîniya xwe parastiye. Sînor li Rojhilata Navîn nayê, heta mirov kare bêje wê ber bi tunebûnê de dibe. Em dizanin li Rojhilata Navîn dinyayeke bê sînor hê gelek dûr e, lê di serdemeke ku teknolojî û komînîkasyon ev qas bi pêş ketiye, dibe ku ji bo kontrol û ewlehiya sînoran di demeke kurt de riyeke hê bêhtir însanî were dîtin. Bi taybetî jî ku rê li ber Kurdan vebe dibe ku gelek pêşketinên girîng çêbibin.

Di vê navberê de, berpirsiyariya Kurdan jî zêde bûye. Nêziktêdayîna antropolojî û sosyolojiyê ya sînoran a nû, berî her tiştî sînoran wekî qadeke sêyem a di navbera her du qadên desthilatdar de, wekî şansekî guherîn û nûbûnê (thirds-pace) (Soja, 1996), an jî wekî hewzeke çandê dibîne.[399] Kurdên ku çar hêlên wan herêmên sînor in, xwedî çandeke dewlemend in. Heger ku bikaribin ji serpêhatiyên xwe yên li sînoran jî dersên nû derxin, wê bikaribin di vê qadê de gelek rolên girîng bigirin ser xwe. Ji ber ku têkiliya Kurdan bi qada çar çand û rêveberiyên cihê re heye ew xwedî îmtiyaza sentezkirinê ne û ji ber vê jî dikarin dezavantajên sînoran veguherînin avantajê.

Her çandek bi serê xwe cîhanek e. Di têkiliya çandên cihê de mirov cîhanên nû nas dike. Hevnasîn û têkilîdanîn zêde bibe hezkirin jî zêde dibe, mirov wê demê baştir dikare ji hevdu fêm bike û pirsgirêkan çareser bike. Esasen rakirina sînorê di navbera çandan de zehmettir e. Ji ber nebûna sînorên Kurdistanê, Kurd di vî warî de bi avantaj in. Bi xweşî be, bi pevçûn be jî têkildarî gelek çandên cihê bûne. Belkî ji ber vê yekê ye xwe aîdî her çar aliyan dibînin. Ev yek nîşanî me dide ku Kurd ne çanda li ser wan hatiye ferzkirin dijîn, ew kevneşopiya pirçandî ya hezar salan berdewam dikin. Niha gelek Kurd herî kêm du zimanan dizanin. Kurd îro hevparê çanda Îraq, Îran, Sûriye û Tirkiyeyê ne. Pratîka di dîrokê de jî nîşanî me dide ku Kurdan tu demê dev ji Tehran, Stenbol, Bexda û Şamê bernedaye. Kurd jiyana pirçandî ji nêz ve nas dikin. Neteweyeke ku bi derfeteke herî biçûk dikare her car xwe ji nû ve biafirîne, bi serpêhatiya xwe ya di qadên cur bi cur de, îro karin di navbera gelek netewan de bibin xebatkarê aştiyê.

[399] Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik, bnb., r. 101

# ÇAVKANÎ

A. M. Menteşaşvili, Dünden Bugüne Kürtler
2. Basım, Evrensel Basın Yayın, 2004

Abdulgani Efendi, Mardin Tarihi
Yayına Hazırlayan: Burhan Zengin
T.C. Başbakanlık Güneydoğu Anadolu
Projesi Bölge Kalkınma İdaresi Başkanlığı
1999, Ankara

Abdurrahman Qasımlo, Özgürlük Mücadelesinde Kırk Yıl
Koral Yayınları, 1992, İstanbul

Ahmet Kahraman, Kürt İsyanları
Evrensel Basım Yayın, 2. basım, 2004, İstanbul

Ahmet Mesut, İngiliz Belgelerinde Kürdistan (1918-1958)
Doz Yayınları, 1992, İstanbul

Ahmet Şık(hazırlayan)
Mayın, Diyarbakır Barosu Yayını
2006, İstanbul

Altan Tan, Kürt Sorunu, Timaş Yayınları, 2009, İstanbul

Andrew Collins, Meleklerin Küllerinden
Avesta Yayınları, 2002, İstanbul

Arşak Poladyan, VII.- X.Yüzyıllarda Kürtler
Öz-Ge Yayınları, 1991, Ankara

Aylık Coğrafya ve Keşif Dergisi Atlas, Sayı:112, Temmuz 2002
Ayşegül Dora Güney, İran'da Devrim
Haziran Yayınları, 1979, İstanbul

Aziz Nesin, Bulgaristan'da Türkler Türkiye'de Kürtler
Adam Yayınları, 1989, İstanbul

Banu Avar, Sınırlar Arasında
Doğan Kitapçılık, 2006, İstanbul

Bazil Nikitin, Kürtler
Sosyolojik ve Tarihi İnceleme, Cilt 1-2
Deng Yayınları, 5. baskı, 2002, İstanbul

Belkıs Kümbetoğlu-Hande Birkalan Gedik
Gelenekten Geleceğe Antropoloji
Epsilon Yayınları, 2005, İstanbul

Bülent Çelik, Kendekol Katliamı
Doz Yayınları, 2006, İstanbul

C. J. Edmonds
Kürtler, Türkler ve Araplar
Avesta Yayınevi, 2003, İstanbul

Cegerxwîn, Hayat Hikayem
Kürtçe'den çeviren: Gazi Fincan
Evrensel Basın Yayın, Haziran, 2003, İstanbul

Cegerxwîn, Jînenîgariya Min
Apec, 1995, Stockholm

Celadet Ali Bedirxan, Kürt Sorunu Üzerine
Avesta Yayınları, 1997, İstanbul

Chris Kutschera, Kürt Ulusal Hareketi
Avesta, 2001, İstanbul(İlk basım-Paris, 1979)

Colin McEvedy, The Penguin Atlas of Medieval History
Penguen, London, 1992

Doğan Avcıoğlu, Milli Kurtuluş Tarihi (1838-1995)
Tekin Yayınevi, 1986, İstanbul

Dr. Abdurrahman Qasımlo, İran Kürdistanı
Belge Yayınları, 1991, İstanbul

Dr. Durmuş Yılmaz
Misak-ı Milli'ye Göre; Musul
Alagöz Yayınları, 1995, Konya

Dr. Jawad Mella, The Colonial Policy of the Syrian
Baath Party in Western Kurdistan,
Western Kurdistan Association
2006, London

Dr. Nuri Dersimî, Hatıratım
Doz Yayınları, 1997, İstanbul

Erik Jan Zürcher
Osmanlı İmparatorluğu'nda Sosyalizm ve Milliyetçilik (1876-1923)
İletişim Yayınları, 1995, İstanbul

Ersal Yavi, Kürdistan Ütopyası (1. Dosya)
Yazıcı Yayınevi, 2006, İzmir

Ersal Yavi, Kürdistan Ütopyası (2. Dosya)
Yazıcı Yayınevi, 2006, İzmir

Ethem Xemgîn, Kürdistan Tarihi
Doz Basım Yayın, 5. baskı, 2004, İstanbul

Faik Bulut, Türk Basınında Kürtler
Melsa Yayınları, 1992, İstanbul

Ferzende Kaya, Mezopotamya Sürgünü Abdulmelik Fırat'ın Yaşam Öyküsü,
Anka Yayınları, 2. Basım, 2003, İstanbul
Fikret Başkaya, Paradigmanın İflası
Doz Basın ve Yayın, 1997, İstanbul

Gunnar Ekelöf, Emgion Prensi İçin Divan
Çeviren: Hüseyin Baş, Yapı Kredi Yayınları, 2003, İstanbul

Günay Aslan, Yas Tutan Tarih-33 Kurşun
Pencere Yayınları, 1989, İstanbul

H. Mem, Mamosteyê Sêyemîn Xanî
Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2004, Stenbol

Hasan Uşak, Kürdistan'da Aşiretçilik Ve Milliyetçilik
Aram Yayınları, 2005, İstanbul

Hasan Yıldız, Aşiretten Ulusallığa Doğru
Fırat Dicle Yayınları, 1991, İstanbul

Hasan Yıldız, Fransız Belgeleriyle
Sevr-Lozan-Musul Üçgeninde Kürdistan
Koral, 1992, İstanbul

Hassan Arfa, Kürtler-Tarih ve Politika
Avesta Yayınları, 2006, İstanbul

Hassan Arfa, The Kurds -An Historikal and Political Study
London, Oxford University Press, 1966

Hastings Donnan-Thomas M.Wilson, Sınırlar
Ütopya Yayınları, Ankara, 2002

Hawar Cild-1, Hejmar 1-23 (1932-1933)
Weşanên Nûdem, Amadekar: F. Ceweri, 1998, Stockholm

Hawar Cild-2, Hejmar 24-57 (1934-1943)
Weşanên Nûdem, Amadekar: F. Ceweri, 1998, Stockholm

Hüsrev Gerede, Siyasi Hatıralarım-İran(1930-1934)
Vakit Basımevi, 1952, İstanbul
Irak-İran Çekişmesi, Kültür ve Tanıtma Bakanlığı
Bağdat, Irak, 1981

İlber Ortaylı, Son İmparatorluk Osmanlı
Timaş Yayınları, 2006, İstanbul

İlhami Aras, Adım Şeyh Said
İlke Yayıncılık, 1997, İstanbul

İslam Ansiklopedisi
Türkiye Diyanet Vakfı
1988 ... 2011, İstanbul

İsmail Beşikçi, Devletlerarası Sömürge Kürdistan
Yurt Kitap Yayın, 1991, Ankara

İsmail Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni
Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temeller-I
Yurt Kitap, Yayın, 1992, Ankara

İsmail Beşikçi, Doğu Mitingleri'nin Analizi (1967)
Yurt Kitap Yayın, Ankara, 1992

İsmail Beşikçi, Kürtlerin Mecburi İskânı
Yurt Kitap Yayın, Ankara, 1991

İsmail Beşikçi, Türk Tarih Tezi-Güneş Dil Teorisi ve Kürt Sorunu
Yurt Kitap Yayın, 1991, Ankara

İsmail Göldaş, Lozan-'Biz Kürtler ve Türkler'
Avesta Yayınları, 2000, İstanbul

İsmail Göldaş, Takrir-i Sükun Görüşmeleri
1923 'Seçim'leri-Atama Meclis
Belge Uluslararası Yayıncılık, 1997, İstanbul

İttihad ve Terakki Cemiyeti'nin kurucusu ve 1/1 no'lu üyesi İbrahim Temo'nun İTTİHAD VE TERAKİ Anıları (Doktor İbrahim Temo İTTİHAD VE TERAKİ Cemiyetinin Teşekkülü ve Hidemati Vataniye ve İnkılâbi Milliye Dair Hatıratım-Romanya-1938)
Arba Yayınları, 1987, İstanbul

Janet Wallach, Çöl Kraliçesi
İngilizce aslından çeviren: Püren Özgören
Can Yayınları, 2004, İstanbul

Kerim Yıldız, Irak Kürtleri
Belge Yayınları, 2005, İstanbul

Ksenophon, Anabasis (Onbinlerin Dönüşü)
Sosyal Yayınlar, 1998, İstanbul

Laleş Qaso, Sê Şev û Sê Roj
Weşanên NÛDEM, 1999, Stockholm

M. Kalman, İngiliz ve Türk Belgelerinde Botan Direnişleri (1925-1938)
Med Yayınları, 1996, İstanbul

M. Kemal Atatürk, Nutuk
Örgün Yayınları, 1980, İstanbul

M. Sadi Koçaş, Kürtlerin Kökeni ve Güneydoğu Anadolu Gerçeği
Kastaş A.Ş.Yayınları, 1990, İstanbul

M. S. Lazarev, Emperyalizm ve Kürt Sorunu (1917-1923)
Öz-Ge Yayınları, 1993, Ankara

Madame Ghaderi Soheila (épouse) Mameli
Quelles Frantieres Pour Le Mayen-Orient
Les Frontieres Des Etats Nes De La Partie
Asiatuque de L'empire Ottoman 1913-1939
Universite de Paris I Pantheon-Sorbone, 1996

Mahmut Baksi, Kürdistan Tarihinde Kamışlı Katliamı
Med Yayınları, 2. Baskı, 1993, İstanbul

Manvel A. Hasratyan, Kurdên Tirkiyê Di Dema Herî Nuh Da
Enstituya Kurdî Ya Brukselê, 1994, Bruxelles

Martin van Bruinessen
Agha, Shaikh and State
on the social and political organization of Kurdistan,
Dissertation, Rijksuniversiteit Utrecht, 1978

Martin van Bruinessen, Kürdistan Üzerine Yazılar
İletişim Yayınları, 1992, İstanbul

Mehmed Hurşîd (Paşa), Seyehatnâme-i Hudûd
Çevrimyazı:  Alâattin Eser, Simurg Yayınları, 1997, İstanbul

Mehmed Uzun, Ruhun Gökkuşağı
İthaki Yayınları, 2005, İstanbul

Mesut Barzani, Barzani ve Kürt Ulusal Özgürlük Hareketi
Doz Yayınları, 2003, İstanbul

Michael Roaf, Bildatlas Der Weltkulturen MEZOPOTAMIEN
München, 1991

Mihemed Emîn Zekî Beg, Dîroka Kurd û Kurdistanê
Weşanên Avesta, 2002, Stenbol (Çapa ewil-Silêmaniyê-1931)

Muhsin Kızılkaya, Eski Zaman Eşkiyaları
Sel Yayıncılık, 1999, İstanbul

Mustafa Akyol, Kürt Sorununu Yeniden Düşünmek
Yanlış Giden Neydi? Bundan Sonra Nereye?
Doğan Kitapçılık, 2006, İstanbul

Mustafa Balbay, İran Raporu
Cumhuriyet Yayınları, 2006, İstanbul

Naci Kutlay, 21. Yüzyıla Girerken Kürtler
Peri Yayınları, 2002, İstanbul

Nadire Mater, Mehmed'in Kitabı
Güneydoğu'da Savaşmış Askerler Anlatıyor
Metis ayınları, 6. basım, 2004, İstanbul

Necefkuli Pısyan, Kanlı Mahabad'dan Aras'ın Kıyılarına
Avesta Yayınları, 2001, İstanbul

Nevzat Bingöl, Suriye'nin Kimliksizleri Kürtler
Elma Yayınları, 2005, İstanbul

Orhan Mîroğlu, Çapraz Ateşte İki Halk: Türkler ve Kürtler
Beybun Yayıncılık, 2005, Ankara

Prens Sureyya Bedirhan, Kürt Davası ve Hoybun
Med Yayınları, 1994, İstanbul

Prof. Dr. Celîlê Celîl, 1880 Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması
Peri Yayınları, Türkçeye Çeviren M. Aras, 3. baskı, 1998, İstanbul

Prof. Dr. Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğunda Kürtler
Özge Yayınları, Rusçadan çeviren: Mehmet Demir, 1992, Ankara

Prof. Dr. George Rawlinson, Eski Doğu'nun Büyük Krallıklarından Medya Krallığı
İngilizceden Çeviren Nadire Işık, Doz Yayınları, 2006, İstanbul

Prof. Dr. H.Neşe Özgen, Toplumsal Hafızanın Hatırlama Ve Unutma Biçimleri
TÜSTAV (Türkiye Sosyal Tarih Araştırma Vakfı), 2003, İstanbul

Prof. Mehrdad R. İzady, Kürtler-Bir El Kitabı
Doz Yayınları, 2004, İstanbul

Rafet Ballı, Kürt Dosyası, Cem Yayınları, 1991, İstanbul

Refîq Hilmî, Yadaşt-Başûrê Kurdistanê û Şoreşa Şêx Mehmûd
Kurmanciya wê: Ziya Avcı, Weşanxaneya Lîs, 2010, Stenbol

Roderic H. Davison
Osmanlı-Türk Tarihi (1774-1923)
Alkım Yayınevi, 2004, İstanbul

Rohat Alakom, Aristokratên Kurd: Torin
Apec Tryck AB, 2004, Stockholm

Rohat Alakom, Eski İstanbul Kürtleri (1453-1925)
Avesta, 1998, İstanbul

Rohat Alakom,
General Şerif Paşa, Bir Kürt Diplomatının Fırtınalı Yılları
Weşanên APEC, 1995, Stocholm

Rohat Alakom, Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması
Avesta Yayınları, 1998, İstanbul

Serdem Çiyayî(derleyen), Yarınlara Yol Almak/Gerilla Anıları-III
Aram Yayıncılık, 2003, İstanbul

Sheri Laizer, Ateş Altındaki Kürdistan
Koral Yayınları, 1992, İstanbul

Soner Yalçın, Binbaşı Ersever'in İtirafları
Kaynak Yayınları, 1994, İstanbul

Stefanos Yerasimos
Milliyetler ve Sınırlar-Balkanlar, Kafkasya ve Orta-Doğu
İletişim Yayınları,1995, İstanbul

Suavi Aydın-Kudret Emiroğlu-Oktay Özel-Süha Ünsal
Mardin/Aşiret-Cemaat-Devlet
Tarih Vakfı Yayınları, 2000, İstanbul

Susan Meiselas, Kurdistan In the Shadow of History
Random House, 1997, London

Şakir Epözdemir, 1514 Amasya Antlaşması
Kürt-Osmanlı İttifakı ve Mevlana İdris-i Bitlisi
Peri Yayınları, 2005, İstanbul

Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname-Tarixa Kurdistanê ya Kevn
Wergera Kurmancî: Ziya Avcı
Weşanxaneya Apecê, 1998, Stockholm

Şeref Han, Şerefname-Kürt Tarihi
Çeviren: M.Emin Bozarslan
Hasat Yayınları, 1990, İstanbul

Şevket Beysanoğlu, Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi (3.basım)
MN Tanıtım, 1998, Ankara

Şevket Beysanoğlu, Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi-Cumhuriyet Dönemi Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları, 2001, Ankara
Tarihten Günümüze Türk İran İlişkileri Sempozyumu (16-17 Aralık 2002/Konya) Türk Tarih Kurumu Yayınları, 2003, Ankara

Tîroj
Kovara Du Mehî Çandeyî Hunerî (15 Rezber-15 Cotmeh), Hejmar:22, İstanbul

Türk Basınında İran-Irak Savaşı
Hazırlayan: İran İslam Cumhuriyeti Ankara Büyükelçiliği
Kadıoğlu Matbaası, 1984, Ankara

Uluslararası Paris Kürt Konferansı, 14-15 Ekim 1989
Hazırlayan: Paris Kürt Enstitüsü, Doz Yayınları, 1992, İstanbul

Prof. Vladimir Fedorovich Minorsky, T. H. Bois, D. N. Mac Kenzie
Kürtler ve Kürdistan
Doz Yayınları, 1996, İstanbul

Vedat Türkali, Özgürlük için Kürt Yazıları
Gendaş Kültür , 2002, İstanbul

Prof. Vladimir Fedorovich Minorsky
Musul Sorunu
Avesta Yayınevi, 1998, İstanbul

William Eagleton Jr. , The Kurdish Republic of 1946
Oxford University Press, 1963, London

Yalçın Küçük, Kürtler Üzerine Tezler
Dönem Yayıncılık, 1990, İstanbul

Zehra Ayman, Bellek Mekan Olarak Sınır ve Ötekilik; Kars Şehri, İstanbul Bilgi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kültürel İncelemeler Yüksek Lisans Programı Bitirme Tezi, 2005

Zekî Bozarslan, Nerînek Li Dîroka Kurdistanê
Doz Yayınları, 2004, İstanbul

Zeki Sarıhan, Kurtuluş Savaşı Günlüğü (1)
Türk Tarih Kurumu Yayınları, 1993, Ankara

Ziya Gökalp, Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler
Sosyal Yayınlar, 1992, İstanbul